# NEWŞE DÎNÊ ÊZÎDIYAN

# ЕЗИДСКОЕ СВЯЩЕНОСЛОВИЕ

# THE YEZIDI HOLY HYMNES

2020

## Nexşeya belavkirina êzîdîtiyê / Карта распространения езидизма[1]




1. Sheykhan – Шейхан  2. Dohuk – Дохук  3. Behzani/Bashiqa – Бахзани/Башика
4. Sinjar – Синджар  5. Jazira – Джазира  6. Tur 'Abdin – Тур Абдин
7. Kurd Dagh – Курд Дах  8. Transcaucasia – Закавказье

[1] binêr: Proceedings of the International Symposium held in Istanbul, 4th – 6th May 2007, Birgül Açıkyıldız «*Cultural Interaction between Anatolia and Mosul in the Case of Yezidi Architecture*» (p 159)

# ВСТУПИТЕЛЬНОЕ СЛОВО

Уважаемый читатель! Эта книга поможет вам открыть врата в духовный мир езидов, представителей таинственной религиозной общины, которая была основана учениками великого суфийского мастера
шейха Ади ибн Мусафира в XII веке на территории северной Месопотамии.

Большинство езидов живут на своих исторических землях в Ираке, в близи города Мосула, в городах Синджар (Шангал), Дохук, Захо, Шейхан, вокруг Ниневии и в многочисленных селениях, расположенных в округе. В близи Синджара отмечены деревни Бардам-ли, Манйакарс, Джадала, Тарф, Кувис, Дадика, Самока, Хабайа, Мандикан, Хатами, Тел Касаб, Карсин, Бакран, Иусфан, Махкран, Дилкан. В районе города Шейхан расположено селение Ба'адра (столица езидов) и деревни Айн-суфни, Башика, проживают также на землях между Артушем, рекой Гомал и горой Маклуб. В Турции езиды населяют Тур, Абдин, Нисибин, Диарбакр, Мардин, Мидьят, Батман, Вераншахир, Сирнах, побережье озера Ван и город Эрзерум, в Сирии — Африн, Амуд, Камушлы. Большая диаспора езидов переселилась и осела на территории Армении, Грузии и России, последняя волна миграции приходится на страны Европейского союза.

На протяжении восьми веков езидское сообщество, подвергаясь постоянным нападкам и гонениям со стороны исламских радикалов (насчитывает 74 геноцида), стоически хранило приверженность к вероучению своего наставника. Представители духовенства, строго оберегая основы религии от иноверцев и мирян, передавали сакральные знания последующим поколениям из уст в уста.

С 80-х гг. XX века миром всех езодов Тахсин-беком, с одобрения Высшего духовного собрания, был снят запрет на письменную фиксацию священных текстов.

Данный свод священных гимнов — первый шаг на пути сложения езидского Псалтиря.

В процессе отбора образцов езидского священословия для данной книги, автору пришлось выполнить дополнительно работы следующего порядка:

1. Подвести все представленные молебны под одно письмо, в качестве которого избран наиболее распространённый латинский алфавит — опубликованные на арабской графике и на кириллице тексты переложены на латынь, что значительно расширяет круг читателей.
2. Во избежания погрешностей при прочтении, тексты молитв приводятся в транскрипции.
3. Отредактированы грамматические, орфографические, пунктуационные и стилистические ошибки, проставлены знаки препинания.
4. Введена классификация по виду и жанру религиозной поэзии.
5. Поскольку кавлбежи (сказители) являются носителями разных диалектов, по возможности язык повествования унифицирован.
6. С целью сбережения всего духовного наследия и удобства сличения молитв, записанных от разных информаторов, тексты разбиты на стихи и строки, пронумерованы, и размещены друг под другом.
7. Для сравнительного анализа и установления истоков религии езидов, в качестве приложения представлены священные тексты курдов других конфессий: мусульман, христиан и зороастрийцев.

Книга может быть использована ученными-религиоведами в качестве дополнительного источника знаний по езидскому богословию, предназначаться в качестве требника священнослужителям, а в традиционной езидской семье стать молитвенной книгой, быть истребована как курдами–мусульманами, так и представителями других вероисповеданий региона Курдистан, и для тех, кто интересуется локальными религозными течениями.

# I. Qewl

*«Qewl — k'êra r̂uhê êzdiyaye»*

# 1. QEWLÊ TAWISÎ MELEK'[2;3]

**S. 1** *1 Ya[4] Rêbî, a'la[5] şanek, û a'la mek'anek, û a'la silt'anek[6]!*
*2 Ya Rêbî, tuyî K'erîmî, tuyî Rahîmî!*
*3 Ya Rêbî, her tu Xwedayî[7],*
*4 Her tuyî layîqî medih û senayî!*
**S. 1** *1 Ya Rêbî, a'la[8] şanek, a'la mek'anek, a'la silt'anek.*
*2 Ya Rêbî, tu Xwedayî!*

**S. 2** *1 Ya Rêbî, tu Melikê[9] melkê[10] cîhanî!*
*2 Ya Rêbî, tu Melikê melkê K'erîmî,*
*3 Tu Melikê E'rşê E'zîmî.*
*4 Ya Rêbî, ji enzel da her tuyî Qedîmî.*
**S. 2** *1 Ya Rêbî, tu Melikê[11] canî,*
*2 Tu Melikê melkê K'erîmî,*
*3 Tu ji enzel da yî Qedîmî.*

**S. 3** *1 Tu tam, û kam, û r̂ayî!*
*2 Ya Rêbî, her tu Xwedayî,*
*3 Her tu hay layîqî medih û senayî!*
**S. 2** *4 Ĥeta ĥetayê tu kama r̂uĥayî.*
*5 Ya Rêbî, tu Xwedayî!*

**S. 4** *1 Ya Rêbî, tu Melikê ins û cinsî!*
*2 Ya Rêbî, tu Melikê E'rş û K'ursîy!*
*3 Ya Rêbî, tu Melikê Gay û Masî!*
*4 Ya Rêbî, tu Melikê a'lem û qudsîy!*
**S. 3** *1 Ya Rêbî, tu Melikê cin û insî, E'rş û K'ursîy,*

**S. 5** *1 Tu il-Semedî, il-Lutfî[12], Lemayî!*
*2 Tu il-Semedî, Ĥey il-Mecîdî,*
*3 Vehdê ferz il-Ĥemîdî[13].*
**S. 3** *2 Semedî, Lutf û Lemayî, Ĥey, il-Mecîdî,*
*3 Vaĥid[14] il-Ferd, il-Ĥemîdî.*
*4 Ya Rêbî, tu Xwedayî!*

**S. 6** *1 Ya Rêbî, tu Xwedawendê sep'ehrî!*
*2 Ya Rêbî, tu Xwedanê Meh û Mehrî[15]!*
*3 Ya Rêbî, tu Xwedanê ceh û merî*
**S. 4** *1 Ya Rêbî, tu Xwedawendê seferî,*
*2 Tu Xwedawendê Meh û Me[h]rî,*

---

[2] http://www.yezidi-european-society.de/ku/?Diha_%FB_Qewl:Qewl%EA_Tawis%EE_Melek; Xeribo (Ilyas) http://www.rojava.net/08.06.2007_Qewl.htm
[3] [2] Dua' Tawisî melek' (pp 990–992)
[4] Если читать какое-либо из этих имен Аллаха выборочно, то надо читать с добавлением вначале «йя» взамен начальных артиклей «аль-», «ар-», «аз-» и так далее. Т.е. например, имя «ар-Рахмаан» читается в этом случае как «йя-Рахмаан»
[5] *e'la*
[6] *sulten*
[7] *xudayî*
[8] *ela*
[9] *melek*
[10] *melek*
[11] *melek*
[12] *lift*
[13] *himîd*
[14] *waĥid*
[15] binêr: *mihr*

*3 Tu Xwedawendê çendî omerî,*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, tu Xwedawendê etayî!*
*2 Ya R̂ebî, tu layîqî medih û senayî!*
**S. 4** *4 Tu Xwedawendê etayî.*
*5 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, ji îsma tuyî bilindî!*
*2 Te nav li çune, tuyî çendî,*
*3 Na zêyî, ne zayî, tu zendî!*
**S. 5** *1 Ya R̂ebî, ji nava tuyî bilindî,*
*2 Te nav çende, tuyî çendî!*

**S. 9** *1 Miqadestê dû p’ayî!*
*2 Tuyî layîqî medih û sena[yî]!*
**S. 5** *3 Tu miza zendê du p’ayî!*
*4 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, tu k’erem daye ĥûtî*[16]*,*
*2 Mendayê qûtî,*
*3 Ĥelîmî melikûtî*[17]*.*
**S. 6** *1 Ya R̂ebî ,tu k’erem dayê ĥutî,*
*2 Tu mendayê qutî,*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, tu Alîmê ilmay!*
*2 Ya R̂ebî, tu hem ĥekîmî, û hem mecalî!*
**S. 6** *3 Tu Alîmê ilmayî.*
*4 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 12** *1 Ya R̂ebî, te ne xafe, te ne xwerde*[18]*,*
*2 Xwedan malî, xwedan p’erde.*
*3 Ya R̂ebî, mek’anê te wê li ĥemû e’rde!*
**S. 7** *1 Ya R̂ebî, tu Xwedan malî, Xwedan p’erde,*
*2 Ciyê te li ĥemû e’rde!*
*3 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 13** *1 Ya R̂ebî, te ne lewne, te ne r̂enge,*
*2 Te ne awaze, te ne denge,*
*3 Te ne endame, te ne çenge.*
*4 Ya R̂ebî, kes nizane tuyî kusay.*
**S. 8** *1 Ya R̂ebî, te ne lewme*[19]*, te ne r̂enge,*
*2 Te ne awaze, te ne denge,*
*3 Te ne, endame*[20]*, te ne denge,*
*4 Ya R̂ebî, kes nizanit tuyî çawanî?!*

**S. 14** *1 Ya R̂ebî, tu weliyê ferza nimêjî,*
*2 R̂uĥ dip’erêjî*[21]*,*
*3 Ji milan milkan dibêjî*[22]*,*
*4 Ya R̂ebî, Ĥakimê şah û gedayî.*
**S. 9** *1 Ya R̂ebî, tu weliyê nimêjî,*
*2 Tu mal û milka dip’erêsî*[23]*,*
*3 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

---

[16] *hatî*
[17] *melik kûtî*
[18] *xurde*
[19] *lone*
[20] *îndam*
[21] biner: *p’erês*
[22] *dibêjî*
[23] *diberêzî*

**S. 15** *1 Ya Ȓebî, tu Ĥakimê cimletî a'lem!*
*2 Ya Ȓebî, te t'obe danabû li ser Adem.*
**S. 10** *1 Ya Ȓebî, tu Ĥakimê şah û gedayî,*
*2 Tu Ĥakimê cimletî a'lem*[24]*,*
*3 Te t'obe kirbû li Adem,*
*4 Ȓê bû Îsa bin Miriyem.*
*5 Ya Ȓebî, tu Xwedayî!*

**S. 16** *1 Ya Ȓebî, Ĥakimê şefayî*[25]*!*
*2 Ya Ȓebî, tu Ȓeĥmî, K'eremî, Emînî!*
*3 Ya Ȓebî, tuyî il-Semedî, em çû nînin.*
**S. 11** *1 Ya Ȓebî, tu Ȓeĥmî, tu K'eremî,*
*2 Tu Emînî, tu Semedî, em çu*[26] *nînin.*
*3 Ya Ȓebî, tu Xwedayî!*

**S. 17** *1 Ya Ȓebî, ezî k'etîme, yî t'awîme,*
*2 Tu hem dermanî, û hem dawayî,*
*3 Tu hem dermanî, û hem t'ebîbî!*
*4 Tu Ĥakîmî*[27]*, em ẍerîbîn*[28]*.*
**S. 12** *1 Ya Ȓebî, êk nema li t'ayî,*
*2 Ya Ȓebî, ez k'etîme, t'awîme,*
*3 Tu dermanî, tu ĥekîmî,*
*4 Tu Ĥakimî, em di ẍerîbîn.*
*5 Ya Ȓebî, tu dizanî derd û dermanê me li k'o dibî.*

**S. 18** *1 Ya Ȓebî, her tu dizanî dermanê me bi çi dibe.*
*2 Ya Ȓebî, tu ûnsê xirbayî*[29]*!*
**S. 13** *1 Ya Ȓebî, tu ûnsê xirbayî*[30]*,*
*2 Sûc, û gune[h], û mişurî*[31]*.*

**S. 19** *1 Li sûc, û guneh, û mişeweşe*[32]*,*
*2 Me kirin teĥiyat û gewşe,*
*3 Ya Ȓebî, li me bibexşe.*
**S. 14** *1 Me nas kirin, me kirin teĥiyat û goşe,*
*2 Ya Ȓebî, her tu me bibexşe!*
*3 Ya Ȓebî, tu Heyî, tu Heyî, tu Heyî.*

**S. 20** *1 Ya Ȓebî, her tuyî hey, û tu Xweday,*
*2 Her tu layîqî medih û senay!*

**S. 21** *1 Ya Ȓebî, tu xaliqî — em mexlûqîn,*
*2 Tu mirazî — em daxwazîn!*

**şaxê – 2**[33]
**S. 1** *1 Ya Xwedê, bilinde navê te,*
*2 Bilinde cihê te,*
*3 Bilinde P'adşahiya te!*

---

24 *alim*
25 *şîfa*
26 binêr: *t'u*
27 *ĥekîm*
28 *xerîbîn*
29 *xurbayî*
30 *xurba*
31 *mişut*
32 *mişewie*
33 [50] (rr. 53-55)

**S. 2** *1 Ya Xwedê, her tu Xwedayî,*
*2 Her tu hêjayî medih u senayî,*
*3 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 3** *1 Tu Melikê[34] milke canî,*
*2 Tu Melikê dilovanî,*
*3 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 4** *1 Tu Melikê milkê merdî,*
*2 Tu Melikê E'rşê gewre yî,*
*3 Ya Xwedê, ji here de her tuyî hayî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 5** *1 Ya Xwedê, her tu kama r̂uĥayî,*
*2 Tu Melikê sûk û semayî,*
*3 Tu t'amî, û kam, û r̂ayî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 6** *1Ya Xwedê, tu xwedanê[35] cin u insî,*
*2 Tu xwedanê E'rş u K'ursîy,*
*3 Tu Melikê Gay u Masî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 7** *1 Ya Xwedê, tu xwedawendê seferî,*
*2 Tu xwedanê ceh û merî,*
*3 Tu xwedanê Mîh u Mehrî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 8** *1 Ya Xwedê, ji nava tuyî bilindî,*
*2 Te ne çûne, tuyî çendî,*
*3 Na zoyî, ne zayî, tu zendî,*
*4 Ya Xwede! her tu Xwedayî!*

**S. 9** *1 Ya Xwedê, tu merdîdarê ĥutî,*
*2 Tu mendayê qutî,*
*3 Tu dilovanî, Xwedayê k'utî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 10** *1 Ya Xwedê, tu xwedan malî, xwedan p'erde,*
*2 Ya Xwedê, te ne xafe[36], te ne xurde,*
*3 Ciyê te we li ĥemû e'rde,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 11** *1 Ya Xwedê, te ne r̂enge,*
*2 Te ne awaze, te ne denge,*
*3 Te ne endame[37], te ne çenge,*
*4 Ya Xwedê, kes nizane tu çawayî!*

**S. 12** *1 Ya Xwedê, tu weliyê ferza nimêjî,*
*2 R̂ewanan dip'erêsî,*
*3 Tu milan ji milka diberêjî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 13** *1 Ya Xwedê, tu hozanê t'evahî a'lem,*

[34] *melek*
[35] *xudan*
[36] *qaf*
[37] *îndam*

*2 Te t'obe danabû ser Adem,*
*3 R̂êbû Îsa kure Meryem.*

**S. 14** *1 Ya Xwedê, tu merdî, dilovanî,*
*2 Ezî k'etime, t'awîme, tu hozanî,*
*3 Tu hem derdî, û hem dermanî!*

**S. 15** *1 Ya Xwedê, tu ûnsê xirbayî,*
*2 Sûc û guneh û mişurî*[38]*,*
*3 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 16** *1 Me naskirin, me kirin silav û gewşe,*
*2 Ya Xwedê, tu li me bibexşe,*
*3 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

**S. 17** *1 Ya Xwedê, her tuyî Hayî,*
*2 Û her tu Xwedayî,*
*3 Ya Xwedê, tu serware şah û gedayî,*
*4 Û her tuyî hêjayî medih û senayî!*

**S. 18** *1 Ya Xwedê, tu Xwedayî, em enzanin,*
*2 Tu mirazî ,em daxwazin,*
*3 Ya Xwedê, her tu Hayî,*
*4 Ya Xwedê, her tu Xwedayî!*

## 2. MEDHÊ XWEDÊ

**şaxê — 1**[39]
*S.* **1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 T'ibarekê*[40] *xulqîn*[41]*,*
*3 Bi ĥimetiya*[42] *Şemsedîn, Fexredîn û Nasirdîn*[43]*, şêx Sin û Sicadîn, şêxû Bek'ir, Qadirê R̂eĥman, Ĥesin Maman*[44]*!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu Dayîmî*[45]*, tu R̂ehîmî*[46]*,*
*2 Tu Melikê*[47] *milkê k'erîmî,*
*3 Ji enzel da tu Qedîmî!*

**S. 3** *1 Tu Melikê sew-sefayî,*
*2 Semedê*[48]*, Lûtf*[49] *navayî,*
*3 T'obayê*[50] *xan û r̂ewayî,*
*4 T'obayê ferz û ĥemdî,*
*5 Tu layîqê medih*[51] *û senayî*[52]*.*

---

[38] *mişut*
[39] [16] (стр 23–26)
[40] *tu barek*
[41] *xuluqîn*
[42] *ĥemetiye*
[43] *Nasredîn*
[44] *Ĥesmeman*
[45] *dayîn*
[46] *Reĥîm*
[47] *melek*
[48] *semend*
[49] *lut'v*
[50] *tubayê*
[51] *me'ĥe*
[52] *sînayî*

**S. 4** *1 Te dahir[53] kir dinya a'lem,*
*2 Te em kirin tejwadî Adem,*
*3 Tu xwedanê E'rş û K'ursîy,*
*4 Xwedanê a'lemê û qudsî[54].*

**S. 5** *1 [Ya] R̂ebî, tu barê ĥeqîyê siwarî[55],*
*2 Herçar qulbê dîne dîyarî[56],*
*3 Xişîna murîyê t'opal ĥişiyarî.*

**S. 6** *1 [Ya] R̂ebî, çiqas bilindî, awqas şikir,*
*2 Weke ĉilk û ĉiya,*
*3 Weke qume binê beĥra,*
*4 Weke steyr-p'erê e'zmana,*
*5 Weke xirugêt[57] berfê, dilapê barana.*

**S. 7** *1 Şikir dayîne te r̂a,*
*2 Şikir k'erema t er̂a,*
*3 Şikir kêmasiya te r̂a,*
*4 Şikir standine te r̂a jî.*

**S. 8** *1 Her Xwedayî, her xwedanî,*
*2 Him Mecayî[58], him Mekkeyî,*
*3 Tu Melikê milk û cîyayî,*
*4 P'adşê şah û gedeyî,*
*5 Vilayîyê[59] ferz-nimêjeyî.*
*6 Tu e'zmana r̂eĥmê dir̂êjî,*
*7 R̂uĥa didî, r̂uĥa dip'arêzî[60],*

**S. 9** *1 Xwedanê[61] Meh û Tarî,*
*2 Xwedanê Şemsê narî,*
*3 Xwedanê ĉem û beĥrî,*
*4 Xwedanê etayî.*
*5 Kes nizane tu çawayî,*

**S. 10** *1 Te ne awaze, te ne denge[62],*
*2 Te ne male, te ne ĥale,*
*3 Te ne şirîke, ne hewele,*
*4 Tu Xwedayî, qe em çine,*
*5 Mewlayî, em t'ewî ba wîne[63],*
*6 Zar zefin[64], lê te bîrin.*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, bidî xatirê ĥezar yek navê xwe,*
*2 Xatirê xas û qelendara,*
*3 Xatirê ewlîye, emîya,*
*4 Tu bidî xatirê dua' qebûla,*
*5 K'îjan cem te xwedane maş, barat'in.*
*6 Tu bidî xatirê Tawisa qedîmî,*
*7 Xêra dayînî, şêra welger̂înî.*
*8 Ya R̂ebî, tu bêyî heware Êzdîxanê,*

---

[53] *dihar*
[54] *qutisî*
[55] *siyar*
[56] *duharî*
[57] *kulîyê*
[58] binêr: *mescid il-nebîy*
[59] *welîyê*
[60] *dip'arêjî*
[61] *xudan*
[62] *reng*
[63] *bawîne*
[64] *zarzefin*

*9 Xayîkî ji zulmê, teyrakê, t'ofenê.*

**S. 12** *1 Ya Ȓebî, tu bideyî xatirê her ĥeft qubê*[65] *Lalîşê,*
*2 Bideyî xatirê dua'yê mala Adiya,*
*3 Xatirê dua'-dirozgê Şemsê xwedane*
*4 Qup û qewata dîne Êzdîxanê.*

**S. 13** *1 Bidî xatirê sitîya Şexs,*
*2 Xatirê sitîya Tawis,*
*3 Xatirê sitîya Mewîj,*
*4 Mewîjê e'zmana hatî xwaȓê*[66]*,*
*5 Mêra ȓa bû maş fitaȓê*[67]*.*

**S. 14** *1 Tu bidî xatirê sitîya Zîn,*
*2 Xatirê sitîya Gul, sitîya E'reb,*
*3 Xatirê Xatûne Fexre,*
*4 Xatirê ĉara p'îr Afat*[68]*.*
*5 Bidî xatirê Ȓoja qirarê,*
*6 Ȓoja bet'er warê,*
*7 Ȓoja duȓê û merhebê*[69]*.*
*8 Ya Ȓebî, tu bêyî hewara êzdîxanê.*
*9 Xayîkî ji teyrakê, zulmê, t'ofenê.*

*Amîn! Amîn! Amîn!*

**şaxê — 2**[70]

**S. 1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 Bi ĥimetiya Şems il-dîn, Fexir il-dîn, Nasr il-dîn, Sicad il-dîn, şêx Ĥesen, şêxû Bek'ir, Qadir il-Ȓeĥman!*

**S. 2** *1 Ya Ȓebî, tu K'erîmî,*
*2 Tu Reĥîmî, Tu Xwedayî,*
*3 Melikê milk û ciyayî,*
*4 Melikê zuq û sefayî,*
*5 Melikê milkê K'erîmî,*
*6 Ji enzel de tu Qedîmî.*
*7 Tu a'badî k*[71]*'om û ȓuĥayî*[72]*,*
*8 Semed, lûtf û niwayî,*
*9 Û Melikê cin û insî,*
*10 Melikê Ademî qidsî,*
*11 Semedî, Hayî û Mecîdî,*
*12 A'badî, ferz û himdî,*
*13 Layîqî medih u senayî.*

**S. 3** *1 Ya Ȓebî, Xwedawindî*[73] *sep'erî,*
*2 Xwedayî mah û tarîyî,*
*3 Xwedanê Şems u narîyî,*
*4 Xwedanê E'rşê E'zîmî,*
*5 Xwedawindî etayî.*
*6 Ya Ȓebî, kes nizane tu çawayî.*

[65] *qulb*
[66] *xar*
[67] *fit'ar*
[68] *pîra Fet*
[69] *mirk'ev*
[70] Silewe il-Êzîdîyê [30] (pp149–150)
[71] *ebed*
[72] *ruayî*
[73] *Xidawind*

*7 Ta na ĥisinî, ta na bilindî,*
*8 Ta na çonî, ta na çendî.*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, Ĥakim cema’ye û alîme,*
*2 Ta dahir dikir t’obeyî*[74] *Adime.*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, ta na male, ta na p’are,*
*2 Ta na besîke, ta na şenge,*
*3 Ta na evre*[75]*, ta na r̂enge,*
*4 Ma dikirî x̂em û sefa,*
*5 Ta dikirî Îsî û Miriyem*[76]*.*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, tu K’erîmî, R̂ehîmî, Emînî,*
*2 Tu Semedî, ez t’unîma*[77]*,*
*3 Ez t’awî*[78] *me, û k’etime*
*4 K’etimî ji ta bîrim,*
*5 Me dikirî ji tarî k’êfşî.*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, gunah û sûcê min,*
*2 E’rd buk’ir û bihuşta*[79]*,*
*3 Wellaĥ*[80]*, wellaĥ, wellaĥ! Amîn!*

**şaxê – 3**[81]
**S. 1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 Teberekê Xulqîn*[82]*!*
*3 Bi hurmetê Şemsedîn, Fexredîn*[83]*, Nasirdîn*[84]*, Sicadîn, şêx Sîn, şêxû Bek’ir, Qadirê R̂eĥman!*

**S. 1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 Bi ĥimeta Şemsedîn, Fexredîn, Nasirdîn, Sicadîn, şêx Sin, şêxû Bek’ir, Qadirê R̂eĥman!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî*[85]*, tu K’erîmî,*
*2 Tu R̂ehîmî, Tu Xwedayî*[86]*,*
*3 Ji e’zel da Tu Qadîmî,*
*4 Melikê mûlk û cîyayî,*
*5 Melikê cin*[87] *ve isnî,*
*6 Melikê Ademê qutsî,*
*7 Melikê mûlkê K’erîmîi,*
*8 Melikê sewq u sefayî,*
*9 Abadê kam û r̂ewayî,*
*10 Abadê ferz û ĥemdî,*
*11 Semedê lutf [û] newayî,*
*12 Semedê Hayî*[88] *û Mecîdî,*
*13 Tu layîqê methê senayî.*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu k’erîmî,*
*2 Tu R̂ehîmî, Tu Xudayî,*

---

74 *tube*
75 *awir*
76 *Mirîm*
77 *tu nîma*
78 *toyî*
79 *bikir û behişa*
80 *welle*
81 [27] (стр 221–226)
82 *Xeliqîn*
83 *Feqredîn*
84 *Nesredîn*
85 *Rebbî*
86 *Xudayî*
87 *cinn*
88 *hayîl*

*3 Melek'e[89] mûlk û jîyayî,*
*4 Melekê sewq û sefayî,*
*5 Melekê mûlkê K'erîmî;*
*6 Ji e'zel da Tu Qedîmî,*
*7 Tu abadê kam û r̂ewayî,*
*8 Semedê lutf û newayî,*
*9 Tu melekê cin ve isnî,*
*10 Melek'ê Ademê qûtsî,*
*11 Semedê Hayî û Mecîdî,*
*12 Ahadê ferz û ĥemdî,*
*13 Layîqê methê senayî.*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, Xwedavendê sep'erî,*
*2 Xwedanê şems u nari,*
*3 Xwedanê ĉem u beĥrî,*
*4 Xwedanê E'rşê E'zîmî,*
*5 Xwedavendê etayî,*
*6 Ĥakimê şah û gedanî,*
*7 Ĥakimê cimlat û a'lemî,*
*8 Te dikirî tobayê Adem,*
*9 Te dikirî Îsa u Miriyem[90],*
*10 Te me dikirî kam u sefa[yî],*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, Xwedavendê sep'erî,*
*2 Xwedanê Meh û Tarî [jî],*
*3 Xwedanê şems u nari,*
*4 Xwedanê E'rşê E'zîmî,*
*5 Xwedevenda etayî.*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, Ĥakimê şah û gedanî,*
*2 Ĥakimê cemae't û a'lemî,*
*3 Te dahir dikir t'obeyê Adem.*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, te ne male, te ne p'ere,*
*2 Te ne baske[91], te ne çenge,*
*3 Te ne avaze, te ne r̂enge,*
*4 Me dikirî kam û sefa[ye],*
*5 Te dikirî Îsa û Miriyem[e].*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, kes nuzane[92] tu çawayi[93].*
*2 Te ne hisne, te ne bilindî,*
*3 Te ne çuyîne, te ne çendî,*
*4 Te ne male, te ne p'ere,*
*5 Te ne baska, te ne çenge,*
*6 Te ne avaze, te ne r̂enge.*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, kes nuzane, tu çawayî.*
*2 Te ne hisne, te ne bilinde,*
*3 Te ne çuyîne, te ne çende.*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, tu K'erîmî, R̂ehîmî, Emînî,*
*2 Tu Semedî, ez qet tu nînim,*
*3 Ez t'awîme, k'etîme,*
*4 K'etîme, ji te bîrim,*
*5 Te me dikirî ji tarî k'ifş[e],*
*6 Guneh û sûca min bigir, bibexşe!*

---

[89] binêr: *Melik*
[90] *Meyrem*
[91] *besk*
[92] binêr: *nizane*
[93] *çevayi*

*7 Ya Ȓebî, ya Ȓebî, ya Ȓebî! Amin!*

**S. 7** *1 Ya Ȓebî, tu K'erîmî, Ȓehîmî, Emînî,*
*2 Tu Semedî, ez t'u nîme,*
*3 Ez t'awîme k'etîme,*
*4 K'etîme, ji te bîrim,*
*5 Me dikirî ji tarî k'ifş[e].*
*6 Ya Ȓebî, tu K'erîmî,*
*7 Ya Ȓebî, guneh û sûcê min bigre[94] û bibexşîne[95]!*
*8 Wellaĥ[96]! Wellaĥ! Wellaĥ! Amin!*
*9 Ya Ȓebî, ji îsma tuyî bilindî*

**şaxê – 4**[97]

*1 Ya Ȓebî, tu Dayîmî,*
*2 Tu K'erîmî, Ȓehîmî, tu Qedîmî,*
*3 Tu Xweda yê[98] her Xweda yî,*
*4 Xweda yê milkê K'erîmî,*
*5 Tu Xweda yê E'rşê E'zîmî,*
*6 Enzel da danî Qedîmî,*
*7 Her Xwedayê, her Xwedayî.*
*8 Hin mek'anî, hin mecayî,*
*9 T'awbe kam ȓewayî,*
*10 Keba t'aw ȓewayî,*
*11 Tu Xwedayê cin û insî,*
*12 Xwedanê[99] E'rş û K'ursîy,*
*13 Tu Xwedayê a'lem û qudsî,*
*14 Semende lib t'u nemayî,*
*15 Semende Heylil Mecrûmî,*
*16 Her Xwedayê, her Xwedayî*
*17 Hin mek'anî, hin mecalî[100],*
*18 Kes nizane tu çewayî,*
*19 Her Xwedayê, her xwedayî,*
*20 Te ne xave, te ne xurde,*
*21 Te ne male, te ne p'erde,*
*22 Te ne lewme, te ne ȓenge,*
*23 Te ne awaze, te ne denge,*
*24 Kes nizane tu çewanî,*
*25 Her Xwedayê, her xwedayî,*
*26 Weliyê ferz û nemêjanî,*
*27 Leme-leme kam dibêjî[101],*
*28 Ȓuĥa didî, ȓuĥa diperêjî,*
*29 Ĥakimê şa û gedenî*
*30 Ĥakimê cimĥî a'lem,*
*31 Te dîhar kir Îsa û Meyrem,*
*32 Te em kirin t'ejbetî Adem,*
*33 Sûc û gune mişawişin,*
*34 Te em kirin t'eybet û k'ewşin,*
*35 Her Xwedayê, her xwedayî,*
*36 Hin mek'anî, hin mecalî,*
*37 Kes nizane tu çewayî!*

---

[94] *girt*
[95] *bexşe*
[96] *Wulle*
[97] [29] (323–324) (№ 1682)
[98] *xuda*
[99] *xudan*
[100] *Hin mek'ayî, hin mecayî*
[101] *divêjî*

*R̂ehme li[102] dê-bavê hostayî! em ẍerîbîn*

## 3. QEWLÊ P'ADŞAY[103] – QEWLÊ XWEDANEN[104]

**S. 1** *1 P'adşê minî P'adşa,*
*2 Ewî çêkir ĉiya û deşta,*
*3 Ew neqaşê ĥemû neqşa.*
**S. 1** *1 P'adşê mine P'adşe,*
*2 Çêkiriye ĉiya û deşte,*
*3 Neqaşê ĥemû neqşe.*

**S. 2** *1 P'adşê minî Xefare[105],*
*2 Ji ba wî têtin biryare[106],*
*3 Bo dinyayê û herçar kenare[107].*
**S. 2** *1 P'adşê min e'fûk'are,*
*2 Ji ba wî t'im tê biryare,*
*3 Ji ba[108] dinya û herçar kenare.*

**S. 3** *1 P'adşê min dinya çêkir,*
*2 Bi ĥed û sed, r̂êk û p'êk kir,*
*3 Bênî[109] Adem têde xinê kir.*
**S. 3** *1 P'adşê min dinya çêkir,*
*2 Bi ĥed û sed, r̂êk û p'êk kir,*
*3 Bênî Adem têde xinê kir.*

**S. 4** *1 P'adşê minî sur̂ il-sema,*
*2 Xwedanê şev û r̂oj û dema,*
*3 Ji ba wî têtin k'erema.*
**S. 4** *1 P'adşê min sur̂ li sema,*
*2 Xwedanê şev û r̂oj û dema,*
*3 Ji ba wî tê t'im k'erema.*

**S. 5** *1 P'adşê min R̂ebê milyak'ete,*
*2 R̂ebê her ĥeft sur̂êt bi t'aqete,*
*3 Û her ĥeft mêrêt bi ĥeybete.*
**S. 5** *1 P'adşê min R̂ebê milyak'ete,*
*2 R̂ebê her ĥeft sur̂ê bi t'aqete,*
*3 Her ĥeft mêrên bi t'aqete.*

**S. 6** *1 P'adşê min qinyat[110] çêkir ji dur̂e cewhere[111],*
*2 Û sparte her ĥeft sur̂êt her û here,*
*3 Vê r̂ojê melek'ê Tawis kire serwere.*
**S. 6** *1 P'adşê min qinyat ava kir ji dur̂ û cewhere,*
*2 Spartbû her ĥeft sur̂ên her û here,*
*3 Tawisî melek' kire serwere.*

---

[102] *r̂emel*
[103] [11] (pp 13–24).
[104] http://www.ahrata.com/index.php/forum/4-qewle-ezdia-/82-qewle-xwedanan; http://www.ezdixandi.com/forum/38-264-1 http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-18.htm90 qewlê Fexredîn
[105] binêr: *Ẍefûr*
[106] binêr: *birîyal*
[107] *kinar*
[108] *ji bo*
[109] *bin*
[110] *kinyat*
[111] *cewahir*

**S. 7** *1 P'adşê[112] min R̂ebê Ademe,*
*2 Ji ba wî têtin k'ereme,*
*3 Li ĥemû wexta û li ĥemû dema.*

**S. 7** *1 P'adşê min R̂ebê Ademe,*
*2 Ji ba wî t'im tê k'ereme,*
*3 P'adşê ĥemû wext û deme.*

**S. 8** *1 P'adşê min Melikê Bêrîye,*
*2 Û R̂ebê p'êẍember û mehdîye,*
*3 Û Ezdayê minî jorîye.*

**S. 8** *1 P'adşê min Melikê Bêrîye,*
*2 R̂ebê xas û mehdîye.*
*3 Ew Ezdayê minî jorîye.*

**S. 9** *1 P'adşê min R̂ebê Silêmane,*
*2 Û Ezdayê ins û cinsa ne,*
*3 Û ĥemû jê r̂a ser k'êşa.*

**S. 9** *1 P'adşayê min R̂ebê Silêmane,*
*2 Û Ezdayê ins û cinsa ne,*
*3 Ĥemû jê r̂a ser k'êşane.*

**S. 10** *1 Babê nebîy[113] Birahîm[114] Xelîle,*
*2 Û xwe[115] bo Xwedê[116] kirbû dexîle,*
*3 Lew qurbana bo Xwedê[117] kirbû kur̂ê xwe Simaîle[118].*

**S. 10** *1 P'adşê min R̂ebê a'leme,*
*2 R̂ebê Lewĥ û Qeleme,*
*3 Ĥemû jê r̂a p'erwestene.*

**S. 11** *1 P'adşê min R̂eb il-Semede,*
*2 R̂ebê Mûsa, Îsa û Mihemede,*
*3 Ĥemû jê r̂a bir sicûde.*

**S. 12** *1 P'adşê min R̂ebê jorîye,*
*2 R̂ebê k'eşîş, û qelender, û sofîye,*
*3 R̂ebê şêxê minê Adîye.*

**S. 11** *1 P'adşê min R̂ebê jorîye,*
*2 K'arê dinya bi destê wîye,*
*3 R̂ebê şêxê minê Adîye.*

**S. 13** *1 P'adşê min êkî mezine,*
*2 Û P'adşayê ĥemû momine,*
*3 R̂ebê dinê Ezdayê mine.*

**S. 12** *1 P'adşê min êkî mezine,*
*2 P'adşê ĥemû momine,*
*3 Xwedayê dinya û Ezdayê mine.*

**S. 14** *1 P'adşê min R̂eb il-Sebûre[119],*
*2 Ew xaliqê agir û nûre,*
*3 Her yî bi Ĥeqe, û yî Ẍefûre.*

**S. 13** *1 P'adşê min R̂eb il-Sebûre,*
*2 Xaliqê agir, û r̂onahî, û nûre,*
*3 Her yî bi Ĥeqe, û herî Ẍefûre.*

---

[112] *Padişa*
[113] *nebî*
[114] *Îbrahîm*
[115] *xo*
[116] *Xodê*
[117] *Xudê*
[118] *Simayîl*
[119] *xefûr*

**S. 15** *1 P'adşê min êkî emîne,*
*2 Ji ba wî têtin mizgîne,*
*3 Bo ĥemû muxliqa û çendî dîne.*

**S. 14** *1 P'adşê min êkî emîne,*
*2 Ji ba wî têtin mizgîne,*
*3 Bo ĥemû muxliqa û çendî dîne.*

**S. 16** *1 P'adşê min R̂ebê qinyatê,*
*2 Heke em pê bigrin e'nyatê*[120]*,*
*3 Ew dê me dike şefa'ete.*

**S. 15** *1 P'adşê min R̂ebê qinyate,*
*2 Da pê bigrin e'nyate,*
*3 Ew li me dike şefa'ete.*

**S. 17** *1 P'adşê minî r̂êbere,*
*2 Û Xwedê êkî Ekbere,*
*3 Navê wî jî her û here.*

**S. 16** *1 P'adşê minî r̂êbere,*
*2 Ewî êkî Ekbere,*
*3 Dua' jê r̂a ya fere.*

**S. 18** *1 P'adşê*[121] *min Êkî me'bûde,*
*2 Xwedanê*[122] *Lewĥa meĥfûde*[123]*,*
*3 Her layîqî dua' û sicûde.*

**S. 19** *1 P'adşê min R̂ebê ĥeqîyê,*
*2 Dibexşînit xwedanê hîvîyê,*
*3 Ewe ji me r̂a didet xweşîyê*[124]*.*

**S. 17** *1 P'adşê min R̂ebê ĥeqîye,*
*2 Bexşender xwedanê hêvîye*[125]*,*
*3 Ew bi t'ifaq li me didê xweşîye.*

**S. 20** *1 P'adşê minî E'dîle*[126]*,*
*2 Ji ĥemû aliya yî k'amile,*
*3 Ew miraza ĥemû dila.*

**S. 18** *1 P'adşê minî E'dile*[127]*,*
*2 Ji ĥemû aliyan k'amile,*
*3 Ewe miraza dilê momine.*

**S. 21** *1 P'adşê min xwedanê r̂isqaye*[128]*,*
*2 Atqatê ĥemû dilaye,*
*3 Li ĥalê ĥemû kesa yî haye.*

**S. 19** *1 P'adşê min xwedanê r̂isqaye*[129]*,*
*2 Atqata ĥemû dilaye,*
*3 Li ĥalê ĥemû kesaye.*

**S. 22** *1 Li ĥemû dema û li ĥemû wexta,*
*2 Ewe P'adşayê e'rd û t'exte,*
*3 Ji ba wî têtin r̂isq û bexte.*

---

120 *inyat*
121 *pedşê*
122 *xudan*
123 binêr: *meĥfûz*
124 *xoşî*
125 binêr: *hîvî*
126 *adil*
127 binêr: *E'dîl*
128 *r̂izq*
129 *r̂izq*

**S. 20** *1 Li ĥemû dem û li ĥemû wexta,*
*2 Ewe Ȓebê ĥemû e'zman û t'exta,*
*3 Ji ba wî tên ȓisq, nesîb, û bexta.*

**S. 23** *1 P'adşê min xwedanê miraze,*
*2 Xwedanê ne'met û naze,*
*3 Bi ĥemû wesfa ew yî ȓaze.*

**S. 21** *1 P'adşê min xwedanê miraze,*
*2 Xwedanê ne'met û naze,*
*3 Em bi ĥemû wesfa ȓaze.*

**S. 24** *1 P'adşê mino yê berek'etê,*
*2 Nazilê nazê û ne'metê,*
*3 Xwedanê dinê û axretê.*

**S. 25** *1 Xwedanê axretê û dine,*
*2 Hasil key miraza minê,*
*3 Êzdanê mino yî bi t'inê.*

**S. 23** *1 P'adşê min xwedanê axretê û dine,*
*2 Ewî hasiland miraza minê,*
*3 Ezdanê min û çiqas dine.*

**S. 26** *1 P'adşê minî Ȓehîme,*
*2 Ew baranekê dibarîne,*
*3 Dinê û a'lemê pê dijîne.*

**S. 24** *1 P'adşê minî Ȓehîme,*
*2 Berek'etê dibarîne,*
*3 Xelq û a'lem pê dijîne.*

**S. 27** *1 P'adşê min Xweda ye,*
*2 Dîndara wî li me xêr û şa ye,*
*3 Ciyê wî li ĥemû dila ye.*

**S. 28** *1 P'adşê min sit'are,*
*2 Xwedêyekî Cebare,*
*3 Ciyê wî li ĉiya û ware.*

**S. 25** *1 P'adşê minî sit'are,*
*2 Ezdanê min êkî cebare,*
*3 Cihê wî li ĥemû cih û ware.*

**S. 29** *1 P'adşê min hosta ye,*
*2 Ew bi a'lemê haga ye,*
*3 Ew li ĥemû e'rda ye,*

**S. 26** *1 P'adşê min hosta ye,*
*2 Dinya her pê ava ye,*
*3 Cihê wî li ĥemû e'rda ye.*

**S. 30** *1 P'adşê min Nûre,*
*2 Ew ji me ne yî dûre,*
*3 Ewî Alîme bi e'rd û e'zman û beĥrêt k'ûre.*

**S. 27** *1 P'adşê minî Nûre,*
*2 Ew ji me ȓa ne yî dûre,*
*3 Li e'rd, û e'zman, û beĥrên k'ûre.*

**S. 31** *1 P'adşê min êkî Ekbere,*
*2 K'îna kesî ne ye li bere,*
*3 Her û her ȓehim li wan dibere.*

**S. 28** *1 P'adşê min êkî herî mezine,*
*2 K'îna kesî li ber t'ine,*

*3 Her û her r̂ehim li bere.*

**S. 32** *1 P'adşê min êkî Qedîme,*
*2 Li dine û axretê E'zîme*[130]*,*
*3 Li ĥemû derda ewî ĥekîme.*
**S. 29** *1 P'adşê min êkî Qedîme,*
*2 Li e'rd û e'zman êkî E'zîme,*
*3 Li ĥemû derda ĥekîme.*

**S. 33** *1 Ya Xwedê, tu r̂uĥa dibey, tu r̂uĥa tînî,*
*2 Û tu sebir û arama dila deçînî,*
*3 Tu dikeye mû û nabizdînî.*
**S. 30** *1 Ya R̂ebî, tu r̂uĥa dibe û tîne,*
*2 Sebir û aramê dila de diçîne,*
*3 Tu momina nabizdîne.*

**S. 34** *1 R̂êya Xwedê r̂astî ye,*
*2 Û k'arê Xwedê ĥeqî ye,*
*3 Û sur̂a Xwedê mixfî ye.*

**S. 35** *1 R̂êya Xwedê min r̂astî ye,*
*2 Û P'adşayê, û şik tê nî ye,*
*3 Xwedê Melikê Bêrî ye.*
**S. 31** *1 R̂êya Xwedayê min r̂astî ye,*
*2 P'adşê şik têde nîne,*
*3 Xwedê Melikê Bêrî ye*[131]*.*

**S. 36** *1 Ya Xwedê, tu xwedanê mirwetê,*
*2 Tu Xwedanê naz û ne'metê,*
*3 Tu R̂ebê dinê û axretê.*
**S. 32** *1 Hert'im xwedayê mirwetê,*
*2 Xwedayê ĉira û berek'etê,*
*3 R̂ebê dinê û axretê.*

**S. 37** *1 Ya Xwedê, tu Melikê E'rşa yî,*
*2 Û tu bi a'lemê agah yî*[132]*,*
*3 Tu li ĥemû e'rda yî.*
**S. 33** *1 Ya Xwedê, tu Melikê E'rşî,*
*2 Li ĥemû k'aran bi ĥeqî,*
*3 Li ĥemû dilan heyî.*

**S. 38** *1 Ji qewlê şêx Fexrê babzere,*
*2 Xwedê êke Ekbere,*
*3 Navê wî jî her û here.*
**S. 34** *1 Ji qewlê şêx Fexrê babzere,*
*2 P'adşê min êkî herî mezine,*
*3 Navê wî jî her û here,*

**S. 39** *1 Îlaĥîo, te ne wek'île,*
*2 Û te ne k'efîle,*
*3 Tu li gel ĥemû dewra û bedîle.*
**S. 35** *1 Îlaĥîo, te ne wek'île,*
*2 Te ne delîle, û ne k'efîle,*
*3 Te ne hevale, ne bedîle.*

---

[130] *hezîm*
[131] *Melikê Berî*
[132] *hagah*

**S. 40** *1 Îlaĥîo, te ne t'ifale*[133]*,*
*2 Û te ne daye, û ne babe, û te ne kale,*
*3 Û bêy te ĥemû tiştî betale.*

**S. 36** *1 Îlaĥîo, te ne t'ifale,*
*2 Te ne dêye, ne bave, û ne kale,*
*3 Bê te ĥemû tişt betale.*

**S. 41** *1 Ya Xwedê, tu dibey, û tu tînî,*
*2 Tu didey, tu distînî,*
*3 Tu r̂eĥmekê bi me da bibarînî.*

**S. 42** *1 Ya Xwedê, tu dibey, û tu tînî,*
*2 Tu dişkînî, û tu dicebirînî,*
*3 Tu r̂eĥmeke bi me da bibarînî.*

**S. 43** *1 Ya Xwedê, tu geş dikey, û diwerînî,*
*2 Û tu didey, û tu distînî,*
*3 Û tu r̂eĥmekê bi me da bibarînî.*

*Em di kêmin, û Xwedê yî t'emame!*

## 4. QEWLÊ SENA[134]

**S. 1** *1 Tu Xwedê minî ez dayî,*
*2 Êkî, li e'zmanî P'adşayî,*
*3 Tu serwerê ĥeftayî!*

**S. 2** *1 Tu dur̂î û ji dur̂êyî,*
*2 Tu nûrî û ji sur̂êyî,*
*3 Her tû ji bo min Xwedêyî!*

**S. 3** *1 Milyak'et ji nûra teye,*
*2 Beĥr ji k'erema teye,*
*3 E'rd ji firwara teye.*

**S. 4** *1 Êkî li e'zmanî Xwedayî,*
*2 Nûrî, dur̂î û P'adşayî,*
*3 Layîqî pesin û senayî.*

**S. 5** *1 Tu serwerê milyak'ete,*
*2 Xwedê ĥeftî û du milete,*
*3 Her tuyî hîvîya xulyaqete.*

**S. 6** *1 Tu Melikê ins û cinsî,*
*2 Te xulqand Gay û Masî,*
*3 Layîqê E'rş û K'ursîy.*

**S. 7** *1 Tuyî xwedanê destûra,*
*2 Misĥefa R̂eş, Mişûra,*
*3 Celu, Êncîl û Zembûra.*

**S. 8** *1 Laliş ji nûra teye,*
*2 K'abe ji ĥeybeta teye,*
*3 Quds ji k'erema teye.*

[133] *tefal*
[134] SENA http://www.bahzani.net/services/forum/archive/index.php/t-56653.html

**S. 9** *1 Te av li coya hurand,*
*2 Duȓ li beĥra e'firand,*
*3 Kevn û beşer te xulqand.*

**S. 10** *1 Xwedê minî Ezdanî,*
*2 Tu layîqi pesnanî,*
*3 Bo min ol û erk'anî.*

**S. 11** *1 Tu Xwedê ĥeqîqetê,*
*2 Nijyarê wê cinetê,*
*3 Sebir ji k'erema te tê.*

**S. 12** *1 Her tuyî Ezdanê mezin,*
*2 Horî û hê[y]vên cot kirin,*
*3 Ĥeqîqet pê ȓê kirin.*

**S. 13** *1 Ĥeqîqet û suȓe te,*
*2 Jê çêdibûn coqete,*
*3 Mi*[135] *ji P'adşê xwe minete.*

**S. 14** *1 P'adşê bo min semiyanî,*
*2 Xwedê e'rd û e'zmanî,*
*3 Ol û atqan erk'anî.*

**S. 15** *1 Tu Xwedê qelendere,*
*2 Delîlê p'êẍembere,*
*3 Hîvîya mi ji te mehdere.*

**S. 16** *1 Êkî Xwedê her tû yî,*
*2 Nijyarê kevnê tû yî,*
*3 Aşiqê derwêşa tû yî.*

**S. 17** *1 Tu suȓî, tu nezerî,*
*2 Aqubetî, mehderî,*
*3 P'adşayî her û herî.*

## 5. QEWLÊ MERSUMA CEBÊRE[136]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 P'adşê min Ȓebê il-Semede*[137]*,*
*2 Wî e'fakir*[138] *çarde t'ebeq e'zman û e'rde,*
*3 Ew layîqî ibadetê*[139] *û sicude.*

**S. 2** *1 P'adşê min bi xwe xaliqe,*
*2 Nûrek ji wî zêde bû û bû serokê meleke,*
*3 Ȓonahiya wî dabû çarde t'ebeqe.*

**S. 3** *1 Şêx Ĥesen ĥed û sed danan bi mersume,*
*2 Bo Êzdiya têde danîn ĥed û sed, û t'ixume,*
*3 Ewî li qanûnê bi meşin, wan nabene duzexa bi dume.*

---

[135] forme kurtî: *min*
[136] [52] (rr. 27-44)
[137] *Ȓebê Semede*
[138] *afakir*
[139] *ebadet*

**S. 4** *1 Qanûn e'sasa e'rdaye,*
*2 E'zman r̂awestabû bi dua'ye,*
*3 R̂oj û Heyv têde xuyaye.*

**S. 5** *1 R̂oj û Heyv nûrin,*
*2 Ilmê wan ji beĥrêt k'ûrin,*
*3 Milyak'etê Xwedê yî yît[140] nêzîkin, neyî dûrin.*

**S. 6** *1 P'adşayê min xaliqe,*
*2 Ji nûra xwe çêkir Tawisî melek'e,*
*3 Kire serwarê her ĥeft meleke.*

**S. 7** *1 Her ĥeft meleke bi nûrê dixemilin,*
*2 Yî yît[141] ibadetin[142], yê faxirin,*
*3 Yî qudretîne, p'ir̂ aqilin.*

**S. 8** *1 Ji wê k'asê Adem vedixwar û bû şiyare,*
*2 Jê çêkir Hewa ji p'eraswa xwe r̂e,*
*3 Bi qudretê ji Adem r̂a bû heval û yare.*

**S. 9** *1 Silt'an Êzî ĥezar û êk nave,*
*2 Ew dinyaye li ba wî sae't û gave,*
*3 Ew dizanit li besta çend kevir li nave,*
*4 Û li beĥra çend k'eşkul ave,*
*5 Ewî Hewa kire bûk û Adem kire zave.*

**S. 10** *1 P'adşayê min çêkir ĉiya, û deşt, û berî, û beĥr bi t'emame,*
*2 Sibĥane ji te xaliqî, li bedena maka heye beĥreka bi ẍemame,*
*3 Di wê beĥrê da çêbûn jin û zelame.*

**S. 11** *1 P'adşayê min R̂eb il-Semede,*
*2 Ji ba wî hat ĥed û sede,*
*3 R̂ê, û r̂esm, û îman, çu cara li ser nede.*

**S. 12** *1 Dinya xweşe[143] bi heval û dostî,*
*2 Guhê xwe bidene vî qewlê gotî,*
*3 Da hûn neçine dojeha[144] ẍafilêt sotî.*

**S. 13** *1 Xwedan îman di şiyarin,*
*2 Ĥed û sed ji xwe r̂a vavarin,*
*3 Da hûn bizanin dojehek heye, t'ijî dupişk û marin.*

**S. 14** *1 Wan zanî axret ye bi daje û behişte[145],*
*2 Jêk cuda kirin ĥelal û ĥeram gişte,*
*3 Li axretê heye ciza û behişte[146].*

**S. 15** *1 Ji bana hatîye qewl û dua'ye,*
*2 Li Celwa şêxê Ĥesen wa xweyaye,*
*3 Nêr û mê hev pişk daye.*

**S. 16** *1 Heke te nîne dunda û zerwete,*

[140] *îît*
[141] *îîb*
[142] *ebadet*
[143] *xuş*
[144] *dojex*
[145] binêr: *bihuşt*
[146] *Li axretê heye siza û beşte*

*2 Ĥeqê te heye ya dûyê bînî bi me'rîfete,*
*3 Da li şuna te r̂abit xulqete.*

**S. 17** *1 Gava dil û ĉava xeberda,*
*2 Ev qanûna e'rda,*
*3 Bi ĥelalî here di serda.*

**S. 18** *1 Heger du dil bûne yeke,*
*2 Cayîze tu bixwezî ji bab û dayîke,*
*3 Heger te e'mir hejdeye, bo te ĥeqe mareke.*

**S. 19** *1 Şêxên şêx Ĥesen dixwezin du şehde bêne,*
*2 Neh û nîv misqal zêr̂ nextê wêne,*
*3 Li mersuma qelen ĥeqê dayî û babêne.*

**S. 20** *1 Bi nîşanîyê bûye bûke,*
*2 Bo te şehdene, birazava û xûşk ĥemûke,*
*3 Ĥevde sal e'mir ye biçûke.*

**S. 21** *1 Gava Xwedê dane te zar̂û û male,*
*2 Ji kura, û kiça, û tevale[147],*
*3 Mal bi navê kur̂ane û bihra nabit betale.*

**S. 22** *1 Dema jin mabû bêye,*
*2 Û li bal heye êxt'îm û sêvîye,*
*3 Gava te bi zorî r̂akir, qelenê wê yî ĥeramkirîye.*

**S. 23** *1 Jinebî (bî jin) di sebirin,*
*2 Bi zarokêt xwe di fekirin,*
*3 Xwe bi axretê qanc kirin.*

**S. 24** *1 Hincîyê dayîka êxt'îma r̂akir,*
*2 Bo t'emaya malê dine k'arkir,*
*3 Ji gunehêt wan de mal xwe xirakir.*

**S. 25** *1 Bîjin hindek di nazikin,*
*2 Bi e'mrê xwe di kiçikin,*
*3 Di bê zarokin û di sivikin,*
*4 Wan ĥeq heye şû bikin.*

**S. 26** *1 Gava bîjinê viya r̂abit,*
*2 Û ĥalê wê yê muĥtac bit,*
*3 Gava ewê şû kir, de nextê wê yî ĥelal bit.*

**S. 27** *1 Jinebî hindek di bê zarone,*
*2 Şû naxwazin û bi mana xwe qanc bûne,*
*3 Pişka malê — ĥeqê wane.*

**S. 28** *1 Jin û mêr hindek di bê zirwetin,*
*2 Di malê de wan di bê k'ulfetin,*
*3 Mîrat'ê wan bê zelam, û kesên wan k'etin.*

**S. 29** *1 Wekî te kiçek[148] ji xwe r̂a xwestî,*
*2 Bi şehdeya şêxê Celwe yê te girtî bi destî,*
*3 Û bê sûc te berda, tu bi qanûnê şkestî.*

---

[147] binêr: *teva*
[148] binêr: *keç*

**S. 30** *1 Wekî te bê sûc berda,*
*2 Fetwayê bide, û ĥeqe li ser te,*
*3 Qanûn heye û dê vegeȓit li ber te.*

**S. 31** *1 Qanûn bigre û qewî be,*
*2 Û xwe bi ĥorastî li dine be,*
*3 Û li axretê ne sotî û gunehêt wî be.*

**S. 32** *1 Jin û mêr herdu ji ciyekî,*
*2 Û ĥeqê wan herdu weke yekî,*
*3 Herdu li ȓoja axretê bi ĥisabekî.*

**S. 33** *1 Jêk vekirin ĥelal û ĥerame,*
*2 Ĥeramkirin jinmam û jinxale,*
*3 Û met' û xalet bi mersuma Xwedê Te'ale.*

**S. 34** *1 Ît nêzîkin xal û mame,*
*2 Jinêt zarokêt wan ew jî ĥerame,*
*3 Ew ĥed û sed ĥeqekî t'emame.*

**S. 35** *1 Dayîk, û xuşk, û jinbira, û birazî,*
*2 Şubhetê wan zarok û xwarzî,*
*3 Mersumî ĥeramkirye ewan jî.*

**S. 36** *1 Şêx û p'îr ȓêberêt t'erîqete,*
*2 Bo mirîda ĥerfeka bi t'aqete,*
*3 Bo mirîda kêr nayên qet û qete.*

**S. 37** *1 Şêx, û p'îr, û mirîd, ĥed û sede,*
*2 Her êk ji wan hene, ĥerfêt wan bi xete,*
*3 Zewac di nav wan da ĥerame û dîyanetêt dî jî bi serte*[149].

**S. 38** *1 Fere ȓoja bûk û sinete*[150]*,*
*2 Zadekî çêke û bike dawete,*
*3 Ew ferzekî şêxê sinete.*

**S. 39** *1 Şêxê sinetê weha gatîye:*
*2 «Fere li me Êzdîye,*
*3 Sinetkirin ferzeka ȓêye».*

**S. 40** *1 Ferzêt Êzdîyatîyê di k'okin,*
*2 T'oq*[151] *û simbêl jî cotin,*
*3 Qewlêt mêra eve jî gotin.*

**S. 41** *1 Qewlêt mêra e'sase,*
*2 Wan vexwarbû ji k'ase,*
*3 Pê avakirin mecase*[152]*.*

**S. 42** *1 Şêx Ĥesen dibêjit: «Sinet, sineta mine,*
*2 Hincîyê li pê wê yê — mamine,*
*3 Hincîyê înk'are — ew dijmine».*

**S. 43** *1 Çilegira ne êşîne, ew jî bi axretê hîvîne,*

---

[149] *serde*
[150] *sunet*
[151] *tok*
[152] binêr: *mecal*

*2 Havîn û zivistanê bi r̂ojîne, û bi wek'az, û t'izbîne,*
*3 Çend cara bi ibadetin û cindîyêt silt'îne.*

**S. 44** *1 Ew cindîyêt silt'în bi hîvîne, bi mehderin,*
*2 Li r̂êya Xwedê û şêx Adî bi cehwerin,*
*3 Ew jî bi şêx Şeims meferin.*

**S. 45** *1 Çarşembû r̂ojeka çake,*
*2 Hincîyê fariqe bû ji make,*
*3 Xaliq dê ĥemû a wefake.*

**S. 46** *1 Mirin heye, bê dermane,*
*2 Mersum danî ji e'zmane,*
*3 Dê pê xinêkî leşî û cane.*

**S. 47** *1 Ĥeqê mirya xêr û r̂eĥme,*
*2 K'ifin, û şûştin, û gor̂, û xeme,*
*3 Û qewl, û beyt' ĥemû deme.*

**S. 48** *1 Sê r̂oja ĥeta bi hev te,*
*2 K'omeka lêzim û fera li ber te,*
*3 R̂eĥma lêke û zadî çêke, ewe xêr û xizmete.*

**S. 49** *1 Banga me Xwedê yeke,*
*2 Li ĥed û seda me şaş neke,*
*3 Li ibadetê me bê maş neke.*

**S. 50** *1 E'mir li dine her hindike,*
*2 Êxt'îm û sêwiye xwedan bike,*
*3 Behişta ferdus ĥasil bike.*

**S. 51** *1 Şûştin fere û xweş tişte,*
*2 Paqijî jê di yêt bêhne behişte,*
*3 Bişo serî, û dest, û ĉava, û leşî, û cila gişte.*

**S. 52** *1 Îman çêbû bi yeqîne*[153]*,*
*2 Ibadetê bike bi bijwîne,*
*3 Ew sinete û nasîne.*

**S. 53** *1 Peyva xweş ibadete,*
*2 Zimanê şîrin*[154] *xweş xilmete,*
*3 Harîkirin bi xwe x̂îrete.*

**S. 54** *1 Bazirganî hege bi ĥeqîye, guneh nîne,*
*2 Maldar bi sûk û qeyserîne,*
*3 Heke bi mirwet bin, li bazarî ne di exsîrîne*[155]*.*

**S. 55** *1 Hege bazirgan di yête male,*
*2 Hege jêk ve ne dan ĥeram û ĥelale,*
*3 Bazirganya wî ji binyat de ye betale.*

**S. 56** *1 Hege bazirgan ji bazirganyê îne,*
*2 Û ne li pê neqila mewlîne,*
*3 R̂oja axretê maşê wî nine.*

---
[153] *êqîn*
[154] *şirîn*
[155] *dixsirîne*

**S. 57** *1 Hege bazirgan ji bazirganiyê di yê ye,*
*2 Û kul û e'melê wî li pê ye,*
*3 R̂oja axretê ew xweştivê*[156] *Xwedê ye.*

**S. 58** *1 Hûn li vê dinê di ĥişyar bin,*
*2 Bo qedrê mêvan û x̄erîba di k'ar bin,*
*3 Da li r̂oja axretê li ber P'adşayê xwe bi zar bin.*

**S. 59** *1 Bi derew û nebuwa agir geş bû,*
*2 Bi r̂astî û sebrê behişt xweş bû,*
*3 Bi r̂eĥmê û dana Xwedê best bû.*

**S. 60** *1 Cayîze hûn di jîr bin,*
*2 T'ebayî xelqê*[157] *gehî bin,*
*3 Da li axretê hûn mîr bin.*

**S. 61** *1 ………………………. ,*
*2 ……………………….. ,*
*3 ……………………….. ..*

**S. 62** *1 Xerqe ĥerfeka girane,*
*2 Fere li me Êzdiyane,*
*3 Ew dilê xerqe nehêlin çû carane.*

**S. 63** *1 Em dilê xerqê nahêlin êkcare,*
*2 Eve mersume ji ba Xwedê Cebare,*
*3 Li ser destê şêx Adî, şêxê şare.*

**S. 64** *1 Feqîra êke çêkir,*
*2 Xwe ji xweşî û lewzetên dine kir,*
*3 Ev dinya hêla û berbi axretê kir.*

**S. 65** *1 Qirara mêra weha gatiye,*
*2 Xwedanê selef û r̂îbayê herî sotiye,*
*3 Hikmê wan dojehe û devêt mara û ga ĥutiye.*

**S. 66** *1 Xwedan selef ji şerma di jarin,*
*2 Li axretê di bê piştin, di bê beĥrin,*
*3 Li dojehê di bê gazî û hawarin.*

**S. 67** *1 Bin Ademo, tu ne çû tiştî,*
*2 Vê dinyeyê bi xwe nekî bar û piştî,*
*3 Yan tu bê mîrî*[158]*, yan tu bê ĥiştî*[159]*.*

**S. 68** *1 P'adşê minî Ekbere,*
*2 K'îna kesî ne ye li bere,*
*3 Û her ewe û r̂eĥma wî p'ir̂e.*

**S. 69** *1 R̂oj qubleta ibadetê,*
*2 R̂abe li ber xilmetê,*
*3 Ji Xwedê bixwaze t'ifaq û r̂eĥmetê.*

**S. 70** *1 Ibadetê bike r̂ojê sê cara,*
*2 Li sibê, û şehdetê, û hêvara,*

---

[156] *xoştiv*
[157] *xelk*
[158] *mir*
[159] binêr: *ĥiş*

*3 Li pêşberî R̂ojê, ev qubleta îxtiyara.*

**S. 71** *1 Heyv jî nûra îlaĥîye,*
*2 Li şevêt tarî kir r̂onahîye,*
*3 Silav ferze bo yê ji nû dîye.*

**S. 72** *1 K'oĉek r̂êberin,*
*2 Bi ibadetin û yî bi ferin,*
*3 Ji batin da xwedan meferin.*

**S. 73** *1 Hindek k'oĉek bi horîne,*
*2 Ji batinê yê bi hîvîne,*
*3 Peyvêt wan bi bînîne.*

**S. 74** *1 R̂eng hebû di qudretîne,*
*2 Mexluq, û dar, û ber, pê xemilîne,*
*3 Bo t'oq û girîvanî r̂engê heşîne.*

**S. 75** *1 Lib[a]sê îmanê yî sipîye,*
*2 Yî nazike, yî tenge, yî qewîye,*
*3 Hûn ne hingêvnê, ew zû dix̂eyrîye.*

**S. 76** *1 Ev dinya ye xweşe û t'ijî naz û ne'mete,*
*2 Bi qewata Xwedê û k'eramete,*
*3 Bo ĥemû xuliyaqe xêr û berek'ete.*

**S. 77** *1 Bi desturî Xwedê û k'erema Bêrî[160] Te'ale,*
*2 Bixwe ji xwarina xweş û ĥelale.*

**S. 78** *1 Hincî teyr, û tewal, û fikaye,*
*2 Şîrê wan ĥelale û bê xetaye,*
*3 Goştê wî ĥelale, heke bi desturî navê Xwedaye.*

**S. 79** *1 Teyr hindek difr̂in,*
*2 Bi bang û basket xwe mefirin,*
*3 Goştê wan yê ĥelale, heke ser bir̂in.*

**S. 80** *1 P'adşê min êkî meĥbude,*
*2 Xwedanê Lewĥ[161] il- meĥfude,*
*3 Ew layîqî ibadetê û sicude.*

**S. 81** *1 Li axretê xwe r̂ûsipî bike,*
*2 Li dinê ibadetê zor bike,*
*3 Sê r̂ojya bigre û ferzêt xwe bi cî bike.*

**S. 82** *1 Ferzêt xwe bi cîhke û derbas be,*
*2 Berî mirinê here Lalişê, p'êxwas be,*
*3 Da li axretê xêrate te nas be.*

**S. 83** *1 Ewê xwe bikujit çi e'cêbe,*
*2 Li nav mirova k'iryarekî x̂erîbe,*
*3 Wî bi xwe dojeh kire nesîbe.*

**S. 84** *1 Ewan ji îmanê xwe dûr kir,*
*2 Li dinê û axretê xwe r̂û sar kir,*

---

160 *barî*
161 *luĥ*

*3 ………………………………… .*

**S. 85** *1 Kuştin belayeka mezine,*
*2 Cizayê wan ĥebse*[162]*, û li axretê sotine,*
*3 Çû cara nak'evine ser r̂êya momîne.*

**S. 86** *1 Bêxof û zalima neĥebînin,*
*2 Çinkî*[163] *ew dijminêt*[164] *meseb û dînin,*
*3 Hevalya wan neken, di bê yeqînin.*

**S. 87** *1 Nifiret ji e'zmana li wan k'ar bûn,*
*2 Wan dizanî ĥeqî heye û her di xwar bûn,*
*3 R̂oja axretê li cehnimê bi bar bûn.*

**S. 88** *1 Qanûn li e'rdî çêbû ji şefae'tê*[165]*,*
*2 Da deste xwedan îmana û atqetê,*
*3 Çiqas zalim hene, ĥemû li k'işê, li matê.*

**S. 89** *1 Heke yekî bi vî te pişkêne,*
*2 Ibadetê bike û xwe netirsîne,*
*3 Bela di zavin Şêşim dê jê r̂a îne.*

**S. 90** *1 Heke te da yekî bext û berat'e,*
*2 Berat' nîşana e'rd û qinyate*[166]*,*
*3 Xwedê heye, ew zor nifĥate.*

**S. 91** *1 Li bextê xwe yê bi heder be,*
*2 Guh nede xelqê*[167]*, û bi xwe ser be,*
*3 Batin heye, dê ji te r̂a mefer be.*

**S. 92** *1 Hevalê te, yê li ser bextê te ye,*
*2 Şîreta lêke, ew e'yba te ye,*
*3 Li nav xelqê ew serhev da te ye.*

**S. 93** *1 Li cînarê xwe yê ĥişyar be,*
*2 Li xweşî û şayî wî yî dîyar be,*
*3 Li makê e'rdî yî şifa be.*

**S. 94** *1 Heke yî bi bexte wî feyde kir,*
*2 Ji bo hevk'aryê we çêtir kir,*
*3 Mal û e'yal we êmin kir.*

**S. 95** *1 Nebêje nefret nîne,*
*2 Mominî bi r̂ecûne, bi hîvîne,*
*3 Şehdêt wan ĥemû xilas û ewlîne.*

**S. 96** *1 Çiqas qewl û beyt' hatine gotin,*
*2 Li Celwê û Mişĥefa R̂eş ĥemû catin,*
*3 Xweş kirin bihuşt*[168] *û xelqê dojehê bi agir sotin.*

**S. 97** *1 Sotin û agir digifişin,*
*2 Zinak'ar û derewîn — di feĥşin,*

[162] *ĥibs*
[163] *çunku*
[164] *dujmin*
[165] *şifat*
[166] *kinyat*
[167] *xelk*
[168] *behişt*

*3 Momin û xwedan xêr — di geşin.*

**S. 98** *1 Yê male xelqê dizî yî — bê namûse,*
*2 Û yê li dîwan û meclisa — wek casuse,*
*3 Ĥeqê wan li dinê û axretê ciza û ĥebse.*

**S. 99** *1 Mal ĥeram yî — şermîne,*
*2 Li e'mrê dine wan xêr nîne,*
*3 Li qiyametê di bê hîvîne.*

**S. 100** *1 Xwedan xêret yî — bi mirwetin,*
*2 Li behiştê yî bi dewletin,*
*3 Li dinyayê yî bi ĥeybetin.*

**S. 101** *1 Xwedê, tu layîqî ibadetê,*
*2 Ew ferzeke ji sinetê,*
*3 T'ifaq û r̂astî sere xilmetê.*

**S. 102** *1 Şeveke li nav şevane,*
*2 Bi gatina şêx Sinê Adiyane,*
*3 Ew şev berat'e, xwe nabînit wekî wane,*
*4 Xêr û ibadeta wê şevê hindî ĥemû mehane.*

**S. 103** *1 Heke sere pilane û heke Çarşembuwa meha Nîsane,*
*2 Û heke serê r̂ojyane, û heke cima'ne, û heke Îda qurbane,*
*3 Li sinetê Îd, û cejn, û keferzane.*

**S. 104** *1 Şêx û p'îr wek'îlin,*
*2 Ferzêt ĥeqîqetê kefîlin,*
*3 Li axretê xwedanê wan li dîwana mîrin.*

**S. 105** *1 Xwedan qiryara hol kir,*
*2 Bi navê silt'an Êzî xîret kir,*
*3 R̂oja axretê ji dojêh dûr kir.*

**S. 106** *1 Xwedê yo, te ne daye, û ne babe, û ne tevale*[169]*,*
*2 Ĥemû tişt bê yî betale bê r̂oja Xwedê Te'ale,*
*3 Xwezka bi wî êzdî bit, ev qewl ji xwe r̂a bikite r̂astemale.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 6. QEWLÊ ÇARŞEMBÊ[170] — BEYT'A NESÎĤETÊT ÇARŞEMBÛYÊ[171]

**S. 1** *1 Çarşembû r̂ojeka fadile,*
*2 Melîk Fexredîn e'frandbû ji eşq û dile,*
*3 Nas nedikir r̂uĥêt çû xafile.*

**S. 2** *1 Çarşembû r̂ojeke bi ĥesabe*[172]*,*
*2 Ji ba wan meleka hatî ev cewabe,*
*3 Derîyêt xêra di vekirîne ji r̂ojhelat ĥeta r̂ojave.*

---

[169] binêr: *teva*
[170] Feremez Xeribo http://www.kaniyasipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1521
[171] Bedel feqîr Ĥecî http://bedel.maktoobblog.com/705227/beyta-arembuye-beyta-nesihetet-carmbuye.
[172] *hisab*

**S. 3** *1 Çarşembû biȓî[173] kirase,*
*2 Ji me ȓa dana e'sase,*
*3 Nabî xwe ji t'oqê[174] bikî xilase.*

**S. 4** *1 Çarşembû ȓojeke xase,*
*2 Hincî mêrê sê ȓik'ina bo xwe ji îmanê biket e'sase,*
*3 Tawisî melek' yî qadire wê ȓuĥê ji agirê dojêh biket xilase.*

**S. 5** *1 Çarşembûyê xweş kir[175] jîyan,*
*2 K'esk kir deşt, û ĉiya, û zevî, û zozan,*
*3 Ew jî bi k'erema P'adşê[176] minê Êzdan.*

**S. 6** *1 Çarşembû ji me ȓa geleke,*
*2 Cendî heyne si'ûd û feleke,*
*3 Ĥemû bi destê Tawisî melek'e.*

**S. 7** *1 Dema çarşembû têt ji sip'êde,*
*2 Ibadetê bike ji Xwedê ȓa bi ta'et û zêde,*
*3 Tawisî melek' li te di yête fêde.*

**S. 8** *1 Dema çarşembû ȓoj hiltê ye,*
*2 Ĥincî mêrê zû ȓabit ji xewa berê sibê ye[177],*
*3 Medih û sena biket bo navê Xwedê ye[178],*
*4 Dua' Tawisî melek' ye lê ye.*

**S. 9** *1 Tawisî melek' yî ȓêberê yî serwere,*
*2 Ew melek'ê her û here,*
*3 Ew dizanit li vê dinyayê çend qender ax û av, û agir, û bayî û bere.*

**S. 10** *1 Ya Tawisî melek', tu melek'ê axretê û dinyayê,*
*2 Tû bideye xatira çarşembûyêt her donzde[h][179] mehayê,*
*3 Tû me li fecrê ȓakey ji xewê da bikeyin ibadetê û dua'yê.*

**S. 11** *1 Ibadet li me ye fere,*
*2 Pirs biken ji derwêşan û qelendere,*
*3 K'a çarşembû çend bi xatere[180].*

**S. 12** *1 Derwêş û qelenderêt safîne,*
*2 Ji îmanê bi ȓonahîne,*
*3 Li çarşembûya di serdayîne.*

**S. 13** *1 Hatin serdayîn li çarşembûyan,*
*2 Daxwez[181] kirin ji Melike Ȓeĥman,*
*3 Ȓuĥêt zalima bêxne dojêh û devê maran.*

**S. 14** *1 Hincîyê navê Tawisî melek' bîne,*
*2 Ye fere çarşembûyê bisadiqîne,*
*3 Tawisî melek' dê wê ȓuĥê ji qeda û bela sit'irîne.*

**S. 15** *1 Hincîyê wacibê çarşembûyê bînte cîye,*
*2 Borê xwe hefsarket li ĥemû cîye,*

---

[173] *perî*
[174] *tok*
[175] *xoşkir*
[176] *pedşa*
[177] *subê*
[178] *Xûdê*
[179] *duwazide*
[180] binêr: *xatir*
[181] *daxiwaz*

*3 Înşallah[182] Tawisî melek' jê r̂azîye.*

**S. 16** *1 Wacibêt çarşêmbûyê li me fere,*
*2 Neken li çarşembûyê çu zîyan û zerere[183],*
*3 Dê cehwer den li dîwan û mehdere.*

**S. 17** *1 Li mehderê deng bike,*
*2 Çarşmbûya serê Nîsanê r̂eng bike,*
*3 E'melê xwe safî bike.*

**S. 18** *1 Çarşembûyê e'mel xweş tê,*
*2 Ji xêrê, ji xilmetê, ji xîretê, ji ibadetê[184],*
*3 Xwezka wê r̂uĥê bi cî bînit vê nesîĥetê.*

**S. 19** *1 Hat çarşembûya sore,*
*2 Nîsan xemilandbû bi xwe r̂a[185],*
*3 Ji batin da ye bi more.*

**S. 20** *1 Hat çarşembûya sor û zere,*
*2 Behar xemilandbû ji k'esk, û sor, û sipî, û zere,*
*3 Me pê xemilandbû seredere.*

**S. 21** *1 Hincîyê sereder̂ê bixemilîne,*
*2 Bila pirsyarket ev jiber çîne,*
*3 Eve xelatêt Tawisî melek' û silt'an Êzîne,*
*4 Tawisî melek' ewê malê ji qeda û bela disit'irîne.*

**S. 22** *1 Bêjme we gelî sinîye[186],*
*2 Hîvîya li çarşembûyê zor hîvîye,*
*3 Hincîyê ferzêt ĥeqîqetê bînite cîye.*

**S. 23** *1 Bêjme we gelî sinetê,*
*2 Li şeva çarşembûyê nefsê nebe şehwetê,*
*3 Ji ber xatira axretê.*

**S. 24** *1 Heke hûn digirin axretê,*
*2 Li çarşembûyê neken xeletê[187],*
*3 Da we bixwînin[188] li baẍê[189] cinetê.*

**S. 25** *1 Dibêjime we ji ĥeqîqetê,*
*2 Hûn sist nebin li ibadet û me'rîfet[ê],*
*3 Tawisî melek' dêde te wê qewetê[190].*

**S. 26** *1 Qewate ji îmanê, îmane bi nîşane,*
*2 T'oq û meft'ûl, simbêl û girîvane,*
*3 Evana[191] di ferin bo mêrane.*

**S. 27** *1 Ĥincîyê bi îmanê xwe[192] nas kir,*
*2 Li çarşembûya serê nîsanê daxwez kir,*
*3 Tawisî melek' ew r̂uĥ xelat kir.*

182 *insallah*
183 binêr: *zirar*
184 *ebadet*
185 *xora*
186 *sûnîye*
187 binêr: *xelat*
188 *bixûnin*
189 *bax*
190 binêr: *qewat*
191 *ewne*
192 *xo*

**S. 28** *1 Hat çarşembûya e'wilî,*
*2 Dur̂[193] bi r̂enga xemilî,*
*3 Ev dinya pê dik'amilî.*

**S. 29** *1 Hat çarşembûya faxirî,*
*2 Ya Tawisî melek' her tûyî qadirî,*
*3 Te p'îranî dahir kir û kire r̂ik'in ji e'wilî.*

**S. 30** *1 Ya Tawisî melek' te ev dinya bi p'îranî kir,*
*2 K'arê p'îranî te qebûl kir,*
*3 K'arê bê p'îranî te ĥez ne dikir.*

**S. 31** *1 Hat çarşembûya qere,*
*2 Dua' ji Melikê[194] Ekbere,*
*3 K'arê p'îranî biçite sere.*

**S. 32** *1 Hat qere çarşembûya qere,*
*2 Hincîyê girîvanê ĥeqî yê li bere,*
*3 Tawisî melek' jê r̂a mefere.*

**S. 33** *1 Hat çarşembûya qere,*
*2 Xelat ji Melikê Ekbere,*
*4 Bo r̂uĥê, ji îmanê gur̂î diken ĉira,*

**S. 34** *1 Çarşembû r̂ojeke xweyane[195],*
*2 Ev dinya t'emam bila pê bizane,*
*3 Tawisî melek' ji me r̂a şehde û îmane.*

**S. 35** *1 Çarşembû r̂ojeke p'ake,*
*2 Hincî kesê fariqe bû ji make,*
*3 Xaliq ĥemûya dê wefake.*

**S. 36** *1 Çarşembû r̂ojeke bi nîşane,*
*2 Hîncîyê bigirit qedrê dayîk û babane,*
*3 Dayîm merk'eba wî li beĥrêt giran ye melevane.*

**S. 37** *1 Çarşembû r̂ojeke Emîne,*
*2 E'zîz Tawisî melek'ê min nav şêrîne,[196]*
*3 Bi navê melik Şerfedîn, ji me r̂a bûye dîne.*

**S. 38** *1 Dîne û şik tê nîne,*
*2 Kesê dibêjit we nîne,*
*3 Melik Şerfedîn sur̂a e'nîya wî distîne.*

**S. 39** *1 Ya melik Şerfedînê minî, her û herî,*
*2 Tû bideye xatira e'rd, û e'zman, û dar, û berî,*
*3 Tû li me nekeye tengavî, zû li banga me werî.*

**S. 40** *1 Tû li banga me werî Lalişê,*
*2 Li çarşembûya serê Nîsanê,*
*3 Melek Adî dikarit[197] înk'ara bînite ser r̂êya îmanê.*

**S. 41** *1 Înk'ar di şikdarin,*

---

[193] *dur̂*
[194] *melek*
[195] *xuyan*
[196] *şirîn*
[197] *diqarit*

*2 Ẍafil*[198] *dik'ifarin,*
*3 Li axretê di bê zarin,*
*4 Ciyê bo wan vejwartî li axretê dojehe û narin.*

**S. 42** *1 Înk'ar çendî bi înk'irit,*
*2 Û ẍafil çendî bi k'ifirit,*
*3 Li axretê cor û e'zaba wî zêde di kitirit.*

**S. 43** *1 Hûn biȓênine ȟeqîqetê,*
*2 Ye t'ijîye ji ibadetê û me'rîfetê,*
*3 Mixabin hûn xwe bidene alî ji ber navê we tê.*

**S. 44** *1 Çarşembû ȓoja sulhetê,*
*2 Hincîyê bo xwe bibîne hedretê,*
*3 Her çarşembû ȓoja şefa'etê.*

**S. 45** *1 Heke te bivêt ser xwe ȓa key core,*
*2 Zadekî li çarşembûyê bide dore,*
*3 Tawisî melek' yî ẍefûre, ew nûre li ser nûre.*

**S. 46** *1 Çarşembû ȓojeke girane,*
*2 Hincî ȓuȟa bi ol, û e'deb, û erk'ane,*
*3 Ew dê hola xwe bete ser holane.*

**S. 47** *1 Dibêjme we gelî êzdîyane,*
*2 Xelatêt Tawisî melek' bi gelek ȓengane,*
*3 Xîreta dînî serê ȟemûwane.*

*T'emametî li navê Xwedê û Tawisî melek'ê mêrane!*

## 7. QEWLÊ ÇARŞEMA SOR[199]

**S. 1** *1 Çarşema serê Nîsanê,*
*2 Gul û çîçek hatine meydanê,*
*3 Tawisî melek' ȓeyîsê îmanê.*

**S. 2** *1 Çarşema serê Nîsanê,*
*2 Şêx Adî, şêx Alê Şemsa xweste dîwanê,*
*3 Xwedê berê xwe da Ezîdxanê,*
*4 Li ser me dibe ferza îmane,*
*5 Ewe e'yda*[200] *Êzîdxanê!*

**S. 3** *1 Nîsanê deng lê kire,*
*2 Bihara xwe dixemilîne,*
*3 Bi k'esk, sor, sipî û zere,*
*4 Ti ȟedê meha t'ine li ber min bide xebere!*

**S. 4** *1 Çarsem ȓojeke fadile,*
*2 Tawisî melek' e'firandiye ji eşq û dile,*
*3 Bar tê nebe kesê ku yî ẍafile,*
*4 Deng yeke, û ȟezar ȓenge!*

**S. 5** *1 Ezim e'rda derwêş,*

[198] *xafil*
[199] http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-07.htm
[200] *êyîd*

*2 Li ser min digeȓe çiqas ȓuĥ li ber milet û cêş,*
*3 Bila ji Xwedê û Tawisî melek' pêştir xwe nede pêş!*

## 8. QEWLÊ XWEDANÊ MALÊ[201; 202]

**S. 1** *1 Bi destûrî[203] xwedanê malê,*
*2 Dilê min mabû li vê xeyalê[204],*
*3 Hûn biȓênin hikmeta silt'an Êzîdû[205] vê salê!*

**S. 2** *1 Eve bû sala serê e'cêba!*
*2 Vekin derê deft'eran û k'itêba,*
*3 Li hikmeta silt'an Êzîd meken lêba!*

**S. 3** *1 Lêba li hikmeta silt'an Êzîd mekin,*
*2 Derê deft'eran û k'itêban vekin,*
*3 Heke ne hikmeta silt'an Êzîd ye, serê min bi oẍleme kin!*

**S. 4** *1 Gelî mêra bêjme we ji yeqîne[206],*
*2 Melîk Şemsedîn dayîm borê wî yî bi zîne,*
*3 Qasidê silt'an Êzîd e'zîz melîk Fexredîne!*

**S. 5** *1 Mêr dibêjin we ye:*
*2 «Xunk'ar[207] ne yî li ser t'extê xwe ye,*
*3 Wê çoye cengê şa[h] ye[208]».*

**S. 6** *1 Şah dibêjite xane:*
*2 «Dê ji ser t'extî ȓebit Osmane,*
*3 Li ȓûyê vê meclîsê, dê bite hikmê mehdî zemane!»*

**S. 7** *1 Aşiqo yî feleke,*
*2 Deng li xanû qoçêt xwe dikete:*
*3 «Hikmê teyî betale, e'mirê te ne geleke».*

**S. 8** *1 Aşiqo, yî derwêş,*
*2 Tû li vê suȓê bike t'eftêş!*
*3 We'de wê hatî, silt'an Êzîd, dê tesmîlî aẍê feqîra ket t'extê Qizilbêş.*

**S. 9** *1 Aşiqo deng diket bi zêȓo[209],*
*2 Tu li vê suȓê bike seẍbêro!*
*3 We'de hatî silt'an Êzîd, dê tesmîlî aẍê feqîra ket t'extê xunk'êro!*

**S. 10** *1 Aşiqo, deng diket bi zare,*
*2 Tu li vê suȓê bike pirsyare!*
*3 We'de hatî silt'an Êzîd, tesmîlî aẍê feqîra biket t'extê xunk'are!*

**S. 11** *1 T'emam bû w'edê dinê,*
*2 Hûn bora girêdin çê,*
*3 Goy ȓeva bû melîk şêx Sin xwedanê[210] sidiqê!*

---

[201] [2] (pp 364–367)
[202] *Qewlê ola Êzdayîya* http://www.mirbotan.com/guzel-siirler/1386-qewle-xudane-male.html
[203] *distûr*
[204] *xîyal*
[205] *Êzî*
[206] *êqîn*
[207] *xundk'ar*
[208] şaye — *şahê îranê* (X.C. Reşo)
[209] binêr: *zar*
[210] *xûdan*

**S. 12** *1 T'emam bû w'edê ĥeqîqetê!*
*2 Hûn bora girêdin bi t'aqetê,*
*3 Goy r̂eva bû melik şêx Sin, xwedanê sadiqê û xilmetê!*

**S. 13** *1 T'emam bû hind û ĥezare,*
*2 A'lem bûne ĥusindare,*
*3 Ewê r̂ojê feqîra li ĥizura silt'an Êzîd mey[a] vedixware!*

**S. 14** *1 Hind û ĥezar di herete,*
*2 A'lem bûne cimlete,*
*3 We'de wê hatî silt'an Êzî, tesmîlî ax̂ê feqîra biket maş, û berat, û xete!*

**S. 15** *1 Cêşek r̂abûyî berberî E'rşa,*
*2 Silt'an Êzî bi destê xwe ji binî hilweşan da,*
*3 Dê nijîyar ket şêr Mehmed[211] R̂eşa.*

**S. 16** *1 Ew bû cêşê bilinde,*
*2 Siltan Êzî hilweşand bû ji bin de,*
*3 Dê nijyar ket qere şêx Mende[212].*

**S. 17** *1 Ew bû cêşê mezine!*
*2 Silt'an Êzîd hilweşandbû ji bine,*
*3 Dê nijyar ket melîk şêx Sine.*

**S. 18** *1 Ew bû cêşê k'ibîre!*
*2 Li herdu mila k'êşa bûn şîre,*
*3 Ewê r̂ojê li nav beynê sekinî silt'an Êzî, ax̂ayê min û çendî feqîre!*

**S. 19** *1 Cêşek r̂abû ne yî ji qanûne,*
*2 Şaş p'êça wan wekî ya ferûne,*
*3 Derwêş qutik dê wan, k'etin zebûne.*

**S. 20** *1 Hûn mebêjin derwêşî qutike,*
*2 Herçî e'rdê biçimê li nike,*
*3 Herçî mêrê li qewlê şêx Adî li deft'era melîk Fexredîn yî bi şike,*
*4 Ew dê r̂oja axretê çî li ĥalê xwe bike!*

*Em di kêmin, şêx Adî t̂emame!*

## 9. QEWLÊ ÎMANÊ

**şaxê – 1**[213]
*Bi destûrî Xwedê!*
**S. 1** *1 Xelqno jîr û zane,*
*2 Werin ji min r̂a bidin beyane,*
*3 K'a îman ya bi çi nîşane?*

**S. 2** *1 Wextê nifûsa me li dinê diger̂îya,*
*2 Min hindek dîtin gedayîye,*
*3 Biĥesibînin[214], wan e'ynat[215] çîye?*

---

[211] *Mamed*
[212] *Şêxmend*
[213] http://bedel.maktoobblog.com/705298/ Bedel feqîr Ĥeci: cavkani *Lalish* Duhok org. Ev qewle lêkolînvan û qewilbêjê hêja û qedirgiran (PÎR DÎMA) ji welatê Gurgistanê ji min r̂a şandîyê, em jî li çend malperên înternêtê belavdikeyin, hivîdarîn sud û mifa jê bête wergirtin.
[214] *hesib*
[215] *e'ynet*

**S. 3** *1 Biĥesibînin çenda li kêm da,*
*2 Hincî îmana xwe bi t'emaya dine da,*
*3 Ew çî ji r̂isqê dojêh r̂a?*

**S. 4** *1 Ji ya me êzdîya ye xweya*[216] *ye,*
*2 Ne bi qudûm heye, ne bi xewna ye,*
*3 Bi qelema girtîne û erk'ane.*

**S. 5** *1 Lib[a]sê îmanê hilînin,*
*2 T'oqa*[217] *silt'an Êzîd ne xeyrînin,*
*3 Ewa erk'aneke, k'a çendî dimînin?*

**S. 6** *1 Derewîn heye yê betale,*
*2 Û çirke li ba hevale,*
*3 Bê qîmete li ba extîyare.*

**S. 7** *1 Wê ilme yê t'eke, wê te kevnîne*[218]*,*
*2 Wê te ĥesibîne, wê te ceribîne,*
*3 K'a k'î di r̂eve û k'î dimîne?*
*4 Sed xwezka*[219] *wî be nexeyrîne.*

**S. 8** *1 Ew k'î bû berî Adem li e'rda bû?*
*2 Bi wî hêvênî, bi çi r̂enga bû,*
*3 K'î îmam bû, k'î hosta bû?*

**S. 9** *1 Ji wî hêvênî bi çi r̂engîne,*
*2 Bi sadiqe*[220]*, û ĥeya*[221]*, û nasîne,*
*3 Aşiqin fidawîne.*

**S. 10** *1 Ew bû sur̂a*[222] *me ya ji mêja,*
*2 Adem çêkir, Hewa jê r̂a,*
*3 Beşer çêkir ji cerbêr̂a.*

**S. 11** *1 Hincî borê bet'er bê li xafkir,*
*2 Û ew lê av li beĥrê k'arkir,*
*3 Ew xwe ji zuretê Adem ĥesabkir.*

**S. 12** *1 Miletek heye ne ji Ademe,*
*2 Hincî beĥra av tê nema,*
*3 Dar k'esk bin li gelek ĉema.*

**S. 13** *1 Ew miletê yî bi mirwete,*
*2 Yî bi xîrete, yî bi ibadete*[223]*,*
*3 Hêvênê wan ji ba milyak'ete.*

**S. 14** *1 Derewîn heye yî betale,*
*2 Yî bê ibadete, yî xeybetk'are,*
*3 Yî derewîne, yî betale.*

**S. 15** *1 Heke êkî derewek li ba xwe çêkir,*
*2 P'adşê min derd û derman bi ĥeqê wî kir,*
*3 Ew şkestî bû, xwe li gor̂a wî kir.*

---

[216] *xuya*
[217] *tok*
[218] *kewn*
[219] *xozka*
[220] *sidq*
[221] *heya*
[222] *sur*
[223] *ebadet*

**S. 16** *1 Ber t'îkê nexwe ew derware,*
*2 Derewê neke, wê belabe,*
*3 Dojeh heye bi dupiştk û mare.*

**S. 17** *1 Xwe bi malê dinê nek'ubrîne,*
*2 Moĥt'ac*[224] *hatin te digo nîne,*
*3 Heke yê bi aqile dewistîne,*
*4 Heke temak'are, bila ĥeqîyê tîne.*

**S. 18** *1 Ji temayê şîn ber da,*
*2 Ji bênamûsî li îman der da,*
*3 Hikm heye wê bê te, ser te.*

**S. 19** *1 Bixebite, xwe jê derîne,*
*2 Moĥt'ac hatin li ber te digrîne,*
*3 Û tu bê r̂ecû bûyî, te digo nine,*
*4 P'adşa ewe diwestîne.*

**S. 20** *1 Ji ber malê dinê nanivin,*
*2 Dojeh heye wê tê dik'evin,*
*3 Ew t'obekin jê dernak'evin.*

**S. 21** *1 P'adşayê min e'zman çêkir,*
*2 E'rdê Xwedê te'm tê kir,*
*3 Qasî ĥemûyê hikm çêkir.*

**S. 22** *1 Cehnem heye, ye bê xweşîye*[225]*,*
*2 Şewqek têda ne diîsîye,*
*3 Ji vê bêtir û hindî dîye.*

**S. 23** *1 Wê wan havêjne nav seqere,*
*2 Ewin bê xêrin, bê mehdere,*
*3 Ewê bê beĥr bin li herdu sere.*

**S. 24** *1 Li wê ĥebsê nayêt sibehî,*
*2 Çend cemed heye jê dernak'evî,*
*3 Ew bû bazareke te ji xwe r̂a kirî.*

**S. 25** *1 Wextê li e'rda te dewr dibir̂î*
*2 Tu çend li xwe bide yî ser nak'evî,*
*3 Hevalêt te birine agirê gur̂î.*

**S. 26** *1 Ibadet bike da bi serk'evî,*
*2 Bi r̂êda bisekine jê dernekevî,*
*3 Tu xebîr bûyî te îman kirî.*

**S. 27** *1 Birime behiştê*[226] *mêrgekê,*
*2 R̂engê xweş lê hiltê,*
*3 Ev dinya ne hêjaye saleke hîngê*[227]*.*

**S. 28** *1 Ew bihuşt ye enzelîye,*
*2 Min mêrgek li wê dît bi xweşîye*[228]*,*
*3 Qesrek tê bû diîsîye.*

---

[224] *muhtac*
[225] *xoşî*
[226] binêr: *bihuşt*
[227] *hingê*
[228] *xoşî*

**S. 29** *1 Ew qesre çendîye mezine,*
*2 Pênc sed e'rife[229] tê hene yêt r̂ûniştine,*
*3 Ew k'î mêr bû digo: «Ser navê mine!»*

**S. 30** *1 Birime bihuşta Adî ĥewase,*
*2 Min li wê dît def, û zembîr, û êẍler[230], û şaze[231],*
*3 Horî sekinîne hîvîya k'ase.*

**S. 31** *1 Li bihuştê mêrgek tê bû,*
*2 Horiya bin Hena ji ba me bi r̂ê bû,*
*3 Milkê wê li wê mêrgê bû.*

**S. 32** *1 Li bihuştê mêrg bi nav bûn,*
*2 Horî têda zaf bûn,*
*3 Li hatina e'rda qane nebûn.*

**S. 33** *1 Li bihuştê mêrg hene t'ijî te'me,*
*2 Coyêt avê jê berdane,*
*3 Şalûl û bilbil li ser dixwînin[232] bi zar û zimane.*

*T'emametîya vî qewlî li Xwedê û*
*Xwedane! Em kêmin, û Xwedê t'emame!*

**şaxê – 2**[233; 234; 235]
**S. 1** *1 Îmane, çi nîşane,*
*2 Wexta ne e'rd bû, ne e'zmane,*
*3 Ne dinyaye, ne binyane.*

**S. 1** *1 Îman bi çi nîşane,*
*2 Berî ne e'rd hebû ne e'zmane,*
*3 Ne ĉiya hebû ne însane,*
*4 Ne derya hebû, ne binyane.*

**S. 2** *1 Ne bajare, ne qinyate[236],*
*2 Ne mîr Biraîmê Adame, ne jî Xor̂istane,*
*3 Berî not ĥezar sal kaniya Sipî qulbeye[237], xerqe şêx Adî şehdeye[238].*

**S. 1** *1 Îmane, çi nîşane,*
*2 Ne e'rde, ne jî e'zmane,*
*3 Ne dinyaye, ne bajare, ne jî qinyate,*
*4 Ne mîr Birahîmê[239] Adame, ne jî Xor̂istane[240].*

**S. 2** *1 R̂ê hebû t'erîqete,*
*2 Îman hebû me'irîfete,*
*3 Ewê r̂ojê kaniya Sipî kire qublete.*

**S. 3** *1 R̂engê îmanê çîye?*
*2 Kelîma enzelîye,*
*3 Sur̂aşêxê Adîye.*

**S. 2** *1 R̂engê îmanê ji çiye?*
*2 Kelîma enzelîye,*

[229] *xurfe*
[230] *axler* (*aẍeler*?)
[231] *saz*
[232] *dixûnin*
[233] [29] (№ 1703) (417–422)
[234] [6] (кн.2, стр 49); [3] (194–200)
[235] [50] (гг. 97-101)
[236] *kinîyaye*
[237] binêr: *qible*
[238] *şe'deye*
[239] *Brahîm*
[240] *Xurîşan*

*3 Navê şêxê Adîye*[241]*.*

**S. 3** *1 Rengê îmane çîye,*
*2 Gotina herî pêşîye,*
*3 Navê silt'an Êzdîye.*

**S. 4** *1 Şêxê Adî xweyî silt'ane*[242]*,*
*2 Nav dik'irê*[243] *te didim beyane.*

**S. 5** *1 Beyana nav dik'irê te dideme,*
*2 Wexta ne lêh hebû, ne qeleme,*
*3 Berî not ĥezar sal ezî cem teme.*

**S. 3** *1 Şêxê Adî xwe silt'ane,*
*2 Çardeh*[244] *t'ebeqe*[245] *e'rd û e'zman dide beyane,*
*3 Ne Lewĥe*[246]*, ne Qeleme,*
*4 Barî not ĥezar salî cem teme.*

**S. 4** *1 Ya silt'an Êzî çendî med[h]e ji te dideme,*
*2 Ji berî depe û qeleme,*
*3 Ji berî Hewa û Ademe,*
*4 Berî wê not ĥezar sal ezî li ba te me.*

**S. 6** *1 Barî not ĥezar sal ezî wê bûm,*
*2 Bê bavî, bê dê bûm,*
*3 Ezî qudreta P'adşê bûm.*

**S. 4** *1 Barî not ĥezar salî li wê bûm,*
*2 Bê bavî, bê dê bûm,*
*3 Ji qudreta P'adşê bûm.*

**S. 5** *1 Berî not ĥezar sal ezî li wê bûm,*
*2 Ne yî ji bab bûm, ne yî ji dê bûm,*
*3 Ezî li ber xilmeta mewlê bûm.*

**S. 7** *1 Qudreta wî P'adşayî,*
*2 Dame destê wî hostayî,*
*3 Mi r̂a çêkirîye xweşî*[247]*û şayî.*

**S. 5** *1 Ji qudreta wî P'adşayî,*
*2 Dame destê wî hostayî*[248]*,*
*3 Mi r̂a çêdikir xweşî û şayî.*

**S. 6** *1 Ez birime ber merdiya wî P'adşayî,*
*2 Ez dame destê wî hostayî,*
*3 Yê ji me r̂a kir xweşî û şayî.*

**S. 8** *1 Xweşî û şayî yê mi r̂a çêdikiro,*
*2 Seyîdo, bin Xidiro,*
*3 Mi r̂a anî k'aseke buk'iro.*

**S. 6** *1 Xweşî û şayî çêdikirî,*
*2 Seyîdo, tuyî bin Xidir,*
*3 Te da destê min k'aseke buk'ir*[249]*,*

**S. 7** *1 Xweşî û şayî ji me r̂a kirî,*
*2 Tu Xidir, lawê Xidirî,*
*3 Te da destê min k'aseka buk'irî.*

**S. 9** *1 K'asa mi r̂a anî,*

---

241 *şêx E'dî*
242 *sult'an*
243 *dik'r*
244 *çarde*
245 *evek*
246 *luh*
247 *xoş*
248 *osta*
249 *bikir*

*2 Mi xwar pê dizanî,*
*3 Dame ser ilmekî[250] Qat'anî.*

**S. 7** *1 Ew k'asa te mi r̂a anî,*
*2 Wekî min zanî, wekî min vedixwarî[251],*
*3 Te danîme ser ilmekî[252] Qat'anî.*

**S. 8** *1 Ew kasa te ji min r̂e anî,*
*2 Min vedixwarî weke tu zanî,*
*3 Te ez danîme ser r̂amana Qat'anî.*

**S. 10** *1 Qat'anî ya we dibêye,*
*2 R̂ê û t'or̂e erk'aneke çêye,*
*3 Mehda[253] nav dik'irê Şerfedînê dîn dibêye.*

**S. 8** *1 We Qat'aniya dibihême,*
*2 Istûna t'or̂e erk'anekî çême,*
*3 Medha[254] didim nav dik'irê silt'an[255] Êzdîd, erk'aneke çême.*

**S. 9** *1 Ji Qat'anî yê we dibême,*
*2 Bi ol û erk'anê çême,*
*3 Da pesna xweşewîst melik Fexredîn bême.*

**S. 11** *1 Medha nav dik'rê Şerfedînê dîne,*
*2 Wê vê dinê bive mizgîne,*
*3 Wê derk'evin xeybetêd t'eleb[256] zêr̂îne.*

**S. 10** *1 Da em biden pesna xweşewîst melik Şerfedîne,*
*2 K'engî ji mer̂e bêtin mizgîne,*
*3 Xebat wek gora zêr̂îne.*

**S. 12** *1 Xeybetê derk'evin,*
*2 Eva dinyayê levk'evin,*
*3 Bedîlê mêra şik k'evin.*

**S. 9** *1 Ev bedîlê derk'evin,*
*2 Ev bedîlê levk'evin,*
*3 Ev bedîlê mêra şik hevin.*

**S. 11** *1 Ev mizgîne wê derk'evî,*
*2 Ev dinya wê li hevkevî,*
*3 Sinetxane dê li xwe şik k'evî.*

**S. 13** *1 Bedîlê mêra yê bivin şike,*
*2 Herçê kesê destê xwe damina xerqê şêx Adî mala Adiya bigre,*
*silt'an şêx Adî yê mirazê wana cem xwe hasil bike.*

**S. 10** *1 Ev bedîlê mêra bivine şike,*
*2 Herça qesta mala Adiya damine xerqe bike,*
*3 Silt'an Êzdîd mirazê wî cem xwe hasil bike.*

**S. 12** *1 Sinet mabû li xwe şike,*
*2 Kesekî di her bendê xaliqe,*
*3 Ewê qesta damana xerqê şêx Adî bike.*

**S. 13** *1 Şêx Adî bi xwe îmane,*
*2 Çi deryake hoye girane,*
*3 Xewasa dur̂e jê înane.*

**S. 14** *1 Xewasa jê înabûn dur̂e,*
*2 Hincî kese ji P'adşê xwe bir ev sur̂e,*

[250] *ulm*
[251] *vedixar*
[252] *u'lm*
[253] *me da*
[254] *meda*
[255] *sultan*
[256] *terep*

*3 Ewî ji deryan deranîbû duȓe.*

**S. 15** *1 Ji wê di îna xwa ȓe,*
*2 Li ber sekinîn herçar yare,*
*3 Xozî me bi damana xerqê şêx Adî hebe p'are.*

**S. 14** *1 Duȓa vê beȟrê[257] der anî[258],*
*2 Ser k'efa destê xwe danî,*
*3 Lê çêkir xerqekî ȓeşî nûranî.*

**S. 16** *1 Silt'an Êzî duȓ ji deryaye deranî,*
*2 Ser k'efa[259] deste xwe danî,*
*3 Jê çêkir t'anc, û hilê, û xerqê ȓeşî nûranî,*
*4 Bir ser xwe ȓa danî.*

**S. 15** *1 Duȓa wê beȟrê hinare,*
*2 Lê sêwirîn herçar yare,*
*3 Hadêr gudêra dîwana silt'an Êzîd heve p'are.*

**S. 11** *1 Duȓa wê beȟrê denare,*
*2 Tê seyran herçar yare,*
*3 Ya şêx Adî mêra, tê heve p'are.*

**S. 16**[260] *1 P'adşayê min erk'anekê cor kir,*
*2 E'yn il-Beyzayê der anî, xerqê ser k'efa destê xwe mor kir,*
*3 E'wil Êzîdê sor kir, feqîra pey sefer kir.*

**S. 15** *1 P'adşayê min erk'an cor kir,*
*2 Xerqe E'yn il-Beyzayê derxist, ser k'efa destê xwe mor kir,*
*3 E'wil de Êzdîdê Sor kir.*

**S. 17** *1 P'adşê min erk'an birî jore,*
*2 Pileya xerqê şêx Adî wa li more[261],*
*3 Ew cilê silt'an Êzdiyê minî sore.*

**S. 18** *1 Silt'an Ezî xerqe li berk' kir[262],*
*2 T'ancekî ȓeşî nûranî, bi ser kir,*
*3 Feqîra li pê sefer kir.*

**S. 17** *1 Pey sefer kirîye feqîre,*
*2 Ȟerça xelat kirîye fênîke mîra,*
*3 Ew jî xelat dike wa mifta, wa k'ilîla.*

**S. 18** *1 K'ilîl ew miftene,*
*2 Destê wa cindîya vedivene,*
*3 Her pênc ferzê ȟeqîqetê, qasî kêr e'malê me ma şehdene.*

**S. 19** *1 Tu hin maşî, hin medayî,*
*2 Melek şêx Sin – Mistefaye,*
*3 Ȟemû derdan yî bin wefaye.*

**S. 20** *1 Bin wefaye ȟemû derda,*
*2 Ȟerçê kesê ȟeqîya ȓêya silt'an şêx Adî xeber da[263],*

---

[257] *be'r*
[258] *deranî*
[259] *lep*
[260] **S. 16** *1 P'adşayê min erk'aneke cor kir,*
*2 Xerqe e'ynzil der anî,*
*3 Beynzil ser k'efa destê xwe mor kir,*
*4 E'wil Êzîdê sor kir,*
*5 Feqîra pey sefer kir.*
[261] *jore*
[262] *ber kir*
[263] *xever*

*3 Ewan jî ajotîye mezine meydanê melekan serda.*

**S. 21** *1 Ewan jî ajotîye mezine meydanê melekan sere,*
*2 Ĥerçê kesê vî qewlî atqat îman baware,*
*3 E'lametê şêx Fexrê Adiya ye, wê heȓe ĥetanî here.*

**S. 22** *1 Çi qendîla cîde,*
*2 Lê cema' we*[264] *bûn mirîde,*
*3 Xerqe hat suȓa silt'an Êzîde.*

**S. 19** *1 Çi erk'aneka cîda,*
*2 Xweyabû*[265] *li nav mirîda,*
*3 Ew erk'ana silt'an Êzîda.*

**S. 23** *1 Çi qendîla buk'ir*[266]*,*
*2 Dinê bibû dik'ir,*
*3 Xerqe hat xelata şêxû Bek'ir.*

**S. 12** *1 Çi erk'aneke dik'ir,*
*2 Nav mêra da bû buk'ir,*
*3 Xerqe hat xelatê şêxû Bek'ir.*

**S. 13** *1 Çi erk'aneke ev ĥal,*
*2 Nav mêra da bû delal,*
*3 Xerqe hat xelatê şêxê Şelal.*

**S. 14** *1 Çi erk'aneke neder,*
*2 Nav mêra da bû bedel,*
*3 Xerqe hat xelatê Şemsê T'et'er.*

**S. 20** *1 Çi erk'aneka bi hinere,*
*2 Xuya[n]bû li nav babzere,*
*3 Ew erk'ana şêx Şemsê*[267] *T'et'ere.*

**S. 24** *1 Çi qendîla mezine,*
*2 Lê cemae' bûn momine,*
*3 Xerqe hat xelata şêx Sine.*

**S. 25** *1 Çi qendîla nûrîne,*
*2 Nazil biye e'zmîne*[268]*,*
*3 Xerqe hat xelata melek Şemsedîn, melek Fexredîn, melek Nasirdîn, melek Sicadîne.*

**S. 26** *1 Çi qendîla girane,*
*2 Nazil bûye*[269] *E'rşane,*
*3 Xerqe hat xelata mêrane.*

**S. 21** *1 P'adşayê min erk'an cor kir,*
*2 Xerqe kaniya Sipî derxist û mor kir,*
*3 Ji berî gişta li ber silt'an Êzdiyê sor kir.*

**S. 27** *1 Xerqe tînin,*
*2 Erk'anê serda tînin,*
*3 Mala Adiya feqîra ȓa diîsînin.*

**S. 16** *1 Erk'anekê tînin,*
*2 Xerqê şêx Adî serda tînin,*

[264] *cemwe*
[265] *xuya*
[266] *bik'ir*
[267] *Şims*
[268] *esmîn*
[269] *biye*

*3 Mala Adiya r̂a*[270] *diîsînin.*

**S. 22** *1 Hun erk'anê tinin,*
*2 Xerqa şêx Adî li serda tinin,*
*3 Ji mala Adiya r̂e diîsînin.*

**S. 28** *1 Mala Adiya şehde ve,*
*2 Kaniya Sipî qulba ve,*
*3 Ya silt'an şêx Adî, mêra gotin me r̂onkayî nav dik'irê te heve.*

**S. 17** *1 Mala Adiya şehde ve,*
*2 Kaniya Sipî quble ve*[271]*,*
*3 Xerqe îmane.*

**S. 23** *1 Mala Adiya şehde be,*
*2 Kaniya Sipî quble be,*
*3 Xerqe îman be.*

**S. 18** *1 R̂engê îmanê ji çî ye?*
*2 Kelîma enzelî ye,*
*3 Navê şêxê Adî ye. (*binêr **S. 2***)*

**S. 24** *1 Rengê îmanê çî ye,*
*2 Gotina herî peşî ye,*
*3 Navê silt'an Êzdî ye.*

**S. 29** *1 Dîwarekî datînim cisne,*
*2 T'emam dikim pesne,*
*3 Bedîlek r̂abîye, kesî haş kesî nîne.*

**S. 19** *1 Dîwarekî datînim cisne,*
*2 T'emam dikim pesne,*
*3 Dîwarî bi binyane*[272]*,*
*4 Hosta yî pê r̂a sergerdane*[273]*.*

**S. 25** *1 Dîwarekî çêken bi cesne,*
*2 Hincî lê kirin pesne,*
*3 Yê fêniyê kes haj ji kesne.*

**S. 30** *1 Dîwarekî datînim kêm t'aqete,*
*2 Osta yî pê r̂a yî ĥeqîqete,*
*3 Ha bir̂a bidine ĥizêmete.*

**S. 31** *1 Sur̂e mixfî*[274] *dahir*[275] *dikirin,*
*2 Mişteriyê wî qumaşî werin,*
*3 Werin mişteriyê wî qumaşî.*

**S. 20** *1 Çil qizê beĥrî li wê bû,*
*2 Yeke nûranî tê bû,*
*3 Lal, dur̂ anîbû, jê bû.*

**S. 26** *1 Çêl keçî beĥrî li wê bû,*
*2 Yeka nûranî tê bû,*
*3 Lal, dur̂ anîbû, je bû.*

**S. 21** *1 Lal û dur̂ê wa beĥra,*
*2 T'eslîm kirne wa extîyara,*
*3 Deng nake ĥemû şar̂a*[276]*.*

**S. 27** *1 Lal, dur̂e wa derya,*
*2 Radest kirne wan extîyara,*

---

[270] *re*
[271] *qul beve*
[272] *binyaye*
[273] *sergidaye*
[274] *nixmî*
[275] *dîhar*
[276] *şahar̂*

*3 Deng neçe ĥemû şara.*

**S. 32** *1 Herçê kesê dest bazî,*
*2 P'ê bazî, ziman baz,*
*3 Ew jî hole xwe mala Adiya r̂a dike k'aş.*

**S. 33** *1 R̂okê birime ber pê p'ira Seratê,*
*2 Xerqeyê here bûsatê,*
*3 Qalbê ne seveqê xerqe ve, wê bimîne k'işême'tê.*

**S. 34** *1 R̂okê birime ber pê p'ra nehînê,*
*2 Xerqeyê her̂e xezînê,*
*3 Qalbê ne seveqê xerqe ve,wê her̂e te'til cihînê.*

**S. 22** *1 Siveye[277], r̂ojê p'ence dane,*
*2 Mêr, milyak'eta silavet vedane,*
*3 Nîşanga silt'an Êzdîd xerqe bûn, r̂û e'rda dimane.*

**S. 28** *1 Sibeye r̂ojê p'ênc dane,*
*2 Mer, firîşteya, silavêt vedane,*
*3 Nişana silt'an Êzdî xerqe bû, r̂ûyî e'rda dimane.*

**S. 23** *1 Hêvare[278], r̂ojê p'ence dadihiştin,*
*2 Mêr, milyak'eta, silavet r̂adihiştin,*
*3 Nîşanga silt'an Êzdîd xerqe bûn, r̂û e'rda dihiştin.*

**S. 29** *1 Sibeye r̂ojê p'enc dadihistin,*
*2 Mer, Firîşte silavêt r̂adihistin,*
*3 Nişana silt'an Êzdî xerqe bû r̂û yî e'rda dihiştin.*

**S. 30** *1 Li pê seferê kirbû feqîre,*
*2 Hincîyê li nefsa xwe bike êxsire,*
*3 Ji pişt diçe pêş dindara mîre.*

**S. 31** *1 Silt'an şêx Adî nasbû li ĥemû e'rde,*
*2 Henjî bi gotina P'adşê xwe xeberde,*
*3 Meriyê melek bi serde.*

**S. 32** *1 Ewan r̂êya melek dabû sere,*
*2 Mala Adiya. xerqa şêx Adî bêtin behwere[279],*
*3 Mala Adiya, xerqa şêx Adî, ola me her û here.*

**S. 33** *1 Çî coyeke r̂ast meydane,*
*2 Ez bejme we gelî birane,*
*3 Amaneta[280] li we dikim, mala şêx Mendê Fexrane.*

**S. 34** *1 Hun werin bik'irin qumaşî,*
*2 Li pey nezana nedin serkaşî*
*3 Da r̂oja axretê kul û k'iryare we nece belaşî.*

**S. 35** *1 Rast bajon deriya bikin xilmetê,*
*2 Bikin p'erweste, bikin ibadetê[281],*
*3 Da şêx Adî mas û berat'an bide Ezdiyen Şerqê,*
*Şame, hazir û guhdaran ji xezîna qudretê.*

**S. 35** *1 Xitmê nevî ya dihatin du birîn,*
*2 Ĥemûşka dêm dijmirîn,*

---

[277] *sive*
[278] *siveye*
[279] binêr: *bawer*
[280] *emanet*
[281] *ebadet*

*3 Ser xitmê vî qewlî seyîdim Mirsilî[n].*

**S. 36** *1 Ji qewlê şêx Mendê Ferxane,*
*2 R̂aste mala mera îmane.*

*Em kemin, Xwedê t'emame!*

## 10. QEWLÊ NASIRDÎN[282] — QEWLÊ ÎMANÊ[283] (şaxê – 3)

**S. 1** *1 Îmane, bi çî nîşane,*
*2 Ji berê ne e'rd hebû, ne binyane,*
*3 Ne ĉiye hebû, ne sikane.*

**S. 1** *1 Îmane, bi çî nîşane,*
*2 Wekî ne e'rd hebû, ne e'zmane,*
*3 Ne beĥr hebû, ne binyane,*
*4 Ne ĉiye hebû, ne sikane.*

**S. 2** *1 Rê hebû — me'rîfet,*
*2 Îman hebû — t'erîqet,*
*3 Ewê r̂ojê kaniya Sipî bo mêra dikir qublet.*

**S. 2** *1 Rê hebû — t'erîqete,*
*2 Erk'an hebû — me'rîfete,*
*3 Wê r̂ojê silt'an Êzî kaniya Sipî bo mêra kir qublete.*

**S. 3** *1 Ewê r̂ojê kaniya Sipî dikire qubleta mêrane,*
*2 Û ji berî e'rd û e'zmane,*
*3 Çendî medha jê didem nîşane.*

**S. 3** *1 Ewê r̂ojê silt'an Êzî kaniya Spî kire qubleta mêrane,*
*2 Berî e'rd û e'zmana, berî beĥr û binyana, berî ĉiye û sikana,*
*3 Ya silt'an Êzî çendî ji te diden medih û nîşane.*

**S. 4** *1 Çendi medha jê dideme,*
*2 Ji berî Lewĥ û Qeleme,*
*3 Ji berî Hawa û Ademe,*
*4 Ya silt'an Êzî, ji berî hingî bi not ĥezar salî ezî li bo[284] teme.*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, çendî medhe ji te didame,*
*2 Berî E'rş û sema,*
*3 Berî Lewĥ[285] û Qelema,*
*4 Berî Hawe û Adema,*
*5 Berî Îsa û Miryema,*
*6 Ya R̂ebî, berî not ĥezar sal ez li ba te me.*

**S. 5** *1 Ya silt'an Êzî, ji berî hingî bi not ĥezar salî ezî li wê bûm,*
*2 Ez ne yî ji bab bûm, ne yî ji dê bûm,*
*3 Ez dayîm li ber k'erema mewlê bûm.*

**S. 5** *1 Ya silt'an Êzî, berî not ĥezar sal ez li wê bûm,*
*2 Ne ji babê bûm, ne ji dê bûm,*
*3 Li ber xilmeta mewlê bûm.*

**S. 6** *1 Ez birime ber k'eremeta wî îlaĥî,*
*2 Daname ber destê wî hostayî,*
*3 Yê ji mi r̂a kirî xweşî û şahî.*

**S. 6** *1 Dibirime ber k'eremeta wî mewla yî,*

---

[282] [2] (rr. 179–184)
[283] [1] (pp. 83-89); [2] (rr. 171–178)
[284] *liba*
[285] *loh*

*2 Didame destê wî hosta yî,*
*3 Ji me r̂a çêdikir xweşî û şa yî.*

**S. 7** *1 Yê xweşî û şayî ji min r̂a kirî,*
*2 Te ez birime ser t'erîqeta melikê faxrî,*
*3 Hingî min zanî tu Xidirî, yî bi Xidirî.*
**S. 7** *1 Xweşî û şahî ji me r̂a çêdikirî,*
*2 Dibirime ser t'erîqeta melikê faxrî,*
*3 Xidiro, bin Xidirî.*

**S. 8** *1 Hey Xidiro, yî Xidir,*
*2 Te k'asek da min buk'ir,*
*3 Min vexwar bi navû dik'ir.*
**S. 8** *1 Hey Xidiro, bin Xidir,*
*2 Te k'asek da min buk'ir,*
*3 Min vexwar bi nav dik'ir,*
*4 Dibirime ser ilmekî faxir.*

**S. 9** *1 Te k'asek ji min r̂a anî,*
*2 Min vexwar weke te dizanî,*
*3 Te ez birime ser ilmê Qat'anî.*
**S. 9** *1 Te k'asek ji min r̂a anî,*
*2 Min vexwarî weke tu[286] dizanî,*
*3 Ez dibirime ser ilmê Qat'anî.*

**S. 10** *1 Qat'anî we dihbê[287] me,*
*2 Bi me'rîfet û erk'anê yî çê me,*
*3 Da bideyn medhêt e'zîz melik Fexredîn divême.*
**S. 10** *1 Ji Qat'aniyê dihbê me,*
*2 Ol, û erk'an, me'rîfeta bi r̂ê me,*
*3 Medhêt e'zîz melik Fexredîn divême.*

**S. 11** *1 Da bideyn medhêt e'zîz melik Şerfedîne,*
*2 K'engî dê ji min r̂a êtin[288] mizgîne,*
*3 Ewî r̂ojê, dê derk'evit xîveta t'eref zêr̂îne.*
**S. 11** *1 Da bideyn medhêt e'zîz Şerfedîne,*
*2 Wê k'engê bo me êt mizgîne,*
*3 Dê derk'evit xîveta[289] t'eref zêr̂îne.*

**S. 12** *1 Ewê r̂ojê xîveta t'eref zêr̂în dê derk'evî,*
*2 Ewê r̂ojê dinya dê lêk k'evî,*
*3 Ewê r̂ojê sinetxane dê li xwe şik k'evî.*
**S. 12** *1 Xîveta t'eref zêr̂în dê derkevî,*
*2 Ev dinya dê lêk k'evî,*
*3 Sinetxane dê li xwe[290] bi şik k'evî.*

**S. 13** *1 Ewê r̂ojê sinet li bo dêmînit bi şike,*
*2 Û kesekî ber benda Xaliqe,*
*3 Qesta damana xerqê şêx Adî bike.*
**S. 13** *1 Sinetxane dê li xwe bibe şike,*
*2 Hincî kesê bendeyê Xaliqe,*
*3 Wê qesta damana silt'an şêx Adî bike.*

---

[286] *tû*
[287] binêr: *dibêjit*
[288] binêr: *bêtin*
[289] *ẍeybet*
[290] *xo*

**S. 14** *1 Şêx Adî bi xwe îmanê,*
*2 Çî beĥreke girane,*
*3 Xewasa dur̂ jê înane.*

**S. 14** *1 Silt'an şêx Adî bi xwe îmane,*
*2 Beĥra wî beĥreke girane,*
*3 Xewasa dur̂*[291] *jê înane.*

**S. 15** *1 Xewasa jê înabû dur̂e,*
*2 Kesekî di ber P'adşê xwe bi hevsur̂e*[292]*,*
*3 Dê ji wê beĥrê derînin dur̂e.*

**S. 15** *1 Xewasa jê înabûn dur̂e,*
*2 Hincî kesê bi P'adşayê xwe r̂a hevsur̂e,*
*3 Ewî ji beĥra der anîbû dur̂e.*

**S. 16** *1 Dur̂ ji wê beĥrê der înin,*
*2 Û silt'an Êzî li ser k'efa xwe danîn,*
*3 Jê çêkirin t'anc, û hile, û xerqêt nûranî.*

**S. 16** *1 Silt'an Êzî dur̂ ji beĥra der anîn,*
*2 Şêx Adî li ser k'efa deste xwe danîn,*
*3 Je çêkir t'ac û hile*[293]*, xerqê r̂eşî nûranî,*
*4 Dibirin ser xwe r̂a danîn.*

**S. 17** *1 P'adşayê min erk'an kirî jore,*
*2 Xerqe kirî more,*
*3 Dereca xerqe wa li jore,*
*4 Berk' kir*[294] *silt'an Êzîdê minî Sore.*

**S. 18** *1 Şêx Adî wê bê bi erk'ane,*
*2 Kirî li jorê, xerqe anî kirî more,*
*3 Xerqe libasê silt'an Êzîdê minî Sore.*

**S. 19** *1 Silt'an Êzîdê min xerqe li berk' kir,*
*2 T'acekî r̂eşî qudretî nûranî li ser kir,*
*3 Feqîra li pê sefer kir.*

**S. 20** *1 Li pê sefer kirî feqîra,*
*2 Hincîyê li nefsa xwe biket êqsîre,*
*3 Bêşik dêçite pêş dîndara mîre.*

**S. 21** *1 Ji wê têne xware,*
*2 Li ber sekinî herçar yare,*
*3 Me di damana xerqê şêx Adî hebit p'are.*

**S. 17** *1 Ji bana hatibû r̂edaye,*
*2 Şêxê Ĥesenî Mistefaye*[295]*,*
*3 Silt'an Êzî li ĥemû derda yî mifaye*[296]*.*

**S. 22** *1 Ji banî hatî r̂edaye,*
*2 Şêxê Ĥesenî Mistefaye,*
*3 Belê, P'adşê min silt'an şêx Adî li ĥemû derda yî mifaye.*

**S. 18** *1 Ya silt'an Êzî, mifadê te wê li hamû derda,*
*2 Me ji k'ilîma te xeber da,*
*3 R̂êya melika dabû bi serda.*

---

[291] *dur*
[292] binêr: *hevsar*
[293] *çile*
[294] *berkir*
[295] *Mustefa*
[296] binêr: *mifade*

**S. 23** *1 P'adşayê min silt'an şêx Adî mifa[de] bû li ĥemû derda,*
*2 Hincîyê bi k'ilîma P'adşayî xeber da,*
*3 Ewan r̂êya meleka bi serda.*

**S. 19** *1 R̂êya melika dabû bi sere,*
*2 Hincîyê bi ol û erk'anêt şêx Adî bêtin bawere,*
*3 Mala Adiya t'erîqeta her û here.*
**S. 24** *1 R̂êya meleka, me dabû sere,*
*2 Hincîyê bi ol û erk'ana xerqê şêx Adî bêtin bawere,*
*3 Mala Adiya t'erîqeta me, her û here.*

**S. 20** *1 Ne bêjin mala Adiya çî ye,*
*2 Hey koro, te ĉav sipî ye,*
*3 Te hay ji manîya[297] xerqê şêx Adî nî ye,*
*4 Çima dibêjî xerqê şêx Adî çengek zergûze[298] û lepek hirîye!*
**S. 25** *1 Mebên mala Adiya k'î ye,*
*2 Hey koro ĉav sipî ye,*
*3 Te haj manîyê xerqê şêx Adî nîye[299],*
*4 Cema'[300] dibêjî: hindek zergûz û lepek hirîye[301]?*

**S. 26** *1 Hey koro, ĉav sipîye,*
*2 Tû nizanî manîya xerqê şêx Adî çîye,*
*3 Dibêjin manîya xerqê şêx Adî çengek zergûz, lepek hirîye.*

**S. 21** *1 Hey koro, zergûz more,*
*2 Dereca xerqê şêx Adî wa li jore,*
*3 Dua' li wî lib[ɑ]sî, ya silt'an Êzîdê minî Sore.*
**S. 27** *1 Hey koro, yî kore,*
*2 Xerqe hirîye, zergûz more,*
*3 Dereca xerqê şêx Adî wa li jore,*
*4 Xerqe libasê Êzîdê minî Sore.*

**S. 22** *1 Çî erk'anekî qewîye,*
*2 Dahir[302] bû li nav wan welîye,*
*3 Ew erk'ana şêxê Adîye[303].*
**S. 28** *1 Ewe erk'ana qewîye,*
*2 Dahir bûn di nêv ewlîye,*
*3 Ewe erk'ana şêxê minî Adîye.*

**S. 23** *1 Çî erk'anekî cîde,*
*2 Dahir buwe li nav wan mirîda,*
*3 Ew erk'ana silt'an Êzîde.*
**S. 29** *1 Ewe erk'ana cîde,*
*2 Dahir bû di nêv mirîda,*
*3 Ewe erk'ana silt'an Êzîde.*

**S. 24** *1 Çî erk'anekî mezine,*
*2 Dahir buwe li nav wan momine,*
*3 Ew erk'ana melik şêx Sine.*
**S. 30** *1 Çî erk'ana mezine,*
*2 Dahir bû nav momine,*

[297] binêr: *me'nî*
[298] *zergur*
[299] *niye*
[300] *cima*
[301] *hiriye*
[302] *hir*
[303] *Edî*

*3 Ewe erk'ana melik şêx Sine*[304].

**S. 25** *1 Çî erk'anekî buk'ir,*
*2 Û li dinê buwe dik'ir,*
*3 Ew erk'ana şêxû Bek'ir.*

**S. 31** *1 Ewe erk'ana buk'ir,*
*2 Li dinyayê bûye navû dik'ir,*
*3 Ewe erk'ana şêxû Bek'ir.*

**S. 26** *1 Çî erk'anekî nûrîne,*
*2 Û dahir li nav wan zergûne,*
*3 Ew erk'ane Şemsedîn û melik Fexredîne.*

**S. 32** *1 Ewe erk'ana nûrîne,*
*2 Dahir bû di nav zergûne,*
*3 Ewe erk'ana melik Fexredîne*[305].

**S. 33** *1 Ewe erk'ana bi hinere,*
*2 Dahir bû di nêv babzere,*
*3 Ewe erk'ana şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 27** *1 Hun xerqa binin,*
*2 Û erk'anê li ser deynin,*
*3 Û hun bi feqîra r̂a bişînin,*
*4 Feqîr sere xwe pê bi hilînin.*

**S. 34** *1 Hûn xerqe yî bînin,*
*2 Erk'an li ser deynin,*
*3 Ji feqîra r̂a bişînin,*
*4 Da feqîr bi serê xwe hilînin.*

**S. 28** *1 Mala Adiya şehde ye,*
*2 Û kaniya Sipî kire qulbe ye*[306],
*3 Cinsê me yî ji axê ye.*

**S. 35** *1 Feqîra hilanî xerqe ye,*
*2 Mala Adîye şehde ye,*
*3 Cesedê me ji axê ye,*
*4 Kaniye Sipî quble ye.*

**S. 36** *1 Dîwarek danî cesne,*
*2 E'sas havête ji besne,*
*3 E'zîzê min ji vê dine kesî hoy ji kesî nine.*

**S. 29** *1 Çî dîwarek çêbû bi nijîne*[307],
*2 Heke e'sasa te ji bine,*
*3 Ji ew paş, p'êl û mewcêt giran ji ber naçine.*

**S. 37** *1 Dîwarek jê bi nijine,*
*2 E'sas havêtê ji bine,*
*3 Her gêl û me jî yê giran*[308], *zên û zêde bibine.*

**S. 30** *1 Heke e'sasa te ne ji binyane,*
*2 Li ber diçin p'êl û mewcêt girane,*
*3 Xwedan li axretê ji ber yî sefîle, yî sergeȓdane.*

**S. 38** *1 Dîwarê ne ji binyane,*
*2 Bi serda tên mewc û p'êlêt girane,*
*3 Li r̂oja axretê xwedan li berî sefîlî sergeȓdane.*

---

[304] *Şêx Sin*
[305] *Ewe erk'ana Şêşims û melik Fexredîne*
[306] binêr: *qible*
[307] *nejin*
[308] binêr: *Her p'êl û mewcêt giran*

**S. 31** *1 Çî coyekî buk'ir,*
*2 Û li dinê bûye dik'ir,*
*3 E'silê coyî sikir.*

**S. 39** *1 Hostayê minî buk'ir,*
*2 Li dinyayê bûye nav dik'ir,*
*3 E'silê coyê heye sikir.*

**S. 32** *1 Çî coyeke r̂ast meydane,*
*2 Dibêjî me we gelî birane,*
*3 Amanetê[309] we dikem şêx Mendê Fexrane.*

**S. 40** *1 Coyeke û r̂ast meydane,*
*2 Bêjme we ji xwedane,*
*3 Amaneta we li gel mala şêx Mandê Fexrane.*

**S. 41** *1 Hûn bipirsin ev r̂oj babek,*
*2 Ev dinya se'at û gavek,*
*3 Mala Adiya ĥemû navek.*

**S. 33** *1 Hun birayîêt min werin,*
*2 Û sur̂êt mixfî[310] dahir kirin,*
*3 Muşterîyê qumaşî werin.*

**S. 42** *1 Mala Adiya hûn werin,*
*2 Sur̂êt mixfî dahir kirin,*
*3 Muşterîyêt qumaşî hûn werin.*

**S. 34** *1 Werin muşterîêt qumaşî,*
*2 Û nezanî nedene serk'aşî,*
*3 Da ĥemû e'melêt we neçine dîwana silt'an Êzî bi belaşî.*

**S. 43** *1 Hûn werin muşterîyêt vî qumaşî,*
*2 Pê nezane, hûn nedin ser kaşî,*
*3 Da r̂oja axretê kul û e'melê we neçit belaşî.*

**S. 44** *1 Bêjme we xwedanêt maşa,*
*2 Pê nezane nedine serkaşa,*
*3 Da r̂oja axretê kul û e'melê we neçit belaşe.*

**S. 45** *1 R̂ast bajone qap'iyê,*
*2 Bi r̂astî r̂êya Xwedê bigrin,*
*3 Bikin xilmetê, bik'êşin ibadetê[311],*
*4 Şêx Adî maş û berat'e bide êzdîyê Şerqê û Şamê, hazir û guhdêra ji xizîna qudretê.*

*T'emametîye vî qewlî ji xwedanî!*
*Em di kêmin, Xwedêyî t'emame!*
*R̂eĥme li dayî û babêt guhdara[312]!*
*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî di t'emamin!*

## 11. QEWLÊ DUR̂A[313]

**S. 1** *1 Êzdanê min wê ji enzelê zemana,*

[309] *êmanet*
[310] *muxfî*
[311] *ebadet*
[312] *gohdar*
[313] *Laliş* № 36, 2012 (rr. 60–63) Belevkirin: E'dnan Xêravaî. https://ru.calameo.com/books/00251831720d66ffd52cf

*2 Xwedîyê ĥemû dem û hêwana,*
*3 Xaliqê çendî duȓ û cana,*
*4 Li nav e'zmana heye zor duȓe û mek'ana.*

**S. 2** *1 Li nav e'zmana heye zor duȓe û e'rde,*
*2 Melik Fexredîn ji we xeber de,*
*3 Ilm got û qafî bi ser de.*

**S. 3** *1 Ilm got û bi ser de qafe,*
*2 Li nav e'zmana heye zave,*
*3 Zor ax, û ber, û xunave.*

**S. 4** *1 Zor ax, û ber, û duȓe,*
*2 Bi qudreta Êzdanê bi suȓe,*
*3 Her duȓekê navek li sere.*

**S. 5** *1 Her duȓek li ser nîşana,*
*2 Zor gewhar û mercana,*
*3 Li ba Xwedê ĥemû e'yana.*

**S. 6** *1 Li ba Xwedê e'yane bi zara,*
*2 Bi nav, û nîşan, û misqala,*
*3 Duȓa zer agire, û agir dibara.*

**S. 7** *1 Duȓa zer agirê sore,*
*2 Cî girt li e'zmanê jore,*
*3 Şewq avête duȓ, duȓê li dore.*

**S. 8** *1 Duȓa zer bi seransere,*
*2 Dixumxume beĥrê agire,*
*3 Şev û ȓoj navemire,*
*4 Bi dewran-dewran here hile.*

**S. 9** *1 Dewran-dewran dihilêtin,*
*2 Bîna agirî ji wê têtin,*
*3 Duȓa zer agir û p'êtin.*

**S. 10** *1 Duȓa zer ji qudretê mekinî,*
*2 Li e'zmanî duȓê cî girt û sekinî,*
*3 Duȓa sor û sipî li duȓê dibezinî,*
*4 Sal bi sal beĥrê bi av û ĥesinî.*

**S. 11** *1 Sal bi salû seransere ,*
*2 Duȓa zer nûre li bere,*
*3 Ya sipî e'mbar dike û digêȓe,*
*4 Şevê tarî dikem zelêle.*

**S. 12** *1 Şevê tarî diken ȓonahîye,*
*2 Duȓa sipî jî wa digeȓîye,*
*3 New jî li duȓê ya sor bi mehîye.*

**S. 13** *1 Duȓa sor wa li hewaye,*
*2 Bi qudreta Xwedê ȓawestaye,*
*3 Ya bi av, û ax, û ber, û baye.*

**S. 14** *1 Duȓa sor bi seransere,*
*2 Heriya bi geȓe û girovere,*
*3 T'ijî av, û ax, û agir, û bere.*

**S. 15** *1 Av û ax, û agir, û ber, li ser sekinî,*
*2 Li nav axê berê nasinî*[314]*,*
*3 Li nav beȓrê beȓra bayî mekinî.*

**S. 16** *1 Beȓra bitir li nav beȓra ave,*
*2 Jor mexlûq tê hene bi nave,*
*3 Bi qudreta Xwedê r̂uĥ diberde t'ebave.*

**S. 17** *1 Bi qudreta Êzdanê enzelîye,*
*2 Wa li e'zmana jor beȓrê dîye,*
*3 Li wan cemede ji e'wil ĥeta bi dawîye.*

**S. 18** *1 Ji e'wil ĥeta bi axir tarîye,*
*2 Wa li e'zmana jor ax, û av, û ber dîye,*
*3 T'uxmê nebat li wêne diîsîye.*

**S. 19** *1 T'uxmê nebat ne diîsî bi êksere*[315]*,*
*2 Li nov e'zmana heye zor ax, û av, û bere,*
*3 Li wêne bû t'uxmê ĥeywan û beşere.*

**S. 20** *1 Li wêne bû bi yek care,*
*2 Dur̂a sor ye maldare,*
*3 Av, û ax, û bayî, û agir di spare.*

**S. 21** *1 Av û ax, û bayî û agire.*
*2 Dur̂a sor ya bi xerze ji bak'ire,*
*3 Çendî muxliq pê bi xatire.*

**S. 22** *1 Çendî muxliq pê xinê bûn,*
*2 Dur̂a sor ji enzelî demê bûn,*
*3 Û çendî dur̂ li dine bûn,*
*4 Ĥemû bi qudreta Xwedê bûn.*

*T'emametiya vî qevlî li navê Xwedê yê her û her hebûyî!*
*Em di kêmin, û Xwedê t'emame!*

## 12. QEWLÊ SUR̂A[316]

**S. 1** *1 Ew bû sur̂a ji pêş.*
*2 CayIze em li wê sur̂ê biken t'eftêş.*
*3 Da li pê we xilet nebe cêş.*

**S. 2** *1 Ew sur̂a bi xêr,*
*2 Cayîze em li wê sur̂ê biken îstexbêr,*
*3 Ewê sur̂ê ez kirim cuwanmêr*[317]*.*

**S. 3** *1 Ew sur̂a li min dike leze,*
*2 Wê sur̂ê Elî hinarte ẍeze,*
*3 Li pê wê sur̂ê diçim eze.*

**S.4** *1 Ew sur̂ min dilezîne,*
*2 Ew sur̂ min bi xasa r̂a digehîne,*

[314] *yasinî*
[315] binêr: *yekser*
[316] [2] (pp 247–251)
[317] *ciwamêr*

*3 Ew suȓ dê min dorîne.*

**S. 5** *1 Ew suȓ li ber dore astenge,*
*2 Li ber wê suȓê hiltê mange,*
*3 A'lem bi navê wê suȓê bange.*

**S. 6** *1 Seyîdî Nesîm xwe bi wê suȓê didorande,*
*2 Ĥusêyînî*[318] *Ĥelac sere xwe li ȓêya silt'an Êzî ȓecamande.*

**S. 7** *1 K'î dibêje ew suȓ derewe?*
*2 Bi wê suȓê ȓon bûn ȓoj û şeve,*
*3 Wê suȓê p'êk şîrin kirin Adem û Hawa.*

**S. 8** *1 Ew ẍafilêt xafe*[319]*,*
*2 Li wan Sipî bin herdu ĉave,*
*3 Ẍafil di korene, nizanin ewê suȓê Hawa kire bûk, Adem zava.*

**S. 9** *1 Şirotîya wê suȓê heye,*
*2 Bi ĥeqî her eveye,*
*3 Bi şira ne ĥewceye*

**S. 10** *1 Bi wê suȓê têtin barane,*
*2 Bi wê suȓê şîn dibit dare,*
*3 Bi wê suȓê dik'amile çendî behare.*

**S. 11** *1 Ewê suȓê xweş kirin dem û ĥeywan,*
*2 Ew e'ynatek da dîwan,*
*3 Şerab ço kirin ji mêwan,*
*4 Xelqê vexwar, pê dibûne ĥeyran.*

**S. 12** *1 Ewê suȓê got û me jê xeber da,*
*2 Ewê suȓê çar k'itêb nazil kirine e'rda,*
*3 Ew suȓ mifade*[320] *li ser cîqas derda.*

**S. 13** *1 Ew bû suȓa K'ibîr,*
*2 Cayîze em li wê suȓê bibin xebîr,*
*3 Wê suȓê çar k'itêb nazil kirine e'rda,*
*4 T'ewrat, Misĥef, Zembûr, Încîl.*

**S. 14** *1 Ew bû suȓa ji pêş,*
*2 Cayîze em li wê suȓê biken t'eftêş*
*3 Ewê suȓê, mîr Birahîm ji Xoȓistanê îna Lalişê, kire derwêş*
*4 Wî t'erik dan jin, û mal, û mêş.*

**S. 15** *1 Zor bi wê suȓê digehiştin,*
*2 Dilê wan ji mêl û muĥbeta silt'an şêx Adî dip'eristin,*
*3 Ew çon, jin û mal di dews da hiştin.*

**S. 16** *1 Zora ew suȓ xeyale*[321]*,*
*2 Zora t'erk kirin male,*
*3 Ew çûn û axret kirin xeyale.*

**S. 17** *1 Ora male xwe t'erk kirin,*
*2 Hûn ȓêya şêx Adî çak bikin,*
*3 Da hûn bi silametî ȓabûhirin.*

---

[318] *Ĥisên*
[319] binêr: *xav*
[320] *mife'et*
[321] *xîyale*

**S. 18** *1 Ew suȓa p'iȓ t'emene,*
*2 Cayîze em ser û male xwe lê bidene,*
*3 Ewê suȓê bi gawira*[322] *şêrîn kirin seneme.*

**S. 19** *1 Ew suȓa p'iȓ ĥesabe,*
*2 Ewê suȓê navdar kirin Mekke û K'abe,*
*3 Wê suȓê p'êk şêrîn dikirin pis û baba.*

**S. 20** *1 Zora li wê suȓê dikir pise,*
*2 Ewê suȓê şerîf*[323] *kirin Mekke û K'abe,*
*3 Ewê suȓê p'êk şêrîn dikirin bab û pise.*

**S. 21** *1 Ew suȓa jîr nedere,*
*2 Ewê suȓê e'ynatek da Avdelê Omere,*
*3 Ewê suȓê şemewin xulqand ji bere.*

**S. 22** *1 Ew bû suȓa bi xêr,*
*2 Cayîze em li wê suȓê biken îstexbêr,*
*3 Wê suȓê nefesêt birsî*[324] *kirine t'êr.*

**S. 23** *1 Ewê suȓê t'êr kirin nefesêt birsî,*
*2 Zora li wê suȓê dipirsî,*
*3 Qesit kirne beĥra, bi telbe ya nebîy Unisî*[325]*.*

**S. 24** *1 Ew suȓa buk'ir*[326]*,*
*2 Ewê suȓê şefeqet*[327] *li zora dikir,*
*3 Ewê suȓê şêx Zêndîn ji Lalişê hinarte Misir.*

**S. 25** *1 Aşiqo, yî felek,*
*2 Min zor dîtin gelek,*
*3 Ev nezanî me şandiye wegarandiye merk'eb û k'elek.*

**S. 26** *1 Aşiq deng diket bi nehîne,*
*2 Xasa pê hatî bawerî ûyeqîne*[328]*,*
*3 Ẍafil*[329] *di korene û beĥr tê nine.*

*Em kêmin, û şêx Adî ťemame!*

## 13. QEWLÊ K'ASA[330]

**S. 1** *1 Ji qewlê mewlê me,*
*2 Heȓe destûrê bide ẍulême,*
*3 Ez*[331] *medhê k'asa divême.*

**S. 2** *1 Ev*[332] *bû k'asa ji muĥbetê,*
*2 Hincîyê P'adşayê min nuqtekî*[333] *ji wê k'asê didetê,*

322 binêr: *k'afir*
323 *şirîf*
324 binêr: *birçî*
325 *Onis*
326 *bûkir*
327 *şefqet*
328 *êqîn*
329 *xafil*
330 [2] *Qewlê mewlê me* (rr. 945–952)
331 *em*
332 *ew*
333 *nuxte*

*3 Sed xwezke min bi wê be, bi wê suhbetê.*

**S. 3** *1 Ew bû k'asa baqî,*
*2 P'adşayê min di navda bû saqî,*
*3 Dilo, tu çendî muşt'aqî!*

**S. 4** *1 Dilo, tu çendî k'eserî,*
*2 Hincîyê nuqtekê ji vê k'asê vedixwerî,*
*3 Şikraniya wê k'asê mabû li serî.*

**S. 5** *1 Ji berî ne kirbû tu nijîyare,*
*2 Qalbê Adem p'êẍember ne kirbû dehare,*
*3 Mêra ji muĥbetê nedera wê k'asê vedixware.*

**S. 6** *1 Qalbê Adem p'êẍember nijî,*
*2 Nûra muĥbetê hat û tê diqendilî,*
*3 R̂uĥ hat û tê wetinî.*

**S.7** *1 Li wê k'asê dayê mersumê r̂edayê,*
*2 R̂uĥ hat û gehayê.*

**S. 8** *1 Ew k'asa nûrîne,*
*2 Adem p'êẍember ji dil, û eşq, û yeqîne*[334]*,*
*3 Lew cinsetê wî ger̂iya bû goşt û xûne.*

**S. 9** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixwar û vedijîya,*
*2 Mest bû, dihejîya,*
*3 Goşt lê hur̂î, xûn lê diger̂îya.*

**S. 10** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta*[335] *wê k'asê dihate dîyare,*
*3 Lew Adem bêhinijî, pê dibû siware.*

**S. 11** *1 Ew k'as bi Adem p'êẍember xweş tê,*
*2 K'eremeta wê k'asê hat û digehiştê,*
*3 Ewê k'asê Adem bire bihuştê.*

**S. 12** *1 Şehîd p'êẍember ji wê k'asê dibeste,*
*2 Wî ne p'ê hebû, ne deste,*
*3 Silt'an Êzî r̂onayêk di ber wî jî dixiste.*

**S. 13** *1 Şehîd p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate dîyare,*
*3 Lew harîya bin ĥena bora dihinare.*

**S. 14** *1 Çî horîyeke çê ye,*
*2 Bi k'eremeta wê k'asê Ĥeşem û Qurêş jê ye.*

**S. 15** *1 Ew bû ĥerfa ji pêş,*
*2 Cayîze em li wê ĥerfê biken t'eftêş,*
*3 Ewê ĥerfê ji hev kirin Ĥeşem û Qurêş.*

**S. 16** *1 Ĥeşem û Qurêş ji hev dikire,*
*2 Qal û qîl çêdikire,*
*3 Silt'an Êzî bi şîrê ĥeqîyê ji hev dikire.*

---
[334] *êqîn*
[335] *keramet*

**S. 17** *1 Ew k'as da nebîy Nuĥ,*
*2 K'eremeta wê k'asê lê dibû suĥ,*
*3 Ewî ji ava t'ofenê xilas dikirin gelek r̂uĥ.*

**S. 18** *1 Ew k'as da Birahîme,*
*2 Malê wî, malekî zorî, zavî, e'zîme,*
*3 Da bi r̂êya êkî K'erîme.*

**S. 19** *1 Da r̂êya êkî Celîl,*
*2 Nuqitek nazil bû ji qendîl,*
*3 Nav lê dane Birahîm Xelîl.*

**S. 20** *1 Birahîm Xelîl ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate bale,*
*3 Lew li wan sarbû nare.*

**S. 21** *1 Bi qudreta R̂eĥmane,*
*2 Nebîy Simaîl vexwarî ji k'asa girane,*
*3 Lew qudreta wî nazilî bû berane.*

**S. 22** *1 Ew k'as da Dawide,*
*2 K'eremeta wê k'asê we dîte,*
*3 Lew li dest nerm dibû ĥedîde.*

**S. 23** *1 K'eremeta wê k'asê bi Dawid r̂akirî,*
*2 Ne ĥewca yî ibadetan û agirî,*
*3 Bi destê xwe ço dik'irê; xurde, û zirî.*

**S. 24** *1 Ew k'asa K'ibîre,*
*2 Silêman p'êẍember vedixwar, pê dibû mîre,*
*3 Hêcet[336] hebû hem gustîle hengustîle.*

**S. 25** *1 Qudreta R̂eĥmane,*
*2 Silêman p'êẍember vedixwar ji k'asa girane,*
*3 Lew hikm dikir li ins, û cins, û çendî cane.*

**S. 26** *1 Ew k'as ji Mûsa r̂a dihate,*
*2 K'eremeta wê k'asê we der hate,*
*3 Lew ji Mûsa r̂a nazilî[337] T'ewrate.*

**S. 27** *1 Mûsa vedixwarî jê ye,*
*2 Û k'eremeta wê k'asê ye[338],*
*3 Lew Mûsa bû k'ilîmçîyê Xwedê ye.*

**S. 28** *1 Îsa ji wê k'asê vedixwarî,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihat û dihedirî,*
*3 Încîl bora di nazilî.*

**S. 29** *1 Ew k'as da Îsa,*
*2 Vedixwar wî û hindirîse,*
*3 Ji e'rda fir̂î, ço e'zmana dilîse.*

**S. 30** *1 Ûsivê nebîya ji wê k'asê vedixwarî,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate dîyarî,*
*3 Li wan r̂on bûn çar ĉavêt tarî.*

---

336 *ĥêcet*
337 *nizilî*
338 *k'asê*

**S. 31** *1 Da di Aqube, da Zelîxa meĥbube,*
*2 Li wan r̂on bûn ĉav û dil û qilube*[339]*.*

**S. 32** *1 Eyub p'êẍember vedixwarî ji wê xemr̂a yê,*
*2 P'adşayê min sebreke we dida yê,*
*3 Îlaĥîo, tuyî Hadêrî, tuyî Nadirî, tuyî Qadirî,*
*4 Sebrekî bide me, em pê bisebirin,ĥeta ev dev bi goştê gay …*[340]

**S. 33** *1 Ew k'as da Ûnisê r̂eqasî,*
*2 Çil şevî û r̂ojî ma li binê beĥrê zigê masî,*
*3 Ĥeta Xwedê xwe bi ĥaq nasî.*

**S. 34** *1 Ew k'as da bin Mensure*[341]*,*
*2 Xewasî*[342] *li beĥrêt k'ûre,*
*3 Silt'an Êzî yî nêzîke, ne yî dûre.*

**S. 35** *1 Ew k'as da seyîdî Nesîmîye,*
*2 K'eremeta wê k'asê we dîye,*
*3 Wî hayî ji gurîyana sere xwe nîye.*

**S. 36** *1 Seyîdî, maş fere,*
*2 K'afira girwandbû seransere,*
*3 Ji eşqî wê k'asê nalînek jê nedihatin dere.*

**S. 37** *1 Ew k'as da nebîy Zek'erî ye,*
*2 K'eremeta wê k'asê dî ye,*
*3 Wî hayî ji birîna mişarê nî ye.*

**S. 38** *1 Wan bir̂î û kire dualî,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate dîyarî,*
*3 Ji eşqa wê k'asê nalîyekê ne dinalî.*

**S. 39** *1 Wan bir̂î bû gişte,*
*2 K'eremeta wê k'asê hat û digehişte,*
*3 Sed xozike min bi wê r̂uĥê be, Xwedê yî li pişte.*

**S. 40** *1 Birahîmê leg ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate dîyare,*
*3 Ĥeta legê, ser serî firandin ew teyare.*

**S. 41** *1 Çil r̂ojî diruste,*
*2 Wî ne dixwar, ne diniviste,*
*3 Ĥeta legê, teyarî ser serî vediguhiste.*

**S. 42** *1 Çil r̂ojî bi hijmare,*
*2 Wî ne dikir, û ne dixware,*
*3 Ĥeta legê ser serî firandin ew teyare!*

**S. 43** *1 Çil r̂ojî li vê bû,*
*2 Mehekeke xasa lê bû,*
*3 Ĥeta legê teyar li ser serî cihê bû!*

**S. 44** *1 Ew k'as da mîr Birahîmî Ademane,*
*2 Wî vedixwar ji k'asa girane,*
*3 Lew wî t'erk kir Xor̂istane.*

---

339 binêr: *qalb*
340 binêr: *Qewlê ĥezarû yek nava* S. 32.2 *Ĥeta wî derbî, goştê gîyanê min xwarî*
341 *miswur*
342 *ẍewisî*

**S. 45** *1 Wî t'erk kir Xorsa,*
*2 Nedera xwe da xasa,*
*3 Buwe r̂ênasek ji wan r̂ênasa.*

**S. 46** *1 Ew k'as da E'merî bin Xetabe,*
*2 Ewî dikuştin dayî û babe,*
*3 Ne jê r̂a xêre, ne sewabe.*

**S. 47** *1 Elî ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê dihate bale,*
*3 Lew şîrê qet'ilê bora dihinare.*

**S. 48** *1 Bi qudreta Qadirî,*
*2 Elî bi sê xelata xelat kirî,*
*3 Fetme, û Zulfeqar, û Dindilî.*

**S. 49** *1 Ew k'as da Aba Bek'ir,*
*2 Wî vedixwarî ji k'asa bi navû dik'ir,*
*3 Lew nebîy Meĥemed bi sadiqê[343] xwe kir.*

**S. 50** *1 Ew k'as da nebîy Meĥemede,*
*2 Vedixwarî ji k'asa sur̂ û cehde,*
*3 Bûwe p'êẍemberê yekî il-Semede.*

**S. 51** *1 Ew k'as da Êzdîne mîre,*
*2 Li dine û axretêyî xebîre,*
*3 Silt'an Êzî t'eslîm kirin Şems û Fexrêt mîre.*

**S. 52** *1 Ew k'as da Şemsê Êzdîne,*
*2 K'ilît û mifte bi destê wîne,*
*3 Çu girtin û berdan bêyî şêx Şems nîne.*

**S. 53** *1 Ew k'as da şêxû Bek'ir,*
*2 Yî şîrine[344] weke şekir,*
*3 Şêx Adî ew k'erem li gel te kir,*
*4 Lew ciyê te li ba xwe kir.*

**S. 54** *1 Ew k'as da şêx Berk'ate,*
*2 Xelat kirî bi ĥeft xelata,*
*3 Ji e'rda fir̂î ço semawata.*

**S. 55** *1 Ew k'asa cîde,*
*2 Hatîye bo mirîda,*
*3 Ew k'asa silt'an Êzîde!*

## 14. QEWLÊ T'EXTE[345]

**S. 1** *1 P'adşê min t'extê nûrê çêkir,*
*2 P'adşê min mesken çêkir,*
*3 P'adşê min seyîrî û seyîran lê kir.*

**S. 2** *1 T'extê Melikê[346] K'ibîr,*

[343] *sedîq*
[344] *şirîn*
[345] https://ru.calameo.com/read/0025183175daa83339ace
[346] *melek*

*2 T'extê lê dibû ew mîr,*
*3 Ewî alîm, ewî besîr.*

**S. 3** *1 T'extê Melikê Elîf,*
*2 Nûr gehişte herçar t'eref,*
*3 Suȓê daye mang û sedef.*

**S. 4** *1 T'extê Melikê Cebare,*
*2 P'adşayê min tarî û ȓonayî înane xware,*
*3 Xasa pê bestbû fîrware.*

**S. 5** *1 T'extê lê dibû ew silt'an,*
*2 P'adşayê min tarî û ȓonayî dane e'rd û e'zman,*
*3 Xasa pê bestbû îman.*

**S. 6** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yî bi suȓa,*
*2 P'adşayê min xwedanê[347] ilmê[348] p'îȓe,*
*3 P'adşayê min muĥbê melekê ĥuȓe.*

**S. 7** *1 Ew qewlekî bi nîşane,*
*2 P'adşayê min li nav t'extê xwe girtbû mek'ane,*
*3 P'adşayê min muĥbê xwedan îmane.*

**S. 8** *1 P'adşayê min l inav t'extê xwe yekî Ekbere,*
*2 Li ba wî dihatin nûr û nedere,*
*3 P'adşayê minî dahire li ĥemû dera.*

**S. 9** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yê, eĥmere,*
*2 Ji ba wî dihatin nûr û nedere,*
*3 P'adşayê min dizane çi heye li ĥemû dera.*

**S. 10** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yê mixfî bû,*
*2 Li ser zarê ĥemû xasan û nebîyan bû,*
*3 Ĥeca me Zimzim û qubet il-Bidor û koniya Sipî bû.*

**S. 11** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yê amine,*
*2 Melik[349] Fexredîn xadime,*
*3 Ĥeca me k'af, û mixar, û qubet il-Bidor[350], û Zimzime.*

**S. 12** *1 Ew t'extê ji muĥbetê,*
*2 P'adşayê min wê li wê coqetê,*
*3 P'adşayê min wê li wê suĥbetê.*

**S. 13** *1 Çi suĥbeteke baqîye,*
*2 T'extê nûr û şev, Ȓoj û Heyv li ser sekinîye,*
*3 Ĥeca me k'af, û mixar, û Zimzim, û qubet il-Bidor, û koniya Sipîye.*

**S. 14** *1 Suĥbeta her ĥeftane,*
*2 T'extê nûr û şev, ȓoj û heyv li ser destane,*
*3 Şerab il-tiĥûr k'asa wane.*

**S. 15** *1 P'adşaye û her ĥeft melek vê ȓa,*
*2 T'extê nûr, û şev, û ȓoj, û heyv, û stêra,*
*3 P'adşayê min şerab bi xwe digêȓe.*

347 *xudan*
348 *alim*
349 *melek*
350 *qublet bidor*

**S. 16** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe Melik il-E'rşe,*
*2 T'extê nûr, û heyv, û şev, û r̂oj geşe,*
*3 P'adşayê min cî danî Lalişe.*

**S. 17** *1 P'adşayê min r̂oj kirîye geşe,*
*2 T'extê nûr û şev, R̂oj û Heyv pê dibûn geşe,*
*3 P'adşayê min danî berê r̂eşe.*

**S. 18** *1 P'adşaye û her hefr melek vêre,*
*2 E'rşek e'firandibû[351] li jore,*
*3 Mifte Şems û Fexre.*

**S. 19** *1 P'adşayê min û her ĥeft melekên k'afûne,*
*2 E'rşek e'firandibû bê stûne,*
*3 Mifte Şems û Fexrê zergûne.*

**S. 20** *1 E'rd û e'zman bi hev r̂e dêminin,*
*2 T'extê nûr û şev, r̂oj û heyv li ser disekinin,*
*3 Mifte Şems û Fexredînin.*

**S. 21** *1 Dergehên e'zmanan yî zerin,*
*2 Mifte Şems û Fexrin,*
*3 Aşiq berzê şayî û qederin.*

**S. 22** *1 Dergehên e'zmanan yî zêr̂înin,*
*2 Mifte Şems û Fexredînin,*
*3 Aşiq berzê şayî û mizgînin.*

**S. 23** *1 Çend k'êlimêt[352] min digot ji dur̂ê ne,*
*2 Yarên mixfî di hêne,*
*3 Bo min ĥemû [w]a li r̂ê ne.*

**S. 24** *1 Çend k'êlimêt[353] min digot ji teĥiyatin,*
*2 Yarên mixfî hatin,*
*3 Bo min ĥemû xelatin.*

**S. 25** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yî eĥmere,*
*2 Dinya ber fitile, ger̂e,*
*3 R̂engê zêde hatine dere.*

**S. 26** *1 Ev qewlekî bi nîşane,*
*2 P'adşayê min li nav t'extê xwe girtbû mek'ane,*
*3 P'adşayê min muĥbê xwedan îmane.*

**S. 27** *1 P'adşayê min yê xebîre bi vê r̂ayê,*
*2 E'rşek e'firandbû wê dinyayê,*
*3 Cehwer dabû ji beyzayê.*

**S. 28** *1 P'adşayê min yî xebîre bi vê e'nyatê,*
*2 E'rşek e'firandbû r̂u yê qinyatê,*
*3 Cehwer dabû ji beyzayê.*

**S. 29** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe bû ji e'wilî,*
*2 Mûsa û Îsa xemilî,*
*3 P'adşayê min, tu sîqala dila.*

---

[351] *afirandbû*
[352] *kîlîmêt*
[353] *kelîmêt*

**S. 30** *1 P'adşayê min li nav t'extê xwe yî bi k'ereme,*
*2 Berî muxliqane û çend deme,*
*3 Ewî da ademî r̂uh̄ û deme.*

**S. 31** *1 P'adşayê min sîqala dila,*
*2 Dest ji r̂êya xwe me hêla,*
*3 Daneye nivîsîn ji ẍafila*[354].

**S. 32** *1 Daneye nivîsîn ji lenge,*
*2 Yî xebîr be ji h̄emû r̂enge,*
*3 Da zebênî bite nekin cenge.*

**S. 33** *1 P'adşayê min yî buk'ir,*
*2 Li dinê û a'lemê kirye dik'ir,*
*3 Ezîzê min, tu dizanî te çi kir.*

**S. 34** *1 P'adşayê minî buk'rîn bû,*
*2 Li h̄emû e'rdanî, sekinî bû*
*3 Li h̄emû deft'eran serê xitmê bû.*

**S. 35** *1 Ji qewlê şêx Fexrê Adiya,*
*2 P'adşayê min yî Bêrîye,*
*3 Yi dahire li h̄emû cîya.*

**S. 36** *1 Ew qewle, qewlekî bi qiriyare,*
*2 Mifta h̄eftî qewlî bi hijmare,*
*3 Em nînin, û Xwedê yî dehare.*

## 15. QEWLÊ BEĤRA[355; 356; 357; 358; 359]

**S. 1** *1 R̂ojekê ez fikirîm,*
*2 Dama bûm heyrîm,*
*3 Li beh̄rekê k'ûr seyrîm.*

**S. 1** *1 R̂ojekê ez fikirîm,*
*2 Dama bûm h̄eyrîm,*
*3 Li beh̄rekê k'ûr seyrîm.*

**S. 1** *1 R̂ojekê ez fikirîm,*
*2 Dama bûm, h̄eyrîm,*
*3 Li beh̄reke k'ûr seyrîm.*

**S. 1** *1 R̂ojekê difikirîm şevan û r̂oja,*
*2 Damamekê digrim li ber xwe da.*

**S. 1** *1 R̂ojekê difikrîm, şevan û r̂oja,*
*2 Damamekê digrim li ber xwe da.*

**S. 2** *1 Çi beh̄reke k'ûre,*
*2 Sibh̄an ji te melekê dilh̄ur̂e,*
*3 Alîyêd vê beh̄rê bi sae'ta yî dûre.*

**S. 2** *1 Çi beh̄reke k'ûre,*
*2 Sibh̄an ji te Melikê Ẍefûre,*
*3 Terefê vê beh̄rê sextî dûre.*

**S. 2** *1 Çî beh̄reke k'ûre,*

---

[354] *xafil*
[355] [50] *Qewlê beh̄ra* (rr. 190-193)
[356] Laliş 25 2006 *QEWLÊ ÇI SIBEYEKE JI YÎ YÊT TARÎYE* (rr. 191-196); belavekirin: Deştî şêx Zeyîdîn
[357] P'adşa [2] (rr. 222–227)
[358] http://www.ezdixandi.com/forum/38-298-1
[359] http://yeziden.de/285.0.html

*2 Sibĥane ji te Melikê[360] Ẍefûre,*
*3 Serefê vê beĥrê bi sae’ta yî dûre.*

**S. 3** *1 Çi beĥreke xase,*
*2 Ye k’ûre, bê binase,*
*3 R̂ik’ineke û çar e’sase[361].*

**S. 3** *1 Çî beĥreke xase,*
*2 Ya k’ûre, bê qiyase,*
*3 R̂ik’ineke û çar e’sase.*

**S. 5** *1 Çî beĥreke xase,*
*2 Ya k’ûre, bê qiyase,*
*3 R̂ik’ineke û çar e’sase.*

**S. 3** *1 Çi beĥreke qiyase,*
*2 R̂ik’ineke — çar e’sase,*
*3 Çar e’sase — r̂ik’ineke xaliqê xase,*
*4 Xaliqê xasê dîwanê şêx Adî ku zivete libase.*

**S. 3** *1 Çi beĥreke qiyase,*
*2 R̂ik’ineke — çar e’sase,*
*3 Çar e’sase — r̂ik’ineke,*
*4 Xaliqê xasê dîwanê şêx Adî ku zivete libase.*

**S. 4** *1 Çi beĥreke pane,*
*2 Sibĥan ji melekê dilovane,*
*3 Alîyêd vê beĥrê ne dixweyane.*

**S. 4** *1 Çi beĥreke pane,*
*2 Sibĥan ji Melikê R̂eĥmane,*
*3 Terefê vê beĥrê ne dixuyane.*

**S. 3** *1 Çî beĥreke pane,*
*2 Sibĥane ji te Melik il-R̂eĥmane,*
*3 Serefê vê beĥrê ne yî xweyane[362].*

**S. 5** *1 Çi beĥreke k’ûre,*
*2 P’adşa li me dike bexşe û bore,*
*3 Em ji dûr înane dore.*

**S. 5** *1 Çi beĥreke k’ûre,*
*2 P’adşa li me dike bexşe û bore,*
*3 Em ji dûr înane dore.*

**S. 6** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Ĉirakî nûranî diîsîye[363] li bine,*
*3 Çar co je diçine.*

**S. 6** *1 Çî beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke nûranî diîsîyêt li bine,*
*3 Çar coyî jê diçine.*

**S. 4** *1 Çî beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke nûranî diîsîyê li bine,*
*3 Çar co jê diçine.*

**S. 2** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke jî bê bine,*
*3 Çar cewê jê çûne.*

**S. 2** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke je bê bine,*
*3 Çar cewê jê çûne.*

---

[360] *melek*
[361] *esas*
[362] *xoyan*
[363] *diêsiye*

**S. 6** *1 Çî beĥreke ĥede,*
*2 Sibĥane ji te Melik il-Semede,*
*3 Me bi şêxê xwe[364] medete[365].*

**S. 4** *1 Çi beĥreke bê ĥede,*
*2 P'adşê mêra yî Semede[366],*
*3 Medeta şêxê xwe me,*
*4 Zor medhê şêxê xwe dideme.*

**S. 4** *1 Çi beĥrek bê ĥede,*
*2 P'adşê mêra yî semede,*
*3 Medeta şêxê xwe me,*
*4 Zor medhê[367] şêxê xwe didime.*

**S. 7** *1 Çî beĥreke emîqe,*
*2 P'adşê min lê girt şufîqe,*
*3 Ji dûr tîne nizîke.*

**S. 5** *1 Çi beĥreke emîqe,*
*2 P'adşê mêra yî şifîqe,*
*3 Dûr bûm, hatime nêzîke.*

**S. 5** *1 Çi beĥreke emîqe[368],*
*2 P'adşê mêra yî şiblîqe,*
*3 Dûr bûm, hatime nêzîke.*

**S. 7** *1 Em ji dur înane kenare,*
*2 P'êl têne me bi dijware,*
*3 Me bi Xweda haware.*

**S. 7** *1 Em ji dur înane kenare,*
*2 P'êl têne me bi dijware,*
*3 Me bi Xudî xo haware.*

**S. 8** *1 Ji dûr me tîne kenare,*
*2 Mewc[369] têne me dijware,*
*3 Me bi şêxê xwe haware.*

**S. 6** *1 Dûr bûm, hatime kenara,*
*2 P'êl didame du cara.*
*3 Hewara şêxê xwe me,*
*4 Zor medhê şêxê xwe dideme.*

**S. 6** *1 Dûr bûm, hatime kenara,*
*2 Pêl didame du cara,*
*3 Hawara şêxê xwe me,*
*4 Zor medhê şêxê xwe didime.*

**S. 8** *1 Hawar ji Xweda yê xwe me,*
*2 Çendî pesna je didime,*
*3 P'adşê min ewe yî li E'rşe li seme.*

**S. 8** *1 Hawar ji Xudê xo me,*
*2 Çendî medha jê dideme,*
*3 P'adşê min ewe yî li E'rşe li sema.*

**S. 9** *1 Heware şêxê xwe me,*
*2 Çendî medha jê dideme,*
*3 Min li wê dî E'rş û seme.*

**S. 9** *1 P'adşê min li wê E'rş kir,*
*2 Neqaşê çendî neqaş kir,*

[364] *xo*
[365] *meded*
[366] *semend*
[367] *meth*
[368] *emlîq*
[369] *moc*

*3 Du cindîya qubek ferş kir.*

**S. 9** *1 P'adşê min li wê E'rş kir,*
*2 Neqaşê çendî neqiş kir,*
*3 Du cindîya qubek ferş kir.*

**S. 10** *1 P'adşê min li wê E'rş kir,*
*2 Neqaşê çendî neqaş kir,*
*3 Dû cindîya qubet feriş kir.*

**S. 10** *1 P'adşê min E'rş dikir,*
*2 Ferş dikir, nexşê xwe dadanî,*
*3 Neqaşê hûr lê dikir.*

**S. 10** *1 P'adşê min E'rş dikir,*
*2 Ferş dikir, nexşê xwe datanî.*

**S. 10** *1 Du cindîya duȓek digêȓe,*
*2 Hûn nehrîvan bin ji Xwedê ȓe,*
*3 Her zerbeke mala Adiya yanzde ĥezar zerb*[370] *vê ȓe.*

**S. 10** *1 Du cindîya duȓek digêȓa,*
*2 Hûh şehde bin ji Xudê ȓa,*
*3 Her zerbek nav ĥezar zerba hebû vê ȓa.*

**S. 11** *1 Du cindîya duȓek digêȓa,*
*2 Hûh şehde bin ji Xwedê ȓa*[371]*,*
*3 Her zerbeke mala Adiya yanzde ĥezar zerb vê ȓa.*

**S. 11** *1 Du cindîya ȓimek digeȓandin,*
*2 Wan cindîya ȓime digêȓandin,*
*3 Hûn şehde bin boy kenarê Xwedê ȓa*

**S. 11** *1 Du cindîya ȓimek digeȓandin,*
*2 Wan cindîya ȓim digêȓandin,*
*3 Hûn boy kenarê Xwedê ȓa şehde bin.*

**S. 12** *1 P'adşê min zelpek tê da,*
*2 Donzde[h] ĥezar silavet ber vedê da,*
*3 Nav dik'irê silt'an Êzdîdê min dergekî duȓê ȓa.*

**S. 12** *1 P'adşê min zelpek te da,*
*2 Donzdeh ĥezar silavet ber vedida,*
*3 Nav dik'irê silt'an*[372] *Êzdayê min dergekî duȓê ȓa.*

**S. 11** *1 Ez hizirîm li wê ye,*
*2 Dergeke, û sê ȓê ye,*
*3 Du ȓuniştîne, yek her tim diçe û tê ye.*

**S. 11** *1 Ez fikirîm li wê ye,*
*2 Dergheke, û sê ȓê ye,*
*3 Du di ȓuniştîne, êk dayîm diçit û tê ye.*

**S. 16** *1 Fikirîm li wê ye,*
*2 Derge yeke, sê ȓê ye,*
*3 Dayîm yek diçe û tê ye.*

**S. 12** *1 Li ba dilê min bû xweyane*[373]*,*
*2 K'ursîyeke û şeş p'eyane,*
*3 Fitîleke û çar ĉirane.*

**S. 12** *1 Li ba dilê min bû e'yane,*
*2 K'ursîyeke û şeş p'eyane,*

---

[370] *zêr*
[371] *Xudê*
[372] *sultan*
[373] *xuyan*

*3 Fitîleke û çar ĉirane.*

**S. 17** *1 Dergekî e'yane,*
*2 K'ursîyeke bi şeş p'êyîne,*
*3 Qendîleke û çar ĉirane.*

**S. 13** *1 T'imê yekî ji wan yî r̂ûniştîye, du dî jî yê p'îyane,*
*2 Dilê minî ji wan ve e'yane,*
*3 Fitîleke çar ĉirane.*

**S. 13** *1 Tim yekî ji wan yî rûniştîye, du de ji ya p'îyane,*
*2 Dilê minî ji wan ve e'yane,*
*3 Fitîleke çar çirane.*

**S. 13** *1 Herçar ĉira û fitîlek,*
*2 Du menber û qendîlek,*
*3 Heşt dergeh û k'ilîlek.*

**S. 13** *1 Herçar ĉira û fitîlek,*
*2 Du menber û qendîlek,*
*3 Heşt dergeh û k'ilîlek.*

**S. 18** *1 Çar ĉira û fitîlek,*
*2 Dû menber û qendîlek,*
*3 Heşt derge û k'ilîlek.*

**S. 14** *1 Çar ĉirayê fitîlekê,*
*2 Ĥeft dergene k'ilîmekê.*

**S. 14** *1 Çar çirayê fitîlekê,*
*2 Ĥeft dergene k'ilîmekê.*

**S. 15** *1 Yanzdeh xendeqa yî k'ûre,*
*2 Ĥeft tarîne, çar nûrînin.*

**S. 15** *1 Çi bajarekî çar sûre,*
*2 Yanzde xendeka yî k'ûre,*
*3 Ĥeft tarîne, çar nûrîne.*

**S. 14** *1 Min li wê ditbu bajarek,*
*2 Navda hebû darek,*
*3 Li ser sekinîbû siwarek.*

**S. 14** *1 Min li wê ditbu bajarek,*
*2 Navda hebû dîyarek,*
*3 Li ser sekinîbû siwarek.*

**S. 12** *1 Min li wê dî bacarek,*
*2 Navda hebû darek,*
*3 Li ser sekinî siwarek.*

**S. 7** *1 Minê dîye beĥrek,*
*2 Ort'ê da heye dîwarek,*
*3 Ser sekinîbû şêresiwarek.*

**S. 7** *1 Minê dî ye beĥrek,*
*2 Ort'ê de heye dîwarek,*
*3 Ser sekinîbû şêreswarek.*

**S. 15** *1 Li ser sekinî ew mîre,*
*2 Xewle kirin ew feqîre,*
*3 Wê dikin r̂ay û qîre.*

**S. 15** *1 Li ser sekinî ew mîr,*
*2 Ewî xewle kirbûn feqîr,*
*3 Wê diken r̂ay û t'egbîr.*

**S. 13** *1 Li ser sekinî ew mîre,*
*2 Xewle kirin ew feqîra,*
*3 Wê diken r̂aw û t'egbîre.*

**S. 8** *1 Minê dî ye emanek,*

*2 Xewle dibû feqîrek,*
*3 Ew jî dikir r̂ay û tedbîrek.*

**S. 8** *1 Minê dî ye emanek,*
*2 Xewle dî bû feqîrek,*
*3 Ew jî dikir r̂aw û tivdîrek.*

**S. 16** *1 Çi mîrekî mezine,*
*2 Xwedanê yanzde ĥezar qewşine,*
*3 Tîpêt giran ji ber di herine.*

**S. 16** *1 Çi mîrekî mezine,*
*2 Xudanê yazde ĥezar qewşene,*
*3 Telp'ê giran ji ber di herene.*

**S. 14** *1 Çî mîrekî minî mezine,*
*2 Xwedanê*[374] *yanzde ĥezar qewşene,*
*3 Tîpêt giran ji ber diher̂ine.*

**S. 9** *1 P'adşê minî mezine,*
*2 Xwedanê yanzdeh cotên qewşine,*
*3 Nifûsê wan leşkerê giran va diçûne.*

**S. 9** *1 P'adşê minî mezine,*
*2 Xwedanê yanzde cotin qewşine,*
*3 Nifûsê wan leşkerê giran va diçûne.*

**S. 17** *1 Bajareke û çar şûrin,*
*2 Tê heye yanzde xendekêd k'urin,*
*3 Ĥeft di tarîne, çar bi nûrin.*

**S. 15** *1 Bacareke û çar sur̂in*[375]*,*
*2 Tê hene yanzde xendekêt k'ûrin,*
*3 Ĥeft di tarîne, çar bi nûrin.*

**S. 18** *1 Ez hizirim bi nedere,*
*2 Melek şêx Sin sekinîbû*[376] *li ser menbere.*
*3 Wê dixwîne*[377] *herçar deft'ere.*

**S. 17** *1 Ez fikirîm bi nedere,*
*2 Melik şêx Sin sekinîbû*[378]*li ser menbere.*
*3 Wê dixûnitin li çar deft'ere.*

**S. 19** *1 Fikirîm bi nedere,*
*2 Melik şêx Sin sekiniye*[379] *ser menbere,*
*3 Wê dixwîne herçar deft'ere.*

**S. 19** *1 Hûn xwedanê nedera,*
*2 Melik şêx Sin sekiniye ser menbera*[380]*,*
*3 Vedike qewla, dixwîne deft'era.*

**S. 18** *1 Hûn xwedanê nedera,*
*2 Melek şêx Sin sekiniye eşkera,*
*3 Vedike qewla, dixwîne deft'era.*

**S. 19** *1 Qat'anî û menberin,*
*2 P'irtûk û deft'erin,*
*3 Bejneke û çar beşerin.*

**S. 18** *1 Qazî û menberin,*
*2 K'itêb û deft'erin,*
*3 Bejneke û çar beşerin.*

**S. 20** *1 Qat'anî û menberin,*

---

374 *xudan*
375 *şurin*
376 *r̂ûniştbû*
377 *dixûne*
378 *r̂ûniştbû*
379 *r̂uniştîye*
380 *member*

*2 K'itêbin û deft'erin,*
*3 Bejneke û çar beşerin.*

**S. 16** *1 Qadî menberin,*
*2 K'itêbe, deft'erin,*
*3 R̂ik'ineke çar beşerin.*

**S. 16** *1 a. Qadî menberin,*
*1 b. Cindî serwerin,*
*2 K'itêbe, deft'erin,*
*3 R̂ik'ineke çar beşerin.*

**S. 20** *1 Herçar mirov bi r̂ewanekê,*
*2 Herdu tahê sihekê,*
*3 T'eba kirin ji derekê.*

**S. 19** *1 Herçar beşer bi r̂uĥekê,*
*2 Herdu tayîyê sihekê,*
*3 T'eba kirina wan ji derekê.*

**S. 21** *1 Herçar beşer bi loĥk[ê],*
*2 Herdu bi teysek[ê],*
*3 T'eba kirin derek[ê].*

**S. 17** *1 Çar beşerê r̂ik'inekî,*
*2 Du da*[381] *min dîne cîkî,*
*3 Nav dik'irê silt'an Ezdîdê min hildan, avîtine sûkî*[382].

**S. 17** *1 Çar beşerê r̂ik'nekî*[383]*,*
*2 Du da min dîne cîkî,*
*3 Nav dik'irê sil'tan Ezda min hildan, avêtine sûkî.*

**S. 21** *1 Herçar yaret t'ebane,*
*2 Tîpeke li nav wan yanzde tîpane,*
*3 Du di r̂ûniştine, yek ji p'îyane.*

**S. 20** *1 Herçar yare t'ebane,*
*2 Ĥerfeke li nav wan yazde ĥerfane,*
*3 Du di r̂ûniştine, êk ji p'îyane.*

**S. 22** *1 Herçar yarêt t'ebane,*
*2 Ĥerfeke li nav yanzde ĥerfane,*
*3 Du di*[384] *r̂unîştine, dayîm yek ji p'êyane,*
*4 Waĥid li qehar yek ji wane.*

**S. 22** *1 Dema bidin xebera,*
*2 Wê dibêjin qewl, wê dixunin ji deft'era,*
*3 Da hun ji bibin xwedan nedere.*

**S. 21** *1 Seĥte diden xebera,*
*2 Wê dibêjin qewl, wê dixunin ji deft'era,*
*3 Bo xudanêt nedere.*

**S. 23** *1 Sae'ta biden xebera,*
*2 Bêjin qewla, bixunin deft'era,*
*3 Da hûn jî bibin xwedan nedere.*

**S. 23** *1 Dema didin hesêba,*
*2 Wê dibêjin qewl, wê dixunin k'itêba,*
*3 Bo xwedaned e'cêba.*

**S. 22** *1 Seĥta diden hisêbê,*
*2 Wê dibêjin qewl, wê dixunin k'itêbê,*

381 *ta*
382 *sîk*
383 *rukn*
384 *dido*

*3 Bo xwedanet e'cêba.*

**S. 24** *1 Sae'ta biden ĥisêba,*
*2 Bêjin qewlan, bixunin k'itêba,*
*3 Bo xwedan e'cêba.*

**S. 24** *1 Qat'anî çendî wate digotin,*
*2 Dayîke û çar dotin,*
*3 Ew ji batin de hate gotin.*

**S. 23** *1 Qat'anîyê çendî me'nî digotin,*
*2 Dayîke û çar dotin,*
*3 Ew di batin dihatine gotin.*

**S. 25** *1 Qat'anî çend manî yî digotin,*
*2 Dayî yeke[385], çar dotin,*
*3 Ji Yasîn[386] da hate gotin.*

**S. 19** *1 Ĥerfa navê wê Yasîne,*
*2 Yek wan Mekke, yek Medîne,*
*3 Xazil ko mi bizanbiya k'î e'rdîne.*

**S. 25** *1 Batin û me'rifete,*
*2 R̂uniştina wan muĥbete[387],*
*3 Vexwarina wan şerbete.*

**S. 24** *1 Batin û me'rifete,*
*2 R̂uniştina wan miĥbete,*
*3 Vexwarina wan şerbete.*

**S. 26** *1 Yasîn û me'rîfete,*
*2 R̂uniştina wan muĥbete[388],*
*3 Vexwerina wan şerbete.*

**S. 26** *1 Xweşiya[389] li wan zor kir,*
*2 Bi maş û cembaqî kir,*
*3 Lew xasa li wê qebûl kir.*

**S. 25** *1 Xuşîya li wan zu kir,*
*2 Bi maş û cembaqî kir,*
*3 Lew xasa li wê qebûl kir.*

**S. 27** *1 Wan li wê zû kir,*
*2 Bi k'as û cenbeqî kir,*
*3 Lew xasa li wir qebul kir.*

**S. 27** *1 Lew xasa li wê suhbet kir,*
*2 Bi k'as û evîn kir,*
*3 Lew xasa li wê loqet kir.*

**S. 26** *1 Lew xasa li wê suĥbet kir,*
*2 Bi k'as û miĥbet kir,*
*3 Lew xasa li wê loqet kir.*

**S. 28** *1 Wan li wir suhbet kir,*
*2 Bi k'as û muĥbet kir,*
*3 Lewma li du loqet kir,*

**S. 28** *1 Lew xasa li wê qebûl kir,*
*2 Bi k'as û evîn kir,*
*3 Lew xasa li du loqet kir.*

**S. 27** *1 Lew xasa li wê qebûl kir,*
*2 Bi k'as û miĥbet kir,*
*3 Lew xasa li wê şerbet kir.*

---

[385] *dayîre*
[386] *basin*
[387] *mehbet*
[388] *mehbet*
[389] *xoşiya*

**S. 29** *1 Gelî bira, ĥeta win li wêne,*
*2 Derheqê ẍafila mebêne,*
*2 Ew jî li benda Xwedêne.*

**S. 28** *1 Gelî bira, heta hûn li wêne,*
*2 Derheqê ẍafila mebêne,*
*3 Ewjik ji benîyêt Xudêne.*

**S. 29** *1 Gelî bira ĥeta hûn li wêne,*
*2 Derheqê ẍafila mebêne,*
*3 Ew jî benda Xwedêne.*

**S. 30** *1 Mebêje ji derheqê ẍafila,*
*2 Bi xof û tirs bin ji ĥemû dila,*
*3 Da r̂oja axretê bibin xwedan mal û mezela.*

**S. 29** *1 Mebêje ji derheqê ẍafila,*
*2 Bi xof û tirsbin li hemû dila,*
*3 Da r̂oja axretê bibin xudanêt mal û mezela.*

**S. 30** *1 Mebêjin derheqa ẍafila,*
*2 Xof*[390] *û tirs bin ji ĥemû dila,*
*3 Da r̂oje axretê jî bibin xwedanê malan û mezela.*

**S. 31** *1 Ji qewlê derwêşê Qat'anî,*
*2 Şêx Adî beĥre, jê diçin çoya û kanî,*
*3 Çûne ber r̂oniya mehrebanî.*

**S. 30** *1 Ji qewlê derwêşê Qat'anî,*
*2 Ilmê Xudê beĥre, jê diçin çoyî û kanî,*
*3 Xas xasin çone ber nûra R̂eĥmanî.*
*4 T'emamya vî qewlî li xudanî!*

**S. 31** *1 Ji qewlê derwêş Qat'anî,*
*2 Şêx Adî beĥre, jê diçûn co û kanî,*
*3 Çûne ber nûra R̂eĥmanî.*

**S. 32** *1 Xas, xas bûn, ẍafil di kore bûn,*
*2 Bi r̂êya şêx Adî û melek şex Sin ne dizanî,*
*3 Li ser holê sekinî ye derwêş Qat'anî.*

**S. 32** *1 Xwes*[391] *xweş bûn, ẍafil di kore bûn,*
*2 Bi r̂êya şêx Adî û melik şêx Sin ne dizanî,*
*3 Li ser hole sekinîye derwêş Qat'anî.*

**S. 20** *1 Derwêş Qat'anî çar manî yî*[392] *digotin,*
*2 Bang da, nayêne gotinê,*
*3 Axretê nayêne firotinê.*

**S. 19** *1 Derwêş Qat'anî çar manî digotin,*
*2 Ban dê nayêne gotin,*
*3 Axretê nayêne firotin.*

*T'emametiya vî qewlî li Xwedê!*
*Em di kêmin û Xudê yî t'emame!*
*T'emamya vî qewlî li Xwedê û xwedanî!*
*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*

## 16. QEWLÊ ILMÊ NADIR[393]

[390] *xov*
[391] *xaş*
[392] *me'nî*
[393] [1] *Dua' bawerîye* (rr. 104–106)

**S. 1** *1 P'adşa*[394] *li naw dur̂ê li xewle bû,*
*2 Ne e'rd hebû, ne e'zman bû,*
*3 Ne ĉiya, ne sikan bû,*
*4 Bawerî navek jê Xweda*[395] *bû.*

**S. 2** *1 P'adşa di nav dur̂ê da bû,*
*2 Bi giranî sê ĥezar û se nav li xwe*[396] *danî,*
*3 Navek jê bawerî pê anî.*

**S. 3** *1 Xwedê bawerî çêkir,*
*2 Not û neh r̂eng pê r̂a vir̂ê kir,*
*3 Bi wê baweriyê xwe jî nava dur̂ê cihê kir.*

**S. 4** *1 P'adşa li dur̂ê ger̂iya,*
*2 Av jê weriya,*
*3 Bû beĥr pengiya.*

**S. 5** *1 P'adşa sê dur̂ çêkiriye,*
*2 Bi wê baweriyê li nava beĥrê daniye,*
*3 Her not û neh ĥezar salî darek jê mek'anê wîye.*

**S. 6** *1 Ew bû dara bi nav ẍewa,*
*2 Serî li xwar, r̂ehêt wê li hewa,*
*3 Meleka r̂ahişt nûra li serê sera P'adşa êk jê ewe.*

**S. 7** *1 Ew bû dara bi nav ẍeware,*
*2 K'ok li hewa, serî li xware,*
*3 Ji qudretê av vedixware,*
*4 Bi baweriyê xerqe kirin nijyarê.*

**S. 8** *1 Bi baweriyê xerqe nijyar kirin,*
*2 Not û neh erk'an ser kirin,*
*3 Ji ew paş meleka bawer kirin.*

**S. 9** *1 Meleka bawerî pê anîn,*
*2 Xerqe birin li ser xwe r̂a danîn,*
*3 Ji ew paş meleka şehda û îmanêt xwe pê anîn.*

**S. 10** *1 Bawerî r̂astî ye,*
*2 Xulqandin Gay û Masî ye,*
*3 Zergûz û mîye,*
*4 Hêvênê*[397] *wan çêkirin ji kaniya Spîye.*

**S. 11** *1 Bi bawerî yê r̂ik'inê e'rd û e'zmana danî ye,*
*2 Ĥeft t'ebeqe e'rd û e'zman li ser pişta Gay û Masî ye.*

**S. 12** *1 P'adşa bawerî û r̂astî danîn li nav meleka,*
*2 Bi wan ava kirin çardeh t'ebeqe,*
*3 P'adşa ĥeqe û navê wî Ĥeqe.*

**S. 13** *1 Melek fikirîn,*
*2 Li êkû du êwirîn,*
*3 Bi wê bawerî yê li beĥra ilm*[398] *seyrîn,*

[394] *pedşa*
[395] *Xuda*
[396] *xo*
[397] *hêvên*
[398] *e'lm*

*4 E'rd çêkirin, e'zman li ser r̂a nijinîn,*
*5 Bi navê Xwedê şikirîn.*

**S. 14** *1 P'adşayî bawerî kir k'oka not u neh nave,*
*2 Melek hatin hindave,*
*3 Xulqandin meha qer mek'anê wê mêrga bi xûnave.*

**S. 15** *1 P'adşayî bi bawerî yê r̂uĥ nijyar kirin,*
*2 Li qendîla kirin,*
*3 Piştî not ĥezar salî li e'rda dahir kirin,*
*4 Dilê meleka pê şahî û şa kirin.*

**S. 16** *1 Bawerî serê ĥemû xêra,*
*2 Meleka sema qanûnî li e'zmana digêr̂a,*
*3 Momin bi wê bawerî yê gehiştin dîwana Cebêra.*

**S. 17** *1 Momin bi wê bawerî yê e'mel çê ne,*
*2 Bi şev û r̂ojê li xilmeta Xwedê ne,*
*3 Aşiq bê serin, bê destin, bê p'ê ne,*
*4 Li virin, ji wê tê ne.*

**S. 18** *1 Ew bûn melekêt ber bedîle,*
*2 Ji wan ço şewq, şemal û nûre.*

## 17. QEWLÊ BÊ Û ELÎF[399]

**S. 1** *1 Bê û Elîf[400] — t'extê nûrî sedef,*
*2 P'adşê min li navda yî bi xef.*

**S. 2** *1 P'adşê min li navda yî mixfî bû,*
*2 Ew bi xwe[w]a xwe r̂azî bû,*
*3 Hêj kevne ye dahir bû,*
*4 Ew bi xwe[w]a, xwe nasî bû.*

**S. 3** *1 Ew bi xwe dip'araste[401],*
*2 Muĥbet her êk û heste,*
*3 Ew nûr bû bi xwe dip'araste.*

**S. 4** *1 P'adşê min nûr bû, nûr hate,*
*2 Aşiq — Celîle, me'şûq[402] — Celale,*
*3 Mêr dipirsî ew ĥale.*

**S. 5** *1 Mêra dipirsîbû ew sur̂e,*
*2 Mêr ĥeyrane bi xwe r̂a,*
*3 P'adşê min bi xwe e'firandbû dur̂e.*

**S. 6** *1 P'adşê min bi xwe e'firand dur̂a beyza ye,*
*2 Mêr neder pê da ye,*
*3 Jê çêkir şêxê Ĥesen il-Mustefa ye.*

**S. 7** *1 Da bideyn medha dur̂a sipî ye,*

[399] [1] (pp. 71–73).
[400] *elêf*
[401] *diperiste*
[402] *maşoq*

*2 K'asek jê die'firî ye*[403]*,*
*3 Ew bi xwe bû xwe r̂azî ye.*

**S. 8** *1 Berî mişûre, berî xete,*
*2 Berî qeleme, berî ĥeqîqete,*
*3 Mêr nasî bû ew muĥbete.*

**S. 9** *1 Muĥbeta ji wê ye,*
*2 Ĥeqiqeta me ji wê hewedê ye,*
*3 Dayî mirîda, dotû dê ye.*

**S. 10** *1 Dayî r̂eda da, dotê r̂eda ne da,*
*2 Nav xasêt şêx Adî bû wesfete*[404]*,*
*3 Dayî li dotê şehde da.*

**S. 11** *1 Dayî — mirîde, dot — dê ye,*
*2 Bêjine min, k'î ji berî k'ê ye?*

**S. 12** *1 Ji e'wil Beyza li berê,*
*2 Zerîyê bê Ehmerê,*
*3 Bêje min k'î ji beĥrê*[405]*.*

**S. 13** *1 Sibĥane ji te sibĥanî,*
*2 Nebîya qedem hilanî,*
*3 Serwerê ewlî ya nav pê danî.*

**S. 14** *1 Serwerê ewlîya dahir bû,*
*2 Şêx Adî bin Musafir bû,*
*3 Mêra li pê Ellaĥû Ekber bû.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 18. QEWLÊ HERÎ BERÊ KU BÛ?[406]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Herî berê k'u bû?*
*2 Xeber bide hêş nebû bû,*
*3 Bêje min ji e'wil P'adşayê min li k'u bû?*

**S. 2** *1 Durust*[407] *bide k'ilîma durust,*
*2 P'adşayê min ne dixwer û ne dinivist,*
*3 Ji e'wil P'adşayê min çî dip'arist*[408]*?*

**S. 3** *1 Durust bide beyane,*
*2 P'adşayê min êkî R̂eĥmane,*
*3 Ji e'wil P'adşayê min derd çêkir, anî dermane?*

**S. 4** *1 Ew qewle, qewlekî me qîle,*
*2 P'adşayê min êkî E'dîle,*
*3 P'adşayê min nûr bû, nûr jê dibû ĥasile.*

---

403 *hefiriye*
404 *usfet*
405 *berê*
406 [52] (rr. 22-26)
407 *durist*
408 binêr: *p'arastin*

**S. 5** *1 Ji e'wil P'adşayê min nûr bû,*
*2 Neqaşê neqşê hûr bû,*
*3 Ji berê xet, û k'itêb, û mişur bû.*

**S. 6** *1 Muĥbete ji qevdê ye,*
*2 Nûre li derge ye, şewqe li e'rdê ye,*
*3 Di navda ĥebîbê Xwedê ye.*

**S. 7** *1 Muĥbeta ji qevda ȓaste,*
*2 Nûreka dî jê di bîraste,*
*3 Li pêşîya destê xwe vedguhaste.*

**S. 8** *1 Muĥbeta ji qevda zere,*
*2 Nûrê da nûrê nezere,*
*3 Jê sêwirand melik şêx Sin bi cehwere.*

**S. 9** *1 P'adşayê min muĥbet ji ba xwe die'firand*[409]*,*
*2 Îna li ba xwe didebirand,*
*3 Melik şêx Sin jê disewirand.*

**S. 10** *1 P'adşayê min muĥbet ji ba xwe dixulqand,*
*2 Îna li ba xwe di mue'liqand*[410]*,*
*3 Melik şêx Sin jê difariqand.*

**S. 11** *1 P'adşayê min muĥbet ji ba xwe dimezicand,*
*2 Îna li ba xwe dixuricand,*
*3 Melik şêx Sin jê difericand.*

**S. 12** *1 Çil salî zeman, P'adşê min mabû li qendîle,*
*2 Aşiq celale, me'şûq celîle,*
*3 P'adşayê min hêvên da Adem, û Nuĥ, û Birahîm Xelîle.*

**S. 13** *1 P'adşayê min muxfî suȓe,*
*2 Êk ĥerf ĥedê p'iȓe,*
*3 Beyzayê k'af da duȓe.*

**S. 14** *1 Beyzayê dabû k'afe,*
*2 P'adşayê min çobû nava,*
*3 P'adşayê min çêkirin Bê û Elafe.*

**S. 15** *1 P'adşayê min Bê û Elîf kirin t'ebave,*
*2 P'adşê min çobû nave,*
*3 Ew li xwe bû, li xwe dikir silave,*
*4 Ew li xwe bû, li pêş destê xwe westave.*

**S. 16** *1 Li pêş destê xwe veweste,*
*2 Aşiqa p'iȓ heweste,*
*3 Ji ber aşiqa li ber ne diwesta.*

**S. 17** *1 Ji aşiqa dabû dere,*
*2 Nûrê da nûrê nedere,*
*3 Jê disewirand şêx Ĥesenê minî bi cehwere.*

**S. 18** *1 Aşiqa we dabû cewabe,*
*2 P'adşayê min çobû nava,*
*3 Duȓ mewcî û bû ava.*

[409] *afrand*
[410] *e'liqand*

**S. 19** *1 Duȓ mewcî û hecicî,*
*2 Bû beȟr û mewcî,*
*3 P'adşayê min nûr bû, bi hikmê xwe difericî.*

**S. 20** *1 P'adşê k'ef dane,*
*2 Jê çobû duxane,*
*3 P'adşayê min jê nijyar kir e'rd û e'zmane.*

**S. 21** *1 Beȟrê k'ef ȓevî,*
*2 P'adşayê min jê çêkirin e'rd, û e'zman, û zevî,*
*3 Ewiye wek P'adşayê min pê devî.*

**S. 22** *1 Beȟrê k'ef da gişte,*
*2 P'adşayê min fikirî li ber û pişte,*
*3 P'adşayê min jê nijyar kir dojeh û bihuşte*[411]*.*

**S. 23** *1 Me muȟbet hebû ji dêr,*
*2 Heke ne ȟebandinan Cebêr,*
*3 Dê kir bane înk'êr*[412]*.*

**S. 24** *1 Nanête înk'ar kirin,*
*2 Nûr bi nûrê diêwirin,*
*3 Muȟbet bi nedera hev didebirin.*

**S. 25** *1 Xwedê û nebîy catin,*
*2 Not û neh k'ilîm*[413] *bi hev ȓa digotin,*
*3 Ew bi xwe bûn, li xwe dihindotin.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 19. QEWLÊ QERE FURQAN[414]

**şaxê — 1**[415]

**S. 1** *1 Çî sibeyeke sewda bû,*
*2 Ȟal li me p'eyda bû,*
*3 Ji e'wil û axir P'adşa li minî xweya*[416] *bû.*

**S. 2** *1 Çî sibeyeke xweşe*[417]*,*
*2 Dane dest min xeteke ȓeşe,*
*3 Go: «Ya derwêş*[418]*, k'erem bike, P'adşa te dixwînite*[419] *E'rşê».*

**S. 3** *1 Çî sibeyeke sore,*
*2 Dane dest min xetekî bi more,*
*3 Go: «Ya derwêş, k'erem bike P'adşa te dixwînite*[420] *jorê».*

**S. 4** *1 Çî sibeyeke bi xirûre,*
*2 P'adşayê min bo min nazil kirbû ilm, û berat', û xet, û mişûre,*
*3 Go: «Ya derwêş, k'erem bike P'adşa te dixwînite jurê».*

---

411 *buhişt*
412 binêȓ: *înk'ar*
413 *k'ilam*
414 *Ferkan*
415 [1] (pp. 94–103)
416 *xoye*
417 *xoşe*
418 *derweş*
419 *dixûnit*
420 *dixûnit*

**S. 5** *1 Çî sibeyeke bi qîmete,*
*2 P'adşayê min bo min nazil kirbû ilm, û berat', û xete,*
*3 Melik Fexredîn pêş P'adşê xwe vediweste, pirsyarekê*[421] *jê dikete.*

**S. 6** *1 Melik Fexredîn pêş P'adşê xwe vediweste, pirsyarek jê kirî:*
*2 «Îlaĥîo, tuyî Wehidî, Qahirî,*
*3 Ji berî binyane e'rda, ji berî e'zmane, ji berî mêra, ji berî meleka, muĥbeta*[422] *bi te r̂a çêbû, te çi jê çêkirî?»*

**S. 7** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexro yê minî faxre,*
*2 Cewaba te li min lêzim û fere,*
*3 Ji berî binyane e'rda, ji berî e'zmana, ji berî mêra, ji berî meleka, muĥbeta min dip'arast*[423] *xerqeye».*

**S. 8** *1 Melik Fexredîn pêş P'adşê xwe vediweste,*
*2 Ewî p'ê danabû ser p'ê, dest danabû ser deste,*
*3 Go: « Eseh cewaba baxo yê mine diruste,*
*4 Be'dî ĥeft sal muĥbeta baxo yê min çêbû, ma bê p'araste».*

**S. 9** *1 P'adşa deng diket bi zare,*
*2 Dur̂ mewicî, bûwe beĥre,*
*3 Ticara û wan çêbû xerqe kirine çare,*
*4 Be'dî not ĥezar sala li qendîlê kir û veşare,*
*5 Ji nû paş dahir kirin herçar yare.*

**S. 10** *1 Dahir kirin herçar yarêt zergûne,*
*2 E'silzade, şêx Adî û melik şêx Sine, Nasirdîne û Sicadîne,*
*3 Ewan ev dinya bi k'ar tîna.*

**S. 11** *1 Ewan ev dinya tîna bi k'are,*
*2 Dur̂ mewcî, bûwe beĥre,*
*3 P'adşa û herçar yare li merk'ebê dibûn siware,*
*4 Seyrîn herçar kenare,*
*5 Li Lalişê sekinîn, gotin: «Eve Ĥeq*[424] *ware».*

**S. 12** *1 Ĥeq war sekinîn.*
*2 P'adşaye min hêvên havête beĥrê, beĥr dimeyînî,*
*3 Duxanek jê duxunî, her ĥeft*[425] *e'zman pê nijinî.*

**S. 13** *1 Melik Fexredîn dibêjitê: «P'adşa weye,*
*2 E'rş û K'ursîy k'efa teye,*
*3 Te bi çî erk'anî kaniya Sipî bo mêra dikire qublete?»*

**S. 14** *1 We dibêjit P'adşayê minî nûranîye: «Fexre û silt'an Êzî ye,*
*2 T'ac û hil ser serê xwe danî ye,*
*3 Li birke kaniya Sipî hilanî ye,*
*4 Ji nû paş mêra şehda û îmana xwe pê anî ye.*

**S. 15** *1 Melik Fexredîn pirsyarek*[426] *ji P'adşayê xwe dikî ye:*
*2 «E'zîzê min dê bo min bêjî r̂astî ye,*
*3 K'a hêvênê kaniya Sipî ji çî ye?»*

---
[421] *pisyar*
[422] *mihbet*
[423] *diperist*
[424] *Heq*
[425] çar
[426] *pisyar*

**S. 16** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexro yî be'îde,*
*2 Ilmdarekî ilmê cîde,*
*3 Heke tû pirsyara hêvênê kaniya Sipî ji min dikî,*
*4 Hêvênê kaniya Sipî ji her û here».*

**S. 17** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexro, tarî û zulmete,*
*2 Wahid li qehar ȟeqîqete,*
*3 Miftê şêx Adî pê vedibit kaniya Sipî, bo mêra dikire qublete».*

**S. 18** *1 Melik Fexredîn pirsyareke dî ji P'adşê xwe dikete:*
*2 «E'zîzê min, tû xaliqê minî her û here,*
*3 Ji berî binyana e'rda, ji berî e'zmana, ji berî mêra, ji berî milyak'eta,*
*xerqe bi destê k'î mêrî çêdikire?»*

**S. 19** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexrê mino yî faxire,*
*2 Cewaba te li min lêzim û fere,*
*3 Ji berî binyana e'rda, ji berî e'zmana, ji berî mêra, ji berî milyak'eta*[427]*,*
*min xerqe bi destê silt'an Êzî çêdikire».*

**S. 20** *1 Melik Fexredîn pirsyareke dî ji P'adşê xwe dikire:*
*2 «E'zîzê min, tu xaliqê minê her û herî,*
*3 Ji berî binyana e'rda, ji berî e'zmana, ji berî mêra, ji berî milyak'eta*[428]*,*
*xerqe bi destê k'î mêrî dikire bere?»*

**S. 21** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexrê minî faxire,*
*2 Cewaba te li min lêzim û fere,*
*3 Ji berî binyana e'rda, ji berî e'zmana, ji berî mêra, ji berî milyak'eta*[429]*,*
*min xerqe bi destê Êzî dikire bere».*

**S. 22** *1 P'îrê xerqê min silt'an Ezîde,*
*2 Manîyeke*[430] *be'îde,*
*3 Atqata min û çendî mirîde.*

**S. 23** *1 Silt'an Êzî p'îrê xerqê mine,*
*2 Atqata min u çendî momine,*
*3 Bînaya herdu ĉavêt mine.*

**S. 24** *1 Silt'an Êzî dest havête qendîla qudretê, duȓek deranî,*
*2 Silt'an şêx Adî ser k'efa xwe danî,*
*3 Jê çêkir t'ac, û hil, û xerqêt nûranî,*
*4 Dane dest xasêt şêx Adî, di ber xwe kirin weke tû dizanî.*

**S. 25** *1 Di ber xwe dikirin ew suȓe, ew xerqe ye,*
*2 Bi silt'an Êzî den şehde ye,*
*3 Ji nûra wan kişifî berê sibe ye.*

**S. 26** *1 Berê sibê ji nûra wan kişifî,*
*2 E'rd û e'zman t'êk ȓeçivî,*
*3 Mêr li wehdaniyê ȓûniştin,*
*4 Ĥeq ȓêya şêx Adî û melik şêx Sin hev ȓa diaxivtin.*

**S. 27** *1 Mêr li wehdaniyê ȓûniştin,*
*2 Ĥeq ȓêya şêx Adî û melik şêx Sin hev ȓa xeber da:*
*3 «Belê e'zîzê min, tû mife'tî ser çiqas der da,*
*4 Bi çî erk'anî jêk vekirin e'zman û e'rde?»*

---

[427] *milka*
[428] *milketa*
[429] binêr: *behişt*
[430] binêr: *me'nî*

**S. 28** *1 «Belê, Fexro min e'rd û e'zman ji êk kire,*
*2 Min Heyv û R̂oj navda dahir dikire,*
*3 Min ev meclîsa bi navê şêx Adî û melik şêx Sin ava kire».*

**S. 29** *1 P'adşa dibêje: «Fexro, min xulqandin şev û r̂oje,*
*2 Min nav dana bihuşt*[431] *û dojeh,*
*3 Min melik Fexredîn dikire heyv, melik Şemsedîn dikire r̂oje».*

**S. 30** *1 Melik Fexredîn pirsyareke dî ji P'adşê xwe dikire:*
*2 «Te ev bihuşta xweş ava dikire,*
*3 Eve çî dojehe pêş miqabilî wê diêwire?»*

**S. 31** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexrê mino yî faxire,*
*2 Cewaba te li min lêzim û fere,*
*3 Min ev dojeh bo wan ava dikire yê bi r̂ojê sê care bi navê Tawisî melek' dik'ifire».*

**S. 32** *1 Melik Fexredîn pirsyareke dî ji P'adşê xwe dikire:*
*2 «Te ev bihuşta xweş ava dikire,*
*3 Eve çî Adem bû navda diêwire?»*

**S. 33** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexro p'ir̂ wesfete,*
*2 Min ji Adem vavartibûn ĥeftî û du milete,*
*3 Û heştî ĥezar xulyaqete».*

**S. 34** *1 Ewan ĥerfa ji pêş,*
*2 Cayîze li wê ĥerfê biken t'eftêş,*
*3 Jê kirin Ĥeşem û Qurêş.*

**S. 35** *1 Ĥeşem û Qurêş jê kirin,*
*2 Qal û qîr nav dahir kirin,*
*3 Silt'an Êzî şîrê ĥeqiyê jê kirin.*

**S. 36** *1 Qurêş bi navê silt'an Êzî têt bawerî û îmane,*
*2 Belê, e'zîzê min, te da ĥerfa k'afiran û misilmana*[432]*,*
*3 Te bo wan nazil kir T'ewrat, Zembûr, Încîl û Qura'ne,*
*4 Sinetxane dê bi çî înit bawerî û îmane».*

**S. 37** *1 Wê dibêjit P'adşayê min xwedan erk'ane:*
*2 «Belê Fexro, dê nazilî e'rda kem qewl, xerqana,*
*3 Da sinetxane*[433] *pê bêt şehde*[434] *û bawerî îmane».*

**S. 38** *1 Melik Fexredîn ji P'adşê xwe diket pirsyare:*
*2 «Navê te yê şîrin, yî şîrin*[435] *extiyare,*
*3 Dê bi çî erk'ane qewl û xerqa nazil keye e'rdane?»*

**S. 39** *1 Wê dibêjit P'adşayê minî nûraniye:*
*2 «Mêşe û zergûze û mîye,*
*3 Hêvênê hersêka ji kaniya Sipîye».*

**S. 40** *1 P'adşa dibêjit: «Fexro nava mîhê û zergûzê dê çêkim xerqeye,*
*2 Feqîr dêken ber xoye,*
*3 Sinetxane dê pê înit bawerî û şehdeye.*

---

[431] *behişt*
[432] *bisilman*
[433] *sunetxane*
[434] *şade*
[435] *şirîn*

**S. 41** *1 Qewl û xerqe t'efsîl dikire,*
*2 Nazilî e'rda dikire,*
*3 T'esmîlî melik Fexredîn dikire,*
*4 Melik Fexredîn t'esmîlî xasêt şêx Adî dikire,*
*5 Xasêt şêx Adî pê hatibû şehde û bawere».*

**S. 42** *1 P'adşê min zergûz t'efsîl dikire,*
*2 Nazilî e'rda dikire,*
*3 T'esmîlî melik Fexredîn dikire,*
*4 Melik Fexredîn t'esmîlî xasêt şêx Adî dikire.*

**S. 43** *1 Xasêt şêx Adî tesmîlî feqîra dikire,*
*2 Feqîra xerqêt xwe pê r̂eş dikire,*
*3 Sinetxane pê hatibû şehda û bawere».*

**S. 44** *1 P'adşayê min hikmê*[436] *xwe p'ir̂ hosa,*
*2 Da nav mêra û nefesa,*
*3 Da destê p'îra fitre û zeka,*
*4 Da destê şêxa bisk û meqese.*

**S. 45** *1 P'adşê min bi hikmê xwe Ẍefûre,*
*2 Ji bo wî hatibû destûre,*
*3 Da destê şêxa bisk û meqese,*
*4 Da destê p'îra zek'at û Mişûre.*

**S. 46** *1 Hindek xatira xerqe li webî,*
*2 Maya xerqe bila webî,*
*3 Û ji kenarê min çî nebî,*
*4 Herçar t'erîqêt dest [û] damana te bî.*

**S. 47** *1 Mîr li dîwana silt'an Êzî go: «Xerqe libasê îmane,*
*2 Hincîyê lê yî bi şike, yî bi gumane, şêşim*
*3 Dê bi çenglêt wî girin hêvêne nav sefdêt misilmana.*

**S. 48** *1 Ciyê wî li axretê vejwarte,*
*2 Tenge, û tûnge, û qîre qet'rane,*
*3 Ĥeta e'bd*[437] *li a'badê her ew ciyê wane».*

**S. 49** *1 Ewan xasa lêk dinêr̂î,*
*2 Li dîwana silt'an Êzî bû şûşe û biriqêt*[438] *zêr̂î,*
*3 Û k'asa şerab il-tiĥûr bo mêra nob bi nob li êkû du digêr̂î.*

**S. 50** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexro, dê r̂ojekê, bi navê silt'an Êzî êt bawere,*
*2 Dê t'esmîlî bêgoya bikem wan k'afire,*
*3 Yê Sin wan nekem t'emame».*

**S. 51** *1 P'adşa dibêjitê: «R̂ojekê ez dê ême r̂uwê e'rda,*
*2 Dê derman kem dilê birînan û k'ovane,*
*3 Hincîyê li vî qewlî, yî bi şike, yî bi gumane,*
*4 Dê bi cenglê wî girin hêvêne, nav sevdêt misilmana.*

**S. 52** *1 Cî bo wî li axretê vejwarte,*
*2 Tûnge û tenge û qîrê qet'rane,*
*3 Ĥeta bi e'bd li a'badê her ew ciyê wane.* (binêr **S. 48**)

**S. 53** *1 Ew qewle qewlê Qere Ferqane,*

---

[436] *hikm*
[437] *ebed*
[438] *birîq*

*2 T'emametîye vî qewlî melek il-mewt*[439] *û Govonê Zerzane.*

*Em di kêmin, şêx Adî herî t'emame!*

**şaxê – 2**[440; 441]

**S. 1** *1 Sibekê*[442] *r̂abûm, sewda bûm,*
*2 Ĥalek li min p'eyda bû,*
*3 E'wil P'adşayê min miva xweyan*[443] *bû.*
**S. 1** *1 Sibekê r̂abûm*[444] *sewda bûm,*
*2 Ĥalek ji min p'eyda bû*[445]*,*
*3 E'wil P'adşayê*[446] *min xwe[yan] bû.*

**S. 2** *1 Sibekê r̂abûm, bêĥiş bûm,*
*2 K'etime nivînê, nexweş bûm,*
*3 Bendeyê Melikê E'rş bûm.*
**S. 2** *1 Sibekê r̂abûm bêĥiş bûm,*
*2 K'etime nivînê nexweş bûm,*
*3 Bendê Melikê*[447] *Erş bûm.*

**S. 3** *1 Çî sibeke xirûre,*
*2 P'adşayê min daye destê melek Fexredîn*[448] *ilme*[449]*, berat'e, û mişûre,*
*3 Go: «Fexro, bixwîn*[450] *berî jêre, berî jore».*
**S. 3** *1 Çi sibeke xurûre,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexredîn*[451] *ilm, berat'*[452]*, mişûre*[453]*,*
*3 Go: «Fexro, bixwîne, çendî jore, çendî jêre».*

**S. 4** *1 Çî sibeke nedere,*
*2 P'adşayê min daye destê melek Fexredîn ilme, berat'e, deft'ere,*
*3 Go: «Fexro, bixwîn seransere».*
**S. 4** *1 Çi sibeke nedere*[454]*,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexredîn ilm, berat', deft'ere,*
*3 Go: «Fexro, bixwîne, seranser[e]».*

**S. 5** *1 Çî sibeke sore,*
*2 P'adşayê min daye destê melek Fexredîn xeta more,*
*3 Go: «Fexro, bixwîn berî jêre, berî jore».*
**S. 5** *1 Çî sibeke sore,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexredîn xeta more,*
*3 Go: «Fexro, bixwîne berî jêre, berî jore».*

**S. 6** *1 Çî sibeke xweşe,*
*2 P'adşayê min daye destê melek Fexredîn xeta r̂eşe,*
*3 Go: «Fexro, bixwîn berî binamîya e'rd, û e'zman*[455]*, û E'rşê».*
**S. 6** *1 Çî sibeke xweşe,*

---

[439] *mot*
[440] [29] *Qewlê Qerefirqan* (rr.426–430) (№ 1705)
[441] [31] *Qewlê Qereferxanî* (rr.32–35)
[442] *sive*
[443] *xwa*
[444] *r̂abûm*
[445] *p'eyîda bûm*
[446] *P'at'şa*
[447] *Melek*
[448] *Ferxedîn*
[449] *ulm*
[450] *bixûn*
[451] *Ferxedîn*
[452] *berat*
[453] *mîşûr*
[454] *nedir*
[455] *e'sman*

*2 P'adşayê min daye destê melik Fexredîn xeta r̂eşe,*
*3 Go: «Fexro, bixwîn binamîya e'rd, e'zman*[456]*,E'rşê».*

**S. 7** *1 Çî sibeke bi qîmetîye,*
*2 Şêx Fexrê Adiya pirsek P'adşayê xwe dikirîye,*
*3 Go: «E'zîzê min, muĥbeta*[457] *berî binamîya e'rdê û e'zman çi bû, çi jê p'eyda dikirî?»*

**S. 7** *1 Çî sibeke bi qîmetiye,*
*2 Şêx Fexrê*[458] *Adiya pirsek P'adşayê xwe kiriye,*
*3 Go: «E'zîzê min, muĥbeta berî binamîya e'rd û ezman çi bû, çi p'eyda dikir?».*

**S. 8** *1 Şêx Fexrê Adîya pêş P'adşayê xwe va wadiwaste,*
*2 P'ê daye p'ê, dest daye deste,*
*3 Go: «E'zîzê min, muĥbeta berî binamîya e'rdê û e'zman çi bû, çi jê dip'ariste?»*

**S. 8** *1 Şêx Fexrê Adiya pêş P'adşayê xwe va wediweste,*
*2 P'ê dide p'ê, dest dide deste,*
*3 Go: «E'zîzê min, muĥbeta berî binamîya e'rd û e'zman çi bû, çi lê dibarest[e]?»*

**S. 9** *1 P'adşayê min go: «Fexro weye,*
*2 Xeberê Xwedê — xeberê teye,*
*3 Muĥbeta berî binamîya e'rdê û ezman p'eyda kirîye xerqeye».*

**S. 10** *1 P'adşayê min go: «Fexro, mi*[459] *xerqê şêx Adî kir nijyare,*
*2 Kire qendîlê vedişare,*
*3 Hew paşwar mêr-melek pê kirin dîhare».*

**S. 11** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe deyn*[460] *dikirî,*
*2 Go: «E'zîzê min, tî E'dîlî, Qadirî,*
*3 Te derê qendîlê ber k'ê vedikirî?»*

**S. 9** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe deyn dike xeberdane,*
*2 Go: «E'zîzê min, tu Hadirî, tu Qadirî,*
*3 Te derê qendîlê*[461] *ber k'ê vedikirî?»*

**S. 12** *1 P'adşayê min şêx Fexrê Adiya deyn dikire,*
*2 Go: «Mi derê qendîlê ber şêxû Bek'ir[ê] feqîr vedikire,*
*3 Berî mêr-meleka xerqê qîmetî, şêxû Bek'ir feqîr ber dikire».*

**S. 10** *1 P'adşayê min go: «Fexro weye,*
*2 Xeberê Xwedê — xeberê teye,*
*3 Derê qendîlê ber şêxû Bek'irê feqîr vedikirin.*
*4 Berî mêr–meleka xerqê*[462] *qîmetî, şêxû Bek'ir feqîr ber dikirin».*

**S. 13** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşa yê xwe deyn dikirî,*
*2 Go: «E'zîzê min, te e'rdê çêkirye bihuşt û dojeh,*
*3 E'zmana çêkirîye Hîv û R̂oje».*

**S. 11** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe deyn dike xeberdanê,*
*2 Go: «E'zîzê min, te e'rdê çêkirîye bihuşt û dojeh, —*
*3 Go — e'zmana kirîye Hîv û R̂oje».*

**S. 14** *1 P'adşayê min şêx Fexrê Adiya dihewoje,*
*2 Go: «Fexro, min e'rdê çêkirîye bihuşt û dojeh,*
*3 E'zmana melek Fexredîn kirîye — Hîv, melek Şemsedîn kirîye — R̂oje».*

**S. 12** *1 Go: «Fexro, we ye,*
*2 Xeberê Xwedê — xeberê te ye,*

---
[456] *e'sman*
[457] *mobet*
[458] *Şêferx*
[459] forme kurtî: *min*
[460] *deyîn*
[461] *qendîl*
[462] *xerqe*

*3 Min e'rdê çêkirîye bihuşt, dojeh,*
*4 E'zmana melik Fexredîn kirîye — Hîv, melik Şemsedîn kirîye — R̂oje».*

**S. 15** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe deyn dikirî,*
*2 Go: «E'zîzê min, ew bihuşta xweşe çêdikirî,*
*3 Ew çi dojeh nexweşe te r̂û çêkirî?»*

**S. 16** *1 P'adşayê min şêx Fexrê Adiya deyn dikirî,*
*2 Go: «Fexro, ew bihuşta[463] xweşe min çêdikirî,*
*3 Dojeh nexweşe mi r̂û çêdikirî,*
*4 Ĥerçê kesê nav dik'irê min bibhurî,*
*5 Min wan ĥeft[464] bavê wan r̂a milk'anek çêdikirî.*

**S. 17** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe deyn dike xeberdanê[465],*
*2 Go: «E'zîzê min, te da ye ser peşka ĥemam cuye, fîleye, surmane,*
*3 Da ye destê wana Încîle, T'ewrate, Qurane,*
*4 Lê ew ometek, ometa meye, wê pê çi bîne bawerî û îmane?»*

**S. 18** *1 P'adşayê min go: «Fexro, we ye,*
*2 Xeberê Xwedê — xeberê te ye,*
*3 Emê bişînine r̂û e'rdê qewle û xerqe ye,*
*4 Bira pê bîne bawarî û şehdeye[466]».*

**S. 19** *1 Şêx Fexrê Adiya P'adşayê xwe dipirsîyê,*
*2 Go: «E'zîzê min, e'mrê te E'rşe ĥetanî K'ursîyê,*
*3 Gelo manîya[467] wî xerqe yî çiyê?»*

**S. 20** *1 P'adşayê min go: «Koro, te ĉav[468] bivne sipîyê,*
*2 Tu nizanî manîya wî xerqeyî çiyê,*
*3 Hinek zergûze[469], lepek hirîyê».*

**S. 21** *1 P'adşayê min go: «Fexro, xerqe ye, zergûze, moze, mî ye,*
*2 Havênê herçara yî kaniya Sipîye.*

**S. 22** *1 P'adşayê min go: «Fexro, silt'an[470] Êzîd p'îrê xerqê mine,*
*2 Manîke mezine,*
*3 Ew atqata me cimlî momine».*

**S. 23** *1 P'adşayê min go: «Fexro, ezê xerqe nava mêra da tême îmane,*
*2 Ĥerçê kesê r̂uĥê wî xerqe yî k'erbî, k'înî, tane,*
*3 Ciyê wanî qane, qîre û qet'rane».*

**S. 24** *1 Silt'an Êzîdê milê wan bigre, bavêje ser r̂efê surmanane,*
*2 Nanenî nezeke avîye, avîya ĥemû kerîyane,*
*3 Bandê wî r̂uĥî nave şivaka şêx Adî, şîrin melek şêx Sinê[471] Adiyane.*

## 20. QEWLÊ QENDÎLA[472; 473]

[463] *buhuşt*
[464] *hevt*
[465] *xeverdan*
[466] *şe'de*
[467] binêr: *me'nî*
[468] *ĉe'v*
[469] *zergoz*
[470] *sultan*
[471] *Şîxsin*
[472] [1] (pp. 90–93)
[473] [2] (rr. 418–420)

**S. 1** *1 Zênare, zênare,*
*2 Şêx Adîo, me bi te haware*[474]*,*
*3 Bedîl li me bûye k'ifare.*

**S. 1** *1 Zênare, zênare,*
*2 Şêx Adîo, me bi te haware,*
*3 Bedîl îro li me bûne k'ifare.*

**S. 2** *1 Bedîl hatin û bihurîn,*
*2 Çendî têde fikirîn,*
*3 Navda mabûn heyrîn.*

**S. 2** *1 Bedîl hatin û bihurîn*[475]*,*
*2 Çend têde fikirîn,*
*3 Navda mabûn ĥeyrîn.*

**S. 3** *1 Bedîl hatin û diçûne,*
*2 Kêm bûn alîm û xetxûne,*
*3 Lewma ji êk û du birî nasbûne.*

**S. 3** *1 Bedîl dihatin û diçûne,*
*2 Kêm bûn alîm û xetxûne,*
*3 Lewma me ji êk û du biȓî nasbûne.*

**S. 4** *1 Hûn bifikirne bedîla,*
*2 Gûhê xwe medene ẍafilan û bexîla,*
*3 Lew ȓonahî ji nav me ȓabû, ço qendîla.*

**S. 4** *1 Werin bedîla bifikirin,*
*2 Gûhê xwe medene ẍafil û bexîla,*
*3 Lewma ȓonahî ji nav me çû qendîla*[476]*.*

**S. 5** *1 Çi qendîleke buk'ir,*
*2 P'adşê min bi ȓehim û şefqêt xwe kir,*
*3 Ewî jê çêkir şêxû Bek'ir.*

**S. 5** *1 Çî qendîla buk'ir,*
*2 P'adşê min bi ȓehim û şefqêt xwe kir,*
*3 Ewî jê çêkir şêxû Bek'ir.*

**S. 6** *1 Çi qendîleke zere,*
*2 Nazil bû ji E'rşê li sere,*
*3 Şêxû Bek'ir bû merebiyê şêx Şemsê T'et'ere,*

**S. 6** *1 Çî qendîla zere,*
*2 Nazil bû ji E'rşê sere,*
*3 Şêxû Bek'ir hat, buwe merebiyê şêx Şemsê*[477] *T'et'ere,*

**S. 7** *1 Çi qendîleke nûrîne,*
*2 Dahir bû ji e'zmîne,*
*3 Şêxû Bek'ir bûwe merebiyê, Şemsedîn û melik Fexredîne.*

**S. 7** *1 Çî qendîla nûrîne,*
*2 Nazil bû ji E'rşê jorîne,*
*3 Şêxû Bek'ir hat, bû merebiyê şêx Şems û Fexredîne.*

**S. 8** *1 Çi qendîleke girane,*
*2 Nazil bû ji e'zmane,*
*3 Şêxû Bek'ir bûwe merebiyê herçar birane.*

**S. 8** *1 Çî qendîla girane,*

---

[474] *hewar*
[475] *buhurîn*
[476] *Lewma jî ȓon adayî nav me çû qendîla*
[477] binêr: *Şêşim*

*2 Nazil bû ji e'zmane,*
*3 Şêxû Bek'ir hat, bû merebiyê herçar birane.*

**S. 9** *1 Çi qendîleke geşe,*
*2 Nazil bû ji E'rşe,*
*3 Dergevan şêx Fexrê řeşe.*

**S. 9** *1 Çî qendîla geşe,*
*2 Nazilbûye ji E'rşe,*
*3 Dergevan şêx[478] Fexrê řeşe.*

**S. 10** *1 Çi qendîleke mezine,*
*2 Řehim û şefeqet P'adşê mine,*
*3 Ewî jê çêkir melîk şêx Sine.*

**S. 10** *1 Çî qendîla mezine,*
*2 Bi řehim şefeqet P'adşayê mine,*
*3 Ewî jê çêkir melîk şêx Sine.*

**S. 11** *1 Melîk şêx Sin dibêjit: «Wekî dinya av bû,*
*2 P'adşê min li nav bû,*
*3 Ew k'î mêr li ber řawesta bû?»*

**S. 11** *1 Mêra ji melik şêx Sin pirsîye: «Wekî dinya av bû,*
*2 Darek di nav bû*
*3 Ew k'îjan mêr bû, li ber řawesta bû?»*

**S. 12** *1 Mêra ji melik şêx Sin pirsî ye,*
*2 Ew şêx Sinê îbn Adî ye:*
*3 «Te zerb û hiner û k'eremetêt P'adşê xwe çawa dî ye?»*

**S. 12** *1 Melik şêx Sin dibêje,*
*2 Ew şêx Sinê îbn Adî ye:*
*3 «Zerib û k'eremeta P'adşayê xwe gelek dî ye?»*

**S. 13** *1 Wê dibêjit melik şêx Sinê Adî:*
*2 «Min zerb, û hiner û k'eremetêt P'adşê xwe dî,*
*3 Ĥemû cara bi navê silt'an şêx Adî».*

**S. 14** *1 Ji qewlê şêx Fexrê zergûne,*
*2 Pirs biken ji Melikê Bêrune[479],*
*3 Gelo çawa ev e'zman řawestabû bê stûne?*

**S. 17** *1 Ew qewle, qewlê melik Fexredînê zergûne,*
*2 Pirs biken Melikê[480] Bêrune,*
*3 Gelo e'zman çawa řawestabû bê stune[481]?*

**S. 15** *1 Melik Fexredîn we dikire řaye,*
*2 Ewî û herçar biraye,*
*3 Vêk řa diken t'ebaye,*
*4 Go: «Stûna e'zman řawestabû bi dua'ye».*

**S. 18** *1 Wê dibêje melik Fexredînê Adî:*
*2 «Ew herçar bira t'eva yî,*
*3 Řada ne bi hevra yî,*
*4 Di bê stune e'zman řawesta bû bi dua' yî».*

**S. 16** *1 Şêx Adî hate Ĥeq ware[482],*
*2 Sicûdebû ber û dare,*

---

[478] *şê*
[479] *beyrûn*
[480] *melek*
[481] binêr: *stûn*
[482] *Hekar*

*3 Şêx Adî li nav mêra serdare.*

**S. 13** *1 Şêx Adî li Ĥeq warê bû,*
*2 Dar û ber sicude pê bû,*
*3 Dilê E'deviye pê xweş bû.*

**S. 17** *1 Şêx Adî hate Lalişe,*
*2 Xemilî bi xerqê r̂eşe,*
*3 E'deviye*[483] *ĥal pê xweşe.*

**S. 14** *1 Şêx Adî hat Lalişe,*
*2 Xemilî bi xerqê r̂eşe,*
*3 Dilê E'deviyan pê xweşe.*

**S. 18** *1 Şêx Adî li Lalişê bû,*
*2 Xemilî bi xerqê r̂eş bû,*
*3 E'deviyan ĥal pê xweş bû.*

**S. 15** *1 Şêx Adî li Lalişê bû,*
*2 Xemilî bu, bi xerqê r̂eş bû,*
*3 Dilê E'deviyan pê xweş bû.*

**S. 19** *1 Ev dinya, dinya ye zere,*
*2 Bin Adem têda yî bê bawere*[484]*,*
*3 Meferê me ma şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 16** *1 Ev dinya, dinyaye zere,*
*2 Bende têda bê bawere,*
*3 Meferê me, male şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 20** *1 Ev dinya, dinyayeke mezine,*
*2 Kêm bûn alîm û momine,*
*3 Meferê me ma melik şêx Sine.*

**S. 20** *1 Çî qendîla mezine,*
*2 Kêm bûn alîm û momine,*
*3 Meferê me mabû melik şêx Sine.*

**S. 21** *1 Ev dinya, dinyayeke bi cîde,*
*2 Xof û r̂ehim ne ma li dilê mirîda,*
*3 Meferê me ma silt'an Êzîde.*

**S. 19** *1 Ew qewle, qewlekî bi cîde,*
*2 Xof ne ma di dilê mirîde,*
*3 Meferê me mala silt'an Êzîde.*

**S. 22** *1 Bedîl borîn, min weha dî,*
*2 Dê dahirbit Şerfedîn il-Mehdî,*
*3 Meferê me ma silt'an şêx Adî.*

**S. 23** *1 Ji qewlê p'îr R̂eşê Ĥeyrane,*
*2 Hincîyê bi r̂astî û dirusî dest p'avête damana yarû birane,*
*3 Dayîm merk'eba wî li beĥrêt giran melevane.*

**S. 24** *1 Ji qewlê p'îr R̂eşê bi cîde,*
*2 Dibêjme we gelî mirîde,*
*3 Me dîn — Şerfedîn, atqat — silt'an Êzîde.*

*Emî di kêmin, şêx Adî t'emame!*
*Emî di kêmin, Xwedê û şêx Adî t'emamin!*

---

[483] *E'dewiye*
[484] *bewer*

# 21. QEWLÊ SEFERÊ[485; 486; 487]

**S. 1** *1 R̂ojekê ez sefer bûm,*
*2 Li ber xilmeta P'adşê xweyî mezin bûm,*
*3 Li deft'era melek Fexredîn der bûm.*

**S. 1** *1 Ez r̂ojekê sefer bûm,*
*2 Ber xilmeta P'adşê xweyî Ekber bûm,*
*3 Deft'era melik Fexredîn der bûm.*

**S. 1** *1 R̂ojekê ez sefer bûm,*
*2 Li xilmeta P'adşê xoyî Ekber bûm,*
*3 Li deft'era melek Fexredîn ezî bi derdbûm.*

**S. 2** *1 Dihizirîm li wê deft'erê,*
*2 Bi dest, û p'ê, û ser, p'erweste dibime berê,*
*3 Lew gehîşte min ji wê sur̂ê[488].*

**S. 2** *1 Fikirîm li wê deft'erê,*
*2 Û dest û p'ê û serê sicûde dibeme berê,*
*3 Lew gehişte min ji wê ger̂ê.*

**S. 2** *1 Fikirîm li wê deft'erê,*
*2 Li dest û p'ê û serê,*
*3 Sicûdeyê dibeme berê.*

**S. 3** *1 P'adşê minî li xewleye,*
*2 Ew bi t'u kesî ne ĥewceye,*
*3 Min te k'are ji mêrê bi e'deb, û îman, û heyaye.*

**S. 4** *1 P'adşê min xewluye,*
*2 Ew bi kesî ne yî ĥewcuye,*
*3 Minetk'are ji mêrê bi e'deb, yî bi îman, û bi ĥeya.*

**S. 4** *1 P'adşê min li xewleye,*
*2 Bi kesî neyî ĥewceye,*
*3 Ewî minetk'are ji mêrê bi îman û ĥeya.*

**S. 4** *1 Gelî bira, li we dikim şîretê,*
*2 Hencî bi r̂astî bike xilmetê,*
*3 Ew dê li P'adşê xwe bike minetê.*

**S. 3** *1 Gelî bira ez li we dikem nesîĥetê,*
*2 Û çî mêrê bi r̂astî biket xilmetê,*
*3 Ew dê bi P'adşê xwe [di]ket minetê.*

**S. 3** *1 Gelî bira, li we dikem nisĥetê,*
*2 Hencî mêrî bi r̂astî biket xilmetê,*
*3 Dê li P'adşê xo ket minnetê.*

**S. 5** *1 Gelî bira, heke we divêt cilê imanê bikne bere,*
*2 Bi r̂astî mala xwe bike sefere,*
*3 Mêrê bê şerm ew kere.*

**S. 5** *1 Gelî bira, heke we divêt lib[a]sê îmanê bikene bere,*
*2 Dê bi e'deb bi mala xwe ken sefere,*
*3 Mêrê bê ĥeya, navê wî k'ere.*

**S. 5** *1 Gelî bira, heke we divêt lib[a]sê îmanê bikene bere,*
*2 Dê mala xo e'deb kene sefere,*
*3 Mêrê bê ĥeyayî nezan û k'ere.*

---

[485] [50] (rr. 229-233)
[486] *Qewlê Ez r̂ojekê sefer bûm* [2] (rr. 528–533)
[487] Lalish (A+K) 18-19 *Qewlê Ez r̂ojekê sefer bûm* (rr.174-178)
[488] *sur*

**S. 6** *1 Mêrê bê şerm ew gemare,*
*2 Şîret pê nabe ĉare,*
*3 Hostayê wi zixte û dare.*

**S. 6** *1 Mêrê bê ĥeya, navê wî «ĥimare»,*
*2 Şîret lê nabit ĉare,*
*3 Hostayê wî zixte û dare.*

**S. 6** *1 Mêrê bê ĥeyayî nezan û ĥîmare,*
*2 Şîret lê naken ĉare,*
*3 Hostayê wî zixte û dare.*

**S. 7** *1 Gelî bira, heke we li vê wateyê bipirsî,*
*2 Dê zebûn bin, şkestî,*
*3 Ew dê bi hefsar bin, serva bestî.*

**S. 7** *1 Gelî bira, heke we bivêt me'nîya bipirsî,*
*2 Dê zebûn bin şkestî,*
*3 Û dê bi hefsar bin ser va bestî.*

**S. 7** *1 Gelî bira: Yê bivêt li me'nîya bipirsî*
*2 Dê yî zebûn bit yî şkestî,*
*3 Dê yî bi hefsar bit û serî bestî.*

**S. 8** *1 Melek Fexredîn xweş delîle,*
*2 Ȓawestabû li qendîle,*
*3 Ewî hêvên da Adem, Nûh û Birahîm Xelîle.*

**S. 8** *1 Melik Fexredîn xweş delîle,*
*2 Ew sekinî li qendîle,*
*3 Ewî hêvên da Adem, û Nuĥ, û Birahîm il-Xelîle.*

**S. 9** *1 Gelî bira, ji wan nebin ser berdaye,*
*2 Win binêrin Cûdî û çendî çiyaye,*
*3 Cûdî zebûnî kêşaye,*
*4 Lew keştiya Nûh li ser ȓawestaye.*

**S. 9** *1 Ji wan nebin ser berdaye,*
*2 Hûn biȓêne Cudî û çendî ĉiyaye,*
*3 Cudî zebûnî k'êşaye,*
*4 Lew sefîna Nuĥ ço li ser ȓawestaye!*

**S. 8** *1 Gelî bira: ji wan nebin serberdaye,*
*2 Tû biȓêne Cûdî û çendî çiyaye,*
*3 Cûdî zebûnî kêşaye,*
*4 Lew sefîna Nuĥî hat û li ser ȓawestaye!*

**S. 10** *1 Ewan k'arkiribûn sefîne,*
*2 Wê têda suȓeke nûrîne,*
*3 Ew suȓa xweşewîst melek Fexredîne.*

**S. 10** *1 K'arkir sefîne,*
*2 Wate da suȓeke nûrîne,*
*3 Yeqîn[489] ew suȓa e'zîz melik Fexredîne!*

**S. 11** *1 Melek Fexredîn wa bi keştiyêre,*
*2 Ewî avête ji mê û nêre,*
*3 Melek Fexredîn bû delîl, û digêȓe.*

**S. 11** *1 Melik Fexredîn bi sefînê ȓa*
*2 Ewî havêtê ji nêr û mêye,*
*3 Melik Fexredîn bû delîl û digêȓa.*

**S. 12** *1 Melek Fexredîn ȓêzanekî e'rife[490],*

[489] *êqîn*
[490] *ê'rif*

*2 Ew ji duȓan[491], perçan sedefe,*
*3 Melek Fexredîn zane k'î Bêye û k'î Elêfe.*
**S. 12** *1 Melik Fexredîn delîlekî e'rife,*
*2 Ew ji duȓan bircan sedefe,*
*3 Ew dizanit k'î Bê ye, k'î Elife.*

**S. 13** *1 Melek Fexredîn ȓêberekî çê ye,*
*2 Ew ȓêberê çendî ȓê ye,*
*3 Melek Fexredtn zane Ĥesenî ji hisnê ye.*
**S. 13** *1 Melik Fexredîn delîlekî çê ye,*
*2 Û ȓêberê çendî rê ye,*
*3 Melik Fexredîn dizanit Ĥesenî ji hisnê ye.*

**S. 14** *1 Ĥesen ji hisnê[492] p'eyda bû,*
*2 Ȓoniya wî li qendîlê ȓawesta bû,*
*3 Bi evîna şêxê Ĥesen şa bû.*
**S. 14** *1 Ĥesen ji hisnê peya dibû,*
*2 Nûra wî li qendîlê ȓawesta bû,*
*3 Bi muĥbeta şêxê Ĥesen şa bû.*

**S. 15** *1 Şabû ji wê muĥbetê,*
*2 Li e'zmana kire şêxê sinetê,*
*3 Li e'rdê hêz da me û gelî sinetê.*
**S. 15** *1 Şa bû ji wê muĥbetê,*
*2 Û ewî qewat da nebîyê ometê,*
*3 Ew li e'zmana suȓa şêxê sinetê.*

**S. 16** *1 Ji ba zebûna[493] hatî cewabe,*
*2 Go xweyanbit[494] zor sehabe,*
*3 Hêvênê wan ji ba melek şêx Sinê bi wabe.*
**S. 16** *1 Ji ba zebûna hatî ciwabe,*
*2 Ku dê dahirbit zor sehabe,*
*3 Hêvênê wan ji ba melik şêx Sinê biwabe.*

**S. 17** *1 Ji ba zebûna hatibû xebere*
*2 Go dê xweyanbe zor p'êẍembere,*
*3 Hêvênê wan ji ba melek şêx Sinê bi cehwere.*
**S. 17** *1 Ji ba zebûna hatî xebere,*
*2 Ku dê dahi bit zor p'êẍembere,*
*3 Hêvênê wan ji melik şêx Sinê bi cehwere.*

**S. 18** *1 Melek şêx Sinê cehwerdarê çendî cehwere,*
*2 Ȓoniya wî ji qendîla dihate dere,*
*3 Ewî nav lê dana, gotê: «Tuyî p'êẍembere».*
**S. 18** *1 Melik şêx Sin cehwerdarê çendî cehwera,*
*2 Nûra wî ji qendîla dihate dere,*
*3 Ewî nav lê dana, gotê: «Tuyî p'êẍembere!»*

**S. 19** *1 Melek şêx Sinê p'iȓ hêjaye,*
*2 Bi ȓoniya wî guȓiyabû ĉiraye,*
*3 Ew li ba me p'iȓ buhaye.*

**S. 19** *1 Ji ba melekêt e'zman hatî ciwabe,*
*2 Ku dê dahirbit zor sehabe,*

[491] *dur*
[492] *husin*
[493] *zibûn*
[494] *xuyabit*

*3 Hêvênê wan ji bo şêx Şemsê biwabe.*

**S. 20** *1 Bangçî wê diçine ser minare,*
*2 Wê dikin gazî û haware,*
*3 Ew suȓa şêx Sin bû, gel çiqas yare.*

**S. 20** *1 …… ……………….kirbû minaret,*
*2 Diçine ser, diken gozî û haware,*
*3 Ew suȓa şêx Şemse li gel çiqas*[495] *yare.*

**S. 21** *1 Bangçî wê diçine ser derave,*
*2 Ewe suȓa melekêd e'zmîn, cewabe,*
*3 Ew suȓa şêx Şims bû, gel çiqas sehabe.*

**S. 21** *1 Bangekî diçine ser derava,*
*2 Ew suȓa melekêt e'zman ciwabe,*
*3 Suȓa şêx Şemse li gel çiqas sehaba.*

**S. 9** *1 Gelî bira: Li dine nebin tema,*
*2 Zêr û mal neken cema,*
*3 Ew dinya bo p'êx̃emberêt Xudê nema.*

**S. 22** *1 Gelî bira, win tima nebin li vê dinê,*
*2 Zimanê xwe kurt bikin ji gotinê,*
*3 Da win ji t'elpa nemînin bi t'inê.*

**S. 22** *1 Gelî bira, hûn tema nebin li vê dinê,*
*2 Û zimanê xwe kuȓtken ji gotinê,*
*3 Da ji t'elpa*[496] *nemînin bi t'ine.*

**S. 10** *1 Gelî bira: tema nebin li dinê,*
*2 Zimanê xo kurtken ji gotinê,*
*3 Da ji telpa nemînin bi tinê.*

**S. 23** *1 Hencî mêrê mabû ji t'elpêye,*
*2 Dê lê kurt bin dest û p'êye,*
*3 Ew t'u*[497] *carî ȓê nabin ser ȓêye.*

**S. 23** *1 Mêrê mabû ji telp'ê ye,*
*2 Dê lê kuȓt bin dest û p'ê ye,*
*3 Dêmînit, rê nabete ser çu ȓê ye.*

**S. 11** *1 Henjcî mêrê mabû ji t'elpêye,*
*2 Dê lê kurt bin dest û p'êye,*
*3 Dêmînit, ȓê nabete ser çu ȓêye.*

**S. 24** *1 Hencî ji ȓêya ola xwa dur dik'ete,*
*2 Di serî de namîne çi dewlete*
*3 Qumaşê wî dimîne bê qîmete.*

**S. 24** *1 Hincîyê ȓêya mesebê xwe biket xilmete,*
*2 Li serî namînit dewlete,*
*3 Qumaşê wî dêmînin bê qîmete.*

**S. 12** *1 Hencîyê ȓêya dînê xo biket xelete,*
*2 Di serî namînit dewlete,*
*3 Qumaşê wî dêmînit bê qîmete.*

**S. 25** *1 Qumaşê wî dimîne bê buhaye,*
*2 Pêve nanêre çu hostaye*
*3 Xwedan kewgirî, damaye.*

**S. 25** *1 Qumaşê wî dêmînin bê beha ye,*
*2 Pêve naȓênit çu hosta ye,*

[495] *çîqa*
[496] *talip*
[497] *t'i*

*3 Xwedanî k'ewgirîye, dama ye.*

**S. 13** *1 Qumaşê wî dimîne bê behaye,*
*2 Pêve nar̂ênin çu hostaye,*
*3 Xudan ji ber yî kewgirî damaye.*

**S. 26** *1 Win t'emen bidine qumaşî,*
*2 Bidne destê bendel û başî,*
*3 Heke yê bê kêmasî be, dêçite ser bazareke başî.*

**S. 26** *1 Hûn temen biden qumaşî,*
*2 Bidene destê bende li başî,*
*3 Heke yî bê êbe, dêçite ser bazareke başî.*

**S. 14** *1 Hûn t'emam biden qumaş,*
*2 Bidene destê mendelbaş,*
*3 Heke yê bî êbe, dêçite ser bazare baş.*

**S. 27** *1 Qumaşa bibin û biger̂înin,*
*2 Bibine ba xewaca da bibînin,*
*3 Heke yî bê kêmasî be, ew dê bi serê xwe hilînin.*

**S. 27** *1 Qumaşî bidene destê delala, bila biben û bigêr̂înin,*
*2 Bibene nik, xwaceyî[498] bibînin,*
*3 Heke yî bê êbe, ew dê bi serê xwe hilînin.*

**S. 15** *1 Qumaşî bidene destê delala da biben û biger̂înin,*
*2 Bibine ber xwaca da bibînin,*
*3 Dê bi xo çinê û serê xo hilînin.*

**S. 28** *1 Ji ew paş birne ser sera xwedanê firoşe,*
*2 Heke hate ser te bazarek boşe,*
*3 Li xwe zêde neke, da li te nebe bê noşe[499].*

**S. 28** *1 Hew paş birime ser sur̂a xwedanê firoşe,*
*2 Heke hate ser te bazareke boşe,*
*3 Li xwe zêde neke, da li te nebite bê noşe.*

**S. 16** *1 Ji ew paş birme ser sêra firoşe,*
*2 Heke hate ser te bazareke boşe,*
*3 Zêde neke li te nebit bê inoşe.*

**S. 29** *1 Li xwe zêde neke buhaye,*
*2 Muhteşem li ser r̂awestaye,*
*3 Da li te giran nebin yarû biraye.*

**S. 29** *1 Tu xwe zêde neke beha yî,*
*2 Û «mihtesin», li ser r̂awesta yî,*
*3 Da ji te gîro nebin yarû bira yî.*

**S. 17** *1 Li xo zêde neke behaye,*
*2 Dê bi çengilê we kirin û bene ber şira'ye,*
*3 Da sibe î li axretê we tegîro nebin bawû biraye*

**S. 30** *1 Gelî bira, bejme we dawî bedîle,*
*2 Xezîne bûne bi k'ilîle,*
*3 Da sinetxane nemîne sêfîle.*

**S. 18** *1 Yar û bira dibejin: axirî bedîle,*
*2 Li xezîna den k'ilîle,*
*3 Da sunet nemînit sêfîle.*

**S. 30** *1 Da ji te gîro nebin yarû birane,*
*2 Û bi çengilê te negirin, te nebene ber şire'ne,*
*3 Ew axir bedîle, û xizîna bibin k'ilîla,*

---

[498] binêr: *ĥac*
[499] e*noş*

*4 Sinet çend têtîye sefîle.*

**S. 31** *1 Ez bêjme we yarû birane,*
*2 Li ba wan, we xweyane,*
*3 Bawerkin wê r̂abe t'ofane.*

**S. 19** *1 Dibêjime we: yar û birane,*
*2 Ew bedîla e'rif û nuĥ û keneane,*
*3 Li ba wan e'yane êqîn dê r̂abit t'ofane.*

**S. 32** *1 Çi t'ofaneka wek qîre,*
*2 Neyar li me bûne şêx û p'îre,*
*3 Kes nema xilmeta P'adşê netê bîre.*

**S. 20** *1 Çî t'ofaneka k'ibîre,*
*2 Xelkê dijmin li me dibûn şêx û p'îre,*
*3 Lew xilmeta P'adşayî naête bîre.*

**S. 31** *1 Li ba wan we e'yane,*
*2 Yeqîn dê r̂abit t'ofane,*
*3 Çî t'ofaneke K'ibîre,*
*4 Xelqê[500] dijmin wê li me bûyîne wek şêx û p'îre.*

**S. 32** *1 Şêx û p'îr û mirîd,*
*2 Û li ĥed meĥed ma nirîd,*
*3 Anit almifir ya silt'an Êzîd.*

**S. 21** *1 Şêx û p'îr û mirîd,*
*2 Iĥed li iĥed maîrîd,*
*3 Inite li mefer ya silt'an Êzîd.*

**S. 33** *1 Ya silt'an Êzî, me bi te mefere,*
*2 Li wê dîwanê li wê civatê were,*
*3 Xweşewîstê min, sinetxane li mixatire.*

**S. 33** *1 Silt'an Êzîd mefere,*
*2 Li wan bestî mehfale[501],*
*3 Sinetxane li "mixatire".*

**S. 22** *1 Ya silt'an Êzî, me bi te mefere,*
*2 Li wê dîwanê, li wê mehderê were,*
*3 Sunet k'eftî muxatire.*

**S. 34** *1 Xweşewîstê mino, ji mêjve k'eftime ber wê xilmetê,*
*2 Hey P'adşê mino, yê dinê û axretê,*
*3 Qence xilmetk'arê xwe bixwîne xilmetê.*

**S. 23** *1 E'zîzê mino, ji mêje k'eftime ber wê xilmetê,*
*2 Hey P'adşê mino, yê dinê û axretê,*
*3 Qence xilmetk'arê xo bixunî e xilmetê.*

**S. 35** *1 Banga mine xwedanê Ĥeq warê[502],*
*2 P'adşê mino, ji ber me hilîne vê fikarê,*
*3 Da tiwafkin Zimzimê digel k'af û mix̂arê.*

**S. 34** *1 Banga mine xwedanê Ĥeq warê,*
*2 E'zîzê mino, li ber hilîne vê fiqarê,*
*3 Tu hawekê bide ber sinîya da bêne Lalişê vê care.*

**S. 24** *1 Banga mine xudanê Heqarê,*
*2 E'zîzê mino ji ber me hilîne wê fikarê,*
*3 Da tuafkeîn Zimzimê digel k'af û mix̂arê.*

[500] *xelk*
[501] *meĥfel*
[502] *Hekar*

**S. 36** *1 Banga mine melek şêx Sinê bi wabe,*
*2 Xweşewîstê min, zû li mehdera me r̂abe,*
*3 Mala me û siniya meke xirabe.*

**S. 36** *1 Banga min melik şêx Sinê biwabe,*
*2 E'zîzê min, li vê mehderê r̂abe,*
*3 Da male li sinetê nekeyî xirabe.*

**S. 25** *1 Banga min melek şêx Sinê bewabe,*
*2 E'zîzê min li vê mehderê r̂abe,*
*3 Malê li me û sunetê neke xirabe.*

**S. 37** *1 Banga mine ji şêx Şems bi saf û tirsî,*
*2 Bi r̂oniya xwe xemilandbû E'rş û K'ursîy,*
*3 Xweşewîstê min, tu li mala me u siniya bipirsî.*

**S. 35** *1 Banga min şêx Şemse,*
*2 Bi nûra xwe zeyînandbû E'riş û K'ûrse,*
*3 Hawekê bide sinîya da bêne Lalişe.*

**S. 26** *1 Banga min Şêşimse,*
*2 Bi nûra xo zeyînandbû E'riş û K'ûrse,*
*3 Tu hawekê bide sunîya bêne Lalişe.*

**S. 38** *1 Banga mine şêx Fexrê Adî ya,*
*2 Ew serafê duran û hindî ya,*
*3 Xweşewîstê min hawekî bide ser me û sinî ya.*

**S. 37** *1 Banga min şêx Fexrê Adiya,*
*2 Ew serafê dur̂an û hindîya,*
*3 Tu hawekê bide ser me û sinîya.*

**S. 27** *1 Banga mine şêx Fexrê Adîya,*
*2 Tuyî serafê dur̂an û hindîya,*
*3 Tu hawekê bide me sunîya.*

**S. 39** *1 Sinetê em sotin bi vî kirasî,*
*2 Ew hind di zebûnin, hind di p'exwasî,*
*3 R̂astiya Êzî û Tawisî melek' bikine nasî.*

**S. 38** *1 Sinî sotin li bin vî kirasî,*
*2 Û hind di zebûnin, hind di p'êxwasin,*
*3 Ewan bi ĥeq r̂êya şêx Adî di ser xwe r̂a nasî.*

**S. 28** *1 Sunî sotin li vî kirasî,*
*2 Hind bi zebûnî, hind bi p'êxwasî,*
*3 Mestim ji wê k'asê, ya ĥeqîya Êzî û Tawisî melek' binasî.*

**S. 40** *1 Ew bû k'asa nûrîne,*
*2 Dabû mêra bi nehîne,*
*3 Hindek pê dibûn leşkerêd silt'îne,*
*4 Hindek pê dibûne sewda û dîne.*

**S. 39** *1 Ew bû k'asa nûrîne,*
*2 Û da mêra bi nehîne,*
*3 Hindek pê dibûne cindîyêt silt'îna,*
*4 Hindek pê dibûne mecnun, sewdaser, li vê dinyayê di dîne.*

**S. 29** *1 Ew bû k'asa nûrîne,*
*2 Dabû e mêra bi nehîne,*
*3 Hindeka vedixwar, pê dibûn cindîyêt silt'îne,*
*4 Hindeka vedixwar, pê dibûn dîne.*

**S. 41** *1 Ew bû k'asa ji dêr,*
*2 Avgêr̂ bi xwe hêzdêr,*
*3 Pê haldar bûn mêr.*

**S. 40** *1 Ew bû k'asa ji dêr,*
*2 Û saqî bi xwe Cebêr,*

*3 Pê ĥaldar bûn mêr.*

**S. 30** *1 Ew bû k'asa ji dêre,*
*2 Saqî bi xo Cebêre,*
*3 Pê ĥaldar dibûn mêre.*

**S. 42** *1 Mêr pê dibûn haldare,*
*2 Wê dikin gazi û haware,*
*3 Xwedê êke û navê wî ĥezare.*

**S. 41** *1 Mêr pê ĥaldar bûn,*
*2 Û ewan gazî û hawar bûn,*
*3 Şêx Adî yeke û nave wî hazar bûn.*

**S. 31** *1 Mêr pê dibûn haldare,*
*2 Wê diken gazi û haware,*
*3 Xudê êke û navêt wî ĥezare.*

**S. 43** *1 Ji qewlê miskîno Jare,*
*2 Henjî gotina vî qewlî bêtin înk'are,*
*3 Li axretê bora vedwestî, dojeh û are.*

**S. 44** *1 Ji qewlê xweşewîst melek Fexredîne,*
*2 Henjî r̂amana, şêx Adî bêtin behwêr li yeqîne*[503]*,*
*3 Ciyê wî li ba melekê dojêh nîne.*

**S. 42** *1 Ji qewlê miskîno Jaro,*
*2 Û sed r̂eĥme li dayîk û babêt guhdare,*
*3 Ne li xelqê nivistî, li xelqê şîyare.*

**S. 32** *1 Ji qewlê miskîno Jaro,*
*2 Hincîyê li qewlêt Şîxadî û deft'era melik Fexredîn biket inkare,*
*3 Dê li axretê bor̂a vejwêrin dojê û nare.*

*Em kemin, Xwedê t'emame!*

*Em di kêmin, Xwedê t̓emame!*

*Em di kêmin û Xudê yî t̓emame!*

## 22. QEWLÊ ZEBÛNÎ [DIL] MEKSÛR[504; 505; 506; 507]

**S. 1** *1 Her zebûnekî dil meksûre,*
*2 [Heger] Ji ba e'zîz melik Fexredîn bihata destûre,*
*3 Dê medhê*[508] *bideyn ji beĥrêt k'ûre.*

**S. 1** *1 Zebûnykî dil meksûre,*
*2 Heke ji ba melik Fexredîn bêtin desture,*
*3 De pesna deyn ji beĥrêt*[509] *k'ûre.*

**S. 1** *1 Çi zebûnekî*[510] *meksûre*[511]*,*
*2 Bal e'zîz melik*[512] *Fexredîn bihata destûre,*
*3 Minê medih*[513] *bidana beĥrê*[514] *k'ûre.*

[503] *êqîn*
[504] [2] (rr. 161–170); [1] (pp. 57–65)
[505] [50] (rr.114-120)
[506] [31] *Qewlê zebûn* (rr. 44–48)
[507] Laliş 25 *QEWLÊ ZEBÛNÎ MEKSUR* (rr. 127–130)
[508] *medh*
[509] *beĥrêd*
[510] *zebun*
[511] *mesûr*
[512] *melî*
[513] *met'ĥ*
[514] *be'r*

**S. 2** *1 Her zebûnekî kêm t'aqete,*
*2 [Heger] ji ba e'zîz melik Fexredîn bibata îcazete,*
*3 Beĥrêt giran em bideyn wesfete*[515].

**S. 2** *1 Zebûnykî kêm t'aqete,*
*2 Heke ji ba melik Fexredîn bêtin îcazete,*
*3 Dê ji beĥrêt k'ûr deyn wesfete*[516].

**S. 2** *1 Çi zebûnekî kêm t'aqete,*
*2 Bal e'zîz melik Fexredîn bihata îcazete*[517],
*3 Minê beĥra emekê*[518] *bida zor wesfete.*

**S. 3** *1 Li min cema' dibûn babzere,*
*2 Ji beĥrêt giran em bideyn xebere,*
*3 Tê heyne dur̂*[519] *û cewhere.*

**S. 3** *1 Li min cema dibûn babzere,*
*2 Dê ji wê beĥrê deyn xebere,*
*3 Ewê beĥrê tê heyne dur̂ û cewhere.*

**S. 3** *1 Cema' bûn zerbabe,*
*2 Wê beĥrê bidin cebabe,*
*3 Têda hene dur̂ û cewhere*[520].

**S. 4** *1 Li min cema' dibûn zerbabe,*
*2 Ji beĥrêt giran bideyn t'ebabe,*
*3 Beĥrêt giran mîr di nave.*

**S. 4** *1 Li min cema' dibûn zerbabe*[521],
*2 Dê ji wê beĥrê deyn t'ebabe,*
*3 Beĥre û dur̂a mîr di nave.*

**S. 5** *1 Medhê bidin kitîr*[522],
*2 T'extê lê dibû mîr,*
*3 Ewî ilm, ewî besîr.*

**S. 5** *1 Pesna neken ji bîr,*
*2 T'extê lê dibû emîr,*
*3 Ew qet ji bîr nake belengaz û êxsîr.*

**S. 4** *1 Medha bidin kitîr*[523],
*2 T'extê te lê emîr,*
*3 Ya R̂ebî, tî Te'alî*[524], *tî Besîr.*

**S. 6** *1 Wekî P'adşayî li dur̂ê bû,*
*2 Ĥisnetek*[525] *jê cihê bû,*
*3 Şaxa muĥbetê ava bû.*

**S. 6** *1 P'adşe min dur̂ jê bû,*
*2 Xweşiyek jê çêbû,*
*3 Şaxa muĥbetê jê bê.*

**S. 7** *1 Pê ava bû şaxa muĥbetê,*
*2 Serê silt'an Ezî t'aca dewletê,*
*3 Li t'iliya wî gustîla qudretê,*
*4 Şikir em havêtîne ser pişka sinetê.*

**S. 7** *1 Jê bû şaxa muĥbetê,*

---

[515] *usfet*
[516] *osfet*
[517] *e'cazet*
[518] *e'miq*
[519] *dir̂*
[520] *cewar*
[521] *zirbab*
[522] binêr: *kitir*
[523] *k'ivîr*
[524] *e'gali*
[525] *ĥisîyatek*

*2 Li destê silt'an Êzî heye gustîla qudretê,*
*3 Em havetine ser pişka sinetê.*

**S. 8** *1 Aşiqa mîr dî, kir nase,*
*2 Jêk vavartin zembîl û k'ase,*
*3 Kirin r̂ik'inê çendî e'sase.*

**S. 8** *1 Asiqa ew mîr dît û kir nase,*
*2 P'adşaye, û muĥbete, û k'ase,*
*3 Kire r̂ik'inê*[526] *çendî e'sase.*

**S. 5** *1 Xasa mîr dît, kire nase,*
*2 P'adşaye*[527] *— dur̂e, muĥbete*[528] *— k'ase,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî e'sase*[529].

**S. 9** *1 Kirin r̂ik'in û r̂ik'inî,*
*2 Dur̂ bi ĥeybetê hincinî,*
*3 T'aqet nema hilgirî.*

**S. 9** *1 Kire r̂ik'in û r̂ik'inî,*
*2 Dur̂ ji ĥeybetê hincinî,*
*3 Hêz nemabû bisebirî.*

**S. 6** *1 Kirin r̂ik'in, r̂ik'inî,*
*2 Dur̂ ji ĥeybeta*[530] *hincinî,*
*3 Sor bû, sipî bû, sefirî.*

**S. 10** *1 T'aqet nema bi sebirî,*
*2 Zor bi r̂enga xemilî,*
*3 Sipî bû, sor bû, sefirî.*

**S. 10** *1 Hêz nemabû hilgirî,*
*2 Dur̂ bi r̂enga xemili,*
*3 Sor bû, sipî bû, bû zerî.*

**S. 11** *1 Dur̂ bi xemilî geş bû!*
*2 Wekî ne e'rd bû, ne e'zman bû, ne E'rş bû,*
*3 Hingî P'adşê min bi k'ê r̂a xweş bû?*

**S. 7** *1 Sor bû, sipî bû, sefirî, geş bû,*
*2 Ne e'rd bû, ne e'zman bû, ne E'rş bû,*
*3 P'adşayê min k'ê r̂a k'êfxweş bû?*

**S. 1** *1 Berî ne e'rd hebû, ne e\zman hebû, ne e'rş bû,*
*2 K'a bêje min P'adşê min bi k'ê r̂a xoş dibû?*

**S. 8** *1 P'adşayê min k'ê r̂a herê kir,*
*2 Şaxa muĥbetê lê kir,*
*3 Ĥesiniya xwe cihê kir.*

**S. 9** *1 Lê kiriye şaxa muĥbetê,*
*2 Dest avîte qelema qudretê,*
*3 Hew paş va şêxê ometê.*

**S. 10** *1 P'adşaye min hikmê xweyî girane,*
*2 Danîbû nav wan zor erk'ane*[531]*,*
*3 Go: «Xerzê*[532] *nûrî çi nîşane?»*

**S. 12** *1 P'adşê min dur̂ ji xwe cihê kir,*

[526] *r̂ikn*
[527] *Patşa*
[528] *mobet*
[529] *asas*
[530] *hêbet*
[531] *mekan*
[532] *xerc*

*2 Bi yarekî r̂a here*[533] *kir,*
*3 Xerqê nûranî çêkir.*

**S. 13** *1 Xerqê nûranî babe,*
*2 Dur̂ û cewher kir nave,*
*3 Yek — e'yne û yek — ĉave.*

**S. 17** *1 Xerze nûrî babe,*
*2 Du cewher k'eftine nave,*
*3 Êk — zimane, êk — çave.*

**S. 11** *1 Xezcê nûrî bave*[534]*,*
*2 Du cehwer*[535] *hatine nave,*
*3 Yek — e'yne*[536]*, yek — ĉave.*

**S. 8** *1 Ẍerzê nûrî babe,*
*2 Du cehwer k'eftine nave,*
*3 Êk — e'yne, êk — ĉave.*

**S. 14** *1 Yek — e'yne û yek —besere,*
*2 P'adşê min dabû dur̂ê nedere,*
*3 P'adşa dizane k'î li bere, k'î li sere.*

**S. 18.** *1 Êk — ĉave, êk — besere,*
*2 P'adşê min da dur̂î bi nedere,*
*3 P'adşa dizanit k'î li sere, k'î li bere.*

**S. 12** *1 Yek — e'yne, yek — beşere,*
*2 P'adşayê min dabû*[537] *dorê xebere,*
*3 P'adşaye min zane k'ê li sere, k'ê li bere.*

**S. 9** *1 Êk — e'yne, êk — besere,*
*2 P'adşê min da dur̂ê bi nedere,*
*3 P'adşa dizanit k'î li sere, k'î li bere.*

**S. 15** *1 P'adşê min xweş kir suhbete,*
*2 P'adşa û k'ase, û muĥbete,*
*3 Ewan çêkirbû ĥed u sede,*
*4 Lêk r̂uniştin muĥbete.*

**S. 11** *1 P'adşê min xweş suhbete,*
*2 Lek r̂ûniştibûn muĥbete,*
*3 P'adşê min li wêderê çêkir ĥed û sede.*

**S. 2** *1 P'adşê min kir xoş suĥbete,*
*2 Lêk r̂ûniştibûn muĥbete,*
*3 P'adşê min li wê derecê kir ĥed û sede,*

**S. 16** *1 Ĥed û sed çêkir,*
*2 Ĥeqîqet û şe'rîe't*[538]*jêk cihê kir,*
*3 Sinetxane mixfî bû, dahir kir.*

**S. 12** *1 P'adşê min ĥed û sed li wê çêkirî,*
*2 Şeri'et û ĥeqiqet jê cihê kirî,*
*3 Sineta vegatrî bû hingî xweya*[539] *kirî.*

**S. 3** *1 P'adşê min ĥed û sed li wê çêkir,*
*2 Şirîe't û ĥeqîqet jêk cuda kir,*
*3 Sunete mixfî bû, hingî dehir kir.*

**S. 17** *1 Sinetxane mixfî bû, kire dahire,*

[533] *erê*
[534] binêr *bab*
[535] *cewar*
[536] *e'ne*
[537] *da bû*
[538] *şêrîe't*
[539] *xuya*

*2 Ĥeqîqet di navda d hinare,*
*3 Wan li k'u girtbû ware?*

**S. 13** *1 Sineta veșatrî bû. hingi xweya kire,*
*2 P'adșê min ȓastî navda dihinare,*
*3 Gotê: «Xweșewîstê min sinet li k'û bû, li k'û girtibû ware?»*

**S. 4** *1 Sunete û ĥeqîqet navda dihinare,*
*2 Gatê: E'zîzê min, sunete li k'u bû, li k'u girtbû ware?*

**S. 18.** *1 Wekî e'rd û e'zman ne disekinî,*
*2 Lalişek pêş miqabil dinijinî,*
*3 Muĥbeta xerza nûranî di navda disekinî.*

**S. 19** *1 Dilê min da ne mabû t'u core,*
*2 Lalişek ava kirin li jorê,*
*3 Denge lêdan qubet il-Bidore.*

**S. 20** *1 Lalişa ber sikane,*
*2 Kaniya Sipî nîşane,*
*3 Nîşana e'rd û e'zmana.*

**S. 21** *1 P'adşayê minî K'amilî, hikm girane,*
*2 Di navda dana zor erk'ane,*
*3 Muĥbeta xerza nûranî dane wan bi nîşane.*

**S. 22.** *1 Çi mewlayekî ĥûkm ȓewa,*
*2 Mersûmek nazilbû ji cewa,*
*3 Ji qudretê, sinet mu'eleq mabû li hewa.*

**S. 14** *1 Çî mewlayekî minî hikm ȓewa,*
*2 Mersum dak'etibû ji cewa,*
*3 Bi qudretê, suȓa sinetê maliq westabû li hewa.*

**S. 13** *1 P'adșayê min hikmê xweyî ȓewa,*
*2 Mexsûs dak'ete[540] cewa,*
*3 Sinet mue'leq[541] mabû[542] hewa.*

**S. 5** *1 Çî mewlayeke minî ĥuk'im ȓewa,*
*2 Mersum nazil bû ji cewa,*
*3 Bi qudretê suȓa sunetê mae'liq westa bû li hewa.*

**S. 23** *1 Ji qudrete mu'eleq ȓawesta bû sinete,*
*2 Sinet birne ber P'adşê min zor şikyete,*
*3 Min go: «E'zîzê min mehzeret wê muĥbete».*

**S. 15** *1 Bi hinerê maliq westabû sinete[543],*
*2 Û bire ber P'adșê xwe șikayete,*
*3 Gote: «Xweșewîstê min hizret muĥbete»[544].*

**S. 14** *1 Mue'leq mabû hewa sinete,*
*2 Birine bal[545] P'adșaye min hurmete[546],*
*3 «E'zîzo, me te ĥizret û muĥbete[547]».*

**S. 6** *1 Bi qudretê mae'liq westa bu subete,*
*2 Û bire ber P'adşê xo îcazete,*
*3 Gotê: «E'zîzê min, me ĥizret meĥbete».*

**S. 16** *1 Çi mewlayekî minî hikm girane,*

540 *da kete*
541 *maliq*
542 *ma bû*
543 *sunet*
544 *muhebet*
545 *bali*
546 *huriyet*
547 *mobet*

*2 Li nav wan dana zor erk'ane,*
*3 Evîn û xerzê nûrî navda bi nîşane.*

**S. 7** *1 Çî mewlaya yî minî ĥuk'im girane,*
*2 Li nav wan dana zor erk'ane,*
*3 Muĥbet û x̂erzê nûrê dana bi nîşane.*

**S. 24** *1 Qendîla ji bana nazilîve,*
*2 P'adşê min pê hilînabû ĉave,*
*3 P'adşayî çî gote dur̂ê, ji dur̂ê werîya bû ave.*

**S. 20** *1 Qendîl ji bana hat, muĥbet k'efte nave,*
*2 P'adşê min pê hilînabû ĉave,*
*3 K'a beje min çî gote dur̂ê, jê weryabû ave.*

**S. 15** *1 Muĥbet danî, qendîl*[548] *avîte nave,*
*2 P'adşayê min pê hilanîbû ĉave,*
*3 Go: «Min çi got bû dur̂ê, dur̂ê weriyabû ave».*

**S. 25** *1 Av ji dur̂ê weriya,*
*2 Bû beĥr û pengiya*[549]*,*
*3 P'adşê min merk'eb best, tê ger̂iya.*

**S. 21** *1 Av ji dur̂ê weriya,*
*2 Buwe derya û pengiya,*
*3 P'adşê min merk'eb best û navda diger̂iya.*

**S. 16** *1 Av li dur̂ê weriya bû,*
*2 Beĥr pengiya bû,*
*3 P'adşaye min merk'ebê*[550] *siwar*[551] *bû,*
*4 P'adşayê min tê ger̂iya bû*[552]*.*

**S. 10** *1 Qendîl ji bana nizilî, muĥbet k'efte nave,*
*2 Av ji dur̂ê di weriya,*
*3 Buwe beĥr û pengiya,*
*4 P'adşê min merkeb best, û li nav geriya.*

**S. 26** *1 P'adşa û herçar yare,*
*2 Li merk'ebê dibûn siware,*
*3 Tê seyrîn çar kenare,*
*4 Li Lalişê sekinîn, gotin: «Eve Ĥeq ware*[553]*».*

**S. 22.** *1 P'adşaye û herçar yare,*
*2 Li merk'ebê dibûn siware,*
*3 Têк seyrîn çar kenare,*
*4 Li Lalişê sekinîn gotin: «Eve Ĥeq ware».*

**S. 17** *1 Merk'ebêyî siware,*
*2 Seyrî çar kenare,*
*3 Lalişa nûrîn sekinî ĥeq û ware.*

**S. 11** *1 P'adşê min li merkebê dibû siware,*
*2 P'adşa û her ĥeft yare,*
*3 T'êk seyîrîn çar kinare,*
*4 Li Lalişê sekinîn got: «Eve ĥeq ware».*

**S. 27** *1 Ĥeq ware, sekinî,*
*2 P'adşê min hêvên havête beĥrê, beĥr meyînî,*
*3 Duxanek jê duxinî,*
*4 Her ĥeft e'zman pe nijinî.*

**S. 23** *1 Li Ĥeq war sekinîn,*
*2 P'adşê min hêvên havête beĥrê, beĥr dimeyinîn,*

---

[548] *qendil*
[549] *pengîya*
[550] *morkeb*
[551] *siyar*
[552] *Ser ger̂iya P'adşayê min*
[553] *Heqwar*

*3 Dumanek jê duxinî her ĥeft e'zman pê nijinîn.*

**S. 18** *1 Ĥequ warî sekinî,*
*2 Havênek avîte beĥrê, beĥr meyînî,*
*3 Duxanek*[554] *jê duxinî*[555]*,*
*4 P'adşayê min çardeh t'ebeq*[556] *e'rd û e'zman pê nijînî.*

**S. 12** *1 Ĥeq ware û sekinîn,*
*2 P'adşê min hêvên havête beĥrê û beĥr meyînîn,*
*3 Duxanek jê duxnî, her ĥeft e'zman pê nijînin.*

**S. 28.** *1 P'adşê min e'zman p'araste*[557]*,*
*2 Mek'an danî, t'ext vediguhaste,*
*3 Muĥbeta ji qevda r̂aste.*

**S. 24** *1 P'adsê min e'zman bîraste,*
*2 Viyan ji qevda r̂aste*
*3 P'adşê min cih dane, t'ext veguhaste.*

**S. 22** *1 P'adşayê min e'zman bîr̂aste,*
*2 Muĥbet qewaza*[558] *r̂aste,*
*3 T'ext çêkir, mek'an guhaste.*

**S. 13** *1 P'adşê min e'zman bîraste,*
*2 Muĥbeta ji qevda r̂aste,*
*3 P'adşê min mekane dane texê veguhaste.*

**S. 29** *1 P'adşê min li e'zmana sefer kire,*
*2 Sefer kirbû, ker bi kere,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî menbere.*

**S. 25** *1 P'adşê min li e'zmana kirbû sefere,*
*2 Kire seferekî ker bi kere,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî menbere.*

**S. 21** *1 P'adşayê min E'rşa kir sefere,*
*2 Sixir kire ker bi kere,*
*3 Kire r̂ik'ina çendî menbere*[559]*.*

**S. 14** *1 P'adşê min li e'zmana kir bû sefere,*
*2 Ew bû çawa sefer kir bû, ker bi kere,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî menbere.*

**S. 30** *1 Aşiqa jê xeber da,*
*2 Şaxekî dî jê berda,*
*3 Kirne r̂ik'inê çendî e'rda.*

**S. 26** *1 Aşiqa we jê xeber da,*
*2 Şaxekî dî jê berda,*
*3 Kire r̂ik'ine çendî e'rda.*

**S. 15** *1 Aşiqa we jê xeber da,*
*2 Şaxekî dî jê berda,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî e'rda.*

**S. 31** *1 E'rd mabû buhitî*[560]*,*
*2 Xidûdekî xwidî,*
*3 E'zîzê min, e'rd bê wê sur̂ê net'ebitî.*

**S. 28** *1 E'rd mabû yî behitî,*
*2 Xidudekî xeditî,*
*3 Got: «Xweşewîstê min e'rd bê wê sur̂ê nat'ebitî».*

**S. 16** *1 E'rd mabû behitî,*

[554] *dûxanek*
[555] *duxûnî*
[556] *tebek*
[557] *pêrast*
[558] *qewz*
[559] *mehber*
[560] *bihitî*

*2 Ĥidûdekî xedidî,*
*3 Go: E'zîzê min, e'rd bê wê suȓê natebidê.*

**S. 32** *1 Be'dî çil salî bi hijmare,*
*2 E'rdî bi xwe ȓa negirtbû hişare,*
*3 Ĥeta muĥbeta xerza nûranî bi navda ne dihinare.*

**S. 29** *1 Piştî çil salî bi hijmare,*
*2 E'rdî bi xwe ȓa negirt heşare,*
*3 Ĥeta Laliş di navda dihate xware.*

**S. 17** *1 Be'dî çil salî bi hijmare,*
*2 E'rdî bi xo ȓa ne girt ĥişare,*
*3 Ĥeta Laliş bi navda ne dihate xware.*

**S. 33** *1 Ku Laliş nazilî,*
*2 Nûra muĥbetê hat ji qendilî,*
*3 E'rd şa bû, bi ȓenga xemilî.*

**S. 30** *1 Laliş ku di nezilî,*
*2 Şaxa muĥbetê hingavte serî,*
*3 Homayî bi ȓenga xemilî.*

**S. 34** *1 Ku Laliş dihate,*
*2 Li e'rdê şîn dibû nebate,*
*3 Pê zeynandbû çiqas qinyate*[561]*.*

**S. 31** *1 Laliş ku dihate,*
*2 Li e'rdê şîn dibû nebate,*
*3 Pê zeynîn çiqas qinyate.*

**S. 18** *1 Laliş ku dihate,*
*2 Li e'rdê şîn dibû nebate,*
*3 Pê zeyînîn çîqas kinyate.*

**S. 35** *1 Çendî qinyat pê zeynî,*
*2 Ax û av û agir û bayî t'êk hincinî,*
*3 Qalbê Adem p'êẍember pê nijinî.*

**S. 32** *1 Ku qinyat pê zeynî,*
*2 Çar qismet pê hincinî,*
*3 Axe, û ave, û baye, û agirî,*
*4 Qalbê Adem p'êẍember jê nijinî.*

**S. 19** *1 Ku Laliş pê di zeynînîn,*
*2 Çar qismet t'êk hincinîn:*
*3 Axe, û ave, û baye, û agirî,*
*4 Qalbê Adem p'êẍemberî jê nijinîn.*

**S. 36** *1 P'adşê min Ȓeb il-E'zete,*
*2 Ji e'wil e'firandbû milyak'ete,*
*3 Dana dest wan doj û cineta.*

**S. 19** *1 P'adşayê min Ȓeb il-Semede*[562]*,*
*2 Xulqand çiqa horî, milyak'ete*[563]*,*
*3 Pê çêkir dojeh*[564]*, cinete.*

**S. 20** *1 Dojeh, cinet çêdikirî,*
*2 Duȓa qendîl nav dikirî.*

**S. 37** *1 P'adşê min û her ĥeft suȓêt xewlene,*

---

[561] *kinîyat*
[562] *remil semed*
[563] *miliyaket*
[564] *doze*

*2 Ȓayekê dikin, yeqîn[565] qinyatekê ava bikene.*

**S. 19** *1 P'adşaye û her ĥeft suȓet xewlene,*
*2 Nêrînekê li nav xwe dikene,*
*3 Bawer dê qinyateke ava kene.*

**S. 38** *1 Şembûye danî e'sase,*
*2 Li înîyê kirin xilase,*
*3 Be'dî ĥeftsed sal, ĥeft suȓ gihiştine duȓan û k'ase.*

**S. 33** *1 Li înê danabû e'sase,*
*2 Li şembûyê kir xilase,*
*3Piştî ĥeftsed sal, ĥeft suȓ hatine doran k'ase.*

**S. 20** *1 Şembû dane e'sase,*
*2 Îniyê kir xilase,*
*3 Be'dî ĥeftsed sal, ĥeft suȓ hatne duȓan û k'ase.*

**S. 39** *1 Ĥeft suȓ hatin hindave,*
*2 Qalbê Adem p'êẍember mabû bê gave,*
*3 Go: «Ȓuĥê, bo çî naçîyê nave?»*

**S. 34** *1 Piştî bi ĥeftsed sal, ĥeft suȓ hatine hindave,*
*2 Qalb mabû bê gave,*
*3 Gote ȓewanê: «Tu bo çî naçiyê nave?»*

**S. 21** *1 Be'dî bi ĥeftsed sal, ĥeft suȓ hatne hindave,*
*2 Qalb mabûyî bê gave,*
*3 Gote ȓuĥê: «Tu bo çî naçiyê nave?»*

**S. 40** *1 Ȓuĥê go: «Bo aşiqa me'lûme,*
*2 Ĥeta ji bana neyêt şaz û qidume,*
*3 Nîveka ȓuĥê û qalbê Adem zor t'ixûbe[566]».*

**S. 35** *1 Rewane got: « Li ba aşiqa we me'lûme,*
*2 Ĥeta bo min ji bana nên şaz û qidûme,*
*3 Nîveka ȓewanê û qalbê Adem p'êẍember t'ixûme».*

**S. 22** *1 Ȓuĥê go: «Li bo aşiqa we me'lûme,*
*2 Ĥeta bo min ji bana nên şaz û qidume,*
*3 Nîveka ȓuĥê û qalbê Adem p'êẍember zor t'ixûme».*

**S. 41** *1 Şaz û qidum hatin û hidirî[567],*
*2 Nûra muĥbetê hingavte[568]serî,*
*3 Ȓuĥ hat û tê wetinî.*

**S. 36** *1 Şaz û qidum hatin û hidirî,*
*2 Û ȓoniya evînê hingivte serî*
*3 Ȓewan hat û qalbe Adem p'êẍember êwirî.*

**S. 23** *1 Şaz û qudim hatin û hidirê,*
*2 Û nûra muĥbetê hingivte serê,*
*3 Ȓuĥ hat û qalbê Adem p'êẍember êwirê.*

**S. 42** *1 Wekî qalbê Adem p'êẍember dikir nijare,*
*2 Xasa li ber pestin berî care,*
*3 K'asa ji muĥbetê bi nedere.*

**S. 43** *1 Ji wê k'asê wedixware,*
*2 Ji wê k'asê dida mersûmê ȓidaye,*
*3 Ȓuĥ hat gihaye.*

---

565 *êqîn*
566 *tixume*
567 binêr: *hadêr*
568 *hingift*

**S. 44** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 Vedijîye, mest bû, hijîya,*
*3 Goşt lê dihurîye, xûn lê digeȓîya.*

**S. 37** *1 Adem p'êẍember ji wê kasê vedixwar û vedijîya.*
*2 Mest bû, hejîya,*
*3 Goşt lê horiya, xwîn tê geȓîya.*

**S. 24** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixwar û vedijiya,*
*2 Mest bû, hijiya,*
*3 Goşt lê huriye, xûn tê geȓiya.*

**S. 45** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê hate dîyarê,*
*3 Lew pêngijî, pê dibû siware.*

**S. 38** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'erameta wê k'asê hate dîyare,*
*3 Lew Adem p'êẍember pêngijî, pê dibû şiyare.*

**S. 25** *1 K'erameta wê k'asê hate diyare,*
*2 Lew Adem p'êẍember pêngijî, pê dibû şiyare,*

**S. 46** *1 Ew k'ase nûrîne,*
*2 Adem p'êẍember vedixwar, bi eşqa dilê yeqîne,*
*3 Lew cesedê wî geȓiye goşt û xwîne*[569]*.*

**S. 47** *1 Ew k'ase bi Adem xweş tê,*
*2 K'eremeta wê k'asê digehiştê,*
*3 Ewê k'asê Adem dibire bihuştê.*

**S. 39** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vexwar û pê xweş tê*
*2 P'irfirazî k'asê hat û gehiştê,*
*3 Lew Adem p'êẍember hilgirt û bire buhiştê*[570]*.*

**S. 26** *1 Adem p'êẍember ji wê k'asê vexwar û pê xoş tê,*
*2 K'erameta wê k'asê hat û gehiştê,*
*3 Lew Adem p'êẍember girt û bire behiştê.*

**S. 40** *1 P'adşê minî bi hêz û t'aqete,*
*2 Ji Adem wê bûn coqete,*
*3 Jê vavartin ȟeftê û du milete.*

**S. 27** *1 P'adşê min R̂ebil Semede,*
*2 Ji Adem çêbûn coqete,*
*3 Jêk vavartin heftî û du milete.*

**S. 48** *1 Şahîd p'êẍember ji wê k'asê dibû meste,*
*2 Ewî ne p'ê hebû, ne deste,*
*3 Lew silt'an Êzî k'eremet li ber dixiste.*

**S. 49** *1 Şahîd p'êẍember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta wê k'asê hate bale,*
*3 Lew horiya çawa bora dihinare.*

**S. 50** *1 Çi horîyeke çêye,*
*2 Bi k'eremeta wê k'asêye,*
*3 Ĥeşem û Qurêş herdu jêne.*

**S. 52** *1 Hatî bedîla Nuȟ û nebîya,*
*2 Qewmek dahirbû di dilê wan da zor k'ifirîye,*
*3 Lew li Xwedê xwe bûne axîye.*

---

[569] *xûn*
[570] binêr: *bihuşt*

**S. 41** *1 Boy bedila Nûh û nebîya,*
*2 Gelek xweyakir, di dilê wan hebû zor kifrîya,*
*3 Lew li Xwede bûne axîya.*

**S. 51** *1 Be'dî wê ĥeywanê,*
*2 Pê wan r̂a qewmek dahirbû dilê wan da nîne xofa îmanê,*
*3 Ew jî xerîq bûne sala t'ofanê.*
**S. 42** *1 Piştî wê hêwanê,*
*2 Gelek xweyakir, dilê wan mabû tirsa îmanê,*
*3 Lew P'adşê min fetisandbûn bi ava t'ofanê.*

**S. 53** *1 Ew k'ase dane Nuĥe,*
*2 Bi k'eremeta wê k'asê dibû sûhe,*
*3 Lew ji t'ofana xilas kirin gelek r̂uĥe.*
**S. 28** *1 Bûyî bedîla Nuĥî nebiya,*
*2 Lê r̂eda bas (t'ofanî) dekirêt le şiwênî xoyê da bas dekeyîn.*

**S. 43** *1 Piştî wan bedîla,*
*2 Gelek xweyakir ne yî e'dîle,*
*3 Nuqtek weriya ji qendîle,*
*4 Wê di navda Birahîm Xelile.*

**S. 54** *1 Ew k'ase da Birahîme,*
*2 Malê wî zorî zavî e'zîme,*
*3 Ĥemû daye r̂êya êkî K'erîme.*

**S. 55** *1 Ĥemû daye r̂êya êkî Celîle,*
*2 Nuqtek nazilbû ji Qendîla,*
*3 Nav lê dana Birahîm il-Xelîle.*

**S. 56** *1 Birahim Xelîl ji nuqteke sadiqe*[571]*,*
*2 Bi sê ĥerfa bû multeqe,*
*3 Lew Xwedê xwe naskir bi ĥeqe.*
**S. 44** *1 Birahîm Xelîl ji nuqteke sadiqe,*
*2 Bi sê tipa dibû multeqe,*
*3 Ĥeta Xwede xwe naskir bi ĥeqe.*

**S. 57** *1 Xwedê xwe bi ĥeq naskir,*
*2 Nivê*[572] *Nemr̂ûd û Azir û Senema ne ĥiskir,*
*3 Gîyanê xwe ji k'ifiriyê xilaskir.*
**S. 45** *1 Ĥeta Xwede xwe bi ĥeq nas kir,*
*2 Li gel Azir û Nemrûd û p'ûta got û bej kir,*
*3 Lew gîyanê xwe ji kifiriyê r̂izgar kir.*

**S. 58** *1 Gîyanê xwe ji k'ifiriyê vavirî,*
*2 K'afira luqmande agirî,*
*3 Axî (Emîn) Cebraîl lê bûye mişterî.*
**S. 46** *1 Gîyanê xwe ji kifriyê vavarî,*
*2 Gawira luqmande agirî,*
*3 Lew axî*[573] *Cebraîl*[574] *lê bûye muşterî.*

**S. 59** *1 Be'dî wî Xelîl delîlêye,*
*2 Îsa û Mûsa û Mihemed il-Mustefaye,*

---

[571] *sideqe*
[572] *nîva*
[573] *axîl*
[574] *Cibraîl*

*3 Eşqa wî ço ba hindek dilaye.*

**S. 29** *1 Be'dî wan Xelîlullaye,*
*2 Îsaye û Mûsaye,*
*3 Meĥmedê nu k'amile,*
*4 Muĥba wî dê hingifte hindek dile,*
*5 Xitmê mîra seyîdê Mursile.*

**S. 60** *1 Sed û bîst û çar ĥezar nebîy hatin û bihurîn,*
*2 Sed û bîst û çar ĥezar welî hatin û bihurîn,*
*3 Silt'an Êzî yek-yek dihijmirîn.*

**S. 47** *1 Çend bedîl hatin û buhirîn,*
*2 Çend xas hatin û min dihijmirîn,*
*3 Ew silt'an şêx Adîye t'ance ji serî ĥeta bi axirîn.*

**S. 61** *1 Silt'an Êzî nûr bû, bi wê nûrê xemilî,*
*2 Silt'an şêx Adî*[575] *t'ac bû, ji e'wil ĥeta bi axirî.*

*R̂eĥma Xwedê li hostayê min, li ĥemû mirov û r̂êncbera,*
*malû mezela em têda, Xwedê ava ket!*

*T'emametîya Xwedê û şêx Adî!*
*T'emametî şêx Adî!*
*R̂eĥme li dê-bavê hostayî!*

## 23. QEWLÊ E'FRANDINE QINYATÊ[576;577]

**S. 1** *1 Zebûnekî*[578] *minî dil meksûre,*
*2 Heke ji ba e'zîz melik Fexredîn bêtin destûre,*
*3 Em dê medha deyn ji beĥrên k'ûre.*

**S. 2** *1 Zebûnekî minî kêm t'aqete,*
*2 Heke ji ba e'zîz melik Fexredîn bêtin îcazete,*
*3 Em dê ji beĥrên k'ûr deyn wesfete.*

**S. 3** *1 Li min cema' dibûn babzere,*
*2 Ji wê beĥrê deyn xebere,*
*3 Tê hene dur̂ên cewahre.*

**S. 4** *1 Li min cema' dibûn zerbabe,*
*2 Dê ji wê beĥrê deyn t'ebabe,*
*3 Beĥre, û dojeh, û qîr di nave.*

**S. 5** *1 Medha bidin ji kitîr,*
*2 T'extê t'enê dibû e'mir,*
*3 Ewe alîm, ewe xebîr.*

**S. 6** *1 P'adşê min ji dur̂ê bû,*
*2 Ĥisnetek jê çêbû,*
*3 Şaxa muĥbetê*[579] *lê bû.*

**S. 7** *1 Lê bû şaxa muĥbetê,*
*2 Li destê silt'an Êzî heye qelema qudretê,*

575 *Şîxadî*
[576] [4] *Qewlê zebûnî dil meksûr* Rûpel 37, çapxana fêrkirina bilind, Hewlêr 1996 http://www.ezdixandi.com/forum/38-258-1
[577] Ev qewl çawa li navça Efrînê tê gotin.
[578] *zibûn*
[579] *mehebet*

*3 Il-ĥemdillah*[580] *û şikir ez avêtime ser pişka sinetê.*

**S. 8** *1 Aşiqa ew mîr dît û kir nase,*
*2 Jêk vavartin muĥbete û k'ase,*
*3 Kire r̂ik'inê çendî e'sase.*

**S. 9** *1 Kire rikn û rikinî,*
*2 Dur̂ ji ĥeybetê hinçinî,*
*3 T'aqet nema hilgirî.*

**S. 10** *1 T'aqet nema li ber bisebirî,*
*2 Dur̂ bi r̂enga xemilî,*
*3 Sor bû, sipî bû, sefirî.*

**S. 11** *1 Dur̂ bi r̂enga geş bû,*
*2 Berê ne e'rd hebû, ne e'zman hebû, ne E'rş bû,*
*3 K'a bêje min P'adşê min bi k'êr̂e xweş bû?*

**S. 12** *1 P'adşê min xweş suhbete,*
*2 Lêk r̂ûniştibûn muĥbete,*
*3 P'adşê min li wêderê kir ĥed û sede.*

**S. 13** *1 P'adşê min ĥed û sed li wê çêkirin,*
*2 Şe'rîe't û ĥeqîqet jêk cihê kirin,*
*3 Sinet*[581] *mixfî bû, hingî dahir kirin.*

**S. 14** *1 Sinet mixfî bû hingî kir dîyare,*
*2 P'adşê min ĥeqîqet navde dihinare,*
*3 Gotê: «E'zîzê min, sinet li k'u bû, k'u girtîbû ware?»*

**S. 15** *1 Çî mewlayekî minî hikm r̂ewa,*
*2 Mersûm nazil bû ji cewa,*
*3 Bi qudretê sur̂a sinetê mue'leq*[582] *westabû li hewa,*

**S. 16** *1 Bi qudretê mue'leq westabû sinete,*
*2 Û bir ji ber P'adşê xwe îcazete,*
*3 Gotê: «E'zîzê min, me ĥizret muĥbete».*

**S. 17** *1 Çi mewlayekî minî hikm girane,*
*2 Li nav van dana zor erk'ane,*
*3 Muĥbet û xerzê nûrî dane wan bi nîşane.*

**S. 18** *1 Xerzê nûrî babe,*
*2 Du cewher k'eftine nave,*
*3 Yek — e'yne, yek — ĉave.*

**S. 19** *1 Yek — e'yne yek — besere,*
*2 P'adşê min da dur̂ê bi nedere,*
*3 P'adşa dizane k'î li sere, k'î li bere.*

**S. 20** *1 Qendîl ji bana nazilî*[583]*, muĥbete k'efte nave,*
*2 P'adşê min pê hilînabû ĉave,*
*3 K'a bêje min çî gote dur̂ê jê weriyabû ave?*

**S. 21** *1 Av ji dur̂ê weriya,*

---

[580] *Elhemdullah*
[581] *sunnet*
[582] *ma'liq*
[583] *nizilî*

*2 Bûye derya û pengiya,*
*3 P'adşê min merk'eb best û tê geȓiya.*

**S. 22** *1 P'adşê min li merk'ebê dibû siware,*
*2 P'adşeye û herçar yare,*
*3 T'êk seyrîn çar kenare,*
*4 Li Lalişê sekinî û got: «Eve Ĥeq ware!»*

**S. 23** *1 Ĥeq ware û sekinî,*
*2 P'adşê min havên[584] avête beĥrê, beĥr meyînî,*
*3 Duxanek jê duxinî, her ĥeft e'zman pê nijinî.*

**S. 24** *1 P'adşê min e'zman biȓaste,*
*2 Muĥbeta ji qevda ȓaste,*
*3 P'adşê min mek'an dane, t'ext veguhaste.*

**S. 25** *1 P'adşê min li e'zman kirbû sefere,*
*2 Ew bû çar sefer kirbû ker bi kere,*
*3 Kire ȓik'inê çendî menbere.*

**S. 26** *1 Aşiqa we jê xeber da,*
*2 Şaxekî dî jê berda,*
*3 Kire ȓik'inê çendî e'rda.*

**S. 27** *1 E'rd mabûye behitî,*
*2 Xedudekê xeditî,*
*3 Got: «E'zîzê min, e'rd bê wê suȓê nat'ebit».*

**S. 28** *1 Piştî çil salî bi hijmare,*
*2 E'rdê xwe ȓa negirt heşare,*
*3 Ĥeta Laliş bi navde dihate xware[585].*

**S. 29** *1 Laliş ku dihate,*
*2 Li e'rdê şîn dibû nebate,*
*3 Pê zeynî çiqas qinyate[586].*

**S. 30** *1 Ku qinyat pê dizeynîn,*
*2 Çar qismet t'êk hincinî,*
*3 Ax, û av, û ba, û agirî, qalbê Adem p'êẍember jê njinî.*

**S. 31** *1 Şembû dana e'sase[587],*
*2 Îniyê kir xilase,*
*3 Piştî ĥeftsed sal, ĥeft suȓ hatin duȓan û k'ase.*

**S. 32** *1 Piştî ĥeftsed sal ĥeft suȓ hatine hindave,*
*2 Qalb mabûye bê gave,*
*3 Gotê: «Ȓuĥê tu bo çî naçiyê nave?»*

**S. 33** *1 Ȓuĥê got: «Li ba aşiqa we me'lûme,*
*2 Ĥeta bo min ji bane nên şaz û qudûme[588],*
*3 Nîveka ȓuĥê û qalbê Adem p'êẍember zor t'ixûme[589]».*

**S. 34** *1 Şaz û qudûm hatin û hadêȓî[590],*

[584] *hêvan*
[585] *xar*
[586] *kinyat*
[587] *asas*
[588] *qedûm*
[589] *tuxûm*
[590] *hidir*

*2 Û nûra muĥbetê hingivte serî,*
*3 R̂uĥ hat û qalbê Adem p'êx̂ember siwarî.*

**S. 35** *1 Adem p'êx̂ember ji wê k'asê vedixwar û vedijiya,*
*2 Mest bû, hejiya,*
*3 Goşt lê huriya, xûn*[591] *tê geȓiya.*

**S. 36** *1 Adem p'êx̂ember ji wê k'asê vedixware,*
*2 K'erema wê k'asê hate dîyare,*
*3 Lew Adem p'êx̂ember pê nigijî, pê dibû siware.*

**S. 37** *1 Adem p'êx̂ember ji wê k'asê vedixwar û pê xweş tê,*
*2 K'erema wê k'asê hat û gehiştê,*
*3 Lew Adem p'êx̂ember hilgirt û bire bihuştê.*

**S. 38** *1 P'adşê minî R̂eb il-Semede,*
*2 Ji Adem bûn coqete,*
*3 Jêk vavartin ĥeftê û du milete.*

**S. 39** *1 Bûye bedîla Nuĥê nebîya,*
*2 Qewmek dê dahir be li dilê wan heye zor k'ifirîya,*
*3 Ew jî wê li Xwedê xwe bine yaxîya.*

**S. 40** *1 Piştî wê hêvênê,*
*2 Qewmek dê dahir be, di dil de namîne îmanê,*
*3 Ew jî dê xeȓiqbin bi ava t'ofanê.*

**S. 41** *1 Piştî wan bedîle,*
*2 Qewmek dê dahir be, ne yê E'dîle,*
*3 Nuqtek*[592] *dê nazilbe ji qendîle,*
*4 Wê li nav dahirbe Birahîm Xelîle.*

**S. 42** *1 Birahîm Xelîl ji nuqtek sadeqe*[593]*,*
*2 Bi sê ĥerfa dibû multeqe,*
*3 Ĥeta Xwedê xwe nas kir bi ĥeqe.*

**S. 43** *1 Ĥeta Xwedê xwe bi ĥeq naskir,*
*2 Li gel Azir, Nemȓûd û senema behskir,*
*3 Lew gîyanê xwe ji k'ifiriyê xilaskir.*

**S. 44** *1 Piştî wan xelîl îlaĥîye*[594]*,*
*2 Îsaye û Mûsaye,*
*3 Meĥemedê nû k'amile,*
*4 Muĥba wî dê hingavte*[595] *hindek dile,*
*5 Xitmê mîra seyîdê mursile.*

**S. 45** *1 Ya seyîd il-Murslî,*
*2 Çend bedîl hatin û bihurî,*
*3 Çend xas hatin, min hijmêrî,*
*4 Ew silt'an şêx Adîye, t'ace ji e'wil ĥeta bi axirî.*

---

[591] *xwîn*
[592] *nuxte*
[593] *sideq*
[594] *Xelîlullaye*
[595] *hingift*

# 24. QEWLÊ E'FIRÎNA DINYAYÊ[596]

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, dinya hebû tarî,*
*2 Têda t'unebûn mişk û marî[597],*
*3 Te zênda kir t'eze ĥalî,*
*4 Cî[598] nema, gul jê barî.*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu hostayê K'erîmî!*
*2 Te vekir r̂ê û dirba tarî,*
*3 Tu hostayê her tiştî,*
*4 Bihuşt çêkir r̂enge bî.*

**S. 3** *1 E'rd û e'zman t'u hebûn,*
*2 Dinya fire, bê bine bû,*
*3 Însan, ĥeywan jî t'unebûn.*
*4 Te xwe lê saz kir.*

**S. 4** *1 Di beĥra da t'enê hebû dur̂,*
*2 Ne dimeşiya, ne diweşiya[599],*
*3 Te xweş r̂uĥ anî ber,*
*4 Nûra xwe lê p'eyda kir.*

**S. 5** *1 Goşt û r̂uĥ hatine ber,*
*2 Nûra ĉavan lê hatine der,*
*3 Dest û p'ê kire leş,*
*4 Lê şêrîn kir got û bêj.*

**S. 6** *1 Xwedawendê me hostayê R̂eĥmanî,*
*2 R̂ê û dergeyê dinyayê vekir, her tişt ji me r̂a der anî,*
*3 Bû bihuşt e'rdû avanî.*

**S. 7** *1 Xwedawendê me tiştî di nasî,*
*2 Dur̂a k'asê jê kir e'sase,*
*3 Jê p'eyda kir mêrê xase,*
*4 Got: «Eve hê, ne bes».*

**S. 8** *1 Dur̂ ji ĥeybeta Êzdan hincinî,*
*2 T'aqet nekir, hilger̂î,*
*3 Ji r̂engê însan xemilî,*
*4 Sor û sipî lê hêwirî.*

**S. 9** *1 Êzdanê me bi R̂eĥmanî,*
*2 Ĥisn[600] û cemal ji me r̂a anî,*
*3 Destûr da qelemê qudretê,*
*4 Em avêtin nav sur̂a muĥbetê.*

**S. 10** *1 Hêvên avête beĥrê, beĥr pê meyanî,*
*2 Duxanek[601] jê duxinî[602],*
*3 Çardeh t'ebeqe e'rd û e'zman pê nijinî,*
*4 Êzdanê me dur̂ der anî.*

**S. 11** *1 Muĥbet avête nave,*

---

[596] [1] (pp. 66–71); [2] (rr. 182-192)
[597] *me'r*
[598] *çu*
[599] *dimeşiya*
[600] binêr: *ĥusn*
[601] *dexanek*
[602] *dexin*

*2 Jê p'eyda kir du ĉave,*
*3 Jê herikî p'iȓ ave.*

**S. 12** *1 Av ji duȓê herikî,*
*2 Bû beĥra bê serî, bê binî, bê ȓê, û bê derî,*
*3 Êzdanê me ser beĥrê geȓî.*

**S. 13** *1 Êzdanê me sefîne çêkir,*
*2 Însan, ĥeywan, teyr û tû,*
*3 Cot bi cot li sefînê siwar kir.*

**S. 14** *1 Xwedawendê me sefîne sere,*
*2 Serîkî digeȓe çar kenare,*
*3 Sefîne qul bû, av k'ete sere,*
*4 Marî xiȓê xwe dane bere.*

**S. 15** *1 Xwedawendê me sefîne ajot,*
*2 Ji kenar çû ber kenare,*
*3 Ajote Lalişê, got: «Ĥeq ware».*

**S. 16** *1 Silt'an Êzî xweş ȓêbere,*
*2 Laliş ko ȓik'inê beşere,*
*3 Niha êzdî jê xebere.*

**S. 17** *1 Ya Ȓebî, bang dikim şêxê mezên,*
*2 Ĉavkanî av jê dizên.*
*3 Ya Ȓebî, te dinya çêkir, dinya bi xêr,*
*4 Însan têda dijîn bi t'êr.*

**S. 18** *1 Şevêt ȓeş, şevêt tarî,*
*2 Cî nema gul jê barîn*
*3 Xwedawendî, K'erîm û Ȓeĥmanî.*

**S. 19** *1 Kire ȓik'in e'rd û e'zman,*
*2 Da ber me ȓuĥ û ziman.*
*3 Xwedawendê me Ȓeb il-Semed,*
*4 E'firandin ĥeft*[603] *milyak'et,*
*5 Cuda kir doj û cinet.*

**S. 20** *1 Xwedawendê me e'rda çêkir, e'zman guhastin,*
*2 Mecalê e'rdê biȓastin,*
*3 Nobeta qeza guhastin,*
*4 Li gunehbaran bû ȓuĥistin.*

**S. 21** *1 Çiqas Xwedawendê me dinya kir sefere,*
*2 Sixir dikir dar û bere,*
*3 Pê nijine ȓik'inê menbere.*

**S. 22** *1 Laliş jorda anî xware,*
*2 Laliş bû xweş cî û ware,*
*3 Li e'rdê şînbû nebate,*
*4 Pê zeynî, zêndî qinyate.*

**S. 23** *1 Xwedawendê me Ȓeĥmanî,*
*2 Çar qism ji me ȓa danî,*
*3 Pê ĥebîba Adem nijinî.*
*4 Xwedawendê me Ȓeĥmanî,*

---

[603] *şeş*

*5 Çar qism li r̂ûyê dinê danî.*

**S. 24** *1 Yek — ave,*
*2 Yek — nûre,*
*3 Yek — axe,*
*4 Yek jî — agire.*
*5 Xwedawendê me bi r̂eĥme,*
*6 Dîyar kir şaz û qudûme.*

**S. 25** *1 Nîveka Adem û ĥeft sur̂[604] zor t'ixûbe.*
*2 Ĥeft sur̂ ger̂iya, hat hendave,*
*3 Qalbê Adem mabû bê gave*
*4 Go: «R̂uĥo, çima naçî nava?»*

**S. 26** *1 Xwedawendê me qudrete,*
*2 Zeynandî çiqas xulyaqete,*
*3 Wanra[605] çêkir doj û cinete.*

**S. 27** *1 Xwedawendê me e'rd çêkir, e'zman guhastin,*
*2 Mecale e'rdê bir̂astin,*
*3 Nobeta qeza r̂astin,*
*4 Ji însan qencîtî xwestin.*

**S. 28** *1 Laliş ji e'zman dihate,*
*2 E'rd şîn dibû, giya hate,*
*3 Pê çêyran çiqas qinyate.*

**S. 29** *1 Xwedawendê me înî kir e'sase,*
*2 Şembî bir̂î kirase[606],*
*3 Çarşemê kir xilase.*
*4 Ĥeftsed sal paş ĥeft sur̂ hat dur̂an û k'ase.*

**S. 30** *1 Ĥeftsed salî ji berî Adem jimare,*
*2 E'rdê xwe r̂a[607] negirtî şiyare,*
*3 Ĥeta Lalişa nûrî navda hinare[608].*

**S. 31** *1 Û ji bana[609] r̂uĥ hadêr̂î[610],*
*2 Hat û çû bihurî,*
*3 Nûra muĥbetê[611] hingivte serî,*
*4 Hat qalbe Adem da hêwir̂î[612].*

**S. 32** *1 Xwedawendê me R̂eĥmanî,*
*2 K'asa sur̂ê ji Adem r̂a anî.*
*3 Av ji k'asê vexwar, vejiya,*
*4 Cîda mest bû, hejiya.*

**S. 33** *1 Goşt jê xwest wî r̂uĥî,*
*2 Xûn[613] canê wî ger̂î,*
*3 Xêret k'ete nav serî,*

---

604 *hevsur*
605 *jêra*
606 *keras*
607 *xiyare*
608 *henare*
609 *banda*
610 *hedirî*
611 *mobet*
612 *êwirî*
613 *xwîn*

**S. 34** *1 Adem xwar ji wê k'asê,*
*2 Suȓa k'asê xweş lê tê,*
*3 K'eremeta k'asê gehiştî bihuştê,*
*4 Meleka milê wî girt, avête bihuştê.*

**S. 35** *1 Adem ji k'asê vedixware,*
*2 K'eremeta k'asê pêve dîyare,*
*3 Xwe pê nijî, bû ĥişiyare.*

**S. 36** *1 Go: «Ev e'rd çi xweşe*[614]*,*
*2 Gîhayê şîn ser geşe,*
*3 Ȓoj, ȓoja mêrê k'eleşe».*

**S. 37** *1 Xwedawendê me Ȓeĥmanî,*
*2 Ji me ȓa k'eremek anî,*
*3 Dem û dezgê baş danî.*

**S. 38** *1 Hey Ademo, ȓû dinê,*
*2 Herdem bike îmanî,*
*3 Xwedawend em xilaskirin ji t'ofanê.*

**S. 39** *1 Gelî mirîdan bikin k'arî,*
*2 Xêra qudretê me hate xwerî,*
*3 E'rd û e'zman didin xêrê,*
*4 Hûn jî bibin xwedanê xêrê,*
*5 Qet ji bîr nekin vê xeberê.*

*Em di kêmin, Xwedê yê T'emame!*

## 25. QEWLÊ NIJYAR[615]

**S. 1** *1 P'adşaye û mewlaye,*
*2 P'adşa li hikmî ȓewaye,*
*3 Wî dahir kir dua'ye.*

**S. 2** *1 Firwar ji beĥrêt k'ûre,*
*2 Hilme ȓastîyê nûre,*
*3 Wê dahirbit destûre*[616]*.*

**S. 3** *1 Destûre û yasa ye,*
*2 Firwara P'adşa ye,*
*3 Duȓe ĥeqîqet têda ye.*

**S. 4** *1 Berî Qudsû Orselîme*[617]*,*
*2 Berî nebîy Birahîme,*
*3 Ez heme suȓa zindîme.*

**S. 5** *1 Xwedê yeke, Xwedêye,*
*2 Hêvênê wî ji suȓeye,*
*3 Ew babe, û kuȓe, û dêya.*

**S. 6** *1 Ji nûrê çêbûn milyak'et,*

---

[614] *xaşe*
[615] http://www.ezdixandi.com/forum/38-963-1
[616] *distûr*
[617] *Quds û Orselîme*

*2 Ji suȓêne û ji qudret,*
*3 Her ĥeft yarê bi îcazet.*

**S. 7** *1 Ewin melekêt bedîl,*
*2 Bi maşin ji P'adşê E'dîl*[618]*,*
*3 Li ĥezreta Melikê Celîl.*

**S. 8** *1 Yezdane P'adşê mezin,*
*2 Firwarek hate gotin,*
*3 Duȓ lerizî xuh jê k'etin.*

**S. 9** *1 Xuha duȓê xunave,*
*2 Beĥra bê bine ave,*
*3 P'adşa k'elekê*[619] *da nave.*

**S. 10** *1 P'adşa li merk'ebê siware,*
*2 P'adşaye û here çar yare,*
*3 Lalişê girtin ware.*

**S. 11** *1 Lalişa nûranîye,*
*2 Ji qudretê çekirîye,*
*3 Ji suȓa Melikê jorîye.*

**S. 12** *1 Xwedê dua'yek lê bû,*
*2 Dua' li avê û beĥrê bû,*
*3 Ji beĥrê hêlimek çêbû.*

**S. 13** *1 Hêlim çobû e'zmane,*
*2 Xemilandî bi stêrane,*
*3 Ew firwara P'adşane.*

**S. 14** *1 Dayê nûra muĥbetê,*
*2 Ȓon bû bi sewqa qudretê,*
*3 Ew bû berê qubletê.*

**S. 15** *1 Ew ȓoj, ȓojeke nîşane,*
*2 Çarsembû we Nîsane,*
*3 Îda milyak'etane.*

**S. 16** *1 P'adşa hate suhbetê,*
*2 Bû serwerê coqetê,*
*3 E'firandin ĥed û sedê.*

**S. 17** *1 Wan ĥed û sed çêkirin,*
*2 Dua'ye xwe lêkirin,*
*3 Ĥeqîqet pê ȓêkirin.*

**S. 18** *1 Ĥeqîqet nesîĥete*[620]*,*
*2 Suȓ, û atqan, û xete,*
*3 Li ba P'adşê min ĥeybete.*

**S. 19** *1 Suȓ ji nava duȓêye,*
*2 P'adşaye her Xwedêye,*
*3 Kira ȓik'inê e'rdêye.*

---

[618] *Celîl*
[619] *kelak*
[620] *ne sirhete*

**S. 20** *1 Hijmar bûye[621] çil sale,*
*2 E'rde ne ye bi heşare,*
*3 Ĥeta suȓ nête dîyare.*

**S. 21** *1 Suȓ jî ji duȓa wîye,*
*2 Lalişa kaniya Sipîye,*
*3 Bû hêvênê e'rdîye.*

**S. 22** *1 Laliş hêvênê e'rdî,*
*2 E'rd bi hêvênî t'ebitî,*
*3 Sinîyê girt çar qurnetî.*

**S. 23** *1 Ku e'rd bi xemilê avabû,*
*2 Çar ȓeng t'ev vesta bû,*
*3 Agir, ax, av û ba bû.*

**S. 24** *1 Herçar ji duȓê e'firîn,*
*2 Leşê Adem sêwirîn,*
*3 Gîyan mabû e'firîn û bê ȓuĥ û jîn.*

**S. 25** *1 Ĥeftsed sal gîyan yî xave[622],*
*2 Ĥeft suȓ hatine hindave:*
*3 «Ȓuĥ çima naçiye nave?»*

**S. 26** *1 Bersiva ȓuĥê waye:*
*2 «Li ba we her tişt ȓewaye,*
*3 Firwar li cem P'adşaye».*

**S. 27** *1 Li bana firwar k'amilî,*
*2 Nûr bû, hingivtiye serî,*
*3 Ȓuĥ hat gîyan êwirî.*

**S. 28** *1 Ji k'asê Adem vexwarîya,*
*2 Xûn û gost t'ev lê geȓîya,*
*3 Ȓuĥ hat, Adem vehejîya.*

**S. 29** *1 Ew bû k'asa muĥbetê,*
*2 Xwedanêt k'eremetê,*
*3 Adem pê ço cinetê.*

**S. 30** *1 P'adşa xwedan qudrete,*
*2 Ji Adem çêbû coqete,*
*3 T'ev ĥeftî û du milete.*

**S. 31** *1 Ademe û horîye,*
*2 Suȓa Melikê jorîye,*
*3 Jê cota çêbûn cindîye.*

**S. 32** *1 Hêvên ji ĥeqîqetê,*
*2 Ewe suȓa sinetê,*
*3 Dahirbû gel coqetê.*

**S. 33** *1 Dahirbû Ezdayîye,*
*2 Kolê P'adşê jorîye,*
*3 Feqîrê kaniya Sipîye.*

---

621 *bûwe*
622 *xo ve*

**S. 34** *1 Ew dîyarîya milyak'ete,*
*2 Xwedan t'oq*[623] *ĥeqîqete,*
*3 Min ji P'adşê xwe minete.*

**S. 35** *1 Bedîla Nuĥê nebîya,*
*2 Beşerî ji bîr kir P'adşa,*
*3 Lew ava r̂eş lê ger̂îya.*

**S. 36** *1 Dahir bû xalek ji qendîl,*
*2 Ew bû Birahîm Xelîl,*
*3 Sê sur̂ lê dibûne delîl.*

**S. 37** *1 Xwe naskir Birahîm Xelîl,*
*2 Bû p'êẍemberê bedîl,*
*3 Got: «Êke Melikê Celîl».*

**S. 38** *1 Paşî Îsa û Mûsane,*
*2 P'êẍemberên e'rdane,*
*3 Wan jî yasa danane.*

**S. 39** *1 Yasîn*[624]*, û mişûr, û xete,*
*2 T'ev dur̂in ji qudrete,*
*3 Ji ba Xwedê û milyak'ete.*

**S. 40** *1 Baweriya min Xwedêye,*
*2 Yeke li e'zmanî çêye,*
*3 Ĥeft milyak'et ji nûr̂êye.*

**S. 41** *1 Her ĥeft sur̂êt qudretê,*
*2 Serwerin li cinetê,*
*3 Firwar ji ba P'adşê me tê.*

**S. 42** *1 Firwar ji ba P'adşane,*
*2 Yek serwerê ĥeftane,*
*3 Dîyarî t'oq û erk'ane.*

**S. 43** *1 Serwerê ĥefta yeka,*
*2 Şêrîn Tawisî melek'e,*
*3 Miraza hasil dike.*

**S. 44** *1 Tawisê milyak'ete,*
*2 Meleke nûre ĥeybete,*
*3 Meferê me li axrete.*

**S. 45** *1 Meferê êzdîye,*
*2 Li ba P'adşê jorîye,*
*3 Nûre û sur̂e û ĥeqîye.*

## 26. QEWLÊ ŞÊXÛ BEK'IR — I[625; 626; 627; 628; 629]

[623] *tok*
[624] *Yasa*
[625] [2] şaxê – 1 (rr. 185–190)
[626] [2] şaxê – 2 (rr. 191–196)
[627] http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=54; [3] şaxê – 3 (rr. 208-214)
[628] [29] (rr. 378–381) (№ 1695)
[629] Laliş 25 *QEWLÊ ŞÊXÛ BEK'IR* (rr. 131–132)

**S. 1** *1 Aşiq û me'şûqêt[630] mûkirê[631],*
*2 Me yarek divêt vê ĥerfê buk'irê,*
*3 K'a bêjne min duȓ ji P'adşaye yan P'adşa ji duȓê?*

**S. 1** *1 Aşiq û me'şûqêt mûkirê[632],*
*2 Me yarek divêt vê ĥerfê yî mûkirê,*
*3 K'a duȓ ji P'adşaye yan P'adşa ji duȓê?*

**S. 1** *1 Aşiq û me'şûqên k'ûrî,*
*2 Me yarek divê li vê ĥerfêyî mûkurê,*
*3 K'a duȓ ji P'adşaye, yan P'adşa ji duȓê?*

**S. 1** *1 Aşiq[633] me'şûqe[634] suȓê,*
*2 Yarek divê vê ĥerfê me mûkurê,*
*3 Hûn binêȓin çika duȓe ji P'adşêye, yan P'adşayî ji duȓê?*

**S. 2** *1 Aşiqê û me'şûqî yî çêye,*
*2 T'eftêşa min li vê cewabêye,*
*3 K'a bêjne min duȓ ji P'adşêye, yan P'adşa ji duȓêye?*

**S. 2** *1 Aşiqê e'rifî çêye,*
*2 T'eftêşa me ji vê cewabêye,*
*3 K'a duȓ ji P'adşê ye, an P'adşa ji duȓê ye?*

**S. 2** *1 Aşiqê e'rifî çêye,*
*2 T'eftêşa me ji wê cewabêye,*
*3 K'a duȓ ji P'adşaye, yan P'adşa ji duȓêye?*

**S. 2** *1 Aşiqê e'rifî çêye,*
*2 T'imtêşa me vê cavêye,*
*3 Hûn binêȓin çika duȓe ji P'adşêye, yan P'adşayî ji duȓêye?*

**S. 1** *1 Aşiqê e'rifî çêye,*
*2 T'eftêşa me ji vê ciwabêye,*
*3 K'a duȓe ji P'adşaye, an P'adşa ji duȓê ye?*

**S. 3** *1 Aşiq, û e'rif, û zana,*
*2 Mim yarek divêt, vê ĥerfê bidet beyane,*
*3 K'a bêjne min duȓ, t'exte û P'adşê min têda girtî mek'ane?*

**S. 3** *1 Aşiqê e'rifî zana,*
*2 Hilûn ji min ȓa biden beyane,*
*3 Duȓ, t'exte û P'adşayî tê girtin mek'ane?*

**S. 3** *1 Aşiqê e'rifî zane,*
*2 Werin ji min ȓa bidin beyane,*
*3 Duȓ t'exte û P'adşa lê girt mek'ane?*

**S. 3** *1 Aşiqo e'rifê zana,*
*2 Yarek divê vê ĥerfê me bide beyane,*
*3 Duȓ t'exte, P'adşayê min lê girtîye mik'ane?*

**S. 2** *1 Aşiqê e'rifî zane,*
*2 Werin ji mi ȓa biden beyane,*
*3 Duȓ, t'exte û P'adşî lê girt mek'ane?*

**S. 4** *1 P'adşê min duȓ ji xwe çêkir,*
*2 Seyrand û seyran pê kir,*
*3 Û sewirand û ber p'êk kir[635].*

**S. 4** *1 P'adşê min duȓ ji xwe çêkir,*

[630] *maşoq*
[631] *mukur*
[632] *mukur*
[633] *Aşoq*
[634] *maşoq*
[635] *pêkir*

*2 Seyrî, seyran lê kir,*
*3 Û sêwirî û ber p'êk kir.*

**S. 4** *1 P'adşê min duȓ ji xwe cihêkir,*
*2 Seyrî seyran lê kir,*
*3 Sêwirî û ber p'êk kir.*

**S. 4** *1 P'adşayê min duȓ ji xwe çêkir,*
*2 Sewirand, k'ewirand bervê kir,*
*3 Seyîdî seyîran dey lê kir.*

**S. 3** *1 P'adşê min duȓ ji xwe cihêkir,*
*2 Seyîrî, seyran pê kir,*
*3 Sêwirî, û ber pê kir.*

**S. 5** *1 P'adşê min duȓ ji xwe vavare*[636]*,*
*2 Duȓ qendîleke maldare,*
*3 Qendîl û nûr sit'are.*

**S. 5** *1 P'adşê min duȓ ji xwe vavare,*
*2 Duȓ qendîleke maldare,*
*3 Qendîlê nûr sit'are.*

**S. 5** *1 P'adşê min duȓ ji xwe vavare,*
*2 Duȓ qendîleke maldare,*
*3 Qendîlê nûr sit'are.*

**S. 5** *1 P'adşayê min duȓ ji xwe vavare*[637]*,*
*2 Qendîla meye dare,*
*3 Ew qendîle nûr sit'are.*

**S. 4** *1 P'adşê min duȓ ji xo vavare,*
*2 Duȓ qendîle ke maldare,*
*3 Qendîlê nûr sit'are.*

**S. 6** *1 Ku duȓ şekilî ye,*
*2 P'adşaye birî xerqe jê ye,*
*3 Dayîm mêra, milyak'eta silavîye lê ye.*

**S. 6** *1 Duȓ ji kelîma P'adşê ye*
*2 Xerqe derk'eftî jê ye,*
*3 Dayîm mêra silavîye lê ye.*

**S. 6** *1 Duȓ ji k'ilîma P'adşê ye,*
*2 Xerge derk'eftî jê ye,*
*3 Dayîm mêra silave lê ye.*

**S. 6** *1 Duȓe ji k'ilîma P'adşê,*
*2 Xerge şêx Adî derk'etîye jê,*
*3 E'wilîn da mêra silam elê.*

**S. 7** *1 Ku ji duȓê derk'eftî xerqe,*
*2 Pê zeynanidî Şame ĥeta Şerqe,*
*3 Şêx Adî deng li şêxû Bek'ir kir, got: «Hil û, xerqeyî li berk' ke*[638]*!»*

**S. 7** *1 Ji duȓê derk'eftî xerqe,*
*2 Pê zeynî Şame ĥeta bi Şerqe,*
*3 Şêx Adî deng li şêxû Bek'ir kir, got: «Hil û, xerqe yî li berk' ke!»*

**S. 7** *1 Ji duȓê derk'etîye xerqe,*
*2 Pê Şe'm zeyînandîye ĥetanî Şerqe,*
*3 Şêx Adî deng*[639] *şêxû Bek'ir kir, go: «Hilîne û berke».*

**S. 8** *1 Şêxû Bek'ir dibêjit: «E'zîzê min, ez ji mêja vê yekê yî ĥewceme,*
*2 Çiqas zêȓ û malê xwe bîr pê dibeme,*

---

[636] binêr: *vavart*
[637] *wevar*
[638] *ber ke*
[639] *deyl*

*3 Ĥemû yî li oẍira[640] xerqê şêx Adî neder deme».*

**S. 8** *1 Şêxû Bek'ir go: «E'zîzê min, ez ji mêj li wê ĥerfê ĥewceme,*
*2 Çiqas zêȓ û malê xwe bîr pê dibeme,*
*3 Ez ĥemûyî li oẍira xerqê şêx Adî neder deme».*

**S. 7** *1 Şêxû Bek'ir got: «E'zîzê min, ji mêje li vê ĥerfê ĥewceme,*
*2 Çiqas zêȓ û malê p'iȓ pê dibeme,*
*3 Ĥemû li oẍira xerqey neder didime.*

**S. 8** *1 Şêxû Bek'ir go: «E'zîzê min, ez vê yekê ĥewceme,*
*2 Ĥemû mal û zêȓ xwe bideme,*
*3 Ĥemû oxira xerqê şêx Adî ĥeq nezer bide min».*

**S. 9** *1 «E'zîzê min, Ez ji mêja vê yekê dinêȓim,*
*2 Çiqas malê xwe bîȓ, pê dibêrim,*
*3 Ĥemûyî li oẍira xerqê silt'an şêx Adî, ĥeq neder sip'êrim».*

**S. 9** *1 «E'zîzê min, ji mêj vê ĥerfê guhdêrim,*
*2 Çiqas zêȓ malê bîȓ, pê dibêrim,*
*3 Ez ĥemûyî li oẍira xerqê silt'an şêx Adî, ĥeq neder sip'êrim».*

**S. 8** *1 «E'zîzê min, ji mêje li vê ĥerfê guhdêrim,*
*2 Çiqas zêȓ û malê p'iȓ pê dibîrim,*
*3 Ĥemû li oẍira xerqey neder disep'êrim».*

**S. 9** *1 Şêxû Bek'ir go: «E'zîzê min, ez vê yekê gudêrim,*
*2 Çendîk mal û zêȓê xwe pê bidêrim,*
*3 Ĥemû oxira xerqê şêx Adî, ĥeq nezer bisip'êrim».*

**S. 10** *1 P'adşayê min ev nefsa qebiland,*
*2 Hidrîsê[641] Xeyat xerqe li bejinê fesiland,*
*3 Feqîra li pê nefiland.*

**S. 10** *1 P'adşê min ev nefes qebiland,*
*2 Hidrîsê[642] Xeyat xerqe di fesiland,*
*3 Feqîra li pê nefiland.*

**S. 10** *1 P'adşayê min vê yekê diqebiland,*
*2 Hidlîsî[643] Xeyat xerqe anî fesiland,*
*3 Feqîra vê ȓa diniqiland.*

**S. 11** *1 Li pê neqilandbû feqîra,*
*2 Hincîyê t'erk ket xirabe, fênîya, û wîra,*
*3 Dê wî xelat ket miftan û k'ilîla.*

**S. 11** *1 Li pê neqilandbû feqîra,*
*2 Hincîyê t'erk ket xirabe, fênîya, û wîra,*
*3 Dê xelat ken bi miftan û k'ilîla.*

**S. 9** *1 Li pê neqilandibû feqîre,*
*2 Hincîyê t'erk kir xirabe, fêniya, wire,*
*3 Dê xelat kin miftan û k'ilîla.*

**S. 11** *1 Vê ȓa diniqiland feqîra,*
*2 Ĥerçî kesê berê xwe bide xirave, fêrîya, e'rye,*
*3 Wê xelat bike wan mifta, wan k'ilîla.*

**S. 12** *1 Ew k'ilîl û ew miftene,*
*2 Bi destê wan cindîya vedibine,*
*3 Yê her pênc ferzêt ĥeqîqetê li dîwana şêx Adî û melik şêx Sin, ȓoja axretê, bo wan bi şehdene.*

**S. 12** *1 Ew k'ilîl û ew miftene,*

---

640 oxir
641 *Edrîs*
642 *Edrîs*
643 *Îndlîs*

*2 Bi destê wan cindîya vedibine,*
*3 Yê her pênc ferzêt ĥeqîqetê li r̂oja axretê bora bi şehdene.*

**S. 10** *1 Ew k'ilîl û ew miftene,*
*2 Bi destê wan cindîya vedibine,*
*3 Her pênc ferzên ĥeqîqetê r̂oja axretê jêre şehdene.*

**S. 12** *1 Ew k'ilîlin, ew miftene,*
*2 Destê wa cindîya vedivene,*
*3 Her pênc ferzê ĥeqîqetê r̂oja axretê, ser me mane şehdene*[644]*.*

**S. 13** *1 P'adşê min e'wil ku mîr bû,*
*2 Xwedanê cêşê k'ibîr bû,*
*3 Ĥeft sur̂a*[645] *silt'an Êzîdê minê feqîr bû.*

**S. 13** *1 P'adşê min e'wil ku mîr bû,*
*2 Xwedanê cêşê K'ibîr bû,*
*3 Ĥeft sur̂ê silt'an Êzîd r̂a xebîr bû.*

**S. 11** *1 P'adşê min e'wil ku mîr bû,*
*2 Xwedanê cêşê K'ibîr bû,*
*3 Bi ĥeft sur̂êd silt'an Êzî r̂a yî xebîr bû.*

**S. 14** *1 P'adşayê min e'wil ku*[646] *mîr bû,*
*2 Xwedanê*[647] *ceşê K'ibîr bû,*
*3 Ĥeft sur̂ê silt'an*[648] *Êzîdê minî feqîr bû.*

**S. 14** *1 P'adşê minî P'adşe,*
*2 Neqaşê çendî neqşe,*
*3 Silt'an Êzî dizanit k'î li bere k'î li paşe.*

**S. 14** *1 P'adşê minî P'adşa,*
*2 Neqaşê çendî neqşa,*
*3 Silt'an Êzî dizanit, k'î li bere k'î li paşe.*

**S. 12** *1 P'adşê minî*[649] *P'adşe,*
*2 Neqşê çendî neqşe,*
*3 Silt'an Êzî dizanit k'î li bere, k'î li paşe.*

**S. 13** *1 P'adşayê minî P'adşa,*
*2 Neqaşê ser çendî neqaşa,*
*3 E'zîzê min zane k'î li bere, k'î li paşe.*

**S. 15** *1 P'adşê mino yî li wehdanîya,*
*2 Dostê dilê minî Bêrîya,*
*3 Xilmeta bi sadiq û ya wekî te divîya.*

**S. 15** *1 P'adşê min li wehdanîye,*
*2 Dosta dilê minî pê di e'limîye,*
*3 Xilmeta bi sadîqîya weye, wekî P'adşê min pê divîye.*

**S. 13** *1 P'adşê minî wehdanîye,*
*2 Dostê dilê min pê di ilmîye*[650]*,*
*3 Xilmeta bi sadiqîye weye, wekî P'adşê min pê divîye.*

**S. 16** *1 P'adşê mino sur̂ li sema,*
*2 Berê ne Lewĥ hebû, ne Qeleme,*
*3 Li ba silt'an Êzî ew se'ete, ew deme.*

**S. 16** *1 P'adşê min sur̂ li sema,*
*2 Ji berê ne Lewĥ hebû, ne Qeleme,*
*3 Ya silt'an Êzî, li ba te ew se'ete, ew deme.*

---

[644] *şe'de*
[645] *hevsur*
[646] *e'wlik*
[647] *xudan*
[648] *sultan*
[649] *minyî*
[650] *e'limiye*

**S. 14** *1 P'adşê min suȓ li sema,*
*2 Berê ne Lewĥ hebû, ne Qeleme,*
*3 Ya silt'an Êzî, li ba te ew se'ete[651], ew deme.*

**S. 15** *1 P'adşayê minî suȓ li[652] sema,*
*2 Wexta ne Lewĥ[653] bû, ne Qeleme,*
*3 E'zîzê min ew seĥete, ew deme.*

**S. 5** *1 P'adşê min suȓ li sema,*
*2 Berê ne Lewĥ hebû, ne (Qeleme),*
*3 Ya silt'an Êzî, li ba te ew see'te, ew deme.*

**S. 17** *1 Berê ne Qelem hebû, ne Lewĥe,*
*2 Min yarek divêt, bêjin ew ĥerfê li ku dibûye,*
*3 Li ku melek yek bû[654], bûne du ye?*

**S. 17** *1 Ji berî ne Qelem hebû, ne Lewĥe,*
*2 Me yarek divêt, vê ĥerfê şiro biket li k'uye?*
*3 Melek yek bû[655], bûne duye?*

**S. 15** *1 Berê ne Qelem hebû, ne Lewĥe,*
*2 Me yarek divê vê ĥerfê şiro biket, ye li k'uye?*
*3 Melek yek bû, bûne duye.*

**S. 16** *1 Wexta ne Qelem bûye, ne Lewĥye,*
*2 Yarek dive: «Binê k'a li k'uye,*
*3 Melek yek bû, bûne duye.*

**S. 18** *1 Ber firwara P'adşêye,*
*2 T'eftîşa me li wê cewabêye,*
*3 Melek du bûn, bûne sêye.*

**S. 18** *1 Ber firwara P'adşêye,*
*2 T'eftîşa min vê cewabêye,*
*3 Melek du bûn, bûne sêye.*

**S. 16** *1 Li ber firwara P'adşêye,*
*2 T'eftîşa me li wê cewabêye,*
*3 Melek du[656]bûn, bûne sêye.*

**S. 17** *1 Ba firwara P'adşê,*
*2 T'imtêşa me vê cavê,*
*3 Melek dudu bûn, bûne sisê.*

**S. 19** *1 P'adşê mino yî Cebare,*
*2 Ji ba te hatî firware,*
*3 Melek sê bûn, bûne care.*

**S. 19** *1 P'adşê minî yî Cebare,*
*2 Ji ba te hatî firware,*
*3 Melek sê bûn, bûne care.*

**S. 17** *1 P'adşê minî Cebare,*
*2 Ji ba hetbû firware,*
*3 Melek sê bûn, bûne care.*

**S. 18** *1 P'adşê minî Cebare,*
*2 Ba wî bata ferware,*
*3 Melek sisê bûn, bûne care.*

**S. 20** *1 P'adşê mino yî mizêce,*
*2 Ew dinya se'ete û sênce,*

---

651 *seat*
652 *û*
653 *luh*
654 *bûn*
655 *bûn*
656 *dû*

*3 Melek çar bûn, bûne pênce,*
*4 Her yek bo mifadê[657], her yekû r̂ênce.*

**S. 20** *1 P'adşê minî yî mizêce,*
*2 Ew dinya se'ete û sênce,*
*3 Melek çar bûn, bûne pênce,*
*4 Her yek bo mifadê, her yekû r̂ênce.*

**S. 18** *1 P'adşê minî mizênce,*
*2 Melek çar bûn, bûne pence,*
*3 Her pênc bûne şefa'etê[658], ĥer r̂êkû r̂ênce.*

**S. 19** *1 P'adşayê minî mizênce,*
*2 Melek çar bûn, bûne pênce,*
*3 Her pênc bune mitĥê r̂ênce.*

**S. 6** *1 Bas melekî yek û du, sê û çiwar dekate ênca:*
*2 P'adşê minî mizênce,*
*3 Melek çar bûn, bûne pênce,*
*4 Her pênc bûne sifĥetê her yêk û r̂înce.*

**S. 21** *1 P'adşê min li vê yekê yî xweşe,*
*2 Melek pênc bûn, bûne şeşe,*
*3 Her şeş bûne melekêt E'rşe.*

**S. 21** *1 Dilê min bi vêkê xweşe,*
*2 Melek pênc bûn, bûne şeşe,*
*3 Her şeş bûne melekêt E'rşe.*

**S. 19** *1 Dilê min li vê yekêyî xweşe,*
*2 Melek pênc bûn, bûne şeşe,*
*3 Her şeş bûn melekên E'rşe.*

**S. 20** *1 P'adşayê min vê yekê dilxweşe,*
*2 Melek pênc bûn, bûne şeşe,*
*3 Her şeş bûne melekê E'rşe.*

**S. 7** *1 Dilê min li vê yekê yî xoşe,*
*2 Melek pênc bûn, bûne şeşe,*
*3 Her şeş bûne melekêd E'rşe.*

**S. 22** *1 P'adşê min xweş kirî suhbete,*
*2 Melek şeş bûn, bûne ĥefte,*
*3 Her ĥeft lêk di êwirîn muĥbete.*

**S. 22** *1 P'adşê min xweş kirî suhbete,*
*2 Lêk r̂unişitbûn suhbete,*
*3 Melek şeş bûn, bûne ĥefte.*

**S. 20** *1 P'adşê min xweş kir suhbete,*
*2 Lêk r̂ûniştin muĥbete[659],*
*3 Melek şeş bûn, bûne ĥefte.*

**S. 21** *1 Sobet xweş sovete,*
*2 K'ase, badîye û movete[660],*
*3 Melek şeş bûn, bûne ĥefte[661],*

**S. 8** *1 P'adşê min xoş kir suĥbete,*
*2 Lêk r̂ûniştin muĥbete,*
*3 Melek şeş bûn, bûne ĥefte.*

**S. 23** *1 Her ĥefta ku êfirîn,*
*2 Bi r̂astî lêk diêwirîn,*
*3 Nûra êk dibirîn.*

---

[657] *mife'et*
[658] *şifet*
[659] *muhbet*
[660] binêr: *muĥbet*
[661] *ĥevt*

**S. 23** *1 Her ĥeft ku die'firîn,*
*2 Bi r̂astî lêk diêwirîn,*
*3 Bi muĥbetê bi nedera êk dibirîn.*

**S. 21** *1 Her ĥeft ku di e'firîn,*
*2 Bi r̂astiyê lêk diêwirîn,*
*3 Bi muĥbetê bi nedera yek didebirîn.*

**S. 22** *1 Her ĥeft dix̂afilîn[662],*
*2 Ciyê r̂astîyê dihewirîn,*
*3 Ew movetê êk dibirîn.*

**S. 9** *1 Her ĥefta ku diêf̂irîn,*
*2 Bi r̂astê lêk diêwirîn,*
*3 Bi muĥbetê bi nedira êk didebirîn.*

**S. 24** *1 Nedera xasa li nav xwe dane medere[663],*
*2 Ewê r̂ojê sinet daneye fere.*

**S. 24** *1 Neder, xweş nedere,*
*2 Nav xwe danebû mehdere,*
*3 Li wêder çêkirin sinetû fere[664].*

**S. 23** *1 Neder xweş nedere,*
*2 K'etîye nava mêre madere,*
*3 P'adşayê min lê çêkirîye sinetû fere.*

**S. 25** *1 Dilê min vê yekêyî şaye,*
*2 Feqîrek hinarte her-herî ev îmane,*
*3 Nav lê dana, E'yn il-Beyzaye»,*
*4 Ev meclîs bi navê şêx Adî û melik şêx Sin bû avaye.*

**S. 25** *1 P'adşê min wekire r̂aye,*
*2 Feqîrek şand her-herê av înaye,*
*3 Nav lê kir E'yn il-Beyzaye».*

**S. 22** *1 P'adşê min we kire r̂aye,*
*2 Feqîrek şand hûr-hûr av înaye,*
*3 Nav lêkir kaniya Sipîye (E'yn il-Beyzaye).*

**S. 24** *1 P'adşayê min vê yekê dilşaye,*
*2 Feqîrek şandîye t'ebeqa[665] her-herê avek înaye,*
*3 Navê wê danîye E'yn il-Beyzaye[666],*
*4 Ev r̂oje miclisa mêrê êzdî pê bûye avaye.*

**S. 26** *1 Feqîra jê xeber da,*
*2 Ji e'zmana ĥeta bi e'rda,*
*3 Ji e'rda ĥeta bi serda,*
*4 Ava kaniya Sipî mifade ser çiqas kul û derda.*

**S. 26** *1 Feqîra we jê xeberda,*
*2 Ji e'zmana ĥeta bi e'rda,*
*3 Ji e'rda ĥeta bi serda,*
*4 Ava kaniya Sipî mifade ser çîqas derda!*

**S. 23** *1 Feqîra we jê xeber da,*
*2 Ji e'zman ĥeta bi e'rda,*
*3 Ava kaniya Sipî şefa'eta çiqas derda.*

**S. 27** *1 P'adşê min Cebare,*
*2 Ji dur̂ê e'firandbû çare[667],*
*3 Baye, û axe, û ave, û nare.*

---

[662] *dixafilîn*
[663] binêr: *mehder*
[664] *sinet û fere*
[665] *tevek*
[666] *e'ynzil beyzaye*
[667] *car*

**S. 27** *1 P'adşê minî Cebare,*
*2 Ji dur̂ê e'firand bû care,*
*3 Axe, ave, baye û agire.*

**S. 24** *1 P'adşê minî Cebare,*
*2 Ji dur̂ê e'rfan dibûn care,*
*3 Axe, û ave, û baye, û agire.*

**S. 25** *1 P'adşayê minî Cebare,*
*2 Ji dur̂ê fariq kirne care,*
*3 Baye, ave, axe û nare.*

**S. 10** *1 P'adşê min Cebare,*
*2 Ji dur̂ê e'firandbûn çare,*
*3 Axe, û ave, û baye û nare.*

**S. 28** *1 Herçar yarêt faxirin,*
*2 K'î di înan û k'î dibirin,*
*3 K'î ji mersumî*[668] *fariqe dikirin?*

**S. 28** *1 Herçar ku di faxirin,*
*2 Bi k'ê di înan û k'ê dibirin?*
*3 Bi k'ê mersumê ji dur̂ê fariqe dikirin?*

**S. 25** *1 Herçar ku di faxirin,*
*2 Bi k'ê di înan û bi k'ê dibirin,*
*3 Bi k'ê mersûmê ji dur̂ê fariq kirin.*

**S. 11** *1 Herçar ku di faxirin,*
*2 Bi k'ê di înan û bi k'ê dibirin?*
*3 Bi k'ê mersumê ji dur̂ê farîq kirin?*

**S. 29** *1 Herçar yarêt dirusin,*
*2 Ne dixwerin û dinivistin,*
*3 K'î ji mersûmê dur̂ê ve diguhastin.*

**S. 29** *1 Her çarêt dirusin,*
*2 Ne dixwere û diniviste*
*3 Bi kê ji mersûmê ji dur̂ê ve diguhaste?*

**S. 26** *1 Her çarên diruste,*
*2 Ne dixwerin ne di niviste*[669]*,*
*3 Bi k'ê mersûmê ji dur̂ê ve diguhiste.*

**S. 26** *1 Herçare dirustin,*
*2 Ne dixwarin*[670]*, ne jî dinivistin,*
*3 K'ê mesruf ji dur̂ê vediguhastin.*

**S. 12** *1 Her çarêd diruste,*
*2 Ne dixwerin û diniviste,*
*3 Bi kê ji mersûmê ji dur̂ê vediguhaste?*

**S. 30** *1 Mersum ne hatîye mêr bixuricî,*
*2 Dur̂ ji ber P'adşa xuricî,*
*3 Şêx Berk'at hat û tê mezicî.*

**S. 30** *1 Mersum ne hate mîr bicewizî,*
*2 Dur̂ ji ber P'adşayî xuricî,*
*3 Ciyê şêx Berk'at bû, hat û tê mezicî.*

**S. 27** *1 Mesruf nehatîye mîr mizewcî,*
*2 Te nizanbû ew çi mêre hatîye te mizewcî,*
*3 Dur̂ ber P'adşayê min xur̂icî.*

**S. 31** *1 Ji qewlê p'îr R̂eşê Ĥeyrane,*

[668] *mersub*
[669] *diviste*
[670] *dixarin*

*2 Hincîye bi r̂astî bestî dest dihavête damana yarû birane,*
*3 Beĥrêt giran merk'eba wê here melevane.*

**S. 31** *1 Ji qewlê qur̂eşê ĥeyrane,*
*2 Hincîye bi r̂astî bestî dest di havête damana yarû birane,*
*3 Dayîm merk'eba wî li beĥrêt girane melevane.*

**S. 28** *1 Qewlê p'îr R̂eşê Ĥeyrane,*
*2 Mork'eve li beĥrê*[671] *girane,*
*3 Ew dayne me li wane.*

**S. 32** *1 Ji qewlê p'îr R̂eşê cîda,*
*2 Dibêjime we gelî mirîde,*
*3 Me din Şerfedîne, atqata me silt'an Êzîde.*

**S. 32** *1 Ji qewlê Qur̂eşê cîda,*
*2 Dibêjme we gelî mirîde,*
*3 Me din Şerfedîne, atqata silt'an Êzîde.*

**S. 29** *1 Qewlê p'îr R̂eşê cîda,*
*2 Dibêjime we gelek mirîda,*
*3 Dînê me Şerfedîne,*
*4 Qulbet*[672] *kaniya Sipî,*
*5 Atqat navê silt'an Êzdîd t'emam.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî di t'emamin!*
*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî di t'emamin!*

## 27. QEWLÊ HERÊ BERÊ K'O BÛ?![673]

**S. 1** *1 Herê berê k'o bû,*
*2 Xeber bide hêj nebû bû,*
*3 Bêje min, ji e'wil P'adşayî min li k'o bû?!*

**S. 2** *1 Dirust bide k'ilîma dirust,*
*2 P'adşayê min ne dixwar û ne dinivist,*
*3 E'wil P'adşayê min çî dip'erist*[674]*?!*

**S. 3** *1 Dirust bide beyane,*
*2 P'adşayê min yekî R̂eĥmane,*
*3 E'wil P'adşayê min derd çêkir, yanî dermane?!*

**S. 4** *1 Ew qewl, qewlekî meqbile*[675]*,*
*2 P'adşayê min yekî E'dile*[676]*,*
*3 P'adşayê min nûr bû, nûr jê dibû ĥêsile.*

**S. 5** *1 E'wil P'adşayê min nûr bû,*
*2 Neqaşê neqşê hûr bû,*
*3 Ji berî xet, û k'itêb, û deft'er, û mişur bû.*

**S. 6** *1 Seyîdî muĥbete ji qevdeye,*
*2 Nûre li dêrgeye, şewqe li e'rdêye,*
*3 Navda ĥebîbê Xwedêye.*

---

[671] *be'r*
[672] binêr: *qible*
[673] [2] (rr. 259–262)
[674] binêr: *p'erestin*
[675] binêr: *meqbûl*
[676] binêr: *E'dîl*

**S. 7** *1 Seyîdî, min ĥeybete*[677] *ji qevda ȓaste,*
*2 Nûreke dî jê dibîȓaste,*
*3 Pêşa destê xwe veguhaste.*

**S. 8** *1 Muĥbeta ji qevda zere,*
*2 Nûrê da nûrê nezere,*
*3 Jê sewirand melik şêx Ĥesenî minê bi cehwere.*

**S. 9** *1 Seyîdî, P'adşayê min muĥbet ji ba xwe e'frand,*
*2 Îna li ba xwe, didebirand,*
*3 Melik şêx Sin jê disewirand.*

**S. 10** *1 Seyîdî, P'adşayê min muĥbet ji ba xwe dixulqand,*
*2 Îna li ba xwe, die'liqand,*
*3 Melik şêx Sin jê difariqand.*

**S. 11** *1 Seyîdî, P'adşayê min muĥbet ji ba xwe dimezicand,*
*2 Îna li ba xwe, dixuricand,*
*3 Melik şêx Sin jê difaricand.*

**S. 12** *1 Seyîdî, çêl salî P'adşayê min mabû li qendîle,*
*2 Aşiq — celala, me'şûq*[678] *— Celîla,*
*3 P'adşayê min hêvên da Adem, û Nuĥ, û Birahîm il-Xelîle.*

**S. 13** *1 P'adşayê min mixfî*[679] *suȓe,*
*2 Yek ĥerf ĥedê p'iȓe,*
*3 Beyzayê k'ef da duȓe.*

**S. 14** *1 P'adşayê dabû K'af,*
*2 P'adşayê min çobûye nav,*
*3 P'adşayê min çêdikirin Bê û Elef*[680]*.*

**S. 15** *1 P'adşayê min Bê û Elîf kirin t'ebabe,*
*2 P'adşayê min çobû nave,*
*3 Ew bi xwe bû, li xwe dikir silave!*
*4 Ew bi xwe bû, li pêş destê xwe vewesta.*

**S. 16** *1 Li pêş destê xwe veweste,*
*2 Aşiqa pê heweste,*
*3 Ji aşiqa li ber ne diwesta.*

**S. 17** *1 Ji aşiqa dabû dere,*
*2 Nûrê da nûrê nedere,*
*3 Jê disewirand şêx Ĥesenê min bi cehwere.* (binêr **S. 8**)

**S. 18** *1 Aşiqa dabû cewabe,*
*2 P'adşayê min çobûye nave,*
*3 Duȓ mewcî û buye ave.*

**S. 19** *1 Duȓ mewcî û hecicî*[681]*,*
*2 Buye beĥr û mewcî,*
*3 P'adşayê min nûr bû, bi hikmê xwe difericî.*

**S. 20** *1 Seyîdî, beĥrê k'ef dane,*

---

[677] *hibet*
[678] *maşuq*
[679] *muxfî*
[680] binêr: *Elîf*
[681] binêr: *hecacî*

*2 Jê ço duxane,*
*3 P'adşayê min jê nijîyar kir e'rd û e'zmane.*

**S. 21** *1 Seyîdî, beĥrê k'ef dar da,*
*2 Aşiqa we jê xeber da:*
*3 «P'adşayê min nijîyar kir e'zman û e'rda».*

**S. 22** *1 Seyîdî, beĥrê k'ef r̂evî,*
*2 P'adşayê min jê çêkirin e'rd, û e'zman, û zevî,*
*3 Eweye wek P'adşayê min pê divî.*

**S. 23** *1 Seyîdî, beĥrê k'ef da gişta,*
*2 P'adşayê min fikirî li ber û pişte,*
*3 P'adşayê min jê nijîyar kir doj û bihuşte.*

**S. 24** *1 Seyîdî, me muĥbet hebû ji dêr,*
*2 Heke ne e'bande Cebêr,*
*3 Dêkir bane înk'êr*[682].

**S. 25** *1 Seyîdî, nête înk'ar kirin,*
*2 Nûr bi nûrê diêwirin,*
*3 Muĥbetê bi nedera hev didebirin.*

**S. 26** *1 Seyîdî, Xwedê û nebîy cotin,*
*2 Not û neh k'ilîm*[683]*bi hew r̂a, digotin, 3*
*Ew bi xwe bûn, li xwe dihindotin.*

…………………………………………..
…………………………………………..
…………………………………………..

(Ew qewl ne yî t'emame û çend sebeqe jê di k'uwîne)

## 28. QEWLÊ MELIK SALIM[684]

**S. 1** *1 Distirêm bi xeberêt k'itêbe,*
*2 Ji e'rifêt zana û bi ĥisêbe,*
*3 Berî Birahîm*[685] *p'êẍember çêbe.*

**S. 2** *1 Melek nazilbû li Şame,*
*2 E'rif û zana [b]û bi fame,*
*3 Cebêrî hinarte ba me.*

**S. 3** *1 Cebêrî hinarte Şamê,*
*2 E'rifek bixunit Xamê,*
*3 K'î dizanî cewabê, welamê.*

**S. 4** *1 Êzdîn mîr digo: «Ba wî bûm,*
*2 Li wê nuqtê hayî bûm,*
*3 Ji qendîlê li cem wî bûm».*

**S. 5** *1 Meleke, melikê mêran,*

682 binêr: *înk'ar*
683 *kilam*
684 [2] (rr. 326–328)
685 *Birhîm*

*2 Qendîle di nêva e'zman*[686]*,*
*3 Ji bo me hînabû peyka Ezdan.*

**S. 6** *1 Silt'ênî*[687] *li bo xwe hinare,*
*2 Bo Lalişê û herçar kenare,*
*3 Bo me xweş yare.*

**S. 7** *1 Ji bora Birahîmî kirbû sicûde,*
*2 Dehêke ji male xwede*[688]*,*
*3 Bû mîrê bi cîde.*

**S. 8** *1 Melike ew dî use,*
*2 Nav yara, li cem Tawise*[689]*,*
*3 Berî Îsa û Mûsa*[690]*.*

**S. 9** *1 Melîkek r̂abû li Orşelîme,*
*2 Sadiqekî zor qedîme,*
*3 E'rifekî e'lîme.*

**S. 10** *1 Ew nûra selîm û sadiq,*
*2 Zanayê bi fehm û natiq,*
*3 Ferwara Xwedayê xaliq.*

**S. 11** *1 Melekê sadiq*[691]*û ĥeqîqe,*
*2 Bo Birahîme zorî şefîqe.*

**S. 12** *1 Sadiq li Birahîmî maşê xwe wergirt,*
*2 Birahîmî ji Salim ilm wergirt.*

**S. 13** *1 Selam silt'anî anî,*
*2 Mişûr û xetî sibĥanî,*
*3 Sed û ĥed hingî r̂anî.*

**S. 14** *1 Nuqteyek ji ilmê ĥeqîqet,*
*2 Hat xwarê sur̂a nûra t'erîqet.*

## 29. QEWLÊ QIYAMETÊ – QEWLÊ T'ERCAL

**şaxê – 1**[692; 693]
**S. 1** *1 Şerefim lawê Dawûde,*
*2 Kuştîbûm pênûsa û'de,*
*3 Xortek bûm, r̂êya ceû'de.*

**S. 1** *1 Şerefim lawê Dawide,*
*2 Kuştbûm qelema ude,*
*3 Şeref r̂êya caude.*

**S. 2** *1 Şerefim lawe p'îre,*
*2 Dilsot bûm ji r̂êza mîre,*
*3 Ez xortek bûm r̂êya feqîre.*

---

686 *esman*
687 binêr: *silt'an*
688 *xoda*
689 *Taûs*
690 *Muse*
691 *sidiq*
692 [50] (rr. 194-198)
693 [2] *Qewlê T'ercal* (rr. 485–488)

**S. 2** *1 Şerefîm lawê p’îra,*
*2 Dilsot ji r̂ezay mîra,*
*3 Şeref bûm r̂êya feqîra.*

**S. 3** *1 Şeref deng diket e’sase,*
*2 Fêmê min xweş[694] qiyase[695],*
*3 Tu Xidirê, an Liyase?*
**S. 3** *1 Şeref deng kir li e’sase,*
*2 Fêmê min xweş qiyase[696],*
*3 Nizanim tu Xidirî, yan Ilyase?*

**S. 4** *1 Hey Xidiro, yî Xidirî[697],*
*2 Ber hêza Qadirî,*
*3 Amê kuşibû dahirî.*
**S. 4** *1 Xidiro yî, ya Xiderî,*
*2 Tu li ber ĥimeta Qadirî,*
*3 A’mê em kuştin dahirî.*

**S. 5** *1 Dahirî[698] a’mê kuştin,*
*2 Zora mala xwe dihiştin,*
*3 Wan şuna xêrêt xwe, şer̂ dihistin.*
**S. 5** *1 A’mê em dahir kuştin,*
*2 Zora male xwe hiştin,*
*3 Wan şuna xêrêt xwe şer̂ hiştin.*

**S. 6** *1 Hun lêkin herîre,*
*2 Berdin xerabe, fêniya, wîre,*
*3 Da ji we gazî nebin gund û cinîre.*

**S. 7** *1 Li ber mersûma Xwedayê delale,*
*2 Xêr çûn, man şer̂ û qale,*
*3 Bawerkin we r̂abe T’ercale.*
**S. 6** *1 Ew jî ber mersuma Barî Te’ala,*
*2 Dê li wir bit qîl û qale,*
*3 Yeqîn[699] dê r̂abit T’ercale.*

**S. 8** *1 Dê r̂abe T’ercale,*
*2 K’iryare wî k’iryarekî betale,*
*3 Hin dêçin, û hin naçine ji bale.*
**S. 7** *1 Dê r̂abit T’ercale,*
*2 Fe’lê wî fe’lekî betale,*
*3 Hinê biçine bal, hin naçine bal.*

**S. 9** *1 T’ercal ji sibĥanê derk’eft,*
*2 Leşkerekî zorî zav li ber k’eft,*
*3 Ji te'liyê kêm xeber k’eft.*
**S. 9** *1 T’ercal ji sibĥanê dekret,*
*2 Leşkerekî zorî zav li ber ket,*
*3 Ji Te’alî kêm xeber ket.*

**S. 10** *1 T’ercal ji sibĥanê hate dere,*
*2 Leşkerekî zorî zavî li bere,*
*3 Ji te'iliyê kêm xebere.*

---

[694] *xoş*
[695] *qeyas*
[696] *qîyas*
[697] *axder*
[698] *dehar*
[699] *êqîn*

**S. 8** *1 T'ercal ji sibĥanê hate dere,*
*2 Leşkerekî[700] zor zav heye li bere,*
*3 Ew ji Te'alî diden xebere.*

**S. 11** *1 T'ercal dêçite e'rdê Şamê,*
*2 Dê li wir qelsket îslamê*
*3 Dê nêzîk be r̂oja qiyame.*
**S. 10** *1 T'ercal dêcite e'rdê Şamê,*
*2 Dê li wir naqisket Îslamê,*
*3 Dê li wan ket r̂oja om il-qiyamê.*

**S. 11** *1 P'adşê min li ĥalê me beze miskîn bipirsî,*
*2 I'sa dê êt Misrê, r̂ûnêt ser t'ext û k'ursî,*
*3 Ewê r̂ojê mîh ji gûr natirsî.*

**S. 12** *1 P'adsê me li r̂ewêa me beze miskîna pirsî dîsa,*
*2 Dê were gerdûnê ĥezretî Îsa,*
*3 Dê bikujê, wî kur̂ê Sîse.*
**S. 12** *1 P'adşê min li ĥalê me beze miskîn bipirsî dîsa,*
*2 Dê dahirbit ĥezretî Îsa,*
*3 Dê bikujit wî kurê sîse.*

**S. 13** *1 Dê kujit kur̂ê miskîne,*
*2 Bi r̂ohilatve bibin mizgîne,*
*3 Bila xort bikin dîne.*
**S. 13** *1 Dê bikujit wî kurê miskîne,*
*2 Bi Ẍerbêve bibên mizgîne,*
*3 Ji ew paş li wir qayîm biken dîne.*

**S. 14** *1 Bersivê bidne K'ur̂distanê,*
*2 Bila xort kin îmanê.*
*3 Şerfedîn mîre li wê dîwanê.*

**S. 15** *1 Bersivê bidine poriya,*
*2 Bila berden r̂eş xumriya,*
*3 Şerfedîn mirê Adiya.*

**S. 16** *1 Şerfedîn ji şkeftê hate dere,*
*2 Sed ĥezar qewşen li bere,*
*3 Ronahî wek ale li sere.*

**S. 17** *1 Şerfedîn ji şkeftê derk'eft,*
*2 Sed ĥezar qewşen li ber k'eft*
*3 R̂onahiyek bi ser k'eft.*

**S. 18** *1 Şerfedîn berê xwe ji şkeftê wergêr̂a,*
*2 Sed ĥezar qewşen vê r̂a,*
*3 Hespit bozin, zîv û zêr̂a.*

**S. 19** *1 Şerfedîn dê were ji ẍerbe,*
*2 R̂ast û çep dihingêvit derbe,*
*3 Ẍafil dêmirin ji k'erbe.*

**S. 20** *1 Şerfedîn ji R̂ojava têye,*
*2 R̂ast û çep dihingêvit derbêye,*
*3 Ẍafil dêmirin ji k'erbêye.*

---
[700] *lêşker*

**S. 21** *1 P'adşê min li r̂ewşa me beze miskîna pirsî,*
*2 Îsa dê li Misrê r̂ûnê ser t'ext û k'ursî,*
*3 Piştî wê, Şerfedîn dê hikm ke, çil sala mîĥ ji gur natirstî.*
**S. 14** *1 P'adşê min li ĥalê me beze miskîn bipirsî,*
*2 Îsa dê li Misrê r̂ûnêt ser t'ext û k'ursî,*
*3 Piştî wî Şerfedîn dê hikm ket, çil sal mîĥ ji gûr natirsî.*

**S. 22** *1 Êt*[701] *wekî melik Şerfedîn çil salî xwe kirî,*
*2 Ev gerdûn hat û r̂abuhirî*[702]*,*
*3 Ji ew paşî Hacuc û Macuc dê dahirî.*
**S. 15** *1 Yê wekî melik Şerfedîn çil salê xwe dikirî,*
*2 Ev dinya t'êk r̂abuhirî,*
*3 Hacuc û Macuc dahir kirî.*

**S. 23** *1 Dê xweyabin*[703] *Hacûc û Macûc cara,*
*2 Dê bixemilînin çiqas şara,*
*3 Dê çik ken avêd derya.*
**S. 16** *1 Ĥacuc*[704] *û Macucêt cara,*
*2 Ewê çik ket avêt beĥra,*
*3 Dê kêmken berek'etêt xwe r̂a.*

**S. 24** *1 Dê hilgirin berek'etêd e'rdane,*
*2 Çovanker dê r̂ûnîne çovane,*
*3 Bira dê bankine birane,*
*4 Werin da bikin xêrane,*
*5 Yeqîn îro li me dawiya demane.*
**S. 17** *1 Dê kêmken berek'etêt e'rdane,*
*2 Hezîz dêk'eft*[705] *qebirstane,*
*3 Bira dê gazîket birane,*
*4 Dil ji xwe r̂a*[706] *bikeînin xêrane,*
*5 Yeqîn êro li me axirzemane.*

**S. 25** *1 Ewê r̂ojê ne kesî kesa dibî,*
*2 Ne babe pisa dibî,*
*3 T'erqin li E'rşa dibi,*
*4 K'ursiya P'adşê li xwar dibî*
*5 Dadger bi xwe P'adşa dibî.*
**S. 18** *1 R̂ojakê ji r̂ojan dibî,*
*2 T'eriqênî li E'rşa dibî,*
*3 K'ursîya P'adşayî li xwar dibî,*
*4 Ĥakim bi xwe P'adşa dibî.*

**S. 26** *1 Ewê r̂ojê, ji r̂ohilat dê were baye,*
*2 Dê hingivt çiqas ĉiyaye,*
*3 Dê vê gerdûnê kete pembuyekî nû jenaye,*
*4 Tu ji r̂ohilat birêne, r̂oava ye xweyaye.*

**S. 27** *1 Ji r̂oavave dê were r̂oje,*
*2 Ewê r̂ojê dê qulpit bihuşt*[707] *û dojeh,*
*3 Ne sed xoziya wî mêrî îmane li koşe,*

**S. 28** *1 Wê bang dike dê r̂abin ser çoke,*

---

[701] *êd*
[702] binêr: *r̂abihurî*
[703] *xuya*
[704] *Hacuc*
[705] *dêkevt*
[706] *xo r̂a*
[707] *buhişt*

*2 Ji goristana derk'etin coq bi coqe,*
*3 Ewan ȟemûwa ji Şamê berbi Qudsê soqe.*

**S. 21** *1 Ji qiburê[708] derk'etin coqe,*
*2 Di dilê wande heye şayî û şoqe,*
*3 Ewan ȟemûwa ji Şamê berbi Qudsê soqe.*

**S. 29** *1 Ji goristane der tê,*
*2 Çiqas e'frînerê ȓewan li ber tê,*
*3 Ȟemû li ber ferwarê yekî fer tê.*

**S. 30** *1 Ji goȓê derêne,*
*2 Çiqas e'frînerê ȓabin ji goȓêne,*
*3 Ewan zêde guneh lêne.*

**S. 31** *1 Ewe ȓoja Xwedî ȟisabe,*
*2 Me divêt Xwedê bide wê cewabe,*
*3 Ewê ȓojê, pis yî bê zare ji babe.*

**S. 32** *1 Ewan derewêt xwe digote,*
*2 Û malê xwe bi ȓibê difiȓote,*
*3 Ewan xêrêt xwe bi ciyê şeȓêd xwe, difiȓote.*

**S. 33** *1 Henciye malê ȓibê dixware,*
*2 Zebênî dê êne ser, bê ȟed û hejmare,*
*3 Dê wî bigrin û bavejne dojêh û devêd mare.*

**S. 20** *1 Hincîyê male selef û ȓibê di xware,*
*2 Ewê li wir ket gazî û haware,*
*3 Ne sed xwezma bi ȓuȟêt gunehk'are.*

**S. 34** *1 Hincîyê malê xwe bide bi ȓibêye,*
*2 Zebênî dê qeyda kene pêye,*
*3 Ew çû ȓêya nabe ser çû ȓêye.*

**S. 19** *1 Hincîyê malê xwe didet bi selef û ȓibêya,*
*2 Dê lê kuȓt bit dest û p'êya,*
*3 Ew çu ȓê nabete ser çu ȓêya.*

**S. 35** *1 Wê bang dike hêzdare,*
*2 Bila ben ew setemkar û ew k'ufare,*
*3 Yê malê min bi ȟeramî dixware.*

**S. 22** *1 Heȓin ser minbara deng hilînin,*
*2 Navû dik'irê Êzî li wê bînin,*
*3 Dê hinerê wî şêresiwarî bînin.*

**S. 23** *1 Silt'an Êzî li ẍafilayî bi ẍezebe,*
*2 Ji wan beȟra derînin kanî û selebe,*
*3 We'de hatîye silt'an Êzî vê dinyayê biket yek yek mesebe.*

**S. 36** *1 Wê bang dike melek Adî,*
*2 Bila bên ew efendî û ew qadî,*
*3 Yê bi dad, û ȟed, û sedên min nedibû ȓazî.*

*Em di kemin, Xwedê t'emame!*

**şaxê – 2**[709]

[708] binêr: *qebir*
[709] Ji p'irtûka «ÊZDANAME». I. Weşanên «Lalîş» 2. Rû №116. Almaniya, Bîlêfêld

*1 R̂ojekê ji r̂ojan dibî,*
*2 T'erqîn li E'rşan dibî,*
*3 Xebare li ĉiyan dibî,*
*4 Siniye*[710] *li beĥran dibî.*
*5 Ne kesî kesan dibî,*
*6 Ne babê pisan dibî,*
*7 Ewê r̂ojê xelqê zalim, li wêderê nuqisan dibî.*
*8 Ew bû r̂oja dijiwar dibî,*
*9 K'ursîy ya P'adşa li xwar dibî,*
*10 Qazî bi xwe Cebar dibî.*
*11 Ne sed xwezî bi r̂uĥa înk'ar dibî,*
*12 Sed xwezme bi r̂uĥa Xwedî k'iryar*[711] *dibî.*
*13 Ew bû r̂oja mezin dibî,*
*14 Qazî bi xwe k'erîm dibî,*
*15 Xelq ĥemû xetxuyin dibî.*
*16 Ewê r̂ojê ne sed xwezme bi wê r̂uĥa derewîn dibî.*
*17 Ew bû r̂oja li wêdibî,*
*18 K'ursîy ya P'adşê li e'rdê dibî,*
*19 Qezî bi xwe Xwedê dibî.*
*20 Sed xweziya wî mêrî, kul û e'melê wî vêdibî,*
*21 Her kesekî kul û e'melê wî vêdibî.*
*22 Hey nebî, he[y] nebî,*
*23 Dilovanê yare bî,*
*24 Ĥimeta seyîda nebî,*
*25 Me hazir û guhdaran, li ber dîwana şêx Adî û melik şêx Sin hebî.*

## 30. QEWLÊ ĤEZAR Û YEK NAVA[712]

**S. 1** *1 P'adşayê minî ĥezar û yek nave,*
*2 Li ba wî ev dinya se'at û gave,*
*3 Silt'an Êzî dizane li beĥrê çend k'eşkûl ave,*
*4 Li besta çend kevir li nave,*
*5 Silt'an Êzî Hawa kire bûk, Adem zava.*

**S. 2** *1 Çendî binyane, çendî pesare,*
*2 Çendî berîye, çendî beĥre,*
*3 Ĥemû li ser k'efa Xwedê û silt'an Êzî dîyare.*

**S. 3** *1 Çendî pesare û çendî binyane,*
*2 Çendî beĥre û çendî berîye,*
*3 Ĥemû li ser k'efa Xwedê û silt'an Êzîye.*

**S. 4** *1 P'adşê minî Bêrîye,*
*2 Xwezî min bizanîye,*
*3 K'anê Gay mezintire, anî Masîye*[713]*?*

**S. 5** *1 Şirûta min ji vêye,*
*2 T'eftîşa me ji wê cewabêya,*
*3 Ĥeft*[714] *cara Masî mestire ji Gêye.*

**S. 6** *1 Bi qudreta yekî Ekbere,*

---

710 *suniye*
711 *qiriyar*
712 [2] (rr. 213–221); [1] (pp.74–81); http://www.ezdixandi.com/forum/38-290-1
713 *me'sî*
714 *heft*

*2 Masî ĥeftî û du p'eȓe,*
*3 P'eȓek jê k'embere,*
*4 Wî p'eȓî Gay li sere.*

**S. 7** *1 Birime ber wî hostayî,*
*2 Ĥeft meleke sekinîne li ber sere wî Gayî,*
*3 Her ĥeft melekêt xas û qelenderêt P'adşayî.*

**S. 8** *1 P'adşê minî Bêrîye,*
*2 Xasa mîr dinasîye,*
*3 Lewa kirine serwerê her ĥeft melekêt Adîye.*

**S. 9** *1 Beĥra nav Nisêbîne,*
*2 Her ĥeft melek il-zemîne,*
*3 Xweziya[715] min bizaniye, nesîĥetê wan çîne,*
*4 Birhanê wan ji yeqîne[716].*

**S. 10** *1 K'asek ji min ȓa di îna,*
*2 Her ĥefta vedixwîne,*
*3 Pê dibûn melek il-zemîne.*

**S. 11** *1 Her ĥefta vedixware,*
*2 Duȓ mewcî, bûwe beĥre,*
*3 Nijyare wan çî bû, ji me ȓa dikir nijyare.*

**S. 12** *1 Gay û Masî jê vedixware,*
*2 Lew li ser pişta xwe qebûl dikirin deşt, û banî, û berî, û beĥre.*

**S. 13** *1 Hat nik Mia'wî xwedanê k'ase,*
*2 Hey dîwaro ji e'sasê,*
*3 Silt'an Ezi xwedanê k'asê.*

**S. 14** *1 Ew k'as da şêx Misafir,*
*2 Hey welîo çendî[717] faxir,*
*3 Lew suȓa P'adşayî li nik te, ji e'wil ĥeta bi axir.*

**S. 15** *1 Ew k'as da şêx Berk'ate,*
*2 Xelat kir ĥeft xelate,*
*3 Go: «Ji e'rdê fiȓî çû semawate».*

**S. 16** *1 Ew k'as da şêx Bek'ir,*
*2 Şêx Adî k'erema xwe li gel te kir,*
*3 Lew ciyê te li bo xwe kir.*

**S. 17** *1 Ew k'as da Êzdîne mîre,*
*2 Li dinê û axretê yî xebîre,*
*3 Li ser milê Şems û Fexrê mîre.*

**S. 18** *1 Ew k'as da Şemsê Êzdîne,*
*2 K'ilîl û mifte bi destê wîne,*
*3 Çî girtin û berdan bê Şemsê Êzdîna nîne.*

**S. 19** *1 Ew k'as da Mehmedê K'emale,*
*2 Sinhetekî[718] çê heye li bale,*
*3 Şevê û ȓojê her wî xeyale.*

---

[715] *xozî*
[716] *êqîn*
[717] *çenî*
[718] binêr: *sinet*

**S. 20** *1 Ew k'as da şexe sinetê,*
*2 K'erem ji ba xwedanê wê k'ase bora tê,*
*3 Li e'zmana bû şexê sinetê,*
*4 Li e'rda qewat*[719] *da nebîyêt ometê.*

**S. 21** *1 Ew k'as bo E'lî ve dihate,*
*2 K'erema wê k'asê we dersate,*
*3 Dibê lew E'lî bi sê xelata kir xelate.*

**S. 22** *1 Ba qûdreta Qadirî,*
*2 E'lî sê xelata kirî,*
*3 Yek Fatime, û yek Zilfiqare, û yek Dindilî.*

**S. 23** *1 Ew k'as da bin Mensûre,*
*2 Qesid kir çû behret k'ûre,*
*3 Silt'an Êzî yî nêzîke, ne yî dûre.*

**S. 24** *1 Ew k'as da seyîd Nesîme,*
*2 Hey Cebaro yî ji qedîme,*
*3 Silt'an Êzî li ĥemû derdayî ĥekîme.*

**S. 25** *1 Ew k'as da p'îr Mendê Gor̂anî,*
*2 Fir̂îya, ço nik wê beĥrê danî,*
*3 Lew hikm kir k'afirstanî.*

**S. 26** *1 Ew k'as da derwêş Qat'anî,*
*2 Vedixwar weke tu dizanî,*
*3 Lew bi xêra P'adşê xwe dizanî.*

**S. 27** *1 Sêsed û şêst û şeş nebîyêt mursilin,*
*2 Ĥemû bi wê nûrê dixemilîn,*
*3 Li ber hikmeta silt'an Êzî dixurcilîn.*

**S. 28** *1 Îlaĥîîo, tuyî Qadirî û Ĥadirî*[720]*,*
*2 Sebrekê li ber min bisebirî,*
*3 Ĥeta wî derbî, goştê gîyanê min xwarî.*

**S. 29** *1 Şehîd p'êẍember ji wê k'asê dibû meste,*
*2 Ewî ne p'ê hebû ne deste,*
*3 Lew silt'an Êzî k'eremek li ber dixweste.*

**S. 30** *1 Ew k'as da Yûnisê r̂eqasi,*
*2 Çil r̂ojî maye zigê masî,*
*3 Ji nu paş P'adşê xwe bi ĥeq nasî.*

**S. 31** *1 Ji hindava çome pêşe,*
*2 Silt'an Êzî li vê dinê ger̂iyabû lib[a]sê derwêşe,*
*3 Ev dinya li bin destê silt'an Êzî bi p'ar û bêşe.*

**S. 32** *1 Ji hindava çome xware*[721]*,*
*2 Ligel min hebû sed efsare,*
*3 Silt'an Êzî axret bo mêra dikir r̂astemale,*
*4 Ya silt'an Êzî, em mirazê xwe ji te dixwazin: dîn û îman, ne male.*

**S. 33** *1 Dibê: «Sêsed, û şêst, û şeş nebîyet mursilin,*

---

719 *qewet*
720 binêr: *hadêr*
721 *xar*

*2 Ĥemû ji wê k'asê dixemilin,*
*3 Ji ber ĥeybeta silt'an Êzî dixurcilin».*

**S. 34** *1 Li ba qudreta Qadirî,*
*2 Silt'an Êzî li r̂uyê vê meclîse da êwirî,*
*3 Gelo, bêjine min, silt'an Êzî bi çend lewna hat û çend lewna bihurî?*

**S. 35** *1 P'adşê minî Cebare,*
*2 Dur̂ mewcî, bû beĥre,*
*3 Silt'an Êzî ev dinya di destê şêx Şems*[722] *û Fexrê mêrava spare.*

**S. 36** *1 Dibê: «Bi hinara*[723] *bûm, şov dikir,*
*2 Bi hinara bûm, tov dikir,*
*3 Bi hinara bûm, xof dikir.*

**S. 37** *1 Bi hinara bûm, şov t'ine,*
*2 Bi hinara bûm, xof t'ine,*
*3 Bi hinara bûm, tov t'ine.*

**S. 38** *1 Bi hinara bûm, çêr li cewa,*
*2 Bi hinara bûm, next li r̂ewa,*
*3 Bi hinara bûm, beharê ĥezreta wan çengek dewe.*

**S. 39** *1 Bi hinara bûm, dirav t'ijî berî,*
*2 Bi hinara bûm, di asya da di xûrî,*
*3 Bi hinara bûm, di birca da, li ber dîwara dimirî.*

**S. 40** *1 Bi hinara bûm, di çûwe dizî,*
*2 Bi hinara bûm, dikir gazî,*
*3 Bi hinara bûm, digo hilo vaye dizî».*

**S. 41** *1 Ya silt'an Êzî, tu bi xwe bayî,*
*2 Tu bi xwe li ser r̂awestayî,*
*3 Tu dibêjî dizî were tu dibêjî xwedanê male, diz vayî».*

**S. 42** *1 Ya silt'an Êzî, tu bayî,*
*2 Tu bayê berî çiqas baranî,*
*3 Tu hilê milê mêrayî.*

**S. 43** *1 Tu şûrê devê kevlana,*
*2 Tu t'ivenga milê sekmana,*
*3 Ya silt'an Êzî, em mirazê xwe ji te dixwazin — dîn û îman, ne male.*

**S. 44** *1 Ya silt'an Êzî, tu wê li e'rda, tu wê li e'zmana,*
*2 Tu wê li beĥra, tu wê li binyana,*
*3 Tu wê zara, tu wê li ser zimane.*

**S. 45** *1 Ya silt'an Êzî, tu wê li e'rda, tu wê (li) sema,*
*2 Tu wê li Lewĥa, tu wê li Qelema,*
*3 Tu wê li şahîya, tu wê li xema,*
*4 Tu wê li gel Îsa, bîn Miryema.*

**S. 46** *1 Tu e'wra diger̂înî,*
*2 Tu baranê dibarînî,*
*3 Tu beĥrêt giran dimeyînî,*
*4 Tu vê dinyayê bi k'ar tînî,*

---

[722] *Şêşms*
[723] binêr: *hiner*

*5 Tu bo me meseb û dînî,*
*6 Sed xwezma min bi r̂uĥê be, tu bideyî û jê nestînî.*

**S. 47** *1 Ya silt'an Êzî, tu wê li mifta, tu wê li sindirûka,*
*2 Tu wê li gel mezina, tu wê (li) gel piĉûka,*
*3 Li gel zava, ligel bûka,*
*4 Li [gel] metrana, li gel k'eşîşa,*
*5 Tu wê li gel zêndana, li gel ĥebîsa.*

**S. 48** *1 Tu li [gel] bacara, li gel beqala,*
*2 Tu li [gel] sûka li gel delala,*
*3 Ya silt'an Ezî, em mirazê xwe ji te dixwazin — dîn û îman, ne male.*

**S. 49** *1 Ya silt'an Êzî, tu mîrê vê dinyayê k'eremdarî,*
*2 K'eremdarî, tuyî xebîrî,*
*3 Ya silt'an Êzî, ji e'wil ĥeta bi axir, me tu li bîrî.*

**S. 50** *1 Qesreke û ĥezar binyane,*
*2 Bacareke û ĥezar dik'ane,*
*3 Serîyeke û ĥezar zimane.*

**S. 51** *1 Ew qesra bi t'inê,*
*2 K'ilîl û mifte tên ji xizînê û batinê,*
*3 Çend li ĥezreta silt'an Êzî r̂ûdinên diken xwendinê.*

**S. 52** *1 Ew qesra du r̂êyîne,*
*2 Dergê wê zêr̂îne,*
*3 Sed ĥezar bayî lê tîne.*
*4 Sed xozme min bi wê r̂uĥê be, Êzdîbe,*
*5 Bêje vî qewlî: Amîn! Amîn! Amîne!*

*R̂eĥmet lêbe, min ev qewl jê pirsî,*
*R̂eĥmet li r̂uĥa dayîyê babê[724] hazir yê guhdêra!*

## 31. QEWLÊ SILAV, SILAVÊD[725] CEBÊRE[726; 727]

Ev qewle r̂ojêd pîroz û Tawis gêr̂unê û şînê, ya li malêd mirîya têne gotin, dibêjinê ( mishabet)

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Silav, silave ji hêzdêre,*
*2 Dîndara silt'an Êzî bi xêre,*
*3 Xwezî [728]me ew dîndar dîtibû t'êre.*
**S. 1** *1 Silav, silavêt Cebêre,*
*2 Dîndara silt'an Êzî li me bi xêre,*
*3 Xwezî[729] me ew dîndar dîtiba t'êre.*

**S. 2** *1 Xwezî me t'êr dîtibû ew dîndare,*
*2 Hizretê lê dibû melekê hêzdare,*
*3 Xasa li ber pestibû perî û ĉare.*
**S. 2** *1 Xwezî me t'êr dîtiba ew dîndare,*
*2 Ĥizreta lê dibû melekê Cebare,*

[724] binêr: *bav*
[725] *silavêd*
[726] [50] (rr. 144-148)
[727] [51] *Qewlê silavêt Cebêre* (rr. 325-331)
[728] *xozî*
[729] *xozî*

*3 Xasa li ber bestibû perî û ĉare.*

**S. 3** *1 Xasa li ber pestibû ĉar û perî,*
*2 Xwezî silt'an Êzî bo me vekiriba ew derî,*
*3 Sipasiya wê tipê li me bi mal û serî.*

**S. 3** *1 Xasa li ber bestibû ĉar û perî,*
*2 Xwezî silt'an Êzî bo me vekiriba ew derî,*
*3 Şikirîna wê ĥerfê li me bi mal û serî.*

**S. 4** *1 Li wan dergeha, li wan derîya,*
*2 Mirazêt lê dibû melekê Adîya,*
*3 Ewe miraza me ĥemîya.*

**S. 4** *1 Li wan dergeha, li wan qap'îya,*
*2 Ĥizreta lê dibû melekê Adîya,*
*3 Ew miraza me ĥemîya.*

**S. 5** *1 Mêra ji berbi meşe cem barê ye.*
*2 Mirazê me li Lalişê ye,*
*3 Me ji Lalişê miraz xwastê ye.*

**S. 6** *1 Me ĥemiya ew miraza,*
*2 Xwezi silt'an Êzî bihata,*
*3 Wî avakiriba çendî welata.*

**S. 5** *1 Me ĥemûwa ew miraze,*
*2 Xwezi silt'an Êzî bihate,*
*3 Wî avakiriba çendî welata.*

**S. 7** *1 Wî avakiribû çendî dinê.*
*2 K'ilît û miftêt[730] batinê,*
*3 Çendî mexlûq pê dibûn xinê.*

**S. 6** *1 Wî avakiriba çendî dinê.*
*2 Bi k'ilît û miftêt batinê,*
*3 Çendî mexliq pê dibûn xinê.*

**S. 8** *1 Pê xinê dibûn çendî mexlûqa,*
*2 Dê li wê k'ombin leşker, û cimlet, û coqa,*
*3 Ewê r̂ojê silt'an Êzî dê betalke p'irtûk û çendî t'oqa.*

**S. 9** *1 Silt'an Êzî xwedan[731] îmane,*
*2 Xwedan ol û erk'ane,*
*3 Xwedan xera girane.*

**S. 10** *1 Dem hatîye dê xweyanbe[732] aldare,*
*2 Xwedan îman û erk'an, dêbine p'aşa, û wezîr, û xundek'are.*
*3 Ewê r̂ojê silt'an Êzî ev qinyat ĥemî bi destê wan ve spare.*

**S. 7** *1 We'de hatî dê k'ifşbin bêraqdare,*
*2 Xwedan îman û xwedan erk'an, dêbine p'aşa û xunk'are[733]*
*3 Ewê r̂ojê silt'an Êzî ev dinya bi t'emametî bi destê wan ve spare.*

**S. 11** *1 Bi r̂onahiya silt'an Êzî k'eramet vavirtim,*
*2 Ji ẍafila xelas kirim,*
*3 Ez ji şire'te r̂izgar kirim.*

**S. 12** *1 Silt'an Êzî hêjayî xasana,*
*2 Hun guhê xwe medene nezana,*

---

[730] *miftêd*
[731] *xudan*
[732] *xuya*
[733] *xundk'ar*

*3 Qumaşê xwe nefiroşin, erzana.*

**S. 8** *1 Dîndara silt'an Êzî minasibê xasane,*
*2 Hûn guhê xwe nedene p'iȓane,*
*3 Qumaşê xwe nefroşin erzane.*

**S. 13** *1 Qumaşê xasa yî bi ȟeqîqete,*
*2 Gêȓa silt'an Êzî gêȓeke bi t'aqete,*
*3 Nav li xwe dana ȟeqîqete.*

**S. 9** *1 Qumaşê xasa ȟeqîqete,*
*2 Gêȓa silt'an Êzî gêȓeke bi t'aqete,*
*3 Nav li xwe dana ȟeqîqete.*

**S. 14** *1 Nav li xwe dana ȓastîye,*
*2 Hencî mêrê li wê gelîye,*
*3 Silt'an Êzî suȓa melikê Bêrîye*[734].

**S. 10** *1 Nav li xwe dana ȟeqîye,*
*2 Hencî mêrê li wê gelîye,*
*3 Silt'an Êzî melikê Bêrîye.*

**S. 15** *1 Birime dîwanê û hidretê*
*2 Ewe ciyê e'debê û me'rifetê,*
*3 Silt'an Êzî bi xwe wê li wê suhbetê.*

**S. 11** *1 Birime dîwanê û ȟidretê*
*2 Ewe ciyê e'deb û me'rifetê,*
*3 Silt'an Êzî wê li suȟbetê.*

**S. 16** *1 Silt'an Êzî wê li wê dîwanê,*
*2 Şêx Şems wê li ser k'ursiya berê sikanê,*
*3 Da ji Dawidî bin Derman bideyn nîşanê.*

**S. 12** *1 Silt'an Êzî wê li wê dîwanê,*
*2 Şêx Şems wê li ser k'ursîka berê sikanê,*
*3 Da ji Dawidî bin Derman nîşanê.*

**S. 13** *1 Silt'an Êzî bi xwe P'adşaye,*
*2 Ȟezar û êk nav li xwe danaye,*
*3 Navê mezin her Xwedaye.*

**S. 17** *1 Navê şîrin*[735] *silt'an Ezîde,*
*2 Wê derk'etî li pênûsan û dewîte,*
*3 Mirovê înk'ar go me nedîte.*

**S. 14** *1 Navê şîrin*[736] *silt'an Ezîde,*
*2 Wê derk'eftî li qeleman û dewîte,*
*3 Mirovêt înk'ar gotin me nedîte.*

**S. 18** *1 Mirovê înk'ar go me nedî ye,*
*2 Silt'an Êzî suȓa melike Bêrî ye,*
*3 Yî li nav xasa, yî suȓ veşartî ye.*

**S. 15** *1 Mirovêt înk'ar gotin me nedî ye,*
*2 Silt'an Êzî melikê Bêrî ye,*
*3 Li nav xasa yî suȓ mixfî ye.*

**S. 19** *1 Li nav xasa yî veşartî suȓe,*
*2 Ewî ji xwe e'frandibû duȓe,*
*3 P'adşê min nûr bû, bi ȓenge xware*[737].

**S. 16** *1 Li nav xasa yî mixfî suȓe,*

---

[734] *melekê bêrîye*
[735] *şirîn*
[736] *şirîn*
[737] *xor*

*2 Ewî ji xwe afrandibû duȓe,*
*3 P'adşê min nûr bû, her bi ȓenge xwe ȓa.*

**S. 20** *1 Çî ȓoniyeke nava ȓenge,*
*2 Deneke û ĥezar [ȓ]enge,*
*3 Berdo leng, yî înk'are, yî lenge.*
**S. 17** *1 Çî nûreke nava ȓenge,*
*2 Deneke, û ĥezar ȓenge,*
*3 Ber tê nine xelqê xam û înk'ar, û lenge.*

**S. 21** *1 P'adşayê minî sebrîne,*
*2 Xwedayê minî êkemîne,*
*3 Êkemînê min Xwedaye.*

**S. 22** *1 Ya Xwede, tu e'frînerê minî haye,*
*2 Li ĥemû derda tuyî dewaye,*
*3 Li ĥemû gîyandara tuyî bi sefaye.*
**S. 18** *1 Ya silt'an Êzî, tu xaliqekî minî hayî,*
*2 Li ĥemû derda tu dewayî,*
*3 Bo ĥemû muxliqa tu sifayî.*

**S. 23** *1 Ya silt'an Êzî şefae'ta[738] te ye p'iȓe,*
*2 Birime nav almasan û duȓe,*
*3 Zanabûnek divêt ji almasa vedet duȓe.*
**S. 19** *1 Ya silt'an Êzî şefae'ta te yî p'iȓe,*
*2 Birime nav almasan û duȓe,*
*3 Me e'rifek[739] divêt ji almasan vedet duȓe.*

**S. 24** *1 Zanabûnek divêt duȓ ji almasa vedete,*
*2 Gêȓa silt'an Êzî gêȓeke bi t'aqete,*
*3 Nav li xwe dana ĥeqîqete.*
**S. 20** *1 Me e'rifek divêt duȓan ji almasan vedete,*
*2 Gêȓa silt'an Êzî gêȓeke bi t'aqete,*
*3 Nav li xwe dana ĥeqîqete.*

**S. 25** *1 Nav li xwe dana ĥeqîye,*
*2 Hincî mêrê li wê gelîye,*
*3 Silt'an Êzî suȓa melike Bêrîye.*

**S. 26** *1 Ĥeqîqet bê qiyasa[740],*
*2 Birime nav duȓan û almasa,*
*3 Silt'an Êzî hêjayî xasa.*
**S. 21** *1 Ĥeqîqet yê bê qiyasa,*
*2 Birime nav duȓan û almasa,*
*3 Dîndara silt'an Êzî minasibê xasa.*

**S. 27** *1 Silt'an Êzî hêjayî xasane,*
*2 Hincî ȓewana wî bi t'ore ye bi zaniste, ye bi erk'ane.*
*3 Silt'an Êzî bê guman yarê wane.*
**S. 22** *1 Dîndara silt'an Êzî minasibê xasane,*
*2 Hincî ȓuĥa bi e'deb û erk'ane.*
*3 Silt'an Êzî bêşik muĥbê wane.*

**S. 28** *1 Silt'an Êzî yarê wan bêşike,*
*2 Hincî ȓewana bê k'erbe, bê k'îne, be ȓike,*

[738] *şifat*
[739] *êrif*
[740] *qeyas*

*3 Siltan Ezi miraza wê r̂ewanê bike.*
**S. 23** *1 Silt'an Êzî muĥbê wane bêşike,*
*2 Hincî r̂uĥa bê k'erb, û k'în, û r̂ike,*
*3 Siltan Ezi miraza wê r̂uĥê dike.*

**S. 29** *1 R̂astî ye bi qiyase,*
*2 Ewan Bêrî dît, nekir nase,*
*3 Lew silt'an Êzdiyê meyî r̂ênase.*
**S. 24** *1 Ĥeqîqet yê bê qiyasa*[741]*,*
*2 Ewan Bêrî dît û nekir nase,*
*3 Silt'an Êzî yê r̂ênase.*

**S. 30** *1 P'adşê minî li dine,*
*2 K'ilît û miftet batinê,*
*3 Ew cindî dêçine dîwana silt'an Êzî ken xwendinê.*
**S. 25** *1 P'adşê min yê li dine,*
*2 Bi k'ilît û miftet batinê,*
*3 Ew cindî dêçine dîwana wî û dêken xwendinê.*

**S. 31** *1 Hincîyê li gel wan cindîya hol r̂ivaye,*
*2 Serê xwe li tîpa silt'an Êzî daye,*
*3 Hol hola silt'an Êzî bi xwe P'adşaye.*
**S. 26** *1 Hincîyê li gel wan cindîya hol r̂evaye,*
*2 Serê xwe li ĥerfa silt'an Êzî daye,*
*3 Hol, hola silt'an Êzîde,*
*4 Silt'an Êzî bi xwe P'adşaye.*

**S. 32** *1 Ev gerdûn va ye,*
*2 Ji bilî derewa tê nemaye,*
*3 R̂astî gehişte xwedane xweye.*
**S. 27** *1 Ev dinyaye vaye,*
*2 Jider derewa xwe tê nemaye,*
*3 R̂astî gehişte xwedane xweye.*

**S. 33** *1 R̂astî ji dinê hilate,*
*2 Kur̂ê Adem ser şer̂e û xebate,*
*3 Ez hincî diger̂im dilê minî r̂ehte.*
**S. 28** *1 R̂astî ji dinê hilate,*
*2 Bin Ademî li ser şer̂ û xebate,*
*3 Hincî diger̂êm, dilê min pê ne yî r̂eĥete.*

**S. 34** *1 Ez diger̂im li van dera,*
*2 Bipirsin ji derwêşan û qêlendera,*
*3 Gelo k'engî dê êt aẍê*[742] *me yê fera.*
**S. 29** *1 Ez diger̂êm li van dera,*
*2 Dipirsim ji derwêşan û qêlendera,*
*3 Gelo k'engî dê bo me êt aẍê*[743] *me yê fera.*

**S. 35** *1 Me dil dikulin, birîn cotin,*
*2 Wateyên k'ûr nêne gotin,*
*3 Xelqê em bi loma sotin.*
**S. 30** *1 Me dil dikulin, birîn cotin,*
*2 Me'nîyêt k'ûr nayêne gotin,*
*3 Xelqê em bi loma sotin.*

[741] *qîyas*
[742] *axe*
[743] *axe*

**S. 36** *1 Xelkê em sotin bi loma,*
*2 Xweşewîstê min te li me dirêjkir doma,*
*3 Lew ji pişt me r̂evî k'oma.*
**S. 31** *1 Xelkê em sotîn bi lome,*
*2 E'zîzê min, te li me dirêjkir doma,*
*3 Lew ji pişt me r̂evî k'oma.*

**S. 37** *1 K'om ji pişt me r̂evîya,*
*2 Pirs bikin ji wan cindîya*
*3 Gelo k'engî dê bo me were Mehdîya.*
**S. 32** *1 K'om ji pişt me r̂evîya,*
*2 Pirs biken ji wan cindîya*
*3 Gelo k'engî dê bo me yêt Mehdîya?*

**S. 38** *1 P'adşê minî faxirî,*
*2 Eve ĥezar û yek sal buhirî,*
*3 Ev gerdûn bi dihizirî.*
**S. 33** *1 P'adşê minî faxirî,*
*2 Eve ĥezar û êk sal buhirîn,*
*3 Ẍafil bi me di k'ifirîn.*

**S. 39** *1 Kifirê bo ji înk'êra*[744]*,*
*2 Bipirsin ji wan mêra,*
*3 Gelo, kengî dê bo me yêt hêzdêra.*
**S. 34** *1 K'ifirî bûn înk'êra,*
*2 Bipirsin ji wan mêra,*
*3 Gelo, k'engî dê bo me yêt xebêra.*

**S. 35** *1 K'ifirî bûn r̂afidîye,*
*2 Bipirsin ji wan cindîye,*
*3 Gelo, k'engî dê bo me yêt Mehdîya?*

**S. 40** *1 Ev gerdûn çar zanist û çar qurnete,*
*2 P'adşê min bo min daxist zaniest, û berat', û mişur, û xete,*
*3 Xwezî silt'an Êzî me bernadete.*
**S. 36** *1 Ev dinyaye çar ilme û çar qurnete,*
*2 P'adşê min bo me nazil kirin ilm, û berat', û mişur, û xete.*
*3 Silt'an Êzî me bernadete.*

**S. 41** *1 Ev qewle qewlê şêx Adî,*
*2 Hincî mêrê şkestî û bestîyêd şêx Adî bitirsî,*
*3 Şêx Adî wê r̂ojê, sê car̂a de li r̂ewşa wê r̂ewanê bipirsî.*

## 32. QEWLÊ MEHA[745; 746]

**S. 1** *1 «Ibadet*[747] *il-Me'bud, Lutf*[748] *û Cemal»*[749]*,*
*2 Her kesekî tiştek heye li bal,*
*3 Ew bi qumaşê xwe dê bite delal.*

**S. 2** *1 «Ibadetû il-Me'bûd, Lutf û Cemal» nebit finê*[750]*,*

---

[744] binêr̂: *înk'ar*
[745] [2] (rr. 263–272)
[746] *ЭЗДИХАНЭ* №12 (148) 2016
[747] *ebadet*
[748] *Lift*
[749] [50] *Qewlê mehan*: *Min Xwedê naskir, ewê be heval (*r. 178)
[750] [50] *Qewlê mehan*: *Qenciya Xwedê nabe fine* (r. 178)

*2 P'adşayê min êkî bi t'inê,*
*3 Ewî sewirandbû çendî dinê.*

**S. 3** *1 P'adşayê min ev dinya sewirand,*
*2 Û dipîva, û diqedirand,*
*3 Ĥîjde ĥezar xulqet di nêvda didebirand.*
**S. 1** *1 Dinîya dana û sêwirand,*
*2 Dipîva û diqedirand,*
*3 Ĥîjde ĥezar muxluqê bi giyan di nav xwe da debirand.*

**S. 4** *1 P'adşê min duȓ mek'ane,*
*2 Li ba wî wa e'yane,*
*3 Wî xulqand E'rd û E'zmane.*
**S. 2** *1 P'adşayê minî dermek'ane,*
*2 Li ba e'zîzê min wî e'yane,*
*3 Ewî hinerkir e'rd û e'zmane.*

**S. 5** *1 Ew bû cara ji mêje,*
*2 P'adşê min qontar kir şev û ȓoje,*
*3 Li navda dana bihuşt û dojeh.*
**S. 3** *1 Eva bû cana ji mije,*
*2 P'adşayê min lê qedirand şev û ȓoje,*
*3 Di navda danî buhuşt û doje.*

**S. 6** *1 Li navda dana Ȓoj û Heyve,*
*2 Da ji ẍafila biçin tîfe,*
*3 Ewan ne zanî Tawisî melek' ev dinya bi bosta dipîva.*
**S. 4** *1 Di navda danî ȓoj û hîve,*
*2 Ij xafilan were û bipîve,*
*3 Ewî nizanbû Şems û Ferxê mîra ev dinîya bi buhista dipîva.*

**S. 7** *1 Pîva û kir qedare,*
*2 Şêx Şems bi xwe xunk'are*[751]*,*
*3 Ȓonahîya şêx Şems da binêt beĥra.*

**S. 8** *1 P'adşê min li ber hikmê xweyî ȓewaye,*
*2 Ewî deşt çêkir ȓukibande ser ĉiyaya,*
*3 Kevna wê dinyayê baye.*
**S. 5** *1 P'adşayê min li ĥukumê xweyî bi ȓewaye,*
*2 Li ba e'zîzê minî dihaye,*
*3 E'zîzê min k'oka vê dinîayê kirîye baye.*

**S. 9** *1 P'adşê min Ȓeb il-Semed,*
*2 «Li mîwilid, li mîlid»*
*3 «Sibĥan int' xilqit îum (îwim?) Ellaĥid».*

**S. 9**[752] *1 P'adşê mi*[753] *p'iȓ bi hêzbû,*
*2 Ewî xwe bi xwe e'firandbû,*
*3 Ȓoja yekem kir yekşambû.*

**S. 10** *1 P'adşê minî bê xem bû,*
*2 Li nav duȓa Xwedayî bi k'erem bû,*
*3 Ewî e'frandbû dusembû.*
**S. 6** *1 P'adşayê minî bi xewim bû,*
*2 Ij duȓa xweyk'erem bû,*

[751] *xundk'ar*
[752] [50] (r. 179)
[753] forme kurtî: *min*

*3 Ewî e'firand duşem bû.*

**S. 11** *1 P'adşê min Bêrîye,*
*2 Qedara vê dinê bi destê wîye,*
*3 Ewî sêşembû dikire sisêye.*
**S. 7** *1 P'adşayê min Bêrîye,*
*2 Neçara vê dinîayê bi destê wîye,*
*3 Ew r̂oj kirine sisêye.*

**S. 12** *1 P'adşê min Cebare,*
*2 Ji ba wî wa firware,*
*3 Ewî çarşembû dikire çare.*
**S. 8** *1 P'adşayê min Cebare,*
*2 Li ba e'zîzê min ferware,*
*3 Ew çar çarşem û r̂oj kirine çare.*

**S. 13** *1 Çarşembû r̂ojeke fadile,*
*2 Melik Fexredîn e'frandbû ji eşq û dile,*
*3 Nas ne dikir r̂uĥêt çu ẍafila.*
**S. 9** *1 Çarşem r̂oja fadile,*
*2 Melek Ferxedîn e'firandîye ij eşq û dile,*
*3 Bar tê neve însanî xafile.*

**S. 14** *1 P'adşê min mizênca[754],*
*2 Ev dinya[755] li ba wî sae't e[756] û sênce,*
*3 Lew wî pêncşembû kirbuwe pênce.*
**S. 10** *1 P'adşayê minî mêzince,*
*2 Ev dinîya seĥet û sênce,*
*3 Ewî r̂oj kirine pênce.*

**S. 11** *1 P'adşayê minî Cebare,*
*2 Li ba e'zîzê minî ferware,*
*3 Şemî r̂ojek bû ij Mûsayê minî binî E'mir kire hinare.*

**S. 15** *1 P'adşê min nûrîne,*
*2 Ewî e'firandbû îne,*
*3 Kire xotbet[757], dana ser çiqas mêrê mislîne.*

**S. 16** *1 P'adşê min her ĥeft r̂oj dikirin hijmare,*
*2 Û ev dinya çêdikir û hildipesare,*
*3 Ew r̂oj şembû bû, Mûsa bin E'mirî dihinare.*
**S. 12** *1 Ewî her ĥeft r̂oj çêkirin bi jimare,*

**S. 17** *1 Ji P'adşê xwe didem medehe,*
*2 Çar înî û sê dehe,*
*3 Lêk r̂ukbandin, kirne mehe.*
**S. 12** *2 De werin, em P'adşayî bidin medeĥa,*
*3 Çar îna û sê deha,*
*4 P'adşayê min lêk barastin, kirine mehe.*

**S. 18** *1 Em donzde[h] mehêt bi nav,*
*2 Şeş di ĥişkin, şeş bi xunav,*
*3 Her donzdeh meh wê li ber ĥimeta melik şêx Sinê bi nav.*
**S. 13** *1 Her dozdeh meh bi navin,*

754 *misênc*
755 *dunîye*
756 *seht*
757 *xutbe*

*2 Şeşe zihane, şeşe bi xunavin,*
*3 Her dozdeh meh bi ĥizreta melik şêx Sin bi navin.*

**S. 19** *1 P'adşê min Cebare,*
*2 Ji bo wî we ferware,*
*3 Her donzdeh meh lêk ȓukibandin, kirine sale.*

**S. 20** *1 Me yarek divêt yî e'rif, yî zane,*
*2 Û ji me ȓa bidet beyane,*
*3 K'a binyata her donzdeh mehakî ji wane?!*

**S. 21** *1 Ji qewlê Fexrê zergûne,*
*2 Herîye bi ĥerfe, ye bi nasîne,*
*3 Binyata her donzdeh meha K'anûne.*
**S. 14** *1 Ji qewlê Ferxê zergûne,*
*2 Here bi ĥerfe, here bi nasîne,*
*3 Ĥîmê her dozdeh mehan ȓoja dinya avabûye, ev ȓoj K'anûne.*

**S. 22** *1 Hatime nav k'uf û k'ane,*
*2 Wekî têt û dibit zivistane,*
*3 Zêndane li ser çiqas mexluqê bi gîyane.*

**S. 23** *1 K'anûnê te malik nebit wêran,*
*2 Heke domkeyî sayan, û befra ,û bayî gêȓan,*
*3 Dê di bî şehde*[758] *zebûnkeyî şêran.*
**S. 17** *1 K'anûnê, te male nebit wêran,*
*2 T'u dombikî seyan, berfan û bageran,*
*3 Tê lê pêşî a zebûnyan bikî şeȓan.*

**S. 24** *1 K'anûnê wa ji xwe xeber da:*
*2 «Ezim seqaya e'rda,*
*3 Belê mife'tim ser çiqas derda».*
**S. 15** *1 K'anûnê ij xwe ȓa xever da:*
*2 «Ezim seqa e'rda,*
*3 Ezim li ser çiqas derda».*

**S. 25** *1 K'anûn dibê: «Seqaya e'rda ezim,*
*2 Û ji sarîya xwe wa di tezim,*
*3 Ez jî li ber qirara mîrê xweye bi lezim».*
**S. 16** *1 «Seqa e'rda ezim,*
*2 Saya xwe bi tevzim,*
*3 Bi ferwara mîrê xwe bi lezim».*

**S. 26** *1 K'anûn ço bi serda hatî Subata ȓeşe,*
*2 Digel K'anûnê diket qerqeşe,*
*3 Gotê: «Tu çoyî, bêhna dinyayê bi minîye xweşe».*

**S. 27** *1 We dibêjit K'anûna berî:*
*2 «Hey subetê, te ȓeş û ȓeş berinî,*
*3 Kes nizanit tu dostî, ne dijminî!*
*4 Çu muxlaqet li te nadebirî».*
**S. 18** *1 Ey, k'anûna ij berî Sivata ȓeş û ȓeş benî,*
*2 T'u muxluq têda nedebirî,*
*3 T'ew nizane tu ne dostî, ne dijminî*

**S. 28** *1 K'anûn dibêjit: «Em du mehêt P'adşayî kirin xelat,*

---
[758] *şade*

2 Li me dik’evin çile û arba’inan[759],
3 Ji ĥedê wîye li gel me bi k’elimit Subat!»

**S. 29** 1 «Subatim, Subat bi navim,
2 Demye dibarim,
3 Demye bi tavim».
**S. 19** 1 Sivat divê: «Sivatim, sivat bi navim,
2 Meheke bi ser û ĉe’vim,
3 Geh dibarim, geh - bi te’vim».

**S. 30** 1 Subatê di spare,
2 Deng nekirbû êk care,
3 Bi serda hatî Adare.

**S. 31** 1 Adar dibêjitê: «Ez Adarim,
2 E’wil k’ilîla çendî beharim,
3 Zeynetim ser çiqas şarim».
**S. 20** 1 Adar divê: «Ez Adarim,
2 K’ilîla çendî biharim,
3 R̂azgela zebûnîyê bi jarim».

**S. 32** 1 Adar dibêjit: «Ezim kenîşka deştê,
2 Hincîyê bên û buha min gehiştê,
3 Her ne yî mirîbin, bi serî ĥiş tê.

**S. 33** 1 Adar bi serda hate,
2 Û li e’rdê şîn lê hat nebate,
3 Pê zeynanid çiqas qinyate,

**S. 34** 1 Adarim, Adara bi nehînim,
2 Heger nebatekî duwa bir̂eşînim,
3 Vê dinyayê di xêr û bêrê da, dê t’emînim.

**S. 35** 1 Subet dibêjitê: «Me yarek divêt ji bedîla,
2 Bipirsin k’a Adariye bi çî k’ilîle,
3 K’aye sexîye, yan bexîle?
**S. 21** 1 Nîsan divê: «Adarê xwehê,
2 Min yarek divê ij bedîlê,
3 Adar çi k’ilîle, çi k’ilîle.

**S. 36** 1 Bexîle, û bexîl bi nave,
2 Heke[760] domket sayan û bayane,
3 Dê di gola de ĉik avane».
**S. 21** 4 Ye bi sexîye, ye bi bexîle,
5 Bexîlê bexîl bi nave,
6 Eger dombike seyan û babanê ê li goman ĉik bike ave».

**S. 37** 1 «Adarim, Adar bi nehînim,
2 Heke nebatekî duwa bir̂eşînim,
3 Vê dinyayê di xêr û bêrêda, dê t’emînim».

**S. 38** 1 Adarê dispare,
2 Deng nekiribû yek care,
3 Bi serda hatî Nîsana ixtîyare[761].

**S. 39** 1 Nîsan wa têt û diket qerqeşe:

[759] êrbeyîn
[760] heqe
[761] binêr: extîyar

*2 «Heke ez vekem derê qumaşe,*
*3 Her yanzdeh meha dê deme paşe».*

**S. 40** *1 Nîsan wa didet xebere:*
*2 «Heke ez behara xwe bixemilînim ji k'esk, û sor, û sipî, û zere,*
*3 Ji ĥedê yanzdeh meha li gel min biden xebere!*
**S. 22** *1 Nîsanê deng dikire:*
*2 « Bihara xwe dixemilîne bi k'esk û sipî, bi sor û zere,*
*3 T'u ĥedê mehan t'une ij min bide xevere».*

**S. 41** *1 Adar dibêjit: «Nîsanê, tu meheke p'iȓ bêjî,*
*2 Ye bi jengî, ye bi qirêjî»,*
*3 Got: «Tu dîskî t'ijî dikeyî û p'ênekê lê dideyî û dirêjî».*
**S. 23** *1 Gulan divêje Nîsanê:« Xwehê, tu meheke p'iȓbêjî,*
*2 Tu bi zenge û bi qiȓêjî,*
*3 Çi ij wê ĉe'lê bikim - xwedan ze'f bidoşe, doman lingê xwe lêxe, biȓêje».*

**S. 42** *1 Adar dibêjit Nîsanê: «Tu meheke bi nuqtû*[762] *barî,*
*2 Heke P'adşa li te sistket hevsarî,*
*3 Kevir û kuĉika bi serê xelqê da dê barî».*

**S. 43** *1 Nîsan wa didet xebere:*
*2 «Heger berezîv bibarin û bere,*
*3 Ew jî firwara P'adşê minî Ekbere».*

**S. 44** *1 Nîsan ço, bi serda hatî Gulanî jare,*
*2 «Ez Gulana bi gulim,*
*3 Ye bi şalul û bilbilim,*
*4 Belê melhema birînêt kulim.*
**S. 24** *1 Gulan divêje: «Ez bi gulim,*
*2 Ez a bi şalûl û bilbilim,*
*3 Ez melĥema birînê kulim.*

**S. 45** *1 Sexye ko sexyane,*
*2 Li deştê t'êr dikem birsyane,*
*3 Belê beharim ser çiqas ĉiyane.*
**S. 25** *1 Ezim sexîya bi sexîyan,*
*2 Biharim li çîyan,*
*3 Li deştan t'êr dikim birçîyan».*

**S. 46** *1 Nîsan dibêjitê: «Gulanê behara teye boze,*
*2 Ye bi mêşe, ye bi kelmoze,*
*3 Belê jê zivêr bû ȓevengêt k'oze.*

**S. 47** *1 Behara teye bi dehil û diȓî*[763]*,*
*2 Çiqas muxliq yî bi fiȓî,*
*3 Te ȓisqê*[764] *gelek beze miskîna wê biȓî».*

**S. 48** *1 Gulan dibêjit: «Nîsanê, nesîb*[765] *ne ye bi mine,*
*2 Wê li mîrê mezine,*
*3 Teyr ji firwara wî difirine.*

**S. 49** *1 Gulanê te li malê bik'evit Xizîrane,*
*2 Dewleta hoye girane,*
*3 Ye bi dexle, ye bi dane».*

---
[762] *nuxte*
[763] binêr: *du*
[764] *ȓizq*
[765] *nisîn*

**S. 50** *1 Xizîran we deng di hiltîne:*
*2 «Ez mehekim ye bê behare, ye bê şînî,*
*3 Li min p'eyda dibin bêderêt hingivînî.*

**S.26** *1 Ĥezîran divêje: «Gulanê, xwehê, tu meheke bi êht'îbarî,*
*2 Eger P'adşayî li serê te sist bike ĥefsarî,*
*3 Tê kevir û kuĉikan bibarî».*

**S.27** *1 Gulan divêje: «Xwehê, nesîvî ne bi destê mine,*
*2 Î bi destê mîrê mezine,*
*3 Teyr jî bi e'mir û ferwara wî difiȓe».*

**S. 51** *1 Li min nîvî bû sale,*
*2 Xweş têt bayê şemale,*
*3 Gelek beze miskîna jê gehiştibû yê ĥale.*

**S.28** *1 Ĥezîranê deng dihilîla:*
*2 «Ij mehan navê min havîne,*
*3 Ez dibiriqim ser çendî bendê misk'îne».*

**S. 52** *1 Suȓa P'adşayî hate hindave,*
*2 Li Şems û Fexrêt mîra dikem silave,*
*3 Li sêzdeyî Xizîranê vegeȓyabûn tave».*

**S. 53** *1 Tîrmeh dibêjit: «Ez meheke germim,*
*2 Ĥelîmeke hoye nermim, ĥelîmeke hurim,*
*3 Ye bi cîyî xûn û bêderim,*
*4 Ez xêrekim, ye bê şerm».*

**S.29** *1 Tîrmeh dive: «Tîrmeha germim,*
*2 Ĥelîmeke nermim,*
*3 Bi cewxûn û bi bênderim,*
*4 Xêreke bê şeȓim».*

**S. 54** *1 T'ebaxê wa deng hilîna:*
*2 «Ez mehekim navê min havîne,*
*3 Ez berkekim ser çiqas baze miskîna».*

**S. 55** *1 Tîrmeh dibêjit: «T'ebaxê ye xenerekî wa digate,*
*2 Te qumaşê xwe bi t'emenekî difirote,*
*3 Te gelek baze miskîn li deştê ji germa disote».*

**S. 56** *1 Ez mehekim bi nav havînim,*
*2 Çiqas fêkî hene ĥemû wa dê gehînim,*
*3 Û ĥemû ya dê bi payîzê ȓa gehînim.*

**S. 57** *1 Dê ji payîzê deyn wesfetê*[766]*,*
*2 Ye t'ijîye ji xêrê, ji nazê, ji ne'metê,*
*3 Jê têt bêhna cinetê.*

**S. 58** *1 Jê têt bêhna bihuştê,*
*2 Goştê belek tam xweş tê,*
*3 Li ser ȓêya, li zozana, hem li deştê».*

**S. 59**[767] *1 Îlon dibe: «Tirmehê, te gotineke ẍafil digote,*
*2 Te qumaşê xwe bi behakî difrote,*

[766] *ûsfet*
[767] [50] *Qewlê mehan* (r.185, sebeqe 58)

*3 Te gelek beze miskîn ji germa disote.*

**S. 30** *1 Îlon divê: «Tirmehê te gotineke xweş digote,*
*2 Te qumaşê xwe bi bihakî difrote,*
*3 Te gelek bendê misk'în ij german disote».*

**S. 60** *1 Îlon hat û derê qumaşê xwe vekir,*
*2 Li dinya û li welata buwe dik'ir,*
*3 Xusin û cemal li Şems û Fexr.*

**S. 61** *1 Îlon dibêjit: «Ez cindî ya mehanim,*
*2 Ye bi meclîs û řeş řîĥanim,*
*3 Li ber Şems û Fexrêt mîraye e'yanim.*

**S. 31** *1 Îlon divê: «Ez cindîya mehanim,*
*2 Ez bi miclis û řeşřîĥanim,*
*3 Ez dayîm ij Şems û Fexrêt mîra řa e'yanim».*

**S. 62** *1 Em du mehin, navê me Çirî,*
*2 Ji cem P'adşayî di xelat kirî,*
*3 Li me dik'evin naz, û ne'met, û tirî.*

**S. 32** *1 Çirî divê: «Em du mehin, nav bi Çirî,*
*2 P'adşayî em xelat dikirî,*
*3 Li ser me hene naz û ne'met û tirî».*

**S. 63** *1 Em du mehin di k'amil û t'emam,*
*2 Li me dik'evin na, û ne'met, û tam»,*
*3 Go: «Payîz mîre, her yanzdeh mehêt dî bin xulam!»*

**S. 33** *1 Çirî du mehên k'amil, t'emam,*
*2 Li ser me xoş bûne çiqas te'm,*
*3 Payîz mîre, her dozdeh jê řa divin xulam!»*

**S. 64** *1 Hat meha bi nav Cebêre,*
*2 Ser yanzdeh meha digêřye,*
*3 Gelek beze miskîna jê dîbû xêre.*

**S. 34** *1 Hat meha bi nav Cebare,*
*2 Li her dozdeh mehên salê digêre,*
*3 Gelek bende û misk'în jê divînin xêre.*

**S. 35** *1 Ya me êzdîya sidq û ĥeya, durist ser p'işkê îmane,*
*2 Kanîya Sipî ij me řa nîşane,*
*3 Berî ne e'rd hebû, ne - e'zmane.*

**S. 36** *1 Ne be'r hebû, ne binyane, Xwedê î ĥeq bû,*
*2 Xerqê Şîxadî, navê Tawisî melek' ij me řa dîn û îmane.*

## 33. QEWLÊ GAY Û MASÎ[768]

**S. 1** *1 Min êk divêt yî jîr bî,*
*2 Li ĥemû manîya[769] yî xebîr bî,*
*3 Li ba şêx Fexrê Adiya yî p'îr bî.*

**S. 2** *1 Şêx Fexrê Adiya lê bit fêde,*
*2 Hûn xebîr bin bi wêde,*

[768] [2] (rr. 252–258); *Laliş* 11, 2000 (rr. 201–208) Belavkirin: Derman Xelef Şarî https://ru.calameo.com/books/002518317359580de1d22;
[769] binêr: *me'nî*

*3 Ji vê dinyayê û pêde.*

**S. 3** *1 Ne ye bi buxtane, ne ye bi zore,*
*2 Li xasa sayîye*[770] *li ẍafila e'wre,*
*3 Jêrû beĥre*[771] *û jêr Gaye.*

**S. 4** *1 Bêje min weke dibûwe,*
*2 Ewî Gayî serî li Şarqêve*[772]*,*
*3 Bi Ẍerbêve duve*[773]*.*

**S. 5** *1 Ba e'rifa wa e'yane,*
*2 Ewî Gayî çî nîşane,*
*3 Çend sitirone, çend didane.*

**S. 6** *1 Ew Gaye sehtî pîre,*
*2 Qurnet û qurnet yî xebîre,*
*3 R̂êya pênc sed salî meyzîre.*

**S. 7** *1 Ew Gay sebirê dêrî,*
*2 Sicûdê dik'êşte êkî Bêrî,*
*3 Ĥeta dema r̂uĥê bispêrî.*

**S. 8** *1 Ew Gayî sehtî qewîye,*
*2 Ji pêş ve sexrekî sipîye,*
*3 Jêrû beĥre û jêr kesekî nedîye.*

**S. 9** *1 Bi ĥimeta wî sexrî,*
*2 Babê pis nexirî,*
*3 Lê cema' fexrî.*

**S. 10** *1 E'cêba di wê da,*
*2 Nîva simê di Gê da,*
*3 Tê hêye sêsed û şêst û şeş bacarê benî*[774] *Adema têda.*

**S. 11** *1 Nîva herdu sima,*
*2 Ye t'ijîye ji bajêrêt benî Adema,*
*3 Wan jî beĥr tê heye ji şahîya*[775]*, û ĥeqîya, û xema.*

**S. 12** *1 Nîva herdu simêt Gayî,*
*2 Wêt têde heyn sêsed û şêst û şeş bajêrêt binî Ademe avayî,*
*3 Ew jî r̂awestiyan*[776] *navû dik'irêt*[777] *Xwedayî.*

**S. 13** *1 Navê îmamê wan Zêndîne,*
*2 Ĥaca wan ĥaceka nûrîne,*
*3 Ew jî r̂awestiyan ber nûra melik Şemsedîn û Fexredîne.*

**S. 14** *1 Dilê minî bi êşe,*
*2 Pêş wî Gayî heye mêşe,*
*3 Ew Gayî ji mêşê yî bi hindêşe.*

**S. 15** *1 Beĥra jêrî Gêye,*

[770] *saye*
[771] *ber*
[772] *şêrîq*
[773] *dû ve*
[774] *binî*
[775] binêr: *şayî*
[776] *r̂awestiyaîn*
[777] *nav û dik'a rêt*

*2 K'ursîy ya P'adşayî*[778] *va lêye,*
*3 Şêx Fexrê Adiya li ĥemû e'rda û r̂êya.*

**S. 16** *1 Fexro, tu xasî,*
*2 Tû bi Xaliqê xwe keyî û libasî,*
*3 Gayî mezintire yan Masî?!*

**S. 17** *1 P'adşê minî Ekbere,*
*2 Ser pişta Masî ĥeftî [û du] p'er̂î keskî le bere,*
*3 P'er̂ekî Gayî wê li sere.*

**S. 18** *1 Ĉiyaye, û fere, û ĥedude*[779]*,*
*2 Ne ciyê*[780] *xelqê*[781] *ẍafilî meqsude,*
*3 Yê e'zabê didete ber wan Êkî me'bûde.*

**S. 19** *1 Ĉiyayekî r̂eş wê li hembere,*
*2 Mişûrî diçine sere,*
*3 Ĉiya dihijin ji ber yê bi sifet*[782]*, yê bi mehdere.*

**S. 20** *1 Mişûrî di êne xware,*
*2 Xwezî min bizanîya bilinîya wî ĉiyayî cend miqdare,*
*3 Menzilî pênc sed salî bi hijmare.*

**S. 21** *1 Ba e'rifa wa e'yane,*
*2 Wa derk'eftî di qewlane,*
*3 Ĉiyayekî r̂eş wê li nêv e'wrane.*

**S. 22** *1 Ĉiyaye, û fere, û ĥedude,*
*2 Ew ne ciyê xelqê*[783] *ẍafil û meqsude,*
*3 Ew salheke*[784] *li nav siude.*

**S. 23** *1 Xelqê Xişîm xwe ji guneha vek'êşin,*
*2 Jêr beĥre û jêr beĥreke şîn.*

**S. 24** *1 Jêrû beĥre û jêr qiyamete,*
*2 Wan bi xwer̂e divete,*
*3 E'rdê ĥisêbê*[785] *lê dik'ete.*

**S. 25** *1 Ĥisêbe û et'êbe*[786]*,*
*2 E'rdek wê hey navê wî e'cêbe,*
*3 Wê têde dixwînin*[787] *k'itêbe.*

**S. 26** *1 E'rdek wê heyî r̂aste,*
*2 Yî sipîye weke maste,*
*3 Mor*[788] *û miska jê efr̂aste.*

**S. 27** *1 Îlaĥîo, Tu r̂uwa li me sipîke,*
*2 E'rdek wê hey, navê wî simîke,*
*3 Jêr beĥre û jêr kesî nedîte.*

---

[778] *pedşa*
[779] *hidud*
[780] *necê*
[781] *xelk*
[782] binêr: *şefa'et*
[783] *xelk*
[784] *saliĥ*
[785] binêr: *ĥeseb*
[786] binêr: *et'eb*
[787] *dixûnin*
[788] *nor*

**S. 28** *1 Beĥr ĥezêmeta[789] silt'îne,*
*2 Jêr beĥre û jêr du beĥrêt dîne,*
*3 Tê heyne zor medîne.*

**S. 29** *1 Medînek ji wane,*
*2 Tê heyne zor binyane,*
*3 Ĥeftî ĥezar ĥeywane[790].*

**S. 30** *1 Hêwanek jê mefere,*
*2 Tê heyne zor beşere,*
*3 Ĥeftî ĥezar hefsere.*

**S. 31** *1 Beĥr hezîmeta silt'îne,*
*2 Wa têde suȓeke[791] narîne,*
*3 Yeqîne[792] ew suȓa e'zîz melik Fexredîne.*

**S. 32** *1 Me navû dik'irê P'adşê minî Celale,*
*2 Ewî xebîre bi ĥal û ĥewale,*
*3 Ji qewlê sibĥane[793] û Te'ala[794].*

**S. 33** *1 P'adşê min bi hikmetê ȓa bi serda,*
*2 Me ji tehiyatê xeber da,*
*3 Xêr bi me da xweş e'rde.*

**S. 34** *1 Ew e'rd xweş mek'ane,*
*2 Li wî e'rdî ĥeyran[795] dimame,*
*3 Navê wî qumî bin qame.*

**S. 35** *1 Me ji tehiyatê xeber ço,*
*2 Ewî Gayî serî li Şerq ço,*
*3 Bi Ẍerbê dûve der ço.*

**S. 36** *1 Me qewata bi Xwedêne bi çûve,*
*2 Ĉiyaye, û baniye, û zilêmate, û ser nişîve,*
*3 Ewî Gayî hilgirt bi piştîve.*

**S. 37** *1 K'ufe, û her êk û tişte,*
*2 Ĉiya û banîye, zilêmat û deşte,*
*3 Ewî Gayî hilgirt bi pişte.*

**S. 38** *1 Şêx Fexrê Adiya go: «Dilê min bo van me'niya p'erçivtin[796]»,*
*2 Nav ĉavê ĥutî beĥr ĥeftin,*
*3 Mewca[797] didin bi qudretê lêk nedik'eftin.*

**S. 39** *1 Beĥr navû dik'irêt P'adşê minî ȓewaye,*
*2 Ĥute li ser ȓawestaye,*
*3 Jêr beĥre û jêr beĥreke bi baye.*

**S. 40** *1 Jêr beĥre û jêr ebrasa,*
*2 T'ewrat da destê Mûsa,*
*3 Ser gelek tiştî kire casuse.*

---

[789] *ĥezêmet*
[790] *Heftî he zar hey wane*
[791] *surek*
[792] *êqîn*
[793] *sibhan*
[794] *tal*
[795] *hiyran*
[796] *percivtin*
[797] *mew ca*

**S. 41** *1 Wey[798] li xelqê k'ifir,*
*2 Li meĥikê r̂awesta sifir,*
*3 Jêr beĥre û jêr beĥreke bi befir.*

**S. 42** *1 Li wê dibûn Ĥesenê zerbave,*
*2 Ciyayek li me'niya[799] r̂awestave,*
*3 Jêr beĥre û jêr beĥreke bi ave.*

**S. 43** *1 Em sê westa pesinî,*
*2 Qudretî têde mekinî,*
*3 Jêr beĥre û jêr beĥrekî ĥesinî.*

**S. 44** *1 Dilê min qirêr kir,*
*2 Hincîyê nefseka birsî t'êr kir,*
*3 Ewî bihuşt[800] eseĥî kir,*
*4 Jêr beĥre û jêrda ji bo xwe xêr kir.*

**S. 45** *1 Îlaĥîo tu xasa mehivoje,*
*2 Tu E'deviya mesoje,*
*3 Jêr beĥre û jêr beĥreke bi r̂oje.*

**S. 46** *1 Melek Fexredîn Manga zere,*
*2 E'cêb nemîne li Qemere,*
*3 Jêr beĥre û jêr dane dere.*

**S. 47** *1 Ji berî Qelem û Lewĥe,*
*2 Jê helgirin çû sûĥe,*
*3 Ji qewlê sal û luhe,*

**S. 48** *1 Beĥr navû dik'irête[801] P'adşê minî K'ibîr,*
*2 T'extê e'rif lê dibin xebîr,*
*3 Jêr beĥre û jêr dane dîr.*

**S. 49** *1 Şêx Fexrê Adiya got: «Dilê min bo van me'niya[802] sotin»,*
*2 Çendî e'lim hatin ev ilme digotin,*
*3 Jêr beĥre û jêr çu[803] yadî jê ne digotin.*

*Em di kêmin, û Xwedê yî t'emame!*

## 34. QEWLÊ E'RD Û E'ZMAN[804; 805; 806]

**S. 1** *1 Bi qudreta êkî Beyrune,*
*2 Bipirsin ji xelqê hûne,*
*3 K'a çawa ev e'zmana r̂awesta bê stûne.*

> **S. 1** *1 Bi qudreta P'adşaye minî Beyrune,*
> *2 Bipirsin xelqê hûne,*
> *3 Gelo ev e'zmane çawa r̂awesta bê stûne?*
>
> > **S. 1** *1 Bi qudreta Melikêt Bêyrûne,*

---

[798] *weî*
[799] binêr: *me'nî*
[800] *behişt*
[801] *dikar*
[802] *me'niya*
[803] *cu*
[804] *Qewlê e'rd û e'zman* http://www.ezdixandi.com/forum/38-295-1
[805] [1] *Qewlê e'rd û e'zman* (pp. 386-390)
[806] Дж. Джалил и О. Джалил *Qewlê e'smîn* http://www.kurdist.ru/index.php?option=com_content&task=view&id=64

*2 Xelqo, bifikirin hûne,*
*3 E'rd û E'zman r̂awestane[807] bê stûne.*

**S. 2** *1 Bi qudreta P'adşê minê Ĥeqe,*
*2 Nijyar[808] kir çardeh t'ebeqe,*
*3 K'a ev e'zmane çawa r̂awestabû mu'eleqe[809].*

**S. 13** *1 Bi qudreta P'adşê minî Ĥeqe,*
*2 Ewî nijyar kirbû[810]çardeh t'ebeqe,*
*3 Bi qudreta, E'zman r̂awestabû mu'eleqe.*

**S. 2** *1 Bi qudreta yekê Ĥeqe,*
*2 P'adşayê min nijyar kirne cardeh t'eveke,*
*3 E'rd û E'zman bê stûn r̂awestane mu'eleqe.*

**S. 3** *1 Bi qudreta R̂eĥmanî,*
*2 Meleka deng hilanî,*
*3 Ev E'zman r̂awestabû mu'eleq li banî.*

**S. 2** *1 Bi qudreta R̂eĥmanî,*
*2 Meleke wê deng hilanî,*
*3 Gelo ev E'zmane çawa r̂awestabû mu'eleq li banî?*

**S. 3** *1 Qudreta yekî R̂eĥmanî,*
*2 Meleka we deng hilanî,*
*3 Go: «E'rd û E'zman bê stûn r̂awestane».*

**S. 4** *1 Melek cewab daye:*
*2 «Şehde bi xwe P'adşaye,*
*3 Stûna E'rd û E'zman r̂awestabû bi wan dua'ye».*

**S. 3** *1 Meleke cewab daye:*
*2 «Şehde bi xwe P'adşaye,*
*3 Stûna E'zman westabû pê dua'ye».*

**S. 4** *1 Meleka wa cav didaye:*
*2 «Şehdê xwe P'adşaye,*
*3 Stûna E'zman pê r̂awestaye — ew dua'ye».*

**S. 5** *1 Ev qewle, qewlekî xase,*
*2 E'zman bi E'rdî dik'etin behse:*
*3 «E'rdo, tu — eşkerî, ez — xase».*

**S. 4** *1 Ev qewle, qewlekî xase,*
*2 E'zman bi E'rdê r̂a dik'et behse:*
*3 «E'rdo, tûyî ejgerî, ezî — p'akim, tûyî ejgerî, ezî — xasim».*

**S. 5** *1 Eva qewla qewlekî xase,*
*2 E'zmên E'rdê r̂a kirye behse,*
*3 Go: «Ta ji t'ojan gire, eze xase».*

**S. 6** *1 E'rdo, tu eşkerî ez çakim,*
*2 Ez ne ji jengim, û ne ji xakim,*
*3 Ez ji cehwerekî p'akim».*

**S. 5** *1 E'zman dibêjite E'rdê:*
*2 «Ne ji nakim, ne ji xakim,*
*3 Ez ji cewherekî p'akim».*

**S. 6** *1 E'rdê li E'zmîn r̂a kire behse:*
*2 Go: «Ne senge, ne li xange,*
*3 Ne ez jî cehwereke[811] xase».*

---

[807] *r̂awastan*
[808] *nişyar*
[809] *maliq*
[810] *nijrandibû*
[811] *cewar*

**S. 7** *1 E'rd dibêjitê: «E'zmano, e'silê min û te ji derekî,*
*2 Em nijyarkirîn ji cewherekî,*
*3 Şefaqe[812] li me dikete derekî».*

**S. 6** *1 E'rd dibêjite E'zmanî: «E'silê min û te ji derek,*
*2 Em nejirandine ji cewherek,*
*3 Şefaqe[813] li me dike nederek».*

**S. 7** *1 E'rde go: «E'zmano e'silê min tê ji derekê,*
*2 Em t'iviqandine ji cehwerekê,*
*3 Şefaqa[814] em anîne pêş nezerekê».*

**S. 8** *1 Şefaqe li me dikete Cebêre,*
*2 Em xulqîn li here,*
*3 Ser min p'eyda bûn naz, û ne'met, û xêre.*

**S. 7** *1 Şefaqe li me dike Cebêre,*
*2 Em xulqtîne li here,*
*3 Ber min p'eyda dibit naz, û ne'met, û xêre.*

**S. 8** *1 E'rdê go: «E'zmano, şefaqa me kir Cebêre,*
*2 Ez t'iviqandim li hêre,*
*3 Ser min cêkirye naz, û ne'met, û xêre».*

**S. 9** *1 «Naz û ne'met dibînî,*
*2 Xwedê bendekî giran ser min datînî,*
*3 Çiqas muxliq xêr ji me dibînî».*

**S. 8** *1 «Naz û ne'met dibînin,*
*2 Bendiya ser min hiltînin,*
*3 Çiqas muxliq bi gîyanin, ĥemû bi xêrin».*

**S. 9** *1 «Naz û ne'metê hûn dibînin,*
*2 Bende ser me hiltînin,*
*3 Ciqas xulyaqet ez xêrê pê dighînim».*

**S. 10** *1 E'rd dibêjitê: «E'zmano, tu birayê min li serî,*
*2 Bê T'eke û bê Berî,*
*3 Ser min p'eyda dibit naz, û ne'me,t û terî».*

**S. 16** *1 E'rd dibêjite E'zmanî: «Tu birê minî serê,*
*2 P'êtekî li vê berê,*
*3 Ser min p'eyda dibit naz, û ne'met, û tire».*

**S. 10** *1 E'rdê go: «E'zmano, tu birê minî serî,*
*2 Tuyî bê T'ikî, bê Berî,*
*3 Xwedêo, ser min cêkirye naz, û ne'met, û tirî».*

**S. 11** *1 «Gul, û sosin, û beybûn,*
*2 Sêv, û bîh, û zeyt'ûn,*
*3 Ew jî li ser min hasil dibûn».*

**S. 9** *1 «Ji min dibînin gul û sosin,*
*2 Xox û beybûn, bî[h], û sêv, û zeyt'ûn,*
*3 Ew jî li ser min hasil dibûn».*

**S. 12** *1 E'rdê go: «E'zmano, xox, û bî[h], û zeyt'ûn,*
*2 Gul, û ȓeĥane, û beybûn»,*
*3 E'rdê go: «E'zmano, ew jî ser min hasil dibûn».*

**S. 12** *1 «Bi qudreta Ȓeĥmane,*
*2 Ser min hatin herçar navêt girane,*
*3 T'ewrat, û Încîl, û Zembûr, û Qura'ne,*
*4 Hatin ji ba Melikê[815] Ȓeĥmane».*

[812] *şefeq*
[813] *şifqe*
[814] *şivqa*
[815] *melek*

**S. 12** *1 «Bi qudreta R̂eh̄mane,*
*2 Nazil bû herçar navêt girane,*
*3 T'ewret û Incîl, Zembûr û Ferqane».*

**S. 13** *1 Erdê go: «E'zmano, qudreta yekî R̂eh̄manî,*
*2 Çar navê hatine ser min giranî,*
*3 Êncîle, T'ewrate, Zembûre, Furqanî*[816]*».*

**S. 13** *1 «Herçar navêt mişûre*[817]*,*
*2 Hatin ji ba Melikê Ẍefûre,*
*3 T'ewrat, û Încîl, û Qura'n, û Zembûre*[818]*».*

**S. 14** *1 «Bi qudreta P'adşê minî Ẍefûre,*
*2 Nazil bûn herçar navêt mişûre,*
*3 T'ewret û Incîl, Ferqane*[819] *û Zembûre».*

**S. 14** *1 Êncîle, Qura'ne, T'ewrate, Zembûr,*
*2 Evin herçar navêd mişûr,*
*3 Nazil bûne ji cem êkî Ẍefûr».*

**S. 14** *1 E'rdê we dikire ĥedêde:*
*2 «Naz û ne'met ser min têne,*
*3 Çiqas muxlêqetêt bi gîyan bo xwe lê diĉêrine».*

**S. 11** *1 E'rdê we kir ĥedêde,*
*2 Go: «E'zmano, naz û ne'metê ser min têt,*
*3 Ew jî ĥeywanete pê diĉêrête».*

**S. 15** *1* «*Naz û ne'met dibînî,*
*2 Xwedê bendek ser min datînî,*
*3 Çiqas muxliq bi gîyan bo xwe lê diçêrînî».* (binêr **S. 9***)*

**S. 16** *1 Ev qewle qewlekî xase,*
*2 E'zman bi E'rda r̂a diketin behse:*
*3 «Fêris û milyak'et min xweş ĥewase».*

**S. 24** *1 Ew qewle, qewlekî xase,*
*2 E'zman E'rdê r̂a diket behse,*
*3 E'zman dibêjite e'rdî: «Fêris*[820] *û milyak'et ser min xweş awaze».*

**S. 15** *1 E'zman E'rdê r̂a kire behse,*
*2 Go: «Ewa qewle qewlakî xase.*
*3 Mêr û meleka ser min xweş ĥewase».*

**S. 17** *1 E'rd dibêjite E'zmane:*
*2 «Ser te hene milyak'et û fêrisîne,*
*3 Ew çû nefes û şubhet li ba wan nîne».*

**S. 20** *1 E'rd dibêjite û e'yb*[821] *û zînê:*
*2 «Ser te hene milyak'et û fêrisîne,*
*3 Çî nefsa şewhet li ba nîne».*

**S. 16** *1 E'rdê wê digote E'zmîne:*
*2 «Ser te melek û fêrisîne,*
*3 Ewana nevs û şubhet*[822] *t'unîne*[823]*».*

**S. 18** *1 E'rd dibêjite E'zman:*
*2 «Xwedê bendek li ser min danî,*
*3 Ser min hene du nefesêt giranî, ew jî bendêt îmanî».*

---

[816] *Firqan*
[817] *meşûr*
[818] *T'ewrat, û Încîl, û Zembûr, û Qura'ne*
[819] *Firqan*
[820] *firis*
[821] *e'b*
[822] *şe'bet*
[823] *tunîne*

**S. 21** *1 E'rd dibêjite E'zmanî:*
*2 «Xwedê Te'ala, bendekî giran li ser min danî,*
*3 Tê hebû du nefsa giranî».*

**S. 17** *1 «Bi qudreta êkî R̂eĥmanî,*
*2 Xwedêo bende ser min danî,*
*3 Vê r̂a hene du nevsê giranî».*

**S. 19** *1 Ew jî bendêt Xwedêne,*
*2 Du nefesêt giran hene li wêne,*
*3 Ewan xwe ji guneha vedik'işêne».*

**S. 22** *1 Ew jî li xwedan îmane,*
*2 Ew jî di benda Xwedêne,*
*3 Dû nefsa giran li wane».*

**S. 18** *1 Ewin bendê Xwedêne,*
*2 Du nevsê giran jê dibêne,*
*3 Ewin xwe ji-ya xirab dipêne».*

**S. 20** *1 E'zman deng diket bi ĉêra:*
*2 «E'rdo ez p'aqijtirim ji zîv û zêr̂a,*
*3 Min ji jorda li kul û e'melêt te dinê r̂a».*

**S. 17** *1 E'zman deng diket bi ĉêre:*
*2 «Ez p'aktirim ji zîv û zêr̂e,*
*3 Ji jorda ez kul û e'melêt te dinêr̂im».*

**S. 22** *1 E'zmên we deyn dikir bi ĉêre,*
*2 Go: «E'rdo, ez çêtirim zîv û zêr̂e,*
*3 Jorda ser kul*[824] *û e'melê te da dinihêre».*

**S. 21** *1 E'zman dibêjitê: «Ez bi xwe deng nekirim,*
*2 Ji zêr̂ û zîva p'aqijtirim,*
*3 Ez ji jorda li kul û e'melêt te difikirim».*

**S. 15** *1 E'zman dibêjite E'rdî: «Ezî deyn nekirim,*
*2 Ji zêr̂ û zîv p'akiştirim,*
*3 Ji jorda kul û e'melêt te digirim».*

**S. 22** *1 E'zman dibêjitê: «E'rdo, ez yî p'ak û bê e'yb,*
*2 Ser te hene derew, û qet'il, û zina, û xêb,*
*3 Ew jî ser te diger̂ê r̂ûyê vê dinê bê e'cêb».*

**S. 18** *1 E'zman dibêjite E'rdî:*
*2 «Ser te hene qet'il, derew, zinê û e'yb,*
*3 Ew jî diger̂in ser r̂uwê e'rdê bi e'cêb».*

**S. 19** *1 E'zmên go: «E'rdo, ezim — ĉak, ta — bi e'yb,*
*2 Ser te dibe qet'il, buxtan*[825] *û ẍeyb,*
*3 E'ĉêv meclîsa vê dinyayê diger̂in e'cêv».*

**S. 23** *1 E'zman bi E'rdê tê gotinê:*
*2 «Ser te heye qet'il, û derew, û xêb, û zinê,*
*3 Ew jî bi e'cêb ser te diger̂ên r̂ûyê vê dine».*

**S. 19** *1 E'zman we diket gatine:*
*2 «E'rdo, li sar te hene qet'il, û derew, û zinê, û êb,*
*3 Ew jî diger̂in ser r̂uwê e'rdê bi e'cêb».*

**S. 24** *1 E'rd dibêjitê: «E'zmano, ezim e'rdê derwêş,*
*2 Ser min diger̂ên coq, û cumlet, û cêş,*
*3 Kesek bi k'ubarî naçite pêş».*

**S. 10** *1 E'rd dibêjite E'zmanî: «Ezim e'rdê derwêş,*

---

[824] *kêl*
[825] *buxdan*

*2 Li ser min hene coq, û cumlet, û cêş,*
*3 Kes bi k'ubarî[826] naçite pêş».*

**S. 23** *1 E'rdê go: «E'zmano, ezim e'rdê derwês,*
*2 Ser min digeȓê cimlet û cêş».*
*3 E'rdê go: «E'zmano, kes k'ubaryê naçe pêş».*

**S. 25** *1 E'rd dibêjitê: «E'zmano, ezim e'rdê feqîr,*
*2 Ser min digeȓên coq, û cumlet, û cêşêt K'ibîr,*
*3 Kesek bi k'ubarî naçite pêş mîr».*

**S. 11** *1 E'rdê go: «Ezim e'rdê feqîr,*
*2 Li ser min hene coq, û cûmlet, û cêşê K'ibîr,*
*3 Kes bi k'ubarî naçite pêş mîr».*

**S. 24** *1 E'rdê go: «E'zmano, ezim e'rdê K'ibîr,*
*2 Ser min digeȓê cimlet, û cêş, û feqîr».*
*3 E'rd go: «E'zmano, kes k'ubaryê naçe ber dindara mîir».*

**S. 26** *1 Safî derî mizgefte,*
*2 Yarî ȓunişt li xewle da,*
*3 Ĥeft suȓêt fêris û milyak'ete.*

**S. 25** *1 Zebinê dev mizgefta,*
*2 Yarêd ȓûniştine xewleta,*
*3 Ĥevsir fêrizêd milyak'eta.*

**S. 27** *1 Safî derê xezêye,*
*2 Yarî ȓunişt li xewleye,*
*3 Ĥeft suȓêt milyak'ete,*

**S. 23** *1 Ew jî gunehê[827] xwe[828]dik'êşine safîya û dil xwe ȓazî ye,*
*2 Ew berî ȓûniştî bû li xewlê ye,*
*3 Ĥeft suȓêt[829] xweş û milyak'et li wê ya.*

**S. 28** *1 Şar li min cema' dibûn qutbe,*
*2 Çar kenar sekinîn xotbe[830],*
*3 Melik şêx Sin li serî xitme.*

**S. 26** *1 Şora lê cema' dibûn qutbe,*
*2 Çar kenarêt min sekinîbûn xotbe[831],*
*3 Melik şêx Sin ser xitme.*

**S. 28** *1 Ziyaretê cem we dibin xwe dibin,*
*2 Herçar t'eref berbi quble[832],*
*3 Nav dik'irê şêx Adî, melik şêx Sin serê xitma.*

**S. 29** *1 Şevêt tênî e'lim dixwînin[833],*
*2 Diçine ser menberê û deng hiltînin,*
*3 Navê şêx Adî û melik şêx Sin serda ditînin.*

**S. 27** *1 Şevêt înîyê e'lim dixwînin,*
*2 Dengê xwe hiltînin,*
*3 Navê şêx Adî û melik şêx Sin dizik'irînin.*

**S. 27** *1 Şevêd înîya e'lim dixwînin,*
*2 Ȓadivine ser menbera[834], deng hiltînin,*
*3 Nav dik'irê şêx Adî, melik şêx Sin Ĥeq tînin.*

---

826 *kibar*
827 *gunah*
828 *xo*
829 *sur*
830 *xutbe*
831 *qut*
832 binêr: *qible*
833 *dixûnin*
834 *member*

**S. 30** *1 Ellaĥû Ekbere,*
*2 E'lim diçine ser menbere,*
*3 Ji Furqan[835] didin xebere.*

**S. 26** *1 Ya Ellaĥû Ekber,*
*2 E'limed r̂adibine ser [menbere],*
*3 Ji Furqanê[836] didine xeber.*

**S. 31** *1 Bi qudreta Melikê Celîl,*
*2 Ser min hene nûr û qendîl,*
*3 Ezraîl, Israfîl, Ezazîl, Cebraîl, Şifqaîl, Mîkaîl, Derdaîl.*
*4 Her ĥeft melekêt K'ibîr.*

**S. 25** *1 E'zman dibêjite E'rdî: «Ser min hene nûr û qendîl,*
*2 Ezraîl û Cebraîl[837], Mîkaîl û Israfîl, Ezazîl, Şimxaîl û Derdaîl,*
*3 Her ĥeft melekêt K'ibîr,*
*4 Ji berî çendî bedîl, di destê wan da mifte û k'ilîl,*
*5 Her û her sekinîne li qaf û qeysîr li ĥezreta Melikê Celîl».*

**S. 29** *1 E'zman go: «E'rdo, ser min heye Ezraîl û Cebraîl, Durdaîl, Mikaîl, Xuşrafîl, Ezrafîl, Ezra Eziz,*
*2 Ewin her ĥeft melekê K'ibîr,*
*3 Nazil bûne cem êkî Qedim».*

**S. 32** *1 Li destê wan heye mifte û k'ilîl,*
*2 Berî xasa çendî bedîl,*
*3 Wê li ĥezreta Melikê Celîl».*

**S. 33** *1 E'zman deng diket bi Nûre:*
*2 «E'rdê Lewĥek heye ji min û ber û jure,*
*3 Qelema wî ji ĥeqîqetê ye sur̂e».*

**S. 28** *1 E'zman we deng dike bidore,*
*2 Go: «E'rdo, lo hekî min bere jore,*
*3 Ew jî Qelemê wî ĥeqîqî sore».*

**S. 34** *1 E'rdê, we dikire ĥikyate:*
*2 «E'zmano, heke[838] melik şêx Sin ji ba te hate, e'zman dê maba bi mate».*

**S. 31** *1 E'rdo we diket ĥikyate:*
*2 «Heke sur̂a şêx Sin ji bana hate, e'zman dê maba mate».*

**S. 31** *1 E'rdê wa kir ĥikyate,*
*2 Go: «Wexta nebî[839] Mehmed banava dihate, hîngê[840] e'zman mabû mate».*

**S. 35** *1 E'rd wê diket gotine:*
*2 «E'zman, bes li me bike gol gefêt mezine,*
*3 Lalişa nûranî, Qudsû Xelîl, Mekke û Medîne ew li ser mine.*

**S. 36** *1 Bi qudreta Melikê Celîl,*
*2 Lalişa Nûranî, Qudsû Xelîl[841], Mekke û Medîn,*
*3 Ew jî li ser min diger̂ên r̂ûyê vê dinê bi sebîl».*

**S. 29** *1 «Bi qudreta Melikê Celîle,*
*2 Ser min hene Laliş nûrîne, Qudsû Xelîle,*
*3 Ji yek diger̂in ser r̂ûyê wê dine sebîle».*

**S. 30** *1 E'rdê go: «E'zmano, qudreta yekê Sebîr,*

[835] *Firqan*
[836] *fira'n*
[837] *Cibraîl*
[838] *heqe*
[839] *nevî*
[840] *hingê*
[841] *Quds û Xelîl*

*2 Mekke, Medîn, Quds Birahîm*[842] *Xelîl, Lalişa Nûranî»,*
*3 E'rdê go: «E'zmano, ew ji ser min dibûne sebîl*[843]*».*

**S. 37** *1 E'rd dibêjitê: «E'zmano, ez medha ji xwe nadem,*
*2 Ser min nijyar kirin Adem,*
*3 Ji suȓa melik şêx Sin li xitm*[844]*».*
**S. 30** *1 E'rd dibêjite E'zmanî: «Ez medha xwe nadem,*
*2 Ser min nejirand bû Adem,*
*3 Suȓa*[845] *melik şêx Sin li xatem*[846]*».*

**S. 38** *1 E'zman dibêjitê: E'rdo, ser min hene Ȓoj û Heyv,*
*2 Ez p'aqijtirim ji zêȓ û zîv».*
**S. 33** *1 E'zman dibêijte E'rdî: «Ser min hene Ȓoj û Heyv,*
*2 Ez p'akitirim ji zêȓ û zîv».*
**S. 32** *1 E'smên go: «E'rdo, çêtirim ji zêȓe û zîv,*
*2 Ser mi heye Ȓoje û Hîv».*
*3 E'rdê go: «E'zmano, ne ser mi jî hene xelqê nazikî let'îf».*

**S. 39** *1 E'rd dibêjitê: «Ser min hene xelqê nazik, let'îf, ciwan û k'amil,*
*2 Mîr û ȟakimêt E'dil*[847]*,*
*3 Ew jî ser min dibûn hasil».*
**S. 32** *1 «Mîro, ȟekîmê*[848] *E'dil,*
*2 Ser min hene melikê nazikî, cuanî, let'îfî, k'êmil,*
*3 Ew jî digeȓin ser ȓûyê dine bi E'dil*[849]*».*
**S. 33** *1 E'rdê go: «E'zmano, ezim e'rdê k'amil,*
*2 Ser min diqerin mîr, ȟakimed E'dil.*
*3 Ewan ji ser min dibûne hasil».*

**S. 40** ……………………………………….
……………………………………….
……………………………………….
**S. 34** *1 E'rd dibêjite e'zmanî: «Ser min hene xelqê*[850] *cuanî, let'îfî k'amil,*
*2 Ew jî digeȓin ser wê dine bi hasil*[851]*».*

**S. 41** *1 E'zmanî we cewab daye:*
*2 «E'rdo, heke ji min nehatiba tav û baye,*
*3 Ev meclîse dê bi çî bit avaye?»*
**S. 36** *1 E'zman gufte daye:*
*2 «E'rdo, heke ji bo min nehate baran û baye,*
*3 Ev meclîsa kevna Xwedê bi çî dibit avaye?»*
**S. 21** *1 E'zmên we gef dixare,*
*2 Go: «E'rdo, wekî cem min neyê baran û baye,*
*3 Miclisa vê dinyayê wê pê çi bive avaye?»*

**S. 42** *1 E'zmanî we cewab daye:*
*2 «Heke ji ba min nehatiba bayî û tave,*
*3 Ev dinya dê bi çî bite avaye?»*
**S. 35** *1 E'zman we gufte daya:*
*2 «E'rdo, heke ji cem min ne hata baran û bayî,*
*3 Ev kevna Xwedê dê bi çî bin avaya?»*

[842] *brahîm*
[843] *sedîb*
[844] *xatim*
[845] *sur*
[846] binêr: *xitm*
[847] *E'dîl*
[848] *hakm*
[849] *e'sêl*
[850] *xekê*
[851] *xasil*

**S. 20** *1 E'smên we gef didave,*
*2 Go: «E'rdo, weki cem min neyê baran û ave,*
*3 Miclisa vê dinyayê wê pê çi avave?»*

**S. 43** *1 E'zman deng diket bi xwe ye:*
*2 «E'rdê Xwedê ser şehde ye,*
*3 Ji ĥeyfa te yî welle ye».*

**S. 37** *1 E'zman dibêjite xwe ye*[852]*:*
*2 «Xwedê li min û te şehdeye».*

**S. 44** *1 Bi qudreta R̂eĥmane,*
*2 E'rd û E'zman p'êk hatin weke xûşik û birane.*

**S. 34** *1 Bi qudreta êkî R̂eĥmanî,*
*2 Axî Cebraîl nazilbûye [ji] banî,*
*3 E'rd û E'zman hev anî.*

*T'emametiya vî qewlî Xwedane,*
*Melek*[853] *il- mewt, û Gavanê Zerzane,*
*Û herçar birane!*
*Ser xitma vî qewlî Dawidê bin Dermane!*

## 35. QEWLÊ NEFSÊ[854]

**S. 1** *1 Xelqê*[855] *jîrî zane,*
*2 Werin ji me r̂a bidin xweyane*[856]*,*
*3 K'a nefs ye bi çîye nîşane?*

**S. 2** *1 Wekî nefs li dilî bela bû,*
*2 Aqil ji serî cûda bû,*
*3 Mal li r̂ewanê xêra bû.*

**S. 3** *1 Şerm erk'anek ji aqile,*
*2 Hincîyê zordarî li nefsa xwe dikire,*
*3 Cehwer li qalbê wî dişuxule.*

**S. 4** *1 Heke te ciwanek dîtye r̂eng sipehî,*
*2 Nefsa te çuyî û tu tê fikirî,*
*3 Bi r̂astiya Xwedê tu dixisirî.*

**S. 5** *1 Heke te ciwanek dîtye şîrine*[857]*,*
*2 R̂êya te bi ĥelalî ji xwe r̂a bîne,*
*3 Batin te nahejmirîne.*

**S. 6** *1 Namûsa xelqê ne ĥelalê te ye,*
*2 Wekî te dinya li wan kire doje ye,*
*3 Ma te ne dizanî mirin heye?*

**S. 7** *1 Temayî şaxê nefsê ye,*
*2 Çawa tu bûye maldarê dine ye,*

[852] *xûêyê*
[853] *il mele*
[854] [50] (rr. 485-488)
[855] *xelk*
[856] *xuyan*

[857] *şirîn*

*3 Ma te hesêb nedikir ji mirinê ye?*

**S. 8** *1 Yê ji malê dinê dihesiland,*
*2 Bê namûsî dît, xwe ne dipîvand,*
*3 Batine ĥemû dihejmirand.*

**S. 9** *1 Heкe tu yekî dibînî tirs nîne,*
*2 War û namûs çima dikey dest jê werîne,*
*3 Heke ne batin heye wê te pê bişkîne.*

**S. 10** *1 Çûme mêrgehekêye xewle bû,*
*2 Min ciwanek dît kesî lê ne bû,*
*3 Min got: «Xweşewîstê min ne ji xwarina me bû».*

**S. 11** *1 Çûme mêrgehekê xewle cî ye,*
*2 Min ciwanek dît ye qîmetî ye,*
*3 Got: «Nefs agirê guȓî ye».*

**S. 12** *1 Aqil dibêjite nefsê: «Tu heya bakê,*
*2 Axret heye dê me di zîndakê,*
*3 Agir heye dê me di belakê».*

**S. 13** *1 Weki aqil û cewher dibûne hevale,*
*2 Nefs dimir, ne dikir sewale,*
*3 Bihuşt*[858] *heye bistan û baẍe.*

**S. 14** *1 Birime dîyarî wê dadgehê,*
*2 Min dojeh dît bi qefla diçinê,*
*3 Sebeb nefs bû, ew dibirnê.*

**S. 15** *1 Çûme mergehekê ye xewle bû,*
*2 Peyv û gotina zav lê hebû,*
*3 Ew dihesibandin yê hevalê we bû.*

**S. 16** *1 Heke ew şaşbûn hûn xwe ȓakin,*
*2 Xwe ji t'ebaya wan cûdakin,*
*3 Xerab sûd nakin.*

**S. 17** *1 Ne ji qehrêd xelqê desta tê werîne,*
*2 Sûdê te qet jê nîne,*
*3 Batin heye te pê dixisrîne.*

**S. 18** *1 Gelek heyne xwe ji qenciyê dikirin,*
*2 Sûdê dibînin li xwe nafikirin,*
*3 Temayê dibînin li xwe ne bi hekerin.*

**S. 19** *1 Hindek li çiyaya difikirin ji zehme tê,*
*2 Li bajêra dişuxulin kes şeȓ ne tê,*
*3 Ew dê gehîne nav ȓefa ew tê.*

**S. 20** *1 Hindek diçine bajêra wê di heyn wan tema diken,*
*2 Le wer tînin ji dîn cûda diken,*
*3 Hêdî-hêdî ȓê ji ber hinda diken.*

**S. 21** *1 Yê diçite bajêra, divêt yî bi fikir be,*
*2 Heke jinek vê ȓa be, divêt lê yî bi heker be,*

[858] *buhişt*

*3 Ne lê bibite bela, û lê yî bi cebir be.*

**S. 22** *1 Hevaletiya wan bi xwe agire,*
*2 Dê xwe li wekene dost wekî bira,*
*3 Da dînê şîrin ji we biqehire.*

**S. 23** *1 Wê ciwanekê diînin awir xedare,*
*2 Di nefsa wê da heye pête û are.*
*3 Dê bi xerabara bite hevale.*

**S. 24** *1 Xirab dê desta di we alînin,*
*2 R̂êka te mayê dê ji we r̂a werînin,*
*3 Da dest di war û namûsa we werînin.*

**S. 25** *1 Hûn bendekî di nîvêka xwe da deynin,*
*2 Xwe ji temaya male dinêr̂a neşikênin,*
*3 Nefsa bilind bavêjin, da dîwanêt xasa bi destxînin.*

**S. 26** *1 Hûn bendekî danên nîveka xwe û xelqê ye,*
*2 Yek diçe û yek tê ye,*
*3 Gerdûn deryaye, em wê dik'eftine ber p'êlê ye.*

**S. 27** *1 Heke te got me eve hêla,*
*2 Nefs agirê gur̂îye di zeviyê da,*
*3 Gerdûn deryaye, em wê dik'eftîne têda.*

**S. 28** *1 Gerdûn deryaye li gelek cîye,*
*2 Nefs agirê gur̂îye,*
*3 Şkestina jinê ji ba mêrî sewalîye.*

**S. 29** *1 Agir û barûd herdu xeterin,*
*2 Herdu vêk r̂a*[859] *naşuxulin,*
*3 Dostêt Xwedê her xwe digirin.*

**S. 30** *1 Bê e'silî neyne*[860] *mala xwe ye,*
*2 Nebêje sûdê min jê heye,*
*3 Ji deha êk xilaf nabit aqilê xwe ye.*

**S. 31** *1 Bê e'silî neyne ji sûdê r̂a,*
*2 Malê xwe xerc neke jê r̂a,*
*3 Dê bi ĥemû wê bixisirî vê r̂a.*

**S. 32** *1 Wekî em hatine r̂ûy vê dine ye,*
*2 Zanayî, şaxê îmanê ye,*
*3 Nezanî şaxê sewalê ye,*
*4 Jîrî r̂usipîyatiya r̂ewanê ye.*

*T'emametiya vî qewlî li Xwedê!*

## 36. QEWLÊ ÎMAN BI ÇI NÎŞANA?[861]

**S. 1** *1 Hincîyê hikm kir li zimanî,*

---

[859] *vêgira*
[860] *ne îne*
[861] http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=49

*2 Wek boriyê li ber R̂eĥmanî,*
*3 Wek çil çile û mocade hilanî.*

**S. 2** *1 Hincîyê hikmke zimanê xwe ye,*
*2 Bizanê bi wezin deng bike ye,*
*3 Ne ĥewcey çile û micade ye.*

**S. 3** *1 «Hey zimano, yê xebate,*
*2 Xebera xweş — nebate,*
*3 Xebera ne xweş çî menfae'te[862]?*
*4 Dê dilê însanî p'êkî r̂ahete.*

**S. 4** *1 Hey zimano, yê sotinê,*
*2 Xeberek ya hey, ne ya gotinê,*
*3 Dê bo çî dahirkî r̂ûyê dinê?»*

**S. 5** *1 Ĉav baziyê serî,*
*2 Dil xunk'are[863] wê li wî berî.*
*3 Ĉav dibîne, dil dixwaze, ziman dibêje: «Min dewrî!»*
*4 «Zimano, xwezî min tu kirbaye ker bi kerî!»*

**S. 6** *1 Ĉav dibîne, dil dixwaze, ziman dibê: «Bîne û minde».*
*2 «Zimano, xwezî min tu bir̂î[864] bay ji bin de».*

**S. 7** *1 Ziman dibêjê: «Dilo, ez delalim,*
*2 Ĥeta ji ba te ne xulqenyê — balim,*
*3 Ez p'erçûmekî ker̂ û lalim.*

**S. 8** *1 Sibĥane ji te sibĥane,*
*2 Te dane min aqil û fame,*
*3 Te ez ji Şerqê birime Şame».*

**S. 9** *1 «Hey nefsê, ye bê me'r̂îfetê, ye bê r̂ê ye,*
*2 Şevên giran te dawe li xeder̂ê[865] ye,*
*3 Tê xeyale li me hisakey ĉirên xederê ye.*

**S. 10** *1 Tê xeyale li me hisakey ĉirên gur̂î,*
*2 Gava teyrê dewletê fir̂î,*
*3 Yarû birên axretê nasbûnî ji me bir̂î.*

**S. 11** *1 Nefsê, çendî tu dikî gumanê,*
*2 Tu xalî nabî ji xederê û duxanê,*
*3 Te xeyale xwedanê xwe xilaskî ji îmanê».*

**S. 12** *1 Nefsê çendî dikî xebatê,*
*2 Wek qazî disekine li pê p'ira Selatê[866],*
*3 Tu alî hêviyê me bihêlî li qismatê[867]?*

**S. 13** *1 Te mal li me xirab kir hey k'ifirê,*
*2 Te em xilas kirîn ji nesirê,*
*3 Ji leyimûn şê ebrus ji Leyilet il-Qedirê».*

**S. 14** *1 «Aqilo, xeberên te di k'ûrin,*

[862] *menfêt*
[863] *xwendk'ar*
[864] *burî*
[865] *xedir*
[866] *Silat*
[867] *kişû mate*

*2 Qeda û qutkên dinyayê di p'iȓin,*
*3 Dinya dunge, lêxin û bibirin».*

**S. 15** *1 Aqil dibêje: «Nefsê newata,*
*2 Çî kesê buxwe luqmeke bê ȓeda,*
*3 Ȓoja axretê dê li pêşiyê bibe qeda».*

**S. 16** *1 Nefse k'ibîre*[868]*,*
*2 Beȟre û ne bîre,*
*3 Ya li ser destê a'le mîre,*
*4 Ya li bin destê feqîre,*
*5 Yê nefsa xwe kirî êxsîre.*

**S. 17** *1 Feqîra yeke çêkir,*
*2 Xwe ji xweşî û levzeta dinê kir,*
*3 Li vê dinyayê berbi axretê kir.*

**S. 18** *1 …………….*
*2 Wekî te bor be ȓû,*
*3 ………………*

**S. 19** *1 Lix̆ab û hevsar li serî ker bi ker bû,*
*2 Borê te li ȟemû mêrga wer bû,*
*3 Ew şolê nefsê bû,*
*4 Ȓengê xwedanî ji ber şkest bû.*

**S. 20** *1 Wek ȟeya ji hizin der dibî,*
*2 Wek ȓezekî bê ber dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî,*
*4 Xwedan li axretê vê ȓa bê mefer dibî.*

**S. 21** *1 Ĥeya ji hizin dûr dibî,*
*2 Wek ȓezekî bê şûr dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî,*
*4 Bi kêr meriya tê ȟeya û e'deb û aqilî.*

**S. 22** *1 Ji wan nebin mişemir mebide ya,*
*2 Rê bi ȓastiyê dibe xwe ya*[869]*,*
*3 Bi kêr meriya tê hizin û e'deb û heya.*

## 37. QEWLÊ NEFS Û AQIL[870; 871; 872]
## (QEWLÊ SIBEKÊ JI TÊT E'DEVIYA – QEWLÊ AXRETÊ)

**S. 1** *1 Çi sibake xweş û tarîye,*
*2 Em da bidin pesna şêxê Adîye,*
*3 Ĥeca me Zimzime, şkefte, kaniya Sipîye.*

**S. 1** *1 Sibekê ji têt E'devîya,*
*2 Birime dîwana şêxê Adîye*[873]*,*
*3 Ĥaca me Zimzime û qubet il-Bidore û kaniya Sipîye.*

[868] *kebîr*
[869] *xuya*
[870] [50] *Qewlê axretê* (rr. 199-204)
[871] [2] *Qewlê sibekê ji têt E'devîya* (rr. 573–579)
[872] Pîr Xidir Slêman *Qewlê axretê Êzdiyetî,* Hewlêr 1996
[873] *şêxê E'dîye*

**S. 2** *1 Ĥece û şik tê nîye,*
*2 Ew qubleta mala Adîye,*
*3 P'adşa bi xwe şêx Adîye.*

**S. 3** *1 Zimzime û qubet il-Bidorin*[874]*,*
*2 K'ursîyêt di batin da bi morin,*
*3 Ew ciyê êzdiyê minî sorin.*

**S. 2** *1 Zimzime û qubet il-Bidorin,*
*2 K'ursîyêt di batin da bi morin,*
*3 Mek'anê Êzîdê minî sorin.*

**S. 3** *1 Em biden medhêt erk'anê,*
*2 Silavêt me li wê dîwanê,*
*3 Em ji mîrê mezin biden beyanê.*

**S. 4** *1 Birime Lalişê cem mîre,*
*2 Dana pêşîya min coqetet feqîre,*
*3 Ez k'oĉek bûm kirime xilmetk'arê p'îre.*

**S. 4** *1 Ez birime Lalişa mîre,*
*2 Min li wê dîtin dîwanêt feqîra,*
*3 Ez koĉek bûm, kirme xadimêt p'îra.*

**S. 5** *1 Birime dîwana bi r̂eng,*
*2 Min li wê dîtin şaz û mûxnî, exler û çeng,*
*3 Gelê xam yî, berdoleng yî, înk'arî leng.*

**S. 6** *1 Birime dîwanêt zerbaba,*
*2 Min li wê dîtin cindîyêt mîr yêt zorî zava,*
*3 Xwedan*[875] *bawer dê li P'adşê xwe kin silava.*

**S. 5** *1 Birime dîwana P'adşayê xweyî zerbabe,*
*2 Min cindîyêt mîr li wê dîtin, zor di zave,*
*3 Xwedan îman, xwedan erk'an li P'adşê xwe diken silave.*

**S. 7** *1 Birime wê dîwanê,*
*2 Bi destûrî xwedanê erk'anê,*
*3 Mêr ji P'adşê xwe diden nîşanê.*

**S. 8** *1 Feqîr yî not û neh erk'ane,*
*2 P'erwesta yekem zimane,*
*3 Nasîbûnî ser xitme wane.*

**S. 6** *1 Feqîrî not û neh erk'ane,*
*2 E'wil ibadet*[876] *zimane,*
*3 Xof silametîya*[877] *r̂êyane,*
*4 Nasînî ser xitmê wane.*

**S. 9** *1 Nasîbûnî xwe nas kir,*
*2 Tirsa xwe r̂izgar kir,*
*3 Mêr bi xêr gehişte ber P'adşayî.*

**S. 7** *1 Nasînê xwe nas kir,*
*2 Bi xofê xwe xilas kir,*
*3 Mêr bi xêrê digehine dîwana P'adşayî.*

**S. 10** *1 Hincîyê*[878] *ĥakim bike li zimanî,*
*2 Ew yî boriyê ber Ezdayê dilovanî,*

[874] *qublet li bidorin*
[875] *Xudan*
[876] *ebadet*
[877] binêr: *selamet*
[878] *henciyê*

*3 Weye wekî çil çile û micade hilanî.*

**S. 8** *1 Hincîyê hikm bike li zimanî,*
*2 Weye bihorîye li ber R̂eĥmanî,*
*3 Wek çil çile û micade hilanî.*

**S. 11** *1 Hincîyê ĥakim bike li zimanê xwe ye,*
*2 Bizane, bipîvane, deng bike ye,*
*3 Ew ne yî ĥewce yî çile û micade ye.*

**S. 9** *1 Hincîyê hikm bike li zimanê xwe ye,*
*2 Bi wezne deng bike ye,*
*3 Ne ĥewce yî çile û micade ye.*

**S. 12** *1 Hey zimano, yê xebate,*
*2 Xebera xweş nebate,*
*3 Xebera ne xweş çî mefete.*

**S. 13** *1 Hey zimano, yê sotine,*
*2 Gotinek wa heye nayê gotinê,*
*3 Bo çi derk'eve r̂ûye dinê?*

**S. 10** *1 Ĉav bazîyê serî,*
*2 Dil xunk'are*[879] *di wî berî,*
*3 Ĉav dibîne, dil dixweze, ziman dibêje: «Ji min r̂a werî»,*
*4 «Xwezî zimano, min tu kirbaye ker bi kerî».*

**S. 1** *1 Ĉav baziyê serî,*
*2 Dil xunk'are*[880] *wê li wî berî.*
*3 Ĉav dibîne, dil dixwaze,*
*4 Ziman dibêje: «Min dewrî!»*
*5 «Zimano, xwezî min tu kirbaye ker bi kerî!»*

**S. 14** *1 Ĉav bazê bilinde,*
*2 Dil xunk'are, wê di binde,*
*3 Ĉav dibîne. dil dixwaze, ziman dibêje: «Bîne û min de».*
*4 «Hey zimano, xwezî min tu bir̂îbaye ji bin de».*

**S. 11** *1 Ĉav bazîyê bilinde, dil xunk'are jê û bin de,*
*2 Ĉav dibîne, dil dixweze, ziman dibêje: «Bi min de,*
*3 Xwezî zimano, min tu bibir̂iye ji bin da».*

**S. 2** *1 Ĉav baziyêbû linge*[881]*,*
*2 Dil xunk'are wê li bin de.*
*3 Ĉav dibîne, dil dixwaze,*
*4 Ziman dibê: «Bîne û min de!»*

**S. 12** *1 Zimano, yî bi xebate,*
*2 Peyîva xweş şekir û nebate,*
*3 Ya ne xweş çî mifade*[882]*,*
*4 Dilekî hêsayî bikî r̂ehete.*

**S. 4** *1 «Hey zimano yî xebate.*
*2 Xebera xweş nebate,*
*3 Xebera ne xweş çî mifete,*
*4 Dilê mirovî pê bikî r̂uĥete!»*

**S. 13** *1 Zimano, ji sotinê,*
*2 Xeberek heye ne ya gotinê,*
*3 Bo çî dahirkeye r̂ûyê vê dine?»*

---

[879] *xwendk'ar*
[880] *xwendk'ar*
[881] *lin*
[882] *nifhete*

**S. 3** *1 «Hey zimano, yê sotinê,*
*2 Xeberek wa hey ne ya gotinê,*
*3 Dê bo çî dahirkî r̂uĥ wê dine?»*

**S. 15** *1 Ĉav baziyê serî,*
*2 Dil xwandek'are we li berî,*
*3 Ĉav dibîne, dil dixwaze. ziman dibêje: «Bîne û min di werî».*
*4 «Zimano, xwazî min tu kirbiya ker bi kerî».*

**S. 16** *1 Dilê min dibêjî,*
*2 Ziman xamiya dirêjî,*
*3 P'adşa cerga lê dibirêjî.*

**S. 17** *1 Dilê min dibête,*
*2 Ziman xamiya dirête,*
*3 P'adşa cerga le diperête.*

**S. 18** *1 Ziman dibeje: Dilo, ezî delalim,*
*2 Ĥeta ji ba te ne e'fire, nête ba min,*
*3 Ez perçûmekî ker̂î lalim.*

**S. 14** *1 Ziman dibêjit: «Dilo, tuyî delîlim,*
*2 Ĥeta ji ba te ne xulifit, ne yête ba min,*
*3 Ez p'erçumekî ker̂î lalim».*

**S. 5** *1 Ziman dibêjitê: «Dilo, ez delalim,*
*2 Ĥeta ji ba te ne xulqat û nête balim,*
*3 Ez p'erçumekî ker̂ û lalim».*

**S. 15** *1 Dil dibêje: «Ziman xamîya dirête,*
*2 P'adşa cergê wan dip'erête.*

**S. 16** *1 Sibĥane ji te sibĥane,*
*2 Da min nefse, û aqile, û fame,*
*3 Ji Şerqê birime Şame.*

**S. 6** *1 «Sibĥane, ji te sibĥane,*
*2 Te dane min aqil û fe'me*[883]*,*
*3 Te ez ji Şerqê birime Şame».*

**S. 19** *1 Tu çi Xwedaye kî t'emame,*
*2 Te da min nefs, û aqil, û fame,*
*3 Ez li R̂ojhilat bûm, birime Şame.*

**S. 20** *1 Ji Şamê birime R̂ojhilatê,*
*2 Nefsê bê me'rifetê,*
*3 Tu r̂anabirê ji p'ira Seratê.*

**S. 17** *1 Ji Şamê birime Şerqeye,*
*2 Hey nefsê bê me'rîfetê, bê r̂êye!*
*3 Şevêt giran te de'we li ẍederêye*[884]*.*

**S. 7** *1 Hey nefsêyê bê me'rîfetêye, bê r̂êye*[885]*,*
*2 Şevên giran te dayîm de'wa li ẍederêye*[886]*.*

**S. 21** *1 Şevêt giran gazi li xwedanê xwe dikî zêde,*
*2 Tu r̂ûnê di malêde,*
*3 Nefsê te xeyale*[887] *tu wan r̂izgar biki ji ĉirêt pête.*

**S. 18** *1 Nefsê, te de'wa li ẍederê dikir zêde,*

[883] *fam*
[884] *ẍiderêye*
[885] *bêreye*
[886] *xedrêye*
[887] *xiyal*

*2 Nefsê, tu r̂une di malêde,*
*3 Te xeyale, tu li xwe hêsa bikî ĉirayîyêt p'ête.*

**S. 8** *1 Şevên giran te dayîm de'wa li ẍederêye û zêde,*
*2 Tu r̂ûnê di malêde,*
*3 Te xeyale li me hisakî ĉirayî ji p'ête!*

**S. 22** *1 Nefsê te xeyale li wan hisay bikî ĉirayêt gur̂î,*
*2 Wekî firindê dewletê firî,*
*3 Nefsê tu sebeb yarû birêt axrete nasînî birî.*

**S. 19** *1 Nefsê, te xeyale, tu li xwe hêsakî ĉirayîyêt gur̂î,*
*2 Û wekî teyrê dewletê difrî,*
*3 Nefsê, tu sebeb, yarû birayêt axretê nasînî birî.*

**S. 9** *1 Te xeyale li me hisakî ĉirên gur̂î,*
*2 Gava teyrê dewletê fir̂î,*
*3 Yarû birên axretê nasbûnî ji me bir̂î.*

**S. 23** *1 Yarû birêt axretê ji wan birî nasîne*
*2 Wekî qadî dibû emîne,*
*3 Nefsê te xeyale tu wan xilas bikey ji r̂êya yekî emîne.*

**S. 20** *1 Yarû birayêt axretê birî nasîne,*
*2 Wextê qadî dibû emîne,*
*3 Nefsê, te xeyale[888], tu xwe şermîn bikî ji êkî K'erîme!*

**S. 24** *1 Nefsê çendî tu bikî gûmanê,*
*2 Dilê te vala nabe ne ji t'ozê, ne ji ẍederê, ne ji dûmanê,*
*3 Nefsê te xeyale tu wan xilas bikey ji îmanê.*

**S. 22** *1 Nefsê, tu çendî dikî gumanê,*
*2 Dilê te xalî nabê, ji agirî, ji duxanê,*
*3 Nefsê, te xeyale, tu xwe xilas bikî ji îmanê.*

**S. 10** *1 Nefsê, çendî tu dikî gumanê,*
*2 Tu xalî nabî ji ẍederê[889] û duxanê,*
*3 Te xeyale xwedanê xwe xilaskî ji îmanê!*

**S. 25** *1 Nefse, tu çendî dikî xebatê,*
*2 Wekî qadî r̂ûdnine ser berê eresatê,*
*3 Nefsê te xeyale tu wan bihêlî li kiş û mate.*

**S. 21** *1 Nefsê, çendî dikî xebetê,*
*2 Wekî melik şêx Sin dibe qadîyê p'ira Selatê,*
*3 Te xeyale, tu xwe bihêlî, li kişê, li mate.*

**S. 11** *1 Nefsê, tu çend dikî xebatê,*
*2 Wekî qazî disekinit li pê p'ira Selatê,*
*3 Tu wa li hîvîyê me bihêlî li k'î omate[890]?»*

**S. 26** *1 Nefsê te mal li xwe xerab kirye hey k'ifirê,*
*2 Te xwe xilas kirye ji wê gawirê,*
*3 Tu ne ji r̂astiya Xwedê mestirê!*

**S. 23** *1 Nefsê, te mal li xwe xirab kir, hey k'ifirê.*
*2 Te xwe xilas kirîye ji nisrê.*
*3 Ji leyîlun, ji şêx ebrus, ji leyîl il-Qedirê.*

**S. 27** *1 Nefsê yare xweşîya[891],*
*2 Tu natirsî ne ji tirşiya û ne ji te'lîya,*
*3 Nefsê her şerm bike ji r̂ûr̂eşîya.*

**S. 24** *1 Nefsê, yara xweşîya,*

---

888 binêr: *xeyal*
889 *xedrê*
890 *ûmat*
891 *xoşî*

*2 Tu natirsî ji r̂ur̂eşîya,*
*3 Xwe naêşînî ji te'lîyan û tengîya!»*

**S. 28** *1 Nefsê gote: «Aqilo, gotinêt te di k'urin*
*2 Qede û qutikêt vê gerdunê di p'ir̂in,*
*3 Ev gerdûn tenge lê bidin û bibir̂in».*

**S. 25** *1 Nefsê go: «Zimano, ne wete, xeberêt te di k'ûrin,*
*2 Û qeda û qotikêt dinyayê di p'ir̂in,*
*3 Dinya dunge, lê biden û bibrin!»*

**S. 12** *1 Nefs dibêje: «Aqilo, xeberê te dik'ûrin,*
*2 Qeda û qutikêt dinê di p'ir̂in,*
*3 Dinya dûnge lê bidin û bibir̂in!»*

**S. 29** *1 Aqil dibêje: «Nefse, xwe p'ir̂ bernede,*
*2 Hincîyê pariyekî bi xwe bernede,*
*3 Dê li axretê li pêşiye bi te qede».*

**S. 26** *1 Go: «Nefsê ne wete!*
*2 Tu hincîyê bixot luqmeke bê r̂eda,*
*3 Dê li axretê li pêşîyê bi te qeda».*

**S. 13** *1 «Nefsê wekî te bor bêt'er bû,*
*2 Borê te li ĥemû mêrga wer bû».*
*3 Ew şolê nefsê bû, r̂engê xwedanî ji ber zer bû.*

**S. 14** *1 «Nefsê wekî te bor ne dibeste,*
*2 Li xav û hevsar çûn ji deste,*
*3 Borê te li ĥemû mêrga dikir qeste!»*
*4 Ew şolê nefsê bû, r̂engê xwedanî ji ber dişkeste.*

**S. 16** *1 Wekî ĥeya ji ĥisin der dibî,*
*2 Wekî r̂ezekî bê ber dibî!*
*3 T'ijî gawir[892] dibî,*
*4 Xwedan li axretê bê mefer dibî!*

**S. 17** *1 Wekî ĥeya ji ĥisin dûr dibî,*
*2 Wekî r̂ezekî bê şûr dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî!*
*4 Bi kêr mêra tê: ĥisin, e'deb û ĥeya!*

**S. 18** *1 Ji wan nebin mişemir mebdeye!*
*2 R̂ê bi r̂astî di ber xweya!*
*3 Bi kêr mêra têtin: ĥisin, e'deb û ĥeya!*

**S. 30** *1 Nefsa mezin deryaye, ne bîre,*
*2 Jor li bin destê mêrê zana, jêr li bin destê mêrê leqire,*
*3 Yê li nefsa xwe kiri êxsire.*

**S. 27** *1 Nefse k'ibîre,*
*2 Beĥre û ne bîre,*
*3 Ser destê amê[893], li bin destê mêrê feqîre.*

**S. 15** *1 Feqîra yeke çêkir,*
*2 Xwe ji xweşî û levzeta dine kir,*
*3 Li dinyayê berbi axretê kir.*

**S. 31** *1 Feqîra êke çêkir,*
*2 Xwe ji xweşî[894] û başiya dinê kir,*

---

[892] *gay û kûr*
[893] *em*
[894] *xuşî*

*3 Li vê dinyayê berbi axretê kir.*

**S. 32** *1 Feqîrî not û neh erk'ane,*
*2 Ji not û neha bi xwe sê ya bi zane,*
*3 Babekî dê li dîwana mîr hebe cî û mekane.*

**S. 28** *1 Feqîrî not û neh erk'anî miqerimin,*
*2 Ji not û neh sê ya ji xwe r̂a bi e'limin,*
*3 Da r̂oj babik hûn li ber P'adşayê xwe bi kelîmin.*

**S. 33** *1 Erk'anek jê nasîne,*
*2 P'adşê xweş divîne,*
*3 P'adşê li dila girtibû bawerîne.*

**S. 31** *1 Erk'anek jê nasîne,*
*2 Hincî dilê têda dibû qewîne,*
*3 Cebêr qewî, ew xweş dibîne.*

**S. 34** *1 Erk'anek jê r̂astîye,*
*2 P'adşê ji xwe bîr̂astîye*[895]*,*
*3 Pêş xwe veguhastîye.*

**S. 29** *1 Erk'anek jê r̂astî,*
*2 P'adşayî ji nik xwe bîr̂astî,*
*3 Pêşan destê xwe guhastin.*

**S. 35** *1 Erk'anek je ĥeya ye,*
*2 P'adşayî ji nik xwe kir p'eyda ye,*
*3 Ev civate bi navê wîye ava ye.*

**S. 30** *1 Erk'anek jê ĥeya ye,*
*2 P'adşayî ji nik xwe kir p'eyda ye,*
*3 Gelî mêra, bo we îna ye.*

**S. 36** *1 Ya derwîş, xerqe sit'are,*
*2 Hincîyê bi ol û erk'anê, xerqê silt'an şêx Adî bike cade,*
*3 Xerqe, ew xerqeye, li axretê bo mêra bibe şade*[896]*.*

**S. 39** *1 Derwêş, xerqe miraze,*
*2 Ol û erk'anêt xerqeyî bike cade,*
*3 Xerqe, ew xerqeye r̂oja axretê li ser kul û e'melêt mêra dibe şade.*

**S. 37** *1 Ya derwîş, xerqe sit'ara i'yûbe,*
*2 Hincîyê bi ol û erk'anê, xerqê silt'an şêx Adî bînin zû be,*
*3 Xerqe, ew xerqeye, li axretê bo mêra dibe tixûbe.*

**S. 40** *1 Derwêş, xerqe sit'ar îl îube,*
*2 Ol û erk'anê xerqeyî zû be*
*3 Xerqe, ew xerqeye, r̂oja axretê ji mêra r̂a danîbû t'ixûbe.*

**S. 38** *1 Ya derwîs, çi li hoçekê xerqê şêx Adî yî nivîsiye,*
*2 Tiştê te danenayî, hilîne bi deste,*
*3 Xerqe, ew xerqeya, Balulî dîwane, Bazîdî Bastame mirazê xwe ji xerqê silt'an şêx Adî dixweste.*

**S. 41** *1 Derwêş, wa li huçkê xerqeyî nivîsî,*
*2 Ya te dananî bide ser meyîne qeste,*
*3 Ol û erk'anêt xerqeyî vewest,*
*4 Xerqe, ew xerqeye, Behlulî li dîwana Bayzîdî Bastam*
*pêş miraza xwe ji silt'an şêx Adî dixwest.*

**S. 39** *1 Li e'rda Ezraîlim, li e'zmana meleke xasim,*
*2 Di dila da melike waswasim,*

---
[895] *veguhast*
[896] binêr: *şehde*

*3 Xweşya li vê dinyayê min dîtî: k'eşkul, û t'izbî, û zembîl, û wek'az, û k'asin,*
*4 Bele, ẍafil di korine, r̂ast r̂êya Xwedê û şêx Adî ser xwe r̂a nenasin.*

**S. 42** *1 Li e'rda Izrayîle,*
*2 Li e'zmana melikê xas,*
*3 Li dila melikê waswas.*

**S. 40** *1 Kesê sur̂a*[897] *r̂astiyê vê bî.*
*2 Kul û k'iryarê wî çê bî.*
*3 Babek dê dîwana mîr û Xwedê bî.*

**S. 33** *1 Hincîyê sur̂a Ĥeqîyê vê ye,*
*2 Û kul û e'melê wî çê ye,*
*3 R̂oja babek li dîwana Xwedê*[898] *ye.*

**S. 41** *1 Kesê sur̂a r̂astiyê agahdar bî,*
*2 Ji xewa ẍefletê*[899] *şiyar bî,*
*3 Xemila vê dinyayê li ber ĉava sar bî,*
*4 Babekî dê li dîwana mîr û hêzdar bî.*

**S. 34** *1 Hincîyê sur̂a Ĥeqîyê xeberdar dibe,*
*2 Xewa ẍefletê*[900] *pê siwar dibe,*
*3 Zeyîneta vê dinyayê li ber ĉava Te'al*[901] *dibe.*

**S. 32** *1 Hincî xwanê li r̂êye,*
*2 Kul û e'melê wî çêye,*
*3 Ew bêşik ĥebîbê Xwedêye*

**S. 42** *1 Wekî te bor bet'er bû*
*2 Liẍab û hevsar li serî ker bi ker bû,*
*3 Ew şolê nefsê bû, r̂engê xwedanî ji ber zer bû.*

**S. 43** *1 Wekî te bor ne dibeste,*
*2 Liẍab û hevsar çûn ji deste,*
*3 Borî li ĥemû mêrga dikir qeste,*
*4 Ew şolê nefsê bû, r̂engê xwedanî ji ber şkeste.*

**S. 44** *1 Wekî şerm ji çelengiyê der dibî,*
*2 Weki r̂ezeki bê ber dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî,*
*4 Xwedan*[902] *li axretê vê r̂a bê mefer dibî.*

**S. 45** *1 Şerm ji çelengiyê dur dibî,*
*2 Weki r̂ezeki bê şur dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî.*

**S. 46** *1 Sur̂a r̂astiyê ĉirê geşe,*
*2 Leng û berdolenge ne ye xweşe,*
*3 Qence mêrê derwêş r̂ûnêt kuncê xanya, p'erweste bike ciyê tarî û r̂ewşe.*

**S. 35** *1 Sur̂a Ĥeqîye ĉirayîyê geşe,*
*2 Bi xam û înk'ara ne ye xweşe,*
*3 Cayîze mîrê derwêş, li kuncêt xanîya, li tarîyêt r̂eşe.*

**S. 47** *1 Qence derwêş azad bin bikir,*
*2 R̂usipî bin, bi navû dik'ir,*
*3 Yekem mêrê xerqê sparte şêxu Bek'ir.*

**S. 36** *1 Qence derwêş diĥur bin, di buk'ir,*

---

[897] *sur*
[898] *Xwidê*
[899] *xeflet*
[900] *xilfet*
[901] *Tee'l*
[902] *xudan*

*2 Di r̂ûsipî bin, bi nav dik'ir,*
*3 Derwêş, e'wil xerqe spartine şêxû Bek'ir.*

**S. 48** *1 Ya derwêş xerqe sit'are,*
*2 Hincîyê vexwarbû k'asa zelale,*
*3 Derwêşînî bo wîye ĥelale.*

**S. 37** *1 Derwêş, xerqe sit'are,*
*2 Û hincîyê vexwarî ji k'asa tale,*
*3 Derwêşî bo wîye ĥelale.*

**S. 49** *1 Hey P'adşê mino yê dinê û axretê,*
*2 Bi destê silt'an Êzî heye qelema qudretê,*
*3 Sipas ji Xweda em havêtine ser piska sinetê*[903].

**S. 44** *1 Silt'an Êzî P'adşayê minî dinê û axretê,*
*2 Destê silt'an Êzî gustîla qudretê,*
*3 Serê silt'an Êzî t'acê dewletê,*
*4 Il-ĥemdillah û şikir, em anîne ser pişka sinetê.*

**S. 43** *1 Min sê tiştêt xweş dîtin,*
*2 K'eşkûl*[904]*, û zembîl, û wek'az,*
*3 Ẍafil di korin, silt'an Êzî ne nas.*

**S. 38** *1 Birime dîwana şêx Şemsê T'et'ere,*
*2 K'ember best, xerqe r̂eş, hile zere,*
*3 Tu li min û hevalê min, bikî xêr, her û here.*

**S. 50** *1 Melek Fexredin ji P'adşê xwe diket pirsyare,*
*2 Belê, xweşewîstê min, navê teyî şîrin*[905]*, extîyare,*
*3 T'ercal p'irtuk anî xware,*
*4 Te qet sur̂eka r̂astiyê ji me r̂a nekir dîyare.*

**S. 45** *1 Melik Faxredîn pêş P'adşayê xwe vediweste, jê dike pirsyare.*
*2 Go: «E'zîzê min, navê te yî şîrinî şerîf*[906] *exrîyare,*
*3 Te çar k'itêb nazil kirne xware,*
*4 Qet sur̂eke ĥeqîqetê bo me ne kire dehare?»*

**S. 51** *1 P'adşa dibêje: «Fexro, ji malet mîre,*
*2 Te r̂êberî kir li xelqe hozanî, zanayî, jîre,*
*3 Te ya sax li k'êder dite?»*
*4 Gote: «Xweşewîstê min qewl û r̂astiya li dîwanit feqîre».*

**S. 46** *1 P'adşa dibêjitê: «Fexrê mino ji mala mîra,*
*2 Te îmamî kir li ber xelqê e'rifî, zana û jîre,*
*3 Te ya r̂ast li k'ûr dî?»*
*4 Go: «Belê e'zîzê min, qewl û ĥeqîqete li dîwanêt feqîra.*

**S. 52** *1 P'adşe dibêje: «Fexre mino yî p'ir̂ wesfete*[907]*,*
*2 Te pêşengî kir li ĥeftê û du milete,*
*3 Te ya sax li k'êder dite?».*
*4 Gote: «Xweşewîstê min li dîwanit feqîra qewl û ĥeqîqete.*

**S. 47** *1 Fexrê mino yî p'ir̂ wesfete*[908]*,*
*2 Te îmamî kir li ber ĥeftê û du milete,*
*3 Hîjdeh*[909] *ĥezar xulyaqete,*
*4 Te ya r̂ast li k'ûr dî?»*

---

[903] *sunet*
[904] *keşkul*
[905] *şirîn*
[906] *şirîf*
[907] *osfet*
[908] *ûsfete*
[909] *hijde*

*5 Go: «Belê e'zîzê min, li dîwanêt feqîra qewl û ĥeqîqete».*

**S. 48** *1 Fexrê mino ji malêt mîre ilmdaro, xwedanê[910] ilmê be'îde,*
*2 Te ya ȓast li k'ûr dî?»*
*3 Go: «Qewl û ĥeqîqete li dîwanêt feqîra».*

**S. 53** *1 Fexrê mino yî ȓêzane,*
*2 Ez dêçime e'zmane,*
*3 Dê înim qewl û xerqane,*
*4 Da sinetxane pê bit bawerî û îmane».*
**S. 49** *1 Fexrê minî jîrî zana,*
*2 Te îmamî kir li ber xelqê[911] e'rifî[912] zana,*
*3 T'emametîya vî qewlî li melk il-mewit, û Dawidî bin Dermane, û Gavanê Zerzane!*

*Em di kêmin, şêx Adî t'emame!*
*Ȓeĥme dayî û babêt guhdara!*

## 38. QEWLÊ MIŞT'AQÊ[913] SÊ BORIM[914]

**S. 1** *1 Mişt'aqê sê borim,*
*2 Xewasê beĥrêt k'ûrim,*
*3 Ji Adîya ezî bi mişûrim.*

**S. 2** *1 Şkestîme, besta min ji malêt mîre,*
*2 Hey Hesedo, xadimê p'îre,*
*3 Firwara min bi xelqê e'rifê, zanayê, jîre.*

**S. 3** *1 Xelqê e'rifê zana werin,*
*2 Li beyana bifikirin,*
*3 Bo xwe nesîĥeta ji vî qewlî hilgirin.*

**S. 4** *1 Bo xwe hilînin nesîĥetê,*
*2 Wa derk'eftiye mişûran û xetê,*
*3 Mêr yî xilase bi xilmetê.*

**S. 5** *1 Hûn li xilmetê ne di kislan bin,*
*2 Li xêr û xêrata kirî ne di p'oşman bin,*
*3 Da li axretê ne di sefîl û sergeȓdan bin.*

**S. 6** *1 Xêrekê bikin ji Xwedê ȓa,*
*2 Kirinekê bikin bi ȓê ȓa,*
*3 Da ne yî gîro bî bi nefsê ȓa.*

**S. 7** *1 Bila hûn ne gîroyît nefsê bin,*
*2 Ne pîverêt ȓê bin,*
*3 Da li axretê negirtiyêt ĥebsê bin.*

**S. 8** *1 Qence hûn di p'iȓ wesfet bin,*
*2 Ne bi mûkir, ne bi ĥîlet bin,*
*3 Da li axretê li ber P'adşê xwe ne di bê e'zet[915] bin.*

**S. 9** *1 Ne bi ĥîlet bin, ne bi mûkir,*

---

910 *xwidan*
911 *xelk*
912 *êrîf*
913 binêr: *muşt'aq*
914 http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=42
915 *îzet*

*2 Dîyar*[916] *bin bi buk'ir,*
*3 Di r̂ûspî bin bi nav dik'ir.*

**S. 10** *1 Di r̂ûspî bin Ya Sinî*[917]*,*
*2 Borê calix metanî,*
*3 Ji hindir̂û p'aqişke denî.*

**S. 11** *1 Borê calix meĥebînin,*
*2 Hûn çendê di meyzînin,*
*3 T'elpêt giran şûnda nemînin.*

**S. 12** *1 Borêt calix ne di çêne,*
*2 Li xafêt sebirê ne dilêne,*
*3 Ji xirabîyê çare pêne.*

**S. 13** *1 Borêt calix meseyrin,*
*2 Hûn çendî tên di fikirin,*
*3 Ew zû xwedanê xwe li meydanê diêxînin.*

**S. 14** *1 Bila borê teyî k'ehêl bê,*
*2 Suxmetekî bi t'îmar bê,*
*3 Da li axretê xebereke fehş nekî, betal bê.*

**S. 15** *1 Bila xebera te ne ye fehş bî,*
*2 Li dîwanêt xasa tu ne li paş bî,*
*3 Da li axretê li ber P'adşê xwe ne yî bê maş bî,*

**S. 16** *1 Bila borê teyî r̂êber bê,*
*2 Bila li xofê sebirê li ser bê,*
*3 Tu goykerî goy li ber bê.*

**S. 17** *1 Heke tu goykerî, her̂e goyê li meydanê li k'aşoyî,*
*2 Heke tu maşxwerê mîrê xweyî,*
*3 K'eremke her̂e û dêyî ew dibî.*

**S. 18** *1 K'eremke her̂e meydanê,*
*2 Bila borê teyî xûrt be li vê lêkdanê,*
*3 Heke tu maşxwerê mîrê xweyî, k'eremke her̂e dîwanê.*

**S. 19** *1 Sebir bo mêra erk'aneka çê ye,*
*2 Tirs silametiya r̂ê ye,*
*3 Nasbûnî ĉirayê neqilê ye.*

**S. 20** *1 Sebrê ji xwe r̂a r̂êzanke,*
*2 R̂astiya xwe tê beyanke,*
*3 R̂astiyê li beĥrêt giran melevanke.*

**S. 21** *1 R̂astî û me'rîfete,*
*2 Hincî mîrê saẍ yî bi t'erbiyete,*
*3 Ew li axretê sur̂ boşekî bi t'aqete.*

**S. 22** *1 Me yek dive yî sur̂ poş bî,*
*2 Net'ebayî xelqê poş bî,*
*3 Ne erzan dur̂ firoş bî.*

**S. 23** *1 Erzan mefroşe dur̂e,*
*2 Mebe bazara cihêlan û kur̂e,*

[916] *dihur*
[917] *sûnî*

*3 Ew zû bang didin li suȓe.*

**S. 24** *1 Nabe li suȓa bang didêrî,*
*2 Hincî ȓêya Êzî bibîne û bike înk'êrî,*
*3 Ew maşê zebêniya bi destê kesekî ve naspêrî.*

**S. 25** *1 Me yek dive yî saẍ bê,*
*2 Yî bê sûc, yî bê gûneh, yî bê binas bê,*
*3 Di xofê da sinî xilas bê.*

**S. 26** *1 Tu ȓûnê di xofê de,*
*2 Sê bor bane t'ine vilê de,*
*3 Ȓast p'ajo û heȓe pê de.*

**S. 27** *1 Me yek dive yî bi ser bê,*
*2 Li ibadetê[918] yî fer bê,*
*3 Ne p'iȓ gotinê dû xeber bê.*

**S. 28** *1 Ji wan mebin dû xebere,*
*2 E'cêb mebin li sere,*
*3 Da hûn li axretê nebin dizêt xebere.*

**S. 29** *1 Bila hûn li xebera ne di casûs bin,*
*2 Li dîwanê ne wek k'abûs bin,*
*3 Da sibey li axretê li ber P'adşê xwe ne di bênamûs bin.*

**S. 30** *1 Megeȓên li pişt dîwara,*
*2 Gûhê xwe medine peyîvêt cînara,*
*3 Da li axretê şûna wan peyva li gûhê we nedin bizmara.*

**S. 31** *1 Bêjme we ya mişûran û xetan,*
*2 Et'les nabine k'itan,*
*3 Kesî nedîtîye baz bigrin betan.*

**S. 32** *1 Nefsa k'ubar[919] mare belê,*
*2 Hincîyê kevanê[920] qûdretê bi serde p'ale,*
*3 Da we bibine wan cîya, her holeke wan bi hezalê.*

**S. 33** *1 Da we bibine wan dergeha wan cîya,*
*2 Li wan olîya,*
*3 Ew ciyê xasan û welîya.*

**S. 34** *1 Da we bibine wan serîra,*
*2 Li wan dergehêt mîra,*
*3 Sed xwezme li wê ȓuĥê ne êşandî hosta, merebî, şêx û p'îra,*
*4 Da li axretê bibine cînar bi xasan ȓa.*

**S. 35** *1 Ji wan nebin beyan li bet'ir,*
*2 Nekin şolêt bê aqil,*
*3 Bo mêr çake e'deb û aqil.*

**S. 36** *1 Ji wan nebin mişemirêt mebdeya,*
*2 Ȓê bi ȓastîyê dibe xweya[921],*
*3 Bo jinê çake ĥisn[922] û ĥeya.*

---

[918] *ebadet*
[919] *k'ibar*
[920] *kivan*
[921] *xuya*
[922] *hisn*

**S. 37** *1 Ez ne bînim ĥisnê bê ĥeya,*
*2 Gava qehrê ĥemû çû bê fêdeye,*
*3 ………………………..*

**S. 38** *1 Ĥeya ji ĥisnê der dibê,*
*2 Wekî ȓezekî bê ber dibê,*
*3 Xwedan li axretê bê mefer dibê.*

**S. 39** *1 Aqil hîdayete,*
*2 Hincî mêrê bê t'erbiyete,*
*3 Ew ȓuĥe li ba P'adşayê xwe bê e'zete.*

**S. 40** *1 Min dît hê wişmê,*
*2 Ez çûm ne gehiştmê,*
*3 Yeqîn*[923] *xilmeta min ye kêmbû, lew ne gehiştmê.*

**S. 41** *1 Heke înk'ara mêrê k'oĉeke,*
*2 Gav yî bê kaze, û gav yî bê çeke,*
*3 Melik Fexredîn xilmeta wî qebûl neke.*

**S. 42** *1 Hincî ciwanî li ȓêye,*
*2 Ĥemû k'iȓyarêt wî çêye,*
*3 Ew dayîm ĥebîbê Xwedêye.*

**S. 43** *1 Li ba e'rifa we dibêne,*
*2 Hincî dilê ȓeĥma Xwedê t'êne,*
*3 Ew ne ji xelqê bihuştêne.*

**S. 44** *1 Li ba e'rifa we dîyare,*
*2 Hincî dilê bi xezebe û bi jehre,*
*3 Ewî mala xwe avakirye bo dûpişkan û mare.*

**S. 45** *1 Ĥezet*[924] *bijî, t'êr bijî,*
*2 Hincî dilê ji ȓeĥma Xwedê dibû t'ijî,*
*3 Ewî mala xwe avakirye bi destê xwe, bi xwe nijî.*

**S. 46** *1 Bêjme we ya filan,*
*2 Hûnin ȓezvanêt sêvan û gulan,*
*3 Bi xof û tirsin li ĥemû deran.*

**S. 47** *1 Li ĥemû deran bi xof û tirsîn,*
*2 Li dîwanêt xasa pirsiyaran pirsîn,*
*3 Da li axretê ber P'adşê xwe hûn bi hasilîn.*

**S. 48** *1 Derwêşê minî qelendere,*
*2 Geȓyabû der bi dere,*
*3 E'ynata li dil qeda wê li sere.*

*Em di kêmin Xwedê yî t'emam!*

## 39. QEWLÊ [M]AŞÊ MUĤBETÊ[925; 926]

[923] *êqîn*
[924] *Hesed*
[925] [2] (rr. 350–354)
[926] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ PÎR ȒEŞÊ ĤEYÎRAN (*rr. 86-87) T'ilbîs 2001

**S. 1** *1 Bidey ĥezar distî şîlanê,*
*2 Ĥezar ĥidodî[927] e'sil ji meydanê,*
*3 Ĥemûyê bik'êşe ber derê dîwanê,*
*4 Fayde naket bo mêrî xêr ser li îmanê.*

**S. 1** *1 Bidin ĥezar dest şîlane,*
*2 Ĥezar kiĥêlê e'sil beyîane,*
*3 Binêrin mirî çi nîşane.*

**S. 2** *1 Bidey ĥezar mîhê zerî,*
*2 Ĥezar ĥidodî e'sil, e'silî şîrî,*
*3 Ĥemûyê bik'êşe ber derî,*
*4 Fayde naket bo mêrî xêr îman li serî.*

**S. 2** *1 Bidin ĥezar mûyê zeriye,*
*2 Ĥezar kiĥêlê e'sil beyiye*
*3 Binêrin mirî çi ȓengiye.*

**S. 3** *1 Bidey ĥezar mîhêt sorî geȓden dirêj[928],*
*2 Ĥezar ĥidodî e'sil ji mêj[929],*
*3 Hem wê bik'êşe ber derê niqêş,*
*4 Mêr bê ser naçite pêş.*

**S. 4** *1 Bidey çend zêȓa li male,*
*2 Qumaş sûka destê delale,*
*3 Bo Ĥeq û Te'ala.*

**S. 3** *1 Bidin zêȓa û mala,*
*2 Qumaşê sûka destê delala,*
*3 Mêra ser seriya de'v û qale.*

**S. 5** *1 Muĥb mala şe'rîe'te,*
*2 Minet[930] bi Ĥeqî wê diherte,*
*3 Înşallaĥ P'adşayê[931] min dê sinetê e'fûkete.*

**S. 4** *1 Mala şe'rîa'tê,*
*2 Têda heye ȓyia heqîqetê,*
*3 P'adşayê min ĥemûşkî safî dike û tê.*

**S. 6** *1 Aşiqo, ber û pê me,*
*2 Dilê wan ji bo tê cerêne,*
*3 Sing û seriya sera di xewêne.*

**S. 7** *1 Hûn xanîya bînin,*
*2 Sing û ser danînin,*
*3 Qebûliya ew jî tê nînin.*

**S. 8** *1 Derwêş bi selaĥîyetê[932],*
*2 Hincîyê bi ȓastî û sadiqî ber[933] qap'îya şêx Adî û melik şêx Sin biket xilmetê,*
*3 P'adşa dê wî xun te hidretê.*

**S. 5** *1 Dewrêşê li level têne,*
*2 Ewe deste, p'êne,*
*3 Ewe qasidê mirinêne.*

**S. 6** *1 Hêlene, li wê da têne,*

[927] *hidûdî*
[928] *dirêş*
[929] *mêş*
[930] *munet*
[931] *pedşa*
[932] *silahet*
[933] *der*

*2 Têne ji mezelê,*
*3 Dik'elin t'evî wê k'elê,*
*4 T'asê vedixwin birk'a hevdel, k'evdelê.*

**S. 9** *1 Derwêş di çêne,*
*2 Bê serin, bê destin, bê p'êne,*
*3 Cindarêt mewlêne,*
*4 Ew li hêrene, ew ji wêder têne.*

**S. 10** *1 Bêjme we gelî sinîya,*
*2 Dest bernedin ji malêt Adîya,*
*3 Hêwîya wan zar hîwîya.*

**S. 7** *1 Dibêjime we gelî mirîdiya,*
*2 Destê xa ber nadin mala Adiya,*
*3 Ew hîviya me bê, bê hîviya.*

**S. 11** *1 Desta ji malêt Adiya berneden,*
*2 Melik şêx Sin pêşîmamê*[934] *xwe ken,*
*3 E'yn il-Beyza qublet*[935] *ken.*

**S. 12** *1 Qubleta me E'yn il-Beyza[da],*
*2 Cebir hatin medih jê da,*
*3 Mek'anê P'adşayê min, sitîya êzdîyê têda.*

**S. 13** *1 Hey koro, yî ĉav sipîye,*
*2 Te hay ji me'nîya xerqê şêx Adî nîye,*
*3 Tu çime dêbêjî çengek zergûz û lepek hirîye?*

**S. 14** *1 Hey koro, ji kore,*
*2 Dereca xerqê silt'an şêx Adî, wa li dereceke zore,*
*3 Ew libasê silt'an Êzîdê minî Sore.*

**S. 15** *1 Heke te mominek dît — ibadetke*[936]*,*
*2 Heke te darek dît — zîyaretke,*
*3 Heke te e'rdek dît — işaretke.*

**S. 16** *1 Sadiqa min xweş sikane,*
*2 R̂êya min xweş erk'ane,*
*3 Me'rîfeta min xweş nîşane.*

**S. 17** *1 Aşiqê t'erîqetim,*
*2 R̂êberê ĥeqîqetim,*
*3 Lew ez dibêjim bi dewletim.*

**S. 18** *1 Sed xweziya mine bi wî mêrî,*
*2 P'adşa bixwînite*[937] *ber dêrî,*
*3 Hevr̂anekî xwe li aşê muĥbetê bihêrî.*

**S. 8** *1 Hev xazla min wî mêrî,*
*2 P'adşa lê veke derî,*
*3 De'nê xa aşê mobetê bihêrî.*

**S. 19** *1 Ew bû aşê muĥbetê,*
*2 Ava wî ji ĥeqîqetê,*
*3 Berê wî ji me'rîfetê.*

[934] *pêşmam*
[935] binêr: *qible*
[936] *ebadet*
[937] *bixûnit*

**S. 9** *1 Aşê mobetê,*
*2 Berê wî ji ĥidretê,*
*3 De'nê w ji qudretê.*

**S. 20** *1 Ew bû aşê hosta Cebare,*
*2 Wê têda xelqê ehlî qiryare,*
*3 Gehê nadete xelqê xware.*

**S. 21** *1 Manîya*[938] *wî aşî me'nîyeke mezine,*
*2 Qeȓaşê wî yî momine,*
*3 Çî dawî*[939] *ez neçim her geha mine.*
**S. 10** *1 Me'niya vî aşî se't mezine,*
*2 P'adşayê berî momine,*
*3 K'î ȓojê herim, dore mine.*

**S. 22** *1 Ew bû şîret li Me'awî kirî,*
*2 Pisekî te debit dahirî,*
*3 Nîveka vê dine pêbit k'ifirî.*

**S. 23** *1 Her bi ehde, herîye bi qirare*[940]*,*
*2 Me'awî sundek ji nebîy ȓa dixware,*
*3 Got: «Ez nazewcim yek care!»*

**S. 24** *1 Ji bana hatibû ȓedaye,*
*2 Eqrebî bi me avî dadaye,*
*3 Go: «Ya mîro, çî derdekî bê wefaye!»*

**S. 25** *1 Me'awî çite nav malêt ĥekîma,*
*2 Dermanekî bo vî derdî bîna,*
*3 Dibêjitê: «Heȓe malekê bo xwe*[941] *bîne».*

**S. 26** *1 Mala tînim dê ve bî,*
*2 Ji pîrî, ji cîȓane bî,*
*3 Da qut û cehwer vê ȓa nebî.*

**S. 27** *1 Mala tînim xuşka E'mere,*
*2 Ji pîrî we dihijên dest û p'ê û sere,*
*3 Vê ȓa nemabû, ne qut, ne cehwere.*

**S. 28** *1 Nav qadîya û ekabira,*
*2 Ewan ȓayek li nav xwe dikire,*
*3 Xuşika E'mer li Me'awî mehr dikire.*

**S. 29** *1 Şamîya got: «Il-ĥemdillah*[942] *û şikir*[943]*»,*
*2 Pîrek bû not sal e'mir kir,*
*3 Sibê ȓabûn qîzka çardeh sale buk'ir.*

**S. 30** *1 Şamîya got: «Selawat li hikmê R̂ebî,*
*2 Kesekî ev e'cêbî nedî,*
*3 (A'ciz) bit û (cabet sebî)».*

**S. 31** *1 Feqîra got: «(Hada muĥbî),*
*2 (Hêza) silt'an Êzîd bi xwe bî,*

[938] binêr: *me'nî*
[939] *davî*
[940] *qirîyare*
[941] *xo*
[942] *hemdulla*
[943] *şukir*

*3 (Hu dînî, hu mesebî)!»*

**S. 32** *1 Ya silt'an Êzî, tu li ber me veke yî derîyêt bûab,*
*2 Min zor quba dîtin mîrav,*
*3 Gelî sinîya, desta berden ji şolêt xirab.*

**S. 33** *1 Desta ji şolêt xirab berden,*
*2 Em ne hatîne îmana xwe li ser deyn,*
*3 Em ne tîne bi me'rîfetê xeber deyn.*

**S. 34** *1 Li ĥerfê, hey e'sil, e'sil ji t'erefî,*
*2 Beĥrêt k'ûrin, kesî nakete t'erefî,*

**S. 35** *1 T'erefê wan beĥrane,*
*2 Sinî ji nehtî digrin qehrane,*
*3 Da webene ciyê mêrdarane.*

**S. 36** *1 Heke divêt tûyî mêrdar bî,*
*2 Borê bi gijnîj*[944] *siwar bî,*
*3 Da li axretê bi xwedan bî.*

**S. 37** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê Ĥeyrane,*
*2 Hincîyê bi ȓastî û bestî, dest dihavête damana yarû birane,*
*3 Beĥrêt giran merk'eba wan her ye melevane.*

**S. 38** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê cîde,*
*2 Dibêjime we gelî mirîde,*
*3 Şerfedîn atqata me û silt'an Êzîde.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî ťemamin!*

## 40. QEWLÊ ȒIMÊ ȒASTIYÊ[945]

**S. 1** *1 Ȓima ȓastiyê bigêre û pêş xwe ve bavêj,*
*2 Pişt xwe ve menêre û here pêş,*
*3 Heke tuyî maşxarî*[946]*, ȓast bajo û ȓast bêj.*

**S. 2** *1 Ȓima ȓastiyê p'alke,*
*2 Pêş xwe ve bavêj, ber xwe ve kalke,*
*3 Heke tuyî maşxarî, maşê mîrê xwe li xwe ĥelalke.*

**S. 3** *1 Wekî sulî di beste,*
*2 Ȓima ȓastiyê hilgirtibû bi deste,*
*3 Heke tuyî maşxarî, te bi ĥelalî maşê xwe ji mîrê xwe di xweste.*

**S. 4** *1 Wekî te sulî hilanîye,*
*2 Ȓima ȓastiyê ye bi destîye,*
*3 Heke tuyî maşxarî, te bi ĥilalî maşê xwe ji mîrê xwe divîye.*

**S. 5** *1 Beĥra qudretê mewc û hawar tê,*
*2 Ĥeyam hatîne sed ĥezar bar tê.*

---

[944] binêr: *bore ginijê – ziman û k'arêt qenc û ȓast* (Silêman Cafer)
[945] [52] *Qewlê şîrê ȓastiyê* (rr. 57-59)
[946] *maşxor*

**S. 6** *1 Beĥra qudretê bar tê nebit xelqê[947] zalim,*
*2 Zor merk'eb bestbûn, xelqê e'lim,*
*3 Ĥeyam hatine sed ĥezara, êk dêmînit saẍ û selim.*

**S. 7** *1 Beĥra qudretê ye di cîde,*
*2 Zor merk'eb bestbûn xelqekî mirîde,*
*3 Ew merk'eb ya silt'an Êzîde.*

**S. 8** *1 Beĥhra qudretêye mezine,*
*2 Zor merk'eb bestibûn xelqî momine,*
*3 Ew merk'eb ya melik şêx Sine.*

**S. 9** *1 Feqîrya bi bawerî ji e'wil da,*
*2 Xasa li pê vê xirabe fêniyê hil da,*
*3 Zor ji fêniyê çobûn, r̂astiya mîrê wan mabû di dil da.*

**S. 10** *1 Feqîra êke çêkir,*
*2 Xwe ji xweşiyêt dinê kir,*
*3 Ev dinya berda û pişt pê kir.*

**S. 11** *1 Wekî te dilê xwe kire xane,*
*2 Mala xwe kire mêrostane,*
*3 Gelek nexweşî têda kirne dermane.*

**S. 12** *1 Wekî te dilê xwe xan kir,*
*2 Mala xwe mêrostan kir,*
*3 Gelek nexweşî têde derman kir.*

**S. 13** *1 Xizîne di çep û r̂astin,*
*2 K'ilîl û mifte şêx Adî bi destê xwe p'arastin,*
*3 Ji mewluda silt'an Êzîd ev qewl ĥemû r̂astin,*
*4 Her kesek r̂oja axretê ser e'melê xwe, dê ête veguhastin.*

*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*

## 41. QEWLÊ ÇAKÊ ME BI SERDA[948]

**S. 1** *1 Çakê me bi serda,*
*2 Me ji yekîniyê agahî da,*
*3 Zora gerdûn girt, û dûmahik berda.*

**S. 2** *1 Ewan silt'an Êzî na hebînî,*
*2 Kesê bivêt herr̂o, r̂û yî dojêh bibînî,*
*3 Dê xwe bi r̂êya silt'an Êzî r̂ecamînî.*

**S. 3** *1 Bi wê r̂ecamê kelim,*
*2 Derê ji enzelim,*
*3 Ji berî qal û berim.*

**S. 4** *1 Ji berî qîl û qale,*
*2 Gîyana min ĥezar sale,*
*3 Ez li ĥezreta P'adşê xweyî delale.*

[947] *xelk*
[948] [50] (rr. 463-467)

**S. 5** *1 Ji yara were, ezî no me,*
*2 K'oka xwe Şamî me,*
*3 Berî çendî nebîy me.*

**S. 6** *1 Bi k'ok binî meme,*
*2 Ji yara ez yî xewleme,*
*3 Mezinê çendî sehabeme.*

**S. 7** *1 Zor bi çava me nasnaken,*
*2 Diken vê gotinê hindaken,*
*3 Me di nav xwe da bi dayî û babiken.*

**S. 8** *1 Me yarek divêt yî Qurêşî,*
*2 Me nasbiket t'ebayî wî artêşî,*
*3 Me bixonte ser r̂êya pêşî.*

**S. 9** *1 Gelî bira betal neken xilmetê,*
*2 Eve bû ya bi kêrî we tê,*
*3 K'a bêje min ew k'î mêr bû, hêvêne wî ji muĥbetê?*

**S. 10** *1 Muĥbet ji berî dep û pênûs bû,*
*2 Bi P'adsê xwe r̂a herdem bû,*
*3 Ew xema ser çiqas xem bû.*

**S. 11** *1 Muĥbet ji berî Bê u Elef bû,*
*2 P'adsê min navda yî bi xef bû,*
*3 Ew hert'im li şe'rîe'tê bi gef bû.*

**S. 12** *1 Ez wê têm û deng hiltînim,*
*2 Evîndarê sur̂a nûrînim,*
*3 Ez şer̂a' kesî na hebînim.*

**S. 13** *1 Şer̂a' kes ne dip'aristin,*
*2 Dilê min ji ber evîna silt'an şêx Adî hate bir̂îtin,*
*3 Dem hatîye dê xwe bideme kuştin.*

**S. 14** *1 R̂astî di bîr̂astim,*
*2 Dibirime ser r̂êya r̂astim,*
*3 R̂ast r̂êya şêx Adî û melik şêx Sin bi balve guhastim.*

**S. 15** *1 Ez hatime dê r̂abihirim,*
*2 Bi r̂astî çêkirim,*
*3 Hizreta şêx Adî û melik şêx Sin bi balve birim.*

**S. 16** *1 P'adşê min we kire t'eqdîr,*
*2 Dane pêşîya min feqîr,*
*3 Ez birime hidreta mîr. hizret*

**S. 17** *1 Feqîr li wêne,*
*2 Candarê teme û lêne,*
*3 Evîndarêd wê r̂êne.*

**S. 18** *1 Evîndarê mêra meleke,*
*2 Xwezî xwendî bame*[949] *ser qent'erêt aşiqe,*
*3 Min li wê naskir hejar Tajdîn bêşike.*

[949] *xondibame*

**S. 19** *1 Xwezî çûbame dîwana wan derwêşa,*
*2 Yê dilê wan ji ber evîna silt'an Adî di êşa,*
*3 Hey dilo, tu çendî bi êşa.*

**S. 20** *1 Hey dilo, tu çendî bi kulî,*
*2 Çend nalîn û irzinka tu r̂adihêlî,*
*3 Xwezî miraza me û hazira li dîwana silt'an Êzî bi hesilî.*

**S. 21** *1 Xwezî li dîwana şêx Adî me hesilîba ew mirade,*
*2 R̂ûyê vê gerdûne ne qewl maye, ne wehde,*
*3 Gelek xelq[950] bi bisteyî ser r̂êya şêx Adî gavde.*

**S. 22** *1 Me êk divêt me nas bikete,*
*2 T'êk r̂abûn çi milete,*
*3 Ev gerdûn wa bûye r̂ûmete.*

**S. 23** *1 Me êk divêt me nas bikirî,*
*2 R̂êya r̂astiyê ber benda veşirî,*
*3 Xwedan[951] îman r̂unişt, bo r̂ewşa xwe girî.*

**S. 24** *1 Gelê încanî dîne,*
*2 Ewan pestibû îman bi zîne,*
*3 Gelek xelq[952] haje r̂êya şêx Adî nîne.*

**S. 25** *1 Gelê încanî serxweşe,*
*2 Tiştê li vê gerdûnê yî zav qadî û qeşe,*
*3 R̂ûmet nemabû delq r̂eşe.*

**S. 26** *1 Gelê încanî mişure,*
*2 Zor gel r̂ast Ĥeqî na ête bîre,*
*3 R̂ûmet nemabû feqîre.*

**S. 27** *1 P'îr̂ ji r̂ê ne,*
*2 Şêx ji dorê ne,*
*3 Feqîr candarî  mewlê ne.*

**S. 28** *1 Feqîr candarin,*
*2 P'îr̂ r̂ê vejwarin,*
*3 Şêx li dîwanê wekî xunk'arin[953].*

**S. 29** *1 Kesekî vê yekê bêtin qanê,*
*2 Mirîd bi danê, p'îr̂ bi nişanê*
*3 Feqîr bi erk'anê[954], şêx xunk'arin, wê li dîwanê,*
*4 Em ĥemû hêvîdarin[955] ji îmanê.*

**S. 30** *1 Gîyanê[956] min gorî wan siwara,*
*2 Wê desta didene letan û mok'ara,*
*3 Wê bajone dojêh û devê mara,*
*4 Wê r̂izgar diken gunehk'ara.*

**S. 31** *1 Gîyanê min gorî malêt Adîya,*
*2 Desta didene letan û hindîya,*

---

[950] *xelik*
[951] *xudan*
[952] *xelk*
[953] *xwendek'ar*
[954] *irk'an*
[955] binêr: *hîvîdar*
[956] *giyan*

3 Wêt hajone dojêh û tengîya,
4 Wê r̂izgar diken wan şaştîya.

**S. 32** 1 Gîyanê min gorî malêt mîra,
2 Desta didene letan û herîra,
3 Wê bajone dojêh û zemherîra,
4 Wê r̂izgar diken wan êxsîra,
5 Êxsîrêt zîndana mîra.

**S. 33** 1 Zebênî yê dikene gazî û haware,
2 Belê xweşewîstê min eve bû maşê me xilmetk'are,
3 Mala Adiya dê ji me stînin gunek'are.

**S. 34** 1 Gelî[957] zebêniyêt min yêt heder,
2 Ev ew cindîne, yêt r̂êya min birîn ser
3 Hincîyê wan viya, û hincîye wan heskir, bila bi xwe ji dojêh bêne der.

**S. 35** 1 Gelî mala Adiya, heke hûn xatira min têt bînin,
2 Zebêniyêt min ne êşînin,
3 Hincî we viya, we heskir ji dojêh derînin.

**S. 36** 1 Ji qewlê p'îr R̂eşê Ĥeyrana,
2 Hincîyê min r̂astîbe, destî pavête damana yarû birana,
3 Hert'im keştiya we li deryêt giran ye melevana.

**S. 37** 1 Ji qewlê p'îr R̂eşê cîda,
2 Bêjme we gelî mirîda,
3 Me dîn Şerfedîn, bawerî silt'an Êzîda.

Em kemin, Xwedê yê t'emame!

## 42. QEWLÊ DERWÊŞ QAT'ANÎ[958; 959; 960]

**S. 1** 1 R̂ojekê fikirîm,
2 Damama ĥeyîrîm[961],
3 Beĥrekê[962] seyîrîm.

**S. 1** 1 Sibekê[963] r̂abûm ĥeyîrm[964],
2 Damame k'ewgirîm,
3 K'etime beĥrekê seyrîm.

**S. 1** 1 Fikirekê fikirîm,
2 Damama ĥeyîrîm,
3 Be'rekê seyîrîm.

**S. 2** 1 Çi beĥreke girane,
2 Sibĥan ji melikê[965] R̂eĥmane,
3 T'erefê vê beĥrê seĥeta ne xweyane[966].

**S. 2** 1 Çi be'reke girane,
2 Sebiĥanî melkî r̂emane,

---

[957] *gelê*
[958] [29] (гг. 349–352) (№ 1689)
[959] [29] (гг. 422–425) (№ 1704)
[960] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ DEWRÊŞ QAT'ANÎ* (гг. 82-83) T'ilbîs 2001
[961] *ĥeyîr*
[962] *be'r*
[963] *sive*
[964] *ĥeyîr*
[965] *melk*
[966] *xuyan*

*3 Seĥîb tebekê be'rê qeyîsa me i'undane.*

**S. 3** *1 Çi beĥreke k'ure,*
*2 Sibĥan ji Melikê Ẍefûre,*
*3 T'erefê vê beĥrê seĥeta dûre.*

**S. 2** *1 Çi beĥreke k'ure,*
*2 Sibĥan[967] te xaliqê minî Ẍefûre,*
*3 T'ebeqê[968] wê beĥrê salte dûrin.*

**S. 3** *1 Çi be'reke k'ure,*
*2 Sibiĥanî melkê xefûre,*
*3 Seĥîb tebekê be'rê qeyîsa me dûre.*

**S. 3** *1 Çi beĥreke pe'ne,*
*2 Sibĥan te xaliqê minî R̂eĥmane,*
*3 Go: «T'ebeqê wê beĥrê kesekîva nexwene, mive vane».*

**S. 4** *1 Çi beĥreke bê ĥede,*
*2 Sibĥan ji xaliqê[969] Semede,*
*3 Mi şêxê xwe da[970] medhe[971].*

**S. 5** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke li bine,*
*3 Çar cew jê diçine.*

**S. 4** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke bine,*
*3 Çar cew jê diçine.*

**S. 7** *1 Çi beĥreke mezine,*
*2 Qendîleke li bine,*
*3 Çar cot k'erema sult'an Şîxadî ber diçine.*

**S. 6** *1 Çi beĥreke bê qiyase[972],*
*2 R̂ik'ineke çar e'sase[973],*
*3 Me li wê dît xelqê xasa.*

**S. 8** *1 Çi beĥreke bê qeyîyase,*
*2 R̂ik'ineke çar asase,*
*3 Me li wê dît xelqê xasa.*

**S. 7** *1 Çi beĥreke emîqe[974],*
*2 P'adşayê mi r̂a şefîqe,*
*3 Dûrbîna me nêzîke.*

**S. 5** *1 Çi beĥreke emîqe[975],*
*2 P'adşayê min mi r̂a şofîqe,*
*3 Dûr anîme nêzîke.*

**S. 4** *1 Çi be'reke bê ĥemîke,*
*2 P'adşayî me r̂a şefîqe,*
*3 Dûrayîya tanîm nêzîke.*

**S. 8** *1 Dûrbîna me kenare,*
*2 P'êl têne mi dijare[976],*
*3 Mi şêxê xwe haware.*

---

[967] *sivĥan*
[968] *tevek*
[969] *xalq*
[970] *di*
[971] *di mede*
[972] *qeyas*
[973] *asas*
[974] *yemîq*
[975] *hemîq*
[976] *dijare*

**S. 6** *1 Dûr anîme kenara,*
*2 P'êlê wê beĥre têne du care,*
*3 Şêxê xwe dibim haware.*

**S. 5** *1 Dûrayîya tanîm kinare,*
*2 P'êl têne me jara,*
*3 Me li şêxê xa haware.*

**S. 9** *1 Hawara şêxê xweme,*
*2 Zor medha jê dideme,*
*3 Me li wê dît E'rş û sema.*

**S. 7** *1 Hawara şêxê xweme,*
*2 Zor me[h]da nav dik'irê te dideme,*
*3 P'adşayê min ewe yekê ser me.*

**S. 6** *1 Hawara şêxê xame,*
*2 Zor me[h]da dibeme,*
*3 Zerb yeke, donzde selewate sult'an Şîxadî pê r̂a.*

**S. 10** *1 Me li wê dît bajarek,*
*2 Nabda hebû dîwarek*[977]*,*
*3 Ser sekinîbû şêresiwarek*[978]*.*

**S. 11** *1 Ser sekinîbû emînek,*
*2 Xewlêdabû feqîrek,*
*3 Ewane dikir r̂aw û t'ivdîrek.*

**S. 9** *1 Me li wê dîtiye embîre,*
*2 Ev*[979] *xewlê dikir ya feqîre,*
*3 Me ser danî r̂a û t'ivdîre.*

**S. 12** *1 Mîrê min mîrekî mezine,*
*2 Xwedanê*[980]*yanzde ĥezar cot qoşûne*[981]*,*
*3 Cêşîyê giran ber nifûsa wan diçine.*

**S. 10** *1 P'adşayê minî mezine,*
*2 Xwedanê yanzde ĥezar cot qoşine*[982]*,*
*3 Cêşê giran ewin ber diçine.*

**S. 10** *1 P'adayşê minî mezine,*
*2 Xudanê danzde ĥezar cot osine,*
*3 Cêşêt giran ber nifûsa wî diçine.*

**S. 11** *1 Min dî wê mehde didane,*
*2 Ĥerfa nava yanzde ĥerfane,*
*3 We'dil qadil yek ji wane.*

**S. 13** *1 Bajarekî çar sûr̂e,*
*2 Yanzde xendeqanî k'ûre,*
*3 Ĥeft jê tarîne*[983]*, çar jê nûre.*

**S. 12** *1 Çi bajarekî çar sûr̂e,*
*2 Yanzde erk'anî*[984] *k'ûre,*
*3 Ĥefte*[985] *tarî, çare nûrin.*

**S. 11** *1 Bajarekî çar sûr̂e,*
*2 Yanzde xendeqanî k'ûre,*

---

[977] *dîharek*
[978] *şêresîyarek*
[979] *ez*
[980] *xudan*
[981] *qoşen*
[982] binêr: *qoşûn*
[983] *te'rî*
[984] *erqan*
[985] *ĥevt*

*3 Ĥeft jê te'rîne, çar jê nûre.*

**S. 13** *1 Me wê dî bû beĥrek,*
*2 Ser wê beĥrê hebû dîvarek,*
*3 Ser wê dîvarî sekinîbû şêresiwarek.*

**S. 14** *1 Cem wî şêresiwarî hebû êk mîrek,*
*2 Ji wana xewle feqîrek,*
*3 Ewî dikir r̂ayek[986], ewî dikir t'ivdîrek.*

**S. 14** *1 P'adşayê min wê E'rş kir,*
*2 Neqaşekê nexş kir,*
*3 Du cindîya qube ferş kir.*

**S. 8** *1 P'adşayê min r̂avû E'rş kir,*
*2 Neqaşê xwe danî, nexş kir,*
*3 Min dî du cindîya quvek ferş kir.*

**S. 15** *1 Du cindîya dur̂ek[987] digêr̂a,*
*2 Şehde bin[988] keskî vê r̂a,*
*3 Zerî yeke, donzdeh ĥezar cilawet navê silt'an[989] şêx Adî, melek şêx Sin vê r̂a.*

**S. 9** *1 Min dî du cindîya dur̂ek[990] digêr̂a,*
*2 Hûn şehde[991] bin nave P'adşê r̂a,*
*3 Her sicûdeke wê dur̂ê yanzde ĥezar cot qoşûn şikrîne nav dik'irê P'adşê r̂a.*

**S. 16** *1 Bi fikirîme li wê ye,*
*2 Dergekî dur̂ê ye,*
*3 Yek r̂ûniştîye, du dayîma p'ê ye,*
*4 P'adşayê min ewe, ser K'ursîya ĥeqîyê ye.*

**S. 15** *1 Vir fikirime wêye,*
*2 Dergeke û du r̂êye[992],*
*3 Dayîme yekî r̂ûniştî ye, duda ji p'êne.*

**S. 17** *1 Ba dilê mewe e'yane,*
*2 K'ursîke û şeş p'îyane,*
*3 Fitîleke, çar ĉirane.*

**S. 16** *1 Dilê mive e'yane,*
*2 K'ursîke, çar p'îyane,*
*3 Fitîleke, çar ĉirane.*

**S. 18** *1 Çar çira fitîlek,*
*2 Ĥeft derge k'ilîlek,*
*3 Ĥeft menbera qendîlek.*

**S. 17** *1 Çar çira fitîlekê,*
*2 Ĥeft derge k'ilîlekê,*
*3 Ĥeyşt menbera qendîlekê.*

**S. 19** *1 Me li wê dî nedera,*
*2 Melek şêx Sin r̂abîye ser menbera[993],*
*3 Vedike qewla, dixwîne[994] deft'era.*

**S. 20** *1 K' itêb û deft'erin,*

---

[986] *r̂ak*
[987] *dur̂*
[988] *şe'de*
[989] *sultan*
[990] *dur̂*
[991] *şe'de*
[992] *dur̂êye*
[993] *mexber*
[994] *dixûne*

*2 Qadî û menberin*[995]*,*
*3 Bejneke çar beşerin.*
**S. 19** *1 K'itêb û deft'erin,*
*2 Qendîl û menberin*[996]*,*
*3 R̂uĥeke çar beşerin.*

**S. 21** *1 Herçar beşerê bejnekê,*
*2 Te'v û sî yeke*[997]*,*
*3 T'evay bûne cîyeke.*
**S. 20** *1 Çar beşerê bejnekê,*
*2 Peya bûne derekê,*
*3 Ew jî dikin xeberekê.*

**S. 22** *1 Ĥerfa nav Yasîne,*
*2 Yek — Mekke, û yek — Medîne,*
*3 Xwezka mi bizanbîya ciyê wan k'une?*
**S. 18** *1 K'itêb û Yasînin*[998]*,*
*2 Mekke û Medînin,*
*3 Xazla mi zanibîye ciyê wana k'îne.*

**S. 23** *1 Ĥerfa nav yanzda ĥerfane,*
*2 Wedil qewala yek jê wane.*

**S. 24** *1 Sekin*[999]*, bidin xebera,*
*2 Vedikin qewla, dixwînin deft'era,*
*3 Ew ĥerfa cem xwedanê nedera.*
**S. 22** *1 Gelî mêra, sekin, bikin xebera,*
*2 Vekin qewla, bixwînin deft'era,*
*3 Ew yeke cem xwedanê nedera.*

**S. 25** *1 Sekin, bidin ĥesêba*[1000]*,*
*2 Vedikin qewla, dixwînin k'itêba*[1001]*,*
*3 Ew ĥerfa cem xwedanê e'cêba*[1002]*.*
**S. 23** *1 Gelî mêra, sekin, bikin ĥesêba,*
*2 Vekin qewla, bixwînin k'itêba,*
*3 Ew yeke cem xwedanê e'cêba.*

**S. 24** *1 Gelî mêra sekin, gilîyê ẍafila*[1003] *ne*
*bêne, 2 Me ẍafil dîbûn li wêne,*
*3 Êwelleĥ ewin xwe ya xirav di pêne.*

**S. 26** *1 Mekin derheqe*[1004] *ẍafila*[1005]*,*
*2 Xofbin, tirsbin ĥemû dila,*
*3 Bandê bivine malxê mezela.*
**S. 25** *1 Gelî mêra sekin, mebihên gilîyê ẍafila,*
*2 Xofbin*[1006]*, r̂eĥmbin*[1007] *ĥemû dila,*
*3 Hûnê jî r̂okê bivine malxê wa mezela.*

---

[995] *member*
[996] *mermer*
[997] *Te'vê sî û yeke*
[998] *asîn*
[999] *se kin*
[1000] *ĥesêv*
[1001] *k'itêv*
[1002] *e'cêv*
[1003] *xafil*
[1004] *derheqe*
[1005] *xafil*
[1006] *xofvin*
[1007] *r̂e'mvin*

**S. 27** *1 Mekin derheqe ẍafila,*
*2 Ẍafil jî bendayê Xwedêye,*
*3 ……………………………. .*

**S. 28** *1 Qat'anî çend me'nî digotin:*
*2 «Dayîmeke di dotin,*
*3 E'rşa dihate gatin batin nehate firotin».*
**S. 21** *1 Eva me'nîya derwêş Qat'anî digotin:*
*2 «Dayîmeke çar dotin,*
*3 E'zmana*[1008] *dihate gotin,*
*4 E'rda ne dihate firotin».*

**S. 29** *1 Qat'anî me'rîfet kir,*
*2 K'as û muĥbet*[1009] *kir,*
*3 Xasa wêderê xas tê qebûl kir.*
**S. 12** *1 Qat'anî me'rîfet kir,*
*2 Neqaşekî neqas kir,*
*3 Du cindî jê ferş kir.*

**S. 26** *1 Derwêş Qat'anî wey kir,*
*2 K'as û badî*[1010] *danî, mey kir,*
*3 Xasa wê derê*[1011] *laqet*[1012] *dikir.*

**S. 30** *1 Xweşka wane go zû kir,*
*2 K'as û cambaqî kir,*
*3 Xasa wêderê xas tê qebûl kir.*
**S. 27** *1 Derwêş Qat'anî zû kir,*
*2 K'as û badî danî, mey kir,*
*3 Xasa wê derê laqet dikir.*

**S. 31** *1 Eva qewla qewlê derwêş Qat'anî,*
*2 Şêx Adî beĥr bû, jê diçû cew û kanî,*
*3 Ẍafila kor bûn, pê nizanî.*
**S. 28** *1 Eva qewla qewlê derwêş Qat'anî,*
*2 Mila hilê*[1013] *r̂eşî nûranî,*
*3 Xasa xas dizanî,*
*4 Ẍafila korin, me'nîyê vî qewlî nizanî.*

*T'emametî şêx Adî!*

## 43. QEWLÊ ABÛ[1014] BAK'IRÊ OMERA

**şaxê –1**[1015]
**S. 1** *1 Destûrî malê bava,*
*2 Hîmeta şêx Sinê*[1016] *bave,*
*3 E'zîzo, ferd osto, ma[h]dera me r̂ave.*

**S. 2** *1 Destûrî male Adîya,*

[1008] *e'sman*
[1009] *mobet*
[1010] *barî*
[1011] *wêderê*
[1012] *loqet*
[1013] *ĥullê*
[1014] *Bav*
[1015] *Qewlê Bav Bekrê Omer*a [29] (гг.360–366) (№ 1691)
[1016] *Şîxsin*

*2 Dibêjime*[1017] *we gelî axîya,*
*3 Nesîĥetê*[1018] *we dikim gelî cindîya.*

**S. 3** *1 Gelî cindîya we dikim nesîĥetê,*
*2 Kesê qap'îya silt'tan*[1019] *şêx Adî bike ibadet*[1020] *û xilmetê,*
*3 Mêr bê mehek qap'îya silt'tan şêx Adî ne tê.*

**S. 4** *1 Abû Bek'irê Omera melamînin,*
*2 Şems û Fexrê mîra meseb û dînin,*
*3 Xasa hay kir, ẍafila*[1021]*kor bûn, agirê xezebê da dimînin.*

**S. 5** *1 Abû Bek'irê Omera mehevojin*[1022]*,*
*2 Şems û Fexrê mîra Hîv û R̂ojin,*
*3 Xasa hay kir, ẍafila kor bûn, agirê xezebê da disojin.*

**S. 6** *1 Abû Bek'irê Omera yeke çê dît,*
*2 R̂û dine beĥreke*[1023] *yeker dît,*
*3 Abû Bek'irê Omera Ĥeq Ekber dît.*

**S. 7** *1 Abû Bek'irê Omera yeke fer dît,*
*2 R̂û dine beĥrekê yeker dît,*
*3 Abû Bek'irê Omera Ĥeq Xwedê dît.*

**S. 8** *1 Abû Bek'irê Omera meste ji mêj,*
*2 Tu ne bitirs, ne bihindêj,*
*3 Te çi dîwana silt'an şêx Adî dîtîye, were dîwana şêx Adî da, melek şêx Sin da bibêj.*

**S. 9** *1 Abû Bek'irê Omera mestê ji mêjva,*
*2 Tu ne bitirs, ne bihindêj,*
*3 Te çi dîwana silt'tan şêx Adî dîtîye, were dîwana şêx Adî da, melek şêx Sin da bibêj.*

**S. 10** *1 Ewe k'asa mi da,*
*2 Dabû dastê babil û hinda,*
*3 Serĥabe biramo ya mi da.*

**S. 11** *1 Ewe k'asa mi dayî,*
*2 Dabû dastê babil û hindayî,*
*3 Serĥabe biramo ya mi dayî.*

**S. 12** *1 Ewe k'asa r̂a didene,*
*2 Ewe k'asê t'ijekin mi bidene,*
*3 Serfa vê k'asê serfeke girane, mêr dixwin*[1024] *derb*[1025] *û seĥet pê diher̂ene.*

**S. 13** *1 Ewe k'asa r̂a di dêrî,*
*2 Ewe k'asê t'ijekin mi bispêrî,*
*3 Serfa vê k'asê serfeke girane, mêr dixwin derb û seĥet xwe pê dispêrî.*

**S. 14** *1 Ewe k'asa mişte,*
*2 Ser dilê mi da dahişte,*
*3 Serfa vê k'asê serfeke girane, derĥa dil-hinavê mi pê dip'arişte.*

---

[1017] *divêjime*
[1018] *nesilĥet*
[1019] *sultan*
[1020] *ebabet*
[1021] *xafil*
[1022] *mehojin*
[1023] *be'r*
[1024] *dixun*
[1025] *derp*

**S. 15** *1 Ewe k'asa t'ijî,*
*2 Ser dilê mi da wê dir̂ijî,*
*3 Serfa vê k'asê serfeke girane, derĥa dil-hinavê mi pê dinerijî.*

**S. 16** *1 Abû Bek'irê Omera mestê cîda,*
*2 K'asa mêr pê dibin mirîde,*
*3 K'as, k'asa E'bû Ta'lê cahile da destê silt'an Êzîde.*

**S. 17** *1 Abû Bek'irê Omera mestê emine,*
*2 K'asa mêr pê dibin sêk'ine,*
*3 K'as, k'asa E'bû Ta'lê cahile da destê melek şêx Sine.*

**S. 18** *1 Silt'ano, serê silt'ana,*
*2 Xaliqekî minî [ji] e'rda ĥeta [bi] e'zmana,*
*3 Silt'an şêx Adî ewe, mêr jê didin beyane.*

**S. 19** *1 Silt'ano, sere cêşa,*
*2 Melĥemê kula, birîna ĥemû r̂êşa,*
*3 Silt'an şêx Adî ewe, mêra dike ber derê Qurêşa*[1026]*.*

**S. 20** *1 Silt'ano, sere mileta,*
*2 Xaliqekî minî ĥeftê û dû mileta, ĥîjde ĥezar*
*muxulqeta, 3 Silt'an şêx Adî ewe, mêr jê didin wesfeta.*

**S. 21** *1 Qewlê lawê hoste,*
*2 Ser tewîla hespê bostê,*
*3 Me yar bira hene ferdostê.*

**S. 22** *1 Qewle mendê Tokila,*
*2 K'ê nifûsa yar birê axretê qebiland,*
*3 Bandê dîwana şêx Adî, melek şêx Sin dihasiland.*

**S. 23** *1 Qewle mendê Mameda,*
*2 R̂ojekê wê bive ĥed û seda,*
*3 Mêr hene dîwana şêx Adî bereberî seda.*

**S. 24** *1 Qewle Mendê Zerza yî,*
*2 Wekî du dil bivne t'eva yî,*
*3 Bi*[1027] *destûrî şêx Adî wê ĉiya hildin bidne ser ĉiya yî.*

**S. 25** *1 We nabe, we nasewirî,*
*2 Kesê maşxur maşê xwe*[1028] *ĥelalî bixwarî,*
*3 Na wecibe erk'anê bore wî t'evî ĥemû r̂evîye biĉêrî.*

**S. 26** *1 We nabe, we nasewirî qete,*
*2 Kesê maşxur maşê xwe ĥelalî bixwete,*
*3 Na wecibe erk'anê bore wî t'evî ĥemû r̂eviye her̂ete.*

**S. 27** *1 Kesî borî ne bestî,*
*2 Hevsar lîvan sêrî çûbû destî,*
*3 Gîhayê ĥemû merga digestî.*
*4 R̂edayê nevsê bû, r̂oja bandê r̂engê wî ber xwedanê*[1029] *wî zer bû.*

**S. 28** *1 Kesî borî bet'er bî,*

[1026] *Kurêş*
[1027] *bê*
[1028] *xu*
[1029] *xudan*

*2 Hevsar lîvan sêrî ker bi ker bî,*
*3 Gîhayê ĥemû merga wer bî.*
*4 R̂edayê nevsê bû, r̂oja bandê r̂engê wî ber xwedanê wî dişkestî.*

**S. 29** *1 Birao, birayê min hay kin,*
*2 Sata r̂uĥê min, qelbê min cuda kin,*
*3 Zenare mork'evê nezane, dêma şol nakin.*

**S. 30** *1 Birao, birayê min werin,*
*2 Sata r̂uĥê min, qelbê min di berin,*
*3 Biramo, hûnê dê mûmê min kûl bi kerin.*

**S. 31** *1 Birao, birayê min bînin,*
*2 Qalbê min ser çardara bişidînin,*
*3 Dest vî cînîyazî nexe, birê axretê t'unîne.*

**S. 32** *1 Qalbê min xwar*[1030] *bû,*
*2 Sur̂eke*[1031] *xasa cem dîhar bû,*
*3 Ew sur̂a silt'an Êzîdê minî dêm cemal bû.*

**S. 33** *1 Qalbê mi zevî bû,*
*2 Sur̂eke xasa cem dîbû,*
*3 Sur̂a silt'an Êzîdê minî bêlî bû.*

**S. 34** *1 Navê k'oĉek — di jarin,*
*2 Navê extîyar — di jarin,*
*3 Wek'azê destê wan da darin,*
*4 R̂oja meydana meleka ew şêresiwarin.*

**S. 35** *1 Navê k'oĉek — miskînin,*
*2 Navê extîyar — miskînin,*
*3 Wek'azê destê wan da darînin,*
*4 R̂oja meydana meleka ew zora ser zîna difir̂înin.*

**S. 36** *1 R̂ojekê bive axire,*
*2 Dahir*[1032]*be t'erfekê faxire,*
*3 Şîrqînê E'rşane,*
*4 Zimînê e'rdane,*
*5 Ĥezêza qebrane,*
*6 Sinîye*[1033] *ji beĥrane,*
*7 Ye kesê kesane,*
*8 Ne bavê pisane,*
*9 Birê axretê hawekê*[1034] *tîne ser gunek'arê birane,*
*10 Destê tarîyê*[1035] *şivatê derdixe ber r̂onayê ĉirane.*

**şaxê –2**[1036]

**S. 1** *1 Hûn Abu Bek'irê*[1037] *Omera melomînin,*
*2 Şems û Fexrêt mîra meseb û dînin,*
*3 Ẍafilêt korene, her bila di agirê xezebê da bimînin.*

**S. 2** *1 Abu Bek'irê Omera mehevojin,*

[1030] *xar*
[1031] *sur̂*
[1032] *deher*
[1033] *sunî*
[1034] *hewek*
[1035] *te'r̂î*
[1036] [1] *Qewlê Babekrê Omera* (pp. 376–379); [2] (rr. 421–424)
[1037] *Babek*

*3 Şems û Fexrêt mîra Heyv û R̂ojin,*
*3 Ji ẍafila bigeȓin, her bila di agirê dojêh da bisojin.*

**S. 3** *1 Ji qewlê Abu Bek'irê Omera,*
*2 Hincîyê li k'êşa mesebê xweyî t'ekerî mekire,*
*3 R̂oja axretê ne şefa'et heye, ne mehdere.*

**S. 4** *1 Ji qewlê Abu Bek'irê Omerayî zerzayî,*
*2 Heke du mêr kire t'ebayî,*
*3 Bi firwara şêx Adî û melik şêx Sin, dê ĉiyayî danêne ser ĉiyayî.*

**S. 5** *1 Weke te bor ne dibeste,*
*2 Li xof*[1038] *û hevsar çûn ji deste,*
*3 Borê te li ĥemû mêrga dike qeste.*
*4 Ew şolê nefsê bû, xulqê Xwedanî ji ber şkeste.*

**S. 6** *1 We nabî, we naşêwirî*[1039]*,*
*2 Ne wacibê erk'anêye, borê te li ĥemû mêrga biçêrî,*
*3 Ew şixulê*[1040] *nefsê bû, ȓoja axretê xulqê*[1041] *xwedanî ji berk' kirî*[1042]*.*

**S. 7** *1 We nabî, we naşêwirî qete,*
*2 Ne wacibê erk'anêye, borê te li ĥemû mêrga biçêrete,*
*3 Ew şixulê nefsê bû, xulqê xwedanî, ȓoja axretê ji ber şkeste.*

**S. 8** *1 Çendî medha*[1043] *dibême,*
*2 Pirsiyara melikê miqême,*
*3 Dabû destê şêxê Silême.*

**S. 9** *1 Ew bû şêxê Silême,*
*2 Stûna qidême,*
*3 Qesit kir, çû cême.*

**S. 10** *1 Hincîyê t'erîqa wî dijmine,*
*2 Barê wî hêsine,*
*3 R̂oja axretê cizê wî sotine.*

**S. 11** *1 Hiciyê t'erîqa wî dijmin dibî,*
*2 Û ĉiyayê Sîp'anê Xelatê li bin dibî,*
*3 R̂oja axretê, ne ji van û ne ji wan dibî.*

**S. 12** *1 Birime dîwana feqîrêt bi more,*
*2 K'ase, û meye, badeye dore,*
*3 K'asek da min, pê dibûm t'oȓe.*

**S. 13** *1 Ji ola Ezî safî bûm,*
*2 Sehîy*[1044]*ezî êzdî bûm,*
*3 (Ji) Ẍafila ez nenasî bûm.*

**S. 14** *1 Ẍafil di b nasîne,*
*2 Têne min bi k'erban û k'îne,*
*3 Ewin dijminê min û dîne.*

**S. 15** *1 Ẍafil wê tên dibezin,*

---

[1038] *xaf*
[1039] *nasêwirî*
[1040] *şûxl*
[1041] *xulk*
[1042] *ber kirî*
[1043] *medeha*
[1044] *sehî*

*2 Ĉav li ẍafilan mekin,*
*3 Li r̂êye ola xwe nehulizin,*
*4 Da r̂oja axretê hûn bi agirê xezebê da megevizin.*

**S. 16** *1 Xweştir ji bihuştê heye,*
*2 K’ase, û muĥbete, û meye,*
*3 Ew k’ase silt’an Êzî bi xweye.*

**S. 17** *1 Cineta baqî ciyê Tawisî melek’e,*
*2 Ciyê şêx Adî, ciyê Êzîde,*
*3 Ciyê mala Adiyane.*

**S. 18** *1 Melik wê e’melê salih dibime,*
*2 Wê ĥerfê sêlerin,*
*3 Wê k’asê êcerin,*
*4 Seyrkin Êzî mezin.*

**S. 19** *1 Şêx Xidir şêxekî çê ye,*
*2 Şêx Ĥisên li pê sicûdê dik’êşe ber mewlê ye.*

**S. 20** *1 Şêx Xidir şêxekî delale,*
*2 Şêx Hisênî li bale,*
*3 Sicûde dik’êşe ber Omer Xale.*

**S. 21** *1 Omer Xala p’îrekî ji enzelîye,*
*2 Hêvênê*[1045] *wî ji kaniya Sipîye,*
*3 Kirine ser xitmê çendî e’dewîye.*

**S. 22** *1 Sed bîst çar ĥezar nebîy hatin û bihurîn,*
*2 Silt’an Êzî yek bi yek hijmirîn,*
*3 Silt’an Êzî nûr bû, ji nûrê xemilî,*
*4 Silt’an şêx Adî t’ac ji e’wilî ĥeta bi axrî.*

## 44. QEWLÊ DÎYA ŞÊX MUS[1046]

**S. 1** *1 Bi destûrî malêt baba,*
*2 Ĥimeta melik şêx Sin bûa be,*
*3 Mefer dost mehdera me r̂a be.*

**S. 2** *1 Destûrî malêt Adiya,*
*2 Ĥimeta melik şêx Sinê Adiya,*
*3 Yala birano, nesîĥê li we dikim gelî cindîya.*

**S. 3** *1 Gelî cindîya li we dikem nesîĥetê,*
*2 Hincî mêrê li ber qap’iya şêx Adî u melik şêx Sin biket xilmetê, bik’êşit ibadetê,*
*3 Mêr li ber P’adşê xwe bê miĥik netê.*

**S. 4** *1 Xeberê bigehînin lawê hostê,*
*2 Ewe bû t’ewla hespê boz tê,*
*3 Yala birano, ciyê yar birêt axretê li mefer dost tê.*

**S. 5** *1 Aba Bek’irê*[1047] *Omera melamînin,*
*2 Şems u Fexrêt mîra mezheb û dînin,*

[1045] *havên*
[1046] [2] (rr. 869–870); (Ji çîroke pîr Şerevî u silt’an şêx Mus)
[1047] *Ebabekir*

*3 Yala birano, ji ẍefila bigeȓên, bila di agirê ẍezebê da bimînin.*

**S. 6** *1 Aba Bek'irê Omero mehevêjin,*
*2 Şems û Fexrêt mîra Heyv û Ȓojin,*
*3 Yala birano, ji ẍefila bigeȓên, bila di agirê ẍezebê da bisojin.*

**S. 7** *1 Ji qewlê Aba Bek'irê Omera,*
*2 Hincî mêrê li ȓêya mesebê xweyî t'eker, yî mekare*[1048]*,*
*3 Yala birano, li dîwana şêx Adî û melik şêx Sin,bi şefa'et lê heye, ne mehdere.*

**S. 8** *1 Ji qewlê Aba Bek'irê Omera zerzayî,*
*2 Heke dû bira kire t'ebabî,*
*3 Bi firwara silt'an şêx Adî dê ĉiyayî danêne ser ĉiyayî.*

# 45. QEWLÊ DERWÊŞ ĤEBÎB

**şaxê – 1**[1049]

*Derwêş Ĥebîb pêşî derwêş bû. Di nav gel de digeȓiya, ȓêya ȓast, ȓêya Xwedê digot, kesên jê ĥez dikirin guhê xwe didanê, yê din jî guhê xwe nedidanê, ew jî bi qîma xwe bûn.*
*Bi qenciya xwe çendeha sal di nav gel de digeȓiya û ev yek dom kir, milet û ixtîyara*[1050] *wî dişopandin û gihane encamekê û gotin: «Ev derweşekî zafî qence û ne aliyê xwerinê ye, aliyê qenciyê ye. Em navê wî çi deynin?» Hineka got ji navê Derweş çêtir çi heye û hineka got em navê wî bikin derwêş Ĥebîb. Berî here, çûn xatir jê xwestin û yekî jêre got:*

*«Ya derwêş Ĥebîb, serî ji me nehêlî».*

*Derwêş Ĥebîb got: «Goȓê Lenga betilî yê xaro-maro Înşallaĥ nikarin cewabê bidin. Çendî hindava li dîn û dîyaneta*[1051]*xwede wersilî, yê bi destê nefsa mezin bigrin bi avêjine Tat el Tirî. Ȓoja huzurî ĥeq tu yarû birayê axretê ne têne hawarê ne têne gazî, lê nabin mişterî».*
*Çendî wersilî ji hicretê,*
*Gerek xas û milyak'et jî bitirsin ji ĥeybetê.*
*Hîngê*[1052] *milkê qenca û xasa çêdibe li baẍê cinetê,*
*Ê bi destê nefsa mezin, bigrin biavêjin binê zindana,*
*Ew der ciyê wane ĥeta ȓoja qiyametê.*
*Hîngê milet got: «Ya derwêş Ĥebîb em jî li cinetê moĥt'acin, em jî dixwazin heȓine cinetê».*
*Got: «Em jî ne ti moĥt'acin û silt'an Êzî got ez ji we ȓe duȓ û t'acim ji we ȓe bawarin»,*
*Got: «Ya silt'an Êzîd, em li ba te bi hinerin,*
*Û em bi e'ynate, bi qewata te deyn dikin.*
*Û çendî yarû birayê axretê emê hûr girin.*
*Hûr û gir bira werin meydanê,*
*Xwedanê sebirê, yanî îmanê,*
*Yê bi destê nefsa mezin, yê bigrin bavêjin binê zindanê,*
*Ew der ciyê wana ĥeta axrzemanê».*

*Derwêş Ĥebîb got:*
*«Got heȓin bipirsin ji wan xasa,*
*Pisê pilinga dibine pisê baza.*
*Însanê di hindava dîn û Xwedê de ȓast be, gava diçin ȓêya qenciyê û dîn ȓêya wî fireh dike û dikine hole-hol û dikin gaze-gaza».*

*Got: «Ya derwêş Ĥebîb hûr girin, hûr girî».*

---
[1048] *mekere*
[1049] http://eziden-celle.de/?page_id=254&preview=true Ĉavkanî: Ûsuvê Keleş
[1050] binêr: *extîyar*
[1051] *diyanet*
[1052] *hingê*

*Got: «Ezî ji dîyanetê xwe r̂a bi k'êfim, bi eşqim, bi şahîme,*
*Bi biçukan r̂e jî r̂adibim, bi mezinan r̂e jî r̂adibim.*
*Ez dikarim bi biçukan r̂e jî xeber bidim, ez dikarim bi mezinan r̂e jî xeber bidim.*
*Hûr girim, hûr girînim,*
*Ez ji dîyanetê xwe r̂e bi k'êf, eşq û şahînim.*
*Ez aşiqekî nûrînim,*
*Ez hatime bi r̂êya qenc dîyaneta xwe de dicadînim,*
*Hatime r̂êya dîyaneta dînê xwe bi ĥeq bibînim».*
*Tawisî melek' gotiye:*
*«Ez ne muĥbê[1053] mirovê derewînim,*
*Derewîna me namînin,*
*Mirovê derewa bike, jê bigeŕin hûn çikas bileptînin xiraptir dike.*
*Yê viŕek, yê derewînin,*
*Ji r̂êya ĥeqiya nazemînin,*
*R̂oja ĥizurî ĥeq,*
*Xasê şêx Adî wê li ĥemû k'ar û e'melê wanê bigazînin.*
*Hatim bibînim wê dîndarê,*
*Weke kulîlka şîn[1054] bibe biharê,*
*Em hatine cem yarû birayê axretê bikin bazarê,*
*Em hatin bikin bazara mîra,*
*Gelî bira, gelîyê Êzdiya, dûr bin ji xirabiya, û ji înk'ê bê p'îra,*
*Û semaxê bidine xwe û mirovê di r̂êya dîyanetê xwe de r̂ast be,*
*Wê zû li me dîyar be pirsiyara mêhdî[1055] mîra,*
*Yê zû li me dihar be pirsiyara mêhdî feqîra,*
*Destê silt'an Êzîdê min k'oteke ser şêran û mêra,*
*Kes li ber Êzîd dit'une, li ber Tawisî melek', li ber şêx Adî, bê aqil nebin û ît'îraza[1056] wan nekin».*

*Derwêş Ĥebîb dibêje:*
*«Ez derwêşim, ez hatime r̂êya r̂ast ji miletê qenc r̂a bêjim,*
*Ez bi r̂êya dîyanetê xwe li pêşim,*
*Ez derwêşekî ser r̂atayî me, ezî qencim, ezî bi kêf, bi eşq,*
*Bi dîyanetê xwe r̂a şahî me, Înşallaĥ hertim r̂êya qenc, r̂êya Îlaĥî me,*
*Ez derwêşekî babĥalim, ez xweş sûkim, xweş sewalim,*
*Xweş mutacirim, xweş delalim,*
*Ez derwêşekî li wê me,*
*Ez xewasê[1057] e'rdê me,*
*Ez xewasê beĥrê me.*
*Ez mişterîkê dîn û dîyanetê xwe silt'an Êzîd, Tawisî melek', şêx Adî û suŕê*
*me, Ez hatime dîn û dîyanetê xwe bidim û bême,*
*Ez derwêşekî wa hame,*
*Ez xelefekî r̂û dame,*
*Înşallaĥ ez li r̂êya mêr û meleka me.*
*Mir û milyak'et[1058] wa dibête,*
*Gelî bira, gelî milet hay ji xwe hebin,*
*Xwedê heye, mirin heye,*
*R̂eb il-A'lemîn li pêş me daniye agirê dojêh, agirekî p'ête,*
*Li hema qismetê xwe ji Xwedayê xwe bivête,*
*Çi dojakî tenge, t'ijî agire, t'ijî p'erenge.*
*Ji xelqê viŕek, yî derewîn, yî înk'arî lengî, berdû lenge,*
*Ĥizura ĥizurî ĥeq tu yarû birayê axretê nikarin bêne hawarê, bêne cenge,*
*Çi dojakî xemdare, û t'ijî agirekî dijware,*
*Jê xelqê viŕekî, derewînî, fesadî, zengî, berdû lengî înk'are,*

[1053] *mehb*
[1054] *k'esk*
[1055] *mêdî*
[1056] *îtras*
[1057] *xewaz*
[1058] *melekiyat*

*R̂oja ĥizurî ĥeq t'u yarû birayê axretê[1059] ne têne gazî, ne têne hawarê.*
*Min dil pê mabû k'esirî,*
*Derwêş Ĥebîb hat û bihurî,*
*Ĥeqê destê derwêş Ĥebîb neĥeq bû, me jê pirsî:*
*«Tu hê betilî», me jêre got: «Xwedê k'engî çêbûye?»*
*Derwêş Ĥebîb bersiv ne da û xeyîdî.*
*Derwêş Ĥebîb got:*
*«Min dil pê şah bû k'u em bi dîyanetê xwe, k'êfa min zaf ji we r̂a hat û min serî ji we nebirî, û r̂êya r̂ast şanî we da.*
*Min dil pê şah bû,*
*Mirov lazim r̂êya dîn û dîyanetê xwe bawer bike, dev jê ber nede, berê ilmdarê xwe nede asêkê.*
*Yê t'emam Xwedê ye».*

*Derwêş Ĥebîb dibêje:*
*«Gelî milet bira tirsa min hebe ji Xwedê ye,*
*Feqîrî erk'anekî çê ye,*
*Bixebitin ji dîyanetê xwe r̂a bi dilikê ye,*
*Ji dil û can ji dîyanetê xwe bixebitin, li pey r̂ê û r̂esmê xwe her̂in û ĥed û sedê xwe zanibin,*
*Hûn hîngê karin qismetê xwe bixwazin ji Xwedêy.*
*R̂êya şêx Adî bi e'mirê, Tawisî melek' ji me r̂a r̂astirîn ji r̂astîye,*
*Gerek mirov ji dîyanetê xwe bike bawerî û yeqîne[1060],*
*Her kesê di hindava dîn û dîyanetê xwe r̂a bi qehr be, bi k'erb be, yî bi k'îne,*
*Tawisî melek', serê sera Xwedê ye,*
*Navbera min û wî ĥeftê ĥezar ĉiyayê berfîne.*
*R̂êya şêx Adî ĥed û sedê, şêx Adî ji me r̂a r̂ast kirî ye r̂aste, ne xware weke şûrekî mirov p'arzin bike, weke genimekî mirov serat bike.*
*R̂êya şêx Adî ji me r̂a r̂ast kirî ne xware,*
*Heçî hindava dîn û Tawisî melek'î bi k'erbe, yî bi k'îne, yî bi qehre,*
*Tawisî melek' dibêje navbera: «Min û wî ĥeftê ĥezar dîware!»*
*R̂oja ĥizurî ĥeqê wî însanî bavêjin agirê*
*dijware, Wî ne gazî, ne haware.*
*R̂êya şêx Adî, ilmê şêx Adî mezine ne biçuke,*
*Gelî bira heçî însanê hindava dîn û dîyanetê xwe de dilê xwe p'aqij neke, neke sûke,*
*Ew li axretê ne dibe zava, ne dibe bûke.*
*Derwêş Ĥebîb dibêje: «Dilê min li wê yekê mabû moĥt'ace,*
*Gelî milet, gelî êzdiya silt'an Êzîd ji me r̂a îlace[1061],*
*Ji me r̂a delqe[1062] û t'ace».*
*Delqe û t'ac li mabû,*
*Û nîvê qalbê derwêş Ĥebîb dîn û dîyanetê wî ne xwezî bi wî be jê mabû,*
*Delqe û t'ac li basê Xaliqê me bû,*
*R̂ojhilat, û R̂ojava, û qublet, û şemaliye,*
*Ĥemû ser destê Xwedê,*
*Û silt'an şêx Adî, û silt'an Êzîd ye,*
*Atrosa[1063] dîyanetê xwe nekin.*
*Heçî însanê girîvaneke r̂astî li bere,*
*Gereke mirov ji dîyanetê xwe bike bawere,*
*Heçî ji dîyanetê xwe neke bawere,*
*R̂oja ĥizurî ĥeq ĥesabekî zafî zorî li sere»,*

*«Xwedanê k'eremê, pêşîya gelîyê Laleşê, me di ĥalê sinetê, banga r̂eĥmetê[1064].*
*Sed r̂eĥma Xwedê li dê û bav hazir, û guhder, û vê cemae'tê!»*

[1059] *yar û birayê axiretê*
[1060] *êqîn*
[1061] *înanc*
[1062] *dirk*
[1063] *etras*
[1064] *r̂ahmet*

**şaxê – 2**[1065]

**S. 1** *1 Ya derwêş, sera ji xema hilîn,*
*2 Borê lenga betilîn,*
*3 Çendî li ĥezreta silt'an Êzî wesilîn.*

**S. 2** *1 Çendî wesilîn li ĥezretê,*
*2 Xas bi tirsîn ji ĥeybetê,*
*3 Milkê xasa baẍê cinetê.*

**S. 3** *1 Li cinetê ezî maşxwerim,*
*2 Bi ĥimeta te deng dikirim,*
*3 Piştî yerê xwe ezî hogirim.*

**S. 4** *1 Hogir bila bêne meydanê,*
*2 Bînin xwedanê sebirê û sikanê,*
*3 Nefsê k'ibîr bigrin bavêne zêndanê.*

**S. 5** *1 Bifikirin li wan r̂aza,*
*2 K'ifş bikin pisêt pilinga ji pisêt baza,*
*3 Çawîş mezin li meydana meleka deng dike,*
*4 Dikin ĥal û gaze-gaze.*

**S. 6** *1 Ya silt'an Êzî, ez li ba te bi hinerim,*
*2 Bi ĥimetê deng deyn dikirim,*
*3 Piştî yarê xwe, ezî hogirim.*

**S. 7** *1 Hogirim, hogirînim,*
*2 Ezî şahîme, dengê xwe hiltînim,*
*3 Ez hatim dîndara silt'an Êzî bibînim.*

**S. 8** *1 Ez hatim bibînim wê dîndarê,*
*2 Ez kulîlka şîn bûme li vê beharê,*
*3 Hatim li gel yarû birêt axretê bikim bazarê.*

**S. 9** *1 Ez hatim bikim bazara mîra,*
*2 Ĉav nedin xirabîya, û derev, û wîra,*
*3 We'de hate dê dahirbit mehdî feqîre.*

**S. 10** *1 We'de hatîye dê dahirbit mehdî mîra,*
*2 Hûn xebîr bin ji me'niyan û kêre,*
*3 Destê silt'an Êzî k'oteke li ser şer̂an û xêre.*

**S. 11** *1 Ez derwêşekî bi r̂ê me,*
*2 Xewasê beĥrê me,*
*3 Mişterîyê silt'an Êzî û r̂ê me.*

**S. 12** *1 Derwêşekî gedayî me,*
*2 Bi xwe şahî me,*
*3 Ez îro sibakê li dîwana îlaĥî me.*

**S. 13** *1 Derwêşekî bab ĥalim,*
*2 Xweş sûkim*[1066]*, xweş sewalim*[1067]*,*
*3 Xweş wergêr̂im, xweş delalim.*

**S. 14** *1 Derwêşekî weha me,*
*2 Xelefekî nû dame,*

---

[1065] [2] (rr. 360–363)
[1066] *sukim*
[1067] *siwalim*

*3 Mêra-meleka bi r̂enga dame.*

**S. 15** *1 Mêra-meleka wê dibê te,*
*2 Li pêşîya me danabû agir, û doj, û p'ête,*
*3 Îro sibê, qismetê xwe ji P'adşê xwe divête.*

**S. 16** *1 Çî dojehke tenge,*
*2 T'ijî agir û t'ijî p'erenge*[1068]*,*
*3 Ciyê xelqê xamî, berdunekî, lenge,*

**S. 17** *1 Çî dojehke ẍedare,*
*2 T'ijî agire, û t'ijî p'erenge,*
*3 Ciyê xelqê xamî berdunekî lengî înk'are.*

**S. 18** *1 R̂oja ĥerfa derwêş Ĥebîb dahirî,*
*2 Momin dil pê k'etirî,*
*3 Ĥeqê bi destê silt'an Êzî, ĥeqê wî betilî.*

**S. 19** *1 Mominî şa bûn, dilê min gote te wê cewabê ji e'wile,*
*2 Ĥeqê ji destê silt'an Êzî, bi ĥeqê wî betile.*

**S. 20** *1 Gelî bira bixebitin, nabine wê gul û di k'ê jê ye,*
*2 Tu jî îro sibekê, qisetê xwe ji P'adşayê xwe dive ye.*

**S. 21** *1 R̂êya şêx Adî bi em nahîne,*
*2 Hincîyê r̂asta, xerfê şêx Adî, mala Adî ye,*
*3 Yî bi k'erbe, yî bi qehre, yî bi k'îne,*
*4 Nav bêna wî û silt'an Êzî, ĥeftî ĥezar ĉiyayê befrîne.*

**S. 22** *1 R̂êya şêx Adî ye r̂aste, ne ye xware*[1069]*,*
*2 Hincîyê bi xerfê şêx Adî mala Adî ye,*
*3 Bi k'erbe, bi qehre, bi k'îne,*
*4 Nav bêna wî û silt'an Êzî, ĥeftî ĥezar diware.*

**S. 23** *1 R̂êya şêx Adî mezine, ne ye piçuke,*
*2 Hincîyê dilê xwe bo mala Adî ye, li axretê neket sûke,*
*3 Li axretê ne dibit zava, ne dibit bûke.*

**S. 24** *1 Dilê min li wê û vê yekê yî moĥt'ac bû,*
*2 Silt'an Êzî delq*[1070] *û t'ac li bo dilê minwe bû,*
*3 Delq û t'ac libasê xaliqê me bû.*

**S. 25** *1 Hincîyê girîvanekî r̂astî li bere,*
*2 Ĥesabekî zorî li sere.*

*T'emametîya silt'an şêx Adî û baqî Ellaĥ!*

## 46. QEWLÊ LAWÊ P'ÎRAN[1071; 1072]

*Bi desturî Xudê*
**S. 1** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Heyameka denga me bê,*

---

[1068] binêr: *piling*
[1069] *xar*
[1070] *diliq*
[1071] Laliş 25 *QEWLÊ LAWÊ P'ÎRAN* (rr.175-190) Belavkirin: xizmatk'ar/E'lo şêx Xelef
[1072] http://www.ezdixandi.com/forum/38-807-1 *QEWLÊ LAWIKÊ P'ÎRANO* Belavkirin: Bedelê feqîr Ĥecî

*3 Yar hene dikin dibên, belê te me'ne hene deng bi nîşan.*

**S. 1** *1 Hey lawekî p'îrano, heyameka denga me bê,*
*2 Te me'nî heyne ceng bi nîşan.*

**S. 2** *1 Hey lawekî p'îrano: heyameka me bê te,*
*2 Yar hene dikin dibêne,*
*3 Belê te li nik li ȓikêb û dest li Celewe,*
*4 Ĉav li zure mue'leq stêȓa wî dimîne.*

**S. 2** *1 Hey lawekî p'îrano, yarî hene ĥeya dikin,*
*2 Denga dibên te pêwanî ȓikêba,*
*3 Destê wan yî li Celewa,*
*4 Ĉavê wan mue'leq li stêȓa dimînî li hewa.*

**S. 3** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Me şêre siwarek divê ji malêt Adîya,*
*3 Me di medê da yek dive ji mêra û meleka bor berdane,*
*4 Bora bînin bor bestî hav lê dibirînin.*

**S. 3** *1 Hey lawekî p'îrano, min cindî siwarek divê ji malêt Adiya,*
*2 Û min minêdîyek ji mêra meleka biçe ser banêt bilind bang didêrî,*
*3 Bor berdaye bora binî bo bestîya havil birî.*

**S. 4** *1 Hey lawekî p'îrano: şîr derk'etin ji pêşa,*
*2 Baz fiȓîn ji mewtena,*
*3 Feqîrê k'eremdar ȓabû ji ber berî mêrave.*

**S. 4** *1 Hey lawekî p'îrano, şêr derk'etin ji bîşa,*
*2 Bazî fiȓîn ji mewtina,*
*3 Feqîrêt xwedan*[1073] *k'erem ȓabûn ji berberêt mêrava.*

**S. 5** *1 Hey lawekî p'îrano: me gelek aşiq dîtin di zergun,*
*2 Te ez hingavtim bi kevanekî qudretê,*
*3 Bi tîreke me'rîfetê,*
*4 Bi peyîveke ji peyîvên heqîqetê.*

**S. 6** *1 Hey lawekî p'îrano: dinya bi dilê k'ê dimîne,*
*2 Bi dilî ne (layîqa) û pezka kuvî dimîne,*
*3 Nalibinê min tên weke nalînê di birîne,*
*4 Erzinkê min tîn weke erzinkî dil bi kuvane,*
*5 Xozî em jî li pê wan erzink û nalîna çubane.*

**S. 5** *1 Hey lawekî p'îrano, ev dinya bi çî dimînî?*
*2 Bi dilê ne layîqa û aşiqê peza k'uvî dimînî.*
*3 Nalînêt min tên weke yê dil bi birîna,*
*4 Û erzinkêt min tên weke yê dil bi kovana,*
*5 Xwezî li pê wan nalîn û erzinka ez biçûma.*

**S. 7** *1 Lawekî p'îrano :*
*2 Heke te ne gevan k'êşayî, te ne tîre meşiyayî,*
*3 Ne birîne xuyayî, te ne xune ȓijyayî,*

**S. 6** *1 Hey lawekî p'îrano, heke ĥeqe te ne kivanî k'işandî.*
*2 Û heke te ne tîrek meşyandî,*
*3 Û heke te ne birînek xweyandî.*

**S. 8** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Heke li te ne kivanî k'işandî, li te ne birîne xuyandî,*
*3 Û heke li te ne xune ȓijandî.*

**S. 7** *1 Hey lawekî p'îrano, heke te ne kivanî k'êşayî.*
*2 Û heke te ne birîne xweyayî,*
*3 Û heke te ne tîre meşyayî.*

[1073] *xudan*

**S. 9** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Her kîlekî kalyek, her milekî alyek,*
*3 Ewe bû ĥalê kirim gestiyê zimanî,*
*4 Heta kalekala cegerê nede te, qumê bê t'imanê.*

**S. 8** *1 Hey lawekî p'îrano, her kêlekê kalyek,*
*2 Û her milekî nalyek.*
*3 Ew ĥala besta zimanî,*
*4 Ĥeta kirim nek'evne binê didanî,*
*5 Kale kala cigeȓê ne birî ji batmanê.*

**S. 10** *1 Ewe bû ĥalê bê hîvî bê,*
*2 Heta kalekala zimên neke hîvî,*
*3 Heta kirim gestê ziman, li ziman neke nivî*[1074]*,*
*4 Kalekala cegerî qet li ser nake hîvî.*

**S. 9** *1 Hey lawekî p'îrano, ew ĥalê wî bê hîvî,*
*2 Û ĥeta kirma didanê wî jî nekire nîvî,*
*3 Kale kala cigeȓê ne birî ji hîvî.*

**S. 10** *1 Hey lawekî p'îrano, ev dinya bi çî dimînî?*
*2 Bi dilê ne layîqa dimînî,*
*3 Mîna berxekî li beharê û seyadê wî ji ber makê hilînî.*

**S. 11** *1 Hey lawekî p'îrano :*
*2 Heke tu n yî mal hiştî, û heke tu neyî dil birijtî,*
*3 Û heke tu neyî gîyan kuştî, belê tu neyî xun ȓijtî.*

**S. 11** *1 Hey lawekî p'îrano, heke tu ne yî mal hiştî,*
*2 Û heke tu ne yî dil birijtî,*
*3 Û heke tu ne yî gîyan kuştî.*

**S. 12** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Mal hiştiya, malê xo divê, û dil birijtiya, dilê xo divê,*
*3 Û gîyan kuştiya, gîyanê xo divê, û xun ȓijtiya, xuna xo divê.*

**S. 12** *1 Hey lawekî p'îrano, mal hiştîya, malê xwe divê,*
*2 Û dil birijtîya, dilê xwe dive,*
*3 Û gîyan kuştîya, gîyanê xwe divê.*

**S. 13** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Diniya bi dilê k'ê dimîne, diniya dilê aşiqa peza k'uvî dimîne,*
*3 Wekî berxekî beharê, gur bêt û bidevîna.*

**S. 14** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Her kêlekê kalyek, her milekî alyek.*
*3 Mêratiya mîra ȓastîya bi zimêne, belê sunde bi silt'êne,*
*4 Ewe bû xilmeta te pê gîyan dilî.*

**S. 13** *1 Hey lawekî p'îrano, her kêlekê kalyek,*
*2 Û her milekî nalyek.*
*3 Belê te ne ȓastîya zimêne,*
*4 Û te ne sunda bi silt'êne*[1075]*,*
*5 Belê eve bû xilmeta te lê gîyan dida.*

**S. 15** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Wekî mert'al ser mila firandî,*
*3 Te maş û canbaqî ji mîrê xo distandî,*
*4 Lew mîrê mezin berê xo ji te geȓandî.*

**S. 14** *1 Hey lawekî p'îrano, wextê te mert'al havêt nêva mila û te xiȓand,*

---

[1074] *nifî*
[1075] *sultên*

*2 Û te maş û cembeqî ji mîrê mezin distand,*
*3 Lew mîrê mezin berê xwe ji te werdigeȓand.*

**S. 16** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ez ȓojekê çome meydana mezine melika, ev dav binehîn,*
*3 Tê hebun k'or-k'or xendek di k'ur, di tarî,*
*4 Gerdeneke gêla bicef bicefîn,*
*5 Belê, lew serê ȓimê wan dişkestîn.*
**S. 15** *1 Hey lawekî p'îrano, zemanekî birime mezin meydana meleka,*
*2 Min kor dîtin bi dav û dahol,*
*3 Xendek hebûn bi nehîn,*
*4 Min zor di wan kor û xendekada dîn,*
*5 Ewin yêt ser geȓdenî û gêla cehnîv bi nehîn, 6 Belê ser ȓimê wan şkestî.*

**S. 17** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Leng nebe da leng, te nexwînin,*
*3 To pê di lenga li nik li ȓikêba namînin,*
*4 Destê wan şîra naqepînin,*
*5 Xam û înk'ar, û leng û berdulenga ji ber stîrka daxuşînin,*
*6 Dilê me û çendî aşiq û xudan îman û xwedan erk'an*
*ji mîr û miĥbeta silt'an Êzî xalî namînin.*
**S. 16** *1 Hey lawekî p'îrano, leng nebe daleng, te nexwînin,*
*2 Xwe bi ȓima ȓastîyê venê, bila te bi dest ne vekişînin,*
*3 Pêt lenga di ȓikêba da namînin,*
*4 Destê lenga sêfa naqefilînin,*
*5 Xam û înk'ar, leng û berdoleng dê li ẍurbetêt giran da mînin,*
*6 Belê dilê xwedan îman û xwedan erk'ana çu cara*
*ji mêr û muĥbeta silt'an şêx Adî xalî namînin.*

**S. 18** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ȓojekê bora ji vê xirabe fênê der dik'işînin,*
*3 Ȓişme û kîwana ser serê ke'yîla di daxuşînin,*
*4 To pê di lenga li nik li ȓikêba namînin,*
*5 Destê wan şîra na qepînin,*
*6 Wê xam û înk'ar û berdulenka ji ber sitrka di xuşînin,*
*7 Dilê me û çendî aşiq û xudan îman û xwedan erk'an,*
*ji ber mîr û miĥbeta silt'an silt'an Êzî xalî namînin.*
**S. 17** *1 Hey lawekî p'îrano, ȓojekê dê pêyêt lenga ji ȓûyê vê xirabe fênîyê k'işînin,*
*2 Û dê zîna ser kivala ȓa xweşînin,*
*3 Û xam û înk'ar leng û berdoleng dê di ẍurbetêt giran da mînin,*
*4 Belê dilê xwedan îman û xwedan erk'ana,*
*ji mêr û muĥbeta*[1076] *silt'an şêx Adî namînin.*

**S. 19** *1 Hey Lawekî p'îrano:*
*2 Ȓojekî ez çome meydana mezine melika, ezî cindî,*
*3 Borê min borî cindîya, û silî min silê ceng ĉîya.*
**S. 19** *1 Hey lawekî p'îrano, zemanekî ez birime mezin meydana meleka,*
*2 Min dît ezî cindî, û borê min borê cindiya,*
*3 Û silyêt min p'êlê dikirin silîyêt ceng ĉiya.*

**S. 20** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Di me meydana mezine melika, min dî ez neyî cindî,*
*3 Borê min ne borê cindiya, silê min ne silê ceng ĉîya.*
**S. 20** *1 Hey lawekî p'îrano, zemanekî ez birime mezin meydana meleka,*
*2 Ez ne yî cindî, borê min ne borê cindiya,*
*3 Û silyêt min p'êlê dikirin ne silyêt ceng ĉiya.*

[1076] *muhebet*

**S. 21** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 R̂ojekê ez birime nav berdulenge,*
*3 Borê min bire nav lenge, belê, silê min derk'eftin silê xerbende.*
**S. 21** *1 Hey lawekî p'îrano, ez birime berdolenge,*
*2 Borê min k'êşane ber xerbende, silîyêt min bûne silîyêt lenge,*
*3 Hey ho te malik nebit wêran, te şermezar kir Lawikê p'îre.*

**S. 22** *1 Hey lawekî minî p'îran, te malik nebit wêran,*
*2 Belê, lew te şermîn kir bû lawikê p'îran.*

**S. 23** *1 Her yî kinike bore teyî, avê bidê bi see'diye,*
*2 Cehî bidê bi qîyas,*
*3 Bejneke teye bilinde gerdeneke teye gaz,*
*4 R̂ast bazoj û bi r̂êde.*
**S. 18** *1 Hey lawekî p'îrano, here kind neke borê teye,*
*2 Avê bidê bi sheet, cehî bidê bi qiyas*[1077]*,*
*3 Bejneke te ye bilind, ger̂deneka te ye xas,*
*4 R̂ast p'ajo bi r̂ê da, êba serê sumê derke,*
*5 Ji ew paş borê xwe li mezin meydana meleka bi sere derke.*

**S. 24** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Bêje mêlê çi kir?*
*3 Hat û xo di dilê mîr Birahîm de bi cî kir.*
*4 Ew mîr Birahîmê Adema Xor̂istan t'erk kir.*
**S. 22** *1 Hey lawekî pîrano, bir̂ênê mêlê çî kir?*
*2 Xwe di dilê silt'an Birahîm bi cî kir.*
*3 Lew silt'an Birahîm Xor̂istan t'erk kir.*

**S. 25** *1 Mîr Birahîm t'erk kir Xor̂istane.*
*2 Hat û nedera xo dida xasane,*
*3 Lew buwe r̂êberek ji wan r̂êberane.*
**S. 23** *1 Hey lawekî p'îrano, silt'an Birahîm t'erk kir Xor̂istane,*
*2 Nedera xwe da nedera xasane,*
*3 Lew bû r̂êzanekî ji wan r̂êzane.*

**S. 26** *1 Mîrê mêra,*
*2 R̂onaya dilêt feqîre, bar tê nîne çu cerg kiwîre,*
*3 Mêr û meleka r̂onaya dilêt aşiqa,*
*4 Bar tê nîne xudanêt şika.*
**S. 24** *1 Hey lawekî p'îrano, mêra mîre!*
*2 R̂onaya dilêt feqîre!*
*3 Bar tê nebit çu cerg k'ûre.*

**S. 25** *1 Hey lawekî p'îrano, mêra meleke,*
*2 R̂onaya dilêt aşiqe!*
*3 Bar tê nebit xwedanêt şike.*

**S. 27** *1 Ya mêra û meleka fesale hincî kesê ew here bale,*
*2 Qewî dest kuja wî a ĥelale.*
**S. 26** *1 Hey lawekî p'îrano, mêra meleka fesale,*
*2 Û ciwanê biçite bale,*
*3 Destkuja wî ye ĥelale.*

**S. 28** *1 Mêr û meleka ĥeqîqete hincî kesê balfe diherete,*
*2 Belê ji e'yba betal dik'ete.*
**S. 27** *1 Hey lawekî p'îrano, mêra meleka ĥeqîqete,*

---

[1077] *qîyas*

*2 Û ciwanê bi bal ve diherite,*
*3 Û p'îrînyekê lê dikete,*
*4 Dê ji êbê betal ke te*[1078].

**S. 29** *1 Ewî betal dike ji e'ybê,*
*2 Gelî bira bi hew r̂a meken x̂eyîbê,*
*3 Li ba hev r̂unên bi heq r̂îya silt'an Êzî,*
*4 P'êk r̂a biken ĥisêbê.*

**S. 28** *1 Hey lawekî p'îrano, dê betal ket ji êbê,*
*2 Û di pişt yek û duda meken xêbê,*
*3 Lêk r̂ûnên bi ĥeqîya şêx Adî û melik şêx Sin, vêk r̂a biken ĥeq û ĥisêbê.*

**S. 30** *1 ......................................................................... ,*
*2 Mêra û meleka bikeve li sinetê, ne li xilfetê,*
*3 Îro dinya ye, sibe bangî axretê.*

**S. 29** *1 Hey lawekî p'îrano, banga mine bo xwedanêt me'r̂îfetê,*
*2 Mêra meleka bik'efte sinetê, nek'efte xulfetê,*
*3 Îro dinya ye, sibe*[1079] *bangê axretê.*

**S. 31** *1 Mêra û meleka bik'eve li xwedan e'sil, ne li bê e'silî,*
*2 Xwedan e'sil di safîne weke zêrin,*
*3 Hincîya qenc ji xwera hildigrin ji xwere vedişêrin,*
*4 Bê e'sil ne hildigrin û ne vedşêrin,*
*5 Ew ser xaniya dik'evin û bang didêrin.*

**S. 30** *1 Hey lawekî p'îrano, banga mine bo xwedan e'sila, ne bo bê e'sila,*
*2 Xwedan e'sil bo xwe vedşêrin,*
*3 Belê bê e'sil nizanin bo xwe veşêrên, diçine ser banêt bilind û bang didêrin.*

**S. 32** *1 Silî heyne çekê cindiya, dilê aşiqa xalî nabe ji hîviya,*
*2 Malê mezelgeha çu car xalî nabin ji pisê r̂îispîya.*

**S. 31** *1 Hey lawekî p'îrano, sil nabin çekêt cindîya,*
*2 Xalî nabit ji dilêt şewqîya,*
*3 Mêr û meleke xalî nabin ji mezelêt pis Adîya.*

**S. 33** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 R̂ojekê birime meydana mezine meleka, bi dav, bi nehîn,*
*3 Tê heyne xendek di k'ûr, di tarî,*
*4 Min li wan xendeka dîtin feqîr di r̂eş, di nurînî,*
*5 Belê, wê r̂oniştîne li suĥbeta wî silt'anî.*

**S. 32** *1 Hey lawekî p'îrano, zemanekî birime mezin meydana meleka,*
*2 Min sê k'or didîtin di k'ûr di tarî,*
*3 Min cindîyêt mîr didîtin di dîwanî,*
*4 Ew di mejxulin bi sur̂a silt'anî.*

**S. 33** *1 Hey Lawekî p'îrano, li te cayîze mêrê derwêş*
*2 Sê borêt wî di r̂abest hebin şehekî cergehî,*
*3 Kimêlekî meydanî, bozekî r̂oja qet'ilê.*

**S. 34** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Hola mine dûre dirêj,*
*3 Min gelek xuden îman û erk'an dîtin di mestin, ne di gêj,*
*4 Ew li ber borê xo dibestîne ji mêj.*

**S. 36** *1 Hey lawekî p'îrano, hola mine dure di r̂êj,*
*2 Min cindîyêt mîr dîtin di mest, ne di gêj,*
*3 Borê xwe bestibûn ji mêj.*

[1078] *betal kete*
[1079] *sube*

**S. 35** *1 Hey lawekî minî p'îrano:*
*2 Nav namîne maslîpekê jîyêt kanîye,*
*3 Giya namîne, malimêrge lê ji yê e'silîye,*
*4 Belê, malê mezelgeha xalî nabin ji wan r̂u sipîya.*
**S. 34** *1 Hey lawekî p'îrano, av namînit ile selîbek ji selîbêt kanîya,*
*2 Û gîya jî namînit, ma li mêrgekê ji mêrgêt e'silîya,*
*3 Mêr û meleke xalî nabin ji mezelêt pis ax̂îya.*

**S. 36** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Qence mêr̂î derwêş hebe sê bore dida bestî,*
*3 An şehê cergî, an kimêtê meydanê, n bor̂î r̂oja kujtinê.*

**S. 37** *1 Hey lawekî minî p'îrano:*
*2 Heke tu neyî t'erka mal,*
*3 Û heke te sur̂ek nebel bal,*
*4 Tu bêje min tu bi cî bi sur̂a mîr bîye xeyal.*

**S. 38** *1 Hey lawekî p'îrano: heke te ne erzinke li lêvanê,*
*2 Û te ne qewete li baskanê,*
*3 Belê, tu dê çî keyî, û dê biçî li ser coqabê.*
**S. 39** *1 Hey lawekî p'îrano, heke te ne ser zenge lêvano,*
*2 Û heke te ne cehwer̂î li baskano,*
*3 Û heke te ne alînga nêva ĉavano,*
*4 Tu dê çawa bi sur̂a P'adşay[1080] bîye ser coqano.*

**S. 39** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu neyî aşiq,*
*3 Û heke tu neyî maşuq,*
*4 Belê, bêje min tu dî çî key û dê bi çî bibiye ser coq.*
**S. 37** *1 Hey lawekî p'îrano, heke tu ne yî aşuq,*
*2 Û heke tu ne yî m'eşoq,*
*3 Û heke te stêrek nebit li foq,*
*4 Tu dê çawa bi sur̂a P'adşay bîye serê coq.*

**S. 40** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu neyî dil bi kul,*
*3 Û te ne ĉav di zil, te ne zimanî şil,*
*4 Tu dî çî key, û tu dê b icî bibiye miraz ĥasil.*
**S. 38** *1 Hey lawekî p'îrano, heke te ne dilî kul,*
*2 Û heke te ne ĉavî zil,*
*3 Û heke te ne zimanî şil,*
*4 Tu dê bi k'ê key, û tu dê çawa bi sur̂a P'adşay bîye miraz hasil.*

**S. 41** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Dê coqeta ji yêt zaretê p'îra vegerînin,*
*3 Ew pisê p'îra li dê evanên bilind dik'evin û dilezînin,*
*4 Gilî û gazinê vê xirabe fînê li ba mîrê xo digehînin,*
*5 Tî pê lenga li nik li r̂ik'êba namînin destê wan şîra naqepînin,*
*6 Xam, û înk'ar, leng û berdulenga ji ber stêrka da dixuşînin,*
*7 Dilê me û çendî aşiq û xudan îman û erk'an ji mêr û miĥbeta silt'an Êzî xalî namînin.*
**S. 40** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂ojekê coqetêt zîyareta,*
*dê pisêt p'îra di berberê mîrave xuşînin,*
*2 Pisêt p'îra bê gilî û gazindêt vê xirabe fênîyê li ba mîrê xwe gehînin,*
*3 Û pisêt p'îra dê li ba mîrê xwe r̂ûspî mînin,*
*4 Xam, û înk'ar, û leng, û berdoleng, dê di x̂urbetêt giran da mînin,*
*5 Dilê xwedan îman û xwedan erk'ana çu cara*
*ji mêr û muĥbeta silt'an şêx Adî xalî namînin.*

[1080] *pedîye*

**S. 41** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂ojekê coqetêt zîyareta,*
*sicadêt kevne berana dê di berberê mêrave xuşînin,*
*2 Dê kevne berana ji t'oz û xubarêt vê xirabe fênîyê da weşînin,*
*3 Û kevne beran dê bi dêrevanêt bilind ve lezînin,*
*4 Û kevne beran dê gilî û gazinêt vê xirabe fênîyê l iba mîrê xwe gehînin,*
*5 Û kevne beran dê li ba mîrê xwe r̂ûspî mînin,*
*6 Xam û înk'ar, leng û berdoleng dê di ẍurbetêt giran da mînin,*
*7 Dilê xwedan îman û xwedan erk'an çu cara*
*ji mêr û muĥbeta silt'an şêx Adî xalî namînin.*

**S. 42** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ew dur̂a r̂ona di e'nya te da,*
*3 Ez nizanim ne te li t'emaya dinê da,*
*4 Ne te li r̂eza nefsê da.*

**S. 42** *1 Hey lawekî p'îrano, k'a ew dur̂a r̂on di e'nya te da?*
*2 Ez nizanim ne te li temaya malê dinê da,*
*3 Û ne te r̂e da nefsê da.*

**S. 43** *1 Belêkem, sed car belê, ew dur̂a r̂on ya di e'nya min da,*
*2 Ne li t'emaya dinê da, û ne li r̂eza nefsê da,*
*3 Belê, sewd û felekê min li bal mîrê min xirawin*
*4 E'cel gurik bû, hat xo lê da.*

**S. 43** *1 Hey lawekî p'îrano, belêkem belê ew dur̂a r̂on di e'nya min da,*
*2 Ne min li temaya malê dinê da, û ne min li r̂e da nefsê da,*
*3 Hew çerx û felekêt min li ba mîrê min man, felek gur bû, hat û xwe lê da.*

**S. 44** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Wî r̂ojekê sicadê van kevne berane ji ber berê mêra hilînin,*
*3 Ew kevne beran bidêevanê bilind dikevin û dilezînin,*
*4 T'oz û ẍebarê bi ser vê dinyayê da diweşînin,*
*5 Beranên r̂usipî li ba mîrê xo dimînin.*

**S. 45** *1 Hey lawekî minî p'îrano:*
*2 R̂ojekê çome meydena mezine melika, min dîtibû zore siware,*
*3 Di berejêrin ser jêr di anîne xware,*
*4 Sixumet ev vêniya ẍedare.*

**S. 46** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 R̂ojekê çome mezine meydena melika, min zar siwar li wê dîne,*
*3 Di ser jêrin bere jêr anîne,*
*4 Belê, sixumet ev vêniya derwîne.*

**S. 47** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Min ĥezar li vê dinyayê dîtin di boẍ, di bet'er, û bi nav,*
*3 Li dîwana Şîxadî û milik Şîxsin dike, û di k'are, û dibê nav.*

**S. 44** *1 Hey lawekî p'îrano, min gelek li vê dinyayê dîtin bi nav,*
*2 Û li axretê dibê nav.*

**S. 45** *1 Hey lawekî p'îrano, min gelek li vê dinyayê dîtin di bê nav,*
*2 Û li axretê bi nav.*

**S. 48** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Min ĥezar li vê dinyayê dîtin di şikestî, di bestî dibê nav,*
*3 Belê, li dîwana miĥfelê dîtin di r̂ûsipîye û bi nav.*

**S. 49** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu t'eliba şêra li min dikî,*

*3 Şêr wê li bîşê tarî, meskenê şêra bîşê tarîne.*
*4 Şêr wê li qatê ȟeta ȓoja qîyametê.*

**S. 48** *1 Hey lawekî p'îrano, t'elbeya şêra bike, qest bike bîşêt tarî,*
*2 Bîşêt tarî meskenê şêra,*
*3 Şêr wê li qatê ȟeta ȓoja om il-qîyametê.*

**S. 50** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu t'eliba baza li min dikî,*
*3 Meskenê baza wê dêdevanê bilindin, baz wê li qetê,*
*4 Heta ȓoja qîyametê.*

**S. 49** *1 Hey lawekî p'îrano, t'elibeya baza bike, qest bike dêrevanêt bilind,*
*2 Dêrevanêt bilind meskenêt baza,*
*3 Baz wê li qatê ȟeta ȓoja om il-qîyametê.*

**S. 51** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu t'eliba mîr li min dikî,*
*3 Dilê aşiqa meskenê mîre: mîr wê qatê,*
*4 Heta ȓoja qîyametê.*

**S. 46** *1 Hey lawekî p'îrano, t'elbeya mîr bike, qest bike mezelêt p'îra,*
*2 Mezelêt p'îra meskenêt mîra,*
*3 Mîr wê li qatê ȟeta ȓoja om il-qîyametê.*

**S. 52** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Heke tu t'eliba ȟakima li min dikî,*
*3 Dilê derwêşa meskenê ȟakima,*
*4 Ȟakim jî wê li qatê heta ȓoja qîyametê.*

**S. 47** *1 Hey lawekî p'îrano, t'elbeya ȟakim*[1081] *bike, qest bike dilêt momina,*
*2 Dilêt momina meskenê ȟakima,*
*3 Ȟakim wê li qatê ȟeta ȓoja om il-qîyametê.*

**S. 53** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ȓojekê t'erqîn wê k'eve E'rşane,*
*2 Ẍibar wê keve e'rdane.*
*3 Hezêmeke mezin wê k'ewe goristane, bira ban dike birane,*
*4 Hûn werin biken xêrane, berê ȓojeke hûn diçin ji virane,*
*5 Cuvan ker sekinî li cê cuvane.*

**S. 50** *1 Hey lawekî p'îrano, ȓojekê t'erqênîyek dêk'efte E'rşane,*
*2 Û zumênîyek dêk'efte qebirstane,*
*3 Ȓuȟ dê kevne ber hestîyan û xiwane,*
*4 Bira dê bakene birane, da bo xwe bikeyin xêrane,*
*5 Îro ese, li me axir zemane.*

**S. 54** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ȓojekê t'erqîn li E'rşan de bî,*
*3 Ẍibare li çiyan de bê, ne kesî kesa dibî,*
*4 Ne babê pisan de bî,*
*5 Ne ser xozima bi wê ȓuȟa nuqsan dibî.*

**S. 51** *1 Hey lawekî p'îrano, ȓojekê axir zeman dibî,*
*2 Û t'erqênî li E'rşan dibî,*
*3 Û xubare li ĉiyan dibî,*
*4 Û ne kesî kesan dibî,*
*5 Û ne babê pisan dibî,*
*6 Û xam û înk'ar, leng û berdoleng li wêderê nuqsan dibî,*
*7 Haweke yarû birêt axretê bi saẍî bi ser gunehk'arêt biran dibî.*

**S. 55** *1 Îlahîo, li wê ȓojê:*

[1081] *hêkim*

*2 Li zaviyê, li zînara, li wê xirojî,*
*3 Silt'an Êzî dê bi çengilî gunehbara gire, havêje dojê.*

**S. 35** *1 Hey lawekî p'îrano, min zênare li wê r̂ojê,*
*2 Li zavîyê li zinarê li axir r̂ojê,*
*3 Dê bi çengilê x̂afil û zalima girin û havêjne binê dojêh.*

**S. 56** *1 Go hey lawekî p'îrano:*
*2 Bira dê bira ji derê dojêve r̂ak'işînin,*
*3 Zebênî ber bi gunehk'are ve di tên û dilezînin,*
*4 Şehbitê gelek mêra û cîhnîkê gelek jina bi destê zebîniya ve dimînin,*
*5 Bila xam û înk'ar û berduleng di x̂urbetêt giran de dimînin.*

**S. 52** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂ojekê dê p'ira zirav di derê dojêh r̂a r̂ak'işînin,*
*2 Û zebênî dê bi gunehk'ara ve lezînin,*
*3 Şubêt gelek mêra û cênîkêt gelek hurmeta dê di destê zebênîya da mînin.*

**S. 57** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ewe r̂oja hezîm dibê,*
*3 Qazî bi xo k'erîm dibê,*
*4 Ne sed xozma borê r̂uĥa derewîn dibê,*

**S. 53** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂ojekê xutbê dibî,*
*2 Qazî bi xwe Xwede dibî,*
*3 Ĥezar pê şun bi yekî dibî,*
*4 Ne xwezîya r̂uĥa înk'ar*[1082] *dibî,*
*5 Sed xwezma mine bi wê r̂uĥê, e'melê wî çê dibî.*

**S. 54** *1 Hey lawekî p'îrano, ewê r̂ojê ĥezîm*[1083] *dibî,*
*2 Û qazî bi xwe k'erîm dibî,*
*3 Ne xwezka bi r̂uĥa derewîn dibî,*
*4 Xwezka mine bi wê r̂uĥê emîn dibî.*

**S. 58** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*2 Ewe r̂oja Cebêr dibê, k'ursiya P'adşa li xwar dibê,*
*3 Belê, sed xozma bi wê r̂uĥa înk'ar dibê.*

**S. 55** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂ojekê Cebar dibî,*
*2 K'ursîya P'adşa yî li xiwar dibî,*
*3 Ne xwezka r̂uĥa înk'ar dibî,*
*4 Xwezka mine bi wê r̂uĥê xwedan qiryar dibî.*

**S. 59** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ewe r̂oja xutbê dibê, k'ursiya P'adşa li e'rdê dibê,*
*3 Qazî bi xo Xudê dibê, ne kesî kesan dibê, ne babî pisan dibê,*
*4 Hezar p'ê li dewsa p'iyekî dibê.*

**S. 60** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ewe r̂oja qîyametê kesek bi kêrî kesî ne tê,*
*3 Ji x̂îrî Şîxadî ĥeqîqetê p'îrekî me'rîfetê,*
*4 Hosta û merebî, yar û birêt axretê,*
*5 Îro dinyaye sibehî bangê axretî.*

**S. 56** *1 Hey lawekî p'îrano, r̂oja om il-qîyametê,*
*2 Kes bi kêr kesî ne tê,*
*3 Yan şêxekî ĥeqîqetê,*
*4 Yan p'îrekî me'rîfetê,*
*5 Şêx û pîr, hosta û merebî, yarû birêt axretê,*
*6 Ew ferin bo me û sinetê*[1084]*,*
*7 Îro dinya û sibêy bo bangê axretê.*

---

[1082] *inkêr*
[1083] *hezîm*
[1084] *sûnet*

**S. 57** *1 Hey lawekî p'îrano, silt'an Êzîd dibêjit: «Bakene malêt Adîya û bînin,*
*2 Û zebênî dê bi gunehk'are ve lezînin,*
*3 Heke bi xweşi ne da, dê bi k'otekî jê stînin».*

**S. 61** *1 Hey lawekî p'îrano:*
*2 Ewin zebînêt p'ir ẍedare, ew cêşekî hoy dijware,*
*3 Ji me distînin wan gunehk'are.*
**S. 58** *1 Hey Lawekî p'îrano, cêşekî xedare,*
*2 Û zebênî wê dikene gazî û haware,*
*3 Go: «Mala Adiya wa ji me distînit gunehk'ara».*

**S. 62** *1 Çî cêşekî hoy dijware, ewin zebênî hoy dijware,*
*2 Dê ji mestînin wan gunehk'are, ewe maşê wan xilmetk'are.*
**S. 59** *1 Hey lawekî p'îrano, cêşekî xedare,*
*2 Û zebênî wê dikene gazî û haware,*
*3 Go: «Mala Adiya wa ji me distînit gunehk'ara,*
*4 Eve bû maşe me xilmetk'ara».*

**S. 63** *1 Şîxadî go: «Gelî bira heder,*
*2 Eve ew cindîne yê r̂iya mesebê xwe birî li ser,*
*3 Hincê ji we ĥisdike herin bi xwe ji desta bînin der.*
**S. 61** *1 Hey lawekî p'îrano, gelî mala Adiyano, dibêjime we bi ĥeder,*
*2 Ew cindîyê r̂êya xwe birye ser,*
*3 Ewî ji dojêh bînine der.*

**S. 64** *1 Gelî bira, heke hûn xatira min tê dibînin,*
*2 Hûn zebêniya meêşînin,*
*3 Hincî ji we ĥisdike herin bi xwe ji desta derînin.*
**S. 60** *1 Hey lawekî p'îrano, silt'an Êzîd dibêjite mala Adiya:*
*«Heke hûn xatira min dibînin,*
*2 Hûn zebênîyêt min ne êşînin,*
*3 Hincî we bivê, hincî we ĥiskir bo xwe ji dojêh derînin».*

**S. 65** *1 Banga mine be wan cindiya:*
*2 Ew disekinîne li ser letan û me'niya,*
*3 Wê jî derînin wan xeteyîya.*
**S. 62** *1 Hey lawekî p'îrano, gîyanê min gorî bo wan cindîya,*
*2 Desta didene ber letan û hindîya,*
*3 Dê hêvêne dojêh û tengîya, dê xilas ken wan xetaîya.*

**S. 66** *1 Banga mine wan şêre siware,*
*2 Ew di sekinîne ser letan û dîmukare,*
*3 Ew di hajune dojê û devê mare,*
*4 Dê jê sitînin wan gunehk'are.*
**S. 64** *1 Hey lawekî p'îrano, gîyanê min gorî bo wan şêre* [1085] *siwara,*
*2 Destan didene ber letan û mik'ara*
*3 Dê havêjne devê dojêh û mara,*
*4 Dê xilas ken wan gunehk'ara.*

**S. 67** *1 Banga mine wan feqîre:*
*2 Ew di sekinîne ser letan û zemherîne,*
*3 Ew di hajone ĥebsa mîre,*
*4 Wê jê derînin wan êxsîre,*
*5 Êxsîrêt ĥebsa mîre.*
**S. 63** *1 Hey lawekî p'îrano, gîyanê min gorî bo wan feqîra,*

[1085] *şere*

*2 Desta didene ber letan û herîra,*
*3 Dê havejne dojêh û zemherîra,*
*4 Dê xilas ken wan êsîra,*
*5 Ew êsîrêt ĥebsa mîra.*

**S. 68** *1 Te di vê bibiye derwêş,*
*2 R̂abe dilê xwe bike li êş,*
*3 Belê, r̂ast bajo, her̂e pêş.*
**S. 65** *1 Hey lawekî p'îrano, heke te bi vê bibîye derwêş,*
*2 Gîyanê xwe biqelêş,*
*3 R̂imê*[1086] *r̂ast bade, r̂ast p'avê, r̂ast her̂e pêş.*

**S. 69** *1 Heke te bi vê bibiye feqîr,*
*2 Tu nefsa xo bike êxsîr,*
*3 Û r̂ast bajo, here pêş dîndara mîr.*
**S. 66** *1 Hey lawekî p'îrano, heke te bi vê bibîye feqîr,*
*2 Gîyanê xwe bike êxsîr,*
*3 R̂imê r̂ast bade, r̂ast p'avê, û r̂ast her̂e pêş dîndara mîr.*

**S. 70** *1 Xerqe lib[a]sê Cebare,*
*2 Hincê li ber xerqe hilîne dare,*
*3 R̂oja axretê k'afirekî gunehbare.*
**S. 67** *1 Hey lawekî p'îrano, xerqe libasê Cebare,*
*2 Kesê ji pêş xerqê şêx Adî hilînit dare,*
*3 R̂oja axretê ew ẍafilekî gunehk'are.*

**S. 71** *1 Xerqe libasê nurîne,*
*2 Hincê destê xo li ber xerqe vewestîne,*
*3 R̂oja axretê şifat û mehder li wê r̂uĥê nîne.*

**S. 72** *1 Hincê bisruma xerqe bigirê,*
*2 Bi awerkê li xerqe bifikirê,*
*3 Bê şik ew jî wê k'afir bimirê.*
**S. 68** *1 Hey lawekî p'îrano, kesê serma xerqe yî bigirî,*
*2 Û bi e'wrêt xezeb tê bi fikirî,*
*3 R̂oja axretê dê k'afir mirî.*

**S. 73** *1 Ewe r̂oja li pê p'ire,*
*2 Pêşiya me agire,*
*3 Me bi silt'an Êzîdê xo mefere.*
**S. 71** *1 Hey lawekî p'îrano, ewe r̂oja li pê p'ire,*
*2 Û li pêşîya me ĥemûya agire,*
*3 Ewê r̂ojê me silt'an Êzîd mefere.*

**S. 74** *1 Ewe r̂oja li pê p'ira Selatê,*
*2 Wê xerqe hilgirin bene bisatê,*
*3 Qalbî gunehbare wê bimîne li kişê û mate.*
**S. 69** *1 Hey lawekî p'îrano, li r̂oja li pê p'ira Selatê,*
*2 Dê xerqe yî hilînin, dê bene bisatê,*
*3 Belê qalbê k'afir dêmînit li kiş û matê.*

**S. 75** *1 Ewe r̂oja li pê p'ira ne'îmê,*
*2 Wê xerqe hilgirin bene xizînê,*
*3 Qalbî gunehbare dêkene kela cehnimê.*
**S. 70** *1 Hey lawekî p'îrano, ewe r̂oja pê p'ira ne'îmê,*
*2 Xerqe yî dê hilînin û bene xizînê,*
*3 Qalbê k'afir dêmînit li kela cehîmê.*

---

[1086] *r̂umê*

**S. 72** *1 Hey lawekî p'îrano, me zênare li wê r̂ojê,*
*2 Li zavîyê li zinarê li axir r̂ojê,*
*3 Dê bi çengilê ẍafîla girin hêvêne binê dojêh.* (binêr: **S. 35**)

**S. 76** *1 Hey Lawekî p'îrano:*
*2 R̂ojekê silt'an Êzî dê dengekî ser geliyê Lalişe ve da dihijînê,*
*3 Xas û qelenderê geliyê Lalişê bi dîdewanê,*
*4 Bi lezkevin û dilezînin,*
*5 Giliyê vê xirabe fênê bi mîrê xo digehînin,*
*6 Tî pê di lenga li nik, li r̂ikêba namînin,*
*7 Destê wan şîra naqepînin,*
*8 Xam û înk'ar ji ber stîrka da di xuşînin,*
*9 Dilê me û çendî aşiq û xudan îman û erk'an ji mêr û miĥbeta silt'an Êzî xalî namînin.*

**S. 73** *1 Hey lawekî p'îrano,*
*r̂ojekê silt'an şêx Adî dê qîr̂ênyekê ser gelîyê Lalişe r̂a hilînêt,*
*2 Û şêrêt gelîyê Lalişê dê bi dêrevanêt bilind ve lezînin,*
*3 Û şêrêt gelîyê Lalişê dê r̂ûspî li ba mîrê xwe mînin,*
*4 Û şêrêt gelîyê Lalişe dê xam û înk'ara, leng û berdoleng,*
*dê di ber stêra r̂a xuşînin,*
*5 Xam û înk'ar, leng û berdoleng, dê di ẍurbetêt giran da mînin,*
*6 Dilê xwedan îmana û xwedan erk'ana çu cara*
*ji mêr û muĥbeta silt'an şêx Adî xalî na mînin.*

*Em di kêmin, û Xudê yî t'emame!*

## 47. QEWLÊ ĤESEDÊ IL-T'EWRÎ[1087]

**S. 1** *1 Wê dibêje Hesedê il-T'ewrî:*
*2 «Werin birayên min yên mişterî,*
*3 K'a ev dinya bi çend lawna hat, û bi çend lewna borî.*

**S. 2** *1 Zeman neman wekî berme,*
*2 Ji dinê hilat ĥeya û şerme,*
*3 Xelqê buxtan girte ser me.*

**S. 3** *1 Hûn buxtaniyê mekin biran,*
*2 Dilê xwe safî bikin ji xediran[1088],*
*3 Zor ji vê dinyayê çûn bi gunehên giran.*

**S. 4** *1 Zor hatine ĥedê r̂êya.*
*2 Ew xebîr nebûn bi çi meniya,*
*3 Ew şikdarin li hev r̂êya.*

**S. 5** *1 Ew li hev r̂êya şikdarin,*
*2 Li r̂êya şêx Adî di înk'arin,*
*3 Lew li axretê bi piştîne, bi barin.*

**S. 6** *1 Ewin yê li axretê bi barin, bi piştî,*
*2 Hincî mêrê dilê t'erîqeta xwe ji xwe hiştî,*
*3 Wekî tovekî ĥeram tu bavêjî zeviyekê, şîn be û negehiştî.*

**S. 7** *1 Ku tovê te bû stirî,*

---
[1087] http://www.ezdixandi.com/forum/38-292-1
[1088] binêr: *xederan*

*2 Ev bû kiryar̂a te kirî,*
*3 Lew xwedan li axretê vê r̂a mabû yî ĥeyrî.*

**S. 8** *1 Dibêjim we şêxan û p'îra,*
*2 Ĉav nedin xirabe, fêniya, wîra,*
*3 Bar tê nîne çi cerik k'ûra.*

**S. 9** *1 Dibêjime xwedanên kevnan û k'ara,*
*2 Di pêşîya xwe vir̂êkin pênc bara,*
*3 Mal namînin li van wara.*

**S. 10** *1 Dem hatîye dê mala ji nav mala êwirînîn,*
*2 Neku dila bi çêrna kul kîn,*
*3 Neku xelqê bi zimanê xwe sil kîn.*

**S. 11** *1 Dilê min di bête di pête,*
*2 P'adşa cerga lê di birête,*
*3 ……………………………*

**S. 12** *1 Dilê min dibêjî,*
*2 Ziman xamiya dirêjî,*
*3 P'adşa cerga lê dibirêjî.*

**S. 13** *1 Dibêjime we şêxan û p'îr,*
*2 Hûn di zana bin, di dilgîr,*
*3 Da li axretê bêjine we hey p'îr.*

**S. 14** *1 P'îro, heke tu ne yî dildarî,*
*2 Û ne zanayekî xweyî di p'arî,*
*3 Weye wekî li axretê gura tu xuwarî.*

**S. 15** *1 P'îro, heke tu ne yî r̂êberî,*
*2 Û heke dilê t'erîqeta ji te bexirî,*
*3 Ĥerame maşê tu di xweyî*[1089]*.*

**S. 16** *1 P'îro heke tu ne yî r̂ênasî,*
*2 Û zalimekî dil qiyasî*[1090]*,*
*3 Dê r̂êya şêx Adî bi çî nasî.*

**S. 17** *1 P'îr bi nasînin,*
*2 Ĥeq li ĥeqiyê dibînin,*
*3 R̂êya şêx Adî çu misêmayî tê nînin.*

**S. 18** *1 P'îr di bê k'erbin, di bê sûne,*
*2 Ew dizanin me'nî yî li k'une*[1091]*,*
*3 Belê, nezan dibêjin r̂ê dûne.*

**S. 19** *1 Wey li nezanên p'ir̂ bêjî,*
*2 Ewin yê xamiya dirêjî,*
*3 Ewin yê derheqî birê axretê dibêjî.*

**S. 20** *1 Hincîyê derheqê birê axretê dibêjî,*
*2 Kivanê wî dê bimîne yê bêjî,*
*3 R̂oja axretê ĥeyre*[1092] *tîra xwe dê bi çî havêjî.*

[1089] *dixoyî*
[1090] *qeyas*
[1091] *kûne*
[1092] *heyriye*

**S. 21** *1 Hincîyê derheqê birê axretê dibête,*
*2 Êbek dê li kivana wî de r̂ête,*
*3 R̂oja axretê yî ĥeyre tîra xwe dê bi çi havête.*

**S. 22** *1 Hincîyê digel t'erîqeta xwe dijmin bî,*
*2 Barê wî dê asin bî,*
*3 Cezayê wî dê sotin bî.*

**S. 23** *1 Hincîyê digel t'erîqeta xwe dijmin bî,*
*2 Û heke ĉiyayê Sîp'anê Xelatê li bin bî,*
*3 R̂oja axretê ne ji van, ne ji wan dibî.*

**S. 24** *1 Hincî li gel t'erîqeta xwe erzan bibî,*
*2 Û li xêr û xêrata kirî p'oşman bibî,*
*3 R̂oja axretê dê sefilekî sergeȓdan bibî.*

**S. 25** *1 Heke birayekî te ji muqibile,*
*2 Bi te r̂a yê sotî dile,*
*3 Li ser cewaba te ya e'wile,*
*4 Heke ew desta ji te bihêle,*
*5 Tû desta jê mehêle.*

**S. 26** *1 Heke birayekî te ne yî ji muqibile,*
*2 Ne yî li ser cewaba te ya e'wile,*
*3 Bi te r̂a ne yî sotî dile,*
*4 Heke ew desta ji te ne hêle,*
*5 Tu desta jê bihêle.*

**S. 27** *1 Ew birayê ji te dixwete,*
*2 Li gel neke çu mie'melete*[1093]*,*
*3 Ew kêr nayê qet û qete.*

**S. 28** *1 Ew birayê ne yî guhdare,*
*2 Heke havîne, û heke behare,*
*3 Ew ji kenarê başkave yî sare,*
*4 Ew birayê ne yî bi te r̂a tîreke bê p'e r̂e,*
*5 P'avêje li pê me r̂a.*

**S. 29** *1 Ew birayê ne yî gihdaştî,*
*2 Darek di destî de ne yî aştî,*
*3 Her bi xwe qaley û bi xwe qaştî.*

**S. 30** *1 Me birayek divê li gel xwe bira kin,*
*2 Sadiqê bi xwe r̂a t'eba kin,*
*3 Xweşiyê bi xw er̂a şa kin,*
*4 Xemê bi xwe r̂e xema kin,*
*5 Heyî û ne yî vêk r̂a p'ar kin.*

**S. 31** *1 Qelî bira li we dikim r̂ayê,*
*2 Hincîyê mêrê ĥeq bi r̂êya şêx Adî bi ĥeq, ser xwer̂a dayê,*
*3 Nisbet (meznahî) bi kêr mêrê derwêş nayê.*

**S. 32** *1 Di vê mêrê derwêş yê qelender bî,*
*2 Li ibadetê yî fer bî,*
*3 Ne p'ir̂ gotineke dû xeber bî,*
*4 Da li axretê li dîwana şêx Adî bi şefa'et bî, bi mahder bî.*

[1093] *miamelet*

**S. 33** *1 Heke mêrê derwêş ne yî qelendere,*
*2 Ne yî bi ibadete, ne yî bi fere,*
*3 P'îr̂ gotineke dû xebere,*
*4 Li axretê li dîwana şêx Adî û melik şêx Sine ne şefa'et heye, ne mehdere.*

**S. 34** *1 Gelî bira neku dila bi waswas[1094] kin,*
*2 Ĥeq r̂êya şêx Adî ser xwe r̂a nas kin,*
*3 Mêrê çê bin, xwe ji destê zebêniya xelas kin.*

**S. 35** *1 Gelî bira mêrên çê bin bi danê,*
*2 Xebîr bin bi erk'anê,*
*3 Ji e'wil dinê ĥeta bi axirzemanê.*

**S. 36** *1 E'sseyî[1095] axirzeman heye,*
*2 Gava hate ser gîyanê we micadeye,*
*3 Ew axirzeman bi xweye.*

**S. 37** *1 We dibêje Hesedê feqîre,*
*2 Neqila me bi neqila mîre,*
*3 R̂êya me bi şêxan û p'îre.*

**S. 38** *1 Hesedê feqîr we dibêye,*
*2 Hincîyê nas ne kirbû neqila mawlêye,*
*3 Meslê mîrê r̂êye.*

**S. 39** *1 P'îro, ji enzelê,*
*2 Bik'ele li wê k'elê,*
*3 Da r̂ûspî bî li mehfelê.*

**S. 40** *1 Da r̂ûspî bî di mehfelên mêra,*
*2 Xebîr be bi me'niyan û kêra,*
*3 Bi xanî mexo goştê t'êra.*

## 48. QEWLÊ MISKÎNO JARO[1096; 1097; 1098; 1099]

**S. 1** *1 Hey binî Ademo,*
*2 Miskîno Jaro Ademo.*

**S. 1** *1 Hey benî Ademo!*
*2 Miskîno Jaro, Ademo!*

**S. 7** *1 Ev dinya e'rdê derwêşe,*
*2 Têda diger̂in cimle cêşe,*
*3 Kesek bi nefsa k'ubar[1100] naçe pêşe.*

**S. 10** *1 Erê bendao[1101], di pey jina mêr menal,*
*2 Gelek aşiq hatin çûne ew ĥal,*
*3 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 2** *1 Ev gerdûn mestexane,*

---
[1094] *wazwaz*
[1095] *ese*
[1096] [50] (rr.173-177)
[1097] http://www.ezdixandi.com/forum/38-283-1
[1098] [2] (rr. 646–651)
[1099] [29] *Beyt'a miskîn* (rr. 435-437) (№ 1709)
[1100] *k'ibar*
[1101] *bendao*

*2 Wekî xewna şevane,*
*3 Herȓo yara hinane.*

**S. 2** *1 Ev dinya mestexaneye,*
*2 Wek xewna şevaye,*
*3 Herȓoj yara hinaye.*

**S. 3** *1 Ev e'rde xane,*
*2 Însan têda bazirgane,*
*3 Hindeka mala xwe bar kir, hindeka ji nû dane.*

**S. 27** *1 Dinya xane û mane,*
*2 Binî Adem têda bazigane,*
*3 Sibê ȓabûn, go: «K'anê filan îbn filane?»*

**S. 4** *1 Gerdûn xane û xan diniji̇̂,*
*2 Ji ber benda, bûye t'ijî,*
*3 Hindek wê dimirin, û hindê wê dijî.*

**S. 28** *1 Dinya xane û xana nijî,*
*2 Ji bingiha bû t'ijî,*
*3 Hind wê dimirin, hind wê dijî.*

**S. 8** *1 Dinya heye xana t'ijî,*
*2 Hin dimre û hin dijî,*
*3 Ȓojekê bê serîya me jî,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 35** *1 Gerdûn xane û xan dimînî,*
*2 Binî Adem bazirgane û lê datînî,*
*3 Bazirganî barkir, û xan şunda dimînî.*

**S. 29** *1 Dinya xane û xan dimînî,*
*2 Binî Adem bazirgane û lê datînî,*
*3 Bazirganî bar kir û xan şunda dimînî.*

**S. 9** *1 Dinya heye xan û mane,*
*2 Însan têda bazirgane,*
*3 Bazirgan diçe, xan cîdane,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 5** *1 Bin Ademo, tu bi xwe veweste,*
*2 Ew sindirûka*[1102] *miftan dişkeste,*
*3 Hind wê dimirin, û hindeka mal ji Xwede dixweste.*

**S. 23** *1 Binî Ademo, bi xwe vewest,*
*2 Sindirûka*[1103] *mifta şikest,*
*3 Hind wê dimrin, hinda mirin dixwest.*

**S. 6** *1 Bin Ademo, te darî li wer de,*
*2 Heke te xêrek dabe di ber de,*
*3 Carekî dî zebênî nayêne ser te.*

**S. 24** *1 Binî Ademo, te dar jur da,*
*2 Heke te xêr û xêrat kirîne, çone ji ber te,*
*3 Babek ji zebêniya li axretê nayêne ser te.*

**S. 7** *1 Here mirin neke ji bîr,*
*2 Gelê hozan, zanayî, jîr,*
*3 Ew jî di nav goȓê da bûne êxsîr.*

**S. 8** *1 Here mirin neke ji xeyal,*
*2 Her kesekî tiştek li bal,*
*3 Dê bo wî tiştî bibe delal.*

---

[1102] *sindirok*
[1103] *sindiȓuk*

**S. 9** *1 Da berî me bibin ji hêr,*
*2 Desta ji çake mal û mehêl,*
*3 Da me bene bihuşta ji dêr.*

**S. 10** *1 Da me bene bihuşta bi gol,*
*2 Min li wan birca dîtin kevok,*
*3 Horî bûn, jê diçin deng.*

**S. 11** *1 Heke ĥezar salî t'emam key,*
*2 Mîryatiyê li R̂ojhilat ĥeta bi Şam key,*
*3 Dawiyê her dê ji k'asa mirinê tam key.*
**S. 32** *1 Binî Ademo, ĥezar salî t'emam keyî,*
*2 Mîrîyatîya Şerq ĥeta bi Şam keyî,*
*3 Her dê ji k'asa mirinê tam keyî.*

**S. 12** *1 Heke ĥezar salî li dine bî,*
*2 Bi zêr̂ û malê dinê yî xinê bî,*
*3 Her dê r̂ojekê mevanê gorê bî.*
**S. 31** *1 Binî Ademo, ĥezar salî li dinê bî,*
*2 Zêr̂ û malî xinê bî,*
*3 Her dê ji r̂uwê vê dinê finê bî.*
**S. 7** *1 Erê bendeo, sed salî li dinê bî,*
*2 Bi zêr̂ û zîv dinê xinê bî,*
*3 Axir r̂ojekê bendayê mirinê bî,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 13** *1 Binî Ademo, li malê dinê nebe tema,*
*2 Zer u male gerdûne neke cema,*
*3 Gerdûn bo p'êẍemberêd Xwedê nema.*
**S. 6** *1 Benî Adem li vê dinyayê mebe tema,*
*2 Vî zêr̂ û malî gelek meke cema',*
*3 Dinya bo R̂esûlê Xwedê nema.*
**S. 30** *1 Binî Ademo, li dine mebe tema,*
*2 Zêr̂ û malî meken cema',*
*3 Dinya bo R̂esulêt Xwedê şik nema.*

**S. 18** *1 K'anê Aqûbê nebî?*
*2 K'a ew salixê çav erebî?*
*3 Ewan ji dizanî mirin her de hebî.*
**S. 11** *1 K'anê Aqubê  nebîy?*
*2 K'a salixê ĉav e'rebî?*
*3 Ewan şik zanî dê mirin hebî.*
**S. 5** *1 K'anên Ûsiv, Ûsivê nebîy,*
*2 K'a salixê ĉav e'rebî,*
*3 Ew jî zane dinyayê da mirin hebî,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 19** *1 K'a Ûsivê ve wesfetê*[1104]*?*
*2 K'a Zelîxa dem ĥimetê*[1105]*?*
*3 Li wan jî r̂izîn tilî û dest û p'ê.*
**S. 12** *1 K'a Ûsivê wesfetî?*
*2 K'a Zelîxa ĥimetî*[1106]*?*
*3 Ewan r̂izîn hestî, û dest, û p'ê.*

[1104] *ûsfet*
[1105] *hişmet*
[1106] *ĥişmet*

**S. 14** *1 K'anî Silemanê hikm dikir?*
*2 K'anî Belqîsa bi navû dik'ir?*
*3 Ewan jî gerdûn ji xwe r̂a t'erk dikir.*

**S. 3** *1 K'a Silêmanê hikm dikir?*
*2 K'a Bilqîza nav dik'ir?*
*3 Tu jî xweş bî, ewan dinya ji xwe r̂a t'erk dikir.*

**S. 17** *1 K'anê Silêman p'êẍemberê hikm dikir ins û cins, û çendî dinê?*
*2 K'a Bilqîza bi zêr̂îye xinê?*
*3 Ew şik ji r̂uwê dinê, bûn fînê!*

**S. 6** *1 K'anên Silêman p'êẍemberê hikm dikir,*
*2 K'a Bilqîza navû dik'ir*[1107]*,*
*3 Ew jî çûn, dinya t'erk kir,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 15** *1 K'a Silemanê p'êẍembera?*
*2 K'a Belqîsa bi zêr̂ê zera?*
*3 Ew jî çûn nav ax û bera.*

**S. 4** *1 K'a Silêmanê p'êẍemberan?*
*2 K'a Bilqîza bi zêr̂ê zeran?*
*3 Tu jî xweş bî, ew jî çûn nav ax û beran.*

**S. 16** *1 K'anê Silêmanê p'êẍember?!*
*2 K'a Bilqîza bi zêr̂îye zere?*
*3 Ew şik çone nav ax û bere!*

**S. 16** *1 K'a Silemanê hikm dikir li ins û cins û çendî teyar,*
*2 K'a Belqîsa bi xelî û sipîçar,*
*3 Ew jî çûne nav ax û berêt sar.*

**S. 18** *1 K'anê Silêman p'êẍemberê hikm dikir ins û cin,s û çendî teyar?*
*2 K'a Bilqîza bi xêlî sipîçal?*
*3 Ew şik çone nav ax û berê sar!*

**S. 17** *1 K'a Silemanê hikm dikir li ins û cins û çendî dine,*
*2 K'a Belqîsa bi zêr̂ û zîvê dinê ye xinê,*
*3 Ewan jî vexwar ji k'asa mirinê.*

**S. 20** *1 K'a ew Mûsaye kelîm?*
*2 K'a ew Îsaye qedîm?*
*3 Ew jî çûne ĥezreta melîke*[1108] *R̂ehîm.*

**S. 13** *1 K'anê Îsaye qedîm?*
*2 K'a Mûsayê kelîm?*
*3 Ew şik çone ĥezreta Melikê K'erîm.*

**S. 9** *1 K'anê E'lî, k'anê E'mer?*
*2 K'anê nebîyê esĥabe li ber?*
*3 Ew şik çone nav ax û ber!*

**S. 10** *1 K'anê E'lî, k'anê Itman?*
*2 K'anê nebîy serî xitman?*
*3 Hûn di xweş bin, ew şik ne man!*

**S. 21** *1 K'a ew xasêt li vir di xas?*
*2 K'a derwêşêt bi t'izbî û wek'az?*
*3 Ewan jî di nav gore da kirin qiyas*[1109]*.*

[1107] *nav û dik'ir*
[1108] *melek*
[1109] *qeyas*

**S. 5** *1 K'anê Xidir, k'anê Ilyas[1110]?*
*2 K'anê derwêşê t'izbî û wek'az,*
*3 Tu jî xweş bî, ew jî di nav axê da kirin qiyas.*

**S. 6** *1 K'a xasêt li vir di xas,*
*2 K'a Ĥemze, k'anê Ebas,*
*3 Hestîyêt wan nav axê girtin qiyas[1111].*

**S. 2** *1 K'anên xasê li vir di xas,*
*2 K'anên Ĥemze, k'anên E'bas,*
*3 Ew jî ber mirinê nebûn xilas,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 22** *1 K'a ew xasêt li vir di zor,*
*2 K'anî p'êẍemberên li dor,*
*3 Ew jî li nav axê girtin heyf û cor.*

**S. 7** *1 K'a xasêt li vir di zor,*
*2 K'anê nebîyêt sehabe li dor,*
*3 Hestîyêt wan şik nav axê girtin ĥeyf û cor.*

**S. 3** *1 K'anên xasê li vir di zor,*
*2 K'a Nevîyê se'be li dor,*
*3 Ew jî çûne hidreta yekê li jor,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 4** *1 K'anên xasê li vir ĥezîm,*
*2 K'anên ĥeçka me dî,*
*3 Ew jî çûne hidreta yekê ĥebîb,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 8** *1 K'a xasêt li vir di k'erîm?*
*2 K'a qewal, k'a nedîm?*
*3 Ew şik çone ĥezreta[1112] Melikê R̂ehîm.*

**S. 23** *1 K'anî zanyar, k'a enbî ya,*
*2 K'a enbîya û k'a ewlî ya,*
*3 Ew jî di nav gore da bûn tî û tî ya.*

**S. 8** *1 K'onî Ĥemze, k'onî E'lî?*
*2 K'onî ewlîya, k'onî enbiya?*
*3 Ew di nav gor̂ê da bûne tûtiya.*

**S. 1** *1 K'anê e'lim, k'a enbîye?*
*2 K'a Ĥeşem, k'a ewlîya?*
*3 Hestîyêt wan şik nav axê bûn totîya.*

**S. 1** *1 K'a e'lim[1113], k'a enbîya[1114],*
*2 Ewan jî axê girt totîya,*
*3 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 2** *1 Nabêt mirin biken ji bîr,*
*2 Xelqê e'rifî, zana, yî jîr,*
*3 Hestîyêt wan nav axê bûn êqsîr.*

**S. 3** *1 Nabêt mirin xeyal her̂in,*
*2 Wa fer bûye, xêra bikin,*
*3 Da berê me şêr r̂a bibin.*

**S. 4** *1 Da berê me bibin ji hêr,*

[1110] *Elyas*
[1111] *qeyas*
[1112] *hizret*
[1113] *evika*
[1114] *emîya*

*2 Dasta ji çake mal û mehêl,*
*3 Da me bene bihuşta ji dêr.*

**S. 5** *1 Da me bene bihuşta bi gol,*
*2 Min li wan birca dîtin kevok,*
*3 Horî bûn, jê diçin deng.*

**S. 24** *1 Banga mine ji P'adşê mezin,*
*2 Ĉavkanîne coy jê diçin,*
*3 Ewê mergê sewle li bin,*
*4 Ya Xwede, derd û derman herdu le dane min.*

**S. 15** *1 Banga mine şahê mezin,*
*2 Ĉavkanîne xweyî jê diçin,*
*3 Ya Ȓebî, derd û derman herdu te dane min.*

**S. 25** *1 Banga mine ji P'adşê mêrdaran,*
*2 Ĉavkanîne coy je berdan,*
*3 Ya Xwede, derd û derman herdu te dan.*

**S. 14** *1 Banga mine şahê mêrdar,*
*2 Ĉavkanîne xweyî jê berdan,*
*3 Ya Ȓebî, derd û derman herdu te dan.*

**S. 26** *1 Banga mine ji P'adşê serbest,*
*2 Ewê mêrgê sewle di best,*
*3 Pelgêt sewle sor û k'esk di best,*
*4 Ezî hejar bûm, k'eşkul dest.*

**S. 27** *1 Çûme merga bi nav,*
*2 Ewê mêrgê sewlek di nav,*
*3 Pelgêt sewlê zêȓ û dirav,*
*4 Ezî xizan bûm, ne dibirime nav.*

**S. 21** *1 Birime mêrgê behîyek di nav,*
*2 Belgê behî zêȓ û diȓav,*
*3 Ez miskîn bûm, birime nav.*

**S. 15** *1 Birime merga sewlek li nav,*
*2 Belgê sewlê zêȓ û dirav,*
*3 Ez miskin bûm, me miskîna ne kir silav,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 16** *1 Ez birime merga sewlek bi ȓast,*
*2 Belgê sewlê zêȓê k'esk,*
*3 Ez miskin bûm, mi ne da li dest,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 22** *1 Birime mêrgê, solik di mist,*
*2 Belgê sole sor û k'esk,*
*3 Ezî miskîn bûm, k'eşkûl*[1115] *bi dest.*

**S. 28** *1 Hûn bakene Ĥebîbî necar,*
*2 Bila t'abûtekê çêke ji dar,*
*3 Da di navda suȓêt*[1116] *ĉav xumar.*

**S. 19** *1 Bang*[1117] *kene Ĥebîbî necar,*
*2 Bila t'ebûtekê çêket ji dar,*
*3 Dê nav ȓazêt ĉav xumar.*

[1115] *keşkul*
[1116] *sur*
[1117] *ban*

**S. 29** *1 Hûn bakene hosta Ĥebîbî,*
*1 Bila t'abûtekê çêke her dê webî*
*2 Da di navda sur̂êt ĉav e'rebî.*

**S. 20** *1 Bang kene hosta Ĥebîb,*
*2 Bila t'ebûtekê çêketîye we bî,*
*3 Dê r̂azêt salihê ĉav e'rebî.*

**S. 30** *1 Dibêjime we xwedanêt*[1118] *konan û k'ar̂a,*
*2 Pêşîya xwe vir̂êken pêşbara,*
*3 Mal namînin li van wara.*

**S. 25** *1 Dibêjime we xwedanêt konan û k'ara,*
*2 Pêşîya xwe vir̂êken pêşbara,*
*3 Mal namînin li van wara.*

**S. 31** *1 Dibêjime we xwedanêt konan û k'ar,*
*2 Çend cindîne hin şêresiwar,*
*3 Ev gerdûn bo kesî nabe heval û yar.*

**S. 26** *1 Dibêjime we xwedanêt konan û k'ar,*
*2 Çend cindîne, hind şêresiwar,*
*3 Ev kevne bo kesî nabite heval.*

**S. 32** *1 Mala gorê çende tarîye, çende k'ure,*
*2 T'ijî mare, t'ijî mûre,*
*3 Ya Xwede, tu dikarî du aşiqa jêk bikî dûre.*

**S. 9** *1 Mala gor̂ê çende tarî û çende k'ûre,*
*2 T'ijî mare û t'ijî mûre,*
*3 Ya R̂ebî, tu dikarî du aşiqan ji yek bikî dûre.*

**S. 11** *1 T'irba mine li ser kanîyê,*
*2 Xuydan dik'şe ji e'nîyê,*
*3 Jê dixaze e'zapê cînarîyê,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 12** *1 T'irba mine ort'a herdu ava,*
*2 Hêsir tê ji herdu ĉava,*
*3 Jê dixaze e'zapê dê û bava,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 13** *1 Derzya ort'a herdu mala,*
*2 Min pirsî, te çir̂a ne da,*
*3 Ew jî bû e'zapê ĥeft*[1119] *sala,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 33** *1 Werin ... werin xizim û lêzim,*
*2 Dax û sed kovan û k'eser,*
*3 Xelqê*[1120] *şîrin*[1121] *lêvêt şekir,*
*4 Nema pê biden xeber.*

**S. 10** *1 Werin, werin xizim û lêzim,*
*2 Wê gavê girya me bêt.*

**S. 11** *1 Dax û sed kovan û k'eser,*
*2 Xelqê şêrîn lêvên şekir,*
*3 Nema bidin xeber.*

**S. 34** *1 Werin ... werin lêzim werin,*

[1118] *xudan*
[1119] *ĥevt*
[1120] *xelk*
[1121] *şîrîn*

*2 Xelqê mêrga ĥeciya ew mîr dike,*
*3 Xêr û şeran Ẍefûr*[1122] *dike,*
*4 Daxa dilan ji bîr dike.*

**S. 14** *1 Werin, werin lezim werin,*
*2 Emê îro gelek bigirîn.*

**S. 15** *1 Xelqê mêrga ĥeciya ew mîr dike,*
*2 Xêr û şeȓan Ẍefûr*[1123] *dike,*
*3 Daxa dilan bap'îr dike.*

**S. 36** *1 Mendo, megrî, menale,*
*2 Hêstira ji ȓuĥêt xwe bimale,*
*3 Ferwara Xwedê êke nabe betale.*

**S. 13** *1 Me girî, menal,*
*2 Hêstiran ji ȓûyê xwe bimal,*
*3 Ev dinya bo p'êẍemberê Xwedê nema.*

**S. 34** *1 Mendo, megirî, menal,*
*2 Hestira ser ȓuwê xwe mical,*
*3 Heke firwara Xwedê hat, nabit betal.*

**S. 37** *1 Mendo, megrî mafê teye*
*2 Şîn û girî bê faydeye,*
*3 Goȓ û k'efen mala meye.*

**S. 12** *1 Qewî girya me bê,*
*2 Hizin û girî bê fêdeye,*
*3 Goȓ û k'efen mala meye.*

**S. 33** *1 Mendo, megirî, ĥeqê teye,*
*2 K'efen*[1124] *û goȓ mala meye,*
*3 Belê hizin û girî bê faydeye,*

**S. 14** *1 Mendo, megrî heqe teye,*
*2 Şayî û girî bê feydeye,*
*3 Goȓ û k'efen ku heye male meye,*
*4 Miskîno jaro, ya ademî.*

**S. 38** *1 Ez wê digrîm şerme,*
*2 Kesên buxtan girte ser me,*
*3 Ji dine hilat fedî û şerme*

**S. 39** *1 Ez wê digrîm, dikim şîr,*
*2 Gerdûn girte ser vavîr,*
*3 Şiret nema, çû ji bîr.*

**S. 35** *1 Ez wê digrîm, şezeme,*
*2 Xelqê bûxtan girte ser me,*
*3 Ji dine hilat ĥeya û şerme.*

**S. 36** *1 Ez wê digrîm, dikim şîr,*
*2 Dinya girte ser vavîr,*
*3 Şîret nema biket kîr*[1125]*.*

**S. 40** *1 Ez wê digrîm weke baran,*
*2 Pê wan cindîya, li pê wan,*
*3 Pê extîyar û cirabûn li ĥemû şaran.*

**S. 37** *1 Ez wê digrîm, weke baran,*

---

[1122] *ẍefîr*
[1123] *ẍefîr*

[1124] *k'ifin*
[1125] binêr: *kêrhatin*

*2 Pê wan cindîya li pîvan*[1126]*,*
*3 Ixtîyar*[1127] *û ĉira bûn li ĥemû şaran.*

*Em yêt kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 49. QEWLÊ SILAVÊT MELIKÊ[1128] K'ERÎM[1129; 1130]

**S. 1** *1 Silavêt melikê K'erîm,*
*2 Aşiqê suȓa berîm,*
*3 Me de'weye mal û serîm.*
**S. 1** *1 Silavêt melikê K'irîm,*
*2 Ez bûm aşiqê suȓa*[1131] *berîm,*
*3 Bi mal û serî ew suȓ dipirsîm.*

**S. 2** *1 Suȓa pê dip'ersim xaliq,*
*2 Muĥbet*[1132] *di dilî da mabû mue'liq*[1133]*,*
*3 Min zor li vê dinyayê dî ȓûsipî, nû baliq.*
**S. 2** *1 Suȓa me dip'arast*[1134] *xaliqe,*
*2 Muĥbê dila mabû mue'liqe*[1135]*,*
*3 Zor hatine dinê di ȓuĥsipî*[1136] *ne di baliqe.*

**S. 3** *1 Zor hatin ĥedê mêra,*
*2 Ewan gûh li me'niya nedigêȓa,*
*3 Ne dizanî ji ku tê şeȓ û xêre.*

**S. 3** *1 Zû k'eftine beĥra tarî,*
*2 Mijûl bûn bi vî mirarî,*
*3 Ew çon, ferza xwe ne bijarî.*
**S. 4** *1 Zor k'etine beĥrêt tarî,*
*2 Mijûl bûne bê qirarî,*
*3 Aşiqêt dinyayê çû ji ola*[1137] *xwe ne dibijarî.*

**S. 4** *1 Ew mirarî bi xwîne,*
*2 Gelî birayêk megirin bi k'erb û k'îna,*
*3 Ev fêne, fênekîya derewîne,*
**S. 5** *1 Ewê qirarê bi xwîne,*
*2 Pê negre giryan û k'îne,*
*3 Ev fêne, fêneka derewîne.*

**S. 5** *1 Sera wî mirarî,*
*2 Ji yek megirin sarî,*
*3 Ev dinya xweşe bi yarî.*
**S. 6** *1 Suȓa wê qirarê,*
*2 P'êk megrin sarê,*
*3 Ev dinya xweşe birayêt yarê.*

---

[1126] *piwan*
[1127] binêr: *extîyar*
[1128] *Melk*
[1129] [2] (rr. 586–590)
[1130] http://www.ezdixandi.com/forum/38-268-1
[1131] *sur*
[1132] *mehbet*
[1133] *maliq*
[1134] *diperist*
[1135] *mûhliq*
[1136] *rîhsipî*
[1137] *owl*

**S. 6** *1 Se'eta x̆ereza nefsê bi çuwe,*
*2 Cengekî mala Adiya li duwe,*
*3 X̆erez ve digeȓî zuwe.*

**S. 7** *1 Gava xedera[1138] nefsê çûye,*
*2 Heke cengê mala Adiya li duye,*
*3 Xeder vekirîye zû ye.*

**S. 7** *1 Se'eta x̆ereza nefsê dibete,*
*2 Cengekî mala Adiya li pê neherete,*
*3 Birano, zînhar gelekî bi ĥeybete.*

**S. 8** *1 Gava xedera nefsê bite,*
*2 Heke cengê mala Adiya li pê neherete,*
*3 Birano, çende bi ĥeybete.*

**S. 8** *1 Gelî bira, betal mekin cengî,*
*2 Li bo te ku du ȓunin bi ceq dengî,*
*3 Belê me îman naskir bi wî ȓengî.*

**S. 9** *1 Gelî bira betal mekin cengê,*
*2 Hûn ȓûnên bû ĥeft dengî û binase bikî ȓengî,*
*3 Me ola xwe naskir bi vî ȓengî.*

**S. 9** *1 Gelî bira dibêjme we ji ĥala,*
*2 Hincîyê dilê xwe neket sîqale,*
*3 Mîna kevne xirabekî, eve sed salî vala.*

**S. 10** *1 Gelî bira dibêjme we ji ĥale,*
*2 Dil bûye sîqale,*
*2 Mîna xirabekî sed salî vale.*

**S. 10** *1 Hûn dilê xwe bi sîqal kin,*
*2 Suȓa mîr kenar kin,*
*3 Ji ew paş qestî bal kin.*

**S. 11** *1 Dilê xwe bi sîqal kin,*
*2 Suȓa mêra ji xeyal nekin,*
*3 Herdem qesta bal kin.*

**S. 11** *1 Birano, yekî ji xwe ȓa bi gîyan bin,*
*2 Ser û male xwe bi şikra din,*
*3 Dîndara silt'an ṣêx Adî bi vê yekê têt standin.*

**S. 12** *1 Birano, yekê ji xwe ȓa bi x̆îrab kin,*
*2 R̂êya ṣêx Adî bi cehde[1139] kin,*
*3 Gîyanê xwe li ber P'adşayê xwe gelekî bi e'zeb[1140] kin.*

**S. 12** *1 Çêbin û gihur nekin,*
*2 R̂êya silt'an Êzdîd ji bîr nekin,*
*3 Da ȓoja axretê gîyanê we bi îza nekin.*

**S. 13** *1 Bêjme we ya cêş,*
*2 Hûn siwar nebin borê serk'êş,*
*3 Ma hûn nizanin, mezin meydana meleka zor xendek heyne li pêş.*

**S. 13** *1 Dibêjme we ya cêş,*
*2 Siwar mebin li borêt serk'êş,*
*3 Mezine meydana meleka, zor xendek di hêne pêş.*

**S. 14** *1 Borê ĥuȓ siwar bin,*
*2 Bi nefesa ȓa guhdarbin,*

---

1138 *xedr*
1139 *ce'd*
1140 *ezab*

*3 Bi ĥemû muxliqa r̂e yar bin.*

**S. 14** *1 Li borê bihil siwar bin,*
*2 Li qewla gûhdar bin,*
*3 Bi ĥemû mûxliqa r̂e yar bin.*

**S. 15** *1 Nasê nefsê,*
*2 Li r̂ûyê vê meclîsê,*
*3 Mêr xilase bi pirsê.*

**S. 15** *1 Nasê nefsê,*
*2 Li r̂ûyê vê meclîsê,*
*3 Mêrê xilas birsê.*

**S. 16** *1 Here nefesê binasî,*
*2 Beĥra ilmê xewasî*[1141]*,*
*4 Di nêv xasa da yî xas bî.*

**S. 16** *1 Nefsê ye nas bî,*
*2 Mecrê giran xiwas bî,*
*3 T'ebaya xelqê xas bî.*

**S. 17** *1 Ji qewlê bin Xidire,*
*2 Hincîyê girîvanê bi ĥeq li bere,*
*3 Ĥisabekî zorî li sere.*

**S. 17** *1 Feqîrê me bi core,*
*2 Hincîyê nefsa wî di zore,*
*3 Ew derdik'eve ji bore.*

**S. 18** *1 Hincî girîvanê ĥeqîyê li stû ve,*
*2 Xebera xam û nûre,*
*2 "Cej bi nête" R̂ebê tu bi çûwe.*

**S. 19** *1 Sedeq*[1142] *ew nefes we bû,*
*2 Hincîyê haj me'nîyê dînê xwe dibû,*
*3 R̂eca me'rîfetê li ba feqîrî dibû.*

**S. 20** *1 Feqîrye bi zore,*
*2 Hincîyê nefsa wîye jore,*
*3 Ew zû dik'eft ser bore.*

**S. 21** *1 Hincîyê nefsa wî li xware,*
*2 Sur̂a mîr hebit li kenare,*
*3 Ew maşê mîrê xwe bi ĥeq dixware.*

**S. 18** *1 Hincyê nefsa wî ye xware*[1143]*,*
*2 Maşê mîrê xwe bi ĥelalî dixware,*
*3 Ji şermê r̂a xeyale.*

**S. 22** *1 Hincîyê bi ĥeramî bixotin maşe,*
*2 Dê bi ĉepilê wî girin havêjne paşe,*
*3 R̂oja axretê ji dîwana cindiya dûrî ĥaşe.*

**S. 19** *1 Hincîyê bi ĥeramî bixwet maşe,*
*2 Ji dîwana cindya ewî ĥaşa,*
*3 Silt'an Êzdîd dê wî havête paşe.*

**S. 23** *1 R̂oja axretê dûrî mala Adiyane,*
*2 Mala Adiya lê napirse,*

[1141] *ẍewas*
[1142] *Sedeq*
[1143] *xiwar*

*3 Ne bi zare, ne bi zimane.*

**S. 24** *1 Ne bi zare, ne bi jare,*
*2 Ŕu ji bilindîya were xare,*
*3 R̂êya r̂astîyê dîyare.*
**S. 20** *1 Ne bizore,*
*2 Ne bi jehre,*
*3 T'oz bilindî, ji r̂astiya r̂ê ye dîyare.*

**S. 25** *1 Nefsa bilind ne r̂ezane,*
*2 R̂astî r̂onaya dilane,*
*3 Ceblê girtî mek'ane.*
**S. 21** *1 R̂astî ye r̂êzane,*
*2 R̂onaya dilane,*
*3 R̂astî r̂êya Yezdane.*

**S. 26** *1 R̂astî û me'rîfete,*
*2 Hincî cane bi t'erbîyete,*
*3 Ew r̂uĥe li ber P'adşê xweyî bi e'zete.*
**S. 22** *1 R̂astî me'rîfete,*
*2 Mêrê qebeh t'erbiyete,*
*3 Li axretê gîyanê wî bi e'zete.*

**S. 27** *1 R̂astî binyan xase,*
*2 Sehet bit warê nase,*
*3 R̂êya îmana xwe binase,*
*4 Ew r̂uĥe li ber P'adşê xwe gelekî xase.*
**S. 23** *1 R̂astî binyat xase,*
*2 Ya ji sehabe ew mekase,*
*3 Yê Xwedê xwe bi tirs nase.*

**S. 28** *1 R̂astî binyan zêr̂e,*
*2 Bi wan cindîya r̂a digêr̂e,*
*3 Dayîm mie'melet[1144]a wan bi Xwedê r̂e.*
**S. 24** *1 R̂astî binyat zêr̂e,*
*2 Wan cindîya xwe r̂a gêr̂a,*
*3 Yê herdem hîvî bi Xwedê r̂e.*

**S. 25** *1 R̂astî binyat zêr̂ bû,*
*2 Hincîyê ber lê bû,*
*3 Hincîyê dixwar bû, di kêr bû.*

**S. 29** *1 Bêjme we ji binêne,*
*2 Ĥemû ji me'nêne,*
*3 Ĥemû ji neqilêne.*

**S. 30** *1 Bêjme we ya saqî,*
*2 Şirove biken qeĥfî,*
*3 Di vê dayîm bore we yî bi li xof bî.*

**S. 31** *1 Borê ĥur li xof kin,*
*2 R̂êya qenc çak kin,*
*3 Li mîrê xwe [y]e silav kin.*
**S. 26** *1 Borê hirîna neke,*
*2 R̂êya ĥeqiyê ji bîr neke,*
*3 Her̂e dostê xwe silavke.*

---

[1144] *me'amelet*

**S. 32** *1 Ji borî vebe wekî heȓe,*
*2 Li xofê ȓastî bide sere,*
*3 Xwedanê borî ser pişta wî goyîkere.*
**S. 27** *1 Heke em di ber borê ve bicîn sere,*
*2 Heke xira li nav ȓastiyê bidîn sere,*
*3 Xwedanê borê ser pişta wî goyîkere.*

**S. 33** *1 Bêjme we gelî sinîya,*
*2 Hincîyê mezin meydana meleka binasîya,*
*3 Ewî hûn kir bi me'nîya.*

**S. 34** *1 Hincîyê mezin meydana meleka binase,*
*2 Ew dîwanekî ji e'sase,*
*3 Ew ȓuĥeke, li ber P'adşayê xwe [y]e gelekî xase.*

**S. 35** *1 Feqîrî ku nuwe,*
*2 Xebere xam û nuwe,*
*3 Geyîj nîne devê wîya Ȓebî tu biçuwe.*

**S. 36** *1 Feqîrî erk'anekî çêye,*
*2 Derwêşekim xwe ve k'êye,*
*3 Dayîm ba vî yek Xwedêye*[1145]*.*

**S. 28** *1 Ji qewlê p'îr Xidire,*
*2 Hincîyê girîvanê ȓastîyê li bere,*
*3 Şikir dêçite dîwana mal û sere.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî ťemame!*
*Em di kêmin, û Xwedê yî ťemame!*

## 50. QEWLÊ MERSUMA BORÎ[1146]

**S. 1** *1 Hatîye mersuma borî*[1147]*,*
*2 Derewîn ẍezeb lê dibarî,*
*3 Ciyê wî dojeha tarî.*

**S. 2** *1 Ew mersuma Cebêre,*
*2 Diȓozin ȓuĥa nekêre*[1148]*,*
*3 Cihêl bit, an ji pîre.*

**S. 3** *1 Hat mersuma Xwedêye,*
*2 Diȓozin li dojeh xêye,*
*3 Hawar dad bê mife'yê ye.*

**S. 4** *1 Hat mersuma Te'ala,*
*2 Bo ĥemû pîr û kala,*
*3 Guhdêrine van gala.*

**S. 5** *1 Diȓozinî ne ĥebînin,*
*2 Dê bi guȓê qelînin,*
*3 Şefa'et*[1149] *ji wan ȓa nînin.*

---

[1145] *Xwidê*
[1146] [2] (rr. 595–598)
[1147] binêr: *barî*
[1148] *neker*
[1149] *şife't*

**S. 6** *1 Diȓozin bê bawere,*
*2 Dupişkekî dahire,*
*3 Ye k'ifiriye, k'afire.*

**S. 7** *1 Dojeh bo wan xweş ware,*
*2 Cem Yezdanî neyare,*
*3 Car lêdane, car nare,*

**S. 8** *1 Hat mersuma Yezdanî,*
*2 Yê ȓastîyê bizanî,*
*3 Ji wîȓa ȓeĥma Ȓeĥmanî.*

**S. 9** *1 Goya ȓastî nebate,*
*2 Bihuşt bo wî xelate,*
*3 Ȓastî ȓêka necate.*

**S. 10** *1 Hat mersuma Ẍefarî,*
*2 Derewê meke çu carî,*
*3 Ber xezeba Cebarî.*

**S. 11** *1 Hat mersuma Tawisî,*
*2 Bi ĉiȓve agir biȓusî,*
*3 Di destî da şîrê ȓusî.*

**S. 12** *1 Hat mersuma Êzdî,*
*2 Di ȓo kerê hendî,*
*3 Bisojin hêd-hêdî.*

**S. 13** *1 Hat ferwara şê[1150] Sinî,*
*2 Melekê ins û cinsî,*
*3 Berê ȓastî dêçinî.*

**S. 14** *1 Ferwara şêx T'ebrîze (şêx Şems),*
*2 Bo wane xena rêje,*
*3 Ew ȓastgoyê berêze.*

**S. 15** *1 Qere Fexrê Furqanî,*
*2 Ferwarek ewî anî,*
*3 Ȓastbêjî li cem xaqanî.*

**S. 16** *1 Ferwar dabû çar suȓa,*
*2 Bixemilînin bihuşt bora,*
*3 Derewê neket çu cara.*

**S. 17** *1 Ĥemû e'mirê yaktaye,*
*2 Derewê neket bi t'ebaye,*
*3 Mîna yare, xwe daye.*

**S. 18** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê Ĥeyran,*
*2 Guh bidene van peyvan,*
*3 Eweye ȓêka Ezdan.*

**S. 19** *1 Vêt me hebit ev k'ame,*
*2 Her dê vexwîn ji came.*

*Em di kêmin, Xwedê ťemame!*

[1150] binêr: *şêx*

## 51. QEWLÊ ÇI SIBEYEK TARÎYE[1151; 1152]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Sibeyeke ji tarî ye,*
*2 K'arê wan û mirinêyî kirî ye,*
*3 K'a werin ji me r̂a bêjin xêr û xêratêt we ji me r̂a kirîn çî ye?*

**S. 1** *1 Çî sibeyeke jî yê tarî ye,*
*2 K'arê wan û mirinêyî kirî ye,*
*3 K'a werin ji me r̂a bêjin xêr û xêratêt we kirîn çî ye?*

**S. 2** *1 Sibeyeke ji ĥale,*
*2 Ser wan bûye qîr û qale,*
*3 Ji me r̂a bêje xîret û namûs çî heye li bale?*

**S. 2** *1 Çî sibeyeke ji ĥale,*
*2 Ser wan bûye qîl û qale,*
*3 K'a ji me r̂a bêjin ẍîret û namûs we çî heye li bale?*

**S. 3** *1 Sibeyeke şêve,*
*2 Birime ciyê ĥeqan û ĥisêbe,*
*3 Wan ĥisêb nîne ji mêl pêva.*

**S. 3** *1 Çî sibeyeke şêve,*
*2 Birine ciyê ĥeqan û ĥisêbe,*
*3 Wan ĥisêb nîne ji mêl pêva.*

**S. 4** *1 Bin Adem yî mal şîrine*[1153]*,*
*2 Herr̂oj, her şev*[1154] *vedihewîne,*
*3 Ewî ĥesab bi mirinê nine.*

**S. 4** *1 Binî Adem yî mal şîrine,*
*2 Herr̂o, herr̂o ve diĥewîne,*
*3 Ewî ĥisab bi mirinê nine.*

**S. 5** *1 Bin Adem yî zinêk'are,*
*2 Bi şevê û r̂ojê yî guhdare,*
*3 Pê bawer nebe yî şermezare.*

**S. 5** *1 Binî Adem yî zinêk'are,*
*2 Bi şevê û r̂ojê yî guhdare,*
*3 Pê amin nebe yî şermezare.*

**S. 6** *1 Zinêk'ar*[1155] *û k'ufir herdu buxtane,*
*2 Li dinyayê belane,*
*3 Li axretê di hindane.*

**S. 6** *1 Zinêk'ar û k'ifar herdu buxtane,*
*2 Li dunyayê belane,*
*3 Li axretê di hindane.*

**S. 7** *1 Ĥeta nîva e'mirî — li dine bû,*
*2 Ji nîvê û paşî — li ser r̂ê bû,*
*3 Ji wê paşî — t'evlî dojêh bû.*

**S. 7** *1 Ĥeta nîva e'mirî yî — li dine bû,*
*2 Ji nîvê û paşî yî — li ser r̂ê bû,*

---

1151 [50] (rr. 438-441)
1152 Lalîş 25 2006 *QEWLÊ ÇI SIBEYEKE JI YÎ YÊT TARÎYE* (rr. 191-196); belavekirin: Deştî şêx Zeyîdîn
1153 *şirîn*
1154 *r̂oj*
1155 *binêr: Daman pîsî*

*3 Ji wê paşî — t'abhî dojêh bû.*

**S. 8** *1 Di nîvê e'mir de ilme kir,*
*2 Li qulix û gel tolazêt gundî xwe k'eşxe kir,*
*3 Ji wê paşî xwe ji axretê bê mefer kir.*

**S. 8** *1 Di nîva e'mirî da ilme kir,*
*2 Di gel qulix û tolazêt gundî xwe k'eşxe kir,*
*3 Ji wê paşî xwe ji axretê bê mefer kir.*

**S. 9** *1 K'a ew ĉavê li ser te serî?*
*2 K'a ew dewra xweş bi te r̂a dibihurî*[1156]*?*
*3 Te ĥesab*[1157] *nedikir, dê çiye nav agirê gur̂î.*

**S. 9** *1 K'a ew ĉavê li ser te sur̂î?*
*2 K'a ew dewra xweş te dibr̂î?*
*3 Te ĥisab nedikir dê çiye agirê gur̂î.*

**S. 10** *1 K'a ew ĉavê te yê işaretê*[1158]*?*
*2 K'a ew yarêt te digirtin ji neyî ji netewiyetê?*
*3 Te ĥesab nedikir ji axretê.*

**S. 10** *1 K'a ew ĉavê te yî işaretê?*
*2 K'a ew yarî te digirtin ne ji qewmiyetê?*
*3 Te ĥisab nedikir ji axretê.*

**S. 11** *1 Birime baẍê*[1159] *gula, gula sor ewicî,*
*2 Gul di baẍade qurmiçî,*
*3 Yî bê temen bûne didericî.*

**S. 11** *1 Birime baẍê gula, gula sor ewicî,*
*2 Gul bê ẍeda va di qurmiçî,*
*3 Ya bê temen bûne dider̂icî.*

**S. 12** *1 Birime baẍê gula gul navê,*
*2 Dostên Xwedê têne silavê,*
*3 Bê e'sil k'etine davê.*

**S. 12** *1 Birime baẍê gula gul navê,*
*2 Dostên Xwedê di êne silavê,*
*3 Bên bê e'sil k'etine davê.*

**S. 13** *1 Gula bînin û bixemilînin,*
*2 Gulêt baẍa temen tê nînin,*
*3 Rezêt bê şûre meĥebînin.*

**S. 13** *1 Gula bînin û bixemilînin,*
*2 Gulêt baẍa temen tê nînin,*
*3 Rezêt bê şore meĥebînin.*

**S. 14** *1 Hatî cêşê*[1160] *atqatê,*
*2 We maf nine, li vê netewiyetê,*
*3 Fexir gêle wê li pey me tê.*

**S. 14** *1 Hatî cêşê atqatê,*
*2 We ĥeq nine, li mê û vê qewmiyetê,*
*3 Fexir gêleye wa li pê me tê.*

**S. 15** *1 Wan bigrin û wan bînin,*
*2 Hijmarken wan bihejmirînin,*
*3 Ji t'elpên giran ew şûnve dimînin.*

---

1156 *dibuhirî*
1157 *hisab*
1158 *îşaret*
1159 *bax*
1160 *artêş*

**S. 15** *1 Wan bigrin û wan bînin,*
*2 Ĥisabken wan bi ĥesbînin,*
*3 Ji t'elpêt giran ew şûnve dimînin.*

**S. 16** *1 Zebêniyêt zav vehêzirîn,*
*2 Şîrê zirav seqa kirîn,*
*3 Ser nezana şîn û girîn.*
**S. 16** *1 Zebînên zav ve ĥêzirîn,*
*2 Şîrêt zirav seqa kirîn,*
*3 Ser nezana bûye ĥizin û girîn.*

**S. 17** *1 Ew dembûsê girane,*
*2 Şerqînî tê ser nezane,*
*3 Dem bû mafê r̂uĥê nezane.*
**S. 17** *1 Ew dembûsî girane,*
*2 Şerqînî jê tê ser nezane,*
*3 Dembûs ĥeqê r̂uĥê dizane.*

**S. 18** *1 Bihuşt*[1161] *heye li ser xweşîya,*
*2 T'ijîne ji t'elpêt ewlîya,*
*3 Ew ĥemû gelê dîn dinasîya.*
**S. 18** *1 Buhişt heye li ser xweşîya,*
*2 T'ijîne ji t'elpêt ewlîya,*
*3 Ewin ĥemû xelkên dîn nasa.*

**S. 19** *1 Min li wê dîtin avahiyên sor û sipî ye,*
*2 T'elpêt xasa li pişt t'elpêt horî ye,*
*3 Ew ĥemû gelê dîn nasîye.*
**S. 19** *1 Min li wê dîtin qesrêt sor û sipî ya,*
*2 T'elpê xasa pişt t'elpê horî ya,*
*3 Ew ĥemû xelkê dîn nasîye.*

**S. 20** *1 Ew çî dare şewq pêve?*
*2 Nuqteke gehê ew yeke bi r̂êve,*
*3 Sibe bû, dibû şêve.*
**S. 20** *1 Ew çi dare şewqe pêve?*
*2 Leqteke gehîye û êke bi r̂êve,*
*3 Ew sibe bû, lê dibû şêve.*

**S. 21** *1 Sebeb çiye ew naçinê,*
*2 Ew dewrana xweş birin ji r̂ûyê dinê,*
*3 Çend dimeşin nagehinê.*
**S. 21** *1 Sebeb çiye, ew naçinê,*
*2 Ew dewrana xweş kirin û birin r̂oyê dinê,*
*3 Hendî dimeşin û nagehinê.*

**S. 22** *1 Çendî dimeşin berbi jêre,*
*2 Ewan xwe ji alîma vedişêre,*
*3 Ew ji bê e'sila nedibûn t'êre.*
**S. 22** *1 Hindî dimeşin berbi jêre,*
*2 Ewan xoe ji alima vedişêre,*
*3 Ew ji bê e'silane dibûn t'êre.*

**S. 23** *1 Alîm yî fere ser sinetê,*
*2 Ew gule li nav ometê,*
*3 Ew dihasilîne axretê.*
**S. 23** *1 Alim yî fere li ser sunetê,*

---

[1161] *behişt*

*2 Ew guleke li nav ometê,*
*3 Ew diĥasilîne ji axretê.*

**S. 24** *1 Ew k'î ye dibêje alîm sûd nîne,*
*2 Ew însana di e'rifîne,*
*3 Ji axretê dihasilîne.*
**S. 24** *1 Ew k'î ye dibêje alim fêde nîne,*
*2 Ew însana di e'rifîne,*
*3 Ew ji axretê diĥasilîne.*

**S. 25** *1 Ew alîm li qeda weye,*
*2 Hikmê xweş li pêşîya weye,*
*3 Di zêdebin sûda weye.*
**S. 25** *1 Ew alim li qeda weye,*
*2 Ĥûkmî xweş li pêşîya weye,*
*3 Ew bi zêr bin fêda weye.*

**S. 26** *1 Here û were xûna teye,*
*2 Darek li nîva ĥewşa teye,*
*3 Mêarê lêde sûda teye.*
**S. 26** *1 Heȓe û were xûna teye,*
*2 Darek li nîva ĥewşa teye,*
*3 Meȓê lêbde fêda teye.*

**S. 27** *1 Mêrê lêde ne bi nezanî,*
*2 Ewê darê ber girt û xilfek dibirî,*
*3 Xilfê dikire erzanî.*
**S. 27** *1 Meȓê lêbde ne bi nezanî,*
*2 Ewê darê ber girt xilfek danî,*
*3 Ewê xilfê dikire erzanî.*

**S. 28** *1 Ew civat li pêşî mala weye,*
*2 Wêda neçe, ne ȓêya teye,*
*3 Ew çi bêjin bê sûdeye.*
**S. 28** *1 Ew civata li pêşîya mala weye,*
*2 Wêda neçe, ne ȓêya teye,*
*3 Ew çi bêjin bê fêdeye.*

**S. 29** *1 Ew çi bêjin ȓêya dinê,*
*2 Qewlê[1162] giran qube li binê,*
*3 Qesra zêȓîn neqîb k'eftinê.*
**S. 29** *1 Ew çi bêjin li ȓêya dinê,*
*2 Kevirêt giran qulpa didinê,*
*3 Qesrêt zêȓî neqeb k'etinê.*

**S. 30** *1 Xatira wî bira yî,*
*2 T'evda ȓabin bi t'eba yî,*
*3 T'emamî bi navê Xweda yî!*
**S. 30** *1 Xatira wî bira yî,*
*2 Ȓabin bi t'eba yî,*
*3 T'emamî bi navî Şîxadî û melik şêx [Sin] û Xuda yî!*

*Em di kêmin, û Xwedê ťemame!*

[1162] *kevl*

## 52. QEWLÊ Ẍ AFILÊ BÊ NASÎN[1163]

**S. 1** *1 Ẍafilê bê nasîne,*
*2 Hatîye ser me bi k'erb û k'îne,*
*3 Ew heye dijminê dîne.*

**S. 2** *1 Ẍafîlo, tu axirî yê gulbe,*
*2 K'axeza berîyê şilbe,*
*3 R̂ohilatê r̂abe, tarîstanê hil be.*

**S. 3** *1 Ẍafîlê bê e'debe,*
*2 Hatîye ser me xezebe,*
*3 Îlaĥîo, merk'eba ẍafila r̂ast nebe,*

**S. 4** *1 Îlaĥîo, merk'eba ẍafila r̂ast ne bûyî,*
*2 Bandê ĥewca mêrekî xerqe bûyî.*

**S. 5** *1 Ĥewce me da ji moĥt'ac,*
*2 Banga xwe dikin feqîrê dilqê bi t'ac,*

**S. 6** *1 Banga xwe dikin feqîrê t'acî k'ulik,*
*2 Dîwana şêx Adî k'amilî bi nik,*
*3 Îlaĥîo, tu mirazê mêra bikî bêşik.*

**S. 7** *1 Ẍafîlo, ji mal bezî,*
*2 T'irêqa xwe r̂a da neherizî,*
*3 Bandê nav agirê cehnemêde venegevizî.*

**S. 8** *1 Ẍafîlo,dibezî ji male,*
*2 T'irêqa xwe r̂a nekî qale,*
*3 Bandê nemînî vale.*

**S. 9** *1 Ẍafîlo, dibezî berî stêre,*
*2 T'irêqa xwe r̂a nekî şêre,*
*3 Bandê ne yê r̂ûyê te nebû û çêre.*

**S. 10** *1 Herçi bi feqîran r̂e dijmin dibûyî,*
*2 Barê wan ĥesin dibûyî,*
*3 Weke ĉiyayê Sîp'anê Xelatê bilind dibûyî,*
*4 R̂uĥê wan cî-cî sokin dibûyî.*

**S. 11** *1 Xwezîka biçûma dîwana şêx Adî, ciyê sola,*
*2 K'as û badî hewdê dola,*
*3 Herça nuqte[1164] xarîye, bûye safîkî p'ola.*

**S. 12** *1 Safîkî pola me,*
*2 Bavekî berbihêrî me,*
*3 Lê ĥerfê da yî serbirî me.*

**S. 13** *1 Xaliqo, r̂engê te dibînim lewra r̂engê bahara,*
*2 T'aceke serê extîyara[1165],*
*3 Hileke[1166] ser milê mêrdara.*

**S. 14** *1 Xaliqo, r̂engê te dibînim lewra r̂engê payîza,*

---

[1163] [50] (rr. 424-426)
[1164] *nuxt*
[1165] *ixtîyar*
[1166] *hule*

*2 T'aceke serê e'zîza,*
*3 Hileke ser milê mêrdara dîsa.*

**S. 15** *1 Xaliqo, r̂engê te, t'u r̂enga namîne,*
*2 Her çiqas bandê te bibîne,*
*3 Aqil, fem, feraset*[1167] *sêrî de dimîne.*

**S. 16** *1 Cîk li bihuştê xweştir hebûn,*
*2 K'as û badî yê me bûn,*
*3 Ferdos ciyê silt'an Êzdayê xwe bûn.*

**S. 17** *1 Ma cime mêrê feqîr, ew jî xwe r̂e dikirî,*
*2 Ma cime mêrê feqîr nenihêre ber tuye,*
*3 Şêx Adî yeke, ne duye,*
*4 Ji hev avaye hirî, pembûye.*

**S. 18** *1 Hirî û pembû ji hev avane,*
*2 Mêrê xwedan*[1168] *îmane,*
*3 Pêş hinare, pêş me dane.*

**S. 19** *1 Pêş me dane, pêş hinarteye,*
*2 Silt'an Êzîd sekinîye ber derê dergeye*[1169]*,*
*3 Ji mêran r̂e vala dike qesran û qubeye.*

**S. 20** *1 Min dî law di ĥikyata,*
*2 Silt'an Êzîd sekiniye ber derê p'ira Sirata.*

**S. 21** *1 Birisatê li tişê e'merî têne,*
*2 Têne nav êzdî û madî,*
*3 Pê kor bûne efendî, qadî.*

**S. 22** *1 Efendî, qadî xwe bi korin,*
*2 Gotina ilmê me dene xebîrin,*
*3 Bandê destê şêxê Xwedî*[1170] *sêfîl û êxsîrin.*

**S. 23** *1 Şêx Xidir şêxekî çê ye,*
*2 Şêx Ĥusêyn go: «R̂abine ji p'ê ye,*
*3 Wana jî sûcek birîye ber mewlê ye».*

**S. 24** *1 Şêx Xidir, şêxekî k'are,*
*2 Şêx Ĥusên jê r̂a bû hevale,*
*3 Wana jî sûcek birîye ber Omer Xale.*

**S. 25** *1 Omerî Xala p'îrekî enzelî,*
*2 Ew serdarê çiqas velîyî*[1171]*,*
*3 Wana jî sûcek birîye ber Şêxê Adî.*

**S. 26** *1 Adîo, Misafiro,*
*2 Herça te kir, kesa nekiro,*
*3 Çiqas surman*[1172] *bû, pêkir k'afiro.*

**S. 27** *1 Tu li beĥra ji nehîna,*
*2 Şûrê ĥeqîyê derxî bi xezîna,*

---

[1167] *firisat*
[1168] *xudan*
[1169] binêr: *dergeh*
[1170] *Xudî*
[1171] *welî*
[1172] binêr: *misilman*

*3 Dad û medad destê tede bibe nasîna.*

**S. 28** *1 T'asek da min r̂ik'ana amê,*
*2 Min vexwarî t̂emamê,*
*3 Destûra şêx Adî nava mala Şamê.*

*Em di kêmin Xwedê t̂emame!*

## 53 . QEWLÊ BÊGOYE[1173]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Îlaĥîo, Tuyî Ĥeqî,*
*2 Bêgoya nekî,*
*3 Şeqşê şê[1174] Fexrê Adiya yî sadiqe yî şexî.*

**S. 1** *1 Îlaĥîo, Tuyî Ĥeqî,*
*2 Beygoya bikey şeqî,*
*3 Şêx Fexrê Adiya yî sadiqe yî sexî.*

**S. 2** *1 Şêx Fexrê Adiya ne malê kesî dixware,*
*2 Ne dilê kesî di azare,*
*3 Bêgoya ji destê wî dikire gazî û haware.*

**S. 2** *1 Bi malê kesî xwariye,*
*2 Ne dilê kesî azardiye,*
*3 Beygoya ji destî dikire hawar û gazîye.*

**S. 3** *1 Wey li bêgoyêt e'wane,*
*2 Şêx Adî û melik şêx Sin dilê wan xalî neket ji êşan û jane,*
*3 Û çu bi ĉavêt xwe nabînin, li şêx Fexrê Adîya diken buxtane.*

**S. 3** *1 Wey li beygoya û e'wana,*
*2 Şêx Fexrê Adiya dilê wan xalî neket ji êş û jana,*
*3 Ew çu bi ĉavê xwe nabînin, ewê li şêx Fexrê Adiya diken buxtana.*

**S. 4** *1 Mal li malêt beygoya bi zên,*
*2 Kiĉêt wan negehin bi wefên,*
*3 Ew çu bi ĉavê xwe nabînin, ewê derheqê şêx Fexrê Adiya dibên.*

**S. 5** *1 Beygo digişt bin,*
*2 Stirîyêt wan weke xişt bin,*
*3 Mezin r̂abin kicik li pişt bin.*

**S. 4** *1 Bêgo, li mara siwar bin,*
*2 Dûpişk r̂ikêt dar bin,*
*3 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye, ji herdu ĉava jar bin.*

**S. 6** *1 Bêgo li mara di siwar bin,*
*2 Dûpişk r̂ikê bi dar bin,*
*3 Bi şêx Adî û melik Fexrê Adiya yî hîvîme, r̂oja axretê ji herdu ĉava ew dê jar bin.*

**S. 7** *1 Dupişkêt dajê semerin,*
*2 Marêt wan di ĥeft[1175] serin,*
*3 Li wan r̂uĥa di înk'arin,*
*4 Ewê r̂ojê sê cara bi navê silt'an Êzî û Tawisî melek' di k'ifirin.*

---

[1173] [2] (rr. 580-585)
[1174] binêr: *şêx*
[1175] *hevt*

**S. 5** *1 Bêgo di keȓ, di kas bin,*
*2 Havînê di p'êxwas bin,*
*3 Zivistanê di bê kiras bin,*
*4 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin ji xweşîya vê dinê di xilasbin.*

**S. 6** *1 Bêgo di keȓ, di kor bin,*
*2 Havînê li Cizîrê bin,*
*3 Zivistanê li bin befra t'êr bin,*
*4 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye ji xweşîya vê dine di dûr bin.*

**S. 7** *1 Ewan yê xêra xelqê nevên,*
*2 Bayê sor, hestî û xaniyêt wan bik'evin,*
*3 Çawa ji ber mehdeȓa şêx Fexrê Adiya di ȓevin.*

**S. 8** *1 Bêgo, mila tu li banî,*
*2 Ne şkeft destî bikevit, ne xanî,*
*3 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye, ew di p'êxwas bin ji binyanî.*

**S. 8** *1 Beygo mala wan wa li bin banî,*
*2 Ne şkeft bi dest wan bik'eft, ne xanî,*
*3 Bi şêx Adî û melik şêx Ĥisinê Adiya yî bi hîvîme, ew her bi p'êxwasî, bi nalî.*

**S. 9** *1 Bêgo, mila tu bin li kepirî,*
*2 Befre, bagêre, lê bête stu kirî,*
*3 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye kiçik û mezinêt wan ĥeta k'î yî lê derî.*

**S. 10** *1 Bêgo, li firwîn ser ve,*
*2 Şevêt K'anûnê bimînin ji der va,*
*3 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye, mezin ȓabin, kiçik li ber va.*

**S. 11** *1 Bêgo, zoma ser bin,*
*2 Havînê p'er xwe bin,*
*3 T'oz û bogêra werbin,*
*4 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye, xêra wan ya xweş li gel yek k'idîler (?) li ber bin.*

**S. 12** *1 Ewan bêgoyêt k'ifirî,*
*2 Melik Fexredîn lêkir nifirî,*
*3 Bi çengilê wan girt û havête nav guȓka agirî.*

**S. 9** *1 Wey li beygoyêt k'ifirê,*
*2 Melik Fexredîn lêkir nifiȓê,*
*3 Şêx Fexrê Adiya bi çengilê wan girt û havête nav befirê.*

**S. 13** *1 Îlaĥîo, wê şevê befir û ba bê,*
*2 Şika*[1176] *sayîka K'anûnê*[1177] *lêdabê,*
*3 Da bêgo li wêderê bi ĥeq û ciza bê.*

**S. 10** *1 Beygo yî weha bî,*
*2 Li herşa befir û ba bî,*
*3 Hişke salekê li Kanunê lêda bî,*
*4 Da beygo bi ĥeq ciza bî.*

**S. 14** *1 Bêgo, şuna agirî destê xwe ber befirê germ biken,*
*2 Şuna lihêf û doşeka, teniştêt xwe bi bera nerm biken.*

**S. 11** *1 Ciyêt beygo [y]a ber koser bin,*
*2 Li t'oz û agira wer bin,*
*3 Cînarêt wan t'irk û t'et'er bin,*
*4 Bi şêx Adî û melik şêx Ĥisinê Adiya yî bi hîvîme,*
*heȓo siba ȓabin, xeberêt wan yêt xweş gedîler bin.*

---

[1176] *sika*
[1177] *Kanun*

**S. 12** *1 Beygo, k'erem ken,*
*2 Bi destêt xwe û newiqêt xwe bera nerm ken,*
*3 Bi şêx Adî û melik şêx Ĥisinê Adiya yî bi hîvîme,*
*herr̂o siba ji xew r̂abin ji êk û du şermken.*

**S. 13** *1 Beygo, havîna di p'êxvas bin,*
*2 Li çilê[1178] zivistanê di bê kiras bin,*
*3 Bi şêx Adî û melik şêx Ĥisinê Adiya yî bi hîvîme,*
*ji xweşî û şahîyêt dinê û axretê xilasbin.*

**S. 14** *1 Beygo, li şev mala biger̂in,*
*2 Bi xwe dewekî tirş bibînin,*
*3 Çenîyêt nanî tê biçînin,*
*4 Şêx Adî û melik şêx Ĥisin bi qismet negehînin,*
*5 Dengizek ji wêva bêt pînekê lê bidet wê jî bir̂ijînin.*

**S. 15** *1 Bêgo, xêrê nebînin,*
*2 Hindek devê tirş ji nav gundî bo xwe bînin,*
*3 Hindek çinêkê nanî bo xwe tê biçînin,*
*4 Min bi şêx Adî û melik şêx Sin hîvîye, wî jî qismetê wan negehînin.*

**S. 16** *1 Ew bêgoyêt r̂û asin,*
*2 Dîwana dibêjin weke almasin,*
*3 Belê silt'an Êzîyê min bi xwe nenasin.*
**S. 15** *1 Wey li beygoyêt r̂û asin,*
*2 Li dîwana di tîjin wekî almasin,*
*3 Silt'an Êzî bi ĥeq nenasin.*

**S. 17** *1 R̂ûyê bêgoya r̂eştirin ji tenîya dêza!*
*2 Şêx Adî û melik şêx Sin lê xweş neket fêkê payîza!*
*3 Ĉava ew jêkve diken dilêt e'zîza.*
**S. 16** *1 R̂ûyêt beygoya di tîjin ji teniya dîza,*
*2 Hincî kesê jêk veket dilêt dû e'zîza,*
*3 Şêx Adî û melek şêx Ĥisinê Adiya lê xweş naket fêkiyê xwe payîza.*

**S. 18** *1 Îlaĥîo, yî Bêrî!*
*2 Ew bû deşta bi r̂akêrî,*
*3 Tu hikmê bêgoya bi destê xwe ve bispêrî.*

**S. 19** *1 Xuşkê û Fexrê şer̂ kir,*
*2 R̂ûniştin çê kir,*
*3 Serê bêgoya k'êr kir.*

**S. 20** *1 Çome kaniyê têm[1179] dibe,*
*2 Çome avê têm dibe,*
*3 Gelo e'melê bêgoya nik şêx Fexrê Adiya kêm dibe?*
**S. 17** *1 Ĉumê avê dêm dibî,*
*2 Kaniya avê ĥişk dibî,*
*3 Kul û e'melê beygoya li ba şêx Fexrê Adiya kêm dibî.*

**S. 18** *1 Me e'rdek di hajoya, ha ji min were merze,*
*2 Me tenure dana, ha ji min were maşe,*
*3 Kul û e'melê beygoya li ba şêx Fexrê Adiya yî belaşe.*

---

[1178] *cil*
[1179] *dêm*

**S. 21** *1 Min tenurek[1180] çêkir, min go: «Qayî aşe»,*
*2 Min xanîyek çêkir, min go: «Qayî maşe,*
*3 Gelo e'melê bêgoya nik şêx Fexrê Adiya herî nelaşe!?»*

**S. 22** *1 Min mêwek çand, min go: «Qayî r̂eze»,*
*2 Min kêlek dana, min go: «Qayî merze,*
*3 Gelo e'melê bêgoya nik şêx Fexrê Adiya herî bi leze!?»*

**S. 23** *1 Min hijîrek çand, derk'eft kerik bû,*
*2 Çînarekê min hebû, qewî yî bi r̂ik bû,*
*3 Wextê min di axaft, ew jî bi e'melê xweyî bi şik bû.*
**S. 19** *1 Min hijîrek çand, derk'eft ker̂ik bû,*
*2 Çînarekî min hebû qewî, yî bi r̂ik bû,*
*3 Gava min di axaft, ew li e'melê xwe bi şik bû,*
*4 Mal wêranî, wî ne dizanî talya dewleta wîye li k'u bû.*

**S. 24** *1 Min gundek da best, derk'eft bazî bû,*
*2 R̂ezwanekî min hebûyî, cihu bû,*
*3 Ewî jî dizanî taliya dewleta min k'u bû.*

**S. 25** *1 Heke înk'are, mêrê mîre,*
*2 Xofa cidê wî nête bîre,*
*3 Ew xilas nabit ji qeydan zincîra.*

**S. 26** *1 Heke mêrê înk'ar p'aşa be,*
*2 Ser t'extê xwe r̂awesta be,*
*3 Qet dilê min pê xweş nabe.*
**S. 20** *1 Mala min ava bî,*
*2 Mêrê înk'ar eger p'aṣa bî,*
*3 Dilê min pê xweṣ nabî.*

**S. 27** *1 Înk'ar çu çê naken,*
*2 Şevêt giran xewê naken,*
*3 Wan divêt t'elpekê ji xwe r̂aken.*

**S. 28** *1 Înk'ar, înk'irî[1181],*
*2 Heke ĥeqî hat û hedirî,*
*3 Cî lê nîne mêr bisebirî.*
**S. 22** *1 Înk'ar yî înk'irî,*
*2 Heke ĥeqî hat û bo dahirî,*
*3 Ciyek nine ew lê bisebirî.*

**S. 29** *1 Înk'ar, înk'îne,*
*2 Heke dîwan best û girê da cî nine,*
*3 Mêrê înk'ar pêve hiltîne.*

**S. 21** *1 Înk'ar yî, înk'êr da,*
*2 Heke ĥeqî hat ew girê da,*
*3 Cîyek nîne herî pê da.*

**S. 30** *1 Ewan înk'ara bi ĥeq negirin,*
*2 Dûrî t'erîqetêt buk'irin,*
*3 Heke qismetekî çak gel heye, ewî jî jê helgirin.*
**S. 23** *1 Hûn înk'ara bi ĥeq neger̂in,*
*2 Ji dûrî t'erîqet bigrin,*
*3 Heke çûne denê, qismetek li gel bit, wî jî ji dest wergirin.*

---

[1180] *ter û nek*
[1181] *enkir*

**S. 31** *1 Ewan înk'ara bi ĥeq nînin,*
*2 Dûrî t'erîqetêt bi xwinin,*
*3 Heke qismetekî çak gel heye ewî jî jê bistînin.*
**S. 24** *1 Hûn înk'ara bi ĥeq nebînin,*
*2 Ji dûrî t'erîqetê bixwînin,*
*3 Heke çû nedenê, qismetek li gel bit, wî jî bistînin.*

**S. 32** *1 Heke leşker[1182] ĥezar dibî,*
*2 Dûrî înk'ar dibî,*
*3 Firwara silt'an şêx Adî û melik şêx Sin, herdu jî ber dibî.*
**S. 25** *1 Înk'ar ĥezar dibî,*
*2 Dû jê înk'ar dibî,*
*3 Bi firwara silt'an şêx Adî herdu yek dibî.*

**S. 33** *1 Heke înk'ar mêrê şobaşîye,*
*2 Çî cihêlê bê xêr, bê xweşîye,*
*3 Dubar ji Te'alîye, ji dest tengîye.*
**S. 28** *1 Heke yî înk'are mêrê bozbeşîye,*
*2 Ciyê têda, ciyekî bi xweş û şahîye,*
*3 Dû beĥra tengî û te'lya ji destê wîye.*

**S. 34** *1 Heke înk'are, malxweyê gunde,*
*2 Nefs k'ubare, nefs bilinde,*
*3 Ew jî dê li oẍlema silt'an Êzî, dê bit hinda.*
**S. 26** *1 Heke yî înk'are, mezinê gunda,*
*2 Yî nefs k'ubar, ne yî nefs kinda,*
*3 Ew dê di eẍlema silt'an Êzî da bit hinda.*

**S. 35** *1 Heke înk'are, malxweyê male,*
*2 Çî şarê feqîran û jara,*
*3 Ew jî li axretê, yî bê milke, yî bê ware.*
**S. 27** *1 Heke yî înk'are, malxweyê male,*
*2 Cînarê derwêş û jare,*
*3 Li axretê yî make yî bê ware.*

**S. 36** *1 Heke înk'ar e'mêrê p'îra,*
*2 Ew xofa cidê wî nête bîra,*
*3 Destê wî r̂amuse jî her ji dure.*
**S. 31** *1 Heke yî înk'are mêrê p'îra,*
*2 Xofa cidê wî nête bîra,*
*3 Destê wî, r̂amuse jî wî, here di wîre.*

**S. 37** *1 Heke înk'are şêxê teye,*
*2 Bi ĥeqîya şêx Adî û melik şêx Sin, fitoyê wî ser te heye,*
*3 Lez nike û p'îrînîyekî lê bike,*
*4 Qismetekî ji benî xwe r̂a çêke,*
*5 Bi silametî ji mala xwe vir̂êke.*
**S. 30** *1 Heke yî înk'are şêxê teye,*
*2 Bi ĥeqî r̂êye şêx Adî û melek şêx Ĥesin ser te heye,*
*3 Bixebite û p'îrînîyekê te bikere qismetekî di bînê li xurçikê bikeye,*
*4 Destê wî bi r̂amuse û silametî ji mala xwe vir̂êkeye.*

**S. 38** *1 Heke înk'are mêrê k'ere,*
*2 Ciyê wî teşbere,*
*3 Sibeyîkê jî li gel mala xwe qale û şer̂e.*

---

[1182] *lêşker*

**S. 29** *1 Heke yî înk'are mêrê k'ere,*
*2 Bincîraxa wîye keşbere,*
*3 Her r̂a siba r̂adibit li gel mala xwe yî bi qal û şer̂e.*

**S. 39** *1 Heke înk'are mêrê k'oĉeke,*
*2 Ger̂î bi wek'aze, ger̂î bi çeke,*
*3 Şêx Adî û melik şêx Sin dua'yê li xilmeta wî neke.*
**S. 32** *1 Heke yî înk'are mêrê k'oĉeke,*
*2 Hege bi wek'aze, hege bi çeke,*
*3 Melik Fexredîn xilmeta wî qebûl neke.*

**S. 40** *1 Heke înk'are mêrê qewala,*
*2 Xwedanê[1183] defa şeş mala,*
*3 Şêx Adî û melik şêx Sin maşê wî lê neket ĥelale.*
**S. 33** *1 Heke yî înk'are mêrê qewala,*
*2 Xwedanê defa bi şeş mala,*
*3 Wê diger̂êt mal bi mala,*
*4 Heke maşê xwe bi ĥeramî dixwere,*
*5 Li axretê yî make yî bê ware.*

**S. 41** *1 Heke înk'are mêrê di berde xerqeye,*
*2 R̂ojê sê cara ibadeta xerqê xwe nekete,*
*3 Cî bûyî vejwartîye, qîre, û qetrîne, û dojeye.*
**S. 34** *1 Heke yî înk'are mêrê di ber dikan xerqeye,*
*2 Heke r̂ojê sê cara ibadeta xerqê xwe nekeye,*
*3 Ciyê vavartî jê r̂a tengî û dojeye.*

**S. 42** *1 Ji qewlê derwêş T'acdîne,*
*2 Hincîyê her pênc ferzêt ĥeqîqetê li nik nîne,*
*3 Ciyê wî tenge, û qîre, û qetrîne.*
**S. 35** *1 Ji qewlê miskîn T'ajdîne,*
*2 Hincî mêrê şêx, û p'îr, û hosta, û merebî, û yarû birêt axretê nine,*
*3 Ciyê bo wan vavartî tengî, û te'lî, û dojeh, û qîl, û qetrane,*
*4 Ĥeta ku û ebed el abdîn ew ciyê wane.*

*Sed r̂eĥmetêt Xwedê li dayî û babêt wî, bêjit amine!*
*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

## 54. QEWLÊ BEDÎLA SINĤET K'AMILA[1184]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Hatibû bedîla sinĥet k'amîla,*
*2 Veşêrin extyarên E'dîla.*

**S. 2** *1 Eve bûya me ji amî hilanî,*
*2 Ew bû T'ercalî Şamê danî,*
*3 Hikmê bê xofa bi xwe r̂a anî.*

**S. 3** *1 Ez xebîr kirim bi herçar r̂ik'ina,*
*2 Danabû ber min ĥemû r̂enga,*
*3 Min zanî meĥkema qiyametê nabit bê denga.*

**S. 4** *1 R̂engek jê serfa dîne,*

---
[1183] *xwidan*
[1184] [52] (rr. 54-56)

*2 Hincîyê bêjin qiyamet nîne,*
*3 Şêx Fexrê Adiya jê yî bi gazîne.*

**S. 5** *1 T'eqdîr hatî dê bi te wefa ye,*
*2 Ne bajêr dimînit, ne cama'ye,*
*3 Ne deşt dimînit, ne ĉiya ye.*

**S. 6** *1 Ew k'îye xeta min naxwînit*[1185]*,*
*2 Û amê min naĥînit,*
*3 Sedê sêzdê bedîla neh sedê xwe di nasînit.*

**S. 7** *1 K'erema wan cin bû,*
*2 R̂onaya wan ne ya bilind bû,*
*3 Li sedê sêzdê bedîla neh sedê ew hil bû.*

**S. 8** *1 Li sedê sêzdê bedîla neh sedê,*
*2 R̂uĥê sêzdara hate e'rdê.*

**S. 9** *1 K'erem û r̂onahya li r̂oj da,*
*2 Wan ji taryê xeber da,*
*3 Ewan ne zanî amê Xwedê mife'te*[1186] *li ser çiqas derda.*

**S. 10** *1 Ewan sêrkera naĥebînin,*
*2 Çendî dihêne xwe û dilezînin,*
*3 R̂oja babekê ji t'elpê giran ew dişonde dimînin.*

**S. 11** *1 Ewan sêrkera çi nîşane,*
*2 K'erem û r̂onahya r̂ojane,*
*3 Ewan ji tariyê xeber dane,*
*4 Ji sedê sêzdê bedîla neh sedê amê Xwedê danîne ser r̂êyane.*

**S. 12** *1 Sedê sêzdê bedîla neh sedê bû,*
*2 K'erem û r̂onahya li xizînê bû,*
*3 Buxtanya li bedîlê bû,*
*4 Nifrîna şehsiwarê deşta Bêbanê û mîr Amadînê Şemsaye li bedîlê bû.*

**S. 13** *1 Li sedê sêzdê bedîla neh sedê destpêkir,*
*2 Geleka ji derewê e'sas çêkir,*
*3 Û ji nebûyê û buxtanê kiras lêkir,*
*4 Şehsiwarê deşta Bêbanê û mîr Amadînê Şemsa û E'bdile'zîzê Ĥerbî ẍezû lêkir.*

**S. 14** *1 Çendî derewîn li dinêne,*
*2 Çend bi zêr̂ û malê xwe li pêne,*
*3 R̂ojê babek*[1187] *gîroyê nefsê ne.*

**S. 15** *1 Çend di derewîn li dînin,*
*2 Çend di hên jê r̂a ditewînin,*
*3 R̂ojê babek ew ji t'elpên giran di şonda dimînin.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 55. QEWLÊ HEVSARÎ[1188]

[1185] *naxunît*
[1186] *mifĥet*
[1187] *bavek*
[1188] http://www.ezdixandi.com/forum/38-291-1

**S. 1** *1 Gelî bira, guh bidêrin,*
*2 Ilmê Xwedê ĥemû nesîĥet û xêrin,*
*3 Xet û berat'ê silt'an Êzdîd zêr̂in,*
*4 Da mirîd bi xwe hilînin û bi xwe veşêrin.*

**S. 2** *1 Da mirîd hilînin ji xwe r̂a,*
*2 Medene xelqê mederek,*
*3 Da mişemir*[1189] *neçit ji xwere.*

**S. 3** *1 Da mişemir neçit bi belaşî,*
*2 Hûn baxoy*[1190] *bidin bi qumaşî,*
*3 Ji ew paş*[1191] *jê bixwazin malî û başî.*

**S. 4** *1 Xilmet bikin sed salan û zêde,*
*2 Heger di serî heye fête,*
*3 Ji xwe nîşan ewe ji pêş ve têtê.*

**S. 5** *1 Heke ji paş ve dê herete,*
*2 Û heke ya bi mikre, ya bi ĥîlete,*
*3 Mehek*[1192] *dê k'ifş k'ete,*
*4 Ne e'sil dinyaye, e'sil axrete.*

**S. 6** *1 Asin ku asine,*
*2 Hosta dibînin di nasine,*
*3 Di nav kurha agirî dikene.*

**S. 7** *1 Heke ya bi mikre, ya bi fene,*
*2 Dad sed ker̂e te jî diherene.*

**S. 8** *1 Şîrê e'sil ne ji asinî,*
*2 Heger xwedan sed car bi pesinî,*
*3 Gava dana ber mihkê,*
*4 Ew bi xwe dê çite ser gêsnî.*

**S. 9** *1 Şîrê e'sil ne ji pûlay,*
*2 Heke xwedan sed car cehwer day,*
*3 Gava dana ber mihikê, e'yba wî dê bit xweyay*[1193].

**S. 10** *1 Mebe muĥbê xelqê*[1194] *av zîr kirî,*
*2 Hosta dibîne dikete nav kurha agirî,*
*3 Mehek nahêle xulqê*[1195] *xwe veşêrî.*

**S. 11** *1 Ew kevanê nû helqe ye,*
*2 Yî kêm şaxe, yî kêm p'e ye.*
*3 Gava dana ber mihikê, e'yba wî dê bit xweya ye.*

**S. 12** *1 Ew kevanê ne ji nû sudare,*
*2 Ji nezanî wergeriya îngeke û nûbare,*
*3 Gava dana ber mehekê, e'yba wî dê bit dîyare.*

**S. 13** *1 Çend bedew û olaqin*[1196]*,*

---

[1189] *mişemer*
[1190] *behay*
[1191] *baş*
[1192] *mehik*
[1193] *xuya*
[1194] *xelk*
[1195] *xulk*
[1196] *ulaq*

*2 E'wrêt beharê ĥemû di pa'nin,*
*3 Belê mirov bi nezanî jêk venedakin.*

**S. 14** *1 Bînin û bigrin bi manê,*
*2 Zîn bikin û bibine seyranê,*
*3 Lê dirêj kin meydanê,*
*4 Dê li wêderê k'ifşbin k'ehêl*[1197] *û bergîrêt gar̂anê.*

**S. 15** *1 Ew siwarêt me di qadirin,*
*2 Li ba mîrê xwe bi xatirin,*
*3 Li ĥemû e'rda bo me di hazirin.*

**S. 16** *1 Ew siwarêt me di bisatin,*
*2 Li ba mîrê xwe bi xelatin,*
*3 Li ĥemû e'rda bo me wê dihatin.*

**S. 17** *1 Gelî bira hûn t'ebayî t'erîq bin,*
*2 Xwedanê ilmê ĥeqîq bin,*
*3 Da hûn bi xasa r̂a di r̂efîq bin.*

**S. 18** *1 Da hûn bi xasa r̂a bi hev sur̂*[1198] *bin,*
*2 Da xwedanê ilmê p'ir̂ bin,*
*3 Da xwedanê ilmê zav bin.*

**S. 19** *1 Li dîwanêt xasa hûn bi r̂û û nav bin,*
*2 Da hûn ne t'ebayî xema bin,*
*3 Da hûn şoqiyêt k'asa bin,*
*4 Da hûn li wêderê cînarêt mêr û milyak'eta bin.*

**S. 20** *1 R̂ojekê dê bite axire,*
*2 Dê li wêderê mînit dojeh û cengekî gire,*
*3 Ewê r̂ojê bira dê haykene ser gunehk'arê bira.*

**S. 21** *1 R̂ojekê dê bite hizîz û gazî,*
*2 Yê wan dê li wêderê mînin r̂ûs û tazî,*
*3 Ewê r̂ojê P'adşa ĥeqiyê û neĥeqiyê dê ji me xwazî.*

**S. 22** *1 Zor dê mînin li wêde,*
*2 Heke haweke birayê axretê neçû pêde,*
*3 Herr̂o sibê zebênî e'zaba*[1199] *wan kirne zêde.*

**S. 23** *1 Heke li pê çû haweka bira,*
*2 Dê li wêder minit dojeh û cengekî gire,*
*3 Ewê r̂ojê ji tariyê hîna ber r̂oniya ĉire.*

**S. 24** *1 Ewê r̂ojê ji tariyê dê hînine ber r̂oniya wî ĉirayî,*
*2 Dê bene ber k'eremeta wî P'adşayî,*
*3 Yê ji me r̂a kirî xweşî û şayî.*

**S. 25** *1 Dê bene hikmeta*[1200] *wî Cebarî,*
*2 Xwedan qesir û qisûrê vejwarî,*
*3 Yê li ber car*[1201]*, û cefayê dua'yê r̂abwarî.*

**S. 26** *1 Hûn çê bikin sed carî ji xwe r̂a çêkin,*

---

[1197] *kihêl*
[1198] *sûr*
[1199] *ezab*
[1200] *hikmet*
[1201] *cor*

*2 Pêşbara di pêşîya xwe vir̂êkin,*
*3 Da hûn ciyekî li wêderê bi xwe çêkin.*

**S. 27** *1 Da hûn bi cî bin,*
*2 Xwedanê qesir, xox, milk û p'î*[1202] *bin,*
*3 Û hûn t'ebayî xelqê çê bin.*

**S. 28** *1 Da hûn ne t'ebayî xema bin,*
*2 Xêr û xêrata kirî, ne di poşman bin,*
*3 Da r̂oja axretê ne di sefîl bin, ne di sergeȓdan bin.*

**S. 29** *1 Dibêjme we xwedanêt maşa,*
*2 Bi nepe'nî hûn gir nekin şaşa,*
*3 R̂ojekê we dixwînite*[1203] *dîwanê p'aşa.*

**S. 30** *1 Gelî siniya, îman ewe ya we birî,*
*2 Ĉav nedene xelqê mişemirî,*
*3 Da zuretê we li pey we dernek'eve k'ifirî.*

**S. 31** *1 Dibêjme we ne ji k'ubarî,*
*2 Hûn ĥelîm bin dildarî,*
*3 Eve bû ĥeqiya hevsarî,*
*4 Ĥezar r̂eĥmetê Xwedê li dayî û babê guhdarî.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 56. QEWLÊ ŞÊXÊ SIRÎ[1204]

**S. 1** *1 Ji qewlê vî şêx Sirî,*
*2 Vî e'rifî, vî babzerî,*
*3 Guhdêr bin heyî*[1205] *hadêrî.*

**S. 2** *1 Jin dibit bi ĥeya bit, bi t'or̂e,*
*2 E'deb bo jinê xweş bi nore*[1206]*,*
*3 Ne ya bi gazinde bit p'ore-p'ore.*

**S. 3** *1 Jin dibîya bi şerm û sit'ir bit,*
*2 Ne t'îqe-t'îq û pêk'enî bit,*
*3 Ber xilmeta mêrî bit.*

**S. 4** *1 Ne ger̂êt serkol mal bi male,*
*2 Li gel mêra biket gift û gale,*
*3 Ew ne ye piçuke, ne ye t'ifale.*

**S. 5** *1 Jinka sefîl, serberda yî,*
*2 Tu ya mezinî, ya fama yî,*
*3 Bo elet û derd û jana yî.*

**S. 6** *1 Jinka e'sil ber e'mirê mêrî,*
*2 Ew ya fehîme bi e'sil û jêrî,*
*3 P'adşa ciyê wê xweş ket li jêrî.*

---

[1202] *pîh*
[1203] *xunte*
[1204] [2] (rr. 601–603)
[1205] *eyî*
[1206] binêr: *nar*

**S. 7** *1 Jinka bi îman û erk'ane,*
*2 Ne herr̂o sile li mal babane,*
*3 Şolek ne layîqe, ne ciwane.*

**S. 8** *1 Jinka bi aqil[1207], û fam, û jîr bî,*
*2 Herdem li ta'eta e'mirê mêr bî,*
*3 Bo sêwî û hejara bi xêr û bîr bî.*

**S. 9** *1 Jinê qed zir̂ bar neke yî,*
*2 Li malê bê beĥr neke yî,*
*3 Ji beĥrê darik neke yî.*

**S. 10** *1 Heger hat û mêr mirî,*
*2 Malê xir nede kur̂î,*
*3 Ji keç[1208] û dayê jî nebirî.*

**S. 11** *1 Nîvek qîz û nîvek dayî,*
*2 Li wê xêra Xwedê dayî,*
*3 Ya dîbû kur̂î wê mayî.*

**S. 12** *1 Kur̂, û qiz, û jin hejî,*
*2 T'evayî divîya bijî,*
*3 P'aqjî û dil ke jî.*

**S. 13** *1 Şêx, û p'îr, û e'rife,*
*2 Ho danabû xêlife.*

*Em di kêmin, Xwide t'emame!*

## 57. QEWLÊ ŞEQE SERÎ[1209]

**saxê – 1**[1210; 1211]
**S. 1** *1 Ji qewlê şeqe serî,*
*2 Nesîĥetêt vî babzerî,*
*3 Gava mêvan hat û hidirî[1212],*
*4 Cayîze ji pêş ve bişikirî.*
*5 Wek'azî ji destî bigrî,*
*6 Ne kû bi ĉavekî[1213] bik'enî û bi êkî bigrî, ĉav*
*7 Ne kî[1214] ĥeft mirî ji malê mirî.*

**S. 1** *1 Ew nesîĥetêt vî babzerî,*
*2 Gava mêvan hat û hedirî,*
*3 Cayîze ji pêş ve bişikirî.*
*4 Wek'azî ji destî bigrî,*
*5 Neku bi ĉavekî bikenî û bi êkî bi girî,*
*6 Weye nekî ĥeft mirî ji malê mirî.*

**S. 2** *1 Gava mêvan hat ji der ve,*
*2 Cayîze r̂abî ji ber ve,*
*3 Nekû êkî nexwendî bê bi ser ve.*

---

[1207] *eqil*
[1208] *kiç*
[1209] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan
[1210] https://yezidentum.jimdo.com/qewls/qewl%C3%AA-%C5%9Feqser%C3%AE
[1211] [2] (rr. 604–608)
[1212] binêr: *hadêr*
[1213] *ĉe'v*
[1214] *nekî*

**S. 2** *1 Ser malxweyê male we ferze,*
*2 Gava mêvan hat ji der ve,*
*3 Cayîze r̂abî ji ber ve,*
*4 Ne ku êkî nexwindî bêt bi ser ve.*

**S. 3** *1 Ne kû li xwe firakî zik,*
*2 Û bêye xwerinê bi r̂ik,*
*3 Xelqê*[1215] *dora jî çav li nik.*

**S. 3** *1 Ne ku li xwe fira key zik,*
*2 Û bê ye xwerinê bi r̂ik*[1216]*,*
*3 Xelqê dora ĉav li nik*[1217]*.*

**S. 4** *1 Ne kû li xwe bikî bi xêrî*[1218]*,*
*2 Çoka li e'rdî r̂ahêlî*[1219]*,*
*3 Cayîze li dor xwe û hevala binêrî.*

**S. 4** *1 Ne ku zikî*[1220] *li xwe bikeyî bi t'êrî,*
*2 Çoka li e'rdê r̂ahêlî,*
*3 Cayîze li dor xwe û hevala binêrî.*

**S. 5** *1 Ne kû li e'rdî biqûtî*[1221] *ejnûya,*
*2 Û p'arî bideye nav pidûya,*
*3 Cayîze pavêye pişt sito û r̂ûya.*

**S. 5** *1 Neku li e'rdê biqûtî ejnowa,*
*2 P'arî bideye nav piduwa,*
*3 Cayîze p'avêjîye pişt sito û r̂uwa.*

**S. 6** *1Çî e'cêbeka dijware,*
*2 Mirovê xwerinê dixot yî p'ir̂ gale,*
*3 Xelqê dora jêyî şermezare.*

**S. 6** *1 Çî e'cêbeka dijware,*
*2 Mirovê xwerinê dixwet yî bê p'ir̂ gale,*
*3 Xelqê dorayî şermezare.*

**S. 7** *1 Fere li ser mêrê meclîsê,*
*2 R̂ojê sê cara li dîwana xwe bipirsî,*
*3 Gelo k'ê xwariye û k'î maye birsî.*

**S. 7** *1 We fere ser mîrê meclîsê,*
*2 Cayîze r̂ojê sê cara li dîwana xwe bipirsî:*
*3 Gelo k'ê xwarîye û k'î maye birsî?*

**S. 8** *1 Mêro xwedanê*[1222] *e'nyatê,*
*2 Cayîze r̂ojê sê cara pirs bikî ji civatê,*
*3 Gelo k'ê xwarîye û k'î maye û k'î nehatê.*

**S. 8** *1 Mîro te vê e'ynatê,*
*2 Cayîze r̂ojê sê cara pirs bikey ji civatê:*
*3 Gelo k'ê xwarîye, û k'î maye, û k'î nehatê?*

**S. 9** *1 Ez nebînim mêrê beranî,*
*2 Weke olaqa garanî,*
*3 Û hermeta bi t'inê biçte k'arwanî.*

**S. 11** *1 Ez nebînim mîrayê beranî,*
*2 Olaqa garanî,*

---

[1215] *xelk*
[1216] *bi rik* — binêr: *bi lez r̂unê*
[1217] *nik* — binêr: *binerin*
[1218] *bikî bi xêrî* — binêr: *xerkê li xwe kê*
[1219] *r̂ahêlî* — binêr: *direşkî*
[1220] *zig*
[1221] *biqûtî* — binêr: *nû destpêbikî*
[1222] *xudan*

*3 Hermeta bi t’inê biçite k’arwanî.*

**S. 10** *1 Ez nebînim mêrê bi t’inê,*
*2 Û maka biket zinê,*
*3 Û mêrê bin ĥûkmê jinê.*
**S. 10** *1 Ez nebînim mêrê bi t’inê,*
*2 Kalê biket zinê,*
*3 Û mêrê li bin ĥûkmê jinê.*

**S. 11** *1 Ez nebînim kalê bi kezî,*
*2 Û keçka ban bi ban*[1223]*,*
*3 Û hermeta dang û daman r̂izî.*
**S. 20** *1 Melik Fexredîn got: «Ez nebînim kalê bi kezî,*
*2 Keçka ban-ban bezî,*
*3 Hermeta dang û daman r̂izî».*

**S. 12** *1 Ez nebînim kalê bikete noş,*
*2 Û sola bi bişkoj,*
*3 Û hermeta binivêbî r̂oj.*
**S. 22** *1 Melik Fexredîn got: «Ez nebînim kalê bikete noş*[1224]*,*
*2 Û sola bi bişkoj,*
*3 Hermeta binivit bi r̂oj.*

**S. 13** *1 Ez nebînim warê berbi zinar,*
*2 Û sala du*[1225] *bihar,*
*3 Û kalê bi guhar û pîrejina bi yar.*
**S. 14** *1 Ez nebînim warê berbi zinar,*
*2 Û sala du behar,*
*3 Kalê bi guhar, pîrejina bi yar.*

**S. 14** *1 Ez nebînim ava bi dar p’irik,*
*2 Û hermeta bi çînçirik,*
*3 Û malxweyê malê kepû girik.*
**S. 13** *1 Ez nebînim ava bi kar p’irik,*
*2 Hermeta bi çînçirik,*
*3 Malxweyê male yî kebûgirik*[1226]*.*

**S. 15** *1 Ez nebînim dewê tirşê lîna,*
*2 Û tayê kevne k’ona,*
*3 Û hermeta bela-bela biçe şîna.*
**S. 12** *1 Ez nebînim dewê tirş lîna,*
*2 Şayêt kevne k’ona,*
*3 Hermeta bel-bele biçite şîna.*

**S. 16** *1 Ez nebînim kalê panî pind,*
*2 Û derwêşê r̂ind,*
*3 Û mêvanê mal li gund.*
**S. 21** *1 Melik Fexredîn got: «Ez nebînim kalê panê pind,*
*2 Derwêşê [ne] r̂ind,*
*3 Mêvanê mal li gund».*

**S. 17** *1 Dilê min bi sê kesa nasojî,*
*2 Mirovê bi ĥal bit û bê e’yş*[1227] *bijî,*
*3 Mirovê korebê û destê xwe bi xenayê birêjî,*

---

[1223] *ban bi ban* — binêr: *gerhak*
[1224] binêr; *vexwerin*
[1225] *dû*
[1226] *kebugirik* — binêr: *qels*
[1227] *eyîş*

*4 Mirovê pîremêrbê li ber koçkê xwe derheqê a'lemê bêjî.*

**S. 15** *1 Melik Fexredîn go: «Dilê min bi sê tişta nasajî,*
*2 Mirovê bi ĥal bit, destê xwe bi xenayê birêjî*[1228]*,*
*3 Mirovê pîremêr bit, derguşkê xwe r̂unêt, derheqê a'lemê bêjî».*

**S. 16** *1 Melik Fexredîn got: «Ez nebînim wane,*
*2 Mêrê biçite dîwana,*
*3 Li pê neçin sifre û nane.*

**S. 18** *1 Hey hêstir ji e'silê k'erê,*
*2 Darekî binê û êkî sere,*
*3 Her dê zivirîye ser e'silê berê.*

**S. 26** *1 Hestiro*[1229]*, e'silê te ji k'erî,*
*2 Darekî qunê, êkî serî,*
*3 Her dê zivirte ser e'silê berî.*

**S. 19** *1 Hêstir di k'erbabin,*
*2 Li meydanê r̂anabin,*
*3 Qelsebab qet çênabin.*

**S. 27** *1 Hestir di k'erbabin,*
*2 Li meydanê r̂anabin,*
*3 Qelsabab qet çênabin.*

**S. 20** *1 Heke qelsebab bûn çêye,*
*2 R̂ojeke, û duye, û sêye,*
*3 Her dê zivirne ser e'silê babêye.*

**S. 28** *1 Heke qelse bab bûn çêye,*
*2 R̂ojeke, û duwe, û sêye,*
*3 Dê her zivirte ser e'silê babêye».*

**S. 21** *1Xwedan*[1230] *e'sil ez bim gorî,*
*2 Û bêe'sil wekî k'erê sito bi morî,*
*3 Ew bêxwendin, dihajone serê jorî.*

**S. 29** *1 Melik Fexredîn got: «Xwedan e'silî ez bibim gorî,*
*2 Bêe'sil di wene wekî k'erê sito bi morî,*
*3 Ew bêxwendin, dihajone serê jorî.*

**S. 22** *4 Wil li bêe'silê bê nebîy,*
*5 Gava di ber xwe da dît kiras û k'efî*[1231]*,*
*6 Divê ewî jî kurta, xulamekê xwe hebî.*

**S. 23** *1 Wey li bêe'silê bê nebîy,*
*2 Wextê di ber xwe da*[1232] *dibînit kiras û k'ofî,*
*3 Divêt ewî jî kurta, ẍûlamekî xwe hebî.*

**S. 23** *1 Wil li bêe'silê bê sinyate,*
*2 Gava der fethê*[1233] *wî dihate,*
*3 Xeyale goştê leşê xwe dixwate.*

**S. 24** *1 Wey li bêe'silê bê sinîyane,*
*2 Gava der fethê wî dihate,*
*3 Ne xeyale goştê gîyanê xwe dip'arate.*

**S. 24** *1 Heke bêe'sil siwarbû,*
*2 Û bi ser sîbera xwe da xwarbû,*

---

[1228] *destê xwe bi xenayê birêjî* — binêr: *zengînî destê xwe dirêjkê*
[1229] *hêstir*
[1230] *xûdan*
[1231] binêr: *k'ofî*
[1232] *xwedo*
[1233] *derfet*

*3 Heke xwedan ocax[1234], li serî nedin, harbû.*

**S. 25** *1 Heke bêe'sil siwarbû,*
*2 Bi ser sîbera xwe da xwarbû,*
*3 Heke xwedan[1235] e'sil serî neden, harbû.*

**S. 25** *1 Xwedan e'sil tû r̂ûnê serê jorî,*
*2 Heke tû yî bi miskî, yî bi enberî,*
*3 Ew bi xwe dê bang ket û dêrî.*

**S. 30** *1 Xwedan e'silo, r̂ûnê li alîyê jêrî,*
*2 E'cubê ne îne sêrî,*
*3 Heke tû ĥiskeyî, bi xwe bang didêrî».*

**S. 26** *1 Deyn meke deravek,*
*2 Hevraz meke gavek,*
*3 Nanek heye îro nede bi gavek.*

**S. 27** *1 Selefxwer yî bê sewabin,*
*2 Nivêjê wan dê dibê duwa bin,*
*3 Mer beçê wan dê ne direwa bin.*

**S. 28** *1 Wey li selefxwerêt bê dîn,*
*2 Di zikî de heye k'erb û k'în,*
*3 Taliya wan, yan ye ĥar, yan ye dîn.*

**S. 29** *1 Min gelek li vê dinyayê dîtin tê r̂isik,*
*2 Li pê malê xwe bûne disik,*
*3 Ji xirabiya û vênîya, lê weryan r̂û[1236], birû[1237] û bisik.*

**S. 30** *1 Min gelek li vê dinyayê dîtin keda yî,*
*2 Xwedê malek dayê bi paşa yî,*
*3 Taliyê ew jî xirab bûn ji ewlîya yî.*

**S. 31** *1 Heke du mêra kire ĥikayete,*
*2 Û ber bûne êk bi şikayete,*
*3 Dê ji destê wan t'enabe welat û berwelate.*

**S. 9** *1 Ez nebînim mêrê bi e'nîyat,*
*2 Heke malxwo li nik xwe şikîyat,*
*3 Dê ji destê herduwa xirabit welat.*

**S. 32** *1 Heke havîne û heke zivistane,*
*2 Mêrê biçe dîwane,*
*3 Cayîze li pê biçin sifr û nane.*

**S. 17** *1 Heke havîne û heke zivistane,*
*2 Mêrê ço dîwana cayîze li pê biçin sifre û nane,*
*3 Mêrê êzdî bite eşqê misilmane[1238],*
*4 Ewî xolî sere xwe kir bi herdu destane.*

**S. 18** *1 Kêrêt qelsa deroken,*
*2 Ĉêlekê ber di r̂oken,*
*3 Ji ew paş şîrî jê ercoken.*

**S. 19** *1 Kêrêt qelsa berbi wêne,*
*2 Mêra r̂ê lê têne,*
*3 Bazîya, bazî jê di zêne».*

---

[1234] *ûcax*
[1235] *xudan*
[1236] *r̂ih*
[1237] *birho*
[1238] *bisilman*

**S. 33** *1 Heke tu kesekî bibinî,*
*2 Xêrekê vêre bigehînî,*
*3 Nebêjê tu ji k'î dînî.*

**S. 34** *1 Heke te xêrek dabî,*
*2 Û bi avekê r̂e berdabî,*
*3 Li nik Xwedê her hinda nabî.*

**S. 35** *1 Çêkin birano, çêkin,*
*2 Pêşbara dipêşîya Xwede vir̂êkin,*
*3 Bo xwe ciyekî li wê dinê çêkin.*

**S. 36** *1 Bila hûn yît weyî*[1239] *bin,*
*2 Bi xof û ne'met û bi bîh*[1240] *bin,*
*3 Hûn t'ebay xelqê gehî*[1241] *bin.*
*4 Da hûn t'ebay xasa bin,*
*5 Ne hûn t'ebay xamiya*[1242] *bin,*
*6 Da her û her li xweşiyan bin.*

**S. 37** *1 Ji şêxe Fexir bigrin şîreta,*
*2 E'deb, û yeqîn*[1243]*, û k'erameta,*
*3 Da li dinê bijîn bi silameta.*

**S. 38** *1 Melik Fexredîn got: «Ji milka aş,*
*2 Ji bacêra simtraş*[1244]*,*
*3 Ne çe dîwana mêrê bero paş.*

> **S. 31** *1 Melik Fexredîn got: «Ji milka aş,*
> *2 Û ji sine'ta simtraş,*
> *3 Û li dîwana mêrê ber û paş.*

**S. 39** *1 Qêrat ne dare,*
*2 Kîj ne ware,*
*3 Babelîsk*[1245] *ne behare».*

> **S. 32** *1 Kîj ne ware,*
> *2 Babelîsk ne behare,*
> *3 Qêrat ne dare».*
>
> **S. 33** *1 Melik Fexredîn got: «Ez ne bînim sê tişta:*
> *2 Olaqa*[1246] *loq-loq,*
> *3 Û hermeta tîq-tîqok,*
> *4 Mêwan bêjite mêwanê xwe me yêyo,*
> *5 Xwedê xirabket malêt ewana bêbexta, beygo, hûn bêjin Amîn her̂r̂o!»*

**S. 40** *1 Ez nebînim olaqa loq-loqo,*
*2 Û hermeta tîq-tîqo,*
*3 Û mêvanê bêje mêvanî mayo*[1247]*.*
*4 Xwedê xirabket malêt bêbexta û êwana û beygo*[1248]*,*
*5 Hûn ĥemû bêjin Amîn her̂r̂o*[1249] *û her̂r̂o.*

---

1239 binêr: *yê pêşî bin*
1240 binêr: *ĥiş, aqil*
1241 binêr: *gehiştin, fehmkê.*
1242 binêr: *neqenca, nezana*
1243 *êqîn*
1244 binêr: *mekîna qusandinê ye helaqa*
1245 *belalisk*
1246 *olax̂*
1247 binêr: *yê min*
1248 *êwana û beygo* — binêr: *fitna û fesadî*
1249 *hero*

*Em di kêmin, Xwedê yî t’emame!*

**şaxê – 2**[1250]

*Ji qewlê şeqî serî, û nesîĥet*[1251]*, û şîretê wî babzerî:*

**S. 1** *1 Gava mêvan hat û da derî,*
*2 Gerek mirov r̂abe di ber de bi şikirî ,*
*3 Gerek mirov wek’azê wî ji desta bigrî,*
*4 Nego mirov ĉavekî bigrî, yekî bik’enê,*
*5 Ku mirov ĉavekî bigrî yekî bik’enê,*
*6 Weke mala ĥeft mirî ji malê mirî,*
*7 Malxwê malê ferze.*

**S. 2** *1 Gava mêvan hat ji der de,*
*2 Gerek mirov r̂abe ji ber de,*
*3 Belkî yekî gundî hat ew jî r̂ûnişt di ber de,*
*4 Nego çaxê ku mêvan tu r̂ûnê çoka li e’rdê r̂adê,*
*5 Û tu zik li xwe mezin bikî weke bi xêrî,*
*6 Nego tu li xwe fereh bikê zik,*
*7 Weke mirovê ĉav mik,*
*8 Wekî xwerinê bixwin li wan bibe r̂ik,*
*9 Nebî tu xwerinê bixwe tu bibêjê ez no,*
*10 Û tu p’ariyê mezin e’cele bikî,*
*11 Û p’ariyê mezin bidî ber pido,*
*12 Gerek tu xwerinê deynê navbera xwe herdo.*
*13 Dibêjê çi e’cêbeke dijware,*
*14 Gelo hun li mêvanê xwe nabin guhdare,*
*15 Û xwerinê dixwin bê p’erwere*[1252]*.*
*16 Gelo mêvanê dora xwe û civata xwe nabin şermezare,*
*17 Dîbê heke havîne û heke zivistane,*
*18 Heçî însanê Xwedê dayê malê dinyayê, û her̂e koçk, û dîwana,*
*19 Gerek bide sifre û nane.*
*20 Melik Fexredîn gotiye: «Heçî însanê nede sifre û nane,*
*21 Xweyî neke mêvane».*
*22 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebin wane,*
*23 Weke mala ser mala ne,*
*24 Mêvanê ser mêhvane,*
*25 Heçî însanê bi dilê safî — dev ji mirovên xwe û pismamên xwe berde,*
*26 Bibe tekiliya mêrê misilmane,*
*27 R̂oja paşî yê poşman bibe.*
*28 Weke xwelî li serê xwe bike bi herdu destan,*
*29 Ferze li mîrê meclîsê.*
*30 Ferze mîrê meclîsê r̂ojê sê caran li malxwê wê malê bipirsê,*
*31 K’î xwariye, k’î nexwariye,*
*32 K’î çûye, k’î hatîye,*
*33 K’î maye, k’î birçîye,*
*34 Ferze li mîrê ĥikyatê.*
*35 Hey mîro mîrê ĥikyatê,*
*36 Gerek li te nebe ĥikyatê,*
*37 Gerek r̂ojê sê caran malxwê male*
*38 Bipirsê ji civatê,*
*39 K’î xwariya, k’î nexwariye,*
*40 K’î çûye, k’î maye,*
*41 K’î birçî ye, k’î nehatê».*
*42 Melik Fexredîn dibêje:*

[1250] http://eziden-celle.de/?page_id=274&preview=true; Ĉavkanî: Ûsivê Keleş
[1251] *nisîhat*
[1252] *perwar*

43 «Xwedê mal dabû wî gedayî,
44 Ew bi malê xwe k'ubar bû, go ezim p'adşayî,
45 Ew bê nîjade ji e'wil dayî,
46 Xwedê mal dabû pêȓe şik,
47 Însanê nebaş jê nehesidin,
48 Ew wî li dûv malê xwe kire şûşek'arî û dizik,
49 Guh medine wî însanê, di xerabiyê, de ewirandî,
50 Ȓuĥ û simbêl, gilî, û guşik».
51 Melik Fexredîn gotiye:
52 «Dilê min bi sê kesan naşewite,
53 Yî bi ĥale bi k'ar bijî,
54 Yî pîre, yî kore, yî keȓe,
55 T'im li ber dîwara di ȓûnî û dibêjî.
56 Hey însanê bêe'silî bê nivî.
57 Wextê tu tazî bûyî.
58 Însanê bê e'sil guh da te.
59 Te li xwe kir kiras û derpî.
60 Te însanê bê e'sil kire xulam. û bi xwe ȓa dibî,
61 Hey bê e'silê, bê binyat.
62 Bê e'silê, bê zinyat,
63 Guh nedin wan,
64 Wan ît'ibar nebin,
65 Wextê ferzenge bê e'sile, dihat ji destê wan xirab, û deşt, û welat.
66 Bê e'sil gavê siwar dibin,
67 Avê t'êr dibin û li Xwedê nanêrin,
68 Li siya serê xwe xwar dibin,
69 Ku mirov li wan nexê har dibin,
70 Cêlê qelsa serokin,
71 T'êr dixwin, tên dibêjin, em jî serokin.
72 Cêlekî jê berbi ȓokin,
73 Hêja jêre bi cokin,
74 Cêlê qelsa berbi wêna,
75 Bazît, û bazîtê ne,
76 Mêra ȓû û simbêlê têne.
77 Însanê baş be li wî însanî ît'ibar be,
78 Li însanê nebaş ît'ibar nebin,
79 Yê dibêjin ta'take derwêşiyê helake,
80 Mal t'aqeta însan nake,
81 Her kes nikarê xwe têke kirasê derwêşiyê.
82 Gerek ku însan xwe kire kirasê derwêşiyê,
83 Însan t'im ya ȓast bêje,
84 Mal ji Xwedê dibêjê min kire qewat ji însan ȓa, û jiyana xwe,
85 Wê li dinyayê jî derbaske, û axretê jî ji xwe ȓa pê bikire,
86 Mal t'aqeta însan nake.
87 Selefxware selefna,
88 Nimêje şike bi ȓewane,
89 Însanê xayîn bê guh nedinê,
90 Însanê merd be, yê jîr be, hêviya jê nake, hêviya wî ji Xwedê ji wî ye,
91 Ȓast bajo gavek, ȓast be,
92 Bi fikir delavek, ĥeta li pişta te hebe nanek,
93 Ȓastiya Xwedê yê li deriye bavek».
94 Melik Fexredîn dibêje:
95 «Nebînim însanê devê tirş di mala xwe de hilîne,
96 Zahf kevne kun dimîne,
97 Kebaniya malê yê paşî di ber de heȓe bikê sîne».
98 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim ava dar pirist,
99 Malxwê malê kep û kirist,
100 Kebaniya malê cir-cirist».

*101 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim derwêşê ne yî r̂ind,*
*102 Weke mêvanê mal li gund,*
*103 Hermeta malxwê malê poz bilind,*
*104 Hermeta malê panî pind».*
*105 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim mîrê beranî,*
*106 Gedeyê dîwanî,*
*107 Bi zilaman r̂a her̂e karwanî».*
*108 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim mîrê bi t'enê,*
*109 Weke berxê ber bizinê,*
*110 Weke mişkê terezinê.*
*111 Mêrê xwe t'êke bin e'mirê jinê,*
*112 T'ucara r̂ûspî nabe li hewata dinê».*
*113 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim mîrê bi e'nyat,*
*114 Li gundiya, li cînara, li maliya, li pismama dikê şikyat.*
*115 Ji destê wî xerab dibe cih, deşt, û welat».*

**S. 3** *1 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim kalê xeber noş,*
*2 Weke sola bi bişkoş,*
*3 Hermeta r̂azê bi r̂oj,*
*4 Dinya li serê wê hermetê dibê doj».*
*5 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim kalê bi kezî,*
*6 Hermeta da û rizî,*
*7 Keçka ban bizî».*
*8 Ew ji destê Xwedê û melik Fexredîn,*
*9 Ewin dikine hawar û gazî.*
*10 Melik Fexredîn gotiye: «Ez nebînim warê ber zinar,*
*11 Pîra di paşiya e'mirê xwe de bi dost û yar.*
*12 Weke kalê guh bi guhar,*
*13 Sala kêm buhar*[1253]*».*
*14 Ew ji destê Xwedê û melik Fexredîn dikin gazî û hawar.*
*15 Melik Fexredîn dibêjê: «Şûr û hesp, û jinin,*
*16 T'ayfekî*[1254] *dijminin,*
*17 T'ucaran li wan ne êminim.*
*18 Şûr kalan dare,*
*19 Hesp bê ît'bare,*
*20 Jin ji p'arsûwan de xware.*
*21 T'ayfekî dijminin, t'ucaran li wan ne êminim».*
*22 Melik Fexredîn gotiye:*
*23 «Xweyî e'silin ez bi gorî,*
*24 Bê e'sil weke kerê stû bi morî,*
*25 Bê gotin diçine serê jorî,*
*26 Xweyî e'sile li jêrî,*
*27 Tu mayî nebe li şêrî,*
*28 Heke tuyî miskî,*
*29 Dayîme tê li xofa Xwedayê xwe binêrî».*

## 58. QEWLÊ DAYÎK Û BABA[1255]

**S. 1** *1 Mend ji şex Fexir pirsîye:*
*2 «Tu bi ĥeqî key Îlaĥiye,*
*3 Erk'ana*[1256] *mêrê êzdî çîye?»*

---

[1253] *buhar*
[1254] *taîfe*
[1255] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan http://www.ezidinasi.com/la/?page_id=88
[1256] *irkan*

**S. 2** *1 Fexir wê ban dike[1257] suȓe,*
*2 Ji k'eşkûla[1258] xwe tîne der duȓe,*
*3 Ji Mendê xwe ȓa dihûne û vediçiȓe:*

**S. 3** *1 «Firwarek hat ji e'zmana,*
*2 Ȓê û ȓisim, û ȟed û sed bo me danane,*
*3 Êk ji wan wesîyeta dayîk û babane.*

**S. 4** *1 Firwar hatîye ji ba Melikê Celîl,*
*2 Li ȟemû wexta li ȟemû bedîl,*
*3 Ji berî Îsa û Mûsa û Birahîm Xelîl.*

**S. 5** *1 Firwar hat ji ba Êzîdê Sore,*
*2 Bi e'mirê wî lêda more,*
*3 Li e'mirê wî bi weste û lê nebore[1259].*

**S. 6** *1 Hizra xwe bike li vê dinê,*
*2 Bi e'mirê P'adşayî bi t'inê,*
*3 Ewî dana bab, ewî dana dê.*

**S. 7** *1 Ez dibêjme we, hûn nekin ji bîr,*
*2 Ez dibêjme we xelqê e'rifî, zana, yî jîr,*
*3 Hûn çu cara bêy dayîk û baba nekin t'ekbîr.*

**S. 8** *1 Li ser teye danaye ȟeqe,*
*2 Ligel dayîk û baba neken axaftina ȓeqe,*
*3 Da ser û ziman li ser we nebin şeqe.*

**S. 9** *1 Kesanê dilê wan hişte,*
*2 Ewî dilê t'erîqeta xwe ji xwe hişte,*
*3 Li axretê yî bê p'ale yî, bê pişte.*

**S. 10** *1 Heke tu li wan bikey silave,*
*2 Û zîyaretî bî li dest û ĉave,*
*3 Li ȟemû suba, li ȟemû gava.*

**S. 11** *1 Yî şkestîye destê ser ȓabî,*
*2 Li dinê û axretê t'ena nabî,*
*3 Dê di agirê dojêh de teȓabî.*

**S. 12** *1 Ew pisekî sefîl yî ȓû ȓeşe,*
*2 Ew gayekî şaş yî beşe,*
*3 Mêrê bê dayîk û baba gava xwe p'avêt û bimeşe.*

**S. 13** *1 Neh meha tu Xwedan kirî,*
*2 Ji av û agir tu dûr kirî,*
*3 Xewêt şeva li xwe ȟeram kirî.*

**S. 14** *1 Bab li e'rda hostaye,*
*2 Mal bi wîye ȓawestaye,*
*3 Ta'eta wî, ta'eta Xwedaye[1260].*

**S. 15** *1 Heke tu çil çilî bi ȓojî bî,*
*2 Heke tu çilêt dî bi micade û ibade[1261]t li pê bî,*

[1257] *badiket*
[1258] *keşkul*
[1259] *ne bore*
[1260] *Xuda*
[1261] *ebadet*

*3 Fayde naket, tu ne li ta'eta dê û babe bî.*

**S. 16** *1 Heke tu dilê dayê şayî nekey,*
*2 Û dilê babê tena nekey,*
*3 Fayde naket, heke tu sed salî ibadet bikey.*

**S. 17** *1 Heke dayîk û bab ji te nebine r̂azî,*
*2 Tu çend bikeye hawar û gazî,*
*3 Tu çu cara miraz nabî.*

**S. 18** *1 Nebêje tû dayîkeke pîrî,*
*2 Û bê hizreke, bê bîrî,*
*3 Heke bi wê dayîkê nebit, tu naçiye dîwana mîrî.*

**S. 19** *1 Nebêje pîremêrekî kale,*
*2 Û zergûnekî bê ĥale,*
*3 Heke bi wî babî nebe, tu naçiye dîwana Xwedê Te'ale.*

**S. 20** *1 Ew gava nesaẍ dibin,*
*2 Ew bê desit û p'ê dibin,*
*3 Cayîze hingî di xizmet da bin.*

**S. 21** *1 Bi destî bigre bigêr̂e,*
*2 Bi Lalişêve bihinêr̂e,*
*3 R̂eĥmekê vê r̂a bibêre.*

**S. 22** *1 Vê r̂a bide xêre,*
*2 Û dua'yekê bike ji melekê Cebêre,*
*3 Da tu şermezar nabî li gel melikan û mêre».*

## 59. QEWLÊ ŞÊX Û AQÛBÊ MÛSA[1262; 1263; 1264]

**S. 1** *1 Çendî r̂oje û çendî şeve,*
*2 Ez fikirîme ber xwe ve,*
*3 Masîyek li wê beĥrê, dur̂ek li deve,*
*4 Ew masî, ewî beĥrê, ewê dur̂ê, dik'êşe ber xwe ve.*

> **S. 1** *1 Çendî r̂oje û çendî şeve,*
> *2 Ez fikirîme ber xwe ve,*
> *3 Min masîyek dî beĥrê de dît, dur̂ek*[1265] *di deve,*
> *4 Ew beĥre wî masî û wê dur̂ê dikêşe dev xwe ve.*

>> **S. 1** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, çendî r̂oje, çendî şeve,*
>> *2 Min e'cêbek dîtiye ewe,*
>> *3 Masîkî beĥrêdaye, dur̂eke deve,*
>> *4 Ewî masî, ew beĥr, ew dur̂, dikşand xwe ve».*

**S. 2** *1 Aqûb go: «Ey şêxê mino ji sur̂ê!*
*2 Ne ji wî masî, ne ji wê beĥrê, ne ji wê dur̂ê,*
*3 Te bi çî mewîj dît bane li ser berê?»*

> **S. 2** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê minî ji sur̂e,*
> *2 Heger ne ji ber wê beĥrê,*
> *3 Ne ji wî masî, ne ji wê dur̂ê,*
> *4 Dê çawa min û te mêwîj dî ban li ser wê berê?»*

[1262] [2] (rr. 512–527)
[1263] http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=58
[1264] http://www.ezdixandi.com/forum/38-274-1
[1265] *dur*

**S. 2** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, tu xwedanê suȓê,*
*2 Qe ne ji wî masiyê be, ne ji wê beȟrê be, ne ji wê duȓê,*
*3 Me ça dîtibe k'işmiş ser berê?»*

**S. 3** *1 Şêx go: «Aqûbo, di vê mêrî, mêr be,*
*2 Şebhatî şêr be,*
*3 Li çêra xweyî p'aye sêr be».*

**S. 3** *1 Şêx dibêje: «Aqûb min, di vê mêr, yî mîr bî,*
*2 Wekî şêrê nêr bî,*
*3 Bi jîriya xwe himberî şêx bî».*

**S. 3** *1 Şêx go: «Aqûbo, di vê mêrê, mêr be,*
*2 Û şebhatê*[1266] *şêrê nêr be,*
*3 Li çêra xweyî p'aye zêȓ be».*

**S. 4** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, heke mêr ne yî mêrdare,*
*2 Li ilmê*[1267] *xwe ne yî siware,*
*3 Ȓoja axretê şêxê wî ji desta yî bê zare».*

**S. 4** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, mêr ne yî mêrdare be,*
*2 Bi ilmê xwe ne yî siwar be,*
*3 Li axretê şêxê wî jê bê zar be».*

**S. 4** *1 Aqûb go: «Seyîdayê, wekî mêr ne mêrdar be,*
*2 Û ilmê*[1268] *xwe ne siwar*[1269] *be,*
*3 Ȓoja axretê, şêxê wî desta da bê zar be».*

**S. 5** *1 Şêx go: «Aqûbo, peza bi stewrî medoş,*
*2 Ȓastîya bi pola mefroş,*
*3 Mebe miȟbê xelqkê*[1270] *îman li koş».*

**S. 5** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, peza stewr[î] nedoş,*
*2 Ȓastiya dilan bi pol*[1271] *nefroş,*
*3 Nebe muȟbê xelqê».*

**S. 5** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, peza stewrî medoş,*
*2 Ȓastiya pola mefroş,*
*3 Mebe mişteriyê meriyê îman koş».*

**S. 6** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, zêȓa mehavêje zikaka,*
*2 Ji êk vede xafîyan û çaka,*
*3 Înşallaȟ*[1272] *weled tê li e'silê maka».*

**S. 6** *1 Aqûb dibêjit: «Şêxê mino, zêȓa nevêje*[1273] *zikakan,*
*2 Ji êk veke xaman û p'akan,*
*3 Zarok nayên li e'silê makan».*

**S. 6** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, zêȓa nevêje nav zikaka,*
*2 Ji hev*[1274] *veke xav û çaka,*
*3 Ewled naçin e'silê maka».*

**S. 7** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, nekî dînî,*
*2 T'oximê xwe ȟişke, beyanya mereşînî,*
*3 Tê ȓoja axretê stirîya*[1275] *jê hilînî».*

**S. 7** *1 Kesêkî, kesak divî,*
*2 Nabe lê şik bik'evî,*

---

[1266] *şe'bet*
[1267] *e'lim*
[1268] *ulm*
[1269] *siyar*
[1270] *xelk*
[1271] *pûl*
[1272] *Înşela*
[1273] *navêje*
[1274] *jev*
[1275] *strî*

*3 Tov nayê li qîmeta zevî.*

**S. 7** *1 Kesê kesan xweş divî,*
*2 Kêr nayê lê bi şik k'evî,*
*3 Tov nayê li qameta zevî.*

**S. 8** *1 Şêx go: «Aqûbo, ev zeviya ser sed dirêj,*
*2 Bi t'oze, bi qirêj,*
*3 Tê heye sur̂et, û teĥiyat, û nivêj».*

**S. 8** *1 «Ev zeviya ser sedêye dirêj,*
*2 Ye p'aqije, ye bê t'oze, ye bê qirêj,*
*3 Tê heye sur̂et û teĥiyat û nivêj».* **(S. 10)**

**S. 10** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, zeviya serseda dirêj,*
*2 Bê t'oze, bê xubare, bê niqêş,*
*3 Serî heye ferz, û teĥiyat, û nimêj».*

**S. 9** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ew zeviya zêde,*
*2 Sê gêsna lêde,*
*3 Ew paş tovê xwe pêde».*

**S. 9** *1 «Ew zeviya zêde,*
*2 Tu sê gêsna lêde,*
*3 Ji wê paş tovê xwe pavêje têde,*
*4 Ne ku tu bi dînî, tovê xwe li ĥişke beyaran bir̂eşînî».*

**S. 9** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, zeviya ji zeviyane zêde,*
*2 Ĥeft gîsna lêde,*
*3 Hew paş t'oximê xwe pêde».*

**S. 10** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ne ko tu bikî dînî,*
*2 Tovê xwe li ĥişke beyarekî bir̂eşînî.*
*3 R̂oja axretê, tu wê stirya jê hilînî».*

**S. 11** *1 Şêx go: «Aqûbo, biçîne weke tu dizanî,*
*2 Pavêj birca qanî,*
*3 Xwedan t'aqet nîne ji dexil û danî».*

**S. 10** *1 «Da li axretê stirya jê hilînî,*
*2 Biçîne weke tu dizanî,*
*3 Pavêj tovekî p'îr̂ deqanî (bê çeqanî),*
*4 Da xwedan*[1276] *xenê be bi dexil û danî».*

**S. 12** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ev zeviye ji dewlete,*
*2 Xwedê dexil û danekî we didete,*
*3 Gelek xelq heye hesûdî û r̂ê dibete».*

**S. 11** *1 «Ev zeviye dewlete,*
*2 Xwedê dexilekî zaf wê bide te,*
*3 Gelek xelq bi hesûdî wê binêrin te».*

**S. 8** *1 Aqûb go: «Seyîdayê min, zeviya dewlete,*
*2 T'ijî naz û ne'mete,*
*3 Xweyî lê t'êr bîye muĥbete».*

**S. 13** *1 Şêx go: «Dilê min kelat ber kelate,*
*2 Agirekî we ji der hate,*
*3 Ji ber sojî deşt, û çîya, û banî, û welate».*

**S. 11** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, dilê min kelate,*
*2 Agirek têda hil dihate,*
*3 Dişewitî welat û berwelate».*

**S. 14** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, dilê min kelat nijî,*

---

[1276] *xudan*

*2 Agirekî wê da gurmijî,*
*3 Deşt, û çiya, û banî, û welat ji ber soĵî».*

**S. 12** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, dilê min kela niĵî,*
*2 Agirek têda digurmiĵî,*
*3 Dişewitî welat û berwelatê din ĵî».*

**S. 15** *1 Şêx go: «Aqûbo, jêk dûrin serkanî û ĥişkelî,*
*2 Ĥeta ĥişkelî av pê tê,*
*3 Serkanî digete ber mewlê».*

**S. 12** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, jêk dûrin serekanî û ĥişkerlo*[1277]*,*
*2 Ĥeta ĥişkelo av pêde tê,*
*3 Serekanî dighêje ber mewlê».*

**S. 14** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ji hev dûrin ĥişkelî û serkanî,*
*2 Ĥeta ĥişkeliya av jê bê,*
*3 Serekanîyê here ber cewla Şîxadî*[1278]*, ber cewlê».*

**S. 16** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ew serkaniya sar û germe,*
*2 Ew kaniya binyat û ber me,*
*3 Bi xwe gerim be, lê nabe dermane».*

**S. 13** *1 Aqûb dibêjit: «Şêxê mino, suř ye sara, an germe,*
*2 Ew kanî çî binyat ji ber me,*
*3 Xwe kirye lê nayê çû deman».*

**S. 13** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, sere sar û germin,*
*2 Sere kaniya binî anî ber me,*
*3 Xwe kirye t'u lê nabe derman».*

**S. 17** *1 Şêx go: «Aqûbo, weke ji piştê babê kal bî,*
*2 Û berê dayê t'ifal*[1279] *bî,*
*3 K'engê bi vê me'rîfetê xeyal*[1280] *bî?»*

**S. 16** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê ji pişta bavê pîr bûy,*
*2 Li ber dayê bi şîr bûy,*
*3 Ji hingî û virve ji wê me'rîfetê bê xeber bûy».*

**S. 15** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî ji pişta bavê kal bî,*
*2 Û berê dayê t'ifal bî,*
*3 K'engê vê me'rîfetê xeyal bî?»*

**S. 16** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, wekî pişta bavê xulqîm,*
*2 Berê dayê t'ifiqîm,*
*3 Hingê ez me'rîfetê giliya şifiqîm*[1281]*».*

**S. 18** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, wextê ji pişta babê pîr bûm,*
*2 Û berê dayê şîr bûm,*
*3 Hingî bi vê me'rîfetê ezî xebîr bûm».*

**S. 17** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, wextê ji pişta bavê kal bûme,*
*2 Li ber dayê t'ifal bûme,*
*3 Ji hingî û virve ji wê me'rîfetê bê xeyal bûme».*

**S. 20** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ez pişta bavê kal bûm,*
*2 Berê dayê t'ifal bûm,*
*3 Hingê ez me'rîfetê xeyal bûm».*

**S. 19** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî ji pişta babê hurîya,*
*2 Û berê dayê řevîya,*
*3 K'ehgê bi vê me'rîfetê ĥisîya?»*

---

[1277] *ĥişker*
[1278] *Şêxadî*
[1279] *tefal*
[1280] *xîyal*
[1281] *siviq*

**S. 14** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wexte tu ji pişta bavê huriya yî,*
*2 Û li ber dayê meşya yî,*
*3 Ji k'engî ve bi vê mérîfeftê ĥisya yî».*

**S. 17** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî ji pişta bavê r̂uĥya yî,*
*2 Û berê dayê r̂evya yî,*
*3 K'engê vê me'rîfetê ĥisya[1282] yî?»*

**S. 18** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ez pişta bavê hêwyam,*
*2 Berê dayê r̂evyam,*
*3 Hingê ez me'rîfetê giliya ĥisyam?»*

**S. 20** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, wextê ji pişta babê dibûme,*
*2 Û berê dayê pêda diçûme,*
*3 Hingî bi vê me'rîfetê ezî hisî bûme».*

**S. 15** *1 Aqûb dibêjit: «Şêxê mino, wextê ji pişta bavê bûme,*
*2 Li ber dayê çûme,*
*3 Jî hingî û virve ji wê me'rîfetê bi xeber bûme».*

**S. 19** *1 Şêx go: «Aqûbê mino: ez pişta bavê pîr bûm,*
*2 Berê dayê şîr bûm,*
*3 Hingê ez me'rîfetê giliya xebîr bûm».*

**S. 21** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî qalbê Adem p'êẍember dixulqand,*
*2 R̂uĥ qendîlê danî, di mue'liqand[1283],*
*3 Bêje min, k'î bû, k'î vêra disediqand?»*

**S. 22** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, weke qalbê Adem p'êẍember die'firand[1284],*
*2 R̂ûh ji qendîlê anî, pê r̂a dihêwirand,*
*3 Ez dizanim k'î li wêder bû, k'ê wê r̂a didebirand!»*

**S. 19** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, wextê qalbê Adem p'êẍember sewirand,*
*2 R̂ûh ji qendîlê îna û tê mu'eliqand,*
*3 Melik Fexredîn li wê bo vê r̂e sediqand».*

**S. 23** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî qalbê Adem p'êẍember çêkir,*
*2 Bi serî, û dest, û p'ê kir,*
*3 Bêje min, k'î lê bû, k'ê k'asa qudretê lê kir?»*

**S. 20** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê qalbê Adem p'êẍember çêkir,*
*2 Bi ser û dest û p'ê kir,*
*3 Ew k'î bû k'asa qudretê lê kir?»*

**S. 21** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, şuxula Xwedê weku çêkir,*
*2 R̂uĥ nava ser, û dest, û p'ê kir,*
*3 Ew k'îjan mêr bû, k'asa qudretê lê kir?»*

**S. 22** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ew şuxula Xwedê we ku anî,*
*2 R̂uĥ nava ser, û dest, û p'ê danî,*
*3 Ew e'zîz melik [1285]Fexredîn bû, k'as pê anî».*

**S. 24** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, wekî qalbê Adem p'êẍember bijinî,*
*2 Serî û dil[1286] dinijinî,*
*3 R̂uĥ ji qendîlê anî, pênigijî,*
*4 Ez dizanim, k'î li wêder bû, k'ê digo il-ĥemdillah, t'êr bijî!»*

**S. 18** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê qalbê Adem p'êẍember nijinî,*
*2 R̂uĥ berdayê, pê nigijî,*
*3 K'î bû got şukir ji Xwedê, û t'êr bijî!»*

---

[1282] *hes*
[1283] *deliqand*
[1284] *afirand*
[1285] *Melek*
[1286] *ser û qalb*

**S. 23** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ew şuxula Xwedê wekî nijinî,*
*2 Ser û qalb, dest û p'ê dinijinî,*
*3 Ew e'zîz melik Fexredîn bû, go: «Hilû bijî!»*

**S. 25** *1 «Wekî qalbê Adem p'êx̃ember dibûye,*
*2 Ser, û dest, p'ê da dibûye,*
*3 Dersed pêda diçûye».*

**S. 21** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, wextê qalbê Adem p'êx̃ember bûye,*
*2 Çêkir û t'emam bûye,*
*3 Bi firwara silt'an Êzî p'êya çûye».*

**S. 26** *1 Şêx go: «Aqûbo, emê xeber bidin ji Adem û pêş ve,*
*2 Wekî av hebû, nediço co û êş ve*[1287]*,*
*3 Ewan çî dixwar sal û meha û cêş ve?»*

**S. 22** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, da em xeber bideyin ji Adem û pal ve,*
*2 Av hebû, ne dihate bi cohyan aş ve,*
*3 Ewan çî dixwar mehan û sal ve?»*

**S. 43** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, em xeberdin Adem pêş va,*
*2 Aş hebû, av nediçû cewa êş va,*
*3 Xwerin û vexwerina wan cimlet û cêş va».*

**S. 27** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, yê wela,*
*2 E'wil yêt ne bê mal, yê wellaĥ,*
*3 Ew ne di bê mam wela,*
*4 Xwerina wan, vexwerine wan şikir il-ĥemdillah».*

**S. 23** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, wela,*
*2 Ewin milyak'etên wî mute wela,*
*3 Xwerina wan şukrîn bû il-ĥemdillah.*

**S. 24** *1 Ew bûn melekên sekinîne,*
*2 Ji nûra Îlaĥîne,*
*3 Xwerina wan il-ĥemdillah û şukrîne.*

**S. 27** *1 Aqûb dibêjit: «Şêxê mino, ezim Aqûbê Mûsa,*
*2 Hey fexro yî fêrisa,*
*3 Tu r̂ûnê li meclîsa,*
*4 Yê wekî Aqûbê Mûsa,*
*5 Şêx Fexrê Adiyan jê bike pirsa».*

**S. 46** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, ezim Aqûbê Mûsa,*
*2 Fexran û fêrisa,*
*3 Yê bîna şêx wê r̂ûnên meclîsa,*
*4 Yê bîna Aqûb wê r̂ûnên û jê bikin pirsan û pirsa».*

**S. 28** *1 Şêx go: «Aqûbo, xeber bidin ji Adem û bal ve,*
*2 Wekî av hebû, ne diçu kenar ve,*
*3 Ewan çî dixwar, cêş û meha û sal ve?»*

**S. 29** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ewan nebîyêt Cebêre,*
*2 Xwandina wan ji dêra,*
*3 Ewan ne dixwar, ji r̂eĥma Xwedê dibin t'êre».*

**S. 25** *1 Ew bûn melekên wî yên Cebêre,*
*2 Xwendina wan ji dêre,*
*3 Ewan tiştek ne dixwar, ji r̂eĥmata Xwedê dibûn t'êre».*

**S. 44** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, nebîyne, nebîyê Cebêrin,*
*2 Xwendina wane ji dêrin,*

[1287] binêr: *aş*(*ve*)

*3 Xwerina wan, il-ĥemdillah[1288] şikir û ji r̂eĥma Xwedê t'êrin».*

**S. 30** *1 «Ewan nebîyêt mislîne,*
*2 Ji nûra Îlaĥîne,*
*3 Xwerina wan, vexwerine wan, il-ĥemdillah û şikrîne».*

**S. 31** *1 Şêx go: «Aqûbo, ezim kur̂ê r̂ewala,*
*2 Min go r̂evandî ji nav sed û bîst û çar ĥezar siwara,*
*3 Ez çom, r̂astiya xwe ne got çu yara».*
**S. 26** *1 Şêx dibêjit: «Aqûbo, ezim lawê r̂iwala,*
*2 Min go r̂evend sed û bîst û çar ĥezar siwara,*
*3 Ez dê çim, min r̂astiya xwe ne gote çû yara».*
**S. 45** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, ezim serê şara,*
*2 Min gogek r̂evandiye nava [sed û] bîst û çar ĥezara,*
*3 Hela hê min saxîke dilê xwe negotiye t'u biran û yara[1289]».*

**S. 32** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, tuyî faxrê fêrisa,*
*2 Yêt wekî şê[x] Fexrê Adiya r̂unêt meclisa,*
*3 Yê wek min çiye şêx Fexrê Adiya jê bikit pirsa».*

**S. 33** *1 Şêx go: «Aqûbo, min e'cêbek dîye.*
*2 Ne e'yare, ne muye, ne zimane, ne ger̂uye,*
*3 Dik'irê wî welat û berwelat diçuye.*
*4 Qewî şaristanîyê bi r̂uye?!»*
**S. 28** *1 Şêx ji Aqûb pirsiye: «Aqûbo, tu bi insî key, bi cinsîye,*
*2 Bi Melikê Bêrîye dê r̂astiyê bo min bêjîye,*
*3 Min e'cêbek dîye?*

**S. 29** *1 Welat û berwelat ger̂îye,*
*2 Ne e'yare, ne muye,*
*3 Ne zimane ne gewrîye,*
*4 Şaristana qewî bi r̂ûye».*

**S. 34** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, e'cêb û ne e'cêbe,*
*2 Deft'ere, k'itêbe, tê heye ji ilmê ẍêbe,*
*3 E'limê wan go k'itêbe, yê gelek tanîn ber hisêbe».*
**S. 30** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, ya te dîtî ne e'cêbe,*
*2 Deft'ere û k'itêbe,*
*3 Tê heye ilmê ji ẍeybe,*
*4 E'limê we nemabû çû k'itêbe».*

**S. 35** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Husnîkî[1290] cinsîye[1291], bêje min r̂astîye*
*3 Jehra marî ji çîye?»*
**S. 31** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Tu bi manîke bi cinsîye, bi Melikê Bêrîye,*
*3 Dê r̂astiyê bo min bêjî ye,*
*4 Bêje min jehra marî ji çîye?»*
**S. 27** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, husnîkî cisnîye, Melikê Bêrîye,*
*2 Tê bêjî min r̂astîye,*
*3 Çik'anê jera mar ji çîye?»*

**S. 36** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ev me'ne li cem min hene,*

[1288] *elhemdilla*
[1289] *biran û yara*
[1290] *hiznîkî*
[1291] *cizn*

*2 E'rdek nîne, hikmê*[1292] *Xwedê lê ne,*
*3 Jehra marî ji xweziya filêne».*

**S. 32** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, ew me'ne li ba min hene,*
*2 E'rdek nîne hikmê Xwedê lê ney,*
*3 Jehra maran ji xweziya filêne».*

**S. 28** *1 Aqûbî ber şêxî zebûne,*
*2 Deyn kir e'ynata melik*[1293] *Fexredîne,*
*3 Go: «Jera mar xweziya filêne*[1294]*,*

**S. 37** *1 «Filan xwezîya xwe davête,*
*2 Mar digiştê û dimête,*
*3 Dersed jehra xwe ji girêde».*

**S. 33** *1 «Filên xweziya xwe avête,*
*2 Mar gehiştê dimête,*
*3 Yekser jehra xwe jê digirête».*

**S. 28** *4 Filên xweziya xwe dirête,*
*5 Mar gihîştê û mête,*
*6 Dest fihal jera xwe pê girêdide».*

**S. 38** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Melikê*[1295] *Bêrîyê, bêje min r̂astîye*
*3 Binyata vê dinê k'engî danîye?»*

**S. 34** *1 Şêx ji Aqûb di pirsîye:*
*2 «Tu bi insîkî, bi cinsîye, bi Melikê Bêrîyê,*
*3 Dê r̂astiyê bo min bêjîye,*
*4 Nijara vê dinê ji k'engî ĥeta k'engîye?»*

**S. 24** *1 Şêx ji Aqûb pirsîye:*
*2 «Husnîkî cinsîye, Melikê Bêrîye,*
*3 Tê bêjî min r̂astîye,*
*4 Çika ew r̂oja r̂ik'ina dinê danîne, ew k'î r̂oj bîye?»*

**S. 39** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, tuyî Faxrê zergûne,*
*2 Her bi ĥerfe, her bi nasîne,*
*3 Binyata vê dine li şembûyê danabû, xilas kirbû li îne».*

**S. 35** *1 Aqûb dibêje: «Şêxo dest yî bi zebûne,*
*2 Deng dikirî bi nehîne,*
*3 Nijyara vê dinyayê ji şembû ĥeta bi îne».*

**S. 25** *1 Aqûbî ber şêxî zebûne,*
*2 Deyn kir e'ynata e'zîz melik Fexredîne,*
*3 Go: «R̂oja dinê danîne, şem û îne».*

**S. 36** *1 «Li şembûyê dana e'sase,*
*2 Li înîyê kir xelase,*
*3 Piştî ĥeftsed sale ĥeft sir hatine dur̂ û k'ase,*
*4 Li çarşemê bir̂î kirase».*

**S. 26** *1 «Şemiyê danî e'sase,*
*2 Çarşemê bir̂î kirase,*
*3 Înîyê dinya kir xilase».*

**S. 40** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Husnîkî*[1296] *cisnî ye, Melikê Bêrî ye,*
*3 Bêje k'a vê dinê li k'êder dibûye?»*

**S. 37** *1 Şêx ji Aqûb dipirsî ye:*
*2 «Aqûbo, tu bi husnêkey, bi cinsîye,*

[1292] *hukm*
[1293] *melek*
[1294] *firêc*
[1295] *Melak*
[1296] *hisn*

*3 Bi Melikê Bêrîye, dê r̂astîyê bo min bêjîye,*
*4 Nîveka vê dinê li ku dibî ye?»*

**S. 41** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, min bajar dîtin k'ibîr,*
*2 Têda heye sidq û sebîl,*
*3 Nîveka vê dinê Qudsû Xelîl[1297]».*

**S. 38** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, min zor dîtin yî bi delîl,*
*2 Tê hene sidq û sebîl,*
*3 Nîveka vê dinê Qudsû Xelîl».*

**S. 42** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Husnîkî cisnîye, Melikê Bêrîye,*
*3 Bêje min r̂astîye*
*4 Axa ji ber qalbê Adem p'êẍember mayî li k'u dibîye?»*

**S. 39** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Aqûb, tu bi husnîkî, bi cinsîye,*
*3 Axa ji ber qalbê Adem p'êẍember mayî li k'u dibîye?»*

**S. 29** *1 Şêx ji Aqûbî pirsîye:*
*2 «Husnîkî cisnîye, Melikê Bêrîye,*
*3 Tê bêjî min r̂astîye,*
*4 Hinek ax ber qalbê Adem p'êẍember ma, li kuye?»*

**S. 43** *1 Aqûb go: «Min baẍ dîtin bi ûsul,*
*2 Têda dixwinin bilbil û şalûl,*
*3 Axa ber qalbê Adem p'êẍember mabû, pê ava kirbûn Beyt il-Me'mur[1298]».*

**S. 40** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, min baẍ dîtin meksûre,*
*2 Lê dixwînin şalûl û bilbile,*
*3 Axa ji ber qalbê Adem p'êẍember mayî pê avakir Beyt il-Me'mûr».*

**S. 30** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,*
*2 Axa ber qalbê Adem p'êẍember ma,*
*3 Pê ava kirin Qudsû Xelîle».*

**S. 44** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindek din li wêder mabû»,*
*2 Aqûb go: «Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Axa ber qalbê Adem p'êẍember mabû,*
*4 "Beyt il-Me'mur" pê ava bû».*

**S. 45** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Dara temir jê p'eyda bû».*

**S. 41** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hin dî li wê mabû,*
*2 Aqûb dibêje: Şêxê mino, e'limê we nemabû,*
*3 Dara xurmê jê p'eyda bû».*

**S. 33** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».*

**S. 34** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,*
*2 E'rifa jê nemabû,*
*3 Dara temir jê p'eyda bû».*

**S. 42** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hin dî li wê mabû,*
*2 Aqûb dibêje: Şêxê mino, e'limê we nemabû,*
*3 Ĥemû tişt jê p'eyda bû».*

**S. 43** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hin dî li wê mabû,*

[1297] *qudis û xelîl*
[1298] Считается, что мечеть Кааба - "харам" или Бейт аль-'Атик, распологается в проэкции, прямо под Байт аль-Ма`Муром (много посещаемый дом) на седьмом небосводе - местом обхода (mataf) тех, кто на небесах.

*2 Aqûb dibêjit: Şêxê mino, e'limê we nemabû,*
*3 Cin Teyar ȓeviya bû,*
*4 Li ser çiya qurban danabû,*
*5 Beĥra ĥemû kesan jê ne dabû».*

**S. 40** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,*
*2 Ĉira jê p'eyda bû,*
*3 Ser banê Kabetilleyê dana bû,*
*4 Cin Teyar lê dabû ȓeva bû,*
*5 P'ara ĥemû kesî jê ne dabû».*

**S. 46** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Genim jê p'eyda bû».*

**S. 47** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Pembû jê p'eyda bû».*

**S. 37** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».*

**S. 38** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,*
*2 E'rifa jê ne mabû,*
*3 Pembû jê p'eyda bû».*

**S. 48** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Sinik[1299], û kule, û qimil jê p'eyda bû».*

**S. 49** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Kul û şê jê p'eyda bû».*

**S. 31** *1 «Şêx go: Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».*

**S. 32** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, e'rifa jê nemabû,*
*2 Qubil, sibil, jê p'eyda bû».*

**S. 35** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».*

**S. 36** *1 Aqûb go: Seyîdayê mino, e'rifa jê nemabû,*
*2 Av û agir jê p'eyda bû».*

**S. 50** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din jê mabû,*
*2 Aqûb go: Ya seyîdî, e'limê wan ne mabû,*
*3 Can teyr ȓiwandbû,*
*4 Li her ĥeft e'zmana gêȓandbû,*
*5 Ser banê Lalişê danabû,*
*6 P'ara ĥemû kesekî jê ne dabû».*

**S. 39** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».*

**S. 51** *1 «Xwedê we kir, we diqedirand,*
*2 Tiştek ji wê navê di e'firand[1300],*
*3 Qalbê Adem p'êx̂ember pê sit'irand».*

**S. 44** *1 «P'adşê min qedirand,*
*2 Tiştek jê di e'firand,*
*3 Qalbê Adem p'êx̂ember pê disit'irand».*

[1299] *snik*
[1300] *afirand*

**S. 52** *1 Şêx go: «Aqûbo, berî r̂oj hiltêye,*
*2 Min destekî goştî ji te divêye,*
*3 Ne ji nêr, ne ji mêye?!»*

**S. 45** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, herr̂oj ku r̂oj hiltêye,*
*2 Min destek goşt ji te divêye,*
*3 Ne ji nêr çêbe ne ji mêye».*

**S. 53** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, sibeye ko r̂oj zeriqî,*
*2 Nûr ji nûrê şifiqî,*
*3 Ew Şimhûnî k'îtêb ji ber xulqî».*

**S. 46** *1 Aqûb dibêjit: «Şêxê mino, herr̂oj ku r̂oj zeriqî,*
*2 Nûr ji nûrê t'ifiqî,*
*3 Şemhûnî k'îb ji ber xulqî».*

**S. 54** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Tu bi husnîkî cinsîye, Melikê Bêrîye,*
*3 Ji berî xulqî k'îye?*
*4 Yê bi avê helikî k'îye?»*

**S. 47** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye:*
*2 «Bi Melikê Bêrîyê bo min bêjîye,*
*3 Yê bi beĥrê xeniqî k'îye,*
*4 Yê ji berî xulqî k'îye,*
*5 Yê ji berî sit'irî k'îye?»*

**S. 41** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, bêje, çika ewê beĥrê*[1301] *xer̂iqî k'îye?*
*2 Ewê berê t'ifiqîye k'îye?»*

**S. 55** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, tuyî Fexrê zergune,*
*2 Her bi ĥerfe, her bi nasîna,*
*3 Ji beĥrî xulqî Şemhúne,*
*4 Yê bi berî sit'irî her ĥeft mêrêt k'afune,*
*5 Yê nave helikî qewmê Ferune».*

**S. 48** *1 Aqûb dibêjet: «Şêxê mino,*
*2 Aqûbê Mûsa bi destê te zebûne,*
*3 Deng dike yî nehîne,*
*4 Yê bi beĥrê xeniqî ferûne,*
*5 Yê ji berî xulqî Şemhúne,*
*6 Yê bi berî sit'irîn her ĥeft mêrên k'afûne»,*

**S. 42** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,*
*2 Ewê berê xer̂iqî Şimhûne,*
*3 Yê berê t'ifiqîne her ĥeftin mêrê K'af û Nûne».*

**S. 48** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, çendî r̂oj zeriqî,*
*2 Nûr ji nûrê t'ifiqî,*
*3 Hingê Şimhûn bû berê xulqî».*

**S. 47** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, r̂oj hiltêye,*
*2 Min deste goşt te di vêye,*
*3 Ne nêr be, ne jî mê ye».*

**S. 56** *1 Şêx go: «Aqûbo, te çend xweşo,*
*2 Bi van me'nîya mebe serxweşo,*
*3 Ĥeramo*[1302] *xwe bi ĥelalê xelqê*[1303] *meşo».*

**S. 49** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hey cerg r̂eşo,*
*2 Tu bi van me'nîyan mebe serxweşo,*

---

1301 *ber*
1302 *heram*
1303 *xelk*

*3 Ĥelaliya xwe bi ĥeramiya xelqê mefroş».*

**S. 49** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, ceger r̂eşo,*
*2 E'rifo, serxweşo,*
*3 Ĥelalê xwe, ĥeramê xelqê neşo».*

**S. 57** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, emin li ba te bi nederin,*
*2 Bi ĥeta te deng dikirin,*
*3 Em ĥelalê xwe bi ĥeramê xelqê nagirin».*

**S. 50** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, em li ba te dik'irin,*
*2 Bi saf û [ĥeybete] te difikirin,*
*3 Ĥelaliya xwe bi ĥeramiya xelqê ne didirin».*

**S. 50** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, Aqûbî xwedan nedere,*
*2 E'ynata e'zîz melik Fexredîn deyn dikire,*
*3 Ĥelalê xwe, ĥeramê xelqê ne dere».*

**S. 51** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, deşta Kerbelayê,*
*2 Ĥeta şêx dîndara xwe ne dayê,*
*3 Aqûbê Mûsa ne r̂uĥyabû pişta dayê».*

**S. 52** *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, deşta Kerbe deştê,*
*2 R̂aste ĥeta dîndara şêx negihîştê,*
*3 Aqûbê Mûsa ne r̂uĥya bû piştê».*

**S. 58** *1 Şêx go: «Aqûbo, ho bi me'nîne, bi xeberin,*
*2 Ba yek û dû r̂unin behs dikirin,*
*3 E'limê vê dinê çend qelenderin»,*

**S. 52** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, kelat û ber kelat,*
*2 Agirek we tê helat,*
*3 Li ber sotî çiqas çiya, deşt û welat».*

**S. 53** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, dilê min kela nijî,*
*2 Agirekê tê gurmijî,*
*3 Li ber çiqas welat û cî».*

**S. 59** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, em û qelenderin,*
*2 Ba yek û dû r̂unin behs dikirin,*
*3 Ji xelefê şêx Fexrê Adiya e'limê vê dinê ĥemû werin».*

**S. 51** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, çendî em û qelenderin,*
*2 Bi mane yî, û bi xeberin,*
*3 Em dizanin e'limên vê dinyayê çend qederin,*
*4 Ji bilî şêx Fexrê Adîya hûn ĥemû werin».*

**S. 60** *1 Şêx go: «Aqûbo, bi jîrîye,*
*2 Bi me'rfetêye, bi xeberêye,*
*3 R̂ast bajo[1304], here dîwana mîrîye».*

**S. 61** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, em di jîrin,*
*2 Bi me'rîfetin, bi xebîrin,*
*3 Li ba şêx Fexrê Adiya bi r̂aw û t'egbîrin».*

**S. 62** *1 Şêx go: «Aqûbo, ez fikirîm di fikirekî da,*
*2 Dama bûm di umrekî da,*
*3 Min sed û bîstû çar ĥezar buk'ir dîn di wê buk'irê da».*

**S. 54** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, fikrîm li ser fikrekê,*
*2 Dama bûn bi umrekê,*
*3 Sed û bîst û çar ĥezar buk'irî dîtin bi kirekê».*

---

[1304] *bihajo*

**S. 63** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ez jî fikirîm di wê fikrê da,*
*2 Ez jî dama bûm di wê umrî da,*
*3 Min jî sed û bîst û çar ĥezar buk'ir dîn di wî buk'irî da».*

**S. 55** *1 «Ez fikirîm di wê fikrê de,*
*2 Dama bûm di wê emrê de,*
*3 Min jî bîst û çar ĥezar buk'ir dîtin di buk'irê de».*

**S. 64** *1 Şêx tê jî Aqûb van me'nîya xweş dibî,*
*2 Sor, û sipî, û r̂eş dibî,*
*3 Şeş û şeş dibî.*

**S. 56** *1 Şêx tê xeber xweş*[1305] *divêye,*
*2 Sor, sipî û r̂eş divêye,*
*3 Şeş û şeş û şeş divêye.*

**S. 65** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, şeş wê li serî r̂a,*
*2 Şeş wê li dergehê mîra,*
*3 Şeş dane xelqê e'rifî, zanayî û jîre».*

**S. 57** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, şeş wê di serîre,*
*2 Şeş wê di dergehê mîr r̂e,*
*3 Şeş dane xelqê e'rif, zana û jîre».*

**S. 66** *1 Şêx tê ji Aqûb van me'nîya tî di bîye,*
*2 R̂eş û sor, û sipî di bîye,*
*3 Hind û hind û hind di vîye.*

**S. 58** *1 Şêx tê xebera hind dive,*
*2 Sor û sipî û r̂eş divê,*
*3 Hind, hind û hind dive.*

**S. 67** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, hind wê li beĥra û cewa,*
*2 Hind wê li e'rda û r̂ewa,*
*3 Hind wê li e'zmana û hewa,*
*4 Şirûtê şêx Fexrê Adiya yek jê ewe».*

**S. 59** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, hind wê li e'rd li r̂ewa,*
*2 Hind wê li e'zmanan, li hewa,*
*3 Hind wê li çare r̂ewa,*
*4 Şirûteke şêx Fexrê Adiya jê ewe».*

**S. 68** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî cara kefir deştê,*
*2 Heke fereca şêx Fexrê Adiya ne digehiştê,*
*3 Yêt wekî Aqûbê Musa ne diço ne piştê».*

**S. 69** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, wekî cara li kefir belayê,*
*2 Heke fereca şêx Fexrê Adiya ne digehayê,*
*3 Ez jî dizanim, yê wekî Aqûbê Musa, ne diço ne bedena dayê».*

**S. 70** *1 Şêx go: «Aqûbo, min bora xwe hildikende,*
*2 Ber girtbû t'oq*[1306] *û zende,*
*3 Ez hatîme li ber Aqûbê Musa bibrim dare û derbenda».*

**S. 62** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê min xwe hilkende,*
*2 Min li ber kir tukan û zende,*
*3 Wê r̂ojê min li Aqûbê Mûsa birîbû derbende».*

**S. 55** *1 Şêx borê xwe hilkende,*
*2 Lê hilda t'oq û zende,*
*3 Go: «Min ĥerfekê da Aqûbê Mûsa, kire bende».*

[1305] *xoş*
[1306] *tok*

**S. 71** *1 Aqûb go: «Heyî şêxê mino ji male şêx Şeref,*
*2 Heyî bazîo, herçar t'eref,*
*3 Yêt wekî şê Fexrê Adiya lê didin ger̂ û gef*[1307]*».*

**S. 61** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, hey şêxo, ji mala şêx Şerefe,*
*2 Tu xwedanê k'itêban û misĥefe,*
*3 Yê*[1308] *wekî Aqûbê Mûsa çîye,*
*4 Şêx Fexrê Adîya li gel bikete gefa».*

**S. 53** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, qewmek*[1309] *heye mehele,*
*2 Xwerina wî qewmî xerdele,*
*3 …………………………………*

**S. 72** *1 Şêx go: «Aqûbo, borê xwe min lebisand,*
*2 Mezin meydana meleka min r̂eqisand,*
*3 Bi yêk ĥerfa ĥeqîyê Aqûbê Musa, min tirsand».*

**S. 60** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê min borê xwe lebisand,*
*2 Min bire meydana melikan r̂eqisand,*
*3 Min bi ĥerfekê Aqûbê Mûsa tirsand».*

**S. 54** *1 Aqûb wê ĥerfê cab ne dabû.*
*2 Şêx borê xwe dimismisand,*
*3 Nava mezin meydanê meleka da dir̂eqisand,*
*4 Go: «Min ĥerfekê da Aqûbê Mûsa tirsand».*

**S. 73** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ezim Aqûbê bi sur̂im,*
*2 Ez hatime li vê bim,*
*3 Li gel cewana şêx Fexrê Adiya hazir bim».*

**S. 63** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, ez Aqûbê mitirbim,*
*2 Ez hatime dê li vir bim,*
*3 Ĥeta r̂oja qiyametê li ber qedemgeha şêx Fexrê Adiyan bi xwe p'ir̂ bim».*

**S. 74** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindyo,*
*2 Heyî qutbo*[1310]*, heyî giran r̂ecîo,*
*3 Tu k'engê bi vê me'rîfetê xeyal bîo?»*

**S. 64** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hindo,*
*2 Hey qutbo, giran r̂eco,*
*3 Tu ji k'engî ve bi vê me'rîfetê hiso?»*

**S. 75** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, hindok û hindune,*
*2 T'op û cen li cane, li dune,*
*3 Dayîm xulamê baxoyê xwe bi r̂ecune».*

**S. 65** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, hindek û hindo me,*
*2 Heger sed car, t'op û cebilxane bidin dûme,*
*3 Ji hingî û virve bi vê me'rîfetê bûme».*

**S. 76** *1 Şêx go: «Aqûbo, hind ĥeta atqat,*
*2 Ezê te kivanekî bikim xelat,*
*3 Dik'rê wî diger̂êt welat û berwelat».*

**S. 66** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, ji hind ĥeta bi atqate,*
*2 Dê kivanek li te kim xelate,*
*3 Dik'rê wî biçe welet berwelate».*

**S. 77** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, kevanek didî minî qelendere,*
*2 Dermanê wî ji t'oza zerne,*

---

[1307] *gelef*
[1308] *Ê*
[1309] *qewat*
[1310] *qitlo*

*3 Dayîm cotê kîz me li ber me».*

**S. 78** *1 Şêx go: «Aqûbo, kevanê didim te dû me'şûqe,*
*2 Ne ĥişke, tê heye p'ar û pişke».*

**S. 67** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, kevanê bidey min dîm ji ĥeqîyê,*
*2 Ne ji ĥişk bê,*
*3 Gelek aşiq te hebin bar û pişk bê».*

**S. 79** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, kevanê didî min ne e'rze,*
*2 Pêber û ne kevne bi merze,*
*3 Da r̂oja axretê siware xwe ve neşêre derza».*

**S. 68** *1 Şêx dibeje: «Aqûbo, dê kevanek li tekim ne yî r̂eza,*
*2 Pê me nek'efte pê merza,*
*3 Pê nekeve pê nere,*
*4 Da siware[1311] xwe veneşêrin li derza».*

**S. 69** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, kevanek di deye min çend qenderbê,*
*2 Dermanê wî ji tuwa zer bê,*
*3 Cotek bizmê li ber bê».*

**S. 70** *1 Şêx dibêje: «Aqubo, hewe r̂oja k'ufir li belaye,*
*2 Heger fereca Xwedê û şêx Fexrê Adiya ne digehayê,*
*3 Ewê r̂ojê Aqûbê Musa ne dibû ji bedena dayê».*

**S. 71** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, hewa r̂oja k'ufir gehiştê,*
*2 Heger fereca Xwedê û şêx Fexrêt Adîyan ne digehiştê,*
*3 Aqûbê Mûsa ne dibû ji piştê».*

**S. 80** *1 Şêx go: «Aqûbo, p'ira Siratê ya zere,*
*2 Bêhn misk, û bixure, û enbere,*
*3 Dîwana silt'an şêx Adî ya bi mal û sere».*

**S. 72** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, p'ira Siratê zere,*
*2 Te bên[1312] ji bixûr, misk û enbere,*
*3 Dîndara silt'an Êzî ya bi male û bi sere».*

**S. 81** *1 Şêx go: «Aqûbo, p'ira Siratê[1313] ya k'eske,*
*2 Te bêhn bixure, û enbere, û miske,*
*3 Dîwana silt'an şêx Adî, ya bi ser, û mal, û r̂isqe[1314]».*

**S. 73** *1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, p'ira Siratê k'eske,*
*2 Te bên ji bixûr, û enbere, û miske,*
*3 Dîndara silt'an Êzî ya bi male, û bi r̂isqe[1315]».*

**S. 53** *1 Şêx go: «Aqûbê mino,qewmek[1316] heye mehele,*
*2 Xwerina wî qewmî xerdele».*

**S. 54** *1 Aqûb wê ĥerfê cab ne dabû.*
*2 Şêx borê xwe dimismisand,*
*3 Nava mezin meydanê meleka da dir̂eqisand,*
*4 Go: «Min ĥerfekê da Aqûbê Mûsa tirsand».*

**S. 82** *1 Me'nîyek ji me'nîyêt ĥeqîqete,*
*2 Me'nîyek ji yarû birayîyêt[1317] axretê,*

---

[1311] *sivor*
[1312] *bihin*
[1313] *Selat*
[1314] *r̂izq*
[1315] *r̂izq*
[1316] *qewat*
[1317] *yar û birayîyêt*

*3 Şêx ji Aqûb r̂azî ye ji vê xilmetê.*
**S. 74** *1 Çêrek ji yên merîfetê,*
*2 Nefesek ji yên ĥeqîqetê,*
*3 Şêx ji Aqûb r̂azî bû bi vê xilmetê*
*4 Îro bo dinê, sibê bo banga axretê.*

*T'emametîya Xwedê û silt'an Şîxadî û melik şêx Sin!*
*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

**S. 1** *1 Şêx go: «Aqûbo, ezim kur̂ê r̂ewala,* **(2. S. 26.1)**
*2 Min go r̂evandî ji nav sed û bîst û çar ĥezar siwara,* **(2. S. 26.1)**
*3 Hela hê min saẍîke dilê xwe negotiye t'u biran û yara».* **(1. S. 1.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, ezim Aqûbê Mûsa,* **(3. S. 46.1)**
*2 Fexran û fêrisa, yê bîna şêx wê r̂ûnên meclîsa,* **(3. S. 46.2)**
*3 Yê bîna Aqûb wê r̂ûnên û jê bikin pirsan û pirse».* **(3. S. 46.3)**

**S. 2** *1 Şêx go: «Aqûbo, çendî r̂oje û çendî şeve,* **(1. S. 2.1)**
*2 Ez fikirîme ber xwe ve,* **(1. S. 2.2)**
*3 Min me'siyek di beĥrê de dît, dur̂ek di deve,* **(2. S. 2.3)**
*4 Ew masî, ewî beĥrê, ewê dur̂ê dik'êşe ber xwe ve».* **(1. S. 2.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, tu xwedanê sur̂ê!* **(3. S. 2.1)**
*2 Qene ji wî m'esîyê be, ne ji wê beĥrê be, ne ji wê dur̂ê,* **(3. S. 2.2)**
*3 Me ça dîtibe k'işmîş ser berê?»* **(3. S. 2.3)**

**S. 3** *1 Şêx go: «Aqûbo, divê mêrî mêr be,* **(1. S. 3.1)**
*2 Şebhatî şêr be,* **(1. S. 3.2)**
*3 Li cêra xwey p'aye zêr̂ be.* **(3. S. 1.3)**
*4 Bi jîriya xwe himberî şêx be[1318]».* **(2. S. 1.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, wekî mêr ne mêrdar be,* **(3. S. 4.1)**
*2 Û ilmê xwe ne siwar be,* **(3. S. 4.2)**
*3 R̂oja axretê şêxê wî desta da bê zar be».* **(3. S. 4.3)**

**S. 4** *1 Şêx go: «Aqûbo, peza bi stewrî nedoş,* **(1. S.5.1)**
*2 R̂astiya dilan bi pol nefroş,* **(2. S. 5.2)**
*3 a. Nebe muĥbê xelqê îman li koş.* **(2. S. 5.1)**
*b. Mebe mişteriyê meriyê îman koş».* **(3. S. 5.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, zêr̂a mehavêje zikaka,* **(1. S. 6.1)**
*2 a. Jêk vede xofîyan û çaka,* **(1. S. 6.2)**
*b. Jêk vede xaman û p'akan,* **(2. S. 5.2)**
*c. Jêk vede xav û çaka,* **(3. S. 5.3)**
*3 Înşallaĥ, weled naçin e'silê maka».* **(1. S. 6.3)**

**S. 5** *1 Şêx go: «Aqûbo, ev zeviya sersed dirêj,* **(1. S. 8.1)**
*2 a. Bi t'oze, û bi qirêj,* **(1. S. 8.2)**
*b. Ye p'aqije, ye bê t'oze, ye bê qirêj,* **(2. S. 6.2)**
*3 Tê heye sur̂et, û teĥiyat, û nivêj».* **(1. S. 8.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, zeviya ser seda dirêj,* **(3. S. 10.1)**
*2 Bê t'oze, bê xubare, bê niqêş,* **(3. S. 10.2)**
*3 Serî heye, ferz, û teĥiyat, û nimêj».* **(3. S. 10.3)**

**S. 6** *1 Şêx go: «Aqûbo, zeviya ji zeviyane zêde,* **(3. S. 9.1)**
*2 Ĥeft gîsna lêde,* **(3. S. 9.2)**
*3 Hew paş t'oximê xwe pêde».* **(3. S. 9.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, ew zeviya zêde,* **(1. S. 9.1)**
*2 Sê gîsna lêde,* **(1. S. 9.2)**
*3 Ew paş tovê xwe pêde».* **(1. S. 9.3)**

[1318] *bî*

| | | |
|---|---|---|
| **S. 7** | *1 Şêx go: «Aqûbê mino, nekî dînî,* | **(3. S. 7.1)** |
| | *2 T'oximê xwe ĥişke beyaniya meřeşînî,* | **(3. S. 7.2)** |
| | *3 Da li řoja axretê stirya jê hilînî».* | **(3. S. 7.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, kesêkî, kesak divî,* | **(1. S. 7.1)** |
| | *2 Nabe lê şik bik'evî,* | **(1. S. 7.2)** |
| | *3 Tov nayê li qîmeta zevî».* | |
| **S. 8** | *1 Şêx go: «Aqûbo, biçîne weke tu dizanî,* | **(1. S. 11.1)** |
| | *2 a. P'avêj tovekî p'iř deqanî,* | **(1. S. 11.2)** |
| | *b. P'avêj tovekî p'iř bê çeqanî,* | **(2. S. 10.2)** |
| | *3 Da xwedan xenê be bi dexil û danî».* | **(2. S.10.2)** |
| | *1 Aqûb go: «Seyîdayê min, zeviya dewlete, t'ijî naz û ne'mete,* | **(1. S.12.1)** |
| | *2 Xwedê dexilekî zaf wê bide te, xweyî lê t'êr bûye muĥbete.* | **(1. S.12.2)** |
| | *3 Gelek xelq bi hesûdî wê binêrin te».* | **(1. S.12.3)** |
| **S. 9** | *1 Şêx go: «Aqûbê mino, dilê min kelate,* | **(2. S. 11.1)** |
| | *2 Agirek têda hildihate,* | **(2. S. 11.2)** |
| | *3 Dişewitî welat û berwelate».* | **(2. S. 11.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, dilê min kelat nijî,* | **(1. S. 14.1)** |
| | *2 Agirek têda digurmijî,* | **(1. S. 14.2)** |
| | *3 a. Deşt û ĉiya û banî û welat ji ber sojî,* | **(1. S. 14.3)** |
| | *b. Dişewitî welat û berwelatê din jî».* | **(3. S. 12.3)** |
| **S. 10** | *1 Şêx go: «Aqûbo, jêk dûrin serkanî û ĥişkelî,* | **(1. S. 15.1)** |
| | *2 Ĥeta ĥişkeliya av jê bê,* | **(1. S. 15.2)** |
| | *3 a. Serkanî digete ber mewlê».* | **(1. S. 15.3)** |
| | *b. Serekaniyê heře ber cewla şêx Adî, ber mewlê.* | **(3. S. 14.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Ew serkaniya sar û germe,* | **(1. S. 16.1)** |
| | *2 Ew kaniya binyat anî ber me,* | **(1. S. 16.2)** |
| | *3 Xwe kirye, t'u lê nabe derman».* | **(3. S. 13.3)** |
| **S. 11** | *1 Şêx go: «Aqûbo, weke ji piştê babê kal bî,* | **(1. S. 17.1)** |
| | *2 Û berê dayê t'ifal*[1319] *bî,* | **(1. S. 17.2)** |
| | *3 a. K'engê bi vê me'rîfeftê xeyal*[1320] *bî».* | **(1. S. 17.3)** |
| | *b. Ji hingî û virve ji wê me'rîfetê bê xeber bî.* | **(2. S. 16.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Wextê ji pişta bavê kal bûme,* | **(2. S. 17.1)** |
| | *2 Li ber dayê t'ifal bûme,* | **(2. S. 17.2)** |
| | *3 Ji hingî û virve ji wê me'rîfetê bê xeyal bûme».* | **(2. S. 17.3)** |
| **S. 12** | *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî ji pişta bavê*[1321] *hurîya,* | **(1. S. 19.1)** |
| | *2 a. Û berê dayê řevîya,* | **(1. S. 19.2)** |
| | *b. Û li ber dayê meşiya,* | **(2. S. 14.2)** |
| | *3 K'ehgê bi vê me'rîfetê ĥesîya?»* | **(1. S. 19.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino,  ez pişta bavê hewiyam,* | **(3. S. 18.1)** |
| | *2 Berê dayê řeviyam,* | **(3. S. 18.2)** |
| | *3 Hîngê*[1322] *ez me'rîfetê giliya hesiyam».* | **(3. S. 18.3)** |
| **S. 13** | *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê ji pişta bavê pîr bûy,* | **(2. S. 16.1)** |
| | *2 Li ber dayê bi şîr bûy,* | **(2. S. 16.2)** |
| | *3 Ji hingî û virve ji wê me'rîfetê bê xeber bûy».* | **(2. S. 16.3)** |
| | *1 Aqûb go: « Wextê ji pişta bavê pîr bûm,* | **(1. S. 18.1)** |
| | *2 Û berê dayê şîr bûm,* | **(1. S. 18.2)** |
| | *3 Hingî bi vê me'rîfetê ezî xebîr bûm».* | **(1. S. 18.3)** |

[1319] *tefal*
[1320] *xîyal*
[1321] *bab*
[1322] *hingê*

**S. 14** *1 Şêx go: «Aqûbo, ……………….*
*……………………………..*
*………………………………….*
*1 Aqûb go: «Wextê ji pişta bavê dibûme,* **(1. S. 20.1)**
*2 a. Û berê dayê pêda diçûme,* **(1. S. 20.2)**
*b.Û li ber dayê çûme,* **(2. S. 15.2)**
*3 a. Hingî bi vê me'rîfetê ezî hisî bûme.* **(1. S. 20.3)**
*b. Jî hingî û virve ji wê mêrîfetê bi xeber bûme».* **(2. S. 15.3)**

**S. 15** *1 Şêx go: «Aqûbo, wekî qalbê Adem p'êx̂ember dixulqand,* **(1. S. 21.1)**
*2 R̂uĥ qendîlê danî, di mue'liqand,* **(1. S. 21.2)**
*3 Bêje min, k'î bû, k'î vê r̂a disadiqand?»* **(1. S. 21.3)**
*1 Aqûb go: «Wextê qalbê Adem p'êx̂ember sewirand,* **(2. S. 19.1)**
*2 R̂uĥ ji qendîlê îna û tê mue'liqand,* **(2. S. 19.2)**
*3 Melik Fexredîn li wê bo vê r̂a sadiqand».* **(2. S. 19.3)**

**S. 16** *1 [Şêx go: «Aqûbo,] xwedê we kir, we diqedirand,* **(1. S. 51.1)**
*2 Tiştek ji wê navê die'firand,* **(1. S. 51.2)**
*3 Qalbê Adem p'êx̂ember pê sit'irand».* **(1. S. 51.3)**
*1 Aqûb go: Weke qalbê Adem p'êx̂ember die'firand,* **(1. S. 22.1)**
*2 R̂uĥ ji qendîlê anî, pê r̂a dihêwirand,* **(1. S. 22.2)**
*3 Ez dizanim k'î li wêder bû, k'ê wê r̂a didebirand!»* **(1. S. 22.3)**

**S. 17** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, wextê qalbê Adem p'êx̂ember nijinî,* **(2. S. 18.1)**
*2 R̂uĥ berdayê pê nigijî,* **(2. S. 18.3)**
*3 Bêje min, k'î bû got şukr ji Xwedê, û t'êr bijî?»* **(2. S. 18.3)**
*1 Aqûb go: «Wekî qalbê Adem p'êx̂ember nijinî,* **(1. S. 24.1)**
*2 Serî û dil*[1323] *dinijinî,* **(1. S. 24.2)**
*3 R̂uĥ ji qendîlê anî, pê nigijî,* **(1. S. 24.3)**
*4 Ez dizanim, k'î li wêder bû, k'ê digo il-ĥemdillah, t'êr bijî!»* **(1. S. 24.4)**

**S. 18** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, şixula Xwedê weku çêkir,* **(3. S. 21.1)**
*2 R̂uĥ nava ser[î], û dest, û p'ê kir,* **(3. S. 21.2)**
*3 Bêje min ew k'îjan mêr bû, k'asa qudretê lêkir?»* **(3. S. 21.3)**
*1 Aqûb go: « Ew şixula Xwedê weku anî,* **(3. S. 22.1)**
*2 R̂uĥ nava serî, û dest, û p'ê danî,* **(3. S. 22.2)**
*3 Ew e'zîz melik Fexredîn bû, k'as pê anî».* **(3. S. 22.3)**

**S. 19** *1 Şêx go: «Wekî qalbê Adem p'êx̂ember dibûye,* **(1. S. 25.1)**
*2 Serî û dest pêda dibûye,* **(1. S. 25.2)**
*3 Dersed pêda diçûye».* **(1. S. 25.3)**
*1 Aqûb go: «Wextê qalbê Adem p'êx̂ember bûye,* **(2. S. 21.1)**
*2 Çêkir û t'emam bûye,* **(2. S. 21.2)**
*3 Bi firwara silt'an Êzîd p'êya çûye».* **(2. S. 21.3)**

**S. 20** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, da em xeber bideyin ji Adem û p'al ve,* **(2. S. 22.1)**
*2 Av hebû ne dihate bi cohyan aş ve,* **(2. S. 22.2)**
*3 Ewan çî dixwar mehan û sal ve».* **(2. S. 22.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, yê wellaĥ,* **(2. S. 23.1)**
*2 Ewin milyak'etên wî muta wellaĥ,* **(2. S. 23.2)**
*3 Xwerina wan şukrîn bû il-ĥemdillaĥ.* **(2. S. 23.3)**
*4 Ew bûn melekên sekinîne,* **(2. S. 24.1)**
*5 Ji nûra îlaĥîne,* **(2. S. 24.2)**
*6 Xwerina wan il-ĥemdillah û şukrîne*[1324]*».* **(2. S. 24.3)**

[1323]

[1324] binêr: *şikir*

**S. 21** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, ……………….* **(2. S. 22.1)**
*………………………………*
*………………………………*
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, ewan nebîyêt Cebêre,* **(1. S. 29.1)**
*2 Xwandina wan ji dêra,* **(1. S. 29.2)**
*3 Ewan tiştek ne dixwar, ji r̂eĥmata Xwedê dibûn t’êre.* **(1. S. 29.3)**
*4 Ewan nebîyêt mislîne,* **(1. S. 30.1)**
*5 Ji nûra îlaĥîne,* **(1. S. 30.2)**
*6 Xwerina wan, vexwerine wan, il-ĥemdillah û şikirîne».* **(1. S. 30.3)**

**S.22** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye: «Tu bi insîkî bi cinsîye, bi Melikê Bêrîye,* **(2. S. 28.1)**
*2 Dê r̂astiyê bo min bêjîye,* **(2. S. 28.2)**
*3 Min e’cêbek dîye.* **(2. S. 28.3)**
*4 Welat û berwelat ger̂îye,* **(1. S. 33.1)**
*5 Ne e’yare, ne mûye,* **(1. S. 33.2)**
*6 Ne zimane, ne gewrîye,* **(1. S. 33.3**
*7 Şaristana qewî bi r̂ûye».* **(2. S. 15.3)**
*1 Aqûb go: «[Şêxê mino] ya te dîtî ne e’cêbe,* **(1. S. 34.1)**
*2 Deft’ere û k’itêbe,* **(1. S. 34.2)**
*3Tê heye ilmê ji ẍeybe*[830]*,* **(1. S. 34.3)**
*4Alîmê we ne mabû, çû k’itêbe».* **(1. S. 34.4)**

**S. 23** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye: «Tu bi insîkî, bi cinsîye, bi Melikê Bêrîye,* **(1. S. 35.1)**
*2 Tê bêjî min r̂astîye,* **(1. S. 35.2)**
*3 Çik’anê jera mar ji çîye?»* **(1. S. 35.2)**
*1 Aqûb go: «Ev me’nîye li cem min hene,* **(1. S. 36.1)**
*2 Jehra maran ji xwezîya*[831] *filêne,* **(2. S. 32.2)**
*3 Filên xwezîya xwe avête,* **(2. S. 33.1)**
*4 Mar digiştê û dimête,* **(2. S. 33.3)**
*5 a. Yekser jehra xwe jê digirête.* **(2. S. 33.3)**
*b. Dersed jehra xwe ji girêde».* **(3. S. 38.3)**

**S. 24** *1 Şêx ji Aqûb di pirsîye: «Tu bi insîkî, bi cinsîye,* **(1. S. 38.1)**
*2 Bi Melikê Bêrîyê, dê r̂astîyê bo min bêjîye,* **(1. S. 38.2)**
*3 Nijyara vê dinê ji k’engî ĥeta k’engîye?»* **(1. S. 38.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, dest yî bi zebûne,* **(2. S. 35.1)**
*2 Deng dikirî bi nehîne,* **(2. S. 35.2)**
*3 Nijyara vê dinyayê ji şembû ĥeta bi îne.* **(2. S. 35.3)**
*4 Li şembûyê dana e’sase,* **(1. S. 39.1)**
*5 Li înîyê kir xelase,* **(1. S. 39.2)**
*6 Piştî ĥeftsed sale ĥeft sur̂ hatine dur̂ û k’ase,* **(1. S. 39.3)**
*7 Li çarşemê bir̂î kirase».* **(1. S. 39.4)**

**S. 25** *1Şêx ji Aqûb dipirsîye:* **(2. S. 39.1)**
*2«Aqûb tu bi insîkî, bi cinsîye, bi Melikê Bêrîye,* **(2. S. 39.2)**
*3Tê bêjî min r̂astîye,* **(1. S. 42.2)**
*4Axa ji ber qalbê Adem p’êẍember mayî li k’u dibîye?»* **(1. S. 42.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, min baẍ dîtin bi ûsul,* **(1. S. 43.1)**
*2 Têda dixwînin bilbil û şalûl,* **(1. S. 43.2)**
*3 Axa ber qalbê Adem p’êẍember mabû, pê ava kirbûn Beyt’ il-Me’mûr».* **(1. S. 43.3)**

| | | |
|---|---|---|
| **S. 26** | *1 a. Şêx ji Aqûb dipirsîye: «Aqûbo, tu bi insê key, bi cinsîye,* | **(2. S. 37.1)** |
| | *b. Şêx ji Aqûbî pirsîye: «Husnîkî cisnîye, bi Melikê Bêrîye,* | **(3. S. 29.1)** |
| | *2 Tê bêjî min r̂astîye,* | **(3. S. 29.2)** |
| | *3 Hinek ax ber qalbê Adem p’êẍember ma, li k’uye?»* | **(3. S. 29.3)** |
| | *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino,* | **(3. S. 30.1)** |
| | *2 Axa ber qalbê Adem p’êẍember ma,* | **(3. S. 30.1)** |
| | *3 Pê ava kirin Qudsû Xelîle».* | **(3. S. 30.1)** |
| | | |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîda yê mino, min bajar dîtin k’ibîr,* | **(1. S. 40.1)** |
| | *2 Tê hene sadiq û sebîl,* | **(2. S. 38.2)** |
| | *3 Nîveka vê dinê Qudsû Xelîl».* | **(2. S. 38.2)** |
| | | |
| **S. 27** | *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».* | **(3. S.31.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’rifa jê nemabû,* | **(3. S.31.2)** |
| | *2 Qubil, sibil, jê p’eyda bû».* | **(3. S.31.3)** |
| | | |
| ***S.28*** | *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».* | **(3. S. 35.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’rifa jê ne mabû,* | **(3. S. 36.1)** |
| | *2 Av û agir jê p’eyda bû».* | **(3. S. 36.2)** |
| | | |
| **S.29** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû»,* | **(1. S. 45.1)** |
| | *1 a. Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’limê wan ne mabû»,* | **(1. S. 45.2)** |
| | *b. Aqûb dibêje: «Şêxê mino, e’limê we nemabû,* | **(2. S. 41.1)** |
| | *2 a. Dara temir jê p’eyda bû.* | **(1. S. 45.3)** |
| | *b. Dara xurmê jê p’eyda bû».* | **(3. S. 33.2)** |
| | | |
| **S. 30** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû»,* | **(1. S. 47.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’limê wan ne mabû,* | **(1. S. 47.2)** |
| | *2 Pembû jê p’eyda bû».* | **(1. S. 47.3)** |
| | | |
| | *1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, e’rifa jê ne mabû,* | **(3. S. 38.1)** |
| | *2 Pembû jê p’eyda bû».* | **(3. S. 38.2)** |
| | | |
| **S.31** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû»,* | **(1. S. 46.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, e’limê wan ne mabû,* | **(1. S. 46.2)** |
| | *2 a. Genim jê p’eyda bû».* | **(1. S. 46.3)** |
| | *b. Ĥemû tişt jê p’eyda bû».* | **(2. S. 42.3)** |
| | | |
| **S. 32** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,* | **(1. S. 48.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’limê wan ne mabû,* | **(1. S. 48.2)** |
| | *2 Sinik û kule, û qimil jê p’eyda bû».* | **(1. S. 48.3)** |
| | | |
| **S. 33** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din li wê mabû,* | **(1. S. 49.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’limê wan ne mabû,* | **(1. S. 49.2)** |
| | *2 Kul û şê jê p’eyda bû».* | **(1. S. 49.3)** |
| | | |
| **S. 34** | *1 Şêx go: «Aqûbo, hindekî din jê mabû»,* | **(1. S. 50.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Ya seyîdayê mino, e’limê wan ne mabû,* | **(1. S. 50.2)** |
| | *2 Cin Teayr r̂iwandbû,* | **(1. S. 50.3)** |
| | *3 Li her ĥeft e’zmana gêr̂andbû,* | **(1. S. 50.4)** |
| | *4 Ser banê Lalişê danabû,* | **(1. S. 50.5)** |
| | *5 P’ara ĥemû kesekî jê ne dabû».* | **(1. S. 50.6)** |
| | | |
| **S.35** | *1 Şêx go: «Aqûbê mino, hindekî dinê jî ber mabû».* | **(3. S. 39.1)** |
| | *1 Aqûb go: «Seyîda yê mino, ĉira jê p’eyda bû,* | **(3. S. 40.1)** |
| | *2 Ser banê K’abet îlaĥîyê dana bû,* | **(3. S. 40.2)** |
| | *3 Cin Teayr lê dabû r̂eva bû,* | **(3. S. 40.3)** |
| | *4 P’ara ĥemû kesî jê ne dabû».* | **(3. S. 40.4)** |

**S. 36** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, herr̂oj ku r̂oj hiltêye,* **(1. S. 52.1)**
*2 Min destek goşt ji te divêye,* **(1. S. 52.2)**
*3 Ne ji nêr çêbe ne ji mêye».* **(1. S. 52.3)**
*1 a. Aqûb go: «Ya seyîdî, sibeye ko r̂oj zeriqî,* **(1. S. 53.1)**
*b. Aqûb go: «Ya seyîdî, sibeye herr̂oj ku zeriqî,* **(2. S. 46.1)**
*2 a. Nûr ji nûrê şifiqî,* **(1. S. 53.2)**
*b. Nûr ji nûrê t'ifiqî,* **(2. S. 46.2)**
*3 a. Ew Şimhûnê k'îtêb ji ber xulqî».* **(1. S. 53.3)**
*b. Hîngê Şimhûn bû berê xulqî.* **(3. S. 37.3)**
*c. Şemhûnî kîb ji ber xulqî».* **(2. S. 46.3)**

**S. 37** *1 Şêx ji Aqûb dipirsîye: «Bi Melikê Bêrîyê bo min bêjîye,* **(1. S. 54.1)**
*2 Yê bi beĥrê xeniqî k'îye,* **(1. S. 54.2)**
*3 Yê ji berî xulqî k'îye,* **(1. S. 54.3)**
*4 Yê ji berî sit'irî k'îye?»* **(1. S. 54.4)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, Aqûbê Mûsa bi destê te zebûne,* **(1. S. 55.1)**
*2 Deng dike yî nehîne,* **(1. S. 55.2)**
*3 Yê bi beĥrê xeniqî ferûne,* **(1. S. 55.3)**
*4 Yê ji berî xulqî Şemhûne,* **(1. S. 55.4)**
*5 Yê bi berî sit'irîn, her ĥeft mêrên K'af û Nûne».* **(1. S. 55.5)**

**S. 38** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, hey cerg*[1325] *r̂eşo,* **(2. S.49.1)**
*2 Tu bi van me'nîyan mebe serxweşo,* **(2. S. 49.2)**
*3 a. Ĥelaliya xwe bi ĥeramiîya xelqê mefroş».* **(2. S. 49.3)**
*b. Ĥelalê xwe, ĥeramê xelqê neşo.* **(3. S. 49.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, em li ba te dik'irin,* **(1. S. 57.1)**
*2 Bi saf û ĥeybete te difikirin,* **(1. S. 57.2)**
*3 Ĥelaliya xwe bi hermiya xelqê ne didirin».* **(1. S. 57.3)**

**S. 39** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, çendî em û qelenderin,* **(2. S. 51.1)**
*2 Bi me'nîyî û bi xeberin,* **(2. S. 51.2)**
*3 Em dizanin ilmên vê dinyayê çend qederin,* **(2. S. 51.3)**
*4 Ji bilî Şêx Fexrê Adiya hûn ĥemû werin».* **(2. S. 51.4)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, em û qelenderin,* **(1. S. 59.1)**
*2 Ba yek û du r̂unin behs dikirin,* **(1. S. 59.2)**
*3 Ji xelefê şêx Fexrê Adiya ilmê vê dinê ĥemû werin».* **(1. S. 59.3)**

**S.40** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, kelat û ber kelat,* **(2. S. 52.1)**
*2 Agirek we tê helat,* **(2. S. 52.2)**
*3 Li ber sotî çiqas ĉiya, deşt û welat».* **(2. S. 52.3)**
*1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, dilê min kela nijî,* **(2. S. 53.1)**
*2 Agirek ê tê gurmijî,* **(2. S. 53.2)**
*3 Li ber çiqas welat û cî [jî]».* **(2. S. 53.3)**

**S. 41** *1 Şêx go: «Aqûbo, bi jîrîye,* **(1. S. 60.1)**
*2 Bi me'rîfetêye, bi xeberêye,* **(1. S. 60.2)**
*3 R̂ast bihajo, her̂e dîwana mîrîye».* **(1. S. 60.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, em di jîrin,* **(1. S. 61.1)**
*2 Bi me'rîfetin, di xebîrin,* **(1. S. 61.2)**
*3 Li ba şêx Fexrê Adiya bi r̂aw û t'egbîrin».* **(1. S. 61.3)**

**S. 42** *1 Şêx go: «Aqûbo, fikrîm li ser fikrekê,* **(2. S. 54.1)**
*2 Dama bûn bi umrekê,* **(2. S. 54.2)**
*3 Sed û bîst û çar ĥezar buk'irî dîtin di buk'irekê».* **(2. S. 54.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ez fikirîm di wê fikirê de,* **(1. S. 63.1)**
*2 Dama bûm di wê e'mirê de,* **(1. S. 63.2)**

[1325] binêr: *ceger*

*3 Min jî sed û bîst û çar ĥezar buk'ir dîtin di buk'rê de».* **(1. S. 63.3)**

**S. 43** *1 Şêx tê xeber xweş divêye,* **(1. S. 64.1)**
*2 Sor, sipî û r̂eş divêye,* **(1. S. 64.2)**
*3 Şeş û şeş û şeş divêye.* **(1. S. 64.3)**
*1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, şeş wê di serî r̂a,* **(1. S. 65.1)**
*2 Şeş wê di dergehê mîr r̂a,* **(1. S. 65.2)**
*3 Şeş dane xelqê e'rif, zana û jîr̂a».* **(1. S. 65.3)**

**S. 44** *1 Şêx tê ji Aqûb van e'nîyatî dibîye,* **(1. S. 66.1)**
*2 R̂eş û sor, û sipî dibîye,* **(1. S. 66.2)**
*3 Hind û hind û hind divîye.* **(1. S. 66.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, hind wê li beĥra û cewa,* **(1. S. 67.1)**
*2 Hind wê li e'rda û r̂ewa,* **(1. S. 67.2)**
*3 Hind wê li e'zmana û hewa,* **(1. S. 67.3)**
*4 Şirûtê şêx Fexrê Adiya yek jê ewe».* **(1. S. 67.4)**

**S.45** *1 Şêx dibêje: «Aqubo, hewe r̂oja k'ufir li belaye,* **(2. S. 70.1)**
*2 Heger fereca Xwedê û şêx Fexrê Adiya ne digehayê,* **(2. S. 70.2)**
*3 Ewê r̂ojê Aqûbê Mûsa ne dibû ji bedena dayê».* **(2. S. 70.3)**
*1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, hewa r̂oja k'ufir gehiştê,* **(2. S. 71.1)**
*2 Heger fereca Xwedê û şêx Fexrê Adiyan ne digehiştê,* **(2. S. 71.2)**
*3 Aqûbê Mûsa ne dibû ji piştê».* **(2. S. 71.3)**

**S. 46** *1 Şêx go: «Aqûbê mino, deşta K'erbelayê,* **(3. S. 51.1)**
*2 Ĥeta şêx dîndara xwe ne dayê,* **(3. S. 51.2)**
*3 Aqûbê Mûsa ne r̂uĥyabû pişta dayê».* **(3. S. 51.3)**
*1 Aqûb go: «Seyîdayê mino, deşta K'erbe deştê,* **(3. S. 52.1)**
*2 R̂aste ĥeta dîndara şêx negihîştê,* **(3. S. 52.2)**
*3 Aqûbê Mûsa ne r̂uĥyabû piştê».* **(3. S. 52.3)**

**S. 47** *1 Şêx go: «Aqûbo, min bora xwe hildikende,* **(1. S. 70.1)**
*2 Ber girtbû t'oq[1326] û zende,* **(1. S. 70.2)**
*3 Ez hatîme li ber Aqûbê Mûsa bibirim dare û derbende».* **(1. S. 70.3)**
*1 Aqûb go: «Hey şêxê mino ji male şêx Şeref,* **(1. S. 71.1)**
*2 Hey bazîo, herçar t'eref,* **(1. S. 71.2)**
*3 Yêt wekî şêx Fexrê Adiya lê didin ger̂ û gef».* **(1. S. 71.3)**

**S. 48** *1 Şêx go: «Aqûbê min, qewmek heye mehele,* **(3. S. 53.1)**
*2 Xwerina wî qewmî xerdele,*
*3 ………………………………….».* **(3. S. 53.2)**
*1 Aqûb wê ĥerfê cab ne dabû, şêx borê xwe dimismisand,* **(3. S. 54.1)**
*2 Nava mezin meydanê meleka da dir̂eqisand,* **(3. S. 54.2**
*3 Go: «Min ĥerfekê da, Aqûbê Mûsa tirsand».* **(3. S. 54.3)**

**S. 49** *1 Şêx go: «Aqûbo, borê xwe min lebisand,* **(1. S. 72.1)**
*2 Mezin meydana meleka min r̂eqisand,* **(1. S. 72.2)**
*3 Bi yek ĥerfa ĥeqîyê Aqûbê Mûsa, min tirsand».* **(1. S. 72.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, ezim Aqûbê bi sur̂im,* **(1. S. 73.1)**
*2 Ez hatime li vê bim,* **(1. S. 73.2)**
*3 Li gel cewana şêx Fexrê Adiya hazir bim».* **(1. S. 73.3)**

**S. 50** *1 Şêx borê xwe hilkende,* **(3. S. 55.1)**
*2 Lê hilda t'oq û zende,* **(3. S. 55.2)**
*3 Go: «Min ĥerfekê da Aqûbê Mûsa kire bende».* **(3. S. 55.3)**

………………………………………
………………………………………

[1326] *tok*

…………………………………………

**S. 51** *1 Şêx go: «Aqûbo, hindîo,* **(1. S. 74.1)**
*2 Hey qutbo, hey giran r̂ecîo,* **(1. S. 74.2)**
*3 Tu k'engê bi vê me'rîfetê xeyal bîo?»* **(1. S. 74.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, hindok û hindune,* **(1. S. 75.1)**
*2 T'op û cen li cane, li dune,* **(1. S. 75.2)**
*3 Dayîm xulamê baxoyê xwe bi r̂ê cune».* **(1. S. 75.3)**

**S. 52** *1 Şêx dibêje: «Aqûbo, ji hind ĥeta bi atqate,* **(1. S. 76.1)**
*2 Dê kivanek li te kim xelate,* **(1. S. 76.2)**
*3 Dik'irê wî biçe welet berwelate».* **(1. S. 76.3)**
……………………………………….
………………………………………
……………………………………….

**S. 53** *1 Şêx go: «Aqûbo, kivanê didim te dû me'şûqe[1327],* **(1. S. 78.1)**
*2 Ne ĥişke, tê heye p'ar û pişke».* **(1. S. 78.2)**
*1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, kevanê bidey min dîm ji ĥeqîyê,* **(2. S. 67.1)**
*2 Ne ji ĥişk bê,* **(2. S. 67.2)**
*3 Gelek aşiq te hebin bar û pişk bê».* **(2. S. 67.3)**

**S. 54** *1 Şêx dibeje: «Aqûbo, dê kevanek li tekim ne yî r̂eza,* **(2. S. 68.1)**
*2 Pê me nek'efte pê merza,* **(2. S. 68.2)**
*3 Da siware xwe veneşêrin li derza».* **(2. S. 68.3)**
*1 Aqûb go: «Ya seyîdî, kivanê didî min ne e'rze,* **(1. S. 79.1)**
*2 P'êber û ne kevne bi merze,* **(1. S. 79.2)**
*3 Da r̂oja axretê siware xwe veneşêre derza».* **(1. S. 79.3)**

**S. 55** *1 Aqûb go: «Ya seyîdî, kevanek didî minî qelendere,* **(1. S. 77.1)**
*2 Dermanê wî ji t'oza zerne,* **(1. S. 77.2)**
*3 Dayîm cotê kîz me li ber me».* **(1. S. 77.3)**
………………………………………………………………
……………………………………………………………….
………………………………………………………………..

**S. 56** *1 Şêx go: «Aqûbo, p'ira Siratê ya zere,* **(1. S. 80.1)**
*2 Bên misk, û bixure, û enbere,* **(1. S. 80.2)**
*3 Dîwana silt'an şêx Adî ya bi mal û sere».* **(1. S. 80.3)**
……………………………………………
……………………………………………
……………………………………………

**S. 57** *1 Şêx go: «Aqûbo, p'ira Siratê ya k'eske,* **(1. S. 81.1)**
*2 Te bên bixûre û enbere û miske,* **(1. S. 81.2)**
*3 Dîwana silt'an şêx Adî, ya bi ser û mal û r̂isqe».* **(1. S. 81.3)**
*1 Aqûb dibêje: «Şêxê mino, p'ira Siratê k'eske,* **(2. S. 73.1)**
*2 Te bên ji bixûr, û enbere, û miske,* **(2. S. 73.2)**
*3 Dîndara silt'an Êzîd ya bi male û bi r̂isqe».* **(2. S. 73.3)**

**S.58** *1 Ĉêrek ji yên me'rîfetê,* **(2. S. 74.1)**
*2 Nefesek ji yên ĥeqîqetê,* **(2. S. 74.2)**
*3 Şêx ji Aqûb r̂azî bû bi vê xilmetê,* **(2. S. 74.4)**
*4 Îro bo dinê, sibê bo banga axretê.* **(2. S. 74.4)**

*T'emametîya Xwedê, û silt'an şêx Adî, û melik şêx Sin!*

[1327] *dû me'şiq — dû alî, dû ker û temirîn*

## 60. QEWLÊ T'ELPÛN Û SE'EDÛN[1328]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 T'elpûn dibêjit:«Se'edûno[1329], ez zêȓê safî qursim,*
*2 Di hatina xwe[1330] da yê biĥisim,*
*3 Ez hatîme bi ȓêya Şîxadî û melik şêx Sin duwazde me'nîya ji te bipirsim».*

**S. 2** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, me muĥbet heye ji dêr,*
*2 Ez hatina te nakim înk'êr[1331],*
*3 Tû hatî sed carî bi xêr».*

**S. 3** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, berî dine û Ĥeşemê,*
*2 Em vavartin ji e'lemê,*
*3 Tû bêje min çî nivîsîbû sere qelemê».*

**S. 4** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, hincî te go cirîya,*
*2 Gava qelem bi ȓuĥê venîya,*
*3 Ew teĥîyatek bû li e'lemê digeȓîya».*

**S. 5** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, berî Adem hikmî,*
*2 Ewî civana[1332] ĥeqîyê bi tere e'limî,*
*3 Ji ew paş bi te ȓe k'ilîmî».*

**S. 6** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, berî Hewa û Ademe,*
*2 Ne[1333] ax hebû, ne av hebû, ne agir hebû,*
*3 Min ev civane bi te da».*

**S. 7** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, wextê melik şêx Sin li e'zman[1334] sefer kir,*
*2 Telbî[1335] nûrî Ekber kir,*
*3 Tû bêje min k'ê e'wil slav li k'ê kir?»*

**S. 8** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, hincî te dot, min qebûl kir,*
*2 Nûr bi nûrê t'eĥmul kir,*
*3 E'wil Xwedê[1336] silav li Ȓesul kir».*

**S. 9** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, mical hatin bi car û nebî,*
*2 Ew k'î bû li ser bisatek ya Ȓebî,*
*3 K'î dibû hosta, k'î dibû merebî?»*

**S. 10** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, melik şêx Sin beyzaya,*
*2 Ȓisla wî ji ba Xwedaye,*
*3 Ewî Emîn Cibraîl te'lîm[1337] daye».*

**S. 11** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, ez di e'cêbekê de mame,*
*2 Min tiştek nav beĥreke bi ẍimame,*
*3 Xwerina wî xwîne[1338] û xweziya wî t'ame».*

---

[1328] *Lalish* № 41, 2015 (rr. 64-69) Belavkirin: Şero Îbrohîm Kişto https://ru.calameo.com/books/002518317a11dbf98e1ff
[1329] *se'edun*
[1330] *xo*
[1331] *enker*
[1332] *ciwan*
[1333] *na*
[1334] *esman*
[1335] binêr: *t'eleb*
[1336] *Xudê*
[1337] *te e'lîm*
[1338] *xûn*

**S. 12** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, ez mabûm li wê e'cêbê,*
*2 Min dîtibû nav wê beĥrê,*
*3 Ew weled bû li zikê make».*

**S. 13** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, qudreta wî Ekberî,*
*2 Bi dûvî ĥeta bi serî,*
*3 Ew k'î bû xwe bi dûvê xwe xurî?»*

**S. 14** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, heyî aşiqo ji batinê,*
*2 Êk medha daxin bi T'inê,*
*3 Ew bû t'oka çendî dine».*

**S. 15** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, du tişt hene,*
*2 Qewî di bo gunhene,*
*3 Herdu tişt şeqt derê dojêh ve herene».*

**S. 16** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, min dî ve,*
*2 E'silê te zêr̂e, ne zîve,*
*3 Êk — R̂oje, êk — Heyve».*

**S. 17** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, du tişt hebûn yî li wêne,*
*2 Qewlî di bo gunehbûn,*
*3 Herdu tişt şewqin bi derê dojêh vediherene».*

**S. 18** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, tîr hevaj,*
*2 Aşiqo ji dur̂a[1339] êk-êk bifroş,*
*3 Êk — Heyve, êk — R̂oj».*

**S. 19** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûn, du tişt hene, ne di xweyane[1340],*
*2 Ne ji insin, ne ji cane,*
*3 Ne bi r̂uĥ, ne bi gîyane,*
*4 Ewan bi hewra xeber dane».*

**S. 20** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, hicîya te weqfî,*
*2 Ya berê sibê hat û k'işifî,*
*3 E'lima li ber şêrifî».*

**S. 21** *1 T'elpûn dibêjit: «Se'edûno, birime dêra dêr ĥebandî,*
*2 Dev û zembere li min hilandî».*

**S. 22** *1 Se'edûn dibêjit: «Seyîdî, min hilanî x̂îrete,*
*2 Dev û zembere li min dewete,*
*3 Hincî mêrê her̂r̂o[1341] siba r̂abit yî mirûze[1342] bit, cehnim bore şehbete».*

**S. 23** *1 Se'edûn dibêjit: «Birime dîwana îlaĥîye,*
*2 Min li wê dîtin xweş û şahîye,*
*3 Serê ĥemû tiştî t'ifaq û t'ebahîye.*

**S. 24** *1 Ew bû dara bi t'inê,*
*2 T'extê ewlîya wê li binê,*
*3 Dust û dujman wê diçinê.*

**S. 25** *1 Aşiq, hila her̂e,*

[1339] *dur*
[1340] *dixuyane*
[1341] *hero*
[1342] *merûse*

*2 Heke xêre, heke şeȓe,*
*3 Ĥimeta min heye bi te ȓe».*

*T'emametîya[1343] vî qewlî li Xwedê û xwedane[1344]!*
*Em di kêmin, Xwedê yê t'emame!*

## 61. QEWLÊ GÊLA ÇAR ZIMAN[1345]

**S. 1** *1 Silav u sed silav,*
*2 Li xelqê[1346] xas, ne li xelqê xav,*
*3 Cumletê gêl di nav.*

**S. 2** *1 Silavêt me li e'rifa,*
*2 Werin gêlê şêrifa,*
*3 Şiro biken van waleya.*

**S. 3** *1 Yar gêlê, min dît bori qintareke Horiya,*
*2 Li bejina te hinya, singê ecirafiya,*
*3 Qurtas berda bû ji ȓîşîya.*

**S. 4** *1 Te k'ofî wer anîye,*
*2 T'acekî ȓeşî nûranî li ser diîsîye[1347],*
*3 Yar gêlê ji ĥeybeta te bizdîye.*

**S. 5** *1 Yar gêlê ji ĥeybeta te bizdîya bûm ez,*
*2 Hawir şêra bi ling dibez,*
*3 Biskit kalin mîna merez,*
*4 Yar gêlê tu bi dûbekê me veşîne ez.*

**S. 6** *1 Yar gêlê tu bi dûbekê me veşîne,*
*2 Hawir şêra ȓeş li kemîne,*
*3 Te li bejin û bala vala çîne.*

**S. 7** *1 K'eremke ser t'extê nûrî sedef ȓûne,*
*2 Pêş te bisekinin mezîne,*
*3 Heke tu muĥbî[1348], me biĥebîne.*

**S. 8** *1 Heke tu evîndarî, me li bîra xwe bîne,*
*2 Heke tu bawermendî, em dê êne ser wî dîne.*
*3 Yar gêlê, ya min û te kir, em xêr jê bibîne.*

**S. 9** *1 Yar gêlê xwendeyekî te me lew,*
*2 Ser û garden, ĉav mabû li xew,*
*3 Singê te baẍçeye, wê têda dixwînin[1349] şalûl, û bilbil, û kew.*

**S. 10** *1 Kesê ȓindiya E'deviya nedîtîye,*
*2 Hoye, nazike, let'îfî bedew,*
*3 Yar gêlê kesê dîndara silt'an şêx Adî nedîtîye,*
*4 Ne bi nebûy, ne bi buxtan, ne bi derew.*

---

[1343] *t'imametî*
[1344] *xudan*
[1345] [50] (гг.401-403)
[1346] *xelik*
[1347] *diêsîye*
[1348] *mihib*
[1349] *dixûnin*

**S. 11** *1 Yar gêlê ez xwendîyekî teme neşê,*
*2 Hawirtîre, ya bi tîr keşê,*
*3 Kiras sipî, girîvan bi neqşê.*

**S. 12** *1 Te bi k'ê dida vê nefsê?*
*2 Yar gêlê heke te bo şêx Fexrê Adiya hiştibê,*
*3 Hilû ji me r̂a besê.*

**S. 13** *1 Yar gêlê şêt mam, te dêm heyva nazik,*
*2 Ser û gerden bend û ciftik,*
*3 Kiras sore, girîvan bi hepik.*

**S. 14** *1 Zêr̂ sur̂a kepû bi şimik,*
*2 Kaxeza bizmar birîbû şimik,*
*3 Min dive li xewleyekê biçime nik.*

**S. 15** *1 Hevdengiyekê li gêla xwe bikem ye nermik,*
*2 Ye bê qale, ye bê qîle, ye bê r̂ik,*
*3 Hejaro, tu li gel me r̂astbe silt'an şêx Adî, miraza me u hazira r̂ast bik,*
*4 Hûn bêjin amin be şik.*

**S. 16** *1 Yar gêlê şêt mame, te dêm Heyva zerî,*
*2 Sê biska ji e'niya bi dêrî,*
*3 Tu Elî yan Emerî.*

**S. 17** *1 Hatî kuştina gawira bikerî,*
*2 Leşê wê dik'evin bê serî,*
*3 Hejaro, tu li gel me r̂astbe, silt'an şêx Adî miraza me û hazira hasil biket, li dîwana qereçerî.*

**S. 18** *1 Min li çu sûka nedît li destê çu sewale,*
*2 Min divêt li xewleyekê biçime bale,*
*3 Hev dengiyekê li gel gêla xwe bikem bi gale,*
*4 Ye bê k'erbe, ye bê k'ine, ye bê gale.*
*5 Hejaro, tu li gel me r̂astbe, silt'an şêx Adî miraza me û hazira p'êk bîne, bêjin amîn Înşallaĥ.*

**S. 19** *1 Yar gêlê şêt mame, te dêm Heyva weku R̂oj,*
*2 Ser û garden, bend u bişkoj,*
*3 Kiras sipî, girivan xiroş,*
*4 Min dit gêlê, suhbel dana,*
*5 Qedeh bo dast gêla xwe te dikem,*
*6 Min got: «Vexwe sed car bi noş,*
*7 Min bibe dîwana silt'an şêx Adî bi xwe bifiroş».*

**S. 20** *1 Yar gêlê şêt mame, te dêm heyva çardey,*
*2 Top û t'iveng têkda dibey,*
*3 Bûwe toz, her ji êvarî ĥeta berê sibey,*
*4 Wekî leşkerêd giran dabezîne êk û du, ew me deçîne xwe bi xwey.*

**S. 21** *1 Yar gêlê tu her hey, em mirîdêd teyên*[1350]*,*
*2 Yar gêlê şêt mame, te dêm heyva weke xale,*
*3 Çav askê, gerden xezale,*
*4 Ciyê gêlê, k'afe û Zimzime û mix̂are.*

[1350] *teyin*

## 62. QEWLÊ XEWRÊ[1351]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Derk'etim li xewrêye,*
*2 K'ifş dike stêra sibêye,*
*3 Lalişe xwedanê qubêye.*

**S. 2** *1 Xewrê derk'etim dere,*
*2 Min dît du mêr li bere,*
*3 Yek p'îr Mende, yek p'îr Omere.*

**S. 3** *1 Birime Usif naza,*
*2 Wan derga, wan derwaza,*
*3 Laliş heye ciyê miraza.*

**S. 4** *1 Birime li wêye,*
*2 Ciyê mirazê me lê ye,*
*3 Banga min ber kekê ye.*

**S. 5** *1 Birime beĥreke xebîr,*
*2 Mîrek heye, ew di mîr,*
*3 Cî û mikan daye destê mêrê feqîr.*

**S. 6** *1 Cî û mikan dane destê qelendera,*
*2 Dengekî tê li wan sera,*
*3 Me Şerfedîn bawere.*

**S. 7** *1 Çi aşiqekî serpoşe,*
*2 Muĥbî k'asa coşe,*
*3 Dik'irî, qe nefroşe.*

**S. 8** *1 Dik'irî wa mişterî,*
*2 Ew çi qumaşê ser berî,*
*3 Tu nizanî malê here, yan serî.*

**S. 9** *1 Ew çi qumaşê xezînê,*
*2 Ew qumaş t'ucar nayê k'irînê,*
*3 Pêştirî me'rîfetê û nasînê.*

**S. 10** *1 Sûkê wa delalin,*
*2 Heçî qumaşî bale,*
*3 Bila wî qumaşî xwe bikin ĥelale.*

**S. 11** *1 Çi qumaşî neqşî hûre,*
*2 Ew qumaşê lomay nûre,*
*3 Ew qumaşê yarê Ẍefûre.*

**S. 12** *1 Ez — beĥrim, tu — gerî,*
*2 Ez — siwarim, tu —p'erî,*
*3 Ez — mîrim, tu — miclisî,*
*4 Ez —erk'anim, tu — qursî…*

**S. 13** *1 Ez — qursim, tu — Celîlî,*
*2 Ez — celalim, tu — delîlî,*
*3 Ez — girîvanê e'zîz melîk Fexredînim.*
*4 Girîvanê melîk Fexredîn pê digihîştin,*

[1351] http://www.ezdixandi.com/forum/38-829-1

*5 Ẍafîla loma ez dikuştim.*

**S. 14** *1 Ẍafîla ez dikuştim loma,*
*2 Pêş min va r̂evî k'ome,*
*3 Xerqê ji qudretê, t'ac û t'acpoş,*
*4 Xerqê şêx Adî loma dike minetê.*

**S. 15** *1 Me dike p'îraniyê,*
*2 Ew dereca mîraniyê,*
*3 Ew dereca xerqeye,*
*4 Xerqe lib[a]sê silt'an Êzdîdê meye.*

**S. 16** *1 K'af û Nûn ne dibirin bere,*
*2 Hatin zora dibirin ne dikirin nase,*
*3 E'rş û K'ursîy t'ev di nase.*

**S. 17** *1 Xaliqo, herî ĥetanî herî,*
*2 E'wil hosta tuyî — bêje pirsa esehî r̂astî,*
*3 Çika mast pê çi dimeyî?*

**S. 18** *1 Sibekêr̂a r̂abûm denî,*
*2 Marê qer̂qer̂ r̂abû k'enî,*
*3 Ez hîngê[1352] feqîran r̂a r̂abûme benî.*

**S. 19** *1 Ez feqîran r̂a r̂abûm k'oĉeke,*
*2 Ev dinya heye marê beleke,*
*3 Amanet ît'bara xwe li vê dinê neke.*

**S. 20** *1 Li vê dinê neke amanet ît'bare,*
*2 Ez şêx Şems r̂a r̂abûme nedere,*
*3 Şêxû Bek'ir r̂a r̂abûme mefere.*

**S. 21** *1 Hatime ji hatîya,*
*2 Ez nabihêrim t'u qatîya,*
*3 Gazîkim destûrî şêx Adî, mala Adiya.*

**S. 22** *1 Me qadîya lev dibhêrim,*
*2 Ez miskînê Şemsê şêrim,*
*3 Ez loma wê dibhêrim.*

**S. 23** *1 Ez miskînê Şemsî me,*
*2 Min zanibû ez ji wê niqtî me,*
*3 Çi nuqteke xwedan p'ir̂e.*

**S. 24** *1 Çi nuqteke xwedan p'ir̂e,*
*2 Çi P'adşakî xwedan sur̂e,*
*3 Binya mala silt'an şêx Adî heye sê dur̂e.*

**S. 25** *1 P'adşayê min qudretê dimekinî,*
*2 Birq vedida dikêlimî,*
*3 Hîngê feqîra e'silê xwe nijinî.*

**S. 26** *1 Mîrê xwe digirtin,*
*2 Van feqîra, van erk'ana,*
*3 Ew çi sur̂eke girane.*

**S. 27** *1 Feqîra xasin,*

[1352] *hingê*

*2 Berî dinê, berî e'sasin*[1353]*,*
*3 Wan mîra vedixwar k'asin.*

**S. 28** *1 K'asa e'silê wê elûne,*
*2 Wê ȟerfê kir xebîre,*
*3 Ez hingê bûme (.....).*

**S. 29** *1 R̂ik'ina dinê danî dû me,*
*2 Hin di ẍefilî, hin xebîre,*
*3 Hinî şêxe, hin yî p'îre.*

**S. 30** *1 Binaya e'rd û e'zman p'aristîme,*
*2 Wê ȟerfê kim şêrosiwarê borê hurê.*
*3 Tu ji k'u têy, têm ji duȓê,*
*4 Eşq, û muȟbet, û k'amile.*

**S. 31** *1 Tu nifûsa p'îranîyê,*
*2 Şêrosiwaro li mesîlê,*
*3 Şêrosiwaro li qefesê.*

**S. 32** *1 Gîyanê mara,*
*2 Silaveke herçar şêra ȓa,*
*3 Silaveke şîrin ĉiyayê Şengalê ȓa.*

**S. 33** *1 Silaveke şîrin ĉiyayê Şengalê ȓa,*
*2 T'evî baraneke hûr–hûr dibarî,*
*3 Dabû t'ac, t'acpoş, hilekî zorî sincebarî.*

*Em kêmin û Xwedê ťemame!*

## 63. QEWLÊ XILMETÊ[1354]

*Bi destûrî Xwedê!*
**S. 1** *1 Ji qewlê Fexrê Êzdîne,*
*2 Herî bi ȟerfe û herî nasîne,*
*3 Xilmet ȓik'ineke ji erk'anê dîne.*

**S. 2** *1 Ji qewlê Fexrî xasa,*
*2 Herî bi ȟerfe û herî bi nasa,*
*3 Mêr bi xilmetê li axretê yî xilase.*

**S. 3** *1 Mêrî xilase bi xilmeta dîne,*
*2 Û hincî kesê ev erk'an nasîne,*
*3 Li ȓoja axretê borê wanî bi zîne.*

**S. 4** *1 Borê wanî bi zîne li axretê,*
*2 Û hincî kesê li ȓêya dîn bike xilmetê,*
*3 Wî beȟr tê heye li nav baẍçê cinetê.*

**S. 5** *1 Li nav baẍçê cinetê wî heye beȟre,*
*2 Û hincî kesê li ȓêya dînî xilmetk'are,*
*3 Ewî bi qîmete li ba Yezdanê Cebare.*

**S. 6** *1 Ewî bi qîmete li ba Yezdanê Ekbere,*

[1353] *asas*
[1354] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan. Govara *Laliş* 37, 2013 (rr 84-88) Belavkirn: Adnan Xiravai https://ru.calameo.com/books/0025183170ab3e943247b

*2 Û hincî kesê li r̂êya dînî xilmetk'are,*
*3 Ew herî r̂ûsipîye li meclîs û mehdere.*

**S. 7** *1 Yî r̂ûsipîye û bi hêbete,*
*2 Hincî kesê li r̂êya dînî bike xilmete,*
*3 Ew li dîwana Yezdanê mezinî bi e'zete.*

**S. 8** *1 Ewî bi e'zete li wê dîwanê,*
*2 Şêx Fexir xwedanê erk'anê,*
*3 Îman bi xilmet r̂ewanê.*

**S. 9** *1 Îman bi xilmetê r̂ewa bû,*
*2 Şêx Adî bi xilmetê şa bû,*
*3 Not neh erk'an ji qudretê beya[n] bû.*

**S. 10** *1 Not neh erk'an ji qudretê nazilî,*
*2 Şêx Adî yek bi yek dihêjmirî,*
*3 Xilmet jî bi nav kir û nedirî.*

**S. 11** *1 Xilmet jî bi nedir kire nava,*
*2 Xwedê yeke bi ĥezar û yek nava,*
*3 Xilmet jî navde t'ebave.*

**S. 12** *1 Xilmet jî ferzeke ji e'sasa,*
*2 Ji not neh erk'anêt xasa,*
*3 Dahir bû dewran û k'asa.*

**S. 13** *1 Dahirbû dewran û deme,*
*2 Û wexta çêbû Hewa û Ademe,*
*3 Milyak'eta bi xilmetê k'êşabû seman.*

**S. 14** *1 Milyak'etê bi xilmetê sema k'êşabû,*
*2 Li ber nav dik'irê P'adşa bû,*
*3 Xwedanê E'zman û E'rşa bû.*

**S. 15** *1 Neqaşê dinê û batinê,*
*2 Herî dahire û nebit finê,*
*3 Benî Adem çêkir bi xêr û xinê.*

**S. 16** *1 Benî Adem çêkir û debare,*
*2 Dinya çêkir û qenun sep'are,*
*3 Û hincî kesê li qenunê yî xilmetk'are,*
*4 Ew li gel batinê yî bi hevale.*

**S. 17** *1 Ew li gel batinê yî bi kilame,*
*2 Hincî kesê xilmetê bike û neke xame,*
*3 Bi van erk'ana ĥeqê wan li bihuştê yî t̂emame.*

**S. 18** *1 Bi van erk'ana ĥeqê, wan li bihuştê di k'amile,*
*2 Û hincî kesê xilmetk'are ji eşq û dile,*
*3 Li vê dinê û li axretê mirazê wî yî hasile.*

**S. 19** *1 Li vê dinê û li axretê hasilbû mirazê wîye,*
*2 Hincî kesê xilmetê k'ara ji eşq û îmana qewîye,*
*3 Ewî bi ĥimete ji e'wil ĥeta bi dawîye.*

**S. 20** *1 Ewî bi ĥimete ĥemî wextana,*
*2 Hincî kesê xilmet k'ara ji eşq û îmana,*
*3 Milyak'etan li bihuştê danî ciyê wana.*

*4 Teyrê bihuştê di distrên bi nave wana,*
*5 Awzan dixnin bo ĥizura wana,*
*6 Nebîy û welîy li cema' dibin dîwana,*
*7 Û ĥeta e'bd li a'badê[843] her ew ciyê wana.*

**S. 21** *1 Ew bû ta'lîya xilmetê,*
*2 Li ȓoja axretê ci ma.*

*T'emametiye vî qewlî li navê Xwedê — xwedanê k'eremetê!*
*Em kêmin, Xwedê yî t'emama!*

## 64. QEWLÊ MUHRA[1355] MÊRA[1356]

**S. 1** *1 Mihra mêra ku dihate,*
*2 Aşiq kirin xelate,*
*3 Dilo miskîno te çî sinyate.*

**S. 2** *1 Miskînekî minî dil delîle,*
*2 Geȓiyabû li nav xasêt e'dîle,*
*3 Şerbetek vexwar şehê şêx Şemsê minî sebîle.*

**S. 3** *1 Birime nav wan xasa,*
*2 Saqî digêȓin k'asa,*
*3 Sehabe li wêderê nasa.*

**S. 4** *1 Bêjme we gelî siniya[1357],*
*2 Her çiyê ȓûyê vê meclîsê,*
*3 Dilê xwe[1358] biket mahikan[1359] û tehliya,*
*4 Ew dêmînit[1360] ser destê şêx Fexrê Adiya.*

**S. 5** *1 Bi sadiqa[1361] yarû birane,*
*2 K'asek da min ji mêra vana,*
*3 Geȓiyabû li hestî û xûna.*

**S. 6** *1 Dil çobû[1362] t'emame,*
*2 Min vexwar ji k'asa tame,*
*3 Lew hate sere min aqil û fame.*

**S. 7** *1 Hate sere min fêm û aqil,*
*2 Li min ȓon bûn çav û dil,*
*3 Lew bi zimanî xwendibûm[1363] bilbil.*

**S. 8** *1 Bi zimanî xwendibûm delal,*
*2 Digeȓêt Şerqe ĥeta Şam,*
*3 Li min k'eşfî bû ew ĥal.*

**S. 9** *1 Daye min ji k'asa dêrîm,*
*2 Sekinî guhdêrim,*

[1355] *muhr*
[1356] *Laliş* № 12 2000 (rr 309-312) belavkirin: K.X. Êzdîxan https://ru.calameo.com/books/002518317598de79305bf
[1357] *suniya*
[1358] *xo*
[1359] *mihek*
[1360] *dê mînin*
[1361] *bisidqe*
[1362] *ço bû*
[1363] *xundbûm*

*3 Dil bal ve dihinêrim.*

**S. 10** *1 Ew bû k'asa nûrîne,*
*2 Dabû mêra bi nehîne,*
*3 Hindeka vedixwar, pê dibûn cindîyêt silt'îne.*

**S. 11** *1 Hindeke vedixwar pê dibûn mecnûne,*
*2 Li dinyayê[1364] digeȓyan sewdan û dîne.*

**S. 12** *1 Ew k'asa sipîya,*
*2 Hatibû ji E'rşêt A'lîya,*
*3 Hindeka vedixwar, pê dibûn ewlîya[1365].*

**S. 13** *1 Ew bû k'asa suȓa[1366],*
*2 Hatibû ji E'rşêt jora,*
*3 Mêra vedixwar, pê dibûn mora.*

**S. 14** *1 Ew bû k'asa zere,*
*2 Hatibû ji E'rşêt sere,*
*3 Mêra vedixwarin, pê dibûn nedere.*

**S. 15** *1 Ew bû k'asa ȓeşe,*
*2 Hatibû ji xezînê E'rşe,*
*3 Mêra vedixwarin, pê dibûn ĥal xweşe[1367].*

**S. 16** *1 Ezîzê min, ji mêjê ber vê xilmetê min kir qesta,*
*2 Birime nav harîya, k'as li ser desta,*
*3 Min li wan feqîra dîtibû coş[1368] bi mesta.*

**S. 17** *1 Min li wan feqîra dîtibû coş bi mestûr,*
*2 Dixemilîn bi t'anc û xerqêt bi nûr,*
*3 Min ji wan feqîra ne dîtibûn jê û bere jûr.*

**S. 18** *1 Da ji wan feqîra bêtin xebera,*
*2 Ji berî ne Quds hebû, ne Mekkeya[1369],*
*3 Ew feqîr bûn, bi mîrê xwe ȓabûn li ber dergeha.*

**S. 19** *1 Da ji wan feqîra bêtin beyane,*
*2 Berê ne e'rd hebû, ne e'zmane,*
*3 Ew feqîr bûn, bi mîrê xwe ȓabûn li dîwane.*

**S. 20** *1 Çî dîwaneka k'ibîre,*
*2 Hincî mêrê bi saxî biket xilmeta feqîre,*
*3 Ewî dil girt, kire êxsîre.*

**S. 21** *1 Çî dîwaneka bi safe,*
*2 Qendîleka nûranî wa di te îsîd di nave[1370],*
*3 Mewlayê me şêxu Bek'ir, şêx Şemse kir t'ebabe.*

**S. 22** *1 Çî dîwaneka bi ĥeybete,*
*2 Hincîyê bi saxî xilmeta feqîra dikete,*
*3 Ẍafil di korene, ne dizanî silt'an Êzî bi xwe wê li semate[1371].*

---

[1364] *dunya*
[1365] *cindîya*
[1366] *sur*
[1367] *xoş*
[1368] *coz*
[1369] *Mekkeh*
[1370] *Qendîleka noranî w di teysîd di nave*
[1371] *sema*

**S. 23** *1 Wêy ẍefilê bê Xweda*[1372]*,*
*2 Marêt dojêh li wan dibine ĥûta,*
*3 Ma hûn nizanin silt'an Êzî bi xwe me'bûda.*

**S. 24** *1 Wêy li ẍefilê koreye,*
*2 Ew nanêrin dojêh cihê xweye,*
*3 Ew wextê dimrin bi silt'an Êzî naden şehdeye.*

**S. 25** *1 Wêy li ẍafilê hat û bate,*
*2 Doj li wan e'zab û siniyate,*
*3 Ew wextê dimrin ne li atqate*[1373]*.*

**S. 26** *1 Ew wextê dimrin ne li îmane,*
*2 Bi xwe r̂a naben çû nîşane,*
*3 Lew hilgirtin û havêtin xergemane.*

**S. 27** *1 Ji xergemanê di îna dere,*
*2 Dêbene nav sê'ran û seqere*[1374]*,*
*3 Li banga wan nîne çû mehdere.*

**S. 28** *1 Feqîr zûrêt li bangî,*
*2 Ẍafil destêt wan dikurtin, nagehine daman û dangê,*
*3 ……………………………………………………….*

**S. 29** *1 Ji mêjê ber vê xilmetê t'eftêşim,*
*2 Latînekî kewekî li qefesê digivêşim,*
*3 Lew ez newêrim derheqî bêjim.*

**S. 30** *1 Lew ez newêrim derheqî bidem xebera,*
*2 Ne e'cêbe dil bikene ker bi kera*[1375]*,*
*3 R̂ê li gel hevirkî naçit sera.*

**S. 31** *1 Êk li ser zarî,*
*2 Êk li ser zimanî,*
*3 Êk li ser dilî,*
*4 Xwedê jî naket harî.*

**S. 32** *1 Pisê Ĥelacî (Mensûr) we dik'ire,*
*2 P'adşê min dergek lê vedikire,*
*3 K'asek dayê lê, kir şekire.*

**S. 33** *1 P'adşê min k'asek dayê lê şirîn kir,*
*2 Li sere xwe li bangîn kir,*
*3 Lew li mezin meydana meleka bor̂ê xwe bi zîn kir*[1376]*.*

**S. 34** *1 Ji qewlî p'îr R̂eşî Ĥeyrane,*
*2 Bêjme we gelî birane,*
*3 Hincîyê bi r̂astî û durustî*[1377] *dest havête damana yar û birane,*
*4 Ew her merk'eba wî li beĥrêt giran ye melewane.*

**S. 35** *1 Ji qewlî p'îr R̂eşî cîda,*
*2 Bêjme we gelî mirîda,*
*3 E'tqata me silt'an Êzîde.*

---

[1372] *bixûda*
[1373] *edqate*
[1374] *seker*
[1375] *kerbiker*
[1376] *Lew li mezin meydana meleka bo r̂ê xo bizinkir*
[1377] *durist*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 65. QEWLÊ SEBRÊ[1378]

*Bi desturî Xwedê:*

**S. 1** *1 Ji qewlê şêx Hevindî babzere,*
*2 Xeberek hatî ye ji e'zmanê sere,*
*3 Got: «Sebir bo mêra xêre û nedere».*

**S. 2** *1 Sebir bo mêra xêre û awaze,*
*2 Û çendî li dil heye daxaze,*
*3 Bi sebirê hasilbû ew miraze.*

**S. 3** *1 Ew miraz bi sebirê hasl bû,*
*2 Ev dinya bi sebirê dahir bû,*
*3 Xwedan sebir li Xwedê bi xatir bû.*

**S. 4** *1 Li ba Xwedê bi xatir bû xwedan sebire,*
*2 Hincî kesê herî bi leze û bê sebire,*
*3 Li ber wen dabû r̂êya, û derbe, û xebere.*

**S. 5** *1 Li ber wen dabû r̂êya û fikire,*
*2 Û hincîyê herî bi leze û bê sebire,*
*3 Li ber wen dabû sit'ar û sikire.*

**S. 6** *1 Sit'ar û sikir ji ba Xwedê ye,*
*2 Derd û derman ji wê tê ye,*
*3 Xwedan sebir li ba Xwedê yî xinê ye.*

**S. 7** *1 Sit'ar û sikire bi r̂eĥma Xwedê sehab bû[1379],*
*2 Dinya bi sebirê ava bû,*
*3 Sebir dermanê xema bû.*

**S. 8** *1 Sebir dermanê xema xweştê,*
*2 Derman bi derda gehiştê,*
*3 Bi sebirê çûne bihuştê[1380].*

**S. 9** *1 Hincîyê xwedan sebir û îmana,*
*2 Û dayîm şikirdarê Yezdana,*
*3 Ew ĥewalê weliyan û xasana.*

**S. 10** *1 Ew ĥewalê weliyan û xasa,*
*2 Hincîyê bi sebirê bike qiyasa,*
*3 Ewî qaymkir serî û e'sasa[1381].*

**S. 11** *1 Ewî qaymkir e'sas û sere,*
*2 Hincîyê sebirê bike ji dile,*
*3 Li vê dinê û axretê yî bi mefere.*

**S. 12** *1 Li vê dinê û axretê yî bi sit'are,*
*2 Xwedan sebir herî bi ĥimete û hevale,*

[1378] *Laliş* 36, 2012 (rr. 45–47) Belavkirin: Adnan Xiravayi http://ru.calameo.com/read/00251831720d66ffd52cf
[1379] *shabû*
[1380] *buhişt*
[1381] *asas*

*3 Xwezka*[1382] *bi wana bi sebirê bikin k'are.*

**S. 13** *1 Xwezka bi wana bi sebirê bikin e'mele,*
*2 Û navê Xwedê bîne ji dile,*
*3 Ĥemû e'melê wanî bi xêr û sere.*

**S. 14** *1 Ĥemû e'melê wanî bi xêre*
*2 Hincîyê herî bi sebir û şikêre,*
*3 Ew herî t'enaye ji qeda û belayî st'êre.*

**S. 15** *1 Hincîyê r̂êya sebirê bikit nasa,*
*2 Û li ser avakit e'sasa,*
*3 Ew herî t'enaya ji qeda û belayî xilasa,*

*T'emametîya vî qewlî li navê Xwedê herî xasa!*
*Em di kêmin, Xwedêyî t̂emame!*

## 66. QEWLÊ CIVATÊ[1383]

**S. 1** *1 Civatê cumleta,*
*2 Heke we divêt bibînin hikmeta,*
*3 Dê guh dene qewlê ĥeqîqeta.*

**S. 2** *1 Guh biden kesekî guhdêra,*
*2 Heke we divêt bibînin xêra,*
*3 Dê guh dene qewlê mêra.*

**S. 3** *1 Guh biden xelqê hûne,*
*2 Ew qewle qewlekî ji qenûne,*
*3 Ĥalê me di ĥale Denûne.*

**S. 4** *1 Kesekî bi vê ĥerfê xebîr ne,*
*2 Hosta, û merebî, û yarû birêt axretê, û şêx, û p'îr ne,*
*3 Bavek li dîwana mîr ne.*

**S. 5** *1 Teyrekim ne ji vê r̂evê,*
*2 Naxim bi r̂ojê, nanivim bi şevê,*
*3 Min bavek li dîndara mîrê xwe divê.*

**S. 6** *1 Ev dinya se'et û gavek,*
*2 Bipirse li r̂oja bavek,*
*3 Mala Adiya ĥemû navek.*

**S. 7** *1 Xelqo we me e'cêba,*
*2 Zor k'eftîne ber mikran û lêba,*
*3 Ew bi xwexwe înine ber ĥisêba*[1384]*.*

**S. 8** *1 Xelqo we me tehlîye,*
*2 Ew nazil*[1385] *biwe ji desta û p'îye,*
*3 Ew bi xwexwe diînine ber me'nîye.*

**S. 9** *1 Çi lawekî silt'êne,*

[1382] *xweska*
[1383] *Laliş* 12, 2000 (pp 218–221) Belavkirin: Mişîr Şemo https://ru.calameo.com/books/002518317598de79305bf
[1384] binêr: *ĥesab*
[1385] *nizil*

*2 Hey koro te haj r̂êne,*
*3 K'oĉek bit li extîyarê xwe ve şikêne.*

**S. 10** *1 Çi lawekî cerig sojî,*
*2 Hey ĉiraw û li ber r̂ojî,*
*3 Tu bi xwe xwe disojî.*

**S. 11** *1 Çi lawekî bê wesulî,*
*2 Hey asino ji qembûlî,*
*3 Tu bi r̂êya Xwedê ne yî qebûlî.*

**S. 12** *1 Hey qembûlî ji asin,*
*2 Hosta r̂êya dine di nasin,*
*3 Mehek bo mêra k'asin.*

**S. 13** *1 Asino ji mehekê,*
*2 Hosta di înê bi met'rekê,*
*3 Jê di îne der êbê û xweke.*

**S. 14** *1 Asin yê dibêjit hosta,*
*2 Didane ber bosta,*
*3 Jê çêdiken silîbêt dosta.*

**S. 15** *1 Agirê sora ji p'êta,*
*2 Hosta bi met'reka pê neşêta,*
*3 Dêhavête nav agir û p'êta.*

**S. 16** *1 Havête nav wan êla,*
*2 Hosta bi met'reka pê neket kêla,*
*3 Dêhavête nav t'ewlêt k'ehêla.*

**S. 17** *1 Dêhavête nav se'îra,*
*2 Kesê ne şêx hebitûne p'îra,*
*3 Li bangiyê nayên feqîra.*

**S. 18** *1 Siwar be li bore qemirî,*
*2 Li serî bike li xa vê sebirî,*
*3 R̂ast p'ajo dergehê e'birî.*

**S. 19** *1 Borê qedîm zînî serke,*
*2 T'ac û t'acpoş e'yadet xerqe,*
*3 R̂astî li lêne êbê jê derke.*

**S. 20** *1 Min li civatê*[1386] *dîtin sebîl,*
*2 Min t'ext dîtin, t'ext û serîr,*
*3 Qewat*[1387] *ji şêx Mend û xof ji mîr.*

**S. 21** *1 Hêz ji şêx Mend û xof ji ĥeder,*
*2 Hundî mezina li meydana meleka danabû ser,*
*3 K'ê hulkiryê ol û ser?*

**S. 22** *1 Ol û erk'an, r̂ê û t'erîq,*
*2 Mesebê me mesebekî ĥeqîq,*
*3 Me jê divêt ol û t'erîq.*

**S. 23** *1 Xweşî li bihuştê hene,*

[1386] *ciwat*
[1387] *qewet*

*2 Li ba e'rifa*[1388] *di wene,*
*3 Ewin p'erwerêt berî mene.*

**S. 24** *1 Ewin p'erwerêt bihuştê,*
*2 Werin xwedanêt xilmetê,*
*3 P'adşê min dêxwînite*[1389] *ĥezretê.*

**S. 25** *1 Li qelemê heyne deft'er,*
*2 Dar di k'eskin belgêt*[1390] *wan di zer,*
*3 Kanî layîqin ferşêt mermer.*

**S. 26** *1 Li xeberêt mala Adiya,*
*2 Bakene wan nebîya,*
*3 Dê xelet keyn wan cindîya.*

**S. 27** *1 Hûn mala Adiya werin,*
*2 Suȓêt mixfî dahir kirin,*
*3 Bik'irêt qumaşî werin.*

**S. 28** *1 Werin bik'irêt qumaşî,*
*2 Bi nezanî nedene serkaşî,*
*3 Da k'arêt we li ba P'adşa yî neçin bi belaşî.*

**S. 29** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê Ĥeyrane,*
*2 Heçî yê*[1391] *bi ȓastî dest havêta damana yarû birane,*
*3 Merk'eba wî herdem li beĥrêt giran ye melavane.*

**S. 30** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê cîda,*
*2 Werin gelî mirîda,*
*2 Atqata me silt'an Êzîda.*

*Em di kêmin, Xwedê yê t'emame!*

## 67. QEWLÊ CIMA' CIMAE'TA[1392; 1393]

**S. 1** *1 Qewlê cema' cimleta,*
*2 Xelqo, we dikim nesîĥeta*[1394]*,*
*3 Werin bibînin hikmeta.*

**S. 2** *1 Guhdar*[1395] *bin ji guhdêra*[1396]*,*
*2 Dibêjime xwedanê*[1397] *xêra,*
*3 Werin guh bidne qewlê mêra.*

**S. 3** *1 Dibêjime we dîwanê xasa,*
*2 Ȓê û bera ȓênasa,*
*3 Ȓêbera ȓêfera,*
*4 Ibadet*[1398] *bikin her pênc fera.*

---

[1388] *ê'rîf*
[1389] *dêxûnit*
[1390] *pelg*
[1391] *Her siyê*
[1392] [31] (гг. 28-32)
[1393] [29] *Qewlê cema cimletê* (гг. 340-343) (№ 1686)
[1394] *nesilĥet*
[1395] *gudar*
[1396] *gudêr*
[1397] *xudan*
[1398] *ebabet*

**S. 4** *1 Her pênc ferê ĥeqîqetê,*
*2 Şêx û p'îr, hoste û merebî, yarû birê axretê*[1399]*,*
*3 Mefer û sinetê*[1400]*,*
*4 Îro dine, [sibê] bandê axretê.*

**S. 5** *1 Ĥalê min ĥalê Denûne,*
*2 Ewa qewla qewlekî qanûne,*
*3 Herçê kesê vê qewlê xebîre, bê şêxe, bê p'îre.*

**S. 6** *1 Bê hoste, bê merebîne,*
*2 Ewan p'ar dîwana mîr nine.*

**S. 7** *1 Zor birin beĥrê*[1401] *tarî*[1402]*,*
*2 Mijûl dibûn vî virarî,*
*3 Vê dinê çûme wê dine hev cara xwe r̂a ne bijarî.*

**S. 8** *1 Lawo*[1403]*, te r̂ê lêne,*
*2 Koro, te haj r̂êne,*
*3 Lawo, tu k'açekî, extîyara*[1404] *neşkêne.*

**S. 9** *1 Çi lawekî cersojî,*
*2 Ĉirake bi r̂ojî,*
*3 Lawo, tu k'açekî, extîyara ne hebojî.*

**S. 10** *1 Çi lawekî bê wesûlî,*
*2 Ne ji qewlê Xwedê, ne ji ĥedîsa r̂esûlî.*

**S. 11** *1 Gebûlo, ji hasin,*
*2 Mehekê mêra hene k'asin.*

**S. 12** *1 Mêra û meheke,*
*2 Wediqetînime ber met'rekê,*
*3 Jê derdixin kêmê xwekê.*

**S. 13** *1 Hasinî ĉak şivête,*
*2 Avîtine nava agir û p'ête,*
*3 Wekî mehekê pê nekir cê te.*

**S. 14** *1 Hew paj va avîte nava iyêre*[1405]*,*
*2 Wekî mehekê pê nekin kêre,*
*3 Hew paj va avîte qeyît'er ew jî mêre.*

**S. 15** *1 Gelî mêra, dibêjime we heder-heder,*
*2 Herçê kesê serhol bire ber,*
*3 Ewî sere xwe r̂îya silt'an*[1406] *Êzîdê sor da bir̂îbû li ser.*

**S. 16** *1 Siwar*[1407] *kirin berê qebrê,*
*2 Kire sêrî hewsarê sebrê,*
*2 Bir çû ber dergê e'mrê.*

**S. 17** *1 Zîn ji qudret, bor berk'e,*

---

1399 *yar û birê axretê*
1400 *sunet*
1401 *be'r*
1402 *te'rî*
1403 *lao*
1404 *ixtîyar*
1405 binêr: *e'yar*
1406 *sultan*
1407 *siyar*

*2 T'ac û t'acp'oş,*
*3 Ibadet bikin xerqê.*

**S. 18** *1 Xerqe ibadet kin,*
*2 R̂astîya lê kin,*
*3 Me'nîya der kin.*

**S. 19** *1 Bihuşta[1408] baqî,*
*2 Milkê E'babek'irê sadiq[1409],*
*3 Aqil, fem, yol û t'erîq,*
*4 Mesebê[1410] me — mesebê dî.*

**S. 20** *1 Bihuşta da xweşî[1411] hene,*
*2 Cem e'lamêd wane,*
*3 Ew p'erwendê lîmoyêd mene.*

**S. 21** *1 Hûn werin lîmoyê cinetê,*
*2 R̂adibe sere ĉiyayê nav Mişetê,*
*3 Dike gazî xwedanê xêra û xizmetê.*

**S. 22** *1 Deft'era da hene mişûr,*
*2 Bihuşta da hene qesr û qisûr,*
*3 Dar di k'eske, berg di nûr,*
*4 Kanî layîq, ferş û mermer.*

**S. 23** *1 Mişûra da hene deft'er,*
*2 Bihuşta da hene qesr, qisûr û yekser,*
*3 Dar di k'eskin, berg di zer,*
*4 Kanî layîq, ferş û mermer.*

**S. 24** *1 Ĥudûr kirin şiva bi def,*
*2 Sinetê pê beste r̂ef.*

**S. 25** *1 Sinet xweş mik'ane,*
*2 Dimeşqîya[1412] têda girt dîwane,*
*3 Dîwane şêx Adî, melek şêx Sin[1413] ĥeqe wane.*

## 68. QEWLÊ PIŞT P'ERDA[1414]

*Bi desturî Xwedê!*
**S. 1** *1 K'asekê vexwe ji meya zelale,*
*2 Bi dil ye şîrine[1415], bi zar ye tale,*
*3 Di e'sil û dîn de ev çende ye betale*
*4 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 2** *1 Li me hilatbû stêra sibê,*
*2 Şemsê[1416] bi nûr û k'eramet dahirbû,*
*3 Şefaqê[1417] dabû çarde t'ebeqên e'rd û e'zmane,*

[1408] *buhuşt*
[1409] *sedîq*
[1410] *meteb*
[1411] *xoş*
[1412] *Dumişqe*
[1413] *Şîxsin*
[1414] [2] (rr. 192-196)
[1415] *şirîn*
[1416] *Şims*
[1417] *şefeq*

*2 Bend û tîrêja wê dabû Lalişa nûranî ĥeta bane k'ursê,*
*3 Emê dest û damanê melik şêx Sinê Adiya tewaf bikin,*
*4 Bila r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*5 Li ser ĥeftî û du babêt qedîm bixunit û xeber bidê,*
*6 K'a bêje bi xêra navê şêx Adî, heke hûn pirsyara kaniya Sipî diken k'a hêvênê wê ji çîye?*
*7 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 3** *1 Li me hilatbû stêra zere,*
*2 Şemsê bi nûr k'eramete,*
*3 Şefaqê dabû çarde t'ebeqên e'rd û e'zmane,*
*4 Bend û tîrêja wê dabû Lalişa nûranî ĥeta bane menbere,*
*5 Bêjin bi xêra şêx Adî heke hûn pirsyara kaniya Sipî diken hêvênê wê ji her û here.*
*6 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 4** *1 Li me hilatbû stêra beyane,*
*2 Şemsê bi nûr k'eramete,*
*3 Şefaqê dabû çarde t'ebeqên e'rd û e'zmane,*
*4 Bend û tîrêja wê dabû Lalişa nûranî ĥeta bi celis û r̂ewaqê dîwanê,*
*5 Emê dest û damanê melik şêx Sinê Adiya tewaf bikin,*
*6 Bila r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*7 Li ser ĥeftî û du babên qedîm bixunit û xeber bide,*
*8 Bêje, gîyanê min gorî, k'a ew k'î mêr bû, sekinye li ser berê sikanê û di destî da qelema îmanê?*
*9 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 5** *1 Li me hilatbû stêra badîna,*
*2 Şemsê bi nûr k'eramete,*
*3 Şefaqê dabû çarde t'ebeqên e'rd û e'zmana,*
*4 Bend û tîrêja wê dabû Lalişa nûranî,*
*5 Emê dest û damanê melik şêx Sinê Adiya tewaf bikin,*
*6 Bila r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*7 Li ser ĥeftî û du babên qedîm bixunit û xeber bide,*
*8 K'a bêjin bi xêra navê şêx Adî, heke hûn pirsyara quba felekê dikin,*
*9 Bêjin k'a quba felekê çend zencin, çend k'ursîne?*
*10 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 6** *1 Li me hilatbû stêra Cebarî,*
*2 Şemsê bi nûr k'eramete,*
*3 Şefaqê dabû çarde t'ebeqên e'rd û e'zmane,*
*4 Bend û tîrêja wê dabû Lalişa nûranî ĥeta bi qubên[1418] nubedare,*
*5 Emê dest û damanê melik şêx Sinê Adiya tewaf bikin,*
*6 Bila r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*7 Li ser ĥeftî û du babên qedîm bixunit û xeber bide,*
*8 Bêjin bi xêra şêx Adî heke hûn pirsyara quba felekê dikin, serê quba felekê nûr sit'are.*
*9 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 7** *1 Hawara min Xwedêye û dilê damayî,*
*2 E'wrek ji binyatê r̂abû, r̂aserî Lalişa nûranî girtibû şewq û alayî,*
*3 Şêxekî ji malên Adiya, p'îrekî miskînê ĥeqîqetê, ilmayekî zêdeyî ilma,*
*4 Bête celsa kaniyê, r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*5 Li ser ĥeftî û du babên qedîm bixunit û xeber bide,*
*6 Bêjit ew k'î mêr bû, gîyanê[1419] min gorî, beĥra sîĥanê bi k'eşkulka pîvaye,*
*7 Xîveta terab zêr̂în li ser beĥrêt k'ûr vedaye?*
*8 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 8** *1 Hawara min Xwedêye û dilê melule,*

---

[1418] *qubkên*
[1419] *giyan*

*2 E'wrek ji binyatê r̂abû, r̂aserî Laliṣa nûranî kire şewq û ala û nûre,*
*3 Bila ṣêxekî ji malên Adiya, p'îrekî miskînî ĥeqîqetê, ilmayekî zêdeyî ilma,*
*4 Bête celsa derê kaniyê, r̂unite ser berê se'edetê, veket derê r̂eşbelekê,*
*5 Li ser ĥeftî û du babên qedîm bixunit û xeber bide,*
*6 Bêjit, gîyanê min gorî k'a ew k'î mêr bû, beĥra sîĥanê pîvaye bi k'eṣkulkê,*
*7 Xîveta terab zêr̂în vedaye li ser beĥrêt k'ûr,*
*8 Ew aẍayê min silt'an Êzîde,*
*9 Mehdî Şerfedînê minê gulî nûrî min qebûle,*
*10 Wê dibin xîvetê da digêr̂in, ṣaz û meẍinî û êẍler û tenbure.*
*11 Hey dê mala min, mala min, ……, tu mala min!*

**S. 9** *1 Hey dinyayê, cindî yê ṣêx Adî e'zîz melik Fexredîne,*
*2 Me çi mal nîne malbaba me Laliṣa nûrîne,*
*3 Hûn gist bêjin amîne!*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 69. QEWLÊ MIZGÎNÎYÊ – QEWLÊ MIZGÎNA MÊRA

**şaxê – 1**[1420]

**S. 1** *1 K'engî bû mizgîne,*
*2 Coqeta r̂abû r̂uĥîne,*
*3 Berbi gelîyê Lalişê diçûne.*

**S. 2** *1 Û k'engê bû coqe,*
*2 Mîrê mezin hilda t'oqe,*
*3 Dilê E'debiya ṣayî û ṣoqe.*

**S. 3** *1 Mîrê mezin qelêmê k'arkir,*
*2 Sîtila mala Adiya maxberê siwarkir,*
*3 Dilê E'debiya ṣayî û ṣoqkir*[1421]*.*

**S. 4** *1 Û birime dîyarê*[1422] *bihuştê,*
*2 Çiqas bîhn û buxṣeke xweş tê,*
*3 Cindî yê têda lib[a]sê r̂eş lê.*

**S. 5** *1 Bihuştê dişxule meysere,*
*2 Helêl k'eskin, quba zere.*

**S. 6** *1 Helêl k'eskin, quba nûranî,*
*2 K'erameta melik Şemsedîn, melik Fexredîn, melik Nasirdîn, melik Sicadîn fericî.*

**S. 7** *1 Helêl k'eskin, quba zere,*
*2 Mêra da me madere,*
*3 Laliş ewe, gelîyê k'ûre.*

**S. 8** *1 Gelîyê Lalişê yî bi nave,*
*2 Mêra da me çend car silave,*
*3 P'adṣê min Hewa kire bûk, Adem kire zave.*

**S. 9** *1 Silava me ser sibexêrî yê,*
*2 R̂uĥû çûye kaniya Sipîyê,*

---

1420 http://www.ezdixandi.com/forum/38-282-1
1421 *ṣa*
1422 *dîhar*

*3 Qalbê maye hêlîyê*[1423]*.*

**S. 10** *1 Ĥesen derge, derge Ẍefûrî,*
*2 K'esera R̂eşe bava, k'esera R̂eşe p'îra,*
*3 Girtin, birine cem r̂ewaqê mîra.*

**S. 11** *1 Min li wir dîtin feqîr bi coş,*
*2 Ew jî t'ace, t'acpoş,*
*3 K'asê wan xwarine*[1424]*, bira wan*[1425] *bibine loş.*

**S. 12** *1 Û birime cem r̂ewaqê r̂ewa,*
*2 Min li wê dît qendîlê, beysûs û hewa,*
*3 Atqata me mêrê êzdî ewe.*

**S. 13** *1 Û birime dergê Rohilatê,*
*2 Li ber me dibirin maş, û berat', û xelatê,*
*3 Ew ji ciyê sondê silava tê,*
*4 Ew ji ciyê şehde îzbatê.*

**S. 14** *1 Û birime dergê R̂oavayê,*
*2 Mêrek nazil bû nava dosta, E'debiya kir silavê,*
*3 Silava me dostan û E'debiya, meẍberê*[1426] *şîlanê,*
*4 Ew jî ciyê de'nê dendorê.*

**S. 15** *1 Her ĥeft stûnê r̂êzêye dera va,*
*2 Medhet*[1427] *dikirin nola cara,*
*3 Qeynt'er dikirin boy bira û yara.*

**S. 16** *1 Hûn çêkin siwarê gêdûka,*
*2 Xwe bixemilînin şebhetê bûka,*
*3 Pêda k'esk û sor pêş derînin.*

**S. 17** *1 Bêşik, cenime hev r̂e kêlimîne,*
*2 Ew jî e'yduyê mêrê zalimîne.*

**şaxê – 2**[1428; 1429]

**S. 1** *1 K'engê me bête mizgîne,*
*2 Coqetê têda r̂iĥîne,*
*3 Berbi gelîyê Lalişê diçûne.*

**S. 1** *1 K'engê me bê mizgîne,*
*2 Coqetê r̂iĥê r̂imîne,*
*3 Telebî gelîyê Lalişê diçûne.*

Di Lalişê da r̂iĥber qalibê î'şaret hatuye berdanê. Şîxadî mêra va çû geliyê Lalişê dîtine r̂iĥê r̂emîn.

**S. 2** *1 K'engê bête coqe,*
*2 Mîrê mezin hildabû t'oqe,*
*3 Dilê E'debiya k'etibû şayî û şoqe.*

**S. 2** *1 K'engê me bê coqe,*
*2 Mîrê mezin hilda t'oqe,*

[1423] *hêle*
[1424] *xarin*
[1425] *lê*
[1426] *mexber*
[1427] *mader*
[1428] [29] (rr. 324–29) (№ 1683)
[1429] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ MIZGÎNIYÊ MÊRA* (rr. 73-76) T'ilbîs 2001

*3 Dilê E'debiya şayî-şoqe.*

Kengê xebera Xudêbawariyê hate bihîstinê mîrê mezin, yenê sult'an Êzîd toqa bawariya Xudê, yanê nîşana wê bawariyê hilda xa. Miletê peyî wî toqî diçe (qerqerê situkra wî) yanê edevî wê xeberê r̂a şabûn.

**S. 3** *1 K'anûn bînin k'ar kin,*
*2 Sîtila şîlana şêx Adî bînin sîyar kin,*
*3 Dilê e'debiya şayî û şa kin.*

**S. 3** *1 Qalibî k'ar kir,*
*2 Sîtila şîlana merbexê melek Adî siyar kir,*
*3 Dilê e'deviya şaya, şa kir.*

R̂iĥ k'ete qalib da û qalib r̂a bû. Heye dara şîlanê, berê wê dare, şîlan (r̂enê wê sore) t'op dikin dik'elînin û ava wê vedixwin. K'engê qalib r̂iĥber da çû, şî lan danîne ser merbexa yanê k'uĉikê melek Adî. Cimae'ta dare pê şa dibû.

**S. 4** *1 Binêr̂in dîyarê bihuştê[1430],*
*2 Ew dîndar qewî mi xweş tê,*
*3 Min cindîya dîtin lib[a]sê r̂eş lê.*

**S. 4** *1 Binihêr̂in dîharê bihêştê,*
*2 Ev dîndara qewî min xaş tê,*
*3Cindiyê dîwanê lib[a]sê r̂eş lê tê.*

**S. 5** *1 Gelî cindîya, dibêjime[1431] we heder-heder,*
*2 Bihuştê ger̂îyan yekser,*
*3 Helê[lê] nûrîn, qube bi zêr̂.*

**S. 5** *1 Gelî cindiya, dibêjme we heder-heder,*
*2 Bihiştê ger̂iyame yekser,*
*3 Helê nûrîn, qube bi zer.*

**S. 6** *1 Helê[lê] nûrîn, qube zêr̂în,*
*2 Gelî mêra, werin zerîya bibînin[1432],*
*3 K'iryametê Şemsedîn û Fexredîn.*

**S. 6** *1 Helê nûrîn, qube zêr̂în,*
*2 Gelî mêra, werin bibînin k'iryametê,*
*3 Melek Şemsedîn, melek Fexredîne.*

**S. 7** *1 Fer̂icîme quban, û mêran, û derga,*
*2 Şêx Şemsê xwe didim med[h]a.*

**S. 7** *1 Fer̂icîm quba, mêra, derga,*
*2 Şêx Şemsê xa didim me[h]da.*

**S. 8** *1 Fer̂icîme quban û nûr,*
*2 Mêra û mader destûr bi şûr,*
*3 Lalişe gelîyê k'ûr.*

**S. 8** *1 Fer̂icîme quba bi nûr,*
*2 Mêr û mader destûrî şûr,*
*3 Lalişe geliyê k'ûr.*

**S. 9** *1 Gelîyê Lalişê bi nave,*
*2 Têda r̂uĥîya bû ave,*
*3 Me wan mêra sed cot silave.*

**S. 9** *1 Geliyê Lalişê bi nave,*
*2 Têda r̂iĥî bi ave,*

[1430] *buhuşt*
[1431] *divêjime*
[1432] *bivînin*

*3 Me li wan mêra sed cot silave.*

**S. 10** *1 Gelî mêra silav sed siba li xêr*
*2 Guhdar bin, çendî di mêr,*
*3 Qalbî vire, ȓuĥî li hêr.*

**S. 10** *1 Gelî mêra silav sed siba li xêr,*
*2 Guhdar bin, çendî mêr,*
*3 Qailbî li vire, ȓiĥî li hêr.*

**S. 11** *1 Gelî mêra silavê mêra we û dîwanê,*
*2 Merberxê, şîlane,*
*3 P'adşa ewe silt'an*[1433] *şêx Adî xwedanê*[1434] *yalê û ark'anê.*

**S. 11** *1 Gelî mêra silav we û dîwanê,*
*2 Merberxê, şîlane,*
*3 P'adşa ewe silt'an Êzîd xudanê ol û erk'anê.*

**S. 12** *1 Silavê dîwanê mêra ve,*
*2 Her ĥeft stûna ȓêza û deȓe va,*
*3 K'esera Ȓeşê bava.*

**S. 12** *1 Silavê dîwanê û mêra ve,*
*2 Her ĥevt sitûna ȓêz û derava,*
*3 K'esereke ȓeşê bava.*

**S. 13** *1 K'esera Ȓeşê mergeh yî,*
*2 Xêra Xwedê em biçûne ber wî derge yî,*
*3 Emê tuabin Zimzimê dewsa şelbe yî.*

**S. 13** *1 K'esereke ȓeşê mergayê,*
*2 Xazla biçûme ber dergayê,*
*3 Ezê taabûma Zimzimê devsa şelbayê.*

**S. 14** *1 K'esera Ȓeşê jara,*
*2 Qent'ereke barkin nale care,*
*3 Maderekê bixazin boy biran û yara*[1435]*.*

**S. 14** *1 K'esereke ȓeşê jara,*
*2 Qent'erekê barkin bînanî cara,*
*3 Maderekê bixazin boyî bira û yara.*

**S. 15** *1 K'esera Ȓeşê p'îra,*
*2 Xazila em biçûna cema'*[1436] *ȓewaqê mîra,*
*3 Ciyê lê sema dibe feqîra.*

**S. 15** *1 K'esereke ȓeşê p'îra,*
*2 Cewlis ȓewaqê mîre,*
*3 Ciyê sima dikir feqîra.*

**S. 16** *1 Feqîr me wê dîtin coş,*
*2 T'ac û t'acp'oş,*
*3 Ew k'as we E'debiya ĥelalbe seda noş.*

**S. 16** *1 Feqîr dîtin coş,*
*2 T'ac û t'acp'oş,*
*3 Ew k'as we E'deviya ĥelal sed noş.*

**S. 17** *1 Silavê ȓewaqêt*[1437] *ȓewa,*
*2 Têda diteîsîya find û şemalêt*[1438] *hewa,*

---

[1433] *sultan*
[1434] *xudan*
[1435] *biran û yara*
[1436] *cems*
[1437] *ȓewaqêd*
[1438] *şemalêd*

*3 Qible[1439] me E'debiya her ewa.*

**S. 17** *1 R̂ewaqê r̂ewa,*
*2 Ĉira sincakê dişixulin hewa,*
*3 Qulba me E'dewiya her ewe.*

**S. 18** *1 Ewe sindirûka min r̂eng e'rûş,*
*2 Ber diçe birq û birûs,*
*3 Têda diteyîsa find, û şemal, û bêsûs.*

**S. 18** *1 Ew sindirûka r̂eng erûş,*
*2 Ber diçe birq, birûsk,*
*3 Têda dit'eyîse find, şemal, p'erî, beyîsûz.*

**S. 19** *1 Dinalim mêlakê,*
*2 Dik'alim nola berxa ber make,*
*3 Eme t'ewafken[1440] Zimzimê dewsa K'ab[a] il şivakê.*

**S. 19** *1 Dinalim mêlakê,*
*2 Dik'alim ivşêta berxê ber make,*
*3 Taabim Zimzimê devsa şivakê.*

**S. 20** *1 Dilê min vê fikarê,*
*2 Sindirûka melek Adî ber derê K'ab[a] il mix̂arê,*
*3 P'adşayê min silt'an şêx Adî ye, xwedanê yalê û ark'anê.*

**S. 20** *1 Dilê min vê fikarê,*
*2 Sindrûka melek Adî ma ber dergê k'af mix̂arê,*
*3 P'adşa Êzîde, xudanê ol û erk'anê.*

**S. 21** *1 Dilê min vê hadêre tê[1441],*
*2 Sindirûka melek Adî ber derê K'ab[a] il nixtê,*
*3 P'adşayê min dinê [û] axretê.*

**S. 21** *1 Dilê min vê hidretê,*
*2 Sindrûka melek Adî ber dergê k'af û nextê,*
*3 P'adşayê min dinê, axretê.*

**S. 22** *1 Ezê vê fikrê mame,*
*2 K'ete bîra min mergeh û Meqlû[b], ew cî, ew meqame[1442],*
*3 Ciyê mîr Xidir lê dikir e'lêkûm[1443] selame[1444].*

**S. 22** *1 Ezê vê fikrê da mame,*
*2 K'ete bîra min merge û Meqlûb, ew cî, ew mik'ane,*
*3 Ciyê mîr Xidirê lê dikir e'lêyîkûm[1445] selame.*

**S. 23** *1 Mîr Xidir lewl û mîr bû,*
*2 E'bil axirdayî xebîr bû,*
*3 Medhê[1446] Seyîd Meĥmedê k'ibîr bû.*

**S. 23** *1 Mîr Xidir lewil mîr bû,*
*2 E'vil axir xebîr bû,*
*3 Met'ĥê seĥîd Meĥmedê k'ibîr bû.*

**S. 24** *1 Seyîdo, nav Ĥemede,*
*2 Mêra jê hildabûn zerb[1447] û k'irîyamete,*
*3 Destê silt'an şêx Adî r̂ede[1448].*

---

[1439] *qulbe*
[1440] *tuabin*
[1441] *hidret*
[1442] *mek'an*
[1443] *e'lêkim*
[1444] *silav*
[1445] *e'lêkim*
[1446] *metĥ*
[1447] *zerp*
[1448] *reda*

**S. 25** *1 P'îro ji atqatê,*
*2 Xemilî bû xelatê,*
*3 Mibexçîyê dîwanê şêx Adî dikine gazî werne simatê.*

**S. 26** *1 Ewe simata, simata sebîle,*
*2 Bê qale, bê qîle,*
*3 R̂ê[y]a û bê bertîle.*

**S. 27** *1 Dewrana şêx Simaîle,*
*2 T'esediqa delîl û jara,*
*3 P'ar tê nîbe keskî p'exile*[1449]*.*

**S. 28** *1 P'exila p'ar tê nîne,*
*2 Ĥerçî mal û r̂isqe xwe da girîne,*
*3 Ew bê şîke dojehîne.*

**S. 29** *1 Ewin nebîyê me Cebêr,*
*2 Xarina wane ji dêr,*
*3 Dexsê k'irîyametê dest mêra va dispêr.*

**S. 30** *1 Ew nebîyê me ceş,*
*2 Me r̂abûne mişterîyê qumêş,*
*3 Şêx Şems zane k'î li paşe, k'î li pêş.*
**S. 24** *1 Ew nebîyê me cêş,*
*2 Me r̂abûne mişterî û qumaş,*
*3 Şêx Şims dizane k'ê li bere, k'ê li paş.*

**S. 31** *1 Îlaĥîo, k'engê me bête ferware,*
*2 Mera bestbû*[1450] *qent'ere,*
*3 Şêx Şems zane k'î li paşe, k'î libere.*
**S. 25** *1 K'engê me bête ferware,*
*2 Mera destûr qent'ere,*
*3 Şêx Şims dizane k'ê li pêşe, k'ê li bere.*

**S. 32** *1 Ewin dergeyê berî R̂ohilat,*
*2 Aşiqa lê dabû selawat,*
*3 Gele cindîya ber dibirin maş û berat'.*

**S. 33** *1 Ewin dergê berî R̂oava,*
*2 Xazila bi e'dilîya ma nava,*
*3 Minê dostê xwe bikra silava.*

**S. 34** *1 Herçî birîna wî heye,*
*2 Zûke Lalişa nûranî her̂eye,*
*3 Ewan derda jî derman heye.*

**S. 35** *1 Herçî birîna wî heste,*
*2 Zûke Lalişa nûranî bike qeste,*
*3 Ewan derda jî derman dixweste*[1451]*.*

**S. 36** *1 Herçî birîna wî melake,*
*2 Qest bike, here Lalişê berberê şivakê,*
*3 Ewan derda jî derman xweke.*

**S. 37** *1 Herçî birîna wî mezine,*

---

[1449] *p'exîl*
[1450] *bestûr*
[1451] *dixast*

*2 Qest bike Lalişê berberê fadile,*
*3 Ewan derda jî derman dibe.*

**S. 38** *1 Dilê min şaye,*
*2 Ewa qewla qewlekî E'yn il-Beyzaye*[1452]*,*
*3 T'ewî celis*[1453] *û r̂ewaqêd mîra,*
*4 Emê qedem ken kekê şêx Şayê,*
*5 Tua'*[1454] *bin lê leylanê*[1455]*.*

**S. 26** *1 Dilê min şaye,*
*2 Ewa qewla qewlê e'nzil benzaye,*
*3 T'evî celis r̂ewaqê mîraye,*
*4 Emê qedem ken kekê şêx Şayê taabin lilayê.*

*T'emametî şêx Adî!*
*R̂eĥme li dê-bavê hostayî!*
*T'emametî! R̂eme bavê hostayî!*

## 70. QEWLÊ E'SASÊ[1456]

**S. 1** *1 Gelo bifikirin li vî e'zmanî,*
*2 P'adşayê min zagon çêkir û bingeh danî,*
*3 Aqil dîyarê ya wî silt'anî.*

**S. 2** *1 Wekî aqil û dewlet bûne hevale,*
*2 Kesekî bi vê biçite bale,*
*3 Ew dizanê yan fêdeya, yan zirare.*

**S. 3** *1 Wekî dikine peyva zêde,*
*2 Binêre hevalêt wî di xewlêde,*
*3 Tu dizanî yan zirare, yan fêde.*

**S. 4** *1 Wekî te dikar xirabe,*
*2 Ji şehrezayê r̂anabe,*
*3 Hêdî-hêdî je cûdabe.*
*4 Kesê xirab çênabe.*

**S. 5** *1 Kirêtiya bê*[1457] *ĥeq megrin,*
*2 Ew dûrî t'erîqetê difikirin,*
*3 Ewnê xisar bibin û malê xwe pê bixisirin.*

**S. 6** *1 Ewnê xisar bibin di xisarê de,*
*2 Wekî te dît lezim li te naket fêde,*
*3 P'adşa ewe li te bike fêde.*

**S. 7** *1 Gerdûn sûke li gelek cî ye,*
*2 Dema tu êkî dibînî bi ĥeqî ye,*
*3 R̂isq*[1458] *û debar ye li wî Xwedî ye.*

**S. 8** *1 Êkî qenciyek bi te kir, ji bîr neke,*
*2 Tuyî deyndarî, bi maf bike,*

---

[1452] *e'yilil bazaye*
[1453] *cews*
[1454] binêr: *dua'*
[1455] *lêlilayê*
[1456] [50] (rr. 502-506)
[1457] *bi*
[1458] *r̂izq*

*3 Da li dadgeha axretê li te fiĥêl bike.*

**S. 9** *1 Xwe bi xelqê r̂e nexisirîne,*
*2 Nebêje ev pêwîstê mine sûd nîne,*
*3 Belkî ji dayîk û baba diguhirîne.*

**S. 10** *1 Heker birayê bê bawerîne,*
*2 Jê cûda bibe, û neĥebîne,*
*3 Kaniya dêm bibe, sûd nîne.*

**S. 11** *1 Bira tê hene,*
*2 K'a yê zanîbe, ji k'ê malêne,*
*3 Dostêt Xwedê ĥemû li ser neqlêne.*

**S. 12** *1 Gelek hene li bal r̂ûniştinê,*
*2 Ew gazindê dikene ji zanyarên dinê,*
*3 K'a wan çi heye ĥeta em bidenê.*

**S. 13** *1 Gelek hene dikene pirsa dîne,*
*2 Ji zanyara ne dirozîne,*
*3 K'a çend derwêş li malê r̂ûniştine,*
*4 Û k'a çend ji malê sûda wîne,*
*5 Û k'a wan çi kirîne bo r̂êya dîne.*

**S. 14** *1 Heke te bi malê xwe kir, tuy[î] nandayî,*
*2 Heke te bi destê xwe kir, tu destûr dayî,*
*3 Heke te bi zimanê xwe kir, tu bersîv dayî,*
*4 U bi van erk'an digel P'adşayî.*

**S. 15** *1 Gelî bira hûn ne betilin,*
*2 Bi r̂êya r̂astiyê biwesilin,*
*3 Da bi ĥeq û ĥesaba nexisirin.*

**S. 16** *1 Ez bêjme weye xwedanê*[1459] *nedere,*
*2 P'erwestê biken û her pênc fere,*
*3 Da we bi şêx Şems*[1460] *hebit mefere.*

**S. 17** *1 Heke tu nekey ĥesabê ĥezar salî,*
*2 Heke tu ne yî bi aqilî, û ne yî maldarî,*
*3 Îro r̂oje, wê li te bibe tarî.*

**S. 18** *1 Bêbext nebe bi hevalê xwe r̂e,*
*2 Wê bibe dîrok ji jiyana te r̂e,*
*3 Gerdûn dewre, wê bê ji te r̂e.*

**S. 19** *1 Binêre li dîroka mêrdara,*
*2 Binêre Cimcimê silt'an û hevala,*
*3 K'a li axretê k'ê bo R̂ojê di mala.*

**S. 20** *1 Gelek hene di bê cewherin,*
*2 Ji berjewndiya xwe dişuxulin,*
*3 Heke dom lê dirêj bû, ew zû vedigeȓin.*

**S. 21** *1 Gelek hene di bê yeqînin*[1461]*,*
*2 Ew ji dînê xwe na êşînin,*

1459 *xudan*
1460 *şê Şims*
1461 *êqîn*

*3 Ew mehê û mehê diqedînin.*

**S. 22** *1 Gelek hene diken zehmetê,*
*2 Ewan ji divên t'êr bibin ji ne'metê,*
*3 Ew gazinde diken ji demê ew tê.*

**S. 23** *1 Heke tu xêrekê bikî bi oldarê Xwedê ȓa,*
*2 Heke tu k'arekî bikî bi ȓê ȓa,*
*3 Te ȟeq heye batin li te bike fêda.*

**S. 24** *1 Madem tuyî sekinî bi sere xwe ye,*
*2 Ne serê te yê biçe, ne malê te ye,*
*3 Batin yê ȓazaye li ser maȓê te ye.*

**S. 25** *1 Heke te bivêt, tu bipirsî ȓêya dîne,*
*2 Ne salekê bike û êkê biguhrîne,*
*3 Bêdera teye mezine, ne şewtîne.*

**S. 26** *1 Heke hate pêşîya te xetere,*
*2 Te xeyret kir bibiye sere,*
*3 Wê hingê te bi şêx Şems mefere.*

**S. 27** *1 Ew nefsê te ȓakirin,*
*2 Ne bi malê Xwedê xweyî*[1462] *dikirin,*
*3 Nehêle ew bifikirin.*

**S. 28** *1 Cend keĉ û kuȓê te hene,*
*2 Heke ne li ferza dînê tene,*
*3 Ew nîşana zewaca tene.*

**S. 29** *1 Çima tu nikarî dest hilînî,*
*2 Tu ne yî korî, ȓoniyê dibînî,*
*3 Tu ne yî seqetî, tu bimînî,*
*4 Tu qêmîş nabî wan fêr bikî û bêşînî.*

**S. 30** *1 Gazindê neke ji meseb û dîne,*
*2 Ev gerdûn dewre, xwe jê derîne,*
*3 Batinê ȟemû yê li ser te bihejmirîne.*

**S. 31** *1 Demê tu bûyî mezinê malekêye,*
*2 Te ser berdayî kir, heçiya têye,*
*3 Hingê tu bûyî êxsîrê zewacêye.*

**S. 32** *1 Gelek hatin, xwe dane kuştin,*
*2 Mal û zarok bi cîda dihiştin,*
*3 Ȟeta bi wê suȓê ȓadigehiştin.*

**S. 33** *1 Gelek hatin bûne derwêş,*
*2 Ewan t'erk kirin jin, û mal, û aş, û bêş,*
*3 Ewan dizanî gelek xweşî heye li pêş.*

**S. 34** *1 Gelek hatin suȓ li xeyale,*
*2 Ewan t'erk kirin mal û e'yale,*
*3 Ew çûn, ewan axret ji xwe ȓa kirine xeyale.*

**S. 35** *1 Ne hema bêje bihuşt*[1463] *ya mine,*

[1462] *xoyî*
[1463] *buhişt*

*2 K'a çend ferzên te yê ĥeqiqetê hene?*
*3 K'a çend dax û sewabê dilî te hene?*
*4 K'a çend dostêt Xwedê şahid tene?*

**S. 36** *1 Ez bi wê suȓê kem, nêva P'adşayî û hêzdêre,*
*2 Mêr ji we suȓê nebin t'êre,*
*3 K'iryar bi mêra ȓe digeȓin wek sîya dêre.*

**S. 37** *1 Gelek hatine dinê dil k'eserin,*
*2 Ewan xewa şevê ji xwe dibirin,*
*3 Li ser gel û miletê xwe bihekerin,*
*4 Ew li çi bazara naxisirin.*

**S. 38** *1 Wekî tu hatî ye dinê, ne li serî nebû xîret,*
*2 Te dil neşewitî bi gel û milet,*
*3 Bi te bû agir û bi te k'et.*

**S. 39** *1 Gelek hatin bersîv dayî,*
*2 Ew li vê gerdûnê digeȓin bi hostayî,*
*3 Ew xweyîn*[1464] *nabin digel Xwedayî.*

*T'emametiya vî qewlî li Xwedayî!*

## 71. QEWLÊ MIRÎDIYÊ[1465; 1466]

*Bi desturî Xudê*

**S. 1** *1 Dibêjime we xelqê e'rifî, jîrî, zane,*
*2 Ji mirîdiyê bidin xweyana*[1467]*,*
*3 Gelo mirîdî bi çî nîşane?*

**S. 1** *1 Xelkê jîrî, zane,*
*2 Werin ji min ȓa biden beyana,*
*3 K'a mirîdî bi çî nîşane?*

**S. 2** *1 Mirîdî dê webî,*
*2 Hincîyê xofa mîrê wî di dilê wî da hebî,*
*3 Ewî hay ji me'nîya dînê xwe dibî.*

**S. 2** *1 Mirîdî dê webî,*
*2 Hincîyê xofa mîr di dilî da hebî,*
*3 Ewî dê haj me'nîyêt [dînê] xo dibî.*

**S. 3** *1 Hincîyê ji me'nîye di ȓê bî,*
*2 Qiryara qestana xwe dihêlî,*
*3 Qirara bê îmana xwe bimeşe,*
*4 Ȓoj bab li t'ebayî li neqilê bî.*

**S. 3** *1 Ew dê bi me'nîya bi ȓê bî,*
*2 Hincîyê bestina qiryara wîye çê bî,*
*3 Ew dê t'ebayî neqilê bî.*

**S. 4** *1 Hincî mêrê bê qiryare,*
*2 Îmane wî ne li kenare,*
*3 Li dinê, li axretê yî şermînî şermezare.*

---

[1464] *xayîn*
[1465] [1] (pp. 293–296); [2] (rr. 591–594)
[1466] Laliş28 *QEWLÊ MIRÎDÎ* (rr. 225–230) belavkirin: Mîrza Silêman Hekarî
[1467] *xuyan*

**S. 4** *1 Hincî mêrê bê qirare,*
*2 Îmanya wîye li kinare,*
*3 Ew li axreta xo yê şermezare.*

**S. 5** *1 Hûn qestane îmana xwe qewî kin,*
*2 E'ynata xwe safî kin,*
*3 Xof li xwe nêzîk kin.*
**S. 5** *1 Hûn bestina qirara xo qewî ken,*
*2 E'ynata xo safî ken,*
*3 Xofê li xo nêzîk ken.*

**S. 6** *1 Hincîyê xof li bal bî,*
*2 Suȓa mîr kenar bî,*
*3 Dê bi mîr ȓa heval bî.*
**S. 6** *1 Heke te xof li bal bî,*
*2 Seȓastiya mîr li xîyal bî,*
*3 Tu dê bi mîr ȓa heval bî.*

**S. 7** *1 Hûn hevêt mîr bin,*
*2 Di ĥelîm bin, di dilgîr bin,*
*3 Li ber nefesa êqsîr bin.*
**S. 7** *1 Bila tu hevalê mîr bî,*
*2 Yî ĥelîm, yî dilgîr bî,*
*3 Ne bi nefesê ȓa êxsîr bî.*

**S. 8** *1 Nefesa mala Adiya ye,*
*2 Hincîyê nefes hilîna ye,*
*3 Jê ȓazî bit hosta ye,*
*4 Maşê xilmetê dua' ye.*

**S. 9** *1 Her bi nasîna nefesê,*
*2 K'uȓa*[1468] *vê meclîsê,*
*3 Mêr xilasin bi tiȓsê.*
**S. 8** *1 Her bi nasî nefsê,*
*2 Ȓuhê vê meclîsê,*
*3 Mêr yî xilase bi piȓsê.*

**S. 10** *1 Heȓin nefesê bi nasî,*
*2 Li beĥra e'limê xewasî*[1469]*,*
*3 Mêr bi xasa dê xasî.*
**S. 9** *1 Heȓe nefsê nasî,*
*2 Beĥre e'limê xewasî,*
*3 Tebayî xasa yî xasî.*

**S. 11** *1 Nefes xweş erk'ane,*
*2 P'êkvetî mêrane,*
*3 Serê ĥemûyê îmane.*
**S. 10** *1 Nefs xoş erk'ane,*
*2 Pê digrin mekane,*
*3 Serê ĥemûyê îmane.*

**S. 12** *1 Dayîm bi xof û îmanê,*
*2 Xebîr bin di erk'anê,*
*3 Da ȓûspî bin li dîwanê.*
**S. 11** *1 Bi xof bin ji îmanê,*
*2 Da dibestî bin li gel erk'anê,*

[1468] *kurî*
[1469] *ẍewas*

*3 Da di r̂ûspî bin li wê dîwanê.*

**S. 13** *1 Me ĥemû wa ew denge,*
*2 Mor kirbû bi herdu çenge,*
*3 Gelo lib[a]sê îmanê bi çî r̂enge?*
**S. 12** *1 Me bi e'ynetêve dabû denge,*
*2 Ez morkirim herdû çenge,*
*3 Bêjine min lib[a]sê îmanê çî r̂enge?*

**S. 14** *1 Lib[a]sê îmanê yî sipî ye,*
*2 Yî nazike, yî let'îfe, yî qewî ye,*
*3 Hûn mehingêvine gelî sinî ye,*
*4 Ew zor r̂engî dix̂eyirî ye.*
**S. 13** *1 Lib[a]sê îmanê yî sipî ye,*
*2 Yî nazike, yî let'îfe, yî qewî ye,*
*3 Me hingiftê ew zû dix̂eyirî ye.*

**S. 15** *1 Lib[a]sê îmanê beyza ye,*
*2 E'yne nasîn we nima ye,*
*3 Hincî r̂enga hingaftin, ew zor r̂enga xweya ye*[1470].
**S. 14** *1 Lib[a]sê îmanê beyza ye,*
*2 E'yn li nas we nemaye,*
*3 Hincî r̂engê hingiftê yî xuya ye.*

**S. 16** *1 …………………………. ,*
*2 Xof û tirsêt min ji Cebêrî,*
*3 Ger̂ dêrî bi xwe didêrî.*
**S. 15** *1 Her̂e r̂engê we na şêrî,*
*2 Bi xof û tirsîn ji Cebêrî,*
*3 Cebêr bi xo dê êbêt me hilddêrî.*

**S. 17** *1 Li min cema' dibûn cimlete,*
*2 Xelqino, li we dikin nesîĥete,*
*3 Gelo îmane bi çî nisbeta.*
**S. 16** *1 Li me cema' dibûn cumlete,*
*2 Xelko, li we dikem nisĥete,*
*3 Bêjne min îman bi çî nisbeta.*

**S. 17** *1 Li me zav dibûn malî ye,*
*2 Hincî mêrê ewlîye,*
*3 Yî bi maşe, bi cembeqî ye.*

**S. 18** *1 Îmane wekî ĉave,*
*2 Heke muwek k'ete nave,*
*3 Ĥeta r̂oja axretê xwedanî ber tengave.*
**S. 18** *1 Îmane weku ĉave,*
*2 Heke muwek k'efte nave,*
*3 Xudan ji ber yî tengave.*

**S. 19** *1 Heke muwek k'etê bi t'inê,*
*2 Xwedan nasebire li ber sotinê,*
*3 Wê ber tarî be çendî dinê.*
**S. 19** *1 Heke k'eftê muwek bi t'inê,*
*2 Dê tarî bit çendî dinê,*
*3 Xodan nawestîyêt li ber sotinê.*

[1470] *xoyaye*

**S. 20** *1 Ew jî mersûma îlaĥîye,*
*2 Hincî mêrê îmana xwe havêtîye,*
*3 Bê şik dinya lê buwe tarîye.*
**S. 20** *1 Ew mersûma îlaĥî bû,*
*2 Hincî mêrê li îmana xo axî bû,*
*3 Bê şik nezera wî tarî bû.*

**S. 21** *1 Ew di korene ji nedere,*
*2 Heke bere, heke dare,*
*3 Ji nedîtinê dane sere.*
**S. 21** *1 Ewî di korene ji nezera,*
*2 Heke li dare, heke li bera,*
*3 Ew ji nedîtinê didane sera.*

**S. 22** *1 Ji nedîtinê [di]bêjin,*
*2 Di bê me'rîfetin, di bê r̂êzin,*
*3 R̂oja axretê ĉirayêt me'rîfetê ji ber wan veguhêzin.*
**S. 22** *1 Ji ne didîtinêve [di]têzin,*
*2 Di bê me'rîfet, di bê r̂êzin,*
*3 Cayîze ĉirayê me'rîfetê ji ber wan veguhêzin.*

**S. 23** *1 Me'rîfet û nasînin,*
*2 Ĉirayêt nûrînin,*
*3 R̂êbera pê dibînin.*
**S. 23** *1 Me'rîfet û nasîne,*
*2 Ĉirayîyêt bi nûrîne,*
*3 R̂êber r̂êya pê dibîne.*

**S. 24** *1 R̂êber û r̂ê fere,*
*2 Bêjme we gelî qelendere,*
*3 Ibadet bikin her pênc ferze.*
**S. 24** *1 R̂êbere û r̂ê fere,*
*2 Dibêjime we gelî qelindere,*
*3 Ibadet biken her pênc fere.*

**S. 25** *1 Her pênc ferzêt ĥeqîqetê,*
*2 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birêt axretê,*
*3 Ferzê li ser me çendî sinetê*[1471]*,*
*4 Îro li dinê, sibê li bangê axretê.*
**S. 25** *1 Her pênc ferêt ĥeqîqetê,*
*2 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birêt axretê,*
*3 Ferêt me sinetê, îro bo dinê, sibeyî bo bangê axretê.*

**S. 26** *1 Me ji bira ew xebere,*
*2 Hincî mêrê r̂êye ĥeqîê li bere,*
*3 Merkeba wî li beĥrêt giran ye seredere.*

**S. 27** *1 Me ji bira ew xeber bû,*
*2 Hincî mêrê r̂êye ĥeqîê li ber bû,*
*3 Merkeba wî li beĥrêt giran ye sereder bû.*

**S. 26** *1 Xelqino, hûn bir̂ênin li dinê,*
*2 Ji medhê, ji gotinê,*
*3 Li beĥrê û li binê.*
**S. 28** *1 Xelko, bir̂îne dinê,*
*2 Beĥrê li binê,*
*3 Li medeha û gotinê.*

[1471] *sunet*

**S. 27** *1 Beȟrêt giran zor mewc tênê,*
*2 Merk'eba wî merk'eb di xinê,*
*3 Merk'eb bi dua' zu ve tê digeȓinê*[1472].
**S. 29** *1 Ew beȟra mewc têne,*
*2 Zor merk'eb hiltavêne,*
*3 Merk'ebêt bê p'îȓînî zu dişkêne.*

**S. 28** *1 Zor merk'eb dibestin,*
*2 Nêva beȟra têxistin,*
*3 Merk'eba bê dua' zû tê şkestin.*
**S. 30** *1 Zor merk'eb dibestin,*
*2 Li nav beȟrî di êxistin,*
*3 Merk'ebêt bê p'îȓînî zû dişkestin.*

**S. 29** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê Ȟeyrane,*
*2 Hicîyê bi ȓastî bike xilmeta yarû birana,*
*3 Beȟrêt giran melevane.*
**S. 31** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşî Ȟeyrane,*
*2 Hicîyê mêrê biket xilmeta yarû birana,*
*3 Merk'eba wî li beȟrêt giran yemelevane.*

**S. 30** *1 Qewlê p'îr Ȓeşê cîda,*
*2 Hûn guh bidêrin gelî mirîda,*
*3 Me dîn Şerfedîne, û atqat silt'an Êzîda.*
**S. 32** *1 Ji qewlê p'îr Ȓeşê cîda,*
*2 Guh bidêrin gelî mirîda,*
*3 Me dîn Şerfedîne, atqat sultan Êzîda.*

*Em di kêmin, Xudê yî t'emame!*

## 72. QEWLÊ ŞÊXÛ BEK'IR – II

**şaxê – 1**[1473; 1474; 1475]
**S. 1** *1 Derwêşo, serê xwe ji xema hilîn,*
*2 Borê ji linga betilîn,*
*3 Cindî çûn dîwana mîr wesilîn.*
**S. 1** *1 Derwêşo, serê xwe xema hilîne,*
*2 Borê niga betilîne,*
*3 Cindî çûne dîwana mîr hasilîne.*
**S. 1** *1 Derwêşo, serê xwe ji xema hilîn,*
*2 Borê linga betilîn,*
*3 Cindî çûn mîr wesilîn.*

**S. 2** *1 Cindî çûne hedretê,*
*2 Xas natirsin ji hêbetê,*
*3 Milk'ê xasa — baẍê cinetê.*
**S. 2** *1 Hasilîn ji qudretê,*
*2 Xas natirsin ji hêbetê*[1476],
*3 Milk'ê xasa — baẍê cinetê.*
**S. 2** *1 Wesilîne wê hedretê,*

[1472] *Merk'eb bê dua' zu ve tê digeȓin*
[1473] [6] şaxa –1 (стр 8–10) http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=50
[1474] [6] şaxa – 3 (стр 13–16) http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=52
[1475] [6] şaxa – 4 (стр 16–18) http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=53
[1476] *hêwet*

*2 Xas bi tirsin ji ĥeybetê,*
*3 Milkê xasa — baẍê cinetê.*

**S. 3** *1 Cinetê da maşxwer[1477] bûm,*
*2 Dilqekî morî li ber bûm,*
*3 Mezine meydanê melekanî gogeȓ bûm.*

**S. 3** *1 Cinete maşxwer bû,*
*2 E'ynata[1478] deyn nekirbû,*
*3 Piştî yarê xweyî gogir bû.*

**S. 3** *1 Ji cinetê maşxwerin,*
*2 E'ynata deyn dikirin,*
*3 Piştî yarû birê[1479] axretê hol dikirin.*

**S. 4** *1 Gogeȓo ji meydanê,*
*2 Cindî xwedanê[1480] sebirê û sikanê[1481],*
*3 Nefsa k'ibîr bigrin û bavêjine zîndanê.*

**S. 4** *1 Hol kirne meydanê,*
*2 P'adşayê min xwedanê sebirê û sikanê,*
*3 Milê nevsa k'ubar girtin dahiştine zîndanê.*

**S. 5** *1 Seyîdê min siwar be berê çêye,*
*2 Mezinê meydanê meleka dengê wan gogeȓa têye.*

**S. 6** *1 Dengê wan gogeȓa tê gaze-gaze,*
*2 K'ifş bûne pisê pilingan û baze.*

**S. 7** *1 Ya silt'an[1482] Êzîd, te yî ĥunirim,*
*2 Piştî te deyn dikirim.*

**S. 8** *1 Deyn dikim goyî digeȓînim,*
*2 Şa divim, deng hiltînim,*
*3 K'engê dîndara silt'an Êzîdê xwe bivînim.*

**S. 4** *1 Go: «Dikim, digeȓînim,*
*2 Şa dibim, dengê xwe hiltînim,*
*3 Ya silt'an Êzdîd, mişt'aqê[1483] teme,*
*4 Hatime dîndara te bibînim.*

**S. 5** *1 Gogeȓem, gog digêȓim,*
*2 Şayîme deng hiltînim,*
*3 Hatime dîndara silt'an Êzdîd bibînim[1484].*

**S. 9** *1 K'engê bivînim wê dîndarê,*
*2 Ezim kulîlka baharê,*
*3 R̂ûniştime, yarû birê axretê ȓa dikim bazarê.*

**S. 5** *1 Dibînim wê dîndarê,*
*2 Ezim kulîlka serê baharê,*
*3 Yarû birê axretê hatine bazarê.*

**S. 6** *1 Ĥeq bibînim wê dîndarê,*
*2 Kulîlkeke şîn bûme ser baharê,*
*3 Yar birê axretê ȓa bikim vê bazarê.*

**S. 10** *1 Bazara min, bazara mîra,*

[1477] *maşxur*
[1478] *e'ynet*
[1479] *yar û birê*
[1480] *xudan*
[1481] *sikan*
[1482] *sultan*
[1483] binêr: *muşt'aq*
[1484] *bivînim*

*2 K'engê dîyar*[1485] *bim alîyê feqîra,*
*3 Dîyara nagihîjme binîya sûkê r̂a.*

**S. 6** *1 Bazar dikin ji mir r̂a*[1486]*,*
*2 Bernedin xinênî fênî wîra,*
*3 P'adşê min xelat kirne miftan û k'ilîla.*

**S. 7** *1 Bazare li mir r̂a,*
*2 Ez xebîrim*[1487] *me'nîyan û k'êra,*
*3 Destê silt'an Êzdîd k'otele ser şer̂an û xêra.*

**S. 11** *1 Xweş me'bûd*[1488]*, derwêş ĥebûb, dahirîn*[1489]*,*
*2 Momina dil k'esirîn,*
*3 Destê silt'an Êzîd ĥeqîyê hatîyê, ji neĥeqîyê di betilî.*

**S. 12** *1 Momina şabû dile,*
*2 Cavekê didim enzele,*
*3 Destê silt'an Êzîd ĥeqîyê hatîye, neĥeqîyê di betile.*

**S. 7** *1 Çi derwêşekî haye,*
*2 Xilfikî*[1490] *bê guhaye,*
*3 Horî meleka r̂eng pê daye.*

**S. 11** *1 Derwêşekî hame,*
*2 Xilfikî*[1491] *nûr bahame,*
*3 Mêr û meleka ha r̂eng didame.*

**S. 8** *1 Çi derwêşekî gedahî,*
*2 Ewî xweş*[1492] *û şahî,*
*3 Dîwana îlaĥî.*

**S. 9** *1 Çi derwêşekî r̂ê bû,*
*2 Xewasê beĥrê bû,*
*3 Mişt'aqê*[1493] *silt'an Êzdîd wê dur̂ê bû.*

**S. 9** *1 Derwêşekî li r̂ê me,*
*2 Xewasê beĥrê me,*
*3 Moĥt'acê dîndara silt'an Êzdîd, wê dur̂ê me.*

**S. 13** *1 Çi derwêşekî ev ĥalim,*
*2 Hin t'acirim, hin delalim,*
*3 Hin sûkim, hin sewalim*[1494]*,*
*4 Mişt'aqê dîndara silt'an Êzîdê xwe van dur̂anim.*

**S. 8** *1 Derwêşekî bav ĥalim,*
*2 Xay sûkim, xay sewalim,*
*3 Xay t'acirî, xay delalim.*

**S. 14** *1 Çi derwêşekî nihame,*
*2 Xilfikî*[1495] *nûyî gîhame,*
*3 Mîr-melekavanî r̂eng dame.*

**S. 10** *1 Derwêşekî zergûnim,*
*2 Hatime ĥeq r̂iya şêx Adî ĥeq bibînim,*
*3 Ne moĥt'acê xelqê derewînim.*

---

[1485] *dîhar*
[1486] *mira*
[1487] *xedîrim*
[1488] *ĥebûd*
[1489] *dehirîn*
[1490] *xilfekî*
[1491] *t'ilifekî*
[1492] *xaş*
[1493] binêr: *muşt'aq*
[1494] *sevalim*
[1495] *xilfekî*

**S. 15** *1 Mîr-meleka we dibête,*
*2 Pêş weve agire guȓe û p'ête,*
*3 Ewan jî sibe[1496] êvara, qismetê xwe P'adşayê xwe dibête.*

**S. 12** *1 Mêr û meleka ha ȓeng dibête,*
*2 Pêşîya wana agirê dojeh, guȓ p'ête,*
*3 Ewan jî ȓisqê xwe ji P'adşayê me divête.*

**S. 16** *1 Çi dojeke xedare,*
*2 T'ijî mişke û t'ijî mare,*
*3 Ew ciyê xelqê selefxurî înk'are.*

**S. 10** *1 Çi dojeke xedare,*
*2 T'ijî agir jê nare,*
*3 Ciyê xelqê selefxurî înk'are.*

**S. 13** *1 Ew çi dojeke xedare,*
*2 T'ijî agire, t'ijî nare,*
*3 Ber diçe xelqê selefxurî înk'are.*

**S. 17** *1 Çi dojeke tenge,*
*2 T'ijî mişke, t'ijî mare, û t'ijî p'iringe,*
*3 Ew ciyê xelqê selefxurî, înk'arî û lenge.*

**S. 11** *1 Çi dojeke tenge,*
*2 T'ijî mar û pilinge,*
*3 Ciyê xelqê selefxurî, înk'arî, lenge».*

**S. 14** *1 Ew çi dojeke tenge,*
*2 T'ijî mar[1497], t'ijî pilinge,*
*3 Ber diçe xelqê selefxurî berdonekî, lenge.*

**S. 18** *1 Gelî mêra bixevitin, neçine wê ye,*
*2 K'eledûkê jê hildikşê ye,*
*3 Ewana jî sibe êvara, qismetê xwe ji P'adşayê xwe dibê ye.*

**S. 12** *1 Got: «Gelî bira k'ar kin, neçine wê ye,*
*2 K'êlendûkê lê hiltê ye,*
*3 Sibê[1498] êvarê ȓisqê xwe ji P'adşê xwe bibê ye».*

**S. 13** *1 Xweş E'rfût derwêş Adem lê dahirî,*
*2 Momina dil pê k'esirî,*
*3 Ȓoja axretê ȟeqê wan dest silt'an Êzdîd neȟeqîyê da betilî.*

**S. 14** *1 Erk'ano, ȟerfî jore,*
*2 Go: «Silt'an Êzdîd xwendîyê[1499] xeta more»,*
*3 Go: «Silt'an Êzdîd çi ȟerfe k'asa Sore».*

**S. 16** *1 Silt'an Êzdîd erk'ana ȟeyfan û cara[1500],*
*2 Me xandîye Xeta More,*
*3 Werin, binêrin silt'an Êzdîd çi e'firandîye ji k'asa Sore.*

**S. 15** *1 Silt'an Êzdîd we dibêje[1501]:*
*2 «Anîna dînê xwe dip'arêze ji çîye,*
*3 Çi ȟerfe ji k'asa Sipîye?»*

**S. 15** *1 Silt'an Êzdîd hat hedirî,*
*2 Momino, dil k'esirî,*
*3 Werin, binê[rin] silt'an Êzdîd çi e'firandîye ji k'asa Sipî.*

[1496] *sive*
[1497] *me'r*
[1498] *sivê*
[1499] *xandîyê*
[1500] *cor*
[1501] *divêje*

**S. 19** *1 Ŕêya silt'an Êzîd r̂aste, ne bi xware*[1502]*,*
*2 Herçî kesê mala Adiya r̂a k'erbî, k'înî, k'are,*
*3 R̂oja axretê ort'a wan û silt'an Êzîda, ĥeyştê ĥezar dîware.*

**S. 17** *1 R̂êya silt'an Êzdîd r̂aste, ne bi xware,*
*2 Herça ber mala Adiya da k'erbî, k'îne, qale,*
*3 R̂oja axretê ort'a wan da ĥezar û ĥeft ĉiya, dîware.*

**S. 18** *1 R̂êya silt'an Êzdîd r̂aste, ne xware,*
*2 Kesê pey mala Adiya bigeře k'erb û k'îne û qale,*
*3 R̂oja bangê ort'a wan, silt'an Êzdîd da, ĥeyştê ĥezar cot dîware.*

**S. 20** *1 R̂êya silt'an Êzîd r̂aste, ne biçûke,*
*2 Herçî kesê dilê xwe mala Adiya r̂a neke sûke,*
*3 R̂oja axretê ne dive zava*[1503]*, ne dive bûke.*

**S. 18** *1 R̂êya silt'an Êzdîd mezine, ne biĉûke,*
*2 Herça mala Adiya dilê xwe da neke sûke,*
*3 R̂oja axretê ne dive zave, ne dive bûke.*

**S. 19** *1 R̂êya silt'an Êzdîd mezine, ne ĉûke,*
*2 Kesê pey mala Adiya bigeře qale, k'erbe, k'îne, sûke,*
*3 R̂oja bangê ne dibe*[1504] *zave, ne jî bûke.*

**S. 21** *1 R̂êya silt'an Êzîd r̂aste ne bi nehîne,*
*2 Herçî kesê mala Adiya r̂a k'erb û k'îne,*
*3 R̂oja axretê ort'a wan û silt'an Êzîd da heyştê ĥezar ĉiyayê berfîne.*

**S. 16** *1 R̂êya*[1505] *silt'an Êzdîd r̂aste, ne nihîne,*
*2 Ĥerça ber mala Adiya da k'erb û k'îne,*
*3 R̂oja axretê ort'a wan da ĥezar û ĥeft ĉiya berfîne.*

**S. 17** *1 Rêya silt'an Êzdîd r̂aste, nak nihîne,*
*2 Kesê pey mala Adiya bigeře qal û k'erb û k'îne,*
*3 R̂oja bangê*[1506] *ort'a wan silt'an Êzdîd da, ĥeyştê ĥezar ĉiyayê berfîne.*

**S. 22** *1 Qelso, gîyanê xwe lez ke,*
*2 Tê bîna mawer*[1507] *û miske,*
*3 Binhêr P'adşayê min çi e'frandîye — k'asa k'eske.*

**S. 23** *1 K'asa tir yê r̂eşe,*
*2 Nazilbûye [ji] E'rşe,*
*3 Xasa xwarîye, ẍafile korin, pê nexweşin*[1508]*.*

**S. 24** *1 K'asa tirî yê sore,*
*2 Nazilbûye [ji] jore,*
*3 Xasa xarîye, ẍafile korin*[1509]*.*

**S. 25** *1 K'asa tirî yê sipî yê,*
*2 Nazilbûye E'rşê Bêrî yê*[1510]*,*
*3 Xasa xwarîye, ẍafile korin, pê k'ifirî yê.*

**S. 26** *1 K'asa na ji tirî yê,*
*2 Melek şêx Sin ji xuya e'nîya xwe çêkirî yê,*
*3 Xasa xwarîye, ẍafile kirin, pê k'ifirî yê.*

**S. 27** *1 K'asa tirî yê mêwa,*

---

1502 *xar*
1503 *ze've*
1504 *dive*
1505 *r̂îya*
1506 *band*
1507 binêr: maye
1508 *nexoşin*
1509 *korin*
1510 *i'êriyê*

*2 E'ynata[1511] wê, e'ynata dêwa,*
*3 Xas vedixwin[1512], ẍafil diçin pêva.*

**S. 19** *1 Dilê min wê yekê moĥt'ace[1513],*
*2 Çi derwêşekî r̂ewace,*
*3 Berk' kirina[1514] şêx Adî dilqe[1515] û t'ace.*

**S. 20** *1 Şêx Adî xerqe berk' kir,*
*2 T'acekî r̂eşî nûranî li ser kir,*
*3 Hêja feqîra lê sefer kir.*

**S. 21** *1 Lê seferkir feqîra,*
*2 Herça t'erikandine xinînî fênî yê, [v]îra,*
*3 Ew jî bûne maşxwerê mîra.*

**S. 22** *1 P'adşê min hin maşe, hin medaye,*
*2 Şêx Sin[1516] mistefaye,*
*3 Ĥemû derda bû e'faye[1517].*

**S. 23** *1 Bû e'fayê ĥemû derda,*
*2 Herça yar t'irêqa şêx Adî xeber da,*
*3 Ajot mezin meydanê, ba meleka ser da.*

**S. 24** *1 Ajot mezin meydanê meleka sere,*
*2 Herça vî qewlî bê baware,*
*3 E'lametê[1518] mala Adiya here, ĥetanî here.*

**S. 28** *1 T'emametî şêx Adî,*
*2 Em kêmin, şêx Adî ťemame,*
*3 Şêx Adî beĥre, ber diçe cew, û cober, û kanî.*
*4 Xasa xas zanin, ẍafile korin, me'nîya vî qewlî nizanin.*

**şaxa — 2**[1519]

**S. 1** *1 K'engê bê mizgîne,*
*2 Coqê tu r̂ave r̂uĥîne,*
*3 T'elebê gelîyê Lalişê yî şîne.*

**S. 2** *1 K'engê qalbî k'arkir,*
*2 Sîtil mermer xwe şêx Adî barkir,*
*3 Dilê E'debiya[1520] şan û şakir.*

**S. 3** *1 Me bi ca, me bi coqe[1521],*
*2 Mîrê mezin hildabû t'oqe,*
*3 Dilê E'debiya şah û şoqe.*

**S. 4** *1 Me dîyarê vê bihuştê,*
*2 Çi dîndareke li me xweş lê,*

---

1511 *e'ynet*
1512 *meriv vedixun*
1513 *mot'ac*
1514 *birq*
1515 *ber kirin*
1516 *Şêxîsin*
1517 *afa*
1518 *alamet*
1519 [6] (стр.10–13) http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=51
1520 *E'deba*
1521 *Me bîca, me bîcoqe*

*3 Çi cindî bû lib[a]sê[1522] r̂eş lê.*

**S. 5** *1 Gelî yara, we li[1523] xeber,*
*2 Bihuştê ger̂iyame yekser,*
*3 Quba[1524] k'eske, helêl[1525] bi zer[1526].*

**S. 6** *1 Quba k'eske helêl bi zerin,*
*2 K'irîyameta melek şêx Sin[1527], melek Fexredîn.*

**S. 7** *1 Difiricîm ji quba,*
*2 Ji mêra, ji derga.*

**S. 8** *1 Difircîm qubê bi nûr,*
*2 Lalişe gelîyê bukur[1528],*
*3 Gelîyê Lalişê [bi] nave,*
*4 Zar med[h]a, r̂uĥave.*

**S. 9** *1 Sed silavê me silavê,*
*2 Silava me sival xêrê,*
*3 Me r̂uĥê kaniya Sipî, qalbî lêvê.*

**S. 10** *1 Dilê min ha k'eser kî,*
*2 Ĥesep'îrk ĥeta dergê xwe kî,*
*3 Ya silt'an Êzdîd tu ser hazir û gudêra da nederkî.*

**S. 11** *1 K'eser kir R̂eşê p'îra,*
*2 Celis[1529] di r̂ewaqê mîra,*
*3 Lê şima kir feqîra.*

**S. 12** *1 Feqîr me dîtin li mit'êc,*
*2 T'acê holdarê t'ac û p'oş,*
*3 Evê k'asê vexwe sed car te xoş[1530].*

**S. 13** *1 Dergê berê wî R̂ohilatê,*
*2 Dilê min şaya xem tê,*
*3 Temazixî qubet il-Bidor̂î[1531] k'ove nextê.*

**S. 14** *1 Dergê berê wî R̂oavayê,*
*2 Xwazila bihêwirîyame navê,*
*3 Yar birê axretê r̂a bikira silavê.*

**S. 15** *1 Sed silavê me silavê,*
*2 Silava me ji dîwanê,*
*3 Bi metbexçî[1532], bi şîlanê,*
*4 Ciyê dandolê de'nê.*

**S. 16** *1 R̂ewaqê r̂ewa[1533],*
*2 Sêsed û şêst û şeş find û beysûs dişxulin hewa,*

[1522] *lems*
[1523] *wel*
[1524] *quva*
[1525] *herê*
[1526] *Quba k'eske, herê bi zer* — binêr: *Helêl k'eskin, quba zere.*
[1527] *Şîxsin*
[1528] *bikûr*
[1529] *cew*
[1530] binêr: *xweş*
[1531] *qubildor*
[1532] *merberxê*
[1533] *r̂ewaqê*

*3 Çiqa qubleta[1534] mêrê Êzîd[1535] heye, t'emam ewe.*

**S. 17** *1 R̂êzê stûna der̂awa,*
*2 Ya şêx Adî, tu bînaya herdu ĉava[1536].*

**S. 18** *1 Şêx Sin şêxê şewatê,*
*2 Go: «Gazîkin mêrekî al bê, r̂ûnî ser mûsatê»,*
*3 Şems bang da, go: «Gelî mêra, werne simatê!»*

**S. 19** *1 Simat, simata sebûrê,*
*2 Ya bê qale, bê qîrê,*
*3 Ya bê r̂êye bê bertîlê,*
*4 Sadiqê sêfîl û delîlê.*

**S. 20** *1 Hatime ziyaretî bikime,*
*2 Sicûda yî ber dibûme,*
*3 Herd p'eyê şêx Adî, herd ĉavê xwe didûme.*

**S. 21** *1 Îlaĥîo, Tu mirazê me zû bikî,*
*2 Xazila biçûme wan qesra, wan sindirûka,*
*3 Bixemilyama şivêtê nebûka.*

**S. 22** *1 Sûk, sûka r̂engalo,*
*2 Ber diçe birq û birûsk[1537],*
*3 Jê diçe find û beysûs.*

**S. 23** *1 Fikarekê da dimame,*
*2 Bîra min ciyê mîr Xidir, e'lêk'ûm selame[1538].*

**S. 24** *1 Wekî mîr Xidir mîr bîya,*
*2 Wevil wexîr xebîr bîya,*
*3 Fetĥa dikim seyîdê[1539] wî nav li mîre.*

**S. 25** *1 Fetĥa dikim seyîdê wî nav Ĥemede,*
*2 Ya şêx Adî, mêr dixwazin r̂eda.*

**S. 26** *1 Mame R̂eşan mêrekî siware,*
*2 Qamçîyê wî mare.*
*3 Pêşberî mêra va kir ĥinare.*

**S. 27** *1 Ay, ay, ay, ay, ay,*
*2 Ay, dinalim, ay dinalim ji birîna,*
*3 Banga xwe dikim Şemsê Êzdîna[1540],*
*4 Ya şêx Adî, dergê Şerfedîna.*

**S. 28** *1 Ay dinalim, birîna min ji dile,*
*2 Ay dinalim, da wasile,*
*3 Banga xwe dikim dergê fadile.*

**S. 29** *1 Ay dinalim, birîna min ji milake,*
*2 Dik'alim şefa'etê berxê, ji ber make,*

---

[1534] binêr: *qible*
[1535] *Êzdîd*
[1536] *çe'va*
[1537] *birû*
[1538] *elêkîme silame*
[1539] *Seyd*
[1540] *Êzdîyana*

*3 Ya şêx Adî, dergê şewakê.*

## 73. QEWLÊ XERQE[1541; 1542; 1543]

**S. 1** *1 Berî gerdûn nebû,*
*2 Wê r̂ojê xerqe hebû,*
*3 Xerqe cilê Xwedê bi xwe bû.*

**S. 1** *1 Berî dinya nebû,*
*2 Ew r̂oj xerqe hebû,*
*3 Xerqe lib[a]sê Xwedê bi xwe bû.*

**S. 1** *1 Berî dinya nebû,*
*2 Ew r̂oj xerqe hebû,*
*3 Xerqe lib[a]sê Xwedê û Tawsî melek bi xwe bû.*

**S. 2** *1 Gerdûn nebû ne disêwirand,*
*2 Evîn hebû mêra ne di înk'arand[1544],*
*3 Wê r̂ojê silt'an Êzî xerqe e'firand[1545].*

**S. 2** *1 Dinya nebû, ne disewirand,*
*2 Muĥbet hebû mêran ne di înk'arand[1546],*
*3 Wê r̂ojê silt'an şêx Adî xerqe dahirand.*

**S. 2** *1 Berî dinya nebû, ne disewirand,*
*2 Muĥbet[1547] ew bû mêran ne hengirand,*
*3 Ew r̂oj P'adşayî xerqe di dahirand.*

**S. 3** *1 Berê ne e'rd, ne e'zman bû,*
*2 Berê ne ĉiya, ne sikan bû,*
*3 Û ne beĥr, ne binyan bû,*
*4 Hîngê[957] di nav xas bû,*
*5 Ewlîya de xerqe îman bû.*

**S. 4** *1 Koro, te ĉavî sipîye,*
*2 Me'nîya[1548] xerqê şêx Adî çîye?*
*3 E'rde bi k'ilît û ne vekiriye,*
*4 Ema ji sur̂a Melikî bihuriye!*

**S. 5** *1 Koro, te ĉavî kore,*
*2 Me'nîya xerqê şêx Adî çiye?*
*3 Ne vekirîye bi Zimzim û more.*
*4 Derenca xerqê şêx Adî li jore,*
*5 Ew ji sur̂a P'adşayê jore.*

**S. 6** *1 Di k'ilimî grîvane,*
*2 Xerqe libasê P'adşê minî girane,*
*3 Ew xerqe qubleta çiqas xasane.*

**S. 3** *1 Ji ba dilê min weye,*
*2 Ji nîveka dilê meye,*
*3 Berkirina silt'an Êzî dirqe t'ance û xerqeye.*

---

[1541] [50] (rr.107-110)
[1542] *Dengê Êzdiyan* 6–, 1997, (r. 29)
[1543] http://www.ezdixandi.com/forum/38-806-1
[1544] *e'nk'irand*
[1545] *afirand*
[1546] *i'nkirand*
[1547] *mihibet*
[1548] *hingê*

**S. 4** *1 Dilê min vê yekê bû mot'ace,*
*2 Çi derwêşekî minî r̂ehwance,*
*3 Berkirina silt'an Êzî delqê û t'ance.*

**S. 3** *1 Dilê min bi vê yekê moĥt'ace,*
*2 Çi derwêşekî r̂ehwance,*
*3 Berk' kirina silt'an şêx Adî delqe û t'ace.*

**S. 5** *1 T'anc dibeje xerqeye,*
*2 R̂ojê sed gunehkar têne ber damana teye,*
*3 R̂astîya şêx Adî, destekî me li ser teye.*

**S. 4** *1 T'ac dibêje xerqeye,*
*2 R̂ojê sed gunehk'ar têne ber damana teye,*
*3 Ĥeqiya şêx Adî destekî ma li ser teye.*

**S. 7** *1 T'ac dêje xerqeye,*
*2 Sed e'vdê gunehk'are qest ke ber de mala teye,*
*3 Bi ĥeqiya Xwedê destekî li ser yê teye!*

**S. 6** *1 Wê deng dike girêvane,*
*2 Xerqe cilê P'adşekî minî girane,*
*3 Ew xerqe qubletê çiqas xasane.*

**S. 5** *1 Wê dik'ilîmin girîvane,*
*2 Xerqe lib[a]sê P'adşeyekî minî girane,*
*3 Xerqe qubleta xasane.*

**S. 7** *1 Xerqeye buha p'ir̂e,*
*2 Hencî nasîbû ew sur̂e,*
*3 Xerqe li bedena mêra wek dur̂e.*

**S. 8** *1 Xerqe cilê merê aẍe,*
*2 Hincî di hin barê xerqê de neke kul û k'iryare saẍe,*
*3 Roja axretê yî r̂utî çîplaxe.*

**S. 9** *1 Xerqe cilê P'adşê bi xwe ye,*
*2 Ewî ser qalbekî bê t'eşe*[1549] *ye,*
*3 Wan xêr nedikirin, guneh li xwe dikirin zêde ye.*

**S. 6** *1 Xerqe lib[a]sê Xwedê bi xwe ye,*
*2 Êwirye ser qalbekî beyt'eşe*[1550] *ye,*
*3 Wan xêr nedikirin guneh li xwe dikirin zêde ye.*

**S. 10** *1 Xerqe xelata Xwedê bi xwe ye,*
*2 Êwiriye ser qalbekî bê t'erse ye,*
*3 Ewan xêr nedikir û guneh li xwe dikir zêde ye.*

**S. 11** *1 Xerqe dibê, ezê li wê me,*
*2 Bê bav û bê dême,*
*3 Ez li ber k'erema mewlê me.*

**S. 12** *1 Ez li ber k'erema vî mewlayî,*
*2 Ez dame destê vî hostayî,*
*3 Ser min çêkirin xweş û sayî*[1551].

**S. 13** *1 Ya R̂ebê min, xweş[î] û sayî ye bide me!*
*2 Berî Adem, berî Hawa, berî Îsa û Mêyreme,*
*3 Not ĥezar sal hebûme, li dîwana te me!*

---

[1549] binêr: *bê t'ersî*
[1550] binêr: *bê t'ersî*
[1551] *sahî*

**S. 10** *1 Xerqe cilê bi suȓe,*
*2 Êwirî li ser milê kire,*
*3 Xêr nedikir, herȓoj sibê guneh li xwe dikir p'iȓe.*

**S. 8** *1 Hincîyê bi suȓ ma[1552], xerqe bigre,*
*2 Û bi xezeb têde bifikire,*
*3 Ew bêşik dê k'afir bimîne.*

**S. 11** *1 Xerqe cilê hêzdare,*
*2 Hincîyê[1553] hiltîne ser xerqê şêx Adî dare,*
*3 Li axretê li ber şêx Adî û melik şêx Sin yî gunehkare.*

**S. 7** *1 Xerqe lib[a]sê Cebare,*
*2 Hincîyê[1554] hilînte ser xerqê şêx Adî dare,*
*3 Li axretê li ber şêx Adî û melik şêx Sin yî k'afir û gunehk'are.*

**S. 12** *1 Xerqe cilê ta rêze,*
*2 Ji bo cindîya cayêze,*
*3 Bi wa cindîya diparêze.*

**S. 13** *1 Ev qewle, qewlê xerqe ye,*
*2 P'îr Mend pesin jê dide ye,*
*3 Ev qewle ji derêya şêx Şems[1555] bi xwe ye.*

**S. 14** *1 Ji derya şêx Şems bû xebîre,*
*2 Derya silt'an Êzî lê disewirin ew feqîre,*
*3 Bêjme we, şîreta yarû birayê axretê mekin ji bîre.*

**S. 15** *1 Xerqe cilekî çê ye,*
*2 Xas çûne beĥrê ye,*
*3 Lal, duȓ anîn jê ye.*

**S. 16** *1 Li derya dibû mizgîne,*
*2 Ew xerqe ji bo[1556] wa cindîya der anîne,*
*3 E bi şev û ȓoj pê xerqê şêx Adî xeme, p'erweste, û girîne.*

**S. 17** *1 Li derya bûye ĥikyate,*
*2 Ew xerqe bo wa cindîya der dihate,*
*3 Yê şev û ȓoj pê xerqê şêx Adî, xeme, girîne, p'erweste.*

**S. 18** *1 Li derya dibû xebere,*
*2 Ew xerqe ji bo wa cindîya anîn dere,*
*3 Yê şev û ȓoj pê xerqê şêx Adî, xeme, girîne, û sefere.*

**S. 19** *1 Xerqe cilê nûrîne,*
*2 Ji bo wa cindîya der anîne*
*3 Yê şev û ȓoj pê xerqê şêx Adî şîne, p'erweste û girîne.*

**S. 9** *1 Xerqe lib[a]sê nûranî,*
*2 Ji xezîna qudretê der anî,*
*3 Di vê mîvan xatirê xerqê şêx Adî bizanî.*

**S. 20** *1 Xerqe cilê ĥede,*
*2 Ji bo wa cindîya nidede,*
*3 Yê şev û ȓoj pê xerqê şêx Adî şîne, girîne, û p'erweste.*

**S. 10** *1 Henciye dibin bare xerqe de neke kul û e'melê saẍe,*

---

[1552] *surma*
[1553] *Hencît*
[1554] *Henciyê*
[1555] *şê Şems*
[1556] *bû*

*2 R̂oja axretê yî tazîye, yî çîplaxe,*

**S. 8** *1 Xerqe xelatê mêrê aẍa,*
*2 Hincî dibin kirê şêx Adî de, neke kul û e'melê saẍa,*
*3 R̂oja bangê yî r̂ût û çîplaxe.*

**S. 9** *1 Xerq[e] — dur̂e,*
*2 R̂ast[î] —sur̂e,*
*3 Xerqe — xelata mêrê hire.*

**S. 21** *1 Xerqe cilê xase,*
*2 Çûne derya, xewase,*
*3 Lal, dur̂ anîn bê qiyase.*

**S. 11** *1 Xerqe lib[a]sê xase,*
*2 Çûne beĥrê xewase,*
*3 Lal û dir anîn bê qiyase.*

**S. 22** *1 Çêl keĉên beĥrî bûn,*
*2 Her çêl yî horî bûn,*
*3 Her çêl nederên kaniya Sipî bûn.*

**S. 12** *1 Çil qîzên beĥrî bûn,*
*2 Her çil yî horî bûn,*
*3 Her çil nedirên kaniya Sipî bûn.*

**S. 23** *1 Yeke din li wê mabû,*
*2 P'îr̂ sînî beĥrî jê p'eyda bû,*
*3 Ew ji nedera P'adşê bû.*

**S. 13** *1 Yeke din li wê mabû,*
*2 P'îr sînî beĥrî yê p'eyda bû,*
*3 Ew jî nedira P'adşa bû.*

**S. 24** *1 Ji qewlê Lawikê p'îre,*
*2 Da em bidin pesne mîre,*
*3 Xelata silt'an şêx Adî xerqeye, danîbû ser milên feqîre.*

**S. 14** *1 Ji qewlê Lawikê p'îre,*
*2 Da em bidin medhêt mîre,*
*3 Xelatê silt'an şêx Adî xerqeye, danîbû ser milên feqîre.*

**S. 25** *1 Ji qewlê derwîşê Qat'anî,*
*2 Şêx Adî deryaye, jê çûn kanî,*
*3 Xas xasin, çûne ser nûra dilovanî,*
*4 Ẍafil di korene tiştekî nizanî,*
*5 Ĥeq r̂êya şêx Adî, melek şêx Sin zanî.*

*T'emametiya vî qewlî li Xwedê û xwedanî!*

## 74. QEWLÊ BORÊT FEQÎRA[1557; 1558]

**S. 1** *1 Borêt feqîra di bestî bin,*
*2 Dilêt aşiqa di şkestî bin,*
*3 Şerêt r̂astgoya babê qelendera bi mîrê xwe r̂a bi hîvî bin.*

**S. 1** *1 Borêt feqîra di besty bin,*
*2 Dilêt aşiqa şkesty bin,*
*3 Serêt sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xore bi hyvî bin.*

[1557] [50] (rr. 571-573)
[1558] *BORÊT FEQÎRA* Laliş 22 2005 (rr. 55-57) Belavkirin: Mîrza Silêman Hekary

**S. 2** *1 Borêt feqîra bi hevsar bin,*
*2 Dilêt aşiqa ne di bêzar bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa bi maş bin.*

**S. 2** *1 Borêt feqîra bi hefsarbin,*
*2 Dilêt aşiqa di bê zar bin,*
*3 Serêt sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora bi maş bin.*

**S. 3** *1 Borêt feqîra bi li xaf bin,*
*2 Dilêt aşiqa ne bi ferş*[1559] *bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa bi řaf bin.*

**S. 3** *1 Borêt feqîra bi li xaf bin,*
*2 Dilê aşiqa ne di vaj bin,*
*3 Serêt sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora bi řav bin.*

**S. 4** *1 Borêt feqîra bi zîn bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi birîn bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa silt'în bin,*

**S. 4** *1 Borêt feqîra bila bi zîn bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi birîn bin,*
*3 Serê sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora bi sult'an bin.*

**S. 5** *1 Borêt feqîra bila bi ĥîle bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi kul bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa hîl bin.*

**S. 5** *1 Borêt feqîra bila bi hîlla bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi kul bin,*
*3 Serê sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora bi hilbin.*

**S. 6** *1 Borêt feqîra bi qeyd bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi xem û êş bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa mêr bin.*

**S. 6** *1 Borêt feqîra bila bi qeyd bin,*
*2 Dilêt aşiqa bi xem û xeyt bin,*
*3 Serê sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora seyd bin.*

**S. 7** *1 Borêt feqîra ne di bê paş bin,*
*2 Dilêt aşiqa ne di şaş bin,*
*3 Şerêt řastgoya babê qelendera bi mîrê xwe řa bi maş bin.*

**S. 7** *1 Borê feqîra ne di pê û paş bin,*
*2 Dilêt aşiqa ne di şaş bin,*
*3 Serê sadiqa, bubê qelindera, bi mîrê xora di aş bin.*

**S. 8** *1 Civat û cema' ye,*
*2 Hilatbû tirsa dila ye,*
*3 Lew ber diket xema bira ye.*

**S. 8** *1 Civat û cemaye,*
*2 Hilat bu xofa dilaye,*
*3 Leu bira diket xêba biraye.*

**S. 9** *1 Civat û cumlê ye,*
*2 Hilatbû tirsa řê ye,*
*3 Lew bira diket xema birê ye.*

**S. 9** *1 Civat û cemlêye,*
*2 Hilatbu xofa řêye,*
*3 Leu bira diket xêba birêye.*

---

[1559]*difaş*

**S. 10** *1 Civat û cumlete,*
*2 Gel ku li we diket nisbete,*
*3 Di dila de nema şewq û muĥbete*[1560].

**S. 10** *1 Civat û cemelte,*
*2 Xelik ku li we diket nisbete*
*3 Di dila nema şeuq û muĥbete.*

**S. 11** *1 Civat û cemîne,*
*2 Hilatbû tirsa Emîne,*
*3 Şewq û evîn di dila da nîne.*

**S. 11** *1 Civat û cemîne*
*2 Hilat bu xofa amîne,,*
*3 Şeuq û muĥbet di dila da nîne.*

**S. 12** *1 Zora ne ji xware,*
*2 Mîr mersûmek dihinare,*
*3 Di xênime dêwe dare.*

**S. 12** *1 Zora ne ji xuare,*
*2 Mîr mersumek di hinare,*
*3 Di xinme dêwe dare.*

**S. 13** *1 Zora ne ji zevî,*
*2 Dibûne avêt yêt şevî,*
*3 Şewq û evîn ji dila r̂evî.*

**S. 13** *1 Zora ne ji zevî ,*
*2 Dilbun av yêt şeqî,*
*3 Şeuq û muĥbet ji dila r̂evî.*

**S. 14** *1 Çî bedîlek bê wefa ye,*
*2 Bênî Adem têda bê ĉare ye,*
*3 Xêr çûbûn, şer̂ê wan ma ye.*

**S. 14** *1 Çi bedî leke bê wefaye,*
*2 Binadem têda bê dûaye,*
*3 Xêr çobun şerê wî maye.*

**S. 15** *1 Çî bedîlek bê wefa bû,*
*2 Bênî Adem têda bêĉare bû,*
*3 Xêr çûbûn, şer̂ê wan mabû.*

**S. 15** *1 Çi bedî leke bê wefabu,*
*2 Binadem têda bê dûabu,*
*3 Xêr çobun şerê wî mabu.*

**S. 16** *1 Li bedîla ne hesede,*
*2 Dil dibîne cemede,*
*3 Lew şewq û evîn di dila da nede.*

**S. 16** *1 Bedîla nehseda,*
*2 Dil bibûn cemeda*
*3 Şeuq û muĥbet di dilada nema.*

**S. 17** *1 Bedîleka bi kêr bî,*
*2 Zimanê mîr li r̂ê bî,*
*3 Pêwîste şewq û evîn di dila da hebî.*

**S. 17** *1 Bedîleke bi kêr bî,*
*2 Zimanê mîr bi xo li r̂ê bî,*
*3 Cayze şeuq û muĥbet di dil da hebî.*

[1560] *muhbet*

**S. 18** *1 Şerm ji çakyê der dibî*
*2 Wekî r̂ezekî bêber dibî,*
*3 T'ijî gay û k'er dibî,*
*4 Xwedan r̂oja axretê vê r̂a bê mefer dibî.*

**S. 18** *1 Heya ji husin der dibî,*
*2 Wekî r̂ezekî bê şur dibî,*
*3 T'ijî gay û gur dibî,*
*4 Xudan r̂oja axretê vera bê mefer dibî.*

**S. 19** *1 Heya ji husin dur dibî,*
*2 Wekî r̂ezekî bê şur dibî,*
*3 T'ijî gay û gur dibî,*
*4 Xudan axretê vera bacur dibî.*

**S. 19** *1 Zor dixwînin*[1561] *k'itêbê,*
*2 Gelî bira hûn lêk neken lebê,*
*3 R̂astiya şêx Adî û melek şêx Sin vêra bikin hisêbê.*

**S. 20** *1 Zor di dixunin k'itêbê,*
*2 Gelî bira hun lê neken xêbê,*
*3 Heqya Şîxadî û melik şêxsin vekra biken hisêbê.*

**S. 20** *1 Ji qewlê şêx Mendê Fexrane,*
*2 R̂asmalê mêra îmane.*

**S. 21** *1 Ji qeulê şêx mendî fexrane,*
*2 R̂as male mêra îmane.*

*Em di kemin, Xwedê t'emame!*
*Em di kêmin xudêy t'emama.*

## 75. QEWLÊ DERWÊŞA[1562]

**S. 1** *1 Dewrêşo xayî ĥimayîlî,*
*2 Borî bin da betilî,*
*3 Cindî çû dîwanê mîra wesilî.*

**S. 2** *1 Wesilî ji qudretê,*
*2 Xas natirsin ĥeyîbetê,*
*3 Melikê xasa baẍê cinetê.*

**S. 3** *1 Çinete maşxur bû,*
*2 Î'netk'arî deyî ne kiri bû,*
*3 Meyîdanê meleka gogir bû.*

**S. 4** *1 Gogir bûn meyîdanê,*
*2 Xudanê sebrê û sik'ranê,*
*3 Nevsa k'ubarî davêtne zîndanê.*

**S. 5** *1 Gog dibêjim, go diger̂înim,*
*2 Şa dibim, dengê xa hiltînim,*
*3 Maşoqê sult'an Êzîdim, dîndara wî dibînim.*

**S. 6** *1 Ez maşoqê wê dîndarê,*

[1561] *dixûnin*
[1562] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ DEWRÊŞA* (rr. 84-86) T'ilbîs 2001

*2 Kulîlkeke ber baharê,*
*3 Hatime birê axretê r̂a dikim bazarê.*

**S. 7** *1 Bazar dibêm, bazarê mîra,*
*2 Bernadim feniyê feqîra,*
*3 Ya sult'an Êzîdo, destê te ser xêr û şer̂a.*

**S. 8** *1 Dewrêşe r̂êne,*
*2 Xewas ji be'rêne,*
*3 Mêr û meleka r̂eng pê dane.*

**S. 9** *1 Dewrêşekî gedehî,*
*2 Dîdara lê, dîndra Îlahî,*
*3 Mêr, meleka r̂eng pê dayî.*

**S. 10** *1 Ĥerfa dewrêş Ademî ber dibêye,*
*2 Birano, k'ar bikin neçin r̂iya xirabiyêye.*

**S. 11** *1 Dergekî li dur̂êye,*
*2 K'êrendîke ber hiltêye,*
*3 Sibê heyanî êvarê r̂isqê xa dest P'adşayê xa bibêye.*

**S. 12** *1 Dergî berî r̂ohilatê,*
*2 Şaya dilê min lê xem tê,*
*3 Ber ta dibim Zimzimê, Qubildarê wê K'abenextê.*

**S. 13** *1 Dergî berî r̂oavayê*
*2 Xazla bihêviriyama li navê,*
*3 Minê birê axretê r̂a bikira silavê.*

**S. 14** *1 Wê silava dîwanê,*
*2 Merbexê û şîlanê,*
*3 Ew bû ciyê dondan û danê.*

**S. 15** *1 Ayî r̂iya sult'an Êzîdê min mezine, ne biĉûke,*
*2 Herĉî kesê anîna dînê sult'an Êzdîd dilê xa da neke sûke,*
*3 Bandê ne dimîne ze'va, ne dimine bûke.*

**S. 16** *1 Riya sult'an Êzîdê min mezine, ne bi neĥîne,*
*2 He[r]ĉê anîna dînê sult'an Êzdîd r̂a, t'erîqetiya mala Adiya r̂a de'vî, galî, k'erbî, k'îne,*
*3 Dojê teng ĉe'vê xa dibîne.*

**S. 17** *1 Dojeye tenge,*
*2 T'ije agir û p'êt, me'r û pilinge,*
*3 Ew ciyê xelqê bux̌danbêĵî, î'netk'arî, lenge.*

**S. 18** *1 R̂iya sult'an Êzîdê min r̂aste, ne bi xare,*
*2 Herĉî kesê anîna dînê sult'an Êzîd r̂a k'erbî, k'înî, de'vîdare,*
*3 Ĉe'vê xa dibîne dojeke xare.*

**S. 19** *1 Ayî dojeye xare,*
*2 Agir, p'êtî, piling û me're,*
*3 Ew ciyê xelqê bux̌danbêĵî selefxare.*

*Temametî melek Adi !*
*R̂eme dêv û bavê hostayî!*

## 76. QEWLÊ K'OĈEKA[1563; 1564; 1565]

**S. 1** *1 Çendî şevê, çendî r̂ojê,*
*2 Fikirim berbi xwe we*[1566]*,*
*3 Xeyala*[1567] *dilê min ewe.*

**S. 1** *1 Çendî r̂ojê, çendî şevê,*
*2 Difikirim berbi xwe ve,*
*3 Xeyala dilê min ewe.*

**S. 1** *1 Çendî r̂ojê, çendî şevê,*
*2 Fikirim ber bi xa ve,*
*3 Xiyala dilê min eve.*

**S. 2** *1 Şevê, r̂ojê fikirim,*
*2 Daman da yar birê axretê digirim,*
*3 Ser atqata îmana xwe dimirim.*

**S. 2** *1 Şevê, r̂ojê difikirim,*
*2 Daman da yare birê axretê digirim,*
*3 Ser atqata*[1568] *dîne Êzdî dimirim.*

**S. 2** *1 Şev, r̂oj difikirim,*
*2 Damana birê axretê digirim,*
*3 Ser atqata dînê Êzîd dimirim.*

**S. 3** *1 Çûme mala merebî,*
*2 Qewlê Xwedê û nebîy,*
*3 Li berbi r̂êya*[1569] *xwe bî.*

**S. 3** *1 Çûme mala merebî,*
*2 Qewlê Xwedê û nebîy,*
*3 Her kesekî ser r̂êya*[1570] *xwe bî.*

**S. 3** *1 Me li malê merhebî,*
*2 Qewlî Xudê ya R̂ebî,*
*3 Herkesekê ser ol, erk'ana xa bî.*

**S. 4** *1 Hatime t'eftêşkim*[1571]*,*
*2 Serê xwe r̂ap'êşkim,*
*3 Xwe ĥelal û cêşkim.*

**S. 4** *1 Hatime t'eftêşkim*[1572]*,*
*2 Serê xwe r̂apêş kim,*
*3 Maşê xwe ĥelal û mêş kim.*

**S. 4** *1 Hatime t'evk'êş kim,*
*2 Serê xa verap'êĉ kim,*
*3 Maşê cida ĥelal û mêĵ kim.*

**S. 5** *1 Berî K'af û berî Nunê,*
*2 Berî dur̂a*[1573] *beybûnê,*
*3 P'adşayê min Bêr̂ûne.*

**S. 5** *1 Berê K'afê û berê Nuĥînê,*
*2 Berê dur̂a*[1574] *beybûnê,*

---

[1563] [29] (гг. 338–339) (№ 1685)
[1564] [5] (стр 133–134)
[1565] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ K'OĈEKA* (гг. 77-78) T'ilbîs 2001
[1566] *xweme*
[1567] *xîyal*
[1568] *e'tqad*
[1569] *r̂îya*
[1570] *rîya*
[1571] *tewtêş*
[1572] *tifteş*
[1573] *dur*
[1574] *dur*

*3 P'adşakê[1575] Bêr̂ûne.*

**S. 5** *1 Berî K'afê, berî Nunê,*
*2 Berî dur̂ê û berî beybûnê,*
*3 P'adşayê min bê r̂ûne.*

**S. 6** *1 P'adşayê min mezine,*
*2 Yeqînya dilê mine,*
*3 Baqî melek şêx Sine.*

**S. 6** *1 Çi P'adşakî mezine,*
*2 Yeqînya[1576] dilê mine,*
*3 Melek şêx Ĥisine.*

**S. 6** *1 P'adşayî mezine,*
*2 Hêqînîş dilê mine,*
*3 Baqî sult'an Ezdamê mezine.*

**S. 7** *1 Silt'anekî[1577] seĥîde,*
*2 Gunekirin feĥîde,*
*3 Atqata me silt'an Êzîde.*

**S. 7** *1 Silt'ano, tu seĥîbî,*
*2 Te ji gune dikirim afûte,*
*3 At'qata min kiriye sult'an Êzîde.*

**S. 8** *1 Kesê silt'an Êzîd atqate,*
*2 Ew deme, ew seĥete,*
*3 Lê nave t'u şikîyate,*
*4 Bandê li dibe şivate.*

**S. 8** *1 Her k'î kesê sult'an Êzîd at'qate,*
*2 Dem û seĥete,*
*3 Bandê ber nave şikiyate,*
*4 Ber dibe şivête.*

**S. 9** *1 Êzîdo, e'lêkûm[1578] selam,*
*2 Nav dik'irê te Şerq ĥeta Şam,*
*3 Me dîn Şerfedîn, qulbet[1579] kaniya Sipî, atqata me Êzîd t'emam!*

**S. 7** *1 Êzdîda[1580] e'lêk'ûm selam,*
*2 Navê dik'irê ji Şerq ĥetanî Şam,*
*3 Êzdîd, Şerfedîn atqata me êzdîya t'emam!*

**S. 9** *1 Êzîdo, navê te e'lêkûm sela,*
*2 Nav dik'irê te Şerqê ĥetanî Şam,*
*3 Nava dik'irê sult'an Êzîd min t'emam.*

**S. 10** *1 Axayê min Êzîde,*
*2 Beyraqa R̂eşê p'îre,*
*3 Çardeh t'ebeq[1581] e'rd û e'zman k'efa silt'an Êzîde.*

**S. 8** *1 Çi P'adşakî ezdîne,*
*2 Beyraqê r̂eşe p'îda,*
*3 Çardeh t'ebeqe[1582] e'rd û e'zman k'efa destê Êzdîda.*

**S. 11** *1 Mala sinetê ser jê,*
*2 Ĥemû xoxe û der jê,*
*3 Ĥemû meyîne û ber jê.*

---

[1575] *Patşa*
[1576] *wîqînya*
[1577] *sultan*
[1578] *e'lêkim*
[1579] binêr: *qible*
[1580] *Ezdîd*
[1581] *tevek*
[1582] *tevek*

**S. 9** *1 Mala sinetê[1583] ser jî,*
*2 Me ĥemiya xof û derd jê,*
*3 Berê hê name jî.*

**S. 12** *1 Berî ĥemû meyîna,*
*2 Mifte ĥemû xezîna,*
*3 Stûna herçar dîna,*
*4 Dezmala Şerfedîne.*

**S. 10** *1 Berê ĥemû mehêna,*
*2 Miftê ĥemû xezîna,*
*3 Stûna herçar dîna.*

**S. 10** *1 Me malê Adiya ferzin,*
*2 Beyînim ĥemû berjin,*
*3 Miftê ĥemû xezîna,*
*4 Sitûnê her çar dîna,*
*5 R̂esilqetiya melek Şemsedên, melek Ferxedîna,*

**S. 13** *1 Yasînê[1584] digrim boy nasînê,*
*2 Xûşk, birê axretê digrim seva bawar[î] û yeqînê,*
*3 Mîrê dîwanê melek Şemsedîne.*

**S. 11** *1 R̂ûselat destê melekê Şemsedîne,*
*2 Yasîne[1585] digirin nasîne,*
*3 Yarê birê axretê bawerê wî yeqîne[1586],*
*4 Mîrê dîwenê melekê Şemsedîne.*

**S. 11** *1 Asîna didim boyî nasînê,*
*2 Damana birê axretê digrim boyî qirar û heqînê,*
*3 Melekê mêra melek Ferxedîn, melek Şemsedîne.*

**S. 14** *1 Herge Lalişe, herge lêre,*
*2 Yeqîna yarû birê axretê[1587] guh bidêre,*
*3 Birê xwe ĥerfa Êzîdê sor da dispêre.*

**S. 12** *1 Lalişe li hêr,*
*2 Nisile'ta birê axretê guh bidêr,*
*3 Serê xa ĥerfa dînê xa da bispêr.*

*T'emametî! R̂eme bavê hastayî!*

## 77. QEWLÊ BAZA[1588] – QEWLÊ P'ÎR ŞEREFÎ MÊRAVÎ

**S. 1** *1 Mestî sukranim[1589],*
*2 Nêĉîrvanê bazanim,*
*3 Aşiqê sur̂a giranim.*

**S. 2** *1 Aşiqê wê sur̂ê me,*
*2 Ji derê dirba ve tême,*
*3 Ji r̂êya baza wê tême.*

**S. 3** *1 Xwezî min bizanî ye,*
*2 R̂êya baza li k'o dibî ye,*

[1583] *sunnet*
[1584] *yesîn*
[1585] *asîn*
[1586] *êqîn*
[1587] *yar û birê axretê*
[1588] [2] (rr. 871–875)
[1589] *sikranim*

*3 Da min girtba bi nijnî ye.*

**S. 4** *1 Nijyare ne ji gul û bare,*
*2 Ye bi miske, ye bi mefere*[1590]*,*
*3 Serê minî bi deft'ere.*

**S. 5** *1 Min davek veda ye,*
*2 Serê dirba yî xwaya ye*[1591]*,*
*3 Bazîyek tê nima ye.*

**S. 6** *1 Dilê min pê şa ye,*
*2 Mala min pê ava ye,*
*3 Min ne zanî, min berda ye.*

**S. 7** *1 Min davek veda bû,*
*2 Serê dirba xwaya bû,*
*3 Bazîyek tê nimîye bû.*

**S. 8** *1 Dilê min pê şah dibû,*
*2 Mala min pê ava dibû,*
*3 Min ne zanîbû, min berda bû.*

**S. 9** *1 Dava min ya zirave,*
*2 Serê dirba min vedave,*
*3 Bazîyek k'efte nave.*

**S. 10** *1 Dilê min pê şayî dibe,*
*2 Mala min pê ava dibe,*
*3 Belê, min ne zanî, min berdave.*

**S. 11** *1 Dava min ji mu ye,*
*2 Serê dirba xwayabû ye,*
*3 Bazîyek tê wer bû ye.*

**S. 12** *1 Dilê min pê şah dibuwe,*
*2 Mala min pê ava dibuwe,*
*3 Belê, min ne zanîbû, ji min ber buwe.*

**S. 13** *1 Çî bazîyekî qewî ye,*
*2 Min di dava xwe da dî ye,*
*3 Min ne zanîbû, ew sur̂a şêxê Adî ye*[1592]*.*

**S. 14** *1 Çî bazîyekî cîde,*
*2 Min di dava xwe da dîte,*
*3 Min ne zanîbû ew sur̂a silt'an Êzîde!*

**S. 15** *1 Çî bazekî mezine,*
*2 K'eftbû dava mine,*
*3 Min ne zanîbû ew sur̂a melik şêx Sine!*

**S. 16** *1 Çî bazîyekî buk'ir,*
*2 Min ji dava xwe vekir,*
*3 Min ne zanîbû ew sur̂a şêxû Bek'ir!*

**S. 17** *1 Çî bazîyekî bi hinere,*
*2 Fir̂î, ço E'rşêt sere,*

---

[1590] *mehwer*
[1591] *xoya*
[1592] *şêx E'dî*

*3 Min ne zanîbû ew suȓa şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 18** *1 Çî bazîyekî nûrîne,*
*2 Fiȓî, ço e'zmîne,*
*3 Min ne zanîbû ew suȓa Şemsedîn û melik Fexredîne!*

**S. 19** *1 Çî bazîyekî bilinde,*
*2 Bazîyek ser dixwînde*[1593]*,*
*3 Min ne zanîbû ew suȓa şêx Hevinde!*

**S. 20** *1 Çî bazîyekî girane,*
*2 Fiȓî ço e'zmane,*
*3 Min ne zanîbû ew suȓa şêx Mendê Fexrane!*

**S. 21** *1 Çî bazîyekî girane,*
*2 Fiȓî, ço e'zmane,*
*3 Li E'rşa dewran dane,*
*4 Mîr Ĥesin Mamane,*
*5 Nasirdînê babane,*
*6 Mîr Sicayê sicane,*
*7 Şêr Mehmedê R̂eşane,*
*8 Şêx Mendê Fexrane,*
*9 Dawidî bin Dermane,*
*10 P'îrê T'ercimane,*
*11 R̂astiyê spartbû li gel yarû birane.*

**S. 22** *1 Li baza, li gel bazgîra,*
*2 Ewin pisêt feqîra,*
*3 Ewin seyadêt mîra,*
*4 Şev û ȓojê li nêĉîra,*
*5 Nêĉîra dîndara mîra.*

**S. 23** *1 Baz hatin û bazirgane,*
*2 Bar lal, û duȓ, û mircane,*
*3 Wê da dinêne dorêt şarane*
*4 Xasêt şêx Adî hatinê ser bi serane,*
*5 E'zîzê mino hêşta erzane!*

**S. 24** *1 Baz hatin bazirganêt boşe,*
*2 Duȓ înabûn bi goşe,*
*3 E'zîzê mino, xwezî te yek bi min firoşe!*

**S. 25** *1 Baz hatin û bihurîn,*
*2 Hevalêt me li xwe biȓîn,*
*3 Dilê me ji mîr û muĥbeta*[1594] *silt'an şêx Adî mabû k'ewgirî.*

**S. 26** *1 Mezela duȓ nijinî,*
*2 Bazîyek jê di beynî,*
*3 Kund hat şûnê di nihî.*

**S. 27** *1 Mezela duȓ nijin bû,*
*2 Bazîyek jê fiȓî bû,*
*3 Kund hat û di şûnda nihî.*

**S. 28** *1 Mezela duȓ girêde,*
*2 Bazî jê difirête,*

---

[1593] *dixund*
[1594] *meĥbet*

*3 Kund hatî şûnda da dinête.*

**S. 29** *1 Şeref lawê Dawide,*
*2 Wa di destî da qelema u'de,*
*3 Ez şebekim di r̂êya cau'de.*

**S. 30** *1 Şeref lawê p'îra,*
*2 Dil sotin — r̂asta mîra,*
*3 Ez şebekim di r̂êya feqîra.*

**S. 31** *1 Şeref lawê duwa caze,*
*2 Di xebîr bin ji duwa ze,*
*3 Ez şebekim di r̂êya baza.*

**S. 32** *1 Yek me divêt yê sipî baze,*
*2 Hûn xebîr bin ĥemû r̂aze,*
*3 Ez dişêm bidem van r̂aze.*

**S. 33** *1 Şeref deng diket ji e'sase,*
*2 Fehmê min zor qiyase,*
*3 Tu Xidirî, anî Ilyase?*

**S. 34** *1 Xidiro, ya Xidirî*
*2 P'ir̂ ĥimeta qadirî,*
*3 Li ĥemû cewaba yî hazirî.*

**S. 35** *1 Xidir we cewab da ye,*
*2 Melle dixwînit*[1595] *zeka ye,*
*3 Wê zêde dike bela ye.*

## 78. QEWLÊ MIŞATÊ[1596]

**S. 1** *1 Îlaĥîo, Tuyî Qadirî,*
*2 Berî r̂oja em bimirî,*
*3 Te kir ber vî derî hedirî.*

**S. 2** *1 Eve bû k'esera dilî,*
*2 Berî r̂oja em bimirî,*
*3 Te kir bi Mişetê wesilîn.*

**S. 3** *1 Mişetê sîha wan bîye,*
*2 Meyze kirbû li wan ciya, li wan ûlîya,*
*3 Ew bû qedemgeha şêx Fexrê Adiya.*

**S. 4** *1 Li Mişetê r̂ûniştbûm bisat,*
*2 Ji xema e'zîmat,*
*3 Ezî hesay dilî minî r̂ehat*[1597]*.*

**S. 5** *1 Dilo, tû çendî dikev nêĉîrê,*
*2 Bûy kevirê*[1598] *li ber serî r̂ê*[1599]*,*
*3 Ji navbera ba sixirê û bîrê.*

---
[1595] *dixûnit*
[1596] *Laliş* 17, 2002 (rr. 231–236) Belavkirin: E'lo şêx Xelef; http://www.ezdixandi.com/forum/38-284-1
[1597] *reht*
[1598] *kevr*
[1599] *serîr̂ê*

**S. 6** *1 Jor hate sere,*
*2 Li min şehde bin dar û bere,*
*3 Şêx Fexrê Adiya ji r̂ewa dimalitin ger̂e.*

**S. 7** *1 Ji jor hate xware,*
*2 Li min şehde bin ber û dare,*
*3 Şêx Fexrê Adiya ji r̂ewa dimalitin xebare.*

**S. 8** *1 Çûme warê Zibêre,*
*2 Wê tê dengê pilingan û şêre,*
*3 Ew bû qedemgeha Şêx Fexrê Adiya bin hêre.*

**S. 9** *1 Ew bû k'elaha*[1600] *me mêsîya,*
*2 Mex̆elê*[1601] *wan pez k'ûvîya,*
*3 Ew bû qedemgeha şêx Fexrê Adîya.*

**S. 10** *1 Çûme warê Harûne,*
*2 Wê sor diket ji beybûne,*
*3 Ew bû meskenê wan xatûne.*

**S. 11** *1 Çûme ser kaniya horîya,*
*2 Min meyze kirbû li wan ciya li wan ûlîya,*
*3 Ew bû meskenê wan sitîya.*

**S. 12** *1 Şexsek wê li ber Burê,*
*2 Ew bû k'elaha dêm, şirûrê,*
*3 Şêx Fexrê Adiya fericîbû li wê nûrê.*

**S. 13** *1 Şexsek wê li ber Bûr de,*
*2 Bi wê qubê kim, di gelîyê k'ûr de,*
*3 Şewqa nûrê jê nûr de.*

**S. 14** *1 Şexsek wê li ber Xewşave,*
*2 Quba mîrê min bi nave,*
*3 Li wêderê min li P'adşê xwe kir zor silave.*

**S. 15** *1 Şexsek wê li ber Xewşava yê,*
*2 Ew bû k'esera dêm sewda yê,*
*3 Şêx Fexrê Adiya fericî bû li wê r̂a yê.*

**S. 16** *1 Şêx Fexrê Adiya bi mal û êl ve,*
*2 Û bi kuç û xêl ve,*
*3 Hêdî hêdî dimeşiya li ber Kendêl ve.*

**S. 17** *1 Dilo, Fexro, yî bi mane,*
*2 R̂eza yê şêx Şems û gul hinarê,*
*3 Ya şêx Şems, te kirye û pite tê xwarê.*

**S. 18** *1 Ji şkeftê ĥeta bi mix̆arê,*
*2 Li min şehde bin ber û darê,*
*3 Şêx Fexrê Adiya r̂ê bo şêx Adî ji r̂uwa di male.*

**S. 19** *1 Fexro, yî dil bi êşe,*
*2 Ji borî peya bû min dik'êşe,*
*3 Ez çûme ber p'îrê hêşe.*

[1600] *keleha*
[1601] *mexolê*

**S. 20** *1 Min li p'îrê hêşe dikir silave,*
*2 Ez çûme ser kaniya ave,*
*3 Ez peya bûme nave.*

**S. 21** *1 Av têt bi Laliş ve,*
*2 Cî û mek'anê xweşe,*
*3 Ew bû qedemgehe şêx Fexrê Ȓeşe.*

**S. 22** *1 Laliş ku Lalişe,*
*2 Cî û mek'anê xweşe,*
*3 Şêx Fexrê Adiye jîr deluwê bû geşe.*

**S. 23** *1 Fexro, yî t'êr bijî,*
*2 Li derê kaniya Sipî ȓûdiniştî,*
*3 Li derê mîr dinivistî.*

**S. 24** *1 Xanî yê em têde yî pane,*
*2 Di nav digeȓyam ȓojek û dane,*
*3 Li dilê şêx Fexrê Adiya namînit ne êşe, ne k'esere, ne kovane.*

**S. 25** *1 Xanî yê em têde yî bi dere,*
*2 Di navde digeȓiyam çend qendere,*
*3 Li dilê Fexrê Adiye namînit ne êşe, ne kovane, û ne k'esere.*

**S. 26** *1 Xanî yê em têdeyî bi cîde,*
*2 Ȓûniştibûn li celisa mîre,*
*3 Ciyê sema lê dik'êşin feqîre.*

**S. 27** *1 Şêx Fexrê Adiye li gel coqetêt şêxan û p'îre,*
*2 P'ala xwe dabûye berê xefîre,*
*3 Berê xwe dabûye celisa mîre,*
*4 Ciyê sema lê dik'êşin feqîre.*

**S. 28** *1 Şêx Fexrê Adiye li gel coqetê yî civane*[1602]*,*
*2 P'ala xwe dabûye berê zave,*
*3 Berê xwe dabûye quba Hebabe.*

**S. 29** *1 Xwezî çûbame deriyê*[995] *mezine,*
*2 Min serê xwe danabe li bine,*
*3 Mêr li dîwana şêx Adî û melik şêx Ȟesen*[996] *dibin miraz hasile.*

**S. 30** *1 Xwezî çûbame deriyê nûranî,*
*2 Min serê xwe li ber datanî,*
*3 Şêx Adî yî agahe*[1603] *yî dûrbîne bi ȟemû yê di zanî.*

**S. 31** *1 Hincîyê birîna wî li dile,*
*2 Qesid bikine dîwanên fazile,*
*3 Mêr li dîwana şêx Adî û melik şêx Ȟesen dibin miraz hasile.*

**S. 32** *1 Hincîyê birîna wî li mêlakê,*
*2 Qesid bikine dîwana şêx Adî û makê,*
*3 Mêr dibin miraz hasil li dîwana şêx Adî û make, û li ber Berê Şibakê.*

**S. 33** *1 Fexro, dilê bi heste,*
*2 Berbi Lalişa nûranî kirbû qeste,*
*3 Li celisa mîrve diweste.*

[1602] *ciwan*
[1603] *agehe*

*4 Şibaka şêx Adî girtbû bi herdu deste,*
*5 Me û hazir û guhdara miraza xwe ji wan dixweste,*
*6 Ewan miraza xwe û ya me, ji dîwana silt'an Êzdîd dixweste.*

*Em di kêmin, û Xwedê[1604] yî t'emame!*

## 79. QEWLÊ BISK BIȒÎNÊ[1605]

*1 Ȓojeka ji ȓojane,*
*2 Biska biskane,*
*3 Biska Şêx Alê Şemsane,*
*4 Bi şehdeya şêx Adî u mêrane,*
*5 Lê danîn ĥed û sed, ol û erk'ane,*
*6 Bisk dibe bi şehdeya şêx Adî û mêrane.*
*7 Bi ȓoj li ser kaniya Sipî dane,*
*8 Ĉiya li hevk'etin wek berane,*
*9 Di navda melik şêx Sin, şêxê şêxane,*
*10 Şêxû Bek'ir, şêx Şems, melik Fexredîn, Sicadîn, Amadîn, Babadîn pê girtin nîşane.*
*11 Bisk bûye k'af, fiȓîye e'zmane,*
*12 Şaya vê biskê yan berxe, yan berane.*
*13 Li me dîyar bû êvara miraza bi ȓengê Ezdane,*
*14 Ji e'rdê bilindbû, çûye e'zmane.*
*15 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birayê axretê bi vê biskê girtin nîşane,*
*16 Ya Ȓebî, tu ji vê biskê bikî çil biskane,*
*17 Ya Ȓebî, ji me dest, ji te dermane.*

*Em kêmin, Xwedê û şêx Adî ťemame!*

## 80. QEWLÊ SER MIRÎ[1606]

**S. 1** *1 Îşeve, bê xewe,*
*2 Îşeve wê ȓojê dike [ĥesabe],*
*3 Xeyala[1607] dilê min eve.*

**S. 2** *1 Şev — ȓoj difikrim,*
*2 Damana birê axretê digirim,*
*3 Ser atqata dînê Êzîd dimirim.*

**S. 3** *1 Me li malê merebî[1608],*
*2 Qewl — Xwedê ya Ȓebî,*
*3 Her kesekê ser ol — erk'ana xwe bî.*

**S. 4** *1 Hatime t'eftêş[1609] kim,*
*2 Serê xwe ve p'êĉ[1610] kim,*
*3 Maşê cîda ĥelal û mêj kim.*

**S. 5** *1 Berî K'afê, berî Nûnê,*

[1604] *Xudê*
[1605] Kov. *Laliş*, N 5; 1997 http://www.ezdixandi.com/forum/38-812-1;
[1606] [14] Qewlê ji gotina şêx Xelo, gundê Qorbulax (rr. 112–113)
[1607] *xiyal*
[1608] *merhebî*
[1609] *tevkêş*
[1610] *verpêĉ*

*2 Berî dur̂ê[1611] û berî qanûnê,*
*3 P'adşayê Bêrûnê.*

**S. 6** *1 P'adşa yî mezine,*
*2 Yeqînî ji[1612] dilê mine,*
*3 Baqî silt'an[1613] Êzîdê[1614] min mezine.*

**S. 7** *1 Silt'ano, tu saĥîbî[1615],*
*2 Te ji guneh[1616] dikirim e'fû[1617] bî,*
*3 Atqata[1618] min kirye silt'an Êzîde.*

**S. 8** *1 Her k'î kesê silt'an Êzîd atqatê,*
*2 Dem û sae'tê[1619],*
*3 Bande ber nave şikyatê,*
*4 Ber dibe şefa'etê[1620].*

**S. 9** *1 Êzîdo, navê te e'lêk'ûm selam[1621],*
*2 Nav dik'irê te Şerqê ĥetanî Şam,*
*3 Nava dik'irê silt'an Êzîd min t'emam,*

**S. 10** *1 Me malê Adiya ferzin,*
*2 Beynim[1622] ĥemû berzin[1623].*

**S. 11** *1 Miftê ĥemû xezîna[1624],*
*2 Stûnê herçar dîna,*
*3 Resûl qetya[1625] melek Şemsedîn[1626], melek Fexredîna.*

**S. 12** *1 Yasîna[1627] didim boy nasîne,*
*2 Damana birê axretê digrim boy qirar û ĥeqînê,*
*3 Melekê mêra: melek Fexredîn, melek Şemsedîne.*

**S. 13** *1 Lalişê li hêr nesebeta[1628] birê xwe axretê guh bidêr, 2 Serê xwe ĥerfa dîne xwe da bispêr.*

*T'emametî r̂eĥme bavê hostayî!*

## 81. QEWLÊ BERÎ ŞÛŞTINÊ [1629]

**S. 1** *1 Berê min r̂ohilatê,*
*2 Tê ser min qasidê calatê,*
*3 Benî Ademo, r̂abe bide şehdetê.*

---

1611 *dur*
1612 *hêqînîş*
1613 *sultan*
1614 *Êzdîd*
1615 *sehîb*
1616 *guna*
1617 *afû*
1618 *arqat*
1619 *sehet*
1620 *şivêt*
1621 *elekûm sela*
1622 *beyîn*
1623 *berj*
1624 binêr: *xezne*
1625 *Resilqetya*
1626 *Şemsedên*
1627 *asîn*
1628 *nisilet*
1629 [5] (стр. 131)

**S. 2** *1 Tu bêje: «Şehdetiya min — Ĥeq Ellaĥ!*
*2 Êzdî — ĥebîbî*[1630] *Ellaĥ,*
*4 Mergê Meqlûbû sela!*

**S. 3** *1 Silavê Meqlûbê mergehe,*
*2 E'vdê Êzdîxanê çu ber t'obe*[1631] *sûcda ye,*
*3 Cûmayê*[1632] *Binîmaye!*

**S. 4** *1 Quba min — qublet il-Bidar*[1633]*!*
*2 Zimzin — ĥaca*[1634] *min!*
*5 Kaniya Sipî — mora min!*

**S. 5** *1 P'îrê min — nûre!*
*2 Ĥacî îbn Mehemmed — mişûre!*
*3 Bawarî atqata xwe êzdî qebûle!*

**S. 6** *1 Şemsê min — çiray e,*
*2 Êzdî — ĥebîbê Ellaĥ ye,*
*3 Bawarî atqata xwe Tawisî melek' daye!*

## 82. QEWLÊ SERE MERGÊ

**şaxê 1**[1635; 1636; 1637; 1638]
**S. 1** *1 R̂ojeke ji r̂ojane,*
*2 Xelqê e'rifî zana,*
*3 Hilûn ji mirinê bidin beyane.*
**S. 1** *1 R̂ojekê ji r̂ojane,*
*2 Xelqê e'rifî*[1639]*, zane,*
*3 Hilûn ji mirinê biden beyane.*
**S. 1** *1 R̂ojekê ji r̂ojane,*
*2 Gazî kirin xelkê êrifî zane,*
*3 Werin ji mirinê bidin beyane*

**S. 2** *1 Xelqê e'rifî zana,*
*2 Hûm werin bifikirin li beyana,*
*3 Nesîĥeta mirinê bigrin ji xweȓane.*
**S. 2** *1 Xelqê e'rifî zane werin,*
*2 Li van beyana bifikirin,*
*3 Sit'arekê*[1640] *ji mirinê bi xwe bigrin.*
**S. 2** *1 Xelqê e'rifî zane werin,*
*2 Li beyana bi fikirin,*
*3 Sidirî te ji mirinê hilgirin.*

**S. 3** *1 R̂ojekê ez nebûm,*

---

[1630] *hebûbî*
[1631] *toube*
[1632] *Camaye*
[1633] *qubildar*
[1634] *hec*
[1635] [2] (rr. 139–150)
[1636] [1] (pp. 341–349)
[1637] [55] BERIVAN CAN EMMEZ AWAZÉ TAWUS: AŞK VE YAS BATMAN EZİDİLERİNİN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE ETNOGRAFİK YAKLAŞIMLAR Ankara – 2018 Qewlê Serêmergê (rr.162-175)
[17] T'erkîne "Ferzê biratiyê" (стр 26)
[1638] [29] *Qewlê sera mergê* (rr. 381–388) (№ 1696)
[1639] *ê'rif*
[1640] *sitir*

*2 Û suȓeke xewle bûm,*
*3 Muxliqê xaliqê xwe bûm.*

**S. 3** *1 Rojekê ez nebûm,*
*2 Sirreke ji xewlebûn,*
*3 Ber methê Xaliqê xwe bûm*

**S. 1** *1 Belkî ez nebûm,*
*2 Beȟrekî[1641] xewle bûm,*
*3 Muȟubê xaliqê xwe bûm.*

**S. 2** *1 T'ifaqekî t'ifaqîm,*
*2 Beȟrekî da xulqîm,*
*3 Suȓa[1642] mîrê xwe şiviqîm.*

**S. 4** *1 Ew suȓa me dikujî,*
*2 Serê qalb dinijî,*
*3 Miskîno, benî Ademo, ȓuȟ hate te, hilû bijî.*

**S. 3** *1 Ew suȓa min dikuje,*
*2 Dest, û ser, û p'ê, û qalb nijî,*
*3 Miskîno, bin Ademo, hilû bijî.*

**S. 4** *1 Ew bû sirra min dikujî,*
*2 Dest û pê serî qalib dinijî,*
*3 Benî Ademo rabe lo bijî.*

**S. 3** *1 Suȓa min dikujî,*
*2 Dest-p'ê, serî lev hildimijî,*
*3 Hilû miskîno Adem [bi]jî.*

**S. 4** *1 Suȓa enzelî,*
*2 Kire qendîl û nizilî,*
*3 Qalb pê k'amilî.*

**S. 5** *1 Ji qendîlê nazilbû ew suȓe,*
*2 Îlaȟîo, nesîbek te e'firandbû ji min ȓe.*
*3 Ezî ȓazîme, heke hindeke, heke p'iȓe.*

**S. 4** *1 Ji bana nazilbû[1643] ew suȓe,*
*2 Nesîbek e'firandbû bi mi ȓe.*
*3 Emî di ȓazîne heke hendeke û heke p'iȓe.*

**S. 5** *1 Bihara nizilî sirre,*
*2 Îlahîyo temsil bike afirandiya jin min re*
*3 Em ȓazîne heke hindike heke p'iȓe.*

**S. 5** *1 Qendîl û nizilî suȓe,*
*2 Hinare qismete ji mi ȓa,*
*3 Herge[1644] hindike, herge p'iȓe.*

**S. 6** *1 Beȟra Ĥeq wetinî,*
*2 Neh meha tê sekinî,*
*3 Bi qudreta îlaȟî dimekinî.*

**S. 5** *1 Beȟra Ĥeq wetinî,*
*2 Neh meha tê sekinî,*
*3 Ji qudretê mekinî.*

**S. 6** *1 Ew bahra heq wetenî,*
*2 Neh mehan de sekinî,*
*3 Ji qudretê t'emam e*

**S. 6** *1 Beȟra Ĥeq medine,*

---

[1641] *be'r*
[1642] *sur*
[1643] *nizil*
[1644] *herke*

*2 Neh meha wê sekinîm,*
*3 Qudretê ez mekinîm.*

**S. 7** *1 Bi qudretê kir ťemame,*
*2 Çî beĥreke tarîye, bi ẍemame,*
*3 Îlaĥîo, dibûm êqsîrê te, ez bûm xulame.*

**S. 6** *1 Ji qudretê kirbû t'emame,*
*2 Çî beĥreke bi ẍemame,*
*3 Ben[dê] êqsîrê te, ez bûm xulame.*

**S. 7** *1 Ji qudreta temam e,*
*2 Dinya bahrê xumane ,*
*3 Bin de miskîn dibim bi xulame.*

**S. 7** *1 Qudretê bûme ťevave,*
*2 Beĥra tarî[1645] ximame,*
*3 Bendê hêsîr ez xulame.*

**S. 8** *1 Fikirîm li fikarê,*
*2 Mersûm li firwarê,*
*3 Îlaĥîo, te em xilas kirîn ji beĥrê.*

**S. 7** *1 Fikirîm li wê fikarê,*
*2 Li mersûmê, li firwarê,*
*3 Min zor fariqe[1646] kirbûn ji wê beĥrê.*

**S. 8** *1 Ez fikirî bûm ji fikarê,*
*2 Mersimê ji ferwarê,*
*3 Firîqet kirim ji bahrê.*

**S. 8** *1 Îlaĥîo, te sit'irandim sit'arê,*
*2 Mersûm[1647] heye boy ferwarê,*
*3 Îlaĥîo, te ez xilas kirîm ji beĥrê.*

**S. 9** *1 Îlaĥîo, te em fariqe dikirin ji makê,*
*2 Ji r̂onehîyê tême zikakê,*
*3 Wezine têm li ser Şibakê,*
*4 Havêtim berberê make.*

**S. 8** *1 Min zor fariqe kirbûn ji makê,*
*2 Ù ezna didam Şibakê,*
*3 Bi r̂û da çome zikakê,*
*4 Ez daname ber bedenê make.*

**S. 9** *1 Firîqet kirim ji makê,*
*2 Bi dev û rû çumê zikakê*
*3 Avêtme ber bedena makê.*

**S. 9** *1 Îlaĥîo, te ez xilas kirîm ji makê,*
*2 Wesirandim ber beĥrê şivakê,*
*3 Devar̂îye çûme zivakê.*

**S. 10** *1 Îlaĥîo, te ez xilas kirîm wê beĥrê,*
*2 Mersûm heye boy ferwarê,*
*3 Îlaĥîo, te ez xilas kirim vê care.*

**S. 10** *1 Li min cema' dibûn xizim û cînare,*
*2 Bab minetk'are ji mîre,*
*3 Li şayê xulam û feqîra.*

**S. 9** *1 Li min cema' dibûn xizim, û lêzim, û cînara,*
*2 Babî minetk'are[1648] ji mêrê mîra,*

---

[1645] *te'rî*
[1646] *ferîq*
[1647] *weslûf*
[1648] *minêkar*

*3 Bi şayiya dîwanêd feqîra.*

**S. 10** *1 Li min cema dibûn xizm û lêzim û cînar,*
*2 Bav minetkar im ji mêrê Mîra,*
*3 Şayî dî bûm xulamê feqîra.*

**S. 11** *1 Li şayê dê û babe,*
*2 Bila qewal bistirên def û şibaba,*
*3 Îlaĥîo, te em xinê kirîn bi van tiwafe.*

**S. 10** *1 Bi şayiya dayî û baba,*
*2 Qewal wê distirên def û şibaba,*
*3 Îlaĥîo*[1649] *te em xinê kirîn û ava.*

**S. 11** *1 Şayî dî bûm dê û bavê,*
*2 Qewal distirên bi def û şebabê,*
*3 Îlahîyo serê min tewafa.*

**S. 12** *1 Bi van tiwafa te em xinî kirin,*
*2 Berî r̂oja em bimirin,*
*3 Bi weledekî nêr em şa kirin.*

**S. 11** *1 Îlaĥîo te em xinê*[1650] *kirîn,*
*2 Berî r̂oja em bimrîn,*
*3 Te bi weledekî nêr em şahî kirîn.*

**S. 12** *1 Tewaf me xine dikirin,*
*2 Berî rojeke ez bimirim,*
*3 Ji weledekî nêr em şah dikirim.*

**S. 13** *1 Çî weledekî miskîne,*
*2 Danabû nav t'abûteke darîne,*
*3 Hind wê digrîn, hind wê dihizîne,*
*4 Ew walede navê şêx Adî û melik şêx Sin li ser bi Ĥeq tîne.*

**S. 12** *1 Çî weledekî miskîne,*
*2 Danane li nav t'abûteke darîne,*
*3 Bi şevê û r̂ojê hijîne û girîne.*

**S. 13** *1 Çi weledekî miskîne,*
*2 Avêtme nav tabûteke darîne,*
*3 Şev û rojê di hejîne,*
*4 Hewlê weledî nîn e,*
*5 Hemû tirsa Îlahî ne.*

**S. 14** *1 P'adşê min p'ir̂ k'eremete,*
*2 Şefeqeta*[1651] *xwe li me dikete,*
*3 Îlaĥîo, te ez r̂akirim ser qedema.*

**S. 13** *1 Îlaĥîo p'ir̂ k'ereme,*
*2 Şefeqeta*[1652] *te hebit li bin Ademe,*
*3 Te em r̂akirîne ser qedema.*

**S. 14** *1 Îlahîyê minê pir kereme,*
*2 Şefqeta xwe da dinya Âdeme,*
*3 Te em rakirîne ser qedema.*

**S. 15** *1 Ser qedemê xwe diger̂iyam,*
*2 R̂uĥ hate dest û p'êyam,*
*3 Îlaĥîo, bi te difir̂îyam.*

**S. 14** *1 Li ser qedema diger̂iyam,*

---

[1649] *Ilehiyo*
[1650] *çine*
[1651] *şifqet*
[1652] *şefqet*

*2 R̂ûh hate dest û p'êyam,*
*3 Îlaĥîo, bi te firiyam.*

**S. 15** *1 Ser qedeme xwe digeriyam,*
*2 Rih hate dest û pêyam,*
*3 Îlahîyo bi te firîyam.*

**S. 16** *1 Li ser qedemê xwe dibezim,*
*2 Eşqê mîrê xwe bi lezim,*
*3 Pisporê babê xwe ezim.*

**S. 15** *1 Li ser qedema dibezim,*
*2 Li sur̂a mîrê xwe bi lezim,*
*3 Pisporê babê xwe ezim.*

**S. 16** *1 Ser qedeme xwe dibezim,*
*2 Sirra Mîrê xo bilezim,*
*3 Pisporê babê xwe ezim.*

**S. 11** *1 Îlaĥîo, te ez r̂akirme ser qedema,*
*2 Ser qedemê dibezim,*
*3 Eşqa mîrê xweyî lezim,*
*4 Bavê t'irê pispor ezim.*

**S. 17** *1 Çî lawekî sermeste,*
*2 Aşiqê mîrê xwe heweste,*
*3 Babê malîyek jê r̂a dixweste.*

**S. 16** *1 Çî lawekî sermeste,*
*2 Bi sur̂a mîrê xwe ve diweste,*
*3 Bab maliyek jêra dixweste.*

**S. 17** *1 Çî lawekî sermeste,*
*2 Sirra Mîrê xweya xeweste,*
*3 Bavê maliyek jê re xweste.*

**S. 18** *1 Ew maliya bi r̂ay û t'ekbîr,*
*2 Lê dihêwirî coqetê feqîr,*
*3 Vê r̂a heye nîşana mîr.*

**S. 17** *1 Çî maleka bi r̂ay û t'ekbîr,*
*2 Lê diêwirîn coqetêd feqîr,*
*3 Vê r̂a hebû nîşana mîr.*

**S. 18** *1 Mala bi ra û tekbîr,*
*2 Lê di êwirîn çovqetê feqîr,*
*3 Walê hebûn nedera Mîr.*

**S. 12** *1 Îlaĥîo, te ez kirime malxê mala,*
*2 Mala r̂a û t'ivdîr,*
*3 Lê hewirîne coqet û feqîr,*
*4 Vê r̂a hevin nîşanê mîr.*

**S. 13** *1 Me şa*[1653] *bûne cînara,*
*2 Şaya xulamê feqîra,*
*3 Qewalê şêx Adî dik'utin defan û şiveva.*

**S. 19** *1 Nîşana mîr hebû vê r̂a,*
*2 Îlaĥîo, be'dî van ĥala,*
*3 Em kirîn malxweyê*[1654] *mala.*

**S. 18** *1 Vê r̂a hebû nîşana mîr Înşallaĥ,*
*2 Be'dî wan hewlan,*
*3 Îlaĥîo te em kirin malxweyêd mala.*

**S. 19** *1 Nedera mîr hebin inşallah,*
*2 Badî wan hewalan,*

[1653] *ca*
[1654] *malxoyê*

*3 Îlahîyo te me malxweyê mala.*

**S. 20** *1 Nema bi vê yekê em bi sebirîn,*
*2 Zoȓ û mal li me kitirîn,*
*3 Besî meye, emê bidin, bixon, ĥeta ȓoja em bihurîn.*

**S. 19** *1 Îlaĥîo, nema bisebrîn,*
*2 Te bi zêȓ û mal kirîm,*
*3 Bese bixoyin, bideyn, ĥeta ȓoja em bimrîn.*

**S. 20** *1 Nema bi sebir im,*
*2 Bi zêr û malî bi kitirim,*
*3 Demekê bidim yekê bixum, ĥeta ȓoja em bimrîn.*

**S. 20** *1 Mekke em derwêş,*
*2 R̂îya Ĥeq bikeyn t'eftêş,*
*3 Li ber navû dik'rêd te bibîn hawîş.*

**S. 21** *1 Sibekê ji tarî babe,*
*2 Kirim nêv eskerekî zorî zave,*
*3 Îlaĥîo, te em xilaskirin ji van tava.*

**S. 21** *1 Sibakê ji tarî bagêr,*
*2 Avêtme nawîskê re Râbe,*
*3 Îlahîyo te em te laç kirin vêda be.*

**S. 14** *1 Sibekê*[1655] *ȓabûm tarî bava,*
*2 K'etime nava leşkerî*[1656] *û ȓava,*
*3 Nemam xilazvim gava.*

**S. 22** *1 Îlaĥîo, te em t'alankirin carek,*
*2 R̂asta me ne ma, çu dîndarek,*
*3 Ne ma, me bipirse biran û yarek.*

**S. 21** *1 T'alankirin bi carek,*
*2 Ne ȓastemal ma, ne dîndarek,*
*3 Ne li me dipirsit ne birayk, ne yarek.*

**S. 22** *1 Talan dibim bi carek,*
*2 Rast e nema dîndarek,*
*3 Nema bi pirse bira û yarek.*

**S. 15** *1 Nemam xilazvim gavek,*
*2 Ne ȓastemal ma, ne dînarek,*
*3 Me va nehatin bira-yarek.*

**S. 23** *1 Wekî teyrê dewletê li ser me fiȓî,*
*2 Li me hêsay dikir ĉirayê guȓî,*
*3 Nasînî li ser me biȓî.*

**S. 22** *1 Teyrê dewletê firî,*
*2 Te li me hesakir çirê bi girî,*
*3 Suxûmeta te yarû birêd axretê nasîn ji me biȓî.*

**S. 23** *1 Teyrê dewletê di firî,*
*2 Hêsayê kir çira diqûrî,*
*3 Sixûmet dibûyî yar û bira nasîn li ser me dibirî.*

**S. 16** *1 Meva nehatin yar-birê axretê,*
*2 Yar-birê axretê nasî me biȓîn,*
*3 Yeqîn teyrê dewletê fiȓîn,*
*4 Me wêsandin ĉirê guȓîn.*

**S. 24** *1 Sebaret te nefsê, yarû birayêt axretê li ser me biȓî nasî,*
*2 Em sotîn li bin vî kirasî,*
*3 Hem bi zebûnî, hem bi p'êxwasî.*

**S. 23** *1 Suxûmeta te yarû birêd axretê ji me biȓî nasî,*

---

[1655] *sive*
[1656] *lêşker*

*2 Sotin li bin vî kirasî,*
*3 Hind bi zebûnî, hind bi pêxwasî.*

**S. 24** *1 Ser me dibirî nasî,*
*2 Sotin li bî vî kirasî,*
*3 Hind zebûnî hind ji bi pêxwasî.*

**S. 17** *1 Yar-birê axretê me biȓîye nasîye,*
*2 Îlaĥîo te ez sotim ber wî li vasîye,*
*3 P'a zebûne du p'a p'êxasîye.*

**S. 25** *1 Îlaĥîo, teme bendekî*[1657] *zebûn,*
*2 Îlaĥîo, te da min ji e'rdekî ne bû,*
*3 Îlaĥîo, xêr û şeȓê me ji ba te dibû.*

**S. 24** *1 Bendekî teme yî zebûn,*
*2 Te ez dam ji e'rdekî ne bûn,*
*3 Xêr û şeȓ li bin destê te bûn.*

**S. 25** *1 Îlahîyo bendê temê zebûn,*
*2 Te dam erdekî nebûn,*
*3 Xêr û şerê destê te bûn.*

**S. 18** *1 Zebûne te me, zebûn,*
*2 Te ez e'firandim ne bûn,*
*3 Yeqîn*[1658] *xêr–gunê me destê te bûn.*

**S. 26** *1 Ji ba te tên xêr û şeȓe,*
*2 Ĥimeta te hebit bi me ȓa,*
*3 Îlaĥîo, de'wedarim bi navê t eȓa.*

**S. 25** *1 Bi te didem xêr û şeȓa,*
*2 Hîmeta te hebit bi mi ȓa,*
*3 De'wedarim bi navê te ȓa.*

**S. 26** *1 Heger xêr heger şerre,*
*2 Hîmeta hebit min re,*
*3 Em dewrêş in navê te re.*

**S. 19** *1 Destê te digrim xêran û gune,*
*2 Ĥemetîya te heve ji me ȓa,*
*3 Şermezar*[1659] *nevim ji P'adşayê xwe ȓa.*

**S. 27** *1 Min go: «Ezim derwêş,*
*2 Dua'yê*[1660] *suȓê dikim t'eftêş,*
*3 Bi nav dik'irêt te bûne hewêş.*

**S. 27** *1 Min got: «Qey em dewrêş,*
*2 Sirra heqîye dikin teftêş,*
*3 Bernavê te bi hawêş.*

**S. 28** *1 Îlaĥîo, li ba te navû dik'irim,*
*2 Saf*[1661] *û ĥeybetêd te difikirim,*
*3 We'de hatîye dê ȓojekê mirim.*

**S. 26** *1 Navê teyî dik'irîn,*
*2 Saf û ĥeybetêd te difikirîn,*
*3 We`de hatîye ȓojekê em dê mirîn.*

**S. 28** *1 Ber navê te dikim,*
*2 Û bi hêbeta te difikirim,*
*3 Wade hatiye ezê bimirim.*

**S. 29** *1 Ȓojekê ne haş bûm,*

---

[1657] *mendekî*
[1658] *yêqîn*
[1659] *şemezer*
[1660] *duê*
[1661] *sav*

*2 K'etime nivînê, nexweş[1662] bûm.*
*3 Girtîyê Melik il-E'rş bûm.*

**S. 27** *1 R̂ojekî ez ne hiş bûm,*
*2 Bendeyê Melikê E'rş bûm,*
*3 K'etime nav nivînê û nexweş bûm.*

**S. 29** *1 Rojekê nehiş bûm,*
*2 Ketime nivînê nexweş bûm,*
*3 Banga melekê erş bû.*

**S. 20** *1 Îlaĥîo, ezî ku hindeşim,*
*2 Bendê Melikê[1663] E'rşim,*
*a. Sibekê r̂abûm, bê ĥişim,*
*b. K'etime nava nivînê, nexweşim.*

**S. 30** *1 Nexweş[1664] bûm, k'etime nivînê,*
*2 Li min cema' dibûn lêzmê xwînê[1665],*
*3 Bi zêr̂ û mal nayême k'irînê.*

**S. 28** *1 Nexweş bûm, k'etime nav nivîne,*
*2 Hatine ser min lêzmêt xwînê,*
*3 Bi zêr̂ û mal nayême k'irîne.*

**S. 30** *1 Nexweş bûm, k'etime nav nivîne,*
*2 Li min cema hatibû xizm û lêzime xwînê,*
*3 Zêr û malî nayê me kirînê.*

**S. 21** *1 Nexweşim, k'etime nivînê,*
*2 Têne ser min lêzimê xwînê,*
*3 Mal û zêr̂ naême kir̂înê.*

**S. 31** *1 Ne bi zêr̂e, ne bi male,*
*2 Babî pîrî kale,*
*3 Ji weleda, ev welede bi t'inê li bale.*

**S. 29** *1 Ne ye bi zêr̂e, ne bi male,*
*2 Babî pîremêrî kale,*
*3 Gotê: «E'zîzê min, ji ĥeft weleda, ev weledê min wê heye li bale».*

**S. 31** *1 Ne bi zêrê ne bi mal e dînê,*
*2 Bavê pîre mêrî kal e,*
*3 Weleda weledî bal e*

**S. 22** *1 Ne mi zêr̂e, ne mi male,*
*2 Bav derwêşekî delîlî kale,*
*3 Ewledakî[1666] ewî bale.*

**S. 32** *1 Ne bi zêr̂, ne bi malê dinyayê,*
*2 Babê pîrî kalî, xinê,*
*3 Ji weleda, ev welede bi t'inê.*

**S. 30** *1 Ne bi zêr̂e, ne bi malê dinê,*
*2 Babî pîremêreyî, kaley, finê,*
*3 Gotê: «E'zîzê min, ji ĥeft weleda, ev weledê min wê heye bi t'inê».*

**S. 32** *1 Ne bi zêrê ne bi mal e dîne,*
*2 Bavê pîremêrî kal e,*
*3 Weledê weledî bi tenê.*

**S. 33** *1 Babê go: «Ez çî bi k'ar kim,*
*2 Deh peza ez bi qurban kim,*
*3 Serê xwe şikran kim,*
*4 Banga banîye nebîy Simaîl bang kim».*

---

[1662] *nexoş*
[1663] *melek*
[1664] *nexweş*
[1665] *xûn*
[1666] *ewledanî*

**S. 31** *1 Bab dibêjit: «Ez çî bikem çî ĉar kem,*
*2 Deh peza bi qurban kem,*
*3 Serê xwe bi şikran kem,*
*4 Banga mine nebîy Simaîl*[1667] *ku ban kem».*

**S. 33** *1 « Ezê çi bikim çi bi çarkim,*
*2 Deh peza qurban kim,*
*3 Serê xwe bi şikran kim,*
*4 Banga Xwedê Emîn Cebraîi bang kim ».*

**S. 34** *1 Banga nebîy Simaîle,*
*2 Babê pîrî, kalî, sefîle,*
*3 Tirsa wî ji saf û ĥeybetê Ezraîle.*

**S. 32** *1 Banga min nebîy Simaîle,*
*2 Babî pîremêrî kale yî, sefîle,*
*3 Go: «Tirsa min saf û ĥeybetêd Ezraîle*[1668]*.*

**S. 32** *1 Banga min nebîy Simaîle,*
*2 Babî pîremêrî kale yî, sefîle,*
*3 Go: «Tirsa min saf û ĥeybetêd Ezraîle*

**S. 23** *1 Banga mine ber Ezraîle,*
*2 Bav derwêşekî kalî delîle,*
*3 Ewledakî ewî bîre.*

**S. 24** *1 Çi bikim, çi bi ĉar kim,*
*2 Deh peza qurban kim,*
*3 Serê xwe şikran kim,*
*4 Banga Ezrahîl, Cebraîl*[1669] *da ban kim».*

**S. 35** *1 Ezraîl melikê mîre,*
*2 Delq*[1670] *û t'ancê feqîre,*
*3 Em di r̂azîne wekî wan êqsîre.*

**S. 34** *1 Ezraîl Melikê mêra,*
*2 Yî delq û t'ancêd feqîra,*
*3 Go: «Îlehîo, te em r̂azandin wekî êqsîra».*

**S. 35** *1 Ezraîlo melekê mîra,*
*2 Serê bi dur û tacê feqîra,*
*3 Ew razîn dibe êxsîra.*

**S. 25** *1 Cebraîlo*[1671]*, melekê mîra,*
*2 E'zezet, celaletê feqîra,*
*3 Tê berdî girtîya, azakî hêsîra.*

**S. 36** *1 Ezraîlê melekê mewtê,*
*2 Li ĥemû dema, li ĥemû wexta ew tê,*
*3 We'de hatîye ji qalbî dê birim sewtê.*

**S. 33** *1 Ezraîl melikê mewtê,*
*2 Li ĥemû dera li ĥemû e'rda ew tê,*
*3 Go: «Ez hatîme zor bibirim ji hew tê».*

**S. 36** *1 Ezraîlo melekê mewtê,*
*2 Zora dibe sewtê,*
*3 Li hemû cîyan hemû cîyan ew tê.*

**S. 28** *1 Cebraîlo, melekê mewtê,*
*2 Haware şeherê giran dengê te tê,*
*3 Çewa zorê dibir̂î sewtê?*

---

[1667] *Simayil*
[1668] *Izrayîl*
[1669] *Cibrahîl*
[1670] *dilq*
[1671] *Cebrahîl*

**S. 37** *1 Ezraîlê p'eȓ kuȓim[1672],*
*2 Hawîȓê şara difiȓim,*
*3 Ne hatîme nobê li kesî bigrim,*
*4 Ez hatîme ȓuĥê ji qalbî bibrim.*

**S. 35** *1 Ezraîl p'eȓî bi kirim,*
*2 Hawirî şara difirim,*
*3 Ez nehatîme nobê li kesî bigrim,*
*4 Ez hatîme bab û pisa jêk bibirim.*

**S. 37** *1 Ezraîlo per kurim,*
*2 Hawirê şara difirim,*
*3 Nehatime nobê li kesî bigirim,*
*4 Hatime destê bav û ser ji mire kurim.*

**S. 26** *1 Ezim Cebraîlê p'eȓ kuȓim,*
*2 Herçar qulbe[1673] ez difirim,*
*3 Ez ne hatîme novê kesî biguhêȓim,*
*4 Ez hatîme bab û pisa jew dabiȓim.*

**S. 38** *1 Ezraîlê p'eȓ k'eskim,*
*2 Hawîrê şara dip'arastim[1674],*
*3 Ne hatîme nobê li kes kim,*
*4 Ez hatîme ȓuĥê ji qalbî nefeskim.*

**S. 36** *1 Ezraîl perî bi k'eskim,*
*2 Hawirî şara diçiriskim,*
*3 Ez nehatîme nobê li kes kim,*
*4 Ez hatîme vî qalbî ji nefs kim.*

**S. 38** *1 Ezraîlê per kesk im,*
*2 Hawirê şara dibir hesk im,*
*3 Nehatime firadê ji kesî kim,*
*4 Hatime vî qalibî ji nefes kim.*

**S. 27** *1 Ezim Cebraîlê p'eȓ keskim,*
*2 Herçar qulbe ez qevz dikim,*
*3 Ez ne hatîme novê qest kim,*
*4 Ez hatîme ȓuĥa nefes kim.*

**S. 39** *1 Ya me ji vê yek bû,*
*2 Ȓuĥ ji dest û p'êya cihê bû,*
*3 Ȓuĥ ĉaveȓênîye suȓê bû.*

**S. 37** *1 Ya me ji wê bû,*
*2 Rûh ji dest û p'êya nijê bû,*
*3 Ya me ji wê bû.*

**S. 39** *1 Ya me ji wê bû,*
*2 Rûh ji dest û p'êya nijê bû,*
*3 Ya me ji wê bû.*

**S. 29** *1 Şuxul ku ji wê bû,*
*2 Peşka sinetê[1675] pê bû,*
*3 Qalb ĉavnêȓîya[1676] suȓê bû.*

**S. 30** *1 Suȓa sembîlê,*
*2 Ȓuĥ behs[1677] kir, çû qendîlê.*

**S. 40** *1 Ȓuĥê li gel suȓê behs kir,*
*2 Berê xwe li qendîlê hevȓast kir,*
*3 Xwedanê xwe li wêder nas kir.*

---

[1672] *kiȓim*
[1673] binêr: *qible*
[1674] *diperistim*
[1675] *sunet*
[1676] *ĉe'v*
[1677] *be's*

**S. 38** *1 Suȓê li gel ȓûhê behs kir,*
*2 Xwe nerm ji dest û pêya xilas kir,*
*3 Ewê der sae't xwedanê xwe li wêder nas kir.*

**S. 40** *1 Rihê sirrê hev nas kir,*
*2 Qendîlê hevî raz kir,*
*3 Derdê Xwedayê xelaskir.*

**S. 31** *1 Ȓuĥ ji qendîlê behs kir,*
*2 Xweyekî xwe wê nas kir,*
*3 Gîyanê xwe xirava fênî xilas kir.*

**S. 41** *1 E'rdê mabû qetîl û qalb,*
*2 Hate ser min destê zorî zavî ẍalib,*
*3 Ji wê k'asê vexwarî nebîy Adem.*

**S. 41** *1 Rih çu mal qendîl û kale,*
*2 Hate ser min destekî kotekî zor î qalind,*
*3 Wê kasê vexwar dinya âlem.*

**S. 32** *1 Ȓuĥu çû, ma qedîbî qelb,*
*2 Hêwrîye ser me destekî talib,*
*3 Eva k'asa vexarîye nevî Meĥemedê bin E'wdile,*
*E'lîê bin E'bû Talib.*

**S. 42** *1 Li min k'om bûn jin û mêre,*
*2 Wê digrîn diken şêran[1678] şêre,*
*3 Ew k'asa ji enzel da, k'asa ji dêre.*

**S. 39** *1 Li min digrîn jin û mêre,*
*2 Hiznek biken şêran şêre,*
*3 Eve bû k'asa enzel[1679] jê ȓa.*

**S. 42** *1 Civandin jîn û mêre,*
*2 Şînek danî şêre,*
*3 Kasa Enzel kasa teyre.*

**S. 33** *1 K'asa enzelî dêre,*
*2 Vexarîye jina yî û mêre,*
*3 Şînekî ser min dikin çewa şêrin.*

**S. 34** *1 Gelî yar-bira, vê yekê bifikirin,*
*2 Binê ez çewa bûme, ezê çewa bimirim.*

**S. 43** *1 Tazî kirim û hiştim,*
*2 Ser pûşekî dana bûm,*
*3 Bi ava germ dişuştim.*

**S. 40** *1 Ez tazî kirim û hiştim,*
*2 Ser pûşekî danam û şûştim,*
*3 Ez bi ava germ biriştim.*

**S. 45** *1 Tazî dikirim di hiştim,*
*2 Danin ser pûşekî şûştim,*
*3 Laşem avekê germ dibiriştim.*

**S. 35** *1 Tazî[1680] kirim wê dihiştim,*
*2 Dame ser pûşîn dişuştim,*
*3 Ava germ bû pê diviniştim.*

**S. 44** *1 K'efenê min dipîve,*
*2 Qerqere du[1681] gaz û nîve,*
*3 Miskîno, benî Ademo, li te dipîve.*

**S. 41** *1 Kivinê min dipîve,*

---

[1678] *şêran*
[1679] *e'zal*
[1680] *te'zî*
[1681] *dû*

*2 Qerqere du bihust*[1682] *û nîve,*
*3 Miskîno bin Ademo, hilû bipîve.*
**S. 43** *1 Kefenê min dipîve,*
*2 Qerqerê min gaz dû nîv e,*
*3 Benî Ademû ew dinya hêv e.*

**S. 45** *1 K'efenê min hîjdeh*[1683] *gaze,*
*2 Danabû ser cinaze,*
*3 Wê li ser min digrîn wêlî û biraze.*
**S. 42** *1 Kivinê min hîjdeh gaze,*
*2 Danabû ser cinaze,*
*3 Dê li min digrîn wêlî û biraze.*
**S. 44** *1 Kefenê min hijdeh gaz ê,*
*2 Danin li ser cenazê,*
*3 Laşem avekê germ dibiriştim.*
**S. 36** *1 K'efenê min pîvane,*
*2 Qerqere min biȓîne du gaz û nîvane,*
*3 K'efenê min biȓîne donzdeh gazane,*
*4 Danime nava ciniyazane,*
*5 Ser min digrîn wêlî û birazîyane.*

**S. 37** *1 Ezim mîna guleke p'işk,*
*2 Dame ser çardarê ĥişk,*
*3 Birime miskenê maran*[1684] *û mişk.*

**S. 46** *1 K'erem kin, du dara bînin,*
*2 Werise lê werînin,*
*3 Cinyazê*[1685] *min di navda bişidînin.*
**S. 43** *1 K'erem ken du dara bînin,*
*2 Werisekî tê werînin,*
*3 Cinazê min ser deynin.*
**S. 46** *1 Kerem bikin deng hilînin,*
*2 Jar û pêştir dara bînin,*
*3 Cinazê min av ne deynin.*
**S. 38** *1 Dame ser çardara,*
*2 Hildame sisîyan û çara,*
*3 Birime miskanê mişkan û mara.*

**S. 47** *1 Dara serê min sikirî gira,*
*2 Hilgirtbû yarû bira,*
*3 Min ji mala mezin xwastbû xatira.*
**S. 44** *1 Ew bû dara leylûn sedire,*
*2 Hilgirtibû yarû bira,*
*3 Min ji mala mezin xwest xatire.*
**S. 47** *1 Dara leylûn sedira,*
*2 Me li wir girt yar û bira,*
*3 Ez ji mala mezin bixwazin xatira.*

**S. 48** *1 Derk'etim ji mala mezim,*
*2 Piĉûk û mezin li pê min dibezin,*
*3 Zînyare*[1686]*, li xilmetê mezin bi lezin.*
**S. 45** *1 Kirime der ji mala mezim,*
*2 Kiçik û mezin li pê min dibezin,*

---

[1682] *bust*
[1683] *hijde*
[1684] *me'r*
[1685] *cenaz*
[1686] *zînhar*

*3 Zênara li xilmeta ẍerîba çî bi lezin.*

**S. 48** *1 Feriqet kirim ji mala mezin,*
*2 Piçûk û mezin li pey min dibezin,*
*3 Birano bi xizmeta xerîba bi lezîn.*

**S. 39** *1 Birime der mala mezin,*
*2 Çûk û mezin pey min dibezin,*
*3 Ĥemûşke xizmeta mine lezin.*

**S. 49** *1 Birime aliyê goȓistanê,*
*2 Cinazê min li ser axa vê t'irbê danî,*
*3 Wê digrîn bo ĥisna vî canî,*
*4 Dema ji vê dinê dibit fanî.*

**S. 46** *1 Birime aliyê goristanî,*
*2 Li ser axa tirbê danî,*
*3 Hind wê digrîn bo vî ciwanî,*
*4 Axir ji rû wê dinê dibû fanî.*

**S. 49** *1 Birime alê goristanî,*
*2 Li ser axa tirbê danî,*
*3 Digirîn ser vî canî,*
*4 Ew can ji vê dinyayê bû fanî.*

**S. 50** *1 Bo min dik'olin t'irbe,*
*2 Bi Şerqe ĥeta bi Ẍerbe,*
*3 Kes nemabû, venexwarbû ev şerbe.*

**S. 47** *1 Dema dik'olin t'irbe,*
*2 Ji Şeriq ĥeta bi Ẍerbe,*
*3 Kes nema venexwaribû ji ew şerbe.*

**S. 50** *1 Dema di kolin tirbê,*
*2 Serê ji şerqê bi xerbe,*
*3 Kes nema venexwari bû ew şerbe.*

**S. 51** *1 T'irba min hildikene,*
*2 Hin wê digrîn, hin wê dik'ene,*
*3 Ĥemû qebûl bû xilmeta mine.*

**S. 51** *1 Tirba min dikê ne,*
*2 Hin digirîn û hin dikê ne,*
*3 Qebûl be ew hizmeta me ne.*

**S. 40** *1 T'irba min hildikene,*
*2 Hinek digrîn, hinek dik'enin*
*3 Ĥemûşke xizmeta minin.*

**S. 52** *1 T'irba min ťemam kir,*
*2 Û serê min li nav kir,*
*3 Min li mala qedîm silav kir.*

**S. 48** *1 T'irba min t'emam kir,*
*2 Serê min dinav kir,*
*3 Min li mala qedîm silav kir.*

**S. 52** *1 Tirba min temam kin,*
*2 Serê min dinav kin,*
*3 Mala qedîm silav kin.*

**S. 53** *1 Silavêd min li mala qedîme,*
*2 P'adşê min Êkî K'erîme,*
*3 Birime nav xelqekî zavî ĥelîme.*

**S. 49** *1 Silavêd min li mala qedîm,*
*2 Birime nav xelqekî zorî zavî hezîm,*
*3 Min go: «Îlaĥîo, tuy[î] Melikê K'erîm».*

**S. 53** *1 Silavê min mala qedîm,*

*2 Birime xelqekî zafî zorî ezîm,*
*3 Banga mine melekê kerîm.*

**S. 41** *1 T'irba min t'evav kir,*
*2 Mala qedîm silav kir.*
*3 «Silava te mala qedîm,*
*4 Sibĥane*[1687] *te melekê K'erîm,*
*5 Sibĥane te melekê E'rş,*
*6 Ser me r̂anîyane ferş,*
*7 Her ferşekî weke xerş».*

**S. 54** *1 Birê min r̂astîyê sere min bêr̂astî,*
*2 Berî min bi qublet ve dinistî.*

**S. 55** *1 Min divê birakî bi rastî,*
*2 Tirba min qulbet nivastî.*

**S. 55** *1 Birê min t'aqete,*
*2 Yê girêka sere min vedkete,*
*3 P'ir̂anî, min r̂a fehm dikete.*

**S. 54** *1 Min divê birakî bi taqet e,*
*2 Girêya serê min bêdîqet e,*
*3 Biratiya xwe li min fîhilbû ket e.*

**S. 56** *1 Banga min Melik il-E'rşe,*
*2 Ser singê min k'işandbû ferşe,*
*3 Her ferşekî weke xerşe.*

**S. 50** *1 Ilaĥîo, Melik il-E'rşe,*
*2 Ser singê min r̂adixên ferşe,*
*3 Her ferşek weke xerşe.*

**S. 56** *1 Banga min melekê erş e,*
*2 Kişandin ser singê min ferş e,*
*3 Her ferşekê wekê xerş e,*

**S. 57** *1 Bi herîyê hunandbû derze,*
*2 Axê diînine ser min bi leze,*
*3 Du kêl danîbûn, gotin: «Benî Ademo, eve bo te merze».*

**S. 51** *1 Heriyî datînin li derze,*
*2 Axê diînine ser min bi leze,*
*3 Du kêla danên, go: «Eve ferze».*

**S. 56** *4 Herî li danîn derz e,*
*5 Ax kişandine ser singê min bi lez e,*
*6 Kêla serî danîn ferz e.*

**S. 42** *1 Du kêla datînin, evaye mezel,*
*2 Ĥer̂îyê davêjin ser derza,*
*3 Xalîyê davêjin ser min, çewa lezin.*

**S. 58** *1 Kêla sere min sikirî,*
*2 Xelqê xanî, nazikî, let'îf li xwe hedirî,*
*3 Cayîze li x̂erîba biken qedirî.*

**S. 53** *1 Ew bû kêla serê şedirî,*
*2 Wê li xelqê nazikî, let'îfî, hedirî,*
*3 Cayîze li x̂erîba bigrî qedrî.*

**S. 57** *1 Kêla serê sitirî,*
*2 Xelqê kirî û hatin êwirî,*
*3 Cahiz e xelq qedrê xerîba bigirî.*

**S. 43** *1 Kêla serê sedire,*

[1687] *sivĥan*

*2 Xelqê alî xêr hat, lê hedirî,*
*3 Xerîba r̂akirin qedirî.*

**S. 44** *1 Birak dive t'aqete,*
*2 Girêya serê min vedikete,*
*3 Belkî Neke û Mekîne*[1688] *ser min netê*

**S. 59** *1 K'eremken, deng hilînin,*
*2 T'erqîn û Yasînê li ser min bixwinin*[1689]*,*
*3 Navê şêx Adî û melik şêx Sin li ser min bînin.*

**S. 52** *1 Keremken û deng hilînin,*
*2 T'erqînê û Yasîna li ser min bixwînin,*
*3 Navê Xwedê û Tawisî melek' li ser min bînin.*

**S. 45** *1 Banga mine ber birê axretê,*
*2 Bira mi r̂a nek'eve e'ynatê*[1690]*,*
*3 Belkî Neke û Mekîne ser min netê.*

**S. 47** *1 Sam û hebetê çi têne girêtê,*
*2 Çomexê destê wî agir û pête,*
*3 Dirêjî saltî mezin,*
*4 R̂eşî weke soxin,*
*5 Çomexê wî ĥeftê*[1691] *min.*

**S. 48** *1 Ditirsim daweşîne min wî ĥevsinde mûsî,*
*2 Ber diçe birq-birûsî,*
*3 Dil-hinavê min virda dûsî.*

**S. 60** *1 Birime xanîyê bê derî,*
*2 Du hatine ser min wekî t'et'erî,*
*3 Her yek qase dolabeke aşî wa li serî.*

**S. 58** *1 Birime xanîyê bê derî,*
*2 Du hatine ser min wekî t'et'erî,*
*3 Her yek qase dolabeke aşî wa li serî.*

**S. 54** *1 Kirime xaniyê bê derî,*
*2 Du hatine ser min wê dixwînin*[1692] *wekî t'et'erî,*
*3 Mîna*[1693] *ĥeft dolabêd aşa li serî.*

**S. 49** *1 Te ĉavê mêra dîyê,*
*2 Dolavê aşa mestire serîyê,*
*3 Min dixure t'et'erîye.*

**S. 61** *1 Du hatine ser min diken qîl û qale,*
*2 Êkî ker̂e, yekî lale,*
*3 Wê ji min dipirsin ĥal û ĥewale.*

**S. 55** *1 Du hatine ser min wê dikene qîr û qale,*
*2 Êkî ker̂e, yekî lale,*
*3 Wê ji min dipirsin ĥal û hevale.*

**S. 59** *1 Dido ser hat qîr û qal e,*
*2 Yekî ker e yekî lal e,*

**S. 62** *1 Tirsa min ji yê lale,*

---

[1688] *Niknikîn*
[1689] *bixûnin*
[1690] *i'înet*
[1691] *ĥevt*
[1692] *dixûnin*
[1693] *Mîn îna*

*2 Ĥeftî batman dembûs ĥesin*[1694] *heye li bale,*
*3 R̂ojê sê care dor r̂uĥa min dibin ĥewale.*

**S. 57** *1 Tirsa min ji yê lale,*
*2 Ĥeftî batman dimbûs heye li bale,*
*3 Ewê li ser r̂ûha min bûye ĥewale*[1695].

**S. 59** *3 Tirsa min ji lal e,*
*4 Heftê batman li bal e dermûz hesin,*
*5 Her sibe li ser riha min hawal e.*

**S. 60** *1 Tirsa min ji lal e,*
*2 Heftê batman dermûz hesin li bal e,*
*3 Her roz ser riha hawale.*

**S. 63** *1 Tirsa mine ji yê ker̂e,*
*2 Dembûsê wî ĥeftî p'er̂e,*
*3 Benî Ademo, ji kenara axî*[1696] *Cebraîl, yî korî, ker̂e.*

**S. 56** *1 Tirsa mine ji yê ker̂e,*
*2 Dimbûsê wî ĥeftî p'ere,*
*3 R̂ojê sê cara tête bi dîyarî mer̂e.*

**S. 64** *1 Du hatine ser min, ĉav di mezin, wekî t'eşte,*
*2 T'ilî weke beşta,*
*3 E'zebê gor̂ê ji min dixweste.*

**S. 63** *1 Dû hatine ser min ĉav di mezin weke t'as,*
*2 T'ilî di wane weke misas,*
*3 Nênûk di wane weke das,*
*4 Min go: «Sed xwezma wê r̂ûhê, ye bê guneheye, bê sûc, bê binas».*

**S. 65** *1 Du hatine ser min, ĉav di mezin weke stêr,*
*2 Nînok hene weke k'êr,*
*3 Min go: «Sed xwezîya mine bi wê r̂uĥê be, ehlî xêr,*
*4 Ne sed xwezîya wê r̂uĥê be, ye înk'êr*[1697]*!»*

**S. 64** *1 Dû hatine ser min ĉav di mezin weke stêr,*
*2 T'ilî di wane weke bêr,*
*3 Nênûk di wane weke k'êr,*
*4 Min go: «Sed xwezme r̂ûha ehlî xêr, ne sed xwezme r̂ûha ink'er».*

**S. 63** *1 Hate ser min çavekê stêr,*
*2 Tilî wekî bêr,*
*3 Tilî neynok wekî kêr,*
*4 Sed xwezîya min riha Êzdî ali'l-xêra, xwezîya bi ruhê inkêr.*

**S. 50** *1 Te ĉav mîna ĉavê mêra,*
*2 T'ilî not'lanî bêra,*
*3 Neynûk not'lanî k'êra,*
*4 Wê nave tiştekî navêjin xwedanî*[1698] *xêra.*

**S. 66** *1 Du hatine ser min, ĉav mezin weke qiyas,*
*2 Sed xwezîya mine bi wê r̂uĥê be, biçit bê sûc, bê guneh, binas*[1699].

**S. 62** *1 Hate ser min çav wekî tas,*
*2 Tilî wekî misas,*
*3 Neynok wekî das,*
*4 Xwezîyek wê ruhê ye bê gûnêh bê binas*

**S. 51** *1 Te ĉav not'lanî t'as,*

---

[1694] *asin*
[1695] *heval*
[1696] *axîl*
[1697] *enkêr*
[1698] *xudan*
[1699] *bê nas*

*2 T'ilî not'lanî r̂isas*
*3 Neynûk not'lanî de's,*
*4 We navê xwedanê xêra ĥeq di nas.*

**S. 67** *1 Du hatine ser min, ĉav di mezin weke t'eşte,*
*2 Ĥeftî batman dembûsî ĥesin heye li deste,*
*3 Dihatin li hindava min vedweste.*

**S. 68** *1 Tirsa min ji xwedanê dembûsî,*
*2 Wekî li min hiltêt dembûsî,*
*3 Jê diçin birq û birûsî,*
*4 Ji tirsa ve dil û hinavêt min p'êkve dinûsî.*

**S. 58** *1 Ko li min dihilînit dimbûsî,*
*2 Wê jê diçin birq û birûsî,*
*3 Ji tirsa da dil û hinavêd min p'êkve dinûsî.*

**S. 61** *1 Ser riha min la nî dembûzê,*
*2 Jê diçe birq û birûzî,*
*3 Dil hinavê min dinûzî.*

**S. 59** *1 Gava min diweste,*
*2 Ĥeftî batman dimbûs ĥesin*[1700] *heye li deste,*
*3 Ji tirsa de zimanê min şkeste,*

**S. 69** *1 Du hatin ji min dipirsî:*
*2 Miskîno, benî Ademo, tu çî insî, tu çî cinsî?*
*3 Hun li k'une, herr̂o şer̂ê we hene, me xêrêt we nedîne.*

**S. 60** *1 Du hatine ser min ji min dipirsî,*
*2 Çeqmaqê wan weke k'ursî,*
*3 Miskîno bin Ademo, tu çî i'nsî, tu çî cinsî?*

**S. 65** *1 Hat û ji min dipirsî,*
*2 Benî Ademo çi insî çi cins î?*
*3 Me xêrêk we nedîne,*
*4 Her şerê we dike sekûne.*

**S. 61** *1 Bin Ademo, hûn li k'ûne,*
*2 Her r̂a siba r̂adibin şer̂êd we di nûne,*
*3 Me çu xêrêd we ne dîne.*

**S. 70** *1 Em bi xwe xêrîn,*
*2 Li ber mersuma Cebêrîn,*
*3 Xwedanêt xêra na azêrîn.*

**S. 62** *1 Bin Ademo, em bi xwe xêrîn,*
*2 Em r̂azdarêd Cebêrîn,*
*3 Em xwedanêd xêra na azêrîn.*

**S. 66** *1 Em xwedî bi xo bi xêra,*
*2 Razdarê cebêrîn,*
*3 Xudana xêra na azirîn.*

**S. 71** *1 Du hatine ser min, di r̂eş, se'eda suxin,*
*2 Bilid, se'eda mezin,*
*3 Ji tirsa dil û hinavêt min p'êkve dilerizin!*

**S. 65** *1 Du hitine ser min sehte il-sixûm,*
*2 Di bilindin sehtek mezin,*
*3 Ji tirsa dil û hinavêd min têk dilerzin.*

**S. 72** *1 Du hatine ser min di r̂eşin wekî feqîr,*

[1700] *asin*

*2 Bisk di nermin weke herîr,*
*3 Vê r̂a hebû nîşana mîr.*

**S. 66** *1 Dû hatine ser min di r̂eşin wekî feqîr,*
*2 Bisk di nermin, weke herîr,*
*3 Vê r̂a hebû nîşana mîr.*

**S. 64** *1 Hate ser min reşî wekî feqîr,*
*2 Biskî nerm in wekî herîr,*
*3 Li balê nedera Mîr.*

**S. 52** *1 Te ĉave r̂eşin mînanî feqîr,*
*2 Şê biske r̂eşin mînanî herîr,*
*3 Bandê bibînin*[1701] *dîndara mîr.*

**S. 73** *1 Dihatin û diqedimîn,*
*2 Bi çêrekê dikelimîn,*
*3 Bi ilmekî diilmîn.*

**S. 67** *1 Gava dihatin û diqedimîn,*
*2 Çêrekê dikelimîn,*
*3 Bi ilmekî diilmîn.*

**S. 67** *1 İlmekî di âlimim,*
*2 Di carekê di kelimîn,*

**S. 74** *1 Ewe ilmê me ji atqatê,*
*2 Zebêniya birin ser p'ira Selatê,*
*3 Ciyê şêx Adî û melik şêx Sin lê diken şea'etê.*

**S. 68** *1 Ew bû ilmê qatê,*
*2 Zebêniya ez birime serp'ê p'ir̂a Siratê*[1702]*,*
*3 Ew bû ciyê Xwedê lê diket şefae'tê.*

**S. 67** *3 İlme ji aqatê,*
*4 Zebanîya şandîya pey gunehkarê pira Silatê.*

**S. 75** *1 Ew şefa'eta weye,*
*2 P'ira Selatê alîyek tarîya, duxan û dojeye,*
*3 Haweke birayîyêt axretê li ser bira heye.*

**S. 69** *1 Ew şefae't ye weye,*
*2 P'ir̂a Siratê, aliyek bihuşte, yek tarîye, yek dojeye,*
*3 Haweke yarû birêd axretê, ser gunehkarêd bira heye.*

**S. 68** *1 Pira Silatê we ye,*
*2 Aliyek buhişt e, yek dûman e, yek dojeh,*
*3 Weke birê axiretê li ser gunehkarê bira heye.*

**S. 76** *1 P'ira Selatê ye bi nîşane,*
*2 Alîyek tarîye, û dojehe, û duxane,*
*3 Haweke birayîyêt axretê li ser birane.*

**S. 77** *1 P'ira Selatê ye bi nîşane,*
*2 Alîyek tarîye, û dojehe, û duxane,*
*3 Haweke birayîyêt axretê ser gunehk'arê birane.*

**S. 70** *1 Ew şefa'eta bi nîşane,*
*2 P'ira Siratê alîyek behişte, êk tariye, êk dojehe,*
*3 Haweke yarû birêd axrete ser gunehk'arêd birane.*

**S. 69** *1 Pira Silatê bi nîşan e,*
*2 Aliyek buhişt e yek dûman e ,*
*3 Hawake birê axiretê ser wî gunehkarê bira ne.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî di t'emamin!*

---

[1701] *bivînin*
[1702] *Sirat* — мост, проложенный над адом, ведущий в рай, по которому каждому предстоит пройти в День воскресения. Кроме того, это слово более сорока раз встречается в Коране в значении «прямой путь» /ас-сират аль-мустакым/.

**şaxê 2**[1703]

**S. 1** *1 Berekî diniya ne bû,*
*2 Be'reke te'rî xuman bû,*
*3 Ne Hîv bû, ne R̂oj bû,*
*4 Xalqê xuliqê xa bû.*

**S. 2** *1 Berekî diniya t'ifîqî,*
*2 Sur̂ek jê [lê] şefiqî,*
*3 Sur̂e ji e'nzelî qalibekî dik'emilî.*

**S. 3** *1 Ji sur̂ê hilmijî,*
*2 Dest û p'iya dinimijî,*
*3 Hişiyar be misk'îno, hilatie mijî.*

**S. 4** *1 [Ez] R̂adibûme ser qedemê,*
*2 Ser qedemê dibezim,*
*3 Bavê t'irê pispor ezim.*

**S. 5** *1 [Ayî] Pisporê bavê xa ezim,*
*2 Hatina xa da lezim,*
*3 Borê mirinêyî beze,*
*4 Ber wê bezê nebûm xilase.*

**S. 6** *1 Berekî ez nedimirim,*
*2 Evledekî nêrîn şa dikirim,*
*3 Evledekî misk'îne,*
*4 Kirne colangeke darîne,*
*5 Şev û r̂o dixûne,*
*6 Navê P'adşayê xa heq hiltîne.*

**S. 7** *1 Berî li wan tava,*
*2 Ez bûme malxwê mala,*
*3 Meleke r̂av û t'ivdîre,*
*4 Lê hêwrî cote feqîre.*

**S. 8** *1 Sibekê r̂a bûm, nexaş bûm,*
*2 Nexaş bûm, k'etima livînê,*
*3 Hatine dora min qewm û lêzmê xûnê,*
*4 Ez ber mal û zêr̂ê dinê nehatime k'ir̂înê.*

**S. 9** *1 [Ayî] Çi bikin, çi nediran kin,*
*2 Çend peza qurban kin,*
*3 Sahabiya serê min kin.*

**S. 10** *1 Herê lave dêmdur̂î,*
*2 Serê bir̂î nay k'irîn,*
*3 E'zetê bavê r̂a kirine, bira bidin boyî kur̂î.*

**S. 11** *1 Ber ĉe'vê min yek hat diger̂e,*
*2 Dest da hesinekî te r̂e,*
*3 R̂iĥê min r̂a de'v û şer̂e.*

**S. 12** *1 Ber ĉe'vê min yek hate male,*
*2 Hesinekî ter̂î li bale,*
*3 [Wê] R̂iĥê min r̂a de'v û gale.*

---

[1703] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ SEREMERGÊ* (rr. 78-82) T'ilbîs 2001

**S. 13** *1 R̂iĥê min dik'işîne miskal-miskalê,*
*2 Qalibekî vala dihêle male,*
*3 Ser min bû gazî, hewar û gale-gale.*

**S. 14** *1 Ser min gazî, hewar, gale-gale,*
*2 Her kesek derdê xa dinale,*
*3 Hinek ĥeyîfa xa min tînin,*
*4 Gelek jî k'enê xa ser min tînin.*

**S. 15** *1 Bişînin birê axretê bînin,*
*2 Birakî bînin, birayê r̂astiyê,*
*3 Yê kevrê selîma min guhaste,*
*4 Giriya serê min bîraste.*

**S. 16** *1 [Ayî] Ez danîm ser p'ûşê, dişûştim,*
*2 Ava germe ez bihiştim,*
*3 Kefenê min bir̂în 12 gaz nîve,*
*4 Danîne ser ciniyaze,*
*5 Ser min giriyan xarzî û biriyaze.*

**S. 17** *1 Kefenê min bir̂în 11 gaze,*
*2 Qerqerê min gaz û nîve,*
*3 Beniyademo, çi dinêke te'riye,*
*4 Ne R̂oje, ne Hîve.*

**S. 18** *1 Ez danîme li ser çar dara,*
*2 R̂wandim sisiya û çara,*
*3 Birme misk'anê mişka û me'ra.*

**S. 19** *1 Hate ser min yekî ĉe'vê wî bîna ĉe'vê şêra,*
*2 T'ilî pêĉî bîna bêra,*
*3 Neyînûk bîna k'êra,*
*4 Alê xêra, xudanê xera.*

**S. 20** *1 Hate ser min yekî ĉe'vê wî bîna t'as,*
*2 T'ilî pêĉiyê wî mînanî de's,*
*3 Neyînûk bîna almas,*
*4 Ez ber avrê wî bûme r̂isas.*

**S. 21** *1 Alê xêra, xêrê xa binas,*
*2 Xa bîne şe'detiyê nas.*

**S. 22** *1 Şe'detiya min: «Ezî e'devîme,*
*2 Şêx û p'îr, hostayî merebîme,*
*3 Silavk'êşê kaniya Sipîme,*
*4 [Erĥemdula] dînê êzdî r̂azîme.*

**S. 23** *1 Sinîme ji makê,*
*2 Sekinîm ber berê şivakê,*
*3 R̂ûva hatime ber zikakê,*
*4 Dûrim p'işka şile'tê.*

*T'emametî şêx Adî,*
*R̂emel bavê hostayî,*

**S. 24** *1 Qesra horî beniyane,*
*2 Horî têda r̂awastane,*

*3 Şeravê k'asane,*
*4 Dane ser destane,*
*5 Birine pêşiya xasane*
*6 Xasê dîwana şêx Adî pê bûne baristane.*

**S. 25** *1 K'ereme xudanê k'erem[et]ê,*
*2 Medet aliyê muĥbetê,*
*3 Gulmamîneke r̂e'metê,*
*4 Yeke dinê, yeke axretê.*

*R̂eme dêv û bavê hostayî,*
*Mal û mezelê em têda.*

## 83. QEWLÊ T'ERQÎNÛ[1704] YASÎN[1705]

**şaxê – 1**[1706]

**S. 1** *1 Ji qewlê şêx Fexrê bi ĥeqî,*
*2 Eve bû r̂êya mirîda bi Ĥeqî,*
*3 Tuyî Dayîm, tuyî Baqî bi Ĥeqî.*

**S. 2** *1 Silav li we be ên mezela,*
*2 Nûra Xwedê li we bibare,*
*3 Ciyê we bihuşt*[1707] *be,*
*4 Dua'*[1708] *nebîy*[1709] *û enbiya li we be.*

**S. 3** *1 Ji qewlê we ve,*
*2 Bi nave,*
*3 Den û muracûh.*

**S. 4** *1 Ellaĥ menzil*[1710] *elêk'ûm*[1711] *t'acehû,*
*2 K'erem bikin deng hilînin,*
*3 T'erqînû Yasînê*[1712] *li ser min bixwînin,*
*4 Navê şêx Adî û melek şêx Sin ĥeq li ser min bînin.*

**S. 5** *1 T'erqînê ji Yasînê,*
*2 Dem-dem[e] ji K'afa, Nûnê,*
*3 Şerh ne ji qanûnê.*

**S. 6** *1 Xerqe ji K'afa, Nûnê Ellaĥ,*
*2 Mewla cumle, a'lem miletî R̂esûl Ellaĥ,*
*3 Feqîrî bismîllaĥ, qebûlî Ellaĥ,*
*4 Tillaĥ, Billaĥ a'badî*[1713]*, emanî*[1714]*,*
*5 Emanî ji qismetî*[1715] *zêde.*

**S. 7** *1 Kelîmetî kul û xetab,*

---

[1704] binêr: *t'elqîn*
[1705] *nasîn*
[1706] Ji qewlên şêx Fexrê Adiyan *Qewlê t'erqîn û nasîn* http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-01.htm; http://www.ezdixandi.com/forum/38-261-1
[1707] *behist*
[1708] *duwe*
[1709] *nebî*
[1710] *yenzil*
[1711] *elêkom*
[1712] *nasîn*
[1713] *ebed*
[1714] *emen*
[1715] *qisman*

*2 Xeta ji ẍayb*[1716]*,*
*3 Xerez ji xezeb,*
*4 Bi e'fû*[1717] *r̂eza.*

**S. 8** *1 R̂eza ji r̂eĥmetê,*
*2 Sêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birêt axretê,*
*3 We fere li me sinetê*[1718]*,*
*4 Wekî libin dara Zenciltopê*[1719] *digirin t'erîqetê.*
*5 Hincîyê li pey fikira şe'rîe'tê,*
*6 Barî t'inebet qatî ser p'ira Selatê.*

**S. 9** *1 Wekî melek şêx Sin r̂ûmetê,*
*2 Li ser berê E'refatê*[1720]*,*
*3 Li şêxa, li p'îra, li mirîda, li hazira û guhdêra, van ẍayba*[1721] *bike şefa'etê.*

**S. 10** *1 Min dîn û dewlet ji wê divête r̂oja îd û E'refatê,*
*2 Ĥezar r̂eĥmet îlaĥ*[1722] *li vê gor̂istanê, li gel vê civatê.*
*3 Xwedanê k'eremê leşkerê gelîyê Lalisê mehdet*[1723] *di ĥalê me û sinetê.*

*Em kêmin Xwedê yî t'emame!*
*T'emametî li vî cuhalî û xwedanan,*
*R̂eĥmet*[1724] *li dê û bavê hazir û guhdaran!*

**şaxê – 2**[1725]

**S. 1** *1 Ji qewlê şêx Fexrê ĥeqe,*
*2 Ev bû r̂êya mirîda bi Ĥeqe,*
*3 Tu Dayîm*[1726]*, tu Ĥeqe.*

**S. 2** *1 Silav li we gelê goristanê,*
*2 Dak'ete ser we ji bihuştê, ji e'zmanê,*
*3 Navê Xwedê û niyaza îmanê.*

**S. 3** *1 Ji qewla û bi navê min,*
*2 Eger ne ji minbe winê tunebin,*
*3 Guh bidine gotinên min.*

**S. 4** *1 K'eremkin deng hilînin,*
*2 T'elqînû Yasînê*[1727] *ser min bixûnin,*
*3 Navê Xweda û Tawisî melek' ser min bînin.*

**S. 5** *1 T'elqîn ji Yasîne,*
*2 Demdem ji K'af u Nûne,*
*3 Şe'rîe't ne ji zagûne.*

**S. 6** *1 Xerqe ji K'af û Nûne,*
*2 Xweda mewlê ĥemû e'lime*[1728]*.*

---

[1716] *xeyb*
[1717] *afû*
[1718] *sunet*
[1719] *tûmê*
[1720] *e'rafat*
[1721] *xayîb*
[1722] *r̂eĥmetilah*
[1723] *medet*
[1724] *r̂ahmet*
[1725] [50] *Qewlê t'elqîn nasîn* (rr. 215-216)
[1726] *dayêm*
[1727] *telqîn û nasin*
[1728] *alim*

**S. 7** *1 Ezda û r̂êbere,*
*2 Xwedayê ĥemû beşere,*
*3 Tawisî melek' r̂ênase[1729] û r̂êbere.*

**S. 8** *1 Gotinên min şîretin,*
*2 Eger win ji xirabiyê durk'etin,*
*3 Ciyên we bi r̂astî cinetin.*

**S. 9** *1 Sur̂a[1730] ji r̂eĥmetê,*
*2 Şêx û p'îr, hoste û merebî, yarû birayê axretê,*
*3 We fere li me sinetê,*
*4 Wek li bin dara Zenciltopê dikirin xilmetê.*

**S. 10** *1 Hencî li pê hizra şe'rîe'tê,*
*2 Barî tê ne bi qatê,*
*3 Ser p'ira Selatê.*

**S. 11** *1 Wekî melek şêx Sin r̂ûniştive ser berê eresate,*
*2 Li şêxa, li p'îra, li mirîda, li hazira û guhdara,*
*3 Li van durketiya bikê şefate.*

**S. 12** *1 Min dîn û dewlet ji wî dihatê,*
*2 R̂oja cejn û hilk'eftê,*
*3 Ĥezar r̂eĥma Xweda li vê goristanê, li vê civatê.*

**S. 13** *1 Xwedanê[1731] k'eremê,*
*2 Leşkerê gelî Lalisê,*
*3 Meded halê sinetê.*

*Em kemin, Xwedê t'emame!*

**şaxê – 3**[1732]

**S. 1** *1 Qewlê şêx Fax[r]ê ĥeqî.,*
*2 Dayîm tuyî baqîye Enzel, r̂iya murida bi ĥeqî,*
*3 Selamî aleyke ali'l-qubul Enzel aleykim ve'l milletî ve'l cînnetî,*
*4 Nûr Allah Teala ti ayet min şûr,*
*5 Îsmê kintî makî makintî bi mebluma cebra lil entacê.*
*6 K'erem bikin deng hilînin,*
*7 T'elqîn û nasîne bixwînin,*
*8 Navê şêx Adî û Şêxsîn bînin.*
*9 T'elqîn û ji nasîne,*
*10 Dime-dimê ji qanûne,*
*11 Xelqe ji K'afa, Nûne,*
*12 Allah û mevla, feqirû bismilahî,*
*13 Ebedî temenî,*
*14 R̂azî ji r̂aĥmet,*
*15 Şêx û p'îr, hosta û merebbî,*
*16 Yar û bira axretê,*
*17 Çûne bin dara Zimzim digirin t'erîqetê.*
*18 Sed r̂aĥma Xodê li vê mezelê,*
*19 Ligel wê civatê,*

[1729] *r̂êcnas*
[1730] *sur*
[1731] *xudan*
[1732] [55] BERIVAN CAN EMMEZ AWAZÉ TAWUS: AŞK VE YAS BATMAN EZİDİLERİNİN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE ETNOGRAFİK YAKLAŞIMLAR Ankara – 2018 *Telqîn û Nasîn* (rr.175-176)

*20 Sed r̂ahma li dê û bavê hazira babaya.*
*21 Em kêmin Xwedê t'emam e*

## 84. QEWLÊ T'ERQÎNE

**şaxê – 1**[1733; 1734]

*1 Selam Alê (silava Xwedê),*
*2 Nazil Alê (şandine Xwedê),*
*3 Qewlê mişur,*
*4 Cinete bi nûr,*
*5 Dua'yê R̂esûl,*
*6 Ellaĥ qebûl (Xwedê lê qebûl)!*
*7 Dengê xwe hiltînim,*
*8 T'erkînekê dixwînim,*
*9 Nav dik'irê Êzda Tawisî melek' hiltînim.*
*10 T'erkîne Yasînê,*
*11 Dem-deme K'afa, Nunê,*
*12 K'ulik, xerqê bi nasînê,*
*13 Xuşk-birê axretê digirim, bona qirar u yeqînê*[1735]*.*
*14 Kaniya Sipî qulbe*[1736] *be,*
*15 Xerqê şêx Adî*[1737] *şehde be,*
*16 Destê me damine xuşk-bire axretê da hebe,*
*17 Îsmî xitmê*[1738]*,*
*18 Maka xêta li k'u tê*
*19 Ber dara Zenciltopê*[1739]*.*
*20 Bona p'ira Selatê,*
*21 Girtîyê xuşk-birê axretê.*
*22 Herĉa ser p'işka şile'tê, p'ar lê netê.*
*23 Bimbarekbe biratiya axretê!*

Ferza biratiya axretê bone Xudênasiyêye. Gava êzdîk dest davêje t'erîqê xa – şêx û p'îra, xerqê û k'ulik datinine ort'ê û bone girtina birê axretê ser da t'erqîna ferzê biratiyê tê gotinê. Peyî xitim kirina t'erqînê herd alî jî dibêjin wekî sê ĥerfa t'ev nabin. Şê ĥerf evin: derba xerqe, dîska denê û şerbikê zêrîn.

**şaxê – 2**[1740]

*1 Selam Elê*[1741]*,*
*2 Nazil Elê*[1742]*,*
*3 Ela qebûl,*
*4 Minet cinet,*
*5 Cinet ji nûr,*
*6 Ellaĥî*[1743] *Te'ala*[1744]*,*
*7 Te'ala R̂esûl,*
*8 Qebûl dua'*[1745]*,*

[1733] [17] T'erkîne "*Ferzê biratiyê*" (стр 26)
[1734] 54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *T'ERQÎNE FERZÊ BIRATIYÊ (*гг. 111-112) T'ilbîs 2001)
[1735] *êqîn*
[1736] binêr: *qible*
[1737] *Şîxedî*
[1738] *xikm*
[1739] *tomê*
[1740] [31] (гг.16-18)
[1741] *sela melê*
[1742] *elêê*
[1743] *Eleyî*
[1744] *tie'ala*
[1745] *di'e'a*

*9 Fetĥa[1746] int'în[1747],*
*10 Qewlî int'în,*
*11 Qismî xetim[1748],*
*12 Make — makînde,*
*13 Qulib mace Nûne[1749],*
*14 Delîl mirace Nûne[1750],*
*15 Îlaĥî e'lêkûm[1751] t'ece Nûne[1752],*
*16 T'erqînekê dixwînim,*
*17 Dengê xwe hiltînim,*
*18 Nav dik'irê şêx Adî, melî şêx Sin tînim.*
*19 T'erqîne ji Yasînê[1753],*
*20 Dem–deme K'afe[1754] Nûne[1755],*
*21 Şehde[1756] her qanûne[1757],*
*22 Xerqê şêx Adî K'afe, Nûne[1758],*
*23 Ewlayî, mewlayî,*
*24 Feqîrê simillaĥî,*
*25 Wellaĥ[1759], Billaĥ[1760], [û Tillaĥ],*
*26 Miletê Adem R̂êşûl Ellaĥ,*
*27 Ev îda[1761] emane[1762],*
*28 Emane qisma zêdeye,*
*29 K'ulindayî, k'ulind xeta,*
*30 Xeta ji xêb,*
*31 Xerac xezeb,*
*32 Afû r̂eĥmet[1763],*
*33 Şêx û p'îr,*
*34 Hosta, merebî,*
*35 Yar birê axretê,*
*36 Bin dara Zenciltopê [1764],*
*37 Hev digrin t'erîqetê.*
*38 Xetmî[1765] sehabê[1766],*
*39 Sinet min cema'[1767],*
*40 Şile't miẍerin,*
*41 Kaniya Sipî qulbe[1768] be,*
*42 Ĥecê kesê ser dîn k'ete,*
*43 P'ar lê[1769] nede. Amîn! Amîn!*

*Fet'ĥa t'emametî şêx Adî!*
*R̂eĥme[1770] li dê û bavê hostayî!*

---

[1746] *fet'iĥ*
[1747] *e'nt'im*
[1748] *xitim*
[1749] *macenûne*
[1750] *miracenûne*
[1751] *e'lêkim*
[1752] *t'ecenûne*
[1753] *asîn*
[1754] *xafe*
[1755] *xafenûne*
[1756] *şe'de*
[1757] *nerqenûne*
[1758] *k'afenûne*
[1759] *Welila*
[1760] *webila*
[1761] *ede*
[1762] *emen*
[1763] *r̂e'met*
[1764] *zinciltê*
[1765] *xitim*
[1766] *tihab*
[1767] *minceme*
[1768] binêr: *qible*
[1769] *tê*
[1770] *r̂eme*

## 85. QEWLÊ SILT'AN ÊZÎD Î MEZIN[1771]

**S. 1** *1 Me êk divêt pê bizanî,*
*2 Bipirsit li ĥalê min ĥeyranî[1772],*
*3 K'a k'u bû qiseta[1773]Mia'wî û silt'anî?*

**S. 2** *1 Me yek divêt biket ĥikyatê,*
*2 Şêro, xwedanê atqatê[1774],*
*3 K'a çawa silt'anî Êzî dahir bû řuwê qinyatê?*

**S. 3** *1 Heke silt'anê Êzî bedena make da[1775] bû,*
*2 Suř li Mia'wî p'eyda bû,*
*3 Mia'wî ji ĥeybeta bizdiya bû.*

**S. 4** *1 Mia'wî vê yekê nedihate bere,*
*2 Bi Dimeşqê kir sefere,*
*3 Maka silt'an Êzî ji Şamê dikete dere.*

**S. 5** *1 Maka silt'anê Êzî wê deng hilînî:*
*2 «Heçî yê ji we xûnekê bibînî,*
*3 Înşallaĥ[1776] ewê ji dest xûna xwe[1777] gazinî».*

**S. 6** *1 Maka silt'anê Êzî we det xebere:*
*2 «Ya Mia'wî, em dê ji bacêrê we çîne dere,*
*3 Kes nemiriye bê meferê».*

**S. 7** *1 Mia'wî kirbû k'ût û k'ařî[1778],*
*2 Maka silt'anê Êzî derkir ji wî şarî.*
*3 Şikir li wan řonahî bû, bû tarî.*

**S. 8** *1 Şikir ji wan tarî ye,*
*2 Dê zanîba wê çî ye,*
*3 Sebeb maka silt'anî Êzî ye.*

**S. 9** *1 Maka silt'anî Êzî ji Şamê bi řê bû,*
*2 Suřa silt'anî Êzî bi vê bû,*
*3 Ew ço, berê vê[1779] li Besrê bû.*

**S. 10** *1 Ew ço, berê vê li Besra ye,*
*2 T'emam bû qewl û we'da ye,*
*3 Dahir bû Êzîdî me ye.*

**S. 11** *1 Dahir bû Êzîdê mine,*
*2 Ew ne yî piĉûke, yî mezine,*
*3 Çend wesfet[1780] wê jê diçine.*

**S. 12** *1 Çend jê çobûn wesfete,*

[1771] [1] *QEWLÊ MEZIN* (pp. 157–172)
[1772] *eyran*
[1773] *qeset*
[1774] *itqat*
[1775] *p'eyda*
[1776] *Înşella*
[1777] *xo*
[1778] *kût û karî*
[1779] *wî*
[1780] *ûsfet*

*2 Zerb ne mabûn k'eremete*[1781]*,*
*3 A'mî êxistibû ĥeybete.*

**S. 13** *1 Bila Besra ya xeber ço nike,*
*2 R̂isqê*[1782] *wan xelef dike,*
*3 Hermetê wan cot-cot man dike.*

**S. 14** *1 Silt'an Êzîd ji maka xwe dipirsî ye:*
*2 «Tu bi wî key îlaĥî ye,*
*3 Navê babê min çî ye?»*

**S. 15** *1 «Lawo, babê te p'aşa ye,*
*2 Ser t'ext û mîriya xwe r̂awesta ye,*
*3 Dimeşq bi navê wîye ava ye.*

**S. 16** *1 Lawo, babê te p'aşa bû,*
*2 Ser t'ext û mîriya xwe westa bû,*
*3 Dimeşq bi navê wîye ava bû.*

**S. 17** *1 Ez jî xatûnek bûm, ji xatûnêt Dimeşqî ye.*
*2 Yekî ji wan bi xewna xwe d îye,*
*3 Pisekî min dahir bî ye,*
*4 Xof û tirsa wan ji destê wî ye.*

**S. 18** *1 Ewan kire dilsarî,*
*2 Ez der êxistim ji wî şarî.*
*3 Şikir li wan r̂onahî bû, bû tarî!»*

**S. 19** *1 «Daê, ez jî dê r̂ojekê herme,*
*2 Cêşekî zav bi xwe r̂a*[1783] *beme,*
*3 Tu li min bir̂êne, dê çî bi serê qazî û ekabirêt Şamê keme».*

**S. 20** *1 «Lawo, babê te mezitire ji min û teye,*
*2 Ew nebe, vê carê çu li gel nekeye».*

**S. 21** *1 Silt'an Êzî sur̂a wî pêda,*
*2 Wê sor diket wekî p'ête,*
*3 Ew k'î yî kore ye, silt'anê Êzî nevête!*

**S. 22** *1 Silt'an Êzî hajowa bacêrê Babilê,*
*2 Tê heyne dik'anêt zorî zav lê,*
*3 T'êkda bideye û dav lê.*

**S. 23** *1 Silt'anê Êzî hajowa bacêrê Babilo nave,*
*2 Tê heyne dik'anêt zorî zave,*
*3 T'êkda bideye û dave.*

**S. 24** *1 Silt'an Êzî derê bacêrê Şamê vediînî,*
*2 Qasidekî dû Mia'wî vedişînî,*
*3 [Got:] «Ya Mia'wî, tu were bi miskînî,*
*4 Şêrêsiwarek derva yî bacêrî te divînî».*

**S. 25** *1 Silt'an Êzî derê bacêrê Şamê vediweste,*
*2 Qasidek şande dû Mia'wî dest bi deste,*
*3 [Got:] «Ya Mia'wî, tu k'eremke, şêrêsiwarekî derê bacêrî, te dixweste».*

---

[1781] *keramet*
[1782] *r̂izq*
[1783] *xora*

**S. 26** *1 Gava[1784] Mia'wî qasid dît û tirsa bû,*
*2 Ĥeyrî û dama bû,*
*3 Çend r̂ay û t'egbîrêt kirîn, ĥemû li ber hinda bû.*

**S. 27** *1 Gava Mia'wî li qasid fikirî,*
*2 Dama bû, heyrî,*
*3 Got: «Sed xwezma [1785] wî, eve sed salayî mirî».*

**S. 28** *1 Mia'wî ji qasid diket pirsyare:*
*2 «Qasido, tu bi wî key nav Cebare,*
*3 Eve çî lewne siware,*
*4 Tu bi qasidî ser meda dihinare?»*

**S. 29** *1 Mia'wî ji qasid diket istexbêre:*
*2 «Tu bi wî key nav Cebêre,*
*3 Ev çî lewne mêre,*
*4 Tu bi qasidî, bi ser meda dihinêre?»*

**S. 30** *1 Qasid li me'niya vediweste:*
*2 «Ya Mia'wî, eve siwarekî hoy meste,*
*3 Lib[a]sê sore, r̂ime k'eske».*

**S. 31** *1 Qasid li me'niya ve westa ye:*
*2 «Ya Mia'wî, eve siwarekî hoy xweya ye».*
*3 Li gîyanê Mia'wî k'eftibû t'a ye,*
*4 Ber hinda bû çiqas t'egbîr û r̂a ye.*

**S. 32** *1 Mia'wî dibêjit ji male:*
*2 «T'u naçim bale,*
*3 Ezê mîrserêt xwe şînime bale».*

**S. 33** *1 Mia'wî şande bal du mîrsere,*
*2 Wextê dîtin ew nedere,*
*3 Silt'anî Êzî dua' lê dikir, kirine bere.*

**S. 34** *1 Mia'wî du mîrseret dî şandine bale,*
*2 Wekî dîtin ew dîndare,*
*3 Silt'anî Êzî dua' li wan jî kir, kirne hicare.*

**S. 35** *1 Yekî bo Mia'wî diîna xebere:*
*2 «Ya Mia'wî, eve siwarekî hoy bi nedere,*
*3 Herdu mêrserêt te, wê dikirîne bere».*

**S. 36** *1 Yekî bo Mia'wî diîna haware:*
*2 «Ya Mia'wî, eve siwarekî hoy dîyare,*
*3 Herdu mêrserêt te, wê dikirîne hicare».*

**S. 37** *1 Mia'wî digo: «Gelî qadîya, ya min digote we, we bawer ne dikir,*
*2 Dê dahirbit silt'anekî buk'ir,*
*3 Navê wî dinê û welata dê bite dik'ir».*

**S. 38** *1 Heke Mia'wî ji mal bi der çû,*
*2 Qadî û ekabir ber çû,*
*3 Saf û ĥeybet bi ser çû.*

**S. 39** *1 Her bi safe, her bi ĥeybete:*

---

[1784] *dava*
[1785] *xozma*

*2 «Siwaro, tu bi wî key nav muĥbete,*
*3 K’a bêje te çî xilmête?»*

**S. 40** *1 Silt’anî Êzî we dike ye:*
*2 «Ya Mia’wî, eve şoleke çû ne ye,*
*3 Sehle, nîveka min û te ye».*

**S. 41** *1 Mia’wî we det beyane:*
*2 «Siwaro, tu bi wî key R̂eĥmane,*
*3 Tu dê li min bive mêvane».*

**S. 42** *1 Silt’anî Êzî deng dihilînî:*
*2 «Ez peya nabim ser vî zînî,*
*3 Ma tu bişînîye Besra maka min bînî?»*

**S. 43** *1 Mia’wî we cewab daye:*
*2 «Siwaro min şande pê maka te înaye!*
*3 Te çî nave, xwezî min zanîbaye?»*

**S. 44** *1 «Çî sibeyekî se’îde!*
*2 Navê mine şîrin[1786] silt’an Êzîde,*
*3 Ezim atqata çendî mirîda».*

**S. 45** *1 Dibêjin: «Êzîdê kuȓê Mia’wî,*
*2 Xwedanê lib[a]sê k’eskê semawî.*
*3 Ez hatime li gel qadî û êkabirêt Şamê bikem da’wî».*

**S. 46** *1 Mia’wî diket gotinê:*
*2 «Ew P’adşayê hoy mezine,*
*3 Ew bêt û xwe dikete pisê mine,*
*4 Ewe tiştekî zêdey dewleta mine».*

**S. 47** *1 Mia’wî dibêjit: «Wî kem li sema,*
*2 Çend zêȓ û mal min heye,*
*3 Ez ĥemû wa li oẍira silt’an Êzîd deme».*

**S. 48** *1 Mia’wî dibêjit: «Ez bikem nabit finê,*
*2 Çend zêȓ û mal min heye li vê dinê,*
*3 Ez ĥemû wê dê li oẍîra silt’an Êzîd dem bi t’ine».*

**S. 49** *1 Ew wê diken t’egbîr û ȓaye.*
*2 Qasid şande Besraye,*
*3 Maka silt’an Êzîd înaye.*

**S. 50** *1 Îna, dibirine male.*
*2 Qadî û ekabir çone bale,*
*3 Wê bora bêjin ĥal û ĥewale.*

**S. 51** *1 Nav qadiya û babê,*
*2 Vên saẍlem biken vê cewabê:*
*3 «Silt’an Êzî bi ilmîne ilmê k’itabê?»*

**S. 52** *1 Maka Êzîd we det beyane:*
*2 «Êzîdê min bi xwe silt’ane,*
*3 Ew ne yî moĥt’acî ilmê Qura’ne!»*

[1786] *şirîn*

**S. 53** *1 Ewan qadiya ilmê xwe digotin,*
*2 Yêt[1787] qadiya me'nî cot bi cotin,*
*3 Silt'an Êzî çar-çar me'nî vêk ȓa digotin.*

**S. 54** *1 Qadiya got: «Sibĥana Melikê Celîl!*
*2 Çend borî sal û bedîl,*
*3 Kesekî nedîtîye, t'ifal[1788] bit ev ilmê li bîr!»*

**S. 55** *1 Qadiya got: «Sibĥana Melikê Celal!*
*2 Çend borîn bedîl û sal,*
*3 Kesekî nedîtîye, t'ifal bit ev ilme li bal!»*

**S. 56** *1 Silt'an Êzîd we dengeye:*
*2 «Qedeh û badiya lêk dideye,*
*3 Gelî yara, vexwen ya layîqî weye!»*

**S. 57** *1 Di ȓûnên wê vedixwene,*
*2 Qedeh û badiye lêk dene,*
*3 Gelî yara, vexwen layîqî weye!»*

**S. 58** *1 Ewan xasa dîwana silt'an Êzî,*
*2 Dibûne şûşe û biriqêt[1789] zêȓî.*
*3 Û k'asa şerab il-tiĥûr, nob bi nob li yek û du digêȓî.*

**S. 59** *1 Qadiye dît ew borî,*
*2 Bo Mia'wîve horî,*
*3 Go: «Vê yekê nabit ye seyîdî».*

**S. 60** *1 Qadî, û mala, û seyîda,*
*2 Ewan digo: «Xwezî ewan mêra nedîta,*
*3 Ȓoja lê dahirbit[1790] silt'an Êzîda.*

**S. 61** *1 Vê yekê nabit ye we bî,*
*2 Tu P'adşayî ser K'ursîye xwe bî,*
*3 Pis bit, yî mey vexwerî.*

**S. 62** *1 Vê yekê nabit ya seyîdî,*
*2 Tu P'adşayî ser K'ursîye bilindî,*
*3 Pis bit hoy lewend bî».*

**S. 63** *1 Ew wê dibene ber Mia'wî şikyate,*
*2 Wê bora dibêjin ĥikyate:*
*3 «Wê ji destê silt'an Êzîd xirab bin welate».*

**S. 64** *1 Mia'wî dibêjit: «Gelî qadiya, ewin hind hene,*
*2 Ba silt'an Êzî ve heȓine,*
*3 Şireta ĥal pê bikene».*

**S. 65** *1 Silt'an Êzîd got: «Gelî yara hûn ȓabin,*
*2 Hûn qenc t'ebabin,*
*3 Çû carêt dî bûna ho çênabit».*

**S. 66** *1 Silt'an Êzîd yarê xwe dibirî,*
*2 Li mala sebax̂î êwirî.*
*3 Sebax̂î e'zeteke çak e'zet kirî.*

---

[1787] *êt*
[1788] *tefal*
[1789] *burqêt*
[1790] *dahir bî*

**S. 67** *1 Sebaẍo, serê singî,*
*2 Tu hilîne pengî,*
*3 Ji silt'an Êzîd bixwaze ĥezar û yek r̂engî.*

**S. 68** *1 Sebaẍo, lingo ser darê çendî linga,*
*2 Tu tê hilîne penga,*
*3 Ji silt'an Êzî bixwaze ĥezar û yek r̂enga.*

**S. 69** *1 Denge û ĥezar r̂enge.*
*2 Heke sebaẍî tê hilîne penge,*
*3 Sebaẍî zû li xwe kire denge.*

**S. 70** *1 Silt'an Êzîd go: «Sebaẍo, nebit tu sur̂a bang bidêrî,*
*2 Çî ji xwe r̂a hilgirî, çî ji xwe r̂a veşêrî,*
*3 Ĥeta sae'ta r̂uĥê dêspêrî».*

**S. 71** *1 Sebaẍî go: «E'zîzê min çi bi k'are?*
*2 Heke sur̂e Ĥeqî hote dîyare,*
*3 Min nedikarî, min sur̂ê xwe bangî ne kire!»*

**S. 72** *1 Silt'an Êzîd mabû li wê ye.*
*2 R̂ojeke, û duwa, û sê ye,*
*3 Yekî xeber gehande babe ye.*

**S. 73** *1 Yekî bo Mia'wî dibir xebere,*
*2 Mia'wî ser sebaẍî kire lêzim û fere,*
*3 Silt'an Êzîd ji mala xwe bike dere.*

**S. 74** *1 Sebaẍî go: «Ya Mia'wî, ewe P'adşê*[1791] *minî dinê û axretê,*
*2 Ez dik'êşime ber sicûde û ibadetê*[1792]*,*
*3 Ez dê çawa bêjme silt'an Êzîd betalke suhbetê?»*

**S. 75** *1 Mia'wî go: «Sebaẍo, nebêje negote mine.*
*2 Ez dê mersûmeke wekeme,*
*3 Ciyê te ne li e'rd hebit û ne li sema».*

**S. 76** *1 Sebaẍ hate mal xulqîkirî*[1793]*,*
*2 Silt'an Êzîd li sebaẍî fikirî,*
*3 Zanî çî li dilê sebaẍî sêwirî.*

**S. 77** *1 Sebaẍ hate mal xulq t'êk r̂a,*
*2 Gote silt'an Êzîd: «Hil û ji mala min her̂e,*
*3 Ez nikarim bime dijmin bi babê te r̂a*[1794]*».*

**S. 78** *1 Silt'an Êzîd digot: «Sebaẍo, ya min û we hinde,*
*2 Tu dibînî bacêrê Şamê yî çende,*
*3 Ez dê hêlim, bixwînit*[1795] *têde kunde.*

**S. 79** *1 Sebaẍo, ez nûrim, e'silê min ji Nûre,*
*2 K'asê digêr̂im şerab il-tiĥûre,*
*3 We'de wê hatî, dê li bacêrê Şamê betal kem xet, û k'itêb, û deft'er, û mişûre».*

---

[1791] *pedşa*
[1792] *ebadet*
[1793] *xulkîkirî*
[1794] *te re*
[1795] *bixûnit*

**S. 80** *1 Silt'an Êzîd ji male sebaẍî derk'eft henekû yarî:*
*2 «Ez pê ve nabim vî neĥrî,*
*3 Ma sergeȓdanî kem vî şarî».*

**S. 81** *1 Silt'an Êzî ji mala sebaẍî der ço,*
*2 Şaz û moẍnî*[1796] *li ber ço,*
*3 Nûra a'lemî ser ço.*

**S. 82** *1 Şaz û moẍnî xweş moẍnîne.*
*2 Êẍler*[1797] *sad û bîst û çar ĥezar weter û t'êlîne,*
*3 Ĥemû ber navû dik'irê*[1798]*silt'an Êzîd distirîne.*

**S. 83** *1 Silt'an Êzîd dest havête ûşîyê tirî,*
*2 Ço ser derê kaniyê, danabû li bin berî.*
*3 Bi qudretê bacêrê Şamê li mey ẍeyirî.*

**S. 84** *1 Çî bû, çî ciriya?*
*2 Bacêr t'êk hijiya,*
*3 [Neĥra] Şamê li mey geȓiya.*

**S. 85** *1 Çi meyeke dest bi deste!*
*2 Heçî muxliqê pê kirbû qeste,*
*3 Hêş jê venexwarî, pê dibû meste.*

**S. 86** *1 Çî meyeke weye.*
*2 Heçî muxliqê nuxtekê jê vedixweye,*
*3 Ser û malê xwe lê deye.*

**S. 87** *1 Çî meyeke wete.*
*2 Heçî muxliqê nuxtekê jê vedixwete,*
*3 Ser û male xwe lê dete,*
*4 Ev dinya ber ĉavê wî dibite dewate*[1799]*.*

**S. 88** *1 Wey li qadî ye!*
*2 Ew naȓênite ciyê xwe û doje ye,*
*3 Gava ço dîwana silt'an Êzî, ȓênî k'ase, û badeye, û meye,*
*4 Lew bi silt'an Êzî nadet şa[h]deye.*

**S. 89** *1 Wey li qadî ẍafila haware,*
*2 Xwe bi mal ve dibire,*
*3 Gava ço dîwana silt'an Êzî, ȓênî k'ase, û badeye, û meye lê hundire.*

**S. 90** *1 Qazî, û ekabira, û beqala,*
*2 Gava çone dîwana silt'anê Êzî, ȓênî kiçikêt wan yêt buk'ir, ĥelal il-bale,*
*3 Vedigeȓiyane mal, diȓênîn li male.*

**S. 91** *1 Qazî Esker*[1800] *dişînite mala xwe bi sere,*
*2 Ma çî hikmek hatîye ji we ȓa.*
*3 We divêt: «Hûn Êzidî bin bi keĉik û kuȓe».*

**S. 92** *1 Wey li xatûna dota mîre!*
*2 Got: «Gelî qazî, û melle, û seyîda,*
*3 Hûn ji îmane xwe nebin be'îde,*

---

[1796] *muẍenî*
[1797] *oẍler*
[1798] *nav û dikar*
[1799] *dawete*
[1800] *e'sker*

*4 Me şehde*[1801] *daye bi navê silt'an Êzîde».*

**S. 93** *1 Qazî Esker bi sûkada [di]çiye*[1802]*,*
*2 Yarê xwe didîte, ji yarê xwe dipirsîye:*
*3 «Ĥalê we di destê silt'an Êzîd da çîye?»*

**S. 94** *1 Qazî Esker dibêjite yarê xweye:*
*2 «R̂evîn ye bê fayide ye,*
*3 Silt'an Êzî ĥeta mal û mezelêt me li me kirine meye».*

**S. 95** *1 Wey li qazîyê buxtanî,*
*2 Ço derê dîwanê, li xwe dir̂and pêsîra kirasî kitanî,*
*3 Go: «Dad û bêdad ji destê wî silt'anî».*

**S. 96** *1 Mia'wî go: «Gelî qazîya hûn hind hene,*
*2 R̂abin r̂ayekê bikene,*
*3 Silt'anê Êzî bigrin û hinda kene».*

**S. 97** *1 Ewê diken t'egbîr û r̂ay,*
*2 Li zavî, li cemay,*
*3 T'erefa beĥrê day.*

**S. 98** *1 Silt'an Êzîd yarêt xwe hilane,*
*2 Li qela Dingizê li nivêka beĥrê dana,*
*3 Xivet vegirt, t'eref k'êşane, şaz û moẍnî li navda danane.*

**S. 99** *1 Şaz û moẍnî xweş moẍnîne,*
*2 Oẍler*[1803] *sad û bîst û çar ĥezar weter lêne,*
*3 Ĥemû li ber navû dik'irêt silt'an Êzîd distrêne!*

**S. 100** *1 Mia'wî dibêjîte wan ji ĥale:*
*2 «Me yek divêt biçite bale,*
*3 Silt'an Êzî şîrêt biket bi zare».*

**S. 101** *1 Qazî Şîro r̂abû ji dîwanê,*
*2 «Ya Mia'wî ez dê bi xwe girim vê damanê,*
*3 Dêçim silt'an Êzîd bo te înime ser deft'era îmanê».*

**S. 102** *1 Qazî Şîro ji dîwanê r̂adibite,*
*2 Berbi çadirêve diherite,*
*3 Silav li silt'anê Êzîd dikete.*

**S. 103** *1 Qazî Şîro ji dîwanê hilweste,*
*2 Berbi çadirê kirbû qeste,*
*3 Silav li silt'anê Êzîd kir dest bi deste.*

**S. 104** *1 «Selamû e'lêk'ûm*[1804] *ya silt'anî!*
*2 Tu mîrekî pisê p'aşanî,*
*3 Eve çî meye, te serê xwe tê danî?»*

**S. 105** *1 Silt'anê Êzîd go: «Li min û te şehde bin ev civat*[1805] *û cema',*
*2 Ez dê nuxtekê ser neynûka xwe ji vê şerabê bi te deme,*
*3 Heger te gote min vexwe, ez dê vexweme, heger te gote min venexwe, ez venaxweme».*

---

[1801] *şade*
[1802] binêr: *çuye*
[1803] aẍ*eler*(?)
[1804] e*lêkim*
[1805] *civet*

**S. 106** *1 Silt'anê Êzîd yek nuxte ser neynûka xwe dana qazî Şîro vedixwere,*
*2 Qazî Şîro wê diket gazî û haware:*
*3 «Gelî bira, vexwen, ye ĥelale,*
*4 Bi dil ye şîrine, bi zar ye tale!»*

**S. 107** *1 Silt'anê Êzîd k'as li qazî Şîro ẍeyirand,*
*2 Bi r̂enga xemiland,*
*3 Binê beĥra seyrand.*

**S. 108** *1 Wey li qazî kore!*
*2 Beĥra ber jore,*
*3 Hincîyê dir̂ênî, lib*[a]*sê silt'anê Êzîd t'êkda sore*[1806].

**S. 109** *1 Qazî Şîro k'axez ĥemû dibir̂în,*
*2 Ĥemû t'erk kirin, ĥemû ker*[1807] *bi ker kirin,*
*3 Ĥemû bi nava beĥrê wer kirin.*

**S. 110** *1 Qazî Şîro nema bixwînit kaxedê,*
*2 Bûwe nedîmê suhbetê,*
*3 Bûwe r̂eqasê dawetê.*

**S. 111** *1 Bûwe r̂eqas û r̂eqisî,*
*2 Bûwe xewas û xewisî,*
*3 Qazî Şîro bi wê sur̂ê newisî.*

**S. 112** *1 Herî bi xof, û herî bi neder,*
*2 Mal wî dibînin t'embûr, û moẍnî, û oẍler, (aẍeler?),*
*3 Dil li qazî Şîro bûwe ker bi ker.*

**S. 113** *1 Suxmetî wê k'asê, qazî Şîro wê diket hawar û gazî,*
*2 Qazî Şîro li wêder mabû yî r̂ûsî-tazî.*

**S. 114** *1 Qazî Şîro wê deng hiltînî:*
*2 «Ya Mia'wî, tu were bi miskînî,*
*3 Min çu cara silt'an Êzî nebînî».*

**S. 115** *1 Mia'wî hat, ew şaş li stoyê xwe kir,*
*2 Go: «Hey Êzîyê minî buk'ir,*
*3 Tu bihêle neĥrê Şamê bi şukir*[1808],
*4 Min bacêrê Şamê milkanî te kir.*

**S. 116** *1 Ji qewlê Xwedê û nebîy,*
*2 Tu bihêle neĥrê Şamê ciyê xwe bî,*
*3 Bacêrê Şamê milkanî te bî».*

**S. 117** *1 Li bane min kur̂ê wî silt'anî,*
*2 Ço ser derê me'nîyî, û ûşiyê tirî jibin berî deranî.*
*3 Neĥra Şamê veger̂iya bi qewata*[1809] *R̂eĥmanî,*
*4 Êzîd bacêrê Şamê stand milkanî.*

*T'emametiye vî qewlî li şêx Adî û Xwedanî!*

[1806] *nûre*
[1807] *kir*
[1808] binêr: *şikir*
[1809] *qewet*

## 86. QEWLÊ SILT'AN ÊZÎD Î BIÇÛK[1810]

**S. 1** *1 Aẍayê min Êzîde,*
*2 Bêraqeke sor, sipî, r̂eşe li p'îda,*
*3 Çarde tebek e'rd-e'zman k'efa destê silt'an[1811] Êzîd da.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 2** *1 Diniyayê biye be'se,*
*2 Deher biye silt'anekî xase,*
*3 Ber diçe ĥezar yek libase.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, sit'anê mêrane.*

**S. 3** *1 Diniyayê biye denge,*
*2 Deher biye silt'anekî p'errenge,*
*3 Ber diçe ĥezar yek denge.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 4** *1 Gelî mêra werin misilĥetê,*
*2 Aẍayê min P'adşayê sunetê,*
*3 Dilê mirîdxanê maye ĥidretê.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 5** *1 Derê xezîne qudretê ve kînin,*
*2 Ĥulekî sincebarî lê derînin,*
*3 Bande elîfa xa ber silt'an Êzdîd dameşînin.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 6** *1 Şam şeherê ber avî,*
*2 Sura silt'an Êzîd dîhar bû navî,*
*3 We'de t'emam bû wê kela bajêr diçe bisitîne, r̂ûnê bi navî.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 7** *1 Şam şeherekî mezine,*
*2 Damane ditirsîne,*
*3 Ĥik'umeta silt'an Êzîdêmine,*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 8** *1 Eva t'asa sipîye,*
*2 Nazil biye E'rşê êliye,*
*3 Cemayiye mêra Zimzime, Qubildare, kaniya Sipîye.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*

---

[1810] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ ÊZÎDÎ BIÇÛK* (rr. 23-24) T'ilbîs 2001
[1811] *sult'an*

*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 9** *1 Eva t'asa sore,*
*2 Nazil biye E'rşê jore,*
*3 Cemayiye mêra kaniya Sipîye, Zimzim û Qubildare.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

**S. 10** *1 Eva t'asa r̂eşe,*
*2 Nazil biye E'rşê,*
*3 Ber melekê mêra mirazbexşe,*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî silt'ane,*
*6 Silt'an, silt'anê mêrane.*

## 87. QEWLÊ JI HINDAVE ÇÛME BANÎ[1812]

**S. 1** *1 Ji hindave çûme banî,*
*2 Li înda da gunehk'ara r̂a anî,*
*3 Me got: «Ortû şabaş bo navû dik'arê vî silt'anî".*

**S. 2** *1 Birime bin dara gunehk'ara,*
*2 Di r̂ûda çûme xware,*
*3 Me got: «Xweşewîstê min zînara dest hikmê te çendî bi ĥeybete, çendî dijware».*

**S. 3** *1 Birime wî gelîyê k'ûre,*
*2 Min qub li wê dîtin, hilêl bi nûre,*
*3 Li ber navû dik'are silt'an Êzîyê minî şîrin[1813], şerîf[1814] yî dibihûra.*

**S. 4** *1 Birime ber wê mehderê,*
*2 Melek Fexredîn sekinî li qent'erê,*
*3 Melek şêx Sin r̂awesta li ber P'adşê min silt'an şêx Adî,*
*4 Got: «Gelî mêra r̂astî her ye weko berê».*

**S. 5** *1 Birime dîwana qudretê,*
*2 Şêxû Bek'irê feqîr, min li wê dît,*
*3 Ser li xewlê[1815] mêr di r̂ûniştine li suhbetê.*

**S. 6** *1 Mêr di r̂ûniştine li yekîniyê, li qiyasê[1816],*
*2 Hûn bifikirin li binyanê, li e'sasê,*
*3 Silt'an Êzî û Ĥebîbî Necar r̂ûniştine li ber masê.*

**S. 7** *1 Ĥebîbî Necar û silt'an Êzî li ber masê di r̂ûniştin,*
*2 R̂astiya r̂êya şêx Adî û melek şêx Sin vêk r̂a di axiftin,*
*3 Bi yekîniya silt'an Êzî, r̂agihaştin.*

**S. 8** *1 Ẍafîlû yêt mirin ji k'erbe,*

---

[1812] [50] (rr. 565-570)
[1813] *şirîn*
[1814] *şirîf*

[1815] *xewte*
[1816] *kiryas*

*2 Wê xwe didine ber dirbe,*
*3 Belê, me go: «Xweşewîstê min xweş te dengê qos, û e'lem, û herbe.*

**S. 9** *1 Li ber navû dik'are P'adşê min yê mezin û jîr,*
*2 Ewin şêx Adî, û melek şêx Sin, û Êzdîne mîr,*
*3 Ewin xasêt sinetê*[1817] *yê feqîr.*

**S. 10** *1 Banga mine wan xasa,*
*2 Amedîn, û şêx Babik, û şêx Alê Şemsa,*
*3 Ewin xwedanê*[1818] *bisk û meqesa.*

**S. 11** *1 Ewan zanî,*
*2 Ev gerdûn dê Wehabî,*
*3 Bawerkin dê dawiya zeman r̂abî.*

**S. 12** *1 Çî zemanekî axire,*
*2 Bab ji r̂êya pisa diçine dere,*
*3 Hawa birayê axretê li ser gunehk'ared bira.*

**S. 13** *1 Birime derya r̂eşa tarî,*
*2 Min li wê dîtin lal û dur̂ hebluyên r̂eş mirarî,*
*3 Pesnêt vî qewlî tên bap'îrî xweş û p'îrê Alî.*

**S. 14** *1 Birime ber we gumbetê*
*2 Li ber min vekirin ĥezar û yek k'ilitên qudretê,*
*3 Li ber navû dik'are silt'an Êzî yê şîrin, şerîf ĥeta r̂oja qiyametê.*

**S. 15** *1 Birime ber wî derî,*
*2 Li ber min vekirin ecem û perî,*
*3 Dîndara silt'an Êzî ye bi mal û serî.*

**S. 16** *1 Birime ber wî mek'anî,*
*2 P'erde ji ber ĉavê min hilanî,*
*3 Min xas dîtin r̂ûniştine li dîwana wî silt'anî.*

**S. 17** *1 Ji ĥewşê ĥeta kelînê,*
*2 K'asek da min li serê xezînê,*
*3 Min vedwar bi destê xwedanê nasînê.*

**S. 18** *1 Ji ĥewşê ĥeta mezelê,*
*2 K'asek da min li serê qelê,*
*3 Bele min got: «Xweşewîstê min sipas te, ez kirme sinceq begê wê gelê».*

**S. 19** *1 Go: «Den k'amilî,*
*2 Dewlet nizilî,*
*3 Pişt silt'an Êzî merdî şuxulî».*

**S. 20** *1 Ez bi silt'an Êzî r̂a bûm li Qer̂e Dengizê,*
*2 Ez bi Îsa r̂a bûm li Qudsê,*
*3 Ez bi Musa r̂a bûm li Hemaye, li Humsê.*

**S. 21** *1 Ez bi Mûsa r̂a bûm bi Kilamê,*
*2 Ez bi Bazid r̂a bûm li Bestamê,*
*3 Ez bi silt'an Êzî r̂a bûm li e'rdê Şame.*

---

[1817] *sunet*
[1818] *xudan*

**S. 22** *1 Ez bi Elî r̂a bûm siware Dindilê,*
*2 Bi Qadî Bilban r̂a bûm r̂oja Mûsilê,*
*3 Bi silt'an Êzî r̂a bûm hincî e'rdê ew lê.*

**S. 23** *1 Bi Elî r̂a bûm serê Kifarê,*
*2 Bi silt'an Êzî r̂a bûm li Beyt il-Farê,*
*3 Bi şêx Adî r̂a bûm r̂oja li Ĥeq ware.*

**S. 24** *1 Ez bi Nasirdîn r̂a celad bûm,*
*2 Bi Sicadîn r̂a bi xebat bûm,*
*3 Li ber navû dik'arê silt'an Êzî bi xelat bûm.*

**S. 25** *1 Bi şêx Misafir r̂a bûm li ehlê,*
*2 Bi şêx Mûsê Enzelî r̂a bûm li r̂ê,*
*3 Pesnê vî qewlî tên weki p'îrê xweş, p'îrê Alî.*

**S. 26** *1 Hesê me r̂a Omera,*
*2 Heke xêre, heke şer̂a,*
*3 Em di r̂azîne bi hikmê te r̂a.*

**S. 27** *1 Meşe mer̂a Omer axir,*
*2 Hey welîo, tu çendî faxir,*
*3 Li ber navû dik'arê silt'an Êzî, yê şîrinî, şerîfî faxir.*

**S. 28** *1 Birime derya r̂eşa tarî,*
*2 Mêrekî ji wan li min bû dîyarî,*
*3 Me go: «Xweşewîstê min te li min r̂onkirin herdu ĉavêd tarî».*

**S. 29** *1 Me go: «Xweşewîstê min ya te ji me r̂a hinare,*
*2 Heke k'are, heke zirare,*
*3 Em disekinîne bi ser û male».*

**S. 30** *1 Me go: «Xweşewîstê min ya te ji me r̂a hinare,*
*2 Heke xêr, û heke şer̂e,*
*3 Em yêt r̂azîne bi desthilatiya te r̂e».*

**S. 31** *1 Me go: «Xweşewîstê min hinciya tê, ji ba te tê,*
*2 Te nivîsîye li serê xetê,*
*3 Li ber navû dik'arê silt'an Êzî yê şîrin, ĥeta r̂oja qiyametê».*

**S. 32** *1 Gelî bira, hûn guh bidêrin,*
*2 Qewl û şirete şêx Adî ĥemû xêrin,*
*3 Xet û berat'ên navû dik'arê silt'an Êzî xêr û zêr̂in,*
*4 Dem hatîye mêr ciya pêk biguhêrin.*

**S. 33** *1 Gelî bira hûn bi xêr hatin,*
*2 Ji dîyarî ĥeta bi batin,*
*3 Hikmeta silt'an Êzî bi çu r̂enga na ête standin.*

**S. 34** *1 Zincîrit gêr̂înim,*
*2 Ala r̂eş hiltînim,*
*3 Bi destûrî silt'an Êzî ez didim û distinim.*

**S. 35** *1 Hate derê ji vî dînî,*
*2 Wekî P'adşê min e'rd çêkir, û e'zman li ser nijinî,*
*3 Wê r̂ojê melekê dojeh digel melek Fexredîn kenî.*

**S. 36** *1 Melekê dojêh wêt bêjîne:*

*2 «Bi bilindiya Xwedê hincî r̂ewanêt Êzdîne,*
*3 R̂êya we li dojeh nine».*

**S. 37** *1 Ji qewlê xweşewîst melek Fexredîne,*
*2 Hincîyê li deft'era melek Fexredin û qewle şêx Adî bêtin yeqîne*[1819]*,*
*3 Ew r̂ewane r̂êya wî li dere dojeh ve nîne.*

**S. 38** *1 Ji qewlê şêx Fexrê faxire,*
*2 Hincîyê li deft'era melek Fexredîn û qewlê şêx Adî nêtin bawere,*
*3 Eseh ew berbi dojêh ve bire.*

**S. 39** *1 P'adşe min xerqe ji hinerê çêkir,*
*2 Sewirand û ber û pêkir,*
*3 Hidrîsî*[1820] *Xeyat nefsa silt'an Êzî bû hosta yê lêkir.*

**S. 40** *1 P'adşê min xerqe ji hinerê çêkir,*
*2 Sewirand û k'amiland,*
*3 Hidrîsî Xeyat nefsa silt'an Êzî bû fesiland.*

**S. 41** *1 Fesiland wekî wê carê,*
*2 Berî binyana berî û beĥrê,*
*3 Mêr r̂ûniştine qublet il-Bidar bi sit'arê.*

**S. 42** *1 Mêr qublet il-Bidar bi sit'ar r̂ûniştin,*
*2 Bi r̂astiya r̂êya şêx Adî û melek şêx Sin vêk r̂a axiftin,*
*3 Bi yekaniya silt'an Êzî r̂a gehistin.*

**S. 43** *1 Silt'an Êzî xerqe li ber bû*
*2 T'anceki r̂eş nûranî li ser bû,*
*3 Ĥeft sur̂et silt'an Êzî xas û qelender bû.*

**S. 44** *1 Dibêjime ĥeft sur̂êt silt'an Êzî k'î û k'îne:*
*2 «Şêx Adi û melek şêx Sin, [şêxû Bek'ir, Şemsedîn ??] û Fexredîn, Nasirdîn û Sicadîne,*
*3 Ewan ev gerdûn bi k'ar tîne».*

**S. 45** *1 Hate derê ji vî libasî,*
*2 Hincîyê r̂astiya r̂êya şêx Adi û melek şêx Sin li ser xwe r̂a nasî,*
*3 Ewî borê ye r̂ûhyê vê deryê bi silt'an Êzî r̂a diger̂êt wekî masî.*

**S. 46** *1 Gelî bira, ……….[xal] û mame,*
*2 Bawer sened bû t'emame,*
*3 Li vî dînî heyran mame.*

**S. 47** *1 Heyran mame li vî dînî,*
*2 Ya Tawisî melek', tu Mangî li e'zmînî,*
*3 Tu bo me meseb û dînî,*
*4 Ya Tawisî melek', sed xweziya bi wê r̂ewanê tu bidê, jê nestînî,*
*5 Dê bi zor dereca gehînî.*

**S. 48** *1 Ji qewlê Omer Xale,*
*2 Hincîyê k'iryarê baş yî li bale,*
*3 Maşê mîrê xwe bi fihêlî dixware,*
*4 R̂oja axretê yî bi cî ye, bi ware.*

**S. 49** *1 Pesnêt vî qewlî tên wekî tavêt buhare,*

[1819] *êqîn*
[1820] *Edrîs*

*2 Sed dilovaniyêt Xwedê li babê guhdare.*

*Em di kemin, Xwedê yî t'emame!*

## 88. QEWLÊ DI E'MIREKÎ DA MAME[1821; 1822]

**S. 1** *1 Di e'mirekî da mame,*
*2 Yarekî ez r̂ivame,*
*3 Ez ji Şerqê hatime, dêçime Şame.*
**S. 1** *1 Di e'mirekî[1823] da mame,*
*2 Yarekî ez r̂ivame,*
*3 Ji R̂ojhilat birime Şame.*

**S. 2** *1 Ez ji Şamê hatime, dêçime Şerqê,*
*2 Xeta min ji vê,*
*3 E'zîzê min, kul û e'melê min jê.*
**S. 2** *1 Ji Şame hatîme, dêçime R̂ojhilatê,*
*2 Xeta min wa di vê,*
*3 Kul û k'iryarê minî jê.*

**S. 3** *1 Çendî di meyzînim,*
*2 Wê deng bilind dikem, wê diseyrînim,*
*3 E'zîzê min, kesekî ji te çêtir nabînim.*
**S. 3** *1 Çendî di meyzînim,*
*2 Li vê gerdûnê diseyrînim,*
*3 Xweşewîstê min, kesekî ji te çêtir nabînim.*

**S. 4** *1 Çend di fikirim,*
*2 Beyana silt'an şêx Adî di ser xwe r̂a hildikim,*
*3 E'zîzê min, r̂ûyê vê meclîsê, ez ji ĥemûwa gunehtirim.*
**S. 4** *1 Çendî difikirim,*
*2 Beyana silt'an şêx Adî di ser xwe r̂a hilgirim,*
*3 Xweşewîstê min, r̂ûyê vê meclîsê ez ji ĥemûwa gunehtirim.*

**S. 5** *1 Şikir ez bi e'rifekî bê êb,*
*2 Te ez r̂ûyê vê meclîsê kirme e'cêb,*
*3 Gunehêt min di p'ir̂in, nayêne ĥisêb!*
**S. 5** *1 Şikir ezî bi êb, tuyî bê êb,*
*2 Te ez li r̂ûyê vê meclisê kirime e'cêb,*
*3 Gunehêt min di p'ir̂in, na êne ĥesêb.*

**S. 6** *1 Evane[1824] piling dêbine bazî,*
*2 Kes li r̂ûyê vê meclîsê nakete gazî,*
*3 Ez ji xwe gelek ne r̂azî.*
**S. 6** *1 Evane piling, dêbine bazî,*
*2 Kes li r̂ûyê vê meclisê nakete gazî,*
*3 Ez ji xwe gelek ne r̂azî.*

**S. 7** *1 Evane piling dêbine şêr,*
*2 Kes li r̂ûyê vê meclîsê ne peyvit bi xêr,*
*3 Ez banga xwe digehînime Cebêr.*

---

[1821] [2] (rr. 368–374)
[1822] [50] (rr. 528-532)
[1823] *emrek*
[1824] *even*

**S. 7** *1 Eve piling dêbine şêr,*
*2 Kes li r̂ûyê vê meclisê ne peyvit bi xêr,*
*3 Ez banga xwe digehînime hêzdêr.*

**S. 8** *1 E'zîzê min, te ez li borekî sahir kirim,*
*2 Çu cara pê nagirim,*
*3 Ji k'eftina xwe ezî [ĥeyrim].*

**S. 8** *1 Xweşewîstê min, te ez li borekî siwar kirim,*
*2 Çu cara pê nagirim,*
*3 Ji k'eftina xwe ez şiyarim.*

**S. 9** *1 Ser ĥişkê min tê nîne ĉare,*
*2 Xwedan ji desta yî bê zare,*
*3 Bi sê r̂oja, mezin meydana meleka, borê min bazdet xendekan û kendale.*

**S. 9** *1 Ser ĥişkê min tê nîne ĉare,*
*2 Xwedan[1825] ji desta yî bê zare,*
*3 Bi sê r̂oja, mezin meydana meleka, borê min bazdet xendekan û kendale.*

**S. 10** *1 Ser ĥişke û min ĉare pê nîne,*
*2 Heke berê wê k'efte r̂evîye,*
*3 Tirsa meye ji zebênîya.*

**S. 10** *1 Ser ĥişke û min ĉare pê nîne,*
*2 Heke berê wê k'efte r̂eviya,*
*3 Tirsa meye ji zebêniya.*

**S. 11** *1 Ez r̂eviyam û gav li min bir̂iyan,*
*2 Heke zebênî bi min r̂a gehîyan,*
*3 Dil û hinavê min bizdîyan!*

**S. 11** *1 Ez r̂eviyam û gav li min bir̂iyan,*
*2 Heke zebênî bi min r̂a gehiyan,*
*3 Dil û hinavê min bizdiyan.*

**S. 12** *1 E'zîzê min, r̂ûyê vê dinê meferek nîne,*
*2 Heke e'limekî dibêjim, bêjne min we nîne,*
*3 Heke xêrekî dikem, bêjne min çendî dîne,*
*4 Heke ĥikyatekî dikem, bêjne min çendî derewîne.*

**S. 12** *1 Xweşewîstê min, r̂ûyê vê gerdûnê meferek nîne,*
*2 Heke ilmekî dibêjim, bêjine min we nîne,*
*3 Heke xêrekê dikem, bêjine min çendî dîne,*
*4 Heke gotinekê dikem, bêjine min çendî derewîne.*

**S. 13** *1 Werin, kesekî me'rîfet li bal,*
*2 Xasêt şêx Adî sekinîbûn xeyal[1826],*
*3 K'ê dîtiye aşiq bit, yî bê heval?!*

**S. 13** *1 Werin kesekî me'rîfet li bal,*
*2 Xasêt şêx Adî sekinîbûn xeyal,*
*3 K'ê dîtiye evîndarbit, yî bê heval.*

**S. 14** *1 Aşiqê pesta hene,*
*2 Ji taliyê deng dikene,*
*3 Ew nizanin r̂oja axretê, ew di ker̂, di korene.*

**S. 14** *1 Evîndarê pesta hene,*
*2 Ji taliye deng dikene,*
*3 Ew nizanin r̂oja axretê ew di ker̂ di korene.*

[1825] *xudan*
[1826] *xîyal*

**S. 15** *1 Aşiqêt pesta di zavin,*
*2 Hawîr dorî wan ĥemû şebek û davin,*
*3 Ew nizanin r̂oja axretê, ew di ker̂î, kore, bê ĉavin.*
**S. 15** *1 Evîndarêt pesta di zavin,*
*2 Hawîr dorî wan ĥemû şebek û davin,*
*3 Ew nizanin r̂oja axretê ew di ker̂î, kore, bê ĉavin.*

**S. 16** *1 Ewin aşiqêt pesta,*
*2 Venexwar̂îye ji k'asa mesta,*
*3 Sê r̂oja, mezin meydana meleka, bore min di westa.*
**S. 16** *1 Ewin evîndarêt pesta,*
*2 Venexwarîne ji k'asa mesta,*
*3 Sê r̂oja, mezin meydana meleka, borê min diwesta.*

**S. 17** *1 Bore min bê dewlete,*
*2 Di serî da nema ẍîrete,*
*3 Ji gava nema ĥerek'ete,*
*4 E'zîzê min, bîne der ji destê zebênîyêt p'ir̂ ûsfete.*
**S. 17** *1 Borê minî bê dewlete,*
*2 Di serî da nema xîrete,*
*3 Ji gava nema ĥerek'ete,*
*4 Xweşewîstê min, bîne der ji destê zebêniyêt p'ir̂ wesfete*[1827]*.*

**S. 18** *1 Bore min li dine,*
*2 Ĉavî li qetlê, li derewê, li zinê,*
*3 E'zîzê min, ez ditisim, min şermezar biket ji dîwan êt batinê.*
**S. 18** *1 Borê min li gerdûnê,*
*2 Ĉavî li kuştinê, li derewê, li zînê,*
*3 Xweşewîstê min, ez ditirsim, min şermezar biket ji dîwanêt batinê.*

**S. 19** *1 Bore min cahile, ne bedewe,*
*2 Ji min divêt xwerinб û vexwerinб û xewe,*
*3 E'zîzê min yê mezin, mezin meydana meleka, zor ẍedar ewe!*
**S. 19** *1 Borê min cahile, ne bedewe,*
*2 Ji min divêt xwerin û vexwerin û xewe,*
*3 Xweşewîstê min, yê mezin meydana meleka, zor xedar ewe.*

**S. 20** *1 Bore min bergîre, ne k'ehêle,*
*2 Pêra nemaye çu fihêle,*
*3 E'zîzê min, ez ditirsim min şermezar biket ji diwanêt Cebêre.*
**S. 20** *1 Borê min bergîre, ne k'ihêle,*
*2 Pê r̂a nemaye çu k'iryere,*
*3 Xweşewîstê min, ez ditirsim min şermezar biket ji dîwanêt hêzêre.*

**S. 21** *1 Heke zebênî li min huzûrîn*[1828]*,*
*2 Ez ji ber saf û ĥeybetêt wan girîm,*
*3 Ji ber kul û e'melê vê dinyayê (…).*
**S. 21** *1 Heke zebênî li min hizirîn,*
*2 Ez ji ber saf û ĥeybetêt wan girîm,*
*3 Ji ber kul û k'iryare vê gerdûnê………….*

**S. 22** *1 Xelqno*[1829]*, meken bêĵîya,*
*2 Xwe dur biken ji xirabîya,*
*3 Şêx Adî hazire, yî qadire li ĥemû cîya.*
**S. 22** *1 Gelo, meken bêĵiya,*

[1827] *osfet*
[1828] *hizirîn*
[1829] *xelk*

*2 Xwe dur biken ji xirabiya,*
*3 Şêx Adî amedeye, yî bi hêze li ĥemû ciya.*

**S. 23** *1 Heke zebênî li min der hatin,*
*2 Xêr û gunehyêt min k'êşane ber mîrê mezin (pisatin),*
*3 Heke xêr û gunehyêt min k'êşan, gunehyêt min ĥeft cara li xêra der hatin.*
**S. 23** *1 Heke zebênî li min dihartin,*
*2 Xêr û gunehêt min k'eşane ber mîre mezin pisatin,*
*3 Heke xêr û gunehêt min k'êşan, gunehêt min ĥeft cara li xêra der hatin.*

**S. 24** *1 Xwedê wê bike xêr k'ar li xêre,*
*2 T'eftîş biken gunehêt mêra,*
*3 Heke xêr û gunehêt min k'êşan gunehêt min ĥeft cara der derk'eftin bi xêra.*
**S. 24** *1 Xwedê wê bike xêrk'ar li xêre,*
*2 Teftêş biken gunehê mêra,*
*3 Heke xêr û gunehêt min kê'şan, gunehet min ĥeft cara derk'eftin bi xêra.*

**S. 25** *1 Ĥalê min xalê cara,*
*2 Min ji destê zebênîya gazî û haware,*
*3 Ne sed xwezika gunehk'ara!*
**S. 25** *1 R̂ewşa min, r̂ewşa cara,*
*2 Min ji destê zebêniya gazi û haware,*
*3 Ne sed xwezika gunehk'ara.*

**S. 26** *1 Ĥalê min xalê ĥesene,*
*2 Zebênî tên ji min pirs dikene,*
*3 Bêjne min, gelo te birayê axretê hene?*
**S. 26** *1 R̂ewşa min, r̂ewşa ĥesene,*
*2 Zebênî tên ji min pirs dikene:*
*3 «Bêjine min, gelo te biraye axretê hene?»*

**S. 27** *1 Min go: «Il-ĥemdillah ez bi bira me,*
*2 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birêt axretê ezî melle me,*
*3 Li ser navû dik'arê şêx Adî, şîrinî şerîf*[1830] *ezî mita me.*
**S. 27** *1 Min go: «Mala Xwede ava, ez bi bira me,*
*2 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birêt axretê ez melle me,*
*3 Li ser nav û dik'are şêx Adî, şîrinî*[1831] *şerîf*[1832] *ezî mita me.*

**S. 28** *1 Kêlekî ezî wa bûm,*
*2 Bi keyfa xwe ezî şa bûm,*
*3 Bi navû dik'arê silt'an Êzî ezî mita bûm.*
**S. 28** *1 Kêlekê ezî wa bûm,*
*2 Bi keyfa xwe ezî şabûm,*
*3 Bi navû dik'are silt'an Êzî ezî mita bûm.*

**S. 29** *1 Ewe r̂oja pê p'ira,*
*2 Pêşîya me agire,*
*3 Ewê r̂ojê silt'an Êzî bo me mefere.*
**S. 29** *1 Ewe r̂oja pê p'ire,*
*2 Pêşîya me agire,*
*3 Ewê r̂ojê silt'an Êzî bo me mefere.*

**S. 30** *1 K'eftime bextê wî silt'anî,*

---

[1830] *şirîf*

[1831] *şirîn*
[1832] *şirîf*

*2 Xaliqo, tu çendî r̂êzanî,*
*3 Ji xiwar ĥeta bi banî,*
*4 Ji e'rda ĥeta bi e'zmanî,*
*5 Silava me muxliqa li xwedanî,*
*6 Li ĥemû derda yî dermanî».*

**S. 30** *1 K'eftime bextê wî silt'anî,*
*2 E'frînero, tu çendî r̂êzanî,*
*3 Ji xiwar ĥeta bi banî,*
*4 Ji e'rda ĥeta bi e'zmanî,*
*5 Silava me afrîne r̂a, li xwedanî,*
*6 Li ĥemû derda yî dermanî.*

**S. 31** *1 Bora înabû, borakî e'rebî ye,*
*2 Û lê dikir zînekî qudretî ye,*
*3 Ĥaca me Zimzime, û mix̂are, û kaniya Sipî ye,*
*4 Ĥace û şik tê nîye!*

**S. 31** *1 Bora înabû, borekî erebî ye,*
*2 Û lê dikir xemilekî hinertî ye,*
*3 Ĥeca me Zimzime, û mix̂are, û kaniya Sipî ye,*
*4 Ĥece û şik tê nî ye,*

**S. 32** *1 Zimzim û qubet il-Bidare,*
*2 Ew K'ursîy ya ji batinê da mi care,*
*3 Ew mek'anê silt'an Êzîdê minî Sore.*

**S. 32** *1 Zimzim û qubet il-Bidore,*
*2 Ew k'ursiya jî batine da bi more,*
*3 Ew ciyê silt'an Êzîdê minî Sore.*

**S. 33** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî Ekber,*
*2 K'ursîy ya silt'an Êzî sekinîbû li ser,*
*3 Li ber sekinîn ĥeftî ĥezar qelender,*
*4 Mor ji k'esk û sor û sipî û r̂eş li ber,*
*5 Jê tê bêhna xweş bixur, û misk, û enber.*

**S. 33** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî mezin,*
*2 K'ursiya silt'an Êzî sekinibû li ser,*
*3 Mor ji k'esk, û sor, û sipî, û r̂eş li ber,*
*4 Jê tê bêhna bixûr, û misk, û enber.*

**S. 34** *1 Ji muĥbeta*[1833] *xwe diger̂înin k'as,*
*2 K'as ji qudretê, dur̂ ji dur̂eke almas,*
*3 Silt'an Êzî da dolaba P'adşê minî r̂ênas.*

**S. 34** *1 Ji evîna xwe diger̂înin k'as,*
*2 K'as ji hinerê, dur̂ ji dur̂eke almas,*
*3 Silt'an Êzî da dolaba P'adşê minî r̂ênas.*

**S. 35** *1 Me li wê dîbû xweşî û şayî,*
*2 Def û şibab, tenbûr, û mux̂enî*[1834]*, û ax̂eler*[1835]*,*
*3 Silt'an Êzî hasil bike çîqas miraz dixwez.*

**S. 35** *1 Me li wê dîbû xweşî û şayî,*
*2 Def û şibab, tenbûr, û mux̂enî, û ox̂ler,*
*3 Silt'an Êzî bi destxe çiqas miraz di xwer*[1836]*.*

**S. 36** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî Celal,*
*2 Ĥeftî ĥezar qelenderî li bal,*

---

[1833] *mehbet*
[1834] *mox̂nî*
[1835] *ax̂ler*
[1836] *dixwez*

*3 Nûr ji k'esk, û sor, û sipî, û r̂eş al.*

**S. 36** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî Celal,*
*2 Ĥeftê ĥezar qelenderî li bal,*
*3 Nûr ji k'esk, û sor, û sipî, û r̂eş al.*

**S. 37** *1 Ji yê r̂eş xumar … ,*
*2 Jê tê bêhna xweş sosin, û beyîbun, û r̂eş r̂îhan,*
*3 Dîsan li ser qedemgeha r̂awestan,*
*4 Hilê r̂eş li bejna wan.*
*5 Go: «Bila bên xwedan îman, xwedan erk'an.*
*6 Biçîn dîwana silt'an Êzî bikeyîn seyran».*

**S. 37** *1 Ji yê r̂eş xumar …. ,*
*2 Je tê bêhna xweş, sosin, û beybûn, û r̂eş r̂îhan,*
*3 Dîsan li ser qedemgeha r̂awestan,*
*4 Cilê r̂eş li bejna wan,*
*5 Go: «Bila bên xwedan îman, xwedan erk'an,*
*6 Biçin dîwana silt'an Êzî bikeyn seyran».*

**S. 38** *1 Çî seyraneke hoye bi nûr,*
*2 K'as li nav wan diger̂iyan şerab il-tiĥûr,*
*3 K'as ji qudretê, dur̂ ji dur̂eke feẍfur*[1837]*,*
*4 Silt'an Êzî da destê P'adşê minî ẍefur.*

**S. 38** *1 Çî seyraneke hoye bi nûr,*
*2 K'as li nav wan diger̂êyan şîrav ji nûr,*
*3 K'as ji hinêre, dur̂ ji dur̂eke fexûr,*
*4 Silt'an Êzî da destê P'adşê minî dibihûr.*

**S. 39** *1 Min li wê dîbû xweşî û şayî,*
*2 Def û şibab, t'embûr,*
*3 Muẍenî, û aẍeler, ew jî dêçîne ĥezreta silt'an Êzî ĥal û mişur.*

**S. 39** *1 Min li wê dîbû xweşî û şayî,*
*2 Def, û şibab, û tenbûr,*
*3 Muẍenî û oẍler, ew jî dêçine hizreta silt'an Êzî ĥal û misûr.*

**S. 40** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî r̂ênas,*
*2 Li ber sekinî ĥeftî ĥezar qelender û xas,*
*3 Nûr ji k'esk, û sor, û sipî, û r̂eş li bas.*

**S. 40** *1 Ez birime dîwana P'adşê minî r̂ênas,*
*2 Li ber sekinî ĥeftê ĥezar qelender û xas,*
*3 Nûr ji k'esk, û sor û sipî û r̂eş li bas.*

**S. 41** *1 Dîsan li ser qedemgeha r̂awestan hilê r̂eşî li bejna wan, êk Xidir, êk Ilyas,*
*2 Muĥbeta xwe digehînin k'as.*

**S. 41** *1 Dîsan li ser qedemgeha r̂awestan cile r̂eş yî li bejna wan, êk Xidir, êk Liyas,*
*2 Muĥbeta*[1838] *xwe digehînin k'as.*

…………………………………………………………………..
…………………………………………………………………..
…………………………………………………………………..

(Ew qewle ne yî t'emame û çend sebeqe ji yê di kuvîne)

---

[1837] *fexfur*
[1838] *muhbet*

## 89. QEWLÊ ÊZÎDÛ MEDHÊ[1839; 1840; 1841; 1842] – QEWLÊ GUL E'MELÊ[1843]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Ji wan mebin gul e'mele, (1 Ji wan mebin gul e'mele,)*
*2 Mek'evin ĥemû kela, (2 Mek'evin ĥemû kele,)*
*3 Da hûn nebin armancêt qeda û bela. (3 Da hûn ne bine armancêt qeda û bela.)*

**S. 1** *1 Ji wan mebin kul e'mele,*
*2 Mekelin ĥemû kela,*
*3 Da r̂oje axretê we nekin e'melêt qedan û bela.*

**S. 2** *1 Ji wan bin gul t'ifaqe, (1 Ji wan bin gul t'ifaqa,)*
*2 Qesid biken dîwanêt xasa, mehfelêt[1844] çaka, (2 Herne dîwanêt xasa û meĥfelêt çake,)*
*3 Da we ne havêjine zikaka. (3 Da we ne havêjne nav zikaka. )*

**S. 2** *1 Ji wan bibin kul t'ifaqe,*
*2 Qesid biken dîwanêt xasa, mehfelêt çaka,*
*3 Da r̂oja axretê we ne havêjine zikaka.*

**S. 3** *1 Bi silt'an Êzî bideyn medehê, (1 Bi silt'an Êzî didem medehê,)*
*2 Serxweş[1845] kirim bi wê qedehê , (2 Serxweş[1846] kirim bi wê qedehê,)*
*3 Xelat kirim bi stêra sibehê. (3 Xelat kirim bi stêra sibehê.)*

**S. 3** *1 Emê bi silt'an Êzî bideyn medehê,*
*2 Lalişê xwedanê qubehê*
*3 Sarxweş kirim bi wê qedehê,*
*4 Xelat kirim bi stêra berê sibehê.*

**S. 1** *1 Êzîd didim[1847] medehe[1848],*
*2 Lalişe xwedanê[1849] qubê,*
*3 Xelat kirim stêra sibê.*

**S. 1** *1 Êzîd didim medhê[1850],*
*2 Lalişe, helêle xwedanê[1851] qubê,*
*3 Ez xelat kirim steyra sibê.*

**S. 4** *1 Bi stêra sibehê ez xelat kirim, (1 Bi stêra sibehê xelat kirim,)*
*2 Bi sê ĥerfa xebîr kirim, (2 Bi sê ĥerfa xebîr kirim,)*
*3 Hatîme û r̂abihurim[1852]. (3 Hatime û dê r̂abihurim[1853].)*

**S. 4** *1 Bi stêra berê sibehê ez xelat kirim,*
*2 Bi wê ĥerfê xebîr kirim,*
*3 Ez hatîme r̂abihurim.*

**S. 2** *1 Xelat kirim stêra sibê,*
*2 Sê ĥerfa qebûl kirim, ez hatime r̂abe,*
*3 R̂abirim, birime pêşe,*
*4 Von ĥerfa[1854] dikim t'evt'êşê[1855].*

**S. 2** *1 Steyra sibê xelat kirim,*
*2 Sê ĥerfa ez xebîr kirim,*
*3 Ez hatim r̂abuhurim.*

---

1839 [2] QEWLÊ GUL E'MELÊ = QEWLÊ ÊZÎD Û MEDHÊ (rr. 914–918)
1840 [2] QEWLÊ ÊZÎD QEWLÊ ÊZÎD Û MEDHÊ (rr. 919–921)
1841 [31] QEWLÊ ÊZÎD Û MEDHÊ (rr. 24–27)
1842 [29] QEWLÊ SILT'AN ÊZÎD (rr. 314–318) (№ 1680)
1843 [52] QEWLÊ GUL E'MELÊ (rr. 172-176)
1844 *meĥfel*
1845 *sarxoş*
1846 *serxoş*
1847 *dudo*
1848 *medeye*
1849 *xudan*
1850 *medê*
1851 *xudan*
1852 *rabuhirim*
1853 *r̂abuhir*
1854 *vê herfê*
1855 binêr: *t'eftîş*

**S. 5** *1 Hatîm we r̂a bihurim, biçime pêş, (1 Hatim, û r̂abihurîm, û hatime pêş,)*
*2 Li wê ĥerfê bikem t'eftêş, (2 Li wê ĥerfê bikem t'eftêş,)*
*3 Wê ĥerfê ji hevkirin Ĥeşem û Qurêş. (3 Ew ĥerfa ji hev kirîn Ĥeşem û Qurêş*[1856]*.)*

**S. 5** *1 Ez hatîme we r̂a buhêrim, herme pêş*
*2 Wê ĥerfê dikeme t'eftêş,*
*3 Ji hev dikirin Ĥeşem û Qurêş.*

**S. 3** *1 Ezê r̂abim her̂me pêş,*
*2 Wê ĥerfê dikim t'eftêş*[1857]*,*
*3 Ĥerfa ji hev*[1858] *dikirin Heşam, Kurêş*

**S. 6** *1 Ĥeşem û Qurêş ji hev dikire, (1 Ĥeşem û Qurêş ji hev ve dikirin,)*
*2 Qal û qîl çêdikire, (2 Qal û qîl jê çêdikirin,)*
*3 Feqîr di mixfî bûn, dahir dikire. (3 Feqîr di mixfî*[1859] *bûn, dahir dikirin.)*

**S. 6** *1 Heşem û Qurêş ji hev ve dikirin,*
*2 Qal û qîl li wê dikirin,*
*3 Feqîr di mixfî bûn, dahir dikirin.*

**S. 3** *1 Ji hev kirin Ĥeşem*[1860]*, Qurêşe*[1861]*,*
*2 Ĥeşem, Qurêşe ji hev kirin,*
*3 Sê ĥerfa qebûl kirin,*
*4 Qal, qîl di hev kirin,*

**S. 4** *1 Heşam, Kurêş ji hev dikirin,*
*2 Qal û qîr beher dikirin,*
*3 Feqîr hîngê*[1862] *mekîn(?)*[1863]*dikirin.*

**S. 7** *1 Wekî feqîr di mixfî*[1864] *bûn, (1 Wekî feqîr di mixfî bûn,)*
*2 Bi ya xwe di r̂azî bûn, (2 Bi k'arê xwe di r̂azî bûn,)*
*3 Bi silt'an Êzî r̂a li veĥdenî*[1865]*bûn. (3 Bi silt'an Êzî r̂a di weĥdanî bûn.)*

**S. 7** *1 Wekî feqîr di mixfî bûn,*
*2 Bi ya xwe di r̂azî bûn,*
*3 Belê li gel siltan Êzî di veĥdenî bûn.*

**S. 3** *5 Xaliqê feqîr mixfî*[1866] *kirin,*
*6 Feqîre mixfîne r̂êya*[1867]*xwe r̂azîne,*
*7 Destê silt'an Êzîd da we'danîne.*

**S. 5** *1 Feqîra û mekîne(?),*
*2 Ĥeq r̂îya xwe r̂azîne,*
*3 Dest silt'an*[1868] *Êzîd da we'danîne.*

**S. 8** *1 Feqîr dahir bûne û nasebirin, (1 Feqîr dahir bûn û nasebirin,)*
*2 P'ir̂ bûne û nasebirin, (2 Pê bûne û nadebirin,)*
*3 Lew silt'an Êzî bêxof ji vê dinyayê kêm kirin. (3 Lew silt'an Êzî bê xof ji vê dinyayê kêm kirin.)*

**S. 8** *1 Feqîr dahr bûne nasebirin,*
*2 P'ir̂ bûne, na hêşirin,*
*3 Lew siltan Êzî xwedanêt k'ifira ji vê dinyayê kêm kirin.*

**S. 4** *1 K'ivş bûne, nasebirin,*
*2 Dahir*[1869] *bûne, na e'şirin,*
*3 Silt'an Êzîd xwedanê xofa kêm dikirin.*

---

1856 *Qerêş*
1857 *t'emtêş*
1858 *jev*
1859 *muxfî*
1860 *heşem*
1861 *kurêş*
1862 *hingê*
1863 *midqîn*
1864 *muxfî*
1865 *weĥdanî*
1866 *mifqî*
1867 *riya*
1868 *sultan*
1869 *deher*

**S. 6** *1 K'ivş bûme nasebirim,*
*2 Dahir[1870] bûme nasit'irim,*
*3 P'adşayê min r̂ê û me'nî ẍafila[1871] kêm dikirim.*

**S. 7** *1 Zemanê berê webû,*
*2 Dila da xof, eşq, îman hebû,*
*3 Ĥeĉka wan digot her ew bû.*

**S. 9** *1 Bêjme we xwedanêt Te'alîya, (1 Dibêjime we xwedanêt Te'alya,)*
*2 Li ber xwe biken sualîya[1872], (2 Li ber xwe biken sulya[1873],)*
*3 Qest bikene dîwanêt E'dewîya, (3 Qest biken dîwanêt E'deviya,)*
*4 Li wê bibînin xweşî[1874] û şahîya[1875]. (4 Li wê bibînin xweşî û şadya.)*

**S. 9** *1 Bêjme we xwedanêt Te'alîyan û tengîya,*
*2 Li ber xwe biken sualîya,*
*3 Qest bikene dîwanêt xasan û E'dewîya.*

**S. 5** *1 Xwedanê xofa Te'aliya[1876],*
*2 Hûn werin vergirin sualiya[1877],*
*3 Dest bigrin[1878] dîwanê E'deviya[1879],*
*4 Ji wê bibînin şayan, xweşiya[1880],*

**S. 8** *1 Dibêjime[1881] we xwedanê Te'alîya[1882],*
*2 Welger̂în e'silîya,*
*3 Her̂ne dîwanê E'debiya,*
*4 Hûnê wê bibînin[1883] xweşî[1884] û şaya.*

**S. 10** *1 Xweşî û şayîya li wê bibînin, (1 Xweşî û şadya li wê bibînin,)*
*2 Xwe ji r̂êya Ĥeq mehêvişînin, (2 Xwe ji r̂êye ĥeq mehêvişînin,)*
*3 Amanet[1885] li we di kem mal li van wara namînin. (3 Amanet[1886] îman, mal li van wara namînin.)*

**S. 10** *1 Xweşîyan û şahîya li wê bibînin,*
*2 Xercîya ĥeqê mehêbişînin,*
*3 Bêjme we mal, me li van wara namînin.*

**S. 6** *1 Şayan, xweşiya li wê bibînin,*
*2 Mal wan wara namînin,*
*3 Serê xwe r̂êya silt'an Êzîd nehêwişînin.*

**S. 9** *1 Xweşî û şaya hûnê wê bibînin,*
*2 Ĥeq r̂îya dînê silt'an şêx Adî newêşînin,*
*3 Me mal nemînin wan wara.*

**S. 10** *1 Feqîre sit'are,*
*2 Feqîre û miskîne[1887],*
*3 Ĥeq r̂îya dînê silt'an şêx Adî mewêşîne.*

**S. 11** *1 Mal namînin li van wara, (1 Mal namînin li van wara,)*
*2 Pêşîya xwe vir̂êken pêş bara, (2 Li pêşîya xwe vir̂êken pêş bara,)*
*3 Feqîrî heye sit'are. (3 Feqîr herî sit'ara.)*

---

[1870] *deher*
[1871] *xafil*
[1872] *sulîya*
[1873] binêr: *sulh*
[1874] *xoşî*
[1875] binêr: *şayî*
[1876] *teliya*
[1877] *siliya*
[1878] *bikin*
[1879] *e'dewiya*
[1880] *xoşiya*
[1881] *divêjime*
[1882] *te'lîya*
[1883] *bivînin*
[1884] *xoşî*
[1885] *emanet*
[1886] *emanet*
[1887] *mekîn*

**S. 11** *1 Bêjme we xwedanêt kevnan*[1888] *û k'ara,*
*2 Pêş xwe viȓêken pênc bara,*
*3 Belê feqîrî heye sit'are.*

**S. 7** *1 Mal naminin li wan wara,*
*2 Xwedanê kevnan k'ara,*
*3 ………………………….(?)*

**S. 11** *1 Me mal nebînin wan wara,*
*2 Pêşîya xwe veȓêkin pênc mala,*
*3 Feqîre sit'are.*

**S. 12** *1 Feqîrî heye denge, (1 Feqîr herî bi denge,)*
*2 Dengekike û ĥezar ȓenge, (2 Denge û ĥezar ȓenge,)*
*3 Me ĥemû*[1889] *more li ser ȓenge. (3 Me ĥemû more li ser ȓenge.)*

**S. 12** *1 Feqîrî heye denge,*
*2 Dengeke û ĥezar ȓenge,*
*3 Me ĥemûwa li ser bû cenge.*

**S. 8** *1 Feqîr heye denge,*
*2 Deng dike ĥezar ȓenge,*
*3 Ĥemûye mor ser zenge.*

**S. 12** *1 Feqîre bi denge,*
*2 Her dengekî ĥezar ȓenge,*
*3 Ĥemû mora P'adşayê minî serzenge.*

**S. 13** *1 Ser ȓenga me ĥemû wa more, (1 Ser ȓenga me ĥemû more,)*
*2 Hincî ciwanê nefsa wîye xware, (2 Hincî ciwanê nefsa wêye xare*[1890]*,)*
*3 Ew diçe ĥezreta silt'an Êzîdî minî Sore. (3 Ew diçe hizreta silt'an Êzîdê minî sore.)*

**S. 13** *1 Li ser ceng me ĥemû wa more,*
*2 Hincîyê nefsa wî li xware, ne li zore,*
*3 Bêşik dêçite ĥezreta silt'an Êzîyê minî Sore.*

**S. 9** *1 Ser renge*[1891] *ĥemûya more,*
*2 Cahilê nefsa*[1892] *wî xare, ne li jore,*
*3 Ĥizreta wî silt'an Êzîdê Sore.*

**S. 13** *1 Serzengîya ĥemîya more,*
*2 Herçî kesê nefsa wî xare, ne li jore,*
*3 Ew naçe ĥizreta Êzîdê sore.*

**S. 14** *1 Ĥezretê xwendim ĥezretê, (1 Hizretê xwendim hizretê,)*
*2 Hincîyê li qap'îya şêx Adî û melik şêx Sin biket xilmetê û ibadetê*[1893]*, (2 Hincîyê li qap'iya şêx Adî û melik şêx Sin biket xilmetê û ibadetê*[1894]*,)*
*3 Silt'an Êzî maş û berat'e didetê ji xizîna qudretê. (3 Silt'an Êzî maş û berat'a didetê li xizîna qudretê.)*

**S. 14** *1 Hizretê xwe dikem hizretê,*
*2 Hincîyê li ber qap'îya şêx Adî û melik şêx Sin bike xiimetê, bik'êşe ibedetê,*
*3 Dinê, Siltan Êzî maş û berat'e wan bişîne ji xizîna qudretê.*

**S. 14** *1 Mîr dixandin vê hidretê,*
*2 Herçî qap'îya silt'an şêx Adî bike xizmet, ibadetê,*
*3 Maş û dera dide xezîna qudretê.*

**S. 15** *1 P'adşayê minî delîl û alîm, (1 P'adşayê min delîl êlim,)*
*2 Ez berbi wêrim, (2 Ezî ber li wêlim,)*
*3 Bi qesrê venîya sêlim. (3 Bi qesrê ve îna sêlim.)*

---

1888 *kewnan*
1889 *hemû*
1890 *xor*
1891 *xeng*
1892 *nevis*
1893 *ebadet*
1894 *ebadet*

**S. 15** *1 P'adşayê mino li dinê alîm[1895],*
*2 Ez gelekî berbi wêrim,*
*3 Bi qesrê venîya sêlim.*

**S. 10** *1 E'lima yî bin wêlo,*
*2 Qasidê e'limiya[1896] [y]î sêlo,*
*3 Sêlim qasidê e'limiya.*

**S. 15** *1 E'limayî ilm,*
*2 Cahilayî bin ilm,*
*3 Qesrê hilanîm sêlim.*

**S. 16** *1 Sêlim bi qesrê veynîya, (1 Silt'an bi qesrê ve înîya,)*
*2 Kul eve we lê şidîya, (2 Kela va we lê şidîya,)*
*3 Îlaĥîo, Tuyî mişurî li ĥemû cîya. (3 Îlaĥîo, Tuyî mişurî li ĥemû cîya.)*

**S. 16** *1 Sêlim bi qesrê venîya,*
*2 Kulabe we lê şidîya,*
*3 Îlaĥîo, Tuyî mişurî li ĥemû e'rda, li ĥemû cîya.*

**S. 11** *1 Heçî ser r̂êye şêx Adî û melik şêx Sin diçîya,*
*2 Girîvanê[1897] lê şidîya[1898],*
*3 Silt'an Êzîd mişûre ĥemû cîya.*

**S. 16** *1 Sêlim qesrê hêlanîya,*
*2 Girîvan bû lê şidîya,*
*3 Silt'an Êzîd mişûr bû ĥemû cîya.*

**S. 12** *1 Silt'an Êzîd ĥemû ciya mişûre,*
*2 Nêzîke, ne [yî] dûre,*
*3 Xewasê[1899] beĥrê[1900] k'ûr̂e.*

**S. 17** *1 Ew bûn qesra zêr̂î tê, (1 Ew bû qesra izêr̂î tê,)*
*2 Derxet û bêrî tê, (2 Derxet û bêrî tê,)*
*3 Xulam û cêrî tê. (3 Xulam û cêrî tê.)*

**S. 17** *1 Qesra e'zîzî tê,*
*2 Destxet û bêrî tê,*
*3 Xulam û cêrî tê.*

**S. 17** *1 Xet û izêrî tê,*
*2 Destxet û bêrî tê,*
*3 Xeta mi jêrîn tê.*

**S. 18** *1 Xulam û cêrî zor qumaşe, (1 Xulam û cêrî zor qumaşe,)*
*2 Ewin cindîyêt ji nûra P'adşa, (2 Ewin cindîyêt ji nûra P'adşa,)*
*3 Silt'an Êzî ji dîwana xwe bora dişîne debir û maşe. (3 Silt'an Êzî ji dîwana xwe bora dişîne debir û maşe.)*

**S. 18** *1 Xulam û xêrî zor qumaşe,*
*2 Ewin cindîyêt nûrî P'adşe,*
*3 Dîwana silt'an Êzî bi bora yê bi ser û maşe.*

**S. 18** *1 Xeta min zor qumaşe,*
*2 Cindîyê nûranî base,*
*3 Her sibe xezîna qudretê jê dertê maşe.*

**S. 19** *1 Li wan qesra, li wan sûka, (1 Li wan qesra, li wan sûka,)*
*2 Li wan mifte, li wan sindirûka, (2 Li wan mifta, li wan sindirûka,)*
*3 Îlaĥîo, ezî mişt'aqim[1901] cotêt nu bûka! (3 Îlaĥîo, ezî mişaqim canêt nu bûka.)*

**S. 13** *1 Wan qesira, wan sûka,*

---

[1895] *êlim*
[1896] *êlim*
[1897] *girevan*
[1898] *şîdiya*
[1899] *qewas*
[1900] *be'r*
[1901] binêr: *muşt'aq*

2 *Wan mifta, wan sindirûka*[1902],
3 *Em ĥeyrî*[1903] *cotê bûka.*

**S. 19** 1 *Qesran û sûka,*
2 *Miftan û sindirûka,*
3 *Dilo, jaro, moĥt'acê cotêd bûka.*

**S. 14** 1 *Cotê bûka zor qumaşin,*
2 *Ewe cindî hûra başin,*
3 *R̂ojê sê cora diçine dîwana şêx Adî, wana r̂a tên dewra maşin.*

**S. 20** 1 *Ewin bûkêt t'ebabe, (1 Ewin bûkêt t'ebaba,)*
2 *K'etine ber periyan û ĥisaba, (2 K'etne ber perîyan û ĥisaba,)*
3 *Me dîtin zava û birazava. (3 Me dîtin zava û birazaba.)*

**S. 20** 1 *Ewin bûkêd t'evayî,*
2 *R̂ûniştine ber p'erîyan û ĥesava*[1904],
3 *Têda hene zava*[1905] *û benazava.*

**S. 21** 1 *Zava û birazava şeşin, (1 Zava û birazaba şeşin,)*
2 *Bi çona xwe di serxweşin, (2 Bi çona xwe di ser xweşin,)*
3 *Ne e'cêbe, hin di sipîne, û hin di r̂eşin. (3 Ne e'cêbe, hin sipîne, hin r̂eşin.)*

**S. 21** 1 *Zava û benazava şeşin,*
2 *Çûyîna xwe k'êfxweşin,*
3 *K'ê dîtîye çende sore, çende sipîne, çende r̂eşin.*

**S. 22** 1 *[Il-]ĥemdillah û şikir, (1 Herdem bêjin [il-]ĥemdillah û şikir,)*
2 *Nav xasêt şêx Adî bûye zik'ir, (2 Di nav xasêt şêx Adî de bûye dik'ir,)*
3 *K'ê dîtîye, dote daye û daye buk'ir! (3 K'ê dîtye, dot da, û daye buk'ir.)*

**S. 17** 1 *Îlaĥîo, te şikir,*
2 *Nava xasê dîwana şêx Adî da bûne dik'ir,*
3 *K'ê dot ĥemed, dayîkî bûne buk'ir*[1906].

**S. 23** 1 *Sibĥane ji te Melikê Semede, (1 Sibĥane ji te melekê Semede,)*
2 *Ewin bûkêt nazik bi ĥede, (2 Ewin bûkêt nazik ĥede,)*
3 *Ne e'cêbe ji bera bi weldin welede. (3 Ne e'cêbe ji bera bibin welede.)*

**S. 16** 1 *Îlaĥîo Semede,*
2 *Ĉi canikê nazik ĥede,*
3 *K'ê ber bedenê bi welide welede?*

**S. 24** 1 *Îlaĥîo me R̂eb*[1907] *il-Semenda,*
2 *Te ẍafilandibû*[1908] *ĥeftê û du milete,*
3 *Ĥîjde ĥezar xulyaqeta*[1909],
4 *K'ê dîtîye meriv ber be[ĥ]ra hilde welada?*

**S. 24** 1 *Destxet ewe Cebêr kirî, (1 Destxet ewe Cebêr kirî,)*
2 *E'rifa we şiro kirî, (2 E'rifa*[1910] *we şira kirî,)*
3 *K'ê dîtiye dote daye û daye mir̂î*[1911]*! (3 K'ê dîtye, dot da, û daye mirî.)*

**S. 25** 1 *Ewin e'rifêt Beẍdayê, (1 Ewan êrîfa beha dayê,)*
2 *Dama bûn li xwe û vê r̂ayê, (2 Dama bûn li xwe û vê r̂ayê,)*
3 *K'ê dîtiye dot şîrî bidete dayê! (3 K'ê dîtye dot şîrî bidete dayê.)*

---

1902 *sindûk*
1903 *heyîr*
1904 binêr: *ĥesab*
1905 *ze'va*
1906 *bikir*
1907 *rebil*
1908 *ĥafilandibû*
1909 *xuleqet*
1910 *êrif*
1911 binêr; *mirîd*

**S. 15** *1 E'rifê[1912] Beẍdayê,*
*2 Hûn werin bikin t'evdîrê[1913] r̂ayê,*
*3 K'ê dît [dot] şîr bide dayê.*

**S. 22** *1 Me hat erifê[1914] Beẍda[y]ê,*
*2 Xwe ĥeyrî bû, xwe we r̂a[y]ê,*
*3 K'ê dîtîye dote şîr bide da[y]ê.*

**S. 26** *1 [Il-]ĥemdillah û şikir, (1 Herdem bêjin [il-]ĥemdillah û şikir,)*
*2 Nav xasêt şêx Adî bûye zik'ir, (2 Di nav xasêt şêx Adî de bûye dik'ir,)*
*3 K'ê dîtîye, dote bida û daye buk'ir! (3 K'ê dîtye, dot bida, û daye buk'ir.)*

**S. 23** *1 Il-ĥemdilllaĥ[1915], şikir,*
*2 Nava dîwana xwedane dera bû navû dik'ir[1916],*
*3 K'ê dîtîye dote ĥemle, make bik'ir[1917]?*

**S. 25** *1 Îlaĥîo, te cebêr dikirî,*
*2 E'lîma r̂ê jê dibir̂î,*
*3 Hadir-gudêra vêk'eve ĉirayê gur̂î,*
*4 K'ê dîtîye dote ĥemleye, zavayî mirî?*

**S. 27** *1 Xizînêt şêx Adî di çep û r̂astin, (1 Xizînêt şêx Adî di ĉep û r̂astin,)*
*2 Mewcêt silt'an Êzî ĥemû[1918] di r̂astin, (2 Mewcêt silt'an Êzî ĥemû di r̂astin,)*
*3 Silt'an Êzî k'ilîl û mifte bi destê xwe di bîr̂astin, (3 Silt'an Êzî k'ilîl û mifte bi destê xwe di birastin,)*
*4 Her kesek li ser kul û e'melê wî diguhastin. (4 Her kesek li ser k'ar û e'melê wî diguhastin.)*

**S. 18** *1 Xezîna ĉep û r̂aste,*
*2 Silt'an Êzîd k'ilît-mifte destê xwe bîr̂aste,*
*3 Ilmê[1919] şêx Adî peva[1920] r̂aste.*

**S. 26** *1 Xezîne ĉep û r̂aste,*
*2 Mala Adiya qewaza[1921] r̂aste,*
*3 Şêx Adî mik'anê[1922] xwe guhaste.*

**S. 19** *1 Lo lema[1923], lo lema,*
*2 Qesira hûr binyane[1924],*
*3 Horî lê r̂awestan[e],*
*4 Hileyî[1925] bejna wan[e],*
*5 Şerabe li k'asane,*
*6 K'as dane ser destane,*
*7 Bir̂êne pêşîya xasane,*
*8 Xasê dîwana şêx Adî lê bûne berîstane[1926],*
*9 Dîwana şêx Adî ĥeqê wan[e].*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*
*T'emametî şêx Adî!*
*R̂eĥme li dê-bavê hostayî!*
*R̂eĥme li dê–bavê guhdarî!*

---

1912 *e'raf*
1913 *t'eyîbîr*
1914 *ie'rif*
1915 *Erĥemdila*
1916 *nav û dik'ir*
1917 binêr*: buk'ir*
1918 *hemû*
1919 *ulm*
1920 *peve*
1921 *qewz*
1922 *mik'an*
1923 *lolema*
1924 *biniyan*
1925 *huleyî*
1926 *baristan*

## 90. QEWLÊ EZDA[1927] — QEWLÊ ÊZDÎD[1928]

**S. 1** *1 Hikmî dikim ĥikyate,*
*2 Şêr xwedanê atqate,*
*3 Hela binêrin Ezda çi r̂ûkî hate r̂û qinyate.*

> **S. 1** *1 Hikmî dikim ĥikyate,*
> *2 Şêr xwedanê atqate.*
> *3 Hela[1929] binêrin silt'an Êzdîd çi r̂ik'inî hate r̂û qinyate.*

**S. 2** *1 Hikmî pê dizanî,*
*2 Pirsê bike min ĥeyranî,*
*3 K'u bû qiseta Mia'wî zemanî.*

> **S. 2** *1 Hikmî pê dizanî,*
> *2 Pirsê bike[1930] mi ĥeyranî,*
> *3 K'u bû qiseta Mia'wî wî silt'anî.*

**S. 3** *1 Mia'wî wê xederê xwe ne da bere,*
*2 Dimesqê[1931] bajarê kir sefere,*
*3 Got: «Maka Ezda Dimesqeyî[1932] înayî dere».*

> **S. 3** *1 Mia'wî wê xederê[1933] xwe ne da bere,*
> *2 Dimeşqê[1934] bajarê kir sefere,*
> *3 Go: «Maka silt'an Êzdîd Dieşqêyî înayî dere».*

**S. 4** *1 Maka Ezda Dimesqeyî r̂ê bû,*
*2 Dajo ber derê Misrê bû.*

> **S. 4** *1 Maka silt'an Êzdîd Dimeşqêyî r̂ê bû,*
> *2 Dajo ber derê Misrê bû.*

**S. 5** *1 Dajo ber derê Misrayê,*
*2 Dem hatîye we'dayê,*
*3 Dahir bûye Ezdayê mine.*

> **S. 5** *1 Dajo ber derê Misrayê,*
> *2 Dem hatîye we'dayê,*
> *3 Dahir bûye silt'an Êzdîdê mine.*

**S. 6** *1 Dahir bûye Êzdayê mine,*
*2 Yî ne biçûke, yî mezine,*
*3 Zor pirsetê giran lê diçine.*

> **S. 6** *1 Dahir bûye silt'an Êzdîdê mine,*
> *2 Ew ne çûke, yî mezine,*
> *3 Zor pirsetê giran lê diçine.*

**S. 7** *1 Jê diçûne zor pirsete,*
*2 A'mê daniye saw, hêwate,*
*3 Zerpane meriya k'eremete.*

> **S. 7** *1 Jê diçine zor pirsete,*
> *2 A'mê danîye saw, hêwate,*
> *3 Zerpane merîye k'iryamete.*

---

[1927] http://www.eziden-celle Qewlê Ezda e.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-08.htm
[1928] [6] (rr. 26–29)
[1929] *hila*
[1930] *pike*
[1931] *Dîmesqe*
[1932] *Dîmesqe*
[1933] *xedir*
[1934] *Dumişqe*

**S. 8** *1 Sibekê min bû sarî,*
*2 Ezda mekê pirsî,Got:*
*3 «Ĥewalê me li vir çiye?»*

**S. 8** *1 Siwekî li me bû sarî,*
*2 Silt'an Êzdîd make pirsî,*
*3 Go: «Ĥewalê me li vir çîye?»*

**S. 9** *1 «Sibekê me bû sarî,*
*2 Em derxistin kirne wî şarî*[1935]*,*
*3 Em wira bûn, li wan bû ronakî,*
*4 Em derk'etin, li wan bû tarî».*

**S. 9** *1 «Siwekî min bû sarî,*
*2 Em derxistin kirne wî şarî,*
*3 Em li wir bûn, wan bû ronkayî,*
*4 Em derk'etin, wan bû tarî».*

**S. 10** *1 Soro weke p'êto,*
*2 K'î kore, Ezda ne bi wêto.*

**S. 10** *1 Soro weke p'êto,*
*2 K'î kore, silt'an Êzdîd ne bi wêto.*

**S. 11** *1 Ezda derê bacarê pêve tîne,*
*2 Qasidekî Mia'wî û dişîne,*
*3 Got: «Mia'wî, k'erem ke şê[r]siwarek te dixwîne».*

**S. 11** *1 Silt'an Êzdîd derê bacarê pêve tîne,*
*2 Qasidekî Mia'wî û dişîne,*
*3 Go: «Mia'wî k'eremke şê[r]siwarek te dixwîne*[1936]*».*

**S. 12** *1 Got: «Tu bi wî k'î, îlaĥîye,*
*2 Tê pirsê bêjî mi řastîye,*
*3 Ew şêrsiwarê min dixwîne, k'iye?»*

**S. 12** *1 Go: «Tu wî kî, îlaĥîye,*
*2 Tê pirsê bêjî mi řastîye,*
*3 Ew şêresiwarê min dixwîne, ew bi k'îye?»*

**S. 13** *1 Got: «Ez bi wî kim, îlaĥîye,*
*2 Pirsê bêjme te řastîye,*
*3 Ew şêresiwarê te dixwîne, k'îye».*

**S. 13** *1 Go: «Ez wî kim îlaĥîye,*
*2 Pirsê bêjme te řastîye,*
*3 Ew şêresiwarê te dixwîne ew bi k'îye».*

**S. 14** *1 Got: «Ew şêsiwarê te dixwîne, řeng jore,*
*2 Libasê destê wî more,*
*3 Sere min qurbave, hole hole silt'an Ezdayê Sore».*

**S. 14** *1 Go: «Ew şêresiwarê te dixwîne řeng jore,*
*2 Libasê*[1937] *destê wî more,*
*3 Serê min qurbave, hole-hole, silt'an Êzdîdê Sore».*

**S. 15** *1 Got: «Ew şêresiwarê te dixwîne, řeng meste,*
*2 Řimeke k'eske-sore li deste,*
*3 Atqat ferwara min, têk'eve deste».*

**S. 15** *1 Go: «Ew şêrsiwarê te dixwîne, řeng meste,*
*2 Řimeke k'eske-sore deste,*
*3 Atqat ferwara min t'eve têk'eve deste».*

---

[1935] *şahar*
[1936] *dixûne*
[1937] *livas*

**S. 16** *1 Silt’an Êzdîd go: «Ĥerça dilê min diĥevînin,*
*2 Bira bişînin, maka min Misrayê bînin».*

**S. 16** *1 Ezda got: «Herça dilê min diĥevînin,*
*2 Bira bişînin, maka min Misrayê bînin».*

**S. 17** *1 Qazî, melle dikire r̂ay,*
*2 Qasidek sandine Misrayî,*
*3 Hildabûn, înabû dayî.*

**S. 17** *1 Qazî, melle dikire r̂ay,*
*2 Qasidek şandine Misrayî,*
*3 Hildabûn, înabû dayî.*

**S. 18** *1 Hildabû înabû male,*
*2 Qazî, melle r̂abûn hatine bale,*
*3 Got: «Ezda, eve çi giliye, çi ĥewale».*

**S. 18** *1 Hildabû, înabû male,*
*2 Qazî, melle r̂abûn[1938] hatine bale,*
*3 Go: « Silt’an Êzdîd, eve çi gilîye, çi ĥewale?»*

**S. 19** *1 Go: «P’adşakî mi hebû nav Silt’an bû,*
*2 Diu’lifand u’ilfê vê Qura’nê».*

**S. 19** *1 Go: «P’adşakî mi hebû nav Silt’an bû,*
*2 Diu’lifand u’lfê vê Qura’nê».*

**S. 20** *1 Got: «Me’niyê wane cot bûn,*
*2 Ew r̂ûnistibûn digotibûn,*
*3 Ezda yek çarê wan digotibûn».*

**S. 20** *1 Go: «Me’nîyê wane cot bûn»,*
*2 Ew r̂ûniştibûn, digotibûn,*
*3 Silt’an Êzdîd yek care wan digotibûn».*

**S. 21** *1 Me’niya wana vane,*
*2 Çend qane k’as û badî mane.*

**S. 21** *1 Me’niyê wane vene,*
*2 Çend qane k’as û badî mene.*

**S. 22** *1 Çend qane k’as û badî pey têne,*
*2 Êx̂lera[1939] sed û bîst û çar ĥezar e’t’ere[1940] lêne,*
*3 Wana jî nav dik’irê Ezda hoye, hoy distrêne.*

**S. 22** *1 Çend qane k’as û badî pey têne,*
*2 Êx̂lera sed bîst çar ĥezar e’t’ere lêne,*
*3 Wane jî nav dikrê silt’an Êzdîd hoye, hoy distrêne.*

**S. 23** *1 Êzda got: «Ĥeça bendê yî e’rifê xulqê, wîne jimêra,*
*2 Mêrê ne li vandera, vandera her̂e».*

**S. 23** *1 Silt’an Êzdîd got: «Ĥeça bendê yî e’rifê xulqê, wîne jimêra,*
*2 Mêrê ne li vandera, vandera her̂e».*

**S. 24** *1 Lengo, serekê lenga,*
*2 Cem xwe bike bena,*
*3 Den ewe, lê here ĥezar r̂enga.*

**S. 24** *1 Lengo, serekê lenga,*
*2 Cem xwe bike bena,*
*3 Den ewe, lê here ĥezar r̂enga.*

---

1938 *ravûn*
1939 *exler*
1940 *êt’er*

**S. 25** *1 Lengo, serekê lengekî,*
*2 Cem xwe bike benekî,*
*3 Den ewe, lê here ĥezar r̂engî.*

**S. 25** *1 Lengo serekê lengekî,*
*2 Cem xwe bike benekî,*
*3 Den ewe, lê here ĥezar r̂engî.*

**S. 26** *1 Got: «Qudreta seyrana wê care,*
*2 Emê sibê milê Ezda bigrin, bavêjne beĥrê».*

**S. 26** *1 Go: «Qudreta seyrana wê care,*
*2 Emê sivê mile silt'an Êzdîd bigrin, bavêne beĥrê».*

**S. 27** *1 Ew sur̂ Ezda e'yan bû,*
*2 Herçar yarê xwe hilanbû*
*3 Nîveka beĥra Şamê dabû, navbû,*
*4 Xwe çadir k'uta bû, xwe ẍeybet[1941] lêdabû,*
*5 Van çadira, van kinyasa,*
*6 Pêşberî me sekiniye xelqê korî, ẍafilî, Xwedê nenasa,*

**S. 27** *1 Ew sur̂ silt'an Êzdîd e'yan bû,*
*2 Herçar yalê xwe hilanbû,*
*3 Nîveka beĥra Şamê dabû, navbû,*
*4 Xwe çadir k'uta bû, xwe ẍeybet lêdabû,*
*5 Van çadira, van kinyasa,*
*6 Pêşberî me sekinîye xelqê korî, ẍafilî, Xwedê nenasa.*

**S. 28** *1 Ezda li cindîyê dîwana xwe dinihêrî,*
*2 Gişke dest yeqîne[1942], qelem zêr̂î,*
*3 Wana jî nobet, nobet k'asê xwe pev duguhêrî.*

**S. 28** *1 Silt'an Êzdîd cindîyê dîwana xwe dinihêrî,*
*2 Gişke dest yeqîne, qelem zêr̂î,*
*3 Wane jî nobet [1943], nobet k'asê xwe pev duguhêrî.*

**S. 29** *1 Ezda nuqtek[1944] daye ser neynûka xwe,*
*2 Daye qazî Siro, qazî Siro vedixware[1945],*
*3 Got: «Ya Mia'wî, zarî sîrîne lê dilî tale».*

**S. 29** *1 Silt'an Êzdîd nuqtek[1946] daye ser neynûka xwe, qazî Şiro vedixware,*
*2 Go: «Ya Mia'wî, zarî şîrine, lê dilî tale[1947]».*

**S. 30** *1 Qazî Siro kire ĥelîmçiyê suhbetê[1948],*
*2 Ezda qazî Siro kire r̂eqasçiyê de'watê,*
*3 Qazî Siro nikare bixwîne vê k'axetê.*

**S. 30** *1 Qazî Şiro kire ĥelîmçîye sovetê suhbetê,*
*2 Silt'an Êzdîd qazî Şiro kire r̂eqasçîyê dawetê,*
*3 Qazî Şiro nikare bixwîne[1949] vê k'axetê.*

**S. 31** *1 Qazî Siro k'axetê xwe t'er[k] bi t'er[k] kirin,*
*2 Qazî Siro k'axezê xwe ker bi ker kirin,*
*3 Nîveka be[ĥ]ra Samê war kirin.*

**S. 31** *1 Qazî Şiro k'axezê xwe ter[k] bi ter[k] kirin,*
*2 Qazî Şiro kexezê xwe ker bi ker kirin,*

1941 *xeybet*
1942 *êqîn*
1943 *navêt*
1944 *nuxte*
1945 *vedixar*
1946 *nuxte*
1947 *te'l*
1948 *sohbet*
1949 *bixûne*

*3 Nîveka beĥra Şamê war kirin.*

**S. 32** *1 Ew deng belayî dinê û a'mê bû*
*2 Got: «Qazî Siro hebû welatê Îslamê,*
*3 Ew jî hate ser anîna dînê Ezda mala Şamê».*

**S. 32** *1 Ew deng belayî dine a'mê bû,*
*2 Go: «Qazî Şirok hebû welatê Îslamê,*
*3 Ew jî hate ser e'yna dînê silt'an Êzdîd mala Şamê».*

**S. 33** *1 Pê R̂eşê, min ĥeyranê*
*2 Beĥrê*[1950] *vegeȓe nefûsa*[1951] *wî silt'anî.*

**S. 33** *1 Pê R̂eşê min Ĥeyranê,*
*2 Beĥrê vegeȓe nefesa wî silt'anê.*

## 91. QEWLÊ ÊZÎD[1952]

**S. 1** *1 Êzîdo dikim medê,*
*2 Laliş helêle xudanê qubê,*
*3 Xelat kirim siteyîra sibê.*

**S. 2** *1 Siteyîra sibê xelat kirim,*
*2 Sê ĥerfa xebîr kirim,*
*3 Ez hatime ȓa bihirim.*

**S. 3** *1 Ez ȓa bûm herme pêş,*
*2 Vê ĥerfê dikim t'ewt'êş,*
*3 Ĥerfa ji hev kirin Ĥeşem, Qurêş.*

**S. 4** *1 Ĥeşem, Qurêş ji hev dikirin,*
*2 Qal û qîr deher kirin,*
*3 Feqîr hingê mit'qîn kirin.*

**S. 5** *1 Feqîre mit'qîne,*
*2 Ĥeq ȓiya xa ȓazîne,*
*3 Destê sult'an Êzîd wedanîne.*

**S. 6** *1 K'ivş bûme, nasebirim,*
*2 Deher bûme nasitirim,*
*3 P'adşayê min ȓê û me'nî xafila kêm dikirin.*

**S. 7** *1 Zemanê berê va bû,*
*2 Dila da xof, ȓem, îman hebû,*
*3 Herĉa digotin ew bû.*

**S. 8** *1 Wê bê zemanekî neçêye,*
*2 Xof, ȓem, îman hilê ji dinêye,*
*3 Birayê bike xeyîbeta birêye.*

**S. 9** *1 Wê bê zemanekî k'ibîre,*
*2 Xof, ȓem, îman ji dila here bîre,*
*3 Mirîdê bike xeyîbeta şêx û p'îre.*

---

[1950] *ber ȓê*
[1951] *nefûs*
[1952] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ ÊZÎD* (rr. 64-68) T'ilbîs 2001

**S. 10** *1 Ew bedîlê der k'evin,*
*2 Ew bedîlê hev k'evin,*
*3 Şêx p'îr û mirîd wê hev şik k'evin.*

**S. 11** *1 Ew bedîlê mêra bibine şike,*
*2 Herĉê kesê qesta mala Adiya damina xerqe bike,*
*3 Sult'an Êzîd mirazê wî li cem xa bike.*

**S. 12** *1 Dibêjime we xudanê te'liya,*
*2 Wergerin e'sliya,*
*3 Herne dîwanê Edeviya,*
*4 Hûnê wê bibînin xoşî û şaya.*

**S. 13** *1 Xoşî û şaya hûnê wê bibînin,*
*2 Heq ȓiya dînê sult'an Êzîd biȟebînin,*
*3 Kes li wan wara namînin.*

**S. 14** *1 Feqîre bi degin,*
*2 Her dengekê ȟezar ȓengin,*
*3 Ȟemû mora P'adşayê minî serzengin.*

**S. 15** *1 Serzengiya ȟemiya more,*
*2 Herĉî kesê nefsa wî xare, ne jore,*
*3 Ew nabe ȟizreta Êzîdê Sore.*

**S. 16** *1 Dixwendin wê hidretê,*
*2 Herĉî kesê qap'iya Êzîd bike e'babetê,*
*3 Maş û dera dide xezina qudretê.*

**S. 17** *1 A'limî êlim,*
*2 Cahilî bin êlim,*
*3 Qesra hilînin sêlim.*

**S. 18** *1 Sêlim qesra hilaniya,*
*2 Girîvanek bû lê şidiya,*
*3 Êzîdê min mişûr bû ȟemû ciya.*

**S. 19** *1 Xet î'zêrî tê,*
*2 Destxet Bêrî tê,*
*4 Xeta wî jorî tê.*

**S. 20** *1 Xeta wî zor qumaşe,*
*2 Cindî nûranî base,*
*3 Her sibe ji xezina qudretê dertê maşe.*

**S. 21** *1 Qesran û sûka,*
*2 Miftan û sindrûka,*
*3 Dilo jaro mat'ecê cote bûka.*

**S. 22** *1 Ew bûkê t'evayî,*
*2 Ȓûniştine ber p'eriyan ȟesaba,*
*3 Têda hene ze'va û benze'va.*

**S. 23** *1 Ze'va û beneze'va şeşin,*
*2 Çûne xa da k'êfxaşin,*
*3 K'ê dizane çende sorin, çende sipîne, çende ȓeşin.*

**S. 24** *1 Me hat ê'rifê benzayê,*
*2 Xa ĥeyîrî bû xa wê r̂ayê,*
*3 K'ê dîtiye dot şîr bide dayê.*

**S. 25** *1 Erĥemdula şikir,*
*2 Nava dîwana xudan nedera da bû şayî û dik'ir,*
*3 K'ê dîtiye dote ĥemile, make bik'ir.*

**S. 26** *1 Îlahiyo te r̂ebil mede,*
*2 Te xafiland ĥeftê û dû milete,*
*3 Ĥeştê ĥezar xuliyaqete,*
*4 Lê k'ê dîtiye meriv ber be'ra hilde evled û velade.*

**S. 27** *1 Îlahiyo te ez cebar dikirî,*
*2 E'lima r̂ê jê bir̂î,*
*3 Hadir, gudêra vêk'eve ĉirayê gur̂î,*
*4 K'ê dîtiye dote ĥemle, ze'vaye mirî.*

**S. 28** *1 Xezîna ĉep û r̂aste,*
*2 Mala Adiya qewza r̂aste,*
*3 Melek Adî mik'an guhaste.*

*T'emametî! R̂eme bavê hostayî!*

## 92. QEWLÊ ÊZDÎNE MÎR[1953]

**S. 1** *1 Sê k'asanî mestim,*
*2 K'asa Sipî di bestim[1954],*
*3 Bi R̂eşî ez dirustim,*
*4 Êzdînê Sor dip'arastim[1955].*

**S. 2** *1 Dip'arastim serfêt giran,*
*2 Bi ĥimeta yarû biran,*
*3 Êzdîn go: «Ez mişûrim li ĥemû derdan.*

**S. 3** *1 Li ĥemû derdan ezî mişûrim,*
*2 Neqaşê neqşê hûrim,*
*3 Berî xet û k'itêb, û deft'er, û mişûrim,*
*4 Ji nêzîkwere, ezî dûrim.*

**S. 4** *1 Ji dûrwere ezî nêzîkim,*
*2 Serfêt giran ne jînkim,*
*3 E'zîzê min, li ba te ne jêkim.*

**S. 5** *1 E'zîzê min, li ba te nasebirim,*
*2 Li fariqetê dê êwirim,*
*3 Li e'lamê[1956] ezî mişterim.*

**S. 6** *1 Mişterîme li e'lamê,*
*2 Hey hêvêno ji muĥbetê,*
*3 Hey r̂êbero ji ĥeqîqetê».*

---

[1953] [1] (pp. 184-187)
[1954] *dipestim*
[1955] *diperistim*
[1956] *e'lem*

**S. 7** *1 Êzdîn go: «Me divê yek dila bike nase,*
*2 Me yarek divê yî xase,*
*3 Silt'an Êzî r̂ênase.*

**S. 8** *1 Min yarek divê Qurêşî be,*
*2 Hey şibheto hî şerîfî*[1957] *be,*
*3 Îlaĥîo, me ne şiblînî ber t'u ademiya.*

**S. 9** *1 Sehîme, ne yî adamîme,*
*2 Ji nuqte*[1958] *ezî Dimeşqîme*[1959]*,*
*3 Ji nizane bi e'sil ez li k'ûme.*

**S. 10** *1 Here bi e'sile, here bi nesebe,*
*2 Hincî canî bi çakî bi e'debe,*
*3 P'adşa bi xwe têda t'elebe».*

**S. 11** *1 P'adşa we dibêjî ye:*
*2 «Êzdîno, bi wî key îlaĥî ye,*
*3 Navê dayîk*[1960] *û babe te çî ye?»*

**S. 12** *1 Ezdin go: «Li we*[1961] *dibême,*
*2 Ne ji babim, ne ji dême,*
*3 Ez ji wê nuqtême,*
*4 Ji hêrame, ji wê tême»*

**S. 13** *1 Her bi wê nuqtê min dikir fitare,*
*2 Min bi silt'an Êzî r̂a vedixwere,*
*3 Lew sur̂êt*[1962] *mixfî, me pê kir dîyare*[1963]*.*

**S. 14** *1 Sur̂êt mixfî me pê dahir kir,*
*2 Ji r̂enga sor û sipî û k'esk û zer kir,*
*3 Sênca şe'rîe'tê me pê ker kir.*

**S. 15** *1 Te çî kire li baẍa şe'rîe'tê,*
*2 Hey hêvêno ji muĥbetê,*
*3 Hey r̂êbero ji ĥeqîqetê,*
*4 Êzdîn go: «Ezî r̂eqas bûm li nav dawetê.*

**S. 16** *1 Li nav wê dawetê ezî r̂eqas bûm,*
*2 Sazbendekî t'eref nas bûm,*
*3 Muĥbê xelqê xas bûm.*

**S. 17** *1 Muĥbê xelqê çak bûm,*
*2 Ne ji bab bûm, ne ji mak bûm,*
*3 Li hatina xwe, ezî mişt'aq*[1964] *bûm.*

**S. 18** *1 Li hatina xwe ezî ĥewceme,*
*2 Bi silt'an Êzî r̂a yî xewleme,*
*3 Ger̂ kesî r̂a xem nemame*[1965]*.*

---

[1957] *şirîf*
[1958] *nuxt*
[1959] *Dimaşqe*
[1960] *dak*
[1961] *law*
[1962] *surêt*
[1963] *diyar*
[1964] binêr: *muşt'aq*
[1965] *— Kes xwe nema —*

**S. 19** *1 Bi xab min ĥerfek dî nav Elêf,*
*2 Min duȓek dî çarçef sedêf,*
*3 Min dayîm ji wê duȓê p'eyda bû bi serêf.*

**S. 20** *1 Ew duȓa safî sedef,*
*2 Ẍafila ji ber girtbû qerf,*
*3 Me dayîm jê p'eyda serf.*

**S. 21** *1 Me dayîm serf jê p'eyda bû,*
*2 Mewcanî ava bû,*
*3 E'rşek pê e'firî, me dil pê mirta bû.*

**S. 22** *1 E'rşek e'firî, me pê kir qeste,*
*2 Mewcanî sermeste,*
*3 Lew sedef berqe, venediweste.*

**S. 23** *1 Bêjme we cewaba ȓast,*
*2 Wekî P'adşê min e'zman pîȓast,*
*3 Şaz û qudûm di navda vediguhast.*

**S. 24** *1 Here bi şaze, here bi qudûme,*
*2 Çî E'rşekî hoy me'lûme,*
*3 Kire îmamê ser çendî mûme.*

**S. 25** *1 Ez disebirim, nasebirime,*
*2 Li a'lemê mişterîme,*
*3 Li farqetê êwirîme,*
*4 Min dît dotê li dû dayê girî.*

**S. 26** *1 Dotê ȓeda da, dayê ȓeda ne da,*
*2 Nav xasêt şêx Adî ȓûniştin p'iȓ wesfete*[1966]*,*
*3 Dayê li dotê şehde da.*

1967 *1 Ew zanayê Beẍdayê,*
*2 Dama bûn li wê ȓayê,*
*3 K'ê dîtiye dot şîr bide dayê».*

**S. 27** *1 Ezdîn go: «Şehde jê yek, ez melik Êzîd,*
*2 Heke dayî ji doteȓa nebû mirîd,*
*3 Dot li wê mabû vaĥîd*[1968]*».*

**S. 28** *1 Ezdîn go: «Heke ez deng bikim, wê bibe k'ubarî*[1969]*,*
*2 Nav xasêt şêx Adî ȓuniştin bi sit'arî,*
*3 Me bi ȓeşve sparî.*

**S. 29** *1 Ȓeş xweş xelate,*
*2 Sipîye li ĥemû derda mife'te,*
*3 Heke bi dahire û batine silt'an şêx Adî atqate.*

*T'emametiya Xwedê*[1970] *û silt'an şêx Adî!*

[1966] *usfet*
[1967] [50] *Qewlê Êzdîne mîr* S. 27 (r.309)
[1968] *wehîd*
[1969] *k'ibar*
[1970] *xudê*

## 93. QEWLÊ ŞIRURA[1971]

**S. 1** *1 Ez dixwînim[1972] şirurekê,*
*2 Ĥeft bacar dîtin li ber şurekê,*
*3 Sêzde alîm dixwînin mişurekê,*
*4 «Saldêre gidindehu mane, sêzde neqila hingiltê».*

**S. 2** *1 Ez dixwînim dik'irekî,*
*2 Ĥeft yar dîtin buk'irekî,*
*3 Ĥeft meleke nijar dikin sikirekî.*

**S. 3** *1 Ez dixwînim cehwerekê,*
*2 Ĥeft xas dixwezin mehderekê,*
*3 Ĥeft meleke safî dikin bêderekê.*

**S. 4** *1 Suȓeke ji suȓêt batinê,*
*2 Sêsed û şêst û şaş alîm têda dikin xwendinê[1973],*
*3 Li ser sekinîye silt'an Êzî, nûra baqî, êkî bi t'inê.*

**S. 5** *1 Li wan dergeha, li wan qap'îya,*
*2 Ĥezreta[1974] lê dibû melik il-Adîya,*
*3 Meleka, mêra ji ber dibir maş û canbeqa, ewe miraza me ĥemîya.*

**S. 6** *1 Me ĥemîya ew miraza xelate,*
*2 Xwezî[1975] silt'an Êzî bihate,*
*3 Bo me ava bikira çendî welate.*

**S. 7** *1 Bo me ava bikira çendî dinê,*
*2 K'ilîl û mifte tên ji xizîna batinê,*
*3 Ew bû[n] cindîyêt silt'an Êzî pê dibûn xinê.*

**S. 8** *1 We'de hatîye dê dahirbit silt'an Êzîyê minî beranî,*
*2 Me li wê dit xweşî û şayî[1976],*
*3 Def û şebab, şaz û qidum, t'embûr, êẍler[1977] û cem,*
*4 Dîwana silt'an Êzî minasibî xasane,*
*5 P'ar tê nîne xelqê[1978] xam, înk'arî.*

**S. 9** *1 Cindîyêt silt'an Êzî, mîr ȓadibin ji p'êye,*
*2 Hincîyê mîrê, ew k'êye,*
*3 Şirê ĥeqîyê li piştêye,*
*4 Yê maşxwer[1979] bit, maşê mîrê xwe[1980] bi ĥelalî dibêye.*

**S. 10** *1 Bêjme we gelî bira bi t'aqete,*
*2 Dê dahirbit Tawisî melek'ê minî milîyak'ete,*
*3 Wê bi destê xwe bişikîne bêraqa şe'rîe'te.*

**S. 11** *1 Heȓin ser bane deng hilînin,*
*2 Navû dik'arê silt'an Êzî, şerîfî[1981] şîrin[1982] bînin,*

---

[1971] [2] (rr. 375–380)
[1972] *dixûnim*
[1973] *xundin*
[1974] *ĥizret*
[1975] *xozî*
[1976] *şahî*
[1977] *aẍler*
[1978] *xelk*
[1979] *maşxor*
[1980] *xo*
[1981] *şirîf*
[1982] *şirîn*

*3 Hiner û k'eremetêt*[1983] *wan şêresiwara bînin.*

**S. 12** *1 E'cêb nemînin wan hinera,*
*2 Dê dahirbit silt'an Êzî, aẍayê misafira,*
*3 Xasa, meydana meleka hol lê dikire.*

**S. 13** *1 Xasa li mezin meydana meleka hol vedaye,*
*2 Dê dahirbit silt'an Êzî, xweş P'adşaye,*
*3 Hal-hala silt'an Êzîde, silt'an Êzî xweş P'adşaye.*

**S. 14** *1 Silt'an Êzî li ẍafila bi ẍezebe,*
*2 Dê ji beĥra derêxe kaniyan û selebe,*
*3 We'de hatîye, dê silt'an vê dinyayê bike êk mesebe.*

**S. 15** *1 We'de hatîye, dê dahirbit melek il-Adî ye,*
*2 P'adşaye min li sinetê bi r̂eĥm* [1984] *ger̂î ye,*
*3 Ewê r̂ojê gur gi dixwaz ji mî ye.*

**S. 16** *1 Gur ji mîyê dixwaze r̂eda yê,*
*2 Ji e'rda ĥeta bi sema yê,*
*3 Oẍlemeke weha giran nayê.*

**S. 17** *1 Oẍlemeke weha giran nîne,*
*2 Bi şayî ya mehdî li zemîne,*
*3 We'de hatîye, dê dahirbit silt'an Êzîne,*
*4 Maş û berat', û xelata ji ẍafila bistîne.*

**S. 18** *1 Ji ẍafila standin maş, û berat', û xelate,*
*2 Bi R̂ojava ĥeta bi R̂ojhilate,*
*3 Xwezî bi wî cîyî, holê dibû misate,*
*4 Lê dibû t'erîqete, lê dibû atqate,*
*5 Lê dibû ĥeqîqete, r̂encune şe'rîe'te.*

**S. 19** *1 Şe'rîe'te r̂encune, şe'rîe'te me'zule,*
*2 Ĥeqîya silt'an Êzî, bi xêre, bi berek'et û nûre.*

**S. 20** *1 T'ezkerek hatîye ji dîwana mîrê mezine,*
*2 Ji şaya, E'debiya momine,*
*3 Dê dahirbit li ser sinetxanê, e'fû bike çendî gune*[1985].

**S. 21** *1 Çî hikmekî weha giran cirîyan,*
*2 Cêşekî giran hev civîyan,*
*3 Leng û berdunek, xilm û înk'ar ji cêşê silt'an Êzî ve vetîyan.*

**S. 22** *1 Silt'an Êzî dibêjite dîwane xwe:*
*2 «Lê mêzekin gelî cindîya, çî hikmekî weha dijware»,*
*3 Silt'an Êzî cêşê xwe şande ser şah û xunk'are,*
*4 Malê ser ĥeqa we, ve dixware,*
*5 Ĥemû*[1986] *li ser k'efa silt'an Êzî, yekî Cebare.*

**S. 23** *1 We dibêje şa[h]ye:*
*2 «Ya silt'an Êzî, çiqas zêr̂ û male min heye,*
*3 Şukrîna me ji navê teye,*
*4 Me ji damena xerqê silt'an Êzî divê sadiq, û îman, û heye'».*

---

[1983] *keramet*
[1984] *reĥm*
[1985] binêr: *guneh*
[1986] *hemû*

**S. 24** *1 We dibêjit xunk'arê R̂amê ye:*
*2 «Ya silt'an Êzî, çiqas zêr̂ û male min henê li vê dinê ye,*
*3 Şukrîna me ji navê teye,*
*4 Me ji damena xerqê silt'an Êzî sadiq, û heye', û îman divêye».*

**S. 25** *1 Silt'an Êzî we bêjîye:*
*2 «Ji mêjwe r̂e min qewl û deft'erê Xwedîye,*
*3 Çendî misilman[1987] ezê keme îşkçîye».*

**S. 26** *1 We dibêje silt'ane:*
*2 «Hikmê mehdî zemane,*
*3 Xeracîya li ser fela hilgire, p'avêje ser misilmana».*

**S. 27** *1 We dibêjit nebîye:*
*2 «Ya silt'an Êzî me ji te hîvîye,*
*3 Xeraca mêrê misilman çîye?»*

**S. 28** *1 We dibêjit silt'ane:*
*2 «Hikmê mehdî zemane,*
*3 Dê dahir be şahê merdane,*
*4 Derman bike birînan û kovane,*
*5 Xeracîya li ser fela hilgire, p'avêje ser misilmana,*
*6 Her serekî dused nisêbîyana».*

**S. 29** *1 Silt'anekî xweş mîre,*
*2 Li herçar kenara k'êşabû şîre,*
*3 Ew kela, ew bacera, standin ji wan xenzîra,*
*4 Da destê wan feqîra.*

**S. 30** *1 Feqîr dibêjin silt'an Êzîde:*
*2 «Hey P'adşayê meyîo cîde,*
*3 Zer da aẍayê mirîda».*

**S. 31** *1 Misre, û T'ewrêze, û Îskendere,*
*2 T'extê lal, û dur̂, û cewahere,*
*3 Kirne (ĥirûbêt) qelendere.*

**S. 32** *1 Misre û T'ewrêze û Subihane,*
*2 T'extê lal, û dur̂, û mercane,*
*3 Kirne (ĥirûbêt) felane.*

**S. 33** *1 Ĥeleb û Îstembûl û Beẍdane,*
*2 T'extê lal, û dur̂, û nîşane,*
*3 Ew kela, ew bacar, bo wan biwe fane,*
*4 Yê serê xwe li ser ĥerfa Êzî dana,*
*5 Yê serê xwe li oẍira dînê xwe dana.*

**S. 34** *1 Silt'an Êzî we deng hiltîne:*
*2 «Hincîyê xatira min tê dibîne,*
*3 Borêjo t'ewlxana bik'işîne,*
*4 Derê cebilxana veke, hila di ser xwe r̂a bik'işîne,*
*5 Fêdeke eşqê silt'an Êzî di virda bi dawîne,*
*6 Bibe guhê beĥra, av nede û vegeȓîne.*

**S. 35** *1 Birine guhê beĥra, av ne dan û vegeȓan,*
*2 Candî, bandî, sehîy, ser selawat,*
*3 Me'zul bû şe'rîe't,*

[1987] *busilman*

*4 Hêsa bû sinet.*

**S. 36** *1 Hatî carşembû a serê Nîsanê,*
*2 Hate min sûka*[1988] *îmanê,*
*3 Hat cewabek ji wê dîwanê,*
*4 Bêjîye: k'ifş bibin k'ihêl û bergîrêt garanê.*

**S. 37** *1 Me û dost, û guhdare bar tê hebe,*
*2 Wê r̂ojê, li wî qewlî li wê mishabetê.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî t̂emame!*

## 94. QEWLÊ MAKÊ[1989]

**S. 1** *1 Min êk divêt pê bizanî,*
*2 Bipirsit ĥale me ĥeyranî,*
*3 Bistirêt qiseta Mia'wî*[1990] *û vî silt'anî.*

**S. 2** *1 Min êk divêt biket vê ĥikyatê,*
*2 Şêro, xwedanê atqatê,*
*3 K'a bêje min, silt'an Êzîd bi çend lewna hatîye r̂ûyê qinyatê?!*

**S. 3** *1 Mia'wî kirî kun û tarî,*
*2 Maka silt'an Êzîd derkir ji şarî,*
*3 Li wan r̂onahîbû, lê dibû tarî.*

**S. 4** *1 Şikir li wan tarî ye,*
*2 Kesekî ji xwe bi zanî ye,*
*3 Zanîba sebeb çî ye,*
*4 Sebeb jî maka silt'anê Êzî ye.*

**S. 5** *1 Maka silt'an Êzî ji şarî bi r̂ê bû,*
*2 Sur̂a silt'an Êzîyê min vê bû,*
*3 Ew ço, berê wê*[1991] *li Besrê bû.*

**S. 6** *1 Ew ço, berê li Besra ye,*
*2 T'emam bû qewl û we'da ye,*
*3 Dê dahirbit Êzîdê me ye.*

**S. 7** *1 Dê dahirbit Êzîdê mine,*
*2 Ew ne yî piçuke, yî mezine,*
*3 Çend wesfet*[1992] *jê diçine.*

**S. 8** *1 Çend jê çobûn zor wesfete,*
*2 Zerb neman k'eremete,*
*3 Li ser a'lemê êxist zor ĥeybete.*

**S. 9** *1 Ehlê Besrayê xêr çobû nike,*
*2 R̂isqê*[1993] *wan xelef cêmike,*

[1988] *sik*
[1989] [2] (rr. 355–359)
[1990] *Mea'wî*
[1991] *wî*
[1992] *ûsfet*
[1993] *r̂izq*

*3 Ĥeramêt*[1994] *wan cat-cat man dike.*

**S. 10** *1 Sê duȓ li min xweya ye*[1995]*,*
*2 Melik şêx Sin E'yn il-Beyza ye,*
*3 Silt'anê Êzîd bi Xweda ye.*

**S. 11** *1 Sê duȓ li min xweya*[1996] *bû,*
*2 Melik şêx Sin E'yn il-Beyzayê bû,*
*3 Silt'anê Êzîd bi P'adşa*[1997] *bû.*

**S. 12** *1 Xeber geȓiya çendî welate,*
*2 Ȓênî silt'an Êzîyê min ji wê vedihate,*
*3 Silt'an Êzîd cidê şêx Berk'ate.*

**S. 13** *1 Li dine û a'lemê bûye dik'ir,*
*2 Dê dahirbit silt'an Êzîyê minî buk'ir,*
*3 Silt'an Êzîd cidê şêxû Bek'ir.*

**S. 14** *1 Babê Ĥewranû şehîda,*
*2 Wê dahir bûyî silt'an Êzîde,*
*3 Atqata min û çendî mirîde.*

**S. 15** *1 Babê Ĥoranû Nûrîdîne,*
*2 Silt'an Êzîd li me'nîya yî şîrine*[1998]*,*
*3 Li gel Mia'wî yî bi k'erbe, yî bi k'îne.*

**S. 16** *1 Mia'wî çobû dîyare,*
*2 Ȓênî silt'an Êzîdê min siware,*
*3 Feqîr sekinîn çar kenare.*

**S. 17** *1 Feqîrêt Comayê deşta Erzenê,*
*2 Ku silt'an Êzîd dahirbû ȓûyê vê dinê,*
*3 Çend E'devî pê dibûn xinê.*

**S. 18** *1 Feqîrêt Comayê li ĉiyayê Ȓeşana,*
*2 Qedrê wan qedirekî girane,*
*3 Dê ji wê tilp'ê ȓa bit bi xwe silt'ane.*

**S. 19** *1 Şame û Besraye ewlade û ĥidaye,*
*2 Çî bacêrekî nazikî let'îfe,*
*3 Tê heyne k'ixme*[1999] *û qedîfe,*
*4 Navê silt'an Êzîdî şîrinî şerîfe*[2000]*.*

**S. 20** *1 Çî Şameke belave,*
*2 Silt'an Êzîd geȓiyabû li nave,*
*3 Li E'deviya ȓon bûn dil û ĉave.*

**S. 21** *1 Çî Şameke li çê ye,*
*2 Lê dahir bû silt'an Êzî ye,*
*3 Atqata min û çendî E'devî ya.*

**S. 22** *1 Çî Şameke li cîde,*

---

[1994] *heremêt*
[1995] *xuyaye*
[1996] *xoya*
[1997] *pedşa*
[1998] *şirîn*
[1999] *kêxime*
[2000] *şirîf*

*2 Dahir bû silt'an Êzîde,*
*3 Atqata min û çendî mirîda,*
*4 Balê mek'anî silt'an Êzîd wê li kaniya Sipî da.*

**S. 23** *1 Çî Şameke li jore,*
*2 K'asek dabû min, bi more,*
*3 Mek'anê silt'an Êzîd qubet il-Bidore.*

**S. 24** *1 Çî Şameke li meĥilî,*
*2 K'asek dabûwe min, sere gelî,*
*3 Mek'anê silt'an Êzîd birka Xwede li Godilî.*

**S. 25** *1 Li nav E'deviya bû dîyare,*
*2 Silt'an Êzîdê min bi P'adşaye,*
*3 Belê k'oĉek cem pê sit'irya.*

**S. 26** *1 Çî şêxekî bi k'ereme,*
*2 Hincî medha jê deme,*
*3 Pê sit'ira bû k'oĉek ceme.*

**S. 27** *1 K'oĉek cem pê sit'ira bi eşqe,*
*2 Ewî k'esk kir dareke ĥişke,*
*3 Ev di îna Şama du bar ĥişke,*
*4 Ya me sinîya îman ser pişke.*

## 95. QEWLÊ QAZÎ ESKER[2001; 2002]

**S. 1** *1 Aşiqo, ne ji vî zemanî,*
*2 Mehfelêt giran hilanî,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt Êzîd û vî silt'anî.*

**S. 2** *1 Aşiqo, mêra û mehfelêt giran deng têyî ye,*
*2 Aşiqo, da bideyn medhêt Êzîd û Xwedê ye.*

**S. 3** *1 Aşiqo, mêr û meleka,*
*2 Aşiqo, da bideyn medhêt Êzîd û Xaliqe.*

**S. 4** *1 Aşiqo, suȓ didî ye,*
*2 Axaftbû ji mehfelêt welî ye,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt şêxê Adî ye.*

**S. 5** *1 Aşiqo, suȓ didîte,*
*2 Axaft bû ji mehfelêt mirîde,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt silt'an Êzîde.*

**S. 6** *1 Aşiqo, yî nûrîne,*
*2 Axaftbû ji mehfelêt zergûne,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt Şemsedîn û melik Fexredîne.*

**S. 7** *1 Aşiqo, yî momine,*
*2 Axaftbû ji mehfelêt mezine,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt melik şêx Sine.*
**S. 6a** *1 Aşiqo, yî mezine,*

---

2001 [2] (rr. 381–384)
2002 S.6a; S.7a; S.8a binêr: [50] *Qewlê qazî Esker* (rr. 356-357)

*2 Axaftbû ji civatet momine,*
*3 Aşiqo,da bideyn medhêt dîwana melik şêx Sine.*

**S. 7a** *1 Aşiqo, yî buk'ir,*
*2 Li gerdune buye dik'ir,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt dêwana şêxû Bek'ir.*

**S. 8a** *1 Aşiqo, yî bi hinere,*
*2 Axaftibû ji mehfelêt babzere,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt dîwana şêx Şemsê[2003] T'et'ere.*

**S. 8** *1 Aşiqo, k'oĉekî p'îra,*
*2 Axaft bû ji mehfelêt mîra,*
*3 Aşiqo, da bideyn medhêt Êzîdû feqîra.*

**S. 9** *1 Aşiqo, derdû mende,*
*2 Hincî mêrê k'ubarî[2004] nefs bilinde,*
*3 Ew dê li oẍlema silt'an Êzî bit hinda.*

**S. 10** *1 Aşiqo, t'emam bû ĥezarû sî ye,*
*2 Hincî mêrê velî ye[2005],*
*3 Aşiqo, yî maş û cenbeqî ye.*

**S. 11** *1 Aşiqo, minû ĥezar diherite,*
*2 A'lem bû cimlete,*
*3 We'de wê hatî, dê silt'an Êzîd t'eslîmî destê feqîra ket maş, û berat', û xete.*

**S. 12** *1 Aşiq mite'lî û ceme,*
*2 Dê dahirbit Îsa bin Miriyeme,*
*3 We'de wê hatî, silt'an Êzî dê betal ket xet, û k'itêb, û qeleme.*

**S. 13** *1 Aşiq mite'lî û cema' ya,*
*2 Dê dahirbit Îsa ya,*
*3 We'de wê hatî, silt'an Êzî dê betal ket k'itêb, û xet, û qelem, û hinda ye.*

**S. 14** *1 Aşiqo, ĥakimê vî şaristanî,*
*2 Dest li kêleka xwe wer anî,*
*3 Got: «Dad û medad ji destê vî silt'anî».*

**S. 15** *1 Aşiqo, wê[y] li qadî û ẍefila,*
*2 Hawara xwe malva dibire,*
*3 Gava ço dîwana silt'an Êzî, wê bit k'ase, û badîye, û kondire.*

**S. 16** *1 Aşiqo, wê[y] li qadî k'ur be,*
*2 Silt'an Êzîd nadet şar be,*
*3 Gava ço dîwana silt'an Êzî, wê bit k'ase, û badîye, û maye.*

**S. 17** *1 Wey li qadî înk'are,*
*2 Hawara xwe malva dihinare,*
*3 Gava ço dîwana silt'an Êzî, dît kiçike li bale,*
*4 Wekî vegeřiyan li male, dit kiçik li male!*

**S. 18** *1 Qedî Esker dibêjite mala xwe bi suře[2006]:*
*2 «Çî hikm hatî ji we řa,*

---

[2003] *şê Şims*
[2004] *k'ibar*
[2005] *welî*
[2006] *sur*

*3 Ma hûn dê êzdî bin bi keç*[2007] *û kuȓe!*

**S. 19** *1 Gelî qadî, û mala, û seyîda,*
*2 Hûn ji îmanê mebin be'îde,*
*3 Min ji ber we şehde da bi silt'an Êzîde».*

**S. 20** *1 Wey li xatûne dota mîra,*
*2 «Gelî qadî, û mala, û seyîda, hûn Xwedêyê xwe meken ji bîre,*
*3 Min ber we şehda*[2008] *xwe da bi Êzîd û feqîra».*

**S. 21** *1 Qedî buxtane,*
*2 Dilê wan girtbû kovane,*
*3 Qedî Esker ȓû diket ahîn û erzinkêt girane.*

**S. 22** *1 Qedî Esker sûka dîçî ye,*
*2 Ji yara xwe pirsî ye:*
*3 «Gelo, ĥal û ĥewal ji destê vî ĥakimî çî ye?»*

**S. 23** *1 Qedî Esker dibêjite yara xwe ye:*
*2 «Ȓevîn bê fayde ye,*
*3 Silt'an Êzî mal û mezal li me kir ye me ye».*

**S. 24** *1 Qedî bê xet û berat'e,*
*2 Berê wî mabû tarî û zilmete,*
*3 Qedî Esker ne mabû çû ĥikyate.*

**S. 25** *1 Qedî Esker bilind ket gatine:*
*2 «Gelî qadî, û mala, û seyîda, û birime ser xêra mine,*
*3 Dêçîne ba silt'an Êzîd bîna dost, nikarîn vê ȓa bîne dijmine.*

**S. 26** *1 Gelî qadî, û mala, û seyîda,*
*2 Çone ba silt'an Êzîde,*
*3 Ya silt'an Êzî, tu şêxî, em mirîde!»*

## 96. QEWLÊ P'ÎR HESEDÊ BOZ[2009]

**S. 1** *1 E'rifa we gu[h]ye,*
*2 P'adşê min her hebûye,*
*3 Nûr bû, nûr lê çûye.*

**S. 2** *1 Ji nûrê, nûr ço,*
*2 Ĥeft derec ço,*
*3 Me xir çal, bîr ne ço.*

**S. 3** *1 E'rifet manê k'ûrin,*
*2 Tê difikirin, ne zorin,*
*3 Şire'tî lê di dûrin.*

**S. 4** *1 Zerbab û derwêşa,*
*2 Kirin t'eftêşe,*
*3 Dilê me êşa.*

**S. 5** *1 Hat cêşê Êzîde,*

---

[2007] *kiç*
[2008] *şada*
[2009] [2] (rr. 552–553)

*2 Ĉavdêr di cîda,*
*3 P'adşê minê Weĥîde.*

**S. 6** *1 Coq-coq werin,*
*2 Let û şîra, r̂ima berin,*
*3 Qizilbêşe tira berin.*

**S. 7** *1 P'îrê Ĥemed xeber dêra,*
*2 Bu al pîre çenkê şêra,*
*3 Sê r̂aher diçûn bêra.*

**S. 8** *1 Hat hewirekî qewî r̂eşe,*
*2 Ser sore, dil qerqeşe,*
*3 Cêşê qizibeşe.*

**S. 9** *1 Sefuetî ne di hinsafin,*
*2 Zorin, di zavin,*
*3 Ît'îqata*[2010] *wan xavin.*

**S. 10** *1 Deng de te wa mêra,*
*2 Bên ĥemû cê k'etîra,*
*3 Bigrin r̂êke bi tîra, bi şêra.*

**S. 11** *1 Çedêra çildîra,*
*2 Sor bûn bi xûna k'afira,*
*3 Wekî kay bay dîre.*

**S. 12** *1 K'êş şîrin*[2011] *şekirtire,*
*2 Ser mahikê dîyartire.*

**S. 13** *1 Mehder P'adşaye,*
*2 Êzdan bi me xweş şaye,*
*3 Me gul t'u kese nemaye.*

## 97. QEWLÊ E'REB BEGÎYA[2012] — QEWLÊ ŞÊX E'REBBEGÎ INT'ÛZÎ[2013; 2014]

**S. 1** *1 Selamû e'lêk'ûm e'reb begîye,*
*2 P'adşayê min êkî ťemam Êzîye.*
**S. 1** *1 P'adşayê min, tuyî yekê ťemam,*

**S. 2** *1 Selamû e'lêk'ûm ya xan silt'anî Êzîde,*
*2 Ẍafila ew sur̂ nedîte,*
*3 Ẍafil di korene, e'silê wan ji ĥedide.*
**S. 1** *2 Silt'an Êzîde, e'lêk'ûm [il-]selam!*
*3 E'silê ẍafila ji ĥedîd,*
*4 Ẍafil kor bûn, ew sur̂ nedît.*

**S. 3** *1 Ẍafil di korene, di r̂û asin,*
*2 Di tûjin weke almasin,*
*3 Ew r̂êya silt'anî Êzîd ĥeq nenasin.*
**S. 2** *1 E'silê ẍafila ji ĥesin,*

---

[2010] *îtqat*
[2011] *şirîn*
[2012] [2] (гг. 385–389)
[2013] [6] (стр 5–7); [3] (pp. 274-281)
[2014] *Entûsh*

2 Ẍafîl dîwanê tûjin, weke almas[2015],
3 Ẍafîl kor bûn, r̂êya silt'an Êzîdê min ĥeq nenas.

**S. 4** 1 Xwedan e'sil bû mişterî,
2 Bê e'sil wergêr̂îne berî,
3 Xwedan e'sil hilbit, dewlet tê ye serî.

**S. 5** 1 Gelî bira guh bidêrin,
2 Xwedan e'sil di safîne, wekî zêr̂în,
3 Da berî jê wergêr̂în.

**S. 6** 1 Zêr̂a mitayîkê çêye,
2 Heku hosta di r̂en têye,
3 Seraf dizanit çî me'nîye.
**S. 4** 1 Zêr̂ madeyekî çêye,
2 Hosta[2016] lê dinihêre,
3 Seraf zane çi behêye.

**S. 7** 1 Me'nîya zêr̂î vaye,
2 Heku hosta çak hilqutaye,
3 Seraf dizanit çî behaye.
**S. 5** 1 Me'nîya zêr̂în vaye,
2 Zêr̂ ku şefêra k'utaye,
3 Hosta lê dinihêrte, seraf zane çi bihaye.

**S. 3** 1 Zêr̂ bavêje nava agirî,
2 Xilte venaşêrî,
3 Zêr̂ê bê ser e'silê xweyî berî.

**S. 8** 1 Ew r̂oja e'fil ĥesabê,
2 Pirsîyar bike ji xelqê Medînê û xelqê K'abê,
3 Ew k'î r̂oje [dot] ĥelal kirîye li babe?!
**S. 6** 1 Dibêjime we alê k'itave[2017],
2 Pirs bikin ji alê Medînê, ji alê K'evê[2018],
3 Çikanî ew k'î bû, dot ĥelal kir li bavî?

**S. 9** 1 Ewan qîl û qal kir,
2 Bi şer̂e yî wesal kir,
3 Hawe û Adem ĥelal kir.
**S. 7** 1 Berî qîl û qal kir,
2 Ew Adem bû, dot lê ĥelal kir,
3 Şêrane lê wîsal[2019] kir.

**S. 10** 1 Hawe û Adem me'şuqeke,
2 Ji Adem vavartbûn[2020] ĥeftî û du milete,
3 Û hîjdeh[2021] ĥezar xulyaqete,
4 Lew jê vir̂êkirin caqete.

**S. 11** 1 Ez newêrim bik'ilîmin,
2 Hake ez bêjim, berî Ademin,
3 Dê bi şire'ta r̂eca min.
**S. 8** 1 Newêrim bik'ilîmim,

2015 *elmas*
2016 *osta*
2017 binêr: *k'itêb*
2018 binêr: *K'abe*
2019 *wisal*
2020 *vevert*
2021 *hijde*

*2 Wekî ez bibêjim, sineta berî Ademe,*
*3 Ezê bi [şire'ta] r̂icimim*[2022]*.*

**S. 12** *1 Sinet berî Adem bû,*
*2 Ber qirara mîrê min bû,*
*3 Me'nîya sinetê, me'nîyake mezin bû.*

**S. 9** *1 Sineta berî Ademe,*
*2 Ew me'nîyîke mezine,*
*3 Hidreta mîrê mine.*

**S. 13** *1 Bêjme we gelî sinetê,*
*2 Bi r̂ojê sed mehek bi ser gîyanê we tê,*
*3 Bi ĥesudîya şire'tê.*

**S. 10** *1 Dibêjime we sinetê,*
*2 R̂ojê heştê ĥezar ta'lî*[2023]*, tengî li ser we tê,*
*3 Hûn bi ĥesûdî menêrin*[2024] *malê şile'tê.*

**S. 14** *1 Bi ĥesudî bi şire'tê mêzin,*
*2 Sed carî bi mal û zêr̂in,*
*3 R̂oja axretê dê wî jî, jê vavêrin.*

**S. 11** *1 Mevê çendiyek malê, çendiyek zêr̂e,*
*2 R̂oja axretê hûn wan va ji heve vavêrin.*

**S. 15** *1 Şire'ta buxtane,*
*2 R̂oja di bite me erk'ane,*
*3 Ne xwezma r̂uĥa wane.*

**S. 12** *1 Şile't ku heye, bux̂d û te'n e,*
*2 Ewin dijminê silt'an e,*
*3 R̂oja axretê ew aşê bigeȓe xûne wan e.*

**S. 16** *1 R̂ojak dê bite hizêz û gazî,*
*2 Dêmînite li wêderê bi r̂usî-tazî,*
*3 Ĥaşayî wî berazî.*

**S. 13** *1 Rajekê wê bibe gazî ye,*
*2 Şile'tê bimîne r̂ût û tezî ye,*
*3 Ĥaşa wê berazî ye.*

**S. 17** *1 Beraz jî xulqatekî çê ye,*
*2 Her weku r̂oj hiltê ye,*
*3 Ew jî şikirîya xwe ji Xwedê dive ye.*

**S. 14** *1 Beraz jî xulqatekî çê ye,*
*2 Sibeye, r̂oj hiltê ye,*
*3 Ew jî ji k'erema xwe tîne navê Xwedê ye.*

**S. 18** *1 Ĥaşa yî xulqatê r̂izî,*
*2 Heke xwedan r̂ojê sê cara lê bix̂eyîdî,*
*3 Ew çu k'erb û k'înê li dilê xwe na hilgirî.*

**S. 15** *1 Ĥaşaş*[2025]*jî xulqê zere,*
*2 Wekî xweyî r̂ojê ĥeft cara lê biqeĥire,*
*3 T'u k'în bugzê dilê xwe da nagre.*

**S. 19** *1 Çend feqe[h] û mellane,*
*2 K'itêbêt wan nemane,*
*3 Ĥeft aş li ber dojêh geȓiyane.*

**S. 16** *1 T'alib, sofî, ew mellane,*

---

[2022] binêr: *r̂ecamim*
[2023] *tehlî*
[2024] *menihêrin*
[2025] *haşaş*

*2 Ya*[2026] *derewa xengeȓene,*
*3 Ȓoja axretê serê wan devê dojêh, cihenimê va diçine.*

**S. 20** *1 Çend feqe[h] û melle bûn,*
*2 K'itêbêt wan ne mabûn,*
*3 Ĥeft aş li ber dojêh geȓiya bûn.*

**S. 21** *1 Min dîtbû li ĥeft cîya,*
*2 Ĥeft aş li ber dojêh geȓîya,*
*3 Av ji xûna zalime dan ji sere melle û sofîya.*

**S. 22** *1 Ew aş ne ji binyane,*
*2 Berê wî ji ẍezebê dane,*
*3 Serê sofîya û melle dihêrit ciyê dane.*

**S. 17** *1 Çi aşekî hûr-binyane,*
*2 Xwedê Te'ala kevirê wî aşî ji ẍezebê*[2027] *dane,*
*3 Ȓoja axretê serê t'alib, sofî û melle tê hêrane.*

**S. 18** *1 K'itêva we nimaye,*
*2 Xwedê Te'ala kevirê wî aşî ji xezebê daye,*
*3 Ȓoja axretê serê t'alib, sofî û melle tê nona deyne.*

**S. 23** *1 Bêjme we gelî sinîya,*
*2 Desta berneden ji malêt Adîya,*
*3 Hîvîya wan zar hîvîye.*

**S. 19** *1 Dibêjime we sinîye,*
*2 Hûn desta bermedin ji mala Adiya,*
*3 Hîvîya wana zor hîvîye.*

**S. 24** *1 Hîvîya wan zar mehdere,*
*2 Qere şêx Mende û şêx Şemsê T'et'ere,*
*3 Ew zu tên li bangîyan û mehdere.*

**S. 20** *1 Hîvîya wan hîvîyeke bi mefere,*
*2 Şêx Adî ye, Şêx Mende, Şemsê T'et'ere,*
*3 Ewin zû têne bangîn û mahderê.*

**S. 25** *1 Ew zu tên li bangî,*
*2 Melik Fexredîn xwedanê Mangî,*
*3 Ew zu tên li e'zabî û astengî.*

**S. 21** *1 Ew zû têne bangê,*
*2 Şêx Şemsê mine xwedanê Mangê,*
*3 Sinetxanê nahêle avdeve, nahêle avistange.*

**S. 26** *1 Banga me suȓêt tarî,*
*2 Ewî e'zîzî k'asek bo min vejiwarî,*
*3 Mîna miskînî vexwarî.*

**S. 22** *1 Hawara me Xwedê, suȓê tarî,*
*2 Me li wê dîtin zor mirarî,*
*3 Me li wê nexteke selef vexwarî.*

**S. 27** *1 Bi serf beȟra k'ûre binyan ji t'eref,*
*2 Min li wê dîtin zor ĥerf.*

**S. 23** *1 Me li wê vexwarî nexteke selefê,*
*2 Beȟra Xwedê k'ûre, kes naghîje t'erefê,*
*3 Me li wê dîtin sê ĥerfê*

---

[2026] *A*
[2027] *xezeb*

**S. 28** *1 Na yêt ĥerfa dibême ji du'a sê di jêne,*
*2 Bal alîmêt vê dinê ĥemû bêne,*
*3 K'a ev me'nîyî ne ji neqilêne,*
*4 Cayîze r̂unên û li min bişikêne.*
**S. 24** *1 Hersê ĥerfê wêne,*
*2 Ĥeftê dudu fariq jêne,*
*3 Ĥerame, ne ji wê neqilêne,*
*4 Bila eva dinya me bikşêne.*

**S. 29** *1 Xelqo jîrî, zana,*
*2 Hilûn ji min r̂a biden beyane,*
*3 K'a mifta xerqê şêx Adî ye bi çî nîşane?!*

**S. 30** *1 Ewî xerqe dip'ariste,*
*2 Bire bi ser xwe da dêxiste,*
*3 Destê silt'an Êzî yî k'oteke ser çiqas deste!*
**S. 25** *1 Ewe miletê xerqe p'ariste,*
*2 Xerqe me'qûl kir, ser xwe r̂a dêxiste,*
*3 Destê silt'an Êzîd ser çiqas meseb, çiqas dîn, çiqas deste.*

**S. 26** *1 T'emametî şêx Adî!*
*2 Em kêmin, şêx Adî t'emame!*
*3 Em e'bdin, beşerin, beĥra gun[eh]ane,*
*4 Sibê ĥeta êverê ĥezar cûr̂e xeber ji devê me derdk'eve.*

*T'emametîya vî qewlî li Xwedane!*

## 98. QEWLÊ YAZÎD ÎBN MAVÎ[2028]
### (Gotina şêx Îsn)

**S. 1** *1 Aẍayê min Êzîde,*
*2 Bêraqeke sor, sipî, r̂eş li p'îda,*
*3 Çarde tebek e'rd-e'zman k'efa destê sult'an Êzîd da.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*4 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*5 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 2** *1 Diniya biye be'se,*
*2 Deher biye sult'anekî xase,*
*3 Ber diçe ĥezar-yek libase.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 3** *1 Diniya biye denge,*
*2 Deher biye sult'anekî p'er bi r̂enge,*
*3 Gazî dikine ĥezar-yek denge.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 4** *1 Gelî mêra werin misilĥetê,*

[2028] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ YAZÎD ÎBN MAVÎ (*rr. 90-92) T'ilbîs 2001)

*2 Axayê min P'adşayê sunetê,*
*3 Dilê êzdîxanê maye ĥidretê.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 5** *1 Derê xezna qudretê vekînin,*
*2 Ĥulekê sincebarî lê derînin,*
*3 Bandê elîfa xa ber sult'an Êzdîd dameşînin.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 6** *1 Şam şeherê ber avî,*
*2 Sur̂a silt'an Êzîd dîhar bû navî,*
*3 We'de hatiye wê kela bajêr bistîne, r̂ûnî navî.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 7** *1 Şam şeherekî girane,*
*2 Sur̂a silt'an Êzîd dîhar bû nave,*
*3 We'de t'emam bû, kela bajêr sitand, r̂ûnişî nave.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 8** *1 Şam şeherê mezine,*
*2 Damana ditirsîne,*
*3 Ĥuqmeta silt'an Êzîdê mine.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 9** *1 Eva t'asa sipîye,*
*2 Nazil biye [ji] e'rşê êliye,*
*3 Cemaya mêra Zimzime, Qubildore, kaniya Sipîye.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 10** *1 Eva t'asa sore,*
*2 Nazil biye [ji] e'rşê jore,*
*3 Cemaya mêra kaniya Sipî, Zimzime, Qubildore.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

**S. 11** *1 Eva t'asa sore r̂eşe,*
*2 Nazil biye [ji] e'rşê,*
*3 Ber melekê mêra mirazbexşe.*
*4 - Heyî cane, heyî cane,*
*5 Şêxê Ĥesenî sult'ane,*
*6 Sult'an sult'anî mêrane.*

*T'emametî Şîxadî!*

# 99. QEWLÊ ŞÊX ADÎ Û MÊRA[2029; 2030; 2031]

**S. 1** *1 Şêx Adî xwedanê k'eremê,*
*2 Xuyabû li e'rebê û li e'cemê.*
**S. 1** *1 Şêx Adî xwedanê k'eremê,*
*2 Dahir bû li e'rebê, li e'cemê.*

**S. 2** *1 Xweyabû[2032] li Beyt' il-Fare,*
*2 Bi r̂êk'et û hate Ĥeq ware[2033],*
*3 Li Lalişê mêr lê k'omdibûn mêrdare.*
**S. 2** *1 Dahir bû Beyt' il-Fare,*
*2 Qesid kir, hate Ĥeq ware,*
*3 Lalişê mêr lê cema' dibûne.*

**S. 3** *1 Li şkeftê bi r̂êk'et, hate Lalişe,*
*2 Ber guhêd mêra k'eftibû guş-guşe,*
*3 Mêr şadibûn, dil pê bûne xweşe.*
**S. 3** *1 Li mix̂are qesid kir, hate Lalişe,*
*2 Ber guhêd wan k'eftibû guş-guşe,*
*3 Ew şadibûn, dil pê bûne xweşe.*

**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Bi ojhilat kir xebate,*
*3 Mem R̂eşan kir xelate.*
**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Bi Şerqiya kir xebate,*
*3 Mehmed R̂eşan kir xelate.*

**S. 5** *1 Xelatkir Mem R̂eşan,*
*2 Dabûyê maşê şeşan,*
*3 Ew kir serwerê mêran.*
**S. 5** *1 Xelat kir Mehmed R̂eşa,*
*2 Dabûwê maşê şeşa,*
*3 Ew kire serwerê mêra.*

**S. 6** *1 Xebere li nav seyîde,*
*2 Dîyarbû şêxekî şehîde,*
*3 Li Lalişê lê k'om dibûn mirîde.*
**S. 6** *1 Xebere li nav seyîda,*
*2 Dahirbû şêxekî şedîda,*
*3 Li Lalişê lê cema' dibûn mirîda.*

**S. 7** *1 Xebere li nav e'cema,*
*2 Dîyarbû şêxekî şehîde,*
*3 Li Lalişê mirîd lê dibûn ceme.*
**S. 7** *1 Xebere li nav e'cema,*
*2 Dahir bû şêxekî bi k'erema,*
*3 Lalişê mirîd lê dibûn cema'.*

**S. 8** *1 Xebere di nav E'cemistanê,*
*2 Dîyarbû şêxekî bi manê,*
*3 Li Lalişê mirîd lê diger̂in dîwanê.*

---

2029 [50] (rr. 236-243)
2030 [1] (pp 178–183); http://www.yeziden.de/sheikh_adi.0.html
2031 http://www.ezdixandi.com/forum/38-273-1; http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=30
2032 *xuya*
2033 *Hekar*

**S. 8** *1 Xebere di nav E'cemistanê,*
*2 Dahir bû şêxekî bi me'nîyê,*
*3 Lalişê mirîd pê kirin dîwanê.*

**S. 9** *1 Hatin sêxêd merdîdare,*
*2 Bor şêre, qamçiyê wan mare,*
*3 Bi navê şêx Adî diken pirsyare.*
**S. 9** *1 Hatin sêxêd k'eremdare,*
*2 Bor şêre, qamiçiyê wan mare,*
*3 Li şêx Adî diken pirsyare.*

**S. 10** *1 Ew bûn şêxêd xwediyêd xêre,*
*2 Qamçiyê wan mare, bor şêre,*
*3 Wê bi navê şêx Adî dikin sexbêre.*
**S. 10** *1 Ew bûn şêxêd ehlî xêre,*
*2 Qamçiyê wan mare, bor şêre,*
*3 Navê şêx Adî diken pirsyêre.*

**S. 11** *1 Ew bûn şêxê ji atqatê,*
*2 Hatibûn ba şêx Adî ĥikyatê,*
*3 Ya şêx Adî zonayê demê, emin li qatê.*
**S. 11** *1 Ew bûn şêxê ji ît'qadê*[2034]*,*
*2 Hatibûn ba şêx Adî ĥikyatê.*
*3 Go: «Şêx Adî qutbê zemên, em li qatê».*

**S. 12** *1 Şêx Adî kirbû firware,*
*2 Mem R̂eşan li berekî dikir siware,*
*3 Peşberî mêrave dihinare.*
**S. 12** *1 Şêx Adî kirbû firware,*
*2 Şêr Mehmed R̂eşan li berekî kir siware,*
*3 Go: «Gelî mêra we çî heye li bale?»*

**S. 13** *1 Got: «Ya Mem R̂eşan siwarbe li berekê,*
*2 Here wan mêra biêwirîne derekê,*
*3 Ji ew paş jê bipirse xeberekê.*
**S. 13** *1 Ya Mehmed R̂eşan siwarbe li berekî,*
*2 Ewan mêra hêwir nema li derekî,*
*3 Ji wan bipirse xeberekî.*

**S. 14** *1 Here, bê buẍde, û k'erbe, û k'îne,*
*2 Ji wan mêra bike pirsîne,*
*3 Bir̂êne hiner û k'eremeta wan çîne,*
*4 Ji ew paş berk'eve û bîne.*
**S. 14** *1 Her bi buẍde*[2035]*, û k'erbe, û k'îne,*
*2 Ji wan bike pirsîne,*
*3 Bir̂êne zerb û k'eremeta wan çîne,*
*4 Ji nû paş ber wan k'eve, bo min bîne.*

**S. 15** *1 Şêx bi r̂ê bûn ji male,*
*2 Here bi gefin, bi gur̂in, bi gale,*
*3 Mem Raşan dibêjit: «We çî heye li bale?»*
**S. 15** *1 Şêx bi r̂ê bûn ji male,*
*2 Bi gor̂in, bi gefin, bi gale,*
*3 Mehmed Ravan dibêjit: «We çî heye li bale?»*

**S. 16** *1 Gelî mêra, hûn ji mêj bi r̂êberin,*

---

[2034] *îqad*
[2035] *bext*

*2 Hûn bi neqîbin, bi serwerin,*
*3 Şêx Adî gotiye: «K'eremkim, hûn werin».*
**S. 16** *1 Ji mêje ewin di r̂êberin,*
*2 Neqîbin, bi serwerin,*
*3 Şêx Adî k'erem kirye, hûn werin.*

**S. 17** *1 Seyîd Abû il-Wefa deng hilînî,*
*2 Gelî mêra k'ubariyê danên da em biçîn bi miskînî,*
*3 P'adşa ewe, yê r̂ewanê ber be[ĥ]ra datînî.*
**S. 17** *1 Seyîd Abû il-Wefa deng hiltêne,*
*2 K'ubarê*[2036] *danin*[2037] *da em biçîn miskînî,*
*3 P'adşa ewe, yê r̂ewanê ber be[ĥ]ra datînî*[2038].

**S. 18** *1 Seyîd Abû il-Wefa dibêje wan serwera:*
*2 «Me gelek şêx dîtin li ĥemû dera,*
*3 P'adşa ewê [yê] r̂ewanê di îne ber be[ĥ]ra».*
**S. 19** *1 Seyîda Abu il-Wefa dibêje wan serwera:*
*2 «Me gelek şêx dîtin li ĥemû dera,*
*3 P'adşa ewê r̂uĥ diîne ber be[ĥ]ra».*

**S. 19** *1 Çendî seyîdîne,*
*2 Wa deng dikin bi nehîne,*
*3 Got: « Bi hinera P'adşayî bere r̂ewan têda nîne».*
**S. 18** *1 Çendî seyîdîne,*
*2 Deng diken bi nehîne,*
*3 Ev bere r̂uĥ tê nîne.*

**S. 20** *1 Wa dibêje şêxê seyîde,*
*2 Gava wan Mem R̂eşan dîte,*
*3 Gatin: «Tu şêxî anî mirîde?»*
**S. 20** *1 Wê dibêjit şêxî seyîda,*
*2 Gava Mehmed R̂eşan dîta:*
*3 «Tu şêxî anî mirîda?»*

**S. 21** *1 Got: «Ez Mem R̂eşîme,*
*2 Siwarê berîme,*
*3 Ez mirîdê şêx Adîme».*
**S. 21** *1 «Ez Mehmedê R̂eşîme,*
*2 Siwarê berîme,*
*3 Ez bi xwe mirîdê şêx Adîme».*

**S. 22** *1 Mem R̂eşan sekinî li derê bi warê,*
*2 Got: «Gelî mêra, win bi xêr hatin vê carê,*
*3 Şêx ez nînim, şêx ewe li miẍarê».*
**S. 24** *1 Mehmed R̂eşan sekinî li ba warê,*
*2 Got: «Hûn bi xêr hatin vê carê,*
*3 Şêx ez nînim, şêx ewe li miẍarê».*

**S. 23** *1 Mêr ji ber Mem R̂eşan xurcilîn,*
*2 R̂abûn t'êk zenzilîn,*
*3 Li derê miẍarê wesilîn.*
**S. 25** *1 Mêr li Mehmed R̂eşan fikirîn,*
*2 R̂abûn t'êk zinzilîn,*
*3 Li derê miẍarê wesilîn.*

[2036] *kibar*
[2037] *deynin*
[2038] [50] *Qewlê Şîxadî û mêra* S. 17 (r. 237)

**S. 24** *1 Mêr wesilîn li derê mix̂arê,*
*2 Bi r̂ûwa da çûne xwarê,*
*3 Got: «Ordî û şabaş ji bo xwedanê[2039] Ĥeq warê[2040]».*

**S. 26** *1 Mêr wesilîn li derê mix̂arê,*
*2 Bi r̂ûwa[2041] çûne xwarê,*
*3 Go: «Ord û şibaş ji bo xwedanê Ĥeq ware».*

**S. 25** *1 Hatin şêxêd t'ebabe,*
*2 Wê li şêx Adî diken silave,*
*3 Şêx Adî ji merdiyê vedave.*

**S. 22** *1 Hatin şêxêd t'ebave,*
*2 Wê li şêx Adî diken silave,*
*3 Şêx Adî ji k'eremê elêk' vedave.*

**S. 26** *1 Şêx Adî bi xwe silt'ane,*
*2 Her yî bi e'debe, her yî bi erk'ane,*
*3 Ewî ciyê mêra nîşan dane.*

**S. 23** *1 Şêx Adî bi xweyî silt'ane,*
*2 Yê bi e'debe, yê bi erk'ane,*
*3 Ewî ciyê[2042] mêra nîşan dane.*

**S. 27** *1 Seyîd Ehmed hatî bi cenga,*
*2 Wê bi Xidir hiltînit denga,*
*3 «Ya şêx Adî, ciyê mêra yî sahte, yî tenge».*

**S. 27** *1 Seyîd Ehmed hat li cenga,*
*2 Xidir hiltêne denga,*
*3 Go: «Ciyê mêra sae'tê tenge».*

**S. 28** *1 Mem R̂eşan got: « Seyîd Ehmedo, tu serwerê ĥemî ye,*
*2 Te got firwerê şêx Adî ye,*
*3 Heke te pişta xwe bi şkeftê venê ye,*
*4 Dê li te û mêra firebê cî ye».*

**S. 28** *1 Mehmed R̂eşan dibê sayîd Ehmeda:*
*2 «Tuyî serwerê ĥemiya,*
*3 Heke te pişta xwe bi mix̂arê veniya,*
*4 Li te û mêra fira be ciya».*

**S. 29** *1 Seyîd Ehmed wa deng dike bi şêşe,*
*2 Got: «Ya şêx Adî me avek ji te divêt, ye ji pêşe,*
*3 Da em pê bigrin destan û nimêje».*

**S. 29** *1 Seyîd Ehmed deng dike bi şîne:*
*2 «Hêja me avek divêye,*
*3 Ji pêşa da em pê bigrin destav û nivêje».*

**S. 30** *1 Şêx Adî deng diket nehîne,*
*2 Got: « Seyîd Ehmedo, nivêja me meyzîne,*
*3 Ĥewceya me bi avê nîne».*

**S. 30** *1 Şêx Adî xweş silt'êne[2043],*
*2 Deng diket bi nehêne:*
*3 «Ĥewceya me bi avê nîne,*
*4 Dest nivêje ji meyizîne».*

**S. 31** *1 Şêx Adî dibê: «Gelî mêra, avekê ji xwar̂ê derkin,*
*2 Destê xwe sinetû ferkin,*

---

[2039] *xudan*
[2040] *Hekar*
[2041] *riwa*
[2042] *cîhê*
[2043] binêr: *silt'an*

*3 Ji ew paş mîrê xwe bi nederkin».*
**S. 31** *1 Şêx Adî dibêje: «Gelî mêra, avekî ji xwe r̂a derken,*
*2 Destê xwe sinetê ferken,*
*3 Ji nû paş mîrê xwe bi neder ken».*

**S. 32** *1 Şêx Adî wa bi nedere,*
*2 Wek'az dabû bere,*
*3 Got: «Were ya Zimzim, were».*
**S. 32** *1 Şêx Adî bi nedere,*
*2 Wek'az dabû bere,*
*3 Deng li avê dikire, gotî: «Te'al, ya Zimzim were».*

**S. 33** *1 Ji qewlê pisê Cimê,*
*2 Çakiya şêx Adî bi kelimê,*
*3 Av dê derk'eve ji kaniya Zimzimê.*
**S. 33** *1 Ji qewlê pisê Cemî,*
*2 T'enê şêx Adî bikelime,*
*3 Av dê derk'eve ji birka e'yn Zimzimî.*

**S. 34** *1 Yê mêra wateye û cêre,*
*2 Hinciya mêra got şêx Adî înabû jêre,*
*3 T'izbî û wek'azê seyîd Ehmed ser k'eibê*[2044] *bûn, hatin p'êlit avê r̂e.*
**S. 34** *1 Ya mêra me'nîye û cêre,*
*2 Çî yê wan xwastibûwe, şêx Adî înabû jêre,*
*3 T'ezbî û wek'azê seyîd Ehmed il-K'ibîr*[2045] *înabûwe.*

**S. 35** *1 We dibêjit Mem R̂eşane:*
*2 «Dibejime we gelî mêrane,*
*3 Av înan li şêx Adî, berdane li we mêrane».*
**S. 35** *1 We dibêjit Mehmed R̂eşane:*
*2 «Şêx Adî bi xwe silt'ane,*
*3 Av îna bo mêrane».*

**S. 36** *1 Çendî ku seyîdîne,*
*2 Wa deng dikin bi nehîne,*
*3 Bi navê P'adşê me hinera, av berdanê nine.*
**S. 36** *1 Çendî seyîdîne,*
*2 Deng dikin bi nehîne:*
*3 «T'aqeta me li av berdanê nine».*

**S. 37** *1 Şêx Adî bi nedere,*
*2 Deng li avê dikire,*
*3 Av gur̂-gur̂ çû dere.*
**S. 37** *1 Şîxadî bi nedere,*
*2 Deng li avê dikire,*
*3 Av gur̂-gur̂*[2046] *çû dere.*

**S. 38** *1 Hatin şêxê bi nasin*[2047]*,*
*2 Li gel êk û du bi razin,*
*3 Alîka şêra ji şêx Adî dixwazin.*
**S. 38** *1 Hûn şêxî bi nasin,*
*2 Li gel yek û du bi razin,*
*3 Alika şêra ji şêx Adî bixwazin.*

[2044] binêr: *K'abe*
[2045] *il-kebîr*
[2046] *gugur*
[2047] *nazin*

**S. 39** *1 Wa dibêjit Xidir neqîbe:*
*2 «Hey P'adşê mino yî ĥebîbe,*
*3 Şêr ji me dixwazin nesîbe».*

**S. 39** *1 Wê dibêjit Xidir neqîbe:*
*2 «P'adşayê mino yî ĥebîbe,*
*3 Bor ji me dixwazin nesîbe».*

**S. 40** *1 Xidir wa dikire ȓaye,*
*2 Wê li pêş şêx Adî vewestaye,*
*3 Got: «Ya şêx Adî, alîka şêra gaye».*

**S. 41** *1 We dibêjitin gêle,*
*2 Dikêşine ba şêx Adî dixêle,*
*3 Got: «Ya şêx Adî, alîka şêra cêle».*

**S. 40** *1 We dibêjit kêla,*
*2 K'êşabû li ber şêx Adî dexîla,*
*3 Go: «Alîka şêra cêla».*

**S. 42** *1 Şêx Adî we dikir firware,*
*2 Ĉêlek li nav şêrave dihinare,*
*3 Ĉêlê ne şêr hiştin, ne mirîşk, ne mare.*

**S. 41** *1 Şêx Adî we dikir firware,*
*2 Ĉêl bi nav şêra dihinare,*
*3 Ne ĉêla şêr hêlan, ne mirîşka mare.*

**S. 43** *1 Li nav neqîba bû beyane,*
*2 Li nav wan bû xemeka girane,*
*3 Got: «Ya şêx Adî, borêd me çûn, em peya mane».*

**S. 42** *1 Li nav neqîba bû beyane,*
*2 Go: «Girîn dil mane»,*
*3 Go: «Şêrêd me çûn, em peya mane».*

**S. 44** *1 Li nav neqîba bû xweyanê û istexbêre,*
*2 Li nav wan buye xem û nihêle,*
*3 Got: « Ya şêx Adî, ne me qamçî mane, ne şêre.*

**S. 43** *1 Li nav neqîba bû sexbêre*[2048]*,*
*2 Li nav ĥezîne*[2049] *û nehêle,*
*3 Go: «Ĥeya me ji wan nema şêre».*

**S. 45** *1 Mem Ȓeşan dibeje: Seyîd Ehmedo, çima naspêrî?*
*2 Qayim nabî bi firwara êkî Bêri,*
*3 Çima tu xwe bi destê şêx Adî naspêrî?*

**S. 44** *1 Meĥmed*[2050]*Ȓeşan got: «Seyîd Ehmedo, tu bi vê yekê naspêrî,*
*2 Qayîm nabî bi yekî Bêrî,*
*3 Çima tu bi t'enê xwe bi destê şêx Adî naspêrî?*

**S. 46** *1 Heke te bawerî bi vê netê,*
*2 K'eremke dê em biçin ser ĉiyayê Mişetê,*
*3 Bayek wê tê ji cinetê.*

**S. 45** *1 Heke te bawerî bi vê netê,*
*2 K'eremke, em biçîn ser ĉiyayê nav Mişetê,*
*3 Bayek wê tê ji ȓeĥmetê.*

**S. 47** *1 Bayek dê ji ȓeĥmetê ve tê ye,*
*2 Em dê ȓabine ser p'ê ye,*

---

[2048] *estexbêr*
[2049] *hizn*
[2050] *Mamed*

*3 Hinciye hikm kir, li r̂îh û simbêlêd xwe ya şêxînî bo wî li çê ye.*
**S. 46** *1 K'eremke, em r̂abin ser p'ê ye,*
*2 Hincî mêrê hikm ket r̂û simbêlêd xwe ye,*
*3 Şêxînî bo wî li cî ye!»*

**S. 48** *1 Şêx Adî p'ir̂ wesfete*[2051]*,*
*2 Wê nav li mêra didete,*
*3 K'eremke dêçine serê ĉiyayê Mişetê.*
**S. 47** *1 Şêx Adî li wan deng dikete:*
*2 «K'eremke, em biçine ser ĉiyayê nav Mişetê,*
*3 Da bifikirîn beyane silt'an şêx Adîye».*

**S. 49** *1 Mêr r̂abûn bi t'ebayî,*
*2 Bi r̂ê k'etin, çûne serê çiyayî,*
*3 Ew sekinîn, berê xwe dane bayî.*

**S. 50** *1 Ev ĉêr̂e, ĉêr̂eke p'ir̂ nebate*[2052]*,*
*2 Mêra ser doz, û cenge, û xebate,*
*3 Bayek ji dilovaniyê dihate.*

**S. 51** *1 Mêr r̂abûn li bayî fikirîn,*
*2 Beyana silt'an şêx Adî bayî wergirîn,*
*3 Bay hat, r̂îh û simbêlêd ĥemûwa ji binî bir̂în.*

**S. 52** *1 Seyîd Ehmed mabû yî melûle,*
*2 Dik'eşite ba şêx Adî dixûle,*
*3 Ya şêx Adî, me ne r̂îh man, ne mijûle.*

**S. 53** *1 Şêx Adî bi seyîd Ehmed têt bi sûwe:*
*2 «Seyîd Ehmedo, na sparî tûwe*
*3 Lew te ne r̂îh dimînin. ne birûwe».*

**S. 54** *1 Wa dibêjit seyîd Ehmede:*
*2 «Hey P'adşê mino yî Semede,*
*3 Ezî r̂azîme her wekî te da».*

**S. 55** *1 Seyîd Ehmed wa dibê ye,*
*2 Ya sex Adi erk'ana te erk'aneke çê ye,*
*3 Bê gûman hinera te hinera Xwedê ye,*
*4 Nîşanek wa li nik te, min ew nîşane ji te divê ye.*

**S. 56** *1 Şêx Adî bi xwe P'adşaye,*
*2 Darsad p'irfirazî nemaye,*
*3 Ew nîşane daye seyîd Ehmed, ziyaretî bû, hate ser r̂aye.*

**S. 57** *1 Seyîd Ehmed dispare,*
*2 Her wekî her care,*
*3 Got: «Xweşewîstê min hikmê te ye bi heybete li me dijware».*

**S. 58** *1 Destê xalibî çê ye,*
*2 Çakiya şêx Adî bo mêra danayî ĥed û sed, û r̂ê ye.*
*3 Da mêr r̂ast bajon li pê ye*

**S. 59** *1 Hincî mêrê r̂ast nehajot bi r̂ê da*
*2 Dê lê xweyabin tarî û şevê da,*
*3 Dê zebênî k'êşîne di zîndanê da.*

---

[2051] *osfet*
[2052] *nehat*

**S. 60** *1 Hatin xasêd dilhûr e*
*2 We ji şêx Adî dixwezin destûr e,*
*3 Ya şêx Adî, r̂êye me p'ir̂ dûr e.*

**S. 61** *1 Gelî mêra hûn bi xêr hatin,*
*2 Hûn ji çiyayê cenbilqatin,*
*3 Her ji mêra bi xelatin.*

**S. 62** *1 Tu seyîd Ehmedê k'ibirî,*
*2 Tu zordarekî ji êd mîrî,*
*3 Vê carî tûy xebîrî.*

**S. 63** *1 Xweşewîstê min, em ji wan ciya hatine, van ciya bi r̂ast û sefa,*
*2 Me li van ciya borandin cor û cefa,*
*3 Boret me dê çawa, ziv[i]rîn peya.*

**S. 64** *1 Seyîd Ehmed, tu bi k'ubarî ji wan ciya hatiye van ciya,*
*2 Tu borî bi simbêlan û r̂uya,*
*3 Heke te bi dest û sur̂a xwe veniya,*
*4 Te got: «Firwara şêx Adî hinekî dê li te û mêra veger̂iya».*

**S. 65** *1 Ji qewle şêx Şabane,*
*2 Çakiya şêx Adî bo mêra dane ĥed û sed, û r̂ê, û micade, û çilexane,*
*3 Ji ew paş t'ext ji e'rdê veguhast çû e'zmana.*

**S. 66** *1 Ji qewlê şêx Cinêd yê Bexdedî,*
*2 Çakiya mêra ew sur̂ li wê dî,*
*3 Ew ji hiner û k'erametêd şêx Adî.*

**S. 67** *1 Ji qewlê şêx Musî Enzelîye,*
*2 Çakiya mêra ew sur̂ li wê dîye,*
*3 Ew ji hiner u k'erametêd şêx Adîye.*

**S. 68** *1 Xeber li gerdûnê ger̂îye,*
*2 Xweyabû silt'an şêx Adîye,*
*3 Mêra ji serî û dawî zanîbû ew k'îye.*

**S. 69** *1 Ji qewlê derwêş Qatanî,*
*2 Şêx Adî deryaye, wê jê diçin coyî û kanî,*
*3 Xas xasêd şêx Adî çûne ber r̂oniya dilovanî,*
*4 Ẍafil di korene, bi r̂ast r̂êya şêx Adî ne dizanî.*

*T'emametiya vî qewlî li Xwedê û xwedanî!*

## 100. QEWLÊ BI ŞÊX ADÎ XILASIM[2053]

**S. 1** *1 Bi şêx Adî xilasim,*
*2 Ĥeq melik şêx Sin di nasim,*
*3 T'ebaya xelqê[2054] xasim.*

**S. 2** *1 Bi şêx Adî emînim,*
*2 Xilmeta mîrê mezinim,*
*3 Ezî r̂êya melik şêx Sinim.*

[2053] [2] (rr. 414-417)
[2054] *xelk*

**S. 3** *1 Moĥt'acim[2055] dinê û axretê,*
*2 Melik şêx Sin şêxê sinetê[2056],*
*3 Min nasî bû me'rîfetê.*

**S. 4** *1 Şêx Adî xwedanê qudretê,*
*2 Melik şêx Sin şêxê sinetê (atqatê),*
*3 Min nasî bû ibadetê[2057] û me'rîfetê.*

**S. 5** *1 Şêx Adî yî E'mrane,*
*2 Bîr̂unî R̂eĥmane,*
*3 Şehde û îmana min bi nav wana.*

**S. 6** *1 Şêx Adî yî silt'îne,*
*2 Melik şêx Sin meseb û dîne,*
*3 Şehde û îmana min bi wan hîvîne.*

**S. 7** *1 Şêx Adî yî ẍefure,*
*2 Melik şêx Sin r̂esûle,*
*3 Şehde û îmana min bi wan qebûle.*

**S. 8** *1 Çak bû li min hatî pişke,*
*2 Hêvênê[2058]wî ji Dimeşqe[2059],*
*3 K'esk kir dara ĥişke.*

**S. 9** *1 Bêjme we yî ĥidîd[2060],*
*2 Cîyê[2061] dil heye qewl û qesîd,*
*3 Atqata[2062] wî silt'an Êzîd.*

**S. 10** *1 Êzdîyê cidê xwe me,*
*2 Hincî medha jê deme,*
*3 Xof k'êş vê dinê nema.*

**S. 11** *1 Hûn bi şehde û şihud bin,*
*2 Ser gotina me'bûd bin,*
*2 Da dîwanêt xasa bi miraz bin.*

**S. 12** *1 Hate ser min ew silt'ane,*
*2 R̂uĥê wî ji min distînit gîyane,*
*3 Şehde û îmana min bi wane.*

**S. 13** *1 Gîyanî ji min distînit,*
*2 Melik şêx Sin xetê ser min dixwînit[2063].*

**S. 14** *1 Gunhêt min wê li a'funî, birime wê civatê,*
*2 Ye bi muĥbet û sifatê,*
*3 Ciyê şêx Adî, Abu il-Wefa tê.*

**S. 15** *1 Birime wê coqetê,*
*2 Ez r̂uniştim hidretê,*
*3 Ewe mezela cidê me tê.*

---

[2055] *muĥitac*
[2056] *sunet*
[2057] *ebadet*
[2058] *hêvên*
[2059] *Dumişke*
[2060] *cidîd*
[2061] *çî*
[2062] *îtqad*
[2063] *dixûnit*

**S. 16** *1 Ewe qesra şêx E'mîr tê,*
*2 Ye bi zîyaret û feqîr tê,*
*3 Şêx Adî yî ẍefure ji wê delîle tê.*

**S. 17** *1 Birime ciyê bab û bap'îra,*
*2 Wê qubê kem, têda şêxû Bek'ir û şêx E'mîre.*

**S. 18** *1 Xwezî salî misal bame cîranî salî donzdeh mehe,*
*2 Xwezî min mêze kirba li wan qubeha,*
*3 Bi ĥisêba heşt dergeha.*

**S. 19** *1 Dergehê qosa bi dengilî,*
*2 P'iȓî mîra ȓengilî,*
*3 Xelatê şêx Alê Şemsa de'wa û çengilî.*

**S. 20** *1 Di «mezinlîra» we be dîyare,*
*2 Li min şehdebin*[2064] *ber û dare,*
*3 Şêx Alê Şemsa ȓuwa da di malit ẍubare.*

**S. 21** *1 Şêx Alê Şemsa yî a'fe, yî bi ȓecuwe,*
*2 Dê şêx Adî xwazit dua'ye,*
*3 Şêx Adî tu p'erê Berê Şibakê bideye ber ȓuwe.*

**S. 22** *1 Hincî dihijmêrim wan dera,*
*2 Ser coqetê silavêt me li derê kaniya Sipî û dîwana qelendera.*

**S. 23** *1 Xwezî şêx Adî em xwendibûne*[2065] *wirê*[2066]*,*
*2 Hincî wan dera dihijmêrim ĥeta ȓuwaqê,*
*3 Sed coqetê silavêt me li derê kaniya Sipî ĥeta dîwana Berê Şibakê.*

**S. 24** *1 Ewe ciyê zora tînin mife'tê*
*2 Ẍerîbkem, têm ji ẍerîbîya,*
*3 Xwezî min mêze kirba li wan cîya,*
*4 Li Lalişê ĥeta Îsbîya.*

**S. 25** *1 Bangîna me Xwedê û Îsbîya,*
*2 Ewe xwedanê meşan û cenbeqîya,*
*3 Me û hazir û guhdêra xilasket ji tengîya, te'lîya,*
*4 Me û hazir û guhdêra bixwîne ser bêderêt xweşîya,*
*5 Li dine û axretê, mefera me silt'an Êzîye.*

## 101. QEWLÊ K'ENIYA MARA[2067] – QEWLÊ ŞÊX ADÎ ŞÊXÊ ŞARANE;[2068]

**S. 1** *1 Şêx Adî şêxê şare,*
*2 Xwedanê beriyan û beĥre,*
*3 Qewl dahir kir berî pênc sed sal, berî k'eniya mara.*

**S. 1** *1 Şêx Adî şêxê şarane,*
*2 Xwedanê*[2069] *ber û deryane,*
*3 Ev qewl xweyabû*[2070] *pênc sed sal, berî k'eniya marane.*

[2064] *şadebin*
[2065] *xûndbayîne*
[2066] binêr: *wêder*
[2067] [1] (pp 391–398)
[2068] [50] (гг. 244-248)
[2069] *xudan*
[2070] *xuya*

**S. 2** *1 Şêx Adî şêxê k'êye?*
*2 Xwedanê me'rîfet û r̂êye,*
*3 Ewî e'rd û e'zman xweş divêye.*

**S. 2** *1 Şêx Adî şêxê k'êye?*
*2 Xwedanê me'rîfet û r̂êye*
*3 Ewî e'rd û e'zman xweş divêye.*

**S. 3** *1 Şêx Adî şêxê ĥeqîqetê,*
*2 Xwedanê me'rîietê,*
*3 Zerb û hiner li ba [wî] tê.*

**S. 3** *1 Şêx Adî xwedanê r̂astiyê ye,*
*2 Xwedanê erk'an û me'rîfetê ye,*
*3 Zerb û hiner li ba wî tê ye.*

**S. 4** *1 Şêx Adî, û Tawisî melek', û silt'an Êzî yekin,*
*2 Hun me'nîya jêk nekin,*
*3 Ew zû miraza hasil dikin.*

**S. 4** *1 Şêx Adî, û silt'an Êzî, û Tawisî melek' yekin,*
*2 Win wateya ji hev nekin,*
*3 Ew zû miraza hasil dikin.*

**S. 5** *1 Ewan hasil kirbû miraze,*
*2 P'adşayê min xeliqê ĥezar û yek nave,*
*3 Ẍefila dît nekir nase.*

**S. 5** *1 Ew zû hasil dikin mir[a]ze,*
*2 P'adşe afrînere, digeře bi ĥezar kirase,*
*3 Ẍefila dît û nekir nase.*

**S. 6** *1 Ẍefila dît, nas nekir,*
*2 P'adşe min bi r̂ehim şefeqetêt[2071] xwe kir,*
*3 E'rd û e'zman çêkir (qewmî bin qam çêkir).*

**S. 6** *1 Ẍefila dît û nas nekir,*
*2 P'adşê min bi r̂ehim û şefae'ta xwe kir,*
*3 P'adşê min e'rd û e'zman çêkir*

**S. 7** *1 Ewî çêkirbûn e'rd û e'zman e,*
*2 Qewmî îbn qam e,*
*3 Meyî îbn meyî, zencel îl t'emam e.*

**S. 7** *1 Ewî çêkir e'rd û e'zman e,*
*2 Tê danîbû binyan e,*
*3 Ser danîbû derya û daristan e.*

**S. 8** *1 Beĥra bi nav emîq e[2072],*
*2 Wek'îlê wê beĥrê sidîq e,*
*3 Lew çêkirin her ĥeft t'erîq e.*

**S. 8** *1 Ewa derya k'ûr e,*
*2 Xewasê vê deryayê, îman û nûr e,*
*3 Li ser wê deryayê hene r̂êk bi nûr e*

**S. 9** *1 Her ĥeft t'erîqe li wê hebûn,*
*2 Ew e'lyêt li mala me bûn,*
*3 R̂ik'inêt wan ji r̂ik'ina zêde bûn.*

**S. 9** *1 Her ĥeft r̂êk wê hebûn,*
*2 Ew zanayêt li mala me bûn,*

[2071] *şifqet*
[2072] *e'mîq*

*3 R̂ik'inêt wan ji r̂ik'ina zêde bûn.*

**S. 10** *1 Mêra û meleka wê diden medeha,*
*2 Xasêt nava qubeha,*
*3 Ew sur̂a berê sibeha*[2073].

**S. 10** *1 Ya Xwedê, sibeye mêr û milyaket ji te didin medeha,*
*2 Ewin xasên nava qubeha,*
*3 R̂oniya wan da berê sibeha.*

**S. 11** *1 R̂onaya berê sibehê dahir bû,*
*2 Nûr li ibadetê k'ar bû,*
*3 Sed xweziya wî mêrê Êzîdî ji pêş, ĥeqiya xwe vewesta bû.*

**S. 11** *1 R̂onaya berî sibê li me xweya bû,*
*2 Bor li ibadetê*[2074] *siwar bû,*
*3 Sed xweziya min bi wî kesê, li ser r̂êya xwe r̂awesta bû.*

**S. 12** *1 Sed xweziya min bi wê r̂uĥê ji pêş ĥeqiya xwe vediweste,*
*2 Aşiq û me'şûq*[2075] *r̂ay di deste,*
*3 Mirazê xwe ji Xwedê dixweste.*

**S. 12** *1 Sed xweziya min bi wî kesê, li ser r̂êya xwe r̂awesta,*
*2 Aşiq û me'şûq*[2076] *r̂aya bi desta,*
*3 Mirazê xwe ji wan bi xwesta,*
*4 Wan mirazê me ji ĥeqiyê bixwesta.*

**S. 13** *1 Birime wê dîwanê,*
*2 Wê metbexê, li wê şîlanê,*
*3 Ciyê dîn û îmanê.*

**S. 13** *1 Xazil ez bibrama wê dîwanê,*
*2 Wê metbexê, li wê şîlanê*
*3 Ew der bû ciyê dîn û îmanê.*

**S. 14** *1 Dîn û îmanêt me ji wêne,*
*2 Ĥeqîqeta me ji wê ĥedêne,*
*3 Lewĥ il-meĥfuz navê Xwedêne.*

**S. 14** *1 Dîn û îmanêt me ji wê bû,*
*2 R̂astiya me ji wê ĥedêbû,*
*3 Navû dik'are şîrin*[2077] *û şerîf, bi xwe Xwede bû.*

**S. 15** *1 Da bideyn medhêt R̂oj û Heyve,*
*2 Hûn li axretê kirin bi zêr̂ û zîve,*
*3 Tawisî*[2078] *melek' ev dinya bi bosta dipîve.*

**S. 16** *1 Pîva û dikir qedare,*
*2 Şêx Şems xwendk'are,*
*3 R̂anaya şêx Şems da binêt beriyan û beĥran.*

**S. 17** *1 Xwezî me zanîba stêrêt e'zmanî ji çîne,*
*2 Ji nûra îlaĥîne,*
*3 K'a r̂ik'inêt van li ser çî sekinîne?*

**S. 15** *1 Xwezî min zanîba stêra e'zmêni ji çîne,*
*2 A ji nûra îlaĥîne,*
*3 K'a r̂uk'nê van li ser çî sekinîne?*

---

[2073] *subeha*
[2074] *îbadet*
[2075] *maşoq*
[2076] *maşoq*
[2077] *şirîn*
[2078] *Tawus*

**S. 18** *1 Her r̂ik'inêt wan avaye,*
*2 Ji meleka hat hingave,*
*3 Ji qudretê hat ji van stêra kire av û xûnave.*

**S. 16** *1 R̂uk'nêd wan ave,*
*2 Ji meleka hat hingave,*
*3 Bi hêza Xwedê hat ji wa stêra kire av û xunave.*

**S. 17** *1 Şêx Adî wa dibête,*
*2 Ne bi ilmê qelem û ne bi dewête,*
*3 Bi hêza Xwedê wa stêra av davête.*

**S. 19** *1 Av ji van stêra rijî,*
*2 P'adşayê min e'rd çêkir, e'zman jê r̂a qurmijî,*
*3 Pêş û dilê min jê r̂a bûhijî.*

**S. 18** *1 Av ji van stera durijî,*
*2 P'adşê min e'rd çêkir, e'zman jê r̂a qurmijî,*
*3 Dil û hinavê min jê r̂a bûhijî.*

**S. 20** *1 Çendî e'zman heyne û beĥre,*
*2 Heke P'adşa biket firware,*
*3 Dê hikm*[2079] *ket herçar kenare.*

**S. 19** *1 Çendî e'zman hene û beĥre,*
*2 Heke P'adşe bike ferware,*
*3 R̂eĥmû*[2080] *nûrê bibare, li herçar kenare.*

**S. 21** *1 Xwezî*[2081] *min zanîba e'zman çend miqdare,*
*2 Heke şêx Adî biket firware,*
*3 Menzîl*[2082] *pênsed salî bi hijmare.*

**S. 20** *1 Xwezî min zanîba ew e'zman çi miqdare,*
*2 Bi gotina Fexrê hêdare,*
*3 Mezela e'rd û e'zmên pencsed sal bi hejmare.*

**S. 21** *1 Xwezî min zanîba ew e'zman çend qedere,*
*2 Bi gotina Fexrê babzere,*
*3 Mezela e'rd û e'zmên pencsed sal bi deft'ere.*

**S. 22** *1 Xwezî min zanîba e'zman çend giyase,*
*2 Ji gotine Xidir û Ilyase,*
*3 Gotinêt e'wil ĥeta e'sase.*

**S. 23** *1 Xwezî min zanîba ew e'zman çi qiyase*[2083]*,*
*2 Bi gotina Xidir û Elyase,*
*3 Ji serî ĥeta bi e'sase.*

**S. 24** *1 Xwezî min zanîba ew e'zman çi r̂enge,*
*2 Ew bêhne û ew denge,*
*3 Bi ĥemiya mor ser denge.*

**S. 23** *1 Xwezî min zanîba ev e'zman zîve yan zêr̂e,*
*2 Ser milêt wan cindiye digêr̂e,*
*3 Yêt*[2084] *mie'melêt*[2085] *wan bi Xwedê r̂a.*

---

[2079] *hukim*
[2080] *R̂ehm û*
[2081] *xozî*
[2082] *menzel*
[2083] *qeyas*
[2084] *êt*
[2085] *mia'mlet*

**S. 22** *1 Xwezî min zanîba ev e'zman zîve yan zêr̂e,*
*2 Li ser milê wan cindiye digêr̂e,*
*3 Yê[2086] herdem baweriya wan bi Xwedê r̂a.*

**S. 25** *1 Me mor ser dengê ĥemiya more,*
*2 Hinjî nefsa wî xware, ne li jore,*
*3 Ew r̂astiya gotina silt'an Êzdiyê minî Sore.*

**S. 24** *1 Şêx Adî şêxê hîne,*
*2 Bînaya ĉavêt mine,*
*3 Çend bispêrî şêx Adî hindî mezine.*

**S. 28** *1 Şêx Adî şêxe û hine,*
*2 Bêniya herdu ĉavê mine,*
*3 Çend wesfeta em jê didine.*

**S. 29** *1 Em jê didin zor wesfete,*
*2 Wî xuya[n] kiribû k'eramete,*
*3 Li cihanê dixist zeynal û ĥeybete.*

**S. 25** *1 Meleka şêx Adî xweş divê ye,*
*2 Jê têt bêhna e'mber û miskê ye,*
*3 Çî ciyê qewl û qesîdêt şêx Adî lê bêjin, ew cî[2087] bihuşte[2088] lê ye.*

**S. 26** *1 Şêx Adî şêxê li k'afê ye,*
*2 E'wiliye wî bi Elîfê ye[2089],*
*3 Navê şêx Adî yê şîrin, yê şerîf[2090] bi xwe[2091] Xwedê[2092] ye.*

**S. 27** *1 Nebiranî şêx li k'afe,*
*2 Ew menadî benî ĥerfe,*
*3 Nûra şêx Adî wa diîsiyêt li herçar t'erefe.*

**S. 28** *1 Şêx Adî şêx li ĥeqîqete,*
*2 R̂awestabû li mue'leqe[2093],*
*3 Nûra şêx Adî dabû her ĥeft t'ebeqe.*

**S. 29** *1 Şêx Adî şêx li ẍefûre,*
*2 R̂onaya şêx Adî da binêt beĥrêt k'ûre,*
*3 Ji gotina şêx Adî jê diçin wesfet[2094] û nûre.*

**S. 30** *1 Şêx Adî şêxek çêkir,*
*2 Novê xweyî şerîf, yê şekir lê kir,*
*3 Dar û bera sicûde pê kir.*

**S. 26** *1 Şêx Adî şêxek çêkir,*
*2 Novê xweyî şîrin lê kir,*
*3 Dar û ber p'erweste li pê kir.*

**S. 31** *1 Şêx Adî şêxek r̂a kir,*
*2 Ewî e'rd û e'zman bora avakir,*
*3 Dilê E'deviya pê şayî û şakir.*

**S. 27** *1 Şêx Adî şêxek r̂a kir,*

---

2086 *ê*
2087 *çî*
2088 *behişt*
2089 *elf*
2090 *şirîf*
2091 *xo*
2092 *Xudê*
2093 *me'leq*
2094 *usfet*

*2 Li bona wî e'rd û e'zman ava kir,*
*3 Me Adiya dîl pê şa kir.*

**S. 32** *1 Şêx Adî şêx Berk'ate,*
*2 Bi wê suȓe kir xelate,*
*3 Ji e'rdî fiȓî ço semawatê.*

**S. 33** *1 Şêx Adî û şêx Berek'ate,*
*2 Bi wê suȓe kir xelate,*
*3 Ji e'rdê fiȓî çû semawate.*

**S. 33** *1 Şêx Adî şêx il me'nîyê ye,*
*2 E'wil bi wê Elîfê ye,*
*3 E'yin il-Ĥeq, navê Xwedê ye!*

**S. 34** *1 Şêx Adî şêx il a'me,*
*2 Wesfetêt wî berî Îslame,*
*3 Qedem gûhastine ji Şame.*

**S. 30** *1 Şêx Adî şêxê a'me,*
*2 Wesfeta wî berî Îslame,*
*3 Qedem vegûhastine ji Şame.*

**S. 35** *1 Şama şîrin silt'an Êzîye,*
*2 Xwendibû*[2095] *ji qeleman û dewîye,*
*3 Ẍafila înk'ar kir, go: «Me ne dîye!»*

**S. 31** *1 Şama şîrin a silt'an Êzîye,*
*2 Xwendibû ji pênûsan û dewîye*
*3 Ẍafila û înk'ara kir, go: «Me ne dîye!»*

**S. 36** *1 Dem û dewran wê bên jî,*
*2 Gotina ser min bi rêjin,*
*3 Qewl û qesida ba mirîda bêjin.*

**S. 32** *1 Dem û dewrana wî ji mêjin,*
*2 Gotina ser min bibirêjin,*
*3 Qewl û qeside bo mirîda dibêjin.*

**S. 37** *1 Laliş — ziyarete,*
*2 Kaniya Sipî — qublete,*
*3 Qublete dinê û axrete.*

**S. 34** *1 Laliş — xweş ziyarete,*
*2 Kaniya Sipî — qublete,*
*3 Qubleta dine û axrete.*

**S. 38** *1 Laliş — sikane,*
*2 Kaniya Sipî ser — nîşane,*
*3 Nîşana e'rd û e'zmane.*

**S. 35** *1 Laliş — xweş mekane,*
*2 Kaniya Sipî — nîşane,*
*3 Nîşana e'rd û e'zmane.*

**S. 36** *1 Laliş — ciyekî çê ye,*
*2 Ewa ȓoja li pê p'irê ye*
*3 Kaniya Ȓastîyê — navê Xwedê ye*

**S. 37** *1 Ewa ȓoja li pê p'ira,*
*2 Li wê dibû dei'we û cengeka bira,*

[2095] *xundibû*

*3 Haweka yarû bira çekirne ser gunehk'are bira,*

**S. 38** *1 Ewa r̂oja li pê p'ira zirave,*
*2 Hizret dak'etiye nave,*
*3 Kesê zalim û gunehk'ar li wir dima bê bave.*

**S. 39** *1 Ewa r̂oja destê p'ira zirave wekî mûye,*
*2 Hizret di navde dak'etibûye,*
*3 Kesê zalim yî gunehk'ar li wêderê kêmbêye.*

**S. 39** *1 Doj û cehnem hene,*
*2 Ewin ciyêt bê faydene,*
*3 Ew dijminêt r̂uĥa mene.*
**S. 40** *1 Doj u cehnem hene,*
*2 Ewin ciyet be faydene,*
*3 Ew dijminê r̂ewanê mene.*

**S. 40** *1 Doj û cehnem[2096] cotin,*
*2 Bi r̂ojê not û neh kelîme di nav xwede digotin,*
*3 Ewanî înk'ar di nav xwede disotin.*
**S. 41** *1 Dojeh û cehneme cotin,*
*2 Ewê r̂ojê gotin bi hevre digotin,*
*3 Gelek gunehk'ar di nav xwede disotin.*

**S. 41** *1 Ewin gelîyêt k'ûre,*
*2 Jê diçin xasêt Ẍefûre,*
*3 Ji gotina: «Şêx Adî jê diçin wesfet û nûre».*
**S. 42** *1 Ewin gelîyêt k'ûre,*
*2 Bang dikim xased di bihûre,*
*3 Gotin: «Silt'an şêx Adî jê diçû saf û nûre».*

**S. 42** *1 Ewe r̂oja gelîyê tenge,*
*2 Mêra li ser me de'we û cenge,*
*3 Jê diçin wesfet[2097] û r̂enge.*

**S. 43** *1 Laliş bihuşteke[2098] xweşe[2099],*
*2 Xwedan îman, xwedan erk'an,*
*3 R̂ûmet nema bo delq r̂eşe.*
**S. 43** *1 Laliş bihuşteke[2100] xweşe,*
*2 Xwedan erk'an, xwedan îman di navda dimeşe,*
*3 Dergevan şêx Fexrê r̂eşe.*

**S. 44** *1 Laliş bihuşteke qewîye,*
*2 Û maleke ji enzelîye,*
*3 Û mek'anê silt'an şêx Adîye.*

*Em kemin Xwede yî t'emame!*

## 102. QEWLÊ XAN QUBAD[2101]

[2096] *cehinim*
[2097] *usfet*
[2098] *bihişt*
[2099] *xoş*
[2100] *bihişt*
[2101] [2] (rr. 438–442)

**S. 1** *1 Bi destûrî mêrê mîran,*
*2 Gelî ciwanan û pîran,*
*3 Guh bidêrine feqîran.*

**S. 2** *1 Feqîr ĥal ji mêjin,*
*2 K'emal go: «Her r̂êjin,*
*3 Ji şêx Adî xeber bêjin».*

**S. 3** *1 Şêx Adî şêxê ĥelîm bû,*
*2 Bîyed û cûd*[2102] *t'eslîm bû*[2103]*,*
*3 Nefesa ĥesar dabû.*

**S. 4** *1 R̂azî bi qazî xwedan bû,*
*2 R̂azî bi her (dihitu) bû,*
*3 Li xilmetê (li mîrît) bû.*

**S. 5** *1 Şev û r̂oj der cubû,*
*2 Di ĥeyrî aşiq nebû,*
*3 Di bore axir çobû.*

**S. 6** *1 Ber dê ji xwe afîne,*
*2 Dostê di xwe afîne,*
*3 Di evê dilî dîne.*

**S. 7** *1 Wesil pê ĥayîl bû,*
*2 Bi destê xwe mayî bû,*
*3 Xaliq r̂ûyê qayîl bû.*

**S. 8** *1 Meqbûl dergeh mîr bû,*
*2 Şêx Adî Adem nezîr bû.*

**S. 9** *1 Şêx Adî derin safe,*
*2 Xolib lê îxtilafe,*
*3 Bedel bû tiwafe.*

**S. 10** *1 Çom tiwafê şêx Adî,*
*2 Ji tiwafê (r̂uq sina),*
*3 Milka mawî du ca.*

**S. 11** *1 Meskena hindê dûr çê,*
*2 Dayîm fereĥ û sirûr lê,*
*3 Dayîm me dayîm nûr lê.*

**S. 12** *1 Nûra bêt li ber dû daran tê,*
*2 Miqamêt dilban li ser tê,*
*3 Nezera xaliqî zû ber tê.*

**S. 13** *1 Hewzê birka bixêr tê,*
*2 Hewzê birka dir ne da tê.*

**S. 14** *1 Qebrê Şêx Adî di binda,*
*2 R̂onahî, û fanos, û finde.*

**S. 15** *1 Meqbera saĥib dest ĥalderî dil mezin tê,*
*2 Zimzim kaniya dilxwar tê,*

---

[2102] *cud*
[2103] *Bîyed û cûd t'eslîm bû* – ango *dinya di destê vî bû.*

*3 Zimzim kaniya xweş tê.*

**S. 16** *1 Ĥewda birka bihuştê,*
*2 Şa buhorî ku gehiştê.*

**S. 17** *1 Şa bû milûka û kesana,*
*2 Li meskenêt zu xana,*
*3 Yê dixeȓiqî beĥra me'tanîyana.*

**S. 18** *1 Beĥrê zu wesfatê,*
*2 Ehdê dirust wefatê,*
*3 Şêx Eĥmed û seyîd Abu il-Wefa tê.*

**S. 19** *1 Şêx Eĥmed nadir,*
*2 Şev û ȓoj (texlit) ĥadir.*

**S. 20** *1 Şêx Ehmed û E'bd il-Qadir Gêlanî,*
*2 Şêx Nûranî birka bi Laliş anî.*

**S. 21** *1 Şêx Ĥesen û Mehmed*[2104] *Ȓeşan tê,*
*2 Mehmed Ȓeşan û Şêx Ĥesen tê,*
*3 Navdarêt dil mezin tê,*
*4 P'îr Muş nûrînda tê.*

**S. 22** *1 P'îr û şêx bi k'emal da,*
*2 Me dîm (teşewq) û ĥal da,*
*3 Ĥemû wan bi Laliş da,*
*4 Laliş gelîyekî seqal da.*

**S. 23** *1 Şîna cinetê ȓenge,*
*2 Wê li wî alî tê denge.*

**S. 24** *1 Wer t'êr li sefa tê,*
*2 Duxana eȓeq bi qam tê,*
*3 Ya mirîd şêx Adî, mek'anê şêxê mirîd tê.*

**S. 25** *1 Meclîsa murşid û ȓişdî tê,*
*2 K'af û Nun û se'edetê.*

**S. 26** *1 Qedeĥa nûrî dostan,*
*2 Qedeĥ ji ĥerfa boşan.*

**S. 27** *1 Ji qehwata xweşa,*
*2 Şêx Adî kire hinoşe.*

**S. 28** *1 Ew paşî xwandava înan,*
*2 Tîte'l û ji k'eftêt maran.*

**S. 29** *1 Mix̂ar sed ĥedud anî,*
*2 Şîva cinetê boqdar anî.*

**S. 30** *1 Li ber meşit dayîm nûre,*
*2 Nûra k'esk û zere,*
*3 Zivirî Melikê Ekibere.*

**S. 31** *1 Zivirî şêx Adî (tibruze) gelo bînin sere Cebare,*
*2 Fiȓî şêxê k'ubare,*

---

[2104] *Mamed*

*3 Sicûdebû ber û dare.*

**S. 32** *1 Qebirê melik nûre,*
*2 Çendî dar mewcude,*
*3 Ĥemû wan li ber sicûde.*

**S. 33** *1 Qebirê xaliq nezîr tê,*
*2 T'ayî daran berfî tê,*
*3 Û darêt nanîna sinetê.*

**S. 34** *1 Qebirê şêx Adî li binê [tê],*
*2 Dujmin ĥed û sedê cinetê,*
*3 Mir şehîd qebûl firata, tiwafî tên hersala,*
*4 Fiȓî şêx Adî bûwa mala.*

**S. 35** *1 Şaho tu dizanî,*
*2 Sitî tên bi mestanî,*
*3 Da bira quba nûranî.*

**S. 36** *1 Qubêt e'mum imaret*[2105] *ken,*
*2 Bi miskîna ĥişaret ken,*
*3 Mirîd bi tiwaf e'rd diken,*
*4 Xwedanêt k'eremê gelîyê Lalişê midaret ken.*

**S. 37** *1 Tiwafî hersal tên,*
*2 Meĥbub dêm şemal tên,*
*3 Bi gelîyê şêx bi nav tên.*

**S. 38** *1 Meĥbub, û şêx, û şengin,*
*2 Bi yarî û ĥeft ȓengin,*
*3 Filaş tên, gelî tengin.*

**S. 39** *1 Filaş gelî yê bi xêr tên,*
*2 Sed coqet jin û mer tên,*
*3 Ji Şamê û Qudsê tên.*

**S. 40** *1 Ji Şamê bi esnaf tên,*
*2 Meĥbub û melek ĉav tên.*

**S. 41** *1 Gelîyê şêx k'amil tên,*
*2 Ji ĉiyayê ẍerîb Musil tên.*

**S. 42** *1 Bi şal û k'ofî tên,*
*2 Ji mal tên, giran tên,*
*3 Ji Başîk û Behzanî tên.*

**S. 43** *1 Mêvanêt liqme bi qîmet qedire,*
*2 Sitî der bû sedire.*

**S. 44** *1 Ji Xetarê, Bee'dirê tên,*
*2 Ji Bee'dir û Xetar tên.*

**S. 45** *1 Ji Nisêbînê, ji Şingalê tên,*
*2 Bi Giliwaz, bi Qedema tên.*

**S. 46** *1 Bi Kanî, ĥezar naz tên,*
*2 Tiwafî Geȓdengaz tên,*

---

[2105] *e'maret*

*3 Tiwafî gelîyê Geȓnas tên.*

**S. 47** *1 Dîm hîr û fîyan zilu mala qebira,*
*2 Şêx Adî bit mala (zilifatha) sedira.*

## 103. QEWLÊ MALA BAVA[2106]

**S. 1** *1 Hay, dibême, dibême,*
*2 Wê qubê kim berî çême,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Ava dikirin qelême,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 2** *1 Qelêm dikire avaye,*
*2 Şêx Adî xwe geȓiye nave,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Dost ȓonkayî ya herdu ĉave,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 3** *1 Şêx Adî Şamê fiȓî,*
*2 Dewranê dewran birî,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Belê, şêx Adî ciyê xwe Lalişê dikirî,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Şerqê girt xebate,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Şêx Adî xweyî nûrêȓayî xelate,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 5** *1 Xelat dikir Memê Ȓeşane,*
*2 Dayê maşê şeşane,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Paşê k'ivş dikir serwerê mêrane,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 6** *1 Mala me mala bavane,*
*2 Serekaniya çiqas siniyane[2107],*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Pê veȓêdikin zîyaretîyane,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 7** *1 Mala me mala Adiyane,*
*2 Serekaniya çiqas siniyane,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Pêy veȓêdikin coqetiyane,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 8** *1 Me ji Adîya, me ji Adîya,*
*2 Dermano, tuyî wefadî[2108],*
*3 Xweş mala bavane,*

[2106] [6] (rr. 18–21)
[2107] *suniyan*
[2108] *afadî*

*4 Xazila min wê r̂uĥê da, şêx Adî lê bibe r̂azî,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 9** *1 Me ji Adîya gelek mêle,*
*2 Wê qubê*[2109] *kim, serî helêle,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Hawardorê şeherê giran têne gêle,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 10** *1 Me ji mala Adiya gelek bexşe,*
*2 Ez wê qubê kim, sur̂e li E'rşe,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Hawarê şeherê giran têne qal û cenge,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 11** *1 Lalişê wê misk û mo ye,*
*2 Ez wê qubê kim, serî li wê ye,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Cimĥa mêra dar û berê gelîyê Lalişê dibûne more,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 12** *1 Lalişe, wê bi miske,*
*2 Ez wê qubê kim, serî li k'eske,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Cimĥa mêra li Lalişê bûye maş û r̂isqe*[2110]*,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 13** *1 Zora sinceq anîne,*
*2 Lalişêda danîne,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Sinceq, sinceqê şêxê Adîne,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 14** *1 Zora sinceq dive r̂astin,*
*2 Lalişêda veduguhastin,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Dinê, axretê, sincaqê şêx Adî t'emam r̂astin,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 15** *1 Sinceqê sorin, sipîne,*
*2 Lalişêda danîne,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Sinceq, sinceqê şêxê Adîne,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 16** *1 Sincaqê sorin, zerin,*
*2 Di Lalişêda dahirin,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Sinceq, sincaqê şêxê Ekberin,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 17** *1 Çendî di mêfirin,*
*2 Destê xwe sinceqê şêx Adî, mala Adiya r̂agirin,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Belkî axretê, ser sadiqê heya, îmanê xwe dimirin,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

---

[2109] *quve*
[2110] *r̂izq*

**S. 18** *1 Çendî we qadirin,*
*2 Destê xwe di sincegên şêx Adî, mala Adiya werînin,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Belkî axretê, ser sadiqê heya, îmanê xwe dimînin,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 19** *1 Şêx Adî hat Lalişe,*
*2 Xemiliye xerqê r̂eşe,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Dost ji r̂onkayî ya ĥerfa xweşe,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 20** *1 Şêx Adî hatîye Lalişe,*
*2 Xemiliye delqê r̂eşe,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Cimĥa mêra dil pê xweşe.*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 21** *1 Şêx Adî û şêx Sinin,*
*2 Beĥrê[2111]wana mezinin,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Nefûsê[2112] wan leşkerê[2113] giran ve disêkinin,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 22** *1 Şêx Adî bin Misafire[2114],*
*2 Xweş mala bavane,*
*3 Mêra dar û berê gelîyê Lalişêve sicûda ber dikire,*
*4 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 23** *1 Şêx Adî hat Ĥeq ware[2115],*
*2 Mêr sicûdabûn ber û dare,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Şêx Adî nava mêrade xweş serdare,*
*5 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 24** *1 Şêx Adî, şêxû Bek'ir,*
*2 Şîrinin nola şekir,*
*3 Xweş mala bavane,*
*4 Şêx Adîyê min k'erem li te kir,*
*5 Ciyê te li cem xwe çêkir,*
*6 Nûre ji mala şêxane.*

**S. 25** *1 Ya ji Adîya, ya ji Adîya,*
*2 Şêxê mine, p'îrê mine!*

## 104. QEWLÊ XWEŞ MALA BABA

**şaxê — 1**[2116; 2117; 2118]

---

[2111] *be'r*
[2112] *nefûs*
[2113] *neşker*
[2114] *Misêfir*
[2115] *heqar*
[2116] [2] *Qewlê xweş male baba,* (rr. 402-406)
[2117] [2] *Qewlê Şîxadî* (rr. 407-409);
[2118] [2] *Qewlê distirême* (rr. 410-413);

**S. 1** *1 Distirême, distirême,*
*2 Bi wê k'afê kim, berî biçême,*
*3 Pê ava dikirin qilême.*

**S. 1** *1 Distirême, distirême,*
*2 Bi wê k'afê kim, berî çême,*
*3 Pê ava kirbû eqilême.*

**S. 1** *1 Distirême, distirême,*
*2 Bi wê k'afê bikem, derî li çême,*
*3 Pê ava kirbû qilême.*

**S. 2** *1 Qilêm pê dikirî ava,*
*2 Şêx Adî dik'irê wî geȓiya,*
*3 Bi Şerqê ĥeta bi Şame.*

**S. 2** *1 Eqilêm pê kirî ava,*
*2 Şêx Adî geȓiyabû li nave,*
*3 Di k'arêt şêx Adî digeȓît Şerq ĥetanî Şame.*

**S. 2** *1 Qilêm pê kirbû ava,*
*2 Şêx Adî geȓiya bû li nave,*
*3 Dik'irê şêx Adî wê digeȓêt ji Şerqê ĥetanî bi Şame.*

**S. 3** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Dewran, dewran didete,*
*3 Şêx Adî hate Lalişê, ciyê xwe dik'ete.*

**S. 3** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Dewrana dewran dane,*
*3 Şêx Adî ciyê xwe li Lalişê dana.*

**S. 3** *1 Şêx Adî ji Şamê hate,*
*2 Dewran, dewran didete,*
*3 Hat û ciyê xwe li Lalişê dik'ete.*

**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê fiȓî,*
*2 Dewran, dewran birî,*
*3 Şêx Adî hat Lalişê, ciyê xwe dikirî.*

**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê fiȓî,*
*2 Dewran, dewran birî,*
*3 Mek'anê Şêx Adî bi xwe dilî.*

**S. 4** *1 Şêx Adî ji Şamê fiȓî,*
*2 Dewranana dewran dibiȓî,*
*3 Hat û ciyê xwe li Lalişê kirî.*

**S. 5** *1 Şêx Adî ji Şamê hilbû,*
*2 Çî bazîyekî bi zengilbû,*
*3 Mek'anê E'deviya miraz hasilbû* [2119]*.*

**S. 5** *1 Şêx Adî ji Şamê hilbû,*
*2 Bazîyekî min pê zengilbû,*
*3 Mek'anê Şêx Adî bi xwe dilbû.*

**S. 5** *1 Şêx Adî ji Şamê hilbû,*
*2 Bazîyekî pê bi zengilbû,*
*3 Mek'anê silt'an şêx Adî yî bi dilbû.*

**S. 6** *1 Şêx Adî hate Lalişe,*
*2 Xemilî bi xerqê ȓeşe,*
*3 E'deviya ĥal pê xweşe.*

**S. 12** *1 Şêx Adî hate Lalişe,*
*2 Xemilî bû bi xerqê ȓeşe,*
*3 E'deviya ĥal pê xweşe.*

---

[2119] *ĥasil*

**S. 14** *1 Şêx Adî hate Lalişe,*
*2 Xemilî bi xerqêt r̂eşe,*
*3 E'deviya ĥal pê xweşe.*

**S. 7** *1 Şêx Adî li Lalişe bû,*
*2 Li mile wî xerqê r̂eş bû,*
*3 E'deviya ĥal pê xweş bû.*
**S. 11** *1 Şêx Adî li Lalişê bû,*
*2 Xwedanê xerqê r̂eş bû,*
*3 E'deviya ĥal pê xweş bû.*
**S. 15** *1 Şêx Adî li Lalişê bû,*
*2 Dixemilî bi xerqê r̂eş bû,*
*3 E'deviya ĥal pê xweş bû.*

**S. 8** *1 Şêx Adî hate Ĥeq ware*[2120]*,*
*2 Pê sicûdebû ber û dare,*
*3 Şêx Adî di nav mêrada serdare.*
**S. 8** *1 Şêx Adî hate Ĥeq ware,*
*2 Lê sicûde dibû ber û dare,*
*3 Belê, ew bû zîyareta şaran û maldara.*
**S. 13** *1 Şêx Adî hate Ĥeq ware,*
*2 Sicûdebû li ber û dare,*
*3 Şêx Adî li nav mêra serdare.*

**S. 9** *1 Şêx Adî li Ĥeq war bû,*
*2 Ber û dar pê sicûdebû,*
*3 Şêx Adî di nav mêra da yî serdar bû.* (biner: **S. 8**)

**S. 10** *1 Şêx Adî (îbn) il-Misafir,*
*2 Mêra hat silav lê kir,*
*3 Dar û bera sicûde li pê kir.* (№ **S. 27**)

**S. 11** *1 Gelî bira, çend hûn difehmînin,*
*2 Dest li sinceqêt Şêx Adî û mala Adiya werînin,*
*3 Da hûn li ser sadiq*[1336]*, û ĥeya, û îmana xwe bimînin.* (№ **S. 10**)
**S. 26** *1 Çendî em di fêmînîn,*
*2 Desta li sinceqêt Şêx Adî û mala Adiya werînîn,*
*3 Da li ser sadiq*[2121] *û ĥeya îmana xwe bimînîn.*

**S. 12** *1 Gelî bira, çend hûn qadirin,*
*2 Dest li sinceqêt şêx Adî û mala Adiya bigrin,*
*3 Da hûn li ser sadiq, û ĥeya, û îmana xwe bimirin.* (№ **S. 11**)
**S. 25** *1 Çendî em di qawîn,*
*2 Desta li sinceqêt şêx Adî û malêt Adiya bigirîn,*
*3 Da li ser sadiqê*[2122]*, û ĥeya, û îmana xwe bimirîn.*

**S. 13** *1 Ewin malêt me Adîya,*
*2 Danîye ser kaniya sinîya*[2123]*,*
*3 Şamê r̂abû caqetîya.* (№ **S. 12**)
**S. 9** *1 Ew bû mala me Adîya,*
*2 Wê li ser kaniya sinîya*[2124]*,*
*3 Dê pê vir̂êkeyîn zîyareta.*
**S. 17** *1 Ewe mala me Adîyane,*

---
[2120] *heqar*
[2121] *sidiq*
[2122] *sediq*
[2123] *sunîya*
[2124] *sonîya*

*2 Wê li ser kaniya siniyane,*
*3 Wê viȓêdiken zîyaretiyane.*

**S. 14** *1 Ewin malêt babaye,*
*2 Danîne ser kaniya siniyaye,*
*3 Şamê ȓabû caqeya.* (№ **S. 13**)
**S. 10** *1 Ew bû mala me babane,*
*2 Wê li ser kaniya beȟrane,*
*3 Dê pê viȓêkeyîn coqetiyane.*
**S. 16** *1 Ewe mala me babane,*
*2 Wê li ser kaniya beȟrane,*
*3 Wê viȓêken coqane.*

**S. 15** *1 Şamê ȓabû caqe,*
*2 Serê sinceqa şêx Adî ço stêra Ĥeyoqe,*
*3 Dilê E'deviya k'etê şahî*[2125] *û şaqe.* (№ **S. 14**)
**S. 6** *1 Şamê ȓê bûn bi coqe,*
*2 Dilê E'deviya k'et şaye û şewqe,*
*3 Serê sinceqa şêx Adî wê li stêra Ĥeîyoqe.*
**S. 11** *1 Ji Şamê bi ȓê bûn caqe,*
*2 Dilê E'deviya k'efite şayî û şoqe,*
*3 Serê sinceqa şêx Adî stêra li Ĥeîyoqe.*

**S. 16** *1 Şamê ȓabû caqete,*
*2 Dilê E'deviya k'etî şayî û şaqe,*
*3 Şêx Adî di nav mêra da serê mişur û xete.* (№ **S. 15**)
**S. 7** *1 Şamê ȓê bûn coqete,*
*2 Dilê E'deviya ket şaye û şewqete,*
*3 Şêx Adî serê mişûran û xete.*
**S. 12** *1 Ji Şamê bi ȓê bûn caqete,*
*2 Dilê E'deviya k'efte şayî û şoqete,*
*3 Şêx Adî tesmîlî mêra diket maş, û berat', û xete.*

**S. 17** *1 Adîo, mîro, Adî,*
*2 Şêxê min şêx Adî,*
*3 Sed xwezima min bi wê ȓuĥêbe, tu jê bibî ȓadî.* (№ **S. 16**)
**S. 6** *1 Hey Adîye, mîro, Adî,*
*2 Şêxê min şêx Adî,*
*3 Sed xweziya*[2126] *wê ȓuĥê jê di bit ȓazî.*

**S. 18** *1 Adîo, şêxê mine,*
*2 Xwedanê quba mezine,*
*3 Zîyaretî wê jê diçine,*
*4 Ewe babe melik şêx Sine.* (№ **S. 17**)
**S. 7** *1 Hey Adîye, şêxê mine,*
*2 Xwedanê quba mezine,*
*3 Zîyaretî jê diçine,*
*4 Dê t'ewaf*[2127] *keyîn dergehê melik şêx Sine.*

**S. 19** *1 Me ji Adîya Wellaĥ*[2128] *mêle,*
*2 Bi ewê qubê kim, serî bi hilêle,*
*3 Suȓê şara têne gêle.* (№ **S. 18**)
**S. 14** *1 Em ji Adîya Wellaĥ mêle,*
*2 Wê qubê kem serî bi hilêle,*

---
[2125] binêr: *şayî*
[2126] *xozî*
[2127] *tiwaf*
[2128] *welle*

*3 Hawirî şara têne gêle.*

**S. 10** *1 Me ji Adîya Wellaĥ mêle,*
*2 Wê qubê bikem serî bi hilêle,*
*3 Hawîrî şara têne gêle*[2129].

**S. 20** *1 Min ji Adîya Wellaĥ denge*[2130],
*2 Ewê qubê kim, serî bi r̂enge,*
*3 Hawîrî şara têne bi cenge.* (№ **S. 19**)

**S. 13** *1 Me ji Adîya denge,*
*2 Wê qubê kem serî bi r̂enge,*
*3 Hawirî şara têne cenge.*

**S. 9** *1 Me ji Adîya denge,*
*2 Wê qubê bikem serî bi r̂enge,*
*3 Hawîrî şara têne cenge.*

**S. 21** *1 Me ji Adîya Wellaĥ bexşe,*
*2 Bi wê qubê kim, serî li E'rşe,*
*3 Cema'ya mêra Lalişe.* (№ **S. 20**)

**S. 15** *1 Me ji Adîya bexişe,*
*2 Wê qubê kem serî bi E'rşe,*
*3 Cema'ya mêra bi xwe Lalişe.*

**S. 8** *1 Me ji Adîya bexşe,*
*2 Wê qubê bikem serî li E'rşe,*
*3 Cema'ya mêra Lalişe.*

**S. 22** *1 Me ji Adîya Wellaĥ miske,*
*3 Bi wê qubê kim, serî k'eske,*
*4 Mêra ji ber bir maş, û berat', û r̂isqe*[2131]. (№ **S. 21**)

**S. 16** *1 Ew Lalişa bi miske,*
*2 Quba şêx Adî ya k'eske,*
*3 Mêra jê birin berat' û r̂isqe*[2132].

**S. 18** *1 Ew Lalişa bi miske,*
*2 Serê sinceqa şêx Adî bi malowîye k'eske,*
*3 Mêra ji ber dibir maş, û berat', û r̂isqe*[2133].

**S. 23** *1 Ewe Lalişa bi misk û moye,*
*2 Ava Zimzim bera çoye,*
*3 Serê quba şêx Adî hilêla goye,*
*4 Lew mêra caqin, û qal, û de'weye.* (№ **S. 22**)

**S. 17** *1 Ew Lalişa bi misk û moye,*
*2 Serê quba şêx Adî goya,*
*3 Ava Zimzim coye,*
*4 Mêra ser de'we, û cenge, û erẍoye.*

**S. 19** *1 Ew Lalişa bi misk û moyî ye,*
*2 Serê sinceqa şêx Adî bi goyî ye,*
*3 Ava Zimzim coyî ye,*
*4 Mêra ser de'we, û cenge, û erẍoye.*

**S. 24** *1 Ewe sinceqa sor û zere,*
*2 Ji Lalişê anîn dere,*
*3 Ew sinceqa Melikê Ekbere.* (№ **S. 23**)

**S. 21** *1 Ew sinceqa sor û zere,*
*2 Ji Lalişê tînane dere,*

---

[2129] *kêl*
[2130] *ceng*
[2131] *r̂izq*
[2132] *r̂izq*
[2133] *r̂izq*

*3 Sinceq, sinceqê şêxê Ekbere.*

**S. 25** *1 Zora sinceqê p'arastin*[2134]*,*
*2 Lalişê veguhastin,*
*3 Sinceqêt şêx Adî ĥemû ȓastin.* (№ **S. 24**)
**S. 23** *1 Zora sinceq wê dip'arastin,*
*2 Wê ji Lalişê dane guhastin,*
*3 Sinceq şêx Adî ĥemû diȓastin.*

**S. 26** *1 Zora sinceqê danîne*[2135]*,*
*2 Ji Lalişê der anîne,*
*3 Sinceqêt şêxê Adîne.* (№ **S. 25**)
**S. 22** *1 Zora sinceq wê danîne,*
*2 Wê ji Lalişê der anîne,*
*3 Sinceq, ĥemû sinceqêt şêxê Adîne.*

**S. 27** *1 Ewe sinceqa sore, sipîye,*
*2 Ji Lalişê der anîye,*
*3 Ew sinceqa şêxê Adîye.* (№ **S. 26**)
**S. 20** *1 Ew sinceqa sor û sipîye,*
*2 Wê ji Lalişê deranîye,*
*3 Sinceq, sinceqê şêxê Adîye.*

**S. 28** *1 Hincîyê derdek lê dibûye,*
*2 Bi Lalişê qest bikin zûye,*
*3 Derda, derdan li wê di bûne.*
**S. 24** *1 Hincîyê derdek lê dibû e,*
*2 Bi Lalişê heȓin zû e,*
*3 Derd û derman li ba şêx Adî dibû e.*
**S. 29** *1 Hincîyê derdek lê diheste,*
*2 Bi Lalişê bikin qeste,*
*3 Derda, derdan li wê dixweste*[2136]*.*
**S. 27** *1 Hincîyê derdek lê diheste,*
*2 Lalişê biken qeste,*
*3 Derda derman li ba şêx Adî dixweste.*

**S. 30** *1 Hincîyê birîneke li dile,*
*2 Qest bike Lalişa nûranî, qubêt fadile,*
*3 Mirazê mêra li dîwana şêx Adî, melik şêx Sin dibû hasile*[2137]*.*

**S. 31** *1 Hincîyê birîna li mêlakê,*
*2 Qest bikin dîwana şêx Adî û melik şêx Sin û Berê Şibakê,*
*3 Mirazê mêra hasil dibû dîwana şêx Adî û make.*

**S. 32** *1 Şerqîye, Ẍerbîye,*
*2 Qubletîye, şemalîye,*
*3 Ĥemû li ser k'efa Xwedê û silt'an şêx Adîye.*
**S. 28** *1 Şerqîye û Ẍerbîye,*
*2 Şamale û qublîye,*
*3 Ĥemû ser kefa siltan şêx Adîye.*

*T'emametîya Xwedê û şêx Adî!*
*«Em di kêmin, şêx Adî t'emame!*

[2134] *pîrastin*
[2135] *anîn*
[2136] *dixest*
[2137] *ĥasil*

**şaxê — 2**[2138; 2139]

**S. 1** *1 Dibême, dibême,*
*2 K'afa derecême,*
*3 Pê ava bû qelême.*

**S. 1** *1 Dibême, dibême,*
*2 Wê k'afê kim derecême,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Ayî, avê dikim qelême,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 2** *1 Qelêm pê dibû ava,*
*2 Silt'an*[2140] *şêx Adî geȓîya bû nave,*
*3 E'debiya ȓon bû ĉave*[2141].

**S. 2** *1 Qelêm dikirim ave,*
*2 Şêx Adî geȓiya li nave,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 E'debiyê dîwanê ȓon bûn ĉe've,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 3** *1 Xweş*[2142] *mala bavane,*
*2 Serekaniya çendî beȟrane*[2143],
*3 Dirba şêxan û p'îrane,*
*4 Emê pê veȓêkin zîyaretîyane.*

**S. 4** *1 Adî, her Adî,*
*2 Dermano, tî fûadî*[2144],
*3 Xazîya mi wî ȓuȟî silt'an şêx Adî, melek şêx Sin*[2145]*lê bive ȓazî.*

**S. 5** *1 Dewran, dewran dibete,*
*2 Silt'an şêx Adî Şamê derk'ete,*
*3 Ciyê xwe Lalişa nûranî dikete.*

**S. 6** *1 Dewran, dewran di berk'e,*
*2 Silt'an şêx Adî Şamê derk'et,*
*3 Ciyê xwe Lalişa nûranî dike.*[*см.* **S. 5**]

**S. 4** *1 Dewranê dewran ber k'et,*
*2 Şîxadî Şamê der k'et,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Ciyê xa nava Lalişa nûranî diket,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 7** *1 Dewran, dewran dibiȓî,*
*2 Silt'an şêx Adî Şamê fiȓî,*
*3 Ciyê xwe Lalişa nûranî dikirî.*

**S. 3** *1 Dewranê dewran dibirî,*
*2 Şîxadî Şamê difirî,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Ciyê xa nava Lalişa nûranî diirît,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

---

2138 *QEWLÊ XOŞ MALE BAVA* [29] (rr. 344-348) (№ 1688)
2139 [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ XOŞ MALÊ BAVA* (rr. 68-73) T'ilbîs 2001
2140 *sultan*
2141 *ĉe'v*
2142 *xoş*
2143 *be'r*
2144 *fewad*
2145 *Şîxsin*

**S. 8** *1 Me mala Adiya we denge,*
*2 Ez wê qubê kim serî nûre û řenge,*
*3 Hawrî şara Lalişa nûranî dihatin cenge.*
**S. 17** *1 Wê mala Adiya denge,*
*2 Wê qubê kim, serî helêla řenge,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Heskê hewêrî řa be te cenge,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 9** *1 Me mala Adiya we bexşe,*
*2 Ez wê qubê kim serî nûre û E'rşe,*
*3 Hawrî şara Lalişa nûranî dihatin bexşe.*

**S. 10** *1 Me mala Adiya we mêle,*
*2 Ez wê qubê kim serî nûre û helêle,*
*3 Hawrî şara Lalişa nûranî dihatin gêle.*
**S. 16** *1 We li mala Adiya mêle,*
*2 Wê qubê kim serî helêle,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Heskê Hewêrî řabe te gêle,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 18** *1 Eva mala Adiyane,*
*2 Serekanî çendî biniyane,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Ber biken ziyaretiyane,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 11** *1 Me mala Adiya misk û haye*[2146]*,*
*2 Serê qubanî goye,*
*3 Mêra ber birîye maş, û barat', û nixraye.*
**S. 19** *1 Ziyareta misk û moye,*
*2 Ava Zimzimê ber diçûye,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Mêra ser danîn nixroye,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 12** *1 Me mala Adiya hay û miske,*
*2 Serê qubanî k'eske,*
*3 Mêra ber birîye maş û barat' û řisqe.*
**S. 20** *1 Ziyareta miske,*
*2 Wê qubê kim, serî helêla k'eske,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Mêra ber bir maş, barat' û řisqe*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 13** *1 Zora sincaq anîne,*
*2 Lalişa nûranî danîne,*
*3 Ĉira sincaqê silt'an şêx Adî Lalişa nûranî ĉep û řastin.*
**S. 12** *1 Zora sincaq anîn,*
*2 Lalişa nûranî da danîn,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 14** *1 Zora sincaq birastin,*
*2 Danî Lalişa nûranî diguhastin,*
*3 Ĉira sincaqê silt'an şêx Adî Lalişa nûranî ĉep û řast diguhastin.*

[2146] *hoy*

**S. 15** *1 Emê çendî fe'mê xwe dife'mînin,*
*2 Ĉira sincaqê silt'an şêx Adî destê xwe hiltînin,*
*3 Ser atqat îmana xwe dimînin.*

**S. 9** *1 Hûne çendî li virin,*
*2 Destê xa ĉira sinceka mala Adiya nebirin,*
*3 Xoş mala bavane,*
*4 Bandê hûnê ser suxtê îmanê xa bimrin,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 16** *1 Emê çendî fe'mê xwe difikirin,*
*2 Ĉira sincaqê silt'an şêx Adî destê xwe r̂adigirin,*
*3 Ser atqat îmana xwe dimirin.*

**S. 10** *1 Hûnê çendî fe'mê xa dife'mînin,*
*2 Ĉira û sincaqê mala Adiya bîra xa bînin,*
*3 Xoş mala bavane,*
*4 Bandê hûnê ser suxtê îmanê xa bimînin,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 17** *1 Sincaqa sor û zere*[2147]*,*
*2 Lalişê deranîn dere,*
*3 Sincaq sincaqa şêxê Ekbere,*
*4 Silt'an şêx Adî xu gel diçûye,*
*5 Emê lê tuabin*[2148] *seransere.*

**S. 13** *1 Sincaqa sor û zere,*
*2 Lalişa nûranî da dihinere*[2149]*,*
*3 Sincaq daye Şemsî Qembere,*
*4 Xoş malê bavane,*
*5 Şîxadî li gel çû sere,*
*6 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 18** *1 Sincaqa sor û sipîye,*
*2 Lalişê deranîye,*
*3 Sincaq sincaqa şêxê Adîye,*
*4 Silt'an şêx Adî xu gel diçûye,*
*5 Emê lê tuabin seransere.*

**S. 14** *1 Sincaqa sor, sipîye,*
*2 Lalişa nûranî da danîye,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Sincaq daye Şemsê Êzdîye,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 15** *1 Sincaqa sor, r̂eşe,*
*2 Lalişa nûranî da danîn bexşe,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Sincaq daye Şemse,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 19** *1 Şêx Adî û şêx Berk'ate*[2150]*,*
*2 Zû bangîna wan dihate,*
*3 Sur̂ê kirbû xelate.*

**S. 20** *1 Şêx Adî bin*[2151] *Misafir*[2152]*,*

---

[2147] *zore*
[2148] binêr: *t'ewafken*
[2149] *dinihare*
[2150] *Bekrat*
[2151] *bi*
[2152] *Misêfir*

*2 Mêra hat silav lê kir,*
*3 Dar berê gelîyê Lalişê sicûde li pê kir.*
**S. 7** *1 Şîxadî bin Misafir,*
*2 Mêra hat selam lê kir,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Çi ĥewcê dor-berê geliyê Lalişê te sicûdeyî ber kir,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 21** *1 Şêx Adî Ĥeq war da*[2153] *[bû],*
*2 Şêx Şems xweyî serdar bû,*
*3 Ewana sicûda li ber dar bû.*
**S. 8** *1 Şîxadî Ĥekare,*
*2 Şêxşimsî pê r̂a serdare,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Me sicûde ber dare,*[2154]
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 22** *1 Şêx Adî Ĥeq war bû,*
*2 Şêx Şems xweyî serdar bû,*
*3 Ewana dewra Lalişê da xunk'ar bû.*

**S. 23** *1 Çi kesê birîne wan heye,*
*2 Zû bike Lalişa nûranî her̂eye,*
*3 Piştî Şêx Adî, melek şêx Sin ewî derdî derman heye.*
**S. 22** *1 Ĥeĉî derdek lê dibûye,*
*2 Ber Lalişa nûranî, xerqê Şîxadî qest kir, çûye,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Vî derdî derman dibûye,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 24** *1 Kesê birîne wan heste,*
*2 Zû Lalişa nûranî bike qeste,*
*3 Piştî şêx Adî, melek şêx Sin ewî derdî derman dixweste*[2155]*.*
**S. 21** *1 Ĥeĉî derdek lê dideste,*
*2 Lalişa nûranî dikir qeste,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 Vî derdî derman dixaste,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 25** *1 Şêx Adî xemilê r̂eş bû,*
*2 Xemilî delqê r̂eş bû,*
*3 E'debiya ĥal pê xweş*[2156] *bû.*
**S. 5** *1 Şîxadî hat Laliş bû,*
*2 Xemilî xerqê r̂eş bû,*
*3 Xoş malê bavane,*
*4 E'debiyê dîwanê ĥal pê xaş bû,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 26** *1 Şêx Adî delqê r̂eşe,*
*2 Xemilî xemilê r̂eşe,*
*3 E'debiya ĥal pê xweşe.*
**S. 6** *1 Şîxadî Lalişe,*
*2 Xemiliye xerqê r̂eşe,*
*3 Xoş malê bavane,*

---
[2153] *Hekar*
[2154] *berdare*
[2155] *dixaste*
[2156] *xaş*

*4 E’debiyê dîwanê ĥal pê xaşe,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

**S. 27** *1 Şêx Adî Şamê dihate,*
*2 Şerqîya kirbû xebare,*
*3 Şêr Memê R̂eşan kirbû xelate.*

**S. 28** *1 Xelat kir şêr Memê R̂eşane,*
*2 Dayê maşê şeşane,*
*3 Hew paşva kirbû serwêrê mêrane.*

**S. 29** *1 Sîtila şîlana şêx Adî bikin sîyare,*
*2 Mîrê mezin hildabû t’aqe,*
*3 Dilê E’debiya bû şayî-şoqe.*

**S. 30** *1 Şerqê dixwin*[2157] *dibeye,*
*2 Şemaqîyê girtîye qubleye*[2158]*,*
*3 Çardeh t’ebeq*[2159] *e’rd û e’zman k’efa silt’an Êzîd da xwaye.*

**S. 23** *1 Zimzime, Qubildare, Xumrîye,*
*2 Sê t’as ava kaniya Sipîye,*
*3 Xoş male bavane,*
*4 Pê vî mirî mor kirîye,*
*5 Nûre ji mala Adiyane.*

*T’emametî şêx Adî!*
*R̂eĥme li dê-bavê hostayî û gudêre!*
*T’emametî.*

## 105. QEWLÊ ĤEMEDÊ BABA[2160; 2161]

**S. 1** *1 Menalî, menalî, Ĥemedê babê kalî,*
*2 Hey zêr̂o ji wî k’emalî,*
*3 Sinîo, sur̂ li balî.*

**S. 1** *1 Menalî, menalî, Ĥemedo, tu ji bavê kalî,*
*2 Zêr̂o tu ji k’emalî,*
*3 Walîyo, aqil balî,*
*4 Ĥemedê bavê çûye, miclîs maye xalî.*

**S. 2** *1 Ĥemed borî diger̂înit,*
*2 Çi ciyê xalî nabînit,*
*3 Ĥemed borê lê bi vehwînit.*

**S. 3** *1 Ji ber cêşê şêx Adîye.*
*2 Şêx Cefer deng diket bi zare,*
*3 Du şêx nabin li ĉirare,*
*4 Êki dayîne, êk ĉirare.*

**S. 4** *1 Babo ez çil salî li ĉiyay bûm,*
*2 Li çi denga ne bîhay bûm,*
*3 Çil salî ez li çê bûm,*

---

2157 *dixûn*
2158 ango *qulbe*, binêr: *qible*
2159 *tevek*
2160 Xeribo (Ilyas) http://yeziden.de/forum/
2161 [53] *MENALÎ* (rr. 128-129) Ji gotinên pîr Ûsivê gundê Şamîramê.

*4 Li xilmeta mewlê bûm,*
*5 Çi denga ne bihê bûm.*

**S. 2** *1 Çil sala li çîya bû,*
*2 Ew xizmeta P'adşa bû,*
*3 Delalîyê wan dera bû.*

**S. 5** *1 Çil salî hoy duruste*[2162]*,*
*2 Min ne dixwar û ne diniviste,*
*3 Min ji hew paş Xwedê xwe bi Ĥeqî dip'ariste*[2163]*.*

**S. 6** *1 Vêca Ĥemedî xwe ji babê xwe cuda kir,*
*2 Û k'arê xwe kir û pişta xwe da dayî û baba.*

**S. 7** *1 Maka Ĥemedî têye,*
*2 Ĥemedo, babê teye,*
*3 Vê carê çi li gel nekeye,*
*4 Mestire ji min û teye,*
*5 Li axretê bo te gunehye.*

**S. 8** *1 Ĥemedî got: «Makê, xwe bide paşe,*
*2 Çêra dikey, çêreka belaşe,*
*3 Ew babê herdu ya dê deme paşe»*

**S. 9** *1 Eve bû cara sibe yê,*
*2 Cer hilgirt çû ser kanî yê,*
*3 Berî te û babê ezî li ber K'ursîy yê,*
*4 Cara ji tarî bavê,*
*5 Cer hilgirt çû ser avê,*
*6 Berî te û babê ezî li ber wê silavê.*

**S. 3** *1 Wextake ser kanîyê,*
*2 Sêvek sore li berîyê,*
*3 Hingê ezî jor bûm, berê min li K'ursîy yê.*

**S. 4** *1 Dayka Ĥemed bînim,*
*2 Herdu bera li ber darînin,*
*3 Belkî Ĥemedê bavê vegerînin.*

**S. 5** *1 Ĥemedê bavê teye,*
*2 Tu xebera pê medeye,*
*3 Ji me r̂a paşê p'ir̂ guneye.*

**S. 6** *1 Go: «Dayê, Haşê!»*
*2 Go: «Ez îdî venagerim paşê,*
*3 Ezê pirsekê bêjim, te nav dine da bikim şaşê».*

**S. 10** *1 Kaniya nava malane,*
*2 Sêva sor nîşane,*
*3 Berî te û babê ezî li ber E'rşane.*
*4 Ĥemedê nû xete,*
*5 Hawirî şara lêk didete,*
*6 Ji qehrêt babê xwede.*

**S. 11** *1 Ĥemedî jîre,*
*2 Û vegeȓya gate Cizîre,*
*3 Ji qehrêt babê pîre,*
*4 Ĥemede wê diçîya.*

---

[2162] *durist*
[2163] *di periste*

**S. 7** *1 Hemed dest kir, çû Cizîrê,*
*2 Êwirî li Mêrdînê.*
*3 Bazîyo, p’eȓ hêşînê,*
*4 Dê û bavê xwe qayîl nînî.*

**S. 12** *1 Siwar borê qîmetî ye,*
*2 Dêçite şarê şêx Adî ye.*
*3 Ĥemedê serxweşe,*
*4 Hilgirtbû delq ȓeşe,*
*5 Qest kir û çû Lalişe.*
*6 Ĥemede wê diçîye,*
*7 Ĥemed Ȓeşê dibînîye,*
*8 Hey Ȓeşmoyî, gareyî, tu bêje min, mek’anê malxwey[2164] çîye.*

**S. 13** *1 Ȓeş wa vedigeȓî ye,*
*2 Şêx Adî jê dipirsî ye.*
*3 Ĥemedê baba wê hatî ye?*
*4 Bi şarê te ne yî ȓazî ye,*
*5 Şêx Adî ji we dibêjî ye:*
*6 «Hey Ȓeşmoyî gareyî ye,*
*7 Heke Ĥemedê baba hatî ye».*

**S. 14** *1 Ev şarê xalê wî ye,*
*2 Ew dizanit bi xwe nîşan jê çî ye?*
*3 Ȓeş wa vedigeȓî ye.*
*4 Wa ji Ĥemedê baba dipirsî ye:*
*5 «Bi qendîla li E’rşî ye,*
*6 T’ijî suȓêt ewlî ya».*
*7 Gote Ĥemedî: «Tu dizanî serdar k’î ye?»*

**S. 15** *1 Ĥemed jî we dibêjî ye:*
*2 «Ew qendîla li E’rşî ye.*
*3 T’ijî suȓêt ewlîya û serdar şêx Adî ye».*
*4 Ĥemed jî we dibêjî ye:*
*5 «Hey Ȓeşmoyî gareyî ye.*

**S. 16** *1 Ew qendîla li E’rşane,*
*2 T’ijî suȓêt xasane».*
*3 Gotê: «Ȓuĥa Ȓeşê jî êk ji wane».*
*4 «Hey Ȓeşmo, yê weke sêla»,*
*5 Dest havête kivanê çingêla,*
*6 Tîrek dabû li kuȓe ȓuwêla.*
*7 Ji vê dinê kirbû vihêla,*
*8 Dergehê Ĥeq û Te’ala.*

**S. 17** *1 Ĥemedî ȓuĥ berdane ser xeyala[2165],*
*2 Ȓuĥ çûbû, mabû qalbekî vala.*
*3 Ȓuĥ Ĥemedî ve digêȓî ye,*
*4 Malxoyê malê li mal nî ye,*
*5 Hûn bêjne min xetêt qalbî kirîn çî ye?»*

**S. 7** *5 Reşî weke sêle,*
*6 Desta hebû kevanekî çençêle,*
*7 Kuştin lawî rûkêle.*

---

[2164] *malxoy*
[2165] *xiyal*

**S. 18** *1 Hê, hê, çî bû, çi cirî ya,*
*2 Xeber li a'lemê geȓî ya,*
*3 Ȓeşê Ĥemed wê kuştî ye.*

**S. 19** *1 Şêx Cefere bi mal de,*
*2 Êk heye di xeberê Ĥemed tal de,*
*3 Hêstir hatin bi şêba kal de.*

**S. 20** *1 Şêx Cefer ȓabû hildiweste,*
*2 Wî jî zînîyek wa li xwe dibeste,*
*3 Bi şarê şêx Adî ve kirbû qeste.*

**S. 8** *1 Melle Cefer ȓadibî,*
*2 Li hespê xwe s[î]yar bî,*
*3 Hewişa P'adşa da peyabî,*
*4 Rûnişt bû digirî.*

**S. 21** *1 Bi êdîka şêx Adî girtbû bi herdu deste.*
*2 Şêx Adî we dibêjîye: «Şêx Cefero, Xelîl xuşka mine,*
*3 Qedrê wê, qedirekî mezine,*
*4 Malo, bila qewal bêne,*
*5 Defa hil p'avêne.*
*6 Ȓeşê li e'zmana çengil dirêjin,*
*7 Malo qewal wa sitraye,*
*8 Semayeka qanûnî li celis û ȓiwaqê,*
*9 Şêx Adî ȓawestaye,*
*10 Û Ȓeşê hatibû ji hewaye.*

**S. 9** *1 Padşa di pirsîyê:*
*2 «Ew dengê giryê kêye?»*
*3 Go: «Dengê giryê melle Cefere».*

**S. 10** *1 Go: «P'adşa dikir sixûne,*
*2 Melle Cefer merîyê mine,*
*3 Qedirê wî mezine».*

**S. 11** *1 Go: «Ji wî ȓa qewala bînin,*
*2 Biȓa li qefa xînin,*
*3 Ȓeş aşiq ji min ȓa bînin».*

**S. 12** *1 Qewala li qefa daye,*
*2 Ȓeş aşiq hat mîna teyraye.*
*3 P'adşa tîrek li Ȓeş aşiq daye.*

*(Dibêjin şêx Adî tîrek di destê Cafer kir û gotê: «Ȓeşê ango p'îr Mehmed Ȓeşan bikuje».)*

*11 Ȓeşê got: «Çî tîreka qewîye,*
*12 Hatibû ji E'rşêt A'lîye*[2166]*,*
*13 Min dizanî tîra şêx Adî yê.*

**S. 22** *1 Tîra şêxê xwe me,*
*2 Mert'alî bernade me,*
*3 Dizanim ȓojekê dê pê herime.*
*4 Xûna Ĥemedê baba westay.*

**S. 23** *1 Şêx Cefer ji wê bi rê bû,*
*2 Û ewê ȓojê Mehmed*[2167] *Ȓeşan (Ȓeşê) li pê bû.*

---

[2166] *êlî*
[2167] *Mamed*

*(Şêx Adî gote Mehmed R̂eşan: «Li pey her̂e. Heke Cafer çû mal got min bi qewata şêx Adî ĥeqê xwe stand, were, lê heke got min bi qewata xwe stand wî jî bikuje».)*

**S. 24** *1 Şêx Cefer bi mal r̂a digehişte,*
*2 Û dabû xeberek ne yî duruste*[2168]*,*
*3 Mehmed R̂eşan digehiştê ew jî dikuşte.*
*4 Ya hatî bi serê şêx Cefere,*
*5 Ne êtin bi serê çu*[2169] *k'afire,*
*6 Li k'eftine yî mixadire.*
*7 Ya hatî bi serê şêx Ceferê zerzane,*
*8 Ne êtin bi serê çi kesane,*
*9 Medûdan şûna êkane.*
**S. 13** *1 Yek hatîye serê şêx Cefer kure,*
*2 Neyê pêşya t'u k'afira*
*3 Her kes me, şûna mixatira.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 106. QEWLÊ P'ÎRÊ DAWIDÊ XERBENDE[2170]

**S. 1** *1 Qedrê mêra yî çende,*
*2 Yî bê kule, yî bê gazinde,*
*3 Da bideyn medhêt Dawidê xerbende.*

**S. 2** *1 Qedrê mêra yî we ye,*
*2 Yî bê kule, yî bê gazinde ye,*
*3 Da bideyn medhêt Dawidê xerbende ye.*

**S. 3** *1 Bifikirine li vî r̂engî,*
*2 Şêx Mûse û silt'anî Zengî,*
*3 We dêçine şêx Adî bi cengî.*

**S. 4** *1 Silt'anê Zeng mêrekî bi k'are,*
*2 Ber diçin dihol û neqare,*
*3 Barek kirî bare,*
*4 Aliyek — sîke, alîyek — jehre,*
*5 Dawid kire qasid, ba şêx Adî ve dihinare.*

**S. 5** *1 Dawid wê diçîye,*
*2 Şêx Adî jê pirsîye:*
*3 «Dawido, dîyarî ya silt'anî Zeng bo min hinartî çîye?»*

**S. 6** *1 Dawid deng diket bi zare:*
*2 «E'zîzê min, çu nîne ji pêş te ve ne yî dîyare,*
*3 Dîyarî ya silt'anî Zeng bo te hinartî, aliyek — sîke, aliyek — jehre».*

**S. 7** *1 Şêx Adî dibê: «Dawido, weye we nîne,*
*2 Tu hilû barê xwe dayîne,*
*3 Dîyarî ya silt'anî Zeng bo min hinare, aliyek — r̂une, aliyek — hingivîne».*

**S. 8** *1 Dawidî bar xwe danaye,*
*2 Silt'an şêx Adî k'eremet tê nemaye,*
*3 Dawid li ser destê şêx Adî [y]î şehda daye,*

[2168] *durist*
[2169] *çi*
[2170] [2] (rr. 858–861)

*4 Dawid spart û hate ser r̂idaye.*

**S. 9** *1 Dawid veger̂iya, silt'anî Zeng jê dipirsîye:*
*2 «Dawid, tu bi Xwedê key, îlaĥîye,*
*3 Dê bêjiye min r̂astîye,*
*4 Hêz û k'eremetêt vî şêxî çîye?»*

**S. 10** *1 Dawid wê we dibê ye:*
*2 Mîro, veger̂ê, were ser r̂ê ye,*
*3 Bêşik hêz û k'eremeta wîya Xwedê ye.*

**S. 11** *1 Silt'anî Zeng yeka neçê kir,*
*2 Zimanê Dawid girt û ji bin jêkir,*
*3 E'cêbî û k'ubariya nefsê kir.*

**S. 12** *1 P'îr Dawid p'îrekî bi erk'ane,*
*2 Sê şeva û sê r̂ojane,*
*3 Ziman ne bû, bi destan xeber dane.*

**S. 13** *1 P'îr Dawid p'îrekî mêrsere,*
*2 Nêv leşkerê silt'anî Zeng ger̂iya seransere,*
*3 Ziman ne bû, bi desta wê didet xebere.*

**S. 14** *1 Dawid vedigeR̂îye,*
*2 Şêx Adî p'if kir devîye,*
*3 Firwara silt'an şêx Adî zimanê wî ĥeft cara çêtirbû berîye.*

**S. 15** *1 Dawido, hilû her̂e,*
*2 Heger xêre û heger şer̂e,*
*3 Ĥimeta min hebit bi te r̂a.*

**S. 16** *1 Dawid dibêjit: «Hey P'adşê mino yî Bêrî,*
*2 Heger tu k'eremetekê ji zimanî mestir nahinêrî,*
*3 Silt'an Zeng li ser destê te naspêrî».*

**S. 17** *1 Şêx Adî bi k'eramete:*
*2 «Dawido, min bi te r̂a şer̂te û her e'ynate,*
*3 Tu leşkerê silt'anî Zeng dê key berbate».*

**S. 18** *1 Şêx Adî dad*[2171] *dixweste,*
*2 Beĥra nazukî bin çengî ve dibeste,*
*3 Li nav leşkerê silt'anî Zeng ve diweste.*

**S. 19** *1 Dadê, dad şidêdî,*
*2 Her̂o sibeyka dê r̂abit siwarbit li bore kulîdî,*
*3 Dêçîte leşkerê silt'anî Zeng bi şkêdî*[2172].

**S. 20** *1 Dada şidêdî hilweste,*
*2 Her̂o sibeyka pişta xwe bi kuçikê şêx Adî ve dibeste,*
*3 Dêçite leşkerê silt'anî Zeng bi şkête*[2173].

**S. 21** *1 Şêx Adî, dad dihinare,*
*2 Li bore kulîdî kire siwarê,*
*3 Zadê wan t'emam di xware,*
*4 Silt'anî Zeng li gel malxweyê*[2174] *xwe mabû yî şermîn, yî şermezare.*

---

[2171] *dot*
[2172] binêr: *şikyat*
[2173] binêr: *şikyat*
[2174] *malxoyê*

**S. 22** *1 Silt'anî Zeng ji malxweyê xwe dipirsîye:*
*2 «Tu bi Xwedê key îlaĥîye,*
*3 K'a tu de bêjiye min r̂astîye, zigê dadê çîye?»*

**S. 23** *1 Malxweyê wî deng dik'et bi zare:*
*2 «Mîro, zige dadê beĥre,*
*3 Dinê û a'lemê ĉar pê nîne,*
*4 Ji ẍêrî Melikê Cebare.*

**S. 24** *1 Mîro, tu zimanê dadê hilîne,*
*2 Di binda heye beĥreke şîne,*
*3 Dinê û a'lemê ĉar pê nîne,*
*4 Ji xerê qutbê zemîne».*

**S. 25** *1 Şêx Adî xwedanê qirarê,*
*2 Mêr cema' kirin li miẍarê,*
*3 Dawid xelat kirbû wê carê.*

**S. 26** *1 P'îr Dawid p'îrekî bi erk'ane,*
*2 Hatîye li gel çil mêrane,*
*3 Şêx Adî Dawid kire p'îrê kirvane,*
*4 Ya me sadiqe, û ĥeya, û îmane.*

## 107. QEWLÊ QADÎ BILBAN[2175; 2176; 2177]

**S. 1** *1 P'adşê minî silt'ane,*
*2 Dîyarkir Qadî Bilbane,*
*3 Kire p'îrê Masekane.*
 **S. 1** *1 P'adşê minî silt'ane,*
 *2 Dahirkir Qadî Bilbane,*
 *3 Kire p'îrê Masekane.*

**S. 2** *1 P'adşê minî silt'ane,*
*2 Dîyarkirbû Qadî Bilbanê miskîne,*
*3 Ew ne yî ĥewceyî çî Misĥefan û Yasîne.*
 **S. 2** *1 P'adşê minî silt'îne,*
 *2 Dahir kirbû Qadî Bilbanê miskîne,*
 *3 Ew ne yî ĥewceyî çî Misĥefan, û Yasîne.*

**S. 3** *1 Mêranû dilî,*
*2 Pesna bidin ji ser̂î,*
*3 Qadî Bilbanê Mûsilî.*
 **S. 3** *1 Mêranû dilî,*
 *2 Medha bidin ji E'wilî,*
 *3 Qadî Bilbanê Musilî*[2178]*.*
  **S. 1** *1 Ji mêranû dilî,*
  *2 Medha bidin ji E'wilî,*
  *3 Qadî Bilban li e'rdê Musilî.*

**S. 4** *1 Qadî Bilban lawekî kir bû,*

---

[2175] [50] (rr. 353-355)
[2176] http://www.ezdixandi.com/forum/38-278-1; belavkirin: Şemo Qasim Dinanî.
[2177] *Qewl û çîroka Qedîbilban.* [2] (rr. 557– 560)
[2178] *Mûsil*

*2 Xwedanê zanîna p'iȓ bû,*
*3 Ji batinde yî bi suȓ bû.*

**S. 4** *1 Qadî Bilban lawekî kir bû,*
*2 Xwedanê ilmê p'iȓ bû,*
*3 Ji batinde yî bi suȓ bû.*

**S. 2** *1 Qadî Bilban k'uȓ bû,*
*2 Xwedanê ilmê p'iȓ bû,*
*3 Qadî Bilban ji batin da yî suȓ bû.*

**S. 5** *1 Qadî Bilban yî çê ye,*
*2 Wê dixwînit*[2179] *Elîf û Bê ye,*
*3 K'afî du bûn, kirne sê ye.*

**S. 5** *1 Qadî Bilban yî çê ye,*
*2 Wê dixwînit Elîf û Bê ye,*
*3 K'afî du bûn, kirne sê ye.*

**S. 3** *1 Qadî Bilban mêre, yî çê ye,*
*2 Xwendbû Elîf*[2180] *û Bê ye,*
*3 K'afî du bû, kirne sê ye.*

**S. 6** *1 Dayîka jîr û zane,*
*2 Girtibû destê Qadî Bilbane,*
*3 Dibe cem mellene.*

**S. 6** *1 Dayîka e'rifî û zane,*
*2 Girtibû destê Qadî Bilbane,*
*3 Dibite cem mellene.*

**S. 4** *1 Babê e'rifî, zana,*
*2 Girtibû ĉepilê Qadî Bilbane,*
*3 Wê dibire ber mellene.*

**S. 7** *1 Dayîk dibêje melleye:*
*2 «Min ev kuȓe heye,*
*3 Min divê tu çak şîret bikeye».*

**S. 7** *1 Dayîk dibêje melle:*
*2 «Amanet*[2181] *ev kuȓe,*
*3 Tu baş t'erbiyet bike».*

**S. 5** *1 Bab dibêjite melleye:*
*2 «Min ev kuȓe heye,*
*3 Min dive tu çak nesîĥet bikeye».*

**S. 8** *1 Melle ȓabûye bi gef,*
*2 Şiv hilanî bi k'ef:*
*3 «Qadî Bilban, bêje Elef».*

**S. 8** *1 Melle ȓabû yê bi gef,*
*2 Şif hilanî bi k'ef*[2182]*:*
*3 «Qadî Bilban, bêje Elîf».*

**S. 6** *1 Melle ȓabû bi gef,*
*2 Şiv hilanî bi k'ef,*
*3 Go: «Qadî Bilbano, bêje Elef!»*

**S. 9** *1 Qadî Bilban dibêjitê* [2183]*: «Elîf navê mîre,*
*2 Nebêje Qadî Bilban yî êxsîre,*
*3 Berî te bi vê tip'e yî xebîre».*

**S. 9** *1 [Qadî Bilban dibêjitê:] «Elîf navê mîre,*

---

[2179] *dixûnit*
[2180] *Elef*
[2181] *êmanet*
[2182] *Micîd*
[2183] *got*

*2 Nebêje Qadî Bilban yî sexîre*[2184]*,*
*3 Berî te bi vê ĥerfê yî xebîre».*

**S. 7** *1 Qadî Bilban dibêjitê* [2185]*: «Elîf navê mîre,*
*2 Mebêje Qadî Bilbanî sexîre,*
*3 Qadî Bilban berî te û Adem, pênc sed salî bi vê ĥerfê yî xebîre».*

**S. 10** *1 Melle go*[2186]*: «Bêje Bê»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Bi ĥimeta êkî Bêrî,*
*3 Tu k'eftiye di nav pencên şêrî,*
*4 Heke te aqil hebe, tu dê zû spêrî».*

**S. 10** *1 Melle go: «Bêje Bê»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Bi ĥimeta yekî Bêrî,*
*3 Tu k'eftiye di nav pencên şêrî,*
*4 Heke te aqil hebit, tu dê zû spêrî».*

**S. 8** *1 Melle go: «Qadî Bilbano, bêje Bê!»*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Bê – sewda di cîde,*
*3 Ew suȓa Mecîde*[2187]*,*
*4 Melle ji wê suȓê yî be'îde».*

**S. 9** *1 Melle go: «Bêje Ĥê!»*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Ĥê min ĥeband ji dil,*
*3 Tu – e'lim, ez – mutlib,*
*4 Em biçîn ba mîr Mislib».*

**S. 11** *1 Melle go: «Bêje He»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «He – beyana çê bû,*
*3 Şaxek jê bi ȓê bû,*
*4 Erk'an û kelepor jê bû».*

**S. 10** *1 «Bêje Hê!»*
*2 Go: «Hê – beyane çê bû,*
*3 Şaxek jê bi ȓê bû,*
*4 Erk'an û me'rîfete jê bû».*

**S. 12** *1 Melle go Qadî Bilban: «Bêje Dale»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Bi Dale ez bûme delale,*
*3 Hinera Xwedaye, geȓ tim li bale,*
*4 Ezê bibirim serê melle derhale».*

**S. 13** *1 Melle go Qadî Bilban: «Ta tu li pê êkî çê bî,*
*2 Hert'im mêra ȓastî, û îman, û şermî li pê bî».*

**S. 11** *1 Melle go Qadî Bilban: «Ta – t'elpê yekî çê bî,*
*2 Dayîm mêra sadiq*[2188]*, û îman, û ĥeya, li pê bî».*

**S. 14** *1 Melle go Qadî Bilban: «Bêje Sîn»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Sîn – suȓa cîde,*
*3 Ew suȓa Qadî Bilban dîte,*
*4 Melle ji wê suȓê yî dure, û ew nedîte».*

**S. 12** *1 Melle go Qadî Bilban: «Sîn – suȓa cîde,*
*2 Ew suȓa Qadî Bilban dîte,*
*3 Melle ji wê suȓê yî be'îde».*

**S. 11** *1 Go: «Bêje Sîn!»*
*2 Dibêjitê: «Sîn – navê yekî Bêrî,*

---

[2184] *sexîr*
[2185] *go*
[2186] *dibeje*
[2187]
[2188] *sidiq*

*3 Û tu wê k'etîye penca şêrî,*
*4 Heke te aqil heba li sêrî,*
*5 Tu wê zû ji min r̂a spêrî!»*

**S. 12** *1 Melle go: «Qadî Bilbano, bêje Dale!»*
*2 Dibêjitê: «Bi Dalê ez bûme delale,*
*3 Qudreta Ellaĥ Te'ala,*
*4 Bûme qesabê serê melle [yê] derĥale».*

**S. 15** *1 Melle go Qadî Bilban: «Bêje Za»,*
*2 Qadî Bilban dibêjitê: «Za – zeyneta dilî,*
*3 Tu hesay bîne li ser aqilî,*
*4 Te zerb nedîtye, lew tu na xûrcilî».*

**S. 13** *1 Melle go Qadî Bilban: «Zay – zeyneta dilî,*
*2 Tu hesay bîne li ser aqilî,*
*3 Te [zerb] nedîtye, lew tu na xûrcilî».*

**S. 13** *1 Melle go: «Qadî Bilbano, bêje Za!»*
*2 Dibêjitê: «Za – zeyneta dilî,*
*3 Te zerib nedîtye, tu wê di xûrcilî».*

**S. 14** *1 Melle go: «Qadî Bilban, bi ĥimeta Bêrîye[2189],*
*2 Heke tu bizanî mesebê, tu pê dip'arastî[2190] k'îye».*

**S. 16** *1 Melle we go: «Dema qalbe Adem pêẍember çêkir,*
*2 Û bi ser, dest û p'ê kir,*
*3 Ew k'î bû k'asa hinerê lê kir?»*

**S. 15** *1 Melle we go: «Wextê qalbê Adem p'êẍember çêkir,*
*2 Û bi ser, dest û p'ê kir,*
*3 Ew k'î bû k'asa qudretê lê kir?»*

**S. 17** *1 Qadî Bilban we dibêjitê: «Dema qalbe Adem pêẍember çêkir,*
*2 Bi ser û dest û p'ê kir,*
*3 Tawisî melek' bû, k'asa hinerê lê kir».*

**S. 16** *1 Qadî Bilban we dibêjitê: «Wextê qalbê Adem p'êẍember çêkir,*
*2 Bi ser û dest û p'ê kir,*
*3 Tawis[î][2191] melek' bû, k'asa qudretê lê kir».*

**S. 18** *1 Ewan ilmê xwe di heyotin,*
*2 Melle cot-cot digotin,*
*3 Qadî Bilban çar-çar di verotin.*

**S. 17** *1 Ewan ilmê xwe di heyotin,*
*2 Melle cot-cot digotin,*
*3 Qadî Bilban çar-çar diverotin.*

**S. 19** *1 Melle mabû li matê,*
*2 Leşê melle lerzînke hate,*
*3 Melle nemabû bike ĥikyatê.*

**S. 18** *1 Melle mabû li matê,*
*2 Leşê melle lerizînkek hatê,*
*3 Melle nemabû biket ĥikyatê.*

**S. 20** *1 Melle mabû ĥeyîrî,*
*2 Di dilê xwe da mabû k'ewgirî,*
*3 Çû mizgeftê êwirî.*

---

2189 *Bîrîye*
2190 *diperistî*
2191 *Tawus*

**S. 19** *1 Melle mabû ĥeyîrî,*
*2 Di dilê xwe da mabû k'ewgirî,*
*3 Çû mizgeftê êwirî.*

**S. 21** *1 Çî leşkerekî qewî ye,*
*2 Qadî Bilban dît û nasî ye,*
*3 Ew leşkerê şêx Adî ye.*
**S. 20** *1 Çî cêşekî qewî ye,*
*2 Qadî Bilban dît û nasî ye,*
*3 Ew cêşê Şêx Adî ye.*

**S. 22** *1 Melle r̂abû helwesta,*
*2 Ewî p'ê dana ser p'ê, û dest dana ser desta,*
*3 Got: «Ew k'erem û me'r̂îfet li ba te bû meste».*
**S. 21** *1 Melle r̂abû helwesta,*
*2 Ewî p'ê dana ser p'ê, û dest dana ser desta,*
*3 Got: «Ya Qadî Bilban, ew k'erem û me'r̂îfet li ba te bû meste».*

**S. 23** *1 Melle mabû li wê ye,*
*2 Dest dana ser dest û p'ê dana ser p'ê ye,*
*3 Got: «E'se k'erema mêra ji ba Xwedê ye».*
**S. 22** *1 Melle mabû li wê ye,*
*2 Dest dana ser dest û p'ê dana ser p'ê ye,*
*3 Got: «E'se k'erema mêra ji ba Xwedê ye».*

**S. 24** *1 Melle deng diket bi xweye:*
*2 «Ev k'erem û me'r̂îfet li ba te heye,*
*3 Tu çima min nake ya mirîdê xweye?»*
**S. 23** *1 Melle deng diket bi xweye:*
*2 «Ev k'erem û me'r̂îfet li ba te heye,*
*3 Tu çima min nake ya mirîdê xweye?»*
**S. 14** *1 Melle go: «Qadî Bilbano, tuyî bi hoye,*
*2 Heke ev ilm û r̂ê li ba teye,*
*3 Çima tu min nakî mirîdê xweye?»*

**S. 25** *1 Melle mabû li mangê,*
*2 Dest havîte daman û dangê,*
*3 Got: «Tu min r̂ezgar bike ji ve zext û astange».*
**S. 24** *1 Melle mabû li mangê,*
*2 Dest havîte daman û dangê,*
*3 Got: «Tu min xilas bike ji vê e'zeb û astangê».*

**S. 26** *1 Melle hêwirî û dibêjî ye:*
*2 «R̂êberê min şêx Adî ye*
*3 Û p'îrê min Qadî Bilbane!»*
**S. 25** *1 Melle hêwirî û dibêjî ye:*
*2 «Ĥeqiya min şêx Adî ye,*
*3 Û p'îrê min Qadî Bilbane!»*
**S. 15** *1 Qadî Bilban go: «Melê bêje Ĥeqê min bi Xwedê,*
*2 Şêxê min şêx Adî,*
*3 P'îrê min Qadî Bilbane!»*

*Em di kêmim, û Xwedê yî t'emame!*

# 108. QEWLÊ MELLE ABÛ BEK'IR[2192]

**S. 1** *1 Minetk'arim ji minetê,*
*2 Vavartim ji şire'tê,*
*3 [Il-]ĥemdillah û şikir havêtime ser pişka şêxê sinetê[2193].*

**S. 2** *1 Minetk'arim ji mîra,*
*2 Vavartim ji xenzîra,*
*3 [Il-]ĥemdillah û şikrî havêtime ser pişka şêxan û p'îra.*

**S. 3** *1 Minetk'arim ji A'diya,*
*2 Vavartim ji r̂afîdiya,*
*3 [Il-]ĥemdillah û şikirî havêtime ser pişka mala A'diya.*

**S. 4** *1 Ji A'diya minetk'arim,*
*2 Bi şêx û p'îr, hosta û mirebî, yarû birêt axretê ezî p'arim,*
*3 Bi silt'an Êzîd r̂a xunk'arim[2194].*

**S. 5** *1 Min çî dur̂eke[2195]zer dit,*
*2 P'adşê xweyê[2196] hiner bin dît,*
*3 Min di batin da qere şêx Mend dît.*

**S. 6** *1 Aşiqê dilbendim,*
*2 Mîrê mezin zor dixwendim,*
*3 Êxsîrê qere şêx Mendim.*

**S. 7** *1 Aşiqekî babzerim,*
*2 Derwêşekî qelenderim,*
*3 Meydana ĥila yî t'obekerim.*

**S. 8** *1 Birime meydana ĥila,*
*2 Hate pêşîya min êlisa[2197], melle û sofiya,*
*3 Gotin: «Melle Abû Bek'ir misilman[2198] nabî?»*
*4 Min gotê: «No, Wellaĥ!»*

**S. 9** *1 Birime meydana ĥila, min borê xwe meşand,*
*2 Hate pêşîya min êlisa, melle, û sofiya, û qeşe,*
*3 Gotin: «Melle Abû Bek'ir misilman nabî?»*
*4 Min gotê: «Ĥeqiya silt'an Êzî bi min ye xweşe».*

**S. 10** *1 Birime meydana dûre dirêj,*
*2 Min li wê t'erik kirin tehiyat, û r̂ojî, û nivêj,*
*3 Çengilê melle[2199] Abû Bek'ir girtin, go: «Hilû r̂astiya bêj».*

**S. 11** *1 «Ez wê hatim ya çak bi îman kem,*
*2 Mizgefta şerab il-xam kem,*
*3 Ĥeqiya silt'an Êzî navda beyan kem».*

**S. 12** *1 Çendî k'itêba diînin,*
*2 Nuqteke[2200] mey lê dir̂eşînin,*

---

2192 [1] (pp173-178); [2] (гг. 541–545)
2193 *sunet*
2194 *xundkar*
2195 *dur*
2196 *xo*
2197 *êlîş*
2198 *bisilman*
2199 *mula*
2200 *nuxt*

*3 Navê silt'an Êzîyê şîrinî*[2201] *serîf serda diînin.*

**S. 13** *1 Sed k'itêbin û sed misĥefin,*
*2 Dane destê melle Abû Bek'ir bi selefin,*
*3 Ĥemû çon ber nuqteke mey bi t'erefin.*

**S. 14** *1 K'itêba sor û zere,*
*2 Wê dixwînim*[2202] *seransere,*
*3 Wê têda navê şêx Adî û şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 15** *1 Ji k'itêba ez k'eşafim,*
*2 Caba cay, ĉiyayê Qafim,*
*3 Ji Adiya ezî şerafim*[2203]*.*

**S. 16** *1 Birime dîyarî beĥra zelale k'ûr,*
*2 Saqî wê beĥrê meyzeke ji duȓ*[2204]*,*
*3 Xewasê wê beĥrê*[2205] *Melikê Ẍefûr.*

**S. 17** *1 K'afira li min qirê da,*
*2 Mîrê mezin li min bi xêr da,*
*3 Belê, min sehkir bihuşt*[2206] *ji min û bira ji dêr da.*

**S. 18** *1 Aşiqekî di p'arêzim*[2207]*,*
*2 Ȓimbazekî bi ȓim bêzim,*
*3 Ji şêx Şems ȓa dibûm*[2208] *ȓêzim.*

**S. 19** *1 Ezim aşiqê a'mî,*
*2 Bazîd ȓa bûm Bestamî,*
*3 Bi silt'an Êzîd ȓa ȓabûm e'rdê Şamî.*

**S. 20** *1 Bi E'lî ȓa bûm şeȓê K'ifarê,*
*2 Bi şêx Adî ȓa bûm li ȓoja miẍarê,*
*3 Bi silt'an Êzîd ȓa bûm ȓoja li Beyt' il-Farê.*

**S. 21** *1 Wê li nebîyêt mahûd*[2209] *xasa,*
*2 P'adşa xaliqê digirt ĥezar û yek nave,*
*3 Wacibe em ĥemû bikeyn nase.*

**S. 22** *1 Divê em beĥr bi Ĥeq bigirîn,*
*2 Çî mêrê li meydana ĥeqî bifikirîn,*
*3 Dersed, ew dê Êzidî mêrîn.*

**S. 23** *1 Ez hind kim, go: «Min ji p'iȓê,*
*2 Ĥeyran mobûn li vê suȓê,*
*3 Ezî li wêderê bûm wekî Êzî e'firandibûm*[2210] *ji duȓê.*

**S. 24** *1 Ez hebûm berî çendî binyana,*
*2 Wextê nijyar dikir e'rd û e'zmane,*
*3 Ez kirime mêvan ser çiqas muxliqê bi gîyane.*

---

[2201] *şirîn*
[2202] *dixûnim*
[2203] *seraf*
[2204] *dûr*
[2205] *ber*
[2206] *behişt*
[2207] *p'arêjim*
[2208] *dibû*
[2209] *mahût*
[2210] *hefirandibûm*

**S. 25** *1 Ez hebûm berî çendî dem bûm,*
*2 Berî şah*[2211] *û ẍem bûm,*
*3 Ew yek bû, ez vê r̂a du bûm.*

**S. 26** *1 Ezim û her ezim,*
*2 Aqisê nefsê qebûl – ezim,*
*3 Ĥusêyînî*[2212] *Ĥelac – ezim,*
*4 Mensûrî Ĥelac – ezim,*
*5 T'irkê t'et'er – ezim,*
*6 Sefîne sere ĉiyayê Cudî bestî – ezim,*
*7 Zêr̂, û zîv, û sifir – ezim.*

**S. 27** *1 Ezim – zêr̂im, e'silê min – sifir,*
*2 Ẍafîla ewser dît û nas nekir,*
*3 Lew bi der ĥeqya silt'an Êzî dibûn k'ifir.*

**S. 28** *1 Ezim melle Abû Bek'rê Cizîrî me,*
*2 Bi e'silê xweyî Adî me,*
*3 [Il-]ĥemdillah û şikir ezî êzîdî me.*

**S. 29** *1 Ez melle Abû Bek'rê Cizîrî bûm,*
*2 Bi e'silê xweyî Qurêşî bûm,*
*3 [Il-]ĥemdillah û şikir ezî êzîdî bûm.*

**S. 30** *1 Ez melle Abû Bek'rim,*
*2 Êzîdîyekî hoy faxirim,*
*3 Şêx û p'îra, û hosta, û merebî, yarû birêt axretê,*
*4 Herr̂o*[2213]*sibeyka, li derê kaniya Sipî sela dikirim.*

## 109. QEWLÊ TEKSTÊ[2214]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Bînin, bînin,*
*2 Borê Memê bînin,*
*3 Tenga lê bişidînin,*
*4 Mem ji nû r̂abxînin.*

**S. 2** *1 Borê Memê anî,*
*2 Zîn kir weke dizanî,*
*3 Mem li sere meydanê nûranî.*

**S. 3** *1 Borê Memê şê ye,*
*2 R̂eş kirbûn dest û p'ê ye,*
*3 Mem xasê Xwedê ye.*

**S. 4** *1 Şêr borê Memê ye,*
*2 R̂eş kirbûn dest û e'nî ye,*
*3 Mem xasê şêx Adî ye.*

**S. 5** *1 Mem xelqê du bêrî,*
*2 Gunehk'ara ne ejdêrî*[2215]*,*

[2211] *şeh*
[2212] *Ĥisên*
[2213] *hero*
[2214] [52] (гг. 149-150)
[2215] *ajêr*

*3 Ĥemû ji şêx Adî divêrî.*

**S. 6** *1 Ew qube li du bane,*
*2 Du şêx li ser r̂awestane,*
*3 Êk – Meme, êk – E'bdilr̂eĥmane.*

**S. 7** *1 Dasinî bi gol û ĉeme,*
*2 Dûmlî bi qewmê xwe*[2216] *ve,*
*3 Li pê p'ira Seratê Meme – şabaş Meme.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 110. QEWLÊ MELEK ŞÊX SIN[2217] – QEWLÊ SILAV Û SED SILAV[2218]

**şaxê – 1**

**S. 1** *1 Silav û sed silav,*
*2 Hey meleko şîrin*[2219] *kilav,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu*[2220] *baxo[yê] şêx Fexrê Adiya, ez bim xulam.*

**S. 1** *1 Silav û sed silav,*
*2 Hey meleko, şîrin kilam,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu baxoyî, ezim xulam.*

**S. 2** *1 Silavêt me li melek şêx Sine,*
*2 Hey mêrdaro yî mezine,*
*3 Ya melek şêx Sin, ji ĥeybeta te dijmin dimirine.*

**S. 2** *1 Silavêt me li melik şêx Sine,*
*2 Mêrdaro yî mezine,*
*3 Ya melik şêx Sin, ji ĥeybetê te dimirin zor dijmine.*

**S. 3** *1 Şêxê mino ji Adiya,*
*2 R̂êbero ber sinîya*[2221]*,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu wê li dereca zor hîvîya*[2222]*.*

**S. 3** *1 Şêxê mino ji Adiya,*
*2 R̂êbero li ber sinîya,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu li dereca zor hîvîya.*

**S. 4** *1 Şêxê mino ji Lalişê,*
*2 Ji qewlê te xilasbûn xişê.*
*3 Ya melek şêx Sin, tu baxo şêx Fexrê Adiya*[2223]*, ez beniyekî ji beniya bi te dijê.*

**S. 4** *1 Şêxê mino ji Lalişê,*
*2 Qewlê te em xilas kirîn ji xişê,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu baxoyê şê[x] Fexrê Adiya, benîyek tişê.*

**S. 5** *1 Şêxê mino t'emam,*
*2 Di girya te di digirî Şerq ĥetanî Şam,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu baxo[yê] şêx Fexrê Adiya, ez xulam.*

**S. 5** *1 Şêxê mino yî t'emam,*
*2 Zik'irê te ji Şerq ĥeta bi Şam,*

---

[2216] *xa*
[2217] [3] (pp. 250–257)
[2218] [2] (rr. 457–462)
[2219] *şirîn*
[2220] *ko*
[2221] *suniya*
[2222] *hêvî*
[2223] *şê Fexirê Adiya*

*3 Ya melik şêx Sin, tu baxoyê şê[x] Fexrê Adiya, ez bibim xulam.*

**S. 6** *1 Tu – beĥrî, ez – r̂o me*[2224]*,*
*2 Tu – kanî, ez – co me,*
*3 Ya melek şêx Sin tu li p'ay, ez li k'ome*[2225]*.*

**S. 6** *1 Tu – kanî, ez – co me,*
*2 Tu – beĥrî, ez – r̂o me,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu li p'ay, ez li k'îme?*

**S. 7** *1 Tu – beĥrî, ez – kanî mê,*
*2 Tu – k'elehî, ez – holî mê,*
*3 Ya melek şêx Sin tu li dahir, ez li k'uyî me.*

**S. 7** *1 Tu – beĥrî, ez – kanî me,*
*2 Tu – k'elehî, ez – olî me,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu li p'ay, ez li k'î me?*

**S. 8** *1 Tu – beĥrî, ez – r̂o me,*
*2 Tu – kanî, ez – co me,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu li p'ay, ez li k'o me?* (binêr: **S. 6**)

**S. 8** *1 Tu – beĥrî, ez – şîv,*
*2 Tu – zêr̂î, ez – ziv,*
*3 Ya melek şêx Sin tu – R̂ojî, ez – Hîv.*

**S. 9** *1 Tu – beĥrî, ez – şîv,*
*2 Tu – zêr̂î, ez – zîv,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – R̂ojî, ez – Hîv.*

**S. 9** *1 Tu – Şemsî, ez – Qemer im,*
*2 Tu – xunk'arî*[2226]*, ez – babzer im,*
*3 Ya melek şêx Sin tu – e'limî, ez – deft'er im.*

**S. 10** *1 Tu – Şemsî, ez – Qemer im,*
*2 Tu – xunk'arî, ez – babzer im,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – e'limî, ez – deft'er im.*

**S. 10** *1 Tu – e'limî, ez – r̂êzan,*
*2 Tu – siwarî, ez – çogan,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu – goykerî ez – meydan.*

**S. 11** *1 Tu – e'limî, ezî – r̂êzan,*
*2 Tu – siwarî, ez – çogan,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – gayîkerî, ez – meydan.*

**S. 11** *1 Tu – Elîfî, ez – r̂o me,*
*2 Tu – siwarî, ez – k'aşo me,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu – ferzî, ez – sinetim.*

**S. 12** *1 Tu – gayîkerî, ez – go me,*
*2 Tu – siwarî, ez – k'aşo me,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu li p'ayî, ez li k'o me?*

**S. 13** *1 Tu – Elîfî, ez – loqet im,*
*2 Tu – Xaliqî, ez – t'erbiyet im,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – ferzî, ez – sinet im.*

[2224] *r̂ûme*
[2225] *binêr: k'ume*
[2226] *xundkar*

**S. 12** *1 Tu – Elîfî, ez – Bê me,*
*2 Tu – bajêrî, ez – r̂ê me,*
*3 Ya melek şêx Sin, nav k'arêd te di me'nê me*[2227].

**S. 14** *1 Tu – Elîfî, ez – Bê me,*
*2 Tu – bacêrî, ez – r̂ê me*
*3 Ya melik şêx Sin, navû dik'irê te ez mane me.*

**S. 13** *1 Tu – bajêrî, ez – sûk*[2228],
*2 Tu – miftehî, ez – sindirûk,*
*3 Ya melek şêx Sin, tuyî – mezinî, ez yî – picûk.*

**S. 15** *1 Tu – bacêrî, ez – sûk,*
*2 Tu – mifteyî, ez – sindirûk,*
*3 Ya melik şêx Sin, tuyî – mezin, ez yî – picûk.*

**S. 14** *1 Tu – babî, ez – pisim,*
*2 Tu – Mekkeyî, ez – Qudsim,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu – mîrî, ez – meclîsim.*

**S. 16** *1 Tu – babî, ez – pisim,*
*2 Tu – Mekkeyî, ez – Qudsim,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – mîrî, ez – meclîsim.*

**S. 15** *1 Tu – mîrî, ez – heval,*
*2 Li min – t'acirî, ez – delal,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu – sûkî, ez – sewal.*

**S. 17** *1 Tu – mîrî, ez – heval,*
*2 Li min – t'acirî*[2229], *ez – delal,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – sûkî, ez – sewal.*

**S. 16** *1 Tu – xinê, ezî – dir̂oj,*
*2 Tu – melhemî, ezî – r̂êj,*
*3 Ya melek şêx Sin, ji nav û k'arêd te dibim hawêj.*

**S. 18** *1 Tu – xinê, ez – dir̂oj*[2230],
*2 Tu – melhemî, ez – r̂êj,*
*3 Ya melik şêx Sin, bi nav dik'rê te dibim hawêj.*

**S. 17** *1 Zêwe – tu Lalişî,*
*2 Mekkeyê*[2231] *– tu berê r̂eşî,*
*3 Ya melek şêx Sin, ji maldara – tu mal t'ijî.*

**S. 19** *1 Ji zêwa – tu Lalişî,*
*2 Ji Mekkeyê – berê r̂eşî,*
*3 Ya melik şêx Sin, ĥaldana – ĥalî t'ijî.*

**S. 18** *1 Tu – hostayî, ez – k'itêb,*
*2 Bixwîne*[2232], *heger te heye êb*[2233],
*3 Ya melek şêx Sin, çêkirin ba te ne e'cêb.*

**S. 20** *1 Tu – hoste, ez – k'itêb,*
*2 Bixwîne heke tê heye fehêt,*
*3 Ya melik şêx Sin, çêkirin li ba te ne şêt.*

---

[2227] binêr: *manî*
[2228] *sûq*
[2229] *t'êcir*
[2230] *dir̂*
[2231] *Mekkeh*
[2232] *bixûne*
[2233] binêr: *e'yb*

**S. 19** *1 Bixwîne seransere,*
*2 Heke êbek tê hate dere,*
*3 Ya melek şêx Sin, çêkirin ba te fere,*
**S. 21** *1 Bixwîne seransere,*
*2 Heke fehêt tê ĥeta dere,*
*3 Ya melik şêx Sin, çêkirin li ba teye fere.*

**S. 20** *1 Tu – hostayî, ez – binyat,*
*2 Tu – xetîbî, ez – civat*[2234]*,*
*3 Ya melek şêx Sin, tu – il-Ĥemdî, ez – teĥiyat.*
**S. 22** *1 Tu – hosteyî, ez – qinyat*[2235]*,*
*2 Tu – xetîbî, ez – civat,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu – «il-Ĥemdî», ez – teĥiyat.*

**S. 21** *1 Tu – e'limî, ez – e'melim,*
*2 Tu – mêvanî, ez – mezelim,*
*3 Ya melek şêx Sin, li navû dik'irê*[2236] *teyî k'amilim.*
**S. 23** *1 Tu – hosteyî, ez – e'melim,*
*2 Tu – mêvanî, ez – mezelim,*
*3 Ya melik şêx Sin, navû dik'irê teyî k'amilim.*

**S. 22** *1 Ji kesa me, tu – kesî,*
*2 Ji veliya*[2237] *me, tu – pisî,*
*3 Ya melek şêx Sin, hem tu ȓuĥî, hem nefesî.*
**S. 24** *1 Ji kesa me, tu – kesî,*
*2 Ji wêrîya me, tu – besî,*
*3 Ya melik şêx Sin, tu hem suȓî, hem nefesî.*

**S. 23** *1 Ji naf[e]sa – tu suȓî,*
*2 Ji horiya – tu ĥuȓî,*
*3 Ji sedefa – tu duȓî.*
**S. 25** *1 Ji suȓa – tu duȓî,*
*2 Ji harîya – tuyî ĥuȓî,*
*3 Ya melik şêx Sin, ji nefesa – tu suȓî.*

**S. 24** *1 Ji duȓa – tu sedefî,*
*2 Ji Qura'na – tu Elefî,*
*3 Ya melek şêx Sin, ji sunda tu bo me mesĥefî.*
**S. 26** *1 Ji duȓa – tu sedefî,*
*2 Ji Qura'na – tu Elefî*[2238]*,*
*3 Ya melik şêx Sin, ji sicûda – tu mesĥefî.*

**S. 25** *1 Ji desta – emînî,*
*2 [Ji] Qura'na – tu Yasînî,*
*3 Beĥrên giran dimeyînî.*
**S. 27** *1 Ji desta – tuyî emînî,*
*2 Bo me – tu meseb û dînî,*
*3 Beĥrêt giran dimeyînî*[2239]*.*

**S. 26** *1 Tu bo me meseb û dînî,*

---
[2234] *civet*
[2235] *kinyat*
[2236] *nav û dik'ar*
[2237] *welî*
[2238] binêr: *Elîf*
[2239] *dimehînî*

*2 Ya melek şêx Sin xwezma wê r̂uĥê, tu bidî û jê nestînî,*
*3 Bi zor dereca gehînî.*

**S. 28** *1 Ya melik şêx Sin, sed xwezme bi wê r̂uĥê bê, jê nestînî,*
*2 Zor dereca bigehînî,*

**S. 27** *1 Seĥî tu melek şêx Sinî,*
*2 Mêrdarekî mezinî,*
*3 Bînaya ĉavê minî,*
*4 Sinet navê Şêx Adî, melek şêx Sin sekinî.*

**S. 28** *3 E'sse*[2240]*, tu melik şêx Sinî,*
*4 Serdarekî mezinî,*
*5 Sinetxane bi navê şêx Adî û melik şêx Sin sekinî.*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî t'emamin!*
*R̂eĥme li dayî û babêt guhdara!*

**şaxê — 2**[2241]

**S. 1** *1 Selîm Ellaĥ, selîm Ellaĥ, selîm Ellaĥ!*
*2 Nebîyne, welîne, şe'ba Ĥesen di mê nîne,*
*3 Ellaĥû e'zmîne.*

**S. 2** *1 Xwedê da emîn Cebraîl mizgîne,*
*2 Go: «Her̂e wî nebîy ji min r̂a bîne.*

**S. 3** *1 Ew nebîyê dihinarê,*
*2 P'êya bînin, yan siwarê,*
*3 Ew nebîyê pêve dihinarî,*
*4 Çeva, p'êya bînin, yan siwarê?»*

**S. 4** *1 Cebraîl go: «Ya R̂ebî, ji te wa e'yane,*
*2 Boreqa nebîy lê siwarê bê e'zmana, nizanim k'îjane?»*

**S. 5** *1 R̂ebê min go: «Her̂e bihuşte baẍçê ye,*
*2 Bor tê hene firêrî ye,*
*3 Ya nebîy yeke jare, mombî ye».*

**S. 6** *1 Cebraîl çû bihuşte baẍê [ye],*
*2 Bor hene firêrî ye,*
*3 Ya nebîy yeke jare mombî ye,*
*4 Cebraîl dibê: «Mombîyê, mombiye te ji destê çî ye?»*

**S. 7** *1 Bor jê r̂a dibêje: «Ewe çil r̂ojê min jimare,*
*2 Û min ne dikir û ne diwexvare,*
*3 Ez ji canê xwe a'ciz bûm,*
*4 Min digot: «Wekî yekî melik şêx Sin, nebîyê Xwedê yê her̂e e'zmana,*
*5 Yî çima li min ne yî siware».*

**S. 8** *1 Emîn Cebraîl t'asek ava hildikanî ye,*
*2 Û serda kirî ye,*
*3 Bor bûye firêrî ye,*
*4 Bor tirîye hestî ye,*
*5 Ĥeft cara bor çêtir, du cara bi elî ye (?)*

**S. 9** *1 Bor dir̂ewîne weke tu zanî,*
*2 Ting û berê nûranî,*

[2240] *eseh*
[2241] https://www.youtube.com/watch?v=TEm5AJZaqZI

*3 Siwar dibe nebîyê Ȓeĥmanî.*

**S. 10** *1 Bor diȓewîne dere,*
*2 Zîn zêȓê zere,*
*3 Ting û ber, lal, û duȓ, cewhere,*
*4 Siwar bibe p'êẍembere.*

**S. 11** *1 Wekî bor li wê bû,*
*2 Nebîy li berê li p'ê bû,*
*3 Bor li ber digeȓiya,*
*4 Emîn Cebraîl ber xuriya.*

**S. 12** *1 Go: «Boro, tu nizanî ev çî ye,*
*2 Ev heye', ev nebîye,*
*3 Miraza te ji Xwedê xwesitîye, ev miraza te hasil kirî ye».*

**S. 13** *1 Anî t'acê nûranî,*
*2 Û nebîy serê xwe li hilanî,*
*3 Hew pêştir boreqê p'ê-p'ê li ber hilneyî anî,*
*4 Hile û xerqe jê ȓa anî.*

**S. 14** *1 Nebîy e'zmanê[2242] yekîne,*
*2 Nav meleka bû mizgîne,*
*3 Got: «Hat melik şêx Sin, nebîyê nûrîne!»*

**S. 15** *1 Nebîy e'zmanê duduwe,*
*2 Meleka govendek girtin û meşiyan,*
*3 Go: «Hat melik şêx Sin, ĥebîbê Xwedê, ĥebîbê îlaĥîye!»*

**S. 16** *1 Nebîy e'zmanê sisîyane,*
*2 Meleka govendek girtin û meşiyane,*
*3 Go: «Hat melik şêx Sin, ĥebîbê salîyane!»*

**S. 17** *1 Nebîy e'zmanê çare,*
*2 Meleka govendek girtin û çan k'are,*
*3 Go: «Ya Ȓebî, neyê pêşiye ĥebîbê Xwedê t'u qeda û t'u zeda!»*

**S. 18** *1 Nebîy e'zmanê pence,*
*2 Meleka govendek girtin û hence,*
*3 Go: «Ya Ȓebî, ne yê pêşiye melik şêx Sin ĥebîbê Xwedê t'u qeda û t'u p'ence.*

**S. 19** *1 Nebîy e'zmanê şeşa,*
*2 Meleka li pêşiye melik şêx Sin govendek girtin û meşiyan,*
*3 Go: Ya Ȓebî, bêhna bîna melik şêx Sin ĥebîbê Xwedê çiqa[s] xweşe.*

**S. 20** *1 Nebîy e'zmanê ĥefta,*
*2 Ferqîn bi e'wilî dik'eta.*
*3 Melik şêx Sin xas bû, çû nav xasê Xwedê û şêx Adî dik'eta.*

**S. 21** *1 Ferqîn nuqtê[2243] ji e'zmana,*
*2 Horî hatin t'ebeqe li bî,*
*3 Dixemilînin li gulê sor û sipî,*
*4 Diçine pêşiye nebîy.*

**S. 22** *1 Horî hatin t'ebeqe li ber,*
*2 Hile bi ȓeşin, k'ember zer,*

---

[2242] *asman*
[2243] *niqte*

*3 Diçine pêşiye melik şêx Sin p'êẍember.*

**S. 23** *1 Qesre ji qesrenê dûre,*
*2 Nicena vê zêr̂ê hûre,*
*3 Cîr̂eqe vê gul û mefure,*
*4 Dîwange Xwedê u R̂esule.*

**S. 24** *1 Qesre ji qesrenê dere,*
*2 Nicena vê zêr̂ê zere,*
*3 Dîwange Xwedê û p'êẍembere,*

**S. 25** *1 Xwedê û nebîy bûne cot,*
*2 Not ĥezar k'ilîmetiyê, ĥeqîqetiyê jê r̂a got.*

**S. 26** *1 Not ĥezarê t'emame,*
*2 Mesĥefa R̂eş do destê melik şêx Sin,*

*(Ew qewle ne yî t'emame û çend sebeqe ji yê di kuvîne).*

## 111. BERVEDANA QEWLÊ BORE-BORÊ[2244]; — QEWLÊ FIWARA MELIK ŞÊX SIN[2245]

**S. 1** *1 Veda, veda, berê sibê, mîro, veda,*
*2 Ezê bangîna xa bidim melekê hayîyê e'rş û seda,*
*3 (Bira bangîna kekê Zendînê bihate feqîrekê bi t'ac, xerqê nûraniye li ber da).*
*4 Heyîlo, birano, bira r̂astiya xa birê ne da.*

> **S. 1** *1 Veda berê subê, e'zîzo veda,*
> *2 Mêr û meleka ba dikene kekê şêx Zêndîno ji E'rşêt Semede,*
> *3 Bila ew feqîr bên, yî yêt xerqe û hilekanî di berda,*
> *4 Ew silt'an şêx Adî ye, mîrê mino, ji e'wil ĥeta bi a'bada[2246].*

**S. 2** *1 Veda, veda berê sibê veda, sêwirane zerin,*
*2 Ezê bangîna xa bidim melekê hayîyê E'rşê serim,*
*3 Bira bangîna kekê Zeyîdînê bihate feqîrekî bi t'ac, xerqê nûraniye li berin.*
*4 Şêx Zeyîdîno, me xirab tê finiyê bi te'rî xeberê zara zor k'eserin.*

> **S. 4** *1 Veda berê subê, sêvane zere,*
> *2 Mêr û meleka ba dikene kekê şêx Zêndîn, ji E'rşêt li sere,*
> *3 Bila ew feqîr bên, yî yêt xerqe û hilekanî di bere,*
> *4 Zora ji vê xirabe fênî yê hilgirtbûn ĥeyf û cor, û zor xebere.*

**S. 3** *1 Veda, veda, berê sibê me veda, sêwrane sorin,*
*2 Ezê bangna xa bidim melekê hayîyê E'rşê jorin,*
*3 Bira bangîna kekê Zeyîdînê bahate feqîrekî bi t'ac, xerqê nûraniye bi morin,*
*4 Şêx Zeyîdîno, me xirab tên finiyê bi te'rî, xeberê zarane zorin.*

> **S. 5** *1 Veda berê subê, sêvane sore,*
> *2 Mêr û meleka ba dikene kekê şêx Zêndîn ji E'rşêt jore,*
> *3 Bila ew feqîr bên, yî yêt di berda xerqe û hile kaniyet bi more,*
> *4 Zora ji vê xirabe fênî yê hilgirtbûn zor ĥeyf û core.*

**S. 4** *1 Veda, veda, berê sibê me veda, sêwrane sipîne,*
*2 Ezê bangîna xa bidim melekê hayîyê E'rşê êlîne,*
*3 Bira bangîna kekê Zeyîdînê bahate feqîrekî bi t'ac, xerqê nûraniye bi p'îne,*

---

[2244] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BERVEDANA QEWLÊ BORE-BORÊ (*rr. 88-89) T'ilbîs 2001)
[2245] [2] *QEWLÊ FIWARA MELIK ŞÊX SIN* (pp. 471-472) [6] (rr. 40–43)
[2246] *ebed*

*4 Şêx Zeyîdîno, me xirab tên feniyê bi te'rî, xeberê zara zor tengîne.*

**S. 2** *1 Veda berê subê, sêvane sipî ye,*
*2 Mêr û meleka ba dikene kekê şêx Zêndîn ji E'rşêt Alî ye*[2247]*,*
*3 Bila ew feqîr bên, yî yêt di berda xerqe û hilekanî ye,*
*4 Zora ji vê xirabe fênî yê hilgirtbûn ĥeyf û cor, zor te'lî ye.*

**S. 5** *1 Veda, veda, berê sibê me veda, sêwrane r̂eşin,*
*2 Ezê bangîna xa bidim melekê hayîyê heyîlo li E'rşin,*
*3 Bira bangîna kekê Zeyîdînê bihate feqîrekî bi t'ac, xerqê nûraniye r̂eşin,*
*4 Şêx Zeyîdîno, me xirab tên feniyê bi te'rî, xeberê zara ne di xaşin.*

**S. 3** *1 Veda berê subê, sêvane geşe,*
*2 Mêr û meleka ba dikene kekê şêx Zêndîn ji sera, ji E'rşe,*
*3 Bila ew feqîr bên, yî yêt di berda xerqe û hilekaniyet r̂eşe,*
*4 Zora ji vê xirabe fênî yê hilgirtbûn ĥeyf û cor, û zor xeberêt ne xweşe*[2248]*.*

**S. 6** *1 Herzê, merzê, jorda dimeşin,*
*2 Him şayîne, him gengeşin,*
*3 Dengê bore bora ê'le ê'le da dimaşin,*
*4 Dîharê batinî qûlê şêx Mendê şêx Ferxê r̂eşin.*

**S. 7** *1 Herzê, merzê, jorda têne,*
*2 Dengê bore bora ê'le ê'le disitrêne,*
*3 Dîharê batinî qûlê şêx Mendê şêx Ferxêne.*

**S. 8** *1 Herzê, merzê, şêx Bavika,*
*2 R̂onaya ber dilê aşika,*
*3 Dîharê batinî p'ar tê ne bû xudanê guman û şika.*

**S. 9** *1 Herzê, merzê wan bav-p'îra,*
*2 R̂onaya ber dilê şêx û p'îra,*
*3 Dîharê batinî p'ar tê ne bû xudanê t'u cilk'ûra.*

**S. 10** *1 Herzê, merzê xal-nîşan,*
*2 Ordek ordê çavîşa,*
*3 Şîxadî bavê xurtaye, xudanê dewrêş û dirûşa.*

**S. 11** *1 Herza, merza, herza, merzê,*
*2 Ĥecî cahalê nevsa canê xa dikir xeza,*
*3 Bandê gîyankujê*[2249] *dîwana Şîxadiye heq û ciza.*

## 112. QEWLÊ BORE BORÊ[2250; 2251; 2252]

**S. 1** *1 Sêxê Ĥesen [yî] silt'ane,* *1 Şêxekî mi hebû nav e'reba, ay nav e'reba,*
*2 Bavêje qelbekî*[2253] *R̂eĥmane,*
*3 Şêx Adî ĥemû derdan yî dermane.*

**S. 1** *1 Sêxê Ĥesenî silt'ane,*
*2 Bavêjî qelbê*[2254] *R̂eĥmane,*
*3 Silt'an Ezdîd ĥemû derda yî dermane.*

**S. 1** *1 Sêxê Ĥesen [yî] Silt'ane,*

[2247] *Elî*
[2248] *ne xoşe*
[2249] *gîhakuj*
[2250] *Qewlê boreborê* [29] (rr. 318–323) (№ 1681)
[2251] http://www.ezdixandi.com/forum/38-827-1
[2252] *Qewlê boreborê* [31] (rr. 53–56)
[2253] *qelpek*
[2254] *qelp*

*2 Bavekî[2255] qelbê[2256] Ȓeĥmane[2257]*
*3 Silt'an şêx Adî ĥemû derda dermane.*

**S. 2** *1 Sêxê Ĥesenî feqîre,*
*2 Bavêje qelbekî mîre,*
*3 Şêx Adî ĥemû derdan yî[2258] xebîre.*

**S. 3** *1 Sêxê Ĥesenî feqîre,*
*2 Bavêjî qelbê mîre,*
*3 Silt'an Êzdîd[2259] ĥemû derda yî xebîre.*

**S. 2** *1 Sêxê Ĥesenî feqîre,*
*2 Bavekî qelbê mîre,*
*3 Silt'an şêx Adî ĥemû derdan yî xebîre.*

**S. 3** *1 Sêxê Ĥesenî mezine,*
*2 Bavêje qelbekî momine,*
*3 Miraza mirazxweza[2260] qap'îya melek şêx Sine, ciyê gilî, gazina.*

**S. 4** *1 Sêxê Ĥesenî mezine,*
*2 Bavêjî qelbê momine,*
*3 Qap'îyê miraza, qap'îyê melîk şêx Sine.*

**S. 3** *1 Sêxê Ĥesenî mezine,*
*2 Bavekî qelbê momine,*
*3 Mirazê mirazxweza qap'îya melî şêx Sine.*

**S. 4** *1 Sêxê Ĥesenî seĥîde,*
*2 Bavêje qelbekî mirîde,*
*3 Miraza mirazxweza qap'îyê silt'an Êzîde.*

**S. 2** *1 Sêxê Ĥesenî cîde,*
*2 Bavêjî qelbê mirîde,*
*3 Qap'iyê miraza, qap'iyê silt'an Êzdîde.*

**S. 4** *1 Sêxê Ĥesenî siĥîde,*
*2 Bavekî[2261] qelbê mirîde,*
*3 Mirazê mirazxweza qap'îyê Silt'an[2262] Êzîde.*

**S. 5** *1 Sêxê Ĥesenî e'mere,*
*2 Xaliqekî minî her bi here,*
*3 Bê ferwara şêx Adî û cizareta ȓuĥ nehate bere.*

**S. 5** *1 Sêxê Ĥesenî e'mere,*
*2 P'adşakî minî herî bi here,*
*3 Ȓuĥ bêy ferwara Xwedê, husin û cisna nayê dere.*

**S. 6** *1 Sêxê Ĥesenî e'mere,*
*2 Xaliqê[2263]minî her bi here,*
*3 Bê ferwara[2264] şêx Adî, melî şêx Sin, ȓuĥ qalbî nayête[2265] dere.*

**S. 6** *1 Sêxê Ĥesenî esede,*
*2 Bavêje qelbekî semede[2266],*
*3 Bê ferwara şêx Adî cizareta ȓuĥ nehate bere.*

**S. 6** *1 Sêxê Ĥesenî esede,*
*2 Bang dike E'rşê ser meda,*

---

[2255] *bavê*
[2256] *qelp*
[2257] *reman*
[2258] *derdanî*
[2259] Biner: *Êzîd*
[2260] *mirazxaz*
[2261] *bavêje*
[2262] *sultan*
[2263] *xalq*
[2264] *fewrar*
[2265] *nayê te*
[2266] *semend*

*3 P'adşayê min yekê Semede*[2267]

**S. 5** *1 Sêxê Ĥesenî esede,*
*2 Bavekî qelbê semede,*
*3 Serbira şêx Adî ne li male*[2268] *sede*[2269].

**S. 7** *1 Çi e'cêbeke wa k'ibîre,*
*2 Ber derê mîre,*
*3 E'wil P'adşa dît feqîre.*

**S. 8** *1 Çi e'cêbeke wa k'ibîr bû,*
*2 Ber derê mîr bû,*
*3 E'wil P'adşa dît, feqîr bû.*

**S. 7** *1 Sêxê Ĥesenî celale,*
*2 Borê qudretê yî siware*[2270]*,*
*3 Şêx Adî xwe*[2271] *t'extê xwe pê ȓa qiȓare.*

**S. 7** *1 Sêxê Ĥesenî celale,*
*2 Borê qudretê yî siware*[2272]*,*
*3 Silt'an şêx Adî ĥemû derda yî dermane.*

**S. 8** *1 Şêxê Ĥesenî duȓ*[2273] *cemale,*
*2 Borê qudretê yî siware*
*3 Bê ferwara şêx Adî, melî şêx Sin, t'u ceseda*[2274] *ȓuĥ te nayê bare.*

**S. 8** *1 Şêxekî min heye Ĥeq warî ye*[2275]*,*
*2 Zerb*[2276] *û kewanê qudretê p'ara wî ye,*
*3 Çardeh*[2277] *t'ebeq*[2278] *e'rd û e'zman k'efa destê silt'an şêx Adî ye.*

**S. 9** *1 Şêxekî min hebû, Ĥeq warî*[2279] *bû,*
*2 Zerb û kewanê*[2280] *qudretê p'ala wî bû,*
*3 Çardeh t'ebeq e'rd û e'zman k'efa destê silt'an şêx Adî da bû.*

**S. 9** *1 Şêxekî min hebû Ĥeq war da*[2281]*,*
*2 Zerb û kewanê qudretê p'al da,*
*3 Çardeh t'ebeq e'rd û e'zman k'efa silt'an şêx Adî da ĥesar da.*

**S. 10** *1 Şêxekî min hebû Ĥeq war da,*
*2 Dergewanê qudretê p'al da,*
*3 Çardeh t'ebeq e'rd û e'zman k'efa destê şêx Adî da hesar da.*

**S. 10** *1 Şêxekî min hebû nava e'reba,*
*2 Xwedanê*[2282] *qelsan*[2283] *û t'eleba,*
*3 Destê P'adşayê k'oteke ser çar meseba.*

**S. 30** *1 Sêxekî min heye li e'rebê,*
*2 Xwedanê dayînê t'elebê,*
*3 Silt'an Ezdîd P'adşayê mine, bira medera mi bê.*

**S. 11** *1 Şêxekî min hebû nav e'reba,*

[2267] *sermed*
[2268] *nelimale*
[2269] *sere*
[2270] *sîyar*
[2271] *xu*
[2272] *syar*
[2273] *dur*
[2274] *ceset*
[2275] *Hekarî*
[2276] *zerg*
[2277] *çarde*
[2278] *tevek*
[2279] *Hekarî*
[2280] *zerevan*
[2281] *Hekar*
[2282] *xudan*
[2283] *qolsan*

*2 Xwedanê[2284] qelsan[2285] [û] t'eleba,*
*3 Destê silt'an şêx Adî k'oteke, ser herçar meseba.*

**S. 11** *1 Sêxekî min hebû E'rebistanê,*
*2 Xwedanê dad ol[2286] û danê,*
*3 Me berxê şîlanê,*
*4 P'adşa, silt'an şêx Adî, xwedanê olê[2287] û erk'anê.*

**S. 29** *1 Şêx Zeydînê got:*
*2 «Şêxekî min heye E'rebistanê,*
*3 Xwedanê dayînê û stanê,*
*4 Bira medara min bê vê hanê.*

**S. 12** *1 Sêxekî min hebû E'rebistanê,*
*2 Xwedanê de dorê diranê,*
*3 Silt'an şêx Adî xwedanê t'extê qirarê.*

**S. 31** *1 Sêxekî min heye li Ĥeq ware,*
*2 Zor kevanê qudretê yî bale,*
*3 Çardeh t'ebeqê e'rd û e'zman k'efa destê wî da ĥesare.*

**S. 32** *1 Sêxekî min heye Ĥeq warî yê,*
*2 Zor kevanê qudretêyî bal wî ye,*
*3 Silt'an Ezdîd P'adşayê min, ciyê wî kulî, fîlî, bêrî ye.*

**S. 33** *1 Sae'ta[2288] r̂uĥê min zebî bû,*
*2 Sur̂ekê min derwêşî mixfî[2289] bû,*
*3 Silt'an Ezdîd P'adşayê mine, ciyê wî kulî, fîlî, bêrî bû.*

**S. 34** *1 Sae'ta r̂uĥê min xar bû,*
*2 Sur̂ekê min derwêşî dahir bû,*
*3 Silt'an Êzdîd P'adşayê mine, ciyê wî Ĥeq war bû.*

**S. 9** *1 Wê qubê kim, qubanê dere,*
*2 Têda dêîsîye find û şemalê zere,*
*3 Silt'an Êzdîd P'adşê mine, xwe r̂ûnistîyê bere.*

**S. 12** *1 Wê qubêkim, quba sur̂a e'zmîne,*
*2 Têda diteîsîye find û şemal, bêsûsêd r̂engîne,*
*3 P'adşa silt'an şêx Adîye, dîwanbegî Şemsê Êzdîne.*

**S. 11** *1 Wê qubê kim, sur̂ê e'zmîne,*
*2 Têda dêîsîye find û şemala nûrîne,*
*3 Dîwanbegê dîwanê Şemse, qûlê dîwanê melîk Fexredîne.*

**S. 13** *1 Wê qubêkim, quba sur̂a E'rşe,*
*2 Têda diteîsîye find û şemal, bêsûsêd geşe,*
*3 P'adşa silt'an şêx Adîye, dîwanbegî Şemse.*

**S. 10** *1 Wê qubê kim, serî li E'rşe,*
*2 Têda dêîsîye find û şemalê geşe,*
*3 Qûlê dîwanê melîk Fexredine,*
*4 Dîwanbegê dîwanê Şemse.*

**S. 14** *1 Wê qubêkim, quba qubana seransere,*
*2 Têda diteîsîye find û şemal, bêsûsêd zere,*
*3 P'adşa silt'an şêx Adîye, dîwanbegî Şemsê T'etere.*

---

[2284] *xudan*
[2285] *qolsan*
[2286] *dadol*
[2287] yol
[2288] *sehet*
[2289] *nixmî*

**S. 12** *1 Wê qubê kim, ser ĥemû qubane,*
*2 Têda dêîsîye sêsed û şêst û şeş ĉirane,*
*3 Silt'an Êzdîd P'adşê mine, destê wî ser herçar qulbane.*

**S. 13** *1 Lalisa nûrîn xemê min dibirin,*
*2 Dara qewala, zincîr, t'op'a mîra wer dikirin,*
*3 Dîndaran yarû birê axretê şa dikirin.*

**S. 14** *1 Lalisa nûrîn xemê min dibine,*
*2 Dara qewala, zincîr, t'op'a mîra wer kirine,*
*3 Dîndara yarû birê axretê şa kirine.*

**S. 15** *1 Wê qubêkim, quba qubana zêde,*
*2 Sitîya*[2290] *Îs r̂ûniştîye têde,*
*3 Benîyê nûranî têne serda.*

**S. 16** *1 Dilê min vê fikarê,*
*2 Sindirûka melek Adî ber derê K'abil mix̂erê,*
*3 P'adşa ewe silt'an şêx Adî, P'adşayê olê û erk'anê.*

**S. 17** *1 Dilê min vê hidretê,*
*2 Sindirûka melek Adî ber dere K'abil nixtê,*
*3 P'adşa silt'an şêx Adî ye, dinê [û] axretê.*

**S. 18** *1 Ba[y]ê sera me têne,*
*2 Gazî û banga ji me'nêne,*
*3 Têne berberê şêx Adî ew jî mêne.*

**S. 16** *1 Evê ser̂a têne,*
*2 Şaye bi xemêne,*
*3 Ewê çûne dîwana şêx Adî, li wêne.*

**S. 19** *1 Ba[y]ê sera me hatin,*
*2 Gazî û banga manî*[2291] *ji xebatin*[2292]*,*
*3 Têne berberê şêx Adî ew jî matin.*

**S. 15** *1 Evê*[2293]*sera hatin,*
*2 Şaye bi xebatin,*
*3 Ewê çûne dîwana şêx Adî, nehatin.*

**S. 20** *1 Ezî ew ĥal bûm,*
*2 Derwêşekî şîv û bêşîv, tengî, tal*[2294] *bûm,*
*3 Xazila min wê r̂ojê kekê şêx Zeydînê*[2295] *Lalişa nûranî da şêx Adî r̂a hevêl bû[m].*

**S. 13** *1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê li me veda,*
*3 Bangîna xwe bigîne melekê*[2296] *E'rşê Semeda,*
*4 Hawara kekê şêx Zeydînê*[2297] *bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî r̂eşî nûrînî berda.*

**S. 21** *1 Ezî ew r̂eng bûm,*
*2 Derwêşekî şîv û bêşîv, ta'lî, teng bûm,*
*3 Xazila min wê r̂ojê kekê şêx Zeydînê Lalişa nûranî da şêx Adî r̂a ew r̂eng bûm.*

---

[2290] *stî*
[2291] binêr: *me'nî*
[2292] *xevat*
[2293] *avê*
[2294] *te'l*
[2295] *Zendîn* (**S. 20** – **S. 25**)
[2296] *melek*
[2297] *Zinîn*

**S. 17** *1 Mangê serayê r̂eşin,*
*2 Şaye bigeyn geşin,*
*3 E'ydê feqîra – e'ydine jê xweşin.*
**S. 16** *1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane r̂eşe,*
*3 Hawara kekê şêx Zeydîn bihata feqîrekî t'ac leka,*
*xerqekî r̂eşî wê bik'eleşe,*
*4 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriyê davîtin xeberê zor nexweşin.*

**S. 18** *1 Mangê serayê sorin,*
*2 Şaye bi carin[2298],*
*3 E'ydê feqîra – e'ydine jê zorin.*
**S. 14** *1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane sore,*
*3 Hawara kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka,*
*xerqekî r̂eşî zincîmore,*
*4 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriya[2299] davetin xeberê E'rşî jore.*

**S. 22** *1 Sera mange zere,*
*2 Navê E'debiyê Şerqê û Şamê bû gazî, mizgînî û xebeyîre,*
*3 Werin, e'yda qurbanê me sinîya[2300] fere.*
**S. 19** *1 Mangê serayê zerin,*
*2 Şaye bi xeberin,*
*3 E'ydê feqîra – e'ydine jê nederin.*
**S. 15** *1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane zere,*
*3 Bangîna xwe bigîne melekê E'rşê sere,*
*4 Bira hawara kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî r̂eşî wê bi nedere,*
*5 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriyê davît xeberê E'rşê k'eser.*

**S. 20** *1 Mangê serayê sipîne,*
*2 Şaya bi xweşîne,*
*3 E'ydê feqîra – e'ydine jê cindîne.*
**S. 17** *1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane sipîye,*
*3 Bangîna xwe bigîne melekê E'rşê Alîye,*
*4 Hawara[2301] kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka,*
*xerqekî r̂eşî nûrînîye.*

**S. 23** *1 Sera mang hilatin,*
*2 Navê E'debiyê Şerqê û Şamê bû gazî, mizgînî, û xebatin,*
*3 E'yda qurbanê me sinîya hatin.*

**S. 21** *1 Gelîyê bakî xweş tê,*
*2 Şayî bi geyn geş tê*
*3 Dengê ĥeznî bore-bora Lalis tê.*

**S. 22** *1 Gelîyê bakî sar tê,*
*2 Şayî bi k'ar tê,*
*3 Dengê ĥeznî bore-bora Ĥek war[2302] tê.*

**S. 24** *1 Ba tê k'ûfa dihejîne,*

---

[2298] *bi corin*
[2299] *fêrîr*
[2300] *sunî*
[2301] *hevar*
[2302] *Hekar*

*2 Dara qewala belg û xezamê xwe ser celis[2303] û r̂ewaqê mîra da diwarîne,*
*3 Xazila min wê r̂ojê kekê şêx Zeydînê dîndara xwe şîna şerîf dixwîne[2304].*

**S. 25** *1 Ba tê k'ûfa t'ev r̂ake,*
*2 Dara qewala belg û xezamê xwe ser celis û r̂ewaqê mîra da warake,*
*3 Xazila min wê r̂ojê kekê şêx Zeydînê dîndara xwe şîna şerîf şa ke.*

**S. 24** *1 We dibêje sitîya Êse,*
*2 Bira her̂e dîwana şêx Adî dîsa,*
*3 Bipirse ĥalê girtîyan û ĥebîsa.*

**S. 25** *1 We dibêje sitîya Ês xwe ye,*
*2 Bira her̂e dîwana şêx Adî we'de ye,*
*3 Bipirse ĥalê me ye.*

**S. 26** *1 Sêx Zeydîno, tu xweyî ne siparî,*
*2 Tu mala Adiya r̂a her pênc t'irêqê xwe r̂a de'wadarî,*
*3 Tu Lalişa nûranî da bê milk'î[2305], bê warî[2306].*

**S. 26** *1 Sêx Zeydîno, tu xweyî ne sparî,*
*2 Tu mala Adiya r̂a her pênc t'irêqê xwe r̂a de'wadarî,*
*3 Tu Lalişa nûranî da bê milk'î[2307], bê warî[2308].*

**S. 27** *1 Sêx Zeydîno, te yeke neçê kir,*
*2 Ĥub û k'ubarî te çima nefsê kir,*
*3 Te çima k'êwrûsk bin ĥulê p'êlûfî danî şerjêkir,*
*4 Şêx Adî nifûnek lê kir, nifûna wî qebûl kir.*

**S. 28** *1 Şêx Zeydîno, te yeke bê usûl[2309] kir,*
*2 Te ne qewlê Xwedê, ne jî ĥedûsa R̂esûl kir,*
*3 Te çima k'êwrûsk bin ĥulê p'êlûfî merebî danî şerjêkir.*

**S. 27** *1 Şêx Zeydînê yeke bê usûl kir,*
*2 Ne qewlê Xwedê kir, ne jî ĥedîsa[2310] R̂esûl kir,*
*3 Kêwrîsk bin hûlê merhevî da şerjêkir,*
*4 Lewma merhevî nifir lê kir,*
*5 Şêx Adî nifiriya merhevî qebûlkir.*

**S. 29** *1 Şêx Zeydîne, şêx Zeydîne,*
*2 P'êlûfî merebî lê dike nifîne,*
*3 Sîxadîyê min avîte Misrê jêrîn pişt beĥrê[2311] hêşîne,*
*4 Axîn dike, ĥizreta wî hê Lalişa nûrîne.*

**S. 28** *1 Şêx Zeydînê, şêx Zeydîne,*
*2 Sîxadî avîte pişta beĥrê şîne,*
*3 Ĥila hisreta Lalişa nûranîye.*

**S. 30** *1 Me bavika k'anê,*
*2 Wê Misrê jêrîn pişt beĥrê pe'nê,*
*3 Xelatê şêx Şems ser mile mêra nîşane.*

**S. 31** *1 Me bavika dûrin,*
*2 Wê Misrê jêrîn pişt beĥrê k'ûrin,*
*3 Xelatê şêx Şems ser mile mêra nûrin.*

---

2303 *cews*
2304 *dixûne*
2305 *bêmilkî*
2306 *bêwarî*
2307 *bêmilkî*
2308 *bêwarî*
2309 *weksûl*
2310 *hedîd*
2311 *be'r*

**S. 32** *1 Teyro, manî*[2312]*,*
*2 Bide p'eȓ û baskê xwe, here ser derê zîndanî,*
*3 Ber miva silavê bike Lalişê derê dîwanî.*
**S. 23** *1 Teyro, teyrê manê,*
*2 Xwedanê dayînê û stanê,*
*3 Emê tavin Zimzimê, qubet il-Bidorê*[2313]*, Dûldûlê*[2314] *danê.*

**S. 33** *1 Teyro, bêrîke,*
*2 Bide p'eȓ û baskê xwe, here ser derê zîndanê guhdarîke*[2315]*,*
*3 Silavê ber miva bike Lalişê derê dîwanêke.*

**S. 34** *1 Ĥeft derge e'zmana hebûn,*
*2 Her ĥefta k'ilît û mifte ji xwe bûn,*
*3 Destê wan cindiya vedbûn,*
*4 Destê her pênc t'irêqê wan ser kir û e'melê wan şehda*[2316] *bûn.*

**S. 35** *1 Ĥeft derge e'zmana hene,*
*2 K'ilît, mifte ji xwene,*
*3 Destê her pênc t'irêqê wan ser kir û e'melê wan şehdene.*

**S. 36** *1 Ĥeft qeynt'er dewe hêsirin,*
*2 Bore-bor mi xatira bar dikirin,*
*3 Wekî şêx Adî ĥiz nedikir, beĥra da xef dikirin.*

**S. 37** *1 Ĥeft qeynt'er dewene,*
*2 Bore-bor mi xatira bar dikine,*
*3 Wekî şêx Adî ĥiz neke, beĥra da xef dike.*

**S. 38** *1 Ne ji wan bûm e'reba lêdayî,*
*2 Serî biȓî, leş deşta K'erbelayî mayî,*
*3 Ne ji wan bin destê her pênc t'irêqê wan jê mayî.*

**S. 39** *1 Ne ji wan bûm e'reba kuştî,*
*2 Serî biȓî, leş deşta K'erbelayî hiştî,*
*3 Ne ji wan bin, wek destê her pênc t'irêqê wan jê mayî.*

## 113. QEWLÊ ŞÊXÊ ĤESENÎ SILT'ANE

**şaxê – 1**[2317]
**S. 1** *1 Şêxê Ĥesenî silt'ane, yî silt'ane, silt'ane,*
*2 Ay e'zîzê mala babê mino, babê qelbê*[2318] *Ȓeĥmane,*
*3 Mîrê qelendera, hey li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor, ye bor, ye bor,*
*5 Hey birîndarê mêrano, silt'an şêx Adî, li ĥemû derda yî dermane, ay dermane.*

**S. 2** *1 Şêxê Ĥesenî feqîre, yî feqîre, feqîre,*
*2 Ay e'zîzê mala babê mino, babê qelbê mîre,*
*3 Mîrê qelendera, ay li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor, ye bor, ye bor,*
*5 Hey birîndarê mêrano silt'an şêx Adî, li ĥemû derda yî xebîre, ay xebîre.*

[2312] binêr: *me'nî*
[2313] *Qubildor*
[2314] *Dandol*
[2315] *gudar*
[2316] *şe'da*
[2317] [1] (pp 355-357) ; [2] (гг. 463–465)
[2318] *qelp*

**S. 3** *1 Şêxê Ĥesenî seyîde, yî seyîde, yî seyîde,*
*2 Ay e'zîzê mala babê min, babê qelbê mirîda, hay li min hayê,*
*3 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor, ye bor, ye bor,*
*4 Hey birîndarê mêrano qap'iya miraza, ya Silt'an Êzîde, ay Êzîde.*

**S. 4** *1 Şêxê Ĥesenî mezine, yî mezine, yî mezine,*
*2 Ay e'zîzê mala babê min, babê qelbê momine,*
*3 Mîrê qelendera, hay li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor, ye bor, ye bor,*
*5 Hey birindarê mêrano, qap'iya miraza heye, ya melik şêx Sine,*
*6 Ew ciyê giliyan, gazine, hey gazine.*

**S. 5** *1 Şêxê Ĥesenî dil birîndare, yî dil birîndare, yî dil birîndare,*
*2 Ay e'zîzê mala babê mino, li borê minetê*[2319] *yî siware,*
*3 Mîrê qelendera, hey li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor,*
*5 Hey birîndarê mêrano, bextê mêra heye qiryare, hey qiryare.*

**S. 6** *1 Şêxê Ĥesenî eĥmere, yî eĥmere, yî eĥmere,*
*2 Ay e'zîzê mala babê mino, xaliqekî min her û here,*
*3 Mîrê qelendera, hey li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor,*
*5 Hey birîndarê mêrano, ferwara silt'an şêx Adî donzde[h] ĥezar sere, oy sere.*

**S. 7** *1 Şêxê Ĥesenî esede, yî esede, yî esede,*
*2 Ay e'zîzê mala babê mino, xaliqê min li sere,*
*3 Mîrê qelendera, hay li min hayê,*
*4 Laliş ye bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor,*
*5 Hey birîndarê mêrano, bê firwara silt'an şêx Adî û melik şêx Sin r̂uĥ axte ber çu cesede, ay cesede.*

(*Li her̂e qewlê Şêxê Ĥesenî silt'ane, xilas dibit û qewlê k'ofiya dest p'ê diket*).

**şaxê – 2**[2320]

**S. 1** *1 Sêxê Ĥesenî silt'ane*[2321]*, ay silt'ane, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bavekî bavê qelbê*[2322] *R̂eĥmane, mîrê qelendera, mîr her û here*[2323]*,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm*[2324] *yî p'îrano, e'zîz silt'an şêx Adî ĥemû derdan yî*[2325] *dermane, ax li mine.*

**S. 2** *1 Sêxê Ĥesenî seyîde*[2326]*, ay seyîde, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bavekî bavê qelbê mirîde mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'zîz silt'an şêx Adî ĥemû derdan yî xebîre, ax li mine.*

**S. 3** *1 Sêxê Ĥesenî mezine, ay mezine, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bavekî bavê qelbê momine mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, qap'îya miraza mirazxweza*[2327] *– qap'îya melek şêx Sine*[2328]*,*

---

[2319] *mihnet*
[2320] *Qewlê boreborê* [29] (гг. 440–452) (№ 1711)
[2321] *sultan*
[2322] *qelp*
[2323] *here-here*
[2324] *ĥêkim*
[2325] *derdanî*
[2326] *siĥîd*
[2327] *mirazxaz*
[2328] *Şîxsin*

*ciyê gilî, gazinane, ax li mine.*

**S. 4** *1 Sêxê Ĥesenî esede, ay esede, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bavekî bavê qelbê semede mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ĥezarî sere ne yî li male, ax li mine.*

**S. 5** *1 Sêxê Ĥesenî feqîre, ay feqîre, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bavekî bavê qelbê mîre mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'zîz silt'an şêx Adî ĥemû derdan yî xebîre, ax li mine.*

**S. 6** *1 Sêxê Ĥesenî e'mere, ay e'mere, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Xaliqekî minî her bi here mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, bê ferwara şêx Adî t'u cizatî[2329] r̂uĥ û qelbî nayê bere, ax li mine.*

**S. 7** *1 Sêxê Ĥesenî dur̂[2330] cemale, ay dur̂ cemale, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Borekî qudretê yî siware[2331] mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'zîz silt'an şêx Adî xweş[2332] qirare, ax li mine.*

**S. 8** *1 Sêxê Ĥesenî dur̂ celale, ay dur̂ celale, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Borekî qudretê yî siware mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, t'extê e'zîz silt'an şêx Adî xweyî[2333] qirare, ax li mine.*

**S. 9** *1 Şêxekî min hebû Ĥeq war da[2334], ay Ĥeq war da, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Zor kewanê qudretê p'al da mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, çardeh t'ebeq e'rd û e'zman[2335] k'efa destê e'zîz silt'an şêx Adî ĥesar da, ax li mine.*

**S. 10** *1 Şêxekî min hebû Ĥeq warî bû, ay Ĥeq warî bû, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Zêr̂ kewanê qudretê p'ara wî bû mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, çardeh t'ebeq e'rd û e'zman k'efa destê e'zîz silt'an Êîd da bû, ax li mine.*

**S. 11** *1 Sêxekî mi hebû E'rebistanê, ay E'rebistanê, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Xwedanê[2336] dadê[2337] û didanê, û de'nê, xwedanê merberxê û şîlanê mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'zîz silt'an şêx Adî xwedanê qirare, ax li mine.*

**S. 12** *1 Şêxekî mi hebû nav e'reba, ay nav e'reba, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Xwedanê qelsan[2338] û t'eleba[2339] mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, dastê e'zîz silt'an şêx Adî k'oteke ser herçar meseba, ax li mine.*

[2329] *cisatî*
[2330] *dur*
[2331] *sîyar*
[2332] *xoş*
[2333] *xuyî*
[2334] *hekar*
[2335] *e'sman*
[2336] *xudan*
[2337] *dod*
[2338] *qolsan*
[2339] *t'eref*

**S. 13** *1 Sêx Zeydîno, te yeke neçê kir, ay neçê kir, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Ĥub û k'ubarî nefsê kir mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, k'êrgî bin ĥulê p'îlovî merhevî derxist şerjêkir, ax li mine.*

**S. 14** *1 P'îlovî merhevî p'ifinek lê kir, ay p'ifinek lê kir, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Şêx Adî, melek şêx Sin p'ifîna wî qebûl kir mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, avîte t'ebeqê beĥrê*[2340] *hêşîne, pişta Misrê jêrîne, hê axînya wî tê ser Lalişa nûrîne, ax li mine.*

**S. 15** *1 Şêx Zeydîne, şêx Zeydîne, ay şêx Zeydîne, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bang dide melekê E'rşê E'zmîne mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, avîte pişta Misrê jêrîne, avîte t'ebeqê beĥra hêşîne, axînya wî tê ser Lalişa nûrîne, ax li mine.*

**S. 16** *1 Şêx Zeydîno, te yeke bê usûl*[2341] *kir, ay bê usûl*[2342] *kir, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Te ne qewlê Xwedê kir, ne jî ĥedûsa R̂esûl kir mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, k'êrgî bin ĥulê p'îlovî*[2343] *merhevî derxist şerjê kir, ax li mine.* (binêr **S. 13**)

**S. 17** *1 P'îlovî merhevî p'ifinek lê kir, ay p'ifinek lê kir, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Şêx Adî, melek şêx Sin p'ifîna wî qebûl kir mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ax li mine.* (binêr **S. 14**)

**S. 18** *1 Sêx Zeydîno, tu xwe va ne yî sparî, ay ne yî sparî, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 T'erêqa xwe mala Adiya r̂a de'wedarî*[2344] *mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, Lalişa nûranî da bê milkî, bê warî, ax li mine.*

**S. 19** *1 Avê sera li me têne, ay têne, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Gazî, û gur̂-gur̂, û me'nêne mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'yda qurbanê me sinîya*[2345] *têne, ax li mine.*

**S. 20** *1 Avê sera li me hatin, ay hatin, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Nava E'debiyê Şerqê, Şamê bû mizgîn, gazî, û xebatin mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, e'yda qurbanê me sinîya dihatin, ax li mine.*

**S. 21** *1 Ba tê, k'ûfa dihejîne, ay dihejîne, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dara qewala belg û xezamê xwe ser celis û r̂ewaqê mîrada diwarîne*[2346] *mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, hew xazila wî çoxî, silt'an şêx Adî, melek şêx Sin, kekê Zeydînê dîndara xweye şîrina şerîf bixwîne*[2347]*, ax li mine.*

**S. 22** *1 Ba tê, k'ûfa t'ev r̂adike, ay r̂adike, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dara qewala belg û cewzê xizêmê mîra da war dike mîrê qelendera, mîr her û here,*

---

[2340] *be'r*
[2341] *bêsûl*
[2342] ango: ***bêsiûd***
[2343] *p'îlobî*
[2344] *de'wî dar*
[2345] ***sunî***
[2346] *Sera dara qewala belg û cewzê r̂ewaqê mîrada diwarîne*
[2347] *bixûne*

*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, hew xazila wê hîngê*[2348] *silt'an şêx Adî, melek şêx Sin, kekê Zeydînê dîndara xweye şîrina şerîf şake, ax li mine.*

**S. 23** *1 Nexweşekî işî-bîşî ta'lî*[2349]*-teng bûm, ay ta'lî-teng bûm, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Hew xazila wî çoxî, silt'an şêx Adî, melek şêx Sin Lalişa nûrîn ȓa ezî ew deng bûm mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ax li mine.*

**S. 24** *1 Nexweşekî işî-bîşî ta'lî-teng bûm, ay ta'lî-teng bûm, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Hew xazila wê hîngê silt'an şêx Adî, melek şêx Sin Lalişa nûrîn ȓa ĥewal bûm mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ax li mine.*

**S. 25** *1 Wê qubê*[2350] *kim suȓa*[2351] *E'rşe, ay E'rşe, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Lê diteîse find, û şemal, û baîsisê di geşe mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, P'adşa xwe silt'an şêx Adî ye, dîwanbegî Şemse, ax li mine.*

**S. 26** *1 Wê qubê kim seran sere, ay seran sere, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Lê diteîse find û şemal, baîsisê zere mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, P'adşa xwe silt'an şêx Adî ye, dîwanbegî Şemsê T'etere, ax li mine.*

**S. 27** *1 Wê qubê kim suȓa e'zmîne, ay e'zmîne, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Lê diteîse find, û şemal, baîsisê ȓengîne mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, P'adşa xwe silt'an şêx Adî ye, dîwanbegî Şemsê Êzdîne, ax li mine.*

**S. 28** *1 Wê qubê kim, qubana zê daye*[2352]*, ay zê daye, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Quba sitîya Îsa, sibê-êvarê p'erîke nûranî têye sere mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, qurbana silt'an şêx Adî seransere*[2353]*, ax li mine.*

**S. 29** *1 Veda, veda, mîro veda, ay veda, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Ezê bangîna xwe têkme melekê E'rşê Semeda mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, heylo*[2354] *birano zemanekî hatîye, bira ȓastiya xwe birê ne da, ax li mine.*

**S. 30** *1 Veda, veda, cewane sore, ay sore, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê bore borê alî*[2355] *têne E'rşê jore [mîrê qelendera, mîr her û here],*
*3 Bira bangîna kekê Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anî, xerqekî ȓeşî more mîrê qelendera, mîr her û here,*
*4 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*5 Ya ĥekîm yî p'îrano, kekê şêx Zeydînê xelefê ȓêyê*[2356] *avîtiye ĥefka core, ax li mine.*

**S. 31** *1 Veda, veda, cewane ȓeşe, ay ȓeşe, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê bore borê alî têne E'rşe mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*

---

[2348] *hingê*
[2349] *te'l*
[2350] *quve*
[2351] *suк*
[2352] *zêdeye*
[2353] *seran ser*
[2354] *heyla*
[2355] *e'lî*
[2356] *xeleferîyê*

*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, bira bangîne kekê şêx Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anî, xerqekî r̂eşe,*
*5 Kekê şêx Zeydînê xelefê r̂êyê avîtiye xeberê zor nexweşe, ax li mine.*

**S.32**[2357] *1 Veda, veda, cewane zere, ay zere, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê bore borê alî têne E'rşê sere mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, bira bangîne kekê şêx Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anî, xerqekî r̂eng esmere,*
*5 Kekê şêx Zeydînê xelefê r̂êyê avîtîye ĥefike sere, ax li mine.*

**S.33**[2358] *1 Veda, veda, cewane sipîye, ay sipîye, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê bore borê alî têne E'rşê A'lîye mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, bira bangîne kekê şêx Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anê, xerqekî r̂eşî nûrîne,*
*5 Kekê şêx Zeydînê xelefê r̂êyê avîtiye ĥefike core, ax li mine.*

**S. 34** *1 Her zê*[2359] *merzê wêda tême, ay tême, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Bore borê alî distirême mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ezê qûlê şêx Mendê şêx Fexrê me, ax li mine.*

**S. 35** *1 Her zê merzê wê dimeşim, ay dimeşim, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Hin şayî me, hin gengeşim mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, ezê qûlê şêx Mendê Fexra şêxê r̂eşim, ax li mine.*

**S. 36** *1 Her zê merzê me bapîra, ay bapîra, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Xweş te dengê coqetê şêx û p'îra mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, bira p'ar te nebe xwedanê cor û k'ûra, ax li mine.*

**S. 37** *1 Her zê merzê bavika*[2360]*, ay bavika, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Xweş te dengê coqetê Ĥesinaneka mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, şêx û p'îra bira p'ar te nebe xwedanê cor û şika, ax li mine.*

**S. 38** *1 Her zê merzê, xweş welate, ay welate, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê şêx Adî, melek şêx Sin navda hate mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, wê zeyandî yê çendu qinyate*[2361]*, ax li mine.*

**S. 39** *1 Her zê merzê, her zê merza, ay merza, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Heçî cihalê nevsa xwe bike xeza mîrê qelendera, mîr her û here,*
*3 Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*4 Ya ĥekîm yî p'îrano, dîwanê şêx Alê*[2362] *Şemsa ĥeq û cize, ax li mine.*

---

[2357] **S. 32** *1 Veda, veda, cewane zere, ay zere, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê boreborê e'lî têne e'rşê sere,*
*3 Bira bangîne kekê şêx Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anî, xerqekî r̂eng esmere,*
*4 Mîrê qelendera, mîr here here,Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*5 Ya ĥêkimî p'îrano, kekê şêx Zeydînê xelefê r̂îyê avîtîye ĥefike sere, ax li mine.*

[2358] **S. 33** *1 Veda, veda, cewane sipîye, ay sipîye, e'zîzê mala bavê mino,*
*2 Dengê boreborê e'lî têne e'rşê e'lîye,*
*3 Bira bangîne kekê şêx Zeydînê bihate feqîrekî t'ac erk'anê, xerqekî r̂eşî nûrîne,*
*4 Mîrê qelendera, mîr here here,Laliş ya bor, dîwan ya bor, mergeh ya bor, ya bor, ya bor,*
*5 Ya ĥêkimî p'îrano, kekê şêx Zeydînê xelefê r̂îyê avîtîye ĥefike core, ax li mine.*

[2359] *herzê*
[2360] *bavk*
[2361] *kunyat*
[2362] *Şîxalê*

## 114. QEWLÊ CELWÊ[2363]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Çi Celweke bê qiyase,*
*2 Danê erk'an û e'sase,*
*3 Êzdiyatî pê bû nase.*

**S. 2** *1 K'itêbeka suȓ û pîroze,*
*2 Ya k'amile, ya bê ĥoze,*

**S. 3** *1 K'itêbeka ber firehe,*
*2 Ĥêwkê k'itêbe qerehe,*
*3 Navê pîroz mijdehe.*

**S. 4** *1 Celwe ji hêvênê sinetê[2364] çê bû,*
*2 Bi ava kaniya Sipî mor lê bû,*
*3 Di xezîna Ȓeĥman de ṣax da û sor bû.*

**S. 5** *1 Berê Celwe ṣeṣ fesil bûn,*
*2 Her ṣeṣ bi navê Tawisî melek' bûn,*
*3 Piṣtî hindek sala çar lê zêde bûn,*
*4 Herçar bi navê ṣêx Şems, û ṣêx Fexr, û ṣêx Sin, û ṣêx Adî bûn.*

**S. 6** *1 Melek ṣêx Sin xwedanê k'amilî,*
*2 Şeṣ sala di mix̂erê de ṣix̂ulî,*
*3 Ĥeta Celwa me pê dixemilî.*

**S. 7** *1 Şeṣ sala çile girt,*
*2 Hersal li ber ṣewqa Tawisî melek' ȓadwest,*
*3 Ĥeta jê ȓa hat k'ilîm, û t'erîqet, û k'ilîma dixwest.*

**S. 8** *1 Şêx Sin babê qewmê xwe dikete biȓêzî,*
*2 Ewin qewmê silt'anê minî Êzî,*
*3 Min ji we ȓe anî Celwe bi t'emîzî.*

**S. 9** *1 Min ji we ȓe anî Celwa sor,*
*2 Bi ava kaniya Sipî hatîye bi mor,*
*3 Bi destê her ĥeft milyak'eta pê dayî mor.*

**S. 10** *1 Bi navê Tawisî melek' çêkir,*
*2 Berat' û nîṣan pê ȓa nazil kir,*
*3 Ji êzdiya ȓa bûye k'itêb û deft'er.*

**S. 11** *1 Ji êzdiya ȓe bûye mefer û k'itêb,*
*2 Li mala mezin dahirbû def û ṣibêb,*
*3 Têda heye dem û ĥisêb.*

**S. 12** *1 Dem, û ĥisêb, û miṣure,*
*2 Li e'zmana[2365] û binê beĥra herî k'ûre,*
*3 Bi destê melik ṣêx Sin mûre,*
*4 Dergehê xwe vedke li ber qublet il-Bidore.*

---

[2363] [52] (rr. 87-92)
[2364] *sunet*
[2365] *asman*

**S. 13** *1 Celwe bi ava zêȓ xemilî,*
*2 Navê ĥeftî û du mileta pê dişemilî,*
*3 Her navê Êzî, navê e'wilî.*

**S. 14** *1 Celwe dahat ji milletê êzdî ȓe,*
*2 Nexşekê bi xet û zêȓe,*
*3 Ji ĥemû [w]aȓe xêr û bêre.*

**S. 15** *1 Xêr û bêr derk'et û bû binyan,*
*2 Bû e'sas*[2366] *û sand ji mala Adiyan,*
*3 Mala Adiyan kirne îd û şev beryan,*
*4 Sinetxane*[2367] *pê şa bûn û kirin dîlan.*

**S. 16** *1 Dîlan geȓya ĥeta berê şefeqê,*
*2 Bi şaz, û qidum, û tekistêt sebeqê,*
*3 Ĥemû[w]a pê behwere*[2368] *û çûne cihê ĥeqê.*

**S. 17** *1 Bi ava kaniya Sipî berat' çêdikirin,*
*2 Celwe li civata melik şêx Sin vedikirin,*
*3 Bi qewata şêx Şems hate xweyakirin*[2369]*.*

**S. 18** *1 Şêx Sin şêxê faxir û ilmdar,*
*2 Da sinetxanê mehder û firwar,*
*3 Çendî binêrî, nabînî hind bihadar.*

**S. 19** *1 Çî qumaşekê çendî bohaye,*
*2 Me Laliş pê xeber daye,*
*3 Ĥisabê ȓoj, û meh, û salaye.*

**S. 20** *1 Çî beĥreke binî k'ûre,*
*2 Jê şefiqî çar nûre,*
*3 Dana kenarêt e'rdê suȓe*[2370]*.*

**S. 21** *1 Şêx Sin şêxê sinetê,*
*2 Ĥekîm û delîlê t'erîqetê,*
*3 Xwe kire siwarê ibadetê*[2371]*.*

**S. 22** *1 Şêx Sin gate qewmê Ezdanî:*
*2 «Werin k'ombin li Lalişa nûranî,*
*3 Minê Celwe sor ji we ȓa anî,*
*4 Têda heye ilmê e'rd û e'zmanî».*

**S. 23** *1 Heçî*[2372] *ilmdar hebî ji xwe ȓa dipirsî,*
*2 Hate Laliş û li ber Celwê didersî.*

**S. 24** *1 K'eşkulê Celwê xelatin,*
*2 Ciwharik, û xatim, û berat'in,*
*3 Li malêt şêx Ĥesina da ĉem û Feratin*[2373]*.*

**S. 25** *1 Bîr û bawer bi Celwêye,*
*2 Sond û atqata bi Celwêye,*

---

[2366] *asas*
[2367] *sunetxane*
[2368] binêr: *bawer*
[2369] *xuyakirin*
[2370] binêr: *siȓ*
[2371] *ebadet*
[2372] *hecî*
[2373] *furat*

*3 Ĥelalkirin bi Celwêye.*

**S. 26** *1 Çî Lewĥeke meĥfude,*
*2 Ilmekê paqije ji bo silt'an Êzîde,*
*3 K'itêbên din li ber sicude.*

**S. 27** *1 Çî Lewĥeke bê qiyase*[2374]*,*
*2 Duȓ, û yaqût*[2375]*, û almase,*
*3 Dik'irê li ser ĥemû xasa.*

**S. 28** *1 Şêx Sin k'itêb xitmand bi p'eȓê qudretê,*
*2 Danî ser destê birayê axretê,*
*3 Got: «Eve k'itêba ehlê sinetê*[2376]*».*

**S. 29** *1 Şêx Sin mehder t'eslîm kire şêxê Şemse,*
*2 Horiya*[2377] *hilhiland pê ȓa li E'rşa,*
*3 Gotin: «Ev mehder çî mehdereke xweşe».*

**S. 30** *1 Ji me ȓa k'itêb xweş nîşane,*
*2 Ȓê û ȓesm erk'ane,*
*3 Aşiqê îmanê ji me ȓa dane,*
*4 Tawisî melek' — t'ace û Êzî — silt'ane.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 115. QEWLÊ ŞÊX ŞEMS[2378] (MESTIM JI QEDEHÊ)

**S. 1** *1 Mestin ji qedehê,*
*2 Lalisê Xwedanê qubehê,*
*3 Welîo, dê em bi şêx Şems bideyn medehê.*

**S. 2** *1 Mestin ji dîwanê,*
*2 Em bi şêx Şems biden beyanê,*
*3 Ya şêx Şems, te em anîne ser erk'anê.*

**S. 3** *1 Ya şêx Şems, tuyî Ȓehîmî,*
*2 Xaliqê min ji Qedîmî,*
*3 Li ĥemû derda tuyî Ĥekîmî.*

**S. 4** *1 Ya şêx Şems, tuyî Ȓeĥmanî,*
*2 Tu xaliqê minî canî,*
*3 Li ĥemû derda tuyî dermanî,*
*4 Li ĥemû xaliqa tu xwedanî.*

**S. 5** *1 Here mare, here mişke,*
*2 Here yî te ȓe, here yî ĥişke,*
*3 Ewan jî bi şêx Şems heye bar û pişke.*

**S. 6** *1 Here yî ȓeqe, here yî mare,*
*2 Here yî mixfîye*[2379]*, here yî dahire,*

---

[2374] *qeyas*
[2375] *yakut*
[2376] *sunet*
[2377] *hûrî*
[2378] *Qewlê Şêsims* [2] *Mestin ji qedehê* (гг. 500–510)
[2379] *muxfî*

*3 Wan jî bi şêx Şems pişk û bare.*

**S. 7** *1 Ji malê ȟetanî malê,*
*2 Şêx Şems xwedanê sîqalê,*
*3 Em bi şêx Şems nabiȓîn*[2380] *xeyalê*[2381]*.*

**S. 8** *1 Ji derecê*[2382] *ȟeta derecê,*
*2 Şêx Şems xwedanê ferecê,*
*3 Emê dest û damanêt şêx Şems tiwaf bîn şûna birka K'abet îlaȟîyê, şûna ȟacê.*

**S. 9** *1 Ji stûnê ȟeta stûnê,*
*2 Çil mifte li hindur û xizînê,*
*3 Şêx Şems da dest[ê] xwedanêt me'rîfet û nasînê.*

**S. 10** *1 Ji ĉava ȟeta bi devî,*
*2 Mora şêx Şems lê dik'evî,*
*3 Ya şêx Şems[ê] mêra, meleka, li gel meye, nahêlin em binivî.*

**S. 11** *1 Ji devî, ȟeta ĉave,*
*2 More şêx Şems geȓiyabû li nave,*
*3 Li ba şêx Şems ev dinya se'at û gave.*

**S. 12** *1 Ji serî ȟeta p'êya,*
*2 [Ya] Şêx Şems, te em neqşandîn, danîn ser derêt ȓêya,*
*3 Em ji şêx Şems nabiȓîn hîvîya.*

**S. 13** *1 [Ya] Şêx Şems, te em xwendîn*[2383] *ser vê xilmetê,*
*2 Li ber me veke derîyekî ȓeȟmetê,*
*3 Bipirse li ȟalê me û çendî sinetê.*

**S. 14** *1 Sinet ku sinete,*
*2 Zebûneke kêm t'aqete,*
*3 Ewan jî bi şêx Şems e'ynate.*

**S. 15** *1 Sinet ku di sinîne,*
*2 Zebûnin her di mandîne,*
*3 Em bi şêx Şems bi hîvîne.*

**S. 16** *1 Ya şêx Şems, tuyî emînî,*
*2 Beȟret giran dimeyînî,*
*3 Ba min meseb û dînî,*
*4 Şed xweziya min bi wê ȓuȟê be, tu bideyê, jê nesitînî,*
*5 Zor dereca bigehînî.*

**S. 17** *1 Here yî gure, here yî goȓane,*
*2 Ewin ẍefilêt buxtane*[2384]*,*
*3 Ewan jî şêx Şems xwedane.*

**S. 18** *1 Here yî tirke, here yî t'et'ere,*
*2 Ewin ẍefilêt bê nedere,*
*3 Ewan jî bi şêx Şems mefere.*

**S. 19** *1 Şêx Şemsê minî mîre,*
*2 Bobê me canî*[2385] *sinetxane, û derwêşan, û qelender, û feqîre,*

[2380] *nabiȓîm*
[2381] *xiyal*
[2382] *derince*
[2383] *xûndîn*
[2384] *buxt û tane*
[2385] *çan*

*3 Ew kaniya şêxan û p'îra.*

**S. 20** *1 Ya şêx Şems, tu li bangiyê, û tu li gazîyê,*
*2 Li gel extîyara, li gel r̂êwîya,*
*3 Erk'an sekinî li ser mile E'deviya.*

**S. 21** *1 Ya şêx Şems, me bi te hîvîye,*
*2 Ya şêx Şems, tu li bangî, tuyî li mehdera,*
*3 Li gel extîyara, li gel r̂êbera,*
*4 Erk'an sekinîye li ser milê qelendera.*

**S. 22** *1 Ya şêx Şems, tu meferî!*
*2 Xaliqê minê her û herî!*
*3 R̂isqa*[2386] *didey û r̂isqa diberî!*

**S. 23** *1 Şêx Şemsê minî nûrîne,*
*2 Ser K'ursîya Zêr̂îne,*
*3 K'ilîl u mifte bi destê wîne,*
*4 Vediket dora zor xizîne,*
*5 Sinetxane jê bi hîvîne,*
*6 Tu dermanê ĥemû birîna,*
*7 Li hêre da dibite qewl.*

**S. 24** *1 Here yî e'rebe, here yî e'ceme,*
*2 Ewin ẍefilêt bê k'ereme,*
*3 Ewan jî şêx Şems pêşqedeme.*

**S. 25** *1 File ku filene,*
*2 Bi k'eşîşin, bi abunene,*
*3 Ew jî li pê şêx Şems diher̂ine.*

**S. 26** *1 Hingî xulqê dibûye,*
*2 Here ji inse, here ji cane*[2387]*,*
*3 Ew jî yeke, ji şêx Şems r̂a ne duye.*

**S. 27** *1 Cihû ku cihûne,*
*2 Di selefxware*[2388]*, û buxtane, û nebûne,*
*3 Ew jî bi şêx Şems bi r̂ê çûne.*

**S. 28** *1 Hingî xulqatî bi gîyane,*
*2 Here ji inse, here ji cane,*
*3 Ĥemû wa şêx Şems xwedane.*

**S. 29** *1 Çend xulqatî dibu we,*
*2 Her yî bi k'erbe, her yî bi su*[2389] *we,*
*3 Ew yeke, şêx Şems vê r̂a du we.*

**S. 30** *1 Çendî têt ba û ax, av û agire,*
*2 Bi k'erema melik şêx Şems we dişuẍile,*
*3 Civana*[2390] *melik Şêmsedîn û melik Fexredîn ji e'wil ĥeta bi axire.*

**S. 31** *1 Çendî têt berf û barane,*
*2 Nuqtek ji e'zmana dihate xware,*
*3 Ya şêx Şems, ji ba te destûre, ji ba te firware.*

---

[2386] *r̂izq*
[2387] *juje*
[2388] *selefxor*
[2389] *su*
[2390] *covan*

**S. 32** *1 Çendî teyr difirin,*
*2 P'eȓ û basikêt xwe dinêȓin,*
*3 Ew jî li ba şêx Şems bi suȓin.*

**S. 33** *1 Ĥeftî û du milete,*
*2 Ĥijde ĥezar terz xulyaqete,*
*3 Şêx Şems ĥemûya mor dikete.*

**S. 34** *1 Şêx Şems ĥemûya dimorîne,*
*2 Melik şêx Ĥesen qelemê dik'işîne,*
*3 Melik Sicadîn vê dinyayê difethîne,*
*4 Melik Nasirdîn, çiqas muxliqê bi ȓuĥ, ȓuĥê t'emama distîne.*

**S. 35** *1 Destê melik şêx Ĥesen qelema îmanê,*
*2 Şêxû Bek'ir sekinî ser li berê sikanê,*
*3 Şêx Şems mîre, wê li dîwanê.*

**S. 36** *1 Melik Şêmsedîn P'adşa ye,*
*2 Şêxû Bek'ir mewle ye,*
*3 Nasirdîn şêxê a'la*[2391] *ye*

**S. 37** *1 Şêxê nav bi Nasire,*
*2 Çiqas muxliqê ȓuĥ li bere,*
*3 Wan şevêt giran xew nedikire, wî xwedan dikire,*
*4 Saf û ĥeybetêt melik Nasirdîn li sere.*

**S. 38** *1 Şêxê bi nav Nasirdîne,*
*2 Çiqas muxliqê ȓuĥ li ber tîne,*
*3 Şevêt giran xew lê nîne,*
*4 Nasirdîn ȓuĥa hamûya destine.*

**S. 39** *1 Nasirdîne — Cebraîlê exî ye,*
*2 Ser cêşê çendî velî ye*[2392]*,*
*3 Ji ĥemû mewta*[2393] *xilmeta wî ye.*

**S. 40** *1 Xelat kirim bi du xelata,*
*2 K'eremete mîr Sicadîn we dersate,*
*3 Ewî mîrê k'ifirê ji vê dinyayê hilate*[2394]*.*

**S. 41** *1 Xelat kirim bi Zilfeqarî û Dindilî,*
*2 K'erame mîr Sicadîn we vixûlî,*
*3 Bi sadiqê gehandin me aqilî.*

**S. 42** *1 Şêxê bi [nav] Sica ye,*
*2 Şîrê qet'ilê bora îna ye,*
*3 Ewî mîrê k'ifirê ji dinyayê hilîna ye.*

**S. 43** *1 Şêxê bi nav Sicadîne,*
*2 Şîrê qet'ilê bora di îne,*
*3 Ewî mîrê k'ifirê ji vê dinyayê di hilîne.*

**S. 44** *1 Xelqino, werin zerba*[2395] *bibînin,*
*2 Qub di k'eskin, hilêl di zêȓînin,*

[2391] *e'la*
[2392] *welî*
[2393] *mot*
[2394] *diberate*
[2395] *zurf*

*3 Ew jî bi hêbeta melik Şemsedîn û melik Fexredînin.*

**S. 45** *1 Meliko, tuyî mominî,*
*2 Hey mêrdaro, tuyî mezinî,*
*3 Ya şêx Şems, tuyî li dereca melik şêx Sinî.*

**S. 46** *1 Meliko, tuyî zergûnî,*
*2 Hey mêrdaro, tuyî zemînî,*
*3 Ya melik şêx Sin tu li dereca silt'anî.*

**S. 47** *1 Meliko, tuyî feqîrî,*
*2 Hey jîro, tu çendî jîrî,*
*3 Ya şêx Şems, ji e'wil û axir tuyî xebîrî.*

**S. 48** *1 Ji R̂ojhilat û ĥeta bi R̂ojava,*
*2 Destê şêx Şems k'oteke li ser xasan û xava,*
*3 Ev meclis bi navê şêx Adî û melik şêx Sin dibû t'ebava.*

**S. 49** *1 Ji R̂ojava û ĥeta bi R̂ojhilate,*
*2 Çend aşiq hene, şêx Şems ĥemûwa diket xelate,*
*3 Me maş û debir ji dîwana şêx Şems û melik şêx Sin dihate.*

**S. 50** *1 Xelqîno, werin bipirsin ji qesîdan û manî ye*[2396]*,*
*2 Wekî binyana vê meclisê danî ye.*
*3 Melik Fexredîn dizane hosta k'î ye.*

**S. 51** *1 Melik Fexredîn bi xwe dibû hosta,*
*2 Ev dinya pîvabû bi bosta.*
*3 Deste melik Fexredîn, yek dojeh, yek bihuşte.*

**S. 52** *1 Xelqîno, werin bipirsin xelqê ehlî xêre,*
*2 Ji hev ĥeft t'ebeqe û bere jêre,*
*3 Şêx*[2397] *Fexrê Adiya li wan jî dike istexbêre*[2398]*.*

**S. 53** *1 Be'dî her çardeh t'ebeqa*[2399]*,*
*2 Ew jî t'ijîye ji muxliqa,*
*3 Wan jî tê ĥeya şaya, xeman û ĥeqe.*

**S. 54** *1 Ez birime t'ebeqe bi cefîne,*
*2 Min çardeh t'ebeqe li wê dîne,*
*3 Her çardeh t'ebeqe r̂awesta bû bê stûne,*
*4 Li ser milêt melik Şêmsedîn û melik Fexredîne.*

**S. 55** *1 Birime t'ebeqe bi cefa ye,*
*2 Ya bi sadiqe, ya bi sefa ye,*
*3 Ya t'erîq li ser dana ye,*
*4 Ev meclîs bi navê şêx Adî û melik şêx Sin dibû ava ye.*

**S. 56** *1 Birime t'ebeqe ĥeqîqî Ehmere,*
*2 Ew bû K'ursîy ya ji zêr̂ê zere*
*3 Min li wê dî şêx Nasirdin, Avdelè Omera.*

**S. 57** *1 Birime t'ebeqe bi r̂eqîq,*
*2 Ya li ser danî her ĥeft t'erîq,*
*3 Min li wê dî şêx Nasirdîn, Aba Bek'irê sadiq.*

---

[2396] binêr: *me'nî*
[2397] *şê*
[2398] *stexbêr*
[2399] *tebek*

**S. 58** *1 Birime t'ebeqe ayet[2400] il-K'ursîy,*
*2 Hincê ji şkestîyê û mestîyê, şêx Adî bitirsî,*
*3 Şêx Adî r̂ojê sê cara li ĥalê wê r̂uĥê bipirsî.*

**S. 59** *1 Ez birime t'ebeqa nazilî wer de,*
*2 Sindirûkêt şêx Adî û şêxê Ĥesen, p'erîyêt nûranî têne ser de,*
*3 Navû dik'arê şêx Şemsî[2401] û melik şêx Sin ji e'zmana ĥeta bi e'rde.*

**S. 60** *1 Birime t'ebeqe sema yî,*
*2 [Ya bi sadiq, ya sefa yî,]*
*3 Ya t'arîx û ser dana yî,*
*4 Ev meclîse bi navê şêx Adî û melik şêx Sin dibû ava yî.*

**S. 61** *1 Birime t'ebeqe zincilî t̂emame,*
*2 Çardeh t'ebeqe digeřame,*
*3 Li wê nûrê ĥeyran dimame.*

**S. 62** *1 Ĥeyran dimam li wê nûrê,*
*2 Ez dixwînim[2402] xetan û mişûrê,*
*3 Navê silt'an Êzî li ser k'oka t'embûrê.*

**S. 63** *1 Min xwendbû[2403] ji xetan û mişûra,*
*2 Heke ji ba e'zîz melik Fexredîn bihate destûre,*
*3 Ezê bûme xewasê beĥrêt k'ûre.*

**S. 64** *1 Banga mine dîwanêt E'deviye,*
*2 Yêt weke Ĥesen Dena û Îsîbîya,*
*3 Ew dizanin li r̂ûyê meclîsê çî dibû, çî dicirîya.*

**S. 65** *1 Banga mine dîwanêt feqîra,*
*2 Yêt wek Ĥesen Dena û Ĥesen P'îra*
*3 Ew jî çon pêş dîndara mîre.*

**S. 66** *1 Hincîyê xilmeta mala Adiya bike ji dile,*
*2 Miraza wî we dibe hasile,*
*3 Weke Mandê Şerîf[2404], Mandê Tokile.*

**S. 67** *1 Aşiqo yî p'îre Xala,*
*2 Hincî[2405] canê kulekî e'melekî çakî li bale,*
*3 Ewî ma vê bi şêxî, p'îrî, hoste û merebî, yarû birayê axretê di xware.*

*Xwedanê k'eremê dêrsê gelîyê Lalisê tu bangî r̂eĥmetê[2406]!*
*R̂aĥme li dê û bavên hadêran û guhdaran,*
*Cîh, û mesken, û mek'anê em têde, bi qedrê şêx Adî[2407] û silava Xwedê!*

## 116. QEWLÊ ŞÊX FEXRÊ ZERGUN[2408]

[2400] *heyat*
[2401] *Şêşms*
[2402] *dixûnim*
[2403] *xwindbû*
[2404] *Şirîf*
[2405] *hingî*
[2406] *r̂ahmet*
[2407] *Şîxadî*
[2408] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan [2] (rr. 509-511)

**S. 1** *1 Ji qewlê Şêx Fexrê zergune,*
*2 Hincî nefesa yarû birayêt axretê bik'işîne,*
*3 R̂oja axretê wê derdekî bê derman bibîne.*

**S. 2** *1 Wê bibîne derdekî bê dermane,*
*2 Hincîyê bi yarû birayêt axretêra kirine bi îmane,*
*3 R̂oja axretê ew [y]î bi xwedane.*

**S. 3** *1 P'adşê min, p'ir̂ nexweşe,*
*2 Danabû zor maşe,*
*3 Dewlat t'acîne, yek aşe.*

**S. 4** *1 Aşî go: «Ezî t'ewrî,*
*2 Hey zero e'silî zivirî,*
*3 Ji îmana havirî k'ifirî.*

**S. 5** *1 Ji k'ifirê havirî îmane,*
*2 Xwezîya min t'êr bidîya ew cîye, ew mek'ane,*
*3 Ciyê P'adşayê min li ser silave».*

**S. 6** *1 Min go: «Xasa kir qebûle,*
*2 Gewher k'işabûye ser şure,*
*3 Dabû ber k'eşkûle*[2409]*».*

**S. 7** *1 Min go: «Xasa kir behwere*[2410]*,*
*2 Gewher k'işabûye sere,*
*3 K'eşkûl dabûye bere.*

**S. 8** *1 Ez birime ser mêravê,*
*2 Berî nuqtê*[2411] *pişta bavê,*
*3 Ewî ĥakim bû li mêravê.*

**S. 9** *1 Mêrav li ko fikirî,*
*2 Li beĥreke jor seyrî,*
*3 Li ber agirî ebirî!»*

**S. 10** *1 Ji qewlê şêx Fexrê Adiya,*
*2 Ezî e'silîme, ji nav dik'irê e'silîme,*
*3 Ezî Misrî bûm ji Misrîye.*

**S. 11** *1 Ji e'silê xwe da ezî Misrî bûm,*
*2 Ji nûra îlaĥî bûm,*
*3 Ciyê Ĥesen Besrî bûm.*

**S. 12** *1 Ĥesen dihate Şame,*
*2 Ĥeqyê wî girt t'emame,*
*3 Bi xwe Êzî li ser selame.*

**S. 13** *1 Silav li te ya xan silt'an Êzîde,*
*2 Heçîyê ew sur̂ dîte,*
*3 Li sêrî zire bestin mirîde.*

**S. 14** *1 Ez birime ser sedefê,*
*2 Ez ger̂iya bûm ĥeq Elefê,*
*3 Min navê xwe naskirbû li K'afê.*

---

[2409] *keşkul*
[2410] binêr: *bawer*
[2411] *nuxt*

**S. 15** *1 Sedef îna ť emam kir,*
*2 Min gewher bi nav kir,*
*3 Ciyê P'adşê xwe min silav kir.*

**S. 16** *1 Bi R̂ojhat, ĥeta bi R̂ojava,*
*2 Min dît ĥemû û ĉave,*
*3 Min dît çerxeke şêx Şems û melik Fexredîn digeȓî nave.*

*T'emametîya Xwedê û silt'an şêx Adî!*

## 117. QEWLÊ SILAVÊT CARA[2412] – QEWLÊ SILAVÊT JARA[2413]

**S. 1** *1 Silav, silavêt cara,*
*2 Li mewlayê min û çendî xunk'ara,*
*3 Xunk'aro, serê xwendk'ara,*
*4 Hey qutbo, serê mêrdara.*

**S. 1** *1 Silav, silavêt jara,*
*2 Mewlayê min û çendî xunk'ara*[2414]*,*
*3 Xunk'ar û çendî xunk'ara,*
*4 Hey qutbo, serî mêrdara.*

**S. 2** *1 Silav her hebî,*
*2 Li melik şêx Sin û çendî nebîy,*
*3 Hey şêro, qurtalê t'ebî.*

**S. 3** *1 Silav li we bî,*
*2 Li melik şêx Sin û çendî nebîy,*
*3 Hey şêro, qurtala t'ebî.*

**S. 3** *1 Silavêt xulêma,*
*2 Li melik şêx Sin û çendî qilêma,*
*3 Ji nesrê te feslandibû silêma.*

**S. 2** *1 Silav li ẍulêma,*
*2 Li melik şêx Sin û çendî qilêma,*
*3 Bi sidqê bestirabû silêma.*

**S. 4** *1 Silavêt milyak'eta,*
*2 Li Cebraîl*[2415] *û çendî cumleta,*
*3 Ew kire qubleta ĥemû mileta.*

**S. 4** *1 Silav li milyak'ete,*
*2 Cebraîl û çendî cimlete,*
*3 Ewe qubleta ĥemû milete.*

**S. 5** *1 Silavêt p'îra,*
*2 Hey mewlayê min û çendîn feqîra,*
*3 Tuyî qutbê şêxan û p'îra.*

**S. 5** *1 Silav li feqîra,*
*2 Mewlayê min û çendîn mîra,*
*3 Ewe qutbê şêxê emîra.*

**S. 6** *1 Hey qutbo, te ĉêȓ ji ť emam,*
*2 Ji nîveka Elîf û Lam,*
*3 Ji Sîn te feslandibû ť emam.*

---

[2412] Qewlê şêx Mendê Fexre Belavkirin: Bedel feqîr Ĥeci
http://www.bahzani.net/services/forum/showthread.php?31818-Bedel-feqîr-Ĥeci-Qewl%C3%AA-Silav%C3%AAt-Cara
[2413] *Laliş* № 39 2013 (rr. 42-47) https://ru.calameo.com/books/002518317e89cc0046304
[2414] *xundk'ar*
[2415] *Cibrayîl*

**S. 7** *1 Hey qutbo, te ĉêr ji ĥeqîqe,*
*2 Melik Fexredîn yî k’ûre, binyata wîye emîqe*[2416]*,*
*3 Zor şire’t lê dibûn xerîqe.*

**S. 6** *1 Qutbo, te ĉêr ji ĥeqîqî,*
*2 Ya melik*[2417] *Fexredîn, tu beĥra k’ûra emîqî,*
*3 Zor şerîe’t*[2418] *li beĥra melik Fexredîn bûn ẍerîqî*[2419]*.*

**S. 8** *1 Zora şire’t dixwende,*
*2 Seyîdî*[2420] *wekî Bedir û Mende,*
*3 Di beĥra melik Fexredîn da dibin hinda.*

**S. 7** *1 Sed şirêt wekî, Bedir û Menda,*
*2 Li beĥra melik Fexredîn dibûn hinda,*
*3 Go: «Ezîzê min, hêj û hinda».*

**S. 9** *1 Zor mabûn r̂encûle,*
*2 Ew ji me’nîyan dibûn dûre,*
*3 Ewan ne dizanî melik Fexredîn nûre, e’silê wî ji nûre.*

**S. 8** *1 Hin ye r̂encol bû,*
*2 Ew ji me’nêt k’ûr bû,*
*3 Ewan nizanî melik Fexredîn ji e’sil nûr bû.*

**S. 10** *1 Hey nûro, te nûr ji e’sile,*
*2 Te ji Adem vekiribû R̂esle*[2421]*,*
*3 Te dabû ber Adem fesle.*

**S. 9** *1 Nûro, tu nûrî ji e’sile,*
*2 Ji Adem çûye nesle,*
*3 Lew jê dane fesle.*

**S. 11** *1 Ya melik Fexredîn, wextê te Adem li bihuştê*[2422] *digêr̂a,*
*2 Heke navû îsmê te heba vê r̂a,*
*3 Adem şaş nedikir ĉêra.*

**S. 10** *1 Ya melik Fexredîn, te çaxê Adem li bihuştê digêr̂a,*
*2 Heger navû wesfeta*[2423] *te hebû fêr̂a,*
*3 Ewê r̂ojê şaş nedibû ĉêra.*

**S. 12** *1 Ya melik Fexredîn, te Adem îna der ji bihuştê,*
*2 Heke navû îsmê te ne digehiştê,*
*3 Hewa ne dibû ji piştê.*

**S. 13** *1 Sed salî û berê,*
*2 Te Adem ji bihuştê îna derê,*
*3 Gevizîbû li t’oz û ger̂ê,*
*4 Ĥeta gehişte wê sur̂ê.*

**S. 12** *1 Sed salî û berî,*
*2 Gevizî*[2424] *di nav t’ozê û ĥer̂î,*
*3 Lew gehiştbû wî hewserî.*

**S. 14** *1 Adem sed salî li bihuştê e’mirê xwe dip’er̂at,*
*2 Û gava ji bihuştê der hat,*
*3 Girî, hêstir liber ĉava weke Ferat.*

---

[2416] *e’mîq*
[2417] *melek*
[2418] *şire’t*
[2419] ango: *xerêqî*
[2420] *sedî*
[2421] binêr: *R̂esûl*
[2422] *behişt*
[2423] *usfet*
[2424] *gefiz*

**S. 11** *1 Adem sed sal li bihuştê e'mir têr̂at,*
*2 Wextê ji bihuştê der hat,*
*3 Hind girî, ĥeta hêstir li ber bûne Ferat.*

**S. 15** *1 Ya melik Fexredîn, nebîy Nuĥ*[2425] *bi qewmê xwe ve maye r̂encûle,*
*2 Heke ji ba te ne hatiba destûre,*
*3 Li wan ne difewirî tenûre.*

**S. 13** *1 Nuĥ bi qewmê xwe ve maye r̂encole,*
*2 Û heke ji ba te ne hatinbû destûre,*
*3 Ewê r̂ojê Nuĥ lê ne diqewirî ew tenûre.*

**S. 16** *1 Ya melik Fexredîn, Birahîm Xelîl bi te dikire gazî û haware,*
*2 Heke navû îsmê*[2426] *te ne hatiba [ser] zare,*
*3 Li wan sar ne dibû nare.*

**S. 14** *1 Birahîm Xelîl deng dikir û haware,*
*2 Ya melik Fexredîn, me navû wesfeta te înî bû*[2427] *ser zare,*
*3 Ewê r̂ojê li usfete*[2428] *dibûne mijare.*

**S. 17** *1 Ya melik Fexredîn, nebîy Simaîl gaziyek bi te r̂a dihişte,*
*2 Heke navû îsmê te ne digehişte*
*3 R̂oja qurbaniyê nebîy Simaîl wê bikuşte.*

**S. 15** *1 Simaîl deng r̂adihişte,*
*2 Ya melik Fexredîn, heke navû wesfetê te ne digehişte,*
*3 Ewê r̂ojê Simaîl bi qurbanî dikuşte.*

**S. 18** *1 Ya melik Fexredîn, tu ne wekî kesne,*
*2 Te dabû Usivê nebîya husne,*
*3 Ne xwezka bi wî kesî bit damana li desne.*

**S. 16** *1 Ya melik Fexredîn, tu wekî kesne,*
*2 Te bi Usif r̂a dabû bi ĥisne,*
*3 Sed xwezma*[2429] *wê r̂uĥê bi amanet*[2430] *hebit desne.*

**S. 19** *1 Ya melik Fexredîn, sêrkera sêrker(?)*[2431] *û r̂aza,*
*2 Te bi Mûsa r̂a hinartbû baza,*
*3 Te şah mar di destê wî da kirbû wek'aza.*

**S. 17** *1 Sê kirin, sê zara,*
*2 Mûsa hilînabû baze,*
*3 Lew destê gobal dikire wek'aze,*
*4 Ew wek'az ne ji dara, û li destê Mûsa dikire şah mare, dersed mêra jêra dixwaze.*

**S. 20** *1 Wek'azê Mûsa ne ji dare,*
*2 Te di destê Mûsada kire şah mare,*
*3 Sêra sêrdarêt ferûnî dixware.*

**S. 21** *1 Mûsa û farûn ji e'sile,*
*2 Te dabû Mûsa nesire,*
*3 Ferûn pê dibû k'esire.*

**S. 18** *1 Mûsa û farûn ji e'sile,*
*2 Heker ferun dibû k'esire,*
*3 Wê r̂ojê nedibûn nesire.*

---

[2425] *Noh*
[2426] *ism*
[2427] *bu*
[2428] *usfat*
[2429] *xuzma*
[2430] *emanet*
[2431] binêr: *sêr ker*

**S. 22** *1 Ferûnî Mûsa li beĥrê asê kir,*
*2 Û k'erema wê suȓê beĥr p'ê kir,*
*3 Ji wî paş beĥrê bor bi ȓê kir.*
**S. 20** *1 Ferûn beĥr li Mûsa asê kir,*
*2 Bi qudretê Mûsa nav lê kir,*
*3 Û beĥrê Mûsa bi ȓê kir.*

**S. 23** *1 Mûsa li Misrê bi ȓê bû,*
*2 Ferûn li pê bû*
*3 Ewê ȓojê tavek li binê beĥrê bû.*
**S. 19** *1 Mûsa li wê bû,*
*2 Ferûn li pê bû,*
*3 Ewê ȓojê binê beĥrê ȓoj lê bû.*

**S. 24** *1 Qudreta P'adşayê minî Ekber bû,*
*2 Beĥr jêk ker bi ker bû,*
*3 Mûsa hat bi qewmê xweve sereder bû,*
*4 Ferûn hat û tê wer bû.*
**S. 21** *1 Ji qudretê beĥr ker bi ker bû,*
*2 Mûsa hat û lê sereder bû,*
*3 Ferun hat, û tê wer bû.*

**S. 25** *1 Şubhetî Îsayê kuȓê Miryeme,*
*2 Ya melik Fexredîn te vê ȓa kirî k'ereme,*
*3 Ji e'rda fiȓî ço sema.*
**S. 22** *1 Têt wekî Îsayê bin Miryeme,*
*2 Ya melik Fexredîn te vê ȓa kirî k'ereme,*
*3 Li Îsa nayêt ew çax û ew dema.*

**S. 26** *1 Şêro xwedanê qirarê,*
*2 Ku bi wan ȓa bû wê care,*
*3 Cara li miẍarê*[2432]*.*

**S. 23** *1 Ewe ȓoja li Bee'drê,*
*2 Ĥimeta Leyîl il-Qedrê,*
*3 Mîr ji eta[y] û sedirê.*

**S. 27** *1 K'afa Behzanê ye kevne,*
*2 P'îrkê lê ĉirandibû t'evne,*
*3 Li xasa sa[yî]ye, li ẍafila tarî û şevne.*

**S. 28** *1 Te k'êşa Zilfeqarê*[2433]*,*
*2 Û te t'eslîm kire wê care,*
*3 Tu bi silt'an şêx Adî ȓa bûyî ȓoja li Ĥeq warê.*
**S. 24** *1 Ya melik Fexredîn, te îna Zilfeqar(e),*
*2 Teslûm kir min li efare,*
*3 Şêx Ad îȓa bû[yî] ji Ĥeq warê*[2434]*.*

**S. 29** *1 Silt'an şêx Adî ȓabû li k'efa yê,*
*2 Li serê sefa yê,*
*3 Sadiq*[2435] *duȓa E'yn il-Beyza yê.*
**S. 25** *1 Şêx Adî ȓabû ji vê k'efa yê,*
*2 Hey sero bi sefa yê,*
*3 Sadiqa*[2436] *me E'yn il-Beyza yê.*

[2432] *mixar*
[2433] *Dûlifiqar*
[2434] *Hekar*
[2435] *sedeq*
[2436] *sediq*

**S. 30** *1 Şêx Adî û şik têne,*
*2 Gelek kore wê di heyin, ewan hajî r̂êne,*
*3 Ew her dibêjin we nîne.*
**S. 26** *1 Şêx Adî şêxe û şik tê nîne,*
*2 Hey koro, te hayî r̂ê nîne,*
*3 Silt'an Êzî P'adşayê*[2437] *e'rd û e'zmîne.*

**S. 31** *1 Ewan ne dizanî ewe û her ewe,*
*2 Ne vexwerine û ne xewe,*
*3 Şehde û îmanêt min bi navê Xwedê, Tawisî melek' dibin r̂ewe.*
**S. 27** *1 Ewe, û her ewe,*
*2 Ne xwerin, û ne vexewarin, û ne xewe,*
*3 Me şehde û îmanê xwe qebûl kir ewe.*

**S. 32** *1 Şehdeya wane,*
*2 Ĥerfeke li nav Qura'na*[2438]*,*
*3 T'efsîl naken çu nezane.*

**S. 33** *1 Ĥerfeke bê t'efsîle,*
*2 Xelqê e'rifî, zaneyî, jîre,*
*3 Ew jî dê bêjin: «Ya melik Fexredîn me neke ji bîre».*
**S. 28** *1 Çi ĥerfeke bi t'efsibîr,*
*2 Hey jîro tu çendî jîr,*
*3 Ya melik Fexredîn li dinê her tu yî li bîr.*

**S. 34** *1 Ya melik Fexredîn xelqê zanayî jîr bi te dikir qeste,*
*2 Ĉiya, û banî, û berî, û beĥr, û beste,*
*3 Te nijyar kirbû bi herdu deste.*
**S. 29** *1 Ya melik Fexredîn me bi te kir qeste,*
*2 Deşt û banî, û berî, û beĥr, û beste,*
*3 Xwezî min zanîba ev e'zman k'ê nijinî bi deste.*

**S. 35** *1 Me dil bi kulin, birîn cotin,*
*2 Û me'nîyêt k'ûr nayêne gotin,*
*3 Dil û hinavêt min bo derwêşiyê sotin.*
**S. 30** *1 Dil bi agir kirim, birînêt min cotin*[2439]*,*
*2 Ew me'nîyêt k'ûr nayêne gotin,*
*3 Dil û hinavêt min bo derwêşînê sotin.*

**S. 36** *1 Derwêşekim, aqilê minî kême,*
*2 Aşê muĥbetê bi minî dême,*
*3 E'zîzê min, dewlet nahêlit ez bêmê.*
**S. 31** *1 Min got ez derwêşim, aqilê min ne yî kême,*
*2 Eger aşê muĥbetê li min kire dême,*
*3 Ew dewlet nahêlit ez bêmê.*

**S. 37** *1 Piştî xwe li dar bidem,*
*2 Sadiqê serê xunk'ar*[2440] *bikem,*
*3 Dê li benyekê xwe pirsyar bikem.*

**S. 38** *1 Piştî xwe dar bidey,*
*2 Sadiqê serê xunk'ar bikey,*
*3 Dê li benyekê xwe pirsyar bikey.*
**S. 32** *1 Be'dî bi xwe dêrke,*

2437 *pedşa*
2438 yanê: *Tip'eke li nav Meshefane*
2439 *çotin*
2440 *xwendk'ar*

*2 Tu bi sidqê[2441] serê xwe di kêrke,*
*3 Benî xwe istexbêrke[2442].*

**S. 39** *1 Muĥsinekî ya muĥsin,*
*2 Melik Fexredîn em benyêt teyên[2443], em di naqisin,*
*3 Bi nav dik'irêt te em di xalisin.*

**S. 40** *1 Naqis key ĉêȓe,*
*2 Xeberek wa heye binya wê xeberê zêȓe,*
*3 Wan cindîya ser milêt xwe gêȓa,*
*4 Yê dayîmen mie'meleta[2444] wî ye bi Xwedê ȓa[2445].*
**S. 33** *1 Me naqis kirbû bêȓa,*
*2 Xebera binyat zêȓa,*
*3 Dayîm mie'meleta wan bi Xwedê ȓa.*

**S. 41** *1 Ji qewlê şêx Mendê Fexrane,*
*2 Ȓastemalê mêra îmane.*

*Em di kêmin û Xwedê ťemame!*
*Em di kêmin û Xwedê ťemame!*

## 118. QEWLÊ SILAVÊT MELIK FEXREDÎN[2446; 2447]

**S. 1** *1 Silavên melek Fexredîn ji jor tên,*
*2 Ji deryayên k'ûr tên,*
*3 Li pê Melekê Ẍefûr tên.*
**S. 1** *1 Silavên melîk Fexredîn ji were tên,*
*2 Ber beĥrên k'ûr tên,*
*3 T'elebê Melikê Ẍefûr tên.*

**S. 2** *1 Silavên melek Fexredîn ji ba e'rda tên,*
*2 Ji ba xasê nîşan tên,*
*3 Li pê melekê dilovan tên.*
**S. 2** *1 Silavên melik Fexredîn ji were tên,*
*2 Ji baẍa nîşan tên,*
*3 T'elebê Melikê Ȓeĥman tên.*

**S. 3** *1 Ji ba P'adşê, tê behwire,*
*2 Hincîyê[2448] mirovê fêm, ĥiş di serîde bisewire,*
*3 Ewî şîreta yarû birayê axretê bi xwe hildigire.*
**S. 3** *1 Silavên melik Fexredîn ji P'adşê min nabûhire,*
*2 Hincîyê fehm û aqil di serîde hey her û here,*
*3 Ewê nesîĥeta yarû birên axretê çak hilgire.*

**S. 4** *1 Ji qewlê xweşewîst melek Fexredîne*
*2 Çi P'adsekî minî Bêrîne,*
*3 Gotinên wî saf zêȓîne.*
**S. 5** *1 P'adşayê mino yî Bêrîye,*
*2 Hawirî şaran û ȓîye,*
*3 Dayîm ȓuĥên momina dihijmêrîye.*

---

2441 binêr: *sadiq*
2442 *stexbêr*
2443 *teyin*
2444 *mu'amilet*
2445 yanê: *Yê dewam dan û stanina wî bi Xwedê ȓe.*
2446 [50] *Qewlê melek Fexredîn* (rr. 91-96)
2447 Laliş № 10 1999 (rr. 87-93) belavikirin: Şêx Ĥelo şêx Xelef https://ru.calameo.com/books/0025183176b60928ea526
2448 *henjî*

**S. 5** *1 Hawirî şara guh bidêre*
*2 Dayîm melek Fexredîn di gêre,*
*3 Rewanê bawermenda dijmêre.*

**S. 6** *1 Hincîyê bike gerekî bi t'aqete,*
*2 Ewî bi p'erweste û micadete,*
*3 Ew r̂ewane li ber P'adşê xweyî bi r̂ûmete.*

**S. 6** *1 Ev fikire fikireke bi t'aqete,*
*2 Herçî r̂uĥa ibadet[2449] û miçadete,*
*3 Ew r̂uĥe li ba Xwedê bi e'zete[2450].*

**S. 7** *1 Heke[2451] em bifikirîn,*
*2 Pêş ĥeft qap'îya bibihurîn,*
*3 Ji nû paş li dîwana mîr biwesilîn.*

**S. 7** *1 Win r̂êya şêx Adî mekin destê nezana,*
*2 Û zanabin bi erk'ana,*
*3 K'ifşiyek mafê wana.*

**S. 4** *1 Ŕêya[2452] Êzîd min da destê nezana,*
*2 Ew pê xebîr nebûn bi çû erk'ana,*
*3 Loma ji wan nakim heqê wane.*

**S. 8** *1 Erzan mefroşe dur̂a[2453],*
*2 Mebine sûkê nezana û ĉav kora,*
*3 Ew zû bang dikin, û li e'rdê xînin sur̂a[2454].*

**S. 9** *1 Win r̂êya şêx Adî ji xwe r̂a bigrin,*
*2 Li ber ĥeft derya r̂e r̂abirin,*
*3 Da win bi dîwana mîr bi hevgirin.*

**S. 10** *1 Ez birime dîwana mîr,*
*2 Dane pêşîya min p'îr,*
*3 Ez birime hizreta melekê jîr.*

**S. 8** *1 Ez birime dîwana mîr,*
*2 Dana ber min şêx û p'îr,*
*3 Birime ĥezreta Melikê Celîl.*

**S. 11** *1 Ez birime wê r̂ewanê gunehk'aran,*
*2 Zana nebûn bi t'i wateyên giran,*
*3 Kirne destê zebêniyan[2455].*

**S. 9** *1 Ez birime mawiya,*
*2 Hincîyê xebîr nebû bab cimetiya,*
*3 Dê k'êşne destê zebêniya.*

**S. 12** *1 Ew zebêniya p'ir̂ wesfete[2456],*
*2 Ji kesî r̂e nebêjin tu çi milete,*
*3 Ji bilî birayî axretê bi t'aqete.*

**S. 10** *1 Ewin zebêniyên bi sefa'ete[2457],*
*2 Natirsin ji çû milete,*
*3 Xeyrî birayê axretê bi t'aqete.*

---

[2449] *ebadet*
[2450] *îzet*
[2451] *heqe*
[2452] *riya*
[2453] *dur*
[2454] *sur*
[2455] *zibêniyan*
[2456] *osfet*
[2457] *sifet*

**S. 13** *1 Ewin zibêniyên p’iȓ xedare,*
*2 We dikin gazî û haware,*
*3 Gelî bira bi kesî ȓe ne axivin[2458] bi zare.*

**S. 11** *1 Ewin zebêniyên p’iȓ xedare,*
*2 Ewin bi gazî û haware,*
*3 Bi kes ȓa na axivin bi zare.*

**S. 12** *1 Dibêjme we xwedanên kuȓa,*
*2 Wê dihajone tarîya muẍdara[2459],*
*3 Zêde tên gunehk’arên biȓa.*

**S. 14** *1 Bêjme we xwedanê kewnan û k’are,*
*2 Win bi birayê dûmahik ȓe nekin bazare,*
*3 Da ȓoja dûmahik, we nevêje[2460] devê dûpişk û mare,*

**S. 13** *1 Dibêjime we xwedanên gûnehk’ara,*
*2 Ŕêya yarû birên axretê nekin bazara,*
*3 Ciyê wan dojehe û devên mara.*

**S. 15** *1 Bejme we xwedanêd gira,*
*2 Ji tarêyan derxînin gunehk’arêd bira,*
*3 Da win ji tariyê bibne ber ȓonya ĉira.*

**S. 16** *1 Gelî bira win hilgirin,*
*2 Bi şeȓanî, bi horiya ȓe[2461] mehizirin,*
*3 Da win bi asayî ȓabirin.*

**S. 16** *1 Ewin horiyên girane,*
*2 Ewin birqên ĉirana,*
*3 Dibine dav û diçin pêşîya xasane.*

**S. 17** *1 Melek Fexredîn ew suȓ daye,*
*2 Bi wê suȓe xweşewîste min hatin em dibexşin,*
*3 Xweşewîstê min dihatin ȓêya şaye û xebatin,*
*4 Bi navê Xwedê em horiya napejirin.*

**S. 17** *1 E’zîzê min em yên hatin,*
*2 Bi ȓêya P’adşayî xebatin,*
*3 Horiya em ne diaxaftin.*

**S. 18** *1 Tirsa min ji wan horiyane,*
*2 Xêrî sipîcan ser ĉava hildane,*
*3 Ew derf hatine pêşiyê xasane.*

**S. 15** *1 Tirsa min ji wane,*
*2 Horiya xêl hilanî ser ĉavane,*
*3 Bûne dav û çûn pêşîya xasane.*

**S. 19** *1 Banga min li ber mewlê ye,*
*2 Bimînin li ser ola bav û dê ye,*
*3 Bi ya Xwedê horî nayêne[2462] ȓê ye.*

**S. 20** *1 Li e’zmana bû bangîne,*
*2 Li nav xasên şêx Adî bû şayî û mizgîne,*
*3 Wê dihat xweşewîst melek Fexredîne.*

**S. 18** *1 Li e’zmana bûye banga dîn,*

---

[2458] *axefin*
[2459] *mûxtar*
[2460] *navêje*
[2461] *hûrî*
[2462] *nayn*

*2 Li nav[2463] xasa bûye şayî û mizgîn,*
*3 Wê hatî e'zîz melik Fexredîn.*

**S. 21** *1 Li e'zmana bû xebere,*
*2 Horî xemilîn k'esk, û sor, û sipî, û zere,*
*3 Wê hat Fexrê babzere.*

**S. 19** *1 Li e'zmana bûye xebere,*
*2 Horî xemilîn k'esk, sor, û zere,*
*3 Wê hatî Fexrê babzere.*

**S. 22** *1 Ez birime wê dîwanê ye,*
*2 Banga min li ber mewlê ye,*
*3 Bi ya Xwedê horî nayêne r̂ê ye.*

**S. 14** *1 Gelî bira tirsa min ji wê ye,*
*2 Banga min ber mewlê ye,*
*3 Ya Xwedê horî têne r̂ê ye.*

**S. 23** *1 Ez birime wê navê,*
*2 Ez gihandim ciyê silavê,*
*3 Xweşewîstê min binêre li horiyan û davê.*

**S. 20** *1 Ez birim nav wan cindîya,*
*2 Hatine pêşîya min t'elebên ewlîya,*
*3 Dîndara silt'an Êzî bi t'enê ye e'silîye.*

**S. 24** *1 Xweşewîstê min em vê yekê ne di înk'irin[2464],*
*2 Bi gunehk'ara bigre bavêje dojêhû bimirin,*
*3 Em hurî ji yek, ne vavirin.*

**S. 21** *1 E'zîzê min em bi te ne di înk'arî,*
*2 Ẍafila û gûnehk'ara p'avêje dojêh û devê marî,*
*3 Em û horî jêk nayên vavirîn[2465].*

**S. 25** *1 Fexro, bila we bî,*
*2 Her qutbû ji mala ne bî,*
*3 Qelenderê gelîyê Lalişê ĥemû ji te r̂a şade[2466] bî.*

**S. 26** *1 Fexro, weye wekî wê carê,*
*2 Bi wê sur̂ê bikim li wê miẍarê,*
*3 Heke we şêx Fexrê Adiya dît pêwîste lê bikin pirsiyarê.*

**S. 27** *1 Fexro, pirsyara bi xêre,*
*2 Nav p'êẍember û melek şêx Sin û hêzdêre,*
*3 K'iryar bi mêran r̂e diger̂in weke siya dêre.*

**S. 28** *1 Fexro, heke tu bikî pirsiyarê*
*2 Silt'an şêx Adî xwedanê[2467] biryarê,*
*3 K'iryar bi mêran r̂e diger̂in weke siya darê.*

**S. 29** *1 Heke wa divê, bikin bi mêra de,*
*2 Win r̂êya şêx Adî bo xwe bikin cade,*
*3 Da r̂oja axretê em li ser we nebine şade.*

**S. 22** *1 Heger te divê bigehiye miraza,*
*2 Ŕêya silt'an Êzdîd bike cade,*
*3 Da li r̂oja axretê ĥemû k'arên te, li ser ĥalê te bibin şade.*

[2463] *naf*
[2464] *e'nk'ir*
[2465] *vavarî*
[2466] binşr: *şehde*
[2467] *xudan*

**S. 23** *1 Hincîyê bi feqîra ne gohdêrî,*
*2 Jê nîne ĥûkmê yek yî Bêrî,*
*3 Ku amaneta[2468] Xwedê[2469] vê nespêrî[2470].*

**S. 30** *1 R̂êya şêx Adî r̂aste, nabe hîne,*
*2 Xasê şêx Adî pê hat behwer[2471] û yeqîne[2472],*
*3 Ẍafil di korine, p'ara wan te nîne.*
**S. 24** *1 R̂êya silt'an Êzdîd biĥebîne[2473],*
*2 Xasa pê hatî bawer û yeqîne,*
*3 Mîro, muĥbeta Xwedê gelek şîrîne[2474].*

**S. 31** *1 Ẍafil go dînin,*
*2 Ew têye r̂êya şêx Adî, bû xwa naxemilînin,*
*3 Wan nizanî mêr û evîna şêx Adî ew darê şîrînin.*

**S. 32** *1 Ev fena[2475], fenaki xedare,*
*2 Zora ji her girtibûn malê axretê ji xware,*
*3 Ye ji ola xwe dûrk'eve, dibe dîn û hare.*
**S. 25** *1 Ev fêniye fêniyek xedare,*
*2 Zora t'erik kirin male,*
*3 Çûn û axret kirin ji xeyale.*

**S. 33** *1 Kirine r̂asmal, zora malê xwe birin,*
*2 Win r̂êya şêx Adî r̂ast ji xwe r̂a bigrin,*
*3 Da win bi asahî r̂abirin.*
**S. 26** *1 Zora malên xwe t'erk' kirin,*
*2 Rêya silt'an Êzdîd çak bigrin,*
*3 Da bi silametî bibihurin.*

**S. 34** *1 Gelî bira win dilê xwe medine vê dinyaye,*
*2 Jiyanê xwe bidin ber mihkan û cefayê,*
*3 Behlûlî dîwanê we digeře li şarê Beẍdayê.*

**S. 35** *1 Beẍda şareki k'ibîre,*
*2 Wekî ẍafil bû mîre,*
*3 Behlûl xwe gîhande nav feqîre.*
**S. 27** *1 Beẍda şarê k'ibîre,*
*2 Demê xelîfe dibû mîre,*
*3 Wê r̂ojê Behlûl yî xwe gehande feqîre.*

**S. 36** *1 Çel sicûde li Beẍdayê hebû,*
*2 Her çel, bi çel micade bû,*
*3 Behlûl di navde yî dîwane bû.*

**S. 37** *1 Melek Fexredîn Behlûl dikir nase,*
*2 Win binêrin gelî xase,*
*3 P'adşe afrînere, ji mere danîbû e'sase.*
**S. 28** *1 Demê melik Fexredîn (Behlûl) dî, kir nase,*
*2 Gelî mîra çoyî nebêjne çû xase*
*3 P'adşê min xaliq kirî ĥezar û yek libase.*

**S. 29** *1 Bi r̂êya Xwedê bibin xebîr,*

---
[2468] *emanet*
[2469] *Xwidê*
[2470] *nesipirî*
[2471] binêr: *bawer*
[2472] *êqîn*
[2473] *bihevîne*
[2474] *şirîn*
[2475] *fîna*

*2 Şîreta yarû birên axretê nekin ji bîr,*
*3 Da li axretê bêjne we p'îr.*

**S. 30** *1 Li r̂êya Xwedê nebin xerfê,*
*2 Hincîyê li r̂ast r̂êya xwe ne bi xof bê,*
*3 Ĥiske bila bibe ĥeywan k'ûvî.*

**S. 38** *1 Min got, dil bi were,*
*2 Win mebêjin ji mere*
*3 Xwede dike xêr û şer̂e.*

**S. 39** *1 Hat Çarşema serî Nîsanê,*
*2 Hat bersiva wê zozanê,*
*3 Hate te miska wê dîwanê.*
**S. 31** *1 Hat çarşembûya serê Nîsanê,*
*2 Hat T'emûza îmanê,*
*3 Hat xebera wê dîwanê.*

**S. 40** *1 Hat bersiva wan derwêşe,*
*2 Dilê wî ser viyana şêx Adî dêşe,*
*3 Ev fena, bi tirsa şûr tu dik'êşe.*
**S. 32** *1 Hat xebera wan derwişa,*
*2 Li dîwana, ji mêr û muĥbeta gelîyê Lalişê dik'êşa,*
*3 Ẍafilên vê dinyayê şîr lê dik'êşa.*

**S. 41** *1 Hat bersiva wan p'îra,*
*2 Yê destê wî, li ser latan û herîra,*
*3 Li vê fenê vê r̂e r̂aketin r̂efê xenzîra.*
**S. 33** *1 Hat cewaba van p'îra,*
*2 Desta didin ser letan û herîra,*
*3 Li vê dinyayê direvin r̂efên xenzîra.*

**S. 42** *1 Bêjme xwedan herîran û late,*
*2 Ewin ser dara çendî coqate,*
*3 Li vê fenê vê r̂e r̂aketin bê mirwate.*
**S. 34** *1 Ewin xwedanên herîr û leta,*
*2 Ewin xwedanên cindî û coqeta,*
*3 Li vê dinyayê direvin r̂efên bê mirweta.*

**S. 35** *1 Sadiq û sena sindirûk û p'eriyên zêr̂îne,*
*2 Ẍafila beĥr tê nine,*
*3 ……………………………….*

**S. 36** *1 Sadiq û sena li nav wan çêbû zor ĥeybete,*
*2 Ẍafila êwrandin ziyarete,*
*3 ………………………………….*

**S. 43** *1 Silt'an şêx Adî lê be selame,*
*2 Ewî diger̂î R̂ojhilatê ĥeta Şame*
*3 Beniyekî te bûm xilame.*

**S. 37** *1 Birano, sindirûka bestkirî miraza,*
*2 Ewin cindîyên delq, û t'ac, û miraza,*
*3 Ẍafila bi ziyareta avakirî merza.*

**S. 44** *1 Ev k'are, k'arekî bê t'aqete,*
*2 Bi wê qubê kim p'ir̂ wesfete*[2476]*,*

[2476] *usfet*

*3 Ẍafila [h]êwirandbû ziyarete.*

**S. 38** *1 Ev k'are, k'arekî bi t'aqete,*
*2 Navda çêbû zor ĥeybete,*
*3 Ẍafila [h]êwirandin ziyarete.*

**S. 45** *1 Ev k'ar k'areki ne bi delîle,*
*2 Bi wê qubê kim serî bi stêre,*
*3 Ẍafila ji ber girtibû r̂ûmet bi t'êre.*

**S. 46** *1 Gelî bira win guh bidin vê seferê,*
*2 Batinê ew zû xaziyê kirê,*
*3 Hebû li wê r̂ojê, li wê seferê.*

**S. 39** *1 Melîk Feiredîn dîn go: Dilê min natirse ji vî qewlî,*
*2 Bayî hat û bir t'oz û xizanî,*
*3 K'iryara me û hazir û gûhdêran hebe li vî qewlî,*
*4 Li wê r̂ojê li wî mehderî.*

*T'emamet li Xwedê û şêx Adî!*
*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*

## 119. QEWLÊ MELEK FEXREDÎN[2477; 2478; 2479; 2480; 2481; 2482]

**S. 1** *1 R̂ojekê Lalişe,*
*2 E'refate, guş-guşe,*
*3 E'zîz melek Fexredîn ĥalekê[2483] [ne] xweşe.*

**S. 1** *1 R̂ojekê Lalişe,*
*2 E'refatê xuş-xuşe,*
*3 E'zîz meli[2484] Fexredîn ĥalekê[2485] xweşe.*

**S. 1** *1 R̂ojekê Lalişe,*
*2 E'refate guş-guşe,*
*3 Melek Fexredîn ĥalekî xweşe.*

**S. 1** *1 R̂ojekê Lalişe,*
*2 E'refate û guş-guşe,*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn r̂ewşa wî r̂ewşeke ne xweşe.*

**S. 1** *1 R̂ojekê Lalişe,*
*2 E'refat û guş-guşe,*
*3 E'zîz melek Ferxedîn ĥalekî xweşe.*

**S. 2** *1 R̂ojekê Ĥeq warê[2486],*
*2 Mêr cema'[2487] bûne mixarê,*
*3 E'zîz melî Fexredîn hatîye ber ferwarê.*

**S. 2** *1 R̂ojekê Ĥeq warê,*
*2 Mêr cema' dibûne mixarê,*
*3 Melek Fexredîn hatîye ber ferwarê.*

[2477] [29] (rr. 353-360) (№ 1690)
[2478] *Qewlê Ferxedîn* [31] (rr. 35-44)
[2479] [29] (rr.329-337) (№ 1684)
[2480] [50] *Qewlê firwarê* (rr.459-462)
[2481] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *QEWLÊ MELEK FEXREDÎN* (rr. 57-64) T'ilbîs 2001
[2482] *Qewlê sindir̂uk* [5] (стр. 131-132)
[2483] *halek*
[2484] binêr: *melik*
[2485] *halek*
[2486] *Hekar*
[2487] *cima*

**S. 2** *1 R̂ojekê Ĥekarê,*
*2 Mêr cema' bûne miẍarê,*
*3 Melek Ferxedîn hatiye ber ferwarê.*

**S. 2** *1 R̂ojekê me dînê,*
*2 Mêr cema' bûn xezînê,*
*3 Sev bavê sitî Xatunê.*

**S. 3** *1 R̂ojekê înê,*
*2 Mêr cema' bûne xezînê,*
*3 Seb xatirê bavê sitî Xatûnê.*

**S. 3** *1 R̂ojekê me dînê,*
*2 Mêr cema' dibûn xezînê,*
*3 Sev xatirê bavê sitî Xatûnê.*

**S. 2** *1 R̂ojekê me dînê,*
*2 Mêr k'ombûn xezînê,*
*3 Bo xatira sitî Zînê*[2488]*.*

**S. 3** *1 R̂ojekê Zebûnê,*
*2 Mêr cema' bûne xezînê,*
*3 Sev xatirê bavê sitî Xatunê.*

**S. 3** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Pirs kin kesekî yê ilmî zanane,*
*3 Werin mirinê bidin beyane.*

**S. 5** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Mepirsin xelqê e'limî*[2489] *zane,*
*3 Werin mirinê bidin beyane.*

**S. 5** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Mêr cema' dibûn e'limî zanane,*
*3 Werin mirinê bidin beyane.*

**S. 4** *1 R̂ojekê ji r̂ojane,*
*2 Mêra k'omkirbûn ilmî zane,*
*3 Birano, werin bi mirinê r̂a bidin xweyane*[2490]*.*

**S. 5** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Mêr cema' dibûn a'lim û zane,*
*3 Werin mirinê bidin beyane, binêrin çi nîşane.*

**S. 4** *1 R̂ojekê xirure,*
*2 Lê cema' bûye cindîyê mîre,*
*3 E'zîz melek Fexredîn hatîye ber ĥidûde.*

**S. 4** *1 R̂ojekê xudûre,*
*2 Pevk'etin cindîyê mîre,*
*3 E'zîz melî Fexredîn nûr bû, xweyî nûre.*

**S. 4** *1 R̂ojekê xirure,*
*2 Mêr cema' dibûne cindîyêd nûre,*
*3 Melek Fexredîn hatîye ber ĥizure.*

**S. 3** *1 Çi r̂ojekê xirure,*
*2 Mêra k'ombûn cindîyêt nûre,*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn hatîye ber ĥidûre.*

**S. 4** *1 Çi r̂ojekê xirure,*
*2 Lê cema' bûne cindîyê nûre,*
*3 E'zîz melek Ferxedîn hatiye ber ĥizûre.*

[2488] *Xatun*
[2489] *alim*
[2490] *xuyan*

**S. 6** *1 Mirin heye ĥeqîye,*
*2 Ser mirinê nedin dîye,*
*3 Ber mirinê nedin sergêra, ĥeĉî kesê wê r̂a,*
*4 E’zîz meli Fexredîn fiĥêl kin boy*[2491] *kenarê Xwedê r̂a*[2492].

**S. 5** *1 Dilê minî xeme,*
*2 Wet e’lema pirs bikene,*
*3 E’zîz melek Fexredîn çarşemê bû, çarşemê hilda gedeme.*

**S. 7** *1 Dilê minî xeme,*
*2 E’limno, dibêjime we,*
*3 E’zîz meli Fexredîn çarşemê bûye, çarşemê hilda gedeme.*

**S. 6** *1 Dilê minî bi xeme,*
*2 Ez e’lima*[2493] *diperseme,*
*3 Melek Fexredîn çarşemê bîye, çarşemê guhast gedeme.*

**S. 5** *1 Dile minî bi xeme,*
*2 Ezê li oldara pirsiyarkeme*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn li çarşembuyê bûwe*
*û li çarşembuyê guhast qedeme.*

**S. 6** *1 Dilê minî bi xeme,*
*2 Ezê a’lima dipersime,*
*3 Melek Ferxedîn çarşemê bûye,*
*çarşemê digivêze gedeme.*

**S. 6** *1 R̂ojekê li Şame,*
*2 Dik’ir ger̂îyebû çendî a’me,*
*3 E’zîz melek Fexredîn qulbê t’emame.*

**S. 8** *1 R̂ojekê Şame,*
*2 Dik’ir ger̂îye çendî a’me,*
*3 E’zîz meli Fexredîn ser xurbet*[2494] *t’emame,*
*4 Ser xurbê yî bethal ba biçû ĥeta velîyî*[2495] *val bû.*

**S. 7** *1 R̂ojekê Şame,*
*2 Dik’ir ger̂îyan çendî a’me,*
*3 Melek Fexredîn ser qudûmê*[2496] *t’emame.*

**S. 6** *1 Ezim r̂ojeke li Şame,*
*2 Dikem ger̂yan li çendî a’me,*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn ser qubê yê t’emame.*

**S. 7** *1 R̂ojekê Şame,*
*2 Dik’ir ger̂iya çendî a’me,*
*3 Melek Ferxedîn xitmê t’emame.*

**S. 7** *1 Şêx Şemso, zerbave,*
*2 Fexro, ber mêra hilînin ĉave*[2497],
*3 Te li me sot dil û ĥinave.*

**S. 8** *1 Melek Fexredîn ser qudûmê bedĥale,*
*2 Mêr cema’ dibûn velîyî û xale,*
*3 Şêx Şems dibêje: «Fexro, ber mêra hilîne ĉave».*

**S. 7** *1 Xweşewîst melik Fexredîn ser qubê yî dinale,*
*2 Mêra cema’ dibûn velîyî*[2498] *û xale,*
*3 Şêx Şems*[2499] *got: «Fexro, birao, li mêra*
*hilîne ĉave».*

**S. 8** *1 Melek Fexredîn ser xitmê*

[2491] *boyî*
[2492] *Xudê*
[2493] *alim*
[2494] *xurba*
[2495] *welî*
[2496] *qudib*
[2497] *ĉe’v*
[2498] *welî*
[2499] *Şê Şems*

*t'emame,*
*2 Mêr cema' bûne velî û xale,*
*3 Şêx Şems dibê: «Ferxo, ber mirinê veke ĉave».*

**S. 9** *1 Şemso, hatîye ser me mecale,*
*2 Şems dibêje mêran û mêrsera:*
*3 «Ber nek'evin mal-zêr̂ê dine,*
*4 E'zîz melek Fexredîn veger̂în me t'enê r̂a».*

**S. 8** *1 Şêx Şems dibêjite mêra:*
*2 «E'zîz melek Fexredîn wey lêra,*
*3 Hûn veger̂in boy me gele xêra».*

**S. 9** *1 Şêx Şems dibêjite mêra:*
*2 «E'zîz melek Fexredîn bal lêra,*
*3 Veger̂înin boy me xêra».*

**S. 9** *1 Şêx Şems dibêje mêra:*
*2 «Melek Ferxedîn bin lêra,*
*3 Veger̂in boyî me xêra».*

**S. 9** *1 Şêx Şems dibêje*[2500] *mêrsera:*
*2 «E'zîz melek Fexredîn wey lêra,*
*3 Hûn veger̂in boy me gele xêra».*

**S. 10** *1 Şêx Şems dibêje: «We mêrsera,*
*2 Berbi mal û zêr̂ê xwe werne dera,*
*3 E'zîz melek Fexredîn veger̂înin boy me r̂a».*

**S. 8** *1 Şêx Şems gote mêrsere:*
*2 Eme biden mal û zêr̂ê xwe li dere,*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn veger̂înin ji xwe r̂e».*

**S. 10** *1 Şêx Şems dibêje:*
*2 «We mêr sera ber mal û zêr̂ê werin dera,*
*3 E'zîz melek Fexredîn veger̂înin boyî me r̂a».*

**S. 11** *1 Sica deyîn dikir vê r̂a:*
*2 «Herge male, herge zêra,*
*3 Melek Ferxedîn vegerînin boyî xa t'enê r̂a».*

**S. 10** *1 Birayê nav Sica ye,*
*2 K'ewgirî ye û dama ye:*
*3 «Birao qewî îro e'zîz melek Fexredîn t'a ye.*

**S. 11** *1 Birê nav Sica ye,*
*2 Ĥeznî dama ye:*
*3 «Birao, k'afira nemaye bê bira ye».*

**S. 12** *1 Birayê nav Sica ye,*
*2 K'ewgirî û dama ye:*
*3 «Şêx Fexrê Adiya r̂a t'a ye».*

**S. 10** *1 Birayê nav Sicada yî,*
*2 Digrî û dama yî,*
*3 Ew yekê bi forma şêx Fexrê Adiya r̂a t'a yî.*

**S. 12** *1 Birayê minî nav Sicaye,*
*2 K'ewgirî û damaye,*
*3 Şêx Ferxê Adiya r̂a t'aye».*

---

[2500] *divêje*

**S. 11** *1 Birayê nav Sicadîne,*
*2 Hêsira r̂ûya da r̂uĥîne:*
*3 «Birao, biratî ça şîrine».*

**S. 12** *1 Birayê nav Nasire,*
*2 R̂ûya da hat hêsire,*
*3 Go: «Birao, k'afira jî nemire bira».*

**S. 14** *1 Birayê nav Nasire,*
*2 R̂ûya da hat hêsire:*
*3 «Birao, bira k'afira nemîne bê bire».*

**S. 12** *1 Birayê nav Nasire,*
*2 Di r̂ûye wî da dihat hestire,*
*3 Got: «Birao, gawir jî li wara da nemînin bê bira».*

**S. 14** *1 Birayê nav Nasire,*
*2 R̂û da hat hêsire,*
*3 «Birao, bira birê kesî nemire.*

**S. 12** *1 Birê nav Nasirdîne,*
*2 Hêsir ĉava tê r̂iĥîne:*
*3 «Birao, biratiye çikas şîrine».*

**S. 13** *1 Birayê nav Nasirdîne,*
*2 Hêsir r̂ûya da r̂uĥîne:*
*3 «Birao, biratî çikas şêrîne».*

**S. 11** *1 Birayê nav Nasirdîne,*
*2 Hestira li r̂û da derhîne,*
*3 Got: «Birao, biratî çiqas şîrine*[2501]*.*

**S. 13** *1 Birayê minî nav Nasrêd̂îne,*
*2 Hêsir r̂û da r̂iĥîne:*
*3 «Birao, biratî çikas şîrine».*

**S. 13** *1 «Nasiro, birayê min tuyî,*
*2 Car–cara veduxurî,*
*3 Naşî min nebî, şêx Mend ve disuyî».*

**S. 13** *1 Go: «Îlaĥîo, te Cebêre,*
*2 Sebrekê [ji] bana bihinêre,*
*3 Bira şêx Mendê Fexra pê bejmêre».*

**S. 19** *1 «Îlaĥîo, mi Cebêrî,*
*2 Sebrekê bana da bihenêrî,*
*3 Şêx Fexrê Adiya ne bihejmêrî».*

**S. 14** *1 Go: «Îlaĥîo, tu me bikî debira,*
*2 Bana da qebûl bikî nedira*[2502]*,*
*3 Me bê bira nayê sebire».*

**S. 18** *1 «Îlaĥîo, tu me bikî debira,*
*2 Bana da qebûl bikî nedira,*
*3 Me sebir nayê bê bira».*

**S. 14** *1 Xwedêo, me bidî debira,*
*2 Benda qebûl bikî nadira,*
*3 Me çu aram naêt bê bira.*

**S. 18** *1 «Îlaĥîo, tu me bikî debira,*
*2 Bana da qebûl bikî nedira,*
*3 Me sebir nayê bê bira».*

**S. 15** *1 Xwedêo, tuyî hêzdêrî,*

---

[2501] *şirîn*
[2502] binêr: *neder*

*2 Tu li cem ĥemû mêra yî hejmêrî.*

**S. 19** *1 «Îlaĥîo, tu Cebhêrî,*
*2 Sebrekê bana da bihevêrî,*
*3 Şêx Ferxê Adiya pê bihejmêrî.*

**S. 15** *1 Sica deng kire zêre:*
*2 «Herge[2503] male, herge zêr̂e,*
*3 Ezê e'zîz melek Fexredîn vegeȓînim boy xwe t'enê ȓa».*

**S. 10** *1 Sicad deng dike pê ȓa:*
*2 «Ĥeĉa kesê wê ȓa,*
*3 E'zîz meli Fexredîn vegeȓînin me t'enê ȓa».*

**S. 11** *1 Cema'[2504] deyn dike v êȓa:*
*2 «Herge[2505] male, herge zêȓa,*
*3 E'zê vegeȓînin boy xwe t'enê ȓa».*

**S. 9** *1 Sicadîn dike li vê ȓe,*
*2 Heke bi malê dine, heke bi zêȓe,*
*3 Ezê vegeȓînim bo xwe bi t'inê ȓe.*

**S. 16** *1 Melek Fexredîn go: «Birano, birayê minin,*
*2 T'u nedera[2506] mi negirin,*
*3 Seĥî[2507] ezê bimirim».*

**S. 14** *1 Bi[ay]rê mine hadirin,*
*2 T'u nedera[2508] min negirin,*
*3 Seĥî[2509] ezî bimirim,*
*4 Paşî min delaliye şêx Mend ser xweȓa bigirin.*

**S. 15** *1 «Birano, hûn birayê minin,*
*2 T'u nedera[2510] min negirin,*
*3 Seĥîke ezê bimirim».*

**S. 13** *1 Melik Fexredîn got:*
*«Birano, hun birayêt minin,*
*2 Çu nedera li min negirin,*
*3 Sekin, ezê bimirim.*

**S. 15** *1 Bira[n]o, hûn birayê minin,*
*2 T'u nedra boyî min negirin,*
*3 Seĥîke ezê bimrim.*

**S. 17** *1 Go: «Birano, mirin ĥeqîye[2511],*
*2 Çî kesekî xwe zanîye,*
*3 Sergêȓ bo mirinê nîye».*

**S. 16** *1 «Mirin ĥeqîye,*
*2 Heçî kesê xwe[2512] zanîye,*
*3 Ber mirinê nabin sergeȓîye».*

**S. 16** *1 Mirin ĥeqîye,*
*2 Heçî kesê xa zanîye,*
*3 Ber mirinê nabe sergêȓîye».*

**S. 18** *1 «Ber mirinê nabe[2513] sergêȓe,*
*2 Çî kesekî vê ȓa,*
*3 E'zîz melek Fexredîn ferĥayê bikin boy kenarê Xwedê ȓa».*

---

2503 *herke*
2504 *cima*
2505 binêr: *herke*
2506 *nedr*
2507 *sihîd*
2508 *nedir*
2509 *sihî*
2510 *nedr*
2511 *Birao, go: «Mirin ĥeqîye*
2512 *xo*
2513 *nave*

**S. 17** *1 «Ber mirinê nabin sergêȓe,*
*2 Heçî kesê vê ȓa,*
*3 E'zîz melek Fexredîn fiȟol kirin boy kenarê Xwedê ȓa».*

**S. 17** *1 «Ber mirinê nabe sergêȓe,*
*2 Herĉî kesê vê ȓa,*
*3 E'zîz melek Ferxedîn ferho kin boyî kenarê Xudê ȓa».*

**S. 19** *1 Nesiro, go: «Birayê mine dêm duȓî,*
*2 Serê biȓî nayê k'iȓîn,*
*3 E'zeta bavê bikin boy kuȓî.*

**S. 15** *1 Bir[ay]ê mine dêm biȓî,*
*2 Serê biȓî nayê k'iȓî,*
*3 E'zabê bavê bidin boy*[2514] *kurî.*

**S. 22** *1 Çi lawekî dê muȓî,*
*2 Serê biȓî nayê k'iȓî,*
*3 Ezeta bavê bikin boy kuȓî.*

**S. 20** *1 «Birano, hûn birayê mine zerûnin,*
*2 Xatirê dilê min bivînin,*
*3 Paşî min şêx Mendê Fexra nehêşînin».*

**S. 20** *1 Go: «Birano*[2515]*, birayê mine e'sasa,*
*2 Bira şêx Mendê Fexra ȓûnê dîwanê xasa,*
*3 Eşq yar birê axretê bigeȓîne duȓan û k'asa».*

**S. 16** *1 Birayê mine e'sasa*[2516]*,*
*2 Bira şêx Mendê Fexra ȓûnê dîwanê xasa,*
*3 Eşqî yal bira bigeȓînin duȓan*[2517] *[û] k'asa».*

**S. 21** *1 Birano*[2518]*, hûn birayê mine e'sasa,*
*2 Bira şêx Mendê Fexra ȓûnî dîwanêd xasa,*
*3 Eşqê her pênc t'erêqê wî bigeȓînin duȓan*[2519] *û k'asa.*

**S. 17** *1 Birano, hûn birayêt e'sase,*
*2 Bila şêx Fexrê Adiya ȓûnit li dîwant xase,*
*3 Eşqê her pênc ȓêyên wî hilde min duȓan*[2520] *û k'ase.*

**S. 21** *1 Birano, hûn birayê mine e'sasa,*
*2 Bira şêx Mendê Fexra ȓûnê dîwana xasa,*
*3 Eşqî pênc t'erîqê bigeȓîne t'asa.*

**S. 22** *1 Lawê min dêm durî,*
*2 Serê biȓî nayê k'iȓî,*
*<u>3 E'zetê bavê bidin boyî kuȓî».</u>*

**S. 21** *1 Nesiro go: «Birayê min tu yî,*
*2 Xeysetê bi xu yî,*
*3 Paşî min şêx Mendê Fexra di sû yî».*

**S. 20** *1 «Birano, hûn birayê mine zergûnin,*

---

2514 *boyî*
2515 *birao*
2516 *asas*
2517 *dolyan*
2518 *birano*
2519 *doran*
2520 *doran*

*2 Xatirê dilê min têk bibînin*[2521]*,*
*3 Paşî min şêx Mendê Fexra ne êşînin».*

**S. 16** *1 Birano, hûn birayêt minin zergunin,*
*2 Xatira dilê min t'ek bibînin,*
*3 Paşî min şêx Mendê Fexra*[2522] *hevdu ne îşînin.*

**S. 22** *1 Ĥeta ez xweş bûm,*
*2 Ez Fexrê r̂eş bûm,*
*3 Berat' û bexş bûm.*

**S. 17** *1 Birano, ĥetanî ezî xweş bûm,*
*2 Fexrê r̂eş bûm,*
*3 Berat' û bexş bûm.*

**S. 23** *1 Ĥetanî ezî xweş bûm,*
*2 Ez Fexrê r̂eş bûm,*
*3 Ez berat' û bexş bûm.*

**S. 18** *1 Ĥeta ez yê xweş bûm,*
*2 Ez Fexrê r̂eş bûm,*
*3 ……………………..* .

**S. 23** *1 Ĥetanî ezî xaş bûm,*
*2 Ez Ferxê r̂eş bûm,*
*3 Ezî berat' û bexş bûm.*

**S. 23** *1 Bexş bûm berat',*
*2 Têgda çendî welat,*
*3 Mi zor aşiq dinê da kirine xelat.*

**S. 18** *1 Bexş û berat',*
*2 Hindî welat,*
*3 Mirenê zor aşiq dinê kirine xelat.*

**S. 24** *1 Bexş bûme berat',*
*2 Mi deng da çiqa welat,*
*3 Mi aşiq zor anî, hatin kirin xelat.*

**S. 19** *1 Bexşî bûne berat',*
*2 Min dengê xwe dida gelek welat,*
*3 Min aşiq dikirin xelat.*

**S. 24** *1 Bi bexş û berat',*
*2 Min deher kir çiqas welat,*
*3 Aşiq zara kirin xelat.*

**S. 24** *1 Go: «Birano, em birane*[2523]*,*
*2 Nik yek da westane*[2524]*,*
*3 Amanetê*[2525] *we — sinetxane*[2526]*.*

**S. 25** *1 Birano, hûn birane,*
*2 Nik yek r̂awestane*[2527]*,*
*3 Amanetî*[2528] *we — sinetxane.*

**S. 25** *1 «Birano, hûn birane,*
*2 Nik yek r̂awastane,*
*3 Anemetê we — mirîdxane.*

**S. 25** *1 Sinet r̂eze, hûn r̂ezvanin,*
*2 Sinet r̂eze ji dêre,*
*3 T'ije naz–ne'met, û xêre,*

---

[2521] *bivînin*
[2522] *Fexrê Adiya*
[2523] *Biramo, go: «Em birane*
[2524] *wasta*
[2525] *anemet*
[2526] *sunetxane*
[2527] *r̂ewastan*
[2528] *anemet*

*4 Ĥeq r̂êya şêx Adî ewe, şêxî lê bive sexbêre.*

**S. 19** *1 Birano, em birane amanetê[2529],*
*2 We sinet û sinetxane,*
*3 Sinet r̂eze — hin r̂ezwane,*
*4 Sinet r̂eze t'êre t'ijî,*
*5 Nan û naz–ne'met[2530] û xêre.*

**S. 26** *1 Mirîd r̂eze, hûn r̂ezvanin,*
*2 Mirîd r̂eze miqimiye,*
*3 T'ijî xaxe, t'ijî biye,*
*4 Ber nedin sûretê guliye.*

**S. 26** *1 Sinet r̂eze qedîmî ye,*
*2 T'ije xoxe, t'ije bî ye,*
*3 Bernedine sinetê gulî ye.*

**S. 20** *1 Şêx sineta here sexbêre,*
*2 Sinet r̂eze enzele,*
*3 T'ijî xoxe, t'ije bî ye,*
*4 Ber sinetê vegirin gulî ya.*

**S. 26** *1 Sinet r̂eze — hûn r̂ezvanin,*
*2 Sinet r̂eze miqîmî ye,*
*3 T'ijî xox, t'ijî bî ye,*
*4 Bermedî ye sûretê gulî ye.*

**S. 27** *1 Gulîya jê vegrin,*
*2 Ĥeqîye[2531] r̂êya[2532] şêx Adî tê bifikirin,*
*3 R̂oja bandê sêfîl jarê me tê bidebirin.*

**S. 21** *1 Gulîya jê vegirin,*
*2 Ĥeq r̂êya şêx Adî ve sekirin[2533],*
*3 Beha dî[2534] feqîr û jar pê didebirin.*

**S. 27** *1 Gulîye sinetê bigrin,*
*2 Ĥeq r̂êye dînê silt'an[2535] Êzîd bifikirin,*
*3 Hûnê sêfîl mala Adiya pê didebirin.*

**S. 27** *1 Gulîya sûretê bigrin,*
*2 Ĥeq r̂iya dînê sult'an Êzîd bifikirin,*
*3 Hûnê sêfîl mala Adiya pê bidebirin.*

**S. 28** *1 Birano, em birane,*
*2 Nik yek da westane,*
*3 Amanetî we — malê xelîfetane».*

**S. 22** *1 Birano, em birane,*
*2 Ĥeĉî kesê nik r̂ewastyane,*
*3 Amanetê we — malê xelîfetane.*

**S. 28** *1 Birano, hûn birane,*
*2 Nik yek r̂awestane,*
*3 Amanetî we — malê xelîfetane,*
*4 Sev xatirê şerbik ĉirane.*

**S. 28** *1 Birao, hûn birane,*
*2 Nik yek r̂awastane,*
*3 Anemetî we malê Xelîfetane,*
*4 Sev xatirê şerbik ĉirane».*

---

2529 *anemet*
2530 *naznemet*
2531 *heq*
2532 *rîya*
2533 *vesekirin*
2534 *bahadîh*
2535 *sultan*

**S. 29** *1 Go: «Bira malê xelîfeta mîr bin,*
*2 Navmalîyê wana feqîr bin,*
*3 Pêşqedemê wane bira şêx û p'îr bin».*

**S. 23** *1 Mala xelîfeta bira wa mîr bin,*
*2 Bermaliyê wan feqîr bin,*
*3 Pêşqedemê wan şêx û p'îr bin.*

**S. 29** *1 Malêt xelîfeta bira mîr be,*
*2 Navmalîyê wana feqîr be,*
*3 Pêşqedemê wane bira şêx û p'îr be.*

**S. 29** *1 Malê Xelîfeta bira mîr be,*
*2 Navmalîyê wana feqîr be,*
*3 Pêşqedemê wana bira şêx û p'îr be».*

**S. 39** *1 Aqil bin xelqê cahêl,*
*2 Ibadet bikin quba helêl.*

**S. 40** *1 Ibadet bikin quba nûr,*
*2 Ibadet bikin ew şûr.*

**S. 41** *1 Wê şûrê bikin ibadet,*
*2 Çi maleke zoran ĥizret.*

**S. 42** *1 Eva mala, mala babane,*
*2 Serekanîye çendî beĥrane*[2536]*,*
*3 Dewra şêxan û p'îrane.*

**S. 30** *1 Dibêjime*[2537] *we gelî şêxan û p'îra,*
*2 Bernedne fenîyêd mîra,*
*3 Ibadetî bikin feqîra.*

**S. 24** *1 Dibêjime we gelî şêxan û p'îran,*
*2 Bernedin fênîyê mîra,*
*3 Ibadet*[2538] *bikin feqîra.*

**S. 30** *1 Dibêjime*[2539] *we gelî şêxa û p'îra,*
*2 Bernedne fenîêd mîra,*
*3 Ibadetî kin feqîra.*

**S. 30** *1 Dibêjme we gelî şêx û p'îra,*
*2 Bernedne feniyê mîra,*
*3 E'babet bikin feqîra.*

**S. 31** *1 Ibadetî bikin xerqe yê,*
*2 Xizmeteke ĉak bo bike ye,*
*3 Ew lib[a]sê babê me ye.*

**S. 25** *1 Ibadet*[2540] *bikin xerqe yê,*
*2 Ew şuxuleke ĉêk pê biye,*
*3 Ew libasê bavê me ye.*

**S. 31** *1 Ibadetî bikin xerqe yê,*
*2 Xizmeteke ĉek boy bike ye,*
*3 Ew lib[a]sê babê me ye.*

**S. 31** *1 E'babet bikin xerqe ye,*
*2 Xizmateke ĉek boyî meye,*
*3 Ew lib[a]sê babê meye.*

**S. 32** *1 Bavê we ew lib[a]sî ber bû,*

---

[2536] *be'r*
[2537] *divêjime*
[2538] *e'babet*
[2539] *divêjime*
[2540] *ebabet*

*2 T'acê nûranî ser bû,*
*3 Wê nûrê va neder bû.*

**S. 26** *1 Bavê meyî ew libas ber bû,*
*2 T'acekî nûranî ser bû,*
*3 Wî t'acî r̂a gelekî neder bû.*

**S. 32** *1 Bavê ew lib[a]sî ber bû,*
*2 T'acê nûranî ser bû,*
*3 Wê nûrê neder bû.*

**S. 32** *1 Bavê we ew lib[a]sî ber bû,*
*2 T'acê nûranî ser bû,*
*3 Wê nûrê neder bû.*

**S. 33** *1 Dilê minî be ye,*
*2 Destê mi bigrin, mi r̂akine ser qedemê me ye,*
*3 Birano, mi destûre, xatirî cem we ye.*

**S. 33** *1 Dilê minî be ye,*
*2 Destê mi bigrin, [min] r̂akin ser qedemê me ye,*
*3 Birano, mi destûre boy we ye.*

**S. 20** *1 Dilê minî bê ye,*
*2 Destê min bigrin biden ser qedemê ye,*
*3 Birano, min destûr bo we ye,*
*dilê minî bey dibê ye,*
*4 R̂ayê min k'işandin dest û p'ê ye,*
*5 R̂ewana min çû, ma qalbekî valeye».*

**S. 33** *1 Dilê minî vêye,*
*2 Destê min bigrin, r̂akin ser qedemê meye,*
*3 Birano, min destûre boyî weye.*

**S. 34** *1 Dilê minî benduhî ye,*
*2 R̂uĥ cû ji destan û p'îya,*
*3 Qelb ĉavnihêr̂îbû*[2541] *kesan û wêlîya.*

**S. 30** *1 Dilê min bêje,*
*2 Dilê minî bêyî dibêye,*
*3 R̂uĥ k'işand dest û p'êye,*
*4 Ĉav ma hîvîya kesan weliye.*

**S. 34** *1 Dilê minî bey dibêye,*
*2 R̂uĥ k'işîye desta û p'îya,*
*3 Ma ĉavnihêr̂îyê kesa û wêlîya.*

**S. 34** *1 Dilê min vêyî dibêye,*
*2 R̂uĥ k'işiya dest û p'iyaye,*
*3 Me ĉe'vnihêr̂iyê kesa û wêlîyaye.*

**S. 35** *1 Caweke r̂aste, ne derewe,*
*2 Ĉavê e'zîz melek Fexredîn mabû hewa,*
*3 Bira t'irê hê li xewa.*

**S. 43** *1 Caweke r̂aste, ne derewe,*
*2 Ĉavê e'zîz melek Fexredîn ma li hewa,*
*3 Bira t'irê melek Fexredîn wê li xewa.*

**S. 21** *1 Bersîvek hatîye ne li derewe,*
*2 Çave xweşewîst melik Fexredîn dima li hewa,*
*3 Bira bi t'irê xweşewîst melik Fexredîn sur̂aye, maye di xewe.*

**S. 35** *1 Cavabeke r̂aste, ne direwe,*
*2 Ĉe'vê e'zîz melek Ferxedîn maye heva,*

[2541] *ĉe'v*

*3 Bira t'irê ĉe'vî xeva.*

**S. 36** *1 Sata r̂uĥê e'zîz melek Fexredîn tê dibir̂î,*
*2 E'rd û e'zman yek dixur̂î,*
*3 Sitîya hîngê*[2542] *berîye xwe didir̂î.*

**S. 27** *1 .......................................... ,*
*2 Gava e'rd û e'zman dixur̂î,*
*3 Sitîya*[2543] *beniya xwe dibir̂î.*

**S. 44** *1 Sata melek Fexredîn teyr difirî,*
*2 E'rd û e'zman yek dixur̂î,*
*3 Sitîye bedenê xwe dibir̂î.*

**S. 22** *1 Ji dengê xweşewîst melik Fexredîn firinde dilirîn,*
*2 E'rd û e'zman t'ev dixûrîn,*
*3 Sitiya bedenê xwe didirîn.*

**S. 36** *1 Seta r̂uĥê e'zîz melek Ferxedîn teyîr difir̂î,*
*2 E'rd, e'zman t'ev dixur̂î,*
*3 Sit'iya bedenê xa dibir̂î.*

**S. 37** *1 Dibêjime we gelî sitîya,*
*2 Dest nevêjine k'ofîya,*
*3 Neĥerifînin xwe mirîye,*
*4 Bir̂a Şemsanî r̂abe p'îye.*

**S. 28** *1 Dibêjime we gelî sitîyano,*
*2 Neĥerifînin k'ofîyan,*
*3 Dest nevêjine zer xirbîyan.*

**S. 45** *1 Dibêjime we gelî sitîya,*
*2 Dest nevêjine xûnmir̂îya,*
*3 Neĥerifînin k'ofîya,*
*4 Şemsanî r̂abine p'îye.*

**S. 23** *1 Dibejime we gelî sitiya,*
*2 Destê xwe nehavêjine xwe nav û r̂ûya,*
*3 Nehejînin k'ofiya,*
*4 Bila Şemsanî r̂abin ser p'iya.*

**S. 37** *1 Dibêjme we gelî sit'iya,*
*2 Dest nevêjne k'ofiya,*
*3 Neĥefîrînin xumiriya,*
*4 Bir̂a Şemsanî r̂abine p'iya.*

**S. 29** *1 Şemsanî r̂abe ji p'îyane.*
*2 Seb xatirê şêx Fexrê Adiyane.*

**S. 38** *1 Li wê bû şabaşe,*
*2 Lê cema'bû mîrek û p'aşa,*
*3 Go: «Birin e'zîz melek Fexredîn nexweşê sere çendî nexweşe».*

**S. 46** *1 We dibû şabaşe,*
*2 Mêr cema' dibûn mîr û p'aşa,*
*3 Melek Fexredîn çû serdarê ĥemû neqaşa.*

**S. 24** *1 Wê dibû şabaşe,*
*2 Li wêderê hebûn mîrek û p'aşa,*
*3 Xweşewîst melik Fexredîn bû neqaşê ser çend neqaşa.*

**S. 38** *1 Li wê bû şabaşe,*
*2 Lê cema' bûn mîr û p'aşa,*
*3 Binêrin, e'zîz melek Ferxedîn*

[2542] *hingê*
[2543] *sit'î*

*serekê çendî neqaşa.*

**S. 25** *1 Wê dibû gişte,*
*2 Qalbê melik Fexredîn didane ser tenişte,*
*3 Wê digêȓandin ser darê ĥişke.*

**S. 39** *1 Go: «Qasidê [ȓuĥê] min t'ecire,*
*2 Sata ȓuĥê min dibiȓe,*
*3 Ȓuĥ çû, qelb ma vala[2544]».*

**S. 31** *1 «Qasidê ȓuĥê min t'acire,*
*2 Siĥeta ȓuĥê min dibiȓe,*
*3 Birano, min destûre we xatire».*

**S. 36** *1 «Qasidê ȓuĥê min t'ecire,*
*2 Sata ȓuĥê min dibiȓe,*
*3 Birano, min destûre, we xatire».*

**S. 39** *1 Qasidê min t'êcire,*
*2 Seĥeta ȓiĥê min dibiȓe,*
*3 Ȓiĥ çû, qalb ma vala».*

**S. 40** *1 «Qasidê [ȓuĥê] min delale,*
*2 Ȓuĥê mi k'işande misqal-misqale,*
*3 Ȓuĥ çû, qelb ma vala».*

**S. 32** *1 «Qasidê ȓuĥê min delale,*
*2 Ȓuĥ k'işand misqal–misqale,*
*3 Ȓuĥ çû, ma qelbekî betale».*

**S. 35** *1 Qasidê ȓuĥê min delale,*
*2 Sata ȓuĥê min bire misqal-misqale,*
*3 Sata ȓuĥê min ma qalbekî vala.*

**S. 40** *1 Qasidê min delale,*
*2 Ȓiĥê min k'işand misqal-misqale,*
*3 Ȓiĥ çû, ma qalbekî vala».*

**S. 41** *1 Qasidê [ȓuĥê] minî leze,*
*2 Borê minî beze,*
*3 Bezê xilaz nabim eze.*

**S. 33** *1 Qasidê ȓuĥê minî leze,*
*2 Borê minî lezî–beze[2545],*
*3 Xilaz nabim eze.*

**S. 37** *1 Borê minî beza,*
*2 Qasidê minî leza,*
*3 Leze xilaz nabim eza.*

**S. 41** *1 Qasidê minî leze,*
*2 Borê minî beze,*
*3 Ber xilaz nabim eze.*

**S. 42** *1 Bezê nabime[2546] xilaz,*
*2 Yê ser mi ȓa sekinîye, ĉavê wî weke t'as,*
*3 T'ilîyê wî weke ȓisas,*
*4 Neynûk weke almas,*
*5 Sed xazil e'vdê cahilî, bê sûcî, bê guneyî, bê binîyas, bandê şêxê xwe bive xilaz.*

**S. 34** *1 Yek ser min ȓa sekinî, ĉavî mînanî t'ase,*
*2 Neyînûk şivatê dase,*
*3 Pêĉî mînanî misase*
*4 Ĥev xazila wî xelqê cahilî, bê yî sûcî, bê binyate.*

[2544] *wala*
[2545] *lezî-leze*
[2546] *navim*

**S. 38** *1 Lezê nabim xilaz,*
*2 Yek ser mi r̂a sekinîye, ĉavê wî weke t'as,*
*3 T'ilî weke r̂isas,*
*4 Abr̂îyê wî weke almas,*
*5 Sed xazlîya min xelqê cehilî, bê guneyî, bê misas.*

**S. 42** *1 Bezê nabim xilaze,*
*2 Ser min sekiniye, yekî ĉe'vê wî mîna t'ase,*
*3 T'iliyê wî weke de'se,*
*4 Neyînûk mîne almaes,*
*5 Sed xazla min wî e'vdî cahilî, bê guneyî, bê binîyase, bandê şêxê xa bibe xilase.*

**S. 35** *1 Dibêjime we xelqê cahêle*[2547]*,*
*2 Ibadet bikin qulba helêle,*
*3 Ibadet bikin qulba nûre,*
*4 Ibadet bikin şûre.*

**S. 36** *1 Ew şûrêd malêd babane,*
*2 Sereka çendî berane,*
*3 Ew derba şêxan û p'îrane.*

**S. 43** *1 K'efenê min înan û pîva,*
*2 Qerqerê gaz û nîve,*
*3 Benî Ademo çi dinyake bê hîve*[2548]

**S. 37** *1 ........................................... ,*
*2 Qerqerê min bir̂în gaz û nîve,*
*3 Birano çi dinyake bê hîve.*

**S. 49** *1 K'efenê mi anî pîvan,*
*2 Qerqerê min gaz û nîve,*
*3 Benî Ademo, jaro, çi dinêke bîma.*

**S. 26** *1 K'efenê min anîn bipîve,*
*2 Qerqere min du gaz û nîve,*
*3 Go: «Kûrê Ademo çi gerdûneke bê hîve».*

**S. 43** *1 K'efenê min înan û pîva,*
*2 Qerqerê gaz û nîve,*
*3 Benî Ademo çi dinyake bê hîve.*

**S. 44** *1 K'efenê min pîva ĥîjde gaze,*
*2 Avîtne ser cinîyaze,*
*3 Ser min digrî velîyî* [2549] *û biraze.*

**S. 38** *1 K'efenê min bir̂în ĥîjde gaze,*
*2 Danîne ser cinyaze,*
*3 Ser min digrîn velîyî, biraziye.*

**S. 50** *1 K'efenê min ĥîjde gaze,*
*2 Danîn ser cinîyaze,*
*3 Ser [min] digrin velîyî*[2550] *û biraze.*

**S. 27** *1 K'efene min hîjdeh*[2551] *gaze,*
*2 Didane ser cinaze,*
*3 We li min digrîn*[2552] *velîyî û biraze.*

**S. 44** *1 K'efenê min hijde gaze,*
*2 Avêtine ser ciniyaze,*

---

[2547] *cahil*
[2548] binêr: *bêhîvîya*
[2549] *wêlî*
[2550] *wêlî*
[2551] *hijde*
[2552] *digirin*

*3 Ser min digrî ê'lî û biraze.*

**S. 45** *1.....................................................,*
*2 Qalbê melek Fexredîn danîne dişûşte,*
*3 Welgeȓînine ser tenişte.*

**S. 47** *1 We dibû gişte,*
*2 Qalbê melek Fexredîn anîn şûşte,*
*3 Welgeȓandin ser tenişte.*

**S. 45** *1 Qalbê melek Fexredîn danîn ser p'ûş şûştin,*
*2 Velgeȓandin ser tenişte.*
*3 Lê cema' bûn gişte.*

**S. 46** *1 Lê cema' bibû gişte,*
*2 Sata qelbê e'zîz melek Fexredîn danîyan dişûşte,*
*3 Welgeȓînine ser tenişte.*

**S. 47** *1 Ser teniştê weldigêȓe,*
*2 Heçî kesê vê ȓa*[2553]*,*
*3 E'zîz melek Fexredîn ferĥa bikin boy kenarê Xwedê ȓa.*

**S. 48** *1 Ser tenişte welgeȓandin,*
*2 Heçî kesê bêȓa,*
*3 Fihêl*[2554] *kirin boy kenarê Xwedê ȓa.*

**S. 46** *1 Ser teniştê veldigandin,*
*2 Herçî kesê vê ȓa,*
*3 E'zîz melek Ferxedîn ferho kin boyî kenarê Xudê ȓa.*

**S. 48** *1 Ez dame ser du darê ĥişk,*
*2 Ȓevandin sisîya û çara,*
*3 Birime meskenê mar*[2555] *û mişk.*

**S. 47** *1 Ez danîm ser du dara,*
*2 Ȓevandin sisîya û çara,*
*3 Birime mesk'enê mişka û me'ra.*

**S. 49** *1 Birak divê ȓastî,*
*2 T'irba min bîȓastî,*
*3 Kevirê*[2556] *selîma mi diguhastî.*

**S. 39** *1 Birano, birê mine ȓastî,*
*2 Yê t'irba min bîȓastî,*
*3 Yê kevirê selîmê min guhastî.*

**S. 53** *1 Birano, hûn birayê mine ȓastî,*
*2 T'irba min pîvastî,*
*3 Kevirê sere min guhastî*[2557]*.*

**S. 48** *1 Birakî dibêjim ȓastî,*
*2 T'irba min bîȓastî,*
*3 Kevirê selîma min digivastî.*

**S. 40** *1 Birano, birê mine ĥeqîqetê,*
*2 Qalbê min t'irbê da ȓast kin,*
*3 Mala ĥeqiyê nas kin.*

**S. 50** *1 Birak dive t'aqet bî,*

---

[2553] *wêra*
[2554] *fihol*
[2555] *me'r*
[2556] *kevr*
[2557] *gohastî*

*2 Girêye[2558] sere min vediket bî,*
*3 Pêşîmamekê boy mi diket bî.*

**S. 41** *1 Birano, dibêjme we t'aqete,*
*2 Pêşîmamekî bo min dikete,*
*3 Girêye[2559] sere min vedikete.*

**S. 52** *1 Birano, hûn birayê mine t'aqetê[2560],*
*2 We dikin nesîlĥetê,*
*3 Pêşîmamekî boy mi biketê,*
*4 Wekî girêye sere mi veketê.*

**S. 49** *1 Birak dibêjim t'aqet bî,*
*2 Giriye sere min vetk'et bî,*
*Pêşîmamekî boyî min bik'et bî.*

**S. 51** *1 T'irba min e'sas[2561] kir,*
*2 Qalbê min têda r̂ast kir,*
*3 Wê r̂ojê mala ĥeqîyê xwe nas kir.*

**S. 51** *1 T'irba min t'ewaf[2562] kin,*
*2 Serê mi di nav kin,*
*3 Mala qedîmê silav kin.*

**S. 50** *1 T'irba min t'evav kin,*
*2 Serê min nav kin,*
*3 Mala qedîmiyê silav kin.*

**S. 54** *1 Bira p'evk'etin çûne ser melek Fexredîn,*
*2 Dixwînin[2563] qewlan, Quran û Yasîn,*
*3 Divê: «Fexro, baqî xweş be, Înşallaĥ.*

**S. 52** *1 P'evk'etin, çûne male,*
*2 Mezin, biĉûk, t'ifale,*
*3 Go: «Şemso, baqî xweşbin Înşallaĥ».*

**S. 42** *1 R̂ê girtin, çûne male,*
*2 Biĉûk ĥetanî t'ifale,*
*3 Şemso baqî xweş be Înşallaĥ[2564].*

**S. 56** *1 Bira p'evk'etin hatine male,*
*2 Herge mezine, herge zar̂e, herge t'ifale,*
*3 Fexro, baqî xweş be Înşallaĥ.*

**S. 28** *1 Bira bi hev dik'etin diçûne male,*
*2 Heke biĉûke, heke zare, heke kale,*
*3 Got: « Şêx Şemso, yên mane xweşbin înşalle».*

**S. 51** *1 P'ev k'etin, çûne male,*
*2 Mezin, biĉûk, t'ifale,*
*3 Gotin: «Şemso, baqî xaş bin Înşala».*

**S. 53** *1 Wêda hebû efendî û qadî,*
*2 Go: « Ji nav me çûye melek Fexredînê pisê Adî,*
*3 Hatîye nav me Şerfedînê mahdî[2565]».*

**S. 43** *1 Wêda[2566] hebûn efendî û qadî,*
*2 Go: «Ji nav me çûne melek Fexredînê pisê Adî,*
*3 Hatîye nav me Şerfedînê mahdî[2567]».*

---

[2558] *girî*
[2559] *giriye*
[2560] *heqet*
[2561] *asas*
[2562] *tivav*
[2563] *dixûn*
[2564] *îşela*
[2565] *madî*
[2566] *wê da*
[2567] *madî*

**S. 52** *1 Wêda hebû efendî û qadî,*
*2 Go: «Ji nav me çû melek Ferredînê Adî,*
*3 Hate nav me Şerfedînê madî».*

**S. 54** *1 Aşiqa go: «Hîne, ho bi hîne,*
*2 Yê bîna melek Fexredîn nav me çûne, em k'îya, k'îne?»*

**S. 44** *1 Aşiqa go: «Hîne ho, bi hîne,*
*2 Yê bîna melek Fexredîn nav me çûne, em k'îya, k'îne?»*

**S. 55** *1 Aşiq dibêjin: «Hîne,*
*2 Yê nolanî e'zîz melek Fexredîn nav me çûne, em k'a k'îne?»*

**S. 29** *1 Wê digo hîne:*
*2 «Yê mîna xweşewîst melik Fexredîne ji nav me çûne, gelo em k'ê û k'îne?»*

**S. 53** *1 Aşiqa go: «Hîne, ha bi hîne,*
*2 Yê bîna melek Ferxedîn nav me çûne, em k'î û k'îne?»*

**S. 55** *1 Eva[2568] sindirûke sore,*
*2 Têda Fexrê more,*
*3 Meleka k'işande E'rşê jore,*
*4 Ber melikê qubet il-Bidore[2569].*

**S. 56** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe[2570],*
*3 Şêx Mend maye bê bave[2571].*

**S. 45** *1 Eva sindirûke[2572] sore,*
*2 Têda[2573] Fexrê more,*
*3 Meleka k'işande E'rşê jore.*

**S. 46** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşemr̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 57** *1 Sindirûke sore,*
*2 Navda Fexrê more,*
*3 Meleka k'işandîye E'rşê jore,*
*4 Ber melikê qubet il-Bidore.*

**S. 59** *1 Bavo r̂ave, babo r̂ave,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend nabe bê bave.*

**S. 35** *1 Eve sindiruka sore,*
*2 Eve t'abota sore,*
*3 Di navda ew Fexrê bi more,*
*4 Firişteya[2574] bire cem E'rşê jore.*

**S. 34** *1 R̂abe babo, tu r̂abe,*
*2 Çarsembu r̂oja hisabe,*
*3 Şex Mend maye bê babe.*

**S. 1** *1 Ev[2575] sindirûka sore,*
*2 Navda meytê more,*
*3 Meleka şandîye E'rşê jore,*
*4 Cem melikê qubet il-Bidore[2576].*
*5 R̂abe, hey rabe,*
*6 Çarşem r̂oje ĥêsabe,*

---

[2568] *ewa*
[2569] *Qebildor*
[2570] *ĥesav*
[2571] *bêbav*
[2572] *sindrûk*
[2573] *tê da*
[2574] *fireşte*
[2575] *ew*
[2576] *qubldor*

*7 Birê te bê te nabe!*

**S. 54** *1 Eva[2577] sindirûke sore,*
*2 Têda Ferxê xudanê xerqê more,*
*3 Meleka k'işand E'rşê jore,*
*4 Cemaya mêra - qubildore.*
*5 - R̂abe bavo, r̂abe,*
*6 Çarşem r̂ojeke ĥesabe,*
*7 Şêx Mendê Ferxe bê bav nabe.*

**S. 57** *1 Eva sindirûke zere,*
*2 Têda Fexrê nedere[2578],*
*3 Meleka k'işandibû E'rşê sere,*
*4 Ber Melikê Ekbere[2579].*

**S. 56** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 47** *1 Eva[2580] sindirûke zere,*
*2 Eva t'abûe zere,*
*3 Têda Fexrê nedere,*
*4 Meleka k'işandibû E'rşê sere,*
*5 Ber Melikê Ekbere.*

**S. 46** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 58** *1 Sindirûke zere,*
*2 Navda Fexrê nedere,*
*3 Meleka k'işandîye E'rşê sere,*
*4 Ber Melikê Ekbere.*

**S. 59** *1 Bavo r̂ave, babo r̂ave,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend nabe bê bave.*

**S. 31** *1 Eve sindruka zere,*
*2 Eve t'abota zere,*
*3 Di navda Fexrê nedere,*
*4 Birne cem melekê ekbere.*

**S. 32** *1 R̂abe babo, tu r̂abe,*
*2 Çarsembu r̂oja hisabe,*
*3 Şex Mend mabû be babe.*

**S. 2** *1 Ev sindirûka zêr̂e,*
*2 Navda meytê nedere,*
*3 Meleka şandîye E'rşê sere,*
*4 Cem Melikê Ekbere.*
*5 R̂abe, hey r̂abe,*
*6 Çarşem r̂oje ĥêsabe,*
*7 Birê te bê te na[be].*

**S. 58** *1 Eva sindirûke r̂eşe,*
*2 Têda Fexrê k'eleşe,*
*3 Meleka k'işandibû E'rşê,*
*4 Ber Melikê mirazbexşe.*

**S. 56** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

---

[2577] *ewa*
[2578] *Ewa t'abûte zere*
[2579] *yek ber*
[2580] *eve*

**S. 48** *1 Eva sindirûke r̂eşe,*
*2 Eva t'abûte r̂eşe,*
*3 Têda Fexrê k'eleşe,*
*4 Meleka k'işandibû E'rşê,*
*5 Ber Melikê mirazbexşe.*

**S. 46** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 62** *1 Ev sindirûke r̂eşe,*
*2 Navda Fexrê k'eleşe,*
*3 Meleka k'işandîye E'rşê,*
*4 Ber Melikê bexşe.*

**S. 59** *1 Bavo r̂ave, babo r̂ave,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend nabe bê bave.*

**S. 30** *1 Eve sindruka*[2581] *r̂eşe,*
*2 Di navda Fexrê k'eleşe,*
*3 Meleka bire cem firişteyên*[2582] *E'rşe.*

**S. 34** *1 R̂abe babo, tu r̂abe,*
*2 Çarsembu r̂oja hisabe,*
*3 Şex Mend maye bê babe.*

**S. 4** *1 Ev sindirûka r̂eşe,*
*2 Navda Fexrê k'eleşe,*
*3 Meleka şandîye E'rşê,*
*4 Cem Melikê bexşe.*
*5 R̂abe, hey r̂abe,*
*6 Çarşem r̂oje ĥêsabe,*
*7 Birê te bê te nabe!*

**S. 56** *1 Eva sindirûke r̂eşe,*
*2 Navda Ferxê xudanê xerqê r̂eşe,*
*3 Meleka k'işandibû E'rşê,*
*4 Cemaya mêra – Zimzim, Qubildor û Lalieş.*
*5 - R̂abe bavo, r̂abe,*
*6 Çarşem r̂ojeke ĥesabe,*
*7 Şêx Mendê Ferxe bê bav nabe.*

**S. 59** *1 Eva sindirûke sipîye,*
*2 Têda Fexrê gulîye,*
*3 Meleka k'işandibû E'rşê A'lîye,*
*4 Ber Melikê Bêrîye.*

**S. 60** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 49** *1 Eva sindirûke sipîye,*
*2 Eva t'abûte sipîye,*
*3 Têda Fexrê gulîye,*
*4 Meleka k'işandibû E'rşê A'lîye*[2583]*,*
*5 Ber melikê*[2584] *Bêrîye.*

**S. 50** *1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 60** *1 Ev sindirûke sipîye,*

---

[2581] *sindirok*
[2582] *firîşte*
[2583] *êlî*
[2584] *melek*

*2 Navda Fexrê gulîye,*
*3 Meleka k'işandîye E'rşê A'lîye*[2585]*,*
*4 Ber Melikê Bêrîye.*

**S. 59** *1 Bavo r̂ave, babo r̂ave,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesabe,*
*3 Şêx Mend nabe bê bave.*

**S. 33** *1 Eve sindiruka sipîye,*
*2 Eve t'abota sipîye,*
*3 Di navda Fexrê bi gulîye,*
*4 Meleka bire cem melikê*[2586] *E'rşe jorîye.*

**S. 34** *1 R̂abe babo, tu r̂abe,*
*2 Çarsembu r̂oja hisabe,*
*3 Şex Mend maye bê babe.*

**S. 3** *1 Ev sindirûka sipîye,*
*2 Navda Fexrê gulîye,*
*3 Meleka şandîye E'rşê A'lîye,*
*4 Ber Melikê Bêrîye.*
*5 R̂abe, hey r̂abe,*
*6 Çarşem r̂oje ĥêsabe,*
*7 Birê te bê te nabe!*

**S. 55** *1 Eva sindirûke sipîye,*
*2 Navda Fexrê gulîye,*
*3 Meleka k'işandibû E'rşê Êlîye,*
*4 Cemaya mêra – Zimzim û kaniya Sipîye.*
*5 - R̂abe bavo, r̂abe,*
*6 Çarşem r̂ojeke ĥesabe,*
*7 Şêx Mendê Ferxe bê bav nabe.*

*T'emametîye şêx Adî!*
*T'emametîye şêx Adî,*
*R̂eĥme li dê-bavê guhdare, hostayî!*
*T'emametîye şêx Adî,*
*Wêda hebû efendî û qadî,*
*R̂eme dê û bavê hostayî!*

## 120. QEWLÊ GÊLA ŞÊX MEND[2587]

**Sêvane[2588] k'esk**

**S. 1** *1 Çi subeyeke*[2589] *sêvane k'eske,*
*2 Tê bêhna ji bixûr, û r̂eşrihan û, miske,*
*3 Yar gêla ser sorgula r̂awestabûn biske.*

**S. 2** *1 Çi subeyeke k'eske sêvane,*
*2 Herdu şabisket gêlê ji heyzerane,*
*3 Yar gêlê li ser sorgula bisk r̂awestane.*

**S. 3** *1 Çi subeyeke sêvane zere,*
*2 Tê bêhna ji bixûr, û misk, û enbere,*
*3 Yar gêlê ser sorgula narîn bisk r̂awestane li sere.*

**S. 4** *1 Li me hilatibû stêra subeha,*

[2585] *elî*
[2586] *melek*
[2587] [50] (r.404)
[2588] *sîwan*
[2589] *sibeyek*

*2 Gêl qendîleka li nava qubeha,*
*3 Yar gêlê tu derîyî li her yar dergeha.*

**S. 5** *1 Stêra berî subehe li min hilatin stêre,*
*2 Herdu şabiskêt gêlê ez bim heyran,*
*3 Yar gêlê te eqrebî ber dayne,*
*4 Cer cotekî sere.*

**S. 6** *1 Stêra berê subehê ez dîme,*
*2 Hilatim ji qedîme,*
*3 Yar gêlê xelqê were ez giravîme.*

## 121. QEWLÊ ŞÊX MEND Û GÊLA[2590]

*Bi destûrî Xwedê!*
**S. 1** *1 Çi sibeyeka merxûne,*
*2 Şêx Mendê Fexra li bore xwe kirbû zîne,*
*3 Çû silavê mîr Zêndîne.*
**S. 1** *1 Çi sibeyeka mer xewne,*
*2 Şêx Mendê Fexra li burê xwe kirbû zîne,*
*3 Çû silavê mîr Zêndîne.*

**S. 2** *1 Çi kanîyeka li ber ave,*
*2 Şêx Mendê Fexra li ser dîtbûn çar gêlî bejin zirave,*
*3 Şêx Mend li herçar gêla kir silave.*
**S. 2** *1 Çi kanîyeka li ber ave,*
*2 Şêx Mendê Fexra li ser dîtbûn çar gêlî bejin zirave,*
*3 Şêx Mend li herçar gêla kir silave.*

**S. 3** *1 Herçar gêla ji k'eremê silav vedave,*
*2 Go: «Ya lawo, silava te ser serê me û ser herdu çave»,*
*3 Xwezî mi[2591] zanîba we herçar çi nave?»*
**S. 3** *1 Herçar gêla ji k'eremê silav vedave,*
*2 Go: «Ya law, silava te ser serê me û ser herdu çave»,*
*3 Û xwezî me zanîba we herçar çi nave?»*

**S. 4** *1 Yekê got: «Navê min Xaye,*
*2 Evîne li çendî dinyaye[2592],*
*3 Ji r̂êza ewe xweyaye[2593]».*
**S. 4** *1 Yekê go: «Navê min Xaye,*
*2 Meĥbûbe li çendî dinyaye,*
*3 Ji r̂êza ewe xuyaye».*

**S. 5** *1 Yekê got: «Lawo, navê min Fate,*
*2 Evîna çendî welate,*
*3 Zik'rê min ji Şamê ĥeta R̂ojhilate».*
**S. 5** *1 Yekê go: «Law, navê min Fate,*
*2 Meĥbuba çendî welate,*
*3 Zik'irê min ji Şamê ĥeta R̂ojhilate,*
*4 Li Şamê û R̂ojhilate».*

**S. 6** *1 Yekê got: « Lawo, navê min Gule,*
*2 Melhema birîna kule,*

[2590] [50] (rr. 405-408)
[2591] *me*
[2592] *dunya*
[2593] *xuya*

*3 Ji r̂êza ewe fadile».*

**S. 6** *1 Yekê go: « Law, navê min Gule,*
*2 Melĥema birîna kule,*
*3 Ji r̂êza ewe fadile».*

**S. 7** *1 Ya din got: «Ya lawo, navê min Ĥebîbe,*
*2 Hincîyê bigirt qedrê xelqê ẍerîbe,*
*3 Ewî di bihuşte baqî da, dê hebit nesîbe».*

**S. 7** *1 Ya din go: «Ya law, navê min Ĥebîbe,*
*2 Hincîyê bigirt qedrê xelkê ẍerîbe,*
*3 Ewî di bihuşte baqî da, dê hebit nesîbe».*

**S. 8** *1 Gêlê gotê: «Ya lawo, tuyî qadirî,*
*2 Tu r̂enga li me negirî,*
*3 Ji me herçar gêla[kî] çêtirî».*

**S. 8** *1 Gêlê gotê: «Ya law, tuyî qadirî,*
*2 Tu r̂enga li me negirî,*
*3 Ji me herçar gêlakî çêtirî».*

**S. 9** *1 Şêx Mend got: «Hun herçar gêlên şîrinin*[2594]*,*
*2 Hun di şekir û hingiv da dimînin, —*
*3 Got — xwezî min zanîba hûn çi dixwînin».*

**S. 9** *1 Şêx Mend go: «Hun herçar gêlên şêrînin,*
*2 Hun di şekir û hingiv da deyînin, —*
*3 Go — xwezî min zanîbe hûn çi dixûyînin».*

**S. 10** *1 Ji sûka ĥeta sindrûka,*
*2 Ji qeyseriya ĥeta sûka,*
*3 R̂a [ç]ava şêx Mend gêla biçûke.*

**S. 10** *1 Ji sûka ĥeta sindrûka,*
*2 Ji qeyîserîya ĥeta sûka,*
*3 R̂a çava şêx Mend gêla biçûke.*

**S. 11** *1 Gêla min r̂eş kezî,*
*2 R̂ojê ĥemû yê ditewizî,*
*3 Mîna sewda nava r̂ezî.*

**S. 11** *1 Gêla min r̂eş kezî,*
*2 R̂ojê ĥemû yê ditewizî,*
*3 Mîna sewza nava r̂ezî.*

**S. 12** *1 Gêlê got: «Lawo, hilo,*
*2 Emê herne nav baẍa û r̂eza, nêva gulan û qeze,*
*3 Emê li wê bibînin sed gula r̂engê şuhbetê eze».*

**S. 12** *1 Gêlê go: «Laû, hilo,*
*2 Emê herne nav baxça û r̂eza, nêva gulan û qeze,*
*3 Emê li wê bibînin sed gula şiklî şuhbetê eze».*

**S. 13** *1 Şêx Mend got: «Gêlê ez bi xwe baẍçeme,*
*2 Bi xwe r̂ezim, bi xwe qezim,*
*3 Pise melek Ferxedîn ezim.*

**S. 13** *1 Şêx Mend go: «Gêlê ez bi xo baxçeme,*
*2 Bi xo r̂ezim, bi xo qezim,*
*3 Pise melek Ferxedîn ezim.*

**S. 14** *1 Ez pise melek Ferxedînim,*
*2 Bazîyê ser t'extê zêr̂înim,*
*3 Ez hatime şîrin gêla xwe bibînim».*

---

[2594]*şirîn*

**S. 14** *1 Ezim pise melek Ferxedînim,*
*2 Bazîyê ser t'extê zêr̂înim,*
*3 Ez hatime şêrîn gêla xwe bibînim».*

**S. 15** *1 Gêlê got: «Hey lawo, ser sewdawo,*
*2 Li ĥewşa babe min r̂awestawo,*
*3 Li seyra te heyran mawo».*
**S. 15** *1 Gêlê go: «Hey law, ser sewdaw,*
*2 Li ĥewşa babe min r̂awestaw,*
*3 Li seyra te heyran maw».*

**S. 16** *1 Gêlê got: «Hey lawo, sewda sero,*
*2 Salê here, carê wero,*
*3 Xelqê mey zana bêşik û bawero».*
**S. 16** *1 Gêlê go: «Hey law, sewda sero,*
*2 Salê here, carê wero,*
*3 Xelkê mey e'rif bê şik û bawero».*

**S. 17** *1 Şêx Mend got: «Gêlê sebrê ji k'u bînim,*
*2 Ser dile şêx Mendê Fexra deynim,*
*3 Ezê çawa salê bêm carekê şîrin gêla xwe bibînim».*
**S. 17** *1 Şêx Mend go: «Gêlê sebrê ji k'uyî bînim,*
*2 Ser dile şêx Mendê Fexra deynim,*
*3 Ezê çawe salê bêm carekê şêrîn gêla xwe bibînim».*

**S. 18** *1 Gêlê got: «Ezim p'epûka p'ir̂ mirarî,*
*2 Ezê ji e'rda bifirima E'rşê tarî,*
*3 Kes bergeh bi min nîne ji bilî melkê hêzdarî».*
**S. 18** *1 Gêlê go: «Ezim p'epûka p'ir̂ mirarî,*
*2 Ezê ji e'rda bifirima E'rşê tarî,*
*3 Kesî mical bi min nîne ji xêrî melikê Cebarî».*

**S. 19** *1 Şêx Mend got: «Ezê bime bazekî p'ir̂ zirave,*
*2 Ezê bifirime r̂efê tu li nave,*
*3 Ezê bi ferwara Xwedê û silt'an Êzî da birime nav dave».*
**S. 19** *1 Şêx Mend go: «Ezê bime bazîyekî p'ir̂ zirave,*
*2 Ezê bifirime r̂efê tu li nave,*
*3 Ezê bi ferwara Xudê û silt'an Êzî da birime nav dave».*

**S. 20** *1 Gêlê got: «Lawo, ezê bime mare,*
*2 Û li ĥeft qadê e'rdê biçime xware,*
*3 Kesek miraz bi min nîne, ji bilî melike hêzdare».*
**S. 20** *1 Gêlê go: «Law, ezê bime mare,*
*2 Û li ĥeft tebeqê e'rdê biçime xware,*
*3 Kesek miraze bi min nîne, ji xêrî melikê Cebare».*

**S. 21** *1 Şêx Mend got: «Ezim pise mîra,*
*2 Ezê siwar bibim li kehêla û bergîra,*
*3 Ezê li te hay bikim margîra.*
**S. 21** *1 Şêx Mend go: «Ezim pise mîra,*
*2 Ezê siwar bibim li keĥêla û me'negîya,*
*3 Ezê li te hay bikim margîra.*

**S. 22** *1 Ezê margîra li te hay bikeme,*
*2 Û şaxê gelîya li te r̂ast bikeme,*
*3 Ezê bi ferwara Xwedê û silt'an Êzî te bigrim û êxsîr bikeme».*
**S. 22** *1 Ezê margîra li te hay bikeme,*
*2 Û şaxê gelîya li te r̂ast bikeme,*
*3 Ezê bi ferwara Xwedê û silt'an Êzî te bigrim û êxsîr bikeme».*

**S. 23** *1 Gêlê got: «Lawo, ezê bime kele di xwar de,*
*2 Şiȓe heyne çar kenar de,*
*3 Şehe û xunk'ar lê di hesar de».*

**S. 23** *1 Gêlê go: «Law, ezê bime kele di xwar de,*
*2 Şiȓe heyne çar kenar de,*
*3 Şeh û xunk'ar lê di hesar de».*

**S. 24** *1 Şêx Mend got: « Gêlê, zor kele hene,*
*2 Ji asêbûna ȓê lê t'inene,*
*3 K'ilîl û miftê wan bi destî mene».*

**S. 24** *1 Şêx Mend go: « Gêlê, zor kele hene,*
*2 Ji asêbûna, ȓê lê t'inene,*
*3 K'ilîl û miftê wan bi destî mene».*

**S. 25** *1 Gêlê got: «Lawo, ezê bime kele ji kever*[2595]*,*
*2 Lê k'omdibûn leşker*[2596]*,*
*3 Lê bisit'irin û xwe bidne ber».*

**S. 25** *1 Gêlê go: «Ezê bime kele ji kevir,*
*2 Lê cema' dibûn leşker,*
*3 Lê bisit'iȓin û xwe bidne ber».*

**S. 26** *1 Şêx Mend got: « Gêlê, zor kele hebûn,*
*2 Ji asêbûna ȓê lê t'inebûn,*
*3 K'ilîl û miftê wan bi destê mala me bûn».*

**S. 26** *1 Şêx Mend go: « Gêlê, zor kele hebûn,*
*2 Ji asê bûna ȓê lê t'ininebûn,*
*3 K'ilîl û muftê wan bi destê mala me bûn».*

**S. 27** *1 Gêlê got: «Lawo, ezê bime sora sêve,*
*2 Ezê sorkime bi ĉiqê darêve,*
*3 Kesekî miraz bi min nîne ji bilî ȓezvanê mîr pêve».*

**S. 27** *1 Gêlê go: «Law, ezê bime sora sêve,*
*2 Ezê sorkime bi ĉiqê darêve,*
*3 Kesekî miraz bi min nîne ji xênî ȓezvanê mîr pêve».*

**S. 28** *1 Şêx Mend got: «Ezê bime nexweşekî giran,*
*2 Ezê bême bin siya daran,*
*3 Ezê bêjme ȓezvanê mîr ezî nexweşim û min sêve sor derman».*

**S. 28** *1 Şêx Mend go: «Ezê bime nexweşekî giran,*
*2 Ezê bême bin sîya daran,*
*3 Ezê bêjme ȓezvanê mîr ezî nexweşim û min sêve sor derman».*

**S. 29** *1 Sêva sor di anin,*
*2 Li ser dilê şêx Mend danin,*
*3 Şêx Mendê Fexra ĉavê xwe bi sêva sor hilanin.*

**S. 29** *1 Sêva sor di anin,*
*2 Li ser dilê şêx Mendê Fexra danin,*
*3 Şêx Mendê Fexra ĉavê xwe bi sêva sor hilanin.*

**S. 30** *1 Gêlê got: «Hey serdaro,*
*2 Serdarê çendî sehabete,*
*3 Te ne bi ezbet didim, ne bi e'şîrete».*

**S. 30** *1 Gêlê go: «Hey serdaro,*
*2 Serdarê çendî seĥabete,*
*3 Te ne bi qewim didim, ne bi e'şîrete».*

---

2595 binêr: *kevir*
2596 *lêşker*

**S. 31** *1 Gêlê got: «Hey lawo,*
*2 Ji desta ĥeta bi e'nîşkê,*
*3 Te nadime ne bi dayê ne bi xwiskê».*
**S. 31** *1 Gêlê go: «Hey law,*
*2 Ji desta ĥeta bi e'nîşkê,*
*3 Te nadime ne bi dayê ne bi xuyîskê».*

**S. 32** *1 Şêx Mend got: «Sed mehrîbane li wê dayê te jê r̂a dot,*
*2 Ĥeta niha ev xebera xweş te ne digot,*
*3 Te cerge şêx Mendê Fexra te bi xwe disot».*
**S. 32** *1 Şêx Mend go: «Sed r̂eĥme li wê dayê te jê r̂a dot,*
*2 Ĥeta niha ev xebera xweş te nedigot,*
*3 Te cerge şêx Mendê Fexra te bi xwe disot».*

**S. 33** *1 Ji qewlê şêx Mendê Fexrane,*
*2 R̂asmalê mêra îmane!*
**S. 33** *1 Ji qewlê şêx Mendê Fexrane,*
*2 R̂asmalê mêra îmane!*

*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*
*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*

## 122. QEWLÊ BEDIR Û MEND[2597; 2598]

**S. 1** *1 Mend dibêjitê: «Silaved me bidin ji ĥerfe,*
*2 Bînaye dilê mino ji herdu t'erfe,*
*3 Xebîr be ĥemû serfe.*
**S. 1** *1 Silavên me bêtirin,*
*2 Ji r̂oniya dilê min û herçar t'erefin.*

**S. 2** *1 Hey xebîr û xebere,*
*2 Hey şîroyî mehdere,*
*3 Melik Fexredîn îmame yî babzere.*
**S. 2** *1 Zanabûn li ĥemû sefere,*
*2 Zanabûn li mehdere,*
*3 Melek Fexredîn pêşenge yî babzere.*

**S. 3** *1 Melik Fexredîn îmame yî zerebabe.*
*2 Bînaye dilê mino, herdu ĉave,*
*3 Melik Fexredîn fitilê digerit ser xasan û xafe».*
**S. 3** *1 Melek Fexredîn pêşenge yî zerbabe,*
*2 R̂oniya dilê min û herdu ĉave,*
*3 Melek Fexredîn xase, fitile digeȓe ser xasan û xabe.*

**S. 4** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, her ji Xwedîyê xwe bitirsî,*
*2 Em hatîna me'nîya ji şêx bipirsin,*
*3 Yî di dilade heye E'rş û K'ursîy.*

**S. 4** *1 Mend got: «Bedro, heke tu nezanî bixebite nezaniyê ji xwe bi derke,*
*2 Yekî qasî*[2599] *xwe xeberke,*
*3 Hecî şêxe ku serî li berke».*

**S. 5** *1 Vê bû t'acir ji e'sila,*

---

[2597] https://www.youtube.com/watch?v=xBxDnQI0TjA Belavkirin: Omar Adani
[2598] [50] Qewlê Bedir Mend (rr. 332-335)
[2599] *qastî*

*2 Xebîrbe me'nîyan û fesle,*
*3 Em hatîna ji şêx bipirsin mesela».*

**S. 5** *1 Bedir got: «Mendo, tu dara ji e'lse,*
*2 Em hatine ji şêx r̂e bikin fesle,*
*3 Em hatine ji şêx bipirsin ew çi e'lse».*

**S. 6** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, bi wî kem, êkî Ekbere,*
*2 Cizwatek ji ilmê melik Fexredîn t'inê yî fere,*
*3 Dabû çend aşiqe r̂ûyê vê dine babzere».*

**S. 6** *1 Mend got: «Bedro, her tu ji Xwedê bitirsî,*
*2 Em hatine wateya, ji wî xweşewîstî bipirsî,*
*3 Yê di dilê wî de ĥezkirina E'rş û K'ursîy».*

**S. 7** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, bi wî kem nabit finî,*
*2 Cizwatek ji ilmî melik Fexredîn bi t'inê,*
*3 Dabû çend aşiqe r̂ûyê vê dine».*

**S. 7** *1 Mend got: «Bedro, ez bi wîkim nabe finê,*
*2 Sebeqek. ji ilmê melek Fexredîn bi t'inê,*
*3 Da çiqasê aşiqên li r̂êye vê dinê».*

**S. 8** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, ji binyat tuyî şêrî,*
*2 Bi r̂îya de tu dêçî, tu wê diçêrî,*
*3 Min nezanî tuyî dibînî t'ebayî dêrî.*

**S. 8** *1 Mend got: «Bedro, ez bi wîkim xwedanê*[2600] *xêr û şer̂e,*
*2 Sebeqek ji ilmê melek Fexradîn fere,*
*3 Da ciqas evîndared babzere».*

**S. 9** *1 Mend got: «Bedro, tu jibo şer̂ê dînekî vekê derîye,*
*2 Tu bi r̂êya Xwede diçîye,*
*3 Tu wê her bighê pileya jorîye.*

**S. 10** *1 Heкe tuyî dînê, r̂ênasbî,*
*2 Ser reşkî bi xasbî,*
*3 Bextê bê qurnasbî».*

**S. 11** *1 Mend got: «Bedro, heke tu nizanî, bixebite, nezaniyê ji xwe bi derke.*
*2 Yekî qasî xwe xeberke,*
*3 Hecî şêxe ku serî li berke».* (binêr **S. 4**)

**S. 12** *1 Mend got: «Bedro, bifikire ber xwe ve,*
*2 Kesên tên ser û ber t'eve,*
*3 Yên ku dibêjin şêx Fexrê Adiya her eve.*

**S. 13** *1 Ewe şêx Fexrê Adiya,*
*2 Sur̂a*[2601] *me siniya*[2602]*,*
*3 Zanaye li e'rd, û e'zman, û zevîya».*

**S. 14** *1 Mend got: «Bedro, tu dara ji e'lse,*
*2 Em hatine ji vêra bikin fesle,*
*3 Em hatine ji şêx bipirsin e'sil u fesle».* (binêr **S. 5**)

**S. 9** *1 Her yê yî dîtiya r̂ê nasîya,*
*2 Bê xetakî, bê qurtasîye,*

[2600] *xudan*
[2601] *sur̂*
[2602] *suniya*

*3 Ser r̂eşekî bê xwasîye.*

**S. 10** *1 Xilmet bike sed sal û zêde,*
*2 Tu r̂ûnê ji guhdare,*
*3 Tu ne şêxî ji hevale,*
*4 Kesek li gel baxoyê xwe ne kirye qale».*

**S. 15** *1 Mend got: «Bedro, p'erwestê bike sed sale,*
*2 Û paşê bifikire û bike hevale,*
*3 Hên tu ne yî şêxê, tuyî hevale».*

**S. 11** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, hêj tu dik'amilî,*
*2 Dest ji êl û mal bihêlî,*
*3 Da bi şêx r̂e biwesilî».*

**S. 16** *1 Mend got: «Min got, tuyî k'amilî,*
*2 Ji dost, û êl, û meriva, xwe nehêlî,*
*3 Da tu bi şêx r̂e biwesilî.*

**S. 17** *1 Şêx çirakî şewq sore,*
*2 Siwar dibû li hespê bore,*
*3 Baweriya wî bi yekî li jore.*

**S. 12** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, hey p'îro, pisê p'îre,*
*2 Hey yê e'rifo nav*[2603] *wan jîre,*
*3 Kesekî ne bezandî bore mîre».*

**S. 19** *1 Hey p'îr û pise p'îre,*
*2 Zanayê nav wan, yê jîre,*
*3 Kesî nebezandiye borê mîre».*

**S. 13** *1 Çi ĉirayîkî ber k'ûre,*
*2 Nab qewlê Xwedê, nav xedîsê R̂esûle*[2604]*,*
*3 Ya R̂ebî, me ne nivîsî ji çu cerik û k'ûre!*

**S. 14** *1 Ya R̂ebî, tu me nenivîsî*[2605] *ji ĉêr belaşe,*
*2 Kesek pirsyar ne dikirîya ji pisê p'adşe*[2606]*,*
*3 K'a k'î r̂ê diçite aşe?»*

**S. 18** *1 Tu diçiyê derên belaşe,*
*2 Kesî nepirsiye ji pisê p'aşe,*
*3 K'i bi r̂êde diçite aşe.*

**S. 20** *1 Bedir got: «Mendo, bes dilê min bi van ĉêra bike r̂ehete,*
*2 Heke min zanîba şêxek dihate,*
*3 Minê ji şêx r̂e amide kira xelate».*

**S. 15** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, kesek bêt ser teve,*
*2 Çî dibêj tê ber xwe ve*[2607]*,*
*3 Netirse bêje qutb zemin eve».*

**S. 16** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, heke tu nezanî, nezaniya ji xwe derke,*
*2 Çî şêxî go, xeberke,*
*3 Hincîyê şêx go serî li berke».*

**S. 17** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, hey ne li dîwane şêx Fexrê Adiya,*
*2 Eve bû sur̂a me siniya*[2608]*,*

[2603] *naf*
[2604] *Risul*
[2605] *nivisî*
[2606] *p'adşe*
[2607] *xove*
[2608] *sunîya*

*3 Ew xebîre e'rd, û e'zman, û zeviya».*

**S. 18** *1 Bedir dibêjitê: «Mendo, bes ĉêre bike belaşe,*
*2 Hege t'acir hatin, vikir derê qumaşe,*
*3 E't'ar dê xwe di îna paşe».*

**S. 21** *1 Mend got: «Bedro, bese jê r̂a bide belaşe,*
*2 Bazirgan hatin, vekirin qumaşe,*
*3 Firoşk'ar k'işiyane paşe».*

**S. 19** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, bes bike qal û qîle,*
*2 Ez çi bikem tu r̂uniştîya ser ciyê delîle,*
*3 Paşî şêx Fexrê Adiya ez û tu nayîn bi derzîyekî bi du pole»,*

**S. 22** *1 Mend got: «Bedro, bes bike qal û qîle,*
*2 Çi bikim tî r̂ûnştiye ser ciyê delîle,*
*3 Bêy sêx Fexrê Adiya ez û tu nêne derziyek bi du pole.*

**S. 23** *1 Xortekî te me dit bijandî,*
*2 Xeta te ji mere dişandî,*
*3 Şerma min pê direvandî*

**S. 24** *1 Binyakî te me ji dêr,*
*2 Ezê pirseke ji te bikim istexbêr,*
*3 Tu hatî desta hilîne li ber xunk'êr.*

**S. 20** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, bes dilê min biĉêre, bike r̂ahete,*
*2 Heger min zanîbe şêx atqate,*
*3 Dê min bi şêx kirba mih cîzate».*

**S. 21** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, ez bê vîrek bi dil ji wande,*
*2 Wekî te ev cewab ji mi r̂a şande,*
*3 Te şermîya min pê direvande».*

**S. 22** *1 Bedir dibêjitê: «Mendo, ez û tu axirzemînin,*
*2 Em çu me'nîya ji êk naĥebînin,*
*3 Ez hatîme dest li ber xunk'êr hilînim».*

**S. 23** *1 Bedir dibêjitê: «Mendo, me'nîyan bi r̂ida,*
*2 R̂abe ji mi r̂a xeberde,*
*3 P'adşayê min çî nicar kirbû e'zman û e'rde?*

**S. 25** *1 Pirsa me hatî bi ser de,*
*2 R̂abe ji me r̂e xeber de,*
*3 K'a P'adşê min ji çi çêkirin e'zman û e'rde?*

**S. 24** *1 Her tu dibêjî ji dur̂a zere,*
*2 Ew dur̂a ne ji axe, ne ji bere,*
*3 Ji male Melikê ejdere!*
*4 Ji k'u bû ji k'u tê, te dere?*

**S. 26** *1 Her tuyê bêjê ji dur̂a*[2609] *zere,*
*2 Ne ji axe, û ne ji bere,*
*3 Ji k'î derê bu, ji k'î derê anîbû dere?*

**S. 25** *1 Dur̂e, û beĥre, û [h]ewe,*
*2 Dur̂e, û bihuşt, û kirewe,*
*3 P'adşayê min çêkirbû ewe.*

**S. 27** *1 Dur̂a derya li hewa,*
*2 Bihuşt û dojeha r̂ewa,*

[2609] *dur*

*3 P'adşê min ji çi çêkirin ewa.*

**S. 28** *1 K'ursiya e'rd û e'zmane,*
*2 R̂abe ji mi r̂e bide xweyane*[2610]*,*
*3 K'a binê ew ji Xwedêne, lê Xwedê ji wane?*

**S. 26** *1 Her tu dibêjî bihuşt yî qewîye,*
*2 Qasî e'rd, û e'zman, û zevîye,*
*3 Tu bêje min k'a t'ixûbê wê çîye?*

**S. 29** *1 Her tuyî bêjê dojeh û qewîye,*
*2 Qasî e'rd û e'zman û zevêye,*
*3 Bêje min ser t'ixuma wan çîye?*

**S. 27** *1 Her tu dibêjî cinet terz li misteĥeqîye*[2611]*,*
*2 Qasî e'rd û e'zman, û zevîye,*
*3 Tu bêje min k'a t'ixûbê wê çîye?*

**S. 30** *1 Her tu yê bêjê bihuşt ji mere mizgîne,*
*2 Qasî e'rd û e'zman û zevîne,*
*3 Bêje min ser t'ixûmê wan jî çîne?*

**S. 28** *1 Melik al-Arz û Melik il-Semawat*[2612]*,*
*2 Ehlî bihuştê ĥeq qinyat*[2613]*,*
*3 Yê doj çî siniyat*[2614]*».*

**S. 31** *1 Wa dibêje melekê e'rd û semawate,*
*2 Gelê bihuştê hew qinyate,*
*3 Gelê dojêh çi bo wan hate?»*

**S. 29** *1 Mend dibêjitê: «Bedro, here ku xwe dukujî,*
*2 Tu bi xwexwe disojî.*

**S. 30** *1 K'ursîy ya e'rd û e'zmane,*
*2 R̂abe ji me r̂a bide beyane,*
*3 K'a ew li Xwedêne, yan Xwedê li wane?»*

**S. 31** *1 «Tu r̂une ez têm li pêde,*
*2 Tu r̂une li malêde,*
*3 Ew k'î bû, li k'ê da?»*

**S. 32** *1 «Dibêjime te ciwan*[2615] *ji qatê,*
*2 R̂abe ji mi r̂a bike ĥikyatê*[2616]*,*
*3 K'a P'adşayê min çî çêkir p'irê Selatê?»*

**S. 32** *1 Mend got: «Bedro, bêjme te bersiva ji qatê,*
*2 R̂abe ji min r̂a bike civatê,*
*3 Binê, P'adşê min ji çi çêkirin p'ira Siratê?*

**S. 33** *1 «Dibêjime te ew xebere,*
*2 Ew p'ire ne ji axe, ne ji bere,*
*3 Ji male Melikê ejde[re]».*

**S. 33** *1 Her tuyê bêjê ji dur̂a zere,*
*2 Ji mala melekê ejdere*[2617]*,*

2610 *xuyan*
2611 *misteqîme*
2612 *al-Simawat*
2613 *kinîat*
2614 *sinîat*
2615 *cewan*
2616 *heqîyatê*
2617 *hêjder*

*3 Ji k'î derê bû, ji k'î derê anîn dere?»*

**S. 34** *1 Mend got: «Bedro, tu r̂ûne li wêde,*
*2 Ez wê têm bi r̂êde,*
*3 Bêje min ew k'î bu, û bi k'êde,*
*4 K'ê dîtibe yê k'oĉek be, bi extîyarê xwe ve girê de?»*

**S. 35** *1 Mend got: «Bedro, tuyî hevalê û ji hevojê,*
*2 Tu ĉirayêd berr̂ojê,*
*3 Tu bi xwe bidê, û bi xwe disojê».*

**S. 36** *1 Mend got: «Bedro, guh bidêre, bêhnekê bi xwede,*
*2 Xelatekê bi êxê xwe de,*
*3 Ew jî wê bi mirîdê xwede».*

**S. 34** *1 Mend dibêjitê: «Bedro dibêjime te cewabe sihîh,*
*2 Bi wî berî kem li Mekkeyê,*
*3 Derece e'zîz melik Fexredîn kes nagehê».*

**S. 35** *1 Mend dibêjitê: «Bedro min çend nebîy dîtine,*
*2 Çend mesel min pirsîne,*
*3 Çend me ĥec bi navin,*
*4 E'lî û E'sman dizavin,*
*5 E'mir û Aba Bek'ir bê şiv westabin».*

**S. 36** *1 Bedir dibêjitê: «Mendo me'nîyîk ji te dixweste,*
*2 Te kir wekî heste,*
*3 Tu — beĥrî, ez — beste!»*

**S. 37** *1 Mend dibêjitê: «Bedro çi we*[2618] *bide ber xwe ve,*
*2 Te sêvek bi şêxê xwede*[2619]*.*

**S. 37** *1 Bijîjkekî mêra me,*
*2 Xweya nabe, ĥeta r̂oja li qiyame».*
*3 Em di kêmin Xwedê yî t'emame!*

**S. 38** *1 Ana û ant sar silî,*
*2 Ya ĥekîmê mêrano,*
*3 Ya t'ebîbê dilano,*
*4 Bila tiştek çê nebî,*
*5 Nav beyne min û te bî».*

## 123. QEWLÊ DU ŞAX[2620]

**S. 1** *1 Çî bedîleke xedare,*
*2 Aşiq çon bi ĥezare*[2621]*,*
*3 Axret bi xwe*[2622] *kirne r̂astemale*[2623]*.*

**S. 2** *1 R̂astemalê me îmane,*
*2 Aşiq sekinîne li civane*[2624]*,*

---

[2618] gue
[2619] *xode*
[2620] *Lalîş* 14, 2000 (rr. 187-196) Belavkirin: E'lo Şex Xelef http://ru.calameo.com/read/0025183177df1dab58f17
[2621] *hezar*
[2622] *xo*
[2623] *raste mal*
[2624] *covan*

*3 Wê li hîvîye teme sûka xwedane*[2625]*,*

**S. 3** *1 Şerefedîn dêhêt ji Ẍerbe*[2626]*,*
*2 R̂ast û ĉep dê hingêvit bi derbe,*
*3 Ẍafil*[2627] *dê mirin ji k'erbe.*

**S. 4** *1 Şerefedîn dêhêt ji banî,*
*2 Xeta qerbê li nav xwe danî*[2628]*,*
*3 Ẍafila pê nedizanî.*

**S. 5** *1 T'elpê faxir hate nêĉîrê,*
*2 Ĥeyfê*[2629] *di kevn*[2630] *hatine bîrê.*
*3 Dê wan r̂aken ji vê dîrê*[2631]*.*

**S. 6** *1 Telpê faxir dê wan r̂a ken,*
*2 Û ji çend ĥezara çenda bar ken,*
*3 Malê dinê mijûl dar ken.*

**S. 7** *1 Gelek wê di heyn pirsa na ken,*
*2 Divên li mehkema*[2632] *xwe xilas ken,*
*3 Hêcet nîne xwe xilas ken.*

**S. 8** *1 Mehkeme k'efte mergeha Şerfedîna,*
*2 K'a werin we çend erk'an girtîne,*
*3 K'a we çî kirîye li r̂êya dîne.*

**S. 9** *1 Werin k'ê li we zordarî kir,*
*2 Ji dostêt Xwedê wekî xweyî kir,*
*3 Mala te p'îs bû, te guhdarî*[2633] *kir.*

**S. 10** *1 Heke te dît mal û e'yal*[2634] *nehotine ser r̂ê ye.*
*2 Jê cudabe ji neqilê ye,*
*3 Te ĥeq heye li mehkemê ye.*

**S. 11** *1 Li k'ê mehkemê te xwe şehtand,*
*2 Mala teye p'îs bû, te nederizand,*
*3 Mezinê malê mal xeyirand.*

**S. 12** *1 Ew mala te xwedan kir,*
*2 Te bi jiyan kir, û te bi ziman kir,*
*3 Agir hebû, te lê bela kir.*

**S. 13** *1 Heke te dî kur̂ê te ne li ser r̂êye dîne,*
*2 Xîret bire, wî derîne,*
*3 Ew hina bi hina ditehmîne.*

**S. 14** *1 Gelek wê di heyn, ya bi xêr naken,*
*2 Xwe dipesinînin, ya bi xîret naken,*
*3 Di derewînin, xwe jê cuda ken,*
*4 Hikmî lêye dê we di bela ken.*

---

[2625] *xudan*
[2626] *xerb*
[2627] *xafil*
[2628] *xodanî*
[2629] *heyf*
[2630] *dikevin*
[2631] binêr: *derê*
[2632] *mehkmea*
[2633] *gohdarî*
[2634] *eyal*

**S. 15** *1 Wê bang didet: wan bê mirweta bînin,*
*2 Ew di hidûd guhêzin, ew di bê yeqînin*[2635]*,*
*3 Ew di xeybetk'arin, ew di der[e]wînin.*

**S. 16** *1 Tu hatîye dine, te bazar wekî dîne,*
*2 Înk'ar nebe, xwe ji P'adşayê xwe řa*[1579] *bidayne,*
*3 Bixebite*[2636] *û biwetîne*[2637]*.*

**S. 17** *1 Tu hatîye dine, te ĥebeke qenc nekir,*
*2 Şîret û namûs te ĥebek nekir,*
*3 Te hikmê*[2638] *giran ser xwe zêde kir.*

**S. 18** *1 Ehlê dojêh ne di faxirin,*
*2 Ew di xeybetk'arin di bê bawirin*[2639]*,*
*3 Ew di miraz malin dê bi xwe vemirin.*

**S. 19** *1 Te bo çî go ev male meye,*
*2 Te bê xwedan dikir di jinê meye,*
*3 Te bawer nedikir mehkeme heye.*

**S. 20** *1 Çî mehkemeke çende xweşe,*
*2 Ẍafil dêçine*[2640] *warêt řeşe,*
*3 Aşiq dêmînin*[2641] *li cîyêt xweşe.*

**S. 21** *1 Bi ĥebekê nabihurin*[2642]*,*
*2 Yê*[1582] *serdayî hikm birin,*
*3 Yê maldayî xelat kirin,*
*4 Xam û înk'ar dê vemirin.*

**S. 22** *1 Ez derk'eftim ji wê zeĥmetê*[2643]*,*
*2 Çend xweşî*[2644] *heye wa li pê me tê,*
*3 Belê, xwezka bi wî gîyanê li wê suhbetê.*

**S. 23** *1 Çî alîmê t'ekbîr kir,*
*2 Bê p'îranî pîrozî kir,*
*3 Hikmê Xwedê li ser xwe bi cî*[2645] *kir.*

**S. 24** *1 Wê bang didet tuyî ilmdarî,*
*2 Tuyî qewlbêjî, tuyî xilmetk'arî,*
*3 Yê te ilm dayî te çî li bal dî.*

**S. 25** *1 Yê te ilm dayî yêt yî*[2646] *xilmetk'ar bit,*
*2 Bi şevê û řojê yî guhdar bit,*
*3 Ne yî derewîn bit, û ne yî betal bit.*

**S. 26** *1 Hat cêşê t'oq sore,*
*2 Ew ẍafilê li me dikirin zore,*
*3 Bi van erk'ana diçone jore.*

---

[2635] *yiqînin*
[2636] *bi xebite*
[2637] *bi wetîne*
[2638] *hikim*
[2639] *nabuhirin*
[2640] *dêçin*
[2641] *dê mînin*
[2642] *nabuhirin*
[2643] *zehmet*
[2644] *xweşî*
[2645] *bicî*
[2646] *vêtîy*

**S. 27** *1 Me ĥîlet hebû bi biran male,*
*2 Me kir ew kes û k'are,*
*3 Wan destê me qut kir ji dost û yare.*

**S. 28** *1 Firmanek hebû wan li me r̂akir,*
*2 We zê meyî xweş bû, wan xirab kir,*
*3 Wan zêr̂ û male me li xwe bela kir.*

**S. 29** *1 Min dît agir berda mala mine,*
*2 Kur̂ê minê, kiçik pêş ĉavê mine,*
*3 Xûn di birîna nasekine.*

**S. 30** *1 Min dît êkî namûs anî,*
*2 Min[2647] bak'ire wî silt'anî,*
*3 Min şîr k'êşa, xûn hurî weke kanî.*

**S. 31** *1 Ez wê badikeme birayê mezin,*
*2 Ev firmanê dihên ser me bi lezin,*
*3 Ew wê dînê şîrin[2648] ji me dixwezin.*

**S. 32** *1 Wekî e'rz û e'yal[2649] ser hevda digrîn,*
*2 Xwezka bi r̂oja em bimirîn,*
*3 Em dînê şîrin naguherîn.*

**S. 33** *1 Wan k'ar ken, wan bar ken,*
*2 Ji bircêt belek wan r̂aken,*
*3 Maşê weye, li xwe ĥelal ken.*

**S. 34** *1 Xewa me nayê ya em derînîn,*
*2 Em ĥeyfêt bira jê helînîn,*
*3 Em Şama şîrin jê bistînîn.*

**S. 35** *1 K'anê ewê mal fêde kir,*
*2 Xîret û namûs ĥebek ne kir,*
*3 Hikmê giran li xwe zêde kir.*

**S. 36** *1 Gelek wê di heyn di mal şîrinin,*
*2 Di bê xîretin, wan xêr nîne,*
*3 Ew di bê ibadetin di dojîne.*

**S. 37** *1 Madek heye, ne ye ehlî xêre,*
*2 Herçî kesê dîn guhêrî ji xelqîre[2650],*
*3 Ĥebsa wîye bere jêre.*

**S. 38** *1 Bilbil heyne her wê dixwînin[2651],*
*2 R̂efê baza wî da diînin,*
*3 Seger di ên wî dilezînin.*

**S. 39** *1 Hatin bazê nêĉîrvane,*
*2 Bilbilê di nav gula da, yî bi zimane,*
*3 Xam û înk'ara çî dermane.*

**S. 40** *1 Xam û înk'ar di bê hîvîne,*
*2 Ew ji xêr û xilmetê di şermîne,*

---

[2647] *mi*
[2648] *şirîn*
[2649] *erz û eyal*
[2650] *xelk*
[2651] *dixûnin*

*3 Ew li dojêh di xweztîne.*

**S. 41** *1 Ew qesrê sor û sipîne,*
*2 R̂efê baza serda tîne,*
*3 Yê*[2652] *bi xwe kirî, derman nîne.*

**S 42** *1 Şêr hatin bi ĥezare,*
*2 Baz çone ser mînbere*[2653]*,*
*3 Wê ba diken k'a xwedanêt milk û male.*

**S. 43** *1 Heke te dît kur̂ê te ne li ser r̂êye dîne,*
*2 Xîret bike, wî derîne,*
*3 Hikmî lê ye dê te şikêne.*

**S. 44** *1 Nebêje eve ji dûrî destê meye,*
*2 Hey bê xîrêto, wacibê teye,*
*3 Dê hikm bî mehkeme heye.*

**S. 45** *1 Çendî bimînî di wê ĥebsê de,*
*2 T'u xweştir*[2654] *nabînî ji binê wê de,*
*3 Tuyî*[2655] *bê sîgal bûyî, lew tu mabûyî têde.*

**S. 46** *1 Hikm bûyî*[2656] *bi ĥedê sala,*
*2 Dayîm tarîye, û dayîm sare,*
*3 Hey bê xîreto, te ew dermale.*

**S. 47** *1 Êzdîyatî her geleke,*
*2 Erk'anek jê xêr û êk xilmete,*
*3 Êk xîrete, û êk mirwete,*
*4 Êk qelema girtîye, û yê zinê neke,*
*5 Te bi van erk'ana nav li ser de.*

**S. 48** *1 Êzdîyatî yê li ser r̂êya dîne,*
*2 Ne yê li ser bêbextîyane, ne ê li ser derewîne,*
*3 Yê li ser wane, yê bi ser û male, xwe li ber dîndare silt'an Êzî sekinîne.*

**S. 49** *1 Êzdîyatî yê bi xûne sore,*
*2 Ew wê li e'rdane, sur̂*[2657] *wa li jore,*
*3 Ew di r̂azayne bi hikm û care*[2658]*,*
*4 Ew bi wan erk'ana çone jore.*

**S. 50** *1 Heke tu ne ẍafilekî dînî, r̂ê bigre,*
*2 Û li van erk'ana bifikire,*
*3 K'a ji qencîyê û xirabîyê kîj çêtire.*

**S. 51** *1 Kerîyê peza dibê xweyîne,*
*2 Baẍ*[2659] *û baẍçan, kes li ser nîne,*
*3 Me ĥeyfê bira jê hilanîne.*

**S. 52** *1 Çî pîlayekî safîne,*
*2 Li ber agirî ne dihelîye,*
*3 Bi teqalê*[2660] *dida, ne ditewîye,*

[2652] *Ê*
[2653] *minar*
[2654] *xoş*
[2655] *tuy*
[2656] *buy*
[2657] *sûr*
[2658] *cor*
[2659] *bax*
[2660] biner: *t'eqela*

*4 Ew yî[2661] layîqe yî Êzdîye.*

**S. 53** *1 Çî beĥreke[2662] çende pa'ne,*
*2 Coyêt avê jê berdane,*
*3 Hatin şêrêt nêĉîrvane.*

**S. 54** *1 Min çu xweşîya ho nedît li çu ĥeywane,*
*2 Bo nirîne pilinga li zozane,*
*3 Werne bacarêt bê xwedane.*

**S. 55** *1 Himênîya pilinga ye,*
*2 Dengê şêr û seqera ye,*
*3 E'rdê Xwedê tew r̂eng daye.*

**S. 56** *1 Salê hinge di bê serma bûn,*
*2 Di bê germ bûn, r̂eng dabûn,*
*3 Hurîya govend lê gêr̂a bûn.*

**S. 57** *1 Êş û bela t'ev dera bûn,*
*2 Ew ne di ĥewceyî ĥekîma bûn,*
*3 Ev xirabe fênîye, ji nû ava bû.*

**S. 58** *1 Wekî me şêx Şems bû mefere,*
*2 Heçî kesê bi ilmê Xwedê bêtin bawere,*
*3 Ew dê hol ket li herdu sere.*

**S. 59** *1 Bêhne gul û r̂ehana ji e'rda têt,*
*2 Kulîlk, û sosin, û beybûn li mîrga tên,*
*3 Hurî xemilîn bi r̂enga tên.*

**S. 60** *1 Hûn çendî biger̂ên li vê qinyatê[2663],*
*2 Hûn a'ciz nabin ji ĥikyatê,*
*3 Ji ber xêr û xweşîyê zav dihate.*

**S. 61** *1 E'rdê Xwedê t'ev k'amilî,*
*2 Dar û berê zozana bi xwe xemilîn,*
*3 Ji ber hatine mîh û beranêt serî birî.*

**S. 62** *1 Li vî e'zmanî bifikire,*
*2 Wekî P'adşayê min beşer çêkire,*
*3 Çawa dimire dojeh heye bi agire.*

**S. 63** *1 Ez bi qurbana wî ĥeyranî,*
*2 Wekî ĥed û sed ser me danî,*
*3 Kes xilas nebit bi nezanî,*
*4 Me bi ĥeqî r̂êye Xwedê naskir û zanî,*
*5 T'emametîye vî qewlî ji Xwedê û xwedanî!*

*Em kêmin, Xwedê[2664] yî t'emame!*

## 124. QEWLÊ ŞERFEDÎN

---

[2661] *î*
[2662] *behr*
[2663] *kinyat*
[2664] *Xudê*

**şaxê — 1**[2665; 2666; 2667]

**S. 1** *1 Xaliqê minî sewabe,*
*2 Û P'adşayê minî li ser cewabe,*
*3 Bê r̂eza Xwedê û Tawisî melek'*
*4 T'ucar p'el ji darê nabe.*

**S. 1** *1 Me yek divêt t'ebabî,*
*2 Li ber Mekkeyî*[2668] *r̂awestabî,*
*3 Dê k'engî mehdî Şerfedîn r̂abî.*

**S. 1** *1 Yek min divê t'emam bî,*
*2 Ber Mekke*[2669] *r̂abî sit'ar bî,*
*3 Dê k'engê mahdî Şerfedînê r̂abî.*

**S. 2** *1 Yekî min di wê deyî[n] t'ebabe,*
*2 Û li ber [Mekke] r̂awestabe*[2670]*,*
*3 Dê k'engî mehdî Şerfedîn r̂abe?*

**S. 2** *1 Dê k'engî r̂abî mahdî,*
*2 Ne efendî dimînin, ne qadî,*
*3 Wê r̂ojê sinetxane bit hêsayî.*

**S. 2** *1 De r̂abe mahdî,*
*2 Ne fendê bimîne ne qadî,*
*3 Hîngê*[2671] *sinetê zanî.*

**S. 3** *1 Dê r̂abe mehdî,*
*2 Û ne findî dimîne, û ne qadî,*
*3 Hîngî sinetê ĥesab.*

**S. 3** *1 Dê hêsa bit sinete,*
*2 Ya melik Şerfedîn, r̂eĥm û şefeqetêt*[2672] *xweke,*
*3 Sûliyêt batinê li ber me ke.*

**S. 3** *1 Hê zanî sinete,*
*2 Ya melik Şerfedîn, r̂ab*[2673] *û şefeqetê*[2674] *xweke,*
*3 Ziryeta batinê di ber me ke.*

**S. 4** *1 Ĥesabî sûnetê,*
*2 Û ya melik Şerfedîn bi r̂ehim û şefeqeta xwe,*
*3 Sur̂êt batinê di ber me ke!*

**S. 4** *1 Li ber me ket sûliyêt batinê,*
*2 K'engî melik Şerfedîn dê dahirbit r̂ûyê dinê,*
*3 Hingî cindî pê dibin xinê.*

**S. 4** *1 Di ber me ke ziryeta batinê,*
*2 Wê cindî pê bibine xinê,*
*3 Ya melik Şerfedîn, tê k'engê r̂abî li r̂ûyê dine.*

**S. 5** *1 Di ber me ke sur̂êt batinê,*
*2 Û ewin cindî pê dibin xinê*[2675]*,*
*3 Ya melik Şerfedîn, tê k'engî derî hawara*[2676] *dinê?*

**S. 5** *1 Çendî pê di xinêne,*
*2 Li gêdûka mêrêt çêne,*

---

[2665] [1] (pp. 473-478); [2] (rr. 368-375)
[2666] http://www.ezdixandi.com/forum/38-271-1; http://www.eziden celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-16.htm
[2667] Çavkanî: Feqîr Elî Catûk, Nivîs Sedîk Dûzgûn Rastkirin Pîr Xidir Silêman 23.01.2000 hatîye nivsandin.
[2668] *meheka*
[2669] *Mêka*
[2670] *r̂awestiyabe*
[2671] *hingê*
[2672] *şifqet*
[2673] binêr: *r̂ehim*
[2674] *şefqet*
[2675] *xene*
[2676] *hawat*

*3 R̂imêt hîzeranî ji me divêne.*

**S. 5** *1 Cindî di xinêne,*
*2 Lê gêdûka mêrê çêne,*
*3 Li mê hizranî ne divêne.*

**S. 6** *1 Cindî di xinê ne,*
*2 Li gêdûkan mêrên hêne bi t'ine,*
*3 Hizranî ji me divêne.*

**S. 6** *1 Çê bûn siwarêt gêdûka,*
*2 Werin ji we r̂a vekin derêt sindirûka,*
*3 Da we bixemilînin şibhetî bûka.*

**S. 6** *1 Gêdûk siwarê gêdûkan,*
*2 Vekin derên sindirûkan,*
*3 Dê bixemilînin bi şerbeta bûkan.*

**S. 7** *1 Çêbûn siwarên gêdûkan,*
*2 Dê bixemilînin şuhbêtî bûkan.*

**S. 7** *1 Werin şibhetî bûka we bixemilînin,*
*2 Sindirûkêt sor û zer bo we derînin,*
*3 Ĥeq r̂êya şêx Adî û melik şêx Sin li ser xwe biqebilînin.*

**S. 7** *1 Bi şerbeta bûkan bixemilînin,*
*2 Sindirûkên k'esk û sor derînin,*
*3 Ĥeq r̂êya navê silt'an Êzîdê şêrîn ser xwe bînin.*

**S. 8** *1Şuhbêtî bûkan bixemilînin,*
*2 Sindirûkêt k'esk û sor û zer derînin,*
*3 Hem bi r̂êya navê silt'an Êzîyê (êrîn li ser xwe binîn).*

**S. 8** *1 Ewin sindirûkêt k'esk û sore,*
*2 Tê heyne xerqê r̂eşî nazikî bi more,*
*3 Feqîran ji vê dinê hilanîn ĥeyf û core.*

**S. 8** *1 Sindirûkên k'esk û sorin,*
*2 Têde hene xerqê r̂engane li cî bi morin,*
*3 Feqîran li r̂ûyê vê dinyayê girtiyê ĥeyf û corin,*

**S. 9** *1 Feqîra ji vê dinê hilanîne hêfe,*
*2 Li ber xwe kirin xerqê r̂eşî nazikî zicêfe.*
*3 Li wê dibirin ĥeq û nisêfe.*

**S. 10** *1 Ĥeq û nisêf li wir dibirin,*
*2 Cêşê silt'an Êzî di p'ir̂in,*
*3 Maşî û canbeqî li hev dibirin.*

**S. 11** *1 Li wan maşa li van canbeqiya,*
*2 Dane destê wan aẍa, wan cindiya,*
*3 Yê r̂uyê vê miclîsê gîyanê xwe da ber mehekan û tae'liya.*

**S. 9** *1 [Li]Van masa, li van cenbaqiyan,*
*2 Dane destê van aẍan*[2677]*, van cindiyan,*
*3 Li r̂ûyê vê miclîsê canê xwe dane mehkan û tae'liyan*[2678].

**S. 12** *1 Li wan milkan û wan baẍa,*
*2 Dane destê wan cindiya, wan aẍa,*
*3 Serê dilê xwe vena daẍa.*

**S. 10** *1 Li van milkan, li van baẍan,*
*2 Dane destê van cindiyan van aẍan,*
*3 Li r̂ûyê vê miclîsê ser dilê xwe ve danîbûn daẍe.*

---

[2677] *axa*
[2678] *taliyan*

**S. 13** *1 R̂ojekê dê bite lêkdane,*
*2 Dê bite de'we û cengekî girane,*
*3 Ewe r̂ojê, dê ji yek k'ifş bibin kevnêt berane.*

**S. 11** *1 R̂ojeke bi navdane,*
*2 Yê bê dawî cengê girane,*
*3 Yê wê r̂ojê ji dînê xwe r̂a k'ifşin kevne berane.*

**S. 12** *1 R̂oje bi te dahire,*
*2 Dîyar dibe t'erpekî faxire,*
*3 Melik Şerfedîn de'wa[2679] hidretê li me dikire.*

**S. 14** *1 R̂ojeke dê bite cenge,*
*2 Feqîr xemilîn letan û zenge,*
*3 Ew r̂oj, ne r̂oja mêrê lenge.*

**S. 13** *1 R̂ojeke bi te cenge,*
*2 Feqîrê bi xelat û zende,*
*3 Ew r̂oj ne r̂oja mêrê çelenge.*

**S. 9** *1 R̂ojekêyê bê te cenge,*
*2 Û feqîrên lê bixemilînin letan û zendan,*
*3 Ew r̂ojne, r̂oja mêrê lenge.*

**S. 15** *1 R̂ojekê dê bite axrete,*
*2 Dê dîyar bit t'erpekî faxire,*
*3 Ewê r̂ojê melik Şerfedîn de'wa ĥezretê me dikire.*

**S. 10** *1 R̂ojekê tête dahire,*
*2 Û dahirbî bi qalbekî feqîran,*
*3 Melik Şerfedîn de'wa ĥezretê li te dikire.*

**S. 16** *1 Aşiq we dibê[jî]ye:*
*2 «Ya silt'an Êzî, me ji te hîvîye,*
*3 Melik Şerfedîn bo me bikî mehdîye.*

**S. 17** *1 Ya silt'an Êzîd, tu k'arî, tu we nakî,*
*2 Melik Şerfedîn ji mix̆arê r̂akî,*
*3 Tu xelqê asê pê mitahkî[2680]».*

**S. 14** *1 Ya silt'an Êzîd, tu k'arî, çima nakî,*
*2 Tu melik Şerfedîn ji mix̆arê[2681] r̂akî,*
*3 Xelqê asê pê mitahkî.*

**S. 11** *1 Ya silt'an Êzîdê, min tu k'arî, û çima nakî,*
*2 Û tu melîk Şerfedîn dikarî ji mix̆arê r̂akî,*
*3 Û xelqê asê pê mitakî.*

**S. 18** *1 Xelqê asê pê mitêhkî,*
*2 Hincî mêrê bi erk'an, bi me'rîfet, bi r̂ê bî,*
*3 Pênc ferza, yek ne bi cê bî.*

**S. 12** *1 Û xelqê asê pê mitî bî,*
*2 Ol û erk'an, me'rîfet û rê bî,*
*3 Pênc ferzan, ferzek ne li cê bî.*

**S. 19** *1 Her pênc ferzêt ĥeqîqetê,*
*2 Sêx û p'îr, hosta û mirebî, yarû birayêt axretê,*
*3 Ye fere li ser me çendî sinetê,*
*4 Îro li dinê, sibe li bangê axretê.*

**S. 15** *1 Pênc ferzên ĥeqîqetê,*
*2 Sêxe, p'îre, hosteye, merebiye, yarû birayê axretê,*

---

[2679] *dawa*
[2680] *mitakî*
[2681] *mixar*

*3 Fere li me çendî sinetê.*

**S. 13** *1 Her pênc ferzên ĥeqîqetê,*
*2 [Bi] şêx, p'îr, hosta, merebî, yarû birê axretê,*
*3 Fere li sinetê îro dinyayê, sibê li bangê axretê.*

**S. 16** *1 Sinete bi leze,*
*2 Siwar li borê bi beze,*
*3 Gel cindiyan emê biçine xeze.*

**S. 14** *1 Sinete ye bi leze,*
*2 Siwar dibe li borekî di beze,*
*3 Digel cindiyan emê herne xeze.*

**S. 20** *1 Cila bidene feqîra,*
*2 Feqîr xemilin bi letan û hirîra,*
*3 Silt'an Êzî hawekî bide ser xirabe fêniyan û wîra.*

**S. 17** *1 Bila bîne feqîran,*
*2 Bi xemilînin letan û herîran,*
*3 Ya melik Şerfedîn, hawarkê bide xiraba û siniyê dêran.*

**S. 15** *1 Emê dilan bidene feqîra,*
*2 Û bila bixemilînin letan*[2682] *û herîra,*
*3 Ya melîk Şerfedîn, hewakê bide xirabê fêniyêt wî ȓa.*

**S. 21** *1 Ya silt'an Êzî, hawarkî*[2683] *li mevede,*
*2 Em li dûv te bûne ser hevde,*
*3 Me bi destê şire'tê ve bernede.*

**S. 18** *1 Ya melik Şerfedîn, hawarkê li mevede,*
*2 Em li pey te bûne ser hevde,*
*3 Me bi destê şire'têve bernede.*

**S. 16** *1 Ya melik Şerfedîn, hawarkê li mevede,*
*2 Û pey tê bûn serheda,*
*3 Tu me bi destên [şire'tê] ve bernede.*

**S. 22** *1 Ya silt'an Êzî, e'wil tuyî berat'ê,*
*2 Tuyî xwedanê atqatê,*
*3 Tu li pê p'ira Selatê.*

**S. 19** *1 Ya silt'an Êzîd, ji e'wil tu berat'î,*
*2 Tu xwedanê*[2684] *atqatî,*
*3 Tu li ser p'ira Selatî.*

**S. 17** *1 Ya silt'an Êzdîd, ji e'wil tu berat'î,*
*2 Û tu xwedanê atqatî,*
*3 Û tu*[2685] *li ser p'ira Selatî.*

**S. 23** *1 Li me biȓêne bi ĉavekî şefeqetê,*
*2 Bi ĉavekî ȓeĥmetê,*
*3 Bipirse li ĥale me û çendî sinetê.*

**S. 19** *4 Me birênî ĉavê sefeqetê*[2686]*, dilê ȓeĥmetê*[2687]*,*
*5 Ȓonayiyekê bidî me û çendî sinetê.*

**S. 18** *1 Tu li me birênî bi ĉavê şefeqetê, bi dilê ȓeĥmêtê*
*2 Tu ȓonayiyekê bidî dilê me û çendî sinetê*[2688]*.*

**S. 20** *1 Xwezî me bi zîn bikira hestire*[2689]*,*

---

[2682] *li pan*
[2683] *hawe*
[2684] *xwidan*
[2685] *tê*
[2686] *sifqet*
[2687] *ȓahmet*
[2688] *sûnet*
[2689] *hêstir*

*2 Cema'yeke*[2690] *şêxan û p'îran pê bikira,*
*3 Ev dinya pê ji nû ve vekira.*

**S. 21** *1 Pênc ferzên ĥeqîqetê,*
*2 Sêxe, pîre, hoste ye, merebî ye, yarû birayê axretê,*
*3 Fere li me çendî sinetê.* (binêr **S. 15***)*

**S. 24** *1 Çendî têt sinete bi leze,*
*2 R̂abin, siwar bin borêt beze,*
*3 Li gel wan cindiya dêçine xeze.*

**S. 25** *1 Ya melik Şerfedîn, sinetê dip'aristî*[2691]*,*
*2 Li lêdanê ne yî sistî,*
*3 Tu li hevserî ne yî nivistî.*
**S. 22** *1 Sinetê dip'aristî*[2692]*,*
*2 Dest û dayînî tu ne yî sistî,*
*3 Ya melik Şerfedîn, dayîm tu t'ev serî, ne yî nivistî.*
**S. 19** *1 Sinetê dip'aristî*[2693]*,*
*2 Li dest û dayînê tu ne yî sistî,*
*3 Ya melik Şerfedîn, dayîm tu ne yî nivistî.*

**S. 26** *1 Melik Şerfedîn t'ev sere,*
*2 Dîwanbestî mehfele,*
*3 Cindî bi nav dik'irê silt'an Êzî dibin sela.*
**S. 20** *1 Melik Şerfedînê Adiyayî t'esele,*
*2 Dîwanbest û mehfele,*
*3 Nav dik'irêt silt'an Êzdîdyê şêrîn bang û sela.*

**S. 27** *1 Feqîr hatine ser me micade,*
*2 Me dîn Şerfedîne û Êzîd atqate,*
*3 Ew bû di bangada dihate.*
**S. 23** *1 Feqîr hatine ser me micade,*
*2 Me bi silt'an Êzîd atqate,*
*3 E'zîzê min zu bi bangê dihate.*
**S. 21** *1 Feqîr hatine ser min bi micade,*
*2 Û me li silt'an Êzdîd atqate,*
*3 E'zîzê min zû bi bangê dihate.*

**S. 28** *1 Li bangan û mahdera,*
*2 Li e'zîzan û r̂êbera,*
*3 Ya silt'an Êzîd, li bangîna me were.*
**S. 24** *1 Van bangiyan li van mahderan,*
*2 Van e'zîzan, van r̂êberan,*
*3 Silt'an Êzîd banga me bê bera.*
**S. 22** *1 Li van banganya li van mahderan,*
*2 Û li van e'zîzan li van r̂êberan,*
*3 Silt'an Êzdîd li banga me tê fere.*

**S. 29** *1 Li bangîna me bên cindîyêt mergehê,*
*2 Cema'yekê bikin Comayê, Binîmayê*[2694]*,*
*3 Da silt'an Êzîd bangîniye me bê.*
**S. 25** *1 Banga me û cindîyê mergêhê,*

[2690] *cimayek*
[2691] binêr: *dip'arastî*
[2692] *dip'arêztî*
[2693] *diperist*
[2694] *ciyêmehê, birîmehê*

*2 We digo emê cema’yekê bikin li Comayê*[2695]*, li Binîmayê*[2696]*,*
*3 Ancax silt’an Êzîd bang û hawara me bê yê.*

**S. 23** *1 Banga me û cindîyê*[2697] *mergehê,*
*2 We digo emê cema’ekê bikin, li Comayê, Binîmayê*[2698]*,*
*3 Ancax silt’an Êzîd, bang û hawara me bê yê.*

**S. 30** *1 Çendî şeve, çendî r̂oje,*
*2 Sinetxane bê gunehe, bê sûce, bê soje,*
*3 Ev dinya bi destê şire’tê*[2699]*, li me bûwe dojeh.*

**S. 24** *1 Çendî şeve û çendî r̂oje,*
*2 Sinetxane yî bi gunehe, yî bi soje,*
*3 Ya melik Şerfedîn, ji destê şerîe’tê vê meclisê te lê bikre doje[h].*

**S. 31** *1 Çendî şeve, çendî r̂oje, dua’sinetxane dike her eve,*
*2 Ya melik Şerfedîn, bo me ji mix̂arê derkeve.*

**S. 25** *1 Çendî r̂oje û çendî şeve,*
*2 Û dara sinetxanê dikir eve,*
*3 Ya melik Şerfedîn bi bor ve ji mix̂arê derkeve!*

**S. 32** *1 We dibêje melik Şerfedîne:*
*2 Heke şêx Şems bike e’zîzîne,*
*3 Letî li ser derê mix̂arê hilîne me dayîm hestir*[2700] *bi zîne.*

**S. 26** *1 Wê dibêje melik Şerfedîne,*
*2 Û heke şêx Şems bike e’zîzîne,*
*3 Û latê ji ser derê mix̂arê derîne!*
*4 Dayîm bor yî bi zîne.*

**S. 33** *1 Me dayîm hestir bi zîn bikirba,*
*2 Cema’yeka şêxa, p’îra, feqîra bikir[ba],*
*3 Ev dinya pê fetih bikirba.*

**S. 27** *1 Dema bi zîn bikire hestire,*
*2 Cema’ke şêxan û p’îran, hosta û merebiyan bikira,*
*3 Ev dinya pê fetih bikire.*

**S. 34** *1 Fetih bikirba bi vê fêniyê*
*2 Bi destûra silt’an Êzî bihajone ser t’extê êmîrîyê*[2701]*,*
*3 K’a binêr serî van k’afira çî bû, çî di cirîyê?*

**S. 35** *1 R̂ojekê dê herme,*
*2 Cêşê silt’an Êzî bi xwe r̂a beme,*
*3 Vê fênîyê li hev bideme,*
*4 Çî bi sere van k’afira bikeme.*

**S. 28** *1 R̂ojekê di herême,*
*2 Û celisa silt’an Êzdîd bi xwe dibême,*
*3 Vê fêniyê t’êk didême.*

**S. 29** *1 Ez t’êk didime vê fêniyê,*
*2 Bi destûra Xwedê û şêx Adî, emê bajonin ser t’extê Amediyê,*
*3 Eme serê van k’afiran jêkin û bavêjin dojehê.*

**S. 36** *1 Ji mêj ve*[2702] *r̂uniştîme li ber vê xilmetê,*

[2695] *cihê*
[2696] *Biremê ye*
[2697] *cinî*
[2698] *ciyê binîmê ye*
[2699] binêr: *şerîe’t*
[2700] *hêstir*
[2701] *êmîryê*
[2702] *were*

*2 Minetk'arim ji P'adşê dine û axretê,*
*3 Ya silt'an Êzî, destûra min bide bo xatira sinetê.*

**S. 26** *1 Ji mêj k'etime ber vê xilmetê,*
*2 Minetk'arim P'adşayê dinê û axretê,*
*3 Destûr da ji bo xatira sinetê.*

**S. 27** *1 Ji mêj ve k'etime ber vê baweriyê,*
*2 Destûra şêx Adî û melik şêx Sin bajome ser t'extê Amêdiyê,*
*3 Serê van k'afiran çi bê, çi ciriyê.*

**S. 37** *1 Ev zeman dê we bî,*
*2 Me bi şêx Adî şehde bî,*
*3 Ĥaca me Zimzim, qubleta me kaniya Sipî bî.*

**S. 28** *1 Ev zeman dê wa bî, şêx Adî şehde*[2703] *bî,*
*2 Zimzim û qubet il-Bidorin*[2704] *ĥaca me bî,*
*3 Ev zeman dê bi îman bî.*

**S. 30** *1 Ev zeman dê yê we bî,*
*2 Şêx Adî şehde*[2705] *bî,*
*3 Zimzim û qubet il-Bidor*[2706] *ĥaca me bî.*

**S. 38** *1 Ev zeman dê mirîd bî,*
*2 Atqata me silt'an Êzî bî,*
*3 Ĥaca me Zimzim, qubleta me kaniya Sipî bî.*

**S. 31** *1 Ev zeman dê mirîd bî,*
*2 Atqata me silt'an Êzdîd bî,*
*3 Zimzim û qubet il-Bidor ĥaca me bî.*

**S. 39** *1 Ev zeman dê bî îman bî,*
*2 Ĥaca me silt'an bî,*
*3 P'îr Ȓeşê Ĥeyran, zebûnê herçar biran bî.*

**S. 29** *1 P'îr Ȓeşê Ĥeyran bî,*
*2 Zebûnê herçar biran bî,*
*3 Xwedanê k'eremê derwêşê gelîyê Lalişê.*

**S. 32** *1 Ev zeman dê bi îman bî*
*2 P'îr Ȓeşê Ĥeyran bî,*
*3 Zebûnî herçar biran bî.*
*4 Xwedê xirabket malêt bêbexta, û êwana, û beygo,*
*5 Hûn ĥemû bêjin Amîn herȓo û herȓo!*

*Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî ťemamin!*

*1 Xwedanê k'eremê cêşê gelîyê Laliş bi hawara me bê!*
*2 Sed ȓehim li dê û bavên guhdaran û seyîdayê me!*
*3 Em di kêmin û Xwedê yî ťemame!*

**şaxê — 2**[2707]

**S. 1** *1 Hatî bedîleke ẍedare,*
*2 Aşiq çon bi ĥezare,*
*3 Axret bo xwe kirin ȓasemale.*

**S. 2** *1 Ȓastemalê me îmane,*
*2 Aşiq sekinîn bi civane*[2708]*,*
*3 Ya seyîdî sûka me xwedane.*

[2703] *şade*
[2704] *qubilbidor*
[2705] *şade*
[2706] *qubildor*
[2707] [2] (гг. 479-484)
[2708] *covan*

**S. 3** *1 Şerfedînê min hatî ji banî,*
*2 Xeta herbê li nav xwe danî,*
*3 Ço ẍafila pê nezanî.*

**S. 4** *1 Şerfedînê min hate*[2709] *e'rda,*
*2 Ẍafila îmana xwe li derda,*
*3 Ew dêmirin ji k'erba.*

**S. 5** *1 T'elpê faxir k'eftinê jîrê,*
*2 Ewin gelek ĥeyfin ji bîrê,*
*3 Wê wan r̂aket ji vê bîrê.*

**S. 6** *1 T'elpê faxir wê wan r̂ake,*
*2 Û çend ĥezara bi serda barke,*
*3 Wê wan bi malê dinyayê li wir windake.*

**S. 7** *1 Heye p'ir̂ …… zana kir,*
*2 Û berê xwe ji mehkemê*[2710] *derbaz kir,*
*3 Hêcet*[2711] *dînê xwe xilas kir.*

**S. 8** *1 Çî mehkemeke faxire,*
*2 Û li ĥebekî na bihure,*
*3 Ji dest, û dev, û ziman, bi qedere.*

**S. 9** *1 Mehkeme k'efte mecalê Şerfedîne,*
*2 Û k'a we çend erk'an girtîne,*
*3 Gelî êzdîye, we çîye li r̂êya dîne?*

**S. 10** *1 Kê li we zordarî kir,*
*2 Û dostê Xwedê we bi çî xweyî kir,*
*3 Mala teye p'îs bû, te çima guhdarî kir!*

**S. 11** *1 Wekî e'rz û e'yal*[2712] *ne hatine ser r̂ê ye,*
*2 Dê cude bit ji neqilê ye,*
*3 Go: «Te heq heye li mehkemê ye».*

**S. 12** *1 Malx[oy]ê malê xwe*[2713] *li mehkemê ….. ,*
*2 Malxoyê malê, mal di ẍeyîrand.*

**S. 13** *1 Wekî te mala xwe bi ziman kir,*
*2 Te e'yşand, te xwedan kir,*
*3 Agir hebû, te lê bela dikir.*

**S. 14** *1 Heke kur̂ê te ço ser r̂êya dîne,*
*2 Bizave û neĥebîne,*
*3 Hina bi guneha bi tuhmîne.*

**S. 15** *1 Tu hatîye dinê, te bazarek kir, wek bazara dîna,*
*2 Înk'ar nebe, xwe ji P'adşê xwe r̂a dayîne,*
*3 Bixebite û biwefîne.*

**S. 16** *1 Tu hatîye dinê, te êke qenc nekir,*
*2 Ĥeqî û r̂astî te bi xwe r̂a ne bir,*

---

2709 *het*
2710 *meĥkem*
2711 *ĥêcet*
2712 *e'rz û e'yal* — binêr: *k'ulfet*
2713 *xo*

*3 Tu ĥuk'm bûyî, bi ĥeqê xweyî viȓ.*

**S. 17** *1 Ehlê dojê[h] ne di faxirin,*
*2 Di bê yeqînin*[2714]*, di bê bawirin,*
*3 T'amak'arê xwe dimirin.*

**S. 18** *1 Hinek hene ya bi xêr nakin,*
*2 Xwe dipesinin, ya bi ẍîret nakin,*
*3 Di derewînin, xwe jê cuda kin,*
*4 Ĥuk'mî lê bit, wê we bela kin.*

**S. 19** *1 Bang kin wan bê mirweta bînin,*
*2 Ew ĥeduda diguhêzin, di bê yeqînin,*
*3 Tema k'arin, di derewînin.*

**S. 20** *1 K'a ew k'îye dibêjit: ev deme yî kême?*
*2 Pê xilas kirin dijminêt me ye,*
*3 Wan ĥisab nekir li dinyayê mehkeme heye!*

**S. 21** *1 Çî mehkemeke xweşe,*
*2 Hindek ȓuniştin li warêt ȓeşe,*
*3 Go: aşiq dêçine cîyêt xweşe.*

**S. 22** *1 Li ĥebekê nabihurî,*
*2 Yê ser lêdayê xirab kire,*
*3 Yê ser lêda ĥuk'm bire.*

**S. 23** *1 Û yê mal lêdayî xirab kire,*
*2 Xam û înk'ar wê dimire.*

**S. 24** *1 Ez derk'eftim ji wê zeĥmetê,*
*2 Û xweşîyeke zav ji wê ve tê,*
*3 Ĥezar xwezge min bi wî k'efte wê suhbetê.*

**S. 25** *1 Herçî e'lîmê bê t'egbîr kir,*
*2 Û bê p'îranî ilm pîrozî kir,*
*3 Ĥuk'mê xelqê bi ser xwe cê kir.*

**S. 26** *1 Heke tuyî alîmî, heke tuyî qewlbêjî,*
*2 Û heke tuyî xilmetk'arî û ȓastbêjî,*
*3 Yê te ilm dayê bi serda nabêjî.*

**S. 27** *1 Bi şev û ȓojê guhdar bit,*
*2 Ne derewînekî înk'ar*[2715] *bit.*

**S. 28** *1 Hatî cêşê tewq sore,*
*2 Aẍa li me dikir zore,*
*3 Me hawar dir li jore.*

**S. 29** *1 Fermanek*[2716] *hebû, wan li me ȓa kir,*
*2 Em ser xwe bûn, wan xirab kir,*
*3 Wan zêȓ û male me belav kirin.*

**S. 30** *1 Ez k'etime xema wan zêȓ û male,*
*2 Me dikir ew k'esib û k'are,*
*3 Em qut bûyîn ji biran û yare.*

---

[2714] *êqîn*
[2715] *ink'ar*
[2716] *firman*

**S. 31** *1 Ewan em di[k]uştîn,*
*2 Em di şewitandin, em dibiriştîn,*
*3 Me zêȓ û male xwe li wê hiştî.*

**S. 32** *1 Agir berda mala mine,*
*2 K'urikê kiçkî li pêş ĉavêt mine,*
*3 Xûn di birîna ȓa nasekine.*

**S. 33** *1 Min dît êk înabû same sari,*
*2 Min bang dikire wî silt'anî,*
*3 Min şîr dik'êşa, xûn dihurî weke kanî.*

**S. 34** *1 Wê bang diket birayê mezin,*
*2 Ferman hat û li ser me bi lezin,*
*3 Wê dînê şîrin ji me dixwazin.*

**S. 35** *1 Wekî e'rz û e'yal biser hevda digrîn,*
*2 Sed ĥezar xwezga bi ȓoja dimirîn,*
*3 Dînê şîrin, na ẍeyîrîn.*

**S. 36** *1 Wan bigrin û wan ȓakin,*
*2 Wan ji burcêt belek ȓakin,*
*3 Malê weye, li xwe ĥelal kin.*

*Em di kêmin, şêx Adî t'emame!*
*Ȓeĥme li dayî û babêt hazir û guhdara!*

## 125. QEWLÊ MÎR MEHEMEDÊ K'URDÎ[2717]

**S. 1** *1 Gelî yarû bira,*
*2 Ji we dibêm macera,*
*3 Da bizanin, yê bê xebere.*

**S. 2** *1 Mehmed go: «Ez mîr,*
*2 Guh den gelî jîr,*
*3 Ji we ȓa dem t'efkîr».*

**S. 3** *1 Cema' bûn li me mêr mîre,*
*2 Biken ji me t'egbîre,*
*3 Adanî, Qat'anî, Şemsanî, sê mîre.*

**S. 4** *1 K'êşan şîr beĥr tîr,*
*2 Min ĥeyfa mîr wezîr,*
*3 Ne kirin t'egbîr.*

**S. 5** *1 Qat'anî go: «Em mîr mergehî»,*
*2 Adanî go: «Îmamê ĥemûyî li we şêx Wezîr».*

**S. 6** *1 Peyman dan destûre,*
*2 Nivîsîn berat' û mişure,*
*3 Ĥemî hadêr[2718] ĥizure.*

**S. 7** *1 Li Mişetê, E'refatê,*

[2717] [2] (rr. 554-556)
[2718] *hadir*

*2 Gul xemilîn li fatê,*
*3 Bîhna[2719] xweşbû tê.*

**S. 8** *1 Melî şêx Sin, melikê mine,*
*2 E'devî îmamê mine,*
*3 R̂ojkî Şemsa mine.*

**S. 9** *1 T'oqa te melî Sino,*
*2 Serĉava hinî û hino,*
*3 Mexfûr e li çenda û çendo.*

**S. 10** *1 R̂êka me nûre zerbave,*
*2 Ew r̂onahîye, ew tave,*
*3 Ji tarî tav da ve.*

**S. 11** *1 Mîr Mehmed, batindare,*
*2 P'îrê Haslan[2720] gewhere,*
*3 Şemsê T'et'er şêre bi xwe r̂a.*

**S. 12** *1 Bidet barane, bara me,*
*2 Ĥeta om el qîyame,*
*3 Biken fame.*

**S. 13** *1 P'adşê[2721] min delîle,*
*2 R̂êbere li sebîle,*
*3 Me nîne çu ĥîle.*

**S. 14** *1 Êzdanê min Xwedaye[2722],*
*2 Şaye P'adşaye,*
*3 Ĥezar nav pê daye.*

**S. 15** *1 Silt'an[2723] Êzîde,*
*2 Ew navê li ĥezar zêde,*
*3 Her R̂eb il-Semede.*

**S. 16** *1 Îlaĥîo t'emame!*
*2 Can der qalb[2724] daye,*
*4 Firwar ji Îlaĥîye.*

## 126. QEWLÊ SITÎYA ÊS[2725]

**S. 1** *1 K'engî ji min r̂a bêtin mizgîne,*
*2 Coq bi gelîyê Lalişê bihurîne,*
*3 Berbi gelîyê Lalişê biçîne.*

**S. 2** *1 K'engî qayîm k'arkin,*
*2 Metbex û şîlanê şêx Adî barkin,*
*3 Dilêt E'devîya şayî û şarkin.*

**S. 3** *1 K'engî min cema' dibûn coqe,*

[2719] *buh*
[2720] *Heslan*
[2721] *pedşa*
[2722] *Xuda*
[2723] *sultan*
[2724] *kalib*
[2725] *Xeribo (Ilyas) http://yeziden.de/forum/*

*2 Mîrê mezin dê helgirin t'oqe*[2726]*,*
*3 Dilêt E'deviya k'eftin şayî û şoqe.*

**S. 4** *1 Çûme dîyarî bihuştê,*
*2 Ew dîdare li min xweş tê,*
*3 Cindî mîr bû, lib[a]sê ȓeş lê.*

**S. 5** *1 Xelq[no]*[2727] *werin zerba bibînin,*
*2 Qubid k'eskin, hilêl di zêȓînin,*
*3 Ew ji k'erema Şemsedîn û Fexredînin.*

**S. 6** *1 Fericîn li wan qubeha,*
*2 Rêza baban û dergeha,*
*3 Dê tiwafkîn*[2728] *her heşt qubeha.*

**S. 7** *1 Fericîn li wan qubêt bi nûr,*
*2 Xasa liber bestî mehder û mişûr,*
*3 Behişt*[2729] *ewe li gelîyê k'ûr.*

**S. 8** *1 Gelîyê Lalişê bi nave,*
*2 Wê pêda dêtin ave,*
*3 Zar medih, zor silave.*

**S. 9** *1 Silav û sed cot siba te bi xêr,*
*2 Dibêjime we gelî mêra,*
*3 Ȓuĥ ya li derê kaniya Sipî qalb yê li hêre qalb yê li here.*

**S. 10** *1 Dilê minî wehaye,*
*2 Îlaĥîo tû li me bikî şaye*
*3 Dê tiwafkîn derê kaniya Sipî, li gel kekê şêx Şeylilaye.*

**S. 11** *1 Ezê dil hoy bi k'eser,*
*2 Gelî bira dibêjime we ev xeber,*
*3 Dê tiwafkîn derê kaniya Sipî li gel ferşêt mermer.*

**S. 12** *1 Dilê minî bi k'eser bê,*
*2 Ji Ĥesen P'îrik ĥeta dergehê bi xêr bê,*
*3 Îlaĥîo, tû li me bi neder bê.*

**S. 13** *1 K'esera Ȓeşê k'are,*
*2 Xwezî*[2730]*qent'er bestî letînî care,*
*3 Dê tiwafkîn derê kaniya Sipî, li gel Zimzim û mix̂ere.*

**S. 14** *1 Îlaĥîo em vêk ȓa*[2731]*bixwazin mirazê,*
*2 Me'bûdê*[2732] *me û şêx Adî xwedanê atqatê*[2733]*,*
*3 Bi şêx Şems*[2734] *bigrîn e'nyatê,*
*4 Melik şêx Sin li me biket şefa'etê,*
*5 Şêxû Bek'ir ȓûnê li wê civatê*[2735]*,*
*6 Me mêrekî e'dîl*[2736] *divê ȓûnê li ser wê bisatê,*
*7 Wekî metbex ciyê şêx Adî bang det: «Hê werne simatê».*

---

[2726] *tok*
[2727] *xelik*
[2728] *tuwaf*
[2729] binêr: *bihuşt*
[2730] *xozî*
[2731] *vêkre*
[2732] *mabûd*
[2733] *xudanê îtqadê*
[2734] *Şêşim*
[2735] *civet*
[2736] *adil*

**S. 15** *1 Simate ye sebîle,*
*2 Ye bê qale, bê qîle,*
*3 Ye bi rêye, bê bertîle,*
*4 Razdarêt derwêşan û delile,*
*5 K'esere R̂eşê p'îre,*
*6 Xwezî r̂ûniştbane li celisa mîre,*
*7 Cihê sema lê dik'êşin feqîre.*

**S. 16** *1 Min feqîr dîtin bi coş,*
*2 Maldarin, bi t'acin, bi t'acpoş,*
*3 Gelî yara vexwen sed carî noş.*

**S. 17** *1 Hey li min ĥeyranî,*
*2 Min li wêder dîtibû cindî,*
*3 Ewe bimanê ciyê dîn û îmanî.*

**S. 18** *1 Ewe r̂ewaq li r̂ewe,*
*2 Qendîlê wê diĩnin p'er̂î wê li hewa,*
*3 Qubleta me mêrê E'devî ewe,*
*4 Dergeh berbi R̂ojave,*
*5 Xwezî derbazbûme nave,*
*6 Dê min li P'adşê xwe kirba silave.*

**S. 19** *1 Xwezî çûbame wê deravê,*
*2 Rêza stûnê û mîravê,*
*3 K'esera r̂eş p'avê.*
*4 K'esera r̂eş mergehê,*
*5 Xwezî derbasbame wê qubehê,*
*6 Dê min tiwaf kirba stûna şêx Şems li wê şerbehê.*

**S. 20** *1 Ez wê dinalim, birîna min ya li mêlak'ê,*
*2 Wê dik'alim wekî berxê li pê make,*
*3 Dê min tiwaf kirba stûna şêx Şems li gel şûna Berê Şibakê.*

**S. 21** *1 Ez hatime dê tiwaf keme,*
*2 Sicûdê li ber P'adşê xwe beme,*
*3 Dê p'eryêt nûranî li ĉavêt xwe deme,*
*4 Îlaĥîo, Tu mirazê me zûke,*
*5 Xwezî çûbame li ber wan p'er̂iya, li wan sindirûke,*
*6 Yên xemilîn letînî bûke.*

**S. 22** *1 Yêt xemilîn letînî*[2737] *erûs,*
*2 Jê diçin birq û birûs,*
*3 Li ber diĩsin find û şemal û bisûs.*

**S. 23** *1 Dilê min mabû li ber vê fikarê.*
*2 Îlaĥîo, Tu l iber me hilgirî vê fiqarê,*
*3 Dê min tiwaf kirba derê kaniya Sipî, li gel Zimzim û mix̂arê*[2738]*,*

**S. 24** *1 Bi wê fiqarê da mame,*
*2 Meqlûb û mergeh ew cîye, û ew miqame,*
*3 Qedemgeha mîr Xidir, e'lêk'ûm selame*[2739]*.*

**S. 25** *1 Mîr Xidir ku mîre,*
*2 Li dinê û axretê xebîre,*

---

[2737] *latînî*
[2738] *mixar*
[2739] *eleyhîlselam*

*3 Ewî mutî kirbû seyîd Ehmed il-K'ebîre*[2740].

**S. 26** *1 Ez wê dinalim ji destê wan birîna,*
*2 K'ilîlêt wan xizîna stûna herçar dîna,*
*3 Wê di destê melek Şemsedîn de.*

**S. 27** *1 Şêx Şems û şêx Emîr Babiko yî feqîre,*
*2 Bi şev û r̂ojê wê li nêĉîre,*
*3 Şêx Şems vêxistibû ĉirayê bi nedîre.*

**S. 28** *1 Şêx Şems vêxistibû ĉirayê bi cêş,*
*2 Mîr westabû li pêş,*
*3 Şêx Şems dizane k'îye li ser û k'îye li pêş.*

**S. 29** *1 Sekinîbû serwere,*
*2 Mîr westabû li qent'ere,*
*3 Şêx Şems dizane k'î li sere û k'î li bere.*

**S. 30** *1 Dilê minî wehaye,*
*2 Îlaĥîo, tû li me bikî şaye,*
*3 Ev qewle qewlekî E'yn il-Beyzaye*[2741],
*4 T'emametîya vî qewlî ji Xwedaye.*

*Em di kêmin û xwedêyî t'emame!*

## 127. QEWLÊ MISKÎN T'AJDÎN[2742; 2743]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Çi sibeykê sibane,*
*2 Li xewleyekê dî damame,*
*3 Hate bîra min Şame.*

> **S. 1** *1 Sibeyekê*[2744] *ji sibane,*
> *2 Di xewleyekêda dimame,*
> *3 Hate bîra min Şame.*

**S. 2** *1 Çend guh didime dilî,*
*2 Fêmê*[2745] *didime ser aqilî,*
*3 We'de hat dest ji mîr û mergeha şêx Adî bihêlî.*

> **S. 2** *1 Min guh da li ser dilî,*
> *2 Fihmê da ser aqilê,*
> *3 We'de wa hatî, desta ji mîr û mergeha şêx Adî bihêlî.*

**S. 3** *1 Çi sibeykê heweste,*
*2 Ava bû borekî minî beste,*
*3 Dê bo e'rdê Şamêkem qeste.*

> **S. 3** *1 Dilê min ji heweste,*
> *2 Eve bû yeqîna*[2746] *min lê di beste,*
> *3 Min zanî dê li e'rdê Şamê kem qeste.*

---

[2740] *elkebîr*
[2741] *eynulbeyza*
[2742] [51] (rr. 18-32)
[2743] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan [2] (rr. 448-456)
[2744] *subeyek*
[2745] *qêmê*
[2746] *êqîn*

**S. 4** *1 Borê min ji Ĥeq ware[2747],*
*2 Xemilî wekî hercare,*
*3 Bo miskîn ji Lalişê dihinare.*
**S. 4** *1 Hey boro, yî ji Ĥeq ware[2748],*
*2 Xemilî wekî hercare,*
*3 Bo min miskînî ji Lalişê dihinare.*

**S. 5** *1 Borê minî ji Lalişa,*
*2 Hey ĥeyrano, yî serxweşa[2749],*
*3 Bajo, em çin tiwa[f]kin dergehê şêr Meĥmed R̂eşa.*
**S. 5** *1 Hey boro, yî ji Lalişê,*
*2 Ĥeyrano, yî serxweşe,*
*3 Dê tiwaf keyîn dergehê şêr Meĥme R̂eşe.*

**S. 6** *1 Xeta min ji dîwanê,*
*2 Min qazî wê li ber danê,*
*3 Ya derwêş, tu dêçî û nagehiye e'rdê Şamê.*
**S. 6** *1 Xeta mine ji dîwanê,*
*2 Min qadî wê di berdanê,*
*3 Gotê: «Ya derwêş, tu dêçî, nagehîye e'rdê Şamê!»*

**S. 7** *1 Xeta mine ji xwedanê qap'iyê,*
*2 Em gehiştine binê beriyê,*
*3 Boro bajo, çima me di êxiyê.*
**S. 7** *1 Xeta mine ji xwedanê qap'îyê,*
*2 Ez gehiştime binêt berîyê,*
*3 Min go: «Boro p'ajo, çome êxîyê».*

**S. 8** *1 Xeta mine ji malê Adiya,*
*2 Em gehiştine binê beriya,*
*3 Boro bajo, min ne êxiya.*
**S. 8** *1 Xeta mine ji malêt Adîya,*
*2 Ez gehiştime binêt berîya,*
*3 Min go: «Boro p'ajo, çume êxêya».*

**S. 9** *1 Bajo, em çine silavêt şêx Bazîda,*
*2 Hey boro, yî vaĥîde[2750],*
*3 Mergeha şêx Adî ciyê mirîda.*
**S. 9** *1 Min hajot, ez çume silavêt şêx Bazîde,*
*2 Hey boro, yî vaĥîde[2751],*
*3 Min got: «Mergeha şêx Adî ciyê mirîda».*

**S. 10** *1 Şêx Bazîd deng dike ji e'sasa:*
*2 «Ya derwêş, mergeha şêx Adî ciyê xasa,*
*3 Tu dê çî li dergehê Ĥelebê nabî xilasa».*
**S. 10** *1 Şêx Bazîd deng diket ji e'sase:*
*2 «Ya derwêş, mergeha şêx Adî ciyê xasa,*
*3 Tu dê çî û ji dergehê Ĥelebê nabî xilase».*

**S. 11** *1 Bajo, em çine silavêt baba cindîye,*
*2 Ji wî e'zîzî diprsîye:*
*3 «Şamû[2752] ciyê xweşîye».*
**S. 11** *1 Min dihajwe, ez çome silavî babe cindîye,*

[2747] *Hekor*
[2748] *Hekar*
[2749] *serbeş*
[2750] *wehîd*
[2751] *wehîd*
[2752] *Şam û*

*2 Min ji wî e'zîzî diprsîye,*
*3 Min got: «Şame û ciyê xweşîye».*

**S. 12** *1 Baba cindî dibêjê:*
*2 «Tu ji mergeha şêx Adî naçî vê carê,*
*3 Li dergehê Ĥelebê dê ji te sitînin xefarê».*
**S. 12** *1 Baba cindî dibêjit:*
*2 «Ya derwêş, heke dê ji min keyî pirsyarê,*
*3 Tu ji mergeha şêx Adî naçî vê care,*
*4 Dê li dergehê Ĥelebê ji te sitînin xefarê».*

**S. 13** *1 Bajo, em çine silavêt şêxê Nûrî,*
*2 Ji wî e'zîzî bixwezin destûrî,*
*3 Li nava me û mergeha şêx Adî gelek durî.*
**S. 13** *1 Min dihajwa, ez çume silavê şêxî Nûrî,*
*2 Min ji wî e'zîzî xwestibû destûrî,*
*3 Min got: «Li navbera min û mergeha şêx Adî mabû êke durî».*

**S. 14** *1 Şêxê Nûrî we dibête:*
*2 «Ya derwêş, dê çî Firatê Şêmê dê li pêş te ête,*
*3 Belê kesek ji mîr û mergeha şêx Adî li hana te naête».*
**S. 14** *1 Şêx Nûrî wa dibêje:*
*2 «Ya derwêş, Feratê Şêmê dê li te ête,*
*3 Kesek ji mîr û mergeha şêx Adî li hana te naête».*

**S. 15** *1 Go: «Ya şêx, ez dêçim ji xwe r̂a,*
*2 Heger xêra, û heger şer̂e,*
*3 Ĥimeta te, hebê bi me r̂a».*
**S. 15** *1 «Ya şêx, ez dêçim ji xwe r̂a,*
*2 Heke xêre, heke şer̂e,*
*3 Ĥimeta te, hebit bi min r̂a».*

**S. 16** *1 Go: «Ya derwêş, r̂aste we ye,*
*2 Xeta şêx Adî wa li ber te ye,*
*3 K'a bixwîne[2753], çî tê heye?».*
**S. 16** *1 «Ya derwêş, sadiq[2754] we ye,*
*2 Xeta şêx Adî wa li ber te ye,*
*3 Bixwîne, k'a çî tê heye?».*

**S. 17** *1 Canê derwêş k'efte Teĥlîya,*
*2 Eve bû qiseta şêx Fexr û şêx Xalîya,*
*3 Gelek aşiqa e'rdê Şamê r̂ê, r̂adibiwarîya.*
**S. 17** *1 Canê derwêş k'eftbû Te'alî,*
*2 Eve bû qiseta şêx Fexrê Adiye û Şêx Alî,*
*Gelek aşiqa e'mirê xwe ji Şamê r̂a, r̂adibarî.*

**S. 18** *1 Bo r̂ojû beyane,*
*2 Ewe bûn e'rifê te hildane,*
*3 Bajo, k'a here me çi nîşane».*

**S. 19** *1 Derwêş bor k'êşabû li cem xwe ve:*
*2 Gotê: «Ewe bû qewat û hinera bi t'eve,*
*3 Bajo, li me bûye şeve».*
**S. 18** *1 Derwêş borî dik'êşte cem xwe ve:*
*2 «Ya boro, hiner û qewatêt te eve,*
*3 P'ajo, da li me neêtin şeve».*

---
2753 *bixûne*
2754 *sedeq*

**S. 20** *1 Bor li gel derwêş axivî,*
*2 Go: «Eve bû k'ubariya tu pê dilivî,*
*3 Bajo,ne bi şev û ne bi r̂oj binivî».*

**S. 19** *1 Bor li gel derwêşî axivî,*
*2 Eve bû e'cêba tu pê dilivî,*
*3 «P'ajo, ĥiskeyî em bi şev jî nanivîn».*

**S. 21** *1 «Hêvara û r̂oj li ava,*
*2 Borê derwêş cehde[2755] kirbe gava,*
*3 Em gehiştine E'yn Zave».*

**S. 20** *1 «Hêvare, r̂oj li ava,*
*2 Borê min ce'de kirbû gave,*
*3 Em gehiştîne E'yn Zave».*

**S. 22** *1 Li E'yn Zava êwirî,*
*2 Û xelqê izeteka çak ji me r̂e kirî,*
*3 Û dilê min ji ber muĥbeta şêx Adî mabû k'ewgirî.*

**S. 21** *1 E'yn Zavê diêwirî,*
*2 E'lî em çî e'zet kirîn,*
*3 Ji ber mêr û muĥbeta şêx Adî mabuwî k'ewgirî.*

**S. 23** *1 Sibeye, û têşt li hindava*
*2 Em siwar bûn ji E'yn Zave,*
*3 Bi xatirî we û sed car malî ava».*

**S. 22** *1 Sibeye têşt li E'yn Hindave,*
*2 Em siwar bûyîn ji E'yn Zave,*
*3 Me go: «E'lî, bi xatirî te, sed carî malî ava».*

**S. 24** *1 E'lî got: «Hey derwêşê minî zirava,*
*2 Tu hatî ser serê mino, herdu ĉava,*
*3 Tu dê çî, tu nagehî wan ciya, wan gava.*

**S. 23** *1 E'lî gotê: «Hey derwêşê mino yî zerbaba,*
*2 Tu ser sere min hatî û herdu ĉava,*
*3 Tu dê çî, nagehîye wan cîya, wan Ka'ba.*

**S. 25** *1 Dilê minî hêtune,*
*2 Ji şêne Zavê siwar bûne,*
*3 E'ynata me dêr stûne.*

**S. 24** *1 Dilê min ji hêtune,*
*2 Em ji E'yn Zave siwar bûne,*
*3 E'ynata me dêre stûne.*

**S. 26** *1 Mala şêx Ĥisênê şêx Avdela,*
*2 Dîwan bestbû bi meĥfela,*
*3 Ya derwêş, tu dêçî, me li e'rdê Şamê bike sela.*

**S. 25** *1 Mala şêx Ĥisênî şêx Avdele,*
*2 Dîwan bestîbû mehfele,*
*3 Ya derwêş, tu dêçî, me li e'rdê Şamê bike sela.*

**S. 27** *1 Çi sibeykê merxune,*
*2 Borê derwêş kirbû bo zîne,*
*3 E'ynata me nav dîna li Mêrdîne.*

**S. 28** *1 Boro yî bê fena,*
*2 Cehde r̂ê bikena,*
*3 Bajo, em biçine nav dina.*

[2755] *cad*

**S. 29** *1 Boro, tuyî Berk'etî,*
*2 Dest û p'ê û serî,*
*3 Bajo, em çine mezela kekê derwêş Omerî.*

**S. 30** *1 Bajo, em çine nav wan sinîya,*
*2 Min ji êkî dipirsîye:*
*3 «Gelo, mezela kekê derwêş Omer k'îye?»*

**S. 26** *1 Min dihajwa, çome nav wan sinîya,*
*2 Min ji yekî ji wan dipirsîye:*
*3 «Gelo, mezela kekê derwêş Omer k'îye?»*

**S. 31** *1 Kekê derwêş Omer hate dere,*
*2 K'oĉekî bazda û feqîr li bere,*
*3 Werin gelî dina tiwaf biken dest, û daman, û sere.*

**S. 27** *1 Kekê derwêş Omer hate der,*
*2 Koçek wê dibezin, feqîr wê li ber,*
*3 Em dê tiwaf keyîn dest, û daman, û ser.*

**S. 32** *1 Kekê derwêş Omer kire hane,*
*2 K'oĉek ço ser bane,*
*3 Werin gelî dina bo we hat mêvane.*

**S. 28** *1 Kekê derwêş Omer wa dikire hane,*
*2 Koĉek şande ser bane,*
*3 Gelî dina, werne mêvana.*

**S. 33** *1 Çendî di nayîne,*
*2 Li me cema'yî bûyîne,*
*3 Aşiqo, mîrê mezin, te ev mêvan bo me ji k'êderê îne?!*

**S. 29** *1 Çendî dineyîne,*
*2 Li min cema' dibûyîne,*
*3 Aşiqo, mîrê mezin tu bo me ji kêder dayîtîne?!*

**S. 34** *1 Ya derwêş, ez û tu birayîn,*
*2 Li xilmeta tey r̂awestayîn,*
*3 Li dîndara te qewî şayîn.*

**S. 30** *1 Ya derwêş, ez û tu birayîn,*
*2 Li xilmeta te di r̂awestaîn,*
*3 Dîndara te qewî di şayîn.*

**S. 35** *1 Ya derwêş, ĥeta tu li virî,*
*2 Li xilmeta tey hazirîn,*
*3 Li dîndara te qewî şa kirîn.*

**S. 31** *1 Ya derwêş, ĥeta tu li virî,*
*2 Li xilmeta te di hazirîn,*
*3 Dîndara te qewî di şa kirîn.*

**S. 36** *1 Got: «R̂aste, tu kekê derwêş Omerî,*
*2 Tu layîqî vê cewabê, vî xeberî,*
*3 Ez ji Şerqê hatim, çime Şamê silavêt nebîy Zekerî».*

**S. 32** *1 E'seyî tu kekê derwêş Omerî,*
*2 Layîqî xwe, e'silê xwe didî xeberî,*
*3 Ez ji Şerqê wê hatîm, dêçime Şamê silavî nebîy Zekerî.*

**S. 37** *1 Got: «Ya derwêş, tu di dizanî,*
*2 R̂êya xwe meke kislanî,*
*3 Vegeȓe, silav bike li silt'anî.*

**S. 33** *1 Ya derwêş, tu wê dizanî,*
*2 R̂êya xwe meke kislanî,*

*3 Silav bike li silt'anî.*

**S. 38** *1 Ya derwêş, r̂ast bajo r̂êye,*
*2 Kislaniyê ne êxêye,*
*3 Û silav bike li ser p'êye».*

**S. 34** *1 Ya derwêş, r̂ast bajo r̂êye,*
*2 Kislanîyê me êxîyêye,*
*3 Silav bike li ser p'êye.*

**S. 39** *1 Em ji Mêrdînê çon bi T'eleb,*
*2 Min li wêderê dîtin qefile,*[2756] *û bazirgan, û celeb,*
*3 Min go: «Gelo, eveye dergehê Ĥeleb?»*

**S. 35** *1 Ez ji Mêrdînê çom bi T'eleb,*
*2 Wê jê diçî qefîl, û bazirgan, û celeb,*
*3 Min go: «Gelo, eveyîye Ĥeleb!»*

**S. 40** *1 Ez ji Mêrdînê dibûm siware,*
*2 Li dergehê Ĥelebê dikim p[ir]syare:*
*3 «Gelo, eveye ciyê jê distînin xefare?»*

**S. 36** *1 Ji Mêrdînê dibûm siware,*
*2 Min dit wê jê diçin qefîl, û celeb, û bazirgane,*
*3 Min got: «Gelo, eve e'rdê jê distînin xefare?»*

**S. 41** *1 Borê min kire sistî,*
*2 Çom dergehê Ĥelebê yî di daxistî,*
*3 Xelqê Ĥelebê vê nivistî.*

**S. 37** *1 Ez çî bikem, bore min kire sistî,*
*2 Ez çom dergehêt Ĥelebê di daxistî,*
*3 Xelqê Ĥelebê ĥemûyî nivistî.*

**S. 42** *1 Wey li derwêşekî minî ser sewdaye,*
*2 Dîwar ber dîwar ger̂iyaye,*
*3 Ne cî bi dest k'et, ne odaye.*

**S. 38** *1 Wey li derwêşê min ser sewdaye,*
*2 Dîwar ber dîwar wêger̂iyaye,*
*3 Ne cî bi dest k'eft, ne odaye.*

**S. 43** *1 Wey li derwêşê min jaro,*
*2 Ger̂iya bû dîwar ber dîware,*
*3 Ĥeta subê r̂oj lê dibû dehare.*

**S. 39** *1 Wey li derwêşê min jaro,*
*2 Ger̂iya bû dîwar ber dîware,*
*3 Ĥeta sibê r̂oj lê dibû dehare.*

**S. 44** *1 Subeye û xweş hêwane,*
*2 Dergehêt Ĥelebê hatine berdane,*
*3 Wê jê diçin qefila û bazirgane.*

**S. 40** *1 Sibeye û xweş hêwane,*
*2 Dergehêt Ĥelebê hatine berdane,*
*3 Wê jê diçin qefîl û bazirgane.*

**S. 45** *1 Bore min şûme,*
*2 Ji bizmara r̂adibû perçûme,*
*3 Û li herdu zenda cemidî xûne.*

**S. 41** *1 Ez çî bikem, bore min şûme,*
*2 Berçum ji bizmara r̂a dibûne,*
*3 Di herdu zenda da cemidîbû xûne.*

---

[2756] *qavil*

**S. 46** *1 Derwêşekî minî derdumende,*
*2 Borê xwe k'êşabû ba solbende,*
*3 Xûn cemidî li herdu zende.*

**S. 42** *1 Wê li derwêşê min derdimende,*
*2 Borê xwe k'êşabû ba solbende,*
*3 Xûn cemidî li herdu zende.*

**S. 47** *1 Beyt'aro, li ber dik'anê,*
*2 Gotê: «Hey ciwamêro, ciwaamêrê hanê».*
*3 Borê te kêrtêt mîr lê siwer bit, her te seyranê».*

**S. 43** *1 Beyt'aro li derê dik'anê,*
*2 Gotê: «Hey camêro, camêrê mane».*
*3 Gotê: «Ya derwêş, borê te layîqe mîr, lê siwer bit, biçite seyranê».*

**S. 48** *1 Got: «Beyt'aro, bi mirwete,*
*2 Borê min dîtina wî p'iȓ hişmete,*
*3 Belê bi meşa xweyî kêm t'aqete».*

**S. 44** *1 Gotê: «Hey beyt'aro, yî bi mizbete,*
*2 Borê min dîtina xweyî p'iȓ hişmete*[2757]*,*
*3 Çona xweyî kêm ĥerek'ete.*

**S. 49** *1 Got: «Ya derwêş, tuyî miskînî,*
*2 Hincîyê vî borî li ba te bibînî,*
*3 Dersad wê ji te distînî».*

**S. 45** *1 Ya derwêş, tuyî miskînî,*
*2 Hincîyê vî borî li ba te bibînî,*
*3 Dersad dê ji te bistînî».*

**S. 50** *1 Canê derwêş got: «Dê xilmeta min bi kezî»,*
*2 Got: «Beyt'aro, bi Xwedê key li xilmeta min bikey lezî,*
*3 Ji tirsa da dil û hinavê min t'êk dilerizî».*

**S. 46** *1 Canê derwêş k'eftibû tezîn,*
*2 Got: Beyt'aro, bi Xwedê key li xilmeta min bilezîn,*
*3 Ji tirsa da dil û hinavêt min t'êk lerizîn.*

**S. 51** *1 Dilê min hind êşe,*
*2 Ez li sûka çome pêşa,*
*3 Du çawîş hatin li min û bor dikine t'eftêşe.*

**S. 47** *1 Di sûka da çome pêşe,*
*2 Hatine pêşîya min du çawêşe,*
*3 Wê li min û borî diken t'eftêşe*

**S. 52** *1 Li sûka da çome xware,*
*2 Du çawîş hatin dikine gazî û haware,*
*3 Yekî bi serê bor girt û yekî bi destê derwêş girt, got: «K'eremke were xware».*

**S. 48** *1 Di sûka da çome xware,*
*2 Hatine pêşîya min du çawîşêt p'ergale*[2758]*,*
*3 Yekî ji destê min girt hefsare,*
*4 Yekî ez ji borî îname xware.*

**S. 53** *1 Ezim derwêşekî şkestî,*
*2 Eve bû borekî minî bestî,*
*3 Min dizanî yan dê xwe êwirînimyan hespî.*

**S. 49** *1 Mîrê Ĥelebê ma dînî,*

[2757] *hijmet*
[2758] *piȓgal*

*2 Du çewîşa li pê min dişînî,*
*3 Ya derwêş, behayî bibe, bo min borî bînî.*

**S. 54** *1 Du çewîş hatin û di nadîne,*
*2 Gotin: Ya derwêş, k'eremke, mîrê Ĥelebê te dixwîne,*
*3 Wê behayê bide te û bor ji te distîne.*

**S. 50** *1 Ya derwêş, ez li te nakeme zorî,*
*2 Dê deme te ĥezar zêȓî florî,*
*3 Behayî bibe, bo min bihêle borî.*

**S. 55** *1 Mîro bi nisbete,*
*2 Borê min çi qimete,*
*3 Ȓêya*[2759] *min li sefereke bê ezete.*

**S. 56** *1 Ya derwêş, ez li te nakeme zorî,*
*2 Ezê [di]dime te sed zêȓî florî,*
*3 Beha bibe û bihêle borî.*

**S. 57** *1 Mîro, tu P'adşayî,*
*2 Ne min bor divêt, ne behayî,*
*3 Min tu spartîye Xwedayî*[2760]*.*
**S. 51** *1 Mîro, tu P'adşayî,*
*2 Ne min bor divêt, ne behayî,*
*3 Min tu spartîye ĉavêt Xwedayî.*

**S. 58** *1 Gava min digot ev xebere,*
*2 Hatine min bi dar û bere,*
*3 Ez ji mecasa mîrê Ĥelebê kirme dere,*
**S. 52** *1 Gava min digot ev xeber,*
*2 Ȓadibûne min bi dar û ber,*
*3 Ez ji dîwana mîrê Ĥelebê kirme der,*

**S. 59** *1 Du çewîş ȓobûn ji dîwanê,*
*2 Yekî bi sere bor girt, bire ixterxanê,*
*3 Û yekî bi destê derwêş girt, bire ĥebs û zêndanê.*
**S. 53** *1 Du çewîş wê li dîwanê,*
*2 Yekî bi sere borî k'êşa êxistime xanê,*
*3 Yekî bi destê min girt, go: «Derwêş, k'eremke binê zêndanê».*

**S. 60** *1 Ĥeft sala bi t'emame,*
*2 Ez li binê ĥebsê da mame,*
*3 Ez ji Şerqê hatim û ne gehiştime Şame.*
**S. 55** *1 Ĥeft salî t'emame,*
*2 Di binê ĥebsa Ĥelebê da mame,*
*3 Ez ji Şerqî hatim, ne çome Şame.*

**S. 61** *1 Ĥeft salan û zêde,*
*2 Ez mabûm li binê ĥebsê da,*
*3 Kes ji mîr û mergeha şêx Adî meyze ne kirbû pêde.*
**S. 54** *1 Ĥeft salan û zêde,*
*2 Ez mame di binê ĥebsa Ĥelebê da,*
*3 Yekî ji Lalişa nûranî meyza nekirbû pêda.*

**S. 62** *1 Sibeye û ȓoj hilate,*
*2 Li ser min bû celade,*
*3 Go: «Hilo miskîno, bide şade».*

---
[2759] *ȓiya*
[2760] *Xudayî*

**S. 56** *1 Sibeye[2761] r̂oj hilate,*
*2 Hatine ser min celate[2762],*
*3 Gotin: Miskîno bin Ademo, hilû bine şade[2763].*

**S. 63** *1 Miskîn got: «Şehda dînê min êk Ellaĥ,*
*2 Meqlub û mergeh sela,*
**S. 57** *1 Min go: Şehda min yek Ellaĥ,*
*2 Meqlub û mergeh sela.*

**S. 63** *3 Silavêt min li Meqlubî, li mergehê,*
*4 Li Lalişê xwedanê qubehê,*
*5 Li wî e'rdî, e'rdê êzîdxane ser dik'êşinê ibadetê û sicûdehê».*
**S. 58** *1 Silavêt min li Meqlubî, li mergehê,*
*2 Li Lalişê xwedanê qubehê,*
*3 Li wî e'rdî, e'rdê êzîdxane dik'êşinê ibadetê û sicûdehê.*

**S. 64** *1 Dilê min behîye,*
*2 E'refate û dehîye,*
*3 K'arê xwe dikine ziyaretîye.*

**S. 65** *1 Xwezî çobame wan dîyara,*
*2 Min meyza kirba wan sûka, wan semadara,*
*3 Min tiwaf kirba derê kaniya Sipî, Êzdîn emîr û qubet il-Bidor, li gel bira û yara.*
**S. 59** *1 Xwezî çobame wan dîyara,*
*2 Min meyza kirba li wan sûka, li wan semadara,*
*3 Min tiwaf kir ba dergehê kaniya Sipî, Êzdîne mîr qubet il-Bidor, li gel biranû yara.*

**S. 66** *1 Xwezî ez t'êr bijîme,*
*2 Li celse û r̂ewaqa r̂uniştîme,*
*3 Min gotiba metbexçiye şêx Adî bo min bîne.*
**S. 61** *1 Xwezî t'êr bijîme,*
*2 Li cejis me'r̂ufê r̂uniştîme,*
*3 Min gotiba metbexçîye şêx Adî bo min miskînî simatê bîne.*

**S. 67** *1 Ew mala me e'firandbû[2764] ji qatê,*
*2 Xwezî ez r̂ûniştibame li ser wê bisatê,*
*3 Wegê metbexçiyê şêx Adî band kir hê werine simatê.*

**S. 68** *1 Ew mala me xwedan erk'ane[2765],*
*2 Ew Lalişa bi sikane,*
*3 Ew ciyê xelqê bi dîn û îmane.*

**S. 69** *1 Xwezî ez çobame sûka me'rîfetê,*
*2 Ciyê xêr, û naz, û ne'metê,*
*3 Ciyê sitî lê dikin dawetê.*
**S. 60** *1 Xwezî çobame sûka me'rîfetê,*
*2 Ya t'ijîye ji xêrê, ji nazê, ji ne'metê.*

**S. 70** *1 Banga min li wana,*
*2 Girtyekî qeydan û zinzana,*
*3 Ji Lalişê bê me bêtin hana.*

**S. 71** *1 Banga min malên mîra,*
*2 Girtyekî qeydan û zincîra,*

---

[2761] *subeye*
[2762] *celad*
[2763] binêr: *şehde*
[2764] *afirand*
[2765] *îman*

*3 Ji Lalişê li banga min bêt feqîra.*

**S. 72** *1 P'adşê min wa kire t'aqete,*
*2 Daye destê şêx Cêncer*[2766] *mişur û xete,*
*3 Got: «Heȓe girtiye me berde, hege bi ĥeqe».*

**S. 62** *1 P'adşê min wa kire t'aqet,*
*2 Şêx Adî dane destê şêx Cêncer mişur û xet,*
*3 Go: «Heȓe girtîye me berde, heke bi ĥeq, heke bi neĥeq!»*

**S. 73** *1 Li derê meclisê sekinî şêx Cêncere,*
*2 K'ember best, hile zere,*
*3 Got: «Gelî qaziya, girtiyê me berdin bînnine dere».*

**S. 63** *1 Hate derê dîwanê şêx Cêncer,*
*2 K'ember best, hile zer,*
*3 Got: «Gelî qadîya, hilûn girtîyê me berden bi neder».*

**S. 74** *1 Li nav qaziye bû ȓaye,*
*2 Gotinê: «Heger te e'şirê me înaye,*
*3 Girtiyê te me berdaye».*

**S. 64** *1 Li nav qadîye bûyîye ȓaye,*
*2 Got: «Heke te eşira me înaye,*
*3 Me girtîyê te berdaye».*

**S. 75** *1 Li nav qaziye bû dik'ir,*
*2 Gotê: «Hey camêro*[2767]*, camêrê buk'ir,*
*3 Kesek girtiya, bernadit bê usir*[2768]*».*

**S. 65** *1 Li nav qadîye bû dik'ir,*
*2 Gotin: «Hey camêro, camêrê buk'ir,*
*3 Kesê girtî, bernedaye bê usir*[2769]*».*

**S. 76** *1 Gelî qaziya li me bilind nekin ȓêye,*
*2 Êk ji ba me hatîye, eve ĥeft sale li ba we yî girtîye,*
*3 K'a bêjin sebeb çîye?»*

**S. 77** *1 Mîro, tuyî bi aqilî,*
*2 Ĥişa bîne ser dilî,*
*3 Malê me mergehiya li we t'erefiya na ĥasilî».*

**S. 67** *1 Mîro, tuyî bi aqilî,*
*2 Ĥişa bîne ser dilî,*
*3 Malê me mergehîya li we t'erefîya ba hasilî».*

**S. 78** *1 Mîro, tu wê dizanî,*
*2 Ĥişa bîne ser canî,*
*3 Piştî şêx Adî dê ji qalbê te fiȓînim gîyanî.*

**S. 66** *1 Gotê: «Mîro, tu wê dizanî,*
*2 Ĥişa bîne ser canî,*
*3 Piştî silt'an şêx Adî dê ji qalbê te fiȓînim gîyanî.*

**S. 79** *1 Li derê zêndanê sekinî şêx Cêncere,*
*2 K'ember bestibû, hile zere,*
*3 Got: «Ya miskîn T'ecdîn, ji ĥebsa Ĥelebê, were dere».*

**S. 68** *1 Hate derê zêndanê şêx Cêncer,*
*2 K'ember best, hile zer,*
*3 Got: «Ya miskîn, hilû ji hebisa Ĥelebê were der!»*

[2766] *Cêncel*
[2767] *cwamêr*
[2768] *uşir*
[2769] *uşir*

**S. 80** *1 Bore minî sipîya,*
*2 Ne deşt dibest, ne van ĉiya,*
*3 Şikir, ez ji wan ciya anîme van ciya».*
**S. 69** *1 «Ez çî bikem, bore min sîya,*
*2 Ewî ne deşt dip'erisit, ne ĉiya,*
*3 Şikir[2770], em ji wan cîya hatîne van cîya».*

**S. 81** *1 P'adşê min kire t'eqdîre,*
*2 Dane pêşîya min feqîre,*
*3 Ez birime ĥizreta mîre.*

**S. 82** *1 Min mîrê xwe dît bi herdu ĉava,*
*2 Li min r̂ohin bûn dil û hinava,*
*3 Min li P'adşayê xwe dikir zor silava.*

**S. 83** *1 Ş êx Adî gotê: «Ya derwêş, tu bi xêr hatî,*
*2 Tu careke dî hatîye vî welatî,*
*3 Bi te ma r̂aĥetî û şiqiîyatî.*
**S. 70** *1 Şêx Adî gotê: «Ya derwêş, tu bi xêr hatî,*
*2 Bi te man r̂aĥetî û şeqîyatî,*
*3 Tu careke dî ji wî welatî hatîye vî welatî».*

**S. 84** *1 P'adşayê mino, min bi te gelek miraze,*
*2 Me gelek k'êşa çile û micade,*
*3 Tu careke dî min ne sipêrî destê celade.*

**S. 85** *1 «Ya derwêş, tuyî miskînî,*
*2 Here, li mala xwe r̂obî,*
*3 Înşallaĥ[2771] tu careke dî mexfur namînî».*

**S. 70** *1 Şêx Adî gotê: «Ya derwêş, tu bi xêr hatî,*
*2 Bi te man r̂aĥetî û şeqîyatî,*
*3 Tu careke dî ji wî welatî hatîye vî welatî».*

**S. 86** *1 Miskîn T'ecdîn ji şêx Adî kir pirşyare[2772]:*
*2 «Kesê bê şêx û p'îr û hosta û merebî, yarû birêt axretê, ciyê vî k'êdere? şêx Adî*

**S. 87** *1 Şêx Adî dibêje: «Ya miskîno, pirsyara te fere,*
*2 Çi kesê bê şêx û p'îr û hosta û merebî, yarû birêt axretê, ĥeft cara dojêh ji ciyê vî xweştire».*
**S. 72** *1 «Ya miskîno, pirsyare te fere,*
*2 Mêrê bê şêx û p'îr û hosta û merebî, yarû birêt axretê, ĥeft cara doj ji ciyê wî xweştire».*

**S. 88** *1 «Ya derwêş, heger tu yê minî,*
*2 Li hind û yemanê bî, tu li ba minî,*
*3 Û heger tu ne yê minî, tu li bo min heç, k'o tu li hind û yemenî».*
**S. 73** *1 «Ya derwêş, heke tu yê minî, tu li emanê[2773] bî, tuyî minî,*
*2 Û heke tu ne yê minî, tu wê li bo min t'u, wê li emanê t'u».*

**S. 89** *1 «Ya derwêş, êmanetî te ev gelî ye,*
*2 Eve maleke ji enzelî ye[2774],*
*3 Mek'anê silt'an şêx Adî ye!»*
**S. 74** *1 «Ya derwêş, amanetê[2775] te ev gelîye,*
*2 Ewe maleke ji enzelîye[2776],*

[2770] *şukr*
[2771] *Îşela*
[2772] *pişyar*
[2773] *emen*
[2774] *e'nzalî*
[2775] *êmanet*
[2776] *e'nzalî*

*3 Mek'anê silt'an şêx Adî ye!»*

*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

## 128. QEWLÊ OMER XALA Û ĤESEN ÇINARÎ[2777; 2778; 2779]

**S. 1** *1 Ez bêjim medehê Omer Xala û Hesen[2780] Çinarî,*
*2 Ewin şemalêt şevêt tarî,*
*3 Ji ĥusna[2781] wan nûr dibarî.*

**S. 1** *1 Ezî çendî li dinême,*
*2 Yê[2782], ber ferwara Xwedême,*
*3 Medhê Omar Xala, Hesen Çinêr dibihême.*

**S. 1** *1 Çendî ez li dinême,*
*2 Li ber firwara Xudême,*
*3 Medehê Omer Xale û Hesin Çinêrî dibême.*

**S. 2** *1 Omer Xala û Hesen Çinarî,*
*2 Ewin şemalêt şevêt tarî,*
*3 Ji ĥusna wan nûr dibarî.*

**S. 2** *1 Omer Xala, Hesen Çinêr şevê tarî,*
*2 Ji ĥezna wan nûr dibarî,*
*3 Hesen Çinêr, Omer Xala mîrê xwedan k'emal,*
*4 Bo wan ava kirin mezelû mal.*

**S. 2** *1 Da em biden medehê Omer Xale û Hesin Çinêrî,*
*2 Ewin şewqê şemalê şevê tarî,*
*3 Ji ĥisna wan nûr dibarî.*

**S. 3** *1 Omer Xale û Hesin Çinêrî,*
*2 Mêrêt xudan k'emalin,*
*3 Bo feqîra avakirin mezel û malin.*

**S. 4** *1 Ewin mêrêt xudan çavin,*
*2 Şîxadî lê digirin silave....,*
*3 Got: «Xoş malê baban, maleke bi dewletin».*

**S. 3** *1 Mala baba, maleke bi dewlate,*
*2 Jê diçit k'eremete[2783],*
*3 Şêx Adî[2784] p'îrêt Omer Xala kirine p'îrêt xelifete.*

**S. 5** *1 Mala baba, maleke bi dewlete,*
*2 Jê diçon k'eramete,*
*3 P'îrê Omer Xale kirine merebiyê xelîfete.*

**S. 4** *1 Mala baba ji enzelî ye,*
*2 Hêvênê[2785] wan ji kaniya Sipî ye,*
*3 Lê tiwaf dibin sinî ye[2786],*
*4 Kire xitmê çendî E'devî ye.*

**S. 6** *1 Malê baba maleka enzeliye,*

---

[2777] [2] (rr. 535-540)
[2778] *Qewlê p'îrê Omer Xala*. P'îr Elîxanê Cimşîd, p'îrê Omer Xala. Bajarê T'ibîlîsê, Gurcistan.
[2779] *Laliş* 16, 2001 (rr. 151-157) belavkirin: E'lo şêx Xelef. https://ru.calameo.com/books/002518317922a3557d519
[2780] *Hesin*
[2781] *husn*
[2782] *Ê*
[2783] *keramet*
[2784] *Şîxadî*
[2785] *hêvên*
[2786] *sunî*

*2 Hêvênê wan ji kaniya Sipî ye,*
*3 Pê tiwaf dibin sinîye,*
*4 Kirine xitmê çendî E'dewî ye.*

**S. 3** *1 Aşiqekî çê me,*
*2 Û erk'ana me'rîfetê r̂ê me,*
*3 Medhê*[2787] *wan şêresiwara*[2788] *maşekî nûrîne.*

**S. 7** *1 Aşiqekî çê me,*
*2 Bi ol, û erk'an, û me'rîfetê li r̂ê me,*
*3 Medehê wan şêre siwara dibême.*

**S. 8** *1 Da bideyn medehêt wan şêre siware,*
*2 Ewin mêrêt ixtîyare,*
*3 Li Lalişê sikenîne, gotin: «Eve Ĥeq ware».*

**S. 5** *1 Aşiqekî nûrînim,*
*2 R̂êya şêx Adî û melik şêx Sin*[2789] *bi ĥeq dibînim,*
*3 Şêx Adî go: «Ne muĥbê xelqê derewînim».*

**S. 4** *1 Aşiqekî nûrîne,*
*2 Melek Fexredîn ne meleke,*
*3 Xelqê derewîne.*

**S. 9** *1 Aşiqê nûrême,*
*2 Ĥeq r̂êya Şîxadî dibême*
*3 Melik Fexredîn ne miĥbê xelkê derewîne.*

**S. 6** *1 Derewîna ne lomînin,*
*2 Ew r̂êya şêx Adî û melik şêx Sin nafehmînin,*
*3 Xas û qelenderêt geliyê Lalişê jê digazinin.*

**S. 10** *1 Ewan derewîna melomînin,*
*2 Ew r̂êya silt'an Êzî nabînin,*
*3 Xas û qelenderêt geliyê Lalişê ser ĥemû k'arê wan bikazne…*

**S. 7** *1 Hesen Çinarî û Omer Xala,*
*2 Ewin du ĉirêt îxtîyara,*
*3 Li Lalişê, ji feqîra r̂a ava diken mezel û mala.*

**S. 8** *1 Ewin du mîrêt Xwedan ĉave,*
*2 Şêx Adî lê dikir silave,*
*3 Got: «Xweş malêt bave»,*

**S. 9** *1 Da min ji k'asa berî,*
*2 Min vexwar loqent'erî,*
*3 Da em bideîyîn medhê p'îr Omerî.*

**S. 5** *1 Dayî ji k'asa bere,*
*2 Min vexwarî vê qent'ere*[2790]*,*
*3 Em bidin medhê Omer Xale.*

**S. 11** *1 Da min ji k'asa perê,*
*2 Min vexwarbû li wê qent'erê,*
*3 Da em biden medehê p'îr Omerê.*

**S. 10** *1 Da min ji k'asa badîyê,*
*2 Min vexwar li wê kaniye,*
*3 Da em bideyn medhê p'îr Adîyê.*

---

[2787] *meth*
[2788] *şêrû sivara*
[2789] *Şîxsin*
[2790] *qeyînt'er*

**S. 6** *1 Da min k'asa meyîyê*[2791]*,*
*2 Min vexwar ji vê kanîyê,*
*3 Emê bidin medhê p'îrê Alîyê.*

**S. 13** *1 Da min ji k'asa behê,*
*2 Min vexwarbû ji wê kaniyê,*
*3 Da em biden medehê p'îr Adiyê.*

**S. 11** *1 Da min ji k'asa meyê,*
*2 Min vexwarbû bi qedehê,*
*3 Da em bideyn medhê xwedanê*[2792] *qubehê.*

**S. 12** *1 Da min ji k'asa meyê,*
*2 Min vexwarbû ji wê qedehê,*
*3 Da em biden medehê xudanê qubehê.*

**S. 12** *1 Da min ji k'asa mîra,*
*2 Min vexwar bi şahî û dîwanêt feqîra,*
*3 Da em bideyn medhê Lawê p'îra.*

**S. 7** *1 Da min ji k'asa nûrîne,*
*2 Min vexariye şahê a'lem feqîra,*
*3 Emê bidin medhê lawê p'îra.*

**S. 14** *1 Da min ji k'asa mîra,*
*2 Min vexwarbû şaya dîwanêt feqîra,*
*3 Da em biden medehê lawêt p'îra.*

**S. 8** *1 Da min k'asa r̂ikatê*[2793]*,*
*2 Min vexwarî t'emame,*
*3 Min da*[2794] *medhê silt'an Êzîd e'rdê Şame.*

**S. 13** *1 Da min ji k'asa ĥelale,*
*2 Min vexwarî derĥale,*
*3 Em wê dideyn medhê Omer Xale.*

**S. 15** *1 Da min ji k'asa ĥelale,*
*2 Min vexwarbû derĥale,*
*3 Da em biden medehê Omer Xale.*

**S. 14** *1 Da min ji k'asa a'mê,*
*2 Min vexwarî bi t'emamê,*
*3 Da em bideyn medhê Êzîdê Şamê.*

**S. 16** *1 Da min ji k'asa r̂ik'î a'mê,*
*2 Min vexwarbû bi t'emamê,*
*3 Da em biden medehê Şîxadî yê Şamê.*

**S. 15** *1 Silt'an Êzîdî Şamî bû,*
*2 Omer Xala ji sur̂a darî bû,*
*3 Hesen Çinarî ji hewa beĥrî bû.*

**S. 9** *1 Silt'an Êzîd Şamê bû,*
*2 Omer Xala sur̂a*[2795] *der[ya] bû,*
*3 Hesen Çinêr li hewa*[2796] *ber bû.*

**S. 17** *1 Silt'an Şîxadî li Şamê bû,*
*2 Omer Xale siwarê darê bû,*
*3 Hesin Çinêrî ji hawariyê beĥrê bû.*

**S. 16** *1 Şêx Adî ji Şamê çoye mergehê,*

[2791] *mayîn*
[2792] *xwidan*
[2793] *r̂ikhat*
[2794] *bida*
[2795] *sir*
[2796] *heva*

*2 Êwirî li Comayê, li Binîmayê*[2797]*,*
*3 Li Lalişê, Xwedanê qubehê,*
*4 Virêkire pê almehê.*

**S. 10** *1 Şêx Adî merk'ebê hêwurî,*
*2 Comayê, Binîmayê* [2798]*,*
*3 Şand pê ala mehê.*

**S. 18** *1 Şîxadî ji Şamê dihate,*
*2 Li mergehê êwirî, û kir xebate,*
*3 Li qubehê cê mehê şande pê al mehê.*

**S. 17** *1 Alîma ji wêve diînin,*
*2 Çendî mêr pêve dimeyzînin,*
*3 Divên navekî şerîf*[2799]*, şîrin dayînin.*

**S. 11** *1 Ala mehê ji wê tîne,*
*2 Çendî mêr lê dimezîne,*
*3 Di navekî şîrin lê tîne.*

**S. 19** *1 Alî mahê ji wêve tînin,*
*2 Çendî mêra lê dimeyîzînin,*
*3 Navekî xuyî yî şirîn li ser dayînin.*

**S. 18** *1 «Almeh» înan ji wêve,*
*2 Mêra meyza kir pêve,*
*3 Şêx Adî ji desta dayîna ew sêve.*

**S. 12** *1 Ala mehê r̂ê ji vebe,*
*2 Mêra mêze kir heve,*
*3 Şêx Adî nav lêkir ew sêve.*

**S. 20** *1 Alî mah tê ji wêve,*
*2 Mera meyîze kir pêve,*
*3 Şîxadî naskir ew sêve.*

**S. 13** *1 Sêv danî bale,*
*2 P'adşayê min nûr şemale,*
*3 Nav lêkir Omer Xale.*

**S. 21** *1 Sêv danîn li bale,*
*2 P'aşa nûr şemale,*
*3 Nav lê danî Omer Xale.*

**S. 19** *1 Hesen Çinarî û Omer Xala vêkê xweş tê,*
*2 Go: «Hey P'adşayê mino li dine û axretê,*
*3 Sebra me bêyî te ne tê».*

**S. 14** *1 Omer Xala wê yekê derd tê,*
*2 Go: «Ay P'adşayê dinê, axretê,*
*3 Sebra me wê E'yn il-Beyzaye tê.*

**S. 22** *1 Omer Xale wê yekê ber tê,*
*2 «Hey P'edşê mino li dinyayê û axretê,*
*3 Sebra me bê kaniya Sipî ne tê».*

**S. 20** *1 Şêx Adî herî heste,*
*2 Hesen Çinarî û Omer Xala pêşberî şêx Adî vewesta,*
*3 Şibabeke*[2800] *avê jê dixweste.*

**S. 15** *1 Hesen Çînêr û Omerê Xala*
*2 Ber şêx Adî vedivestin,*
*3 Şibabeke*[2801] *ava kaniya Sipî lê dixwestin.*

**S. 23** *1 P'edşê min p'ir̂ heweste,*

---

[2797] *li cîmayê, li benîmeye*
[2798] *Serê mehê — binê mehê*
[2799] *şirîf*
[2800] binêr: *şerbik*
[2801] *şibek*

*2 Omer Xale û Hesin Çinêrî ber Şîxadî ve diwesta,*
*3 Şibîbeka ava kaniya Sipî jê dixweste.*

**S. 16** *1 Çax ewa — ew îniye,*
*2 Şibabeke*[2802] *ava kaniya Sipîye,*
*3 Ba wan dikir r̂ewaye.*

**S. 21** *1 Got: «E'zîzê mino, mek'anekî me çêke,*
*2 Avê xwe yê şîrinî şerîf lêke,*
*3 Her şev, êvarê înîya şibabek ava kaniya Sipî ji me r̂a vir̂êke».*

**S. 24** *1 Hesin Çînêrî û Omer Xale*
*2 Gotin: «E'zîzê min, cîyekî me çêke,*
*3 Navekî xo yê şirîn yê şirîf lêke,*
*4 Şibabeka ava kaniya Sipî bo me bi r̂êke».*

**S. 22** *1 Şêx Adî we dikir firware,*
*2 Her şev, êvarêt înîya şibabeke ava kaniya Sipî bi zîweyîve dihinare,*
*3 Qasid Îsbîya bi şehdeya Dawidî bin Dermane.*

**S. 25** *1 Şîxadî we dikire firware,*
*2 Her hêvareka îniyê şibîbeka ava kaniya Sipî r̂ê dikire zêwe,*
*3 (…………………………..).*

**S. 26** *1 Qazide wî Isibiyane,*
*2 Şehde Dawidê bin Dermane,*
*3 Min li wir dîtin civateke girane.*

**S. 23** *1 Mêr r̂uniştin li dîwana,*
*2 Da em jê bideyn beyane,*
*3 Omer Xala û Hesen Çinarî herdu birane.*

**S. 17** *1 Omer Xala Hesen Çinêr herdu birane,*
*2 Şêx Adî go: «Gelî mêra, berberî mekin,*
*3 Omer Xala Hesen Çinêr herdî yekin».*

**S. 24** *1 Min li wê dîtin zor meclîse,*
*2 Mîr r̂uniştin bi ĥeqîya şêx Adî û melik şêx Sin jêk diken pirse,*
*3 Omer Xala babe, Hesen Çinarî pise.*

**S. 27** *1 Mêr r̂uniştîne bi hev r̂êya Şîxadî jêk diken pirse,*
*2 Omer Xale babe, Hesin Çinêrî pise.*

**S. 28** *1 Min li wir dîtin zor dîwane*
*2 Mêr r̂uniştine bi ĥeq r̂êya Şîxadî, jêk dikirin neyane,*
*3 Omer Xale û Hesin Çinêrî herdu birane.*

**S. 29** *1 Şîxadî go: «Gelî mêra, vê yekê mekin,*
*2 Hûn berberîya mekin,*
*3 Omer Xale û Hesin Çinêrî herdû yekin».*

**S. 25** *1 Pişt wan gotina şêx Adî got:*
*2 «Gelî mêra, Omer Xala û Hesen Çinarî du mêrêt mezine,*
*3 Ew herdu navek, ji navêt mine».*

**S. 18** *1 Ĥedî wan gotina*
*2 Şêx Adî go: «Gelî mêra,*
*3 Omer Xala û Hesen Çinêr navekî mezinin,*
*4 Ew nava navê minin».*

**S. 30** *1 Piştî wan gotina Omer Xale û Hesin Çinêrî du mêr mezinin,*
*2 Şîxadî go: «Ew jî navek ji navêt mine».*

[2802] *şebek*

**S. 26** *1 Piştî wan xebera,*
*2 Da em jê bideyn nedere,*
*3 Şêx Adî û Omer Xala û Hesen Çinarî zincîra zere.*

**S. 31** *1 Piştî wan xebera,*
*2 P’edşê minî xudan nedere,*
*3 Isbata Omer Xale û Şêxalê Şemsa zincîra zere.*
*4 Ya me ȓaste, ne derewe,*
*5 Isbata melik şîx Ĥisin Celewe.*

**S. 27** *1 Şêx Adî go: «Gelî mêra, ya min digot, her ewe,*
*2 Û ȓaste û ne derewe»,*
*3 Şêx Adî da melik şêx Sin Celewe.*

**S. 28** *1 Melik şêx Sin, Celewê dixune,*
*2 Çendî li dîwanê dimeyzîne,*
*3 Mêrekî ji xwe mezintir nabîne.*

**S. 32** *1 Melik şîx Ĥisin Celewê dixûne,*
*2 Çendî lê dimeyîzîne,*
*3 Mêrekî ji xwe mezintir nabîne.*

**S. 29** *1 Ya mêra ew nefese,*
*2 Ya mêra ew hewese,*
*3 Da mêra nefese.*

**S. 19** *1 P’adşayê min p’iȓ ĥewase,*
*2 Da mêra hew nefese,*
*3 Da şêx bisk û meqese,*
*4 Da p’îr ferz û zikate.*

**S. 33** *1 P’edşê min p’iȓ ĥewase,*
*2 Da mêra ew nefese,*
*3 Da destê p’îra fitir û zikate,*
*4 Da destê şêxa bisk û meqese.*

**S. 20** *1 P’adşayê min Ẍefûre,*
*2 Ji ba wî tê destûre,*
*3 Da şex bisk û meqese,*
*4 Da p’îr ferz û zikate.*

**S. 34** *1 P’edşê min Ẍefûre,*
*2 Ji ba wî hatibû destûre,*
*3 Da destê şêxa bisk û meqese,*
*4 Da destê p’îra zikat û mişûre.*

**S. 30** *1 Da p’îra ferz û zekaye,*
*2 Da şêxa bisk û meqese,*
*3 P’adşayê min bi hikmê xweyî ȓewa (ye)!*

**S. 35** *1 P’edşê min bi ĥukimê xoyê ȓewaye,*
*2 Ji ba wî hatibû dua’ye,*
*3 Da destê şêxa bisk û meqese,*
*4 Da destê p’îra xat û mişûre.*

**S. 21** *1 P’adşayê min hikmê xweyî nûre,*
*2 Ji ba wî tê dua’ye,*
*3 Da şêx bisk û meqese,*
*4 Da p’îr ferz û zikate.*

**S. 31** *1 Hindekî dilê xerqeyî li wê maye,*
*2 Şêx Adî go: «Xerqe bila webî!*
*3 Çu dilan ji kenarê te çênebî».*

**S. 22** *1 Şêx Adî go: «Hidekî dila чerqe wa maye».*

*2 Go: «Xerqe, xerqê mine,*
*3 Sinetxane, sinetxana mine!».*
*4 Şêx Adî go: «Gelî mêra, xerqe îmane!»*

**S. 36** *1 Hindek dilê xerqe li wê maye,*
*2 Şîxadî go: «Xerqe bila webî,*
*3 Çu ji kinarê min nebî».*

**S. 23** *1 Ĥecî k'êşa xerqe,*
*2 Bêşike gumane,*
*3 Wê pê bigeȓin bavêjin nav xelqê bê îmane.*

**S. 32** *1 Sinet, sineta mine,*
*2 Herçar t'erîqet dest li damana te bî,*
*3 Yê xatira te libal ne bî,*
*4 Bila qet wacebê min ne bî.*

**S. 37** *1 Sinet, sineta mine sinetxaneyê,*
*2 Herçar t'erîqeta li dest û damanêt tede bê,*
*3 Hincî şehda te nebê,*
*4 Bila bi ȓuyê min nek'eftî.*

**S. 33** *1 Ewan mêra li hev dinêȓî,*
*2 Dîwana silt'an Êzî bû şuşe û birûqêt zêȓî,*
*3 Ew k'as şerab il-tiĥur bû, ewan mêra nobe bi nob, li hev digêȓî.*

**S. 25** *1 Gelî Mêra divînin,*
*2 Silt'an Êzîd bîna şûşe,*
*3 Û biriqî zêȓîne,*
*4 Mêra nobe — nobe lê dinêȓî.*

**S. 34** *1 Şêx Adî go: «Gelî mêra, xerqe îmane,*
*2 Hincîyê ȓasta xerqe şik û gumane,*
*3 Cî jîr werhatî, ȓemle, û qîre, û qet'rane,*
*4 Ĥeta a'bad*[2803] *il-axir, ew der ciyê wane».*

**S. 24** *1 Ȓoja axretê,*
*2 Tenge, tûngê ȓem qet'rane,*
*3 Dojeh — cehnimaye,*
*4 Ĥeta ibadet*[2804] *hebe ew der ciyê wane.*

**S. 38** *1 Şîxadî go: «Gelî mêra, xerqe lib[a]sê îmane,*
*2 Hincî li xerqê Şîxadîyê bi şikeyê, bi gumane,*
*3 Dê bi çengilê wî girin û havêne nav bê îmane,*
*4 Çiyê li axretê bora vejvartî tenge, tunge, dojiye qîre û qitrane,*
*5 Ĥeta ebed li abdiyê dernayînin, her ewe ciyê wane».*

**S. 39** *1 Mêra lêk dinêrî,*
*2 Li dîwana silt'an Şîxadî bû şûşe û birîqê zêȓî,*
*3 Ew k'asa silt'an Êzdî bo mêra geȓ bi geȓ lêk digêȓê.*

**S. 35** *1 T'eleba*[2805] *mala baba li min kirî,*
*2 Hêvênê mala baba li mala Şemsedîn û Fexredîn dilê min ev pêkirî.*

**S. 26** *1 Mala bava maleke enzelîye,*
*2 Hêvênê wan ji kaniya Sipîye,*
*3 Mala bava maleke nedîre,*
*4 Lê dihêwirî*[2806] *coqet[êt] feqîre.*

**S. 40** *1 Malê baba maleka enzelîye,*
*2 Hêviyê wan ji kaniya Sipîye,*

---

[2803] *ebed*
[2804] *ebadet*
[2805] *telib*
[2806] *dihêwurî*

*3 Ew kaniye ji berî ĥemû cîye.*

**S. 36** *1 P'adşayê min çêkir Gay û Masî, beĥr û K'ursîy,*
*2 Deşt û ĉiya, e'rd û e'zman, mêrg û zevî,*
*3 Xulyaqet t'evî hêvên ji kaniîya Sipî bî,*
*4 Ew ya weye, wek P'adşa pê divî.*

**S. 41** *1 Malê bava maleka bi nedîre,*
*2 Lê di êwirin coqetêt feqîre,*
*3 Hêvênê wan ji mala melik Şerfedîne,*
*4 Ewan pê nebû,*
*5 P'adșê min çêkir e'rd û e'zmîne,*
*6 Deșt, û ĉîya, û beĥr, û zevîne.*

*Em di kêmin, Xwedê û Şêx Adî t'emamin!*
*R̂eĥma[2807] hosta û gotî!*
*Em di kêmin, Xwedêyî t'emame!*

## 129. QEWLÊ K'OFA[2808; 2809; 2810] (QEWLÊ P'ÎRÊ LIBNANE)

**S. 1** *1 Dilê min kovana,*
*2 P'îrê bi nav Lubnana,*
*3 P'îrê Lubnano[2811] gîyano, bi suȓa Şêx Alê Şemsana.*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 8** *1 Dilê min bi k'ofane,*
*2 P'îrê nav Libnane,*
*3 P'îrê Libnano gîyano zeynet bi suȓa Şêx Alê Şemsane,*
*4 Oy p'îrê, ez bim xulam.*

**S. 33** *1 Dilê minî bi kovane,*
*2 P'îrê bi navê Libnane,*
*3 P'îrê Libnano gyano, zeynet bi suȓa şêx Mendê Fexrane.*

**S. 2** *1 K'ofiya te ya qewîya,*
*2 Lê cema' bûn ewlîya,*
*3 P'îrê Lubnano gîyano, bi suȓa şêxê Adîya.*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 9** *1 K'ofiya teye qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîyî[2812],*
*3 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa şêxê Adîye,*
*4 Oy, p'îrê, ez bim xulam.*

**S. 34** *1 K'ofê teyî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîyî,*
*3 P'îrê Libnano gyano, zeynet bi suȓa şêxê Adîya.*

**S. 3** *1 K'ofiya te cîda,*
*2 Lê cema' bû mirîda,*
*3 P'îrê Lubnano gîyano bi suȓa silt'an Êzîda.*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 10** *1 K'ofiya teye cîde,*
*2 Şahiye li çendî mirîde,*
*3 P'îrê Libneno gîyano, ezê nav suȓa silt'an Êzîde,*

---

[2807] *rema*
[2808] *Qewlê p'îrê Libnane*. http://sarkilar.love.gen.tr/kardes-turkuler/qewle-kofa-kofi-ilahisi-.html
[2809] [1] (pp. 357-360); [2] (rr. 465-467)
[2810] [3] (pp. 230–242)
[2811] binêr: *Libnano*
[2812] *weliye*

*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 35** *1 K'ofê teyî bi cîde,*
*2 Lê cema' dibûn mirîde,*
*3 Pîrê Libnano gyano, zeynet bi suȓa melek silt'anê Êzîde.*

**S. 4** *1 K'ofiya te ya mezina,*
*2 Lê cema' bû il mûmina,*
*3 P'îrê Lubnano, gîyano bi suȓa melik şêx Ĥesina.*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 11** *1 K'ofiya teye mezine,*
*2 Lê cema' dibûn momine,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa melik şêx Sine,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 36** *1 K'ofê teyî mezine,*
*2 Lê cema' dibûn momîne,*
*3 P'îrê Libnano gyano, zeynet bi suȓa melik şêx Sine.*

**S. 5** *1 K'ofiya te bûkêr,*
*2 Vay dinya bûye du ker,*
*3 P'îrê Lubnano, gîyan bi suȓa şêxû Bek'ir,*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 12** *1 K'ofiya teye buk'ir,*
*2 Li dinyayê bûye dik'ir,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, ezê nav suȓa şêxû Bek'ir,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 37** *1 K'ofê teyî buk'ir,*
*2 Li dinê bûye dik'ir*
*3 P'îrê Libnano gyano, zeynet bi suȓa şêxû Bek'ir.*

**S. 6** *1 K'ofiya te bi hinara,*
*2 Lê cema' bû il babzara,*
*3 P'îrê Lubnano, gîyano bi suȓa şêx Şemsê T'et'era.*
*4 Ay p'îrem, wez bûm xulamo.*

**S. 14** *1 K'ofiya teye bi hinare,*
*2 Lê cema' dibûn babzare,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa şêx Şemsê T'et'ere,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 13** *1 K'ofiya teye nûrîne,*
*2 Lê cema' dibûn zergûne,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, ez nav suȓa melik Şemsedîn û melik Fexredîne,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 38** *1 K'ofê teyî nûrîne,*
*2 Lê cema' dibûn zergûne,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa Semsedîn û Fexredîne.*

**S. 15** *1 K'ofiya teye girane,*
*2 Fiȓî ço e'zmane,*
*3 Li E'rşan dewran dana.*
*4 Mîr Sicayê sicane,*
*5 Nesirdînê babane,*
*6 Şêr Mehmedê Ȓeşane,*
*7 Pîrê T'ercimane,*
*8 Dawidî bin Dermane,*
*9 Ȓastî spartî gîyane,*
*10 Mîr Ĥesin Mamane,*
*11 Serwerê me her çilane,*
*12 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa şêx Fexrê Adiyane,*

*13 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 40** *1 K'ofê teyî girane,*
*2 Fiȓî, çû bûwe e'zmane,*
*3 Li e'rsan dewran dane.*

**S. 41** *1 Mîr Sicayê sicane,*
*2 Nasirdînê Babane,*
*3 Şêr Mehmed R̂eşane,*
*4 P'îrê T'ercimane,*
*5 Dawidê[2813] bin Dermane,*
*6 R̂astî spartî gîyane,*
*7 Mîr Ĥesin[2814] Mamane,*
*8 Serwerê me her çilane,*
*9 Pîrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa şex Mendê Fexrane.*

**S. 16** *1 K'ofiya teye mezinde,*
*2 Baziya li ser dixwende[2815],*
*3 P'îrê Libnano gîyano, zeynet bi suȓa şêx Hevinde,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 17** *1 K'ofiya teye bi t'ertîbe[2816],*
*2 Mêra ji ber dibir nesîbe,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, Xidir–Ilyas bi xwe neqîbe,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 39** *1 K'ofê teyî bi t'eȓtîbe,*
*2 Mêra jê dibir nesîĥete,*
*3 P'îrê Libnano gyano, Xidir–Ilyas bi xwe neqîbe.*

**S. 42** *1 Çûme dîyarî wê nûrê,*
*2 Kela te wê dixûrê,*
*3 P'îrê Libnano gyano, wê li ĥewşê, wê li sûrê.*

**S. 18** *1 Çome dîyarî k'afê o,*
*2 Min qest kir merzêt beĥrê o,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, k'asê wa li ber gizrê o,*
*4 Oy, p'îrê ez bim xulam.*

**S. 44** *1 Çûme banê k'ofê o,*
*2 Me dît merzêd beĥrê o,*
*3 P'îrê Libnano gyano, k'asê wa li ber gizirê o.*

**S. 19** *1 Çome dîyarî bihuştê,*
*2 Ew dîndare li min xweş tê,*
*3 P'îrê Libneno gîyano, cindî bû lib[a]sê ȓeş lê,*
*4 Oy, pîrê ez bim xulam.*

**S. 43** *1 Çûme dîyarî behiştê[2817],*
*2 Ew dîndare li min xweş tê.*
*3 Çendî mîr bû, lib[a]sê ȓeş lê.*

**S. 20** *1 Çome silavgehê,*
*2 Fericîme li qubehê,*
*3 P'îrê Libnano gîyano, li Comayê[2818] li Binîmayê,*
*4 Dê bi silt'an şêx Adî keyîn ibadetê, sicûdehê.*

**S. 45** *1 Çûme silavgehê,*

[2813] *Dawûd*
[2814] *Hasil*
[2815] *dixûnd*
[2816] *tertîf*
[2817] binêr: *bihuşt*
[2818] *Cîrêmayê*

*2 Fericîme li qubehê,*
*3 P'îrê Libnano gyano, li Comayê, li Binîmahê*[2819]*,*
*4 Dê bi silt'an şêx Adî bikin ibadetê û sicudehê.*

*Em di kêmin Xwedê yî t'emame!*

## 130. QEWLÊ ĤESENÊ[2820] CÊLÊ[2821 ;2822]

**S. 1** *1 Zînare, zînare,*
*2 Çî hikmekî hoy dijware,*
*3 Ĥesino, ser zîna te firîne siware.*

**S. 2** *1 Zînare ji ba melik Şemsedîne,*
*2 Çî hikmekî hoy keskûne*
*3 Ĥesino, [siware] ser zîna te fiřîne.*

**S. 3** *1 Zînara, ji ya pane,*
*2 Hey Şemsê mino P'adşane,*
*3 Ĥesino, zor siwar peya dimane.*

**S. 4** *1 Hikmek hat ji ba Xwedê ye,*
*2 Dak'ete ser e'rdê ye,*
*3 Ser Ĥesine Cêlê ye.*

**S. 5** *1 Hikmek hat ji e'zmane,*
*2 Dak'ete ser Ĥesinê e'rdane,*
*3 Ser Ĥesinê Cêlane.*

**S. 6** *1 Wê li Ĥesinê Cêlê ye,*
*2 K'efte ber mewc û p'êlê ye*
*3 Sebeb Ĥesinê babe ye.*

**S. 7** *1 Wê li Ĥesinê Cêlane,*
*2 K'efte ber mewc û p'êlêt girane,*
*3 Sebeb Ĥesin ji babane.*

**S. 8** *1 Borê Ĥesin bînin,*
*2 Li sûka zanînê dînin,*
*3 Ĥesinê Cêlê li ser zînin.*

**S. 9** *1 Bore Ĥesin anî,*
*2 Li sûka me'rifetê danî,*
*3 Ĥesinê Cêlê ne ser meydana nû anî.*

**S. 10** *1 Bori Ĥesin şê ye,*
*2 Li sûka me'rifetê tê ye,*
*3 Ĥesinê Cêlê hot, nebir ser hole ye.*

**S. 11** *1 Wê li Ĥesinê minî p'îre,*
*2 Bi dilq û t'anced feqîre,*
*3 Ĥesino, ma tu nizanî şêx Şems*[2823] *wezîre.*

[2819] *li cihê mayê libinê mayî*
[2820] *Hesin*
[2821] *CELÊ*
[2822] [50] (гг. 340- 343)
[2823] *şê Şims*

**S. 12** *1 Wê li Ĥesinê minî p'îrîye,*
*2 Bi dilq û t'anced feqîrîye,*
*3 Ĥesino, tu zanî şêx Şems wezîre ser K'ursîye.*

**S. 13** *1 Ĥesino, tu mestî an dinî?*
*2 Şiva hinerê dest hilînî,*
*3 Şêx Şems guharê zêr̂î ji guhê Ĥesinê Cêlê dertînî.*

**S. 14** *1 Ĥesino, tu mestî an sikranî,*
*2 Şiva hinerê dest hilanî,*
*3 Guharê zêr̂î ji guhê Ĥesinê Cêlê deranî.*

**S. 15** *1 Wê li Ĥesinê minî ser meste,*
*2 Şiva hinerê hilgirtiye bi deste,*
*3 Şêx Şems Ĥesinê Cêlê ji maş existe.*

**S. 16** *1 Wî guhar zêr̂îne,*
*2 Şêx Şems ji guhe Ĥesinê Cêlê der anîne,*
*3 Ĥesinê Cêlê hate mal digrîne.*

**S. 17** *1 Wê li Ĥesinê minî bi dewlete,*
*2 Ji serî çû ĥiş û aqil dewlete,*
*3 Ĥesino, tu nizanî şêx Şems mîre, maş didet û maş dibete.*

**S. 18** *1 Ĥesin dibêjit : «Wexteki ez maşxur bûm,*
*2 Xwedan[2824] guhar zêr̂î zer bûm,*
*3 Li dîwana silt'an şêx Adî bi Hevrême bi ĥeq ser bûm».*

**S. 19** *1 Xelat ji ĥeft r̂enga,*
*2 Dana bo sûka tenge,*
*3 Mêre ser gotin, û qale, û cenge.*

**S. 20** *1 Xelatê nûranî,*
*2 Ji xezîna qudretî deranî,*
*3 Li sûka me'rifetê danî.*

**S. 21** *1 Ĥesin dibeje: «Ji k'engî ĥeta bi k'engî,*
*2 Bi celis û r̂ewaqa şêx Adî bêta dengî»,*
*3 Careke dî Ĥesinê Cêlê veger̂î ser vî r̂engî.*

**S. 22** *1 K'engî qiyamet dê r̂a bî,*
*2 Li celis û r̂ewaqa şêx Adî r̂awesta bî,*
*3 Ĥesinê Cêlê careke dî bi xelata şêx Şems de şa bî.*

**S. 23** *1 Ĥesin dibeje: «Banga mine şêx Adî,*
*2 Xweşewîstê mino, li vê mehderê r̂a bî,*
*3 R̂ewşa Ĥesinê Cêlê ji dest şêx Şems yî tengav bî».*

**S. 24** *1 Banga mine şêx Şems bewaye,*
*2 Xwesewiste min, li vê mehderê r̂abe,*
*3 R̂ewşa Ĥesinî ji dest şêx Şems yî tengave.*

**S. 25** *1 Banga mine feqîrêt gorî,*
*2 Xweşewîstê mino, li vê mehderê mebin gorî,*
*3 Şêx Şems Ĥesinê Cêlê vala kir ji sur̂ê.*

[2824] *xudan*

**S. 26** *1 Banga mine şêr Avdel Omere,*
*2 Xweşewîstê mino, li vê mehderê were,*
*3 Şêx Şems li Ĥesinê Cêlê buye mefere.*

**S. 27** *1 Banga mine sitiya Zine,*
*2 Wa dibeje Şems Ezdîne,*
*3 Xelatê Ĥesinê Cêlê, bora bizivrîne.*

**S. 28** *1 Sitiya Zin dibeje: «Şêx Şemso, tu bi Xwedê key,*
*2 Tu bi şêre şêx Fexrê key,*
*3 Tu xelatî Ĥesinê Cêlê bora fire key».*

**S. 29** *1 We dibeje Şemsê Ezdine:*
*2 «Bi sere xweşewist melik Fexredîne,*
*3 Min r̂eda li Ĥesinê Cêlê nine»,*
*4 Ĥesinê Cêlê hate male, lê buye girîne.*

*Em dikemin, Xwedê yi t'emame!*

## 131. QEWLÊ NUĤ P'ÊẌEMBER[2825]

**S. 1** *1 K'ifir bûn hindî qewmê Nuĥe,*
*2 Pîr û kal, şeng û şoẍe[2826],*
*3 Gotine Nuĥî: «Gala te doxe».*

**S. 2** *1 Nuĥî ji Xwedê xwe xwest,*
*2 Ewine nayêne r̂êka r̂ast,*
*3 Ji k'ifirîya bûyîne mest.*

**S. 3** *1 Xwedê go: «Ya Nuĥ, sefinê çêke,*
*2 Bi cavdêrîya me r̂êk û p'êk ke,*
*3 Hincî mexluq cot-cot lêke».*

**S. 4** *1 Nuĥ p'êẍember sefine çêkir,*
*2 Însan, teyr, tewal lê kir,*
*3 Nêr, mê cot-cot lê kir.*

**S. 5** *1 Li Êsvinê[2827] kalî tenur,*
*2 R̂abû avek r̂eş û sur,*
*3 K'ifirî kirin gor̂ bi gor̂.*

**S. 6** *1 Sefîn r̂abû ser avê,*
*2 Ço R̂ojhelat, R̂ojavê,*
*3 Bakur, Başur da avê.*

**S. 7** *1 Xwedawende me li sefinê ĉavdêre,*
*2 Ajote çar kenare dîr̂e,*
*3 Zivirande mergeha mîre.*

**S. 8** *1 Sefine niqul bû, av k'ete sere,*
*2 Marî xwe xir kir, da bere,*
*3 Ajote Laliş, got: «Xweş ware!»*

---

[2825] [2] (rr. 322-325)
[2826] *şox*
[2827] ango *Eyîn Sefîn*

**S. 9** *1 Be'dî wan ĥeywane,*
*2 Qewmek dahir dibî, bê îmane,*
*3 Ew jî dixeȓiqin bi ava t'ofane.*

**S. 10** *1 Poşî wê bêt Mûsaye,*
*2 Ew jî kelîmî Ellaĥye,*
*3 Mifade[2828] bo cuwaye.*

**S. 11** *1 Poşî dahir di bit Îsê bê babe,*
*2 Fele qewî pê di şabe,*
*3 Axirzeman dê ȓabe.*

**S. 12** *1 Poşî dêhêt nebîy axirzemanî,*
*2 Dahir di bit nov e'rebistanî,*
*3 Serîet dibî erk'anî.*

**S. 13** *1 Piştî çar ĥezar salan t'emame,*
*2 Dê dahirbit susê zemane,*
*3 Diket hikmê not û neh salane.*

**S. 14** *1 Dahir dibit li Xoȓistan[ê] T'ercal,*
*2 Du dik'evin çend pîr û kal,*
*3 Cêşê wî hindî xîze, piȓ ciwal.*

**S. 15** *1 Dê nazil bit Îsê nûranî,*
*2 Siwarê bora zu hanî,*
*3 Şîrê wî, yê silt'anî.*

**S. 16** *1 Tawis melek' û Êzîde,*
*2 Cêşê wan, yê şedîde,*
*3 Harî Îsê biken gel etîde.*

**S. 17** *1 Cêşê T'ercal li Şamê cema' bûn,*
*2 E'limê wan dulkê kera bûn,*
*3 Av li beĥra zuha bûn.*

**S. 18** *1 Îsê ba kire[2829] Tawisî,*
*2 Harî min bi cin husî,*
*3 Lê bistînin bê[y]t il-Qudsîy.*

**S. 19** *1 Li Şame cenga qewîye,*
*2 Xûn ço wek coyîye,*
*3 T'ercal li wê kuştîye.*

**S. 20** *1 T'ercal ewê diroce,*
*2 Ilmê wî xave, p'uĉe,*
*3 Heval kire doz doce.*

**S. 21** *1 Piştî sê ĥezar salan,*
*2 Gurg diçêrî gel mihan,*
*3 Mar yarîya dike gel t'ifalan.*

**S. 22** *1 Paş dê hêt dengê nefîre,*
*2 Li e'zmanî û e'rdê qîre,*
*3 Derge girt xêr û bere.*

---

[2828] *mife'ete*
[2829] *bakir* ango *bang kire*

**S. 23** *1 Qadî r̂unişt ser t'extî,*
*2 Her kes e'mel baş nextî,*
*3 T'erazî bi destê xuwa bextî.*

*…………………………………,*
*…………………………………,*
*……………………………… .*

*(Ew qewle ne yî t'emame û çend sebeqe ji yê di kuvîne.)*

## 132. QEWLÊ EYÛB P'ÊẌEMBER[2830]

**S. 1** *1 Ĥemû pêẍmbera bînin,*
*2 Ĥemû weliya bi bicivînin,*
*3 Arameke wekî arama Eyûb nebînin.*

**S. 2** *1 Eyûb aramê çê ye,*
*2 Kurm xwaribû pê ye,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te Xwedê ye».*

**S. 3** *1 Eyûb aram çake,*
*2 Kurma xwaribû saqe,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te ya r̂izaqe».*

**S. 4** *1 Eyûb arame k'oke,*
*2 Kurma xwaribû çoke,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te ya Xwedaye p'ake».*

**S. 5** *1 Eyûb arame hana,*
*2 Kurma xwaribû r̂ana,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te ya meleke li e'zmana».*

**S. 6** *1 Eyûb sebre li nike,*
*2 Kurma xwaribu zike,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te ya xaliqe».*

**S. 7** *1 Eyûb arame gişte,*
*2 Kurma xwaribû pişt u tenişte,*
*3 Eyûb sipasî ji Xwedê dixwaste.*

**S. 8** *1 Eyûb arame hinde,*
*2 Kurma xwaribû zende,*
*3 Eyûb sipasî ji navê Xwedê dixwende.*

**S. 9** *1 Eyûb arame bûwe,*
*2 Kurma xwaribû sto û r̂ûwe,*
*3 Eyûb sipasî ji navê Xwedê dixwest zûwe.*

**S. 10** *1 Eyûb arame here,*
*2 Kurma xwaribû sere,*
*3 Eyûb got: «Sipas ji te ya Melikê[2831] her û here».*

**S. 11** *1 Eyûb sê tişt mane,*
*2 Ĉave, û dile, û zimane,*

[2830] [50] (rr. 86-88)
[2831] *melek*

*3 Ziman dixwîne pirtûkane,*
*4 Dil k'ursiya yarê dilovane.*

**S. 12** *1 Kurmê Eyûbî zere,*
*2 Li leşê Eyûbî geȓêya seransere,*
*3 Tiştek nedît ji xwe ȓa,*
*4 Eyûb got: «Sipas ji te ya Melikê her û here».*

**S. 13** *1 Kurmê Eyûbî sore,*
*2 Li leşê Eyûbî geȓêya dormandore,*
*3 Tiştek nedît ji xwe ȓa,*
*4 Eyub got: «Sipas ji te ya Melikê li jore».*

**S. 14** *1 Kurmê Eyûbî ȓeşe,*
*2 Li leşê Eyûbî geȓêya ferş bi ferşe,*
*3 Tiştek nedît ji xwe ȓa,*
*4 Eyûb got: «Sipas ji te ya Melikê E'rşe».*

**S. 15** *1 Kurmê Eyûbî sipîye,*
*2 Gehişte serê dilîye,*
*3 Devê Eyûbî wê dinalîye.*

**S. 16** *1 Surgir Cebraîl*[2832] *wê lê dixurîye,*
*2 Eyûbo, bes binalîye,*
*3 Dê te ji paya mêra kem xalîye.*

**S. 17** *1 Cebraîlê axîye,*
*2 Çû gehişte mandîye,*
*3 Ȋnabu şiva şîyanîye,*
*4 Ser leşê Eyûbî danîye,*
*5 Leşê Eyûbî çêtir kir, ȟeft cara ji cara berîye.*

**S. 18** *1 Hole hola leşe Eyûbî bû çiyayekî pola,*
*2 Eyûbî hola xwe biribû ser hola.*

## 133. QEWLÊ ÛSIFÊ NEBÎYA[2833]

*Bi destûrî Xwede!*
**S. 1** *1 Medih û sena ji e'rda,*
*2 Layîqîn bikin geȓda,*
*3 Me ji Aqûbî xeber da.*

**S. 2** *1 Nexşa sûreta Usif Xwede çêkir,*
*2 Û ew navê şîrinî*[2834] *şîrin lêkir,*
*3 Seyrî û seyran têkir.*

P'êẍember Aqûb (Yaqûb) 12 kur hebû, 10 kur ji dayekê, û 2 (Ûsif û Binyamîn) ji dayekê bûn.

**S. 3** *1 Ewan deh kura girtibûn biryare,*
*2 Û li Ûsif girtibûn ȓik û neyare,*
*3 Gotin bila Ûsif nemînit li van ware.*

**S. 4** *1 Evan kura kiribûne qestan,*
*2 Di ber Aqûbî vediwestan,*

---

[2832] *Cibraîl*
[2833] [50] (rr. 574-578)
[2834] *şirîn*

*3 Gotin: «Ya bavo, Ûsif nêĉir ji me dixwestan».*

**S. 5** *1 Aqûb bo wan kuran got:*
*2 «Gelî kura, hun Xwede dihebînin,*
*3 Usif berî r̂oava ji min r̂a bînin».*

**S. 6** *1 Ew çûne r̂ave û pêda,*
*2 Bîrek dîtin li devê r̂êda,*
*3 Bi deste Ûsif girtin û havêtine têda.*

**S. 7** *1 Bele Xwedê we nekire firware,*
*2 Wê gavê emîn Cebraîl*[2835] *dihinare,*
*3 Ûsif di binî bîr da li berekî dikire siware.*

**S. 8** *1 Ewan kura çûn r̂av kirin,*
*2 Û gurek dîtin û zincir kirin,*
*3 Û kuştin, û pê kirasê Ûsif xwîn kirin.*

**S. 9** *1 Aqûb dengek dihilanî,*
*2 K'anî Ûsifê minî Kena'nî,*
*3 K'anî cewhere minî Elmanî.*

**S. 10** *1 Hawar û sed haware,*
*2 Gotin: «Ya babo, em mijûlbûn li avare,*
*3 Me dît gurekî Ûsif bir û xware».*

**S. 11** *1 Aqûb dengek r̂adihişte,*
*2 Çiqas gur li beriye, û ĉiya, û deşte,*
*3 Ĥemû dihatin li ber Aqûb û diweste.*

**S. 12** *1 Hatin gurêt ker̂ û lale,*
*2 Li menzilê pênc sed sale,*
*3 Çiqas mîh û berx li we ĥelale,*
*4 Heke we ji Ûsif heye hevale?*

**S. 13** *1 Gura sund dixwarin bi t'emamî,*
*2 Çend cizû hene bi k'itêb û kelamî,*
*3 Me hayî Ûsif nîne bi çû e'lamî.*

**S. 14** *1 Gur sund dixwarin bi kove,*
*2 Û sed cizû heye bi meskove*
*3 Me hayî Ûsif nîne yî bi k'uve.*

**S. 15** *1 Gur dibêjin: «R̂anê me yî şkestî bit,*
*2 Û qirka me bir̂î bit,*
*3 Heke me goşte Ûsif gestî bit.*

**S. 16** *1 Dema Aqûb bû dil birîndare,*
*2 K'efte nav tozê û xubare,*
*3 Aqûb ji gava kor bû êk care.*

**S. 17** *1 Bazirganê Misrê bi k'ar bû,*
*2 Malê zorî zav li bar bû,*
*3 Hat li devê bîrê penar bû.*

**S. 18** *1 Dê avê dene dev*[2836] *û dewerê*[2837]*,*

---

[2835] *Cibraîl*
[2836] *def*
[2837] *dewarê*

*2 Dewlcî dest havete dewlê,*
*3 Te dîm fermane ji mewlê,*
*4 Ûsif li binê bîrê girtî dewlê.*

**S. 19** *1 Dewlcî got: «Dewla min bi giranî di têye,*
*2 Ronayek li ber têye,*
*3 Xwede xer ket vê carê ye».*

**S. 20** *1 Bazirganê Misrê malê zorî zav heye l ibale,*
*2 Bi xewleyekê k'efte li nava pale*
*3 Got: «Heke r̂ewanbû ji mira, û ji were heke male».*

**S. 21** *1 Ûtûrmiş xane dale,*
*2 Deng r̂ahişte delale,*
*3 Werine ciwan û cemale.*

**S. 22** *1 Mirek li Misrê hebûye, bê ĥal bû,*
*2 Û bi gîyanî nebe betal bû,*
*3 Sê girêt der jê li bal bû,*
*4 Hat ji xwe r̂a bi kirê, u kirya bû.*

**S. 23** *1 Çî xatuneka gerden nûre,*
*2 Hem cêriyêt xwe xwendine jore,*
*3 Got: «Werin heyran bo min bînin şore».*

**S. 24** *1 Dema Ûsif derk'eft wekî siwarê deştê,*
*2 Û Zelîxa beziya û çû digehiştê,*
*3 Kirasê Ûsif qetandibû ĥeta piştê.*

**S. 25** *1 Ûsif çû dibeziye,*
*2 Û Zelîxa çû di gehiye,*
*3 Kirasê Ûsif qetandbû ĥeta p'iye.*

**S. 26** *1 Zelîxa çû ba mîrî û digote:*
*2 «Ya mîro, benîyekî te heye,*
*3 E'slê wî t'uneye,*
*4 Ĉavê wî li nivîna teye».*

**S. 27** *1 Mîrîi şand pê Ûsif, go bila bê,*
*2 Heke ev gotin ye r̂ast bê,*
*3 Cihê te wê zêndan bê.*

**S. 28** *1 Ûsif dibêjeye mîre:*
*2 «Delîlê min xwedayê qedîre,*
*3 Û biçûkek heye li ber şîre,*
*4 Ew bi van wateya yî jîre».*

**S. 29** *1 Mîrî şande pê wî biçûkî û anîye,*
*2 Biçûk kelî û got: «Ya mîro, bi wî kem yî îlaĥîye,*
*3 Ûsif ji vê xeberê yî bêrî ye».*

**S. 30** *1 Dema Ûsif li zêndanê biwe,*
*2 Du yî di jî, li wê biwe,*
*3 Ew bi wan r̂e sê biwe.*

**S. 31** *1 Mîrî xewnek hebû li bale,*
*2 Çarde Gay ji e'zmana dihatine xware,*
*3 Ĥeft yê bi bez bûn, û ĥeft yêt qore.*

**S. 32** *1 Jîrêt mîrî gotine:*
*2 «Zendaniyekî te heye bi qeyd û zincîre,*
*3 Tu bişîne pê, ew li van xewna yî zana û jîre.*
*4 Ew dê bo te şiroveket, û danit t'ekbîre».*

**S. 33** *1 Ûsif hate dîwana mîrî û got:*
*2 «Ĥeft sal dibine erzanî,*
*3 Û kes berê xwe nedete nanî,*
*4 Û dexil û dan dimîne li bêderan û banî.*

**S. 34** *1 Û ĥeft sal dibine giranî,*
*2 Û bi dest nakevit pariyê nanî*
*3 Û ne mîh dimînit û ne beranî».*

**S. 35** *1 Gava xela hat û dibuhirî,*
*2 R̂abûn sibeyekê mîr we mirî,*
*3 Û t'extê Misrê, Ûsif ji xwe r̂a birî.*

*Em di kemin, Xwedê t'emame!*

## 134. QEWLÊ MÛSA[2838; 2839; 2840]

**S. 1** *1 R̂ojekê ji r̂ojane,*
*2 Mûsa wê dixunit k'itêb û mişûrane*[2841]*,*
*3 Ezraîl*[2842] *û Cebraîl*[2843] *li mezela Mûsa bûne mêvane.*
**S. 1** *1 R̂ojekê ji r̂ojane,*
*2 Mûsa wê dixunit mişûran û k'itêbana,*
*3 Ezraîl û Cebraîl*[2844] *li mezela Mûsa bûne mêvane.*
**S. 1** *1 R̂ojekê bû t'aqet,*
*2 R̂îya axî Cebraîl*[2845] *mala Mûsa k'et,*
*3 Mûsayê min pirs bike axîyê çi qismete.*

**S. 2** *1 Sibeyeke ji xilfete,*
*2 Mûsa wê dixwinit mişûran û xete,*
*3 R̂êya Ezraîl û Cebraîl li mezela Mûsa dik'efte.*
**S. 2** *1 Sibeyeke p'ir̂ xilfete,*
*2 Mûsa wê dixunit mişûran û xete,*
*3 R̂êya Ezraîl û Cebraîl li mezela Mûsa dik'ete.*

**S. 3** *1 Mûsa wa deng dikete:*
*2 «Ya Cebraîl we çi xilmete?*
*3 Îro gîyanê min ji ber we girtibû ĥeybete!»*
**S. 3** *1 Mûsa deng dikete:*
*2 «Ya Cebraîl we çî xilmete?*
*3 Îro gîyanê min ji ber we girtibû ĥeybete!»*

**S. 4** *1 «Ya Mûsa bes bike sexbêre,*
*2 R̂abe r̂uĥê xwe bi me bispêre,*
*3 Hate ser te mersuma Cebêre».*
**S. 4** *1 «Ya Mûsa, bes bike sexbêre,*

---

[2838] [2] (rr. 642-645); "Gundiyatî" P'îr Xidir p'îr Silêman di sala 1984an de nivîsandiye û piştre Îdo Baba Şêx
[2839]. [51] *Qewlê fiwara Mûsa* (rr. 88-90);
[2840] *Qewlê Mûsa p'êxember.* [29] (rr. 366-368) (№ 1692)
[2841] *mişur*
[2842] *Ezrayîl*
[2843] *Cibrayîl*
[2844] *Cîbraîl*
[2845] *Cibraîl*

*2 R̂abe, r̂uh̄a xwe bispêre,*
*3 Hate ser te mersuma Cebêre».*

**S. 5** *1 Mûsa dibêjit: «Bi wî kem, êkî Ẍefûre[2846],*
*2 Ez li r̂uh̄a xwe nakem destûre,*
*3 K'ulfetê min hêjî hûre».*

**S. 5** *1 Mûsa dibêjit: «Bi wî kem, êkî Ẍefûre,*
*2 Ez li r̂uh̄a xwe nakem destûre,*
*3 K'ulfetê min hêj yê hûre».*

**S. 2** *1 «Ez wî kim, êkî Ẍefûrî,*
*2 Ez r̂uh̄ê xwe te r̂a nakim destûrî,*
*3 Ez t'enême, k'ulfetê minî hûrî».*

**S. 6** *1 Wa dibêjit Cebraîlê emîne:*
*2 «Ya Mûsa r̂eben E'mirîne.*
*3 R̂isqê[2847] k'ulfetê we wê li Xwedê be, li te nîne!»*

**S. 6** *1 We dibêjit Cebraîlê emîne:*
*2 «Ya Mûsa bin E'mirîne.*
*3 R̂isqê k'ulfetê te wê li Xwedê, li te nîne!»*

**S.3** *1 Go: «Mûsayê bin E'mrano,*
*2 — Go — r̂oja negir ne înano,*
*3 R̂isqê k'ulfet ser mile min, te nine, k'efa Xwedayê[2848] mine».*

**S. 7** *1 «Ya Mûsa, r̂abe û hilweste,*
*2 Em dê berbi beh̄rê keyîne qeste,*
*3 Dê firwara Xwedê nîşa te keyîn dest bi deste».*

**S. 7** *1 «Ya Mûsa, r̂abe û hilweste,*
*2 Em dê berbi beh̄rê keyne qeste,*
*3 Dê firwara Xwedê nîşa te keyn dest bi deste».*

**S. 8** *1 Mûsa r̂abû hilweste,*
*2 Ewan berbi beh̄rê kire qeste,*
*3 Emîn Cebraîl şiva qudretê hilgirtibû bi deste,*
*4 Li beh̄rê da, ba ji h̄eybetê dû telî ji ber vediweste.*

**S. 8** *1 Mûsa r̂abû, hilweste,*
*2 Ewan berbi beh̄rê kir qeste,*
*3 Emîn Cebraîl şiva qudretê hilgirtbû bi deste,*
*4 Li beh̄rê da, ji h̄eybetê dû telî ji ber vediweste.*

**S. 4** *1 Mûsa Cebraîl va beh̄r[2849] kir bûne qeste,*
*2 Devê beh̄rê kevirek, taşek wê derêye, qamçî lêdixiste.*

**S. 9** *1 Hey P'adşê minî P'adşa!*
*2 Binê beh̄rê kirme û daşe*
*3 Devê kirmî p'elqek maşe!*

**S. 9** *1 Hey P'adşê mino yî P'adşa!*
*2 Binê beh̄rê kurme û daşe,*
*3 Devê kurmî p'elqek maşe.*

**S. 5** *1 Ewî taşî waraya bû başe,*
*2 Kurmekî çîlî qerqaş nave,*
*3 Herr̂o sere sibê belgeke şîn jê r̂a maşe.*

**S. 10** *1 Mûsa ji wê dihate male,*
*2 Wê jê dipirsin dayî û h̄elale:*
*3 «Hey Mûsayê mino yî dêm şemale,*
*4 Îro xulqê te gelekî tale?»*

---

[2846] *xefûr*
[2847] *r̂izq*
[2848] *Xuda*
[2849] *be'r*

**S. 10** *1 Mûsa ji wê dihate male,*
*2 Wê jê dipirsin dayî û ĥelale:*
*3 «Hey Mûsayê mino yî dêm şemale,*
*4 Îro xulkê te gelekî tale?»*

**S. 6** *1 Mûsa vegeȓîya male,*
*2 Berda hatibû dayîka kale,*
*3 Mûsa go: «Beşera te herȓo bi xweşe, îro çima qewî mi tale[2850]?»*

**S. 11** *1 Mûsa dibêjite dîya kale:*
*2 «Ya dayê şîr û berê xwe li min bike ĥelale,*
*3 Hate ser min mersûma Bêrî[2851] Te'ala».*

**S. 11** *1 Mûsa dibêjite diya kale:*
*2 «Ya dayê şîr û berê xwe li min bike ĥelale,*
*3 Hate ser min mersûma Bêrî[2852] Te'ala».*

**S. 7** *1 «Dayîka mine kale,*
*2 Şîrê bedena min bike ĥelale,*
*3 Hatîya ser min ferwara melike[2853] Cebare.*

**S. 8** *1 Dayîka mine pîre,*
*2 Ferĥa bike mi şîre,*
*3 Hatîya ser min ferwara mîre».*

**S. 12** *1 Dayîka Mûsa şîrê xwe lê ĥelal kirîye,*
*2 Mûsa ji wê diȓevîye,*
*2 Hin ȓevî, ĥeta serê wî bi taliya qulniçka dinyayê k'eftîye.*

**S. 12** *1 Dayîka Mûsa şîrê xwe lê ĥelalkirî,*
*2 Mûsa ji wê der diȓevî,*
*3 Hind ȓevî ĥeta serê wî bi qurneta dinyayê k'evî.*

**S. 13** *1 Mûsa ji wê vedigeȓiye,*
*2 Dîtin du ciwanêt qîmetiye,*
*3 Wê t'irbekê dik'oliye,*
*4 Çu cinaza dîyar nîye.*

**S. 13** *1 Mûsa ji wê vedigeȓîye,*
*2 Dîtin du ciwanêt qîmetîye,*
*3 Wê t'irbekê dik'olîye,*
*4 Çu cinaza dîyar nîye.*

**S. 9** *1 Mûsa ȓabû ji mal ȓevî,*
*2 Ber k'etibû ax û berî,*
*3 Dîbû du canê qîmetî.*

**S. 10** *1 Go: «Xwedê xêra we binivişte[2854]».*
*2 Ewan jî go: «Hevalê xêra bî».*

**S. 11** *1 Go: «Gelî canê qîmetî,*
*2 Çi t'irbe hûn dik'olin,*
*3 Go hûn haş mirî hene?»*

**S. 14** *1 Cebraîl digotê: «Ya Mûsa, [me] birayek hebû,*
*2 Mala wîye li Mekke[2855] bû,*
*3 Bi bejnê herî wekî te bû,*
*4 K'a were biȓêne vê t'irbê, we bû, yan we nebû?»*

**S. 14** *1 Cebraîl digotê: «Ya Mûsa, me birayek hebû,*

---

[2850] *te'l*
[2851] *Barî*
[2852] *Barî*
[2853] *melk*
[2854] *binvşe*
[2855] *Mêka*

*2 Mala wîye li Mekke bû,*
*3 Bo bejnê her wekî te bû,*
*4 K'a were biȓêne vê t'irbê, k'a we bû, yan we nebû?»*

**S. 12** *1 Go: «Mirîkî me malû Mekke,*
*2 Bejn, û bal, û qedera teke,*
*3 Were bik'eve nav, çika weke, yan ne weke?»*

**S. 15** *1 Derê t'irbê li hasil dena,*
*2 Aliyek axe, yek xena,*
*3 Gotê: «Birano, neku li min biken fena?»*

**S. 15** *1 Derê t'irbê li hasil dena,*
*2 Aliyek axe, yek xena,*
*3 Gotê: «Birano, neku li min biken fena?»*

**S. 13** *1 Mûsa k'ete t'irbê da,*
*2 Mûsa go: «Berê vê t'irbê kene,*
*3 Jê derk'etîye ax, û ber, û xene,*
*4 E'zetê şêx Adî go, eva t'irba mine, belê fene».*

**S. 14** *1 Go: «Berê vê t'irbê ȓeşe,*
*2 Jê derk'etîye ax, û ber, û ferşe,*
*3 Eva t'irba bîn û buxsa*[2856] *wê gelek mi*[2857] *xweşe».*

**S. 16** *1 Derê t'irbê yî hinda,*
*2 Ji qewlê Şêx Hevinda*
*3 Mûsa ȓazabû di binda.*

**S. 16** *1 Derê t'irbê yê hinda,*
*2 Ji qewlê Şêx Hevinda*
*3 Mûsa ȓazabû di binda.*

**S. 17** *1 Derê t'irbê yî ȓeşe,*
*8 Ser singê Mûsa ȓaxistbûn ax û ferşe,*
*9 Mûsa got: «Bêhna vê t'irbê bi min geleke xweşe!»*

**S. 17** *1 Derê t'irbê yê ȓeşe,*
*2 Ser singê Mûsa ȓaxistbûn ax û ferşe,*
*3 Mûsa got: «Bêhna vê t'irbê li min gelek xweşe*[2858]*!»*

**S. 18** *1 Derê t'irbê yî zere,*
*2 Ser singê Mûsa ȓaxistbûn ax û bere,*
*3 Mûsa got: «Mirin ĥeqe û goȓ fere!»*

**S. 18** *1 Derê t'irbê yî zere,*
*2 Ser singê Mûsa ȓaxistibûn ax û bere,*
*3 Mûsa go: «Mirin ĥeqe û goȓ fere!»*

**S. 15** *1 Berê vê t'irbê zere,*
*2 Jê derk'etîye ax û bere,*
*Dahir*[2859] *bû şêxê minî nedere.*

**S. 16** *1 Ĉav bûne t'ase,*
*2 T'ilî bûne ȓîsase,*
*3 Neynûk weke almase,*
*4 Sed xazil heçê cahilî bê sûcî, bê gune yî, bê binase,*
*5 Ȓoja bandê şêxê xwe bive xilase.*

**S. 19** *1 Mûsa k'ilîmçiyekî çêye,*
*2 Ewî ȓojê not û neh k'ilîme li gel Xwedêye*[2860]*,*

---

[2856] *buxza*
[2857] forme kurtî: *min*
[2858] *xoş*
[2859] *deher*
[2860] *Xwidê*

*3 Ew jî ço, serê wî li nav axêye*
**S. 19** *1 Mûsa k'ilîmçiyekî çêye,*
*2 Ewî r̂ojê not û neh k'ilîme li gel Xwedêye,*
*3 Ew jî ço, nav axêye*

**S. 20** *1 Mûsa k'ilîmçiyekî çê bû,*
*2 Ewî r̂ojê not û neh k'ilîme li gel Xwedê bû,*
*3 Ew jî çû serê wî li nav axê bû.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 135. QEWLÊ MÛSA P'ÊẌEMBER Û XIDIRÎ ZÊNDE[2861; 2862]

**S. 1** *1 Pirsa me ji şêx Fexrê Adîye,*
*2 Suhbeta Mûsa li gel Xidirê Zendîye,*
*3 K'a çawa bû û çî di cerîye.*
**S. 1** *1 Pirsa me ji Fexrê Adiya biket beyane,*
*2 Suhbeta Mûsê gel Xidir biket e'yane,*
*3 Ji te r̂a ez bibim qurbane.*

**S. 2** *1 Xidir xewasê beĥra ye,*
*2 Ĉêr li cew Mûsa ye,*
*3 Dîtina wan p'êkve va ye.*

**S. 3** *1 Mûsa pirsyarek ji P'adşê[2863] xwe[2864] kirbû,*
*2 Go: «Kesek ji min e'limtir[2865] nebû,*
*3 Heke êk heye li k'êderê bû».*
**S. 2** *1 Mûsê[2866] gel R̂ebê xwe gift û go kirbû:*
*2 «Ji min li dinê e'limtir[2867] nebû,*
*3 Heger heye, li k'êderêye û li k'o dibû?»*

**S. 4** *1 Êzdanî go: «Ya Mûsa,*
*2 Ezim alîmê[2868] ĥemû ilma[2869],*
*3 Dizanim [li] E'rşa, li ferşa li ĥemû dema.*
**S. 3** *1 Êzdanî go: «Ya Mûsa, ezim alîmê ĥemû ilma,*
*2 Dizanim li E'rş, û ferş, û dema.*

**S. 5** *1 Ji ilmê xwe yê batinê,*
*2 Min hinek wê daye vê dinê,*
*3 Û min hinek wê daye Xidirê Zêndî bi t'inê».*
**S. 4** *1 Ji ilmê xwe yî batinê,*
*2 Min hindek da dinê,*
*3 Hinek da Xidirê Zênde t'inê».*

**S. 6** *1 Mûsa go: «Ya alîmê ilma,*
*2 Min di vêt ezû bi bîn ma,*
*3 K'a li beĥra ye yan jî li dêma».*
**S. 5** *1 Mûsê go: «Ya alîm, ya kelîm,*

---
2861 [2] (rr. 329-332)
2862 *Lalish* 41 K A 2015 (rr. 31-34). Belevkirin: Pir Xelat Alyas Ce'fo. https://ru.calameo.com/books/002518317a11dbf98e1ff
2863 *pedşe*
2864 *xo*
2865 *alemtir*
2866 *Musa*
2867 *êlimtir*
2868 *e'lim*
2869 *e'lim*

*2 Min divê ez wê bibîm*
*3 Li k'u cîye li behre, yan jî dêm?»*

**S. 7** *1 Mûsa li milê xwe kir k'eşkûle*[2870]*,*
*2 Geȓiya li her beȟra û binêt şewle,*
*3 Dît zergunekî bi ibadet*[2871] *mijule.*
**S. 6** *1 Mûsa li mile xwe kir k'eşkûle*[2872]*,*
*2 Geȓiya li cem beȟra û binê dole,*
*3 Dît zergunek ibadet şole.*

**S. 8** *1 Mûsa gotê: «Tu bi wî keyî êkî R̂eȟmanî,*
*2 Tû k'î û çî dikeye li ser derêt r̂êyanî,*
*3 Bo xatira çakên Xwedê*[2873] *li e'rdî û e'zmanî*[2874]*».*
**S. 7** *1 Mûsê go: «Bo min bêje bi R̂eȟmanî,*
*2 Tu k'îyî, çî dikî li derê deriyanî?*
*3 Bi xatira Xwedê û xasêt cihanî».*

**S. 9** *1 Xidir go: «Ez Xidirê Zêndîme,*
*2 Ji enzel da Xwedê ez dayîme,*
*3 Ez suȓa yarê Bêrîme».*
**S. 8** *1 Xidir go: «Ez Xidirê Zêndîme*[2875]*,*
*2 Ji enzelî e'fîrê*[2876] *Xwedême,*
*3 Suȓa*[2877] *yarê Bêrîme».*

**S. 10** *1 Suȓ, û me'rîfet, û erk'ane,*
*2 Xwedê dane min sibȟane*[2878]*,*
*3 Dizanim çend qender duȓ li beȟrane.*
**S. 9** *1 Me'rîfet, û suȓ, û erk'ane,*
*2 Xwedê da min sibȟane,*
*3 Dizanim çi qeder duȓ li beȟrane».*

**S. 11** *1 Mûsa go: «Ez ji tere xulam bim,*
*2 Ezê şagirdekî r̂ehwan bim,*
*3 Tû yî mezin û ezê gedayî bim».*
**S. 10** *1 Mûsê go: «Xidiro, ez li ba te xulam bim,*
*2 Şagir dibim, r̂ehwan bim,*
*3 Tu mezin, ez geda bim».*

**S. 12** *1 Xidir go: «Mûsa tû neşê,*
*2 Dêzivirî weke t'eşê,*
*3 Dê bi te nexweş*[2879] *bit jê».*
**S. 11** *1 Zêndî go: «Mûsê neşê*[2880]*,*
*2 Dêzivirî wak t'eşê*
*3 Li te ne nexweş bit jê*[2881]*?»*

**S. 13** *1 Musa go: «Tuyî derwêş û ezî qelender,*
*2 Û dê li gel te bim der bi der,*
*3 Ez benî û tuyî serwer».*
**S. 12** *1 Mûsa go: «Tu derwêş, ez qelender,*

---

[2870] *keskul*
[2871] *e'badet*
[2872] *keşkol*
[2873] *Xudê*
[2874] *e'sman*
[2875] *Zinde*
[2876] *afir*
[2877] *sur*
[2878] *subhan*
[2879] *nexoş*
[2880] *nikare*
[2881] *jîyan*

*2 Digel te bim ĥemû der,*
*3 Ez benî, tu serwer».*

**S. 14** *1 Herdu li merk'ebê siwar bûn bi yeqîne*[2882]*,*
*2 Xidir niqul kir bine sefîne,*
*3 Mûsa go: «Ev k'ar bi min xweş nîne».*
**S. 13** *1 Siwar bû herdu li merk'ebê bi evîne,*
*2 Xidirî niful kir binê sefîne,*
*3 Mûsa go: «Ev şole, t'u şol nine!»*

**S. 15** *1 Xidir go: «Mûsa neke çu gale,*
*2 Ev merk'eb dê bite vale,*
*3 Heke te bivêt here male».*
**S. 14** *1 Zêndê go: «Mûsa, bes bike gal-galî,*
*2 An jî heȓe malî,*
*3 Merk'eb dê bite xalî».*

**S. 16** *1 Hatine xwarê bi delîla,*
*2 Di birsî bûn mina sefîla,*
*3 Çone nêv k'olanet melîla.*
**S. 15** *1 Hatine xwarê li merk'eb bê delil,*
*2 Pirsî bûn melûl.*

**S. 17** *1 Xidir xirab kir dîware,*
*2 Sêwî mabûn bê ware,*
*3 Mûsa go: «Ne xweş k'are».*
**S. 16** *1 Zêndê xirab kir diware,*
*2 Hatîm man bê ware,*
*3 Mûsê go: «Eve ne xweş k'are!»*

**S. 18** *1 Xidir go: «Mûsa bi Êzdanî,*
*2 Heger*[2883] *te peyveke dî anî,*
*3 Tu dêzivrî bi êk carî».*
**S. 17** *1 Zêndê go: «Mûsê, ez bi Yezdanî,*
*2 Heger careke dî te peyîvanî,*
*3 Gel min nabîye xwedanî!»*

**S. 19** *1 Mûsa go: «Bila bi şert bê,*
*2 Êdî ez nabêjim Lam û Bê,*
*3 Hincî ya ji dergehê te tê».*
**S. 18** *1 Mûsê go: «Bila şert bê,*
*2 Ez nabêjim Lam û Bê,*
*3 Heçî li dergayê te tê».*

**S. 20** *1 Çone nav k'olan û male,*
*2 Xidir dît ciwanekî t'efale,*
*3 Ȓuĥ jê k'êşa, qalb ma vale.*
**S. 19** *1 Çon k'olan*[2884] *k'olan, mal bi mal,*
*2 Dît wê dibe li t'ifal,*
*3 Yek ji wan ciwan wek ĥelal.*

**S. 21** *1 Mûsa bi t'efal girtî ye,*
*2 Qalbê wî ȓuĥ jê firî ye,*
*3 Dilê Mûsa jê tirsî ye.*
**S. 20** *1 Mûsa t'ifal girtîye,*
*2 Serê wî jêkirîye,*

[2882] *êqîn*
[2883] *eger*
[2884] *kulan*

*3 Berza[2885] kirîye.*

**S. 22** *1 Jê tirsiyabû dilê Mûsa ye,*
*2 Li şûna xerê bû qedaye,*
*3 Qeyd k'efte herdu çoka ye.*

**S. 23** *1 Lê westabû dil û cegere,*
*2 Lê hinda bûn derd û pirse,*
*3 Lê bû mefer Xidir Zênde[2886].*

**S. 24** *1 Mûsa go: «Evca bese,*
*2 Were bo min bêje hese,*
*3 Êdî ev k'ar nabit wese».*
**S. 21** *1 Mûsa go: «Vêca bese,*
*2 Bo min bike gift û qise,*
*3 Şolê te na r̂ese!»*

**S. 25** *1 Xidir go: «Mûsa dibêjim ji tere,*
*2 Da diz nebin, min merk'eb niqul dikire,*
*3 Di bin dîwarî da zêr̂ hebûn, min xirab dikirê,*
*4 R̂uĥa ewî t'efalî ye zalim bû, min fena dikire».*
**S. 22** *1 Zêndê go: «Mûsa, bo te bêjm,*
*2 Merk'eb da diz ben, min niful kir,*
*3 Dîwar p'ir̂ zêr̂ bû, min xirab kir,*
*4 T'ifêl zalim bû, min fena kir».*

**S. 26** *1 Mûsa go: «P'adşê minî Celale,*
*2 Ilmê te zêdey xeyale,*
*3 Kesî eve nîne li bale».*
**S. 23** *1 Mûsa go: «P'adşê minê Calale,*
*2 Ilmê te zêdeyî xeyale,*
*3 Min eve ne li bale».*

**S. 27** *1 Wê dibêjît Xidirê Zêndî ye:*
*2 «Dibêjime we gelî êzidayî ye,*
*3 Hêvênê p'ak ji kaniya Sipî ye».*

*Em di kemin û Xwedêy t'emame!*

## 136. QEWLÊ GELÎYÊ MARÎ[2887]

**S. 1** *1 Mûsa îlaĥî [2888] il-Selame,*
*2 Xwedê dabûyê aqilekî zorî fame,*
*3 Ji k'î cî hate van cîya van miqama.*

**S. 2** *1 Ji k'î cî hate van welata,*
*2 Ji Medînê bi ĥeta Kelata,*
*3 Mûsa ji sefereke dûrve dihate.*

**S. 3** *1 Mûsa ji sefereke dûrve diêye,*
*2 Ser bacêrekî dihiltêye,*
*3 Bacêre û avayî têye.*

[2885] *berze*
[2886] *Zênde*
[2887] Bedel feqîr Ĥecî http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1554
[2888] *e'leyhî*

**S. 4** *1 Bacêr û şaristane,*
*2 R̂ahiltîyêt şûştî wêt li ser r̂istane,*
*3 Goştê sor wê li bestane,*
*4 Aş wê arî dihavêt bi mistane.*

**S. 5** *1 Aş wê arî bi mista dihavête,*
*2 Tenûre sore wekî şip'ête,*
*3 Wekî wî t'ayî xwedan ji ber dihiltête.*

**S. 6** *1 Tenûre sore vene kûştî,*
*2 Û deryê malê yî nazikî, let'îfî, miştî,*
*3 Wekî wî t'ayî xwedan ji ber dihêwiştî.*

**S. 7** *1 Mûsa yî li r̂êye,*
*2 Li wî bacêrî diger̂ya r̂ojeke, û dûwe, û sêye,*
*3 Mûsa li wî bacêrî ne dît r̂êça dû p'êye.*

**S. 8** *1 Mûsa yî bê hevale,*
*2 Li wî bacêrî ger̂iya r̂ojeke, û duwe, û sêye, û çare,*
*3 Mûsa li wî bacêrî ne dît r̂êça dû siware.*

**S. 9** *1 Mûsa yî bin E'mrane,*
*2 Pişta xwe bestibû bi Melikê*[2889] *e'zmane,*
*3 Qest kir ço sere ĉiyane.*

**S. 10** *1 Mûsa yî bin E'mrîne*[2890]*,*
*2 Pişta xwe bestibû bi Melikê e'zmîne,*
*3 Qest kir ço serê ĉiya yê t'or̂e sîne.*

**S. 11** *1 Mûsa vewesta li ĉiya,*
*2 Û ji P'adşayê*[1716] *xwe dipirsîye,*
*3 Gotê: «P'adşa, hikmê*[2891] *vî bacêrî çîye?»*

**S. 12** *1 P'adşa dibêjitê:*
*2 «Mûsa, min hebû derwêşekî xwedan îmane,*
*3 Li vî bacêrî ger̂iya sê r̂oj û sê şevane,*
*4 Êkî bi eşqî navê min ne dabûyê p'ariyek nane.*

**S. 13** *1 Min dikire firware,*
*2 Min dihinarte vî bacêrî mare,*
*3 Kiçik û mezinê bacêrî t'êkda dixware.*

**S. 14** *1 Xwerin mezin û biçûke,*
*2 Li wan e'firandin qeysêrî û sûke,*
*3 Ne zava dihêla û ne bûke.*

**S. 15** *1 Em ji ba te bi yeqînîn*[2892]*,*
*2 Û min divêt em nîşanekê ji te bistînîn,*
*3 Em wî marî bibînîn».*

**S. 16** *1 Mûsa vewesta li ĉiyave,*
*2 Û ew nîşane sitave,*
*3 Qest kir ço serê ĉiyayî marî li nave.*

---

2889 *melek*
2890 binêr: *E'mran*
2891 *pedşa*
2892 *êqîn*

**S. 17** *1 «Selamû e'lêk'ûm*[2893] *ya mihêr*[2894]*,*
*2 Tû k'eremke were hêr,*
*3 Wa bi min r̂a hey temûska Cebêr».*

**S. 18** *1 Mar dibêjitê:*
*2 «Ya Mûsa, ew ĉiyayê r̂eşî yî li himbere,*
*3 Tu*[2895] *k'eremke her̂e sere,*
*4 Fitlêt min diên bi qal û şer̂e,*
*5 Ez ditirsim fitileke min bi te bikevit,*
*6 Ez şermîn bim bi R̂ebê xwe r̂e».*

**S. 19** *1 Ew ĉiyayê bi nav Qûfe*[2896]*,*
*2 Mar li xwe didan liftan û lûfe,*
*3 T'ijî kir ĉiya û banî, û bere jor, û ser nişîve.*

**S. 20** *1 Ĉiyayê bi nav Qafe,*
*2 Û mar li xwe didan liftan û lafe,*
*3 Mûsa, wek'az îna pêşyê, go:*
*4 «Û Qifya we Qafe»*[2897]*.*

**S. 21** *1 Mûsa ji marî dipirsîye:*
*2 «Maro, tû bi Xwedê key, îlaĥîye!*
*3 Tu bêje min meznatîya te ev ye yan hindeke dîye?»*

**S. 22** *1 Mar dibêjitê:*
*2 «Mûsa, bi wî key*[2898] *hindave,*
*3 Min sê fitil heyine bi nave,*
*4 Eve fitil û nîvin,*
*5 Fitil û nîv wê di mayin dibin ĉiya ve».*

**S. 23** *1 Mûsa ji marî dipirsîye,*
*2 Gotê : «Maro, tû bi Xwedê key, îlaĥîye!*
*3 Tû dê bêjîye min r̂astîye,*
*4 K'a nav beyna şevê û r̂ojê xwerina te çîye?»*

**S. 24** *1 Mar dibêjitê:*
*2 «Mûsa bin*[2899] *E'mrîne,*
*3 Heke te bi min bêt bawerî û yeqîne,*
*4 Nêv beyna şevê û r̂ojê xwerina min sê girhêt axêne».*

**S. 25** *1 Mûsa ji marî dipirsîye:*
*2 «Maro, tû bi Xwedê key, îlaĥîye!*
*3 Tu dê bêjîye min r̂astîye,*
*4 K'a marekî dî yî mezin yî wekî te li k'u dibîye?»*

**S. 26** *1 Mar dibêjitê:*
*2 «Mûsa, xalekî min wê hey bere zere,*
*3 Di nêv beyna tivnê û lêvê r̂a biçme dere,*
*4 Her haj min nîne çû xebere».*

**S. 27** *1 Go: «Mûsa, xalekî min wê heyî bere sipîye,*

---

[2893] *Selam û e'lêk'ûm*
[2894] binêr: *mihr*
[2895] *tû*
[2896] *Kûfe*
[2897] *Ûqif ya weqafe*
[2898] *ke yî*
[2899] *ibin*

*2 Ji dûvî ĥeta bi serîye,*
*3 Menzilî pênc sed salîye.*

**S. 28** *1 Mûsa, marêt dojêh di zavin,*
*2 Û fitlêt wan di belavin,*
*3 Fitlêt min li ba yêt wan gelek di ziravin.*

**S. 29** *1 Marêt dojêh di fûrin,*
*2 Fitlêt wan di stûrin,*
*3 Fitlêt min li ba yêt wan gelek di hûrin.*

**S. 30** *1 Mar li dojêh hene,*
*2 Fitlêt wan di zêdene,*
*3 Fitlêt min li ba yêt wan gelek di çûnene.*

**S. 31** *1 Marêt dojêh di ĥeft serin,*
*2 Dûpiştkêt wan qasî gay û k'erin,*
*3 Leşê wan mirova dixwerin.*
*4 Yê xeber bi dayî û baba dikirin,*
*5 Yê k'îjêt buk'ir[2900] di malade mezin dikirin,*
*6 Û yê malê xwe bi selef û r̂ibê diderin».*

## *Qewlê ji ĉîroka Birahîm Xelîl û Nemr̂ûd*[2901]

## 137. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER Û NEMRÛD

**S. 1** *1 Silava yekî dayîm,*
*2 Li wê ĥerfê e'cêb mayîm,*
*3 Da em bideyn wesfetê Birahîm.*

**S. 2** *1 Silava yekî Me'bûde,*
*2 Bedîla Azir û Nemr̂ûde,*
*3 Ewan ne teĥiyat hebû ne sicûde.*

**S. 3** *1 Silava yekî Bêrîye,*
*2 K'eşîşekî di xewna xwe da dîye,*
*3 Weledek dê dahir be, nava wê şarîstanîye,*
*4 Hikmê Nemr̂ûdê k'afir dêk'efte destê wîye.*

**S. 4** *1 Nemr̂ûd go: «Ya k'eşîşo, ya tu dibêjî we nabê,*
*2 Ev dinya t'êkda li min cema'bê,*
*3 Kesek ji Nemr̂ûd mezintir nabê!»*

**S. 5** *1 Wey Nemr̂ûdê k'afire,*
*2 Wey li hurmetê[2902] bê mefere,*
*3 Zigê wan diqelaşt, piçuk jê di hawêtine dere.*

**S. 6** *1 Bi qudreta Qadirî,*
*2 Ew zarake ji nava wî şarîstanî vavîrî havête bedena jina Azirî,*
*3 Yê dêr û senem bo k'afira bi destê xwe çêkirî.*

---

[2900] *bûkir*
[2901] [2] (ji ĉîrake *Birahîm Xelîl û Nemrûd*) (rr. 273-302)
[2902] *hermet*

**S. 7** *1 Çî sibeyeke ji ĥedêda,*
*2 Xwedê Te'ala fereca Birahîm Xelîl li wêda,*
*3 Da milet û omet pê bine zêda.*

**S. 8** *1 «Hey lawo, tuyî r̂ijî!*
*2 Xwedê e'mirekî bide te, t'êr bijî!*
*3 Da Mekke û Medîne bi destê xwe binijî!»*

**S. 9** *1 Çi sibeyeke ji xewleye,*
*2 Birahîm Xelîl bi malva diçîye,*
*3 Ji maka xwe dipirsîye: «Ya dayê, Xwedê [yê] hûn diĥebînin, k'îye?»*

**S. 10** *1 Wey li x̂afilê bix̂ude,*
*2 Wê dikşînin ber senema sicûde.*
*3 Ya lawo, dayîk u bavê te diĥebînin Nemr̂ûde!*

**S. 11** *1 «Ya dayê, tu nebêje Birahîm t'ifale*[2903]*,*
*2 Xwedê min li ser îmana we nekuje,*
*3 Îmana we pêgirtîye betale.*

**S. 12** *1 Îmana we pêgirtî xirabe,*
*2 Ne xêr tê heye, ne sewabe.*
*3 Ya dayê, r̂oja axretê ĥemû li ser weye bi ĥisabe».*

**S. 13** *1 Babê bi*[2904] *nav Azire,*
*2 Ço bal Nemr̂ûdê k'afire,*
*3 Go: «Kuştina vî weledî li me fere,*
*4 Îro ji bin hikmê îmama we çoye dere».*

**S. 14** *1 Nemr̂ûdî go: «Hûn bişînin Birahîm bînin,*
*2 K'eşîş û xumxuma li ber dayînin,*
*3 Bo xatirê Azir û senema carek din vegeřînin».*

**S. 15** *1 Ewan şandin Birahîm anîn*[2905]*,*
*2 K'eşîş û xumxum li ber danîn.*
*3 Ya lawo, tu t'ifalekî canî,*
*4 Hikmê Nemr̂ûd ji e'rd ĥeta bi e'zmanî.*

**S. 16** *1 Birahîm go: «Ya mîro, heke r̂ast tu silt'ênî,*
*2 Miriyekî ji qebrestanî hilînî,*
*3 Baranekê bi sayî bo min bînî,*
*4 R̂ojê ji nîvro bifitilînî,*
*5 Ji ew paş ez dême ser ewî dînî».*

**S. 17** *1 Nemr̂ûd go: «Birahîmo, ez diqarim, we nakim,*
*2 Miriyekî ji qebrestanê r̂akim,*
*3 E'rd û e'zmana fira kim,*
*4 Baranekê ji sayêda kim,*
*5 Belê şola kesî nekirî, ez jî nakem».*

**S.18** *1 Birahîm go: «Ez bi wî kem me'bûda,*
*2 Ez dik'êşime ber ibadet*[2906]*, sicûda,*
*3 Yê bistîne r̂uĥê Azir û Nemr̂ûda».*

**S. 19** *1 Azir go: «Nemr̂ûd, ez hatime bo te evî weledî bikujî,*

---

[2903] *tefal*
[2904] *min*
[2905]
[2906] *ebadet*

*2 Bihavêjiye nav agirî, bikî ȓejî,*
*3 Hêj dilê min pê nasojî».*

**S. 20** *1 Wey li k'afirê*[2907] *p'iȓ cêra,*
*2 Ewan mehdera Birahîm Xelîl bi xirabî digêȓa,*
*3 Ĥezar bar dar cama'kirin jê ȓa.*

**S. 21** *1 Ĥezar bar dar cama'kirin,*
*2 Pêncsed barî neftî pêdakirin,*
*3 Ji nû paş mencenîq k'arkirin.*

**S. 22** *1 Wey li k'afirêt bê dînin,*
*2 Wê tên û dilezînin,*
*3 Ji nû paş menceniqê dişidînin.*

**S. 23** *1 Ewan menceniq kirbû k'are,*
*2 Birahîm Xelîl havête nare,*
*3 Birahîm Xelîl ji ȓuĥa xwe mabû bê zare.*

**S. 24** *1 Ewan menceniq kirbû t'ebabe,*
*2 Birahîm Xelîl havêtin nave,*
*3 Birahîm Xelîl ji ȓuĥa xwe mabû tengave.*

**S. 25** *1 Birahîm Xelîl we dike gazî:*
*2 «Ya Ȓebî, ez e'bdekî te me, bê sûc, bê guneh, binasî*[2908]*,*
*3 Tu min ji agirê Nemȓûdê k'afir bikî xilasî,*
*4 Ezê qurbaniya te kem çî tiştî li ber dilê min xasî*[2909]*».*

**S. 26** *1 Emîn*[2910] *Cebraîl qesidê Melikê Me'bûde,*
*2 Û bi teĥiyata, û bi sicûde,*
*3 Go: «Îbred ya nar Nemȓûde».*

**S. 27** *1 Emîn Cebraîl qesidê Melikê E'rşe,*
*2 Dora Birahîm Xelîl kire mêrg û çîmenêt xweşe,*
*3 Dar, û baẍ, û bostan, sosin û gulêt geşe.*

**S. 28** *1 K'afira dîtbû bi ĉava,*
*2 Agirê wan bihujî, bû ava,*
*3 Dî Birahîm Xelîl û axî Cebraîl wê li nava.*

**S. 29** *1 K'afira dinêȓa,*
*2 Dît emîn Cebraîl û Birahîm Xelîl vêk ȓa,*
*3 Wê li birka û kaniyêt cinetê digêȓa.*

* * *

**S. 30** *1 Ewe kanîya nav cinetê,*
*2 Xwedê fereca nebîy Simaîl wê didetê,*
*3 Da dotmam lê biket hêcetê.*

**S. 31** *1 Wey li dotmama bext û bere,*
*2 Wey li hurmeta bê mefere,*
*3 Sûcê Hecerê çî bû, Sarê ji mal dikir dere?*

**S. 32** *1 Ȓojekê Birahîm Xelîl ji mal çu,*

[2907] *karf*
[2908] *bê nasî*
[2909] *xaşî*
[2910] binêr: *Amin*

*2 Sarê li gel Hacerê gal çu,*
*3 Hacerê ser hilanî ji bal çu.*

**S. 33** *1 We li xatûna ez li miĥêra,*
*2 Ber xwe girtibû berîke doj vê r̂a,*
*3 Go: «Xwedê dike şer̂an u xêra».*

**S. 34** *1 Hacerê go: «Beriya me beriyake r̂aste,*
*2 Xwedê nesîbê min ji vê malêve diguhaste,*
*3 Xwedê derseta dilê t'ebayî, dilê r̂aste».*

**S. 35** *1 Beriya me beriya zêde,*
*2 Hacerê meşiyabû pêde,*
*3 Xwedê fereca nebîy Simaîl li wêda.*

**S. 36** *1 Bi qudreta yekî Ekber bû,*
*2 Li wê ĉalê[2911], nebîy Simaîl dahir bû,*
*3 Ava Zimzim li bin p'êya der bû.*

**S. 37** *1 Ewe kaniya nav deştê,*
*2 Jê tê bêhna bixur, û misk, û anber, û bihuştê,*
*3 Heçîyê nuqtek vedixwar[2912], dersed k'eremet digehiştê.*

**S. 38** *1 Bazirgan tên ji wê r̂a,*
*2 Yî mezine weke şikêra,*
*3 Xêrî Xwedê, kes nizane çiqas mal heye vê r̂a.*

**S. 39** *1 Bazirgan xelq[ê] di nave,*
*2 R̂abûn, çûn silave,*
*3 «Xwezî me bizaniye te çî nave?»*

**S. 40** *1 Hey t'ifalo, yî jîre,*
*2 Tuyî xunk'arî[2913], anî e'mîre,*
*3 Tuyî e'bdalî, anî feqîre?»*

**S. 41** *1 Go: «Ez nebîy Simaîlim,*
*2 Ewledê Birahîm Xelîlim,*
*3 Li ber hosta emîn Cebraîlim.*

**S. 42** *1 Gelî bazirganî, eger hûn xatira min dibînin,*
*2 Bişînin hindê male xwe bînin,*
*3 Li derê kaniyê deyinin».*

**S. 43** *1 Bazirgan xatira nebîy Simaîl we dizanî,*
*2 Şandine hindê male xwe anî,*
*3 Li derê kaniyê danî,*
*4 Bi r̂ojê sê care diçûne mala nebîy Simaîl bi mêvanî.*

**S. 44** *1 Nebîy Simaîl yî bi r̂ecûne,*
*2 Herr̂o sibeya r̂adibûne,*
*3 Ew ewledê min bû, lew navê wî welat berwelat diçûne.*

**S. 45** *1 R̂ojekê Birahîm Xelîl mabû difikir,*
*2 Her r̂o sibê r̂adibûyî şikir,*
*3 Ew ewladê me, nav wî li dinyayê bûye dik'ir.*

[2911] *çalê*
[2912] *xe dixwar*
[2913] *xwendk'ar*

**S. 46** *1 Nebîy Simaîl wê dibête:*
*2 «Ya dayê, qewî min ji te şerm û fête,*
*3 Vê sibeyîkê qewî bêhna babe min tête».*

**S. 47** *1 Go: «Erê lawo, ya babe te bi serê me di anî,*
*2 Em derxistin ji wî şaristanî,*
*3 Kes nizane babe te yî saẍe, anî canî?*

**S. 48** *1 Erê lawo, ya babe te bi serê me kirî,*
*2 Sal hatin û zeman bihurȋ*[2914]*,*
*3 Kes nizane babe te saẍe anî mirî?»*

**S. 49** *1 Erê dayê bi wî xaliqî kem, ewî r̂uĥa min û te daye,*
*2 Wexte babe min ji wêve bibit xuyaye.*

**S. 50** *1 Nebîy Simaîl dihert wêve,*
*2 Derwêşek têt ji wêve,*
*3 R̂eş diket mîna şêve.*

**S. 51** *1 Birahîm Xelîl dihat, qedimî dikir silave,*
*2 Nebîy Simaîl ji k'eremê silav vedave,*
*3 Go: «Ya Birahîm Xelîl, tu ser serê min hatî, herdu ĉava!»*

**S. 52** *1 Birahîm Xelîl cewab we vedave:*
*2 «Hey t'ifalo zirbave,*
*3 Çava tu dizanî min çî nave?»*

**S. 53** *1 Nebîy Simaîl go: «Erê babo, tuyî xasî,*
*2 Tu xwedanê xwe û wî libasî,*
*3 E'silzade ew kur̂, bab nebîne ji dûrve binasî».*

**S. 54** *1 Birahîm Xelîl dest ji ger̂dena nebîy Simaîl weranî,*
*2 Hind digir̂îya, hêstir li ber dibûne kanî,*
*3 Emîn Cebraîl nazil bû ji banî,*
*4 R̂uĥa nebîy Simaîl ji te dixwazî.*

**S. 55** *1 Emîn Cebraîl we dike gazî:*
*2 «Ya Birahîm, Xwedê xwe bi ĥeq binasî,*
*3 Ew r̂oja mencenîqê, Xwedê serê nebîy Simaîl ji te dîxwazî».*

**S. 56** *1 Birahîm Xelîl mabû dil bihujî,*
*2 Dilê wî weke agirekî digurmijî,*
*3 Kê dîtiye, bab ewladê xwe bi destê xwe bikûjî.*

**S. 57** *1 Birahîm Xelîl go: «Ya emînê Xwedê, min çiqas mal heye li bale,*
*2 Ĥemû dikem ĥelale,*
*3 Serê nebîy Simaîl nakem ĥelale».*

**S. 58** *1 Birahîm Xelîl go: «Ya emînê Xwedê, ez wî kem yekî li sema,*
*2 Min çiqas zêr̂ û mal li ceme,*
*3 Ĥemû bi te dideme,*
*4 Serê nebîy Simaîl nademe».*

**S. 59** *1 Nebîy Simaîl go: «Ya babo, em di r̂ewane,*
*2 Xwedê Te'ala, em li wê dane,*
*3 Bi qurbaniya Xwedê em şane.*

[2914] *bihirî*

**S. 60** *1 Ya babo, silava bike il-Semede,*
*2 Û li nebîyêt xwedan k'eremete,*
*3 Babê nebîya, qurbaniya xwe dikir welede.*

**S. 61** *1 Ya babo, silave bike il-Cebêre,*
*2 Û li nebîyêt ehlî xêre,*
*3 Babê nebîyano, gîyano, xwindina wan dêre».*

**S. 62** *1 Nebîy Simaîl t'ifale,*
*2 Ji deştê dihate male,*
*3 We dibêjite daya kale:*
*4 «Ya dayê, şîrê xwe li min bike ĥelale,*
*5 Îroke hate ser min mersuma Barî Te'ala,*
*6 Babê xemeke giran heye li bale».*

**S. 63** *1 «Ya babo, xema hilmegir,*
*2 Dest û p'êyêt min ji xana birêj,*
*3 Min qurbaniya Xwedê bike, zu bikuj».*

**S. 64** *1 Nebîy Simaîl jîre*
*2 We dibêjite daya pîre: «Dayê, li min ĥelal bike şîre,*
*3 Îroke hate ser min mersuma mîre».*

**S. 65** *1 Dayê nav Hacere,*
*2 Şuştibû cil û sere,*
*3 «Ya lawo, şîrê min ĥelal bit bi cane te r̂a».*

**S. 66** *1 «Ya dayê, hûn şerîta*[2915] *bînin,*
*2 Dest û p'êyêt min qayîm bişidînin,*
*3 R̂uĥe şîrine, neko xwe bilivînim».*

**S. 67** *1 Înabû şerîta nûranî,*
*2 Dest û p'êyêt nebîy Simaîl şidandbûn weke tu dizanî,*
*3 Birahîm Xelîl di dilê xwe da dinalî.*

**S. 68** *1 «Ya babo, megrî, menal,*
*2 Hêstira ji ĉava bimal,*
*3 T'eqdîra Xwedê qet nabit betal!»*

**S. 69** *1 Înabû şerîta zirave,*
*2 Nebîy Simaîl bavête nave,*
*3 Birahîm Xelîl di dilê xwe da mabû tengave.*

**S. 70** *1 Ew k'êra ne ji vî zemanî,*
*2 Li ger̂dena nebîy Simaîl bir û anî,*
*3 K'êrê qet mûyîk jê hilnanî.*

**S. 71** *1 Ew k'êra weke nare,*
*2 Ger̂dena nebîy Simaîl wergehare.*
*3 K'êrê qet mûyîk jê nediazare.*

**S. 72** *1 Ew k'êra weke mûye,*
*2 Ger̂dena nebîy Simaîl diçuye,*
*3 Dev werger̂iya, çuye r̂ûye.*

**S. 73** *1 Ew k'êra weke xişte,*
*2 Ger̂dena nebîy Simaî lr̂a dihişte,*

---

[2915] *kilît*

*3 Dev wergeȓiya, çuye pişte.*

**S. 74** *1 Nebîy Simaîl jîre,*
*2 We dibêjite babe pîre:*
*3 «Em dêçin pêş dindara mîre».*

**S. 75** *1 Birahîm Xelîl wedixurî,*
*2 «Ya lawo, tu ne yî Munkirî,*
*3 Çî bikem k'êr qiȓka te nabiȓî?»*

**S. 76** *1 Birahîm Xelîl xeyalek din hate bale,*
*2 K'êr havête kevirekî sare,*
*3 K'êrê kevir kir weke xiyare.*

**S. 77** *1 K'êrê cewab daye:*
*2 «Ya Birahîm Xelîl min çî xetaye,*
*3 Ji ba Xwedê ne hatî ȓedaye».*

**S. 78** *1 Nava Birahîm Xelîl û k'êrê bûye qal û qîle,*
*2 Ẍeyîdî ehlî*[2916] *Cebraîle.*

**S. 79** *1 «Cebraîlo me ȓa,*
*2 Serê nebîy Simaîl jê veke ji te ȓa,*
**3** *Belkî namusekê bikem li gel Xwedêyê xwe ȓa».*

**S. 80** *1 K'êrê go: «Birahîm Xelîl, ezî tûjim,*
*2 Çava dê nebîya bikujim,*
*3 Ȓoja axretê dê di agirê dojêh da bisojim».*

**S. 81** *1 K'êr nav sikîne,*
*2 [Go:] «Birahîm Xelîl, e'silê min ji biȓîne,*
*3 Belê ȓeda ji Xwedê Te'ala nine».*

**S. 82** *1 Ew beranê hirandî,*
*2 Horiya ĥeft sala li ba xwe cinetê geȓandî,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl qebilandî.*

**S. 83** *1 Ew beranê hundire,*
*2 Horiya ĥeft sala li baẍçê cinetê xwedan dikire,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl dikire.*

**S. 84** *1 Ew beranê k'ilîle,*
*2 Nazil bû ji xizîna qendîle,*
*3 Bo qurbaniya serê nebîy Simaîle.*

**S. 85** *1 Ew beranê beleke,*
*2 Nazil bû ji xizîna xaliqe*[2917]*,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl qebûl dike*[2918].

**S. 86** *1 Ji qewlê p'îrî Xidir,*
*2 Beranek hatî ji hidir*[2919]*,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl qebûldikir.*

**S. 87** *1 P'îrî Xidir wê dibête:*
*2 «Beranek ji bana tête,*

[2916] *axîl*
[2917] *xalik*
[2918] *dikir*
[2919] binêr: *hadêr*

*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl dişête.*

**S. 88** *1 Îdoke û E'refate,*
*2 Beranek ji bana têdaye,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl dişaye.*

**S. 89** *1 Îdoke û E'refate,*
*2 Beranek ji bana dihate,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl dişate,*
*4 Me, û dost, û guhdara[2920] p'ar tê hene ji dîwana Xwedê, û şêx Adî, û melik şêx Sin,*
*Li wê r̂ojê, [li]wî qewlî, li wê suhbetê.*

*T'emametiya silt'an şêx Adî!*

## 138. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER Û NEBÎY SIMAÎL[2921; 2922]

**S. 1** *1 Silavêt yekî Me'bûde,*
*2 Ne teĥiyat hebû, ne sicûde,*
*3 Bedîla Azir û Nemr̂ûde.*
**S. 1** *1 Silavêt yekî Me'ibûde,*
*2 Ne silav hebû, ne sicûde,*
*3 Bedîla Azir û Nemr̂ûde.*

**S. 2** *1 Silavêt yekî dayîm,*
*2 Li vê ĥerfê e'cêb[2923] mayîm,*
*3 Da bideyn wesfetêt[2924] Birahîm.*
**S. 2** *1 Silavêt êkî dayîm,*
*2 Li vê tip'ê şêt mayîm,*
*3 Da bideyn destnîşana Birahîm[2925].*

**S. 3** *1 Silavêt êkî Bêrîye,*
*2 K'eşîşekî di xewna xwe dîtiye,*
*3 Ewladek li nava şaristanê dê dahir bîye,*
*4 Hikmê Nemrûdê k'afir dêk'efte destê wîyîye.*
**S. 3** *1 Silavêt êkî Bêrîye,*
*2 K'eşîşekî di xewna xwe de dîtîye,*
*3 Lawek li nava şaristanê dê dahir bîye,*

**S. 4** *1 Nemrûd go: «Ya k'eşîşo, ya tu dibêjî we nabê,*
*2 Ew dinya li min cema' bê,*
*3 Kesek ji Nemr̂ûd mezintir nabê».*
**S. 4** *1 Nemrûd got: «Ya k'eşîşo, ya tu dibêjî we nabê,*
*2 Ew gerdûn li min k'om bibê,*
*3 Kesek ji Nemr̂ûd mezintir nabê».*

**S. 5** *1 Wey Nemr̂ûdê k'afire,*
*2 Wey li hermetêt bê mefere,*
*3 Zigê hermeta qelaşt, ewled jê dihavêtine dere.*
**S. 5** *1 Wey Nemr̂ûdê gawire,*
*2 Wey li jinên bê mefere,*
*3 Zigê jina qelaşt, law jê avêtine dere.*

---

[2920] *gudar*
[2921] [2] (rr. 303–311)
[2922] [50] *Qewlê Birahîm Xelîl* (rr. 62-69)
[2923] *ecîb*
[2924] *usfet*
[2925] *Birayîm*

**S. 6** *1 Li ber qudreta Qadirî,*
*2 Ew zarok ji nava şaristanî vavirî,*
*3 Havête bedena jina Azir zirî,*
*4 Yê dêr û senem bo k'afira bi destê xwe*[2926] *çêkirî.*

**S. 6** *1 Li ber şîyana Qadirî,*
*2 Ewî zarok ji nava şaristanî vavirî,*
*3 Avête bedena jina Azirî,*
*4 Yê dêr û p'ût bo gawira bi destê xwe*[2927] *çêkirî.*

**S. 7** *1 Sibeyeke ji yêt ȟedêda*[2928]*,*
*2 Xwedê*[2929] *Te'ala fereca Birahîm Xelîl li wê da,*
*3 Da milet û omet*[2930] *pê bit zêda.*

**S. 7** *1 Sibeyeke ji yêt ȟedêda,*
*2 Xwedê řihbûna Birahîm Xelîl li wê da,*
*3 Da milet û niştiman pê bibe zêda.*

**S. 8** *1 Ya lawo, t'êr bijî,*
*2 Xwedê e'mirekî bide te, t'êr bijî,*
*3 Da Mekke û Medîne bi destê xwe binijî.*

**S. 8** *1 Ya lawo, t'êr bijî,*
*2 Xwedê t'emenekî bide te, t'êr bihjî*[2931]*,*
*3 Da Mak û Medîne bi destê xwe binijî.*

**S. 9** *1 Sibeyek, ji yêt xewlî ye,*
*2 Birahîm Xelil bi malva diçî ye,*
*3 Ji maka xwe dipirsî ye:*
*4 «Dayê, Xwedê hun diȟebînin, k'î ye?»*

**S. 9** *1 Sibeyek, ji yêd xewlî ye,*
*2 Birahîm Xelil ji maka xwe pirsî ye:*
*3 «Dayê, Xwedê win ȟezdikin, k'î ye?»*

**S. 10** *1 Sibeyek ji yêt bi xûde,*
*2 Wê dikşînin ber senema sicûde,*
*3 Ya lawo, yê dayîk û babê te dihebûnin bi xwe Nemřûde.*

**S. 10** *1 Sibeyek ji yêd bi xûde,*
*2 Ne pîşwazî hebû, ne sicûde,*
*3 Ya law, yê dayê û babê te ȟezdikin bi xwe Nemřûde.*

**S. 11** *1 Ya dayê, tu nebêje Birahîm yî t'ifale*[2932]*,*
*2 Xwedê min li ser îmana we nekujit, Înşallaȟ û Te'ala,*
*3 Îmana we pê girtî ye betale.*

**S. 11** *1 Ya dayê, tu nebêje Birahîm yî menale,*
*2 Xwedê min nekuje ser bawerêya we ya vale,*
*3 Baweriya we pê girtî ye betale.*

**S. 12** *1 Îmana we pêgirtî, xirabe,*
*2 Ne xêr tê heye, ne sewabe,*
*3 Řoja axretê ȟemû li ser řuȟa weye bi ȟesabe!*

**S. 12** *1 Baweriya we pê girtî mixabe,*
*2 Ne xêr tê hebû, ne sewabe,*
*3 Li axretê ȟemû li ser řuȟa weye bi pirsiyarbe!*

---

2926 *xo*
2927 *xo*
2928 *ȟedîd*
2929 *Xodê*
2930 *umet*
2931 binêr: *çêkir, dirust kir*
2932 *tefal*

**S. 13** *1 Babê bi nav Azire,*
*2 Çû nik Nemȓûdê k'afire,*
*3 Go: «Kuştina vî weledîyî ye fere!*
*4 Îro ji ber hikmê îmana we çoye dere».*
**S. 13** *1 Babê bi nav Azire,*
*2 Çû nik Nemȓûdê gawire,*
*3 Go: «Kuştina vî lawî ye fere!*
*4 Îro ji ber zora bawerêya we çûye dere».*

**S. 14** *1 Nemȓûdî go: «Hûn bişînin Birahîm bînin,*
*2 K'eşîş û xumxuma li ber deynin,*
*3 Bo xatira Azir û senema vegeȓînin».*
**S. 14** *1 Nemȓûdî got: «Hûn bişînin Birahîm bînin,*
*2 K'eşîş û xumxuma li ber dînin,*
*3 Bo xatira Azir û p'ûta vegeȓînin».*

**S. 15** *1 Ewan şandin, Birahîm di anîn,*
*2 K'eşîş û xumxum li ber danîn,*
*3 Go: «Ya lawo, tu t'ifalekî canî,*
*4 Hikmê Nemȓûdî, ji e'rd ĥeta bi e'zmanî»*
**S. 15** *1 Ewan şand, Birahîm anî,*
*2 Go: «Ya lawo, tu biçûkê û ciwanî,*
*3 Serweriya Nemȓûdî ji e'rd ĥeta bi e'zmanî»*

**S. 16** *1 Birahîm dibêjit: «Ya mîro, heger ȓast tu silt'ênî,*
*2 Baranekê ji sayî bo min bênî,*
*3 Ȓojê ji nîvro vegeȓînî,*
*4 Û mirîyekî ji qebristanî hilînî,*
*5 Ji ew paş ez dê ême ser wî dînî!»*
**S. 16** *1 Birahîm dibêje: «Ya mîro, heke tu ȓast silt'înî,*
*2 Baranekê ji sayî bo min bînî û ȓojê ji nîvro vegeȓînî,*
*3 Û mirîyekî ji qebristanî hilînî,*
*4 Ji ew paş ez tême ser wî dînî!»*

**S. 17** *1 Nemȓûd dibêjit: «Birahîmo, ez diqarim û we nakem,*
*2 Baranekê ji sayî dakem,*
*3 Û mirîyekî ji qebristanê ȓakem,*
*4 Û e'rd û e'zmana firakem,*
*5 Belê kesî nekirye, ez jî nakem».*
**S. 17** *1 Nemȓûd dibêje: «Birahîmo, ez dikarim û nakim,*
*2 Baranekê ji sayî dakem, û mirîyekî ji qebristanê ȓakem,*
*3 Û e'rd û e'zmana firakim,*
*4 Belê kesî nekirîye, ez jî nakim».*

**S. 18** *1 Birahîm dibêjit: «Bi wîkem, yekî bi Xwede (m'ebuda),*
*2 Ber wî xaliqî bikem sicûde,*
*3 Yê disitînit ȓuĥa Azir û Nemȓûda».*
**S. 18** *1 Birahîm dibêje: «Bi wîkim, yekî bi Xwede,*
*2 Ber wî afrînerî bikim sicûde,*
*3 Yê bistîne ȓewanê Azir û Nemȓûda».*

**S. 19** *1 Azir go: «Ya Nemȓûd, ez hatîme bo te evî weledî bikujî,*
*2 P'avêjiye nav agirî bikî rejî,*
*3 Hêj dilê min pê nasojî».*
**S. 19** *1 Azir got: «Ya Nemȓûd, ez hatîme li gel te evî lawî bikujî,*
*2 Bavêjiye nav agirî bikî ȓejî*[2933]*,*

[2933] ango: *bisojî*

*3 Hîç dilê min pê nasojî».*

**S. 20** *1 Wey li ẍafilêt înk' êre,*
*2 Ewan mehdera Birahîm Xelîl bi xirabî digêȓa,*
*3 Ĥezar bar dar cema' kirin jê ȓa.*
**S. 20** *1 Wey li ẍafilêt enk'êre,*
*2 Ewan mehdera Birahîm Xelîl bi xirabî digêȓa,*
*3 Ĥezar bar dar cema' kirin jê ȓa.*

**S. 21** *1 Ĥezar bar dar cema' kirin,*
*2 Pênc sed sindoqêt neftê lêkirin,*
*3 Ji ew paş mencenîq k'ar kirin.*
**S. 21** *1 Ĥezar bar dar cema' kirin,*
*2 Pênc sed sindûqêt neftê lêkirin,*
*3 Ji ew paş mencenîq bo Sara û Birahîm k'ar kirin.*

**S. 22** *1 Wey li ẍafilêt bê dînin,*
*2 Wê diînin û digêȓînin,*
*3 Menceníqê dişidînin.*
**S. 22** *1 Wey li ẍafilêt bê dînin,*
*2 Wê tînin û digêȓînin,*
*3 Menceníqê bo Sara û Birahîm dişidînin.*

**S. 23** *1 Menceníq kirbû k'are,*
*2 Birahîm Xelîl havêtine nava nare,*
*3 Birahîm Xelîl ji destê ȓuĥa xwe mabû bê zare.*
**S. 23** *1 Menceníq kirbû k'are,*
*2 Birahîm Xelîl havêtne nava are,*
*3 Birahîm Xelîl ji destê ȓuĥa xwe maye bê zare.*

**S. 24** *1 Wey li k'afirêt înk'are,*
*2 Birahîm Xelîl datînit nave,*
*3 Birahîm Xelîl ji destê ȓuĥa xwe mabû yî tengave.*
**S. 24** *1 Ewan menceníq kiribû t'ebabe*
*2 Birahîm Xelîl havêtine nave,*
*3 Birahîm Xelîl ji ȓewana xwe mabû yî tengave.*

**S. 25** *1 Birahîm Xelîl we dike gazî:*
*2 «Ya R̂ebî, ez e'bdekî teme, bê sûc, bê guneh, bê binasî,*
*3 Tu min ji agirê Nemȓûdê k'afir bikeyî xilasî,*
*4 Dê qurbanîya te kem, çîqas tiştê li ber dilê minî xasî».*
**S. 25** *1 Birahîm Xelîl we dike gazî:*
*2 «Ya Xwedê, ez xulamê te me yî bê guneh, bê binasî,*
*3 Tu min ji agirê Nemȓûdê k'afir bikî xilasî,*
*4 Ezê qurbaniya te kim, çî tiştê li ber dilê minî xasî».*

**S. 26** *1 Cebraîlo, qasidê Melikê Me'bûde,*
*2 Yî bê teĥiyate[2934], yî bi sicûde,*
*3 Go: «Îbred ya nar Nemȓûde».*
**S. 26** *1 Cebraîl[2935], mebestyarê Melikê Me'bûde,*
*2 Yî bê teĥiyate[2936], yî bi sicûde,*
*3 Gotê: «Sar bibe agirê Nemȓûde».*

**S. 27** *1 Cebraîlo, qasidê Melikê E'rşe,*
*2 Dora Birahîm Xelîl kire mêrg û çîmenêt xweşe,*

[2934] *teyet*
[2935] *Cîbraîl*
[2936] *teyet*

*3 Sosin, û hilhil, û beybûnêt geşe.*

**S. 27** *1 Cebraîl, mebestyarê Melikê E'rşe,*
*2 Dora Birahîm Xelîl kire mêrg û çîmenêt xweşe,*
*3 Sosin, û hilhal, û beybûn, û gulêd geşe.*

**S. 28** *1 K'afira (wa) dîtbû bi ĉava,*
*2 Agirê bohojî, bû ava,*
*3 Cebraîl û Birahîm Xelîl li nave.*

**S. 28** *1 Gawira wa dîtibû bi ĉave,*
*2 Agirê buhojî, bûye ave,*
*3 Cebraîl û Birahîm Xelîl li nave.*

**S. 29** *1 K'afira dinêr̂e,*
*2 Dît emîn Cebraîl û Birahîm Xelîl di vêk r̂a,*
*3 Li birk û kaniyêt cinetê digêr̂a.*

**S. 29** *1 Gawira dinêr̂e,*
*2 Dît emîn Cebraîl û Birahîm Xelîl di vê r̂e,*
*3 Wê li birk û kaniyêt cinetê digêr̂e.*

**S. 30** *1 Ew bû birk û kaniyên cinetê,*
*2 Xwedê Te'ala fereca nebîy Simaîl li wêde tê,*
*3 Da dotmam lê biket hêcetê.*

**S. 30** *1 Ew bû birk û kaniyêd cinetê,*
*2 Xwedê fereca pêx̂ember Simaîl li wêde tê,*
*3 Da dotmam lê biket hêcetê.*

**S. 31** *1 Wey li dotmam bext û bere,*
*2 Wey li hurmeta*[2937] *bê mefere,*
*3 Sûcê Hacerê çî bû, Sarê ji mal dikir dere.*

**S. 31** *1 Wey li dotmam bext û bere,*
*2 Wey li hurmeta bê mefere,*
*3 Sûcê Hacerê çî bû, Sarê ji mal dikir dere.*

**S. 32** *1 R̂ojekê Birahîm Xelîl ji mal ço,*
*2 Sara li gel Hacer bi gal ço,*
*3 Hacer ser hilanî û ji mal ço.*

**S. 32** *1 R̂ojekê Birahîm Xelîl ji mal çû,*
*2 Sara li gel Hacer bi gal çû,*
*3 Hacer ser hilanî û ji mal çû.*

**S. 33** *1 Wey li dotmamê, ez bim mihêra,*
*2 Girte ber xwe deşteke durî vêra,*
*3 Go: «Xwedê yî agahe*[2938] *ji şer̂an û xêra».*

**S. 33** *1 Wey li dotmamê, ez bim mihêra,*
*2 Girte ber xwe deşteke durî vêra,*
*3 Got: «Xwedê agahdare ji şer̂a û xêra».*

**S. 34** *1 Hacerê go: «Berîya me, berîyake r̂aste,*
*2 Xwedê Te'ala nesîbê me ji vê malê veguhaste,*
*3 Xwedê desete, li gel dilê r̂aste.*

**S. 34** *1 Hacerê got: «Berya me, beryake r̂aste,*
*2 Xwedê p'ara me ji vê malê veguhaste,*
*3 Xwedê doste, li gel dilê r̂aste.*

**S. 35** *1 Berîya me, berîya zode»,*

---

[2937] *xurmet*
[2938] *ageh*

*2 Hacerê meşiyabû pêde,*
*3 Xwedê fereca nebîy Simaîl li wê da.*
**S. 35** *1 Berya me, berya zêde»,*
*2 Hacer meşiyabû pêde,*
*3 Xwedê fereca p'êẍember Simaîl li wê da.*

**S. 36** *1 Li ber qudreta P'adşê minî*[2939] *Ekber bû,*
*2 Li wê çolê nebîy Simaîl dahir bû,*
*3 Kaniya Zimzim li ber p'êya der*[2940] *bû.*
**S. 36** *1 Li ber şîyana P'adşê minî mezin bû,*
*2 Li wê çolê p'êẍember Simaîl dahir bû,*
*3 Kaniya Zimzim li ber p'iya dîyar bû.*

**S. 37** *1 Ewe kaniya nava deştê,*
*2 Jê tê bêhna bixur*[2941]*, û misk, û e'nber, û bihuştê,*
*3 Heçîyê nuqtek*[2942] *vedixware, dersed k'erem digehiştê.*
**S. 37** *1 Ew kaniya nava deştê,*
*2 Jê tê bêhna bixur û misk, û e'nber, û buhiştê*[2943]*,*
*3 Heçî yê nuqtek vedixware, dersed k'erem digihiştê.*

**S. 38** *1 Serê bazirganî têt ji wê r̂a,*
*2 Yî mezine qasî şikêra,*
*3 Xêrî Xwedê, kes nizane çiqas mal heye vê r̂a.*
**S. 38** *1 Bazirgan tên ji wê r̂a,*
*2 Yî mezine weke şikêra,*
*3 Bi t'enê Xwedê zane çiqas mal heye vê r̂a.*

**S. 39** *1 Bazirgan hat û dibihirî,*
*2 Yî r̂ehete û yî tênî,*
*3 Yî k'esirî û yî mirî,*
*4 Ŭ li derê kaniyê êwirî.*
**S. 39** *1 Bazirgan hat û buhirîn,*
*2 Yî westa, û yî tênî, û yî mirîn,*
*3 Li derê kaniyê êwirîn.*

**S. 40** *1 Bazirgan xelq di nave,*
*2 R̂abûn çan silave:*
*3 «Xwezî me bizanîye te çî nave?*
**S. 40** *1 Bazirgan xelq*[2944] *di nave,*
*2 R̂abûn çan silave:*
*3 «Xwezî*[2945] *me bizaniye te çî nave?»*

**S. 41** *1 Hey t'ifalo, yî jîre,*
*2 Tuyî xunk'arî, anî e'mîre?*
*3 Tuyî e'bdalî, anî feqîre?»*
**S. 41** *1 Hey mendalo, yî jîre,*
*2 Tuyî xunk'arî, an yî mîre?*
*3 Tuyî koleyî, an yî feqîre?»*

**S. 42** *1 Go: «Ez nebîy Simaîlim,*
*2 Ewledê Birahîm Xelîlim,*
*3 Li ber hosta emîn Cebraîlim.*

---
[2939] *min yî*
[2940] *dahir*
[2941] *buxur*
[2942] *nuxt*
[2943] binêr: *bihuşt*
[2944] *xelik*
[2945] *xozî*

**S. 42** *1 Got: «Ez p’êẍember Simaîlim,*
*2 Kurê Birahîm Xelîlim,*
*3 Li ber hosta sirgir Cebraîlim.*

**S. 43** *1 Gelî bazirganî, heke hûn xatira min tê dibînin,*
*2 Bişînin hindê malê xwe bînin,*
*3 Li derê kaniyê deynin».*

**S. 43** *1 Gelî bazirganî, heke hûn xatira min tê dibînin,*
*2 Bişînin hindê malê xwe bînin,*
*3 Li derê kaniyê deynin».*

**S. 44** *1 Bazirgan xatira nebîy Simaîl we dizanî,*
*2 Şandina hindê malê xwe anî,*
*3 Li derê kaniyê danî,*
*4 Bi řojê sê cara diçone mala nebîy Simaîl bi mêwanî.*

**S. 44** *1 Bazirgan xatira p’êẍember Simaîl we dizanî,*
*2 Şandina hindê malê xwe anî,*
*3 Li derê kaniyê danî,*
*4 Bi řojê sê cara diçûne mala p’êẍember Simaîl bi mêwanî.*

**S. 45** *1 Řojekê Birahîm Xelîl mabû di fikir,*
*2 Her řo sibê řadibû yî şikir,*
*3 Ev ewladê me, nav wî li dinyayê bûye dik’ir.*

**S. 46** *1 Nebîy Simaîl dêmî bi řicûye,*
*2 Herřo sibeya řadibûye,*
*3 Ji kirê wî bi Şamê ve diçûye.*

**S. 45** *1 P’êẍember Simaîl yî dêmi řicûwe,*
*2 Herřo sibê řadibûwe,*
*3 Zikirê wî bi Şamê ve diçûwe.*

**S. 46** *1 Řojekê Birahîm Xelîl mabû dihizir,*
*2 Herřo sibê řadibû, sipas dikir,*
*3 Ew kurê me navê wî gerdûnê bûye dikir.*

**S. 47** *1 Nebîy Simaîl we dibête:*
*2 «Dayê, min qewî ji te şerme û fête,*
*3 Vê sibeyîkê qewî bêhina babê min tête».*

**S. 47** *1 P’êẍember Simaîl we dibête:*
*2 «Dayê, min qewî ji te şerme û fête,*
*3 Her îro bêhne bavê min wê tête».*

**S. 48** *1 Go: «Lawo, eve bû babê te, bi serê me anî,*
*2 Em derk’eftîn ji wî şaristanî,*
*3 K’î dizanit*[2946]*, babê te yî saẍe, an yî canî*[2947].

**S. 48** *1 «Lawo, eve bû babê te, bi serê me anî,*
*2 Em derk’eftîn ji wî şaristanî,*
*3 K’î dizane babê teyî saẍe, an yî bi canî.*

**S. 49** *1 Ev bû babê te bi serê me kirî,*
*2 Em ji wî bajêrî der kirîn,*
*3 K’î dizanit babê te yî saẍe anî mirî?»*

**S. 49** *1 Ev bû babê te bi serê me kirî,*
*2 Sal hatin û dem bihurî*[2948]*,*
*3 Kes nizane babê tey saẍe an yî mirî?»*

[2946] *dinizanit*
[2947] *bi erkanî*
[2948] *buhirî*

**S. 50** *1 Nebîy Simaîl wa dibête:*
*2 «Dayê min qewî ji te şerme û fête,*
*3 Her îro navê babê min wê tête».*

**S. 51** *1 Nebîy Simaîl diherit wêve,*
*2 Derwêşek têt ji wêve,*
*3 Wê r̂eş diket weke şêve.*
**S. 50** *1 P'êx̂ember Simaîl diherit wêve,*
*2 Derwêşek wê têt ji wêve,*
*3 Wê r̂eş diket weke şêve.*

**S. 52** *1 Birahîm Xelîl diqedimî dikir silave,*
*2 Nebîy Simaîl ji k'eremê silav vedave,*
*3 Go: «Ya Birahîm Xelîl, tu ser serê min hatî û herdu çave!»*
**S. 51** *1 Birahîm Xelîl dihat, dikir silave,*
*2 P'êx̂ember Simaîl ji k'eremê silav vedave,*
*3 Got: «Ya Birahîm, tu ser serê min hatî û herdu çave!»*

**S.53** *1 «Bi wê kem hindave,*
*2 Hey t'ifalo zirbave,*
*3 Çawa dizanî, min çî nave?»*
**S. 52** *1 «Bi wê kem hindave*[2949]*,*
*2 Hey mendalo yî zirbave,*
*3 Çawa dizanî, min çî nave?»*

**S. 54** *1 Nebîy Simaîl go: «Erê babo, tuyî xasî,*
*2 Tu bi xaliqê xwe keyî û libasî,*
*3 E'silzade ew kur̂, bab ne dîtî, neket nasî!»*
**S.53** *1 P'êx̂ember Simaîl got: «Erê babo, tuyî xasî,*
*2 Tu bi xwedanê xwe keyî û wî kerasî*[2950]*,*
*3 E'silzade ew kur̂, bab nedîtî, neket nasî!»*

**S. 55** *1 Birahîm Xelîl dest li ger̂dena nebîy Simaîl wer anî,*
*2 Hind digrîya, hêstir li ber dibûne kanî,*
*3 Emîn Cebraîl nazil bû ji banî.*
*4 R̂uĥa nebîy Simaîl ji te dixwazî.*
**S. 54** *1 Birahîm Xelîl dest li ger̂dena nebîy Simaîl weranî,*
*2 Hind digrîya, hêstir li ber dibûne kanî,*
*3 Emîn Cebraîl nazil bû ji banî.*

**S. 56** *1 Emîn Cebraîl we dike gazî,*
*2 «Birahîm, Xwedê xwe bi ĥeq binasî,*
*3 Ew r̂oja menceniqê, Xwedê serê nebîy Simaîl ji te dixwazî».*
**S. 55** *1 R̂izgar Cebraîl we dike gazî:*
*2 «Ya Birahîm, Xwedê xwe bi r̂ast binasî,*
*3 Ew r̂oja menceniqê, Xwedê serê Simaîl ji te dixwazî».*

**S. 57** *1 Birahîm Xelîl wê digurmijî,*
*2 Mîna hêtûneke ger̂im dilê wî disojî,*
*3 Kê dîtîye, bab weledê xwe bi destê xwe bikujî.*
**S. 56** *1 Birahîm Xelîl wê digurmijî,*
*2 Mîna hîtûneke ger̂im dilê wî disojî, mabû dil bihûjî,*
*3 Kê dîtîye, bab lawê xwe bi destê xwe bikujî?»*

**S. 58** *1 Birahîm Xelîl go: «Ya emînê Xwedê, min çîqas mal heye li bale,*

---
[2949] ango: *li jore, li e'zmane*
[2950] *keras*: livir mebest *xerqeye*

*2 Ȟemû dikim ȟelale,*
*3 Serê nebîy Simaîl nekem ȟelale».*

**S. 57** *1 Birahîm Xelîl go e: «Ya emînê Xwedê, min çîqas mal heye li bale,*
*2 Ȟemû dikim ȟelale,*
*3 Serê p'êẍember Simaîl nekem ȟelale».*

**S. 59** *1 Birahîm Xelîl go: «Ya emînê Xwedê, ez wî kem yekî li sema,*
*2 Min çîqas zêȓ û mal li ceme,*
*3 Hem bi te dideme,*
*4 Serê nebîy Simaîl nademe».*

**S. 58** *1 «Ya surgirê Xwedê, ez wî kem yekî li sema,*
*2 Min çîqas zêȓ û mal li ceme,*
*3 Hem bi te dideme,*
*4 Serê p'êẍember Simaîl nademe».*

## 139. QEWLÊ NEBÎY SIMAÎL[2951; 2952]

**S. 1** *1 Silav bike li Cebêre,*
*2 Û nebîyêt ehl îl-xêre,*
*3 Xwendina[2953] wan ji dêra.*

**S. 1** *1 Silav bike li hêzdêre,*
*2 Wê p'êẍember xudiyê xêre,*
*3 Bobê p'êẍemberan û gîyan[2954], xwendina[2955] wan ji dêra.*

**S. 2** *1 Silav bike il-Semede,*
*4 Û nebîyêt xwedan k'eremete,*
*5 Babê bi qurbanîya xwe kirbû welede.*

**S. 2** *1 Silav biken il-Semede,*
*2 Wê li p'êẍemberêd xwedan[2956] k'eremete,*
*3 Babê bi qurbana Xwedê kirbû welede.*

**S. 3** *1 Simaîlî t'ifale[2957],*
*4 Ji deştê dihate male,*
*5 Babê xemeke giranîye li bale.*

**S. 3** *1 Simaîlî mendale,*
*2 Ji deştê dihate male,*
*3 Babê xemeke giran li bale.*

**S. 4** *1 «Babo, xema hilmegre,*
*4 Dest û p'êyêt min xena birêje,*
*5 Min qurbanîya navê Xwedê bikuje.*

**S. 4** *1 «Babo, xema hilmegre,*
*2 Dest û p'êyêt min xena birêje,*
*3 Min qurbana navê Xwedê bikuje.*

**S. 5** *1 Babo, em diçêyîn,*
*2 Xwedê ȓoj em divêyîn,*
*3 Qurbanîya Xwedêyîn».*

**S. 5** *1 Babo, em di ȓewayîn,*
*2 Mîrê mezin ji jor em dayîn,*

---

[2951] [2] (rr. 312–317)
[2952] [50] *Qewlê p'êẍember Îsmaîl* (rr. 70-74)
[2953] *xondin*
[2954] *giyan*
[2955] *xundin*
[2956] *xudan*
[2957] *tefal*

*3 Em bi qurbana Xwedê di şayîn».*

**S. 6** *1 Babo, em diçêne,*
*2 Mîrê mezin ji jor em divêne,*
*3 Em bi qurbana Xwedê dişêne».*

**S. 6** *1 Simaîlî t'ifale,*
*4 Ji deştê dihate male,*
*5 We dibêjite dayîka kale:*
*6 «Şîrê xwe li min bike ĥelale».*

**S. 7** *1 Simaîlî mendale,*
*2 Ji deştê dihate male,*
*3 Wê dibêjit diya kale:*
*4 «Dayê şîrê xwe li min bike ĥelale».*

**S. 7** *1 Simaîlî jîre,*
*2 We dibêjite dêya pîre: «Li min ĥelal bike şîre,*
*3 Hatîye ser min mersuma mîre!»*

**S. 8** *1 Simaîlî jîre,*
*2 Wê dibêjit diya pîre:*
*3 «Dayê li min ĥelal bike şîre,*
*4 Hatîye ser min yasaya mîre!»*

**S. 8** *1 Maka bi nav Hacere,*
*2 Şuşitîne cil û sere,*
*3 Gotê: «Simaîlo, heȓe, şîrê min ĥelal bit bi cane te ȓa!»*

**S. 9** *1 Ew maka bi nav Hacere,*
*2 Şuştibû cil û sere,*
*3 Gotê: «Lawo, şîrê min ĥelal bû bi cane te ȓe!»*

**S. 9** *1 Şerîtekî bînin,*
*4 Dest û p'êyêt Simaîl bişidînin,*
*5 Ȓuĥe şîrine[2958], neku xwe li ber k'êra Cebraîl bilivînim.*

**S. 10** *1 Babo, benê zirav bînin,*
*2 Dest û p'iyêd Simaîl bişidînin,*
*3 Ȓuĥe şîrine[2959], ne ku xwe bilivînim.*

**S. 10** *1 Şerîta zirave,*
*8 Dest û p'êyêt Simaîl şidand, havêtine nave,*
*9 Birahîm Xelîl di hindurûyê zigî Xwedanî tengave.*

**S. 11** *1 Înabûn benê zirave,*
*2 Dest û p'êd Simaîl şidînin, havête nave,*
*3 Birahîm Xelîl ji hinderû dilê xwe may tengave.*

**S. 11** *1 Şerîta nûranî,*
*2 Dest û p'êyêt nabî Simaîl şidandî weke [tu] dizani,*
*3 Birahîm Xelîl hindiȓûyê zigê xwe da wê dinalî.*

**S. 12** *1 Înabûn benê nûranî,*
*2 Dest û p'iyêd p'êẍember Simaîl girêdidin weke [tu] dizanî,*
*3 Birahîm Xelîl hindiȓû dilê xwe may dinalî.*

**S. 13** *1 Babo, megirî[2960], bes binale,*
*2 Hêstira ji ȓûwê xwe bimale,*
*3 Biryara Xwedê heke hat, nabe betale.*

[2958] *şirîn*
[2959] *şirîn*
[2960] *bigirî*

**S. 12** *1 K'êra ne ji vê zemanî,*
*2 Sê cara di geȓdena nabî Simaîl wer anî,*
*3 K'êrê qitmek zê hilnanî!*
**S. 14** *1 Ew k'êra ne ji vî zemanî,*
*2 Sê cara di geȓdena p'êẍember Simaîl ȓa wer anî,*
*3 K'êrê qet mûwek jê hilnanî!*

**S. 13** *1 K'êra weke xişte,*
*2 Sê cara di geȓdena nabî Simaîl ȓadihişte,*
*3 K'êrê dev wergeȓiya bûye*[2961] *pişte.*
**S. 15** *1 Ew k'êra weke xişte,*
*2 Sê cara di geȓdena p'êẍember Simaîl ȓa dihişte,*
*3 K'êrê dev wergeȓandibû pişte.*

**S. 14** *1 K'êra weke mûye,*
*2 Sê cara di geȓdena nabî Simaîl di hisûye,*
*3 K'êrê dev wergeȓiyabûye ȓûye!*
**S. 16** *1 Ew k'êra weke mûwe,*
*2 Sê cara di geȓdena p'êẍember Simaîl ȓa di hisûwe,*
*3 K'êrê dev wergeȓandibû ȓûwe!*

**S. 15** *1 K'êra weke nare,*
*2 Havête kevirekî sare,*
*3 K'êrê kevir ker kir weke xîyare!*
**S. 17** *1 Ew k'êra weke are,*
*2 Havêtiye kevirekî sare,*
*3 K'êrê kevir ker kir weke xîyare!*

**S. 16** *1 K'êrê digotê: «Nebîy Birahîmo, mane ye tujim,*
*2 Ez nabîyya nakujim,*
*3 Dê di agirê temer bê da sojim».*

**S. 17** *1 K'êra bi nav sikîne,*
*2 Birahîm Xelîl e'silê min ji biȓîne,*
*3 Belê ji bana hatî ȓeda, ji nik Xwedê nine.*

**S. 18** *1 Nîneka k'êrî û Birahîm li Xelîle,*
*2 Li wêder bû qale û qîle,*
*3 Ẍeyîdî exî li Cebraîle.*
**S. 18** *1 Nîneka k'êrî û p'êẍember Birahîm Xelîle,*
*2 Li wê hebû qale û qîle,*
*3 Ẍeydî axî li Cebraîle*[2962]*.*

**S. 19** *1 Birahîm Xelîl dibêjite: «Cebraîlo me ȓa,*
*2 Dê serê nebîy Simaîl biȓim ji te ȓa,*
*3 Namusekê kem ji Xwedê yê xwe ȓa».*
**S. 19** *1 Birahîm Xelîl dibêjite: «Cebraîlo, tu me ȓa,*
*2 Dê serê p'êẍember Simaîl jêkem ji te ȓa,*
*3 Namusekê kem ji Xwedayê xwe ȓa».*

**S. 20** *1 T'emam bû qewl û we'de,*
*2 Birahîm Xelîl geȓdena nebîy Simaîl girtbû û bada,*
*3 Sê cara k'êr têda da,*
*4 K'êrê qitmek jê hilneda.*
**S. 20** *1 T'emam bû qewl û sozê Xweda,*
*2 Birahîm Xelîl geȓdena p'êẍember Simaîl girtibû û bada,*

[2961] *bûe*
[2962] *Cebrayîl*

*3 Sê cara k'êr têda da, k'êrê qitmek jê hilneda.*

**S. 21** *1 Nebîy Simaîl jîre,*
*2 We dibêjite babê pîre:*
*3 «Em dêçin pêş dîndara mîre».*
**S. 21** *1 Simaîlî jîre,*
*2 We dibêjite babê pîre:*
*3 «Em dêçin pêş dîndara mîre».*

**S. 22** *1 Birahîm Xelîl we dixurî,*
*2 «Ya lawo, tu ne yî Munkirî,*
*3 Çî bikem k'êr qiȓka te nabiȓî!»*
**S. 22** *1 Birahîm Xelîl li wî xurî,*
*2 Gotê: «Ya lawo, tuy[î] Munkirî,*
*3 Çî bikim k'êr qiȓka te nabiȓî!»*

**S. 23** *1 Birahîm Xelîl xemeke din hate bale,*
*2 K'êr havête kevirekî sare,*
*3 K'êrê kevir kir weke xîyare.*
**S. 23** *1 Birahîm Xelîl xemeke din hate bale,*
*2 K'êr havête kevirekî sare,*
*3 K'êrê kevir kir weke xyare.*

**S. 24** *1 K'êrê cewab daye:*
*2 «Ya Birahîm Xelîl, min çî xetaye,*
*3 Ji bo Xwedê ne hatî ȓedaye».*
**S. 24** *1 K'êrê wa bersiv daye:*
*2 «Ya Birahîm, min çî xetaye,*
*3 Ji bo Xwedê nehatîbû ȓedaye».*

**S. 25** *1 K'êrê bi nav sikîne,*
*2 Got: «K'oka min bi xwe biȓîne,*
*3 Belê ji ba Xwedê ȓêdan nîne».*

**S. 25** *1 K'êrê go: «Birahîm Xelîl, ezî tujim,*
*2 Çawa dê nebîya bikujim,*
*3 Ȓoja axretê dê di agirê dojêh da bisojim».*
**S. 26** *1 K'êrê got: «Ma ez neye tujim,*
*2 Ez p'êẍtmbera nakujim,*
*3 Dê li ȓoja axretê di dojêh da sojim».*

**S. 26** *1 Ji qewlê p'îr Xidir,*
*2 Beranek hatî ji hidir*[2963]*,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl dikir.*
**S. 27** *1 Ji qewlê p'îr Xidir,*
*2 Beranek hatî ji hidir,*
*3 Qurbaniya serê p'êẍember Simaîl dikir.*

**S. 27** *1 P'îrî Xidir we dibête:*
*2 «Beranek ji bana tête,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl divête».*
**S. 28** *1 P'îr Xidir we dibête:*
*2 «Bila beranek ji bana bête,*
*3 Qurbaniya serê nebîy Simaîl dişête».*

**S. 28** *1 Beranê k'indira,*
*2 Horîye li bihuştê xwedan dikire,*

[2963] binêr: *hadêr*

*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl dikire.*
**S. 29** *1 Ew bû beranê hundira,*
*2 Horêye ĥeft sala li bihuştê xwedan dikire,*
*3 Qurbaniya serê p'êẍember Simaîl dikire.*

**S. 29** *1 Beranê k'elîne,*
*2 Înabû ji xezîna Celîne,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl digehîne.*
**S. 31** *1 Ew beranê k'elîle,*
*2 Hatibû ji xezîna Xwedayê Celîle,*
*3 Kire qurbaniya p'êẍember nebîy Simaîle.*

**S. 30** *1 Beranê beleke,*
*2 Înabû ji xezîna xaliqe,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl dike.*

**S. 31** *1 Beranê sore,*
*2 Înabû ji xezîna jore,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl dibore.*
**S. 32** *1 Ew beranê sore,*
*2 Hatibû ji xezîna jore,*
*3 Qurbaniya serê p'êẍember Simaîl dibore.*

**S. 32** *1 Beranê r̂eşe,*
*2 Înabû ji xezîna E'rşe,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl dixweşe.*

**S. 33** *1 Beranê hirandî,*
*2 Horîye li bihuştê gêr̂andî,*
*3 Qurbanîya serê nebîy Simaîl di gehandî.*
**S. 30** *1 Ew beranê hirandî,*
*2 Horêye ĥeft sala li bihuştê ĉêrandî,*
*3 Qurbaniya serê p'êẍember Simaîl digehandî.*

**S. 34** *1 Beranek ji bana dihate,*
*2 K'elî bû li wê simatê,*
*3 R̂oja îd û E'refatê,*
*4 Me û hazir û guhdêra, bar hebit li vê simatê.*
**S. 34** *1 Beranek ji bana dihate,*
*2 K'elî bû li wê simatê,*
*3 R̂oja cejn û E'refatê,*
*4 Me û hazir û guhdêra, p'ar hebit li vê simatê.*

## 140. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER[2964]

**S. 1** *1 Ew Birahîmê[2965] t'ifalê save,*
*2 Deh salî li k'afê mave,*
*3 Ne dîbû r̂onehî û tave.*
*1 Ew Birahîmê[2966] mendalê save,*
*2 Deh salî li şkeftê mave,*
*3 Ne dîbû r̂onehî û tave.*

**S. 2** *1 Wextê donzde[h] sal ťemam bû,*

[2964] [2] (rr. 318–321)
[2965] *Birihîm*
[2966] *Berhim*

*2 Zana, e'rif û fam bû,*
*3 Go: «Ez ji k'afê der dik'evim babo!»*
*1 Dema donzdeh*[2967] *sal t'emam bû,*
*2 Zanayar, teghiştî, û fam bû,*
*3 Got: «Ez ji şkeftê der dik'evim babo».*

**S. 3** *1 Dema li k'afê ço der,*
*2 Vebûn ĉav û neder,*
*3 Sicûdet bo r̂ojê ber.*
*1 Dema ji şkefte çû der,*
*2 Vebûn ĉav û neder,*
*3 P'erweste bo r̂ojê ber*

**S. 4** *1 Birahîmê p'ir̂ zana,*
*2 Dişkênî p'ût*[2968] *û p'ûtxane*[2969]*,*
*3 Nemr̂ûdî pê zana.*
*1 Birahîmê p'ir̂ zana,*
*2 Dişkênî p'ût*[2970] *û p'ûtxane*[2971]*,*
*3 Nemr̂ûdî pê zana.*

**S. 5** *1 Nemr̂ûdî bin Kene'ane,*
*2 Gawirê wî zamane,*
*3 Qeralê k'afirane.*
*1 Nemrudê bin Kena'ne,*
*2 Gawire wî zemane,*
*3 Qiralê gawirane.*

**S. 6** *1 Nemr̂ûdî go: «Bi p'ût û senema nijî,*
*2 Lêzime Birahîmî bi agir bisojî».*
*1 Nemrudi got: «Bi p'ût û senema nijî,*
*2 Pêwîste Birahîmî bi agir bisojî».*

**S. 7** *1 Dar înan li çar kenaran,*
*2 Bi k'er, û olaq*[2972]*, û deweran,*
*3 Ĥezar bar, sed ĥezaran.*
*1 Dar înan li çar kenaran,*
*2 Bi k'er, u hêster, û deweran,*
*3 Ĥezar bar, sed ĥezaran.*

**S. 8** *1 Dar înan li çar kenare,*
*2 Ĥezar ĥezar bar dare,*
*3 Go: «Heliken agir nare,*
*4 Birahîmî p'avên xware».*
*1 Dar înan li çar kenare,*
*2 Ĥezar ĥezar bar dare,*
*3 Go: «Heliken agir nare,*
*4 Birahîmî p'avên xware».*

**S. 9** *1 Nemr̂ûd mêjû xave,*
*2 Birahîmî diêxite nave,*
*3 Li wî dem[î] û gave.*
*1 Nemrûd mejû xave,*
*2 Birahîmî diêxite nave,*

2967 *diwanzde*
2968 *bit*
2969 *butxane*
2970 *bit*
2971 *butxane*
2972 *wilax̆*

*3 Li wê demê û gave.*

**S. 10** *1 Tawisî melek' nazilî*[2973] *ji e'zmanî,*
*2 Go: «Ya agir bibe zivistane!»*
*1 Tawisî melek' dak'et ji e'zmane,*
*2 Got: «Ya agir bibe zivistane!»*

**S. 11** *1 Lerizî Birahîm û bihinijî,*
*2 Tawisî melek' k'enî û girnijî.*
*1 Lerizî Birahîm û bihinijî,*
*2 Tawisî melek' k'enî û girnijî*[2974]*.*

**S. 12** *1 Birahîm go: «Ya melek'ê Tawise!*
*2 Li ber serma, min nîne hewese».*
*1 Birahîm got: «Ya melek'ê Tawise,*
*2 Li ber serma, min nîne hewese*[2975]*».*

**S. 13** *1 Tawisî melek' ew cihe, ew mek'ane,*
*2 Kire baẍ û bîstane,*
*3 Zozane wek kuwarstane*[2976]*.*
*1 Tawisî melek' ew cihe, ew mek'ane,*
*2 Kire baẍ û bistane,*
*3 Zozane wek kuwerstane*[2977]*.*

**S. 14** *1 Nemȓûd dît Birahîm li gel yare,*
*2 Nasojit bi guȓû nare,*
*3 Go: «Ev çi k'are?»*
*1 Nemȓûd dît Birahîm li gel yare,*
*2 Nasojit bi guȓû are,*
*3 Got: «Ev çi k'are?»*

**S. 15** *1 Birahîm xilasbû ji agir û guȓî,*
*2 Nav çendî ya derk'eft û borî.*
*1 Birahîm ȓizgar bû ji agirû guȓî,*
*2 Nav çende ya derk'et û borî.*

**S. 16** *1 Birahîm barkir li gel çend êle,*
*2 Li gel bû Sara ser kêle,*
*3 Gehişte Lalişa bi hilêla.*
*1 Birahîm barkir li gel çend êle,*
*2 Li gel bû Sara ser kêle,*
*3 Gihişte Lalişa bi hilêle*

**S. 17** *1 Birahîm gehişte Lalişa nûranî,*
*2 Bi e'mirê*[2978] *Êzidê sibĥanî,*
*3 Li xasa bûye mêvanî*[2979]*.*
*1 Birahîm gihişte Lalişa nûranî,*
*2 Bi fermana Êzdî sibĥanî*[2980]*,*
*3 Li xasa bûwe mevanî.*

**S. 18** *1 Birahîm hat Lalişa p'iȓ xase,*
*2 Ji destê e'rifa vexwar k'ase,*

---

[2973] *nizilî*
[2974] *girnijîn* ango *ȓûk'en, nîşana dilxwaşî û şadîye*
[2975] *hewes* ango *debara min ji serma naye*
[2976] *kwêstane*
[2977] *kuyêstan*: bi diyalikta kurmanciya *xwariye*, ango *zozan, havîngehe. Ciyê şîinkay, pir mêrg û çîmen*.
[2978] *e'mir yê*
[2979] *hêvan*
[2980] *subhan*

*3 Ji nûka Ȓebê xwe*[2981] *kir nase.*
*1 Birahîm hat Lalişa p'ir xase,*
*2 Ji destê zanyara vexwar k'ase,*
*3 Ji nûka Xwedayê xwe kir nase.*

*Em di kêmin, Xwedî yî ť'emame!*

## 141. QEWLÊ CUMCUMÎ SILT'AN[2982]

**S. 1** *1 Îsa û Şemûne,*
*2 Di bi ȓêyekê da diçûne,*
*3 Ser Cumcumekî hilbûne.*

**S. 2** *1 Ew serê li nav Cumcumî,*
*2 Wekî Îsa bora diqedimî,*
*3 Darsed di serîda dikelimî.*

**S. 3** *1 Îsa diqedimî, lê dikir silave,*
*2 Serî ji k'eremê bore vedave,*
*3 Go: «Ya nebîy*[2983] *Îsa, tu ser serê min hatî û herdu ĉava».*

**S. 4** *1 Îsa gotê: «Çawa tu dizanî ezim Îsa yê bi nave»,*
*2 Ser dibêjitê: «Eve berî pêncsed salane,*
*3 Min ji k'erema Xwedê dizanî, dê li min bêya mêvane».*

**S. 5** *1 Îsa digotê: «Sero, tu bi wî key îlaĥîye,*
*2 Dê bêjiye min ȓastîye,*
*3 K'a k'arê te kirî ser e'rdê Xwedê çîyê?»*

**S. 6** *1 Ser dibêjitê: «Ya nebîy Îsa,*
*2 Ez xunk'arek*[2984] *bûm, ji xunk'arêt giran,*
*2 Min dayî nedîtibû, ne bab, û ne biran».*

**S. 7** *1 Îsa dibêjitê: «Tu bi wî key îlaĥîye,*
*2 De bêje min ȓostîye,*
*3 Xunk'ariye te kirî çîyê?»*

**S. 8** *1 Ser dibêjitê: «Ya nebîy Îsa, min hebûn ĥezar jina,*
*2 Ez bi xewleyekê bi navda diçime,*
*3 Ew bedîla Cumcumî silt'an bû, kes bi kes ȓa nedibû dijmine.*

**S. 9** *1 Ya nebîy Îsa, min hebûn ĥezar xamekiye,*
*2 Ew bedîla Cumcumî silt'an biye*[2985]*,*
*3 Kes bi kes ȓa nedibû neyartiye.*

**S. 10** *1 Herȓo ku ȓoj dihate dere,*
*2 Min ĥezar ji zêndana înane dere.*

**S. 11** *1 Ya nebîy Îsa, ĥezarî p'êxwas min dikirin medas,*
*2 Û ĥezarî ȓûs min dikirin bi libas».*

---

[2981] *xo*
[2982] [1] (pp. 350–354)
[2983] *nenî*
[2984] *xwendk'ar*
[2985] *bû*

**S. 12** *1 Îsa dibêjitê:*
*2 «Ya Cumcum, ev leşkerê*[2986] *zorî zave,*
*3 Çawa te ji êk dinasîn bi nave?»*

**S. 13** *1 Ser dibêjitê: «Ya nebîy Îsa, ĥezar di cuce bûm,*
*2 Ĥezarî di k'ose bûn,*
*3 Ĥezarî bi qutik û qedife bûn,*
*4 Ĥezarî bi şîrê mirwede bûn.*

**S. 14** *1 Ĥezar gêncêt r̂ewal bûn,*
*2 Ĥezar lawêd bi xilxal bûn,*
*3 Ĥezar bi min r̂a heval bûn.*

**S. 15** *1 Ĥezar bi şûrê sor bûn,*
*2 Ĥezar bi şûrê mor bûn,*
*3 Ĥezar bi min r̂a yî li jor bûn.*

**S. 16** *1 Ĥezarî bi qelûn bûn,*
*2 Û ĥezarî bi t'itûn bûn,*
*3 Belê ew ji dîwane minî di mehr̂ûm bûn».*

**S. 17** *1 Ser dibêjitê:*
*2 «Ya nebîy Îsa, carek ez çûme nêĉîrê,*
*3 Min dît leşkerekî zorî zave li wê dîrê.*

**S. 18** *1 Qasî stêrêt e'zmana»*
*2 Min go: «Gelo, ewe leşkerê k'êye hoy girane?»*
*3 Cewab da min: «Ewe qitmeke ji leşkerê Cumcumî silt'ane!»*

**S. 19** *1 Îsa ji serî dipirsîya: «Sero, tu bi wî key îlaĥîye,*
*2 Dê bêjîye min r̂astîye,*
*3 K'a ola te dip'arasit çîye?»*

**S. 20** *1 Ser dibêjitê: «Ya nebîy Îsa,*
*2 Bi wî kem yî e'rd û e'zman bîr̂ast,*
*3 Ola min gay bû, min dip'arasit.*

**S. 21** *1 Çu nema min bo wî gay ne kirî,*
*2 Min qesra r̂ijêjî jê r̂a ava kirî,*
*3 Min tej û mehfûr li bin ciyê wî r̂axist kirî».*

**S. 22** *1 Îsa dibêjitê: «Sero, tu bikeyî îlaĥîye,*
*2 Dê bêje min r̂astîye,*
*3 K'a ĥewalê te û mirinê çawa bîye?»*

**S. 23** *1 Ser dibêjitê: «Ya nebîy Îsa, carekê çome r̂ave,*
*2 Li min êşan dil û hinave,*
*3 Gelek ji xenîmê dibûm tengave.*

**S. 24** *1 Ya nebîy Îsa, ez çom zûye,*
*2 Xenîm li min bûne dûye,*
*3 Çu cara li r̂ima min ne dibûye.*

**S. 25** *1 Ya nebîy Îsa, ez çom li r̂êye,*
*2 Xenîm li min dibûne sêye,*
*3 Çu çare li r̂ima min nekirin bi çu r̂êye.*

---

[2986] *lêşker*

**S. 26** *1 Ya nebîy Îsa, ez çom wekî hercare,*
*2 Xenîm li min bûne çare,*
*3 Li r̂ima min nekirin çû care.*

**S. 27** *1 Ya nebîy Îsa, ez çom li r̂êĉ,*
*2 Xenîm li min bûne pênc,*
*3 Ez dik'eftim wekî hêştirekî hêç,*
*4 R̂uĥa min dibirin, qalb mabû li r̂êĉ.*

**S. 28** *1 Ya nebîy Îsa, wekî qewm û milet dihatine min,*
*2 Leşê min bi ava germ p'ak kirin,*
*3 Serê min li nav k'ifnî*[2987] *werkirin.*

**S. 29** *1 Zebênî li min r̂a digehaye,*
*2 Bin Ademo, çu meferêya te nemaye,*
*3 Hilû hana xwe bigehîne wî gaye!»*

**S. 30** *1 Gay wê diçêye bi qudreta îlaĥîye,*
*2 Çar qurnetê dinyayê ger̂îye,*
*3 Li derê bihuştê gehiştîye.*

**S. 31** *1 Gay ji melekê bihuştê dipirsîye:*
*2 «Tu bi wî key îlaĥîye,*
*3 Bo min bêje r̂astîye,*
*4 Yê berî sê r̂oje hatî k'îye?»*

**S. 32** *1 Melekê bihuştê dibêjitê wîye:*
*2 «Tu bi Xwedê key îlaĥîye,*
*3 Yê hatîye hêre, navê wî çîye?»*
*4 Gay dibêjitê: «Nave wî Cumcumî silt'an, gay p'arêse».*

**S. 33** *1 Wextê melekê bihuştê pelg qûlpandîne,*
*2 Navê Cumcumî têda ne dîtîne,*
*3 Gotê: «Cumcumê te li hêre nîne».*

**S. 34** *1 Gay wê diçiye li derê dojêh gehiştîye,*
*2 Ji melekê dojêh dipirsîye:*
*3 «Berî sê r̂oja Cumcum nehatîye?»*

**S. 35** *1 Melekê dojêh ji Gay r̂e dibêjîye:*
*2 «Bi firwara îlaĥîye,*
*3 Cumcumê te li nik minî girtîye».*

**S. 36** *1 Gay gote melekê:*
*2 «Cumcum bîne dere»*
*3 Gote gay: «Meysa Xwedêye, firwara wî bi sere».*

**S. 37** *1 Gay çî kirîye,*
*2 Serê xwe bi dîwarê dojêh venaye,*
*3 Bi qewata îlaĥîye, dojeh xidê hijandîye.*

**S. 38** *1 Ya ĥeywanê micbarek,*
*2 Tu muhletê bide min, nêhin wedanek,*
*3 Da ez ji R̂ebê xwe bikem hîvîyek.*

**S. 39** *1 Bi r̂eĥmeta îlaĥîye,*
*2 Cewabek jê r̂a hatîye,*

[2987] binêr: *k'efen*

*3 Cumcum li gel hevala berdayîye.*

**S. 40** *1 Cumcum dibêjitê: «Ya nebîy Îsa, ne ez bim, ne mîrîye min kirî,*
*2 Li ser ĥemû k'irîyarêt min kirî,*
*3 Sê r̂oja ez havêtme nav kurha agirî».*

## 142. QEWLÊ R̂ABIYA IL-EDEWIYE[2988]

**S. 1** *1 Li min cema' dibûn velîye*[2989]*,*
*2 Şêx Cûnêd Şiblîye,*
*3 Şêx Me'rûf Kerxîye,*
*4 Şêx Dawid T'ixûbîye,*
*5 Bazîd Bestamîye.*
*6 Herçar birayêt qîmetîye,*
*7 Derê Şerefxane diçîye,*
*8 R̂abî ji me r̂a der anîye.*

**S. 2** *1 Xelqê ẍafilî şenge,*
*2 Li vir neken çu denge,*
*3 Da ji heya neçitin çu r̂enge.*

**S. 3** *1 Xelqê ẍafilî kore,*
*2 R̂abî ciwaneke dilgire,*
*3 Şêx Bazîd mêrekî p'îre,*
*4 Şerm diket biçite dîwanêt feqîra.*

**S. 4** *1 R̂abî ciwaneke çake,*
*2 Li wê sur̂ê gelekî muşt'aqe,*
*3 Ger̂iyabû zikak bi zikake,*
*4 Ĥeta dîkila li E'rşa bang dike.*

**S. 5** *1 R̂abiya il-Edewiye,*
*2 Girte berberê wê dîye,*
*3 Şivanekî wê dibînîye.*

**S. 6** *1 «Şivano, tu bi Xwedê keyî îlaĥîye,*
*2 Tu r̂astî bo min bejîye,*
*3 Te siwarekî ho[y] nedîtîye,*
*4 Li berda t'ac û hile nûranîye?*

**S. 7** *1 Şivano, yî şivane,*
*2 Te xirab nebit malik wêrane,*
*3 Te nedîtbû ew silt'ane,*
*4 Yê dilê R̂abî pê dibû ĥeyrane».*

**S. 8** *1 Şivan dibêjitê: «E'yb li te hurmetê,*
*2 Eve çil sal dik'êşim ẍîretê,*
*3 Qet r̂astîyek ji dilê min der netê».*

**S. 9** *1 «R̂ojekê sibehîye,*
*2 Min dîtbû siwarek borîye,*
*3 Li berda t'ac û hile, xerqê nûranîye,*
*4 Eve çil sal min ji berî te zanî sur̂a şêxê Adîye*[2990]*!»*

---

[2988] [1] (pp. 196-201); [2] (rr. 432-437);
[2989] *weliye*
[2990] *şêx E'dî*

**S. 10** *1 R̂abî Edewiye,*
*2 Girte ber xwe berê wêdîye,*
*3 Xulqatekî dibînîye,*
*4 Xwezî min zanîye miraza vê xulqatê çîye?*

**S. 11** *1 Ji k'eremê min dave,*
*2 Dêlê cewab didave:*
*3 «Ya R̂abî, ĥezreta min nuqtek ave».*

**S. 12** *1 R̂abî Edewiye,*
*2 K'êrek ji berîka xwe der anîye,*
*3 Dest havête kezîyêt xumrîye,*
*4 Danan û dibirîye,*
*5 Kire şerîtekî nûranîye,*
*6 Av bi solka xwe deranîye,*
*7 Da wê xulqata t'ênîye.*

**S. 13** *1 Xêr ji wê xulqatê dîtîye,*
*2 Berejor r̂ênî, dît E'rş û K'ursîye,*
*3 Berejêr r̂ênî, dît Gay û Masîye.*

**S. 14** *1 Ĥeft t'ebeqêt e'rdê,*
*2 Ĥeftêt e'zmana,*
*3 Ser k'efa silt'an Şîxadiye.*

**S. 15** *1 R̂abî av da dêla,*
*2 Ser hilîna dît qub û hilêle,*
*3 K'ursiya lê dîbû Cebêre.*

**S. 16** *1 R̂abiya dêl av da ye,*
*2 Mexsûsek dur̂ek bora îna ye,*
*3 Xêr kir, xêr ceza ye.*

**S. 17** *1 Xeber ger̂iyabû li welate*[2991]*,*
*2 R̂abî tê ji xirabate,*
*3 Ser serê wê heye k'eramate*[2992]*.*

**S. 18** *1 Herçar birane,*
*2 Vêkr̂a dikin dengane,*
*3 Herçar birayêt ĥebîbî R̂eĥmane.*

**S. 19** *1 Herçar birayêt gul babe,*
*2 Ji malê çone pişt ave,*
*3 Bi xêr hatin, min vedave,*
*4 Mêvan werin, bila li derve miskîn zave.*

**S. 20** *1 R̂abî we dibêye:*
*2 «Bila mêvan têye,*
*3 Miskîn zava nêye,*
*4 Me qewî şerme û vêye».*

**S. 21** *1 We dibêjît şêx Bezîde:*
*2 «Hey R̂abî vaĥîde*[2993]*,*
*3 Em şêxin tu mirîde.*

---

[2991] *wekat*
[2992] binêr: *k'eremet*
[2993] *wehîd*

**S. 22** *1 Ez mirîdê şêxê xweme,*
*2 Berî Lewĥ û Qelema,*
*3 Ewe şêxê min, suȓ li sema.*

**S. 23** *1 Ȓabî k'anê,*
*2 Şêxê jê det nîşanê,*
*3 Hêj ne qedimîye dîwanê.*

**S. 24** *1 Şêxê min silt'ane,*
*2 Wê li destî da mişûrê mêrane,*
*3 Serê ĥemû wê îmane.*

**S. 25** *1 Şêxê min heweste,*
*2 Gustîla qudretê wê li deste,*
*3 Sed wekî te pêşve diweste,*
*4 Maşê xwe jê dixweste.*

**S. 26** *1 Be'dî çil sal t'emame,*
*2 Şêxek dê ȓabit li Şame, Laliş meqame,*
*3 Navê wî silt'an şêx Adî e'leyhî il-selam*[2994]*,*
*4 Ez dê bime cêrî, hûm dê bin xulame.*

**S. 27** *1 Be'dî çil salê dîye,*
*2 Şêxek li e'rdê Şamê ȓabiye, Laliş meqamê wîye,*
*3 Navê wî silt'an şêx Adî ye,*
*4 Hûn dê bine xulam, ez dê bime cêriye.*

**S. 28** *1 K'erem, k'erema mêrane,*
*2 Şifqe — şifqa P'adşane,*
*3 Serê ĥemûyê îmane.*

**S. 29** *1 Kes bawirî*[2995] *bi hurmetê neînan,*
*2 Hûn şêrpikê avê bînin,*
*3 Da beyana bicerbînin.*

**S. 30** *1 Xelqê*[2996] *li wê bihîşte,*
*2 Şêrpik hilawiste,*
*3 K'î da serê k'eremê êxiste.*

**S. 31** *1 Şêx Bezîd mêrekî bi k'are,*
*2 Wek'az îna ji nav dare,*
*3 Wek'az li şêrpikî da, av û şêrpik îna xware.*

**S. 32** *1 Ȓabî dibêjit:*
*2 «Ĥeyfa me tê mêr wekî te li dîwenê şermîn, şermezare».*

**S. 33** *1 Dor hate ser Ȓabî sermeste,*
*2 Destûrî ji Xwedê û mêra dixweste,*
*3 Pişta xwe bi silt'an şêx Adî beste,*
*4 Wek'az hilgirtiye bi deste,*
*5 Wek'az li şêrpikî da, şêrpik dişkeste,*
*6 Şêrpik hate xwer, av mabû mu'eleq*[2997] *qendîl vediweste.*

**S. 34** *1 Bi qûdreta Celîle,*

[2994] binêr: *e'lêk'ûm selame*
[2995] binêr: *bawerî*
[2996] *xelk*
[2997] *mi'eleq*

*2 R̂abî şikand sebîle,*
*3 Av mabû mu'eleq li qendîle.*

**S. 35** *1 Ew mêrêt Ellaĥe,*
*2 Vêk r̂adiken medehe,*
*3 [Ya] R̂abî, sehe û sed car sehe.*

**S. 36** *1 Ew bûn mêrê me'bûde,*
*2 Vêk r̂a diken ĥedûde*[2998]*,*
*3 Dik'êşine ber R̂ebî sicûde.*

*Em di kêmin, Xwedê yî ťemame!*

## 143. QEWLÊ DENUNÊ MISRÎ[2999]

**S. 1** *1 Hun bifikirin xelqî hune,*
*2 Ew qewle ji qanûne,*
*3 Em da bideyn medhê şêx Denune.*

**S. 2** *1 Neku berê xwe jê wergeȓînin,*
*2 Qest kene dîwanêt xasa, xwe pê hilînin,*
*3 Da we bibene ciyê xêr û xêrata lê diqebilînin.*

**S. 3** *1 Neku*[3000] *berê xwe jê bibetilin,*
*2 Qesid kene dîwanêt xasa, pê bi e'silin*[3001]*.*
*3 Da we bibene ciyê xêr û xêrata lê qebilin.*

**S. 4** *1 Hun qebûl bikin firwarê,*
*2 Qest kene dîwanêt xasa, biken pirsê û pirsyarê,*
*3 Şêx Adî xwedanê qirarê.*

**S. 5** *1 Kesek ji Silêman p'êx̂ember meztir ne bû,*
*2 Êqsîr û zebûnê nefsa xwe bû,*
*2 Gava ço dîwana ĥeqîyê, sebeb nefsa xwe damayî bû.*

**S. 6** *1 Ewî hikm dikir ins, û cins, û çendî cane,*
*2 Gava ço dîwana ĥeqîyê, sebeb nefsa xwe ma sefîlekî sergeȓdane.*

**S. 7** *1 Hun bibînin mîrya mîr Birahîme,*
*2 Ewî t'erk kir milkan û xezîna,*
*2 Ĥeta gehişte ciyê me'rîfetê û nasîne.*

**S. 8** *1 Birahîm dibêjit: «Denuno, heke te divêt tu bik'evîye benda îmanê,*
*2 Misrê t'erk bike, wekî min t'erk kir Xoȓistanê,*
*3 Da bigehîye wê mirazê, wê dîwanê».*

**S. 9** *1 Wey li Denunê minî dêm şemale,*
*2 Bi xerqê silt'an Birahîm xemilî çobûye bale,*
*3 R̂eş xumrîyan û r̂eş xeyale*[3002]*,*
*4 Da ji dilî der înabû ew xeyale.*

**S. 10** *1 Wey li Denunê minî qelendere,*

[2998] *xidûd*
[2999] [2] (rr. 563-566)
[3000] *neko*
[3001] *bû e'silin*
[3002] *xeyal*

*2 Bi xerqê silt'an Birahîm xemilî ĉobûne bere,*
*3 Hûn bibînin r̂eş xumrîyan û r̂eş nedere,*
*4 Da ji dilî der înabû ew k'esere.*

**S. 11** *1 Mîrîya Denunî çêye,*
*2 P'aşayê Misrêye,*
*3 Aşiqê dota p'îrêye.*

**S. 12** *1 P'îrîye Denunî çê bû,*
*2 Ew e'zîzê Misrê bû,*
*3 Aşiqê dota p'îrê bû.*

**S. 13** *1 Wê dibêjite dêye:*
*2 «Ya dayê, dengekî alî yî wê têye,*
*3 Mîna dengê e'zîzê Misrêye».*

**S. 14** *1 Dayê girte dotê bi xebere,*
*2 Gotê: «R̂ojê r̂eş bi nedere,*
*3 Tu nabînî derwêşeke, barekî xerqê silt'an şêx Adî li bere».*

**S. 15** *1 Dayê bi dote ne dizanî,*
*2 Me şande pê wî silt'anî,*
*3 Go: «Ji me nayê qewî mêvanî».*

**S. 16** *1 Wey li Denunê minî miskîne,*
*2 Ji ber xwe k'êşabû sikîne,*
*3 Herdu ĉavêt xwe kirin bir̂îne,*
*4 Sebeb hizna gilîyêt xatîna.*

**S. 17** *1 Wey li xatûna bi nefsî sermeste,*
*2 Li ber Denun vediweste,*
*3 K'êr ji Denunî dixweste,*
*4 Denun k'êr ji kemenda xwe vekir, dabû deste,*
*5 Ẍezalê herdu ĉavêt xwe bir̂în, ew jî dane deste.*

**S. 18** *1 Bi qudreta R̂eh̑mane,*
*2 Ewî şevê, mîr Birahîm li wan bû mêvane,*
*3 Ĉavêt herdu a kirin dermane,*
*4 Bi firwara silt'an şêx Adî, ne êş tê ma û ne jane!*

**S. 19** *1 Kesî nedî li ba çu momina îşete,*
*2 Mêrê e'lim bigeȓê li coqete,*
*3 Bibite aşiqê xiznêt hurmete.*

**S. 20** *1 Kesekî nedî li ba çu babire r̂a,*
*2 Mîrê e'lim bixwinit deft'era,*
*3 Bite aşiqê xiznêt esmera.*

**S. 21** *1 Kesî nedî li ba çu momina.*
*2 Mêrê e'lim biket gotine,*
*3 Bi aşiqê xiznêt jine.*

## 144. QEWLÊ MÎR BIRAHÎM[3003]

[3003] http://www.ezdixandi.com/forum/38-285-1

**S. 1** *1 Bi qudreta êkî[3004] Ẍefûre,*
*2 Pêşinek nazilbû jore,*
*3 Xasêd Xwedê bûn, mîr Birahîmê Adema pê ne dibû bacûre.*

**S. 2** *1 Bi qudreta êkî R̂eĥmanî,*
*2 Pêşinek nazilbû ji banî,*
*3 Ew xasêd Xwedê bûn, mîr Birahîmê Adema pê ne dizanî.*

**S. 3** *1 Bi qudreta êkî Fexir, mîr Birahîmî wa dibêjîye:*
*2 «Qesra min r̂ijêjîye[3005],*
*3 Gelo ew k'îye, li ser qesra min diger̂îya?»*

**S. 4** *1 Be qudreta êkî Fexre,*
*2 Mîrek ji wan xwe lê dahir dikire*
*3 «Birahîmo[3006], me li ser qesra te winda kirbû hêştire[3007]».*

**S. 5** *1 Mîr Birîm wê we dibêjîye:*
*2 «Kesa nema, kes nedîye,*
*3 Meskenê hêştira çolê û berîye».*

**S. 6** *1 Çî hêştira pirçê sipîye,*
*2 Mîrek ji wan dibêjîye:*
*3 «Kesa nema kes nedîye,*
*4 Pisê derwêşa bit r̂azête nav lihêfan û be'lgîye».*

**S. 7** *1 «Birahîmo, em hatine bêjine teye,*
*2 Ber xwe bike xerqeye,*
*3 Eva bû lib[a]sê babê teye.*

**S. 8** *1 Birahîmo, tuyî mestî, tuyî gêjî,*
*2 Mîrî ji Lalişê em hinartîne bite bêjî,*
*3 Pisê derwêşa bit r̂azêt qesrêt r̂ijêjî.*

**S. 9** *1 Mîr Birahîmo, em hatîne bêjîne teye,*
*2 Qesid ke Lalişê, berke xerqeye,*
*3 Ew libasê babe teye.*

**S. 10** *1 Birînê te li wê dibûne xweşe.*
*2 Birahîmo, ma tu nizanî ser ĥeft baba tu Qurêşî?»*

**S. 11** *1 Mîr Birahîm malva diçîye,*
*2 Ji makê dipirsîyê:*
*3 «Tu bi Xwedê k'î, îlaĥîye,*
*4 Dayê, babe min k'îye?»*

**S. 12** *1 Maka mîr Birahîm p'ir̂ k'ereme:*
*2 «Pisê mino, ez vê cewabê bi te deme,*
*3 Tiştê min jê zanî navê babê te derwêş Ademe».*

**S. 13** *1 Mîr Birahîm wa dibêjîyê,*
*2 Ji maka xwe dipirsîye:*
*3 «Ya dayê, meskenê babê min li ku dibîye?»*

**S. 14** *1 Maka mîr Birahîm wa dibêjîye:*

[3004] binêr: *yek*
[3005] *r̂izicêcîye*
[3006] *Îbrahîm*
[3007] *hêştir*

*2 «Hey pisê mino nûranîye,*
*3 Tiştê min jê zanîye,*
*4 Meskenê babê te Lalişa nûranî, ber merzê beĥrê kaniya Sipîye».*

**S. 15** *1 Mîr Birahîm mîrekî bi jîre,*
*2 Nesîĥeta makê kirbû ji bîre,*
*3 Tîr û kevanê xwe hilgirtin, li borê xwe siwar*[3008] *bû ço nêĉîrê.*

**S. 16** *1 Dabuwe devê kivanî tîre,*
*2 Pêşber bû askek bi şîre,*
*3 Askê dibêjit: «Birahîmo, tu Xwedê xwe neke ji bîre,*
*4 Ma tu nizanî, ser ĥeft baba Lalişa nûranî tuy[î] feqîre?»*

**S. 17** *1 Askê dibêjit: «Serê a'lemê kim bexşê,*
*2 Tu ji Xwedê xwe natirsî dê vê tîrê li min k'eşê,*
*3 Înşallaĥ, mîrîtîya Xoȓistanê pê neşê».*

**S. 18** *1 Askê dibêjit: «Birahîmo, tu Qurêşî,*
*2 Qest bike Lalişa nûranî, ber xwe bike xerqê ȓeşe,*
*3 Ma tu nizanî, ser ĥeft baba li Lalişa nûranî tuyî derwêşî?»*

**S. 19** *1 Askê dibêjit: «Birahîmo, sê kara şîr dideme,*
*2 Li berya jêrî xwedan dikeme,*
*3 Ez ji ber seyadêt mîra newêrim li gel xwe bibeme».*

**S.20** *1 Sê kara şîr dêrim,*
*2 Berîya jêrî vedşêrim,*
*3 Ji ber seyadêt mîra newêrim li gel xwe bigêrim.*

**S.21** *1 Askê dibêjit: «Birahîmo, ezê bi wî kim, êkî sema,*
*2 Tu bihêle ez hersê karêt xwe şîrdeme,*
*3 Qirar be, paşî ez vegeȓim, nêĉîra teme».*

**S. 22** *1 Gava askê cewab daye,*
*2 Mîr Birahîm kivanê xwe şikênaye,*
*3 Borê xwe berdaye,*
*4 Girte ber xwe berî û çiyaye.*

**S. 23** *1 Mîr Birahîm binê berîyekî vediçîya,*
*2 Ser şivanekê hilbûye:*
*3 «Şivano, tu bi Xwedê k'î îlaĥîye,*
*4 Dê bêjîye min ȓastîye k'a ev peze pezê k'ê dibîye?*

**S. 24** *1 Şivan wê we dibêjîye: «Dê bêjme te ȓastîye,*
*2 Eva pezê mîr Birahîmê Adema bi xwe li hêra dibîye,*
*3 Ez jî benîyekî ji benîyêt wîye».*

**S. 25** *1 Şivan dibêjit: «Biramo*[3009]*, çil şevî bi jimire,*
*2 Ev pez min xwedan dikire,*
*3 Şîrê vî pezî min te'm ne dikire,*
*4 Mi zanî li ȓoja axretê li min ĥeram dikire».*

**S. 26** *1 Şivan dibêjit: «Biramo*[3010]*, çil şevî te ȓa ava ye,*
*2 Gel vî pezî min*[3011] *k'êşabû bê qal û bê miqale,*

---

[3008] *sûar*
[3009] *Birahîmo*
[3010] *Birahîmo*
[3011] *mi*

*3 Şîrê vî pezî min nedikir te'me,*
*4 Mi zanî li r̂oja axretê li minî ĥerame».*

**S. 27** *1 Mîr Birahîm dibêjit: «Şivano, ez mîr Birahîmê Adema bi xweme,*
*2 Dê vî pezî û vî çoxî bi te deme,*
*3 Belê, mi çoxê te heye te'me».*

**S. 28** *1 Şivan dibêjit:*
*2 «Min çoxê te nevêye,*
*3 Ĥemû ji k'ed û xoya xelqêye*[3012]*,*
*4 Xwedê bikem ne beĥr tê hebit ne hevrêye».*

**S. 29** *1 Mîr Birahîm dibêjit: «Şivano çoxê min merweze,*
*2 Çil salî bo te bese,*
*3 Belê, te'mayî di çoxê te heye ĥewase».*

**S. 30** *1 Şivan dibêjit: «Birahîmo, min çoxê te ne vêye,*
*2 Ĥemû ji xûna xelqêye,*
*3 Înşallaĥ, şivanê te nebit çû p'ar ĥevcêye».*

**S. 31** *1 Mîr Birahîm dibêjit: «Şivano, çoxê min çil t'ûmane,*
*2 Xeracîya Misrê ĥeft salane,*
*3 Xêncîya mal, p'ay t'ext Xor̂istane,*
*4 Çoxê te li vek ji yêt berxane».*

**S. 32** *1 Şivan dibêjit: «Birahîmo, çoxê teyî ĥişke,*
*2 T'ijî mare, t'ijî dûpişke,*
*3 Xwedê bikem ne bar tê hebit, ne pişke».*

**S. 33** *1 Şivanî agirek jenîye,*
*2 Hindek çoxê mîr Birahîm nav danîye,*
*3 Mar û dûpişka jê derk'etin, ber xwe girtibûn û berî, û zewîye.*

**S. 34** *1 Şivanî agirekî dadaye,*
*2 Hindek çoxê mîr Birahîm nêv danaye,*
*3 Mar û dûpişk jê derk'etin, ber xwe girtibûn u berî, û ĉiyaye.*

**S. 35** *1 Şivanî agirekî hindote,*
*2 Hindek çoxê mîr Birahîm nêv dane û sote,*
*3 Mar û dûp'işk jê derk'etin cot bi cote.*

**S. 36** *1 Şivan agirekî başqe bo xwe jenîya,*
*2 Hindek k'epenekê xwe nêvda danîye,*
*3 Nûrekî k'esk jê derk'et, çû E'rşêd A'lîye*[3013]*.*

**S. 37** *1 Şivan agirekî başqe bo xwe hilkire,*
*2 Hindek k'epenekê xwe nêv werkire,*
*3 Buwe nûreke k'esik ço E'rşêt faxre, wê diîsîyêt*[3014] *wekî çire.*

**S. 38** *1 «Ez bûm mîr Birahîm, mîrê Xor̂istanê,*
*2 Xwedanê ĥeft landikêt nan danê,*
*3 Û çil aşê ber ava zeferanê,*
*4 Û çil borêt axtexanê,*
*5 Û min ĥemû t'erk kir bo xatira îmanê,*
*6 Xelqê nezan niho bêjte min çimanê.*

---

[3012] *xelk*
[3013] *Êlî*
[3014] *diêsîyêt*

**S. 39** *1 Ez bûm mîr Birahîmê Adima,*
*2 Û min dest hilanî ser şîran û r̂ima,*
*3 Û xelqê nezan niho bêjte min çima?»*

**S. 40** *1 Mîr Birahîm mîrekî dêm pîroze,*
*2 Wê diger̂êt mal bi mal, hoz bi hoze,*
*3 Êkî ne p'arse dayê, ne dir̂ozine,*
*4 Xasa xwe lê aşkera kir gotê: «Birahîmo, ji nû derwêşî bo te ye pîroze».*

**S. 41** *1 Mîr Birahîm mîrekî dêm şemale,*
*2 Wê diger̂êt hoz bi hoz, mal bi male,*
*3 Êkî ne p'arse dayê, ne siwale,*
*4 Xasa xwe lê aşkera kir û gotê:*
*5 «Birahîmo, ji nû derwêşî bo te ye ĥelale».*

**S. 42** *1 Xasa bangekî r̂adihişte:*
*2 «Mîr Birahîm ev dinya berda, axret ji xwe r̂a kire p'ar û pişke».*

**S. 43** *1 Mîr Biraîm xas bû, nav xasêd şêx Adî r̂ûdnişte,*
*2 Ji vê dinyayê çû, dilê t'u kesî ji xwe nedihişte.*

**S. 44** *1 Hikmê Xwedê li ser wî bacêrî çî bû?*
*2 Ev têkoştê[3015] li xwarê wê bersîvê didet.*

*Em kêmin, Xwedê û şêx Adî t'emam!*

## 145. QEWLÊ DERWÊŞ ADEM[3016; 3017] – BEYT'A DERWÊŞ ADEM[3018]

**S. 1** *1 Çi sibeke bi nedere,*
*2 Nav xased şêx Adî bûye xebere,*
*3 Derwêş[3019] Adem dêçîte sefere.*
 **S. 1** *1 Çi sibeke[3020] nedere,*
 *2 Nava xasa dibe xebere,*
 *3 Derwêş Adem wê her̂e sefere.*

**S. 2** *1 Çi sibeyeke bi nîşane,*
*2 Nav xasêd şêx Adî bûye xeberdane.*
*3 Derwêş Adem dêçîte Xor̂istanê.*
 **S. 2** *1 Çi sibeke nîşane,*
 *2 Nava xasê dîwana şêx Adî wê bive beyane.*
 *3 Derwêş Adem wê her̂e Xor̂istan[3021].*

**S. 3** *1 Çi derwêşekî bi delîle,*
*2 Yî bê qale, yî bê qîle,*
*2 Wê r̂uniştîye ser r̂êya xêran û sebîle.*
 **S. 3** *1 Way derwêşê minî delîle,*
 *2 Be qale û be qîle,*
 *3 R̂uniştîye ser r̂îya xêran û sebîle[3022].*

---

[3015] *têkist*
[3016] Джалиле Джалил (Венский университет, Австрия) (Статья написана в рамках курдологическогоисследовательского проекта Фонда для поощрения научных исследований (Вена) P-11330 SPR. Петербургское востоковедение, вып.10. С. 271–291). http://www.kurdist.ru/index.php?option=com_content&task=view&id=70&Itemid=99999999
[3017] Belavkirin: Bedel feqîr Ĥecî http://www.kaniyasipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1554
[3018] [29] (гг. 307–311) (№ 1678)
[3019] *Dewrêş*
[3020] *sube*
[3021] *Xur̂êsan*
[3022] *sexîl*

**S. 4** *1 Mîrê Xor̂astanê wê we dibêye:*
*2 «Çi derwêşî li wêye,*
*3 K'a bir̂ênin ewî derwêşî çî divêye.*
**S. 4** *1 Mîrê Xor̂istanê we dibêye:*
*2 «Qasid, her̂e binêr̂e ew çi derwêşe wêye,*
*3 Ew derwêşî çî dibêye?»*

**S. 5** *1 Qasidî wê diçîye,*
*2 Wê ji derwêşî dipirsîye:*
*3 «Derwêş, meslehêta te li van ciya çîye?»*
**S. 5** *1 Qaside diçûye derwêş pirsîye:*
*2 «Derwêş baba, nesîĥeta te wan e'rda çiye?»*

**S. 6** *1 Ew[3023] derwêş wê we dibêye:*
*2 «Firmanek hatî ji ba Xwedêye,*
*3 Derwêş dota mîrê te divêye».*
**S. 5** *3 Ew derwêş wa dibêye:*
*4 «Qesid, fermaneke hatîye ji Xwedêye, derwêş dote mîrê we dibêye».*

**S. 7** *1 Çi qasidekî jîre,*
*2 Çi derwêşekî hay nedere:*
*3 «Heke tu derwêşî, çi [te] derwêşa û dota mîre?»*
**S. 6** *1 Qasidê minî jîre,*
*2 Dibêje[3024] derwêşê delîle:*
*3 «Derwêş, te çiye ji dota mîre?»*

**S. 8** *1 Qasidî vedigêr̂îye,*
*2 Mîrê Xor̂istanê jê dipirsîye:*
*3 «Tu hatî, derwêş mabû li cîye?»*
**S. 7** *1 Qaside vedigêr̂îye,*
*2 Mîr jê pirsîye:*
*3 «Qasid, tu hatî, derwêş çima mabû cîye?»*

**S. 9** *1 Qasid we didet xebere:*
*2 «Mîro derwêşekî hay[3025] xweyî sere[3026],*
*3 Ibadeta R̂ebê min, cewaba derwêşî nikarim bidime dere[3027]».*
**S. 8** *1 Qasidê minî zere,*
*2 Dibê: «Çi derwêşekî xweyî sere,*
*3 Ez caba derwêş nikarim bikim dere».*

**S. 9** *1 Ew qasid wa dibêye:*
*2 «Mîrê min, derwêş dibê fermanek hatîye boy Xwedêye,*
*3 Ez dota mîrê we dibêye».*

**S. 10** *1 Mîr di vê cewabê mabûyî dilmayî,*
*2 Fikirîbû xofê hikmê P'adşayî:*
*3 «Binêre li min û vî gedeyî?»*
**S. 10** *1 Mîrê min wê xeberê mabû dilmayî,*
*2 Fer̂icîbû hikmê P'adşayî,*
*3 Go: «Binêrin derwêşê cemlayî?»*

**S. 11** *1 Mîro, xwedanê dewletê,*

[3023] *ey*
[3024] *divêje*
[3025] *hoy*
[3026] *xiweser*
[3027] *Ez nikarim cewabêt wî bikim dahire*

*2 Fikirîbû li xofê, li e'ynatê*[3028]*,*
*3 Bi nêfe li derwêş û mirwetê.*

**S. 12** *1 Li wê hebû xelqê e'rif û nasîne:*
*2 «Ya mîr, bi hinêre pê wî derwêşî û bîne,*
*3 K'a yî sewdaye, yanî dîne?»*
**S. 11** *1 Wê hebû xelqê me'rîfetî Yasîne:*
*2 «Mîrê min, bişîhe derwêş bîne,*
*3 Çi k'a aqile, yanê sewdênîye?»*

**S. 13** *1 Mîr dihinart derwêşî dihate,*
*2 Mîrê Xor̂istanê digehiştê bi r̂ê axafte:*
*3 « Derwêş, te qelenê keĉa*[3029] *min çêkir xebate?»*
**S. 12** *1 Mîr dişand derwêş dihate,*
*2 Derwêş r̂êva diaxafte.*
*3 Mîr go: «Derwêş baba, te qelena keĉa min çi bikî xebate*[3030]*?»*

**S. 14** *1 Ew derwêş wê we dibêye:*
*2 «Ya mîr, heke tu zêr̂ û mal divêye, ezê ji te r̂a înim ji dinêye,*
*3 Heke te dur̂ divên, ezê ji te r̂a înim ji beĥrêye».*
**S. 13** *1 Ew derwêş we dibêye:*
*2 «Mîrê min, çiqa zêr̂a dixazî te r̂a bînim dinêye,*
*3 Çiqa cewahira dix[w]azî te r̂a bînim ji beĥrêye».*

**S. 15** *1 Mîro, xwedanê nasîne:*
*2 «Derwêş dur̂a ji min r̂a bîne,*
*3 Te li me bêt bawerî û yeqîne*[3031]*,*
*4 Heke dê serê te birim ser kela Xor̂istanê dayîne».*
**S. 14** *1 Wey derwêşê minî jîre,*
*2 «Tu derwêş bîne, bawarî yeqîne»,*
*3 «Çiqa cewahira dix[w]azî ji te r̂a bînim ji beĥra e'zmîne».*

**S. 16** *1 Ew derwêşê minî xase,*
*2 Yî bi saya*[3032] *yarû birayêt axretê vexwarî ew k'ase,*
*3 Qest kire dîwana Xidir û Ilyase.*
**S. 15** *1 Wey derwêşê minî xase,*
*2 Vedixwar k'ase,*
*4 Qest kir, çû dîwana Xidir–nebîy û Xidir–Ilyase*[3033]*.*

**S. 17** *1 «Xidiro, yî Xidirî,*
*2 Yî bi ĥimetayî Qadirî ji derwêş Adem fikirî»,*
*3 «Derwêş bira tu li van dergehî li mehderê».*
**S. 16** *1 Derwêş dibê: «Xidiro, tu ĥeqderî,*
*2 Ĥimeta*[3034] *Qadirî,*
*3 Tu ber vî dergeyî hadêrî*[3035]*».*

**S. 18** *1 «Xidiro, bira, dur̂a ji min r̂a bînin ji beĥrêt e'zmînin,*
*2 Li pêş nederêt xasa dayînin,*
*3 Heke bi e'zetê şêx Adî serê min ser kela Xor̂istanê dadinihînin».*
**S. 17** *1 Derwêş dibê: «Xidiro, here mi r̂a dur̂a bîne,*
*2 Pêşma dara xasa va dayîne,*

---

[3028] *e'ynet*
[3029] *kiĉ*
[3030] *xevat*
[3031] *êqîn*
[3032] *şaya*
[3033] *Xidireylas*
[3034] *hêmet*
[3035] *hedir*

*3 Tê r̂oja qîyametê her̂î sere kela Xor̂istanî dayînî».*

**S. 18** *1 Xidirê minî sêfîlî sergerdane,*
*2 Qest kir beĥra bê binyane.*

**S. 19** *1 Xidir fikirî li wê ye,*
*2 Tirsabû ji xofa*[3036] *Xwedê ye,*
*3 Çengilê derwêşî girt tesmîl kire beĥrê ye.*

**S. 20** *1 Derwêş wê diger̂êt wê dikete gazî,*
*2 Çiqas muxliqê beĥrê serhilîna hevrazî:*
*3 «Derwêş tû Xwedê xwe bi ĥeq dinasî,*
*4 K'a binê*[3037] *tu çi ji me dixwezî*[3038]*?»*

**S. 19** *1 Xidire wa dike gazî:*
*2 «Heçî xulyaqetê*[3039] *beĥrê serê xwe bikin hevrazî,*
*3 Derwêş Adem dur̂a we dixazî».*

**S. 21** *1 «Gelî mɜxilqa dur̂a ji me r̂a bînin ji beĥrêt e'zmînin,*
*2 Li pêş nederêt xasa daynin,*
*3 Heke bi e'zetê şêx Adî hûn dê r̂oja axretê cizay ji destê min bînin».*

**S. 22** *1 Çiqas muxliqê li wê ye,*
*2 Ĥemûwa qesid kirin çone beĥrê ye,*
*3 Her kesek hat dur̂ek divê ye.*

**S. 20** *1 Heçî xulyaqetê wê ye,*
*2 Qest kirin, çûne beĥrê ye,*
*3 Hatin, herek dur̂ek lê ye.*

**S. 23** *1 Ewan muxliqa dur̂ wêt anîn,*
*2 Li pêş nederêt xasa ve danîn,*
*3 Derwêş Adem ji wan dur̂a t'u dur̂ hilnanîn.*

**S. 24** *1 Çi derwêşekî minî sergirdane,*
*2 Xwe berda beĥra boy binyane,*
*3 Ji wan dur̂a sê dur̂ înane.*

**S. 25** *1 Wê li derwêşê minî îna dur̂e,*
*2 Ji wan dur̂a hilgirtbû sê dur̂e,*
*3 Da destê mîrê Xor̂istanê bi sur̂e.*

**S. 21** *1Wey derwêşê minî bav dur̂e,*
*2 Wan dur̂a hildabû sê dur̂e,*
*3 Danî destê mîr̂ê Xor̂istanî bi sur̂e*[3040].

*S. 22* *1 Mîr go: «Werin binêrin vê e'cêbê,*
*2 Mêşê girtîye deft'erê û k'itêbê.*
*3 Xebera gel derwêş girte lêvê».*

**S. 26** *1 Mîro, xwedanê ĥesabê,*
*2 Mêjwe r̂e derk'etîye deft'eran û k'itêba,*
*3 Şixula derwêşa nabite bi lêbe.*

**S. 27** *1 Mîro, xwedan nedera,*
*2 Ji mêjwe r̂e derk'etîye qewlan û deft'era,*
*3 Şixula derwêşa nabe bi derewe.*

---

[3036] *xewf*
[3037] binêr: *bir̂êne*
[3038] *dixazî*
[3039] *xuleqet*
[3040] *sur*

**S. 28** *1 Mîro, xwedan qirîara,*
*2 Keĉa xwe li derwêşî dikire mare,*
*3 Derwêşî p'al keĉa xweve dihinare.*
**S. 23** *1Wey mîrê minî xwedan qirare,*
*2 Destê keĉa xwe girt derwêş va hinare,*
*3 Keĉa xwe derwêş r̂a kire mare*[3041]*.*

**S. 29** *1 Derwêş î difir̂î weke teyara,*
*2 Kulek û p'encerêt qesrêra hate xware,*
*3 Ne gehiştibû nav keziya û guhare,*
*4 Hindekî ji xerqê xwe bi keĉêva spare.*
**S. 24** *1 Wey derwêşê minî jare,*
*2 Fir̂î nalenî teyare,*
*3 Qesrê p'encerê r̂a hatibû xare,*
*4 Hine xerqe xwe keĉêva spare.*

**S. 30** *1 Dabu e keĉê xerqeye:*
*2 «Silava bike li babê xweye,*
*3 Çakîya we kirî, gelekî layîqî we û e'slê weye.*
**S. 25** *1 Dabû keĉê xerqeye,*
*2 Go: «Xilmeta we kirîye layîqî weye,*
*3 Az diçim, pêj miva silavê bike bavê xweye.*

**S. 31** *1 Qencîya we kirîya li r̂êye,*
*2 Heke weledekî me dahir bû, xwe negirt û bêye.*
**S. 26** *1 Pêj miva silavê bike bavêye,*
*2 Herge ewledek paş mi dibêye,*
*3 Bira nesekine, lêxe bêye.*

**S. 32** *1 Li wê hebû xelkê e'rifî, zaneyî, jîre,*
*2 Qest kirine dîwana mîre:*
*3 «Ya mîr, k'a ew derwêşê meyî hay*[3042] *nedîre*[3043]*?»*
**S. 27** *1 Wê heye xelqê me'r̂îfetî jîre,*
*2 P'evk'etin, çûne ba mîre,*
*3 Divê: «Mîr k'a derwêşê meyî xwedan nedîre?»*

**S. 33** *1 Mîrê Xoristanê malva diçîye,*
*2 Wê ji keĉa xwe dipirsîye:*
*3 «Keĉa min, k'a ew derwêşê hay ewlîye?»*
**S. 28** *1 Mîr we diçûye,*
*2 Keĉê pirsîye:*
*3 «Lawo*[3044]*, k'a derwêşê meyî xwedan ewlîye?»*

**S. 34** *1 Keĉa xwedan qirîare,*
*2 Wê deng dikete bi zara:*
*3 «Ya babo, wekî te derwêş ba minve dihinare,*
*4 Derwêş fir̂î wekî teyare,*
*5 P'encera qesra r̂ijêjîva*[3045] *hatî xware.*

**S. 35** *1 K'ulek û p'encerêt qesrê r̂a hate xware,*
*2 Nehêştbû nav kezîyan û guhare,*
*3 Hindek xerqê xwe bi mera spare».*
**S. 29** *1 Keĉê dibê: « Bavo, wey li qewla, wey li qirara,*

[3041] *me'r*
[3042] *hoî*
[3043] *ewlîye*
[3044] *lao*
[3045] *r̂izicêcêva*

*2 Derwêş qesrê p'encerê da hate xare,*
*3 K'ete nava kezîyan û guhare,*
*4 Hine xerqê xwe miva spare».*

**S. 36** *1 «Ya bavo, dabuwe min xerqeye,*
*2 Go: «Silava bike li bavê xweye,*
*3 Qencîya we kirîye layîqî e'slê weye,*
*4 Heke pisekî me dahir bû, xwe negirt û bêye».*
**S. 30** *1 «Dabû min xerqeye,*
*2 Go, xizmeta we kirî, layîqî weye,*
*3 Ez diçim, pêş miva silavê bike bavêye».*

**S. 37** *1 Neh meh t'emam bûn, bihurî, nû bû ĥeft sale,*
*2 Mîrê Xoȓistanê sadiq[3046] û yeqîn xilmetk'are û bû nuqta mîr Birahîm Ademe.*
**S. 32** *1 Dibê neh meh hatin bihurîn,*
*2 Mîr Birahîmê Ademî li wê nixtê xulqî,*
*3 Ĥemûşka lê anî bawarî û yeqînî.*

**S. 38** *1 Ji wê nuqtê kû birî mîrya Birahîm ye li çê ye,*
*2 Şev û ȓo[j] li seydê ye,*
*3 Ewî ne dizanî bavê wî derwêş bû xerqê şêx Adî lê ye.*
**S. 33** *1 Wey derwêşê minî çê ye,*
*2 Şevê, ȓojê seyrê ye,*
*3 Çima tu nizanî bavê te feqîre, xerqê şêx Adî lê ye.*

## 146. QEWLÊ ĤUSÊYÎNÎ ĤELAC

**şaxê - 1**[3047]
**S. 1** *1 Ĥusêyîne, Ĥusêyînî Ĥelace,*
*2 Şêrî heye t'ace,*
*3 Pêşberî wî sekinîye Xecîce[3048].*

**S. 2** *1 Xecîcê go: Ĥusêyîno, birao, vir meȓeve,*
*2 Wê sivê vira bive qal û ceng, û şeȓe,*
*3 Ȓev heye mêra ȓa i'êve,*
*4 Kuştina te heye ne e'cêve,*
*5 Serê te serîkî ber ĥesêve.*

**S. 3** *1 Xecîcê go: «Ĥusêyîno, birao, vir meçe,*
*2 Wê sivê vir bive qal û cenge,*
*3 Me jî t'ev yar bira ke».*

**S. 4** *1 Ĥusêyîn go: «Birangê Xecîca xweme,*
*2 Mêr hatine vir ȓa, çûne,*
*3 Me suȓ jê ȓa dîne, yanê k'ereme».*

**S. 5** *1 Herça ew Baẍdayîne,*
*2 Xwe ȓa şa dibûn, dik'enîne,*
*3 Go: Em heȓin Ĥusêyînî ber miskîne.*

**S. 6** *1 Herça ew Baẍdayîne,*
*2 P'eva şa dibûn, dik'enîne,*

[3046] *sidq*
[3047] [6] (стр.37-40)
[3048] *Xece*

*3 Go: «Mîro, mesta melomînin,*
*4 Em heȓin ĥalê Ĥusêyîn bibînin*[3049]*».*

**S. 7** *1 Herça ew Baẍdayîne,*
*2 P'eva şa dibûn, dik'enîne,*
*3 Go: «Mîro, negrî melamîne,*
*4 Em heȓin çika ĥalê Ĥusêyîn çine?»*

**S. 8** *1 Herça Baẍdaya, ew fiȓîngin,*
*2 P'evaşka davêjine ser Ĥusêyîn dar û singin,*
*3 Ĥusêyîn hîngê*[3050] *ne gozîye û ne denge.*

**S. 9** *1 Ew Ĥusêyîn, Ĥusêyînî delale,*
*2 Qazîyan û melle ȓa ceng û qale,*
*3 Go: «Hûn çi bikin, suȓa we suȓake betale».*

**S. 10** *1 Be'zî ya li Qura'nê,*
*2 Destê Ĥusêyînda heye ilmê*[3051] *dîwanê,*
*3 Destê silt'an*[3052] *Êzdîda heye dayînê ĥetanî stanê.*

**S. 11** *1 Şêx Cinêt avîtê ser Ĥusêyîn belgek gulê,*
*2 Hîngê sibĥan*[3053] *jê mabû dilê.*

**S. 12** *1 Ew Ĥusêyîne, Ĥusêyînî delale,*
*2 Çendî k'ûr dibêje*[3054]*, çendî k'ûr dinale,*
*3 Go: «Ne destê cumlî ale».*

**S. 13** *1 Go: «Ĥeta ȓoja oẍir qîyametê,*
*2 Ezê derdê belgê gula şêx Cinêtê bêjim, bine'lim*[3055]*».*

**S. 14** *1 Wexta Ĥusêyîn ew me'nî dahir*[3056] *kir,*
*2 Şêx Cinêtê zimanê xwe ker bi ker kir,*
*3 Go: «Birao, biratî nayê t'erk kirin».*

**S. 15** *1 Şêx Cinêtê go: «Ĥusêyîno, birê minî axretê,*
*2 Dar, berê Baẍdayê p'êva ser te tên, ne'lîne tê netên,*
*3 Hema ne'lîna te ji destê belgekî gula, destê mi tên».*

**S. 16** *1 Beĥra Ĥeq sewirand,*
*2 Hîngê k'afira cinyîazê Ĥusêyîn diĥincirand,*
*3 Xûnê hevȓaz avît, Ĥusêyîn go: «E'ynul sere, vê ȓa dik'ubirand.*

**S. 17** *1 Beĥra wa go, Ĥeqe,*
*2 Hîngê k'afira cinîyzê Ĥusêyîn dikir şeq û şeqe.*
*3 Xûnê hevȓaz avît, Ĥusêyîn go: «E'ynul sere, e'ynul fera, e'ynul ĥeqe»,*

**S. 18** *1 Ew Xecîca mal Xuȓîstanê,*
*2 Go: «Ĥusêyîno, birao, mala min ȓîya ĥeft mehane,*
*3 Minê kirîye ĥeft gavane,*
*4 Sêla mine k'uçane,*
*5 Nanê minî sere,*
*6 Ĉûkê minî bere,*

[3049] *bivînin*
[3050] *hingê*
[3051] *u'lm*
[3052] *sultan*
[3053] *sivhan*
[3054] *divêje*
[3055] binêr: *binalim*
[3056] *deher*

*7 Evê ĥucayê ber xwe bike,*
*8 Mêvanê minî heȓeyî seferê».*

**S. 19** *1 Xecîcê go: «Ĥusêyîno, birao, mala min ȓêya ĥeft mehane,*
*2 Minê kirîye ĥeft gavane,*
*3 Sêla mine k'uça dimayî,*
*4 Nanê minî ser dimayî,*
*5 Ĉûĉikê minî ber dimayî,*
*6 Zû bike vê ĥucreyê ber xwe bike,*
*7 Mêvanê minê heȓe, nan nexwarîye[3057], Xuȓîstanî».*

**S. 20** *1 Ĥusêyîn go: «Erê Xecîca mine xuşkê, te Ĥusêyîn te'na dikuşte».*
*2 Xecîcê go: «Ĥusêyîno, birao, ȓo hiltê ji ometê,*
*3 Ȓojê ĥeft[3058]k'asê qudretê têne boy mi hurmetê,*
*4 Birao, dîsa nedeke nola ya te, ber dilê min natê».*

**S. 21** *1 Ĥusêyîn bore xwe zîn kir,*
*2 Evê dinyayê çû, t'erka dinyayê derewîn kir.*
*3 Avê bihîst, go: «Ĥusêyîn Beẍdayê kuştin».*

**S. 22** *1 Ava Geberê hatibû, der bû,*
*2 Nava Beẍdayê da war bû,*
*3 Beẍda ber ker bi ker bû.*

**S. 23** *1 Xecîcê çû pêşîya avê,*
*2 Go: «Heȓê avê, heȓe avê,*
*3 Cara îcarîn Beẍdayê xirav meke.*

**S. 24** *1 Ne birakî me te mezintir heye».*
*2 Avê p'êl da, vegeȓiya,*
*3 Hîngê Beẍda ber bû du ciya.*

**S. 25** *1 Çi siwarekî hat ĉek ȓeşe,*
*2 Can û camaqî hat ĉek ȓeşe,*
*3 Ewî êvara înîyê k'etîye nava Beẍdayê,*
*4 Qazîyan û melle t'emamkirîye sêsid şêst şeşe.*

**S. 26** *1 Çi siwarekî[3059] ha mêrsere,*
*2 Ewî dixwest hema ordî saron-sere.*

**S. 27** *1 Çi siwarekî hay astengê,*
*2 Xelîfê Beẍdayê banzdaye,*
*3 Dest avîtiye daman[3060] û dangê,*
*4 Go: «Me îdî paşî wêderê we'de t'obeye[3061]».*

**şaxê — 2**[3062]

**S. 1** *1 Ji badiya[3063] ez ne yî dînim,*
*2 Hun mesta nelomînin,*
*3 Heȓin ĥalê Ĥusêyîn[3064] bibînin.*

**S. 2** *1 Bana we fer bûwe,*

[3057] *nexarîye*
[3058] *ĥevt*
[3059] *sîyer*
[3060] *damin*
[3061] *t'ove*
[3062] [2] (rr. 940–944)
[3063] *bada*
[3064] *Ĥisên*

*2 Ĥusêyînî ji wê k'asê vedixwar zûwe,*
*3 Lew bû e şira'qadiya, Ĥusêyînî serîda bûwe.*

**S. 3** *1 Ĥusêyîn il-Ĥusêyîne,*
*2 Ewî vexwaribû ji k'asa beyne,*
*3 Lew qest kir, ço Far îl-E'yne.*

**S. 4** *1 Ĥusêyînil-Ĥelace,*
*2 Ewî ji wê k'asê vedixwar bi ser û mêlance,*
*3 Lew bû e şira'qadiya, Ĥusêyînî sere xwe dikir armance.*

**S. 5** *1 Eyî çako ji çakêt me[h]da,*
*2 Ĥusêyîno, çakî cew de,*
*3 P'adşê min k'asek bi te da,*
*4 Lew Ĥusêyînî serê xwe li ber r̂ê û atqata xwe da.*

**S. 6** *1 Ĥusêyîn îbn Mensure,*
*2 Ewî vexwarbû ji k'asa nûre,*
*3 Lew qesid kir, ço beĥrêt k'ûre.*

**S. 7** *1 Ĥusêyîn il-Beẍdêdilî,*
*2 Ewî sur̂ek dit û li ber ne bû hêdî,*
*3 Lew bû e şira'qadiya, bi serê xwe bû minêdî.*

**S. 8** *1 Ĥusêyîn il-Beẍdelî,*
*2 Ewî sur̂ek dit û li ber nesebirî,*
*3 Lew bû e şira'qadiya, bi serê xwe bû mişterî.*

**S. 9** *1 Ĥusêyînil-Ĥelace,*
*2 Di sere xwe kiribû t'ace,*
*3 Bi r̂eva xweyî r̂ehwance,*
*4 Lew vê r̂a gehiştbû ne'ce.*

**S. 10** *1 Wê li mîhê miskînê,*
*2 Hey bazî o ji hêlînê,*
*3 Li xwe megre r̂evînê,*
*4 Em jî t'ebayî te hatîne ber wê sikînê.*

**S. 11** *1 Mîha ser ji berane,*
*2 Wa li Ĥusêyînî didet te'nane,*
*3 Ĥusêyîno, r̂evîn e'ybe bo mêrane.*

**S. 12** *1 Ĥusêyîno, r̂evîn êbe,*
*2 Kuştina mêra ne e'cêbe,*
*3 Xasme serê teyî bi Ĥusêyîne.*

**S. 13** *1 Ĥusêyîn li van me'nîya yî qare,*
*2 Ewî li xwe girtbûn ber û dare,*
*3 Lew hawareke birê axretê r̂a dihinare.*

**S. 14** *1 Hawareke birê axretê r̂a dihişte,*
*2 Xecîca ji Xor̂istanê hat û gehişte,*
*3 Ewê jî Ĥusêyîn bi te'na dikuşte.*

**S. 15** *1 Xecîca li Xor̂istane,*
*2 R̂îya sê mehane,*
*3 Hatibû ĥeft gavane,*
*4 «Ĥusêyîno, gîyanê te çî gîyane,*

*5 Piçuk li min birane,*
*6 Gîyan bispêre Xwedê û dostêt e'zmane.*

**S. 16** *1 Gîyan bispêre biraye,*
*2 Landika minîye savaye,*
*3 Nana min li ser sêlê maye,*
*4 Mêvanê min ji pêveyî westane,*
*5 Gîyan bispêre dostêt Xwedaye.*

**S. 17** *1 Gîyan bispêre û heȓe,*
*2 Me mêvanek heye ji sefere,*
*3 Ĥeta ȓuĥ ji qalbê te bête dere».*

**S. 18** *1 «Xuşkê Xecîcê, belê-belê,*
*2 Bi wê ȓojê kem, ȓoja li enzelê,*
*3 Min k'asek vexwar ji sere kelê,*
*4 K'erema û da pê biçîn belê.*

**S. 19** *1 Xecîcê xuşka xwe me,*
*2 Min ser wê daye û bideme,*
*3 Da bizanin dinya û a'leme,*
*4 Ya mêra suȓe û k'ereme».*

**S. 20** *1 «Hey Ĥusêyîno, birê minê axretê!*
*2 Herȓo ku*[3065] *ȓoj hiltê ji mile ometê,*
*3 Ĥeft k'asî qudretê,*
*4 Tên bo min hurmetê,*
*5 Yekî ȓojekê ȓastî ji dilê min der ne tê».*

**S. 21** *1 Ĥusêyîn di spare,*
*2 Li Beẍdayê û çendî şara,*
*3 Ĥusêyîn miskîn di azara.*

**S. 22** *1 Ĥusêyîn ku ew me'nîyî digote,*
*2 Leşê Ĥusêyîn diînan û sote,*
*3 Lew xûna lal ĥeq vê ȓa ciwab digote.*

**S. 23** *1 Li Hormê hizin û şîne,*
*2 Li Beẍdayê şahye û mizgîne,*
*3 Kuştbû Ĥusêyînê miskîne.*

**S. 24** *1 Li Beẍdayê û çendî şara,*
*2 Şahî dibûn k'ifare,*
*3 Ĥusêyîn, zergun û azare.*

**S. 25** *1 Ĥusêyîn guleke di gulê da,*
*2 Ĥincîyê hat berek lêda,*
*3 Û şêx Cinêt*[3066] *gulek lêda!*

**S. 26** *1 Ĥusêyîn guleke bû k'amile,*
*2 Wê li Beẍdaya hoye zalime.*

**S. 27** *1 Û hincîyê hat lêdabû kevire,*
*2 Şêx Cinêt gulek lê berdav kire,*
*3 Dersad jê mabû dile.*

---

[3065] *ko*
[3066] *cinêd*

**S. 28** *1 Ĥusêyîn guleke bû şikifitî,*
*2 Û bi aya teĥiyat di axifitî,*
*3 Lew şerîe't pê şikifitî.*

**S. 29** *1 «Hey şêx Cinêto, birê minî axretê!*
*2 Çen dar û berêt benî vê ometê*
*3 Ĥemû bo min u gîyanê min tê,*
*4 Ĥeta r̂oja om li qiyametê,*
*5 Nalînêt min ji destê gula te tê.*

**S. 30** *1 Şêx Cinêto, çendî digrîm, çendî dinalim,*
*2 Kesî ne dizanî ezî bi çî ĥalim,*
*3 Te dizanî ezî bi çî ĥalim,*
*4 Ĥeta r̂oja om al qiyametê, dê ji destê gula te nalim!»*

**S. 31** *1 Ĥusêyîn sur̂î bû,*
*2 R̂îya ĥeq nasî bû,*
*3 Lew şêx Cinêt lê xurî bû!*

## 147. QEWLÊ DOTA QADÎYÊ BESRAYÊ[3067; 3068]

**S. 1** *1 Gelê jîrî, zana,*
*2 R̂abin ji mi r̂a biden xuyane,*
*3 K'a evîn bi çi nîşane.*
> **S. 1** *1 Xelqê e'rif̂î[3069], zana,*
> *2 Werin ji me r̂a biden beyane,*
> *3 K'a aşiq bi çi nîşane.*

**S. 2** *1 Ew demekî ji mêj bû,*
*2 Şarê Besra yê şarê derwêş bû,*
*3 Derwêş evîndarê k'emalî Artêş bû.*
> **S. 2** *1 Aşiqa k'emal, cê bû,*
> *2 Di Besrê de yarekê derwêş bû,*
> *3 Ew zemanekî ji mêj bû.*

**S. 3** *1 Derwêş evîndarê k'emale,*
*2 Şeş nefs hene li bale,*
*3 Di ker̂in, di korin, di lale.*
> **S. 3** *1 Aşiqa k'emale,*
> *2 Şeş nefs heye li bale,*
> *3 Ker̂e, û kore, û lale.*

**S. 4** *1 Sibĥane ji te sibĥane,*
*2 Çi hikmekî hoy girane,*
*3 Sisê xuşkin, sisê birane.*
> **S. 4** *1 Sibĥan ji te sibĥane,*
> *2 Çi hikmekî hoy girane,*
> *3 Sê xuşkin û sê birane.*

**S. 5** *1 Wê li derwêşê minî ser meste,*
*2 K'eşkul, zembîl û wek'az hilgirtibûn bi deste,*
*3 Silav li yehûdî kir, yehûdî hind kubarbû ji êş silava derwêş venediweste.*

---
[3067] [50] (rr. 376-381)
[3068] [51] *Qewlê dota qazî* (rr. 47-53)
[3069] *êrîf*

**S. 5** *1 Çi derwêşekî ser meste,*
*2 K'eşkul,û zembîl, û wek'az li deste,*
*3 Bi şarê Besrayî ve kir qeste.*

**S. 6** *1 Derwêş bi şarê Besrê ve kirbû qeste,*
*2 Zêr̂angirek pêşberbû dest bi deste,*
*3 Zêr̂angir cisûr bû, destura xwe li ber silava derwêş ne vediweste.*

**S. 6** *1 Wê li derwêşê minî  ewlî ye,*
*2 Yî bi erzinge, yî bi nalî ye,*
*3 Ji pêş wîve bû dota qadî ye.*
**S. 7** *1 Çi derwêşekî ewlî ya,*
*2 Yê bi arzink û nalî ya,*
*3 Kirne ber xwe deşt û zevî ya,*
*4 Pêşber bû dota qazî ya.*

**S. 7** *1 Dota qadiyê Besrê bû*
*2 Ew bû cara li civiyê bû,*
*3 T'ebay wan sitêt, gelê Xwedê bû.*
**S. 8** *1 Dota qaziyê Besrê bû*
*2 Li r̂oja carşembuyê bû,*
*3 Weke sitiya Nesret û K'amlê bû.*

**S. 8** *1 Dota qadî wa dibejî ye:*
*2 «Hey derwêşê mino, yê ewlî ye,*
*3 Bacêrê meyî bi xweşî û şahî ye,*
*4 Vê subeyîkê girya te ya te'l ser çî ye?*
**S. 9** *1 Hey derwêşê mino, yê ewlîye,*
*2 Ev girya teye hoye teĥil ji ber çîye?*

**S. 9** *1 Derwêş dibeje: «Ya keĉa qenc, ez bi wîkem li sema,*
*2 Şeş nefsa xwedan dikeme,*
*3 Çu nîne ez ji wan r̂a bibeme».*
**S. 10** *1 «Ez ji vê cewabê bi te dideme,*
*2 Şeş nefsa xwedan dikeme,*
*3 Tiştek nîne jê r̂a bibeme».*

**S. 10** *1 Wê li keĉa dike xêra,*
*2 Ji derwêşî kire istexbêra:*
*3 «Bi te r̂a nîne asin k'êra».*
**S. 11** *1 Keĉa ehlî xêra,*
*2 Wa deng dik'ete bi sexbêra,*
*3 Got: «Derwêş bi te r̂a heye k'êra».*

**S. 11** *1 We li derwêşê minî miskine*
*2 Got: «Ya keĉa qenc, heke tu li me derwêşa bêy bawerî û yeqîne*[3070]*,*
*3 Bi min r̂a heye asin sikîne».*
**S. 12** *1 Çi derwêşekî miskine,*
*2 Wê deng diket bi nehîne,*
*3 Got: «Belê ya keĉa qenc, bi min r̂a heye asin sikîne».*

**S. 12** *1 We li derwêşê minî ser meste,*
*2 Ewê k'êr ji kebendê xwe vekir da deste,*
*3 Guliyêt zerî pê kiribûn qeste.*
**S. 13** *1 Çi derwêşekî ser meste,*
*2 [Ewê] K'êr ji derwêş dixweste,*

---
[3070] *êqîn*

3 *Derwêş k'êr da deste,*
4 *Bi lez bi guliyê zêr̂î ve kir qeste.*

**S. 13** *1 Guliyet zêr̂în ji herhala,*
*2 P'êl dibin ji dur̂a û lala,*
*3 Keĉkê bir̂îbûn ji bin guhara,*
*4 Da destê derwêşî bi sit'ara,*
*5 Got: «Here r̂isqe*[3071] *te û wan sefîl jara».*

**S. 14** *1 Ewî hilînabûn kezîye,*
*2 Bi bacerê Besrayê ve diçîye,*
*3 Xoce maldar dibînîye.*
**S. 14** *1 Derwêş helgirtibû r̂eş kezîya,*
*2 Nav bajarê Besrê ve diçîya,*
*3 Xwace û maldara didestî da dîya.*

**S. 15** *1 Xoce maldare,*
*2 Pê k'ifş bûn ew k'ufare*[3072]*,*
*3 Keziyêt keĉkê dan bi duwazde ĥezar dînare.*
**S. 15** *1 Li wan xwace û li wan maldara,*
*2 Jêk kişfin ew k'ifara*[3073]*,*
*3 Bi guliyê keĉê dan bi duwazde ĥezara.*

**S. 16** *1 Keziyêt keĉkê dan bi duwazde ĥezar dînare boş,*
*2 Got: «Ya derwêş, tu veke koş».*
*3 Derwêş got: «Ya keĉa qenc bihuşt*[3074] *hêjay teye sed car li te bi noş».*
**S. 16** *1 Gotê: «Derwêş, evan guliyêt zêr̂î bi me bifraşe,*
*2 Derwêş bigre koşe,*
*3 Ez dê têkem duwazde ĥezar male Besrê maleke boşe,*
*4 Derwêş: «Ya keĉa qenc behişt ye layîqe e'silê teyî sed cara bê inaşe.*

**S. 17** *1 Got: «Ya derwêş tu veke koşa xweye,*
*2 Donzdeh*[3075] *ĥezar dînare Besrayê tê heye»*
*3 Derwêş got: «Ya keĉa qenc bihuşt*[3076] *hêjay te û e'sile teye».*
**S. 17** *1 Derwêş bigre dawa xweye,*
*2 Em dê têken duwazde ĥezar malê Besrêyê,*
*3 Derwêş: «Ya keĉa qenc, te beĥr hebit li bihuştê, hîvîya min Xwedêye».*

**S. 18** *1 Derwêş hilînabû buhayê lal, û dur̂, û kezîye,*
*2 Bi bacerê Besrayê ve diçîye,*
*3 Nanbirêj dibînîye.*
**S. 18** *1 Derwêş hilgirtibû r̂eş kezîye,*
*2 Û ba xebazekî ve diçîye,*
*3 Xebazo, tu bi Xwedê key îlaĥîye,*
*4 Tu qîmetê van r̂eş kezîya bêje min bi r̂astîye.*

**S. 19** *1 Derwêş got: «Ya nanbirêj, tu bi wî key xwedane dar û bere,*
*2 Tu dê ji min r̂a bejî bersîveke pêwîst û fere,*
*3 Ev nanek pê têt yanî kere».*
**S. 19** *1 Tu bi wî key êkî Ekbere,*
*2 Tu dê r̂astîyê bêjî bi min r̂e,*
*3 K'a heqê r̂eş kezîya nanek, yan jî kere?»*

[3071] *r̂izq*
[3072] binêr: *k'afir*
[3073] binêr: *k'afir*
[3074] binêr: *bihuşt*
[3075] *duwanzde*
[3076] *behişt*

**S. 20** *1 Nanbirêj got: «Ya derwêş, ez bi wîkem Xwedayê mine,*
*2 Ezê dînarekî hilgirim ji berek'eta malê mine,*
*3 Salê, duwazde mehe nanê te li ba mine.*

**S. 21** *1 Rizqê te û kulfete te bi mere,*
*2 Heke yê te bi ser minve hat, eşqê Xwedê yekî fere,*
*3 Heke yê min bi ser te ve hat, eşqê Xwedê yekî fere».*

**S. 20** *1 Xebaz tirsa bû ji xofa êkî Ekbere,*
*2 Gotê: «Derwêş, ez dê êk ĥezarî bo berek'eta Xwedê înime dere,*
*3 Heke yê te ser meda hat bila bi r̂êye Xwedê û çiqas ewlî û nebîy û p'êẍembere.*

**S. 22** *1 Xwece maldare r̂axistibû xêlîye,*
*2 Ser danabûn r̂eş kezîye,*
*3 Tavê lê dida diîsîye.*
**S. 21** *1 Xebazî r̂axistibûn xêlîya,*
*2 Pêda berdabûn r̂eş kezîya,*
*3 Tavê lê dida û diîsîya,*
*4 Zêr̂angir hat, lê nihêr̂î, dest xetê xwe nasîye.*

**S. 23** *1 Yehûdî di bera diborîye,*
*2 Destxeta xwe nenasîye,*
*3 Bi ba qadiyê Besrayê ve diçîye.*

**S. 24** *1 Qadîyî bila webî,*
*2 Ev bacêre Besrayê li bin destê te bî,*
*3 Evr̂o keĉa te ne ser kul û k'iryarê xwe bî.*
**S. 22** *1 Qazî bûye webê û wenebê,*
*2 Bajêre Besrayê li bin hikmê te bê,*
*3 Keĉa te ne li ser e'melê xwe bê.*

**S. 25** *1 Qadî got: «Ha Yehûdî, heke ev nûçe derew bî,*
*2 Li ser keĉa min misk û mû bî,*
*3 Serî û malî te, te çû bî».*
**S. 23** *1 Qadî dibêjit: «Zêr̂engiro, heger ev xeberye dirust bit,*
*2 Serê keĉa min bi misk û b mor û kulî bit,*
*3 Ser û male te, dê ĉûyî bit».*

**S. 26** *1 Yehûdî got: «Ya qadî, here sere keĉa xwe hinêre,*
*2 Heke li pişt hene gulyêt zêr̂e,*
*3 Ser û malê min bi xwe wergêr̂e».*
**S. 24** *1 Zêr̂angir dibêjit: «Bişîne û keĉa xwe bîne,*
*2 Heke pêve hebit guliyêt zêr̂îne,*
*3 Ser û malê min ji xwe werger̂îne».*

**S. 25** *1 Qazî xwedanê nasînê,*
*2 Wê dihisût sekînê,*
*3 Dê pê bikujit xizêm zêr̂înê.*

**S. 27** *1 Wê li qadiyê xwedanê menberê,*
*2 Wê disût xençerê,*
*3 Dê pê kujî xizêm zerê.*
**S. 26** *1 Qazîyê xwedanê menberê,*
*2 Wê dihisût xençerê,*
*3 Dê pê bikujit xizêm zerê.*

**S. 28** *1 Wê li qadiyê xwedanê nefsînê*

*2 Wê disût sikînê,*
*3 Dê pê kujî xizêm zerînê.*

**S. 29** *1 Qesra dota qadî lê,*
*2 Ĥeft dergehê asinî lê*
*3 Qadî ĥeft şandî li pê yek şandine pê.*

**S. 27** *1 Qesra dota qazî ĥeft dergehê asinî lê ye*
*2 Qazî sê qasida li gel êk dişîne pê ye,*
*3 Qasid: «Keĉa qenc bave[3077] te, te dixwazit li civatê ye».*

**S. 30** *1 Keĉik r̂adibû ji nerme,*
*2 Dilê wê diîsît weke agirekî germe,*
*3 Got: «Ya Xwedê, min xêrek bi r̂êya navê te kiriye, îro min p'ir̂ ji bavê xwe şerme».*

**S. 28** *1 Keĉ r̂abû ji nerme,*
*2 Di dilê wêde îsîyabû agirekî germe,*
*3 «Min qewî ji bavê xwe gelek şerme».*

**S. 31** *1 Keĉik hate dergehê êke,*
*2 Yareke bêşike,*
*3 Got: «Ya Xwedê, min xêrek bi r̂êya navê te kiriye, îro tu meferiya min bike».*

**S. 29** *1 Keĉk hatibû dergehê êke,*
*2 Ew meĥbûbeke bêşike,*
*3 «Ya Xwedê, tu meferyekê bo min bike».*

**S. 32** *1 Keĉik hate dergehê dûwe,*
*2 Yareke bi misk û mûwe,*
*3 Got: «Ya Xwedê, min xêrek bi r̂êya navê te kirî, îro tu li hana min bey zûwe».*

**S. 30** *1 Keĉk hatibû dergehê dûwe,*
*2 Ew meĥbûbeke bi misk û mûwe,*
*3 «Ya Xwedê, tu li hawara xwedanêt xêra werî zûwe».*

**S. 33** *1 Keĉik hate dergehê sisêye,*
*2 Yareke wa li r̂êye,*
*3 Got: «Ya Xwedê min xêrek bi r̂êya navê te kirî, îro tu li hana me bêye».*

**S. 31** *1 Keĉk hatibû dergehê sêye,*
*2 Ew meĥbûbe li ser r̂êye,*
*3 «Ya Xwedê vê sibê zû li banga min bêye».*

**S. 34** *1 Keĉik hate dergehê çare,*
*2 Yareke wa bi xêlî û sipîçare,*
*3 Got: «Ya Xwedê, min xêrek bi r̂êya navê te kirî, îro tu li hana min bişînî melekê hêzdare».*

**S. 32** *1 Keĉk hatibû dergehê çare,*
*2 Çi meĥbûbeke bi xêlî û sipîçare,*
*3 «Ya Xwedê, li bange me werê melekek ji Cebare».*

**S. 35** *1 Keĉik hate dergehê pênce,*
*2 Yareke gul gênce,*
*3 Got: «Ya Xwedê, tu nedey pêşîya xwedanê xêra çû r̂ênce».*

**S. 33** *1 Keĉk hatibû dergehê pênce,*
*2 Çi meĥbûbeke bi gul û gênce,*
*3 «Ya Xwedê, nedî ber dilê xwedanêt xêra çi r̂ênce».*

**S. 36** *1 Keĉik hate dergehê şeşe,*
*2 Yareke gul geşe,*
*3 Got: «Ya Xwedê, min xêrek bi r̂êya navê te kirî, îro tu li banga min bişînî meleke e'rse».*

**S. 34** *1 Keĉik hatibû dergehê şeşe,*

[3077] *bab*

*2 Çi meĥbûbeke dêm geşe,*
*3 «Ya Xwedê, li hawara xwedanêt min xêra werê melekek ji e'rse».*

**S. 37** *1 Keĉik hate dergehê ĥefte,*
*2 T'erqînî li E'rşa dik'ete,*
*3 Axî Cebraîl[3078] jê dek'efte.*
**S. 35** *1 Keĉik hatibû dergehê ĥefte,*
*2 T'erqînî li E'rşa dik'ete,*
*3 Amîn Cebraîl[3079] jê dek'efte.*

**S. 38** *1 Cebraîle axîye,*
*2 Çu bihuşta baqîye,*
*3 Havêtibû serê dota qadîye,*
*4 Qadî û yehûdî lê fikirîn. mûwek ji mûyî nezanîye.*
**S. 36** *1 Ew Cebraîle axîye,*
*2 Ço buişta[3080] baqîye,*
*3 Înabû cotekî ȓeş kezîye,*
*4 Avête pişta dota qazîye,*
*5 Ĥeft cara çêtir ji yêt berîye.*

**S. 39** *1 Hatî bayê dilovanî,*
*2 Xêlî û sipîçal ser serê keĉê hilanî,*
*3 Qadî û yehûdî lê fikirîn, mûwek ji mûyî nezanî.*
**S. 37** *1 Hatîbû bayê Ȓeĥmanî,*
*2 Xêlî û sipîçar ji ser serê keĉê hilanî,*
*3 Qazî û zêȓegir t'êk fikrîn,êkî mu[w]ek ji muekî nizanî.*

**S. 38** *1 Dota qazî got: «Bavo, zêȓegir yî bê mirwete,*
*2 Êkî xêrekê bi ȓêye mesebê xwe bikete,*
*3 Li bo Xwedê çi car hinda nabite».*

**S. 40** *1 Got: «Bavo tu wê yekî bibînî,*
*2 Tu xêrekê vê ȓa bigehînî,*
*3 Pirsyar[3081] meke tu ji çi dînî.*
**S. 39** *1 Heke tu êkî dibînî,*
*2 Xêrekê vê ȓa bigehînî,*
*3 Nebêjê tu ji k'î dînî.*

**S. 41** *1 Bavo, heke te xêrek dabî,*
*2 Bi avêda berdabî,*
*3 Li ba Xwedê hinda nabî».*
**S. 40** *1 Heke te xêrek di ȓêya Xwedê da dabî,*
*2 Te di avêda berdabî,*
*3 Li ba Xwedê qet hinda nabî».*

**S. 42** *1 Hey bavoyî, bê mirwete,*
*2 Hind kesê xêrekê li ȓêya mesebê xwe ji xwe ȓa bikete,*
*3 Xwedê ew Xwedêye, hefl hewza bora vedikete.*

**S. 43** *1 Keĉikê got: «Xazil min zanîba k'ê ev nûçe gote,*
*2 Da min derê qesra wi bihindote,*
*3 Min agir berdabiyê bisote».*

**S. 44** *1 Keĉikê got: «Ey gelê Besrayê,*

---

[3078] *Cîbraîl*
[3079] *Cîbraîl*
[3080] *behişt*
[3081] *pisyar*

*2 Heκe hun xatira min tê bibînin*
*3 Serê malê, barek dar û p'ûş bînin,*
*4 Li guhê meydan deynin».*

**S. 45** *1 Ewan xatira keĉikê we zanîn,*
*2 Serê malê barek dar û p'ûş anîn,*
*3 Yehûdî û biçûkêt yehûdî li nav danîn,*
*4 Şewitandin weke tu dizanî,*
*5 Keĉ nûr bû, çû ber nûra dilovanî!*

## 148. QEWLÊ MALÛ[3082] MÊRA[3083]

**S. 1** *1 Gîyanê min gorî malû mêrane,*
*2 Wê dihajone dorê şarane,*
*3 T'eliba xûna[3084] yarû birane.*

**S. 2** *1 Gîyanê min gorî malêt Adîye,*
*2 Wê dihajone dorêt berîye,*
*3 T'eliba xûna biran û axîye.*

**S. 3** *1 Çî siwarek t'anc li sere,*
*2 Xûtibê dixunit seransere,*
*3 Ez peye nabim, ĥeta Beẍdayê nekem êk li sere.*

**S. 4** *1 Gîyanê min gorî melik şêx Sin şêr siware,*
*2 R̂oja înî yê çil qadî ji Beẍdayê firandibûn êksere[3085].*

**S. 5** *1 Çî siwarekî hoy bê xişe[3086],*
*2 Maş û cenbeqî tên ji Lalişe,*
*3 Melik şêx Sin şêresiware r̂oja înî yê ji Beẍdayê kuştibû şêst û şeşe.*

**S. 6** *1 Çî siwarekî hoy li cesede,*
*2 Xelîfe dixwezin medhe,*
*3 Melik şêx Sin şêresiware r̂oja înîyê ji Beẍdayê kuştbû sêsede.*

**S. 7** *1 Çî siwarekî hoy r̂ehwance,*
*2 Serê xwe danabû t'ance,*
*3 Xûne Ĥisên Ĥelac ji ehlê Beẍdayê dixwaze.*

**S. 8** *1 Çî siwarekî hoy sermeste,*
*2 R̂imeke k'esk li deste,*
*3 Bi dengî Beẍdayê ve kir qeste,*
*4 Xûne Ĥisên Ĥelac ji ehlê Beẍdayê di dixweste.*

**S. 9** *1 Çî siwarekî hoy sekrane,*
*2 Dilê wî li Beẍdayê nehat paristane,*
*3 Got: «Li Beẍdayê nîne tê r̂a xûna yarû birane».*

**S. 10** *1 Xelîfe we deng dikete:*
*2 «Ya melik şêx Sin, destê me li damana teye,*
*3 Qey tu Beẍdayê xirab nekeye,*

---

[3082] *mal û*
[3083] [2] (rr. 468–470)
[3084] *xwin*
[3085] binêr: *yekser*
[3086] binêr*: bê e'yb*

*4 Me ser destêt te sed ẍefar û t'obeye».*

**S. 11** *1 Xelîfe deng diket bi zare:*
*2 «Ya melik şêx Sin, tu li ser menberê were xware,*
*3 Qey tu Beẍdayê xirab neke êkcare,*
*4 Me li ser destê te t'obeye û sed ẍefare».*

**S. 12** *1 Serê keverê der bû,*
*2 Ev li herçar kenarê Beẍdayê wer bû,*
*3 Beẍda ji ĥeybetê dû ker bû.*

**S. 13** *1 Serê keverê hat û hilgeȓîye,*
*2 Ev çar kenarê Beẍdayê zivirîye,*
*3 Bi firwara silt'an şêx Adî, hat û vedigeȓîye.*

**S. 14** *1 Xecîca*[3087] *we deng dikeye:*
*2 «Ya melik şêx Sin, me birayek heye,*
*3 Mezintire ji min û teye,*
*5 Ew qebûl neke Beẍdayê xirab keye».*

*Em di kêmin, û Xwedê yî t'emame!*

[3087] ango: *Xedîca*

# II. Beyt’

# 1. BEYT'A ŞÊX ADÎ[3088]

**S. 1** *1 Hey şêxê mino semiyanî,*
*2 K'erem ji qendîl hat ji banî,*
*3 Lew ciyê te bûye Lalişa nûranî.*

**S. 2** *1 Şêxê min şêxekî bi k'ereme,*
*2 Şêxê mino, k'eremet li ceme,*
*3 Li ĥemû wexta moĥt'acê[3089] teme.*

**S. 3** *1 Xwedan k'eremî, qelenderî,*
*2 Ji pesna tu şêxekî babzerî*
*3 Ez mirîdim, tu şefa'etî, mehderî.*

**S. 4** *1 K'erema te ji P'adşêye[3090],*
*2 K'ilîma te ji nûrêye,*
*3 Tu duȓî[3091] e'silê[3092] te ji duȓêye.*

**S.5** *1 Sêxê min bi ol, û erk'an[3093], û yare,*
*2 Nûra Tawisî melek' firware,*
*3 Lew şêxê min Lalişê girtbû ware.*

**S. 6** *1 Sed xwezime wî şêxî bi k'erem bit,*
*2 Ȓoja axretê mehder bit,*
*3 Zana, û dilgîr, û şefa'et[3094] bit.*

**S. 7** *1 Sêxê min şêxekî bi erk'ane,*
*2 Wê li dîwana velîya[3095] û xasane,*
*3 Mêrekî bi nûre, feqîr lê bûn mêvan[e].*

**S. 8** *1 Şêxê min ji mala Adiyaye,*
*2 Bi suȓ, û nûr, û dua'ye[3096],*
*3 Wa li ba şêxî k'erem û nûra P'adşaye.*

**S. 9** *1 Firware şêxê min ji Xwedaye[3097],*
*2 Sêxeki bi nûre, li ilmê[3098] xwe[3099] ȓewaye,*
*3 Ew jî nûreke ji nûrêt P'adşaye.*

**S. 10** *1 Sêxê min mêrekî çê ye,*
*2 K'erema wî ji nûra P'adşê ye,*
*3 Lew dahir bû ser ȓûyê e'rdêye.*

**S. 11** *1 Dahir bû, şirovekir ilmê mewlê ye,*
*2 Bawirya mêra wehil qehar Xwedê ye,*
*3 Hêvênê her ĥeft milyak'ete ji nûrê ye.*

**S. 12** *1 Mêr bi me'rîfetê wê li pêş e,*
*2 Bi ol û erk'ane serk'êş e,*

---

[3088] http://www.bahzani.net/services/forum/archive/index.php/t-56653.html
[3089] *muhtac*
[3090] *pedşe*
[3091] *dur*
[3092] *esl*
[3093] *rekan*
[3094] *şefahet*
[3095] *welî*
[3096] *duha*
[3097] *xuda*
[3098] *hilm*
[3099] *xo*

*3 Qelender him westaye, him derwêşe.*

**S. 13** *1 Derwêş yet qelenderin,*
*2 Li dîwana xasa mehderin,*
*3 Îman û aqûbet r̂oja axretê ferin.*

**S. 14** *1 Îmana min Xwedê ye,*
*2 Tawisî melek' ji nûrê ye,*
*3 Nûr jî ji pesna P'adşê ye.*

**S. 15** *1 E'sil, yêqin û bawerîye,*
*2 R̂astî — muĥba îlaĥîye,*
*4 Mehdera mêra ĥeqîye.*

## 2. BEYT'A KANYA SIPÎ[3100]

**S. 1** *1 Berî ne e'rd hebû, ne e'zmane,*
*2 Qudret û muĥbet lêk ger̂ane,*
*2 Kaniya Sipî ji batin da bi xwedane*[3101].

**S. 2** *1 Ava kaniya Sipî qudrete,*
*2 Mehdere li axretê şefa'ete*[3102],
*3 Ferze yeqîne*[3103] *loqete.*

**S. 3** *1 Ferze jibo nêr û mê ye,*
*2 T'evaya xulyaqetê e'rdê ye,*
*3 Hêvênê wê ji Xwedê ye.*

**S. 4** *1 Mora kaniya Sipî fere,*
*2 Ji bo însanî mehdere,*
*3 Firwar ji Melikê Ekbere.*

**S. 5** *1 Eve firware P'adşaye*[3104],
*2 Mora kaniya Sipî r̂ewaye,*
*3 Fere û atqate ezdaye.*

**S. 6** *1 Ezdaye û P'adşaye,*
*2 P'adşa li hikmî r̂ewaye,*
*3 Sêne ferên ezdaye.*

**S. 7** *1 R̂oj û dua'*[3105] *jî ferin,*
*2 Li gel more mehderin,*
*3 Mehderên her û herin.*

**S. 8** *1 Mor li kaniya Sipî ye,*
*2 R̂ojî bi navê Êzî ye,*
*3 Dua' fere û ĥeqî ye.*

**S. 9** *1 R̂oj bergeha t'oq*[3106] *nîşane,*

---

[3100] *Laliş* 38, 2013 (rr. 40-43), Belavkirin: Şerif Sileyman https://ru.calameo.com/read/002518317118b00c1c5c4
[3101] *xudan*
[3102] *şefahet*
[3103] *êqîn*
[3104] *petşa*
[3105] *duha*
[3106] *tok*

*2 R̂ist û simbêl erk'ane,*
*3 Pê t'emam dibit îmane.*

**S. 10** *1 Pê t'emam dibit îmane,*
*2 Xîret ferek girane,*
*3 Serê ĥemû ferane.*

**S. 11** *1 Mora kaniya Sipî fere,*
*2 Laliş cîkê mehdere,*
*3 Nûra wê ji her û here.*

**S. 12** *1 Ji nûra îlaĥîye,*
*2 Mor, more kaniya Sipîye,*
*3 Hêvênê vî e'rdîye.*

**S. 13** *1 Firwar ji ba P'adşaye,*
*2 P'adşa li gotê r̂ewaye,*
*3 Li nêr û mêya dua'ye.*

**S. 14** *1Nêr û mê ji yek darin,*
*2 T'ev ji kaniya zelalin,*
*3 Li dinê û axretê hevp'arin.*

**S. 15** *1 Ji yek nûrê vêjîne,*
*2 Xûn û goşt lê ĥûrîne,*
*3 T'eva ji t'oqê yeqîne.*

**S. 16** *1 Yeqîna me Xweda ye*[3107]*,*
*2 Bawerîya t'ev e'vda ye,*
*3 Sema herdu nefsa ye*[3108]*.*

**S. 17** *1 Sê meferên*[3109] *îmanê,*
*2 Gel bawerîye û atqanê,*
*3 T'ev loqetê û nîşanê.*

**S. 18** *1 Nîşan t'oqa Ezdaye,*
*2 T'oq dîyarî ya Xwedaye,*
*3 Atqan pê bû r̂ewaye.*

*Em di kêmin, û di Xudê t'emame!*

## 3. BEYT'A ŞÊX Û P'ÎRA[3110]

**S. 1** *1 Seyîdî şara înabû mizgîne,*
*2 Seyîdî çendî sinîne*[3111]*,*
*2 Da bora bikeyîn mizgîne.*

**S. 2** *1 Seyîdî berî bigehîne Lalişê biçîne,*
*2 Seyîd, qubeha bibîne,*
*3 Seyîdî serê hilêla zêr̂îne.*

[3107] *Xuda*
[3108] *nifs*
[3109] *mehwer*
[3110] [2] (rr. 666-667)
[3111] *sunî*

**S. 3** *1 Seyîdî k'êşabû simate,*
*2 Mîro, şêx Adî ji Şamê hate,*
*3 Seyîdî ço bi t'elebê şêx Berk'ate.*

**S. 4** *1 Seyîdî şukr ji weĥidanî,*
*2 Mîro, şêx Adî ji Şamê hilanî,*
*3 Şêx Adî beĥre wê jê diçin coyê û kanî,*
*4 Xas xasin, wê dicone ber nûra R̂eĥmanî.*

**S. 5** *1 Seyîdî şukr ji ẍefure,*
*2 Mîro, şêx Adî ji Şamê xwastbû destûre,*
*3 Li gelîyê Lalişê k'eftbû şewq û nûre,*
*4 Zor xelq mabûn bacure.*

**S. 6** *1 Dergehê Şerqîyê,*
*2 Min naverik lê dîye,*
*3 Min nav kir kaniya Sipîye.*

**S. 7** *1 Zimzim û miẍare,*
*2 Ziyareta şêran û mare,*
*4 Şêx Adî bi xwe serdare.*

## 4. BEYT'A P'ÎRA[3112]

**S. 1** *1 P'îro, qedrê te geleke,*
*2 Dergewan derê cinetê weke[3113],*
*3 P'îr Ĥecî Miĥemed bûye[3114] p'îrê şêx Îsn Ĥesnanekî.*

**S. 2** *1 P'îro, qedrê te girane,*
*2 P'îr bûye camya ĥemû mêrane.*

**S. 3** *1 P'îro, p'îrê bav [û] pisa [e],*
*2 P'îr, t'û kesî netirse,*
*3 R̂ê û me'niya[3115] bavê xwe dipirse.*

**S. 4** *1 P'îr ji atqatê[3116],*
*2 P'îr bûye p'îrê şefa'etê[3117],*
*3 Çi p'îrekî k'efî[3118] demane,*
*4 P'îr bûye p'îrê axirzemane.*

**S. 5** *1 P'îr ji bedîl[e],*
*2 Berî qalê, berî qîlê,*
*3 Not ĥezar sal min tu dîtbû qendîlê[3119].*

*R̂eĥme li dê–bavê hostayî!*

---

[3112] [31] (гг. 21-22)
[3113] *veke*
[3114] *biye*
[3115] *me'niyan*
[3116] *at'qat*
[3117] *şivae't*
[3118] *k'afil*
[3119] *qendîl*

## 5. BEYT'A DERWÊŞA[3120]

**S. 1** *1 Derwêşin, qelenderin[3121],*
*2 Me'rîfetê serwerin,*
*3 Qelender bi mehderin.*

**S. 2** *1 Zanîn û fer e'sasin,*
*2 Hilm û t'erîqet nasin,*
*3 Ew jî muĥbet û k'asin.*

**S. 3** *1 Ew k'asa nûranîye,*
*2 K'asa suȓa jorîye,*
*3 Vexwar malêt Adîye.*

**S. 4** *1 Adîne û derwêşin,*
*2 Ȓastî ĥeqîqet bêjin,*
*3 Li cem xasa wê li pêşin.*

**S. 5** *1 Wê li pêşin çimku[3122] bi Celewin,*
*2 Li meydane her ewin,*
*3 Ĥezreta P'adşê siwarin, nebin xewin.*

**S. 6** *1 Siwarin bo ibadetê,*
*2 Wesfa P'adşê diden ji qudretê,*
*3 Ewin aşiqêt sûka me'rîfetê.*

**S. 7** *1 Aşiqêt sûka me'rîfetê ewin,*
*2 Çimku[3123] bi erk'anin, bi Celewin,*
*3 Siwarin herdem, ne bi xewin.*

**S. 8** *1 Siwarin bo me'rîfetê,*
*2 Cel[ew], û Misĥef[3124], û xetê,*
*3 Ew jî duȓin, ji duȓêt qudretê.*

**S. 9** *1 Ew jî k'ilîmêt mişûre,*
*2 Jê hilgirtin qelem, û xet, û destûre[3125],*
*3 Sed xwezme wî ṣabit bi wan nûre.*

**S. 10** *1 Ewin malêt derwêşe,*
*2 Bi wê nûrê diçin pêse,*
*3 Lew derman diken derdan û êşe.*

**S. 11** *1 Ewan êş derman kirin,*
*2 Ȓastî û ĥeqîqet dîyar kirin,*
*3 Lew ẍafil ji xewa ȓakirin.*

**S. 12** *1 Jêȓa dibêjin ȓastiye,*
*2 Hirsê P'adşê min jorîye,*
*3 Mehdere mêran ĥeqîye.*

**S. 13** *1 Serwerin bi me'rîfetê,*
*2 Bi ilm, û mişûr, û xetê,*

---

3120 http://www.ezdixandi.com/forum/38-964-1
3121 *qelinder*
3122 *çinku*
3123 *çiku*
3124 *misef*
3125 *distûr*

*3 Ji wan bigrin t'or̂ û ibadetê*[3126].

**S. 14** *1 Ji wan fêrbin îmanê,*
*2 Dua', û ferz, û nîşanê,*
*3 Da qayîmken atqanê.*

**S. 15** *1 Atqana min îlaĥîye,*
*2 Zîyaret Lalişa, kaniye Sipîye,*
*3 P'adsa bi xwe Melikê jorîye.*

**S. 16** *1 P'adşa bi xwe Xwedê ye,*
*2 Tawis melek' nûre, ji nûrêt P'adşê ye,*
*3 Hate ba şêxê min muĥbeta k'asêye.*

**S. 17** *1 Ew k'asa ji sur̂a qudretê,*
*2 Şêx Adî jê hilîna p'ara muĥbetê,*
*3 Dahir kire dinê bi r̂engê k'eremetê.*

**S. 18** *1 Şêxê min bi k'ereme, bi hinere,*
*2 Şehde*[3127] *bi navê Xwedê û Tawisî melek' fere,*
*3 P'adşê min ke li e'zmanî serwere.*

**S. 19** *1 Ewe serwerê qelendere,*
*2 Ji ba wî têtin mehdere,*
*3 Malo çep nede ji fere.*

**S. 20** *1 Ji fera xwe ba neden,*
*2 Ji r̂astiyê xwe çep neden,*
*3 P'ara îmana xwe biden.*

**S. 21** *1 P'ara îmanê — r̂astîye,*
*2 Xîret — cewher ĥeqîye,*
*3 Da bigehine r̂êza cindîye.*

**S. 22** *1 Cindî xerqe nijyarin,*
*2 Li r̂ûyê dinê bi k'arin,*
*3 Lew li axretê bi p'arin.*

**S. 23** *1 Bihuşt ciyê qelendere,*
*2 Derwêşa,û xwedan fere,*
*3 P'adşê min li wan mehdere.*

**S. 24** *1 Derwêş yî p'îrin,*
*2 Li axretê sexbîrin*[3128],
*3 Bi ilmê Xwedê jîrin.*

**S. 25** *1 P'îr yî derwêşe,*
*2 Bi ilmî serk'êşe,*
*3 Li dîwana wê li pêşe.*

**S. 26** *1 Heger p'îr ne westaye,*
*2 Ne yî bi fere, [ne] bi dua'ye,*
*3 Ne maş, û bê semaye.*

**S. 27** *1 Westa ferek e'sase,*

---

[3126] *ebadet*
[3127] *şade*
[3128] binêr: *sexbêr*

*2 Li dîwana xasa base,*
*3 Xwedê da wan wek'aze.*

**S. 28** *1 Westa û derwêş bi nûrin,*
*2 Zaniyarin beȟrêt k'ûrin,*
*3 Ji bo Ezdaya destûrin.*

## 6. BEYT'A BAZA

**şaxê — 1**[3129]

**S. 1** *1 Mestim sik'ranê,*
*2 Nêĉîrvanê bazame*[3130]*,*
*3 Aşiqê suȓa*[3131] *giranim,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 2** *1 Aşiqê suȓême,*
*2 Derê dirbê va tême,*
*3 Ȓênga baza dinême,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 3** *1 Bazan û bazgîne,*
*2 Şevê ȓoj nêĉîra,*
*3 Nêĉîra te heye dîndara mîra,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 4** *1 Xazke min zanîya,*
*2 Ȓengê baza k'î alîye,*
*3 Minê bigirta bi nijare,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 5** *1 Nijare ne li bere,*
*2 Ne li axe, mîna misk û maware,*
*3 Yala sere min deft'ere,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 6** *1 Baz hatin, baz bihurîn,*
*2 Dilê min da k'ew û girî,*
*3 Yala ȟewalê baza kirî,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 7** *1 Baz hatin, baz diçûne,*
*2 Dilê minî dûne,*
*3 Xazila hevalê baza bûme,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melȟema birîna min mille.*

**S. 8** *1 De'fa min bînin,*

---

3129 [29] (гг.452-457) (№ 1712)
3130 *be'z*
3131 *sur*

*2 Derê dirbê werînin,*
*3 Bazîyê dûr dixûnin,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 9** *1 De'fa mine mûye,*
*2 Derê dirbê danîye,*
*3 Bazîkê tê hilbîye,*
*4 Baz fiȓî, min nizanîye,*
*5 Cora dilê min core,*
*6 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 10** *1 De'fa min ȓaxistî,*
*2 Bazîkê tê nivistî,*
*3 Baz fiȓî, min nizanbû suȓa Amadîn, Sicadîn û Şemsê minî Êzdî,*
*5 Cora dilê min core,*
*6 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 11** *1 De'fa min vedave,*
*2 Bazîkê k'etîye nave,*
*3 Baz min girtî, min berdave,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 12** *1 Mezela der nijînî,*
*2 Bazîkê tê wetinî,*
*3 Baz fiȓî, kundê dewsê sekinî,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 13** *1 Mezela der girêda,*
*2 Bazîkê tê di p'irê da,*
*3 Baz fiȓî, kundê mabû dewsê da,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 14** *1 Mezela der dadan,*
*2 Bazîkê tê di neman,*
*3 Baz fiȓî, kundê dewsê diman,*
*4 Cora dilê min core,*
*5 Yala melĥema birîna min mille.*

**S. 15** *1 Şerefa lawêd p'îra,*
*2 Dil sotin, qeda wî da,*
*3 Şerefe şebeqe digeȓin nêĉîrê cedûda,*
*4 Il-ĥemdillah[3132], her ya R̂ebî[3133], her ya R̂ebî, her ya Xweda[3134],*
*5 Ew ĥimeta[3135] seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 16** *1 Şerefa lawêd incûza,*
*2 Dê û bavê xwe dikin naza,*
*3 Şerefe şebeqe digeȓin nêĉîrê baza,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 Ew ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

---

[3132] *E'rĥemdûlla*
[3133] *yarebî*
[3134] *xuda*
[3135] *hemet*

**S. 17** *1 Şerefa tî ax̆darî,*
*2 Cawa tî qadirî,*
*3 Bangîna tî hazirî,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 Ew ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 18** *1 Şerefa r̂ê nasî,*
*2 Beĥra[3136] tî xwasî,*
*3 Tu Xidirî yan Ilyasî[3137],*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 Ew ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 19** *1 Hatîye bazirgane,*
*2 Danîye hewirdorê şeherane,*
*3 Barê wana lal, û dur̂, û mircane,*
*4 Xasê şêx Adî dikirine gozî, ser bi ser, can bi cane,*
*5 Barê wan sivike, ne arzane,*
*6 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*7 Ew ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 20** *1 Hatîye ser te bazare,*
*2 Bazara xwe bike sit'are,*
*3 Bandê ba mîrê xwe nebe şermezare,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 21** *1 Hatîye ser te bazareke boş,*
*2 Dur̂ hatine bi k'oş,*
*3 Hew xazila min wî e'vdî, dur̂ baha bik'îr̂e, arzan ne froş*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 22** *1 We dive elaye,*
*2 Heqe zik'atê heye dua'ye*
*3 Ĥeçkê kesê sere zere micqalê ser maye,*
*4 Ew jî bandê p'îr̂ cefaye,*
*5 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*6 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 23** *1 R̂ojekê r̂oj xweş[3138] dibe,*
*2 Xelq ĥemû xet xweş dibe,*
*3 Ne xazila r̂uĥê derewînî înk'ar[3139] dibe,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 24** *1 R̂ojekê ser p'ira Selatê,*
*2 Xerqeyê her̂e bûsatê,*
*3 Ĥeçkê kesê ne ser sebeqa xerqe be, qalbê gunek'arê her̂e hişmatê[3140],*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 25** *1 R̂ojekê ser p'ira nehîne,*
*2 Xerqeyê her̂e xezîne,*
*3 Ĥekê kesê ne ser sebeqa xerqe be, qalbê gunek'arê her̂e Beyt il-Mesîle,*

---

[3136] *be'r*
[3137] *E'ylas*
[3138] *xoş*
[3139] *ink'oş*
[3140] *kişimat*

*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 26** *1 R̂ojekê li wê dibe,*
*2 K'ursyî xarî e'rdê dibe,*
*3 K'aẍaza wan mistê dibe,*
*4 Kêr e'melê wan t'emam lê dibe,*
*5 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*6 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 27** *1 R̂ojekê wê bive axirzemane,*
*2 Ĥezêkê têk'eve qebrane,*
*3 Sinîyê[3141] bavêne beĥrane,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 28** *1 Ne kesê kesane, ne bavê pisane,*
*2 Wê r̂ojekê yar birê axretê hawekê[3142] bidne ser birane,*
*3 Tarîyê[3143] şeva derxin, bînin ber r̂onkaya ĉirane,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*4 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 29** *1 R̂ojekê wê bive axire,*
*2 Wê r̂abe ferxekî fexire,*
*3 Ne kesê kesane, ne bavê pisane,*
*4 Wê r̂ojekê yar birê axretê hawekê bidne ser birane,*
*5 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*6 We ĥimeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**S. 30** *1 Wey li me wê r̂ojê,*
*2 P'êletîyê bi dojêh,*
*3 Şivê vê gele camêr cênîkê gele ĥurmet bigrin bavêne agirê dojêh,*
*4 Il-ĥemdillah, her ya R̂ebî, her ya R̂ebî, her ya Xweda,*
*5 We himeta seyîdê me bî, yala ferdoste, werê me bî.*

**şaxê — 2**[3144]

**S. 1** *1 Mestê sêk'ranê,*
*2 Delawanê giranê.*

**S. 2** *1 Nêĉîrvanê bazame[3145],*
*2 Derê t'irbe r̂a tême,*
*3 R̂enga baza dûr dipême.*

**S. 3** *1 De'fa mine mîye,*
*2 Derê t'irbê r̂axistîye,*
*3 Bazîngê hatibû, tê nivistîye.*

**S. 4** *1 Dilê mi şa bû,*
*2 Mala mi ava bû,*
*3 Mi girtî bî, mi berda bî.*

**S. 5** *1 Çi bazîkî mezine,*
*2 K'etibû de'fa mine,*

[3141] *sunî*
[3142] *hewek*
[3143] *te'rî*
[3144] [29] (гг. 343-344) (№ 1687)
[3145] *be'z*

*3 Dilê mi şa bû, mala mi ava bû,*
*4 Bazî fiȓîn, mi nizanbû, suȓa*[3146] *melek şêx Sine*[3147].

**S. 6** *1 Çi bazîkî qewîye,*
*2 Mi de'fa xwe dîye,*
*3 Dilê mi şa bû, mala mi ava bû,*
*4 Bazî fiȓîn, mi nizanbû, suȓa silt'an*[3148] *Êzîye.*

**S. 7** *1 Çi bazîkî buk'ir,*
*2 Dinê dahir*[3149] *bibû dik'ir,*
*3 Dilê mi şa bû, mala mi ava bû,*
*4 Bazî fiȓîn, mi nizanbû, suȓa şêxû Bek'ir.*

**S. 8** *1 Baz hatin, baz bihurîn,*
*2 Dilê mi şa bû, mala mi ava bû,*
*3 Ĉavê*[3150] *mi pêk'et, dil k'ewgirî,*
*4 Xwazka hevalê baza dikirî.*

**S. 9** *1 Baz hatin, baz diçûne,*
*2 Dilê mi şa bû, mala mi ava bû,*
*3 Ĉavê mi pêk'et, dil bi dûne,*
*4 Xwazka hevalê baza dikeme.*

**S. 10** *1 Şerefe lawê p'îra,*
*2 Dil sotibûn eşqera wî da,*
*3 Berbanga sibê Şeref digeȓe nêĉîrê feqîra.*

## 7. BEYT'A CINDÎ[3151] — LAVA ŞIFAQÊ[3152]

**şaxê — 1**
**S. 1** *1 Cindîo, ȓabe ȓoje,*
*2 Bes vê xewê hindoje,*
*3 Xewa berê sibê zor e'deb û dojeh.*
**S. 1** *1 Cindîo, ȓabe ȓoje,*
*2 Bes vê xewê hindoje,*
*3 Xewa berê sibê zor e'zeb û dojeh.*

**S. 2** *1 Cindîo, ȓabe, ȓabe,*
*2 Bes bi vê xewê tu şabe,*
*3 Xewa berê sibê zor e'zabe.*
**S. 2** *1 Cindîo, ȓabe, ȓabe,*
*2 Bes bi vê xewê tu şabe,*
*3 Xewa berê sibê zor e'zabe.*

**S. 3** *1 Ȓabe ji xewêd şêrîne,*
*2 Bes goȓê teng bibîne,*
*3 Feqîr di bê k'erbin, di bê k'îne.*
**S. 3** *1 Ȓabe ji xewê şêrîne,*
*2 Bes goȓê teng bibîne,*
*3 Feqîr di bê k'erbin, di bê k'îne.*

---
[3146] *sur*
[3147] *Şîxsin*
[3148] *sultan*
[3149] *deher*
[3150] *ĉe'v*
[3151] [3] (pp. 230–242)
[3152] http://www.ezdixandi.com/forum/38-842-1

**S. 4** *1 R̂abe ji xewêd tarîye,*
*2 Xew ĥeram dibû li cindîye,*
*3 Wê li xwedanêd maşan û cenbenqîye.*

**S. 5** *1 R̂abe ji xewa tarîyê ,*
*2 Xew ĥeram dibû li cindîyê,*
*3 Wê li xwedanê xerqeyê (cenbeqîye).*

**S. 5** *1 R̂abe ji xewêd sibehe,*
*2 Xew ĥeram dibû li medhe,*
*3 Wê li xwedanêd xerqehe.*

**S. 4** *1 R̂abe ji xewê sibeye,*
*2 Xew ĥeram dibû li medheye,*
*3 Wê li xwedanê xerqeye.*

**S. 6** *1 R̂abe ji xewêd hingora,*
*2 Xew ĥeram dibû li zora,*
*3 Wê li xwedanêd xerqêd bi mora.*

**S. 6** *1 R̂abe ji xewê hingora,*
*2 Xew ĥeram dibû li zora,*
*3 Wê li xwedanê xerqêd bi mora.*

**S. 7** *1 R̂abe ji xewêd hêvara,*
*2 Xew ĥeram dibû li mêrda r̂a,*
*3 Wê li xwedanêd kevnan û k'ara.*

**S. 7** *1 R̂abe ji xewa êvaran,*
*2 Mêrda r̂a wê li xwedanê kevn*[3153] *û k'aran,*
*3 R̂abe ji xewa mêrxanan,*
*4 Xew ĥeram*[3154] *dibû li zergûnan,*
*5 Wê li xwedanê dana(n) û stûnan.*

**S. 8** *1 R̂abe ji xewêd merxûna,*
*2 Xew ĥeram dibû li zergûna,*
*3 Wê li xwedanêd danan û stûna,*

**S. 8** *1 R̂abe ji xewê merxûna,*
*2 Xew ĥeram dibû zerguna,*
*3 Wê li xwedanê danan û stûna.*

**S. 9-10** *1 Malo, nîveka şevê ye,*
*2 Dengekê Alî wê tê ye,*
*3 Here têde bore ji p'ê ye,*
*4 Maşê te maşêkî çê ye,*
*5 Wê li ber xilmeta mewlê ye.*

**S. 9** *1 Malo, nîveka şevê ye,*
*2 Dengekî bilind wê tê ye,*
*3 Here têde borê ji p'ê ye,*
*4 Maşê te maşekî çê ye,*
*5 Wê li ber xilmeta mewlê ye.*

**S. 11** *1 Malo, dîkil wê dixûnin,*
*2 Van şeva xew lê nînin,*
*3 Cindî holê distînin.*

**S. 10** *1 Malo, dîkil wê dixûnin,*
*2 Van şeva xew lê nînin,*
*3 Cindîo, holê distînin.*

**S. 12** *1 Cindî naken nû xewê,*

---

[3153] *kewn*
[3154] *haram*

*2 Dê bi serê xwe çine gewê,*
*3 Digel mîrê xwe naken derewê.*

**S. 11** *1 Cindî nake xewê,*
*2 Dê bi serê xwe çine gewê,*
*3 Digel mîrê xwe naken derewê.*

**S. 13** *1 Dîkilê p'eȓê wî sipîye,*
*2 Wê dixwînêt li e'rsê Alîye,*
*3 Wê li ber Melikê Bêrîye*
*4 Bang û hawarêd me ji dîwana şêx Adîye*

**S. 12** *1 Dîkilê p'eȓê wî sipîye,*
*2 Wê dixwîne li E'rşê A'lîye,*
*3 Wê li ber Melikê Bêrîye,*
*4 Bang û hawarê me ji dîwana şêxê Adîye*[3155].

**S. 14** *1 Dîkelê p'eȓê wî sore,*
*2 Wê dixûnit li e'rsê jore,*
*3 Wê li ber Melikê bi more,*
*4 Bang û hawarêd me ji qubet il-Bidore.*

**S. 13** *1 Dîkelê p'eȓê wî sore,*
*2 Wê dixwînit li E'rşê jore,*
*3 Wê li ber Melikê*[3156] *bi more,*
*4 Bang û hawarê me ji qubet il-Bidore.*

**S. 15** *1 Dîkilê p'eȓê wî zere,*
*2 Wê dixûnit li E'rşêd sere,*
*3 Wê li ber Melikê Ekbere,*
*4 Bang û hawarêd me ji şêx Şemsê T'et'ere*

**S. 14** *1 Dîkilê p'eȓê wî zere,*
*2 Wê dixûnit li E'rşêd sere,*
*3 Wê li ber Melikê Ekbere,*
*4 Bang û hawarê me ji şêx Şemsê zere.*

**S. 16** *1 Dîkilê p'eȓê wî k'eske,*
*2 Tu vê xewê beske,*
*3 Ȓabe ji şêx Adî bixwaze maş, û berat', û ȓisqe*[3157].

**S. 15** *1 Dîkilê p'eȓê wî k'eske,*
*2 Tu vê xewê beske,*
*3 Ȓabe ji şêx Adî bixwaze maş, û berat', û ȓisqe*[3158].

**S. 17** *1 Dîkilê e'rsa bang da,*
*2 Yê e'rda cewab da,*
*3 Şêx Adî wê di Ȟeq war da,*
*4 P'adşê min wê di dilê bi ȓehim da.*

**S. 16** *1 Dîkilê E'rşa bang da,*
*2 Yê e'rda cewab da,*
*3 Şêx Adî wê di Ȟeq war da,*
*4 P'adşê min wê di dilê bi ȓehim da.*

**S. 18** *1 Dîkilî k'oke k'oke,*
*2 Wê dixûnit li me'şoqe,*
*3 Wê li ber Melikê foqe,*
*4 Êle biramo li dîwana şêx Adî kirbû şewqe.*

**S. 17** *1 Dîkilî k'oke k'oke,*

---

3155 *şêx E'dî*
3156 *melek*
3157 *ȓizq*
3158 *ȓizq*

*2 Wê dixwînit li me'soqe,*
*3 Wê li ber Melikê foqe,*
*4 Êle birano li dîwana şêx Adî kirbû sewqe.*

**S. 19** *1 Dîkilî p'eȓê wî bi ȓenge,*
*2 Ji E'rşa têtin denge,*
*3 Haway şara têne cenge.*
**S. 18** *1 Dîkilî p'eȓê wî bi ȓenge,*
*2 Ji E'rşa*[3159] *têtin denge,*
*3 Haway sara têne cenge.*

**S. 20** *1 Malo, feqîr di zergûnin,*
*2 Mîrê xwe bi ĉava nabînin,*
*3 Maşê xwe ji mîrê mezin distînin.*
**S. 19** *1 Malo, feqîr di zergûnin,*
*2 Mîrê xwe bi ĉava nabînin,*
*3 Maşê xwe ji mîrê mezin distînin.*

**S. 21** *1 Cindîo, ȓabe ȓoje,*
*2 Feqîr çûne berȓoje,*
*3 Bi xunav k'eftî peykan, û xerqan, û biskoje*[3160]*.*
**S. 20** *1 Cindîo, ȓabe ȓoje,*
*2 Feqîr çûne berȓoje,*
*3 Bi xunav k'efti peykan, û xerqan, û biskoje.*

**S. 21** *1 Ȓabe ji xewa tarîya,*
*2 Qest bike merzê kanîya,*
*3 Civan bike destan û e'nîya,*
*4 Ev e'detê*[3161] *me cindîya.*

**S. 22** *1 Ȓabe ji xewê sibehe,*
*2 Feqîr çûne ber dergehe,*
*3 Bi xunav k'eftî peykan, û biskojan, û xerqehe.*

**S. 23** *1 Ȓabe ji tarî bave,*
*2 Qesid bike merzê ave,*
*3 Civan*[3162] *bike destan û ĉave,*
*4 Eve bû e'detê me zîrbave.*
**S. 22** *1 Ȓabe ji tarî bave,*
*2 Qesid bike merzê ave,*
*3 Civan bike destan û ĉave,*
*4 Eve bû e'detê me zerbave.*

**S. 24** *1 Cindîo, tuyî nivistî,*
*2 Li xilmetê yî sistî,*
*3 Lew mîrê mezin tu ji maş êxistî.*
**S. 23** *1 Cindîo, tuyî nivistî,*
*2 Li xilmetê sistî,*
*3 Lew mîrê mezin tu ji maş êxistî.*

**S. 25** *1 Nexwestim lew nivistim,*
*2 Heke bixwastama nedinivistim,*
*3 Lew mîrê mezin ez ji maş xistim.*
**S. 24** *1 Nexwestin lew nivistim,*
*2 Heke bixwestama nedinivistim,*

---

[3159] *êrs*
[3160] *Bi xunav k'eftî peykan, û biskojan, û xerqehe*
[3161] *adet*
[3162] *ciwan*

*3 Lew mîrê mezin ez ji maş xistim.*

**S. 26** *1 Cindîo, mexwe[3163] r̂ojê,*
*2 Û menive bi şevê,*
*3 Herr̂o ku r̂oj hiltê, te maşê xwe ji mîrê mezin divê.*
**S. 25** *1 Cindîo, nexwe[3164] bi r̂ojê,*
*2 Û nenive bi şevê,*
*3 Her ku r̂oj hiltê, te maşê xwe ji mîrê mezin divê.*

**S. 27** *1 Cindîo, mexwe r̂ojan,*
*2 Û menive bi şevan,*
*3 Serî hilîne bibîne milkan û bax̆an,*
*4 Bihuşta baqî milkê silt'an Êzî û e'lêk'ûm selam[3165].*
**S. 26** *1 Cindîo, nexwe bi r̂ojan,*
*2 Û nenive bi şevan,*
*3 Serî hilîne bibîne milkan û bax̆an,*
*4 Bihuşta baqî milkê Êzîd û silav li xwedan.*

**S. 28** *1 Cindîo, tuyî şufîq,*
*2 Me şerab divêt ji k'asêd badî[3166],*
*3 Li wê ĥewdê[3167] yala biramo milkê Ebabek'er[3168] il-Sedî.*

**S. 29** *1 Cindîo, tuyî cindî,*
*2 Me şerab divê ji k'asêd qewî,*
*3 Li wê ĥewdê yala biramo milkê E'mer û E'lî.*

**S. 30** *1 Cindîo, tuyî r̂êber,*
*2 Me şerab dive ji k'asêd zer,*
*3 Li wê ĥewdê yala biramo milkê şêx Şemsê T'et'er.*

**S. 31** *1 Cindîo, tuyî r̂ênas,*
*2 Me şerab div] ji k'asêd xas,*
*3 Li wê ĥewdê yala biramo milkê Xidir û Ilyas[3169].*
**S. 27** *1 Cindîo, tuyî r̂ênas,*
*2 Me şerab dive ji k'asê xas,*
*3 Li wê hewdêye, li biramo milkê Xidir û Ilyas.*

**S. 32** *1 Cindîo, tuyî nûrîn,*
*2 Me şerab divê ji k'asêd zerguîn,*
*3 Li wê ĥewdê yala biramo milkê Şemsedîn û Fexredîn.*
**S. 28** *1 Cindîo, tuyî nûrîn,*
*2 Me şerab divê ji k'asê zergûyîn,*
*3 Li wê hewdêye, li bir̂amo milkê Semsedîn û Fexredîn.*

*(Li her̂e Beyta Cindî xilas dibit û qewlê k'ofiya dest p'ê diket.)*

*Em kêmin, Xwedê yê t'emame!*
*Em kêmin, Xwedê yê t'emame!*

**şaxê — 2**[3170]
**S. 1** *1 Divê Cindîyo, r̂abe sibeye,*
*2 Xew ji te r̂a bêfeydeye,*

---

3163 *mexo*
3164 *nexewe*
3165 *e'leyhe il-Selam*
3166 *xas*
3167 *hewed*
3168 binêr: *Ebû Bek'ir*
3169 *Liyas*
3170 [53] *BEYTA CINDÎ (*rr 26-27) got: Hemîdê Kinyazji Hoktemberyanê

*3 R̂ave, wextê maşê teye.*

**S. 2** *1 Divê Cindîyo, r̂ave xewê şevane,*
*2 Canke dest û ĉevane,*
*3 Wextê maşê mêrane.*

**S. 3** *1 Divê Cindîyo, r̂ave, hey r̂oje,*
*2 Bese xewê şeva bidoje,*
*3 Xewê şeva heye e'zab û doje.*

**S. 4** *1 Divê, Cindîyo, bang da dîkê E'rşane,*
*2 Cav da dîkê E'rdane,*
*3 R̂ave, wextê maşê mêrane.*
*4 Cindîyo, bese xewê di şevada be, xewê şeva heye e'zabekî girane.*

**S. 5** *1 Cindîyo, hilatî r̂oje,*
*2 Şemsê me bişkoje,*
*3 Xewa şevaye e'zab û doje.*

**S. 6** *1 Divê Cindîyo, r̂ojê p'er vedaye,*
*2 Nedîra wî daye,*
*3 Herçar qulba mesîyê binê beraye.*
*4 Malxiravo, r̂ave, xewa şevaye gele-gele e'zabe.*

**S. 7** *1 Divê, Cindîyo r̂ave, Şemsê me şewq vedaye,*
*2 Nedîra wî daye herçar qulbê dinêye.*
*3 R̂ave, malxirav, bese xewa şevada be,*
*4 Sur̂ sadiqo, birê mino, bese xewa şevada be.*

**S. 8** *1 Divê Cindîyo, r̂o derk'etiye teştiya mîra,*
*2 Şemsê me li t'ivdîre,*
*3 Malxiravo, sur̂ sadiqo, bese xewê bîne bîre.*

**S. 9** *1 Divê Cindîyo, bang da dîkê p'erê wî sipîye,*
*2 Bang daye E'rşê A'lîye,*
*3 Nîşana mêra heye qubil, Laliş, kanya Sipîye.*

**S. 10** *1 De r̂ave, wey r̂ave,*
*2 Sur̂ sadiqo, birê mino, bese di xewa şevada be,*
*3 Xewa şewa gele-gele e'zabe.*

**S. 11** *1 Divê Cindîyo, r̂ave, bang da dîkê 'perê wî sore,*
*2 Ewî bang da li E'rşê jore,*
*3 Nîşana mêra heye qubil, Laliş, kanya Sipî li dore.*

**S. 12** *1 De r̂ave, wey r̂ave,*
*2 Sur̂ sadiqo, birê mino, bese di xewa şevada be,*
*3 Xewa şevê heye p'êşê gayê cote, gele-gele e'zabe.*

**S. 13** *1 Cindîyo, bang da dîkê p'erê wî r̂eşe,*
*2 Ewî li bang daye li E'rşe,*
*3 Nîşana mêra heye qubil, kanya Sipî, Lalişe.*

**S. 14** *1 De r̂ave, wey r̂ave,*
*2 Sur̂ sadiqo, birê mino, dil bi xemo, bese di xewa şevada be,*
*3 Xewa şeva bendê ji te r̂a ĥeq û ĥesav[e].*

*(Cindî mêrê dîwanê bûye, çiqa mêr hatine dîwanê-r̂aza bûye)*

## 8. BEYT'A ŞERSFEDÎN[3171]

**S. 1** *1 Şerfedîne bi gosk û gulî,*
*2 Siwarbû li hespê Dindiliî,*
*3 Ceşê wî wek xerzê gulî,*
*4 Şerfedîne dînê mine.*

**S. 2** *1 Hespê boze, zînî li sere,*
*2 Tu ji miẍarê*[3172] *were dere,*
*3 Serfedine ser eskere.*
*4 Şerfedîne dînê mine.*

**S. 3** *1 Şerfedîn ji miẍarê derk'et,*
*2 Nûra k'esk û sor bi ser k'et,*
*3 Leşkereki bos bi r̂ex k'et.*
*4 Şerfedîne dînê mine.*

**S. 4** *1 Hol bidine*[3173]*di ber bendê de,*
*2 Naçime şer̂ê badin tê de,*
*3 Amadîne wê di pêşiyê de.*
*4 Şerfedîne dînê mine.*

**S. 5** *1 Ciwabe bidine Êzdîxanê,*
*2 Bila qayîm kin îmanê,*
*3 Şerfedîne mîre*[3174]*li dîwanê.*
*4 Şerfedîne dînê mine.*

**S. 6** *1 Xeberê bidine wan p'arîya*[3175]*,*
*2 Bila berdin r̂eşxumrîya,*
*3 Şerfedîne dînê mine.*

## 9. BEYT'A ŞÊX ŞEMS – BEYT'A SIBÊ[3176]

**şaxê – 1**[3177]

**S. 1** *1 Hê, hê ji wê hiltêtin r̂oje,*
*2 Şêxê Nûrî bi bişkoje,*
*3 Destê şêx Şems Selate û Dojeh.*
**S. 1** *1 We dibêm r̂o hiltêye,*
*2 Mangeke zere li pêye,*
*3 Şêşims dîwanbegî Xudêye,*
*4 Ayî, Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 2** *1 Ji wê ku r̂oj hilate,*
*2 Ji berî mang der hate,*
*3 Şêx Şems zeynandibû welate.*
**S. 2** *1 We dibêm r̂ohilate,*

---

[3171] http://www.yeziden.de/forum2008/index.php?page=Thread&postID=23870#post23870; https://www.facebook.com/permalink.php?id=356489017721003&story_fbid=429249193760161
[3172] *mixa*r
[3173] *bedin*
[3174] *mir*
[3175] *por*
[3176] ango: *Beyt'a sibê*. [1] (pp 210-216); [2] (rr. 655-661)
[3177] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYÎT'A ŞÊXŞIMS (*rr. 100-102) T'ilbîs 2001)

*2 Şewaqê daye mizgevt û welate,*
*3 Destê Şêşims da heye p'ira Dojê û Serate,*
*4 Ayî Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 3** *1 Ji wê ku r̂oj hiltêye,*
*2 Ji berî mang dertêye,*
*3 Şêx Şems zeynandibû dinêye.*

**S. 3** *1 We dibêm hiltê r̂oje,*
*2 Nûreke bijkoje*
*3 Destê Şêşims da heye p'ira Seret û dojê,*
*4 Ayî, Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 4** *1 We dibêm hiltê qembere,*
*2 Şêşims nûreke zere,*
*3 Şewaqê daye çarde tevek e'rd-e'zman, binêt be'rê k'ûr, ser pişta me'siyê p'erzere,*
*4 Ayî, Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 4** *1 Ji wê hiltêtin tave,*
*2 Şêxê Nûrî zerbabe,*
*3 Sinet kiribû t'ebabe.*

**S. 5** *1 We dibêm hiltê te've,*
*2 Şêşimsî zerbave,*
*3 Çarde tevek e'rd-e'zman dest da maye heva,*
*4 Ay,î Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 5** *1 Ji wê hiltêtin tîye,*
*2 Jê diçit manga spîye,*
*3 Şemse û Şêx Alîye.*

**S. 6** *1 Ji wê hiltêtin Şemse,*
*2 Me nedît li nav çu kese,*
*3 Wekî bob û pise,*
*4 Pê ava kiribûn meclîse.*

**S. 6** *1 We dibêm hiltê Şemse,*
*2 Li wê t'unebû t'u kese,*
*3 Weke bave, weke p'ise,*
*4 Êzdîxanê pê bû nase nav-dik'irê xilase.*
*5 Ayî, Şemsê êzdiyano, melekê mêrano, diyano.*

**S. 7** *1 Berî aşiqêt momine,*
*2 Şêx Şems bînaya ĉavêt mine,*
*3 Mang û nederêt şêx Şems ji ber diçine.*

**S. 8** *1 R̂oj ĥeta têştane*[3178]*,*
*2 Şêx Şems bestî dîwane,*
*3 Maşa wê didete mêrane.*

**S. 7** *1 R̂o me hatiye te'ştiyane,*
*2 Şewaqê daye çarde tevek e'rd-e'zmane,*
*3 Feqîra ber kir xeberdane,*
*4 Şêşimso, maş bide mêrane, e'zîzo, maş bide mêrane.*

**S. 9** *1 R̂oj ĥeta têşta mîre,*
*2 Şêx Şems yî wezîre,*
*3 Mang û nederêt şêx Şems da celis û r̂uweqêt mîre.*

**S. 10** *1 R̂oj hate nîvr̂oye,*

[3178] binêr: *ta'ştê*

*2 Manga sipî jê diçoye,*
*3 Şêx Şems yî bi miske, yî bi moye.*

**S. 11** *1 Nîvro dageřîye,*
*2 Jê diçû manga sipîye,*
*3 Şemse û şêx Alîye,*
*4 Sinet*[3179] *kiribû qewîye.*

**S. 12** *1 Ȓoj hate E'rşe jûre*[3180]*,*
*2 Şêx Adî yî ẍefûre,*
*3 Mang û nederêt şêx Şems da berî û beȟrêt k'ûre*[3181]*.*

**S. 13** *1 Ȓoj hate E'rşe Semeda,*
*2 Aşiqa we je xeber da,*
*3 Mang û nederet şêx Şems ji e'zman hate bi e'rda.*

**S. 14** *1 Ȓoj hate E'rşêt A'lî*[3182]*,*
*2 Aşiqa bang didêrî,*
*3 Mang û nederêt şêx Şems da berî û beȟrêt jêrî.*

**S. 15** *1 Ȓoj hate E'rşêt A'lîye,*
*2 Şêx Şems we dibêjîye,*
*3 Da biçîne silavî kaniya Sipîye.*

**S. 16** *1 Ȓoj hate E'rşane,*
*2 Şêx Şems dibêjite mêrane,*
*3 Da biçîne silavî Dawidî bin Dermane.*

**S. 17** *1 Dawid we dibêjî ye:*
*2 «Hey şêx Şemso yî ewlî ye,*
*3 Da biçîne silavî şêx Adî ye».*

**S. 18** *1 We dibêje Dawidî feqîre:*
*2 « Şêx Şemsê mino yî wezîre,*
*3 Da biçîne silavî mîre».*

**S. 19** *1 Ȓoj hat û ava bû,*
*2 Şêx Şems li E'rş řawesta bû,*
*3 Aşiqa selawet lê veda bû.*

**S. 20** *1 Şems û Fexir di çê ne,*
*2 Li dergehêt P'adşêne,*
*3 Ew ẍefûrêt p'irêne.*

**S. 21** *1 Şems u Fexir birane,*
*2 Li dergeha řawestane,*
*3 Wê maşa didene mêrane.*

> **S. 8** *1 Şems, Fexir birane,*
> *2 Ȓê řawastane,*
> *3 Maş û berat ji xa dane,*
> *4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 22** *1 Şêx Şemso, navê te mîre!*
*2 Hey babikê mino yî feqîre,*
*3 Bi şevê û řojê wê li nêĉîra dîndara mîre.*

---

[3179] *sunet*
[3180] binêr: *jor*
[3181] *k'ur*
[3182] *E'lî*

**S. 23** *1 Ew babê şêx Hevindî,*
*2 Wê li dereca bilindî,*
*3 Şêx Adî tu wê xundî.*

**S. 24** *1 Ew babê şêx Ĥesinî*[3183]*,*
*2 Wê li dereca mezinî,*
*3 Sinet bi şêx Şems sekinî,*
*4 Bînaya ĉavêt minî.*

**S. 25** *1 Ew babê şêx E'vdalî,*
*2 Welîo suȓe li balî,*
*3 Wê li ĥizreta Melikê Celalî.*

**S. 15** *1 Tu bavê şê E'vdalî,*
*2 Weliyo suȓ li balî,*
*3 Lalişê da e'şq û dilî,*
*4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 26** *1 Ew babê Alê Ȓeşe,*
*2 Hey şêro ji Lalişe,*
*3 Dîwane şêx Adî bi te xweşe.*

**S. 13** *1 Tu bavê Alê Ȓeşî,*
*2 Şêxo, tu Lalişî,*
*3 Derge, dîwana Xudê ma boyî te jî.*
*4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 27** *1 Ew babê şêx Babikî,*
*2 Welîo, suȓe li nikî,*
*3 Wê li ĥizreta Xaliqî.*

**S. 11** *1 Tu bavê şêbavikî,*
*2 Weliyo, suȓ bi nikî,*
*3 Hidiretêyî xaliqî,*
*4 Mirazê mêra hasil dikî.*
*5 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 28** *1 Ew babê Amadîne,*
*2 Welîo, borî bi zîne,*
*3 Wê li ĥizreta silt'îne.*

**S. 12** *1 Tu bavê Amedînî,*
*2 Weliyo, bor bezînî,*
*3 Hev xazla min wî e'vdî bidêyî, lê nestînî.*
*4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 29** *1 Ew babê Babadî,*
*2 Tû dermanê fûadî,*
*3 Şêxê mine şêx Adî,*
*4 Sed xweziya wê ȓuĥê jê dibit ȓazî.*

**S. 30** *1 Ew babê şêx Xidirê ye,*
*2 Velîyîek*[3184] *jê diçê ye,*
*3 Şêx Adî hinare pê ye,*
*4 Kira qasidê mewlê ye.*

**S. 14** *1 Tu bavê şêx Xidirî,*
*2 Tu derecê bilindî,*
*3 Şîxadî heq tu xandî,*
*4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

[3183] binêr: *Ĥesen*
[3184] *welî*

**S. 31** *1 Ew babe şêx Takilî,*
*2 Ewe suȓe ji e'wilî,*
*3 Wê ji berî qal û qîlî*[3185].

**S. 32** *1 Wê ji berî, qîlî û qala,*
*2 Me sûk dîtin bazare,*
*3 Qumaş beha diken ĥezara*[3186],
*4 Me ȓasemal nemabû dîndara*[3187].

**S. 33** *1 T'irbetîyêt me diçêne,*
*2 Bi di girin, bi me'nêne,*
*3 Qumaş beha diken ȓastemal ji me divêne.*

**S. 34** *1 Ewan suȓa mîr beynand,*
*2 Hincîyê li ȓêya ĥeqiyê ẍeltand,*
*3 Ji bê nasînî îmana xwe şihitand*[3188].

**S. 35** *1 Hûn îmanê ber neden,*
*2 Cewhera li der neden,*
*3 Da we li dîwanêt xasa li ser neden.*

**S. 36** *1 Îman ewe, ya we birî,*
*2 Ĉav nedine xelqê mişêmirî,*
*3 Da li taliya we ȓanebit k'ifirî.*

**S. 37** *1 E't'ar hatin kitirîn,*
*2 Xwace*[3189] *wê dive şêrîn,*
*3 Ȓêya ĥeqiyê maye mişêmirî.*

**S. 38** *1 Şêx Adî û şêx Ĥesene,*
*2 Beĥra wan ya mezine,*
*3 Merk'eb lê diçine,*
*4 Şe'b bi wan sêkine,*
*5 Leşkerêt giran li ber nefesêt wan diçine.*

**S. 39** *1 Şêx Adî îbn Misafir,*
*2 Mêr hatin silav lê kir,*
*3 Dar û bera sicûde p'êk kir*[3190].

**S. 40** *1 Şêx Adî û şêx Berk'ate,*
*2 Bi wê nûrê dikir xelate,*
*3 Ew zû bangiya dihate.*

**S. 41** *1 Şêx Adî ji Şamê dihate,*
*2 Li Şerqiya dikir xebate,*
*3 Mehmed Ȓeşan kir xelate.*

**S. 42** *1 Xelat kir Mehmed Ȓeşa,*
*2 Dabûyê maşê şeşa,*
*3 Ji hew paş kire serwerê mêra.*

**S. 43** *1 Ew bobê sitîya Bilqanê,*
*2 Ȓûniştîbû li dîwanê,*

[3185] *berî*
[3186] *hezar*
[3187] *dînar*
[3188] *şehitand*
[3189] binêr: *ĥac*
[3190] *pêkir*

*3 Sinet[3191] mabû li cuvanê[3192].*

**S. 44** *1 Ew bobê sitîya Êsîyê,*
*2 R̂ûniştî li ser K'ursîyê,*
*3 Sinet mabû li hîvîyê.*

**S. 10** *1 Tu bavê Sit'iyêyî,*
*2 R̂ûniştî ser k'ursêyî,*
*3 Mîrê Mezin şandiye tu bêyî,*
*4 Tê bibî qasidê dinêyî,*
*5 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 45** *1 Ew babê sitîya Nisretê,*
*2 R̂ûniştîbû li ĥizretê,*
*3 Sinet mabû li xilmetê.*

**S. 9** *1 Tu bavê Sitî Nisretê,*
*2 R̂ûniştî sohbetê*
*3 Dinê, a'lem maye hidretê,*
*4 Şêşimso, maş bide mêra, e'zîzo, maş bide mêra.*

**S. 46** *1 Ji we r̂a dibêjim qisetê,*
*2 Hey şêro ji ĥeqîqetê,*
*3 Navû dik'irê şêx Şems ji me'rîfetê.*

**S. 47** *1 Ox̂leman, ox̂leman,*
*2 Dik'irê te digeřêt ji Şerqê ĥetanî bi Şam.*

**S. 48** *1 Ox̂ledîn şêx Adî û melik şêx Sin[3193], Şemsê Êzdîna,*
*2 Cêşêt gelîyê Lalişê, medet ĥalê me û sinete!*

**S. 15** *5 - E'rebê, e'cemê,*
*6 Şêşims pêra bike k'eremê,*
*7 Dil da namîne xemê.*

*Em di kêmin, Xwedê yî ťemame!*

**şaxê – 2[3194]**

**S. 1** *1 Şemso, tu bavê sitîya Gûlanî[3195],*
*2 Sekinî li dîwanî,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra me dîndar[a] mîre.*

**S. 2** *1 Şexsimso, tu bav Sitya Alî[?],*
*2 E'zîzekî delalî,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 3** *1 Tu bavê Stîya Xatî,*
*2 Deher bû çend welatî,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

---

3191 *sunet*
3192 *covan*
3193 *Şîxsin*
3194 BEYTA SIBÊ Got: Mêralîyê Xudo, ji gundê Cercerîsê, HECÎYÊ CINDÎ *KILAMEN CIMETA KURDA* YEREAN WEANXANA LÎMÛŞ 2008 (rr. 29-31)
3195 *stuyê gulanî,*

**S. 4** *1 Tu bavê Alê R̂eşe,*
*2 E'zîzekî k'eleşe,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 5** *1 Tu bavê Şê Tokilê,*
*2 Nebîya r̂a tu dik'irî,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 6** *1 Şexsimso, r̂o zeriqî,*
*2 Şemsê me tiviqî,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 7** *1 Şexsimso, hilat r̂oje,*
*2 Şemsê e'zîz bişkuje,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 8** *1 Şexsimso, r̂o hiltêye,*
*2 Mangê berê xwe dayêye,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra me dîndar mîre.*

**S. 9** *1 Nadîra Şaxsim daye herçar qulbê dinê,*
*2 Mesîyê binê be[h]raye,*
*3 Şexsimso, navda mîra,*
*4 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*5 Nêçîra te dîndara mîre.*

**S. 10** *1 Şexsimso, r̂o hate teştîya mîra,*
*2 Şemsê mezin tivdîre,*
*3 Tivdîra wî dîndara mîre,*
*4 Şexsimso, navda mîra,*
*5 Şevê, r̂ojê li nêçîra,*
*6 Nêçîra te dîndara mîre.*

## 10. BEYT'A ŞÊX MENDÊ GÊLÊ[3196; 3197]

**S. 1** *1 Çi sibeke[3198] melxûne,*
*2 Şêx Mendê [Fexra] borê xwe dikire zîne,*
*3 Çûbû r̂awa mîr Sêwdîne.*

**S. 1** *1 Sibeke[3199] mexrûme,*
*2 Şêx Mendê Fexra[3200] borê xwe kir zîne,*

[3196] [29] (гг. 311-314) (№ 1679)
[3197] *Beyt'a şêx Mendê Ferxa* [31] (гг. 57-60)
[3198] *sube*
[3199] *sive*
[3200] *Ferx*

*3 Ewî çar gêl ĉava dibûne.*

**S. 2** *1 Çi sibeke tarîbave,*
*2 Şêx Mendê Fexra çûbû nêĉîrê û r̂awa,*
*3 Çar gêl dîtbû berî ava.*

**S. 2** *1 Sibeke tarî*[3201] *baba,*
*2 Şêx Mendê Fexra meşiyabû merzrê ava.*

**S. 3** *1 Çar gêl dibûn ĥeçar ĉava,*
*2 Gêla kirbû silave,*
*3 Aha şêx Mendo, bêyî ser seriyan, ĥeçar ĉava.*

**S. 3** *1 Şêx Mendê Fexra deyn li gêle dike,*
*2 Divê: «Ewe gêla mine zar şîrine,*
*3 Xeberê wê şekir dibîne,*
*4 Ez nizanim çi zimanî dixûne.*

**S. 4** *1 Gêla mezin dive: «Navê min Gule,*
*2 Ez ĥebîbim*[3202] *çendî dile,*
*3 R̂êza ez fadilim.*

**S. 8** *1 Yekê go: «Navê min Gule,*
*2 Miĥûba ĥiçkî dile,*
*3 P'ar tê nebe kesa dil k'afire».*

**S. 5** *1 Gêla duda dive: «Şêx Mendo, navê min P'aye,*
*2 Ez ĥebîbim çendî dinyaye,*
*3 Ez dik'irê xwe Şerqva çûm, Şamva xuyaye».*

**S. 6** *1 Gêla go: «Şêx Mendo, navê min Faye,*
*2 Miĥûba ĥiçkî dinyaye,*
*3 K'iryameta*[3203] *şêx Adî, melî şêx Îsn r̂izma giran pêva xuyaye».*

**S. 6** *1 Gêla sisîya dibê: «Şêx Mendo, navê min Fate,*
*2 Ĥebîbim çendî qinyate*[3204]*,*
*3 Dik'irê xwe Şerqva çûm Şamva hatim».*

**S. 7** *1 Gêla yekê go: «Navê min Fate,*
*2 Miĥûba ĥiçkî welate,*
*3 K'iryameta şêx Adî, melik şêx Sin*[3205] *r̂izmê giran pêva hatim».*

**S. 7** *1 Gêla biĉûk dibê: «Şêx Mendo, navê min Ĥebîbe,*
*2 Herçkî kesê dilê xelqê*[3206] *ẍerîbe*[3207]*,*
*3 Cinetê da heye zor û nesîbe».*

**S. 9** *1 Yekê go: «Navê min Ĥebîbe*[3208]*,*
*2 Ĥeça kesê bigre xwetirê dilê ẍerîbe,*
*3 Ewan bihuşta*[3209] *baqiyêd heye p'ir̂ nesîbe*[3210]*».*

**S. 8** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, sindirûka dare sindirûka,*
*2 Çar gêlê xemilîne şebe'tê di bûka,*
*3 Sedira dilê şêx Mendê Fexre*[3211] *gêla biĉûka».*

**S. 9** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, were me her̂ne navî r̂eza,*

---

[3201] *te'rî*
[3202] *ĥebûb*
[3203] *k'iriyamet*
[3204] *k'înat*
[3205] *melî şêx Îsn*
[3206] *xelk*
[3207] *xerîb*
[3208] *Ĥebûb*
[3209] *bihişt*
[3210] *nesîv*
[3211] *Ferq*

*2 Tê t'evdî gulan baẍçan û qaza,*
*3 Tê r̂ojê sedî bivînî weke eza».*

**S. 10** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ez gulim baẍçeme r̂ez,*
*2 Pisê e'zîzî melek Fexredîn ez.*

**S. 11** *1 Ez pisê e'zîz melek Fexredînim,*
*2 Bazîkî ĉeng nûrînim,*
*3 Ez ser t'extê zêr̂înim,*
*4 Hatime te bivînim.*

**S. 12** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, ezê bibime[3212] kevokeke p'er̂ nûrînim,*
*2 Bifir̂ime, her̂im E'rşê jorînim,*
*3 Ezê wêderê minetê bikim Melikê R̂eĥmînim[3213]».*
**S. 12** *1 Gêlê go: «Ezê bibime kevokeke p'er̂ hêşîne,*
*2 Ezê bifir̂ime ber p'erê E'rşê E'zmîne,*
*3 Kesekî min ĉar[3214] nîne, xêncî Melikê[3215] R̂eĥmîne[3216]».*

**S. 13** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê bibime bazîkî[3217] p'er̂ zirave,*
*2 Bifirim, her̂me r̂efê gêl di nave,*
*3 Ezê te wêderê bigrim bê k'awe[3218]».*
**S. 13** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê bibime bazîkî[3219] çeng zirave,*
*2 Ezê bifirime ji hindave,*
*3 Ezê herme nava r̂efê gêlê di navdane».*

**S. 14** *1 Gêlê dibê: «Şêx Mendo, ezê bibime kevokeke p'er̂ xubarî,*
*2 Bifirim, her̂me E'rşê tarî[3220],*
*3 Minetê bikim Melikê Cebarî».*
**S. 14** *1 Gêlê go: «Ezê bibime kevokeke p'er̂ mirarî,*
*2 Ezê bifirime ber e'zmanê fikî tarî[3221],*
*3 Kesekî min nîne ĉarî, xêncî wî Xaliqî, wî Cebarî».*

**S. 15** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê bibime bazîkî p'er̂ kur̂im,*
*2 Hindav da bifir̂im,*
*3 Te wan cî û meskena bibir̂im».*
**S. 15** *1 Şêx Mend go: «Herê Gêlê, ezê bibime bazîkî çeng kur̂im,*
*2 Ezê hindava da bifir̂im,*
*3 Înşallaĥ[3222] ezê te wan r̂efa da bihirim».*

**S. 16** *1 Gêlê go: «Şêx Mendo, ezê bibime bazîkî p'er̂ zirave,*
*2 Ĥeft[3223] t'ebeqê[3224] e'rdê K'ibîr da herime xare,*
*3 Ezê wê derê minetê bikim Melikê Cebare».*

**S. 17** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê dinyayê te cema' kim,*
*2 Mar û margîra te p'eyda kim,*
*3 Ezê te wan cî û meskena jî r̂akim».*
**S. 10** *1 Gêlê go: «Şêx Mendo, ezê bibime tîre marê[3225],*

---

[3212] *bivim*
[3213] *R̂e'mîn*
[3214] *çar*
[3215] *Melk*
[3216] *R̂emîn*
[3217] *be'zîk*
[3218] *kav*
[3219] *be'zîk*
[3220] *te'rî*
[3221] *te'rî*
[3222] *Îşela*
[3223] *ĥevt*
[3224] *tevek*
[3225] *me'r*

*2 Ĥeft[3226] t'ebeqê[3227] axê da herme xare,*
*3 Kesekî min nîne ĉare, xêncî wî Xaliqê Cebare».*

**S. 11** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê r̂av-nêĉîra t'erk bidime,*
*2 Ĥeft t'ebeqê e'rdê dest-pêĉiyê xwe vedime».*

**S. 18** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, biramo[3228],*
*2 Dîno, ser sewdawo[3229],*
*3 Hevalê te çûne, tu jê mawo[3230],*
*4 Tu ser k'îjan gêlê maşoq mawo?»*

**S. 4** *1 Gêlê go: «Here lawo, ser sewdawo,*
*2 Ser pişta borê xwe r̂azawo[3231],*
*3 Me ĥeçar gêla k'îjana ĥeyrî[3232] dimawo[3233]!»*

**S. 18** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ez ne dînim, ne sewdame,*
*2 R̂aste hevalê min çûne, ez jê mame,*
*3 Lê ez ser gêla biçûk maşoq mame».*

**S. 5** *1 Şêx Mend digot: «Ezî ne ser sewdame[3234] ,*
*2 Ser pişta borê xwe r̂azame,*
*3 Ez bejina bilind, dêmê gulî ĥeyrî mame.*

**S. 20** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, ezê bibim sêveke sore bi darêva,*
*2 Tirsa baẍvançîyê mîra kes nikare bê nêva».*

**S. 21** *1 Gêlê go: «Şêx Mendo, ezê bibime sêveke sore guliya dara,*
*2 Kese tirsa baẍvançiyê mîra newêre mezer bike dal da».*

**S. 21** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê bibime nexweşekî p'ir̂ girane,*
*2 Wê min bidine ser darekî, dudan, sisyan, çarane,*
*3 Wê min bivine nava wan r̂ezane,*
*4 Hergê digo çi dermane,*
*5 Ezê bêjim sêva sor dermane».*

**S. 22** *1 Şêx Mend go: «Ezê bibime nexweşekî Ĥeq warî[3235],*
*2 Ezê r̂azêm r̂ojekê, dudan, sisiyan, du çaran,*
*3 Xelqê bê: — gel şêx Mendo te çi dermane?*
*4 Ezê bêjim: — sêva sore guliya darane.*
*5 Wê herin biqetînin, dayînin ser dilê şêx Mendê Fexra[ne],*
*6 Wê pê weke herdu ĉavane».*

**S. 22** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, dilê min kela kevire,*
*2 Hosta dihat çêdikire,*
*3 Bira p'ar t'unebe[3236] yê dil k'afire».*

**S. 16** *1 Gêlê go: «Şêx Mendo, here, go bejina min kela kevire,*
*2 Çar nikalê min sekinîne leşkire,*
*3 P'ar tê t'unebe kesê dil k'afire».*

**S. 19** *1 Gêlê go: «Herê lawo, bejina min kela nîvî,*
*2 Serê min hilnayê zêr̂ û zîvî,*
*3 Gele aşiqê mîna te dikine bê hîvî».*

**S. 18** *1 Gêlê go: «Herê şêx Mendo, bejina min kela xar da,*

---

[3226] *ĥevt*
[3227] *tebek*
[3228] *birao*
[3229] *sewdao*
[3230] *mao*
[3231] *r̂azao*
[3232] *heyîr*
[3233] *dimawo*
[3234] *sersewda*
[3235] *hekar*
[3236] *p'artinîbe*

*2 Leşkir sekinîne çarnikal da,*
*3 Kese newêre mêzer bike bal da».*

**S. 20** *1 Şêx Mend go: «Herê, Gêlê, bejina te kela xar da,*
*2 Çiqa leşker[3237] bisekinin çarnikal da,*
*3 K'iryameta şêx Adî, melî şêx Îsn ezê bême[3238] bal da».*

**S. 23** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, dilê min kela hikm jine,*
*2 R̂aste, hoste dihat çêdikire,*
*3 Lê tu bizanbe, k'ilît, miftê wê kelê destê mala mene».*

**S. 17** *1 Şêx Mend go: «Herê Gêlê, kela serî jine,*
*2 Ĥeçî gava mala me bîne,*
*3 K'ilît-mifte wê destê mala me vedibine».*

**S. 24** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, xêra xazî min bizanbîya bav û pis,*
*2 Were weke ber û sîngê mine etles,*
*3 Her̂e were kesekî netirs».*

**S. 25** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, xêra xazî min bizanbîya dê û dot,*
*2 Te çir̂a zûtirê ew xeber mi r̂a negot,*
*3 Te dil û hinavê şêx Mendê Fexra sot».*

**S. 26** *1 Gêlê divê: «Şêx Mendo, lawê nevî lawa,*
*2 Tu zêr̂ê nav dur̂ava,*
*3 Ĥeyran, min tu ĥesab[3239] kirî dewsa biran û bava».*

**S. 27** *1 Şêx Mend go: «Gêlê, kelîşka ser darê kelîşka,*
*2 Tu bazin zêr̂ê ĥeta e'nişka,*
*3 Her̂e mi tu ĥesab kirîye dewsa dê û xûşka».*

## 11. BEYT'A ŞÊX ALÊ ŞEMSA[3240; 3241; 3242; 3243]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Me yarek divêt, bila me bike minetê,*
*2 Ji Şerqê bixûne, Şamê vê xetê,*
*3 Ew mezela cidê me tê.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 1** *1 Me yarek dibê me bike minetê,*
*2 Şerqê bixûn, Şamê her vê xetê,*
*3 Ew mezela cudê me tê.*

**S. 1** *1 Me yarek digirt me bike minetê,*
*2 Şerqê bixûnim Şamê her vê xetê,*
*3 Ew muĥbeta cidê me tê.*

**S. 2** *1 Yarek dibêm me dike minetê,*
*2 Şerqê dibêje, Şamê dixûn her vê xetê,*
*3 Ew mezela cidê me tê.*

**S. 12** *1 Dilo jaro,*
*2 Ne li wan e'rda, ne li van cîya,*

3237 *leşkir*
3238 *bê me*
3239 *ĥesav*
3240 http://bedel.maktoobblog.com/705285/beyta-x-al-emsa/; http://www.ezidinasi.com/la/
3241 [29] (rr. 302-306) (№ 1677)
3242 [31] (rr. 61-63)
3243 [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYT'A ŞÊX ALÊ ŞEMSA (*rr. 92-97) T'ilbîs 2001)

*3 Xerîbo ezo.*

**S. 2** *1 Werin bixûnin vê xetê,*
*2 Ew te'lîya ser qurbetê,*
*3 Bira her pênc t'erêqê wî r̂ûnên hidretê.*

**S. 3** *1 Werin, werin, bixûnin vê xetê,*
*2 Ew te'liye ser qudretê,*
*3 Bira her pênc t'erîqê wî r̂ûnên hidretê.*

**S. 2** *1 Me yarek divêt, bila şewq*[3244] *be,*
*2 Bila ĥemû r̂ê û me'niya*[3245] *yî t'erîq be,*
*3 Ber dilê miskîn şêx Alê şêrînî şerîf be.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, xerîbo ezo.*

**S. 2** *1 Me yarek digirt şewq*[3246]*be,*
*2 Ĥemû p'ê û me'niya be, t'erîq be,*
*3 Ba dilê şêx Alê*[3247] *Şemsa şîrinî şerîf be.*

**S. 1** *1 Yarek dibêjim t'erîq be,*
*2 Ĥemû r̂ê û me'niya dayî şefîq be,*
*Bira serdilkê ser dilê şêx Alê Şemsa ayî şîrînî şefîq bê.*

**S. 3** *1 Xetê me dibene,*
*2 Li dîwana şêx Adî ber her pênc t'erîqa vedikene,*
*3 Ta'lî*[3248] *û tengiyê şêx Alê Şemsa têda hene.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, xerîbo ezo.*

**S. 3** *1 Xetê me dibene,*
*2 Dîwana şêx Adî ber her pênc t'erêqê wan vedikene,*
*3 Ta'lî–tengîyê şêx Alê Şemsa têda hene.*

**S. 3** *1 Xeta me divene,*
*2 Dîwana şêx Adî vedikene,*
*3 Ta'lî–tengiyê şêx Alê Şemsa têda*[3249] *hene.*

**S. 4** *1 Xetê me şêrînin,*
*2 Li dîwana şêx Adî ber her pênc t'erîqa datînin,*
*3 Ta'lî û tengîyê şêx Alê Şemsa têda dibînin,*
*4 Li hidretê r̂ûniştine û hêsira dibarînin.*
*5 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, xerîbo ezo.*

**S. 4** *1 Xetê me şîrinin,*
*2 Dîwana şêx Adî datînin,*
*3 Ta'lî*[3250]*–tengîyê şêx Alê Şemsa têda dibînin.*
*4 Hidretê r̂ûdinin hêsira dibarînin.*

**S. 4** *1 Xetê me şîrinin,*
*2 Dîwana şêx Adî datînin,*
*3 Ta'lî–tengîyê şêx Alê Şemsa têda divînin,*
*4 Yarû birê axretê*[3251] *hidretê r̂ûdnin*[3252] *hêsira dibarînin.*

**S. 4** *1 Ayî xetê me şîrînin,*
*2 Te'lî-tengiyê misk'în şêx Alê Şemsa ber her*

---

[3244] *şefîq*
[3245] *me'niyan*
[3246] *şofîq*
[3247] *Şîxalê*
[3248] *te'l*
[3249] *tê da*
[3250] *te'l*
[3251] *yar û birê axretê*
[3252] *rûdinin*

*pênc t'erîqa ve dikînin,*
*3 Bira r̂ûniştine hidretê, hêstira dibarînin.*

**S. 5** *1 Ayî, me dilkulin, birîn cotin,*
*2 Me'nî k'ûrin, nahêne gotin,*
*3 Dîwanê da xebera mîna tîra dilê bira disotin.*

**S. 6** *1 Ayî, xetê me şîrînin,*
*2 Te'lî-tengiyê misk'în şêx Alê Şemsa ber her pênc t'erîqa vedikînin,*
*3 Bira r̂ûniştine dîwanê da hêstira dibarînin.*

**S. 5** *1 Xetê me biperêjin,*
*2 Her pênc t'erêqê wî dîwana şêx Adî r̂ûdinin,*
*3 Ta'lî–tengîyê şêx Alê Şemsa têda dibînin.*
*4 Hidretê r̂ûdinin hêsira dibarînin.*

**S. 5** *1 Xetê me ferêşin,*
*2 Bibine dîwana şêx Adî ber her pênc t'erîqê wî vekin û bêjin*
*3 Li hidretê r̂ûnên û ĥalê miskîn şêx Alê Şemsa da hêsira birêjin.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 5** *1 Xetê me narijin,*
*2 Dîwana şêx Adî datînin,*
*3 Yarû birê axretê r̂ûdinin hêsira dirêjin.*

**S. 7** *1 Ayî, wê xetê dip'erêjin,*
*2 Te'lî-tengiyê misk'în şêx Alê Şemsa ber her pênc t'erîqa dibêjin,*
*3 Hidretê bira r̂ûniştine her hêstira dirêjin.*

**S. 8** *1 Wê dixûnin xeta hanê,*
*2 Şêx Alê Şemsa xudanê e'yîd û qurbanê, deft'era îmanê,*
*3 Havîtine ĥevsa Şamê.*

**S. 9** *1 Dilo, dilo, jaro, birîndaro,*
*2 Ne li wan ciya, ne li wan dera,*
*3 Xerîbo, xerîbo, ezo.*

**S. 6** *1 Xetê me bişînin,*
*2 Bibine li dîwana şêx Adî ber her pênc t'erîqa vekin û bixûnin,*
*3 Li hidretê r̂ûnên ser ĥalê miskîn şêx Alê Şemsa da hêsira bibarînin,*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 7** *1 Nesîĥetê dikim we gelî kesa,*
*2 Miskîne şêx Alê Şemsa,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, ĥeft sala mabû li Şamê zîndan û ĥebsa,*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 6** *1 Nesîĥetê dikim gelî kesa,*
*2 Miskîne Şîx Alê Şemsa,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa yî t'erqî bû, ĥeft sala mabû Şame ĥebsa*[3253].

**S. 10** *1 Werin, werin, misilĥetê gelî kesa,*
*2 Misk'în bûye şêx Alê Şemsa,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa tengî bûye, havêtine Şam ĥevsa.*

---

[3253] *ĥevs*

**S. 8** *1 Ezî wexta gulbax̃[3254] bûm,*
*2 Mecalê seferê hatibû, wext bû,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, Şamê da gur̂ û gef bû,*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, x̃erîbo ezo.*

**S. 7** *1 Ezî wexta yî gulbax̃[3255] bûm,*
*2 Mecalê seferê hatibû, wext bû,*
*3 K'ê dizane Şîx Alê Şemsa Şerqî bû, Şamêdayî gur̂ û gef bû.*

**S. 7** *1 Wexta ezî gulbax̃ bûm,*
*2 Mecalê Şamê dihatin, wext bûm,*
*3 Ĥeft sala Şamê da girtî bûm û girî–gef bûm.*

**S. 9** *1 Mexsûs ĥeta Somayê,*
*2 Dengê dûr qewî nayê,*
*3 Ez hatime dengê dûr xwe r̂a bibim.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, x̃erîbo ezo.*

**S. 8** *1 Mexsûs hate Somayê,*
*2 Dengê dûr qewî nayê,*
*3 Ez hatime dengê dûr xwe r̂a biveme.*

**S. 6** *1 Mexso te çovayê,*
*2 Dengê dûr qewîn nayê,*
*3 Hatime dengê dûr xwe r̂a bivime.*

**S. 11** *1 Ayî, mexsûs hatiye somayê,*
*2 Dengî dûre, qewî nahê,*
*3 Ĉira qasidê merga bo min sêfîlê Xudê nahê.*

**S. 10** *1 Îlaĥîo, te em nivîsîn,*
*2 Em şandin li e'rdekî cînar sîsî,*
*3 Dilê x̃urbetiyan qewî tîsî.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, x̃erîbo ezo.*

**S. 9** *1 Îlaĥîo, te em nivîsîn,*
*2 Em şandine e'rdekî cînar sîsî,*
*3 Dilê x̃urbetîya[3256] qewî tîsî.*

**S. 11** *1 Îlaĥio, te em nivîsîn,*
*2 Bin me e'rdekî cînar sîsî,*
*3 Dibe x̃urbetiya qewî li me tîsî.*

**S. 12** *1 Îlaĥîo, te ez nivîsîm,*
*2 Havîtme e'rdekê cînar sîsî,*
*3 Dilê qurbetî qewî qeyîsî.*

**S. 11** *1 Dilê x̃urbetiya jane,*
*2 Ez nanivim li van şevane,*
*3 Ĉavê miskîn şêx Alê Şemsa şaqûl pêvira[3257] mane.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, x̃erîbo ezo.*

**S. 10** *1 Dilê x̃urbetiya jane,*
*2 Ez nanivim van şevane,*
*3 Ĉavê[3258] miskîn şêx Alê Şemsayî şaqûl pêvira mane.*

**S. 13** *1 Dilê qurbetiya qe ne dişane,*
*2 Ez nalivin wan şevane,*
*3 Ĉe'vê misk'în şêx Alê Şemsa pêvra heva mane.*

---

3254 *gulbax*
3255 *gulbax*
3256 *qurbet*
3257 *pêwra*
3258 *ĉe'v*

**S. 12** 1 Pêvirê me xuya[n] bûn,
2 Ĥeta hatim me ava bûn,
3 Ezî miskînî herî wa bûm.
4 Ax dilo jaro, birîndaro,
5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.

**S. 11** 1 Pêvirê me xuya[n] bûn,
2 Ĥeta hatim me ava bûn,
3 Ezî miskînî herî wa bûm.

**S. 8** 1 Pêvirê me hilatin,
2 Hatin, hatin, ava bûn,
3 Ĉavê miskîn şêx Alê Şemsa ĥeyrî[3259] wan bûn.

**S. 13** 1 Pêvirê me hiltêne,
2 Ĉavê miskîn şêx Alê Şemsa şaqûl pêviȓa ȓêne,
3 Min qey go, qasidê Mergêye,
4 Min nizanbû ji Şamêva boy min sêfîlê Xwedêva têne.
5 Ax dilo jaro, birîndaro,
6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.

**S. 12** 1 Pêvirê me hiltêne,
2 Ĉavê miskîn şêx Alê Şemsa şagulin pêvira ȓêne,
3 Mi qey go, qasidî Mergêye,
4 Mi nizanbû Şamêva boy min sêfîl û Xwedêva têne.

**S. 9** 1 Pêvirê me hilatine,
2 Me nizanbû qasidê Şamêne,
3 Boy[3260] min sêfîlê Xwedê[3261] têne.

**S. 14** 1 Pêvr, Mêzîn hilatin,
2 Ber ĉe've misk'în şêx Alê Şemsa hêstir hatin bûn Feratin,
3 Ĉira qasidê mergayê bo min sêfîlê Xudê nedihatin.

**S. 14** 1 Şevê dirêje bi jan[3262],
2 Ĥeta hatim, sibe dibû,
3 Hêsir ji ĉavê şêx Alê Şemsa diçûn,
4 Ew hêsir ser ȓûyê şêx Alê Şemsa bû p'erçum[3263].
5 Ax dilo jaro, birîndaro,
6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.

**S. 13** 1 Şevê dirêje bi jon,
2 Ĥeta hatim, sibe[3264] dibû,
3 Hêsir ji ĉavê şêx Alê Şemsa diçûn,
4 Ew hêsir ser ȓûyê şêx Alê Şemsa bû p'erçom.

**S. 15** 1 Şevê dirêje dayî,
2 Pêvir û Mêzîn li e'zmana bûne qayî,
3 Ez miskînim, bûm miskînî wayî.
4 Ax dilo jaro, birîndaro,
5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.

**S. 14** 1 Şevê dirêje dayî,
2 Pêvir û Mêzîn e'zmana bûne qayî,
3 Ez miskîn bûm herî hayî.

**S. 15** 1 Şevê dirêje bijonî danî,
2 Pêvr û Mêzîn e'zmana bûne qanî,

[3259] ĥeyîr
[3260] boyî
[3261] Xudê
[3262] jon
[3263] binêr: p'erçem
[3264] sive

*3 Ĥevsa Şamê mi va ne dixuanî.*

**S. 16** *1 Şevê dirêje mezin,*
*2 Ĥeta hatim, sibe dibin,*
*3 Hêsir ji ĉavê miskîn şêx Alê Şemsa diçin,*
*4 Ew hêsir ser r̂ûyê şêx Alê Şemsa dibin p'erçim.*
*5 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 15** *1 Şevê dirêje mezin,*
*2 Ĥeta hatim, sibe dibin,*
*3 Hêsir ji ĉavê şêx Alê Şemsa diçin,*
*4 Ew hêsir ser r̂ûyê şêx Alê Şemsa dibin p'erçim.*

**S. 16** *1 Tarîgevrikê min gevr kir,*
*2 Berê sibê li min zer kir,*
*3 Ĥevsa Şamê mi va xua kir.*

**S. 17** *1 Ez r̂ûniştime û ĥalê xwe da mame,*
*2 K'ete bîra min mergeh û Meqlûb, ew cî û mikane,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, ĥeft sala mabû ĥebsû Şame,*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 16** *1 Ezê r̂ûniştime, ĥalê xwe da mame,*
*2 K'ete bîra mida mergeh û Meqlûb, ew cî[3265] ew mek'ane[3266],*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa Şerqî bû, ĥeft sala mabû ĥebsû Şame.*

**S. 10** *1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da mame,*
*3 Min nizanbû ĥebsû Şame[3267].*

**S. 13** *1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da mame,*
*3 E[z] nizanim k'uva[3268] hatime, k'uva herime.*

**S. 18** *1 Ez r̂ûniştime û ĥalê xwe da digrîme,*
*2 Bînaya bazîkî çeng bir̂îme,*
*3 K'ê dizane ez ji k'uva hatim û k'uva çûme,*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 17** *1 Ez r̂ûniştime, ĥalê xwe da digrîme,*
*2 Nola bazîkî ĉeng bir̂îme,*
*3 K'ê dizane ez k'uva hatim û k'uva çûme?*

**S. 14** *1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da digrîm,*
*3 Bîna bazeke[3269] dil birînim.*

**S. 17** *1 Ez r̂ûniştim, ĥalê xa da digirîm,*
*2 Bînanî be'zekî ĉengbirî,*
*3 Ez ĥevsa Şamê da hêvirîm.*

**S. 20** *1 Xazila min hikmek serê,*
*2 Ez hin bigrîm, hin hêsirê xûnê ji ĉavê min derê,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, ĥeft sale [w]a mabû seferê?*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 19** *1 Xwezîya min hikmek serê,*
*2 Ez hin bigrîm, hin hêsirê xûnê ĉavê min derê,*

---

[3265] *jî*
[3266] *mikan*
[3267] *ĥevs û Şame*
[3268] *ku va*
[3269] *bez*

*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsayî Şerqî bû, ĥeft sala mabû seferê.*

**S. 19** *1 Xazla min ĥik'imê sere,*
*2 Digrîm, hêsirê xûnê ber ĉe'vê min hatine dere,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa tengî bûye, ĥevsa Şamê da kir sefere.*

**S. 21** *1 Xazila min hikmek ser hata,*
*2 Ez hin bigrîm, hin hêsirê xûnê ji ĉavê min der hata,*
*3 Ber min bûye Ferate.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 20** *1 Xwezîya min hikmek ser hata,*
*2 Ez hin bigrîm, hin hêsirê xûnê ĉavê min der hata,*
*3 Ber mi biye Ferate,*
*4 K'ê dizane şêx Alê Şemsa Şerqî bû, ĥeft sala mabû ĥebsû Şame.*

**S. 18** *1 Xazla min ĥik'imê ser hatî,*
*2 Ez digirîm, hêsirê xûnê ber ĉe'vê min der hatî,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa k'u bû, k'u da hatî.*

**S. 22** *1 Ez e'mirê çûme t'eleb,*
*6 Biska mu muĥbetê li e'nîyê bestiyabû xeleq,*
*7 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, ĥeft sala mabû li ŞamûĤeleb?*
*8 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 21** *1 Ez e'mrê çûme t'eleb,*
*2 Biska muĥbetê[3270] e'nîyê bestîyabû xeleq,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa Şerqî bû, ĥeft sala mabû li Şamû Ĥeleb.*

**S. 20** *1 Ez bi ĥik'imê hatime teleb,*
*2 Biska moĥbetê, ne'tikê vastiya bû xelek,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa tengî bûye, ĥevt sala maye Şam,Ĥeleb.*

**S. 23** *1 Şam e[h]lê cindîya,*
*2 Xazila min xwe bizanîya,*
*3 K'a dereca ta'lî û tengîya çîye,*
*4 Min bi xwe, serê xwe kirîye, derman lê nîye.*
*5 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 22** *1 Şam ehlê cindîya,*
*2 Xazila mi xwe bizanîya,*
*3 Çika dereca ta'lî-tengîya çiye?*
*4 Min xwexwe kirîye, derman lê nîye.*

**S. 21** *1 Şam,Ĥeleb elê cindiya,*
*2 Xazla min bizanbiya me'nî-derecê te'lî û tengiya,*
*3 Herge min xa kiriye bira derman boyî û nebiya.*

**S. 24** *1 Xazila min bihata bihara dila,*
*2 Meha nava gula,*
*3 Em qesid bikin, heȓine nav mezela.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 23** *1 Xêra xazila min bizanbîya hatîye bahara dila,*
*2 Meha nava gula,*
*3 Emê qest bikin, heȓine nava wan mezela.*

**S. 22** *1 Bira min bihata bahara dila,*
*2 Meha nava gula,*

[3270] *mobet*

*3 Minê qest bikira, biçûma nav wan mezela.*

**S. 25** *1 Sitîya Gul xûşka mine,*
*2 Bila heȓe li dîwana şêx Adî û melik şêx Sine,*
*3 Bike ȓeca û dîleka mine.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 24** *1 Sitîya[3271] Gul xûşka mine,*
*2 Wê heȓe ba şêx Adî, melek şêx Sine[3272],*
*3 Bike ȓeca, dîleka mine.*

**S. 23** *1 Sit'iya Gul xûşka mine,*
*2 Bira heȓe dîwana Şîxadî cem şêx Îsne,*
*3 Bira bike hîvî û ȓeca serê mine.*

**S. 26** *1 Sitîya Gul xûşka min dîsa,*
*2 Bila heȓe li dîwana şêx Adî û melik şêx Sinada,*
*3 Bike ȓeca û dîleka girtîyan û ĥebîsa.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 25** *1 Sitîya Gul xûşka min dîsa,*
*2 Bira heȓe ba şêx Adî û melek şêx Sina,*
*3 Bike ȓeca, dîleka girtîyêd ĥebîsa.*

**S. 24** *1 Xûşka mine sit'iya Nefûsa,*
*2 Bira heȓe dîwana Şîxadî cem şêx Îsn dîsa,*
*3 Bira bike hîvî û ȓeca girtiyê û hedîsa.*

**S. 25** *1 Erê teyîro, teyîrê me'nê,*
*2 Teyîrê danî ser p'encera zîndanê,*
*3 Namer biriye cem mêra û dîwanê.*

**S. 28** *1 Ĥalê min ĥalê Denûne,*
*2 Min herdu ĉavê xwe kirye zebûne,*
*3 Bila ĥezinya xatûn, xwe ȓa bigeȓe xatûne.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 27** *1 Ĥalê min, ĥalê Denûne,*
*2 Min herd ĉavê xwe kirîye zebûne,*
*3 Bira Ĥuznîya xatûn, xwe ȓa bigeȓe xatûne.*

**S. 30** *1 Ĥalê min, ĥalê Denûne,*
*2 Minê ĉe'vê xa xandiye Zebûne,*
*3 Bira sit'iya Ĥeznî ȓûnî xatûne.*

**S. 29** *1 Ĥalê min ĥalê dibhêrî,*
*2 Kesê ne dabû bêrî,*
*3 Xêncî T'eminî Dêrî.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 28** *1 Ĥalê min ĥalê dibihêrî,*
*2 Keskê ne dabû bêrî,*
*3 Xêncî T'emûrî Dêrî.*

**S. 28** *1 Ayî, ĥalê min ĥala dibihêrî,*
*2 Qe kesekî nedide bêrî,*
*3 Ew ĥalî bû T'emûrî bin Dêrî.*

**S. 30** *1 T'eminê Dêrî westiya bû,*

[3271] *stî*
[3272] *Sîxisn*

*2 Cin Teyar*[3273] *lêdabû, r̂ewa bû,*
*3 Ĥeft sala li wêderê mabû,*
*4 Ĥeta ferwara P'adşê min pê r̂a bû.*
*5 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 29** *1 T'emûrî Dêrî wa westiya bû,*
*2 Cin Teyara lêdabû r̂ewa bû,*
*3 Ĥeft sala wêderê mabû,*
*4 Ĥeta ferwara P'adşayê min pê r̂a bû.*

**S. 29** *1 T'emûrî bin Dêrî ew ĥalî bû,*
*2 Ew ĥeft sala li wê ma bû,*
*3 Cem Sîxrî Cin da vastiyayî bû.*

**S. 34** *1 Ayî, Cinî Teyiyaro, te va e'yîyane,*
*2 Ez ĥevt sala ĥ evsa Şamê da mame.*

**S. 35** *1 Ez ĥevt sala ĥ evsê bûm,*
*2 Ĥevsê dayî gurî-gef bûm.*

**S. 31** *1 Ĥalê min ĥalê Sindebade,*
*2 Çi t'acireke*[3274] *Misrêva dihate,*
*3 Sindebad bi merk'eba xwe beĥrêva r̂adiweste.*
*4Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 30** *1 Ĥalê min ĥalê Sindebate,*
*2 Çi t'acireke Misrêva hate,*
*3 Sindebat bi merk'eba*[3275] *xwe beĥrêva*[3276] *r̂adiwaste.*

**S. 31** *1 Ĥalê min ĥalê nebate,*
*2 T'ecirekê aliyê seferê va hate,*
*3 Sinderebedê mork'ev ser be'rê r̂avasta be.*

**S. 32** *1 Merk'eba Sindebad şkestîbû nava beĥrê,*
*2 Destê Sindebad mabû t'extê darê,*
*3 Qadirî R̂eĥman dizanî li pê r̂ê.*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 31** *1 Merk'eba Sindebat şkestîbû nîveka beĥrê,*
*2 Destê Sindebat mabû t'extê darê,*
*3 Qadire R̂eĥman ne dizanî.*

**S. 32** *1 Mork'eva Sindrebadê şikestiye nîvêka be'rê,*
*2 Destê Sindrebadî maye t'extekî dare.*

**S. 33** *1 Qadirî R̂eĥman pê dizanî,*
*2 Ewî dareke merk'ebê serî lê hilanî,*
*3 Sindebad destê xwe lê wer anî,*
*4 Dinya r̂on bîr anî, şikir ji te ya R̂eĥmanî!*
*5 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*6 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 32** *1 Dareke merk'ebê serî lê hilanî,*
*2 Sindebat dest lê wer anî,*
*3 Dinya r̂on bîr anî, şikirîma te ya R̂eĥmanî!*

**S. 33** *1 T'extekê be'rê serî hilanî,*
*2 Sindrebadî destê xa lê veranî,*
*3 E'vdil Qadirê R̂emanî li pê dizanî.*

---

[3273] *Cinteyar*
[3274] *t'êcir*
[3275] *mork'eva*
[3276] *be'r*

**S. 34** *1 Ĥalê min çi ĥekî peşmûne,*
*2 Cina ximitandibû Şimûne,*
*3 Cina Şimûn diximitand,*
*4 Binê beĥra da diaqûfand,*
*5 Ewî dinya r̂on ji bo xwe serifand.*
*6 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*7 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 33** *1 Ĥalê min çi ĥalekî p'eşmûne,*
*2 Cina ximitandibû[3277] Şimûne[3278],*
*3 Cina Şimûne diximitand,*
*4 Binê beĥra r̂a diaqûfand,*
*5 Ewî ji dinya r̂on xwe r̂a ser̂ifand.*

**S. 36** *1 Ĥalê min, ĥalê nefşxûne,*
*2 Cina diqimintand şibxûnê.*

**S. 37** *1 Cina şibxûn diqimintand*
*2 Binê be'ra da dar diniqand,*
*3 Ewane şêx Alê Şemsa dîwana Şîxadî sêvirand.*

**S. 19** *1 Ta'rîgewrkê li min gewr kir,*
*2 Berê ci[h]bê li min zer kir,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa li Şerqê bû, ĥeft sala Şamê da gur̂ û gef kir?*
*4 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*5 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 18** *1 Tarîgewrkê li mi gewr kir,*
*2 Berê sub[h]ê li mi zer kir,*
*3 K'ê dizane şêx Alê Şemsa Şerqî bû, ĥeft sala Şamê da gur̂ û gef kir.*

**S. 15** *1 Tarîgewrkê[3279] li min gewr kir,*
*2 Berê sibê li min ker kir,*
*3 Min ĥef[t][3280] sala li Şamê da sefer kir.*

**S. 27** *1 Li Çarşema serê nîsanê,*
*2 Deng belabû nav êzdîyê Şerqê û Şamê,*
*3 Şêx Alê Şemsa ji zîndanê hate berdanê,*
*4 Şêx Alê Şemsa k'erem kir û hat dîwanê,*
*5 Jê r̂a kirin e'yda qurbanê, vekirin deft'era*
*îmanê. 6 Ax dilo jaro, birîndaro,*
*7 Ne ji van cîya, ne ji van e'rda, ẍerîbo ezo.*

**S. 26** *1 Çarşema serê nîsanê,*
*2 Deng belabû êzdîyê Şerqê û Şamê,*
*3 Şêx Alê Şemsa k'eremkir hate dîwanê,*
*4 Jê r̂a kirin e'yda qurbanê, vekirin deft'era îmanê.*

**S. 16** *1 Hat e'yda[3281] R̂eĥmanyê[3282],*
*2 Şêx Alê Şemsa zîndanê hate berdanê[3283],*
*3 Hat mizgîna îmanê,*
*4 Ya R̂ebî, şikir, şêx Alê Şemsa hate dîwanê.*

**S. 26** *1 Li Çarşema serê Nîsanê,*
*2 Deng belav bû êzdiyê dinê-a'mê,*
*3 Şêx Alê Şemsa k'erem ke were dîwanê.*

**S. 27** *1 Bikin e'yîdê, bidin qurbanê,*
*2 Wekin deft'era îmanê.*

---

[3277] *qimitandibû*
[3278] *Şibĥûn*
[3279] *Terîq e'wrek*
[3280] *ĥev*
[3281] *eyîd*
[3282] *r̂eman*
[3283] *ber dan*

*Em kêmin, û Xwedê t'emame!*

*Temametî Şîxadî!*

## 12. BEYT'A ŞÊX AL[3284]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Me yarek divêt bila li me biket minetê,*
*2 Û ji Şamê bibete Şerqê vê xetê,*
*3 Ewe bû cinême tê.*

**S. 2** *1 Me yarek divêt bila yî r̂efîq be,*
*2 Û bila li ĥemû r̂êyayî tewfîq be,*
*3 Fitîla[3285] dilê şêx Alê Şemsa bi şefîq be.*

**S. 3** *1 Hey dilo, hey jîro, hey jîro,*
*2 Hey dil bi kulo, dil birîndaro,*
*3 Hey dûro ji welatî, xerîbo ezo.*

**S. 4** *1 Nesîĥetê li we dikim gelî kesa,*
*2 Yî miskîne, û yî şîrine[3286] şêx Alê Şemsa,*
*3 Li Şamê ewe ĥeft sal maye di zîndan û ĥebsa.*

**S. 5** *1 Hûn xetêt me bigehînin û biben,*
*2 Û bila li celisa şêx Adî li ber yarû birêt me veken,*
*3 K'onê me çend xerîb li ẍurbeta wêt hen.*

**S. 6** *1 Hûn xetêt me biverêjin,*
*2 Û bibine celisa silt'an şêx Adî, bila veken û binêjin,*
*3 Û bila hêstira li ser ĥalê miskînî dil bir̂êjin.*

**S. 7** *1 Hûn wan xetêt me bişînin,*
*2 Û bibine celisa silt'an şêx Adî, bila veken û bixwînin,*
*3 Hêstira li ser ĥalê miskînî dil bibarînin,*
*4 Belkî li ĥalê şêx Alî bipirsînin.*

*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

## 13. BEYT'A FENDA BERÊ SIBÊ[3287] (GOVENDA ŞÊX ALÊ ŞEMSA)

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Çendî gowenda diger̂înim,*
*2 Distirêm, dengê xwe hilînim,*
*3 Mişţaqim dîndara gêla[3288] xwe bibînim.*

**S. 2** *1 Çendî gowned diger̂ya,*
*2 Şemalê sêvan lê dialiya,*
*3 Ev gowenda şêx Fexrê Adiya.*

---

[3284] [52] (rr. 263-264)
[3285] *finîl*
[3286] *şirîn*
[3287] [52] (r. 262)
[3288] *kêl*

**S. 3** *1 Çendî gowenda li banê kela,*
*2 Sitya Tawisî wa li ber mehdera meĥfela,*
*3 Şêx Alê Şemsa wê diêtin digele.*

**S. 4** *1 Çendî gowenda li banaye,*
*2 Dilê Alê r̂eş pê r̂e wistaye,*
*3 Ewe bû gowenda şêx Alê Şemsane.*

*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

## 14. BEYT'A ĤESENÊ CÊLÊ[3289]

*Mêrekî zêr̂ek ji e'rdê hilda, zanibû wekî zêr̂ malê şêx Şemse, anî da şêx Şems[3290], go: «Şêx Şemso, eva malê teye». Şêx Şems zêr̂ dest girt û anî mal. Cêlê kevanîya mala şêx Şems bû, ewê gavê destê Cêlê ne vala bû, hevîr distira. Cêlê gote şêx Şems: «Zêr̂ têke devê min ĥetanî destê min vala dive, ezê hildim». Ĥetanî Cêlê hevîr stira, zêr̂ devê Cêlê da ĥelîya û çû xarê. Cêlê qe t'exmîn nekir ew zêr̂ çewa bû, k'uda çû, qe nehate bîrê jî.*

*We'de derbaz bû, Cêlê ĥemle derk'et, şêx Şems seva wira dilteng bû, gote Cêlê, got: «Tu kevanîya mala min, xizmetk'ara mala min, wekî mala mi da şuxulê wa qewmîye ne r̂aste». Hîngê[3291] k'ete bîra Cêlê wekî ew zêr̂ devê wê da ĥelîyaye. Cêlê gote şêx Şems, go: «Şêx Şemso, ew zêr̂ê te daye min, ew zêr̂ devê mi da ĥelîyaye çûye, heger tiştek heve ji wî zêr̂îye, herge ji dêv welidîm, wekî usane ji wî zêr̂îye».*

*Wext, we'de t'emam bûn, nêzîkîya welidandinê Cêlê gote şêx Şems, go: «Destê xwe bigre». Şêx Şems destê xwe girt, Cêlê dêvr̂a welidî, k'upek k'ete destê şêx Şems, batin da deste guharê zêr̂ guha da, bê vekirin. Şêx Şems îdî bawar kir wekî ew kur̂ ji wî zêr̂î bûye.*

*Navê kur̂ danîn Ĥesen, Ĥesenê Cêlê. Ĥesen mezin bû, waxtê dest damina bû. Batin da xelatê zêr̂în jê r̂a hatin. Mêra gişka ĥevsûdî xelatê Ĥesenê Cêlê dikirin. R̂ojekê şêx Şems gote Ĥesen, go: «Te r̂a lazime dest û damin».*

**S. 1** *1 «Çi hikmeta Xwedê ye,*
*2 Nazilbûye r̂û e'rdê ye,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Bona Ĥesenê Cêlê ye,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 2** *1 Çi hikmeta giran e,*
*2 Nazilbûye r̂û e'rdan e,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Bona Ĥesenê Cêlan e,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 3** *1 Ĥeseno, tî dînî,*
*2 Şiva qudretê ĥulê e'zîz melek Fexredîn r̂a dik'şînî,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Malxirav, tu nizanî, şêx Şems ser K'ursîye ĥeqîyê r̂ûniştîye,*
*5 Maşê mêra dide, hew distîne,*
*6 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 4** *1 Ĥeseno, bê dewleto,*
*2 Aqil û fe'm sêrî her̂eto,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Malxirav, tu nizanî, şêx Şems ser K'ursîye ĥeqîyê r̂ûniştîye,*
*5 Maşê mêra distîne, hew dideto,*

---

[3289] [29] (гг. 430-433) (№ 1706)
[3290] *Şêxşims*
[3291] *hingê*

*6 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 5** *1 Ĥesenê Cêlê ye,*
*2 K'etîye berê p'êlê ye,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Malxirav nizane nifirîye wîye ji birêye,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 6** *1 Çi xelatê he'virengin,*
*2 Derk'etine sûkene tengin,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Mêrê dîwanê ser oẍirmene, ser cengin,,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 7** *1 Borê Ĥesenê minî şê ye,*
*2 Sûkê me'rîfetê da tê ye,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Ĥesenê Cêlê yî hêsîrî û ne yî lê ye,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 8** *1 Borê Ĥesenê minî çale,*
*2 Sûkê me'rîfetê da hatîye xare,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Ĥesenê Cêlê yî hêsîr lê ne yî sîyare,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 9** *1 Borê Ĥesenê minî more,*
*2 Sûkê me'rîfetê da tê di more,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Ĥesenê Cêlê yî hêsîr hol xwe nebirîye ser hole,*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 10** *1 Borê Ĥesenê minî ȓeşe,*
*2 Sûkê me'rîfetê da tê dimeşe,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Ĥesenê Cêlê yî hêsîr destê şêx Şems da qe ne yî xweşe,*
*5 Miskin ĥalê min p'îr Ĥeseno.*

**S. 11** *1 Ewa xelatê zêȓînin,*
*2 Şêx Şems destê xwe Ĥesenê Cêlê distîne,*
*3 Kirîye mala defê vavîtîye E'ȓşê E'zîme,*
*4 Ĥalê min Ĥeseno,*
*5 Go: «Mêrê dîwanê kesekî ȓeda pê nîne,*
*6 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno».*

**S. 12** *1 Go: «Emê heȓne cem sitîya[3292] Zîne,*
*2 Bira heȓe bike ȓeca dîleka xelatê Ĥesenê Cêlê zêȓîne,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno».*

**S. 13** *1 Dê go: «Lawo[3293], şîrê berê dê kî,*
*2 Tu jî gulîyê Fexrê[3294] kî,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Tî[y]ê xelatê Ĥesenê Cêlê lê kî.*
*5 Miskin, ĥalê min p'îr Ĥeseno».*

[3292] *istîa*
[3293] *lao*
[3294] *ferx*

**S. 14** *1 Go: «Dayê, ez şîrê berê dê kim,*
*2 Jî gulîyê Fexrê kêm,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Xelatê Ĥesenê Cêlê hew lê kim.*
*5 Miskin, ĥalê min min p'îr Ĥeseno».*

**S. 15** *1 Dê go: «Lawo, k'engê, ĥetanî k'engê?»*
*2 «K'engê dar û berê gelîyê Lalişê deng bê,*
*3 Ĥalê min Ĥeseno,*
*4 Hîngê Ĥesenê Cêlê xelatê xeva r̂eng bê.*
*5 Miskin, ĥalê min min p'îr Ĥeseno».*

## 15. BEYT'A NISRA[3295]

**S. 1** *1 Nisra keĉa mîr mewlaye,*
*2 Xatûneke p'ir̂ hêjaye,*
*3 Xwe[3296] li hîvîya sur̂ê hêlaye.*

**S. 2** *1 Nisra xatûneke p'ir̂ delale,*
*2 Kire ĥisabê ĥezar sale,*
*3 Axret ji xwe r̂a kire r̂astemal[e],*
*4 Go: «Ev dinya p'ûĉe betale».*

**S. 3** *1 Mîr mewla xwedanê dewletê,*
*2 Nisra fikirî li hikmetê[3297],*
*3 Go: «Sur̂ek dê dahirbit li r̂ûyê vê ometê».*

**S. 4** *1 Nisra go: «Ev dinya t'uneye,*
*2 Sur̂ek dê dahirbit wextê meye,*
*3 Xweşya[3298] hingî heqê meye».*

**S. 5** *1 Nisra ban[g] diket[3299] milyak'eta,*
*2 Keyfa vê dinyayê li min xweş neke,*
*3 Behişt[3300] heye bêşike.*

**S. 6** *1 Bejin û bala wê ça şêrîne[3301],*
*2 Peyva wê ji mêzîne,*
*3 Dîtina wê t'êrbûn nine.*

**S. 7** *1 Nisra go: «Çi sibeyek[3302] ji yêt xewleye,*
*2 Min dît derwêşek hate mala meye».*
*3 Go: «Nisra van erk'ana bernede, Êzîd dê dahirbit li wextê teye».*

**S. 8** *1 Nisra bi k'esî r̂a ne dida cewabe,*
*2 Dayîk[3303] û baba da cewabe,*
*3 Go: «Ocaxa me betal nabe».*

**S. 9** *1 Nisra cewab daye:*

---

[3295] http://www.ezdixandi.com/forum/38-819-1; http://www.ezidinasi.com/la/?page_id=42
[3296] *xo*
[3297] *hikûm*
[3298] *xoşya*
[3299] *bandiket*
[3300] binêr: *bihuşt*
[3301] *şirîn*
[3302] *sube*
[3303] *dak*

*2 «Silt'anek[3304] dê dahirbit p'iȓ ȓeng daye,*
*3 Ne sed xwezika[3305] wî ȓêya xwe berdaye».*

**S. 10** *1 Nisra wa didet cewaba:*
*2 «Guh nedene birînan û daxa,*
*3 Bihuşt heye bostan[3306] û baẍa».*

**S. 11** *1 Nisra go: «Ĥalê me ji ĥalê we xweştire,*
*2 Bedîla nehsed t'ev agire,*
*3 Xwezka ȓuĥa hingî bibe sere».*

**S. 12** *1 Nisra xatûneke Şemsanî ye,*
*2 Kevokeka nû ferxî ye,*
*3 Kulîlkeke nû bijkivî ye.*

**S. 13** *1 Ȓengê wê ji k'asê ye,*
*2 Peyva wê ji mêzînê ye,*
*3 Aqilê wê ji qudretê ye.*

**S. 14** *1 Nisra go: «Heke[3307] hûn bisebirin,*
*2 Şev û ȓoja bifekirin,*
*3 Xam û înk'ar[3308] bi xwe di demirin».*

**S. 15** *1 Nisra go: «Şîreta neken bi belaşî,*
*2 Heke ĥace[3309] hatin vekirin derê qûmaşî,*
*3 Xam û înk'ar dêmînin li paşî».*

**S. 16** *1 Nisra go: «Şîreta neken bi nezanî,*
*2 Xwe xelas biken ji vî zemanî,*
*3 Ezim fedayî ya[3310] wî silt'anî.*

**S. 17** *1 Ew silt'anê em çêkirîn,*
*2 Berî Adem dahir kirîn,*
*3 K'î dizanit çawa em dayîn, çawa em birîn?*

**S. 18** *1 Ew Ademê me dîtî ye,*
*2 Hêvênê me yî batinî ye,*
*3 E'silê me yî fedayî ye.*

**S. 19** *1 Ew k'î bû piştî Adem exî bû,*
*2 Bi şola Xwedê ne yî ȓazî bû,*
*3 Hêvênê me ji beĥra Sipî bû.*

**S. 20** *1 Wextê me dît p'êla veda*
*2 Av xewidî mewca li meda,*
*3 Sebra me têt bi kaniyêt zelal.*

**S. 21** *1 Kaniyêt zelal bisit'irînin,*
*2 Avêt xewidî tam tê nînin,*
*3 Heke tavê da wê çikînin.*

**S. 22** *1 Ji malê ĥeram ne hesidin,*
*2 Destêt wan wekî agirin,*

[3304] *sultan*
[3305] *xozik*
[3306] *bîstan*
[3307] *heqe*
[3308] *enkar*
[3309] *xiwace*
[3310] *fedawî*

*3 Birînêt wan ji yêt we k'ûrtirin.*

**S. 23** *1 Birînêt wan derman nabin,*
*2 Ev dinya dê jê ȓabin,*
*3 Dê di ĥebsêt tarî da hindabin.*

**S. 24** *1 Ez çi bikem, ez ne mêrim,*
*2 Ez hevalêt xwe dihijmêrim,*
*3 Da bi fehm u aqil bifikirim.*

**S. 25** *1 Ez li hatinê fikirîm,*
*2 Li ser hevalêt xwe digrîm,*
*3 Bedîl bihurîn û betilîn.*

**S. 26** *1 Hevalêt min horîyêt delal,*
*2 Ȓuniştin li ser kaniyêt zelal,*
*3 Wê diîsîyên weke find û şemal.*

**S. 27** *1 Xwezî ez mêrek bame bi dil û ceger,*
*2 Min helgirtiba şîr û xencer,*
*3 Da ez bame fedayî yê duȓa zer.*

**S. 28** *1 Xwezî ez mêrek bame ne yî t'icare,*
*2 Ne bi zêȓ û mal, ne yî beqale,*
*3 Da min kuştibane qet'il ĥelale.*

**S. 29** *1 Xwezî ez derwêşek bame yî xilmetk'are,*
*2 Da min ibadet*[3311] *kiriba li ĥedê sala,*
*3 Da gehiştibame wan hevala.*

**S. 30** *1 Xwezî ez mêrek bame yî ciwamêr,*
*2 Xwedê malek daba min t'êr,*
*3 Da min hevalêt xwe kiȓîbane bi mal û zêȓ.*

**S. 31** *1 Ez bi qurbanîya wî ĥeyranî,*
*2 Dil û qelba*[3312] *min di zanî,*
*3 Da em ȓunêyin li dîwana wî silt'anî.*

**S. 32** *1 Ew silt'ane yî mezine,*
*2 Hikm û hekamet da destê dijmine*[3313]*,*
*3 Ew dizanit k'î fedayî ye û k'î êmine*[3314]*.*

**S. 33** *1 Ewan digot silt'an Êzîd nayê,*
*2 Sinet*[3315] *çêkir, agir dayê,*
*3 Cimhûrîye û p'alek dayê.*

**S. 34** *1 K'erem ȓakir,*
*2 Sinet k'arkir,*
*3 Çu yê ji me bawer naken,*
*4 Dora weye xwe xelas ken.*

**S. 35** *1 Heke tû êkî dibînî,*
*2 Hola teye, tû jê helînî,*
*3 Li meyla dinê pê neĥesînî.*

---

[3311] *ebadet*
[3312] *gelb*
[3313] *dujmin*
[3314] *êmin*
[3315] *sine't*

**S. 36** *1 Pirs neke li ĥemû kese,*
*2 Heke yî aşiqe, ji xwe r̂a bese,*
*3 Heke yî fedayî ye dê li te pirse.*

**S. 37** *1 Heke tu aşiqî bisebire,*
*2 Bi şev û r̂oj bifekire,*
*3 Xam û înk'ar bi xwe didemire.*

**S. 38** *1 Li ĥemlê îmanê r̂abin,*
*2 Ji xam û înk'ara cudabin,*
*3 Hincîyê xiwarî dê cezabin.*

**S. 39** *1 Heke yekî divêt te bişkênîne,*
*2 Tû xilmeta şêx Şems bikey xwe metirsîne,*
*3 Bela dizavin şêx Şems dê j êr̂a îne.*

**S. 40** *1 Bela dizavin şêx Şems dê li wan k'ar ket,*
*2 Navê wan dê dinav kuştîya ket,*
*3 Agir heye dê li wan bela ket.*

**S. 41** *1 Ewan divêt vî agirî bit'e'mînin*[3316]*,*
*2 Li ba hev r̂unên da bit'efînin,*
*3 E'mirê jore nat'efînin.*

**S. 42** *1 Agir hilbû k'efte Şerqê,*
*2 P'êt bilindbû, k'efte Ẍerbê,*
*3 T'elpê fexir hate herbê.*

**S. 43** *1 Hindek hene xwedan xofa ji xwe r̂a dikene berbere,*
*2 Ew nikarin serê xwe r̂akin ji ber bêbext û nebûkere,*
*3 Ew di bê beĥrin li herdu sere.*

**S. 44** *1 Gelek hene xwe xurt diken,*
*2 Ew nikarin eşîret û mileta qanae biken,*
*3 Ew bira û bira ji hev diken.*

**S. 45** *1 Gelek hene xwe dikene aẍa*[3317]*,*
*2 Di bê sîqalin nameşin saẍe,*
*3 Herba giran dê li wan r̂abe.*

**S. 46** *1 Xwezî bihata ew dem û ew hîwan,*
*2 Ĥeqî û r̂astî dê ba t'emam.*

*T'emamtîya vî qewlî li navê Sesims û xwedan!*

## 16. BEYT'A MÎR MIH

**şaxê 1**[3318]
**S. 1** *Qebrê mîr Mihê min li bal agire,*
*Felek bê qole, û bê taliye, zir̂ya bû weke gure.*

**S. 2** *Felek dibêje: «Ezî t'obedarim, sundxwarîme,*
*di pê mîr Mihê minî xortî nuhatî, siwarê*[3319] *qata caniyê,*

[3316] *bitemînin*
[3317] *axa*
[3318] *Dastan û beyt'a Mîr Mih*. http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=75
[3319] *swar*

*t'u soz û qirara nadim t'u mêvana, u t'u misafira».*

**S. 3** *Felek dibêje: «Qebrê mîr Mihê min di derê r̂ê da,*
*eze t'obedarim, sundxwarîme,di pê mîr Mihê r̂a, t'ucara şarê nadim ber k'ofiyê da».*

**S. 4** *Felek dibêje: «Baẍçekî mala babê min heye, dara derê ĉiyayê,*
*şalul u bilbila, malik avayê, berê xwe[3320] dayê.*
*Bazîkî fexrî bû, hat û berî wan gehayê».*

**S. 5** *Felek dibêje: «Dara şêx Simaîl wa li jore,*
*wê li ser dixûnin kevok, û şalul, û bilbil, û sê p'er̂êve sore,*
*mirina pîr û kala sit'are, mirina xelqê ciwan, li dinyayê ĥeyf û zare (core)»,*

**S. 6** *Felek dibêje: «Ẍerîbo[3321], çî dikey li Mekke û Medînê,*
*lib[ɑ]sê te xerqeye, li bejna te hileye, t'acê serê te nûranîye,*
*ĥeca mêrê Êzdî nîne, xêrî Lalişeke nûranîye dîwana mîr Şerfedîne.*

**S. 7** *Emê berê xwe bidin Lalişeke nûranî, ĉiyayê Şingalê, tiwafa çil mêra dîwana mîr Şerfedîne».*

**S. 8** *Felekê go: «Ẍerîbo, çî dikey li Mekke, u Medînê u hêreye, lib[ɑ]sê te xerqeye, li bejna te hileye,*
*T'acê serê te zêr̂e, emê berê xwe bidene, heça mêrê Êzdî,*
*Lalişeke nûraniye, ĉiyayê Şingalê, dîwana mîr Şerfedîne».*

**S. 9** *Ẍeribo go: «Felekê weye, wenîne,*
*t'erazu mêzên li e'zmanê ĥeftê bilin bûne,*
*sed ĥeyf û mixabina bixwazin: êkî wek Ĥesen il[3322]-Hisnî, Denun il-Miisrî, mîr Birahîmê Ademe,*
*mîr Mihê minî şengî, xortî nuhatî berê xwe da vê dinyayê, pişta xwe da Muxarzemîne».*

**S. 10** *Felekê go: «Ẍerîbo, t'irba mîr Mihê lawîn li berî r̂êye,*
*serê vê qubê li semawetî jorêye,*
*lingê vê qubê xwe berdaye binê beĥrêye».*

**S. 11** *Felekê go: «Ẍerîbo, ezê sundxware t'obedarim pê mîr Mihê lawîn r̂a, ez t'u soza nadim canik û camêrêt xelqêye»[3323].*

**S. 12** *Mîr Mihê go: «Felekê, min bawerî[3324] bi vê yekê netê li e'zmanê ĥeftê,*
*t'iraz û mêzîn hatin û bilind bûne stêrk û qurxê berê xwe da vê qubletê,*
*sed ĥeyf u mixabina bixwazin, yekî weke Ĥesen[3325] il-Hisnî, Denun il-Mirsî, Mîr Birahîmî Adema, mîr Mihê şakî lomî, xortî nuhatî, siwarê qata canîyê berê xwe da vê axretê, pişta[3326] xwe da vê ometê (dinyayê)».*

**S. 13** *Feleke go: «Ẍerîbo, çend cara min gote te neçe ser vî girî,*
*Emîn Cebraîl qasidê melekê mirinê bû, bi r̂enga dixemilî,*
*hersê sêvêt mîr Mihê lawîn jê dibirî,*
*bêjin, ev dinya bi çend lewna hat û bi çend lewna bihurî».*

**S. 14** *Felekê go: «Ẍeribo, dinya dem u dewranêt Xwedêne[3327],*
*yeman, yeman, di serê canik û camêrêt xelqê beyerîne».*

**S. 15** *Felekê go: «Ẍerîbo, baẍçekî min heye derî li jore,*
*têda dixûnin bilbil, û şalul, û kevokêt malik avayî p'er̂sore».*

---

3320 *xo*
3321 *xerîbo*
3322 *li*
3323 *xelk*
3324 *behwerî*
3325 *Adem*
3326 *bişt*
3327 *Xudêne*

**S. 16** *Felekê go: «Ẍerîbo, mirina kala û mêra sit'areye,*
*Mirina xelqê can, ĥeyf û zore».*

**S. 17** *Felekê go: «Ẍerîbo, baẍçekî min heye li derê r̂êyaya bilbil, û şalula,*
*kevokêt malik avaye, p'er̂êt sorêt xwe lêdaye,*
*ĥeyf û sed mixabin êt weke Ĥesen il-Hisnî, Denun il-Misrî, Mîr Birahîmê Adema,*
*Mîr Mihê lawîn, berê xwe dane axreta şêrîn, pişta xwe kirine vê dinyayê».*

**S. 18** *Felekê go: «Ẍerîbo, qubêt mergehê sê ne,*
*serê van quba semawetî jorîne, lengelê van quba li binî beĥrê ne,*
*min nezanî, mîr Mihê minî xortî nuhatî, r̂êyekê di qebrê r̂eşî tarî da dibî ne».*

**S. 19** *Felekê go: «Ẍerîbo, loma ji dilê ẍerîba mekin,*
*merivê ẍerîb, li welatê ẍerîb, li malêt bava ĉaver̂ênin».*

**S. 20** *Felekê dibêje: «Ẍerîbo, qubêt mergehê çarin,*
*serê van quba li semawetî jorîne, lenger̂ê van quba li beĥrê dixwerin, sed*
*ĥeyf û mixabina bixwazin yekî wekî Mîr Mihê, di qebrekî r̂eşê tarî da,*
*kirim û kêza goştê gîyanê*[3328] *wî dixwerin».*

**S. 21** *Felekê dibêje: «Ẍerîbo, qubêt mergehê sipîne*[3329]*,*
*serê van quba li semawetî jorîne, binê van quba li beĥrêt tarîne,*
*loma ji mirovê ẍerîb, li welatê ẍerîbiyê, ji malê bava bi hîvîne».*

**S. 22** *Felekê dibêje: «Ẍerîbo, qubêt merhegê pêncin,*
*serê van qubeha li semawetî jorîne, lenger̂ê van quba li binê beĥrêt dir̂êncin (mizêncin),*
*sed ĥeyf û mixabin, êt weke Ĥesen il-Hisnî, Denun il-Misrî, Mîr Birahîmê Adema,*
*Mîr Mihê lawîn berê xwe dane sefera mirine, hêşta digêncin».*

**şaxê 2**[3330]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Hûn werin lêzim werin,*
*2 Gund û cîranêt hêṣetê,*
*3 Em da r̂ayekê lê bikeîn,*
*4 Îr̂o qewî girya me tê.*

**S. 2** *1 Îr̂o qewî li me têtin girî,*
*2 Sosin li mêrga xeyirî,*
*3 Nema vexwin*[3331] *vê ṣerbetê».*

**S. 3** *1 Lêvêt nazik, r̂engê şekir,*
*2 Jê kêm dibûn derew û xeber,*
*3 Sed daẍ, û kovan, û k'eser,*
*4 Ĥeyfe bêjit mala ĥicretê*

**S. 4** *1 Ĥeyfe em jêk bibin cuda,*
*2 Ya R̂ebî, ĥizin û girî herdu te da,*
*3 Em di r̂azîne bi hikmê Xweda,*
*4 Hincî ya tê, ji dergehê te tê.*

**S. 5** *1 Hincî ya diket – ew mîr diket,*
*2 Daxa di qeliba da – pîr diket,*
*3 Xêr û şer̂a – tencîl diket,*
*4 Sotim bi narê firqetê.*

---

3328 *giyan*
3329 *spî*
3330 [51] *Beyt'a mîr Mih* (rr. 541-543)
3331 *vexun*

**S. 6** *1 Sotim bi narê agirîn,*
*2 Hey felekê vê fêniyê em jêk kirîn,*
*3 Dost û bira çerxa e'detê.*

**S. 7** *1 Çî e'dete bê hewaye,*
*2 Çend ciwan û meĥbub wê r̂ewaye,*
*3 Ĥemû li nav axê daneye.*

**S. 8** *1 Hincîyê dinav axiya wî,*
*2 Hincîyê li ber enkêriya wî,*
*3 Em da bideyn t'erkiya wî,*
*4 Ewe bi serî netê.*

**S. 9** *1 Ev*[3332] *k'umbeta li nav qebûre,*
*2 Çî meqbereke tarî, hoy k'ure,*
*3 Hana dostê ya dure,*
*4 Tewer — tewera vê muĥbetê.*

**S. 10** *1 Ev k'umbeta li nav beyare,*
*2 Çî meqbereke tarî, hoye sare,*
*3 Ya R̂ebî, te li min ĥeramkirbûn bihare,*
*4 Wan çîçeka k'î dê dest k'etê?*

**S. 11** *1 Wan çîçeka, li wan werda,*
*2 R̂îĥanêt bêhn*[3333] *xweş*[3334] *wê li ĥemû e'rda,*
*3 Ĥeta di xweşin dê mirin bi kul û derda,*
*4 Şeb lîxan ĥeta bi serde tê.*

**S. 12** *1 Ew dinyaye bi yarînîye,*
*2 Heqe bore — du r̂ûnîye,*
*3 Qelsî — hevalê xweyîye,*
*4 Qet na ête îtae'tê.*

**S. 13** *1 Zeber nebab û kewkebin,*
*2 Hincîyê dur̂ û cihwer hebin,*
*3 Ew bêşik dê nîşanêt tebin.*

**S. 14** *1 Şire't mîr Miĥê şire'kê k'eşake,*
*2 Hincî k'esê fariqe bû ji make,*
*3 Xaliq ĥemûa dê wefake,*
*4 Kas namînit ji ẍêr şahê qudretê.*

*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

**şaxê 3**[3335]
**S. 1** *1 Hal min mêrgê,*
*2 Mêrg min hewas,*
*3 Çûme şewlê, şew li min hewas,*
*4 Belgê dara zêr û diraf,*
*5 Mîr Miĥê, tu misk'înî pê navî nas.*

**S. 2** *1 Çûme şewlê şewla bê mal,*
*2 Sitêrk e'zmana şewag-şemal,*

---
[3332] *em*
[3333] *bên*
[3334] *xoş*
[3335] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYÎT'A MÎR MIĤÊ (*rr. 107-108) T'ilbîs 2001

*3 Harî p'êrî nav digerin bengz ĥisnî delal,*
*4 Mîr Miĥê, tu misk'înî, nizanî k'îjan cahile, k'îjan kal.*

**S. 3** *1 Bigere dayîka xaye delal,*
*2 Bavê xayî delîlî kal,*
*3 Mirin pê r̂a bûye k'emal,*
*4 K'etine nava ax-berê sar,*
*5 Tu misk'înî pê navî nas.*

**S. 4** *1 Mîr Miĥê tê çigas dinê e'mr bikî,*
*2 Zêr̂, malê dinê xenî bikî,*
*3 Tê t'asa mirinê te'm bikî.*

**S. 5** *1 Mîr Miĥê ĥezar salî dinê bî,*
*2 Zêr̂, malê xenî bî,*
*3 Tê r̂ojekê vê fenê bî,*
*4 Ayî, mêvanê t'irbê bî.*

**S. 6** *1 T'irbê, t'irba devî ava,*
*2 Hêsir barî ĥerd ĉe'va,*
*3 Girane e'zavê dê û bava.*

**S. 7** *1 T'irbê t'irba dev kaniyê,*
*2 Hêsir barî e'niyê,*
*3 Girane e'zavê cinariyê.*

## 17. BEYT'A GILAVÎ[3336; 3337; 3338]

**S. 1** *1 Hate qasidê ĉiyane,*
*2 Minê pêra kir xeberdane,*
*3 Divê: «Avê sera min bityane.*

> **S. 1** *1 Hatîye qasidê ĉiyane,*
> *2 Werê emê bikin xeberiyane,*
> *3 Ax li minê, seraye r̂ê me biryane.*
>
> > **S. 1** *1 Me hatiye qasidê ĉiyane,*
> > *2 Minê pirsê kiriye xeberdane,*
> > *3 Divê: «Avê seriya te biriyane».*
>
> **S. 2** *1 Hatîye qasidê derda,*
> *2 Soranîkê sore berda,*
> *3 Ax li minê, r̂eşxeteke r̂eşe serda.*

**S. 2** *1 Hatîye qasidê zêr̂î ye,*
*2 Xeta Gilavîya min lê ye,*
*3 Vê xetê da nixteke xûnê lê ye.*

> **S. 3** *1 Hatiya qasidê zê ye,*
> *2 R̂eşxeteke r̂eşe lê ye,*
> *3 Ax li minê, navê Gilavîya mine lê ye.*
>
> > **S. 2** *1 Hatiye qasidê zêr̂iye,*
> > *2 Xeta nama mine li pêye,*
> > *3 Xetê da heye xebera nexaşyêye.*

---

[3336] [6] М.Б. Руденко *Курдская обрядовая поэзия* (стр. 87-89; 111-114)
[3337] [29] (rr. 400-403) (№ 1699)
[3338] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYT'A GILAVÎYÊ (*rr. 108-110) T'ilbîs 2001

**S. 3** *1 Vê xetê da hene xeberê ne xweş,*
*2 Ĥeyfa min tê ĉavêd r̂eş,*
*3 Çawa têk'evine axê gor̂ê r̂eş.*

**S. 3** *1 Xetê da hene xeberê nexaş,*
*2 Ĥeyîfa min tê ĉe'vê r̂eş,*
*3 Birû-bijangê qelemê dik'eş*
*4 K'etime ax û berê ferş.*

**S. 4** *1 Ĥeyfa min tê van dirana,*
*2 Ĉav-birûyê van mircana,*
*3 Çawa têk'evine axed gor̂istana!*

**S. 5** *1 Ĥeyfa min tê dêmê gulî,*
*2 Lêv (Dev) û diranêd şekirî,*
*3 Çawa tek'evine axê r̂eşî tarî.*

**S. 4** *1 Ezê wê r̂eşxetê dixûnim,*
*2 Qe t'î p'ak tê navînim,*
*3 Dibêjim[3339], berê xwe didime, pişta xwe lê vedger̂înim.*

**Şiravekirin:**

**S. 6** *Mîr Etlas pêşîyê mala mîrê şêxa di Şengalê çû bû eskerîyê çawa qomender.*

**S. 7** *Jinek, navê we Gilavî anîbû ser jina xwe ya kevin bona vê yekê jina wî zaro ne danya.*

**S. 8** *Wextê jin anî sê r̂oja sekinî, p'aşê gazî kirê, bire eskerîyê çawa qomender.*

**S. 9** *Paşê birina wî jina wîye kewin çawa hewî je'r da jina t'eze — Gilavî.*

**S. 10** *Hîjdeh r̂oja ma Gilavî bi wê je'rê mir.*

**S. 11** *Paşê e'lametî dane mîr Etlas wekî Jina te mirîye!*

**S. 12** *Mîr Etlas çû destûra xwe ji mezinê xwe stand, borê xwe siwar bû û berbi mala xwe hat, go:*

**S. 13** *1 «Boro, e'silê teyî xase,*
*2 Tu wîkî Xidir–nebîy, Xidir–Ilyase,*
*3 Te mezela Gilavîya bikî nase».*

**S. 5** *1 Go: «Herê boro, e'silê te yî xas,*
*2 De tu bajo qewata Xidir–nebîy, Xidir–Ilyas,*
*3 Ax li minê, t'irba x̂erîba mi durva bike nas».*

**S. 4** *1 Mîr go: «Boro, e'silê teyî xase,*
*2 Bidî xatirê Xidir–Nebî, Xidir–Eyîlase,*
*3 Tê t'irbê xerîba dûr va bikî nase».*

**S. 14** *1 Ezê çume ĥafa gor̂istînê,*
*2 Min pirsek kirîye ji dergivînê:*
*3 «Mezela x̂erîba li kêderîne?»*

**S. 6** *1 Çume ĥafa gor̂istîne,*
*2 Pirsekê xastiye dergewîne,*
*3 Ax, go: «Gelo t'irba x̂erîba k'î bi k'îne?»*

**S. 7** *1 Çume ĥafa gor̂êstanî,*
*2 Pirsekê xastiye dergiwanî,*
*3 Ax, min go: «Gelo t'irba x̂erîba min k'îjanî?»*

**S. 5** *1 Ezê çume ĥafê gor̂istîne,*
*2 Minê pirsê kirîye dergevîne:*

[3339] *divêjim*

*3 Divê: «T'irbê xerîba*[3340] *li hêrîne».*

**S 15** *1 Dergivîn va dideya cihabe:*
*2 «Mîrê min, çiqas dinya ha be,*
*3 Ez çi zanîm, mêzel k'ê hinda be?*

**S 16** *1 Mîrê min, r̂ojê bi seda.*
*2 Mirî dimirin nav meda.*
*3 Ez nizanim mezelê ẍerîba k'ê e'rda?»*

**S 17** *1 Mîr go: «Boro, e'silê teyî xase,*
*2 Tu wîkî Xidir–nebîy, Xidir–Ilyase.*
*3 Were, mezelê ẍerîba dûrve bike nase».*

**S. 18** *1 Borê bimbareke r̂ê dibîne,*
*2 Mîr Etlas dizgînê hildikişîne,*
*3 Ser mezela Gilavî dertîne.*

**S. 19** *Mîr bore xwe qaşkir, destpêkir t'irb veda, cinyazê wê derxist, dani wê bestê, dua' ji Xwedê xwest:*

**S. 32** *1 Mir dibêje:«Devê t'irbê min hilk'ete,*
*2 Têda dîbû ĉave belek. bazin û zinde,*
*3 Ew jî sibê zû pê dik'şand sergovende.*

**S. 8** *1 «Derê t'irbê li min vekir,*
*2 Gilavîyê ax û berê sarda r̂eng guhêr̂îbû, min nas nekir,*
*3 Ax li minê, Gilavîyê xeyîdî, pişt min vekir».*

**S. 33** *1 Devê t'irbê min hilbirî,*
*2 Têda dît ĉavê belek dêmê durûyî,*
*3 Gilavîya min ĉava r̂eng û r̂ûyê xwe guherî».*

**S. 6** *1 «Derê t'irbê min hil birî,*
*2 Têda hebû ĉe've belek, dêmê dur̂î,*
*3 Girtiye xûbara mirina bê ît'barî,*
*4 Xerîba r̂engê xa guherî.*

**S. 9** *1 Mîr go: «Qudreta yekê di Ẍefûrê,*
*2 Ĥafa t'irba Gilavîyê min k'işîya nûre,*
*3 Eva yeka ne qebûle».*

**S. 7** *1 Mîr go: «Ayî qudreta îlahiya,*
*2 R̂iĥekê bahata dest-p'iya,*
*3 Zimanê Gilaviyê mîr r̂a bigeriya».*

**S. 12** *1 Mir go: «Sed ĥeyfa teyî dêmê narî,*
*2 Ger̂denê morî mircan û k'aribarî,*
*3 Ax li minê, ew jî çûne ax û berê gor̂ane tarî».*

**S. 13** *1 Mir go: «Gilavîyê sed ĥeyfa te wî devî, wa dirana,*
*2 Te wî morîya, wî mircana,*
*3 Sed ĥeyfa te, tu jî çûyî ax û berê gor̂istana».*

**S. 14** *1 Mîr go: «Ĥeîfa min tê wan dev-dirana,*
*2 Ĉe'vê belek singe morî-mircana,*
*3 Wê k'etine axê goristana».*

**S. 20** *1 Ji qudreta îlaĥî bîya,*
*2 R̂uĥê bihata dest û pîya,*
*3 Zimanê Gilavîyê min r̂a*[3341] *biger̂îya.*

**S. 10** *1 Qudreta yekê di R̂eĥmanê,*

[3340] *xerîv*
[3341] *mi r̂a*

*2 R̂uĥê hatîye dest û p'iyanê,*
*3 Gilavî r̂ûniştîye mîr ĥewas r̂a dike xeberdanê*[3342]*.*

**S. 8** *1 Ayî, qudreta îlaĥî bû,*
*2 R̂uĥ hati bû dest- p'î bû,*
*3 Zimanê Gilaviyê mir r̂a geriyayî bû.*

**S. 21** *Bi qudreta Îlaĥîyê r̂uĥ hate ber Gilavî, Gilavî r̂abû ber mîr Etlas sekinî.*

**S. 22** *Mîr Etlas gotê da:*

**S. 23** *1 «Here Gilavîyê dilsotinê,*
*2 Were bike vê gotinê,*
*3 K'a çi bûye ĥevalê te û mirinê?»*

**S. 11** *1 Mir go: «Gilavîyê ji Suxinê*
*2 Hela bêje pirsa vê gotinê,*
*3 Hela çika çi ĥewalê te mirinê?»*

**S. 9** *1 Mir go: « Herê Gilaviya mine dilsatinê,*
*2 Bêje pirsê vê gotinê,*
*3 Çi ĥewalê te mirinê?»*

**S. 24** *1 Gilavî go: «Her̂e mîro tu hazirî,*
*2 Ezê te r̂a bêjim şîrin zarî,*
*3 Te yeke zalimva ez disparî!»*

**S. 10** *1 Gilaviyê, go: «Her̂e mîro, tu li hêrî,*
*2 Te ez hîviye zalimekê va dispêrî,*

**S. 14** *1 Gilavîyê go: «Mîro, te ez hênare,*
*2 Ne ez nava zêr̂ û zîv da wez dijbare,*
*3 Te ez destê zalimeke zalva dispare,*
*4 Evê zalima ber serê siva da min k'ase je'r̂e».*

**S. 25** *1 «Ewê do min k'asê je'rî,*
*2 Ez jî bi dilê xwe ĥelalî,*
*3 Ez hîjdeh r̂oj pê dinalî.*

**S. 10** *3 Ewî dabû min da k'asa je'rî,*
*4 Eze xerîb bûm, minê xerîbî vedxarî,*

**S. 26** *1 Hîjdeh r̂ojê vê havînê,*
*2 Ezê k'etime nivînê,*
*3 T'unebû dore min pismamê*[3343] *yê di xûnê».*

**S. 15** *1 Go: «Ĥîjde şevê havînê,*
*2 Nexweşbûm, k'etime nav nivîne,*
*3 Ax li minê, qe nehate ser min lêzimekî xûnê».*

**S. 10** *5 Eze 18 r̂oja ber dinalîm.*
*6 18 r̂ojê wê havînê k'etime nivînê,*
*7 T'une bûn dora min qeûm, lêzmê xûnê».*

**S. 16** *1 Go: «Hîjdeh şevê havînê jimare,*
*2 Min ne xwarîye, ne vexware,*
*3 Ax, xurê xwe av û hêsira da dibhare».*

**S. 17** *1 Mir go: «Gilavîyê, xazil*[3344] *tu bihatay li k'ir̂înê,*
*2 Min berenberî te zêr̂ bavîta nav mêzînê,*
*3 Bona di qirara vê evînê».*

**S. 18** *1 Gilavîyê go: «Mîro, her̂e, bira tuyî xweş bî,*

[3342] *xeverdan*
[3343] *pizmam*
[3344] *xazil*

*2 Sorgulaneke nava baẍane geş bî,*
*3 Bira ciyê Gilavîyê ax û ferş bî».*
**S. 11** *1 Gilaviyê got: «Here mîro, bira tu xaş bî,*
*2 Sorguleke baẍaye geş bî,*
*3 Bira ciyê Gilaviyê ax-berê ferş bî».*

**S. 27** *Dilê Gilavîyê xiravbû, serxweşî da mêrê xwe, ber dilê wî da hat, gotê:*

**S. 28** *1 «Heȓe mîro, bira tuyî saẍ bî,*
*2 Sorgulaneke nava baẍ bî,*
*3 Ciyê Gilavîyê te nava farş û ax bî!*
**S. 19** *1 Gilavîyê go: «Mîro, heȓe bira tuyî saẍ bî,*
*2 Sorgulaneke nava baẍ bî,*
*3 Bira ciyê Gilavîyê xalî, ax bî».*
**S. 12** *1 Gilaviyê got: «Here mîro, bira tu sax bî,*
*2 Guleke nava baẍ bî,*
*3 Bira ciyê Gilaviyê ax bî».*

**S. 29** *1 Erê mîro, bira tuyî xweş bî,*
*2 Sorgulaneke baẍane geş bî,*
*3 Ciyê Gilavîyê nava ax û berê ferş bî».*

**S. 30** *1 Ya hatîye sere mîr Etlase,*
*2 Bira ne yê sere t'u kese,*
*3 Ez jî sitîyek bûm çûme nava sitîyê şêx Şemsê!*
**S. 15** *1 Ȟeĉa hate serê mîr Etlese,*
*2 Bira neyê serê t'u kese,*
*3 Ew sit'iye wê here nava sit'iyê Şemse.*

**S. 31** *1 Heȓe mîro ji qudretê,*
*2 Dua'ke bixwaz ji qudretê,*
*3 Bira Gilavîya te dîsa heȓe vê xilmetê».*
**S. 13** *1 Gilaviyê got: «Here mîro, tu ji hidretê,*
*2 Dia'ke bixaze qudretê,*
*3 Ezê heȓime wê xizmetê».*

**S. 34** *1 «Heȓe mîro ji hidura,*
*2 Were, em bixwezin ji hev destûra,*
*3 Ya min û te çû ban dura».*

**S. 35** *Wêderê, cara mayîn, mîr Etlas dua' ji Xwedê dixwaze, Gilavî diçe wefatê.*

**S. 20** *1 Mîr go: «Bero, li ser bera,*
*2 Tu Xwedêkî, p'êẍembera,*
*3 Tê ax û berê sarda xirav nekî xweş nedera».*

**S. 36** *Mîr Etlas Gilavî dîsa dike t'irbê, ĉel dike, bore xwe siwar dibe û diçe mala xwe.*

**S. 21** *1 Mir go: «Heȓe boro ser sêk'înê,*
*2 Tu Xwedê kî, vê Yasînê*[3345]*,*
*3 Tê Xweda xirav nekî ĉav û birîyêd belek vê nevsînê».*

**S. 22** *1 Li dua'yê van qenca, li van xasa,*
*2 Gilavî bû sitîyekê, çû malî Şemsa.*

**S. 37** *Paşê êla wî tên serxweşîya wî didinê; mehek dik'eve ort'ê.*

---

[3345] *asîn*

**S. 38** *R̂ojekê êvarê tarî dik'eve e'rdê, mîr Etlas jina xwe kevin gazî dike, tîne dide r̂ûniştandinê û ji jin dipirse: «Ewdê Xwedê, Gilavî ji çi mir? Nexweşîya wê çi bû?»*

**S. 39** *Jinik dibêje: «Pey te r̂a digo ez nexweşim, serê min dêşe, dilê min dêşe!*

**S. 40** *Min wê bir cem hekîm, hekîm kir ne kir tişt bi nexweşîya wê nekr.*

**S. 41** *Sekinî û bi e'mirê Xwedê wefat kir.*

**S. 42** *Min jî şande pey te».*

**S. 43** *Lê jinikê nizanbû wekî mîr Etlas Gilavî dîtîye, gilî-gotin e'ne'ne kirin, paşê hatîye mal.*

**S. 44** *Mîr jina xwe wê şevê bi cizaret p'irtî-p'irtî kir, kire nava xorcekî, avite beĥrê*[3346].

**S. 45** *Paşê, sekinî mux̂dareke direj k'ete ort'e mîr Etlas, çû sitîke mîna Gilavî bedew anî stand.*

**S. 46** *Ĥeta îro r̂ik'ina mala mîrê şêxa di Şengalê mîr Etlas û jina wî ya t'eze p'eyda bûye û bê nisleta wan hene.*

## 18. BEYT'A NESÎĤETA [3347] — HEGAN TU P'ADŞAYÎ[3348]

**S. 1**
*1 Heqan ku nite P'adşayî,*
*2 R̂ezaqê ins û cinsî,*
*3 Xaliqê E'rş û K'ursîy,*
*4 Xwedanê Mihr û Mahî*[3349]*,*
*5 Pexşendeyî bê gunehî*[3350]*,*
*6 E'sil û fesil û cinsî.*

**S. 1**
*1 Heqan tu P'adşayî,*
*2 Rezaqê cins û insî,*
*3 Xwidanê Mor û Mahî,*
*4 Munşê E'rş û E'ursîy,*
*5 Pexşindeyê gunehî,*
*6 Bê e'sil, û fesil, û cinsî.*

**S. 2**
*1 Tuyî K'afî, tuyî Besîrî,*
*2 Îlaĥîo, Tuyî Qedîrî,*
*3 Qeharî, Layîqî û Fesîĥî.*

**`S. 2**
*1 Bê cins û bê nezîrî,*
*5 Bê k'ufu, bê misalî,*
*6 Semîye'yî û nesîrî,*
*7 Qeharê layezalî,*
*5 Elamehê Qedîrî,*
*6 Te'ala şein Alî.*

**S. 3**
*1 Yan Besîrî, Te'alîya*[3351] *şahî,*
*2 Qeyum xeliqî, çar k'emberî,*
*3 Te dana ber û bûm,*
*4 Îstiqlal çîn û maçîn,*
*5 Çendî E'cem û Şam û R̂om, dinya bû hikmê zemîn.*

**S. 3**
*1 Te'ala şein qeyum,*
*2 Xelaq çerxa berîn,*

---

3346 *be'r*
3347 [2] (rr. 730-735)
3348 [2] (rr. 736-740)
3349 *mehr û mayî*
3350 *gunah*
3351 *te'el*

*3 Te çêkirin ber û bom,*
*4 Sivilaq çîn û maçin,*
*5 Hind û E'cem, Şam, R̂om,*
*6 Dinya û koh û zemîn.*

**S. 4** *1 Dinya ko xweş dinya ye,*
*2 Em t'emaşa tê bibînin,*
*3 Arusa dil r̂ivaye,*
*4 Seranser pê dişêrînin,*
*5 Ĥeyfe ku bê beqaye,*
*6 E'slan[3352] bo kes namînin.*

**S. 4** *1 Dinya çi xweş dinya,*
*2 T'emaşa tê bibînin,*
*3 Arusa dil r̂ewaye,*
*4 Serasar t'êk şêrînin,*
*5 Ĥeyfe ko bê beqaye,*
*6 E'slan bo kes namînin.*

**S. 5** *1 E'slan peyî wende nake,*
*2 Ji ehda neyarî,*
*3 Ĥeyfe ko finê bin,*
*4 Ciwanêt ber nexwarî,*
*5 T'ixûba[3353] di axê r̂akin,*
*6 Sîyah zulfêt tarî.*

**S. 5** *1 Bo kes pê wende naket,*
*2 Ji dest ehda neyarî,*
*3 Ĥeyfe ko jî fenaket,*
*4 Lawê p'ir̂ ji xwe nexarî,*
*5 Xwe panit axê r̂a ket,*
*6 Sîyah zilfêt ti tarî.*

**S. 6** *1 Sîya mekin t'irabe,*
*2 Ĥeta we'de digehiştê,*
*3 Bo kes nabit babe,*
*4 Yar diket bihuştê,*
*5 Axir dê bit xirabe,*
*6 Micid mehavêj piştê.*

**S. 6** *1 Zilfa girtin t'irabe,*
*2 Dema we'de gehiştî,*
*3 Bo kes nabîte babe,*
*4 Yarê ti gel sur̂a kuştî,*
*5 Axir dê bît xirabe,*
*6 Micid neavê piştî.*

**S. 7** *1 Micid mehavêje deste,*
*2 Yeqînîye[3354] bê e'sase,*
*3 Li me'nîya xwe veweste,*
*4 Nek'evinê kêm û k'ase,*
*5 K'ubarê xwe dipesintî,*
*6 Buxtank'ar[3355] ne yî xase.*

**S. 7** *1 Micid neavê deste,*
*2 Lewma ko bê e'sase,*
*3 Tu şalê xwe veweste,*
*4 Te nebin kêm û k'ase,*

[3352] *esalan*
[3353] *tixub*
[3354] *êqîn*
[3355] *bixtanker*

*5 T’egbîr xwe dip’araste*[3356]*,*
*6 Buxtank’ar elixenase.*

**S. 8** *1 Buxtank’ar û bedguman,*
*2 Herduwa ciger ji k’afê*[3357]*,*
*3 Ĥeyfe beg, û mîr, û silt’an,*
*4 P’iȓ biken bê însafê,*
*5 Belê bêje zengê qalb xirab,*
*6 Çêtire ji sofiyê ne yî safî.*

**S. 8** *1 Buxtank’ar û bedguman,*
*2 Herdu çêkir ji k’afê,*
*3 Ĥeyfe ko mîr û silt’an,*
*4 P’iȓ biken bê însafê,*
*5 Li e’zîze bêt û (ş),*
*6 Wek sofiyêt ne safî.*

**S. 9** *1 Sofiyê bi ceng û defne,*
*2 Yî dûre ji ȓaya Ȓesûl,*
*3 Li me’nîya xweyî du xeber*[3358]*,*
*4 Mîna p’êxwasî serkol,*
*5 Mêrê bi lêb û geȓ,*
*6 K’om-k’om ji ber diçin şol.*

**S. 9** *1 Sofî bi çeng û p’eȓ bît,*
*2 Duȓe ji ȓahê îsol,*
*3 Mêrê bê laq û k’ef bît,*
*4 Kom kom ji ber diçin şol,*
*5 Suȓa te kirne xef bît,*
*6 Dêbiye p’êxasê serkol.*

**S. 10** *1 Suȓa mekin aşkira,*
*2 Çake suȓ di xefî bin,*
*3 Da t’iraşê*[3359] *ne uman,*
*4 Suhbeta*[3360] *kerî bin,*
*5 Erzak’ar û xebersar,*
*6 Herdo*[3361] *di ziman biȓî bin.*

**S. 10** *1 Suȓa meken aşk’ar,*
*2 Qence ew di xefîbin,*
*3 Ne t’iraşîyê ti homar,*
*4 Ti suhbeta kerîbin,*
*5 E’rzek’ar û xebersar,*
*6 Herdu e’zman birîbin.*

**S. 11** *1 Bê ȓêz û e’det,*
*2 Nayên dû ser qelûna,*
*3 Hincîyê jê hat ferset,*
*4 Ȓojê meke li zebûna,*
*5 Çendî li te hat molet,*
*6 Meçe nêzîkî mona.*

**S. 11** *1 Herdu bi rêz û e’det,*
*2 Tînin du ser qelunan,*
*3 Hindî te hebit t’aqet*[3362]*,*
*4 Neçe nêzîkî monan,*

3356 *diperist*
3357 *k’af* —binêr: *k’ifirî* (gotin û k’arê guneh û ne li ȓê)
3358 binêr: *derewîn*
3359 *teraş*
3360 *suĥbet*
3361 *herdo*
3362 *teqet*

*5 Wextê te bêtin firset,*
*6 R̂u zî neke li zebûnan.*

**S. 12** *1 Monê xwe dipesintî,*
*2 Navê lê cema' bin,*
*3 Quling û t'ewlazêt gundî,*
*4 Çake ji wan di cuda bin,*
*5 Bo qelsî dewlemendî,*
*6 Mixabin û sed mixabin.*

**S. 12** *1 Monê ti xwe pesindî,*
*2 Ĥeyfe li wan xema bin,*
*3 Qilinçî û tulkindî,*
*4 Qence li nav cuda bin,*
*5 Bo qelsî dewletmendî,*
*6 Mixabin, sed mixabin.*

**S. 13** *1 Qelsî bedîl pê mayî,*
*2 Çakî nayêna xeyale*[3363]*,*
*3 R̂eşaşçîyê*[3364] *ji xweyî r̂azî,*
*4 R̂oja şer̂î, yî betale,*
*5 P'ir̂ gotina li balî,*
*6 Ew jîye bê fesale.*

**S. 13** *1 Qelsî bidî peymayî,*
*2 Çîye wî jin xeyale,*
*3 Her çi mêrê ji xwe r̂a yî,*
*4 R̂oja şer̂î ne li male,*
*5 Pîrka dîtina li bayî,*
*6 Ew jîka tehil û sare.*

**S. 14** *1 Li ba xwedan aqil û k'emala,*
*2 Keĉêt şox û esmer,*
*3 Medene pîr û kala,*
*4 Ew meytin li dara,*
*5 Belê mêrê li ber hikmê jinê,*
*6 R̂ûsipî nabe çu cara.*

**S. 14** *1 Ew jîka tehil û sare,*
*2 Lalî xwedan k'emala,*
*3 Kîjêt şor guhare,*
*4 Et'eken pîr û kala,*
*5 Her meytê li dara,*
*6 Mêrêt qewlê mala.*

**S. 15** *1 Bêtama şarek li pê be,*
*2 Baranîyek bê bi serda,*
*3 Baranî çûne merza,*
*4 Yî sare ji r̂engê cemed,*
*5 Kislan, û lam, û lamîd.*

**S. 15** *1 Mêrêt qewlê jinê bît,*
*2 R̂ûsipî nabin li çu e'rdan,*
*3 Qelsî bidî li pê bit,*
*4 Nabît ji wî xeberdan,*
*5 Bê tama r̂otikek pêbit,*
*6 Baranîyek bi serdan.*

**S. 16** *1 Ĥeyfe ko keĉ û beç,*
*2 Nêzîk bin bed guman,*

---

[3363] *xîyal*
[3364] *r̂eşaşçî* – mirovê yê xwe t'im dip'esinînit

*3 Bed guman nêzîk bin,*
*4 Mîr û silt'an,*
*5 Ĥeyfe ko dibê sefa bin,*
*6 Xwedan zêȓ û xwedan mal.*

**S. 16** *1 Baranî çûnî (t'imid),*
*2 Li ber teda bît dayîm,*
*3 Sare ji ȓengê cemed,*
*4 Kixsarehê milayîm,*
*5 Ĥeyfe bibît keĉ û bed,*
*6 Nêzîkî mîr û ĥakim.*

**S. 17** *1 Xwedan zêȓî xinê,*
*2 Xesîs herî şeqîye,*
*3 Ĥeta lê safî be ȓojî,*
*4 Hî divêt pîne dozî,*
*5 Ĥeyfe ko menceniq,*
*6 Ĉavêt şeng bişojî.*

**S. 17** *1 Jibo ĥakiman mixabin,*
*2 Nizîk bibin bed gewher,*
*3 Ĥeyfe ko zû fena bin,*
*4 Şoxêt (zitikdakir),*
*5 Mixabin ti bê sefa bin,*
*6 Xwedan sîm û xwedan zer.*

**S. 18** *1 Ĥeyfe ko t'oximê*[3365] *kuȓa,*
*2 Wefa dara bibîtin,*
*3 Ĥeyfe ko mîr û ĥekim,*
*4 Beser bibîtin,*
*5 Ĥeyfe ko mezin bide yek xeber,*
*6 Ĥeyfe ko li xebera xwe vebîtin.*

**S. 18** *1 Mixabin ji bo xebîsê,*
*2 Wefadarî ne bîtin,*
*3 Xwedan aqilê p'iȓ huner,*
*4 Ĥeyfe ko berze bîtin,*
*5 Mezin biden yek xeber,*
*6 Direwe lêve bîtin.*

**S. 19** *1 Lêbe ku lê bixebitin,*
*2 Berî t'ertîba*[3366] *hola,*
*3 Goya t'ebabe şkestî,*
*4 Zeĥmete biçite hola,*
*5 Belê p'iȓ bêjê lêv zirav,*
*6 Jê bawer meke çu şola.*

**S. 19** *1 Mixabin lê nixavî,*
*2 Ji ber t'ertîb û yola,*
*3 Gowa şkestî tivavî*
*4 Nahête ber çu hola,*
*5 Nawer neken çu şola,*
*6 Ji p'iȓ bêjêt lêv zirav.*

**S. 20** *1 Bawer bike ji miĥala,*
*2 Yeqîn ya sadiqane,*
*3 Belê p'iȓ k'enîya bê mical,*
*4 Nîşanêt ehmeqane*[3367]*.*

---

3365 *tuxim*
3366 *tertîf*
3367 *eĥmeq*

**S. 20** *1 Bawer neken miĥala,*
*2 Nîşana sadiqane,*
*3 Bê rêzî û bed guman,*
*4 Terzê minafqane,*
*5 P'iȓ sinîya bê mecal,*
*6 Nîşana ehmeqane.*

**S. 21** *1 Ehmeq di p'iȓ nîşanin,*
*2 Nîşanek jê p'iȓ bêjî,*
*3 Li vê dinê çu nizanin,*
*4 Ji ber sewtan û gêjî,*
*5 Zebênî di bê yemanin,*
*6 Ji bo kira nimêjî.*

**S. 21** *1 Ehmeq ti p'iȓ nîşanin,*
*2 Nîşanin jê p'iȓ bêjî,*
*3 Çu ji dinyayê nuzanin,*
*4 Ji ber sewda û gêjî,*
*5 Zebênî ti bê yemanin,*
*6 Ji bo neker nivêjî.*

**S. 22** *1 Ne kira nimêjiye dilȓeş,*
*2 Ĥevsud herî kesare,*
*3 Qelsiye bê miraze,*
*4 Xeber bezîne ȓûȓeşe,*
*5 Bê curetê hiner k'eşe,*
*6 Li ser sifrê ȓibate.*

**S. 22** *1 Neker nivêjê ȓuȓeş,*
*2 Ĥuȓe here kusare,*
*3 Bê curetê huner keş,*
*4 Li ser sifrê ȓobare,*
*5 Xeber bezînê ȓoȓeş,*
*6 Ew qelsê namdare.*

**S. 23** *1 Her dayîme peya ban,*
*2 Qet nabît êmin,*
*3 Tu sed qencî li gel bikî,*
*4 Nabite dost dijmin,*
*5 Ji ber noşî dayîm,*
*6 Hem suhbeta mixabin.*

**S. 23** *1 Her dayî da peya-peyî,*
*2 Bed qalbê nabît êmin,*
*3 Ser qencîyan ti gel keyî,*
*4 Nabîte dost, ne doşmin,*
*5 Digel noş mendîyê meyî,*
*6 Hem suhbeta mixanin.*

**S. 24** *1 Suhbeta ȓeqî be,*
*2 Ji aşiqa ȓa bêtame,*
*3 Heke çikîna ji enzel be,*
*4 Hî li gel qirêye ĥerame,*
*5 Bê sebirê, bêşikirîn be,*
*6 Ji aqilve*[3368] *ne yî t'emame.*

**S. 24** *1 Hem suhbeta ȓeqî bît,*
*2 Bo aşiqa bê tame,*
*3 Çikîna enzelî*[3369] *bît,*
*4 Ti gel qebrî ĥerame,*

---

3368 *êqil*
3369 *endelî*

*5 Bê sebirê na şikirî bît,*
*6 Ji aqilî na ťemame.*

**S. 25** *1 Sebir û aqil ĥesare,*
*2 Tehmule[3370] ji beĥra nîle,*
*3 Nabite hevalê kesî,*
*4 Xelqê fine û ĥîle,*
*5 Belê dilê aşiqê bê yar,*
*6 Ĉirayekî bê fetîle.*

**S. 25** *1 Aqil û sebir ĥisarin,*
*2 T'ehmûl[3371] beĥra nîle,*
*3 Kesê ne got ẍedarin,*
*4 Mêrê bi fetil û ĥîle,*
*5 Dilê bi eşq û yarin,*
*6 Ĉiraẍê bê fetîle.*

**S. 26** *1 Ĉirayê aşiqa zemîr,*
*2 Dil ji kelamî gênce,*
*3 R̂emza dêkeyî ji t'eqdîr,*
*4 Mêzîna Te'alan[3372] û sênca,*
*5 Qelsî bo mêrî nagirt çu û çe,*
*6 Bale şuxula[3373] bê r̂aw û t'egbîr kes nabêje ya qence.*

**S. 26** *1 Ĉiraẍê eşqa zemîr,*
*2 Dil ji kelamî gence,*
*3 Remza ko dêkeyî t'eqdîr,*
*4 Mîzan û le'l û since,*
*5 Şola bê r̂eyî û t'egbîr,*
*6 Kes nabêjît ya qence.*

**S. 27** *1 Nabe hevalê  kesî,*
*2 Xelqê ewanî qumisî,*
*3 Serê p'alî bê minet,*
*4 Mîre li ser t'ext û k'ursî,*
*5 Tu bixweyî kilolekî ĥişkî,*
*6 Sed salî çêtire ji ĥelawa qelsî.*

**S. 27** *1 Qenc nine bibîye heval,*
*2 Ti gel ẍemazî[3374] qelsî,*
*3 Serê bêminet û p'al,*
*4 Mîre li ser t'ext û k'ursî,*
*5 Kilora ĥişkî sed sal,*
*6 Çêtire ji xebîsa qelsî.*

**S. 28** *1 Qenca em bixwen[3375]aẍ û ber,*
*2 Neçîye pêş qilsevanî,*
*3 Heke bêe'sil bûne mêrser,*
*4 Medet[3376] ji destê wî zemanî,*
*5 Nizanit bibite r̂eber,*
*6 Medet ji destê nezanî.*

**S. 28** *1 Çêtir bixweyî aẍ û ber,*
*2 Neçîye pêş qilt'ebanî,*
*3 Bede'sil bûne mirser,*
*4 Ti çerxa vî zemanî,*

---

3370 *teĥemul*
3371 *tehemil*
3372 *le'alan*
3373 *şuxla*
3374 *ẍemaz*
3375 *bixon*
3376 *meded*

*5 Nizanît bîte ȓehber,*
*6 Bê dad ji ber nezanî.*

**S. 29** *1 Nezana, qence berdin,*
*2 Bajon[3377], bila biçine garan,*
*3 Şoẍila deh jê xeber biden,*
*4 Ser nagre t'ucaran,*
*5 Cangê p'akî sipî be,*
*6 Naçe sûka qesaran.*

**S. 29** *1 Nezanî, qence berden,*
*2 Bajon biçîte garan,*
*3 Şola deh jê xeber den,*
*4 Suȓ nagirt çu caran,*
*5 Cangê p'akî sipî bît,*
*6 Naçîte nik qesaran.*

**S. 30** *1 Naçe sûka qesaran,*
*2 Qimaşî p'akî et'lesî,*
*3 Yek xeber û qirara,*
*4 Hîvî nekin ji kesî.*
*5 Belê nesîĥeta bi dirwan,*
*6 K'ar nake bo ĥemû kesî.*

**S. 30** *1 Naçît sûkêt qesaran,*
*2 Qumaşê p'akî et'les,*
*3 Yek xeber û qiraran,*
*4 Hîvî neken ji na kes,*
*5 Nesîĥet p'iȓ dirwan[3378],*
*6 Geȓ nagehîte na kes.*

**S. 31** *1 K'arê nemerda dune,*
*2 Dange bi gênc û qanûne,*
*3 Qeĥpe[3379] yare,*
*4 Felek li p'êye bin cune (bi incune?),*
*5 Hîvî meke bi ye ȓeĥet,*
*6 Yarê felek bê fel bawere.*

**S. 31** *1 K'arê Nemȓûd dane,*
*2 Genca Qarunî dak'et,*
*3 Fulik her wa hazone,*
*4 Hîvî neke bi ye ȓaĥet,*
*5 Yarê bê felî mone,*
*6 Bi taha û berayet.*

**S. 32** *1 Yarê bê fel û bawer,*
*2 Nabê em tê bi fikirin,*
*3 Mêrê ji dilî yek xeber,*
*4 Wek ĉirayekî hilkirî,*
*5 Mêrê zebûnî xweser,*
*6 Salosawîd û xwe nagirî.*

**S. 32** *1 Yarê bê fel û bawer,*
*2 Qenc nîne tê fikirî,*
*3 Yarê ji dil yek xeber,*
*4 Ĉirayeke helkirî,*
*5 Yarê zemanê xweser,*
*6 Salose û çi nakirî.*

3377 *pajo*
3378 *pidirwar*
3379 binêr: *qehbe*

**S. 33** *1 Zemirêt xweserbin,*
*2 Me ji wî îlaĥî qebûle,*
*3 Kom-kom be, ber deb-debe bê,*
*4 Me ji wî îlaĥî qebûle,*
*5 P'ale deme mersebê.*

**S. 34** *1 Mersebe belîwane,*
*2 Peya ne ser ne bûne,*
*3 Me bawerî ji qalbî,*
*4 Sewî dilî zebûne,*
*5 Koçka bê dan (nan) û qehwe,*
*6 Ya qenc ewe, ne çûne.*

**S. 35** *1 Nabê di xweserbin,*
*2 Xulam û xizmet emir,*
*3 Û heke baran şîrin û şekir,*
*4 Be enzel*[3380] *nabit şîrin,*
*5 Belê r̂eqîbê p'ir̂ k'eser bin,*
*6 Ba tê gotîye Amîn!*

**S. 33** *1 Qenc nîne p'ir̂ xweserbît,*
*2 Xulamê xadimet*[3381] *emîn,*
*3 Baran eger şekerbît,*
*4 Enzel nabîte şîrin*[3382]*,*
*5 R̂eqîbî dil k'eserbît,*
*6 Ba te yî gotê Amîn!*

**S. 36** *1 Hun guh bidêrin xelqekî li hêre,*
*2 Ev nesîĥete bi xêre.*

*«Em di kêmin, şêx Adî tememe!»*

## 19. BEYT'A ŞÊWRA[3383] — JANDILA ŞÊWRAN[3384]

**S. 1** *1 Şêwra me ji P'adşaye,*
*2 Mêra bersiva wê daye,*
*3 Şêwirmend bi xwe Xwedaye.*

**S. 2** *1 Yezdane û şêwirmende,*
*2 Xwedan maf nabin winde,*
*3 R̂astî li ba yê r̂inde.*

**S. 3** *1 R̂astî îmana mêre,*
*2 Mêr bi îmanê serwêre,*
*3 P'adşê min vêt hinêre.*

**S. 4** *1 R̂ast bin, ne bes bi gotinê,*
*2 Bi xebat bin r̂ûyê dinê,*
*3 Da li dojêh neyên*[3385] *sotinê.*

**S. 5** *1 Bi xebat bin, ne xew giran,*

[3380] *ĥenzel*
[3381] *xidimet*
[3382] *şirîn*
[3383] http://www.ezdixandi.com/forum/38-842-1
[3384] http://www.ezdixandi.com/forum/38-301-1; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-04.htm
[3385] *nêyn*

*2 Yeqîn*[3386]*, û ĥeq, û erk'an*[3387]*,*
*3 Ol, û îman, û sikan*[3388]*.*

**S. 6** *1 Feqîr xerqe*[3389] *li xwekir,*
*2 Xwe ji malê vê dinê kir,*
*3 Lewma li bihûstê cî*[3390] *çêkir.*

**S. 7** *1 Ew feqîrin zergunin,*
*2 Li xizmeta P'adşê minin,*
*3 Li axretê ew mominin.*

**S. 8** *1 Li dinê xebatk'arin,*
*2 Bi cotin, him cotk'arin,*
*3 Li gel P'adşê min ew yarin.*

**S. 9** *1 Yar ewin bi e'mel bin,*
*2 Li dinê û axretê fer bin,*
*3 Da li dîwanan mefer bin.*

**S. 10** *1 Mefer bin li meydana,*
*2 T'oq*[3391] *û sur̂ nîşane,*
*3 Firwar P'adşê min dane.*

**S. 11** *1 Firwar t'oqa zêr̂îye,*
*2 Nîşana Êzîdîye,*
*3 Ji ba Melikê jorîye.*

**S. 12** *1 Me'niya t'aqê Celewe,*
*2 Dîyariya P'adşê ewe,*
*3 Melek pê pêşr̂ewe.*

**S. 13** *1 Bû serwer li e'zmanî,*
*2 Çak r̂êya Xwedê zanî,*
*3 Bo min ol û erk'anî.*

**S. 14** *1 Erk'ana min eveye,*
*2 Yek Xwedê min e'wileye*[3392]*,*
*3 Nûra wî ĥeft p'arçeye.*

**S. 15** *1 Firwar t'ev ji ba wine,*
*2 T'ev hikmê*[3393] *îlaĥîne,*
*3 Yasayê vî e'rdîne.*

**S. 16** *1 Yasa yeqîna r̂aste,*
*2 Ĥeqîqeta wî bê r̂aste,*
*3 Mêr nabê bêyî weste.*

**S. 17** *1 Ji hosta bibin zanyar,*
*2 Ji Xwedêye ev firwar,*
*3 Da li bihûstê çêkin war.*

**S. 18** *1 Êzîdîya bin xebata xwe*[3394]*,*

---

[3386] *êqîn*
[3387] *itqan*
[3388] *erk'an*
[3389] *xirqe*
[3390] *cih*
[3391] *tok*
[3392] *ewle* — binêr: *ewlîya*
[3393] *hikm*
[3394] *Kur̂manc bin bi e'melê xwe*

*2 Hevalê coketa xwe,*
*3 Da bi r̂û bin li ba P'adşê xwe.*

**S. 19** *1 P'adşê min aqil da te,*
*2 Hingî li dinê bi xebate,*
*3 Ew kes xwedan berat'e.*

**S. 20** *1 R̂astiya berat'ê ewe,*
*2 Xilmeta*[3395] *ĥeq bedewe,*
*3 Hingî li dinê bi Celewe.*

**S. 21** *1 P'adşa nêr û mê dane,*
*2 Ew ji dua'yê P'adşane,*
*3 Hev p'arin li e'zmana.*

**S. 22** *1 Bizava dinê ewin,*
*2 Binyata P'adşê min ewin,*
*3 Ji k'ok û binyat wek hevin.*

**S. 23** *1 E'firandin*[3396]*ji qudretê,*
*2 Bûne cot bo loqetê,*
*3 Wek hevin li ibadetê*[3397]*.*

**S. 24** *1 Yeqîna me Xweda ye,*
*2 Baweriya t'ev Ezda ya,*
*3 Sema herdu nifsa ye.*

**S. 25** *1 Firwar ji ba P'adşaye,*
*2 P'adşa li gotê r̂ewaye,*
*3 Li nêr û mêya dua'ye.*

**S. 26** *1 Nêr û mê ji yek darin,*
*2 T'ev ji kaniya zelalin,*
*3 Dinê û axretê hev p'arin.*

**S. 27** *1 Mor û dua' jî ferin,*
*2 Wekî r̂ojiya mehderin,*
*3 Mehderên her û herin.*

**S. 28** *1 Sê meferên*[3398] *îmanê,*
*2 Gel baweryê û atqanê,*
*3 T'ev li qetê û nîşanê,*

**S. 29** *1 Nîşan t'aqa azdaye,*
*2 T'oq dîyarî ya Xwedaye,*
*3 Atqan pê bû r̂ewaye.*

**S. 30** *1 Hin kolin û koledarin,*
*2 Ji bihuştê xwe bê p'arin,*
*3 Li ba P'adşê min bê warin*

**S. 31** *1 Firwar ji p'îraye,*
*2 Hêvên ji P'adşaye,*
*3 Biken cot ezdaye.*

[3395] *xilamet*
[3396] *afirandin*
[3397] *ebadet*
[3398] *mehwer*

**S. 32** *1 Firwar ji P'adşê delale,*
*2 Ezda lêk ĥelale,*
*3 T'ev ji kaniya zelale.*

**S. 33** *1 T'oq li sukra xwe kirin,*
*2 Milyak'et qebûl kirin,*
*3 Lewma xwe ĥelal kirin.*

**S. 34** *1 E'silê beniya cewhere,*
*2 Suȓe, û nûre, û nezere,*
*3 Lewma çêbûn p'êẍembere.*

**S. 35** *1 T'ev bo ȓastiya însanî,*
*2 Ȓêya Xwedê xwe zanî,*
*3 P'adşa yeke li e'zmanî.*

**S. 36** *1 Pêncin ferzêt Ezdaye*[3399]*,*
*2 Ev firwara P'adşaye*
*3 Axrete û hostaye,*
*3 Mor, û ȓojî, û dua'ye.*

**S. 37** *1 Mora kaniya Sipî fere,*
*2 Laliş cîkî mehdere,*
*3 Suȓa wê jî her û here.*

**S. 38** *1 Da p'aqijkin gîyana xwe,*
*2 Bip'arêze ȓuĥ û canê xwe,*
*3 P'oşman nebe li ȓêka xwe.*

**S. 39** *1 Ji ferê Ezdayî ye,*
*2 Serwer bin li sêwîya,*
*3 Xelqê hejar birçîye.*

**S. 40** *1 Welat bin, welatî bin,*
*2 Bi mor ji kaniya Sipî bin,*
*3 Cindîyê P'adşê jorî bin.*

**S. 41** *1 Ji benî Adem xelat,*
*2 Ji ba P'adşê min berat',*
*3 Da bi destê we bin civat*[3400]*.*

**S. 42** *1 Ȓêka Ezda îmane,*
*2 P'adşayê min semiyane,*
*3 Yeke Xwedê, li e'zmane.*

## 20. BEYT'A MÊZÎNÊ[3401]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Heça t'êlê mêzînê xar bik'işîne,*
*2 Donzdeh*[3402] *p'ût ĥesin ĥeft sala ser pişta xwe digeȓîne,*
*3 Mîre mezin dibê: «Hela heqê wî ťemam nîne!»*

**S. 2** *1 Heça darê mêzînê bigre xare,*

---

[3399] *Pêncin ferzê Ezdaye*
[3400] *civet*
[3401] [29] (гг. 433-434) (№ 1707)
[3402] *duwazdeh*

*2 Bendê li ber mîrê xwe bê zare,*
*3 Xenîmê wî mareke[3403] ĥare.*

**S. 3** *1 Dive t'êl û destmale,*
*2 Binê niga ĥeta serî diale,*
*3 R̂ojê sê cara xûna wî dixare.*

**S. 4** *1 Ji e'zmana mêzîn hate x[w]are,*
*2 T'êlê mêzînê k'etin destê bendane,*
*3 Heçî kesê qelpiya mêzînê dildane,*
*4 Ciyê wî ne e'rde û ne e'zmane.*

**S. 5** *1 Mêzîn ewe, li E'rşane,*
*2 Kirîye neqş û danîye ber ĉavê bendane,*
*3 Ez dibêjime[3404] we şêxan û p'îra, û koçek û beden miskînane,*
*4 Xêra şêx Adî mi r̂a bêjin, çika t'êlê mêzînê k'ê badane?*

**S. 6** *1 Mêzîn heye du birane,*
*2 Bi nîrekî ĥeft t'êlane,*
*3 T'êlê mêzînê destê Horîya bin Ĥenane.*

**S. 7** *1 Mêzîna min ya biçûke,*
*2 Li ber qulix dike yeke cahile bûke,*
*3 Bi gumana Xwedê ewê dergê bihuştê bi destê xwe r̂uĥê xwe veke.*

**S. 8** *1 Mêzîna min ya mezine,*
*2 Li ber qulix dike yeke pîrejine,*
*3 Ciyê wê t'u yêr û welata t'unene.*

**S. 9** *1 Mêzîna min ya mezine,*
*2 Ji E'rşê E'zîm nazilbû, hate e'rdane,*
*3 Ez dibêijme şêxan û p'îrane,*
*4 Ew çi mêre, ku şiklê mêzînê di seĥe te k'ê da, bela kir herçar qulbane?*

**S. 10** *1 Çi mêzîneke ĥelale,*
*2 Malê dinyalikê dikşîne misqal-misqale,*
*3 Mêzîn r̂aste, ne derewe,*
*4 Heçî kesê mêzînê r̂ast bik'işîne,*
*5 Ewê cinetê bi ĉavê xwe bivîne.*

*Em kêmin, û Xwedê t'emame!*

## 21. BEYT'A SERAFÊ HINDÎYE[3405]

**S. 1** *1 Silavêt hindîya bila bêne meydanê,*
*2 Xana gote xumrîya min kas nayê li hanê,*
*3 R̂ondik dibarin wekî tavêt baranê.*

**S. 2** *1 Ne hindîne bengin kela sed carê birca,*
*2 Teyrêt birca bi dengin wê dixûnin li e'rdê,*
*3 R̂eş r̂iĥanî[3406] dişengin, dêçine silavê sorgula p'ir̂ da.*

**S. 3** *1 Dêçine silavêt sorgulan li dîwana e'slanî,*

[3403] *me'r*
[3404] *divêjime*
[3405] [2] (rr. 741-742)
[3406] *r̂eĥan*

*2 Çend bi nefş û sosinan, gulĉîĉek[3407] û r̂ih̑anî,*
*3 Bû ĉirîk ĉirîka[3408]bilbilan, nalîn çan ba e'zmanî.*

**S. 4** *1 Bilbilo, wextê seherê[3409] çira qemê jî t'ebabî[3410],*
*2 Kela aqibo h̑eta r̂oj bêt qîya bî[3411],*
*3 Wekî li te dabû neder, aqil ji serî xwe da bî.*

**S. 5** *1 Aqil di serî dip'arêzan ber hizina[3412] şorşînê,*
*2 Kul û birînêt min di îşan ji ber dax̂a evînê,*
*3 Wekî te derd û neder dik'êşan, ez nesax̂ bûm k'eftime nav nivênê.*

**S. 6** *1 Nexweşekî[3413] giranim, nalîme ji bo birîna,*
*2 Dilo, x̂erîbo, min hilgirin bibine malêt h̑akîma.*

**S. 7** *1 Şuşa t'ijî gulave, kiras situna selayê,*
*2 Sax̂î girtî xunave bi çoka têne semayê,*
*3 Dilo, x̂erîbo, eve mal nine li vê dinyayê.*

**S. 8** *1 Sotim, bûme e'vdal, najîme ji ber birîna,*
*2 Ne sax̂ekî giranim, na jîme nav nivîna,*
*3 Wekî hildikirin find û şemal, çî diqewê bezîna.*

**S. 9** *1 P'erwerek hatî sotin li gel r̂ewneqê destê cemala,*
*2 Wesfet nayête gotin di r̂ûyî delala,*
*3 Dilo, x̂erîbo, min xew nayê ji ber xumrîyan û xala.*

**S. 10** *1 Xala bin guharê, stêra pêş Qemerê,*
*2 Dê pêgirin nederê h̑eta r̂oj tête hêvarê,*
*3 Hey şengê, şox̂ê[3414], şêrînê[3415], esmerê.*

## 22. BEYT'A BEĤRÊ[3416]

**S. 1** *1 Benim, benim h̑eyranî,*
*2 Sibh̑anê sur̂ Celalî li me nû bû nû sal bi qudreta R̂eh̑manî,*
*3 Kewgîrî h̑al pê xweş bû, li Newrazî silt'anî.*

**S. 2** *1 Kewgîrî aşiq bû,*
*2 Sorgul û şebçirax̂î, bilbilî bi îşiq[3417] û dil bû,*
*3 Û enzelîbî[3418] bi derd û dax̂î.*

**S. 3** *1 Ezim feqîrê cara,*
*2 Sefayê wê dîlberê,*
*3 K'amil dibû Adar[ê],*
*4 Melek Zeyîn hate derê.*

**S. 4** *1 Nerm bû hewayê salê*
*2 Xweş bû xewa li xewarê,*

---

[3407] *gulçîcek*
[3408] *cirîk*
[3409] *seh̑ar*
[3410] binêr: *t'emam*
[3411] binêr: *qîyam*
[3412] *h̑izin*
[3413] *nexoş*
[3414] *Şox*
[3415] *şirîn*
[3416] [2] (rr. 743-745)
[3417] *işiq*
[3418] *endelî*

*3 Sibĥan*[3419] *ji te ya qeyîum.*

**S. 5** *1 Xelqno*[3420]*, werin t'emaşa,*
*2 Cebelî bûne p'aşa,*
*3 Berû bûm herî mezlume,*
*4 Cezayekî Xwedê li ser we heye, hûn neken ĥaşa.*

**S. 6** *1 Heke qasidê e'celê hat,*
*2 Felek lê metelib bû,*
*3 Li min zeyîn bû welat,*
*4 Bayê bang mişekil bû*
*5 Li befrê bû hat-hat,*
*6 Bê mek'an û mezal bû.*

**S. 7** *1 Bê mezal û bê mek'an ĥibirê r̂êja ser k'ax̂ezê,*
*2 Ji ĥimrîya dinalî Celal dik'ete lezê,*
*3 Ji ber e'rd û bayêt Nîsanê însan wê dihurmijê.*

**S. 8** *1 Însan ew şefeqete*[3421]*,*
*2 Hawarek tê ji e'zmanî*[3422]*,*
*3 Celatê*[3423] *bê molet bû,*
*4 Îsa wê li ser gumbetê,*
*5 Ji ber dengê Zêndanê.*

**S. 9** *1 Dengê ji Zêndanê der bû,*
*2 R̂oja îzna wî hat,*
*3 Xeyatî tê wer bû,*
*4 R̂oja îzna wî hat*
*5 Êqsîra der bi der bû,*
*6 Şayî*[3424] *xweş bû.*

**S. 10** *1 Behar hat û dikemilî,*
*2 Sîs dibûne gopal,*
*3 Dikene melĥema dilî,*
*4 Sosin, û yasmîn, û çobal.*

**S. 11** *1 Xemilîn, bûne tirî û carek,*
*2 Etlesî p'avê mila,*
*3 Bir̂êne kulîlkêt ĥezar r̂eng bûn,*
*4 Xweş bû lefzeta behara.*

**S. 12** *1 Ji teyra hatî deng,*
*2 Qaz û quling, miravî û werdek,*
*3 Sinî û qazin, seqer û bazin,*
*4 Totî zer Wehabî,*
*5 Wê dixûne r̂engê şazî,*
*6 Sibĥan çî sur̂ şêrîne*[3425]*.*

**S. 13** *1 Ĉirayê îlaĥî hilbû,*
*2 Lewma qumçî bişkiftin,*
*3 Lewnêt wan hilhala,*
*4 Birînêt k'ûr axiftin,*
*5 Ji r̂engê wan zulfane,*

---

[3419] *sibhan*
[3420] *xelk*
[3421] *şifqet*
[3422] *asman*
[3423] *celad*
[3424] *şahî*
[3425] *şirîn*

*6 Xalê tasê hingavtin (hingiftin).*

**S. 14** *1 Cinete û we'de û k'ilîme,*
*2 E'bdo, r̂abe sibeye,*
*3 Deqa siba sare,*
*4 Dil kûkî, dil birîndare,*
*5 Bilbilê dixûne li metane,*
*6 Sibĥan çî sur̂ şêrîne.*

**S. 15** *1 Feqîre û core û e'mere,*
*2 «Fî nefsê tiha ziletê»,*
*3 Berîya me ji berîya alîm bû,*
*4 Şerab li wê kaẍetê,*
*5 Ez bi wê nûrê[3426] dikem li xerdelê,*
*6 Ew bû ĥaca[3427] li ĥacetê,,*
*Xwedê avake mal û mezela em tê!*

## 23. BEYT'A HÊVARÎ[3428] (HÊVARE DEST)

**S. 1** *1 Ya Ellaĥ[3429], r̂oj diço hêvare, hêvare, hêvare deste,*
*2 Seyîdî fesilandbû hêvare, hêvare hêvare deste,*
*3 Mêr û cindîyêt P'adşêne,*
*4 Seyîdî, ya Ellaĥ, ya sermeste,*
*5 Ya Ellaĥ, li k'unî yê mêra xilmet ji dergehê şêx Adî dixweste.*

**S. 2** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj hêvare,*
*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ, ya ji mêrdare,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe wê li Ĥeq ware[3430].*

**S. 3** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj hindave,*
*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ, [ya] zerbave,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li ba xwe li mêra dikir silave.*

**S. 4** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj zerike,*
*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ, ya ji Melike,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe bi xwe xaliqe.*

**S. 5** *1 Seyîdî ya qetê r̂o[j] avaye,*
*2 Mîro, li dergehê P'adşeye,*
*3 Seyîdî wê têda r̂awistaye,*
*4 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe Abu il-Wefaye.*

**S. 6** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj ava bû,*
*2 Mîro, li dergehê P'adşa bû,*
*3 Seyîdî têda r̂awista bû,*
*4 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe Abu il-Wefa bû.*

**S. 7** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj nehîye,*
*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ. ya ji welîye!*
*3 Mîro Abu il-Wefa bû, li bo xwe şêxê Adîye.*

**S. 8** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj di ĥeşêr da,*

---

[3426] *nur*
[3427] *ĥec*
[3428] [2] (rr. 662-665)
[3429] *Ella*
[3430] *heqar*

*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ, ya di hawîr da,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe wê di gelîyê k'ûr da.*

**S. 9** *1 Seyîdî ya qetê r̂oj hingore,*
*2 Mîro, lê cema' dibûn seyîdî, ya Ellaĥ, ya li zore,*
*3 Mîro, dergehê şêx Adî li boa xwe wê li jore.*

**S. 10** *1 Ya Ellaĥ, r̂oj diço, şev dihate,*
*2 Seyîdî li xasa dikir xelate,*
*3 Mîro, ibadet bi serda dihate,*
*4 Ĥeq r̂astî r̂êya şêx Adî bi qosa dihingavte.*

**S. 11** *1 Seyîdî tarîya şewana,*
*2 Sit'are ya mêrane,*
*3 Seyîdî, xas li pê diçine, yê belê dîwane.*

**S. 12** *1 Seyîdî, xas li pê diçine dîwane,*
*2 Wê lêkve diken baẍçan û milkane,*
*3 Seyîdî, ji qiyasê[3431] yê belê ji xulqê[3432] wane.*

**S. 13** *1 Seyîdî here xulq xweştire,*
*2 Maşê wan bitire,*
*3 Seyîdî, hidê[3433] wan, yê belê çêtire.*

**S. 14** *1 Seyîdî li ferdos êwire,*
*2 Mîr ji mêra xelat kire,*
*3 Seyîdî, li wêderêyê belê Selatû p'ire.*

**S. 15** *1 Seyîdî şev tarîne,*
*2 Xasa xerqe hilanîne,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe li wehdanîne.*

**S. 16** *1 Seyîdî şev di xweşin,*
*2 Xasa sur̂ li E'rşin,*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe miraz dibexşin.*

**S. 17** *1 Seyîdî, şev di çê ne,*
*2 Ew xasêt P'adşê ne.*
*3 Seyîdî, ji milkan û baẍa, yê belê miraz pê divêne.*

**S. 18** *1 Seyîdî, ji milkê cinetê,*
*2 Maş dane «ehlê sinetê».*
*3 Seyîdî, maşê wan, yê belê qiyasê xilmetê.*

**S. 19** *1 Seyîdî, cineta mîre,*
*2 Maş dabû feqîra.*
*3 Seyîdî, bar tê nebûn, yê belê çu çerg k'ûre.*

**S. 20** *1 Seyîdî, cineta Melika,*
*2 Maş dabûne aşiqa.*
*3 Seyîdî, bar tê nebûn, yê belê xwedanêt şika.*

**S. 21** *1 Seyîdî, cinetî babane,*
*2 Maş dabûne aşiqane.*
*3 Seyîdî, bar tê nebûn, yê belê çu ol k'işane.*

---

[3431] *qeyas*
[3432] *xulk*
[3433] binêr: *bext*

**S. 22** *1 Seyîdî, cinet, xweş cinete,*
*2 Wê têda Hidrîsî*[3434] *Xeyate.*
*3 Seyîdî, wê didirut, yê belê xelate.*

**S. 23** *1 Seyîdî, wê didirut, wê didete,*
*2 Wê li xasa lêk vedik'ete.*
*3 Ya Ellaĥ, şêx Adî li bo xwe mabû li xilwete.*

**S. 24** *1 Seyîdî, cinet xweş mek'ane,*
*2 Baẍ tê heyne, baẍebane,*
*3 Qesîra nûrî ji binyane,*
*4 Horî li ser r̂awestane.*
*5 Mîro, hile li bejna xasane,*
*6 Şerab li k'asane,*
*7 Horî wê da dinêne ser destane,*
*8 Wêdibene pêşîya xasane,*
*9 Xasêt şêx Adî pê nedibûn berîstane*[3435]*.*
*10 Dîndara silt'an şêx Adî heqê wane.*

**S. 25** *1 Bi Xwedanê k'eremê,*
*2 Cêşê gelîyê Lalişê medet ĥalê me û sinetê.*

*Em di kêmin, Xwedêyî t'emama!*
*T'emametî li Xwedê!*
*R̂eĥme li dayî û babêt guhdara!*

## 24. BEYT'A MÛSA P'ÊẌEMBER[3436]

**S. 1** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Mûsayî bin E'mrane,*
*3 Axî Cebrahîl*[3437] *lê bîye mêvane.*

**S. 2** *1 R̂ojekê kêm t'aqete,*
*2 R̂îya axî Cebraîl mala Mûsa p'êẍember dik'ete,*
*3 Go: «Mûsa tu qe napirsî axîn çi xizmete?»*

**S. 3** *1 Mûsa go: «Wî kim, yekî Ẍefûre,*
*2 Ez r̂uĥê xwe te r̂a nakim destûre,*
*3 Ezî t'enême, hêsîrê minî hûre».*

**S. 4** *1 Go: «Mûsayê bin E'mrano,*
*2 Tu xwe neke hûnano,*
*3 R̂isqê hêsîr ne ser mile min û tewo*[3438]*».*

**S. 5** *1 Mûsa derda çûye male,*
*2 Berda hat dayîka ĥelale,*
*3 Go: «Mûsa, lawo, herr̂o bengzê te mi*[3439] *xweşê, îro çima wa mi tale*[3440]*?»*

**S. 6** *1 Go: «Dayîka mine pîre,*
*2 Mi ĥelal ke şîre,*

[3434] *Îdrîs*
[3435] *barsitan*
[3436] [29] (гг. 438-440) (№ 1710)
[3437] *Cibraîl*
[3438] *teo*
[3439] forme kurtî: *min*
[3440] *te'l*

*3 Hatîye ser min ferwara mîre».*

**S. 7** *1 Di vê[3441] Mûsa r̂abû[3442] mal r̂evîye,*
*2 Ber k'etin deşt û zozen, çîye û banîye,*
*3 Mûsa p'êẍember çû ser du cane qîmetîyê.*

**S. 8** *1 Mûsa lê dipirse, dive: «Ew çi mezele, hûn vedidin?»*
*2 Wane got, go: «Mûsayê min, mirîke me heye male Mekke,*
*3 Bejnê û bale qedeme teke,*
*4 Go, hela were têk'evê, çika weke, yan ne weke?»*

**S. 9** *1 «Serê t'irbê min kine,*
*2 Berê t'irbê min kine,*
*3 Bîn-buxsa vê t'irbê mi[3443] xine».*

**S. 10** *1 «Serê t'irbê min zere,*
*2 Berê t'irbê min zere,*
*3 Bîn-buxsa vê t'irbê mi were».*

**S. 11** *1 «Serê t'irbê min r̂eşe,*
*2 Berê t'irbê min r̂eşe,*
*3 Bîn-buxsa vê t'irbê mi xweşe».*

**S. 12** *1 Ĉav ser serî bûne t'ase,*
*2 T'ilî bûne r̂isase,*
*3 Neynik bûne de'se,*
*4 Xazila minê wî e'vdîda, bê gune yî, bê e'sase[3444],*
*5 Axretê her pênc t'irêqê xweyî xilase.*

*Mûsa, hat dît wekî ew k'ulingê pê e'rdê vedidin zêr̂e, me r̂a pê xalîyê derdixin zêr̂e. Mûsa, hat gote wane, go: «Ew çi mirîye, wekî hûn hatine t'irba wî vedidin, k'uling zêr̂, mer̂ zêr̂?»*

*Ewane got: «Me bîrkirîye, çapa mirî neanîye wekî em qasî çapa wî mezel vedin».*

*Go: «Em te dinêr̂in, bejnê û bale we nona hevduye. Go, were mezel da p'alde, em binêr̂in çike weke, yan ne weke? Emê me r̂a zêr̂în, k'ulingê zêr̂ jî bidine te bive her̂e».*

*Mûsa timayî kir, mezel da p'alda. axî Cebraîl[3445] serda sekinû, Mûsa lê nihêr̂î, go: «Axî Cebraîl tuyî?*

*Go: «Lê ezim. Tu çawa destê min xilasbî?»*

## 25. BEYT'A EYÛB P'ÊẌEMBER[3446]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Ĥemû nebîya bînin,*
*2 Û ĥemû weliya bicemînin,*
*3 Sebreka wekî sebra Eyub nabînin.*

**S. 2** *1 Sebra Eyub, sebreka çêye,*
*2 Kirma xweribû pêye,*
*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya Xwedêye».*

**S. 3** *1 Sebra Eyub, sebreke cake,*
*2 Kirma xweribû saqe,*

---

[3441] *divê*
[3442] *ravû*
[3443] forme kurtî: *min*
[3444] *asas*
[3445] *Cibrahîl*
[3446] [51] (rr. 533-536)

*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya ȓezaqe».*

**S. 4** *1 Sebra Eyub, sebreke k'ake,*
*2 Kirma xweribû çake,*
*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya melik*[3447] *il-Foqe».*

**S. 5** *1 Sebra Eyub sebreke hana,*
*2 Kirma xweribû ȓana,*
*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya melik il-Ȓeĥmana».*

**S. 6** *1 Eyubî sebreka li nike,*
*2 Kirma xweribû zike,*
*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya Xaliqe».*

**S. 7** *1 Sebra Eyub, sebreke kişte,*
*2 Kirma xweribû pişt û tenişte,*
*3 Eyubî şukir ji navê Xwedê dixweste.*

**S. 8** *1 Sebra Eyub, sebrî hende,*
*2 Kirma xweribû zende,*
*3 Eyubî şukir ji navê Xwedê dixwende.*

**S. 9** *1 Sebra Eyub, sebrî buwe,*
*2 Kirma xweribû stu û ȓuwe,*
*3 Eyubî şûkir ji navê Xwedê dixwest zuwe.*

**S. 10** *1 Sebra Eyub, sebreke here,*
*2 Kirma xweribû sere,*
*3 Eyubî got: «Şûkir ji te ya melkê Ekbere».*

**S. 11** *1 Eyubî sê tişt mane,*
*2 Ĉave, û dile, û zimane,*
*3 Ĉav dinêrin mêrane,*
*4 Ziman dixunit k'itêbane,*
*5 Dil k'ursiya ĥebîbê Ȓeĥmane.*

**S. 12** *1 Kirmê Eyubî geȓiya serta sere,*
*2 Tiştek nedît ji xwe ȓa,*
*3 Eyubî got: «Şukir ji te ya melkê Ekbere».*

**S. 13** *1 Kirmê Eyubî yê sore,*
*2 Li leşê Eyubî geȓiya dormandore,*
*3 Tiştek nedît ji xwe ȓa*[3448]*,*
*4 Eyubî got: «Ya melikê bi soȓe».*

**S. 14** *1 Kirmê Eyubî ȓeşe,*
*2 Li loşê Eyubî geȓiya feriş bi ferşe,*
*3 Tiştek nedît yê xweşe*[3449]*,*
*4 Eyubî got: «Şukir ji te ya Melikê E'rşe».*

**S. 15** *1 Kirmê Eyubî sipîye,*
*2 Gehişte serê dilîye,*
*3 Devê Eyubî wê dinalîye.*

**S. 16** *1 Emîn Cebraîl*[3450] *wê lê dixurîye,*

---

[3447] *melek*
[3448] *xore*
[3449] *xoş*
[3450] *Cibraîl*

*2 Eyubo, bes binalîye,*
*3 Dê te ji dereca mêra keme xalîye.*

**S. 17** *1 Cebraîl yî axîye,*
*2 Çu gehişte baqîye,*
*3 ÎNabû şiva qudretîye.*

**S. 18** *1 Ser leşê Eyub danîye,*
*2 Leşê Eyub çêtir kir ĥeft cara ji berîye,*

**S. 19** *1 Hol-hola, loşê Eyubî kire ciya êkî pola,*
*2 Eyub hola xwe birbû ser hola …*

*Em di kêmin û Xwedê yî t'emame!*

## 26. BEYT'A BILBILÊ

**şaxê — 1**[3451; 3452; 3453; 3454]

**S. 1** *1 Sibĥane ji te sibĥane,*
*2 Cî hikmekî hoy girane,*
*3 Hun biȓênin*[3455] *bilbilî û teyrane.*

**S. 1** *1 Sibĥane*[3456] *ji te sibĥane,*
*2 Ci hikmekî hoy girane,*
*3 Wê hatîye ser bilbilî û teyrane.*

**S. 1** *1 Sibĥane ji te sibĥane,*
*2 Cî hikmekî girane,*
*3 De emê bidin medhê*[3457] *bilbilê teyrane.*

**S. 1** *1 Sibĥan ji te sibĥane,*
*2 Ewe çî hikmekî hoy girane,*
*3 Li ser bilbilê miskîn û çiqas teyrane.*

**S. 2** *1 Wextekî teyr dê cema'bin,*
*2 Dê bi ȓayekî ȓabin,*
*3 Benda bilbilê miskîn dê damabin.*

**S. 2** *1 Wextekî teyr cema'bûn,*
*2 Li ser derekê ȓawestabûn,*
*3 Li benda bilbilê miskîn damabûn.*

**S. 2** *1 Çiqas teyr lêk ce'm habûn,*
*2 Ser ȓeĥekî ȓawastyabûn,*
*3 Belê, benda bilbilê miskîn damabûn.*

**S. 2** *1 Silêman p'êẍember teyr cema kirin û cemabûn,*
*2 Li ȓayekê ȓawestabûn,*
*3 Li benda bilbilê miskîn damabûn.*

**S. 3** *1 We dibêje mezinê teyrane:*
*2 «Wê diçîne ba mîr Silêmane»,*
*3 Go: «Mîro, emê digrîn wek tavêt barane.*

**S. 3** *1 We dibêjit mezinê teyrane:*
*2 «Da biçîne bo mîr Silêmane,*
*3 Da bigirîn wekî tavêt barane».*

---

[3451] Ji qewlên Şêx Fexrê Adîyan [2] (rr. 723-729)
[3452] [1] (pp. 256-261)
[3453] [2] (rr. 717-722)
[3454] [51] *Beyt'a bilbil û Silêman p'êxember* (rr. 537-540)
[3455] *biȓêne*
[3456] *sibhan*
[3457] *metĥ*

**S. 4** *1 Mîro, emêt girîn û wê dibarînin,*
*2 Çang û baska ji xunava berê sibê daweşînin,*
*3 Da benda bilbilê miskîn bi gazînin.*

**S. 4** *1 Da bigirîn û bibarînîn,*
*2 Çang û baska ji xunava berê sibê weşînîn,*
*3 Li benda bilbilê miskîn bigavînîn».*

**S. 5** *1 Mîro, bi xêrwê bêt behare,*
*2 Em bi r̂ojê dixûnin bi ĥezare*[3458]*,*
*3 Bi şevêt giran xitm diken deft'erkê ji deft'erêt mare.*

**S. 5** *1 Bi xêr bêt behare,*
*2 Bilbil dixwinit bi ĥezare,*
*3 Bi şevê vedket deft'era mare.*

**S. 3** *1 «Ya mîro, xêr bêt bihare,*
*2 Bilbil r̂ojê dibet ĥezare,*
*3 Belê, şevêd giran dixûne deft'er ji deft'erê mare*[3459]*.*

**S. 3** *1 Bilbilo, bi xêr bêt behare,*
*2 Li şevêt giran wê dixûnin bi zare,*
*3 Deft'erkê*[3460] *ji deft'erêt mare.*

**S. 4** *1 Ya mîro, biha[r] xêr bêt,*
*2 Bilbil r̂ojê hin divêt,*
*3 Belê, şevêd giran dengê xwe distirêt».*

**S. 6** *1 Mîro, behar wê bêyîyo,*
*2 Bilbil bi r̂ojê zav dibêyo,*
*3 Şevêt giran bi dengê xwe distirêyo».*

**S. 6** *1 Bi xêr behar bêyîyo,*
*2 Bilbil k'efte xewêyîyo,*
*3 R̂ojê bi destê xwe distirêyîyo».*

**S. 4** *1 Bilbil, bi xêr behar bêyîyo,*
*2 Bilbil bi r̂ojê li wê hizrêyo,*
*3 Bi şevêt giran bi dengê xwe distirêyo».*

**S. 7** *1 We dibêjit mezinê teyrane:*
*2 «Bêjne mîr Silêmane,*
*3 Ewe çîye, ji teyra bilbil ne li virane?»*

**S. 7** *1 Silêman p'êẍember we dibêjîye:*
*2 «Bilbil teyrekî aẍîye,*
*3 Xwezî*[3461] *min zanîya meskenê wî k'o dibîye?»*

**S. 10** *1 Mîr Silêman we dibêjîye:*
*2 «Ew teyrê hoy k'ubarî aẍîye,*
*3 Xwezî min zanîba mesken wî li k'î cîye?»*

**S. 6** *1 Silêman p'êẍember go: «Ew teyrê hoyî aẍîye,*
*2 Xazila min bizanbîya cî wet'anê bilbilê miskînê k'u dibîye?»*

**S. 5** *1 Mîr Silêman ji teyra dipirsîye:*
*2 «Ji we k'î nehatîye?»*
*3 Wê dibêjîye qomesîye*[3462]*:*
*4 Dibêjiyê: «Mîro, bilbil ne hatîye».*

**S. 8** *1 Silêman p'êẍember we diket suxne:*
*2 «Bilbil teyrekî p'ir̂ gotine,*

---

[3458] *hezar*
[3459] *me'r*
[3460] *devter*
[3461] *xozî*
[3462] *qûmis*

*3 Yeqîn[3463], bilbil ne yî li ber hikmê mine».*

**S. 9** *1 Mîr Silêman we diket gotine:*
*2 «Ew teyrê hoy k'ubarî mezine,*
*3 Yeqîn, ne yî li ber hikmê mine!»*

**S. 5** *1 Silêman p'êẍember go: «Ew teyrê hoyî p'îȓ gotine,*
*2 Yeqîn hûn bizanbin, ew jî ne ber er hikmê mora mine».*

**S. 6** *1 Mîr Silêman wê dike gotin:*
*2 «Yê ev teyrê hey mezine,*
*3 Yeqîn, ne yî li ber hikmê mine».*

**S. 7** *1 Mîr Silêman wê we dibêjîye:*
*2 «Ev teyrê wey axîye,*
*3 Hûn bi Xwedê ken, meskenê wî li k'ude bîye?»*

**S. 9** *1 We dibêje qomesîyê teyrane:*
*2 «Wê diçite ba mîr Silêmane»,*
*3 Dibêje: «Mîro, meskenê bilbil nava baẍê gulane».*

**S. 8** *1 We dibêjit qomesê teyrane:*
*2 «Mîrê min, eve çîye ji teyra bilbil nehane?»*

**S. 7** *1 We dibêje qomesîyê[3464] teyrane:*
*2 «Ya mîro, ew e'rdê bilbilê miskîn lê kirîye mik'ane,*
*3 Wê li ada ĥeft[3465] beĥra[3466], nav baẍê gulane».*

**S. 10** *1 We dibêje qomesîye:*
*2 «Bi dîwana mîr Silêmanve di çîye,*
*3 Meskenê bilbil nava gulêt sor û sipîye».*

**S. 11** *1 We dibêjit qomesîye[3467] têyrane:*
*2 «Li ba min we e'yane,*
*3 Meskenê bilbil, wê li nav baẍê gulane».*

**S. 12** *1 Mezinê teyra we dibêjîye:*
*2 «E'rdê bilbil, mesken lê girtîye,*
*3 Wê li nav baẍê gula sor û sipîye».*

**S. 11** *1 Silêman p'êẍember we dike firware,*
*2 Ji teyra bazî dijmare[3468],*
*3 Kire qasid û ba bilbilîve dihinare.*

**S. 13** *1 Silêman p'êẍember we diket firware,*
*2 Ji teyra bazî vedijmare[3469],*
*3 Bazî kire qasid, ba bilbil da dihinare.*

**S. 8** *1 Silêman p'êẍember wa dikire fermane,*
*2 Ji teyra, teyrê bazî dij[m]are[3470],*
*3 Kir qesid pey bilbilê miskîn dihinare[3471].*

**S. 8** *1 Mîr Silêman wê dikire firware,*
*2 Ji teyra bazî dijmare,*
*3 Kire qasid di pê bilbil ȓa dihinare.*

**S. 12** *1 Go: «Bazîyo, heȓe bilbilî bîne,*
*2 Ȓuĥa wî jê mestîne,*
*3 Bi saẍî bigre, bo mi bîne».*

**S. 14** *1 Silêman p'eẍember dibêjite bazî:*

---

[3463] *êqîn*
[3464] *qoms*
[3465] *ĥevt*
[3466] *be'r*
[3467] *quma*
[3468] *dijwar*
[3469] *vedijwar*
[3470] *dijar*
[3471] *diniare*

*2 «Heȓe bilbil bo min bîne,*
*3 Ȓuĥa şîrin lê nestîne,*
*4 Bi saẍî bigre û bo mi bîne».*

**S. 9** *1 Bazîo, heȓe bilbil bîne,*
*2 T'ek ȓuĥê şîrin jê nestîne,*
*3 Belê saẍî bigre, ji min ȓa bîne».*

**S. 13** *1 Bazî difiȓîye,*
*2 Welat berwelat geȓîye,*
*3 Meskenê bilbil dîtîye.*

**S. 15** *1 Bazî ji wê fiȓîye,*
*2 Welat û berwelat geȓîye,*
*3 Meskenê bilbil nedîye.*

**S. 10** *1 Bazî wa difiȓe,*
*2 Welat berwelat digeȓî,*
*3 Cî-wet'anê bilbilê miskîn dipirsî.*

**S. 9** *1 Baz ji wê derê bifiȓîye,*
*2 Welat û berwelat geȓîye,*
*3 Meskînê bilbilî qet nedîye.*

**S. 14** *1 Bazî fiȓî ji hindava,*
*2 Welat û berwelat geȓave,*
*3 Meskenê bilbil dîtbû bi ĉave.*

**S. 16** *1 Bazî fiȓî ji hindava,*
*2 Ço wî alî herdu ava,*
*3 Ȓênî bilbil t'extê wî danayî nav baẍê gulava.*

**S. 11** *1 Bazî fiȓîbû, çûbû pişt ava,*
*2 Welat berwelat dîtbû herdu ĉave*[3472]*,*
*3 Dît baẍê gula da bilbilê miskîn nave.*

**S. 10** *1 Baz ȓabû ji hindave,*
*2 Ço aliyê herdu ave,*
*3 Bilbil t'ext çêkir li nav baẍê gula û bilbil li nave.*

**S. 17** *1 Bazî ji hindav da fiȓîye,*
*2 Welat û berwelat geȓîye,*
*3 Dît meskenê bilbil gula sor û sipîye.*

**S. 15** *1 Bazî çoye cîyekî xalî,*
*2 Dî bilbilî t'extê danî,*
*3 Bilbilê miskîn di navda dinalî.*

**S. 19** *1 Bazî fiȓî ço ciyê xalî,*
*2 Rênî bilbilî t'extê wî danayî,*
*3 Sorgul bi serda, bilbilê miskîn li navda dinalî.*

**S. 13** *1 Bazî fiȓîbû, çûbû ciyêd xalî,*
*2 Dît baẍêd gula da bilbilê miskîn t'ext danî, sorgul ser ȓa dip'alî,*
*3 Wê li nav baẍê gulada dinalî*[3473]*.*

**S. 12** *1 Ez çume e'rdekî xalî,*
*2 Bilbil t'ext dana, sorgul serda p'alî,*
*3 Go: «Bilbil boçî tu di navda dinalî.*

**S. 16** *1 Bazî çowe cîkêt*[3474] *bestî,*
*2 Dî bilbilî t'extê danî, sorgul bi serda şkestî,*
*3 Bilbilê beze miskîn di navda yî nivistî.*

**S. 18** *1 Bazî fiȓî, ço ciyê bestî,*

---

[3472] *ĉe'v*
[3473] *dine'lî*
[3474] *çîkêt*

*2 R̂ênî, bilbilî t'extê danayî, sorgul bi serda şkestî,*
*3 Bilbilê miskîn di navdayî nivistî.*

**S. 12** *1 Bazî fir̂îbû, çûbû ciyêd bestî,*
*2 Dît baẍê gula da bilbilê miskîn t'ext danî, sorgul ser r̂a dişkestî,*
*3 Wê li nav baẍê gula da nivistî.*

**S. 11** *1 Ez çume e'rdê bestî,*
*2 Bilbilî t'ext dane û serda şkestî,*
*3 Bilbilê miskîn di navda nivistî.*

**S. 17** *1 Go: «Bilbilo, hoy bilbilo!*
*2 Hey ĥeyrano, sotî dilo,*
*3 Tuyê li nava gûla, ĥizreta te ew gulo!*

**S. 20** *1 Bazî bang*[3475] *dike: «Bilbilo, hey bilbilo!*
*2 Ĥeyrano, sotî dilo,*
*3 Tuyê li nav baẍê gûla, ĥizret gulo!*

**S. 14** *1 Bazî go: «Bilbilo, hey bilbilo!*
*2 Ĥeyrano, sotî dilo,*
*3 Te li nav baẍê gula da, ĥizretîya te çima gulo!*

**S. 21** *1 Bilbilo, teyrê mane,*
*2 E'zîzê meha Gûlanê,*
*3 Mîr te dixwazit, were biçîne dîwanê».*

**S. 18** *1 Bilbilo, yî dil derwêşe,*
*2 Min xetek anîye ji pêşe,*
*3 Silêman peẍember wê li te dike t'eftêşe.*

**S. 22** *1 Bazî ba dik'etê: «Bilbilo dil derwêşo!*
*2 Min xeta te îna ji pêş Silêman p'eẍembero,*
*3 Mezinê teyra li te diket t'eftêşo!»*

**S. 15** *1 Bazî go: «Bilbilê dil derwêşo,*
*2 Min xeta te anîye pêşo,*
*3 Belê Silêman p'eẍember te dike t'eftêşo*[3476]*».*

**S. 14** *1 Bilbilê mino yî dil derwêşe,*
*2 Mîr Silêman teyra diket t'eftêşe,*
*3 Min xeta te wa înayî ji pêşe.*

**S. 16** *1 Bazî go: «Bilbilê dil şerqîo,*
*2 Pey te bûye hizêz û gazîo,*
*3 Belê, Silêman p'eẍember te dixazîo».*

**S. 23** *1 Bazî ba diketê: «Bilbilo, dil kovane,*
*2 Mîr Silêman û mezinê teyra li ser te girtî civane*[3477]*,*
*3 K'eremke, min xeta te wa înayî ji ba wane».*

**S. 13** *1 Bilbilê mino [yî] dil bi kovane,*
*2 Min xeta*[3478] *te înayî ji bo wane.*

**S. 19** *1 Bilbilo, yî dil feqîre,*
*2 Min xetek anîye ji ba mîre,*
*3 Silêman peẍember wê li te ke êqsîre».*

**S. 24** *1 Bazî go: «Min xeta te wa înayî ji ba mîre,*
*2 Dê te ji van cîya kem êqsîre».*

**S. 20** *1 Bilbil go: «Ez bi wî kem, yî R̂eĥmane,*
*2 Ĥeta r̂uĥ di ber canê min dane,*
*3 Ez naçime dîwana mîr Silêmane.*

---

[3475] *ban*
[3476] *tewtêş*
[3477] *covan*
[3478] *sehet*

**S. 25** *1 Bilbil dibê: «Bi wî kem R̂eĥmanî,*
*2 Min divêt tu r̂uĥa min bik'êşî ji vî canî,*
*3 Bi saxî ez neçme ba mîr Silêmanî».*

**S. 17** *1 Bilbil go: «Ez wî kem, R̂eĥmanî,*
*2 R̂uĥê şîrin ji qalbî bik'şînî gîyanî,*
*3 Belê nayême dîwana mîr Silêmanî».*

**S. 15** *1 Bilbil dibêjite bazê pîra: «Bi wî kem, yî R̂eĥmane,*
*2 Min gulek wa hey nadem bi çîqas dane,*
*3 Ez naçime ba mîr Silêmane».*

**S. 26** *1 Bilbil dibê: «Bi wî kem nabit fine,*
*2 Tu çend bikeyî gotinê,*
*3 Ba çime nik mîrê bin ĥûkmê jinê».*

**S. 21** *1 Ez bi wî kem, Ekbere,*
*2 Ĥeta r̂uĥ ji qalbê min neçe dere,*
*3 Ez naçime dîwana mîr Silêman pex̂embere».*

**S. 22** *1 Bazî go: «Bilbilo, bes bike gur̂an û gefe,*
*2 Tu neçu teyrî ji wan r̂efa,*
*3 Ezê te bigrim bi herdu k'efe,*
*4 Dê te êqsîr bikem ji dîyan û t'erefe».*

**S. 27** *1 Bazî dibê: «Bilbilo, tu teyrekî ji wan r̂efa,*
*2 Bes gefa bide sar gefa,*
*3 Dê te êqsîr kem bi herdu k'efa,*
*4 Dê te bem ji van ciya, ji van t'erefa».*

**S. 18** *1 Bazî go: «Bilbilo, bese bike van gefa,*
*2 Tu ne teyrekî ji ĥemû r̂efa,*
*3 Ezê te bigrim herdu k'efa,*
*4 Hêsîr bikim ji welat û t'erefa».*

**S. 16** *1 «Bilbil, tu teyrekî ne ji wan r̂efe,*
*2 Bes gava bide ber van gefe,*
*3 Ez dê te girim bi herdu k'efe,*
*4 Dê te êqsîrkem ji van t'erefe».*

**S. 23** *1 Bazî li bilbila dihat û dibire,*
*2 Bi bayî r̂a dabû xebera,*
*3 Go: «Bilbilê beze miskîn gelekî li we gula r̂a yî k'esere».*

**S. 24** *1 Ba r̂awestabû li bere,*
*2 Bi sorgula r̂a dabû xebere,*
*3 Bilbilê beze miskîn dibêjit: «Paşî min amanet[3479] gulêt sor û zere.*

**S. 28** *1 Bazî, bilbil girt û bire,*
*2 Bilbil bi bayî r̂a det xebere,*
*3 Amanet[3480] gula mina sor û zere.*

**S. 19** *1 Bilbil gel bayê didet xebere,*
*2 Bilbil gel bayê didet xebere.*

**S. 25** *1 Amanet û sed amanet*
*2 Ew gula ez dibûme ĥezret[3481]*
*3 Paşî min ne bişkive qet û qet*

**S. 29** *1 Bazî, bilbil girt û dibete,*
*2 Bilbil deng diket bi t'aqete:*
*3 «Gula ez bi ĥezrete,*
*4 Bila ne bişkivit qet û qete».*

[3479] *imanet*
[3480] *êmanet*
[3481] *hizret*

**S. 20** *1 Bao, amanet, sed amanet,*
*2 Amanet heye t'aqet,*
*3 Ew gula ez lê dibûm ĥizret*
*4 Bira paşî min gul nav baẍda ne bişkivtin qet bi qet».*

**S. 26** *1 Amaneta û we qetî,*
*2 Ew gula ez bi ĥezretî,*
*3 Paşî min ne bişkive qet û qetî».*

**S. 30** *1 Bazî, bilbil girt û diîna,*
*2 Bilbil bi bayî ȓa deng hiltîna:*
*3 «Bextê teme, gula min sor û sipî newerîna».*

**S. 17** *1 Baz bilbil girt û îna,*
*2 Bilbil bi bazî ȓa deng dihiltîne,*
*3 Go: «Bextê Xwedê û teme, gula min newerîne».*

**S. 27** *1 Bilbilo,teyrê manê,*
*2 Meh e'zîze li gûlanê,*
*3 Silêman p'êẍember teyr xwendîne dîwanê.*

**S. 28** *1 Bilbilo, teyrê şîrin hestî,*
*2 Silêman p'êẍember tuyî xwestî,*
*3 Teyra gil[î] girt û bire destî.*

**S. 31** *1 Bazî, bilbil girt û anî,*
*2 Li ba Silêman p'êẍember danî.*
*3 «Hey bilbilo dil ȓeĥmanî,*
*4 Min e'fû*[3482] *ser te danî.*

**S. 18** *1 Bazî bilbil girt û anî,*
*2 Li dîwana mîr Silêman danî,*
*3 «Ha bilbil, te çî dikir, tu hindî bê zimanî?»*

**S. 29** *1 Bazî, bilbil di dest da danî,*
*2 Bilbil go: «Mîro, tu wê dizanî,*
*3 Qence ĥeq ȓêya Xwedê bizanî.*

**S. 30** *1 Tu mîr, û ez xulam,*
*2 Hincîyê nuqtekî*[3483] *ji vê k'asê bike tam,*
*3 Qence bêye serî, aqil, û fem.*

**S. 31** *1 Mîro, tu xinê!*
*2 Hincîyê ji vê k'asê vexwe bi t'inê,*
*3 Qecne ew mezlum ne geȓe li dine».*

**S. 32** *1 Birîne bilbilî û gule,*
*2 Û şîrin şîrin hiltîne denge,*
*3 Go: «Mîro, ẍenîmê min bixune, k'a biȓêne yî çende?*

**S. 23** *1 Silêman p'êẍember go: «Hûn binêrin bilbilû ȓengî*[3484]*,*
*2 Şîrin û şîrin hiltîne dengî».*
*3 Bilbilê miskîn go: «Mîro, bixûne bira xenîmê min bêne ĉengî».*

**S. 24** *1 Silêman p'êẍember go: «Hûn binêrin bilbilû xeberdanê».*
*2 Silêman p'êẍember teyr xandibû dîwanê,*
*3 Bilbilê miskîn go: «Mîro, xenîmê min k'anê?»*

**S. 34** *1 We dibêje kewe.*

---

[3482] *e'f*
[3483] *nuxt*
[3484] *bilbil û ȓengî*

*2 Go: «Mîro, hincîyê mêra, meleka birîne cewe,*
*3 Şevêt giran ew naket xewe».*

**S. 34** *1 Wa dibêjit kewe:*
*2 «Hincî mola meleka birîn li cewe,*
*3 Şevêt giran naketin xewe».*

**S. 21** *1 We dibêje kewe:*
*2 «Hincîyê ji mêra û meleka birîne cewe,*
*3 Şevêt giran naket xewe».*

**S.35** *1 We dibêje kewîne:*
*2 «Mîro, hincîyê mêra, meleka sotî birîne*
*3 Şevêt giran xew lê nîne».*

**S.35** *1 Wa dibêjit kewîne:*
*2 «Hincî mola meleka dilbirîne,*
*3 Şevêt giran xew lê nîne».*

**S.22** *1 We dibêje kewîne:*
*2 «Mîro, hincîyê mêra, meleka sotî birîne*
*3 Şevêt giran xew lê nîne».*

**S. 36** *1 We dibêje tote:*
*2 «Hincîyê mêra, meleka birîn sote,*
*3 Şevêt giran xew ne k'arê wîye, xew k'arê gayê cote».*

**S. 32** *1 Ez bêjim tote,*
*2 Hincî mola meleka birin cote,*
*3 Pîşî gayê cote».*

**S. 25** *1 Wa dibêje tote:*
*2 «Ya mîro, ȟeçê mêra û meleka birîn û sote,*
*3 Belê, şevêt giran pêşê gayê cote».*

**S. 19** *1 We dibêje tote:*
*2 «Ser mêr[3485] û meleka dibe sote,*
*3 K'o şevêt giran xwe pêşî gayê cote».*

**S. 37** *1 We bêye totake:*
*2 «Mîro, hincîyê mêra, meleka sotî mêlake,*
*3 Şevêt giran xewê nake»*

**S. 33** *1 Wa dibejît tote:*
*2 «Hincî mola meleka birîn mêlake,*
*3 Şevêt giran xewê nake».*

**S. 26** *1 Wa dibêje totake:*
*2 «Ya mîro, ȟeçê mêra û meleka sotibû mêlake,*
*3 Belê, şevêt giran xewê nake».*

**S. 20** *1 We dibêjit totake:*
*2 «Hincîyê ji mêra û meleka sot mêlake,*
*3 Şevêt giran xewê nake».*

**S. 38** *1 We dibêje r̂eşêlake:*
*2 «Mîro, hincîyê mêra, meleka sotî mêlake,*
*3 Ew şevêt giran xewê nake».*

**S. 36** *1 Wa dibêjit r̂eşêle[3486]:*
*2 «Mîrim ewin, eve ne fikire û ne fête,*
*3 Te ev teyrine kirine qeydê de».*

**S. 23** *1 R̂esolî we dibête:*
*2 «Mîro, ewe ne fikre û ne fête,*
*3 Te ev teyr hebû kirî qeydê da».*

**S. 39** *1 We dibejît e'ndele:*

---

[3485] *mîr*
[3486] *reşole*

*2 «Mîro, hincîyê mêra, meleka sotîbû dile,*
*3 Şevêt giran xew ne dikire».*

**S. 40** *1 We dibejît e'ndelîbe:*
*2 «Hincîyê r̂agire dilê xelqê ẍerîba,*
*3 Ewî, bêşik li bihuşta*[3487] *baqî heye nesîne».*

**S. 38** *1 We dibejît e'ndelîbe:*
*2 «Hincîyê r̂agirit dilê ẍerîba,*
*3 Dê li ber (şabaqê) hebititin nesîbe».*

**S. 27** *1 We dibejît e'ndelîbe*[3488]*:*
*2 «Ya mîro, ĥeçê r̂agirt dilêt ẍerîba,*
*3 Bahişta baqîn p'ar tê hebet nesîbe»*

**S. 41** *1 We dibêje şalûle:*
*2 «Mîro, bilbil teyrekî bi nûre,*
*3 Qence tu xelat bikî, bidî destûre».*

**S. 37** *1 We dibêjit şalûle:*
*2 «Ji teyra, ew teyrekî bi nûre*[3489]*,*
*3 Mîro bide destûre,*
*4 R̂êya bilbil qey ye dûre».*

**S. 28** *1 Wa dibêje şalûle:*
*2 «Ya mîro, bilbil teyrekî nûre,*
*3 Xelat bike, bide destûre».*

**S. 24** *1 We dibêje şalûle*[3490]*:*
*2 «Ji teyra ew teyrekî bi nûre,*
*3 Go mîro, desturiya bilbil bide, r̂êya wî dûre».*

**S. 42** *1 Silêman p'êẍember bilbil xelat dikire,*
*2 Deng li dara ter̂ dikire,*
*3 Bişkiftin kulîlkêt sor û zere.*

**S. 29** *1 Silêman p'êẍember bilbil xelat dikir, dida destûre,*
*2 Ji gula k'etibûn gulê sor û zere.*

**S. 43** *1 Kulîlkêt sor û zer bişkiftin,*
*2 Xweşî hate, Te'alê*[3491] *veşirtin,*
*3 Birînêt bilbil di k'ûr bûn, hingî axifitin*

**S. 30** *1 Gulê sor û zer baẍa dibişkivtîn,*
*2 Xweşî hatin, ta'lî nixivtîn,*
*3 Birînê bilbilê miskîn k'ûr bûn, serî hildan, nû axivtîn.*

**S. 33** *1 Bilbil teyrekî bi namûse,*
*2 Li teyraket k'abûse,*
*3 Fir̂în, çone hindirîsî Tawuse.*

**S. 39** *1 Bilbil teyrekî bi namûse,*
*2 Li nav teyra bûwe k'abûse,*
*3 Bilbil ço ĥezreta hindî Tawise.*

**S. 21** *1 Bilbil teyrekî namûse,*
*2 Ji teyra k'etibû k'apûse,*
*3 Bilbil fir̂îbû çûbû hindirîsî Taûse.*

**S. 22** *1 Gava diçû nave,*
*2 Ĥemûşka r̂on dibû dil û ĉave.*

**S. 44** *1 Bilbil teyrekî dewletê,*

---

[3487] *buhişt*
[3488] *ĥendelî*
[3489] *nur*
[3490] *şalol*
[3491] *te'el*

*2 X̆ewisî li beĥra qudretê,*
*3 Beĥra me û hazira, li wê se'etê.*

**S. 31** *1 Bilbil teyrekî dewletê,*
*2 Xeȓiqî bû beĥra muĥbetê,*
*3 Sed ȓeĥmet dê û bavê hoste û cimae'tê.*

*«Em di kêmin, Xwedê û şêx Adî ť emame!»*

**şaxê — 2**[3492]

**S. 1** *1 Çi ȓojeke ji ȓojane,*
*2 Çi şibeke ji şibane,*
*3 Teyr û tûyîên hev hîldane,*
*4 Hajî mala Silêmane*[3493]*.*

**S. 2** *1 Ĥemûçkan şikîyate bilbil wa kirye,*
*2 P'êx̆ember bilbil ji xwe ȓe hewqas maye,*
*3 Wê siba bîst û çar gulaye,*
*4 Em herimandine ji xewa berbangêye.*

**S. 3** *1 Hate teyrek, teyrê ȓeşe,*
*2 Qîȓîn kirye, dengê wî wê çoye E'rşe,*
*3 P'êx̆ember dibêje: «Goştê bilbil gelek xweşe».*

**S. 4** *1 Bilbil ji xwe ȓe hewqas şaye,*
*2 Bengî bûye, ser bîst û çar gulaye,*
*3 Dixwîne*[3494] *bi bîst û çar zimanane,*
*4 Em herimandine ji xewa wan şevane.*

**S. 5** *1 Hate teyrek, teyrê çure,*
*2 Li wan e'rdan dimeşe û dibûre:*
*3 «P'êx̆ember bilbil bikuje,*
*4 Ȓenga me jî gelek dûre».*

**S. 6** *1 Bilbil ji xwe ȓe hewqas şaye,*
*2 Wê seba bîst û çar gulaye,*
*3 Dixwîne bîst û çar zimanaye,*
*4 Nahêle bikin xewa berbangêye*[3495]*.*

**S. 7** *1 Hatîye teyrek, teyrê wê sipîye,*
*2 Qîȓîn kirye, dengê wî çûye ba dinêye:*
*3 «P'êx̆ember bilbil bikuje,*
*4 Goştê bilbil bide teyrên ĉîyaye».*

**S. 8** *1 Hate teyrê mirîşkan hindêye,*
*2 Qîȓîn kirye, dengê wî çûye E'rşê înêye:*
*3 «P'êx̆ember bilbil bikuje,*
*4 Goştê bilbil bi min t'enêye».*

**S. 9** *1 Wê çûye nava bîst û çar gulaye,*
*2 Dixwîne bîst û çar zimanaye,*
*3 Nahêle bikin xewa berbangêye.*

**S. 10** *1 P'êx̆ember çavên xwe geȓandiye,*
*2 Ewî teyrê sipî diye,*

---

[3492] [47] (rr. 422-428)
[3493] *Silîman*
[3494] *dixûne*
[3495] *berang*

*3 «Kuro, here bilbil bîne,*
*4 Bilbil nekuj, bi saẍî bîne».*

**S. 11** *1 Teyrê sipî wê firîye*[3496]*,*
*2 Herçar qulbên dine ew digeȓîye,*
*3 Li ber gula bilbil wê [t'exte] danîye.*

**S. 12** *1 Bilbil çavên belek vekirye,*
*2 Ewî teyrê sipî diye,*
*3 «Kuro, çira hatî van derane,*
*4 Şuẍlê te çiye li van cîyane?»*

**S. 13** *1 Got: «Heştê ĥezar*[3497] *teyr û tû*[3498] *li hev civîyane,*
*2 Di mala p'êẍemberde şikîyata te kirne,*
*3 P'êẍember gotîye bira bêye.*

**S. 14** *1 Got: «Kuro, bi çima van derane,*
*2 Tû nemîne li van e'rdane,*
*3 Ez nayîyêm dîwana e'debîyane.*

**S. 15** *1 Ez îro ji xwe dikim van gilîyane».*
*2 Dibêjme: «Ji xwe ȓe dikim van gilîyane».*
*3 Teyrê sipî wê firîye,*
*4 Li dîwana p'êẍember danîye.*

**S. 16** *1 Li dîwana p'êẍember danîye,*
*2 Got: «Kuro, çira te bilbil ne anîye?»*
*3 P'êẍember bilbil di nava bîst û çar gulan deye,*
*4 Dixwîne bîst û çar zimanaye.*

**S. 17** *1 Dibêjê nayîyêm dîwana e'debêye,*
*2 Ez jî wê ji xwe ȓe dikim wan gilîyane,*
*3 P'êẍember ĉavê xwe geȓandye,*
*4 Ewî teyrê bazî diye.*

**S. 18** *1 Got: «Kuro, here bilbil bîne,*
*2 Bilbil mekuj, bi saẍî bîne,*
*3 Bilbil li ber destên min bixîne.*

**S. 19** *1 Teyrê bazî wê firîye, şûna bilbil wê danîye,*
*2 Bilbil ĉavê xwe jî vekirye,*
*3 Ewî teyrê bazî dîye.*

**S. 20** *1 Bilbil şkestîye qudum dest û p'êye,*
*2 Digot: «Teyro, çi ȓa hatî van derane,*
*3 Şuẍlê te çiye li van cîyane?*

**S. 21** *1 Dibêje: «Heştê ĥezar teyr û tû li hev civîyane,*
*2 Dîwana p'êẍember şikîyata te kirne,*
*3 Were em herne dîwanêye.*

**S. 22** *1 Digot: «Tîro, ez nayîyême dîwana p'êẍembere,*
*2 Ez di nav bîst û çar gulan deme,*
*3 Ez gulê ji xwe ȓe dikim mesletane».*

**S. 23** *1 Teyrê bazî bilbil hilanîye,*

[3496] *firye*
[3497] *hezar*
[3498] *teyr û tûr*

*2 P'er û qanat lê şikandiye,*
*3 Bilbil dua' li ber kirye,*
*4 Got: «Teyro, tu bidî ba[3499] Xwedêye,*
*5 Eger temîkê bikim li van jinaye».*

**S. 24** *1 Got: «Gelî gulan, ez di herim dîwana e'debêye,*
*2 Çûna min heye, hatina min t'uneye,*
*3 Paşî min nekin t'u xortane.*

**S. 25** *1 Teyrê bazî bilbil hilanîye,*
*2 Li dîwana p'êẍember danîye,*
*3 Bilbil ĉavê xwe vekirye,*
*4 Heştê ĥezar şikîyatĉîyên wî sekinîye,*
*5 Bilbil ji xwe r̂e ẍereqye.*

**S. 26** *1 Teyrê bilbil wê anîye,*
*2 P'er̂ û bask vekirye,*
*3 Bilbil mala te xirab bibe,*
*4 Ji xwe r̂e bike şikîyatane.*

**S. 27** *1 Bilbil p'erek daye ber ĉavane,*
*2 P'er̂ek daye ber sîngane,*
*3 Li ber p'êẍember sekinîye.*

**S. 28** *1 P'êẍember sûcê min ha bi çiye?*
*2 We şikîyata min kirye,*

*(Ev beyt'e tam nehatîye nivîsandinê.)*

## 27. BEYT'A SILÊMAN P'ÊẌEMBER Û BÛM[3500]

**S. 1** *1 Teyr û tûyê Beyt' il-Farê[3501],*
*2 Derbaz dikin li r̂û dinyayê,*
*3 Silo gate jina xwe Belqîzayê.*

**S. 2** *1 Ji p'er̂ê teyrê berbi welat,*
*2 Emê k'oçkekê çêkin du qat,*
*3 Bi wê bivne xinê û xelat.*

**S. 3** *1 Ewî bi more hikm da,*
*2 Teyr t'opkirin ji çar qulba,*
*3 Ew ĥuqumekî ze'f girane,*
*4 Li ser ĥemû teyr û tûyane.*

**S. 4** *1 Ew teyr û tûya dicivîne,*
*2 P'er̂ baska li wan bir̂ûçkîne,*
*3 Wana bihêlê bê cî û war,*
*4 K'oçkê çêke xwe r̂a sit'ar.*

**S. 5** *1 Çarinkal civîyan teyrê feqîr,*
*2 Ew cema' bûn li dîwana mîr,*
*3 Sekinîn li ber Beyt' il-Farê,*
*4 Bilbil r̂evî ji ber firwarê.*

[3499] *ha*
[3500] [29] (гг. 461-464) (№ 1714)
[3501] *bent'ilfayê*

**S. 6** *1 Li pey bilbilê bû hawar,*
*2 Li wî geȓyan çarnikal,*
*3 Ewana xwe ȓa kir t'ivdîr,*
*4 Bilbil bigrin bivine cem mîr.*

**S. 7** *1 Mirîşkê qomsîtîya bilbilê kir,*
*2 Ciyê bilbilê wan ȓa e'yan kir,*
*3 Mirîşk qomsîya teyrane,*
*4 Ciyê bilbilê gote Silêmane.*

**S. 8** *1 Bazî[3502] li hewa fiȓîn û çûn,*
*2 Li pey bilbilê şîrin geȓîyan,*
*3 Ew bilbilê şîrin bestî,*
*4 Pey wî digeȓin t'imê qestî.*

**S. 9** *1 Teyrê bazî li hewa fiȓîyan,*
*2 Li ser ciyê bilbil vebûn,*
*3 Ewana bilbil hilanîn,*
*4 Li ber Silêman danîn.*

**S. 10** *1 Ji xof û tirsa mîr,*
*2 Bilbil cîda bû hêsîr,*
*3 Lê bilbilê şîrin ziman,*
*4 Dest-p'ê wî ĥişk girêdan.*

**S. 11** *1 Balĉemkê xwe ĥejand,*
*2 Berî ĥemîye xwe ȓûçikand,*
*3 Go: «Cûckê mine hûrin,*
*4 Wekî zû neçim wê bimirin».*

**S. 12** *1 Bûm ji ciyê xwe ȓabû,*
*2 Li ber mîr sicûde bû.*
*3 Ew wextê ȓabû p'îya,*
*4 Yek bi yek caba mîr da.*

**S. 13** *1 «Mîrê min hikmê te girane,*
*2 Hatîye ser me teyr û tûyane,*
*3 Ew guneye te ȓa li dinyayê,*
*4 Wê têk'eve stûyê te û Belqîzayê».*

**S. 14** *1 Mîr [go]: «Tu li ĉava[3503] binêr çewane?»*
*2 Bûm [go]: «Ĉavê min yê mêrane».*
*3 Mîr [go]: «Tu li serî binêȓ çewane?»*
*4 Bûm [go]: «Serê min yê şêrane».*

**S. 15** *1 Mîr [go]: «Tu li qûnê binêr çewane?»*
*2 Bûm [go]: «Wekî tu qûnê naĥebînî,*
*3 Çira teyr tûya dicivînî,*
*4 P'eȓ-baskê wan diȓûçkînî.*

**S. 16** *1 Bone te û Belqîzayê,*
*2 Emê ĥişk bin li dinyayê,*
*3 Tu bawerîya bîne yeqîm,*
*4 P'eȓ û bask te ȓa navne ĥîm.*

**S. 17** *1 Sibê bakê li k'oçka te ȓabe,*
*2 Her p'eȓekî wê cîkî da belake,*

[3502] *be'z*
[3503] *ĉe'v*

*3 Em teyr û tûyê baz,*
*4 Emê bimînin belengaz».*

**S. 18** *1 Hê gotina bûme li devî,*
*2 Qijika r̂eş qeydêva r̂evî,*
*3 Silêman selawet ve da,*
*4 Destûra teyr û tûya da.*

**S. 19** *1 Lê şîrinê bilbil dila,*
*2 Dîsa vegeȓîya nava gula,*
*3 Nav gula bû şayî û deng,*
*4 Bone bilbilê besk r̂eng.*

**S. 20** *1 Teyr û tû aza bûn,*
*2 Ji hev bela bûn,*
*3 R̂ûyê gotina bûm da mîr destûra teyra da.*

## 28. BEYT'A R̂ABIYÊ[3504] — JANDILA R̂ABIYÊ[3505]

**S. 1** *1 R̂abiyê, hey R̂abiyê,*
*2 R̂abiyê, Edewiye!*
*3 Cema'[3506] bû velîye[3507],*
*4 Şêx Merûvê Kerxiyê,*
*5 Şêx Cinêtê Şilbiyê,*
*6 Şêx Bazîdê Bastemiyê,*
*7 Herçar birê qîmetiye,*
*8 Derê Şerefxanêra çûye,*
*9 R̂abî der anîye.*

**S. 1** *1 Ha werne beyt'a R̂abiyê,*
*2 Ha werne beyt'a R̂abiyê,*
*3 Ay hayê, werne beyt'a R̂abiyê.*

**S. 2** *1 K'erem, k'erema mêrane,*
*2 Sur̂ o, sur̂a mêrane.*

**S. 3** *1 Wê cema'[3508] bûye nebîye[3509],*
*2 Wê cema' bûye velîye[3510],*
*3 Şêx bihuştê Şiblîye,*
*4 Şêx Merifê Kehxîye.*

**S. 4** *1 Herça[r][3511] yarê qîmetîye,*
*2 Derê şerabxanê[3512] fitîliye,*
*3 Wê dîtine R̂abiya Edewiye.*

**S. 2** *1 Xelqê ẍafilî şenge,*
*2 Bira nede denge,*
*3 Heyê neçe r̂enge.*

**S. 5** *1 R̂abiya min cameke şenge,*
*2 R̂abiya got: «Xwe meyînin denge,*

[3504] http://www.ezdixane.ru/content/view/624/156/
[3505] [48] Bedel Feqîr Ĥecî: "*Bawerî û Mîtologiya Êzidîyan. Cendeha Têkist û Vekolîn*" Duhok 2002; http://www.ezidinasi.com/la/?page_id=70
[3506] *cima*
[3507] *welî*
[3508] *cem me*
[3509] *nevî*
[3510] *welî*
[3511] *herça*
[3512] *şiratxane*

*3 Ĥetanî hûn dibînine r̂enge».*

**S. 3** *1 Xelqê ẍafilî kore,*
*2 R̂abiya min dilgîre,*
*3 Heyê [şermê] naçe dîwana feqîra.*

**S. 4** *1 R̂abî xerebeta hatîye,*
*2 Deng welaya k'etiye,*
*3 Serî k'iryamete.*

**S. 5** *1 K'erem, k'erema mêrane.*
*2 Şewq, şewqa P'adşane,*
*3 Serî ĥemûşka dîn-îmane.*
*4 Îmane nîşane, t'aqeta r̂uĥê xwedan xêrane.*

**S. 6** *1 R̂abî wê biçûye.*
*2 Berî wê he'riyêye.*
*3 R̂abiya şivan diye.*

**S. 6** *1 R̂abî ji wê r̂abûye,*
*2 Daye ber xwe ĉiya û banîye,*
*3 Ser şivanekî we hilbûye.*

**S. 7** *1 Şivano, şivano!*
*2 Te malik t'unebe, tu wêrano,*
*3 Te nedîtîye silt'ano?*

**S. 7** *1 Got: «Şivano, ha şivano!*
*2 Te malik nebe wêrano,*
*3 Te nedîye ĥeyranî silt'an Êzdîye?»*

**S. 8** *1 Ew şivanê li ber peze,*
*2 Dêde banê bilind dibeze,*

**S. 9** *1 Got: «Ĥeyranê R̂abiyê,*
*2 Min ne ĥeyranî silt'an Êzdîyê».*

**S. 10** *1 Şivên got: «Ĥeyranê R̂abiyê,*
*2 Eva heye bedêlî çil saliye,*
*3 Şêresiwarekî hêlîva diçûye,*

**S. 11** *1 Hilekî[3513] r̂eşî nûranî nav mila bûye,*
*2 Min nas kir, ew silt'an Êzdîye,*
*3 Dilê min R̂ebiya E'debî t'evî dûye».*

**S. 12** *1 Şiven got: «Ĥeyranê R̂abiyê,*
*2 Min gelekî divê te hurmetê[3514],*
*3 Îsal çil salê mine, ez vî pezî r̂a dibînim zorî zeĥmetê,*
*4 Nedeke nolaya te ber dilê min netê».*

**S. 8** *1 Dilê R̂abiyê dibû ĥeyran,*
*2 Mêra got: «R̂ebiyê, e'yba te hurmetê,*
*3 Ev çi şala dik'işînî xiretê.*

**S. 9** *1 Çi sibeke zûye, siwarek hatîye-çûye,*
*2 T'ac, hile[3515], xerqê nûranî berbiye,*
*3 Pêşîya te zanim silt'an şêx Adîye[3516]».*

---

[3513] *hule*
[3514] *hirmet*
[3515] *hîle*
[3516] *Şîxadî*

**S. 10** *1 R̂abî we hatîye,*
*2 Ne cewe, ne kanîye,*
*3 Bezreke bîra dîye,*
*4 Xulyaqetek ser sekinîye.*
*5 Xulyaqetê pirsîye:*
*6 «Xulyaqetê, te ji vir çîye?»*

**S. 13** *1 R̂abî ji wê r̂abîye,*
*2 Daye ber xwe berî û bêrîye,*
*3 Ser bîrekêve hilbîye.*

**S. 14** *1 Ĥeywanetek ser wê bîrê diye,*
*2 R̂ebiyê got: «Xêra mala Xwedê r̂a,*
*3 Mi zanibiya, gelo te ĥeywanetî çiye?»*

**S. 11** *1 Xulyaqetê da cabe,*
*2 Go: «Ĥizreta[3517] min t'ase ave».*

**S. 15** *1 Ew qudreta Şemsê zerbave,*
*2 Ewe ĥeywanetê dav û ĉave,*
*3 Got: «Ĥeyranê R̂abiyê,*
*4 Bîra k'ûre, ĥezreta min qurtek ave».*

**S. 12** *1 R̂abiyê k'êr der anî,*
*2 P'or-gulî hilanî,*
*3 Kireme şirîteke nûranî,*
*4 Av pê şimka xwe[3518] bîrê der anî,*
*5 Xulyaqetê xariye.*

**S. 16** *1 R̂abî ji wê r̂abiye,*
*2 Dest di berîka xwe kiriye,*
*3 Şikrîm ji berîka xwe der aniye,*
*4 Avîtiye cote gûliyê xwe, cote gûlyê xwe wer anîye.*

**S. 17** *1 Hûnaye kiriye şirîteke r̂eşe, nûranîye,*
*2 Avîtîye şimka xwe, av şimka xwe bîrê der anîye,*
*3 Nevsa ĥeywanata tînî kir r̂edîye.*

**S. 13** *1 Hevr̂az nêhêrî E'rşê [û] K'ursîy,*
*2 Berjêr nêhêrî Gay [û] Masî,*
*3 Çardeh t'ebeqe ser destê k'efa silt'an şêx Adî sekinî.*

**S. 20** *1 R̂abî fêza xwe da nihêrî,*
*2 Pêve xankir E'rş û K'ursîy,*
*3 Berjêr nihêrî, pêve xankir Gay û Masî[3519].*

**S. 14** *1 R̂abiyê av da dêle,*
*2 Se hilda quba Helêle,*
*3 Cot K'ursîyê Cebêle.*

**S. 18** *1 R̂abiyê av da dêle,*
*2 Berî Xwedê, berî qubêle,*
*3 K'ursîy ya ber sekinî, K'ursîy ya Cebêle.*

**S. 15** *1 R̂abiyê av dêl didaye,*
*2 Mexsûs r̂uĥaye.*
*3 Xêr kira, xêr cizaye.*

**S. 19** *1 R̂abiyê dêl av daye,*
*2 Bê mexsûse û bê r̂êdaye.*

---

[3517] *ĥizret*
[3518] *xa*
[3519] *m'esî*

**S. 21** *1 Xêra xêr cizaye,*
*2 Seȓa seȓ cizaye.*

**S. 22** *1 Deng bela bûye çiqas welata,*
*2 Deng bela bûye berbi welata,*
*3 Go: «Hay, hayê, R̂abî biye sereka çiqas k'eremeta»*

**S. 23** *1 Cawa li me herçar birane,*
*2 Go: «Em siwar bin merzê avane,*
*3 Em herne silavekî bidine R̂abiyê Edewiyê silava e'lêl ve daye».*

**S. 24** *1 R̂abî got: «Hûn hatine ser serî, ĥerdu ĉavane,*
*2 Hûn werne hundur, biȓa derva bimîne zavane».*

**S. 16** *1 Mêra go: «R̂abiyê, k'anê şêxê te da nîşanê?»*
*2 Go: «Hê neqedimiye dîwanê!»*

**S. 17** *1 R̂abiyê got t'emame:*
*2 «Şêxek ȓabû Şame,*
*3 Lalişim mikane,*
*4 E'lêk'ûm selame,*
*5 Ez carîme, hûn xulame».*

**S. 18** *1 Mêra got: « R̂abî, tu canikeke bi çakî,*
*2 Çiqa dîndara şîrin şêx Adî mişaqî».*
*3 Mêra got: «R̂abî, tu canikeke bihurî,*
*4 Ĉira mêra wediguȓî».*

**S. 25** *1 Şêx Bazîd got: «R̂abiya minî cîdî,*
*2 Eme şêxin, tu mirîdî».*

**S. 19** *1 Ez şêxim, tu mirîdî,*
*2 Ez mirîda şêxê xwe me*[3520]*,*
*3 Berê ne Lewĥe*[3521]*, ne Qeleme,*
**S. 26** *1 R̂abiyê got: «Ez mirîda sêxê xwe me,*
*2 Şêxê min heye ew silt'ane,*
*3 Çiqas maş û berat'ê mêra heye, ĥemû k'efa destê wî dene».*

**S. 20** *1 Şêxê min sema,*
*2 Şêxê min silt'ane.*
*3 Devsa mişûra mêrane,*
*4 Serê ĥemûşka dîn-îmane.*
*5 Îmane nîşane,*
*6 T'aq ciya ȓuĥê xwedan xêrane.*

**S. 21** *1 R̂abiyê go: «Şêxê min ĥewaste*[3522]*,*
*2 Gustîla qudretê bi deste.*
*3 Sedê weke we û nebîy Miĥemed berde diwaste.*
*4 Maş, xelat, berat'a jê dixwaste.*
**S. 27** *1 Got: «Şêxê min heye ew ĥewaske,*
*2 R̂imeke k'eske li deste,*
*3 R̂ojê sedî nonanî we, nebîy Memed, tê ber min dadiwaste».*

**S. 28** *1 Şêx Bazîd got: «R̂abiya mine sermeste,*
*2 Hela tu jî binêre, çikas k'eremeta mêra, k'î ye, k'î bi deste?»*

[3520] *xa me*
[3521] *nihe*
[3522] *hevast*

**S. 22** *1 Ew R̂abiyê sermestbû,*
*2 Dua' Xwedê xwestbû,*
*3 Şelbik hîlawest bû,*
*4 Wek'az dabû dest bû.*
*5 Lêxist, şelbik şkestbû,*
*6 Av qendîlê r̂awastiya bû.*

**S. 31** *1 R̂abiyê, R̂ebiya mine sermestê,*
*2 Dîsa wek'azek hildabû destê,*
*3 R̂edê xwe dîwanê feqîra, mêra dixwastê,*
*4 Pişta xwe îlanî dibestê,*
*5 Şelbikekê avê hilavîtiyê,*
*6 Lê dixist şerbik dişkestê,*
*7 Av mue'leq[3523] maye qendîlê, sê cara dadiwestê.*

**S. 23** *1 Ew R̂abiya sermeste,*
*2 Dua' Xwedê xweste,*
*3 Şelbik hilaweste.*

**S. 30** *1 R̂abû R̂abiya mine cîdê,*
*2 Hildaye wek'azû tîrê,*
*3 Şelbikekî avê hilavîtiyê,*
*4 Lê dixist şelbik dişkestê,*
*5 Av hewa ma qendîlê.*

**S. 24** *1 Şêx Bazîd mêrekî k'are,*
*2 Wek'az hilda nava dare,*
*3 Lêxist, şelbik hate xare,*
*4 Mêr ma ĥeyrî û şemezare.*

**S. 29** *1 Şêx Bazîd sêxekî k'are,*
*2 Wek'az hildabû dare,*
*3 Şelbikekî avê hilavîtiye,*
*4 Lêda şelbik dişkeste,*
*5 Av, şelbik, t'ev dihatine xware.*

**S. 25** *1 K'erem, k'erema delîle,*
*2 R̂abiyê şikênand sebîle,*
*3 Av mue'leq ma qendîle.*

**S. 32** *1 R̂ebiyê got: «Wekî mi wêrîbûya Cobêre,*
*2 Minê derê dojêh girêda ber wê r̂e,*
*3 Min nedihişt gunehk'ara pêştir kese biçya li hêre.*

**S. 33** *1 Wekî mi Cebêr wêrî biya,*
*2 Minê derê dojêh hiljeniya,*
*3 Xêncî gunehk'ara pêştir, min nedihişt kes pêve biçîya.*

**S. 26** *1 K'erem k'eretna ĥebûbe,*
*2 Mêra bire ber R̂abiyê sicûde.*
*3 K'ereme xwedanê k'eremê,*
*4 Minete cêşe gelîyê Lalişê, ale sinetê, baqê cinetê.*
*5 Ya silt'an şêx Adî bangeke me tê dinê, yek axretê,*

**S. 34** *1 Xana, xanane mezine,*
*2 Têda r̂uniştiye R̂abiya Edewî, k'omek jine,*
*3 Şêx Adî xwe lûtfê[3524] xweyî şîrin,*
*4 Kire gaziyê got: «Xêra R̂abiyê, xêrane mestire».*

---

[3523] *maliq*
[3524] *lutf*

**S. 35** *1 Xana, xanane wêda,*
*2 Têda r̂ûniştiye R̂abiya Edewî, k'omek jinê têda,*
*3 Şêx Adî, xwe lûtfê xweyî şîrin,*
*4 Kire gaziyê, got: «Medhek xêra R̂aebiyê da».*

**S. 36** *1 Xana, xanane t'eke,*
*2 Têda r̂ûniştiye R̂abiya Edewî, k'omek hurmetê,*
*3 Şêx Adî, xwe lûtfê xweyî şîrin,*
*4 Kire gaziyê, got: «Xêra R̂abiyê, gelekî qebûl dike».*

**S. 37** *1 Xana, xanane ĉûke,*
*2 Têda r̂ûniştiye R̂abiya Edewî, k'omek bûke,*
*3 Şêx Adî xwe lûtfê xweyî sîrin kire gaziyê, got: «Xêra R̂abiyê gelekî qebûl dike».*

**S. 38** *1 Xelibiye, Celibiye,*
*3 Cemale, qulbiye,*
*3 Ĥemû, ser k'efa destê silt'an Êzîd nivîsiye,*

**S. 27** *1 Hole, hol emane,*
*2 K'ase ser destê mêrane,*
*3 Mêrê dîwana şêx Adî xwerin, bûne berîstane*[3525].

*R̂eĥme hostayî, bavê hostayî,*
*Mal-mezela mirîd, mixatiba*[3526].
*T'emamet qebûl be boyî silt'an şêx Adî!*
*R̂eĥme li dê-bavê te, cimae'tê ve,*
*Xêra ve qebûl be!*

## 29. BEYT'A SÊVANA K'ESK[3527]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Sinete sêvana*[3528] *k'eske,*
*2 Te bihêne ji bixûr, ji enber û miske,*
*3 Yar gêlê*[3529] *sorgul westabû li biske.*

**S. 2** *1 Subeye k'esk sêvane,*
*2 Te bihên ji enber, û misk, û r̂îĥane,*
*3 Yar gêlê ser sorgula bisk westane.*

**S. 3** *1 Sinete*[3530] *sêvana zere,*
*2 Te bihên ji bixûr, û misk, û enbere,*
*3 Li ber sorgula bisk westane li sere.*

**S. 4** *1 Subeye, stêra subê hiltê ye,*
*2 Kar ẍezaleke ĉav gul tê ye,*
*3 Yar gêlê şêx Alê Şemsa ji eşq û dil pê ye.*

**S. 5** *1 Li min hilatî stêra subane,*
*2 Gêl qendîleke li nav qubane,*
*3 T'obeye û li her çardeh erk'ana dergane.*

---

[3525] *baristan*
[3526] *miĥtib*
[3527] [52] (гг. 260-261)
[3528] *sîwan*
[3529] *gêlî*
[3530] *sunet*

**S. 6** *1 Srêra subê li min bi stêra,*
*2 Biska gêlê ez bim bi xêra,*
*3 Yar gêlê tersîn hatine ser cotkêt şêra.*

**S. 7** *1 Srêra subê li min nedîme,*
*2 Hatibû ji e’rdekî qedîme,*
*3 Yar gêlê ez ji xelqê we r̂a serafîme (ji?) û giravîme.*

**S. 8** *1 Lewo, mal û ĥalê xwe vewêrî,*
*2 Gêl ẍezaleke mesken bêrî,*
*3 Yar gêlê dilê miskînî*[3531] *şêx Alê Şemsa pê dibû hêrî.*

**S. 9** *1 Yar gêlê tu mureke p’ir̂ heştê,*
*2 Wek horiyeke behiştê*[3532]*,*
*3 Te bisk xumrê bi ĥinayê diriştê.*

**S. 10** *1 Hersê tişt e’firandin*[3533] *êkî Bêrîye,*
*2 Ne da kesê bê r̂êye,*
*3 Ji ẍêrî te mîmê dêrye.*

**S. 11** *1 Tu hoyeka li nav bi nefşa,*
*2 Tu ĥeftî li ser wan şeşa,*
*3 Tu ĥekîmî wek nebeşa,*
*4 Diger̂yayî li ser birîndar û nexweşa,*
*5 Belê, te nizanî ya li min cî êşa.*

*Em di kêmin û Xwedê yî t’emame!*

## 30. BEYT’A ZEMBILFIROŞ[3534]

*Bi desturî Xwedê!*
**S. 1** *1 Ay mecasa p’ir̂ zewq û xweşî.*
*2 Guh bidene suĥbetek xweşî,*
*3 Dikeyîn beĥşê zimbîlfiroşî.*

**S. 2** *1 Yadîl were …….. yadîl were,*
*2 Hincîyê bi te înit bawere,*
*3 Ne şefae’t lê ye, ne mehdere.*

**S. 3** *1 Yadîl were …….. carek bi coş,*
*2 Camê dila şerbet hinoş,*
*3 Dil îqîna zembîlfiroş.*

**S. 4** *1 Zembîlfiroş lawikê r̂ewale,*
*2 Wê çêdiket zimbîlêt male,*
*3 Şevê û r̂ojê axret xeyale.*

**S. 5** *1 Zembîlfiroş zembîla di îne,*
*2 K’olan, k’olan diger̂îne,*
*3 Xatûn li ser bane dimeyzîne,*
*4 Qelbê dilê wê diqetîne.*

[3531] *misîknî*
[3532] binêr: *bihuşt*
[3533] *afirandin*
[3534] [51- (rr. 544-551)

**S. 6** *1 Xatûnê miftela kir,*
*2 Ço hin di r̂u (hindiru) û sur̂ li cêriyê e'şkera kir,*
*3 Go: «Wî derwêşî qelb û dilê min cuda kir».*

**S. 7** *1 Çî xetûneka bi xêlî û sipîçare,*
*2 Ewê cêriya xwe dihinare,*
*3 Da wî derwêşî bi înite balê*

**S. 8** *1 Çî cêriyeka bi qelp*[3535] *û bende,*
*2 Go: «Ya derwêş, mîr wê te dixwende,*
*3 Wê bide selka te zor beha mende».*

**S. 9** *1 Zembîlfiroş dibê: «Bila webe,*
*2 Cêriyê tu selika ji mîr r̂e bibe,*
*3 Çî Xwedê qismet kirî bila ewbe».*

**S. 10** *1 Çî cêriyeka bi bend û lêne,*
*2 Go: «Derwêş neka çu ĥisêbe,*
*3 Dîtina mîreka ne e'cêbe».*

**S. 11** *1 Cêriyayî derwêş anî,*
*2 Dergeh da destê de[r]gevanî,*
*3 Lawikî bi fêniyê ne dizanî*[3536]*.*

**S. 12** *1 De[r]gevanî dergeh dadave,*
*2 Derwêş qutbû ji ejinî gava,*
*3 Ewî ne dizanî pîşya wî dave.*

**S. 13** *1 Xatûnê got: «Zembîlfiroş, hey lawikê biyanî,*
*2 Ez r̂astî bêjme te, tu pê bizanî,*
*3 Min tu ji muĥbeta dilê xwe r̂a anî».*

**S. 14** *1 Zembîlfiroşî got: «Xatûnê, ez t'obedarim,*
*2 Ez xwedan mal û e'yalim,*
*3 Li ber mîrê mezin ez gunehk'arim».*

**S. 15** *1 Xatûnê got: «Zembîlfiroş lawikê feqîra,*
*2 Tu k'eremka li ser t'extê mîra,*
*3 Axretê tu bike ji bîra».*

**S. 16** *1 Zembîlfiroşî got: «Xatûnê, gerden şibabê,*
*2 Em dêçîne nav ax û tirabê,*
*3 Tirsa min ji r̂oja ĥîsabê.*

**S. 17** *1 Ez nakem vê xilmetê,*
*2 Min dil nebû bo vê fikretê,*
*3 Tirsa min ji r̂oja qiyametê».*

**S. 18** *1 Xatûnê got: « Hey zembîlfiroş, lawikê mirêva,*
*2 K'eremke li nav baẍçê sêva,*
*3 Dîşlim bike herdu lêva».*

**S. 19** *1 Zembîlfiroşî got: «Xatûnê, gerden tenikê,*
*2 R̂eş kezîyê te wek mare di selikê,*
*3 Wê di tên û diçin li qasekê.*

---

[3535] *qolp*
[3536] *dazinî*

**S. 20** *1 Xatûnê, gerden zerê,*
*2 Em her dêçine nav ax û berê,*
*3 Tirsa min ji r̂oja meĥşerê».*

**S. 21** *1 Xatûn ço û xwe bi k'arkir,*
*2 Qolê zêr̂a li ber e'niya xwe barkir,*
*3 Kalemêrê ĥeftêsalî dîn û harkir.*

**S. 22** *1 Zembîlfiroşî got: «Xatûnê, tu ye aqil t'emamî,*
*2 Ye şîrinî*[3537]*, wek şerbeta camî,*
*3 Ji serî û binî tu li min ĥeramî».*

**S. 23** *1 Xatûnê got: «Hey zembîlfiroş, lawikî xase,*
*2 Bes bike zeĥmet û qase,*
*3 Tu ji destê min nabî xilase».*

**S. 24** *1 Zembîlfiroşî got: «Xatûnê, li seĥitê û gavê,*
*2 Ez da teĥîyatekê bigrim bi avê»,*
*3 Wê ne dizanî ew dêçite ser banî û xwe havê.*

**S. 25** *1 Çî xatûneka sermeste,*
*2 Û av ji cêriyê dixweste,*
*3 Go: «Ezê bikem li deste».*

**S. 26** *1 Zembîlfiroşî got: «Ewe guneheka mezine,*
*2 Tu avê bikey li destê mine,*
*3 Ew gunek'ariye her bê mine».*

**S. 27** *1 Derwêşî seĥkire mezelê ĥeta mezelê,*
*2 Û e'rdek nebû xwe lê veşerê,*
*3 Derwêşî da derçêt*[3538] *sere.*

*Zembîlfiroşî ço ser bane qesrê û destê xwe berejêr kir:*

**S. 28** *1 Derwêş berejêr fikirî,*
*2 Û berejêr r̂ênî û berda girî,*
*3 Got: «Ya R̂ebî, tu min xilaskey ji vî agirî.*

**S. 29** *1 Banga min R̂ebê ĥeqîqetê,*
*2 Min xilas bikey ji vê zeĥmetê,*
*3 Ya R̂ebî, bang û hawarêt min ji ba te tê.*

**S. 30** *1 Banga min Xwedê û melekê Cebare,*
*2 Yî yêt*[3539] *wekî Eyubê, kurma xware,*
*3 Yî yêt wekî Îbrahîm û Sare.*

**S. 31** *1 Yî yêt wekî Nemrudê laqet te nare,*
*2 Yî yêt wekî Ĥebîbê Necare,*
*3 Xunk'arî*[3540] *jê dixwest barek arê mişare».*

**S. 32** *1 Malîyê gotê: «Hey Ĥebîbê Necar,*
*2 Were binivê wekî hercar,*
*3 Xwedê mestire ji şah û xunk'ar».*

---

[3537] *şirîn*
[3538] *derc*
[3539] *îyêt*
[3540] *xwendk'ar*

**S. 33** *1 «Banga min Xwedîye, êkî bi t'inê,*
*2 Yî yêt wekî nebî Nuĥ sefîne gêr̂an li dinê,*
*3 Li serê ĉiyayî lê sekinî Cudî bi t'inê».*

**S. 34** *1 Xwedê gotê: Cibraîlo, teyrê sivik,*
*2 Tu here ber borca kinik,*
*3 Zembîlfiroș danê e'rdê tenik.*

**S. 35** *1 Pê nekey çû zeĥmetê,*
*2 Demê dik'efte wê qadê,*
*3 Bang û hawarêt wî ji ba me tê».*

**S. 36** *1 Kelĥa xatûnê mermer ĥezare,*
*2 Zembîlfiroș xwe dihavîte xware,*
*3 Û tiștek jê ne dibû azare.*

**S. 37** *1 Zembîlfiroș dihate male û çu ne mabû li xeyale,*
*2 Malîyê vêêa dikire șer̂, û qîl, û qale,*
*3 Tu çoy bi selik û t'ebeq, û tu hatî vala,*
*4 Emê çî bixweyî*[3541] *û t'êrken van e'yale.*

**S. 38** *1 Zembîlfiroș dibêje malîyê:*
*2 «Ez çume ber fîșe kala,*
*3 Min cêiryayek dî p'ir̂ lêb û ĥewala,*
*3 Digel xatûneka bi xalî û sipîçare.*

**S. 39** *1 Qesreka bi mermer ĥezare,*
*2 Bo demekî ez têda kirim ĥesare,*
*3 Û min ji ser qesrê ço dihavête xware,*
*4 Û bi qudreta Xwedê tiștek li min ne dibû zirare».*

**S. 40** *1 Ew malîya bi stu mûrî,*
*2 Got: «Ya derwêș, hincîyê li te bike zurî,*
*3 Me ew sparte R̂ebê jûrî».*

**S. 41** *1 Zembîlfiroș got: «Malîyê, agirekî dade li hêre,*
*2 Û her wekî duhî û pêre,*
*3 Xwedê dizane bi șer̂ û xêre».*

**S. 42** *1 Malîyê agirek dada bi kuĉik,*
*2 Melek Cibraîlê emîn hate nik,*
*3 Çendîn tam û tirușt havîtine zik.*

**S. 43** *1 Wextê malîyê derê berașê vekir,*
*2 Ma șaqis, û hizira R̂ebê xwe kir,*
*3 Zarok k'omkirin di nav wan kir.*

*Em di kêmin, û Xwedê yî t'emame!*

## 31. BEYÎT'A DINÊ[3542]
(binêr: QEWLÊ MISKÎNO JARO)

[3541] *Emê bi çî xweyî*
[3542] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina șêx Xelîfê Șemsanî. *BEYÎT'A DINÊ (*rr. 104-106) T'ilbîs 2001

**S. 1** *1 Diniya K'afe, diniya Nûne,*
*2 Diniya milk'ê kesî nîne,*
*3 Kes van wara namîne.*

**S. 2** *1 Diniya bê ît'bare,*
*2 Herr̂o k'oĉe, herr̂o bare,*
*3 Kesekî r̂a nave ware,*
*4 Beniyademî misk'în jare.*

**S. 3** *1 Misk'în jar beniyademe,*
*2 Misk'îno jaro, her ademo.*

**S. 4** *1 Beniyo, diniya t'u kesî r̂a nema,*
*2 Diniya ewiliyê xas r̂a nema,*
*3 Diniya meĥbûbê Xudê r̂a nema,*
*4 Kes li van wara nema,*
*5 Misk'îno jaro, her ademo.*

**S. 5** *1 Beniyo, diniya Adem p'êxemberê bav r̂a nema,*
*2 Diniya Ferxê Gulî nema,*
*3 Diniya Mûsayê k'ilimçî r̂a nema,*
*4 Diniya Îsayê nûranî r̂a nema,*
*5 Diniya Miĥemedê E'vdil bin Mistefe r̂a nema,*
*6 Diniya E'liyê bin E'bût'el r̂a nema,*
*7 Diniya şêx Adiyê bin Misefir r̂a nema,*
*8 Kes van wara nema.*

**S. 6** *1 K'anê Silêman p'êxember,*
*2 P'êxemberê mor miqerim,*
*3 K'a Belqîza zêrê zer,*
*4 Mirin pê r̂a nebû sereder.*

**S. 7** *1 K'anê Aqûb p'êxember,*
*2 P'êxemberê wek'az-k'emal,*
*3 P'êxemberê qurs-zeman,*
*4 Mirin pê r̂a nebû cemal.*

**S. 8** *1 K'anê Ûsib, Ûsibê nebî,*
*2 K'a Zelîxa ĉe'v-e'rebî,*
*3 Wane zanî bû mirinê hebî.*

**S. 9** *1 Beniyo, tu çiqas dinê e'mir bikî,*
*2 Zêr û malê xenî bikîe,*
*3 Tê t'asa mirinê te'm bikî.*

**S. 10** *1 Ĥezar salî dinê bî,*
*2 Zêr malê dinê xenê bî,*
*3 Tê r̂ojekê vê fenê bî,*
*4 Mêvanê t'irbê bî,*
*5 T'irbê, t'irba devî ava,*
*6 Hêsir hatin ĥerd ĉe'va,*
*7 Girane e'zavê dê û bava.*

**S. 11** *1 Diniya heye xana t'ijî,*
*2 Têda hene behîn berjî,*
*3 Nemir hene ser dijîn,*
*4 Nemir yek navê Xudêye,*
*5 Ya dinê - qenciya bendeye.*

**S. 12** *1 Ezrahîlo, melk'ê mewtê,*
*2 Herca dera dengê te tê,*
*3 Tu zara bibiȓî sewtê.*

**S. 13** *1 Ezrahîlo, melk'ê p'er k'eskî,*
*2 Her çar qulba dikî qestî,*
*3 Qe tu nakî ĥeyîfa caniya t'u kes kî,*
*4 Ayî, tu ȓiĥa qefes kî.*

**S. 14** *1 Ezrahîlo, melk'ê p'er kuȓî,*
*2 Her çar qulba difiȓî,*
*3 Destê bav û kura hev dibiȓî.*

# III. Jandil

# 1. JANDILA LAVIJÊ PÎRÊ[3543]

Ev jandil li ser mêrxasî û ciwaniya Lavijê pîrê, ku ji Lalisa nûranî diçe bakurê Kurdistan li hemberî dagîrkeran derdorên Sîpanê Xelatê, ser dikin. Di vî serî de, Lavij û gelek hevalê xwe li Sîpanê Xelatê sehîd dibin. Lavij bi xwe p'îre, û ji bo baweriya xwe û miletê xwe diçe ser û sefera mirinê:

**şaxê – 1**

**S. 1** *1 Lavijo[3544], were Lalişê bibîne,*
*2 Destan di qub û hilêlên zer werîne,*
*3 Xem û xeyalên dilê xwe pê biȓevîne.*

**S. 2** *1 Em hatin Lalişê bibînin,*
*2 Destan di qub û hilêlên zer werînin,*
*3 Xem û xeyalên dilê xwe pê biȓevînin.*

**S. 3** *1 Em hatin Lalişê tiwaf[3545] kin,*
*2 Destan di qub û hilêlên zer werkin,*
*3 Xem û xeyalên dilê xwe pê belavkin.*

**S. 4** *1 Lavijekî minî lavano,*
*2 Ȓêvingekî ȓêyano,*
*3 Miskînê şêx Alê[3546] Şemsano.*

**S. 5** *1 Seferên me çûne seferê venegeȓiyano,*
*2 Xêr û xweşî bo xwe hilgirtin,*
*3 Kul û k'eser bo pîredayîka xwe hêlano.*

**S. 6** *1 Lavijo kuȓê pîrê, em li gel coqeteke şêxan, p'îran û neqîban, biçîne ser ĉiyayê Mişetê, bik'êşîn sêgerên semayê,*
*2 Heke pîredayîka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê, pirsiyar ji we kir, bêjin:*
*«Li gel xalê xwe Avdel Omera çûye zozanên jorî, ewqet nayê».*

*[3547] *1 Heke pîredayîka Mîrzayê Mîrza Lavjê kuȓê pîȓê pirsyar ji we kir, bêjin:*
*2 «Digel xalê xwe Avdel Omera wê çûye zozanêt jorî qet nayê».*

**S. 7** *1 Lavijo, kuȓê met'ê,*
*2 Li gel coqeteke şêxan û p'îran, qewalan û neqîban, em biçine serê ĉiyayên Mişetê,*
*3 Heke pîredayîka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê pirsiyar ji we kir bêjin:*
*«Li gel xalê xwe Avdel Omera wê çûye sefera qiyametê».*

**S. 8** *1 Çendî dilê min dike ȟisêbê,*
*2 Gîyanê min gorî, şêx Şems ȓûdinê celisa kaniyê, wê dik'êşê qelemê, wê dixwîne k'itêbê,*
*3 Wextê gîyanê min gorî, şêx Alê Şemsa cotê lewendiya berdabûne ser ȓanî û ȓikêbê.*

**S. 9** *1 Hingî dilê min nasekene ber van me'niya,*
*2 Wextê "gîyanê min gorî" melik şêx Sin ȓunê celisa kaniyê,*
*3 Ser berê se'detê wê dixwûne k'itêbê, wê dik'êşe qelema Sipîye,*
*4 Wextê şêx Alê Şemsa cotê lewendîya berdabûne ser ȓanî û zendiye.*

---

[3543] http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=8; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-05.htm
[3544] Согласно повествованию в Akbaş (2009), настоящее имя Lawijê Pîrê (Сын Старухи) - Мирза. Имя его отца также Мирза. Lawij - единственный сын у матери. Он упоминается как территории езидов Xalt подвергаются персидской атаке. Омер Хала, который является дядей Лавиджа, является одним из эзидских пиров, собирая своих людей, чтобы защитить свою землю от нападения. Lawij также хочет вступить в войну, чтобы защитить свою землю, но поскольку он единственный сын дома, его дядя не хочет, чтобы он вступил в войну. Однако Lawij никого не слушает, идет на войну и принимает мученическую смерть на войне. Его дядя Омер Хала скрывает это от своей сестры Пире. Пире, который долгое время не слышал от своего сына, идет в Лалеш зажигает гексаду ии спрашивает судьбу своего сына. Шейх Ади видит, как тяжела и горела Пире в беде. Он показывает Пире, его сына, в райских садах (Акбаш, 2009: 69-70).
[3545] *tuwaf*
[3546] *Şêxalê*
[3547] [52] *Lavijê pîrê* S. 7 (r. 238)

**S. 10** *1 Çendî dilê minû*[3548] *beĥra bate,*
*2 Xêr û xweşî k'ete mala şêx Adî,*
*3 P'elekên befrê k'etibûne Sîp'anê Xelatê,*
*4 Ezê t'erka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê nadim ĥeta gîyanê min gorî,*
*5 Mahdî Şerfedîn neyê ser ȓûyê vê cîhanê.*

**S. 11** *1 Çendî dilê minû beĥra bi t'ine,*
*2 Xêr û xweşî k'ete mala şêx Adî,*
*3 P'elekên befrê k'eftine banê bizinê,*
*4 Ezê t'erka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê nadim ĥeta gîyanê min gorî,*
*5 Mahdî Şerfedîn neyê ser ȓûyê vê dine.*

**S. 12** *1 Çendî dilê minû vê k'eserê,*
*2 Ezê ȓabim k'axezekê ȓeş û şîn kim, bi ȓêkim zozanên jorî,*
*3 Heke pîredayîka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê pirsiyar ji we kir, bêjin:*
*«T'irba wî wa li zozanên jorî, li derê mêrga zerê».*

**S. 13** *1 Çendî dilê minû van t'ebîba,*
*2 Emê ȓabin k'axezekê binivîsin, bi ȓê kin zozanên jorî, bo Avdel[ê] Omera,*
*3 Heke pîredayîka Mîrzayê Mîrza, Lavijê kuȓê pîrê pirsiyar ji we kir, bêjin:*
*«T'irba wî wa li zozanên, jorî li derê gelîyê t'ixûba*[3549]*».*

**S. 14** *1 Avaye babê Simaîl k'etim wa li jore,*
*2 Têde dixwînin sêbarî bilbila û sivore,*
*3 Mirina pîremêra ĥeqe, mirina cihêla ĥeyf û core.*

**şaxê – 2**[3550]

**S. 1** *1 Hey… Dilê min lê barekî ji barê sînîya,*
*2 Ezê te di li dînyayê di gerîyam,*
*3 Hekîm û tabîb dil û dîlurkêşa me biryani,*
*4 Heyf û sed mixabin, yekî wekê Lawiye Pîre kîras guherî,*
*5 Hey Lawiye Pîrê ketiye Qewlên İbrahîmî Adema,*
*6 Hey gowana dilê,*
*7 De hey Mirzanî Mirzano,*
*8 Ya wekî binî dengano,*
*9 Seferkeşef meye çune seferê,*
*10 Hata axrê zulmê venegiryano…*

**S. 2** *1 Hey… Dilê min lê bareke barê xwe ma,*
*2 Ezê çende lî dinyayê digeriyam,*
*3 Hekîm û tabîb dil û dîlurkêşa me biryan.*
*4 Û Heyf û sed mixabin yekî wekê Lawiye Pîre kîras guherî,*
*4 Hey Lawîye Pîrê ketiye Qewlên Süleyman Nebîya,*
*5 Hey govana dilê, ew Lawo sad govanoyî.*

**S. 3** *1 Hey… Serê min bi heyran,*
*2 Yekê wekê Melîk Şêxsîne Adîya,*
*3 Runîştîye serperçê Şeyh Kanîya Spî,*
*4 Destê kalema îmane dikşîne xeta spîye.*
*6 Eza terka Lawiyê Pîre Nadim,*
*7 Heta Melîk Şêxsîne Adîya darûle sêhil nakê Nûranî,*
*8 Şêxale Şemsa Şur bikşîne ser cotikê zengûya.*
*9 Hey govana dile min, Lawo sad govanoyî.*

---

[3548] *min û*
[3549] *tuxûb*
[3550] [55] BERIVAN CAN EMMEZ AWAZÉ TAWUS: AŞK VE YAS BATMAN EZİDİLERİNİN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE ETNOGRAFİK YAKLAŞIMLAR Ankara – 2018 Lawiye Pîre (rr.176-177)

**S. 4** *1 Lawij dibê gelê qulinga: «Hun herin wazê bê mo»,*
*2 Bi Xodê riya me dûre, taqeto şame ne kêmo,*
*3 Li dinyayê hevalo holdaşê min*
*4 Dayîk û bavê min wi were pirsî pirsîyalekê ji we bikin,*
*5 Hune bin Lawêj gotiyê:*
*6 «Xwedê dîtiname nema, heta malê Şerfedîn çadira te r̂a bi zerîn derxê r̂umeta wê dinê».*

## 2. JANDILA MENDO[3551]

**S. 1** *1 Mendo, dinya bendexane,*
*2 Heye têda bazirgane,*
*3 Bazirgan diçûn, xan dimane.*

**S. 2** *1 Mendo, dinya xane xane,*
*2 Li benda têde t'êrî, t'ijî,*
*3 Hin pê dimire, hin pê dijî.*
*4 Miskîno, can te benî Ademî.*

**S. 3** *1 Mendo, li malê dinê nebe tima,*
*2 Zêr̂ û zîv neka cema'[3552],*
*3 Dinya ji p'êẍemberên Xwedê r̂e nema.*

**S. 4** *1 Mendo, sed salî li dine zêr̂ û zîv xen bî,*
*2 Axir, nabe her tu li dinê bî.*

**S. 5** *1 Mendo, sed salî xebat kî,*
*2 Mîrîtiya R̂ojhilat ĥetanî R̂ojava kî,*
*3 Axir, nabe her tu dê ji ava mirinê tam[3553] kî.*

**S. 6** *1 Mendo, li vir ware, li vir tala[3554],*
*2 Emê bik'evine va ĉala,*
*3 Em jî dê bidin dûv hevala.*

**S. 7** *1 Mendo, menal, menal, menal,*
*2 Li pey jina mêr zav nek'al,*
*3 Gelek cindî, gelek dildar çûne ev ĥal.*

**S. 8** *1 Mendo, megrî heqê teye,*
*2 Şîn û girî bê feydeye[3555],*
*3 Gor̂ û k'efen mala meye.*
*4 Miskîno, jaro, tu benî Ademî.*

## 3. JANDILA ŞÊX ŞEMS[3556]

Di vê beyt'ê de dîyar dibe, ku r̂oj di baweriya Ezdanî de girînge. Û bi qedir û qîmete. Tistê din yê herî giring jî di navbera êzdîtayia beriya diharbûna şêx Adî û dema diharbuna şêx Adî hirmet û hevgirtina şêx Şems, Fexredîn, Amadîn, Sicadîn, Pîranî, Adanî û Qat'aniyne. Li Lalisê dibin mêvan û t'ifaq û t'evayê p'êk tînin. Pêsiyê

---

[3551] http://www.ezdixandi.com/forum/38-303-1 http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-02.htm
[3552] *cena*
[3553] binêr: *te'm*
[3554] binêr: *te'l*
[3555] *fêdeye*
[3556] JANDILA BEYT'A ŞÊX ŞEMS http://www.ezdixandi.com/forum/38-256-1; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-06.htm

li ber ser û cengan digirin. Lewma dibêjin Amîn! Amîn!, t'ifaqa li dîn, t'ifaq yemîn, xelata mîr Zeydîn, xêra bidî, şeȓa wergeȓîn:

**S. 1** *1 Wê kim ȓo hiltêye,*
*2 Manga zere pêye,*
*3 Şêx Şems*[3557] *dîwanbegê Xwedêye.*

**S. 2** *1 Wê kim, ȓo hilate,*
*2 Mizgîna welate,*
*3 Destê şêx Şems daye p'ira dojeh Selate.*

**S. 3** *1 Wê kim, hiltê Ȓoje,*
*2 Şêxê nûrî bişkoje,*
*3 Destê şêx Şems daye p'ira Selat û Dojeh.*

**S. 4** *1 Wê kim, hiltê Şemse,*
*2 Me wê ne dîye t'u kese,*
*3 Weke bave, weke pise,*
*4 Sinetxane nav dik'irê şêx Şems xalise.*

**S. 5** *1 Wê kim, hiltê Tave*[3558]*,*
*2 Ĥetanî heȓe ava,*
*3 Sinetxane nav dik'irê şêx Şems t'ebabe*[3559]*.*

**S. 6** *1 Wê kim, hiltê Qimere,*
*2 Şêx Şemsî ser k'ursîya Zere,*
*3 Daye nûr nedire,*
*4 Sinetxane nav dik'irê şêx Şems dahire*[3560]*.*

**S. 7** *1 Ȓo hatîye E'rşane,*
*2 Hilatiye Manga girane,*
*3 Nûr, nedera şêx Şems daye, masîyê*[3561] *binê beĥrane.*

**S. 8** *1 Ȓo hatîye E'rşa mîra,*
*2 Şêx Şemsî — wezîre,*
*3 Nûr, nedera şêx Şems daye masîyê beĥrê k'ûre.*

**S. 9** *1 Wê kim mizgoye,*
*2 Ȓo hatîye nîvȓoye,*
*3 Nûr, nedera giran jê diçûye.*

**S. 10** *1 Ȓo hatîye E'rşa ser mêra,*
*2 Wa feqîra jê xeber da*
*3 Nûr, nedera şêx Şems e'zmana daye e'rda.*

**S. 11** *1 Ȓo hatîye E'rşa jûre*[3562]*,*
*2 Şêx Şemsî ẍefure,*
*3 Nûr, nedera şêx Şems daye masîyê beĥrê k'ûre*

**S. 12** *1 Ȓo nîvȓo dageȓîya,*
*2 Şêx Şems gote velîyîya,*
*3 Ȓo çûye, E'rşa tenge,*
*4 Sêx Şemsî p'eȓ ȓenge,*

[3557] *Şêxşims*
[3558] binêr*: te'v*
[3559] *tewawe*
[3560] *deĥr*
[3561] *me'sî*
[3562] binêr: *jor*

*5 Mêra wê danî oẍirme[3563] cenge.*

**S. 13** *1 R̂o çûye tîştane,*
*2 Hilatîye Manga girane,*
*3 Got: «Em heȓin silavga Dawidî[3564] kuȓê Dermane».*

**S. 14** *1 Dawidî kuȓê Dermane,*
*2 Omerê Xalane,*
*3 Gavanê Zerzane,*
*4 Şêx Şems û herçar birane,*
*5 Ĥesin Maman[3565] p'îrê çil p'îrane.*

**S. 15** *1 Ew Dawidî feqîre, ȓawa li nêĉîra,*
*2 Em heȓin silavga şêx Adî, mirazê me qap'iyê mîra.*

**S. 16** *1 Wê dikim qisetê,*
*2 Şêro me'rîfetê,*
*3 Şêx Şems heye ĉira ber sinetê.*

**S. 17** *1 Wê dikim gotinê,*
*2 Şêro, tûyî xandinê,*
*3 Nav dik'irê şêx Şems dahir[3566] bûye dinê.*

**S. 18** *1 Tu bavê Al R̂eşî,*
*2 Şêro, tûyî Lalişî,*
*3 Derge dîwanê Xwedê te jî.*

**S. 19** *1 Tu bavê Sêx Ĥesenî,*
*2 Welîkî bor bezînî,*
*3 Tu bînaya ĉavanî,*
*4 Tu ĥizreta silt'anî,*
*5 Sinetxane nav dik'irê te sekinî.*

**S. 20** *1 Tu bavê Amadînî,*
*2 Welîkî bor bezînî,*
*3 Bînaya ĉavê minî,*
*4 Tu ĥezreta silt'anî,*
*5 Sinetxane nav dik'irê te sekinî.*

**S. 21** *1 Tu bavê Ĥeyamadî,*
*2 Dermano, tû yî wefadî,*
*3 Xwezka min wî ȓuĥî be, şêx Adî xwe lê bivê ȓedî.*

**S. 22** *1 Mek[ke] [e] dînê bajaran,*
*2 R̂astemal tê hene ĥezaran,*
*3 Xweyî kore, mayê tu dîndaran.*

**S. 23** *1 Îmanê bernedin,*
*2 Cehwera[3567] ser nedin,*
*3 Mezin meydanê meleka hûnê ser bin.*

**S. 24** *1 Îman wisaye, weke ĉave,*
*2 Qasî mû k'etîye nava,*
*3 Xweyî destanî bê gave.*

---

[3563] *oẍilme*
[3564] *Dawûd*
[3565] binêr: *Ĥesin Maman*
[3566] *deher*
[3567] *cewar*

**S. 25** *1 Ew mûyê t'inê[3568],*
*2 Tarî[3569] kirîye dinê,*
*3 Xweyî kore, nayê ber xwendinê.*

**S. 26** *1 Tu bavê sityêyî,*
*2 R̂ûniştîyî ser K'ursîyêyî,*
*3 Sinetxana te maye hîvîyêyî.*

**S. 27** *1 Tu bavê sitî Nisretê,*
*2 R̂ûniştîyî ser suhbetê[3570],*
*3 Sinetxana te maye hidretê.*

**S. 28** *1 Tu bavê sitî Gulanê,*
*2 R̂ûniştîyî wê dîwanê,*
*3 Sinetxana te maye we'danê.*

**S. 29** *1 Şêx Adî, şêx Sinin,*
*2 Beĥrê wane mezinin,*
*3 Lêşkirê giran nefesê[3571] wan diçin,*
*4 Nefesê wan disekinin.*

**S. 30** *1 Şêx Adî, şêxû Bek'ir,*
*2 Şêx Adî got: «Şêxû Bek'iro, sîrinî weke şekir»,*
*3 Şêx Adî k'eremek te kir,*
*4 Ciyê te jor, ba xwe kir».*

**S. 31** *1 Şêx Adî, şêx Berek'atin,*
*2 Velîyî[3572] kirin xelatin,*
*3 Hawar, bangîna êzdîxanê maye ba te.*

**S. 32** *1 Şêx Adî, hat Lalisê,*
*2 Xemilîye xerqê r̂eşê,*
*3 E'debiya dil pê bûye xweşê.*

**S. 33** *1 Şems û Fexir birane,*
*2 R̂akê r̂awestane[3573],*
*3 Maş û berat'ê mêra ew r̂edane.*

**S. 34** *1 Şems, Fexrê çêne,*
*2 Qasidê p'ir̂êne,*
*3 Wêne wê têne,*
*4 Maş û berat'ê mêra ew didin, ew dibêne.*

**S. 35** *1 Şêx Adî, hat Ĥeq ware[3574],*
*2 Sicuda[3575] bûye berbi dare,*
*3 Şêx Adî, nav mêrada xweyî serdare.*

**S. 36** *1 Hat Şêx Adî bin Misafir[3576],*
*2 Mêra hatin silav lê kir,*
*3 Dar-berê gelîyê Lalisê sicûda jê r̂a kir.*

---

[3568] binêr: *t'enê*
[3569] *te'rî*
[3570] *sohbet*
[3571] *nefûs*
[3572] *welî*
[3573] *r̂awastan*
[3574] *Hekar*
[3575] *sucud*
[3576] *Şîxadî hat bin Misêfir*

**S. 37** *1 Amîn! Amîn!*
*2 T'ifaqeka li dîn,*
*3 Şemsedîn, Fexredin, Sicadin, Nesirdîn,*
*4 T'evekê*[3577] *yekemîn*[3578]*,*
*5 Xelefa melek Zeyîn*[3579]*,*
*6 Xêra bidî, şêra wergeȓîn.*

## 4. JANDILA ŞÊX SIN[3580]

**S. 1** *1 Kes sinetê, kes sinetê!*
*2 Lê bûkê qisetê,*
*3 Melik şêx Sin — şêxê sinetê.*
*4 Yala şêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 2** *1 Kes sinetê bi destane,*
*2 Pirs bike jê birane,*
*3 Melik şêx Sin şêxê şêxane!*
*4 Yala şêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 3** *1 Kes sinetê Dahokê,*
*2 Pirs bikin jê me'şuqê*[3581]*,*
*3 Melik şêx Sin serdarê çendî coqê.*
*4 Yala şêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 4** *1 Kes sinetê bi E'dîle,*
*2 Pirs bike ji dile,*
*3 Melik şêx Sin şêxekî bav gule.*
*4 Yala şêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 5** *1 Kes sinetê bê nehîne*
*2 Pirs bike yeqîne*[3582]*,*
*3 Melik şêx Sin şêxekî nûrîne.*
*4 Yala şêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 6** *1 Ew bû çê ciriya*[3583]*,*
*2 Stêrka*[3584] *ȓeş ȓijiya,*
*3 Ez k'î Musil p'ihîna şêx Mend posara wergeȓiya,*
*4 Ser xatirê melik şêx Sin*[3585]*, şexê Adiya.*
*5 Yala şêxê siniyano,*
*6 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 7** *1 Musil bajarê mezine,*
*2 Xwedê xirab bike jê bîre,*

---

[3577] binêr: *t'ebeqe*
[3578] *yek mîn*
[3579] *mîr Zeydîn*
[3580] http://www.ezdixandi.com/forum/38-300-1; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-03.htm
[3581] *maşoq*
[3582] *êqîn*
[3583] *çiriya*
[3584] *sêtirka*
[3585] *Şêxîsin*

*3 Ser xatira melik şêx Sin, sêxê feqîre,*
*4 Yala sêxê siniyano,*
*5 Yala melik Şêxîsinê Adiyano, min xulamo!*

**S. 8** *1 Musil bajarê neçê ye,*
*2 Hizirî bi suȓê ye,*
*3 Yala melik şêx Sin jê nûrê ye.*
*4 Yala sêxê siniyano,*
*5 Yala melik şêx Sinê Adiyano, min xulamo!*

## 5. JANDILA SER MIRÎ[3586; 3587]

**S. 1** *1 Werin, werin, lêzim werin,*
*2 Qewm û milet de hûn werin.*
*3 Hewar werin, werin ȓoja firiyaqetê,*
*4 Mirin heye heqîqetê,*
*5 Mirina bê çax sed ĥeyîf lê tê.*
**S. 1** *1 Werin, werin, lêzim werin,*
*2 Qewm û milet da hûn werin.*

**S. 2** *1 Hawar werin, werin ȓoja firêqetê*[3588]*,*

**S. 2** *1 Werin, werin, cînar werin,*
*2 Qewm û milet de hûn werin.*
*3 Werin ȓoja hêsetê,*
*4 Hûn ȓojekê t'evdîr bikin,*
*5 Îro qewî girya we tê.*
**S. 2** *2 Hûn ȓojekê t'evdîr bikin,*
*3 Îro qewî girya we tê.*

**S. 3** *1 Îro qewî we tê girî,*
*2 Sosin mêrga ĥeyîrî,*
*3 Ĥeyfa dev-lêvê şekirî,*
*4 Nagirin fincanê şerbetê,*
**S. 3** *1 Îro qewî we tê girî,*
*2 Sosin mêrga ĥeyrî*[3589]*,*
*3 Ĥeyfa dev-lêvê şekirî.*

**S. 4** *1 Nagirin fincanê şerbetê,*

**S. 4** *1 Lêvê narîn nûr meder,*
*2 Lê dibarin duȓ xeber,*
*3 Sed heyf, ax, koban, k'eser,*
*4 Me kêm bûn duȓ xeber.*
**S. 4** *2 Lêvê narîn nûr mehder*[3590]*,*
*3 Lê dibarin duȓ*[3591] *xeber,*
*4 Sed heyf, ax, koban, k'eser,*
*5 Me kêm bûn duȓ xeber.*

**S. 5** *1 Herĉa dike, ew mîr dike,*
*2 Dayînê*[3592] *qelpa p'îr dike,*

---

[3586] 54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYÎT'A MIRINÊ (*rr. 102-104) T'ilbîs 2001
[3587] [14] Estelle Amy LA PASSION DU TRAGIQUE *BEYT'A SER MIRÎ* (pp. 114-115) şêx Xelo, gundê Qorbulax
[3588] *firyaqet*
[3589] *heyîr*
[3590] *meder*
[3591] *dur*
[3592] *dayn*

*3 Herĉa têye, dergê te da,*
*4 Em r̂azîne e’mrê xa da.*

**S. 5** *1 Herça dike, ew mîr dike,*
*2 Dayînê[3593] qelba[3594] p’îr dike,*
*3 Herça têye, dergê te da,*
*4 Em r̂azîne e’mirê[3595] xwe da.*

**S. 6** *1 Me li mal-mederê,*
*2 T’evdîrê k’iriyametê,*
*3 Dilê şayî agir k’etê,*
*4 Ber wê p’êtê sebra k’ê tê?*

**S. 6** *1 Me li mal-mezelê[3596],*
*2 T’evdîrê k’iryametê,*
*3 Dilê şayî agir k’etê.*

**S. 7** *1 Ber wê p’êtê sebra k’ê tê?*

**S. 7** *1 Ĥali nûrê, ĥali sûrê,*
*2 K’endirbesta li ber sûrê,*
*3 Weke dilê min tîr lê nijar,*
*4 P’êta dil da we li anî x[w]ar,*
*5 Dikir gazî weyîlêr hewar.*

**S. 7** *2 Halî nûrê, halê sûrê,*
*3 Kendirbesta li ber sûrê.*

**S. 8** *1 Weke dilê min tîr lê nijar,*
*2 P’êta dil da we li anî x[w]ar,*
*3 Dikir gazî weylêr hawar.*

**S. 8** *1 Hewar digot, hewar nayê,*
*2 Bavo dikir, sed car dayê,*
*3 R̂oja çûyî pajda nayê,*
*4 Mirin li dinê hilnayê,*

**S. 9** *1 Hawar digot, hawar nayê,*
*2 Bavo dikir, sed car dayê,*
*3 R̂oja çûyî pajda nayê,*
*4 Mirin li dinê hilnayê,*

**S. 9** *1 Her heye xudanê sebirê,*
*2 Nedîr şemale ser dewrê,*
*3 Mal-wêrano beniyademo,*
*4 Her tu mêvanê qebirê.*

**S. 10** *1 Her heye xwedanê[3597] sebirê,*
*2 Nedîr şemalê ser dewrê,*
*3 Mal-wêrano benî[3598] Ademo,*
*4 Her tu mêvanê qebirê.*

---

[3593] *dayn*
[3594] *qelp*
[3595] *emr*
[3596] *mader*
[3597] *xudan*
[3598] *beny*

# IV. Qesîda

## 1. QESÎDA ȒABIYA EDEWIYE[3599; 3600]

*Bi Desturi Xudê*

**S. 1** *1 Hey li min cema' bûn velîye*[3601]*,*
*2 Şêx Me'rûfî Kerxîye,*
*3 Bazîdî Bastamîye,*
*4 Dawidî T'ixumîye,*
*5 (Şêx Cûnêd Şiblîye).*
*6 Herçar birayêt qîmetîye,*
*7 Bi derê şerefxane diçîye,*
*8 Ȓabî ji min ȓa der înîye.*

**S. 1** *1 Hey li min cemandibun weliye,*
*2 şêx cinêdî şiblîye,*
*3 şêx me'rufî kerxîye,*
*4 bazîdî bastemîye,*
*5 dawidî tixubîye,*
*6 Li derê şeref xana were di çîye,*
*7 Ȓabî ji mi aȓ der anîye.*
*1 Ȓabî edewîye,*
*2 hayî aşiqa heyrano,*
*3 sura edewiye.*

**S. 2** *1 Xelqê ẍafilî şenge,*
*2 Denge û ço ȓenge,*
*3 Da ji ĥeya biçit ȓenge.*

**S. 2** *1 Xelkê xafilî şene,*
*2 dengê bi çu ȓenge,*
*3 da ji heya biçit ȓenge.*

**S. 3** *1 Xelqê ẍafilî kore,*
*2 Şêx Bazî mêrekî p'îre,*
*3 Şerm kir biçite dîwanêt feqîra.*

**S. 3** *1 Xelqê ẍafilî yî kore,*
*2 şêx bazîd mêrekî p'îre,*
*3 Şerim kir biçte dîwanê feqîra.*

**S. 4** *1 ȓabî ciwaneke çake,*
*2 geȓya bû zikak bi zikake,*
*3 ȓabî li vî dengî Qewî miştaqe.*
*1 ȓabî edewîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 sura edewîye.*

**S. 4** *1 Ȓabî Edewiye,*
*2 Girte ber xwe berî wê dîye,*
*3 Şivanekî dibînîye.*
*4 Ji Şivanî dipirsîye.*

**S. 5** *1 ȓabî edewîye,*
*2 Girte berxo beȓî û wêdiye,*
*3 Şivanekî di bînîye,*
*4 Ji şivan di pirsîye.*

**S. 5** *1 «Şivano, şivane!*
*2 Te mal lê xirab nebit li wêrane,*
*3 Te nedîtye ew silt'ane,*

---

[3599] [2] (rr. 712-716)
[3600] Laliş 27 (rr. 63-70) 2007 Belavkirin: Rêsan Hesen
[3601] *welîye*

*4 Dê dilê R̂abî pê dibit ĥeyrane».*
**S. 6** *1 Şivano, şivane,*
*2 te mal xirab nebit li wan r̂ane,*
*3 te ne dîtîye ew sultane,*
*4 yê dilê r̂abî pê dibit ĥeyrane».*

**S. 6** *1 Şivan dibêjit: «E'ybe li te hurmetê[3602],*
*2 Eve çil salî dik'êşime xîretê,*
*3 Ji r̂astî dilê min der netê».*
**S. 7** *1 Şivan di bêjit[ê]:*
*2 êbbit li te hirmetê,*
*3 eve çil sale di k'êşim x̂îretê,*
*4 hêş r̂astî ji dilê min dernetê».*
*1 r̂abî edewîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 sura edewîye.*

**S. 7** *1 «R̂ojekê sibeye[3603],*
*2 Min siwarek bi r̂êve dîye,*
*3 Di berda t'anc û hile û xerqê nûranî ye.*
**S. 8** *1 «r̂ojekê sibehîye,*
*2 min siwarek bi r̂êve dîye,*
*3 Li berde t'anc û hillen, xerqê nûranîye,*

**S. 8** *1 Ji ber te eva çil salî min zanîye,*
*2 Eva sur̂a şêxê Adîye[3604],*
*3 R̂abî Edewiye,*
*4 Ĥal pê dibûn qewîye».*
**S. 8** *4 Mane ji berî Çil salî min dizanîye,*
*5 eve Sur̂a şêxê adîye!»*

**S. 9** *1 Ço ser merzê bîrê,*
*2 Merzê bîrê vedinusîye,*
*3 Dît xulqekî t'ênîye,*
*4 Xwezî min bizanîye,*
*5 Miraza vê xulqatê çîye?*
**S. 9** *1 r̂abî edewîye,*
*2 wê Girte ber xo ber̂î û wêdîye,*
*3 Ço ser merzê bîrê – merzê bîrê vednuziye,*
*4 dît xulqetek yê tênîye,*
*5 xuzî me bi zanîye miraza vî xulqetî Çîye?*
*1 hey r̂abî edewîye,*
*2 aşiqo heyrano,*
*3 sura edawîye.*

**S. 10** *1 Ji k'eremê min dave,*
*2 Ewî ĥeywanî we cewab ve dave:*
*3 «Ya R̂abî, ĥizreta[3605] min nuqtek ave».*
**S. 10** *1 ji k'eremê min dave,*
*2 ewî ĥeywanî we Cewab di dave:*
*3 «ya r̂abî, ĥizreta min piçek ave».*

**S. 11** *1 R̂abî Edewiye,*
*2 K'êrek ji berîka xwe der anîye,*
*3 Keziyêt xwe pê bir̂îye,*

3602 *hirmet*
3603 *sube*
3604 *şêx E'dî*
3605 *ĥizret*

*4 Kire şerîtekî nûranîye.*
**S. 11** *1 r̂abî edewîye,*
*2 k'êrek ji berîka xo deranîye,*
*3 havête kezyêt xo û ji binî da bir̂îye,*
*4 kire şerîtekî nûranîye,*

**S. 12** *1 Gehişte binê bîrêye*
*2 Av ji sumka xwe der aniye,*
*3 Dabû wî xulqatê t'ênîye.*
*4 Xêr ji wî xulqatî dibînîye,*
**S. 11** *5 gehşte binê bîrê, av bi simka xo deranîye,*
*6 da bu wî xulqetê t'ênîye.*
*6 hêr ji xulqetî di têye'*

**S. 13** *1 Berejêr r̂ênî, dît Gay û Masîye,*
*2 Berejor r̂ênî, dît E'rş û K'ursîye.*
*3 Ĥeft t'ebeqêt e'rda, ĥeftêt e'zmana, ser k'efa silt'an Êzîye*
**S. 11** *8 bere jêr r̂ênî, dît Gayî û masîye,*
*9 bere jor r̂ênî, dît erş û Kursîye,*
*10 dît ĥefit tebeqêt erda û ezmana wê li ser kefa sultan êzîye.*

**S. 14** *1 R̂abî av da dêle,*
*2 Ser hilîna, bû qub û hilêle,*
*3 K'ursîy lê dîbû Cebêre.*
**S. 12** *1 r̂abî av da dêra,*
*2 dît Qub û hilêle,*
*3 kursyê lê dîbo Cebêre.*

**S. 15** *1 R̂abî dêl av da ye,*
*2 Mexsusek dur̂ek bora îna ye,*
*3 Xêr kir, xêr ciza ye.*
**S. 13** *1 r̂abî têm avdaye,*
*2 mexsûsa dur̂e haye,*
*3 xêr kera, xêr Cizaye.*
*1 r̂abî edawîye,*
*2 aşiqo heyrano,*
*3 Sura edawîye.*

**S. 16** *1 Xeberek ger̂iyabû li welate,*
*2 R̂abî tê ji xirabate,*
*3 Ser serê wê heye k'eramate.*
**S. 14** *1 Xeber gerya bu li welata,*
*2 R̂abî tê ji xirabata,*
*3 Li serî heye k'iramata.*

**S. 17** *1 Herçar birane,*
*2 Vêk r̂a diden dengane,*
*3 Herçar K'ursîya hatîbê R̂eĥmane.*
**S. 15** *1 her Çar birane,*
*2 Vêk r̂a diden dengane,*
*3 dilê her Çara kursiryê hebîbê r̂ehmane.*

**S. 18** *1 Herçar gulêt bave*
*2 Ji malê diçone pişt ave,*
*3 Gotê: «Tu bi xêr hatî min dave,*
*4 Mêvan werin, bila li derva miskîn zave».*
**S. 16** *1 her Çar birayê qulbabe,*
*2 Ji malê Çone pişt ave,*
*3 go: Tu bixêr hatî min dave,*

*4 mêvan werin, bila li derve bit miskînê zave.*

**S. 19** *1 R̂abî we dibêjîye:*
*2 «Mêvanê min bo min velîye*[3606]*,*
*3 Hindiruk li xanî nîye».*
**S. 17** *1 r̂abî we dibêjîye:*
*2 mêvanê min bo welîye,*
*3 hindiro gulxanê nîye.*

**S. 20** *1 R̂abî we dibête:*
*2 «Yê bite zava bila nête,*
*3 Min ji wî qewî şerme û fête».*
**S. 18** *1 r̂abî we dibête:*
*2 yê bibte zava bila nête,*
*3 Min ji wî Qewî Şerme u fehête.*
*1 heyî r̂abî edawîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 Sura edawîye.*

**S. 21** *1 …………………… .*
*2 «R̂abî, tu bi cîde,*
*3 Em şêxin tu mirîde».*
**S. 19** *1 we dibêjît Şêx bezide:*
*2 «ya r̂abî, tu bi Cîde,*
*3 em Şêxin tu mirîde.*

**S. 22** *1 «Ez mirîdê şêxê xwe me,*
*2 Ji berî ne Lewĥ hebû, ne Qeleme,*
*3 Şêxê min ewe li sema.*
**S. 20** *1 ez mirîdê şêxê xome,*
*2 ji berê ne lewh hebu ne Qeleme,*
*3 Şêxê min ewe li Sema.*

**S. 23** *1 «Şêxê min silt'ane,*
*2 Bi destî heye mişurê mêrane,*
*3 Serê ĥemû wa îmane.*
**S. 21** *1 Şêxê min Sultane,*
*2 di destîda mişûra mêrane,*
*3 serê ĥemwê îmane.*

**S. 24** *1 Şêxê min heweste,*
*2 Gustîla qudretê wa li deste,*
*3 Sedî wekî te û nebîy Meĥemed pêşve diweste,*
*4 Ewan maşê xwe jê dixweste.*
**S. 22** *1 Şêxê min heweste,*
*2 gustîla Qudretê wê li deste,*
*3 sed wekî te û p'êẍember pêş ve di weste,*
*4 mêr hatin maşê xo jê di xuste.*
*1 r̂abî edewîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 Sura edawîye.*

**S. 25** *1 Be'dî çil salî t'emame,*
*2 Şêxek dê ji Şame r̂abe,*
*3 Navê wî silt'an şêx Adî ye,*
*4 Hûm dê bine xulam, ez dê bime cêrîye.*
**S. 23** *1 piştî Çil salê dîye,*

[3606] *welî*

*2 Şêxek dê ji Şam r̂abîye,*
*3 laliş meqamê wiye,*
*4 navê wî siltan şîxadiye,*
*5 hûn dê bine xulam, ez dê bime cêrîye.*

**S. 26** *1 Be'dî çil salî t'emame,*
*2 Şêxek dê r̂abit ji Şamê, Laliş meqame,*
*3 Navê wî silt'an şêx Adî ye, «e'leyhî selame»,*
*4 Ez dê bime cêriye, hûn dê bine xulame.*
**S. 24** *1 piştî Çil salê temame,*
*2 Şêxek dê r̂abit ji Şame,*
*3 laliş meqame, navê wî siltan Şîxadî eleîhiselame,*
*4 Ez dê bime Cêrîyê, hun dê bine xulame.*

**S. 27** *1 K'erem, k'erema mêrane,*
*2 Şifq — şifqê P'adşane,*
*3 Serê ĥemûya îmane.*
**S. 25** *1 Kerem, kerema mêrane,*
*2 Şifqet — şifqeta padşane,*
*3 serê hemwê îmane,*
*4 kesê bawerî bi hirmetê nîne.*
*1 r̂abî edawîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 Sura edawîye.*

**S. 28** *1 Kesek bawerîyê li ĥurmetê neînin,*
*2 Hûn şerbikê avê bînin,*
*3 Beyana lê bicerbînin.*
**S. 26** *1 sêrbikê avê bînin,*
*2 beyana lê bi cerbînin.*
*3 xelkê lê di bihîstine,*
*4 lê ji we keremê dihestine.*

**S. 29** *1 Xelqê lê dibihîste,*
*2 K'î ji we seremê heste.*

**S. 30** *1 Şêx Bezîd mîrekî bi k'are,*
*2 Wek'az bijart bû li nav dare,*
*3 Wek'az li şerbî da, şerbik dişkeste.*
**S. 27** *1 Şêx bezîd mêrekî bi kare,*
*2 wekaz bijartibu ji nav dare,*
*3 wekaz li şerbik da, şerbik û kelêt avê tê îna xure.*

**S. 31** *1 Şerbik û kelê avê t'êkda di îna xware.*
*2 R̂abî dibêjit: «Ĥeyfa min tê, yekî wekî te li dîwenê yî şermîn, şermezare».*
**S. 28** *1 rabî dibêjit:*
*2 heyfa me li wê têt*
*3 mêr wekî te li dîwenê yê şermîn, yê şermezare.*

**S. 32** *1 Dor hatîye ser R̂abî sermeste,*
*2 Destûr ji Xwedê û mêra dixweste,*
*3 Pişta xwe bi silt'an şêx Adî beste,*
*4 Wek'az hilgirtbû bi deste,*
*5 Wek'az li şerbî da, av li qendîl*[3607] *vediweste.*
**S. 29** *1 dor hatîye ser r̂abî sermeste,*
*2 destûr ji xudê û mêra di xuste,*

[3607] *qendê*

*3 pişta xo bi siltan Şîxadî ve di beste,*
*4 wekaz hilgirtibû bi deste,*
*5 wekaz li şerbik da, şerbik di şkeste.*
*1 r̂abî edewîye,*
*2 hayî aşiqo heyrano,*
*3 Sura edawîye.*

**S. 33** *1 Bi qûdreta Celîle,*
*2 R̂abî şikandbû sebîle,*
*3 Av mue'leq vewestandbû li qendîle.*
**S. 30** *1 bi Qûdreta Celîle,*
*2 r̂iabî şikandibû sebîle,*
*3 av mueliq westandbû li Qendîle.*

**S. 34** *1 Ew bûn mêrêt Ellaĥe*[3608]*,*
*2 Vêk r̂a didem medehe:*
*3 «Ya R̂ebî, seĥe û sed carî seĥe».*
**S. 31** *1 ew bû mîrehêt ellah,*
*2 Vêk r̂e didin medeh:*
*3 ya r̂ebî, r̂aste û sed Car r̂aste.*

**S. 35** *1 Ew bûn mêrêt me'bûde,*
*2 Vêk r̂a diden ĥedûde,*
*3 Dik'êşine ber R̂abî û şêx Adî sicûde.*
**S. 32** *1 ew bû mirê mabûde,*
*2 vêk r̂a didin xidûde,*
*3 Dê cine ber şîxadî û r̂ebîne sicûde.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame û r̂eĥme li dayî û babêt guhdara!*
*em di kêmin, xudê yê temame!*

## 2. QESÎDA NADIMÎ[3609]

**(zimanê k'urdî)**
*1 Hogirê min ewe, yê eşqê bi ĥaya, çu nike ez bi xwe ĥeyame,*
*2 Dê xweşî*[3610] *û şayîyêt*[3611]*min bînit, dê ciyê eşqa Xwedê (vexwerina Xwedayî) bînî,*
*3 Li dewr û zamanê min, ji bilî Xwedê kes t'unebû,*
*2 Gelî miletî, werin min bigehin, min ĥemû tişt bi cî anî,*
*3 Ez şêxê k'eremdarim bi ser qudreta xwe û ser ciyê vexwarna xwe,*
*4 Min p'êẍember û mîr dest nîşan kirin û ewan jî ez dest nîşan kirim,*
*5 Li dewr û zamanê min, ji bilî Xwedê kes t'unebû,*
*8 Min Adem ji qurê dirust kir û nûr berda kir û bi qudreta min r̂a bû.*
*9 Min Nuĥ p'êẍember û sefîna wî çêkir,*
*10 Kes ji bilî min ne hatîye dinêye,*
*11 Ya R̂eb il-A'lemîn, medih û sena ji te r̂a».*

**(zimanê e'rebî)**
*1 Nadimî min li ĥeya, men kan vî li hewa ĥeya, ena li ĥeya,*
*2 We teliqî erusî, we teliqî ĥanatî,*
*3 Mek'an vî weqtî ẍeyîre îlaĥî şeyîya,*
*4 Te'alu ya qewm heqqunî we ena heqeqtu ku le şeyîya,*
*5 Ena li şeyîx li mutefezel ela qederî we ela ĥanatî,*
*6 Ena bawe'tu li nebî we li ricale wehum bawe'unî,*

[3608] *Eleh*
[3609] [2] (rr. 760-761)
[3610] *xoşî*
[3611] *şahî*

*7 Ma kan vî weqtî ẍeyîre îlaĥî şeyîya,*
*8 Ena neşayîtu Ademe huwe min tîn wehebtu lehu nûra,*
*9 We qam vî qederî we sikanu nebî nu ĥên we li sefînetu min qezayî,*
*10 We ma Eĥedu cah il kevnî siwaye,*
*11 We li medih û we li sena le ke ya R̂eb il-A'lemîn.*

## 3. QESÎDA COPAN

**zimanê k'urdî**[3612]:
*1 Verin, verin, eve ne copanê şivanê pezîye,*
*2 Tiştê me xwindî dê hatiba zanin,*
*3 Ĉav bi qelemê yî kildaye,*
*4 Eve şêxê min Ĥesene di bin xîvetê da.*
*5 Eve ne copanê şivanê berxane,*
*6 Heke ĉêrand bana, dê bane ĥezar*[3613]*,*
*7 Di nêva şeva da, beĥr bilind dibit (bi ser dik'eft).*
*8 Eve şêxê min Ĥesene di bin keprê da,*
*9 Eve ne copane, na bi zimanê e'rebî bi ser min da ẍeyîdî,*
*10 Pawanê pezê min, ji min stand,*
*11 Xwedanê Lalişê di hawara min were,*
*12 Ewe ne copane, ewe mîre,*
*13 Di pêşîya weda r̂axistine sor̂e,*
*14 Li ser pişta ĥêştirê, avê di bîne.*

**zimanê e'rebî**[3614]:
*1 Ĥeya mu lelem, haza mu copan rayî li ẍenem,*
*2 Ena nifira li kanu ulm,*
*3 Me kiĥul li ên, mezrub li qelem,*
*4 Haza şêxî Ĥesen cewab li xêm,*
*5 Haza mu copan rayî li xeruf,*
*6 Ena te r̂a li kanu yauf,*
*7 Bên li leyalî il beĥr tituf hada şêxî Ĥesen cewab ilsiruf,*
*8 Haza mu copan, haza eleye bi li e'rebî exez mek'anî minî ẍenemî,*
*9 Ya camî Laliş Te'al bi t'elebî,*
*10 Haza mu copan, haza li e'mir,*
*11 Qidamu sobên eĥmer serîr,*
*12 Year li ma min ras li beyr.*

## 4. QESÎDA SIBĤANE JI TE MELIKÊ EKBER[3615]

**S. 1** *1 Sibĥane ji te Melikê Ekber,*
*2 Dil min k'elî wek mecber*[3616]*.*
*3 Sêva sore, Şamê der,*
*4 Şamî hatin li der, li ber.*
*5 Misir u T'ewrîz, Wellaĥ Îsender,*
*6 Şêlaz, Gêlaz, Wellaĥ Şuşter.*
*7 Te dêm dur̂ê, Wellaĥ Qemer,*
*8 Van çawîşa gaze-gaze, Wellaĥ li ber.*
*9 Muşt'aqe şêx Fexrê Adiya yek bike barî, bi k'eser.*

---

[3612] [2] (r. 759)
[3613] *hezar*
[3614] [2] (r.758)
[3615] [2] (rr. 754-755)
[3616] binêr: *mecbûr*

**S. 2** *1 Te dêm duȓê, îlaĥ[3617] sîranc,*
*2 Ser zengînê, ser k'ofî bi t'anc.*
*3 Qevd werand, qevda jî anc,*
*4 Lib[a]s ĥerîrê, etles zîmanc.*
*5 Şîr hingêftê, mertal ȓewanc,*
*6 Dil aşiqe, çend moĥt'ac[3618].*
*7 Muşt'aqe şêx Fexrê Adiya yekî bi t'evanî moĥt'ac.*

**S. 3** *1 Te dêm duȓê, xalê di keş,*
*2 Fexra bide ĉav di ȓeş.*
*3 Ew şa ȓêza xalêt bi nefiş,*
*4 Te ji xwe berdan gulîyêt ȓeş.*
*5 Tu serê e'bda li goş,*
*6 Ez ĥeyrim, ĥale (ĥalim) bi coş.*
*7 Miştaqe şêx Fexrê Adiya yekî bi t'evanî serxweş[3619].*

**S. 4** *1 Sing eqîqî, ĥemû[3620] bi cehwer[3621],*
*2 Zeca qatî, ferşêt mermer.*
*3 Kor nigeha darêt li ber,*
*4 Sê kotir westane li ser.*
*5 Liĥêf di k'eskin, be'lgu di zer,*
*6 Bêhn ji bixur, bêhn ji[3622] enber.*
*7 Miştaqe şêx Fexrê Adiya yekî bi t'evanî bi k'eser.*

**S. 5** *1 Hawîr dilqin, şîrê hindî,*
*2 Berda westan, canda cindî.*
*3 Bedirû Qemer[3623], ȓoja min dî,*
*4 Dilo sefîlî, tû yî bilinî.*
*5 Ez ĥeyrîm, ȓoja min dî,*
*6 Dil bi te ȓa, ĥeta k'engî?*
*7 Miştaqe şêx Fexrê Adiya yekî bi t'evanî …………… .*

**S. 6** *1 Min li bejna te dîtin sirîr,*
*2 Qumrî zavin, banê kitîr.*
*3 Tu hatîye min bi ȓim û şîr,*
*4 Te ez kuştim, bi sav û tîr.*
*5 Sed xweziya ȓuĥa tête li bîr,*
*6 Ez aşiqim, bûme hêsîr[3624].*
*7 Miştaqe şêx Fexrê Adiya yekî bi te ȓa yî feqîr.*

**S. 7** *1 Ĉav eskîyê, sing û ber,*
*2 T'elpa nûrî, cudî li ser.*
*3 Goyî hingêvê, pişte van Melikê Ekber,*
*4 Çogan zîvê, ji mêrgê di der.*
*5 Miştaqe şêx Fexrê Adiya bi kovanî, bi k'eser.*

**S. 8** *1 Ĉav eskîyê, xumar di mest,*
*2 Şerab li ber, kevka hewest.*
*3 Leĥim dixwast, şekir dixwast,*
*4 Şekir mekir, bi serda hewest.*
*5 Miştaqe şêx Fexrê Adiya yekî bi hewes.*

---

3617 *îla*
3618 *muĥt'ac*
3619 *serxwoş*
3620 *hemû*
3621 binêr: *cewar*
3622 *bihinj*
3623 *Bedir û Qemer*
3624 *esîr*

**S. 9** *1 Çî horiyeke hawr nefsî,*
*2 Çî sêveke xilxal weşî.*
*3 Me Xwedê û R̂eb il-A'lemîn,*
*4 Gir vê melik Fexredîn hûn bêjin Amîn!*

## QESÎDÊ SÊXANIYAN:

## 5. QESÎDA ADÎYA ŞÊXÊ MINE[3625; 3626]

**S. 1** *1 Hey Adîya şêxê mine,*
*2 Xwedanê[3627] quba mezine,*
*3 Ziyaret jê diçine,*
*4 Dê tiwaf ken babê melik şêx Sine.*
**S. 1** *1 ……………………….*
*2 Xwedanê quba mezine,*
*3 Ziyaret lê diçine,*
*4 Wê tiwaf diken biwabê melik şêx Sine.*

**S. 2** *1 Adîye şêxe xweme,*
*2 Ewê r̂ojê bin heşome,*
*3 Ez ẍûlamè teme,*
*4 Şêx Adî, şêxekî bi k'ereme.*

**S. 2** *1 Hey Adî, mîro Adî!*
*2 Tu dermanê fûadî[3628],*
*3 Şêxê min şêx Adî,*
*4 Sed xwezma[3629] wê r̂uĥî be, jê bit r̂azî.*
**S. 3** *1 Adî mîro, Adî!*
*2 Tû dermanê fûadî,*
*3 Şêxê mine şêx Adî,*
*4 Sed xwezma wê r̂uĥî tu jê dibî r̂azî.*

**S. 3** *1 Me ji Adîya denge,*
*2 Bi wê qubê kem serî bi r̂enge,*
*3 Ji hawîrî şara têne cenge.*
**S. 5** *1 Me ji Adîye denge,*
*2 Bi wê qubê kem serî bi r̂enge,*
*3 Hawîrî şara têne cenge.*

**S. 4** *1 Me ji Adîya mêle,*
*2 Bi wê qubê kem, serî bi hilêle,*
*3 Ji hawîrî şara têne gêle.*
**S. 4** *1 Me ji Adiya mêle,*
*2 Bi wê qubê kem, bi hilêle,*
*3 Hawîrî şara têne dêre.*

**S. 5** *1 Me ji Adîye bexşe,*
*2 Bi wê qubê kem serî bi E'rşe,*
*3 Cema'ya mêra wa li Lalişe.*

**S. 6** *1 Ew sinceqa sor û zere,*

---

[3625] [2] (rr. 668-669)
[3626] ……..
[3627] *xudan*
[3628] *fuad*
[3629] *xozme*

*2 Ji Lalişê têne dere,*
*3 Sinceq, sinceqa şêxê Ekbere.*

**S. 7** *1 Ew sinceqa sor û sipîye,*
*2 Ji Lalişê der anîye,*
*3 Sinceq, sinceqa şêxê Adîye*[3630].

**S. 8** *1 Zora sinceq di bîȓastin,*
*2 Ji Lalişê ve diguhastin,*
*3 Sinceqêt şêx Adî ĥemû di ȓastin.*

## 6. QESÎDA AMEDÎN[3631]

**S. 1** *1 Xelqo*[3632] *yî jîrî, zana,*
*2 Çil mêrî xewlexane,*
*3 Şêx Amadîn dergewane.*

**S. 2** *1 Bifikirîn hune,*
*2 Çil mêrê k'afune,*
*3 Dergewan — şêx Amadîne.*

**S. 3** *1 Şêx Sin — P'adşaye,*
*2 Derê k'afê qutaye,*
*3 Şêx Amadîn cewab daye.*

**S. 4** *1 Şêx Amadîn dabû cewabe*[3633]*,*
*2 Ew k'îye li pişt mêrave,*
*3 Wê têt dengê şêx Sinê babe.*

**S. 5** *1 We dibêjit şêx Amadîne:*
*2 «Ȓaste û şik tê nîne,*
*3 Cilêt me bi yekîne».*

**S. 6** *1 Şêx Sin ȓênî wêve,*
*2 Dît derwêşek têt bi ȓêve,*
*3 Destî bi xune pêve.*

**S. 7** *1 Sekinî bi kiriyasê,*
*2 Awir digêȓin k'asê,*
*3 Silêman têt ji paşê.*

**S. 8** *1 Silêman qedimî û kir silave,*
*2 Mîr mêwîjek dave,*
*3 Şêx Şems p'erxand k'eşkûl*[3634] *ave.*

**S. 9** *1 K'eşkûl ya qewîye,*
*2 Şerbet ji kaniya Sipîye,*
*3 Pê serxweş bûn cindîye.*

**S. 10** *1 Mêwîj û mîr hinare,*
*2 Çil mêrî jêve dixware,*

---

[3630] *Edî*
[3631] [2] (rr. 683-684)
[3632] *xelk*
[3633] *ciwab*
[3634] *keşkul*

*3 Xasa ser di spare.*

## 7. QESÎDA SÊX BABIK[3635]

**S. 1** *1 Distirêm cindîye,*
*2 Şêx Babikî zerîye,*
*3 Hêvên ji kaniye Sipîye.*

**S. 2** *1 Hêvên ji r̂astî e'yîn meyîne,*
*2 Mek'anê Şems û Fexredîne,*
*3 Mêr pê diînin bawerî û yeqîne*[3636]*.*

**S. 3** *1 Hêvên ji ĥewd li kewtele,*
*2 Şêx Babik wê li sere,*
*3 Mek'anê şêx Şemse dur̂a zera,*
*4 Hey nûro yî ji dur̂a zera!*

## 8. QESÎDA NASIRDÎN[3637]

**S. 1** *1 Distirêm Nasirdîne,*
*2 Dayîm borê wî yî bi zîne,*
*3 Dayîm li dergehê silt'îne.*

**S. 2** *1 Distirêm mêrane,*
*2 Nasirdînê babane,*
*3 Dayîm li dergehê P'adşane.*

**S. 3** *1 Quba teye qewîye,*
*2 Nasirdîn têda welîye,*
*3 Nasirdîn celatê*[3638] *şêxê Adîye*[3639]*.*

**S. 4** *1 Quba teye mezine,*
*2 Nasirdîne têda bo mine,*
*3 Nasirdîn celatê melik şêx Sine.*

**S. 5** *1 Qubek deq Beẍdaye,*
*2 Du*[3640] *şêr ser r̂awestaye,*
*3 Yek Nasirdîne, yek Sicaye.*

## 9. QESÎDA SICADÎN[3641]

**S. 1** *1 Hikmek wê nazilî*[3642]*,*
*2 Li e'rdave wesilî,*
*3 Ew dinya t'êk zilzilî*[3643]*.*

---

[3635] [2] (r. 685)
[3636] *êqîn*
[3637] [2] (r. 680)
[3638] *celad*
[3639] *şêx E'dî*
[3640] *dû*
[3641] [2] (rr. 678-679)
[3642] *nizil*
[3643] *zinzinî*

**S. 2** *1 Hikmek hat ji jûre,*
*2 Nazilî ser şêxê bi nûre,*
*3 Sebebk'ar şêx Mensûre*[3644]*.*

**S. 3** *1 Hikmek hatîye ji sema,*
*2 Nazilî ser şêxê bi k'ereme,*
*3 Ew dinya pê hilînabû qedeme.*

**S. 4** *1 Deştane û zozane,*
*2 Teĥliya û ser mek'ane,*
*3 Ser Sicayê sicane.*

**S. 5** *1 Xeber bigehine K'aşaxîya,*
*2 Bila berden r̂eş xumarîya,*
*3 Ser şêx Fexrê Adiye.*

**S. 6** *1 Cendî K'aşaxîne,*
*2 Ĥemû bi ĥuzn u şîne,*
*3 Ser melik Sicadîne.*

**S. 7** *1 E'rebê Çilwaye,*
*2 Li min werne vê r̂aye,*
*3 Hizina*[3645] *şêx nebin şaye.*

**S. 8** *1 Şêxê Silêmî*[3646]*,*
*2 Situna qilêmî*[3647]*,*
*3 Hajot ço cêmî*[3648]*.*

**S. 9** *1 Mîr bimînin dayîm,*
*2 Mîr dayîm bi dîwane,*
*3 Mîr Sicanê sicane.*

## 10. QESÎDA ŞERFEDÎN[3649]

**S. 1** *1 Şerfedîn ẍerazê gulê,*
*2 Dê bixemilî, dê bixemilî,*
*3 Ew sineta*[3650] *sotî dilî.*

**S. 2** *1 Xiveta melik Şerfedîne,*
*2 Min vedayî li Nisêbîne,*
*3 Serê t'erefa ço e'zmînê.*

**S. 3** *1 Ciwabê bidne K'ûrdistanê,*
*2 Bila qayîm ken îmanê,*
*3 Şerfedîn mîre li wê dîwanê.*

**S. 4** *1 Ciwabê bidene Heyporiya,*
*2 Bila berden r̂eş xumriye,*

[3644] *Misur*
[3645] *ĥizin*
[3646] *Silêmî* – nave şêxekîye
[3647] binêr: *qelem*
[3648] binêr: *came*
[3649] [1] (pp 221-222?); [2] (rr. 674-675)
[3650] *sunet*

*3 Şerfedîn mîrê E'deviye*[3651].

**S. 5** *1 Şerfedîn ji miẍarê hate dere,*
*2 Sed ĥezar qewşen yî li bere,*
*3 Nûrî a'lem*[3652] *hey li sere.*

**S. 6** *1 Şerfedîn ji miẍarê derk'eft,*
*2 Sed ĥezar qewşen ji ber k'eft,*
*3 Nûrî a'lem hey li ser k'eft.*

**S. 7** *1 Şerfedîn berê xwe ji miẍarê wergêȓa,*
*2 Sed ĥezar qewşenî vê ȓa,*
*3 Hesp di bozin, zin yî zêȓe.*

**S. 8** *1 Şerfedîn wê têt ji Ẍerbe,*
*2 Ȓast û çep di hingêvit dirbe,*
*3 Ẍafîl dêmirin ji k'erbe.*

**S. 9** *1 Şerfedîn ji Ẍerbêve*[3653] *têye,*
*2 Ȓast û çep di hingêvit dirbêye,*
*3 Ẍafîl dêmirin ji k'erbêye.*

## 11. QESÎDA SÊX ALÊ ŞEMSA[3654]

**S. 1** *1 Çakiya sinetê*[3655] *bi dildarî,*
*2 Dil pê biçin şêr di siwarî,*
*3 Dil ser neçin çu k'ubarî.*

**S. 2** *1 Çakiya sinetê bi ȓastîye,*
*2 Ji borî vebin bi ĥeqîye,*
*3 Helbet dewlat tête serîye.*

**S. 3** *1 Ji borî vebin bi ĥemlîne,*
*2 Berva neden ser kislîne,*
*3 Helbet feqîr tên nasîne.*

**S. 4** *1 Ji borî vebin qeyda di p'êken,*
*2 Zînê ȓastiyê malo lêken,*
*3 Çêken birano, sed cara ji xwe ȓa çêken.*

**S. 5** *1 Ji borî vebin, dawet nebî,*
*2 Bi mista bidê, da ĥemer nebî,*
*3 Da ȓoja axretê kore nebî.*

**S. 6** *1 Ya xwe, min bi ya xwe di dest,*
*2 Wekî te borî bire best,*
*3 Liẍab*[3656] *û hefsar çon ji dest,*
*4 Li gelek mêrga di best,*
*5 Ew şola nefsê bû, xulqê*[3657] *li axretê ji ber şkest.*

---

[3651] *e'dewîye*
[3652] *e'lem*
[3653] binêr: *ẍerbe*
[3654] [2] (rr. 687-688)
[3655] *sunet*
[3656] *liẍav*
[3657] *xulk*

**S. 7** *1 Wekî te bor bet'er bû,*
*2 Lixab û hefsar ji destê wî ker bi ker bû,*
*3 Ew şola nefsê bû, xulqê li axretê zer bû.*

**S. 8** *1 Wekî te bor anî,*
*2 Zîn kir weke dizanî,*
*3 Ew şola nefsê bû, min silav kir li silt'anî.*

**S. 9** *1 Wekî te bor zîn kir,*
*2 Merk'eba bi ĉavîn kir,*
*3 Ew şola nefsê bû, min silav li silt'an kir.*

**S. 10** *1 Wekî te bor av da,*
*2 Merk'eba bi ĉav da,*
*3 Ew şola nefsê bû, min silav li şêx Şems ve da.*

## 12. QESÎDA SÊX CENCER[3658]

**S. 1** *1 Serafe cewahir ĥeqayîq,*
*2 K'eşafe xewamze deqayîq.*

**S. 2** *1 Vê ĥerfê nikarim ez şiro kem,*
*2 Bê meyî cav venabit bo we r̂on kem.*

**S. 3** *1 Yek p'erdaxe meyî bide me r̂uĥ,*
*2 Kevnar û kevn ser deme Nuĥ.*

**S. 4** *1 Da dinya ĥemû bo min xuya[3659] bit,*
*2 Ĥemûye bibînim ya p'enah[3660] bit.*

**S. 5** *1 Eyî muzhirê a'lem bo ûcudê,*
*2 Eyî menbe'yê k'erem û wicudê*

**S. 6** *1 Eyî sewerê cumleyî enwar,*
*2 Eyî e'rfê penhan û dîyar.*

**S. 7** *1 Her zatê teye dizanit nihan,*
*2 Nuqte ji nûra te co gîyan.*

**S. 8** *1 Ne te awaze, ne goye, ne sifatin,*
*2 Ne te r̂enge, ne te denge, ne cihatin.*

**S. 9** *1 Tawis ji nûra xwe te dîyarî kir,*
*2 T'êkda melekû milka[3661] xweya kir.*

**S. 10** *1 Eyî ezdanê waĥd,*
*2 Tu e'ĥed bo me, tu fer û heme derd.*

**S. 11** *1 Cavê te hebit li hind dasin,*
*2 Zergun, û p'êxwa,s û bê kirasin.*

**S. 12** *1 Nezan lê nizanin r̂az û esrar,*

---

[3658] [2] (r. 757)
[3659] *xoya*
[3660] *pena*
[3661] *melek û milka*

*2 Lewra dikujin cend p'iȓ û înk'ar.*

**S. 13** *1 Hîvî dikeyîn tu me xilaskeyî,*
*2 Miletê Êzid bê bela keyî.*

## 13. QESÎDA SÊX E'BDILQADIR[3662]

**S. 1** *1 Şêx Adî best dîwane,*
*2 Gote E'bdilȓeĥmane,*
*3 Suȓa[3663] her K'abê sûkane.*

**S. 2** *1 Mêr lê cema' dibûne,*
*2 Şêx Adî kir sixûne,*
*3 E'rş ȓawestit bêyî stûne.*

**S. 3** *1 Şêx E'bdilqadir suȓ bire xeberekî,*
*2 Ser dana ber şêx Adî û ziviȓî,*
*3 Bi xilmetê bo mişterî.*

**S. 4** *1 Mişterî vê xilmetê,*
*2 Hey P'adşê min yê dinê û axretê,*
*3 Şêx E'bdilqadir bû birê şêx Şems yê axretê.*

**S. 5** *1 Xilmet bi ser û ĉave,*
*2 E'rş naziliȓ[3664] hindave,*
*3 Li şêx Adî dikir silave.*

**S. 6** *1 Sed cêşê Binîmayê,*
*2 Kaniya Sipî kir qubleye,*
*3 Cumlet bi melik şêx Sin da şehdeye.*

**S. 7** *1 Şêx Adî, melik şêx Sin bi şêxînî qebiland,*
*2 E'rş û K'ursîy bora xemiland,*
*3 Milyak'eta li e'zmana bora hilhiland.*

**S. 8** *1 Şêx Adî meqbûle,*
*2 Pê zeynandbû stûne,*
*3 Dîwana şêx Adî kirbû şewq û nûre.*

## 14. QESÎDA SÊX MEND[3665]

**S. 1** *1 Seyîdî, îro min dîtbû civane,*
*2 Di dilê min da bû ĥezîneka[3666]girane,*
*3 Seyîdî, siniya[3667] pê çobû dîwane.*

**S.2** *1 Seyîdî, min çî mirand,*
*2 Seyîdî, ĥece sore,*
*3 Mîr ji mîra vavire,*

---

[3662] [2] (r. 677)
[3663] *sur*
[3664] *nizil*
[3665] [2] (rr. 681-682); *Laliş* 36, 2012. (rr. 29-30) Belavkirin: Kemal Tolan. http://ru.calameo.com/read/00251831720d66ffd52cf;
[3666] *ĥiznek*
[3667] *suniye*

*4 Şêx Adî şêx Mend xelat kire.*

**S. 3** *1 Sindirûka sor û sipîye,*
*2 Ji Ĥelebê der anîye,*
*3 Seyîdî, şêx Adî li ber diçîye.*

**S. 4** *1 Sindirûka sor û zere,*
*2 Ji Ĥelebê hate dere,*
*3 Seyîdî, şêx Adî ço bere.*

**S. 5** *1 Sindirûka zêr̂îne,*
*2 Ji Ĥelebê dertine,*
*3 Wesilandine Mêrdîne.*

**S. 6** *1 Wesiland[in]e R̂uĥa yê,*
*2 Feqîra şehda dayê,*
*3 Sindirûka k'eske hatine hewayê.*

**S. 7** *1 Sindirûka k'ibîre,*
*2 Şêx Mend t'abûteke k'ibîre,*
*3 Vê r̂a kirbû feqîre,*
*4 Wesilandine Cizîre.*

**S. 8** *1 Sindirûka girane,*
*2 Şêx Mend t'abûteke girane,*
*3 Şêx Mendê Fexrane,*
*4 Wesilandine Bozane.*

**S. 9** *1 Sindirûka bi neqşe,*
*2 Şêx Mend t'abûteke bi neqşe,*
*3 Vê r̂a kirbû delqe*[3668] *r̂eşe,*
*4 Wesilandine Lalişê.*

**S. 10** *1 Wesilandine Semedrê,*
*2 Welîyo, xwedanê Ĥeq warê*[3669]*.*
*3 Seyîdî şêx Mend xelat kir vê care.*

## 15. QESÎDA ŞÊXÊ ĤESENÎ SILT'ANE[3670]

*Bi desturî Xwedê!*
**S. 1** *1 Sêxê Ĥesenî silt'ane*[3671]*,*
*2 Babê qelbê*[3672] *R̂eĥmane,*
*3 Mîrê qelendera,*
*4 Laliş ya bor, dîwan ye bor, mergeh ye bor, ye bor, ye bor,*
*5 P'adşê mey silt'ane li ĥemû derda yî dermane.*

**S. 2** *1 Sêxê Ĥesenî feqîre,*
*2 Li ĥemû derda yî xebîre,*
*3 Babê qelbê mîre.*

**S. 3** *1 Sêxê Ĥesenî mezine,*
*2 Babê qelbê momine,*

---

3668 *dileq*
3669 *Hekar*
3670 [52] (гг. 272-274)
3671 *sultan*
3672 *qelp*

*3 Qap'îya miraza melik şêx Sine, ew ciyê gilyan û gazine.*

**S. 4** *1 Sêxê Ĥesenî seyîda,*
*2 Babê qelbê mirîda,*
*3 Qap'îya miraza silt'an Êzîda.*

**S. 5** *1 Sêxê Ĥesenî eĥmere,*
*2 Silt'an Êzîd xaliqekî minî her bi here,*
*3 Hikmeta silt'an şêx Adî duwazde ĥezar sere.*

**S. 6** *1 Sêxê Ĥesenî dil birîndare,*
*2 Li borê muĥbetê yî siware,*
*3 T'extê mîra qiryare.*

**S. 7** *1 Sêxê Ĥesenî celale,*
*2 Bi wê k'ursiyê kem, li ser sekinî Êzîdî Te'ale,*
*5 Bêy qirara silt'an şêx Adî û melik şêx Sin, çu qalba řuĥ naçe bale.*

**S. 8** *1 Sêxê Ĥesenî hesede,*
*2 Silt'an Êzî xaliqê minî se'ede,*
*3 Bêy firwara silt'an şêx Adî û melik şêx Sin řuĥ naçe bal çu cesede.*

**S. 9** *1 Bi wê qubê kem, serî li E'rşe,*
*2 Li ber îsîyabû*[3673] *fend û şemalê nûranî yê geşe,*
*5 Mîrê dîwanê silt'an şêx Adî û dîwanbegê wî Şemse.*

**S. 10** *1 Bi wê qubê kem, serî li e'zmane,*
*2 Li ber îsîyabû fend û şemalê nûrîne,*
*5 Mîrê dîwanê silt'an şêx Adî û dîwanbegê wî Şemsê Êzdîne.*

**S. 11** *1 Bi wê qubê kem, ye mezine,*
*2 Fend û şemal îsîyabûn li bine,*
*3 Mîrê dîwanê silt'an şêx Adî û dîwanbegê wî Şemsê mine.*

**S. 12** *1 Bi wê qubê kem, seransere,*
*2 Fend û şemalê nûranî îsîya bûn li bere,*
*3 Mîrê dîwanê silt'an şêx Adî û dîwanbegê wî Şemsê T'et'ere.*

**S. 13** *1 Bi wê qubê kem, ya p'iř sewaye,*
*2 Ew cî ciyê şêx Adî wê têde,*
*3 Sêx Berk'at mîre, jê řa bir maş û xelête.*

**S. 14** *1 Bi wê qubê kem, quba nûrîne,*
*2 Cî, ciyê silt'an şêx Adî û sitiya Ês lê datîne,*
*3 Xasêt şêx Adî hatin û medhe jê dayîne.*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 16. QESÎDA SÊX SIN [3674] (QESÎDA KES NE TÊ[3675]) — BEYT'A ŞÊX ÎSN[3676]

[3673] *êsiya*
[3674] [1] (pp 219-221); [2] (rr. 672-673)
[3675] [2] (rr. 489-493)
[3676] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYT'A ŞÊX ÎSN* (rr. 27-29) T'ilbîs 2001

**S. 1** *1 Kes ne tê, kes ne tê,*
*2 Were bêjme we qisetê,*
*3 Bo şêx Sinê[3677] sinetê[3678].*

**S. 1** *1 Kes sunetê, kes sunetê,*
*2 Werin bikin sunetê,*
*3 Şêx Îsn şêxê sinetê.*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 2** *1 Kes sunetê neĥoke,*
*2 Pirs bikin maşoqe,*
*3 Şêx Îsn serekî çendî coqe.*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 3** *1 Kes sunetê nehîne,*
*2 Pirs bikin hêqîne,*
*3 Şêx Îsn şêxê nûrîne,*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 2** *1 Kes netê ji destane,*
*2 Pirs biken ji birane,*
*3 Bo şêx Sinê şêxane.*

**S. 4** *1 Kes sunetê deştane,*
*2 Pirs bikin birane,*
*3 Şêx Îsn şêxê şêxê şêxane,*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 3** *1 Xetê ji Musilîye[3679],*
*2 Çî û çî tê nabînîye,*
*3 Berê xwe jê wergeȓîye.*

**S. 4** *1 Xetê ji Musile,*
*2 Pirs bikin ji E'dîle,*
*3 Bo şêx Sinê babê Gule.*

**S. 5** *1 Sêx Sin xetê dixwinî,*
*2 Çî û çî nabînî,*
*3 Berê xwe jê werdigîȓînî.*

**S. 6** *1 Ĥeft qedeĥ jehre[3680],*
*2 Sêx Sin wedixware,*
*3 Xeberek nedihate zare.*

**S. 14** *1 Ĥeft sitegan je're,*
*2 Ber şêx Îsnê mala Madiya dinihare,*
*3 Şêx Îsn her ĥeft vedxware,*
*4 Xeberek ne da zare.*

**S. 15** *1 Ĥeft sitegan je'riye,*
*2 Ber şêx Îsnê Madiya daniye,*
*3 Şêx Îsn her ĥeft jî xariye,*
*4 Xeberek ne da zariye.*

---

[3677] *Şêxsin*
[3678] *sunet*
[3679] *Mûsil*
[3680] *jeĥr*

**S. 7** *1 Amanet[3681] — amanete,*
*2 Amanet — sinete,*
*3 Amanet te dikem p'iȓ sifete[3682].*

**S. 8** *1 Çandî malê xwe me,*
*2 Ĥemî wê bi te dideme,*
*3 Ez sinetê bernademe.*

**S. 9** *1 Çandî mala didêrim,*
*2 Ĥem wê bi te disip'êrim,*
*3 Ez sinetê na azêrim.*

**S. 5** *1 Bediredîn vê dibêye:*
*2 «Şêxo, serê şêxê Madiye,*
*3 Minê ĥecek çê kirye, ȓiya ĥecê te biȓiye»,*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 10** *1 Bedredîn we dibêjîye:*
*2 «Hey şêx Sino bin Adîye,*
*3 Te Lalişeke xwe ava kirîye,*
*4 Te ȓêya ĥecaca biȓîye».*

**S. 6** *1 Bediredînê wê dibêye:*
*2 «Şêxo, serê şêxê teyî Madiye,*
*3 Ĥecek çê kirye, ȓiya ĥecê te biȓiye,*
*4 Were bêje, ĥeca bavê min k'uye?»*
*5 - Ayî şêxî suniyano,*
*6 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

(Êdî şêx Îsn nas dike, wekî eva Bedroye, dore wî girtiye û hotiye ser wî şêr).

**S. 11** *1 Sêx Sin we dibêjîye:*
*2 «Bi serê şêxê Adîye[3683],*
*3 Ĥeca me Zimzime û mix̂are, û k'afe, û kaniya Sipîye,*
*4 Ĥece û şik tê nîye,*
*5 P'adşa bi xwe şêx Adîye».*

**S. 7** *1 Şêx Îsn va dibêye:*
*2 «Bedro, serê şêxê Madiye,*
*3 Minê ĥec daniye Zimzime, Qubildore,*
*4 Ser birk'a kaniya Sipîye,*
*5 Êzdîxane ber dike sicûdêye»,*
*6 - Ayî şêxî suniyano,*
*7 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

**S. 8** *1 Bedro va dibêye:*
*2 «Şêxo, serê şêxê teyî Madiye,*
*3 Bêje gunê te çiye?»,*
*4 - Ayî şêxî suniyano,*
*5 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano*

**S. 9** *1 Şêx Îsn va dibêye:*
*2 «Bedro, serê şêxê Madiye,*
*3 Minê ĉûkek ji dîwarê nijîye,*
*4 Nizam saxe yan miriye,*

---

[3681] *êmanet*
[3682] binêr: *şefa'et*
[3683] *şêx E'dî*

*5 - Ayî şêxî suniyano,*
*6 Şêx Îsn malî Madiyano, Madiyano.*

(**S. 10** *1 Bedro va dibêye:*
*2 «Ĥecî Miĥemed p'îrê cewarane,*
*3 Kiras libasî wane,*
*4 Ĥecî Miĥemed p'îrê şêx û p'îrane.*

**S. 11** *1 Ĥecî Miĥemed p'îrê bab û p'ise,*
*2 Me'niya ji bavê xa dipirse,*
*3 Qe kesekî natirse».*

**S. 12** *1 P'îro qedrê te geleke,*
*2 Derqewan dergê cinetê te veke,*
*3 Ĥecî Miĥemed p'îrê Ĥesnaneke.*

**S. 13** *1 P'îro qedrê teyî girane,*
*2 Ser cemeya mêrane,*
*3 Şêx Îsn te dayê da dermane,*
*4 Damanê bît'er nebû ceware.*)[3684]

**S. 16** *1 Bajarê Misulê, bajarekî girane,*
*2 Xirab bû biniyane,*
*3 Seb xatirê şêxê suniyane.*

**S. 17** *1 Bajarê Musulê, bajarekî mezine,*
*2 Xirab be serî ĥetanî bine,*
*3 Seb xatirê şêxê mezine.*

**S. 12** *1 Çî bû, çî cirîya,*
*2 Stêra r̂eş r̂ijîya,*
*3 Musil werdiger̂îya,*
*4 Sêx Sin şêxê sinîye, Hey şêx Sino bin Adîye.*
**S. 18** *1 Çi bû, ĉi ciriya,*
*2 Terkeke r̂eş ji e'zmana r̂ijiya,*
*3 Eskîla Musulê velgeriya,*
*4 Seb xatirê şêxê suniya.*

## 17. QESÎDA ŞEMSÊ T'EWRÊZÎ[3685]

*Bi desturî Xwedê!*
*1 Neyar dider, negwîl[3686] dider,*
*2 Melle dê cana, xaliqê e'rd û e'zmana,*
*3 Canê bo te îna çîçkek, Şemsê Tewrêziye k'oĉek,*
*4 K'oĉekê xerqey mijyar, bîz dider sibĥan îlaĥ û wesar,*
*5 Xwedanê bê ṣubehet ṣerîkî meslî memet,*
*6 Meṣyatî ne yî erus a'lem, gewherî ṣiblî nisletî Adem,*
*7 Meĥmerbin ferin îrs, ṣerabê konî meres biris,*
*8 Sirafî ciwahirî ĥiqayiq, kiṣafî ẍiwamzî diqaiq,*
*9 P'erdan gunî her heyenkî baṣendim, meded êkî derdîmendim,*
*10 Singim r̂aẍim ew fidade, beĥre k'ure mi r̂a zade.*

---

[3684] binêr: QESÎDA ĤACÎ MIĤEMED
[3685] [52] (r. 275)
[3686] binêr: *negul*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 18. QESÎDA ŞEMSEDÎN Û FEXREDÎN[3687]

**S. 1** *1 Şemsedîne û Fexredîne,*
*2 Herdu pisêt sitîye Zîne,*
*3 Herdu xelfetêt şêx Êzdîne,*
*4 Herdu neviyêt Şerfedîne.*

**S. 2** *1 Êk bite Xwedanê suȓe,*
*2 Mal û hikmê te serê p'irê,*
*3 Xasa mîr dinasîn serê duȓê.*

**S. 3** *1 Yek bite melike,*
*2 Xaso, ji malêt babike,*
*3 Navê şêx Şems ser ĥemû nike.*

**S. 4** *1 Yek bite batinê*[3688]*,*
*2 Şêrê axretê malê dinê,*
*3 Wesfeta*[3689] *melik Şemsedîn pê dibûn xinê.*

**S. 5** *1 Yek bite siware,*
*2 Xaso, ji mala herçar yara,*
*3 Navê şêx Şems t'ijî beriyan û beĥra.*

**S. 6** *1 Yek bite cindîye,*
*2 Xaso, ji malet Adîye,*
*3 Navê şêx Şems ser cinan û insîye.*

**S. 7** *1 Yek bite qudretê,*
*2 Malê dinê, şêrê axretê,*
*3 Ew bûn ser kaniya sinetê.*

**S. 8** *1 Ez gorî herdu şêra,*
*2 Bo çakêt lave ȓa,*
*3 Destê şêx Şems ser şeȓan û xêra.*

**S. 9** *1 Ez gorî herdu baza,*
*2 Bo çakêt dilxwaze,*
*4 Destê şêx Şems ser ĥemû ȓaze.*

## 19. QESÎDA ŞÊXÛ BEK'IR[3690]

**S. 1** *1 Distirêm şêxû Bek'ir,*
*2 Şixadî k'erem li gel te kir,*
**3** *Lew ciyê te li ba xwe*[3691] *kir.*

**S. 2** *1 Şêxekî k'ibîre*[3692]*,*
*2 Dik'arê wî li nav feqîra,*

[3687] [1] QESÎDA ŞÊX ŞEMS Û MELIK FEXREDÎN (pp 218-219); [2] (rr. 670-671)
[3688] *bayin*
[3689] *usfet*
[3690] [2] (r. 676)
[3691] *xo*
[3692] *kebîr*

*3 Şêxû Bek'ir r̂an bi r̂an li gel mîra.*

**S. 3** *1 Şêxo, ji Adîya,*
*2 Xwedanê baskê qewîye,*
*3 Şêxû Bek'ir r̂êya şêx Adîye*[3693]*.*

**S. 4** *1 Şêxo, ji ĥeqîqetê,*
*2 Xwedanê me'r̂îfetê,*
*3 Şêxû Bek'ir r̂abûwe bi xilmetê.*

**S. 5** *1 Şêxû Bek'ir nave,*
*2 Erk'ane bin t'ebabe,*
*3 Li şêx Adî dikir silave.*

## 20. QESÎDA E'BDALÊ ŞEMSA[3694] (QESÎDA XATÛNA FEXRA)

**S. 1** *1 Şêxekî qewî ye,*
*2 Lê cema' dibûn velî ye*[3695]*,*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'erema şêxê Adî ye*[3696]*.*

**S. 2** *1 Şêxekî bi cîde,*
*2 Lê cema' dibûn mirîde.*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'arema silt'an Êzîde.*

**S. 3** *1 Şêxekî mezine,*
*2 Lê cema' dibûn momine,*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'arema melik şêx Sine.*

**S. 4** *1 Şêxekî buk'ir,*
*2 Li dinyayê*[3697] *dibûye dik'ir,*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'arema şêxû Bek'ir.*

**S. 5** *1 Şêxekî bi hinere,*
*2 Lê cema' dibûn babzere,*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'arema şêx Şemsê T'et'ere.*

**S. 6** *1 Şêxekî nûrîne,*
*2 Lê cema' dibûn zergune,*
*3 Fexrê şêx Sin ji k'arema Şemsedîn*[3698] *û Fexredîne.*

**S. 7** *1 Ji mala şêx Şemsê mîre,*
*2 Ser kaniya şêxan u p'îre,*
*3 Hîvîya derwêşan û feqîra.*

**S. 8** *1 Şêx E'bdalê Şemsa,*
*2 Xwedanê bisk u meqesa,*
*3 Mêra ji ber dibir maş û berat' û r̂isqe*[3699]*.*

---

[3693] *Şixadî*
[3694] ango: *Qesîda Xatûna Fexra.* [2] (r. 686)
[3695] *welî*
[3696] *şêx E'dî*
[3697] *dunîya*
[3698] *Şêşemsedîn*
[3699] *r̂izq*

## QESÎDÊ P'ÎRANIYAN:

## 21. QESÎDA ALUBEK'IR[3700]

**S. 1** *1 Alîko, p'îrê minî,*
*2 Ne dixwar û ne li minî,*
*3 Alubek'ir xasê şêx Sin,*
*4 Çil sale nehînî.*

**S. 2** *1 Nefsa xwe kir ĥebsîne,*
*2 Fitar bûn r̂ûr̂eşîne.*

**S. 3** *1 Çil salêt bi hij[m]are,*
*2 Nefsa xwe kir ĥesare[3701],*
*3 R̂ual[3702] teĥil fitare.*

**S. 4** *1 Alubek'ir, wey şêrîno[3703] weke şekir,*
*2 Şêx Adî r̂ual teĥil li devê te kire şekir.*

**S. 5** *1 Alubek'irê,*
*2 Siwarê Şakirê,*
*3 Serdar sadir̂ê,*
*4 Serdar sê merzê,*
*5 Siwarin û ẍerzê,*
*6 Kire p'îrê Mamusê.*

## 22. QESÎDA ÎSIBIYA[3704]

**S. 1** *1 Qedrê mêranî p'îr̂e,*
*2 Hincîyê nasî bû ew sur̂e,*
*3 Îsibiya wê diîsêt weke dur̂e.*

**S. 2** *1 Sebra mêranî weye,*
*2 Çil[2348] sala micadeye,*
*3 Îsibiya ibadeta[3705] mîrê xweye.*

**S. 3** *1 Silêt cindiye,*
*2 Ji xizîna Adiye,*
*3 Da destê lawê Îsibiya.*

**S. 4** *1 Silêt aşiqa,*
*2 Ji xizîna xaliqe,*
*3 Da destê lawêt Babika.*

**S. 5** *1 Zêwa der gelîyê,*
*2 Tê heyne t'elpêt velîye,*
*3 Serdar Îsibiya.*

---

[3700] [2] (r.705)
[3701] binêr: *hêsîr*
[3702] *rula*
[3703] *şirîn*
[3704] [2] (rr. 693-694)
[3705] *ebadet*

**S. 6** *1 Zêwa der gelîyê Ĥeq ware,*
*2 Tê heyne t'elpêt siwara,*
*2 Îsibiya serdare.*

**S. 7** *1 Zêwa der gelîyê Lalişe,*
*2 Hey şêxo, yî li Lalişe,*
*3 Îsibiya bi te neşê*[3706]*.*

**S. 8** *1 Eseyî, tu îsî,*
*2 Nûrek li ser diîsî,*
*3 Tu yar E'mer Qebîsî.*

**S. 9** *1 Eseyî, Îsibiyanî,*
*2 Xizîndarê P'adşayî,*
*3 Tu yar şîr Meĥemed*[3707] *Ȓeşanî.*

**S. 10** *1 Îso ibn Adî,*
*2 Çakîya P'adşayî,*
*3 Îso bû xizîndarê şêx Adî.*

## 23. QESÎDA ĤACÎ MIĤEMED[3708; 3709]

**S. 1** *1 P'îro, qedrê te geleke,*
*2 Dergevan derê sinetê veke,*
*3 Ĥacî Miĥemed bû p'îrê Hesnanalka.*

> **S. 12** *1 P'îro qedrê te geleke,*
> *2 Derqewan dergê cinetê te veke,*
> *3 Ĥecî Miĥemed p'îrê Ĥesnaneke.*
>
> **S. 13** *1 P'îro qedrê teyî girane,*
> *2 Ser cemeya mêrane,*
> *3 Şêx Îsn te dayê da dermane,*
> *4 Damanê bît'er nebû ceware.*

**S. 2** *1 Çi p'îrekî buk'ir,*
*2 Dîyarbû li dinê lê me bi nav dik'ir,*
*3 Ĥacî Miĥemed bû p'îrê Alûbek'ir.*

**S. 3** *1 Çi p'îrekî bi nedere,*
*2 Lê bi cema'*[3710] *bûn babzere,*
*4 Ĥacî Mihemed bû p'îrê Şemsê T'et'ere.*

**S. 4** *1 Çi p'îrekî mezine,*
*2 Lê cema' bûn momîne,*
*3 Ĥacî Miĥemed bû p'îrê melik şêx Sine.*

**S. 5** *1 Ĥacî Miĥemed, ĥacî Miĥemede,*
*2 Asiqê t'im di dilde,*
*4 Şêx Adî kesekî mede pê, nede t'u ewlede.*

**S. 6** *1 Ĥacî Miĥemed p'îrê pise,*

---

3706 *welî*
3707 *Mehemed*
3708 JANDILA ŞÊX SIN S. 9-17; http://www.ezdixandi.com/forum/38-300-1; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-b-03.htm
3709 *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYT'A ŞÊX ÎSN* (rr. 27-29) T'ilbîs 2001
3710 *cima*

*2 Cewlanê kirasê libasê*[3711] *wane,*
*4 Bû p'îrê bav û pisane.*

**S. 10** *2 «Ĥecî Miĥemed p'îrê cewarane,*
*3 Kiras libasî wane*
*4 Ĥecî Miĥemed p'îrê şêx û p'îrane.*

**S. 7** *1 Ĥacî Miĥemed bav pise,*
*2 Ne jê kesî xofe, ne tirse,*
*3 Yala li r̂ê û me'niya*[3712] *bavê xwe bipirse.*

**S. 11** *1 Ĥecî Miĥemed p'îrê bab û p'ise,*
*2 Me'niya ji bavê xa dipirse,*
*3 Qe kesekî natirse».*

**S. 8** *1 P'îro, atqatê xemilî jê xelatê,*
*2 Ĥacî Mihemed bû p'îrê şêxê şixatê.*

**S. 9** *1 P'îro, berî qîle, berî qale,*
*2 Not ĥezar sale min şêx Adî naskir qendîle.*

## 24. QESÎDA HACYAL[3713]

**S. 1** *1 Distirêm Hacyale,*
*2 Quba merzê deĥila,*
*3 Ĥacyalê*[3714] *momina, xadim ne yî Wellaĥ*[3715].

**S. 2** *1 P'îr Alî û p'îr Mende,*
*2 Bazîyo, derdende,*
*3 Ĥacyalê momina kire p'îrê Omer Mende.*

**S. 3** *1 P'îrek di r̂êda,*
*2 P'adşê xweş divête,*
*3 Hacyalê momina kire qasidê sitîya Êse.*

**S. 4** *1 P'îrekî mêrdare,*
*2 Yî bi de'weye, yî bi dare,*
*3 Hacyalê momina kire qasidê Beyît il-Fare.*

**S. 5** *1 P'îrekî şofîqe,*
*2 Bi r̂ê, bi t'erîqe,*
*3 Hacyalê momina kire p'îrê bab sadiqe*[3716].

**S. 6** *1 P'îrekî nûrîne,*
*2 R̂astdarê silt'îne,*
*3 Hacyalê momina kire p'îrê melik Nesirdîne.*

## 25. QESÎDA HASNALEKA[3717]

[3711] *lipis*
[3712] binêr: *me'nî*
[3713] [2] (rr. 700-701)
[3714] *Hacyal*
[3715] *vala*
[3716] *sedîq*
[3717] [2] (r. 704)

**S. 1** *1 Safê, safê, saf lê,*
*2 Bor bezîne, lix̆ab*[3718] *lê,*
*3 P'ajo ciyê zar lê.*

**S. 2** *1 Safê, safe r̂eng lê,*
*2 Bor bezînê teng lê,*
*3 P'ajo ciyê şêx Adî lê.*

**S. 3** *1 P'îro ji wêve tê ye,*
*2 Mora şêx Adî lê ye,*
*3 Hasnaleka kire p'îrê şêx Mend û şêx Fexrê ye.*

**S. 4** *1 P'îro têt ji wêve,*
*2 Mora şêx Adî pêve,*
*3 Hasnaleka dar û ber kirne sêve.*

## 26. QESÎDA ĤECÎ E'LÎ[3719]

**S. 1** *1 Çî r̂obarekî xweşe,*
*2 T'ijîye ji gulêt geşe,*
*3 Ĥacî E'lî sur̂ ji E'rşe.*

**S. 2** *1 Çî r̂obarekî şîne,*
*2 T'ijîye ji gulêt r̂engîne,*
*3 Ĥacî E'lî sur̂ ji e'zmîne.*

**S. 3** *1 Çî r̂obarekî çê ye,*
*2 Gul sor û zer lê ye,*
*4 Ĥacî E'lî li ba Xwedê ye.*

**S. 4** *1 Çî r̂obarekî girane,*
*2 Ĥacî E'lî têda girt mek'ane,*
*3 Ĥacî E'lî kire p'îrê Qedir il-R̂eĥmane.*

## 27. QESÎDA MEMÊ ŞIVAN[3720]

**S. 1** *1 Bînin, bînin,*
*2 Borî Memê bînin,*
*3 Zînî li ser dayînin,*
*4 Tenga lê bişidînin,*
*5 Mem ji nûra bixwînin.*

**S. 2** *1 Borê Memê anî,*
*2 Zîn kir weke dizanî,*
*3 Mem li sere meydana nûranî.*

**S. 3** *1 Borê Memê şêye,*
*2 R̂eş kirbûn dest û p'êye,*
*3 Mem xasê Xwedêye.*

---

[3718] *lix̆av*
[3719] [2] (r. 699)
[3720] [2] (rr. 702-703)

**S. 4** *1 Şîr bore Memêye,*
*2 R̂eş kirbûn dest û e'nîye,*
*3 Nav xasêt şêx Adî dîye.*

**S. 5** *1 Mem xelqê*[3721] *dubêrî,*
*2 Gunehk'ara ne azêrî,*
*3 Ĥemû ji şêx Adî divî.*

**S. 6** *1 Ew quba li du bane,*
*2 Du şêr li ser r̂awestane,*
*3 Yek Meme, yek E'bdilr̂eĥmane.*

**S. 7** *1 Dasnî kulu cema',*
*2 Dumlî bi qewmê xweve,*
*3 Li pê p'ira Selatê: Meme, şabaş Meme.*

## 28. QESÎDA QADÎ BILBAN[3722]

**S. 1** *1 P'adşê min silt'ane,*
*2 Dahir kir Qadî Bilbane,*
*3 Kire p'îrê Masekane.*

**S. 2** *1 P'adşê min silt'îne,*
*2 Dahir kir Qadî Bilbanê miskîne.*

**S. 3** *1 Qadî Bilban yî buk'ir bû,*
*2 Xwedanê ilmê p'ir̂ bû,*
*3 Qedîm di batinda yî bi sur̂ bû.*

**S. 4** *1 Qadî Bilban yî Musilî,*
*2 Şêx Adî xelat kirî,*
*3 Nivîsîbû çilî.*

**S. 5** *1 Qadî Bilban lawê çê ye,*
*2 Wê dixwinit Elîfan u Bê ye,*
*3 K'afê du, kire sê ye.*

**S. 6** *1 Babê e'rifî*[3723] *zana,*
*2 Girt bu destê Qadî Bilbane.*

## 29. QESÎDA ĤESIN[3724] MAMAN[3725]

**S. 1** *1 Ji te didem medehê,*
*2 Welîyo, xwedanê qubehê,*
*3 Ji te k'erema mehê.*

**S. 2** *1 Ĥesin*[3726] *Mamanî melevanî*[3727]*,*

---

3721 *xelk*
3722 [2] (r. 706)
3723 *êrîf*
3724 *Hasil*
3725 [1] (pp 222-223); [2] (rr. 689-690)
3726 *Hesin*
3727 *melewan*

*2 Li beĥrêt giranî,*
*3 Li gel mîr r̂a biranî.*

**S. 3** *1 Zêde kirbû zore,*
*2 Kire p'îrê çil p'îre,*
*3 Wê bang diden ji E'rşe.*

**S. 4** *1 Bila bêt Ĥesin Maman,*
*2 Dîtina wî qewî li me derman.*

**S. 5** *1 Ĥeya mîr we dibête,*
*2 Bila Ĥesin Maman bête,*
*3 Bila r̂unêt û bisit'irête,*
*4 K'a mîryatî bi k'î dişête.*

**S. 6** *1 Mîrê K'ibîre,*
*2 Ĥesino, P'adşayî K'ibîre,*
*3 Heçî yê Ĥesin p'îre,*
*4 Ser naçit Mûnker û Nekire*[3728].

**S. 7** *1 Mîrê mezine,*
*2 Ĥesino, P'adşayê mezine,*
*3 Heçî yê p'îr Ĥesine,*
*4 Mûnker û Nekir li ser naçine.*

**S. 8** *1 T'acê şehde*[3729] *tê,*
*2 Ĥesino, k'ulikê şehde tê,*
*3 Ji xezîna qudretê,*
*4 Ĥesino, ji bana bo te tê.*

**S. 9** *1 T'acê te bi zêr̂e,*
*2 Ĥesino, k'ulikê te bi zêr̂e,*
*3 Û li ĥeft e'zmana bigêre,*
*4 Lew ser serê te wergêr̂a.*

**S. 10** *1 Çil r̂abûne ser p'êye,*
*2 Xelatek wê têye,*
*3 Kesek nizanit bo k'êye.*

**S. 11** *1 Mehmedê R̂eşane,*
*2 Çakiye min dît bi ĉavane,*
*3 Xelat, xelatê Ĥesin Mamane.*

## 30. QESÎDA MEĤMEDÎ R̂EBAN[3730]

**S. 1** *1 Hey Meĥemedî R̂ebene,*
*2 Siwaro, yî bi erk'ane,*
*3 Kire p'îrê çendî dinane.*

**S. 2** *1 Siwaro yî sipayîo*[3731]*,*
*2 Nivîsîbû çilîo,*

---

[3728] *Nekir û Nekîne*
[3729] *şe'de*
[3730] [2] (гг. 710-711)
[3731] *sipehîyo*

*3 Kire xitmê E'devîo.*

**S. 3** *1 Ȓeben dêçite zozane,*
*2 Meĥemed dimînit li deştane.*

**S. 4** *1 Şîreta Ȓeben kirbû lê ye,*
*2 Mîr be ji mêra çê ye,*
*3 Ji deh k'oma yek bide Xwedêye.*

**S. 5** *1 Hey Meĥemedo, hey nûrîno,*
*2 Hey ĥeyrano bi zerguno,*
*3 Te ji babe xwe zêde kir me'rîfet û nasîno.*

**S. 6** *1 Meĥemed e'rifekî*[3732] *tê fikirim,*
*2 Heger ji deh k'oma yek bo xwe hilgirim,*
*3 Yeqînî*[3733] *ji babê xwe çêtirim.*

**S. 7** *1 Meĥemed e'rifekî zana,*
*2 Seyîdî beĥrêt girane,*
*3 Ji deh k'oma yek bi xwe hilgirt, neh dane Ȓeĥmane.*

**S. 8** *1 Çî hikmekî bi k'iryare*[3734]*,*
*2 Meĥemed t'ijîkirbû ĉal û imbare,*
*3 Hêş zêde mabû li xware.*

**S. 9** *1 Şêx Adî we deng hilîne,*
*2 Gote Ĥesin*[3735] *P'îrik: «Heȓe Meĥemed bîne,*
*3 Çilêt me çilin, t̂emam nîne».*

**S. 10** *1 Ĥesin P'îrik*[3736] *çobû li wêye,*
*2 Laqaye*[3737] *Meĥemed bû ȓêye,*
*3 Gotê: «Pêşk'eve, da biçîne silavê Xwedêye».*

**S. 11** *1 Meĥemed ço dîwanê,*
*2 Silav kir li silt'anî,*
*3 Gotê: «Tu bi xêr hatî xwedan îmanî!»*
*4 Çî bû, çî ciriya ne li vê erk'anê.*

**S. 12** *1 Hey Meĥemedo, hey nûrîno!*
*2 Ĥeyrano, ney bi zegune,*
*3 Te ji babe xwe zêde kir me'rîfet u nasîne.*

## 31. QESÎDA MEĤMED ȒEŞAN[3738]

**S. 1** *1 Ew babê p'îr Eyûbî,*
*2 Hey şêro, yî ji Meqlûbî,*
*3 Hikmê*[3739] *te wê li t'ixûbî.*

---

3732 *êrîf*
3733 *êqîn*
3734 *qiriyar*
3735 *Hesin*
3736 *p'îr*
3737 *liqa*
3738 [1] (pp 223-224); [2] (гг. 691-692)
3739 *hukm*

**S. 2** *1 Meqlûbî alîye[3740],*
*2 Wê li binda beĥra Sipîye,*
*3 R̂eşe şêx Adî ye.*

**S. 3** *1 Meqlûbî mezine,*
*2 Meĥmed R̂eşa wê li bine,*
*3 K'erema melik şêx Ĥesine[3741].*

**S. 4** *1 Quba dîyarê k'afe,*
*2 Xebîr bin li wê navê,*
*3 Xasa mîr nasîn serê r̂abê.*

**S. 5** *1 Quba dîyarê p'ir̂ê,*
*2 Xebîr bin li wê sur̂ê,*
*3 Xasa mîr nasîn li serê dur̂ê.*

**S. 6** *1 Min dît bi ĉavane,*
*2 Û te dît bi ĉavane,*
*3 Leşkerê şêx girane,*
*4 Serdar Mehmed R̂eşane.*

**S. 7** *1 Min bi ĉava dîye,*
*2 Û te bi çawa dîye,*
*3 Leşkerê[3742] Şêxê Ediye,*
*4 Serdara Ĥemêdiye.*

**S. 8** *1 Ĥemedî yala Ĥemêdî,*
*2 Bazîyo mek'an k'ê dî,*
*3 Şêx Adî ye me li xewlê dî.*

**S. 9** *1 P'îrekî nûrîne,*
*2 R̂astdarê silt'îne,*
*3 Meĥmed R̂eşan kire p'îrê melik Sicadîne.*

## 32. QESÎDA P'ÎRÊ CERWA[3743]

**S. 1** *1 Distirêm feqîre,*
*2 Zêwa nava zûre,*
*3 Wê têda lawê p'îre.*

**S. 2** *1 Zêwa t'abûta r̂eş lê,*
*2 Hey şêro, yî ji Lalişê,*
*3 Şêx Adî k'erem gehiştê.*

**S. 3** *1 Şêx Adî didet nedere,*
*2 Celew ji nûrê çêkire,*
*3 P'îrî Cerwa ji nav hate dere.*

**S. 4** *1 Cerwa der bû ji nava,*
*2 Erk'ana[3744]bin t'ebabe,*
*3 Li şêx Adî dikir silava.*

---

[3740] *êlî*
[3741] binêr*: Ĥesin*
[3742] *lêşker*
[3743] [2] (rr. 695-697)
[3744] *îrkan*

**S. 5** *1 Cerwa dipirsîye,*
*2 P'adşê min nûranîye,*
*3 Şikraniya*[3745] *Celew çîye?*

**S. 6** *1 Şêx Adî kir nesîĥete*[3746]*,*
*2 Celew ji ĥeqîqete,*
*3 P'îrê Cerwa ji nav hate dere.*

**S. 7** *1 Şikranî Celew xelîfete,*
*2 Xelîfet dibêjit bi xweye*[3747]*,*
*3 Celew ilmê meye,*
*4 Di berda sicûdeye.*

**S. 8** *1 P'îrekî ĥebîbe,*
*2 P'adşê min dabû nesîbe*[3748]*,*
*3 Sparte hikmê wî di bîbe*[3749]*.*

**S. 9** *1 P'îrekî bi mane,*
*2 Û xwedanê erk'anê,*
*3 Mîr xwendîye*[3750] *dîwanê.*

**S. 10** *1 Pisê Sincêrî*[3751]*,*
*2 Li dîwanê hildêrî,*
*3 Ji nûra veşêrî.*

**S. 11** *1 Ji ĥeybetê*[3752]*k'eft û mirî,*
*2 K'eft û şewişî,*
*3 Bi k'asekê neqşî.*

**S. 12** *1 Ĥecî Meĥmed û p'îrê Cerwane,*
*2 Kirasek lib[ɑ]sê wane,*
*3 Ew bûn p'îrêt bab û pisane.*

**S. 13** *1 Şêx Sin û ew pisin,*
*2 Ji kesekî* natirsin,
*3 R̂êya p'îrê xwe dipirsin.*

**S. 14** *1 P'îro ji bedîlê,*
*2 Ji berî qal û qîlê,*
*3 Şêx Sin naskir li qendîlê.*

**S. 15** *1 Qedrê te geleke,*
*2 Derê bihuştê veke,*
*3 Ĥacî*[3753] *Meĥmed kire p'îrî Hesnaleke.*

**S. 16** *1 Ew Ĥecra sere girî,*
*2 Ĥacî Meĥmed lê diêwirî,*
*3 Şêx Adî xelat kirî.*

---

[3745] *şukraniya*
[3746] *nisĥet*
[3747] *xoye*
[3748] *nisîb*
[3749] binêr: *bab*
[3750] *xundî*
[3751] binêr: *Sincar (Şengal)*
[3752] *ĥeybet*
[3753] *hacî*

**S. 17** *1 Xemilî bi xelatê,*
*2 P'îro xwedanê atqatê,*
*3 Ĥacî Meĥmed kire p'îrê şêxê şefa'etê*[3754].

## 33. QESÎDA P'ÎRÊ K'EMAL[3755]

**S.1** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye*[3756]*,*
*3 P'îrî K'emal xasê şêx Adî ye.*

**S. 2** *1 Hava p'îrî K'emale,*
*2 Xwedanê defa şeş mala,*
*3 Spartine destê qewala.*

## 34. QESÎDA P'ÎR MEĤMED[3757] (P'ÎR AFAT) – XETÎ PISÎ

**S. 1** *1 Cema' dibûn cumlete,*
*2 Çî p'îrekî p'iȓ wesfete*[3758]*,*
*3 P'îr Meĥmed jê diçin k'eremete.*

**S. 2** *1 Cema' dibûn mal û coqe,*
*2 Dilêt E'debiya k'etibûn şayî û şoqe,*
*3 P'îr Meĥmed mabû suȓ li foqe.*

**S. 3** *1 Cema' dibûn mal û p'îre,*
*2 Hey mêrdaro, yî feqîre,*
*3 P'îr Meĥmed kire xasê mîre.*

**S. 4** *1 Ȓêya ji ȓêya necêre,*
*2 Tê heyne xasêt Cebêre,*
*3 P'îr Meĥmed kire p'îrê şahê mîra!*

**S. 5** *1 Ȓêya ji ȓêya nûrîne,*
*2 Tê heyne xasêt zergune,*
*3 P'îr Meĥmed kire p'îrê melik Şemsedîne.*

## 35. QESÎDA ÊK SIWAR[3759]

**S. 1** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye*[3760]*,*
*3 P'îr Bûk li Beĥzênî xasê şêx Adî ye.*

**S. 2** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Biwal xasê şêx Adî ye.*

---

[3754] *şêxê şifatê* — binêr: *şêx Sin*
[3755] [2] (r. 707)
[3756] *welîye*
[3757] Yan: *xetî pisî*
[3758] *usfet*
[3759] [2] (r. 698)
[3760] *welîye*

**S. 3** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Meĥmud xasê şêx Adî ye.*

**S. 4** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Mus xasê şêx Adî ye.*

**S. 5** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Tus xasê şêx Adî ye.*

**S. 6** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Ĥelan xasê şêx Adî ye.*

**S. 7** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema dibûn velîye,*
*3 P'îr Beybûn xasê şêx Adî ye.*

**S. 8** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Mecřuĥ xasê şêx Adî ye.*

**S. 9** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Gergur xasê şêx Adî ye.*

**S. 10** *1 P'îrekî qewîye,*
*2 Lê cema' dibûn velîye,*
*3 P'îr Qemer xasê şêx Adî ye.*

**S. 11** *1 P'îrekî ťemame,*
*2 Dik'irê wan digeřê ji Şerqê ĥeta bi Şame,*
*3 Ĥemû p'îrin û yê distirên, ez bi xulame.*

# V. Dua’, diȓoza

# 1. DIR̂OZA[3761]

**şaxê 1**[3762; 3763; 3764]

**S. 1** *Amîn, Amîn, Amîn! Ĥimeta Şemsedîn, Fexredîn, Sicadîn*[3765]*, Nasirdîn*[3766]*, şêx Şemse qewata dîn, Qadî Bilban qedîm, silt'an şêx Adî t'ac ji e'wilîn û axirîn, Ĥeq [il-]ĥemdillah yê R̂eb il-A'lemîn!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam*[3767]*!*

**S. 1** *Amîn, Amîn, Amîn, bi ĥimeta Şemsedîn, Nasirdîn, Sicadîn şêx Şemse qewata dîn, silt'an şêx Adî t'ace ji e'wil ĥeta bi axirîn!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam*[3768]*!*

**S. 1** *Amîn, Amîn, Amîn! Bi ĥimeta Şemsedîn, Fexredîn, Nasirdîn, Sicadîn, şêx Şemse qewata dîn, silt'an şêx Adî t'ance ji e'wil ĥeta bi axirîn! Xêra bideîn, şer̂a wergeř̂în. Ĥeq il-ĥemdillah R̂eb il-A'lemîn!*

**S. 2** *Mehderekê dixwezîn bi r̂eĥma şêx Adî, bi r̂eza melik şêx Sin, li ber k'erema şêx Şems!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 2** *Mehderekê dixwazîn bi r̂eĥmeta şêx Adî, bi r̂eda melik şêx Sin ber k'erema şêx Şems! Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 3** *Bi qedrê celis*[3769] *û r̂ewaqêt şêx Adî, k'af û mix̂arêt şêx Adî, qub û hilêlêt şêx Adî, dergeh û dîwanêt şêx Adî, simat û sayêt xwe dayîm bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 4** *Bi qedrê celis û r̂iwaqêt şêx Adî, k'af û mix̂arêt şêx Adî, qûb û hilêlêt şêx Adî, dergeh û dîwanêt şêx Adî bi qedir û qîmet!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 2** *Bi qedrê celis*[3770] *û r̂ewaqêt şêx Adî, k'af û mix̂arêt şêx Adî, qub û hilêlêt şêx Adî, dergeh û dîwanêt şêx Adî key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 4** *Bi qedrê berê şêx Ĥemed, Ĥesen Dena, Ĥesen P'îrik, sûka me'rîfetê, hersê malêt Adiye, bi qedrê malê xelîfet key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 3** *Bi qedrê berê Şêx Ĥemid, Ĥesin Dena*[3771]*, Ĥesin P'îrik, Hidrîsî*[3772] *Xeyat li sûka me'rîfetê, kirasêt malêt Adîya bi qedrê malêt xelîfet kî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 3** *Bi qedrê berê Şêx Ĥemed, sûka me'rîfetê, k'iryarêt mala Êzdiya, Ĥesin Denan û Ĥesin P'îrik, Hidrîsî*[3773] *Xeyat û qedrê mala xelifetêt şêx Adî key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 5** *Bi qedrê şêx Berekat, şêx Misafir, şêx Smayîlî Enzelî, şêxû Bek'irê feqîr, şêx E'bdilqedir, sitîya Êş, li dîwana Berê Şibakê, xasêt ber şêx Adî, bi qedir û qîmet bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 5** *Bi qedrê şêx Berik'at, şêx Misafir, şêx Mûsê Enzelî, şêx Simaylê Enzelî, şêxû Bek'irê feqîr, şêx E'bdilqadir, sitîya Ês, dîwana Berê Şibakê, xasêt li ber şêx Adî bi qedir û qîmet!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

---

[3761] *r̂ozge*
[3762] [1] (pp 281-287); [2] (rr. 960-965)
[3763] http://www.ezdixandi.com/forum/38-310-1; http://ezipedia.de/index.php/gallery/85-religioese-t'exte.
[3764] [52] *Diroza xasa* (rr. 266-269)
[3765] *Sijadîn*
[3766] *Nesredîn*
[3767] *elêk il-selam*
[3768] *Eleykelselam*
[3769] *celîs*
[3770] *celîs*
[3771] *Hesin Dine*
[3772] *Îdrîs*
[3773] *Endirîs*

**S. 4** *Bi qedrê şêx Misafir û şêx Berk'at, melik şêx Sin, melik Şerfedîn, şêx Birahîmê Xetimê û tiwafa xan, p'îrê bi Avdelî û Dawidê bin Derman, p'îr Şerefê Mîranî û Mendî mal ava, û kaniya gulava, dîwana berê şibakê, seyîdî Henan û seyîdî Minan, û qedrê mala ava key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 6** *Bi qedrê melik Şêx Ĥesen, melik Şerfedîn, şêx Birahîmî Xetim, tiwafa xasa, bin Dermane, kaniya Kulava, p'îr Şerefî Mêranî, Hena û Mar Hena, bi qedrê Mendê Malava kî! Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 6** *Bi qedrê melik şêx Sin, melik Şerfedîn, şêx Birahîmê Xetmî, kaniya Kulava, p'îr Şerefê Mêravî, Hene û Merhene, bi qedrê Mendê Malava kî! Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 7** *Bi qedrê çilê kaniya Sipî, Êzdînê mîr, qubet il-Bidor[3774], Sicadînê Êzdîna, Nasirdînê Êzdîna, şêx Mendê Fexra, Xatûne Fexra, Fexrêt Adiya, bi qedrê çil mêrêt k'eftine axa şêx Adî bi qedir û qîmet bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 7** *Bi qedrê çilê kaniya Sipî, Êzdîne mîr, «qubet il-Bidor[3775]», Sicadînê Êzdîna, Nasirdînê Êzdîna, şêx Mendê Fexra, Xatûna Fexra, Fexrê Adiya, çil mêrêt axa şêx Adî, xasêt li ber şêx Adî bi qedir û qîmet!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 7** *Bi qedrê çirayî kaniya Sipî, celisa Êzdîn emîr, Sicayê Êzdîna, Nasirdînê Êzdîna, Fexrêt Adiya, şêx Mendê Fexra, Xatûne Fexra, û çil mêrêt kevne axa şêx Adî key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 8** *Bi qedrê şêx Alê Şemsa û şêx Hevindê Şemsa, şêx Ĥesenê Şemsa û şêx E'vdalê Şemsa, şêx Babikê Şemsa, Amadîn û Babadînê Şemsa, şêx Xidir û Fexrêt mîra, li dîwanêt feqîra, li dahirê, li batinê, xasêt ber şêx Adî bi qedir û qîmet bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 8** *Bi qedrê şêx Alê Şemsa, şêx Hevindê Şemsa, şêx Ĥesenê Şemsa, şêx Babkê Şemsa, Amadîn û Babadînê Şemsa, şêx Xidir û şêx Tokilê Şemsa, Şems û Fexrêt mîra, li dîwanêt feqîra, yê li dahirê yê li batinê, xasêt li ber şêx Adî bi qedir û qîmet!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 6** *Bi qedrê şêx Alê Şemsa û şêx Hevindê Şemsa, şêx E'vdalê Şemsa, şêx Babikê Şemsa, Amadîn û Babadînê Şemsa, şêx Xidir û şêx Takilê Şemsa, qublet il-Bidar û Şemis û Fexrêt mîra, û sitya Ês li dîwanêt feqîra, li dahirê, li batinê key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 9** *Bi qedrê mêr û mergeha şêx Adî, Ĥesin Maman û Meĥmed R̂eşan, Îsibiye û p'îrê Cerwan, Ĥacî Meĥmed û p'îr Meĥmed, Memê Şivan û Gavanê Zerza, çilê şêx Adî, çilê melik şêx Sin, xasêt ber şêx Adî bi qedir û qîmet bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 9** *Bi qedrê mêrê mergeha şêx Adî, Ĥesin[3776] Maman, Meĥmed[3777] R̂eşan, Ĥesen P'îrik, Ĥacî Meĥmed[3778], Gavanê Zerza, çilê şêx Adî, çilê melik şêx Sin, xasêt Li ber şêx Adî bi qedir û qîmet!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 5** *Bi qedrê mêr û mergeha şêx Adî, Ĥesin Meman û Meĥmed R̂eşan, Memê Şivan, Gavanê Zerza, p'îr Meĥmed R̂eban, Êsibiye, p'îrê Cerwa, Ĥacî Meĥmed û Hacyalê mamina, çilê şêx Adî û çilê melik şêx Sin key!*

---

[3774] *qubleta bidar*
[3775] *qubêt il-Bidor*
[3776] *Hasil*
[3777] *Mamed*
[3778] *Mamed*

*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 10** *Bi qedrê civata boza, r̂iwalê kevin û şahsiwarê deşta Bêbanê key! Ĥacî E'lî li Ba'edirê, Ĥacî R̂eceb li Bêristekê, şêx Mişeleh x̂efûrê r̂êya, şêx Ĥesen li Ĥeseniyê, ber k'eremeta şêx Mamedî Doxatî, Hegî Fêris key! Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 10** *Bi qedrê xasêt Bêbanê, Ĥacî Elî li Ba'edirê, Ĥacî R̂ecebê Bêristekî, şêx Mişeleh x̂efûrê r̂êya, şêx Ĥesen li Ĥeseniyê, ber k'erema şêx Mamedî Doxatî, bi Hegî Fêris kî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 9** *Bi qedrê civata boza, r̂iwalê kafê, şahsiwarê li deşta Bêbatê, Ĥacî E'liyê li Ba'edirê, Ĥacî R̂ecebê li Bêristekê, şê[x] Mişeleh x̂efûrê r̂êya, şêx Ĥesen li Ĥeseniyê, li ber k'erameta şêx Mamedê Doxatî û bi qedrê Hekî Fêris key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 11** *Bi qedrê mêrê t'ebeqe Şamê, şêx Romî li Şingalê, Boqedarî baba şêx Mûsê Sircî, p'îr Aqilî Mendî, p'îr T'erciman*[3779] *il-Ibrî, seyîdî Henan, seyîdî Menan, şêx Qesab Liqmedîn, şêx Kiras, babê Ĥebîbî necar, p'îrê Libna, li ber k'eremeta silt'an Êzîd şîrinî, şerîf*[3780] *bikî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 11** *Bi qedrê mêrê t'ebeqe Şamê, şêx Rûmî, Şingarî Boqedar, Babaşêx Misrî Sirûgî, şêx Aqilê Babî, şêx Cemalidînê Ebrî, seyîdî Henan, şêx Kiras, şêx Qesab Lugmedîn, şêx Cemalidînê Baba, Ĥebîbî necar, p'îrê Libna, ber k'erema silt'an Êzîdê şêrîn*[3781]*!*
*Ya şêx Adî, Elêk'ûm selam.*

**S. 10** *Bi qedrê şêx Mûs Sirucî, Şêx Aqilê Mendî, p'îr Aqilê Babê, şêx Cemalidînê Ebrî, şêx Kirnas şêx Qesab, û Luqmedînê Babê, Ĥebîyê Necar, p'îrê Libna li ber k'erema silt'anê şêrînê şerîf key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 12** *Bi qedrê dîwana Omer Xala, zêwa Ĥesen Çinarî, p'îrî Mîna, bapîrî Muqdar, bi qedirî Gulîzêr̂ key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 12** *Bi qedrê dîwana Omer Xala, zêwa Ĥesen Çinarî, Ĥacî Meĥmed li k'ifir zemanî, ĥaciya lê momina Hesnalika, p'îra Hêşim, p'îra Mine, bap'îrê Muqdar*[3782]*, bi qedrê guhar zêr̂ kî!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 8** *Bi qedrê şêx Simaylê Enzelî, şêxû Bek'irê feqîr, şêx E'bdilqedirê Qat'anî, Boqdar baba, şêx R̂umê li Şingalê, bap'îrê Muqdar li kifir zemanê û zêwaÇinêrî key, dewlet , xelîfet, axirzeman di e'sîl bin!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 13** *K'erema ĉiyayê Mişatê, ĉiyayê Hizratê, ĉiyayê E'refatê, dar û berêt gelîyêt Lalişê, ya şêx Adî, ĉirayêt te di gur̂î bin, simat û sayêt te dayîm bin, r̂ûyê te digeȓê li Şerqê, li Şamê, yî vekirî bin, dewlet, xelîfet, e'sil zeman di dayîm bin.*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 13** *1 Bi qedrê ĉiyayê Mişetê, ĉiyayê Ĥizretê, ĉiyayê E'refatê, dar û berê gelîyê Lalişê, ya şêx Adî ĉirêt te di gur̂î bin!*
*2 Simat û bisatêt te di dayîm bin,*
*3 R̂êya te û E'deviyêt Şerq û Şamê di Ekber bin, dewletî û xelîftî bin!*

**S. 11** *Bi qedrê ĉiyayê Mişatê, ĉiyayê Hizratê, ĉiyayê E'refatê, dar û berêt gelîyêt Lalişê, ya şêx Adî, ĉirayêt te di gur̂î bin, r̂êya te li e'rdê Şamê yî vekirî bit, qedem û qiduma Tawisî şêx Adî, û def û şibabêt şêx Adî, li van diroza, li van westaya zîdî ehlî îmanê pîrazî key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

[3779] *Tercuman*
[3780] *şirîf*
[3781] *şirîn*
[3782] *Moxdar*

**S. 14** *Qedem û qudûmêt Tawisa şêx Adî, def û şibabêt şêx Adî, li van dua', li van diȓoza, li vî cî, li vî mek'anî, li Êzîdiyê Şerqê, Şame, li hazir û guhdêra, li zêde xelqê ehlî îmanê!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

**S. 13** *4 Hamû zemana dayîm bê qedem û qidumêt, Tawisa şêx Adî, def û şibabêt şêx Adî,*
*5 Ev dua', ev diȓozine, li vî cî, li êzdîyêt Şerq û Şamê di vekirî bin,*

**S. 15** *Ya şêx Adî dîwana te dîwana ȓehim û mirazana! Her kesekî sekinî, tu miraza wî bikey haweke bangê ȓeĥmetê, sela yarû biraêt axretê!*

**S. 13** *6 Haweke sinetê, guh li bangê ȓeĥmetê, sela yarû birêt axretê!*

**S. 12** *Ya şêx Adî, dîwana te dîwana ȓehim û mirazaya! Kesanekî sekinî, tu mirazawî bikey, haweke sinet ê û got û bangê axretê, di mala yarû biraêt axretê key!*
*Ya şêx Adî, e'lêk'ûm selam!*

*Gundê em têda Xwedê xwedan ket,*
*Mala em têda Xwedê ava ket!*
*Ȓeĥme li dayî û babêt hazir û guhdara û seyîdayê mine!*
*Em di kêmin, Xwedê t'emame!*

**şaxê — 2**[3783]

**S. 1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 T'ubareke Eladîn, Amadîn Hebatîn, Babadîn, Şemsedîn, ezîz melek Fexredîn,*
*3 Şêx Şemsa*[3784] *qulpe qewata mine dîn,*
*4 Xêrê bidin, şeȓê welgeȓîn.*

**S. 2** *1 Şêx Şemso, malê ĥetanî malê,*
*2 Şêx Şemse xwedanê*[3785] *sîqalê,*
*3 Şêx Şemsê xwe nabiȓim xeyalê*[3786].

**S. 3** *1 Şêx Şemso, stûnê ĥetanî stûnê,*
*2 Şêx Şemse xwedanê xezînê,*
*3 Şemsê xwe nabiȓim nasînê.*

**S. 4** *1 Derecê ĥetanî derecê,*
*2 Şêx Şemse xwedanê ferecê,*
*3 Emê heȓne dewsa damya şêx Şems, dewsa Lalişê, Zimzimê, Qubet il-Bidorê*[3787]*,*
*şîlanê, merbexê ĥecê.*

**S. 5** *1 Ya Ȓebî*[3788]*, ĉirê te guȓî nîvim,*
*2 Mûsatê te danîvim,*
*3 Destê te ser E'debiya Şerq, Şe'm*[3789] *werkirî ve,*
*4 T'acê xelîfeta sere şêx Simayîlê Enzelî qedîm ve.*

**S. 6** *1 Ya Ȓebî, xatira navê xwe kî,*
*2 Nûra xwe kî, ȓeĥma*[3790] *xwe kî,*
*3 Xatira Tawisa qedîm kî.*

**S. 7** *1 Def û şibab*[3791]*, tîn û zivav,*
*2 Muẍenî û oẍler*[3792]*, saz û t'embûr.*

---

[3783] [29] (rr. 392-400) (№ 1698)
[3784] *Şêxşims*
[3785] *xudan*
[3786] *sîqal*
[3787] *qubildor*
[3788] *yaȓebî*
[3789] *Şe'm*
[3790] *ȓe'm*
[3791] *şivav*
[3792] *Îxnî, muxnet*

*3 T'embûrê xweş têne denge,*
*4 Ya R̂ebî, ewe ji yîêrênê tê nûrê çêkirine.*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, xatira sitîya Tawis, sitîya Şexsî, sitîya Mewuj kî,*
*2 Mewuj nab Zibare,*
*3 E'zmana hatîye xare,*
*4 Mêra pê kirîye maş û fitare.*

**S. 9** *1 Ya R̂ebî, xatira qubet il-Bidorê[3793],*
*2 Berê şibekê[3794] berê faxil, destê k'esk kî,*
*3 Ya R̂ebî, xatira ĥezar yek navê xwe kî,*
*4 Xatira du ĥezar du navê xwe kî,*
*5 Xatira sê ĥezar sê navê xwe kî,*
*6 Xatira xas û qelenderê dîwana xwe serenser kî,*
*7 Ya R̂ebî, xatira Îsîbîya, Omerê Xala, gavanê Zerza kî,*
*8 Ya R̂ebî, xatira şêx Ĥer̂anî, şêx Fe'ran, melek Birûs, melek Zeydîn kî.*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, xatira şêx Mendê P'adşa, Xatûna Fexra, Mendê Bedir, E'bû Sefa, E'bû Cefa, şayê Merda, şayê K'ermanşayê, qûlê şayê K'ermanşayê, Şemsê mewêlî kî.*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, xatira nevî Horîya, navî Dawid, nevî Zenk'er, şêx Ce'fûr kur̂, miskîn T'ajdîn, şêx Cencerê kî,*
*2 Mîrê t'ebeqa Şamê, girtîyê Şamê, ûlecamîya Şamê, berê şibekê, berê faxil, deste k'esk kî.*

**S. 12** *1 Ya R̂ebî, xatira şêx Brahîmê, xitmê tuavê, t'oqe dinê herçar qulba kî.*

**S. 13** *1 Ya R̂ebî, xatira şêx Sin, Şerfedîn, şêx Babikê, Mendê Şîrîn, Mendê Takil kî.*

**S. 14** *1 Ya R̂ebî, xatira şêxû Bek'ir, Abû Bek'ir, Sorê Sora, Abû Bek'irê sadiq kî.*

**S. 15** *1 Ya R̂ebî, xatira Şems û Fexir kî,*
*2 Xatira Nasirdîn, Sicadîn kî,*
*3 Mîr Ĥesen Maman[3795] xitmê çila[3796], p'îr Sinî Be'rî, p'îr R̂eşîdê Mêrevê, bîrk'a navkur̂ê, feqîrê navkur̂ê, jît gulîyê melek Fexredîn, gulîyê ĉiyayê Fexrê, çil keĉê be'rî kî.*

**S. 16** *1 Ya R̂ebî, xatira kar̂ê[3797] ber xezala kî,*
*2 Xatira her ĥeft[3798] kur̂ê pîrê kî,*
*3 Dane de'ska xwe ber zevîyê cihê sekinîn.*

**S. 17** *1 Ya R̂ebî, xatira melek Ce'fî, derwêş Cefî kî,*
*2 Xatira nefûsa her ĥeft kurê pîrê kî,*
*3 Ya R̂ebî, xatira Ezdîne mîr, Qere Çerî, Qere Firqan, mîr Denûn, Xezalê,*
*4 Herda ser ĉiyayê E'rafetê mirazê xwe te xwestin.*
*5 Ew qencê te bûn, te mirazê wan kir,*
*6 Ew gihîştne mirazê xwe.*
*7 Mirazê me hîvîya te, gumana me r̂eĥma te.*

**S. 18** *1 Ya R̂ebî, derdi[m], mendi[m], tu xwedayî,*
*2 K'esîs xeberim tu xwedayî,*
*3 Heqet şikir tu xwedayî,*
*4 Tu xwedabenda wezendî,*
*5 Xwedabendê nûr, îman,*
*6 Tu xwedabendê dîn dirusta,*
*7 Tu xaliqê şiyar û mesta,*

---

[3793] *Meman*
[3794] *berê şivekê*
[3795] *Ĥezmaman*
[3796] *ĉêla*
[3797] *alk*
[3798] *ĥevt*

*8 Xaliq tuyî, p'iȓ usfetî*[3799]*,*
*9 Usfet ji navê te ȓa.*

**S. 19** *1 Ya Ȓebî, xatira ĉiyayê E'rafetê, ĉiyayê Şerefatê,*
*2 Ĉiyayê Şerefatê, ĉiyayê Tût, Sîna, ĉiyayê Ce'filqaf kî.*

**S. 20** *1 Ya Ȓebî, xatira şêx E'bd il-Qadir*[3800] *Gêlanî kî,*
*2 Xatira E'bd il-Qadir Ȓeĥman kî,*
*3 Xatira şêx Derwêşa, xatira şêx Ĥesen Besrayê kî.*

**S. 21** *1 Ya Ȓebî, xatira cin Teayr*[3801]*, p'îr Ewîdîyê, p'îrê Bû[b], p'îrê Dirbê, p'îrê Devê, p'îrê Ĉêlê, p'îrê K'emal, şêxê Cemal kî.*

**S. 22** *1 Ya Ȓebî, xatira Ĥusêyînî Ĥelac, Mensûrê*[3802] *Ĥelac, Denûnî Misir, Seyîdîn, Misêwdîn, Seyîd il-Xew, Seyîd il-Bedew, Meĥemedê Qewxesiz kî.*

**S. 23** *1 Ya Ȓebî, xatira ĥesretî*[3803] *fesil kî,*
*2 Xatira tî[y]a ĥesretî fesil kî,*
*3 Xatira şivka ĥesretî fesil kî,*
*4 Xatira k'ûzkê ĥesretî fesil kî.*

**S. 24** *1 Ya Ȓebî, xatira Mûsilê Enzelî, şêx Qadirê Ȓeĥmanî, Xecîcê Balûlî zane, Bazîdê Bestamî kî.*

**S. 25** *1 Ya Ȓebî, xatira şêx Cinetê Şiblî, Dawidê T'ixûbî, Merûfê K'erxî, Banîrê Muxdar, Ȓevîya E'debî, sînî nexel kî.*

**S. 26** *1 Ya Ȓebî, xatira Ĥesen Deqîq, Ĥecî Şîrîn, Ĥesen Çikêr, Ĥesen Maman, Ĥesene kî.*

**S. 27** *1 Ya Ȓebî, xatira şêx Xidirê Şemse, şêx E'vdalê Şemse, şêx Amadê Şemse, şêx Babadînê Şemse, şêx Babikê Şemse, şêx Tokilê Şemse, şêx Hevindê Şemse, şêx Ĥesenê Şemse, şêx Alê Şemse kî.*

**S. 28** *1 Ya Ȓebî, xatira p'îr Xemsî, şêresiwarê Bêbanî, şêx Adî, şêx Simayîlê Enzelî kî.*

**S. 29** *1 Ya Ȓebî, derdim, mendim tu qirar,*
*2 K'esîs xeberim tu qirar,*
*3 Heqet şikir tu qirar,*
*4 Tu Xwedawendê*[3804] *wezendî,*
*5 Xwedawendê nûr îman,*
*6 Tu Xwedawendê* [3805] *dîn durusta*[3806]*,*
*7 Tu Xwedayê şar û masta,*
*8 Xaliq tuy[î] p'iȓ usfetî,*
*9 Usfet*[3807] *lazime navê te ȓa.*

**S. 30** *1 Ya Ȓebî, xatira derwêş Gurgîn kî,*
*2 Xatira derwêş Çingîn kî,*
*3 Xatira derwêş Ȓet'wan kî,*
*4 Xatira derwêş Siĥîm kî,*
*5 Xatira derwêş Unt'ûs kî,*
*6 Xatira derwêş Qut'ûs kî,*
*7 Xatira derwêş Adem kî,*

---

3799 *usbet*
3800 *A'dil Qadil*
3801 *Cinteyar*
3802 *Miseîn*
3803 *ĥesret*
3804 *xudabend*
3805 *dudabend*
3806 *durist*
3807 *uzbet*

*8 Xatira derwêş Dinê kî,*
*9 Xatira derwêş R̂ih̑îm kî,*
*10 Xatira derwêş E'rd kî,*

**S. 31** *1 Ya R̂ebî, xatira mergê Memed xunav kî,*
*2 Berxa Mamedê Berxê, gayê Cimcime silt'an*[3808]*, ĉêle Uzêr p'êxember, mîyê K'alî kî.*

**S. 32** *1 Ya R̂ebî, xatira dîwana Qûmî Biqa kî,*
*2 Xatira E'rş û K'ursîy, Gay û Masî*[3809] *kî,*
*3 P'îr Ins, p'îr Mûc, p'îr Tûs kî,*
*4 Quba*[3810] *felekê, mêrê quba felekê kî.*

**S. 33** *1 Ya R̂ebî, xatira sitîyê*[3811] *kî,*
*2 Xatira sitîyê Gulan kî,*
*3 Xatira sitîyê Bilxan kî,*
*4 Xatira sitîyê E'reb kî,*
*5 Xatira sitîyê Merqebes kî,*
*6 P'îra Hêşim, p'îra Mena, p'îr Afet kî.*

**S. 34** *1 Ya R̂ebî, xatira Cinî cin, K'okevî cin, Mamedî cin, Tûrî cin, Xyarî cin, K'okî cin, Sixrî cin, cin Teyar,*
*2 Xatira donzde[h] P'adşê Acinya,*
*3 Xatira donzdeh qubê*[3812] *Acinya kî.*

**S. 35** *1 Ya R̂ebî, xatira R̂eca, Weca kî,*
*2 Xatira Ayîc, Zayîc kî,*
*3 Mişqîn Cibrî kî,*
*4 Xatira E'caz Mebtûl kî,*
*5 Xatira Bîdlîs fariz kî,*
*6 Xatira H̑emze Avas kî,*
*7 Xatira melekê xas kî,*
*8 Xatira melekê waswas kî.*

**S. 36** *1 Ya R̂ebî, xatira r̂oja dur̂ê kî,*
*2 Xatira herçar dergê dur̂ê kî,*
*3 Xatira herçar yarê dergê dur̂ê kî.*

**S. 37** *1 Ya R̂ebî, xatirê wê r̂ojê kî, dinya beh̑r*[3813] *bû,*
*2 P'adşayê min t'extê xwe ser danî,*
*3 K'as û badî ser r̂astkirin.*

**S. 38** *1 Ya R̂ebî, xatira wê r̂ojê kî,*
*2 Xatira wê beh̑rê kî,*
*3 Xatira wan k'as û badîya kî,*
*4 Xatira emîn Cebraîl*[3814] *kî.*

**S. 39** *1 Ya R̂ebî, xatira r̂ojê mork'evê kî,*
*2 Xatira herçar dergê mork'evê kî,*
*3 Xatira qerewilê mork'evê kî.*

**S. 40** *1 Ya R̂ebî, xatira wê r̂ojê kî,*
*2 P'adşayê min mork'evê dibû siware*[3815]*,*
*3 Lê ger̂îya çar kenare,*

---

[3808] *sultan*
[3809] *me'sî*
[3810] *quva*
[3811] *isitî*
[3812] quv
[3813] *be'r*
[3814] *Cebrahîl*
[3815] *sîyar*

*4 Lê seyîrîn herçar yare,*
*5 Kaniya Sipî, gelîyê Lalişê sekinî, got: «Ĥeqû ware[3816]!»*

**S. 41** *1«Ĥeq ware» — got û sekinî,*
*2 Havên avîte beĥrê, beĥr meyînî,*
*3 Dûxane jê dûxinî,*
*4 Wê duxanê çardeh[3817] t'ebeqê[3818] e'rd û e'zman jê nijinîn.*

**S. 42** *1 Ya R̂ebî, xatira mêrê R̂o[j]hlat, R̂o[j]ava kî,*
*2 Xatira quba şexsê Batê,*
*3 Xatira r̂oja Beyt' il-Farê[3819],*
*4 Ĥewşa şêx Şems dara gulĥinarê kî.*

**S. 43** *1 Ya R̂ebî, p'ira Selatê sore zerê,*
*2 Bîna misk û mawerê,*
*3 Dîndara şêx Şemsê min çêtire mal û sere.*

**S. 44** *1 Ya R̂ebî, p'ira Selatê sore û k'eske,*
*2 Ber diçe mawer û miske,*
*3 Dîndara şêx Şemsê min çêtire mal û r̂isqe.*

**S. 45** *1 Ya R̂ebî, xatira mezela kekê E'zîm kî,*
*2 Xatira zêwa Omerê Xala,*
*3 Ziv qubê gelîyê Lalişê kî,*
*4 Ciyê xasa, qenca, qelendera, ewlîya, enbîya,*
*5 Cem te maşe, beret'e, qedre, qîmetin.*

**S. 46** *1 Ya R̂ebî, xatira gelîyê Lalişê kî,*
*2 Xatira sêsid şêst û şeş qubê gelîyê Lalişê kî,*
*3 Xatira dar û berê gelîyê Lalişê kî,*
*4 Xatira celis[3820] û r̂ewaqê gelîyê Lalişê kî,*
*5 Xatira gelîyê Lalişê seranser kî.*

**S. 47** *1 Ya R̂ebî, xatirê dirozga şêx Şems kî,*
*2 Xatira ewa dua', ewa dirozga,*
*3 Dua'yê dua' qebûla,*
*4 Ew xas, ew qenc, cem te qedre, qîmetin, maşê berat'in,*
*5 Xatira wa[n] xasa, wa[n] qenca, wa[n] berat'e kî.*

**şaxê — 3**[3821]

……………………………..
……………………………..
……………………………..

**S. 5** *1 Melek Ezraîl not û neh ĥezar sal sekinî li xilmetê,*
*2 P'adşa[3822] r̂ûniştî li wê huzûrê[3823] wêşehdetê[3824],*
*3 Miraz hasilbû li ĥeqîqetê,*
*4 Ew bû çawişê sehdatê.*

**S. 6** *1 P'adşa miraz hasile,*

---

[3816] *Heq û ware*
[3817] *çarde*
[3818] *tevek*
[3819] *Beytilfar*
[3820] *cews*
[3821] [1] (pp. 279-281)
[3822] *pedşa*
[3823] *hizûr*
[3824] *şe'de*

*2 Hûn bi xof û tirs bin ji ĥemû dile,*
*3 Da li axretê bibin xweyê miraz-hasile.*

**S. 7** *1 P'adşayî bi r̂astî miraz çêkir,*
*2 Navê xweyê şêrîn[3825], şerîf[3826] lêkir,*
*3 Meleka ji ew poş sicûde li pêkir.*

**S. 8** *1 Ji P'adşê xwe didan medeha,*
*2 Melek r̂awestan li pişt dergehe,*
*3 Miraza xwe xwestin ji stêrka berê sibehe.*

**S. 9** *1 Stêrka berê sibehê dahirbû,*
*2 Bor li ibadetê siwarbû,*
*3 Sed xweziya me bi wî mêrî, li ber ĥeqiyê r̂awestabû.*

**S. 10** *1 Sed xweziya me bi wî mêrî, li ber ĥeqiya xwe veweste,*
*2 Aşiq û me'şûq[3827] r̂ay wê li desta,*
*3 Me mirazê xwe[3828] ji wan dixwesta,*
*4 Ewan mirazê xwe ji ĥeqiyê dixwesta,*

**S. 11** *1 Miraza miraz ji dîwane ĥeqiyê,*
*2 Em mobûn li hîvîyê,*
*3 Melek r̂awestan li pêşiyê,*
*4 Bi wê mirazê ji ew poş gehiştin wê xweşiyê.*

**S. 12** *1 P'adşa miraz qebûle ji berî xet û mişûre,*
*2 Êzî neqaşê neqşê hûre,*
*3 Xewasê beĥrêt k'ûre ji nêzîkayî dur̂e.*

## 2. Dua'– dir̂oza [3829]

**S. 1** *1 Il-ĥemdillaĥ[3830], il-ĥemdillaĥ,*
*2 Seyîdîne — nebîyne,*
*3 Şivate zedenîne,*
*4 T'ebîbî qulebîne,*
*5 Îlaĥî mewlîne,*
*6 Ferz il[3831]-e'lemîne.*

**S. 2** *1 Dua'kî[3832] dixwezim enzelî r̂a[3833],*
*2 Enzelî menzelî r̂a,*
*3 Xwedanê[3834] Miĥemed E'lî r̂a,*
*4 Fetĥa qedel bevşî mom r̂a,*
*5 Qewlî K'emala r̂a,*
*6 Bizirgayê Xweda r̂a,*
*7 E'ynat[3835] — beynetê K'erîm Ellaĥ r̂a,*
*8 Ji zê r̂a, zîyaret r̂a,*
*9 Demîra e'zet r̂a,*

[3825] *şêrîn*
[3826] *şirîf*
[3827] *maşoq*
[3828] *xo*
[3829] [31] *Di'a* (гг. 18-21)
[3830] *herĥemdile*
[3831] *ferzil*
[3832] *di'a*
[3833] *ra*
[3834] *xudan*
[3835] *e'yînet*

*10 Not ĥezar esĥabê[3836] ĥeqîqet r̂a,*
*11 Semara sefar r̂a,*
*12 Sefa e'zîz r̂a,*
*13 Ji Xidir–nebîy[3837], Xidir–Ilyas r̂a,*
*14 Danzdeh ĥezar nebîyê xas r̂a,*
*15 Danzdeh ĥezar weliyê xas r̂a,*
*16 Ji Aqûb p'êẍember r̂a[3838],*
*17 Ji Ûsibê nebîya r̂a,*
*18 Dawid[3839] p'êẍember r̂a,*
*19 Neh kur̂ê[3840] Aqûb p'êẍember r̂a,*
*20 Seyîd Miĥemedê K'ibîr [r̂a],*
*21 Wesil[3841] Quranî r̂a[3842],*
*22 Şêx E'bd il-Qadir Gêlanî r̂a[2456][3843],*
*23 Avokê Senemî r̂a,*
*24 Çil çar p'îr̂ê Demirqat r̂a,*
*25 Ûnis p'êẍember r̂a,*
*26 Cercîz p'êẍembe r̂a,*
*27 Seyîd p'êẍember r̂a,*
*28 Haziyanî R̂om r̂a,*
*29 Xaziyanî R̂om r̂a,*
*30 P'adşayê mek'em Medînê r̂a,*
*31 Mifriq da Mişriq,*
*32 Mişriq da Mifriq,*
*33 Eva dua'– dir̂oza nûr û nedera Şemsê e'ynî [minî] T'ewrêzî r̂a[3844].*

**S. 3** *1 We siqana[3845] we t'iya'na[3846],*
*2 We kesanê e'lîme dan[a][3847],*
*3 Delaletî fesilê minî Adem,*
*4 K'ulî–k'ulî xaliq[3848] Ellaĥ,*
*5 Ya melek ehsab,*
*6 Sehab li tem,*
*7 Melih sebirî,*
*8 Melih sit'irî,*
*9 Melih gorî,*
*10 Melih sur̂et r̂eĥme[3849],*
*11 Qurbana nebîy Îsmaîl qebûl.*
*12 Qebûl qurban, Meẍbûbî[3850] Ellaĥ[3851]*
*13 Sifrayî[3852] Celîl,*
*14 Berek'et Îbrahîm Xelîl.*
*15 Xem nebe, dem nebe,*
*16 Mal [û] r̂isqê te zêdabe,*
*17 Eva nan û êmeka,*
*18 Xêra miriya qebûlbe.*

---

[3836] *e'sab*
[3837] *Xidirnebî*
[3838] *pêxember*
[3839] *Davît*
[3840] *kur*
[3841] *weyîsil*
[3842] *Qiran*
[3843] *şê E'vdil Qali Gêlanî*
[3844] *T'evrêz*
[3845] *wesiqana*
[3846] *wet'iya'na*
[3847] *wekesanê e'lîmedan[a]*
[3848] *xalq*
[3849] *sûretreme*
[3850] *mexbûr*
[3851] *elah*
[3852] *surp*

## DUA'YÊT P'ERWESTIN Û BI R̂OJ Û ŞEVÊVE DI GIRÊDAYÎ:

## 3. DUA'YA PIŞT GIRÊDANÊ[3853]

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, mehderekê ji te dixwazin, mehdereke xêrê:*
*2 Yek k'eremete,*
*3 Yek nedere,*
*4 Yek şefeqete*[3854]*,*
*5 Yek dewlete.*
*6 Yek zare,*
*7 Yek zimane,*
*8 Yek dîne,*
*9 Yek îmane*
*10 Yek aqile,*
*11 Yek fame!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu aqil û fem di serê me bike!*
*2 Tu pirsiyareke xêrê li ĥalê me û vî miletî bike!*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu bide xatirê delîlê Xweda axirzeman,*
*2 Ji xas û saliha,*
*3 Saf û milyak'eta,*
*4 Dewrêşê qelendera,*
*5 Xasê qelendera,*
*6 Li pey p'ira Selatê dik'ira.*

*Em kêmin, Xwedê ťemame!*

## 4. DUA'YA FECRÊ[3855] – DUA'YA ŞIFAQÊ[3856]

**S. 1** *1 Mêr û meleka deyin medeha,*
*2 Û xasêt nava qubeha,*
*3 R̂onahî dabû berê sibeha.*
**S. 1** *1 Ya Xwedê, bidî xatirê mêra, milyak'eta,*
*2 Yê didin medeha,*
*3 Ewin xasêt nîva qubeha.*

**S. 2** *1 R̂onahî ya berê sibê dahir bû,*
*2 Borê ibadetê siwar bû,*
*3 Sed xwezma wî mêrî, bi ĥeqî r̂awista bû.*
**S. 2** *1 R̂onîya berê sibeha li me dahir bû,*
*2 Borê ibadetê*[3857] *siwar bû,*
*3 Sed xwazka mina bi wê r̂uĥê, li ber ĥeqîqeta xwe westiya bû.*

**S. 3** *1 Aşiq û me'şûq*[3858] *mifte bi deste,*
*2 Me miraza xwe[y]e ji wan dixweste,*
*3 Ewan miraza xwe[y]e bi ĥeqî dixweste.*

---

[3853] http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete02.htm
[3854] *şefqet*
[3855] [2] (гг. 967-969); аль-фаджр – заря (Сура 89)
[3856] [2] (гг. 970-971)
[3857] *ebadet*
[3858] *maşuq*

**S. 3** *1 Aşiq û me'şûqa*[3859] *mirazê xwe ji wan dixweste,*
*2 Wan mirazê xwe ji ĥeqîyê dixweste.*

**S. 4** *1 Ya mêrê*[3860] *li ber erk'anê,*
*2 Ya siba r̂oj û r̂onkayîyê,*
*3 Ya Xwedayê*[3861] *bilind, xwedanê soz dayê.*

**S. 5** *1 Ya şêxê ĥeqîqetê,*
*2 Ya mîrê sibehê,*
*3 Ya sibeha nû.*

**S. 4** *1 Ya mêrêt sibê, sibeha nû,*
*2 Ya melik şehîd, ya nefesa silt'an Êzîd,*
*3 Ĥeta êk bixwaze, tu şêx û ez mirîd!*
*4 Ezî r̂azîme meferê meye silt'an Êzîd!*

**S. 6** *1 Ya xunk'arê*[3862] *şehîd,*
*2 Ya nefesa ĥeq, ya sur̂a silt'an Êzîd,*
*3 "Tu yê xelasîyê", ya silt'an Êzîd, tu şêxî, ez mirîd.*

**S. 7** *1 Ya Xweda, bi r̂azîbûna te,*
*2 Wek xwazîya te,*
*3 Şêxa, p'îra û mirîda, yek ji vêkî dixwaze.*

**S. 8** *1 Ya Xwedê, tu dua' me qebûl bikî bi dir̂ozinîya bawermenda,*
*2 T'eve dua' yêt extîyarêt mixfî li ber dergehê xasa Xwedê Amîn!*

**S. 9** *1 Xweda[wo], tu li me vekî deriyê xêra,*
*2 Me sax bikî bi bawermendara,*
*3 Ya Xwedê, tu qeza û bela ser me derbaskî.*

**S. 10** *1 Bi şêx Adî*[3863] *û şêx "çi danî",*
*2 Û r̂ê û erk'anî,*
*3 Û zanîngeh ew Xwedîyê e'rd û e'zmanî.*

**S. 11** *1 Bi xwazîya şêx Adî, şêxê k'afê,*
*2 Yê e'wilê wî ji Lewĥê, girtîye Xwedayê.*

**S. 5** *1 Ya mêrêd sibê, siba ,,mişoklîn,*
*2 T'anc ji e'wilîn, ĥeta bi axirîn,*
*3 Xêra bide, şer̂a werger̂în,*
*4 Ĥeq [il-]ĥemdillah, R̂eb il-A'lemîn.*

**S. 6** *1 Feqîr, "Aliyî", mîr li wehdanî,*
*2 Ya Xwedê dua'ya me qebûl bikî,*
*3 Ji dua'ya mominêt çak, extîyarê mixfî,*
*4 Li ber dergehêt xasa, ya Xwedê Amîn!*

**S. 7** *1 Şêx Adî — şêxê ĥeqîqetê,*
*2 Xwedanê me'rîfetê,*
*3 Zerb û k'eremet ji ba te tê!*

**S. 8** *1 Şêx Adî — sêxekî çêye,*
*2 Dana me'rîfet û r̂êye,*

---

[3859] *maşuq*
[3860] *mîr*
[3861] *Xuda*
[3862] *xwendk'ar*
[3863] *Şêxadî*

*3 E'rd û e'zman xweş*[3864] *te divêye!*

**S. 9** *1 Şêx Adî — şêxe û hine,*
*2 Bînaya ĉavêt mine,*
*3 Çend wesfet*[3865] *jê diçine.*

**S. 10** *1 Şêx Adî, melik şêx Sin bi şêxîtî qebiland,*
*2 E'rş û K'ursîy bora xemiland,*
*3 Mêr û milyak'eta li e'zmana bora hilhiland!*

**S. 12** *1 Şêx Adî*[3866]*, melik şêx Sin bi sêxîtî qebiland,*
*2 E'rş u K'ursîy jê r̂a xemiland,*
*3 Horiya li e'zmana jê r̂a hilhiland.*

**S. 11** *1 Şêx Adî li hestî nezer kir,*
*2 Hestî ji k'eremê nûr û neder kir,*
*3 P'adşayê min bi şefeqet*[3867] *û r̂eĥmeta xwe kir.*

**S. 12** *1 Şêx Adî — sêx[ê] meqbûle,*
*2 Zeynandî hestîyê stûre,*
*3 Dîwana şêx Adî şefeqet, û muĥbet*[3868]*, û nûre!*

**S. 13** *1 Şêx Adî — şêxê meqbûle, r̂awestîyabû bê stûna,*
*2 Dîwana şêx Adî û melik şêx Sin şewq û nûre.*

**S. 13** *1 Şêx Adî — şêxê k'afê,*
*2 E'wilê wî li Elîfê,*
*4 Lewĥ il-meĥfûz navê Xwedê!*

**S. 14** *1 Şêx Adî — şêx Berk'at,*
*2 Bi wê nûrê kir xelat,*
*3 Lew fir̂î, ço semawat!*

**S. 14** *1 Ser leşkere binê vê kaniya Sipîye,*
*2 Qubleta sibĥane*[3869]*,*
*3 Bo navê şêx Adî u melik şêx Sin dide şehdîye.*

## 5. DUA'YA SIBÊ[3870; 3871; 3872]

Piştî hilatina r̂ojê, her Êzidîyek ji xewê şiyar dibe û dest û ĉe'vên xwe dişo û pişta xwe girê dide û k'umê xwe, yan cemedanîya xwe di havêje ser serê xwe, bi esq û dil berê xwe dide r̂ohilatê, herdu destên xwe danête ser yek, beranberî R̂ojê disekine u dua' sibê dibêje. Piştî dua'ya xwe bi dawî tîne, xwe kin dike e'rdê û sê cara li suna R̂ojê mac dike, destên xwe bi ser û r̂ûyên xwe da tîne û sikrînîyê ji Xwedê, Tawsî melek', xasa dixwaze. Xêr u bêbelayê, ji xwe r̂a, ji milletê xwe r̂a, ji ĥemû mirovên çak r̂a dixwaze. Dua' bi vî awayî di hête gotin:

**pişka yekê:**
**S. 1** *1 Amîn! Amîn!*

---

[3864] *xoş*
[3865] *usfet*
[3866] *Sîxadî*
[3867] *şifqet*
[3868] *miĥibet*
[3869] *subhan*
[3870] [2] (rr. 972-974); [3] (rr. 216-219); [7] Lava sibê (rr. 38-40)
[3871] http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete03.htm (*); http://www.ezdixandi.com/forum/38-304-1(*); http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=968
[3872] [2] (rr. 975-977)

*2 T'ibarek[3873] il-dîn,*
*3 "Ellaĥ eĥsen il-xaliqîn".*
*4 Bi ĥimeta Şemsedîn Fexredîn, Secadîn, Nasirdîn, Şêx Şems[3874] qewata dîn,*
*5 Silt'an şêx Adî t'ac ji e'wilîn ĥeta axirîn.*
*6 Ĥeq [il-]ĥemdillah, ya Ȓeb il-A'lemîn xêra bike, şeȓa wergeȓîn,*
*7 Mehderekê dixwazin bi ȓeĥma şêx Adî, ȓeza melik şêx Sin, k'erema şêx Şems.*

**S. 1** *1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 Xwedê t'ibarek li dîn,*
*3 T'ifaqe li t'ifaqîn,*
*4 Xwedê e'sil xaliqîn.*

**S. 2** *1 Bi ĥimeta melek Şemsedîn, Amadîn, Babadîn, Nasirdîn, Sicadîn, melik Fexredîn,*
*2 Şêx Şems li ser qewata me û dîn,*
*3 Silt'an şêx Adî t'acê ji e'wil ĥeta bi axirîn,*
*4 Ya Xwedê, tu derê xêra veke, derê şeȓa wergeȓîn.*

**piska duwê:**

**S. 2** *1 Nûr ji nûrê şifiqî,*
*2 Sibĥane[3875] ji te xaliqî,*
*3 Meleka li ber t'ifiqî.*

**S. 3** *1 Berî ȓoj zeriqî,*
*2 Melek emin li ber t'ifiqî,*
*3 Nûr bû ji nûrê şefiqî,*
*4 Sibĥan ji te ya Xaliqî.*

**S. 1** *1 Sibeye, ȓoj zeriqî!*
*2 Nûr ji nûrê şefiqî!*
*3 Melek "emeredîn" li ber t'ifiqî*
*4 Sibĥane ji navê te xaliqî!*

**S. 1**[3876] *1 Sibe bû, ȓoj zeriqî,*
*2 Nûr ji nûrê şefiqî,*
*3 Mêr û milyak'et li ber tifiqî.*

**S. 2** *1 Sibeye, ȓoj hilat!*
*2 Şukrîna me pê hat!*

**S. 3** *1 Me ji navê Xweda yê şêx Şems[3877] hêvîyane[3878],*
*2 Me yek sadiqe, û ĥeya, û îmane,*
*3 Sibeye ȓonîya şêx Şems dibû beyane,*
*4 Navû dik'arê şêx Şems dikim silave,*
*5 Ȓonahîya şêx Şems dabû çardeh t'ebeqê e'rd û e'zmane.*

**S. 3** *1 Ji malê ĥeta male,*
*2 Şêx Şems xwedanê sîqalê,*
*3 Em li şêx Şems nabiȓîn xeyalê[3879].*

**S. 4** *1 Ji malê ĥetanî malê,*
*2 Şêx Şemse xwedanê sîqalê[3880],*
*3 Dest û damanê şêx Şems nabirim ji xeyalê.*

**S. 4** *1 Ji malê ĥeta[3881] malê,*
*2 Şêx Şems xwedanê sîqalê,*

---

[3873] *tebarek*
[3874] *Şêşims*
[3875] *sibhan*
[3876] *Qewl û beyt'ên êzidiyan yê piroz* http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
[3877] *Şêşims*
[3878] binêr: *hîvî*
[3879] *xiyal*
[3880] *sêqal*
[3881] *ĥeya*

*3 Em ji şêx Şems nabiȓîn xeyalê.*

**S. 4** *1 Ji derecê ĥeta deracê,*
*2 Şêx Şems xwedanê ferecê,*
*3 Em dê dest û damanêd şêx Şems tiwaf keyn şuna K'abet îlaĥîyê û ĥacê.*

**S. 5** *1 Ji derecê ĥetanî derecê,*
*2 Şêx Şemse xwedanê ferecê,*
*3 Dest û damanên şêx Şems ȓadimûsim li dewsa K'abê, ciyê ĥacê.*

**S. 5** *1 Ji derecê ĥeta derecê,*
*2 Şêx Şems xwedanê ferecê,*
*3 Em dest û damîna şêx Şems tiwaf dibîn sûna birka K'abet îlaĥî*[3882] *û ĥacê.*

**S. 5** *1 Ji stûnê ĥeta stûnê,*
*2 Şêx Şems xwedanê me'rîfet, û erk'an, û nasînê.*

**S. 6** *1 Ji stûnê ĥetanî stûnê,*
*2 Çil mifte heye li derî xezînê,*
*3 Şêx Şems dane destê xwedanê me'rîfetê û nasînê.*

**S. 6** *1 Ji stûnê ĥeta bi stûnê,*
*2 Çil mifte li hindurê xizînê,*
*3 Şêx Şems dane destê xwedanê me'rîfetê, nasînê.*

**S. 6** *1 Ji ĉavî ĥeta devî,*
*2 Mora şêx Şems lê dik'eve,*
*3 Meydana menzina, ji germa nahêlin binivî.*

**S. 7** *1 Ji ĉavan ĥetanî devî,*
*2 Mora şêx Şems lê dik'evî,*
*3 Mora meleka germe, nahêle tu binivî.*

**S. 7** *1 Ĉava ĥeta devî,*
*2 Mora şêx Şems lê dik'evî,*
*3 Ji muĥbeta mêra, milyak'eta, nahêlin em binivî.*

**S. 8** *1 Ji devî ĥeta bi ĉava,*
*2 Mora şêx Şems kire nava,*
*3 Ya şêx Şems, me bi te silave!*
*4 Ev dua'ya li ba te, ew sae't, ew gave.*

**S. 7** *1 Serî ĥeta p'êya,*
*2 Ya şêx Şems, te neqşandin danayîne serê ȓêya,*
*3 Em ji şêx Şems nabiȓin hîvîya.*

**S. 8** *1 Ji serî ĥetanî p'îya*[3883]*,*
*2 Ya şêx Şems, te em danîne devê ȓêya,*
*3 Dîndara Xwedê û şêx Şems em nabirin ji hêvîya.*

**S. 9** *1 Serî ĥeta bi p'êya,*
*2 Te t'emam neqşandin, danîye ser du ȓêya,*
*3 Me û sinetxanê ji te hêvîya.*

**S. 10** *1 Ya şêx Şems, te em înane ser vê xilmetê,*
*2 Ber me û sinetxanê vekî dergekî ȓeĥmetê,*
*3 Bipirsî ĥalê me û çendî sinetê.*

**S. 8** *1 Ya şêx Şems, tu li me vekeyî dergehê ȓeĥmetê*
*2 Te em înabûyine ser vê xilmetê!*

**S. 9** *1 Ya şêx Şems, te em xwestine ser vê xilmetê,*
*2 Li me vekî dergê ȓeĥmetê,*
*3 Ȓonahîkî bidî ber me û çendê sinetê.*

[3882] *K'abetulla*
[3883] binêr*: p'ê*

**S. 9** *1 Sinîk k'u sinîne,*
*2 Di mandîne,*
*3 Me bi şêx Şems hêvîne*[3884]

**S. 11** *1 Sinî k'u sinîne,*
*2 Zebûnî ji bandîne,*
*3 Em ji Xwedê û şêx Şems bi hîvîne.*

**S. 10** *1 Sinetik k'û sinete,*
*2 Zebûne kêm t'aqete,*
*3 Me bi şêx Şems e'ynate.*

**S. 10** *1 Sinet k'u sinete,*
*2 Zebûnî kêm t'aqete,*
*3 Me bi Xwedê û şêx Şems yî bi enîyete.*

**S. 11** *1 Sinet k'u sinete,*
*2 Her bi zebûne kêm t'aqete,*
*3 Me bi şêx Şems e'ynete.*

**S. 12** *1 Şêx Şemso, tu*[3885] *Emînî,*
*2 Li ser beĥra giran dîne,*
*3 Sed xwezka mine bi wê ȓuĥê be, bideyê, jê nestînî,*
*zor dereca bigehînî.*

**S. 13** *1 Ya şêx Şems, tuyî Ȓehîmî,*
*2 Xaliqekî minî ji qedîmî,*
*3 Ĥemû derda tu K'erîmî.*

**S. 14** *1 Ya şêx Şems, tu Ȓeĥmanî,*
*2 Xaliqekî minî bi canî,*
*3 Ĥemû derda tu dermanî,*
*4 Ĥemû mexlûqatî xwedanî.*
*5 Ya şêx Şems, tu mîrê babê*[3886] *min û çend derwêşa,*
*qelendera, feqîra, sêxa, p'îra, ewin kanî.*

**S. 15** *1 Ya şêx Şems, tu li bangê gaze li gel extîyara*[3887]*, ȓêwîya,*
*2 Erk'an sekinî ser milê qelendera.*

**S. 16** *1 Ya şêx Şems, tu meferî!*
*2 Ya Xweda, tu xaliqê minê her û herî,*
*3 Tu ȓisqa*[3888] *didî, ȓisqa diberî.*

**S. 12** *1 Şêx Şemsê me yî nûrîne,*
*2 Li ser K'ursîya Zêȓîne,*
*3 Mifte û k'ilîlên feqîrê mezelê bi destê wîne.*

**S. 17** *1 Şêx Şemsê minî nûrîne,*
*2 Ser K'ursîya Zêȓîne,*
*3 K'ilîl û mifte bi destê wine.*

**S. 13** *1 Ewe vedike derê ĥemû xezîna,*
*2 Sed xweziya mine bi wî be, şêx Şems bidê û jê nestîne,*
*3 Wê zor dereca ȓagihîne.*

**S. 17** *4 Wê vedike derê zor xezîna, xelata jê dertîne,*

---

[3884] binêr: *hîvî*
[3885] *tî*
[3886] *bav*
[3887] *extiyar*
[3888] *ȓizq*

*5 Em û sinetxane ji te bi hêvîne,*
*6 Tu dermanê ĥemû birîna.*

**S. 11** *1 Çî dua' ya extîyarê mirgehê kirî,*
*2 Cêşê melik Fexredîn, qewalê şêx Adî,*
*3 Dua' ya qebûl, p'îrê Libna,*
*4 Wan çî dua' kirî, me jî ew dua' kirî.*

*Em kêmin, Xwedê t'emame!*
*T'emametî li Xwedê[3889], û şêx Adî, û melik şêx Sin!*

## 6. DUA'YA SIP'ÊDEHÊ[3890]

*Bi navê Ezdanê p'ak û dilovan:*

**S. 1** *1 Xwêdeo, ji bona şanê te, şuna te, ji bona P'adşahîya te!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tuyî K'erîmî, tuyî R̂ehîmî,*
*2 Tu Xwedayê milkê[3891] cihanî,*
*3 Melikê saqî[3892] semayî, Melikê E'rşê E'zîmî!*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu ji enzelda qedîmî,*
*2 Ya R̂ebî, ta a'bad[3893], tu kama r̂uĥayî!*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, tu Melikê cins û insî,*
*2 Melikê E'rş û K'ursîy,*
*3 Ya R̂ebî, tu Semedî, Lutfî[3894] û Lemayî[3895]!*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, tu Semedî, Ĥey il-Mecîdî,*
*2 Yek û yekta û bê enbazî,*
*3 Ya R̂ebî, her tu layîqî medih û senayî!*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, tu Xwedawendê sep'erî,*
*2 Xwedawendê Meh û Mehrî[3896],*
*3 Xwedawendê çem[3897] û neĥrî,*
*4 Ya R̂ebî, tu Xwedawendê etayî!*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, te ne lewme, te ne r̂enge[3898],*
*2 Te ne awaze, te ne denge[3899],*
*3 Te ne endame[3900] te ne çenge[3901],*
*4 Ya R̂ebî, kes nizane tu k'usayî!?*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, tu guhrendey, mendayî, qutî,*
*2 Tu ĥelîmê melekûtî.*
*3 Ya R̂ebî, tu Ĥakimê şah û gedayî,*
*4 Ya R̂ebî, herî Hayî, herî Hayî, herî Hayî!*

---

[3889] *Xûdê*
[3890] [2] (rr. 978-979)
[3891] *mulk*
[3892] *soq û*
[3893] *ebed*
[3894] *lift*
[3895] *nimayî*
[3896] *mah û mehr*
[3897] *em*
[3898] *Te ne lome, te ne îndade*
[3899] *reng*
[3900] *îndam*
[3901] *Te ne denge, te ne r̂enge*

# 7. DUA'YA NÎVRO

Êzidî sibeykê berê xwe didin r̂ohilatê û êvarî berê yê ûnke demê r̂oj li nîveka e'zmanî, nîvro jî xwe didin r̂oavayê. Ėzidî berê xwe didin Lalisa nûranî û dua'ya yê, disekine, dibêjin, xwe dikin:

**şaxê –1**[3902]

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, tu bideyî xatira stûna e'rd û e'zman,*
*2 Leylan[3903], Leylet il-Qedir[3904] û "sur̂et il-R̂eĥman",*
*3 Ya R̂ebî, ji herçar mala bo me u sinetxanê vir̂êkey han.*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatira gayê binê dine û masiyê bi t'inê,*
*2 K'erema xwedanê xîveta veday li ser girê kela Dingizê!*
*3 Ya R̂ebî, tu bo me û sinetxanê vir̂êkey, derwêşê r̂uniştî li k'afa Zimzimê.*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê sur̂a[3905] çêbûyî li nav mêra di xewlexanê da,*
*2 Yê xwe kirîye pisê şêx Adî di mix̂arê da.*
*3 Ya R̂ebî, tu me û sinetxanê x̂efir bikî, ji gunehêt me kirîn li gel dayî û babê da.*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê melik şêx Sinê Adiya,*
*2 Yê serê xwe dayî p'êxama me sinîya[3906].*
*3 Ya R̂ebî, tu bo me û sinetê vir̂êkey r̂isqekî[3907] ji xizîna xwe ya jorîye!*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê şêxê sinetê,*
*2 Çend xas u mominê bo te dikin ibadetê[3908].*
*3 Ya R̂ebî, tu bo me û sinetxanê vir̂êkey r̂isqekî ji xizîna xwe ya qudretê!*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, tu bi xatira aşê muĥbetê[3909] kî,*
*2 Û her ĥeft dergehêt qudretê kî,*
*3 Û herçar k'ilîlêt me'r̂îfetê kî.*
*4 Ya R̂ebî, tu pirsiyareke[3910] xêrê li ĥalê me û sinetê kî!*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, tu bidey xatira mêrê li zuĥayê,*
*2 K'erema gelîyê Laliş, dar û berayê!*
*3 Ya R̂ebî, tu me û sinetê xilas kî ji qeda yê, belayê!*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, tu bideye xatira siwarê, siwar bûyî nîveka r̂ojê, hatî ji Şerqê çoyî bo X̂erbê!*
*3 Ya R̂ebî, tu gunehêt me x̂efir bikî û çendî sinetê!*

**S. 9** *1 Ya R̂ebî, tu bideye xatira sur̂a herçar qirifita û k'erema her ĥeft meleka.*
*2 Ya R̂ebî, tiştê ji te dixwazîn: dîn û îmane, ne dewlete!*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, tu bideye xatira şev û r̂oje, bihuşt[3911] û dojeh.*
*2 Ya R̂ebî, tu me û sinetê bixûne dîwana xas û mominêt jorê.*
*3 Ya R̂ebî, her tûyî, her tûyî, her tûyî!*

---

[3902] [2] (гг. 983-984); http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=973
[3903] leylun
[3904] *Leylet al-Qedir — Ночь Аль-Кадра,* одна из ночей конца месяца Рамадана, который считается благословленным среди мусульман. В этой ночь, согласно суннитской традиции, Коран был ниспослан Мухаммаду от ангела Джабраила. В шиизме это связано с нисхождением науки на имаме. Эта ночь считается благословленной мусульманами, которые должны совершать призывы, молитвы, читать Коран и просить о искреннем прощении за совершенные грехи.
[3905] *sur*
[3906] *sunî*
[3907] *r̂izq*
[3908] *ebadet*
[3909] *miĥibet*
[3910] *pisiyarek*
[3911] *bihişt*

**şaxê –2**[3912]

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê Ĥesen zerbaba,*
*2 Def û şibaba, Quds, Mekke, Medîne û K'aba,*
*3 Êzdîne mîr, bavê bava, mezinê çendî siĥaba!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê melekê ber r̂ojê, çawîşê şêx Şems*[3913]*, Bercis Adêl, Marîn, E'sed, melik il-Mişterî, Amadînê Şemsa, Qadî Bilban, Hicm û Mendûm, Mendê Şerîf, Mendê Tûkil kî!*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê dur̂a sipîye, P'adşe Bêrîye,*
*2 Nefesa ĥeq, sira silt'an Êzdîye,*
*3 Melik Şerfedîn, xêr û sebîl, şerpik û ĉiraye,*
*4 P'erî qendîl, dergehê dîwan silt'an şêx Adî kî!*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê ixtîyarê*[3914] *mixfî, sur̂a li pê p'ira Selatê*[3915]*, Ĥadêr, Nadêr, Qadêr, Cencerî, Cebrîn, qubit xilûrî alî tu bi Umranê Hindî kî!*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê mezin meydana meleka,*
*2 Ser holê sekiniye derwêşê Qat'anî, serdarê heştê ĥezar siwarê mala Adiya, p'îrê Libna, p'îr Afat*[3916]*, R̂ebiya E'debî, sitîya Ês, maka şêx Adî, Xatûna Fexra, şêx Fexrê Adiya, şêx Mend, Nasirdîn, Sicadîn, k'afê û Zimzimê*[3917]*, qubet il-Bidor*[3918]*, Êzdîne mir kî!*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê kaniyia Sipî, seyêd il-Kewdel, Ĥewdel, Kewdel kekê şêx şehîd Ellaĥ, p'îr Bab, p'îr Mendî gor̂î, delîlî beĥrî, Zencerî wer̂eq, Mişe'l, sira Tawisî melek', her ĥeft kur̂ê pîrê, Sûka me'rîfetê, pênc ferzên ĥeqîqetê, dîwana aẍê qelendera, dergeha mîr li mîr Amadîn kî!*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê Hidrîsî*[3919] *Xeyat, banî E'rşe, Bilalî Hebeş, şêx Mihemedî Harûnî, R̂eşî Gor̂ayî, melek Zeyîn*[3920]*, melik Fexredîn, çil mîrî li ber secadê kî!*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê p'îrî Kûza, p'îrî K'emal, p'îrî T'erciman*[3921]*, şahê siwara, seyêd el Bek'ir, Guharzer, Zerguhar, dara qewala, dare qelendera, sitîya Ês, maka şêx Adî, qepiyê R̂eş, qepê miraza kî!*
*2 Ya R̂ebî, em mirazê xwe ji te dixwazin dîn, û îman, û k'emale!*

*T'emam Xwedê û silt'an şêx Adî!*

## 8. DUA'YA ÊVARÊ[3922]

Êzîdî dema berî r̂oj biçe ava, hîn zerayiya r̂ojê li derve ye, berê xwe didin r̂ojê. Destê xwe datînin ser hev û dua' xwe dikin. Wekî dua' sibê ji Xwedê xêrê, qenciyê û t'ifaqê û ji bo qeza û bela neyên serê wan, jibo Xwedê dua' dikin. Ji bo ku r̂oj diçe ava û şev destpêdike, qeza û belayên di tariyê de neyên serê wan û miletê wan, ew vê dua'yê dikin:

**S. 1** *1 Ya siwarê R̂ojhilatê, R̂ojavayê,*

---

[3912] [7] *Lava nîvro* (rr. 40-41)
[3913] *Şêşems*
[3914] binêr: *extîyar*
[3915] binêr: *Serat*
[3916] *pîra Fat*
[3917] *Zemzem*
[3918] *qublit il-Bidûr*
[3919] *Idrîs*
[3920] *melik Zîn*
[3921] *Tercman*
[3922] [2] (rr. 985-987)

*2 Hûn bidene xatira dotê û dayê,*
*3 Hûn me xilaskin ji qedayê, ji belayê,*
*4 Ya şêx Şems[3923], tu ĥalê mala xwe[3924] bipirsî û me jî vê care.*

**S. 2** *1 Hûn bidene xatira E'rş û K'ursîy,*
*2 Gay û Masî, heyat[3925] il-K'ursîy,*
*3 Ya şêx Şems, tu li ĥalê mala xwe û me jî [bi]pirsî.*

**S. 3** *1 Hûn bidene xatira Lewĥ û Qeleme,*
*2 Hewa û Ademe, Îsa bin Miriyeme,*
*3 Ya şêx Şems, tu li ĥalê [mala] xwe û me jî bipirsî li ĥemû dema.*

**S. 4** *1 Hûn bidine xatira çerxan û feleke, horîyan û meleke,*
*2 Suȓa Tawisî melek' û çardeh t'ebeqe,*
*3 Ya şêx Şems, tu pirsiyareke xêrê li mala xwe û me jî bike.*

**S. 5** *1 Hûn bidine xatira bihuştê û darê, k'afê û mixarê[3926],*
*2 Suȓa şêx Adî [3927] û Beyt[3928] il-Farê,*
*3 Ya şêx Şems, tu pirsiyareke xêrê li mala xwe û me jî bike vê carê.*

**S. 6** *1 Hûn bi xatira dare ken, k'asê ken,*
*2 Extîyarê suȓa mixfî pê p'ira Selatê ken.*
*3 Ya şêx Şems, hûn pirseke mala xwe û me jî biken.*

**S. 7** *1 Hûn bidene xatira duȓa Sipîye,*
*2 Melikê Bêrîye, suȓa Êzîye.*
*3 Ya şêx Şems, li dîwana şêx Adî tu bo mala xwe û me jî bikî hêvîye[3929]*

**S. 8** *1 Hûn bidine xatira duȓa Sore,*
*2 Êzdîne mîre, qubet il-Bidore.*
*3 Ya şêx Şems, bang û hawarêt me bet Melikê[3930] jore.*

**S. 9** *1 Hûn bidene xatira duȓa Zere,*
*2 Ax, û av, û bayî, û agire,*
*3 E'rd û e'zman û bere,*
*4 Êzdîne mîr û herçar suȓe.*
*5 Ya şêx Şems, tu li banga mala xwe û me jî were.*

**S. 10** *1 Hûn bidene xatira sûka me'rîfetê,*
*2 Mêrê li ber bedilê diket xilmetê,*
*3 Derwêşê şev û ȓojê diket ibadetê,*
*4 Her pênc ferzêd ĥeqîqetê: şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birayên axretê.*
*5 Ya şêx Şems, tu mefereke[3931] mala xwe û me jî bike vê care.*

**S. 11** *1 Hûn bidene xatira dua'êt fêran,*
*2 Ȓebenêd binê dêran.*
*3 Ya şêx Şems, tu li mala xwe û me jî bikey sexbêran.*

**S. 12** *1 Hûn bidene xatira K'ursîya Ȓeĥmana,*
*2 Melekî cana, beĥra qudsîy cana.*
*3 Ya şêx Şems, me ji te divêt dîn û îmana.*

---

3923 *Şeşims*
3924 *xo*
3925 *ĥeyat*
3926 *mixar*
3927 *Êzîd*
3928 *bet*
3929 *hivîye*
3930 *melek*
3931 *meferiyek*

**S. 13** *1 Hûn bidine xatira Ezraîl[3932], Cebraîl[3933], Mîkaîl, Şifqaîl, Derdaîl[3934], Israfîl[3935],Ezazîl[3936],*
*2 Ewin her ĥeft melekêt K'ibîr, di destî da mifte û k'ilîl,*
*3 Ew jî wê li ber ĥezreta Melikê Celîl.*

*Em kêmin, Xwedê t'emame!*

## 9. DUA'YA [BERÎ] ȒAZANÊ[3937]

**S. 1** *1 Ya Ȓebî, tu Xwedayî, tu Ezdayî,*
*2 Ti xaliqê medih û senayî,*
*3 Ejqenderî bê gunehî[2526]*
*4 Ĥezar û yek nav li xwe danayî,*
*5 Navê şêrîn her Xwedayî*

**S. 2** *1 Ya Ȓebî, tu Dayîmî, tu Qedîmî,*
*2 Tu xaliqê E'rsê E'zîmî,*
*3 Ya Ȓebî, tu Mihrî!*
*4 Tu xaliqê e'rd û e'zman,*
*5 Ȓeĥma te heye li ĥemû e'rdan,*
*6 Tuyî dermanê ĥemû derdan.*

**S. 3** *1 Ya Ȓebî, tu me bidî xatirê şêx Şems û Şemsaniyê,*
*2 Ya Ȓebî, tu me bidî xatirê melek şêx Sin û Adaniyê,*
*3 Ya Ȓebî, tu me bidî xatirê Sêxûbek'ir û Qat'aniyê.*
*4 Ya Ȓebî, tu me bidî xatirê mîr Ĥesin Maman[3938] û p'îraniyê.*
*5 Ya Ȓebî, tu me bidî xatirê şêx Adî [3939] û mirîdaniyê.*
*6 Deriyekî xêrê li me û vî dînî vekê.*

**S. 4** *1 Mefera min — şêx Şems, atqata min — Êzîd.*
*2 Derdê min, dua'yê min — Ezdayê min.*
*3 P'îrê min — hostayê min, Xwedê Ĥeq — Xwedayê min.*

**S. 5** *1 Tawisî melek'— îmana min, kaniya Sipî — mora min.*
*2 Çumaye û qubet il-Bidore[3940] — mek'anê silt'an Êzîdye Sore.*
*3 Sinetxane lê dibe more.*

**S. 6** *1 Meqlûbû mergeh silav[3941].*
*2 Silavên min li Meqlûbê, li mergehê,*
*3 Li Lalisê, li xwedanê qubehê.*

**S. 7** *1 Şêx Adî — nûre,*
*2 Melik şêx Sin — mişûre,*
*3 Me şehda û îmana xwe bi navê Tawisî Melek û bi xerqê şêx Adî qebûle.*

**S. 8** *1 Ez minetk'arim ji mala bava,*
*2 Ẍafilî korin ji herdu[3942] ĉava,*

---

[3932] *Izraîl*
[3933] *Cibraîl*
[3934] *Dirdaîl*
[3935] *Izrafîl*
[3936] *Izazîl*
[3937] http://ezipedia.de/dua-razane-das-gebet-vor-dem-schlaf/
[3938] *gunah*
[3939] *Meman*
[3940] *qublidore*
[3941] *selav*
[3942] *herdo*

*3 Ku t'im û dayîm hilnadin van nava.*

**S. 9** *1 Lalis ciyê bi nûre,*
*2 Ewe mek'anê silt'an Êzîdê Sore,*
*3 Êzîdxane lê dibe more.*

**S. 10** *1 Mek'anê silt'an Êzdîye,*
*2 Êzîdxane lê t'iwaf dibîye.*

**S. 11** *1 Ezdayîme, ji duȓeke enzelîme.*
*2 Bendeyî kaniya Sipîme,*
*3 Berxê k'oza silt'an Êzîme,*
*4 Şikir ji Xwedê, ji vî dînî û îmanî, ji vî ol û erk'anî ȓazîme.*

**S. 12** *1 Çûme Lalişa nûranî,*
*2 Min serê xwe li ber cotê qubeha danî.*
*3 Min îman bi navê Tawisî melek' û xerqê şêx Adî anî.*

## 10. DUA'YA ȒOHILATÊ[3943]

*Bi navê Ezdanê dilovan û mihriban!*

**S. 1** *1 Ya Ȓebî, tu heyî, ez nînim,*
*2 Tu Ȓeĥmî, ez gunehim,*
*3 Tu xwedan heqî, ez bendim.*

**S. 2** *1 Te ne çone, tuyî çendî,*
*2 Te ne bejne, tuyî bilindî,*
*3 Te ne awaze, tuyî bi dengî.*

**S. 3** *1 Ciyê[3944] te ĥemû e'rde,*
*2 Tu xaliqe celetî a'lem,*
*3 Te daye ĥezretî Adem,*
*4 Te kir dema me ev dem.*

**S. 4** *1 Ya Ȓebî, tu vilayîyê[3945] ferza nimêjî,*
*2 Tu ȓuĥan ji ȓuĥa dibirêjî,*
*3 Tu ji seran, ȓuĥan davêjî.*

**S. 5** *1 Tu ne mîna me kêm dibînî,*
*2 Tu li seran ȓuĥan digehînî.*

**S. 6** *1 Ya Ȓebî, tu Xwedayî, tu P'adşayî,*
*2 Tu alîmê[3946] e'limayî,*
*3 Tu xunk'arê[3947] ser çend P'adşayî.*

**S. 7** *1 Te ne xafe, te ne xurde,*
*2 Te ne awaze, te ne denge,*
*3 Xwedan malî, xwedan p'erde,*
*4 Ciyê te ĥemî e'rde.*

---

[3943] [2] (rr. 980-981); [8] (rr. 18-19)
[3944] *cihê*
[3945] *welîyê*
[3946] *elîm*
[3947] *xundkar*

**S. 8** *1 Tu Xwedayî, derdemendim,*
*2 Bexşendeyî, bê gunahî,*
*3 Layîqî medih û senayî,*
*4 Kes nizane tu çawayî.*

**S. 9** *1 Tu hem derdî, hem dermanî,*
*2 Ĥekimê şah û gedayî.*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, tu P'adşayê E'rş û K'ursîy,*
*2 Xaliqê Gay û Masî.*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, bi xatirê navê xwe ke,*
*2 Ĥalê K'urdistanê û êzdîyêt R̂ojhilat û R̂ojavayê bipirse!*

## 11. DUA'YA R̂OAVAYÊ

**şaxê — 1**[3948]

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê mîrê R̂ojhilat, R̂ojava, dotê û dayê, çel E'yn il-Beyzayê,*
*2 Ya R̂ebî, me [û] sinetxanê xelas bikî ji qeda û belayê*
*3 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê E'rş û K'ursîy, Gay û Masî,*
*4 Ya R̂ebî, tu li ĥalê me û sinetxanê bipirsî,*
*5 Ya R̂ebî, tu bidî bona xatirê E'rş û sema, Lewĥ*[3949] *û Qeleme, Hewa û Adem, Îsa û Meryem*
*6 Ya R̂ebî, li bangîna me û sinetxanê bê ĥemî çaxa, ĥemî dema*
*7 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê zerhêvarî, bihuşt û darê, k'afê û Zimzimê*[3950] *û mix̆arê,*
*8 Silt'an Êzîd Xwedanê biryarê,*
*9 Silt'an şêx Adî li Beyt il-Fare,*
*10 Ya R̂ebî, li bangîna me û sinetxanê bê vê hevarê!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê silt'an Êzîd, atqatê R̂ebit il-Tae'la,*
*2 Xwedanid xêra, k'afê û her ĥeft mêra, melik Fexredîn herçar gêla,*
*3 Ya R̂ebî, li ber me û sinetxanê vekî dergekî xêra!*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê E'rşan û feleka,*
*2 Ĥoriya û meleka,*
*3 Tawis melek',*
*4 Çardeh t'ebeqa,*
*5 Ya R̂ebî, Ferceka xêrê li ber me û sinetxanê vekî!*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê sûka me'rîfetê,*
*2 Pênc ferzê ĥeqîqetê,*
*3 Mêrê çê, derwêş bi r̂ojê dike xilametê, bi şev û r̂oj digîşte ibadetê*[3951]*,*
*4 Ya R̂ebî, li ber me û sinetxanê vekî dergekî r̂eĥmetê!*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, bidî [bona] xatirê dur̂a Sipîye,*
*2 P'adşê Bêrîye,*
*3 Nefesa ĥeq sur̂a silt'an Êzîdîye,*
*4 Ya R̂ebî, me û sinetxanê ji te hîvîye!*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê dur̂a Zere,*
*2 Ba û agire, e'rd û e'zman û bere,*
*3 Dîwanê ax̆ê Qelendere,*

---

[3948]
[3949] *luĥ*
[3950] *Zemzem*
[3951] *ebadet*

*4 Êzdîne mîr,*
*5 Herçar sur̂e,*
*6 Ya R̂ebî,di bangîna me û sinetxanê were!*

**S.7** *1 Ya R̂ebî, bidî [bona]xatirê dur̂a Sore,*
*2 K'ursîy ya ji batin de more,*
*3 Mek'anê silt'an Êzîdî minî Sore,*
*4 Lalişek avakir li jore,*
*5 Dergehek[3952] li danî qubet il-Bidore[3953],*
*6 Ya R̂ebî, li bangîna me û sinetxanê were!*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, bidî bona K'ursîy ya R̂eĥmanê,*
*2 Can lawê cane,*
*3 E'rd û e'zmane,*
*4 Quds û mûsĥane,*
*5 Sur̂a qere şêx Mendê Fexrane,*
*6 Li ber me vekî dergekî xêrane!*

**S. 9** *1 Ya R̂ebî, bidî bona K'ursîy ya Cebêre,*
*2 Xwedanên xêra,*
*3 K'afê[3954] [û] her ĥeft mêra*
*4 Ya R̂ebî, li bangîna me û sinetxanê were!*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, bidî bona xatirê Ezazîl, Derdaîl, Mîkaîl, Cebraîl, Israfîl, Şifqaîl, Nûraîl,*
*2 Her ĥeft melekêt kibêr,*
*3 Ewan çiqas sal, û wext, û bedîl,*
*4 Her û her sekinîne li qeĥif û qeyser ĥezreta Melikêt Celîl,*
*5 Di dest wan de mifte û k'ilît,*
*6 Ya R̂ebî, me û sinetxanê nekî ji bîre!*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, bidî [bona] xatirê mîrê bilind,*
*2 Feqîrê soz dayî mîrê t'ebeqê Şamê,*
*3 Silt'an Êzîd li Şamê,*
*4 Şêx Mend p'aşayê Ĥelebê, mezela kekê Ezîz.*

*T'emam Xwedê û silt'an şêx Adî!*

**şaxê –2**[3955]

**S. 1** *1 Ya siwarê R̂ojhilatê û R̂ojavayê!*
*2 Win bidine xatirê dotê û dayê,*
*3 Win me xelaskin ji qedayê, ji belayê,*
*4 Win bidine xatirê kaniya Sipîyê.*
*5 Ya şêx Şems[3956], tu li ĥalê mala xwe bipirsî û me jî vê care.*

**S. 2** *1 Win bidine xatira E'rş û K'ursîy,*
*2 Gay û Masî,*
*3 Heyat il-K'ursî.*
*4 Ya şêx Şems, tu li ĥalê mala xwe û me bipirsî[3957].*

**S. 3** *1 Hewa[3958] û Ademe,*
*2 Îsa bin Miriyeme.*

[3952] *dergek*
[3953] *qubit il-bidûr*
[3954] gav
[3955] [7] *Lava rojava* (rr. 41- 43)
[3956] *Şêşems*
[3957] *Tu li halê xwe û mala me bipirsî*
[3958] *Hawa*

*3 Ya şêx Şems, tu li ĥalê [mala] xwe û me jî bipirsî li ĥemû[3959] deme.*

**S. 4** *1 Win bidine xatira çerxan û feleka,*
*2 Horiyan û meleka,*
*3 Sur̂a[3960] Tawisî melek' û çardeh t'ebeqa.*
*4 Ya şêx Şems, tu pirsyareke xêrê li mala xwe û me jî bike.*

**S. 5** *1 Win bidine xatira behiştê[3961] û dare,*
*2 K'afê û mix̆arê,*
*3 Sur̂a Êzî û Beyt'il-Farê[3962].*
*4 Ya şêx Şems, tu pirsyareke xêrê li mala xwe û me jî bikî vê care.*

**S. 6** *1 Win bi xatira darê kin,*
*2 K'asê kin,*
*3 Extîyarê mixfî pê p'ira Selatê kin.*
*4 Ya şêx Şems, win pirseke mala xwe û me jî bikin.*

**S. 7** *1 Win bidine xatira dur̂a Sipîye,*
*2 Melikê[3963] Bêrîye,*
*3 Sur̂a Êzîye.*
*4 Ya şêx Şems, li dîwana silt'an[3964] Şîxadî[3965] tu bo mala xwe û me jî bike hêvîye[3966].*

**S. 8** *1 Êzdîn mîre,*
*2 Qubet il-Bidore[3967],*
*3 Ya şêx Şems, bang û hawarên me bêt Melikê jore.*

**S. 9** *1 Win bidine xatira sûka me'rîfetê,*
*2 Mêrê li ber bedilê dike xilmetê,*
*3 Derwêş[ê] şev û r̂oj dike ibadetê[3968],*
*4 Her pênc ferzên ĥeqîqetê,*
*5 Şêx û p'îr, hoste û merebî, yar brayên axretê.*
*6 Ya şêx Şems, tu li mala xwe û me jî bikî sexbêran.*

**S. 10** *1 Win bidine xatira K'ursiya R̂eĥmana,*
*2 MelIkê cana,*
*3 Beĥra qudsê cana.*
*4 Ya şêx Şems,me ji te divêt dîn û îmana.*

**S. 11** *1 Win bidin xatira Ezraîl[3969], Cebraîl[3970], Mîkaîl[3971],*
*2 Şifqaîl[3972], Derdaîl[3973], Israfîl[3974], Ezazîl,*
*3 Her ĥeft melekên K'ibîr di dest de mifte û k'ilîl,*
*4 Ew jî li ber ĥezreta Melikê[3975] Celîl.*

*T'emam Xwedê û silt'an Şîxadî!*

---

[3959] *hemo*
[3960] *surr*
[3961] binêr: *bihuşt*
[3962] *bêtilfare*
[3963] *melek*
[3964] *sultan*
[3965] *Şêxadî*
[3966] binêr: *hîvî*
[3967] *Qublet li bidûre*
[3968] *ebadet*
[3969] *Izrayîl*
[3970] *Cibrayîl*
[3971] *Mîkayîl*
[3972] *Şifqayîl*
[3973] *Dirdayîl*
[3974] *Ezafîl*
[3975] *melek*

## 12. DUA'YA DI R̂OJÊ[3976]

*1 Xwedê me xweyîke[3977] derba xerqe,*
*2 Xwedê me xweyîke dîska denê,*
*3 Xwedê me xweyîke şer̂ê sibê,*
*4 Xwedê me xweyîke e'zabê dê û bavê,*
*5 Destê şile'tê,*
*6 Qurî buxtana,*
*7 Şer̂ê cînara,*
*8 Destê nep'aka,*
*9 Yê nebûyî, yê nep'ak.*

## 13. DUA'YA HEYVÊ[3978]

**S. 1** *1 Me heyveke xweye[3979] nû dîye,*
*2 Dur̂eke qîmetîye,*
*3 Ser t'ancekî r̂eş nûranî diîsîye,*
*4 Şehdê min — şêx Adî ye,*
*5 Qubleta min — kaniya Sipîye,*
*6 Mesebê min — şêx Şemsê T'et'erîye.*

**S. 2** *1 Fexro, tû fexrekî di cîda,*
*2 Xwedanê ilmê be'îde,*
*3 Tu wê li ber k'erema silt'an Êzîda.*

**S. 3** *1 Ez Êzdî yê cidê xwe me,*
*2 Medha jê ve didime.*

**S. 4** *1 Şêxek r̂abû ji Şamê,*
*2 Avakir Laliş meqamê,*
*3 Bo dîndara şêx[3980] Fexrê Adiyanê.*

**S. 5** *1 Ya melek Fexredîn, te em xwendîne[3981] li ĥezretê[3982],*
*2 Tu me bisitrînî ji derba[3983] xerqê, ji şerî'etê, ji t'erîqetê,*
*3 Şikir te em havêtine ser pişka sinetê.*

**S. 6** *1 Ya melik Fexredîn, me ji te divêt,*
*2 Fire[3984] dest, û ol, û t'erîqet.*

**S. 7** *1 Bimbarek ya pîroz,*
*2 Îyêt ĥesûd, ĉav sipî di boz.*

**S. 7** *1 Ya melik Fexredîn. heyva nû, qismetê kevin,*
*2 Ya melik Fexredîn, heyva nû, qismetê kevin,*
*3 Ya melik Fexredîn, heyva nû, qismetê kevin.*

---

3976 [17] (стр. 26)
3977 *xayîke*
3978 [2] (rr. 993-994); http://www.ezdixandi.com/forum/38-311-1
3979 *xoye*
3980 *şê*
3981 *xundîn*
3982 *ĥizret*
3983 *dirb*
3984 *fira*

## 14. PAŞDUA'[3985]

*Bi navê Yezdanê dilovan û mihriban:*

**S. 1** *1 Amîn! Amîn!*
*2 Xwedê arîk'arîya dîn!*
*3 Ya R̂ebî, xêra bidey, şer̂a wergeȓîn Şemsedîn, Fexredîn, Amadîn, Nasirdîn.*

**S. 2** *1 Ĥeqo, tu P'adşayî,*
*2 Xwedanê Mor û Mayî[3986],*
*3 R̂ezaqê cin û insî,*
*4 Xwedayê a'lema qudsîy,*
*5 Xaliqê cin û insî.*

**S. 3** *1 Şerfedîn xerzê gulî (kulî),*
*2 Mizgînê bînê K'urdistanê,*
*3 Bila veken deft'era îmanê,*
*4 Şêx Şems R̂oja Êzdîyane,*
*5 Şerfedîn mîre li dîwane.*

**S. 4** *1 Silîxan[3987] biketin K'urdistanê,*
*2 Wê t'opan berdetin T'urkistanê,*
*3 T'extî ȓaketin bibete K'urdistanê,*
*4 Qeda dik'efte mala E'rebistanê.*

## DUA'YÊT ĈARESER KIRNA ÊŞ Û DERDAN:

## 15. DUA'YA KÊMA HEYVÊ[3988]

Demê heyv li e'zmana nû dibû gelek zarok bi nexweşîyê diketin, t'ayî dihatê u bijwangên wan dibûne cot, xelqê digot: "ser u binêt heyvêne," di wê baweriyêda bûn ji ber deketina heyva nû, nexweşî wan piçûka digirit, diçone cem sêxekî Melik Fexredîn, dest u e'nîya zarokî bi teniyê nîşan dikirin (ȓeş dikirin), yan diçone cem qewlzanekî ,"du´a kêma heyvê," li ser digotin:

*1 Li min û vî malî,*
*2 Şêx Fexrê Adiya p'ala xwe dabû stûna malî,*
*3 Wê bi vir çî qen filî,*
*4 Ji qelsîya jinê, ji xesîsîya mêrî,*
*5 Girara hêvarî,*
*6 Nedirê t'ifalî[3989],*
*7 T'ifal dê ȓabite nava malî.*

## 16. DUA'UA NEZERÊ

[3985] [8] (p. 21)
[3986] binêr: *mihr û meh*
[3987] binêr: *salix*
[3988] http://www.bahzani.net/services/forum/archive/index.php/t-56653.html
[3989] *tefal*

Heke zarokek derĥal nexos ba, li kêm daba,digotin cava ew piçuke wê girtî, deyk u babên wî(wê) dibirne cem qewlzanekî, yan mirovekî van du´a dizanit u du´a nezerê li ser digot u li gel du´ayê sê cara hîkek li dora serî digêȓan, yan jî risas di helandin:

**şaxê –1**[3990]

*1 Ya Cebar, ya Cebêr,*
*2 Ya p'îrî k'ar,*
*3 Ya xunk'arê*[3991] *ber u beĥr,*
*4 Ya xaliqê lêylû neĥr*[3992]*,*
*5 Ya Ȓebî, îsmek sit'ar*[3993]*!*

**şaxê — 2**[3994]

*1 Ya sitar, ya Cebarîn, ya Efan, ya Emîn,*
*2 Ya xunk'arê ber û beĥr,*
*3 Ya xaliqê lêylû neĥr*[3995]*,*
*4 Ya Ȓebî, îsmek sit'ar!*

## 17. DUA'YA DÛPIŞK Û MAR[3996]

*1 Êẍler*[3997] *— êẍler*[3998] *bî,*
*2 Carî nûrî çiqilî,*
*3 Di wirde û di kurd de, di xîveta*[3999] *Ȓesûl de,*
*4 Şêx Mendî Fexrane*[4000]*,*
*5 P'îrê Cerwane,*
*6 Heke dûpişke,*
*7 Heke mare,*
*8 Di serî de bike hefsare,*
*9 Berde çol û çolbeyaran,*
*10 Ĥeya em sibê bibin ĥişyare,*
*11 Û ȓoj li me bibe dîyare.*

## 18. DUA'YA XATÛNA FERXRA[4001]

*1 Ya Xatûna Fexra, bidî xatira navê Xwedê û şêx Adî!*
*2 Xatûna Fexra, tu werî hawar*[4002] *û gazîya me!*
*3 Ya Xatûna Fexra, heȓî hawara jinê bi ĥal!*
*4 Ya Xatûna Fexra, heȓî hawara jin, û zarok, û t'ifalan!*
*5 Ya Xatûna Fexra, derî li ber me vekî!*
*6 Ya Xatûna Fexra, tu me ji derê teng derxî!*
*7 Ya Xatûna Fexra, tu zarokêd me xweyîkî!*
*8 Ya sitî Xatûn, tu îmane me qayîmkî!*

3990 [2] (p 997); http://www.ezdixandi.com/forum/38-952-1
3991 *xundk'ar*
3992 *lêl û nehr*
3993 Ido Babe Sêx - *Zarok di civata me da* - govara rosenbîrî nwê, jimare 123, 1989
3994 *Dengên Êzîdîyan* 6-7 1997 (r. 29)
3995 *leyil u nehar*
3996 *Dengê Êzdiyan* 6-7, 1997 (p. 29)
3997 *aẍler*
3998 *axle*
3999 *xîbet*
4000 *Feqran*
4001 Ji zîyarete silt'an Êzîd bajare Tilbîsê
4002 *hewar*

*9 Me xwe avêtîye ber te, tu dua’yêd me qebûl kî!*

## 19. DUA’YA STÊRA DEMBILQAP’ÎYÊ[4003]

**zimanê e’rebî**:
**S. 1** *1 Bi navê Xwedê ĥezin u dilovan, bi navê Xwedê ĥezin u dilovan,*
*bi navê Xwedê ĥezin û dilovan, navê Xwedê E’rşa, bi navê Xwedê e’zmana!*
*2 “Bismîllaĥ al-sema e, bisim al-zîĥit al-E’rş û al-K’irsî”,“Ĥete E’rş li sema, sewa li kayînat”,*
*3 “Îsmînî, îsmînî Ellaĥ îyu a’qe semĥîrat”,*
*4 “Demiĥîrat silt’an el-edîd, k’amil el-atqat”.*
*5 “Selîmun, beslîtun, Sexrî cin, Nûrî cin, Mehdî cin, Kewkebî cin, R̂eşîdî cin, Miradî cin,*
*Cin cin”,*
*6 “Mizîlit bêt el-bêt, edîlit nisret el-ên”,*
*7 “Şerab el-xitme, aswed al-ên”.*

**S. 2** *1 Ya stêra Dembilqap’î selamûn e’lêk’, ya stêra Dembilqap’î selamûn e’lêk’,*
*ya stêra Dembilqap’î selamûn e’lêk’, ya stêra Dembilqap’î selamûn e’lêk’,*
*2 Ya stêra Dembilqap’î, seĥî tu stêra Dembilqap’î,*
*4 Dergehê e’rdî, e’zmanî,*
*5 Qatî stûna e’rdî e’zmanî.*

**S. 3** *1 Qatî her ĥeft dergehêt qudretê keyî,*
*2 Herçar k’ilîlêt me’rîfetê keyî,*
*3 Me bi xwedan bikeyî,*
*4 Ji harî, ji marî, ji tarî, ji dupişkî, ji dizî, ji destê hara, ji ẍafila xwedan bikeyî,*
*5 Ji kur̂ê buxtan, ji ĥeftî û du milet, ji hîjdeh[4004] ĥezar xulyaqet.*

**S. 4** *1 Şems û Qemer,*
*2 Dawidî bin Derman, p’îr T’ericman, şêx Hevr̂uz[4005] û serdarî dizan, bi ĥimeta Xwedê Ekber,*
*xeta Silêman p’êẍember,*
*3 Herçar kenara bit, ĥeta r̂oj bête der.*

*T’emametiya vê dua’yê li p’îrî Cerwan û Şêx Alê Şemsan, li şêx Adî û mêran!*

## DUA’YÊT BAWERÎYÊ Û PESNANDINÊ OCAXA:

## 20. DUA’YA MEZIN[4006; 4007]

**S. 1** *1 Ya şêx Şems, tû bideye xatira Ĥesenî zerbaba,*
*2 Def û şibaba,*
*3 Û Mekke, û Medîn, û K’aba,*
*4 Êzdînê mîr babê baba,*
*5 Mezinê çendî siĥaba.*

> **S. 1** *1 Ya R̂ebî, tu bidî xatirê Ĥesen zerbaba[4008],*
> *2 Def û şibaba,*
> *3 Quds, Mekke, Medîne û K’aba[4009],*
> *4 Êzdîne mîr bavê bava,*

[4003] [2] (rr. 998-1000)
[4004] *hijde*
[4005] binêr: *Ebrus*
[4006] http://www.ezdixandi.com/forum/38-837-1; http://www.lalish.de/modules.php?name=News&file=article&sid=205
[4007] Bedel feqîr Ĥecî http://www.bahzani.net/kurdi/show.php?aid=1482
[4008] *k’eremet*
[4009] *K’e’ba*

*5 Mezinê çendî siĥaba.*

**S. 2** *1 Ya şêx Şems, tû bidî xatira duȓa Sipîye,*
*2 P'adşayê Bêrîye,*
*3 Suȓa ĥeq ya silt'an Êzîye.*

**S. 3** *1 Ya Ȓebî, tu bidî xatirê duȓa Sipîye,*
*2 P'adşe Bêrîye,*
*3 Nefesa ĥeq, suȓa silt'an Êzdîye,*

**S. 3** *1 Ya şêx Şems, tû bideye xatira melik şêx Sine*[4010] *û xêrêt sefîla,*
*2 Şêrpik, û ĉira, û p'erî, û qendîle,*
*3 Tû bi xatira dergeh û dîwanêt silt'an şêx Adî kî.*

**S. 3** *4 Melik Şerfedîn, xêr û sebîl, şerpik û ĉiraye,*
*5 P'erî qendîl dergehê dîwan silt'an şêx Adî kî.*

**S. 4** *1 Ya şêx Şems, tû bideye xatira her ĥeft melekêt K'ibîr,*
*2 Azraîl, Cebraîl, Derdaîl, Şemnaîl, Mîkaîl, Ezazîl û Ezrafîl,*
*3 Ewin her ĥeft melikêt K'ibîr ji berî xasa û çendî bedîl,*
*4 Wê di destê wande mifte û k'ilîl,*
*5 Ew di ȓawestayîne li ĥezreta Melikê Celîl.*

**S. 5** *Ya şêx Şems, tu bideye xatira melikêt ber Ȓojê, çawîşê şêx Şems, Berces melek, miştерî, midîyan, Ese'd, Qadî Bilban, Ĥecam, Amadînê Şemsa, Mendê Şerîf û Mendê Tokil kî.*

**S. 2** *Ya Ȓebî, tu bidî xatirê melekê ber Ȓojê, çawîşê şêx Şems, Bercis Adêl, Marîn, Ese'd, Malik il Miştерî, Amadînê Şemsa, Qadî Bilban, Ĥicm û Mendûm, Mendê Şerîf, Mendê Tûkil kî.*

**S. 6** *1 Ya şêx Şems, tu bideye xatira ixtîyarê*[4011] *mixfî*[4012]*,*
*2 Suȓ li ser p'ira Selatê,*
*3 Ĥadir, Qadir, Nadir û Cencerê Cabir,*
*4 Cabirê Ȓefeîl k'erim, qesra cehwerî binyat, melekê fênîyê,*
*5 Qubet il-Bîdor il-Alîyî, bi qedrê Umranê Hindî kî.*

**S. 4** *1 Ya Ȓebî, tu bidî xatirê ixtîyarê mixfî,*
*2 Suȓa li pê p'ira Seratê,*
*3 Hadêr, Nadêr, Qadêr, Cencerî Cebrîn,*
*4 Qubit xilûrî Alî tu bi Umranê Hindî kî.*

**S. 7** *Ya şêx Şems, tû bideye xatira mezin meydana meleka, li ser holê sekinî derwêş Qat'an[î], serdarê hestî siwarê malêt Adîyan, p'îrê Libna, nefesa Êzîd, şex Mend, Nasirdîn û Sicadîn, sitîya Êş, p'îr Afat, Xatûna Fexra, Ȓebiya E'debiya, Zimzim, qubet il-Bidor, bi qedrê Êzdîne mîr kî.*

**S. 5** *Ya Ȓebî, tu bidî xatirê mezin meydana meleka, ser holê sekiniye derwêşê Qat'anî, serdarê heştê ĥezar siwarê mala Adiya, p'îrê Libna, p'îr Afat, Ȓebiya E'debî, sitîya Ês, maka şêx Adî, Xatûna Fexra, şêx Fexrê Adiya, şêx Mend, Nasirdîn, Sicadîn, k'afê û Zimzimê*[4013]*, qubet il-Bidor*[4014]*, Êzdîne mir kî.*

**S. 8** *Ya şêx Şems, tû bideye xatira kaniya Sipî, Seyîd il-Kewin, Hewid il-Kewdel, buk'rêt buk'ir, t'obedarêt qedîm, berê şêx Ehmed, şêx Şelal, p'îr Bûb, p'îr Mendê goȓ, delîlê beĥra, Zincil, Weȓaq, Mise'l, Mistêrî, suȓa Tawisî melek', tû bideye xatira her ĥeft kuȓêt pîrê li derê mîr Amadîn kî.*

**S. 6** *Ya Ȓebî, tu bidî xatirê kaniya Sipîî, Seyêd il-Kewdel, ĥewd il-Kewdel, Kekê şêx, şehîd Ellaĥ, p'îr Bab, p'îr Mendî goȓî, delîlî beĥrî, Zencerî Weȓeq, Mişe'l, suȓa Tawisî melek', her ĥeft kuȓê pîrê, sûka me'rîfetê, pênc ferzên ĥeqîqetê, dîwana aẍê qelendera, dergeha mîr, li mîr Amadîn kî.*

---

[4010] *Şêxsin*
[4011] binêr: *extîyar*
[4012] *muxfî*
[4013] *Zemzem*
[4014] *qublit il bidûr*

**S. 9** *Ya şêx Şems, tu bideye xatira p'îrî Gos, p'îrî K'emal, p'îrî Mecirmafa, R̂eşê Gareyî, Guharzer û Zerguhar, Şeswar, Seyîd il-Bedew, dara qewala, sitîya Êş, maka şêx Adî, qap'îya R̂eş, qap'îya miraza, miraza xwedan miraza, miraza e'rd û e'zman biçite ber wê qap'îyê kî.*

**S. 8** *Ya R̂ebî, tu bidî xatirê p'îrî Kûza, p'îrî K'emal, p'îrî T'erciman, şahê siwara, Seyêd il-Bek'ir, Guharzer, Zerguhar, dara qewala, darê qelendera, sitîya Ês, maka şêx Adî, qap'iyê R̂eş, qap'iyê miraza kî.*

**S. 7** *Ya R̂ebî, tu bidî xatirê Hidrîsî[4015] Xeyat, banî E'rşe, Bilalî Hebeş, şêx Mihemedî Harûnî, R̂eşê Gor̂ayî, melek Zeyîn[4016], melik Fexredîn, çil mêrî li ber sicûdê[4017] kî.*

**S. 9** *Ya R̂ebî, em mirazê xwe ji te dixwazin dîn, û îman, û k'emale!*

*T'emam Xwedê û silt'an şêx Adî!*

## 21. DUA'YA ÎMANÊ[4018]

**S. 1** *1 Îman bi çi nîşane?*
*2 Berî ne e'rd hebû, ne e'zmane,*
*3 Ne beĥr hebû, ne binyane,*
*6 Ne ĉiya hebû, ne sikane,*
*7 Îman hebû t'erîqete,*
*8 Ewê r̂ojê kaniya Sipî kir qublete.*

**S. 2** *1 Kaniya Sipîî ji berî e'rd û e'zmane,*
*2 Ji berî beĥr[4019] û binyane,*
*3 Ji berî ĉiya û sikane,*
*4 Da medha jê bideyn bi nîşane.*

**S. 3** *1 Em çendî medha jê dene,*
*2 Ji berî Lewĥ[4020] û Qeleme,*
*3 Ji berî ĥeftî û du Ademe,*
*4 Ya Êzî, ji berî notû ĥezar[4021] salî ez li ba teme!*

**S. 4** *1 Berî notû ĥezar salî ez li wê bûm,*
*2 Ne ji bab bûm, ne ji dê bûm,*
*3 Ez li ber k'erema mewlê bûm.*

**S. 5** *1 Ez birime ber k'erema wî mewlayî,*
*2 Ez dame destê wî hostayî,*
*3 Ji me r̂a kirbû xweşî û şayî.*

**S. 6** *1 Yê xweşî û şayî ji me r̂a kirî,*
*2 Ez birime ser t'erîqa melikê Faxirî,*
*3 Min nezanî tu Xidir bin Xidirî.*

**S. 7** *1 Xidiro, bin Xidir,*
*2 Te k'asek da me buk'ir,*
*3 Me vexwar bi navû dik'ir.*

**S. 8** *1 Te k'as ji me r̂a anî,*

---

4015 *Idrîs*
4016 *melik Zîn*
4017 *secad*
4018 [2] (rr. 1013-1015)
4019 *e'rd*
4020 *loh*
4021 *not û ĥezar*

2 *Me vexwar wek tu zanî,*
3 *Lew te ez birime ser ilmê Qat'anî.*

**S. 9** 1 *Ji Qat'anî we dibême,*
2 *Bi me'rîfet û erk'anê çême,*
3 *Da medhê e'zîz*[4022] *melik Fexredîn bême.*

**S. 10** 1 *Da bideyn medhê e'zîz melik Fexredîne,*
2 *K'engê ji me r̂a têtin mizgîne,*
3 *Wê r̂ojê, wê derkevin xîvetên t'ereb zêr̂îne.*

**S. 11** 1 *Îman weke ĉave,*
2 *Heke mûwek k'ete nave,*
3 *Xweyî ji ber ĥeyrî, tengave.*

**S. 12** 1 *Heke k'etiyê mûwekî*[4023] *bi t'inê,*
2 *Xweyî nasekinê li ber sotinê.*

**S. 13** 1 *Me îman naskir,*
2 *Hincîyê bi xofê ĥelal xwe*[4024] *derbazkir,*
3 *Ewan xwe bi wê xofê ji dojêh, ji destê zebêniya xilaskir.*

**S. 14** 1 *Hincîyê bawerî bi îmanê anî,*
2 *Îman beĥre, jê diçin co û kanî,*
3 *Mamina şehde û baweriya xwe bi navê Tawisî melek' anî.*

**S. 15** 1 *Tawisî melek' bi wê îmanê gehişte ber K'ursîyê,*
2 *Mamin ber bendin li hîvîyê,*
3 *Tu bîniya pêşîya*[4025] *me xofê ĥeqîyê.*

**S. 16** 1 *Lib[a]sê îmanê sipîye,*
2 *Nazike, let'îfe, yî qewîye,*
3 *Me hingêvnê gelî êzdiya, ew zu xeyîrîye.*

**S. 17** 1 *R̂êya îmanê fere,*
2 *Ji berî nebîya u çiqas p'êẍembera,*
3 *Îman bi ser hêvênê sinetê danin, me bi navê Tawisî melek' behwere*[4026].

**S. 18** 1 *Îman bi e'melê sipîye,*
2 *Ji berî e'rd, e'zman, û zevîye,*
3 *Bû mehder li ser êzdiya.*

**S. 19** 1 *Me îman nasîye,*
2 *Tawisî melek' li ser pişta Gay û Masîye,*
3 *T'acê wî li ber K'ursîya Melikê Bêrîye*[4027].

**S. 20** 1 *Tawisî melek' bi xwe îman ji hêvênê sinetê qebûl kir,*
2 *T'oq*[4028], *û erk'an, û xelat lêkir,*
3 *Cinet ji wan û be jêr kir.*

**S. 21** 1 *Şêx Şems bû mefer,*
2 *Melik şêx Sin bû sifaet,*
3 *Şêxû Bek'ir bû mewla,*

---

[4022] *eziz*
[4023] *mûek*
[4024] *xo*
[4025] *pêsiya*
[4026] binêr: *bawer*
[4027] *Melikê Berî*
[4028] *tok*

*4 Melik Fexredîn bû r̂êber,*
*5 Melik Sicadîn bû qasid,*
*6 Êzî bû atqat.*

**S. 22** *1 R̂êya îmanê jê r̂a bi xêr û berk' kir,*
*2 Hûn r̂êya îmanê bi ser nedin,*
*3 Cehwera bi der nedin,*
*4 Da hûn dîwana xasa bi ser nedin.*

**S. 23** *1 Ew bû dua'[ya] hêvênê sinetê,*
*2 Tawisî melek' wê ser berê se'edetê,*
*3 Ji me dixwezê xilmetê, r̂astîye, ibadetê*[4029].

**S. 24** *1 Me îman bi Tawisî melek' tê,*
*2 Îman bi wê xilmet û ibadetê,*
*3 Ĥeta r̂oja qiyametê.*

## 22. DUA'YA XWEDANÊ MALÊ[4030]

**S. 1** *1 Ya Xwedê*[4031]*, xwedanê malê tu li me bikî serdanê,*
*2 Em ji te dixwezin t'ifaqê, û me'rîfetê, û îmanê,*
*3 Me hîvî ji te heye, tu hîvîya me û êzdiya bikî li dîwanê!*

**S. 2** *1 Em r̂awestan li ber xwedanê male,*
*2 Tu li dilê me bikî sîqalê,*
*3 Tu li pêşîya me hilînî k'erbê û k'înê,*
*4 Bidî pêşîya me xofê, û sebirê, û erk'anê!*
*5 Tuyî xwedanê sebirê û sikanê!*

**S. 3** *1 Xwedanê malê ji male dixwezê medeha,*
*2 Em r̂awestan li ber çardeh dergeha,*
*3 Emê miraza xwe bixwazin ji xwedanê wan qubeha!*

**S. 4** *1 Xwedanê malê, xwedanê quba nûrîne!*
*2 K'ursîya wî ser banê E'rşê E'zmîne,*
*3 Li ber diîsîyêt şemalê nûrîne,*
*4 Me hîvî ji te heye, tu hîvîya me bike li ba [R̂eb il-A'lemîne],*
*5 Em dîm ji te û wan sur̂ û k'erema bi hîvîne,*
*6 Tu e'melê baş*[4032] *bidî me, k'arê xirab ji pêşîya me hilîne.*

**S. 5** *1 Ewan gunehk'ara, xwedanê malê nas nekirin,*
*2 Xwe ji r̂êya Xwedê dûr kirin,*
*3 Derê qeda û bela li xwe vekirin,*
*4 Zebênîya r̂oja axretê, ew li gelîyê waweyê werkirin.*

**S. 6** *1 Ew xwedanê malê xof û r̂ehim li dilî kirin,*
*2 Me hîvî ji xwedanê malê heye, mom û ĉira li ber vekirin,*
*3 Em ji donzde[h] ĥezar bela dûr kirin.*

**S. 7** *1 Ya xwedanê malê ji cineta mîre,*
*2 Lê êwirîn coqetêt feqîre,*
*3 R̂êya me bi hosta, şêx û p'îre.*

---

[4029] *ebadet*
[4030] [2] (rr. 1016-1018); http://www.bahzani.net/kurdi/show.php?aid=428
[4031] *Xudê*
[4032] *bas*

**S. 8** *1 Xwedanê malê navek jê Melikê Bêrîye,*
*2 Hincê r̂êya ĥeqîyê nasîye,*
*3 Ewê bibê serwerê mala Adîya.*

**S. 9** *1 Eve bû dua' xwedanê male,*
*2 Mala ĥeqîyê dîm em berdin hîvîyê,*
*3 Em dilxweşin bi wê xweşî û şayê*[4033].

**S. 10** *1 Xwedanê malê xweyîtî*[4034] *li me kir,*
*2 Meleka dilê aşiq û momina xweş kir,*
*3 Dilê xirab û beygoya t'erîq kir.*

**S. 11** *1 Xwedanê malê, xwedanê cara,*
*2 Hincîyê bi t'erîqetê dijmine,*
*3 R̂oja axretê bare wî ĥesine, cizayê wî sotine.*

**S. 12** *1 Hincîyê li xwedanê malê ne yî guhdare,*
*2 Yê wan li axretê bavêjin dojêh, devê mara,*
*3 Ew be şêx û p'îr, hosta û merebî, birayê axretê, bê extîyare*[4035],
*4 R̂oja ĥesabê, bê cîya, bê ware.*

**S. 13** *1 Me bi xwedanê malê behwere*[4036],
*2 Ji me r̂a sekinin li merdere,*
*3 Melik wê li ser menbere,*
*4 Xwedanê malê ji me r̂a anî t'oqa* [4037] *zere,*
*5 Ya xwedanê male, tu ji dilê me hilîne kul û k'esere,*
*6 Tu li me bibî hevere.*

## 23. DUA'YA TAWISÎ MELEK'[4038]

Ev dua' ji wan dua'yêt p'îr̂ giringe, li gelek cî u dema dihête gotin. Ne gereke em bêjin TawIsî melek' k'îye u r̂ola wî di dîn û baweriya Êzidîyan da çîye; çunke dua' bi xwe, persiva vê pirsiyarê dide û ciyê bilindê Tawsî Melek de xweyakirinê. Carna dibêjin: dua' Tawsî Melek, carna jî qewlê Tawsî melek', dîyare gotina dua' bitir li gel naverokî di guncê:

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, a'la*[4039] *şanek, a'la mek'anek, a'la silt'anek.*
*2 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 2** *1 Ya R̂ebî, tu Melikê*[40405] *canî,*
*2 Tu Melikê melkê K'erîmî,*
*3 Tu ji enzel da yî Qedîmî,*
*4 Ĥeta-ĥetayê tu kama r̂uĥayî.*
*5 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu Melikê cin û insî, E'rş û K'ursîy,*
*2 Semedî, Lutf*[4041] *û Lemayî, Ĥey, il-Mecîdî,*
*3 Vaĥid*[4042] *il-Ferd, il-Ĥemîdî.*

[4033] *şahîyê*
[4034] *xoyîtî*
[4035] *axtîyar*
[4036] binêr: *bawer*
[4037] *tok*
[4038] [2] (rr. 990-992)
[4039] *ela*
[4040] *melek*
[4041] *lift*
[4042] *waĥid*

*4 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, tu Xwedawendê seferî,*
*2 Tu Xwedawendê Meh û Mehrî*[4043]*,*
*3 Tu Xwedawendê çendî omerî,*
*4 Tu Xwedawendê etayî.*
*5 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 5** *1 Ya R̂ebî, ji nava tuyî bilindî,*
*2 Te nav çende, tuyî çendî!*
*3 Tu miza zendê du*[4044] *p'ayî!*
*4 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, tu k'eremdayê ĥutî,*
*2 Tu mendayê qutî,*
*3 Tu alîmê ilmayî.*
*4 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, tu Xwedan malî, Xwedan p'erde,*
*2 Ciyê te li ĥemû e'rde!*
*3 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, te ne lewme*[4045]*, te ne r̂enge,*
*2 Te ne awaze, te ne denge,*
*3 Te ne, endame*[4046]*, te ne denge,*
*4 Ya R̂ebî, kes nizanit tuyî çawanî?!*

**S. 9** *1 Ya R̂ebî, tu vilayîyê*[4047] *nimêĵî,*
*2 Tu mal û milka dip'erêsî*[4048]
*3 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 10** *1 Ya R̂ebî, tu Ĥakimê şah û gedayî,*
*2 Tu Ĥakimê cimletî a'lem*[4049]*,*
*3 Te t'obe kirbû li Adem,*
*4 R̂êbû Îsa bin Miriyem.*
*5 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 11** *1 Ya R̂ebî, tu R̂eĥmî, tu K'eremî,*
*2 Tu Emînî, tu Semedî, em çu*[4050] *nînin.*
*3 Ya R̂ebî, tu Xwedayî!*

**S. 12** *1 Ya R̂ebî, êk nema li t'ayî,*
*2 Ya R̂ebî, ez k'etîme, t'awîme,*
*3 Tu dermanî, tu ĥekîmî,*
*4 Tu Ĥakimî, em di ẍerîbîn.*
*5 Ya R̂ebî, tu dizanî derd û dermanê me li k'o dibî.*

**S. 13** *1 Ya R̂ebî, tu insê*[4051] *xirbayî*[4052]*,*
*2 Sûc, û gune[h], û mişurî*[4053]*.*

---

[4043] *mer*
[4044] *dû*
[4045] *lone*
[4046] *îndam*
[4047] *welîyê*
[4048] *diberêzî*
[4049] *alim*
[4050] binêr: *t'u*
[4051] *uns*
[4052] *xurba*
[4053] *mişut*

**S. 14** *1 Me nas kirin, me kirin teĥiyat û goşe,*
*2 Ya R̂ebî, her tu me bibexşe!*
*3 Ya R̂ebî, tu Heyî, tu Heyî, tu Heyî.*

## 24. DUA'YA T'EMEDÎYA ŞÊX ADÎ[4054]

*1 Babîlko tu r̂eve r̂emanî!*
*2 Dîwan ger̂iya qeynt'ere,*
*3 Şêx Adî zane, k'î li pêşe, k'î li bere,*
*4 Bînatara vî qewlî girêda E'yn il-Beyzayê,*
*5 Yarû birê axretê hûn r̂evne simayê,*
*6 K'ereme xwedanê kerermê.*
*7 Gêşê gelîyê Lalişê,*
*8 Gulbanîke r̂emetê, yeka axretê*
*9 R̂eĥme li dê û bavê hadêr-gu[h]dêra,*
*10 Mirîd- momîna,*
*11 P'îr — hostayê, me jî pêra,*
*12 Mal mezelê em têda,*
*13 R̂eĥme li r̂uĥê[4055] seyîdayê mive!*

## 25. DUA' EZÎ ÊZDÎME

*1 Ezî Êzdîme,*
*2 Mirîdê şêxê Adîme[4056],*
*3 Bi şêx, û p'îr, û merebîme,*
*4 Min berê xwe da ser şivekê,*
*5 Ji bo xotirê navê Êzîdû makê.*
*6 Min got: «Ezî Êzdîme,*
*7 Kiras û derpê min sipîne.*
*8 Şêx Adî nûre,*
*9 Melik şêx Sin û melik Fexredîn ẍefure,*
*10 Navê Tewisî melek' me qebûle,*
*11 Şikir ezî Êzdîme!»*

## 26. DUA'YA ÊZDÎYATÎYÊ[4057]

*Ewe mehder̂a êzdîya:*
**S. 1** *1 Ya Xwedê[4058] r̂oja te e'sas danî û çêkir,*
*2 Te ĥed û sed, her pênc ferzêd ĥeqîqetê ji me r̂a vir̂êkir,*
*3 Êzîyê Sor navê xwe lêkir.*

**S. 2** *1 R̂oja sur̂a sinetê kirin dîyare,*
*2 Nûra meleka hate xware,*
*3 Ew ji me r̂a kirin dîyare,*
*4 Her yek li ser k'oka xwe girtibû ware.*

---

[4054] [6] (стр 23)
[4055] *goha*
[4056] *şêx E'dî*
[4057] [2] (rr. 1001-1003)
[4058] *Xudê*

**S. 3** *1 Hêvênê sinetê[4059] sipîye,*
*2 Suȓa wê ji ber damana Êzîye,*
*3 Ya Êzîyê Sor, tu li me u vî dinî bikî xweyîye[4060],*
*4 Tu me xilas bikî ji nexweşîye[4061].*

**S. 4** *1 Êzdiyatî miraze,*
*2 Êzî k'arê ȓast ji me dixweze,*
*3 Jêk k'ivş bibin pisêt baza.*

**S. 5** *1 Êzî li xewleye,*
*2 Ew miĥbê k'asa xweye,*
*3 Ew bi kesî ne yî ĥewceye,*
*4 Ew minetk'are ji mêrê bi e'deb, erk'an, bi ĥeya.*

**S. 6** *1 Êzî li xewle bû,*
*2 Ew bi kesî ne yî ĥewce bû,*
*3 Ew miĥbê k'asa xwe bû.*

**S. 7** *1 Êzdîyatî şefa'ete[4062],*
*2 Kaniya Sipî kir qublete,*
*3 Kir qubleta dine û axrete.*

**S. 8** *1 Sinet more,*
*2 P'adşayî Lalişek ava kirbû li jore,*
*3 Ȓêya Êzdîya bi ĥêyf û core.*

**S. 9** *1 Suȓa sinetê hebû,*
*2 Bi P'adşayî ȓa xewle bû,*
*3 Ji berî çendî dem bû.*

**S. 10** *1 Ew suȓ li veĥdenîyê[4063] çêkir,*
*2 Meleka nobet[4064] lêkir,*
*3 Ȓoja îda ĥeciya ji me ȓa viȓêkir.*

**S. 11** *1 Tawisî melek' bû îman,*
*2 Melik Şerfedîn bû dîn,*
*3 Melik Adî bû ol,*
*4 Melik Êzî bû atqat[4065],*
*5 Melik Şemsedîn bû mefer,*
*6 Melik şêx Sin bû şefa'et,*
*7 Şêxû Bek'ir bû mewla,*
*8 Melik Fexredîn bû ȓêber,*
*9 Ewê ȓojê, ji me ȓa danîn ĥed u sed.*

**S. 12** *1 Êzdî ȓawestan bi dua'yê,*
*2 Suȓa Êzî gehayê,*
*3 Hincîyê safî Êzdî bê, agirê dojehê ne gehayê.*

**S. 13** *1 Êzdî bi e'melê çak gehiştin benda îmanê[4066],*
*2 Meleke ȓawestan li dîwanê,*
*3 Şêxû Bek'ir li ser berê sikanê,*
*4 Şêx Şems ji êzdîyara ĉiraye li dîwanê,*

---

[4059] *sunet*
[4060] *xoyî*
[4061] *nexoşî*
[4062] *şifa'et*
[4063] *weĥdanîyê*
[4064] *nubet*
[4065] *atqad*
[4066] *êman*

*5 Ya Êzî tu li me bikî xwedanê.*

**S. 14** *1 Heçî êzdîyê e'mel saf bin,*
*2 Hûnê ji axretê hîvî bin,*
*3 Hûnê li dîwana Êzî bi xweşî û şahî*[4067] *bin,*
*4 Hûnê li axretê bi xweyî bin.*

**S. 15** *1 Axret mala Ĥeqe,*
*2 Melek r̂awestan li çardeh t'ebeqe,*
*3 Ji êzdiya r̂a dahir kir girîwanê Ĥeqe.*

**S. 16** *1 Ji êzdiya r̂a anîn ilmê batinê,*
*2 P'adşa êkî bi t'inê,*
*3 Hincî êzdîyê ne yî safî bê,*
*4 Derê dojêh ji wan r̂a vekirî bê.*

**S. 17** *1 Bêjim we gelî sinetê,*
*2 Hûn desta bernedin ji t'erîqetê,*
*3 Da melik şêx Sin li we bikit şefa'etê.*

**S. 18** *1 Ew bû dua' mehderaÊzîye,*
*2 Tawisî melek' da destê şê[x] Fexrê Adiye,*
*3 Ya Êzî, me bi te hîvîye,*
*4 Tu me xilas bikî ji tengiya, ji teliye.*

## 27. DUA'YA SI'ÛRA[4068]

*E'ynata dînê Êzdî te li me kiriye ferz, em sê r̂o r̂ojî li bo te bigrin.*

## 28. DUA'YA ŞÊXÎTÎYÊ[4069]

**S. 1** *1 Xwedê*[4070] *şêxîtî dahir kir,*
*2 Dunzde ĥezar qewl û qesîde, dua' û diroze pê r̂a vir̂êkir,*
*3 Êzîyê Sor t'ancê milukê li berk' kir*[4071]*,*
*4 Ji ew paş, êzdiya li pê sefer kir.*

**S. 2** *1 Êzî bi şêxatîyê xwe naskir,*
*2 Her pênç ferz li xwe fer kir,*
*3 R̂êya axretê bi mal û ser kir.*

**S. 3** *1 R̂êya şêxatîyê, r̂êya axretê,*
*2 Danîn not û neh erk'anê ĥeqîqetê,*
*3 Em li ber dikin xilmetê û ibadetê*[4072]*,*
*4 Îro dinyaye, sibe bangê axretê,*
*5 Ya Xwedê, tu li me bikî şefa'etê.*

**S. 4** *1 Şehîd p'êẍember bi şêxatîyê bû heste,*
*2 Ewî ne p'ê hebû, ne deste,*

[4067] binêr: *şayî*
[4068] [7] (r. 152)
[4069] [2] (rr. 1004-1006)
[4070] *Xwidê*
[4071] *ber kir*
[4072] *ebadet*

*3 Êzîyê Sor r̂onehî li ber wî dixiste,*
*4 Ewî miraza xwe ji Xwedê dixweste.*

**S. 5** *1 Şêxîtî fere,*
*2 Ji berî nebîya, ji berî p'êẍembera,*
*3 Ji şêxatîyê hatibû not û neh erk'anê ĥeqîqetê,*
*4 Bi nûra k'esk, û sor, û sipî, û zerê,*
*5 Ya Xwedê, tu li me bikî mefere.*

**S. 6** *1 Şêxîtî not û neh erk'ane e'wil ibadet zimane,*
*2 Nasbûnî ser xitmê wane,*
*3 Ya me sadiqe û îmane,*
*4 Li bangiya me bê melekê R̂eĥmane.*

**S. 7** *1 Şêxîtî miraze,*
*2 Xwedê r̂êya ĥeqîyê ji me r̂a dixwaze,*
*3 Ya Xwedê, tu miraza me bikî li berberê miraze.*

**S. 8** *1 Şêxîtî ferzek ji yêt îmanê,*
*2 Meleke meclis girtbû li dîwanê,*
*3 Ya Xwedê, tu me bigehînî wê ĥizurê, wê erk'anê.*

**S. 9** *1 Şêxîtî ferzek ji yêt dîne,*
*2 Hincîyê r̂êya şêxîtîyê girt bi yeqîne*[4073]*,*
*3 Şêxîtî bi mêr û muĥbet şêrîne,*
*4 Ya Êzî, tu hîvîya me bikî ji dîwana R̂eb il-A'lemîne.*

**S. 10** *1 Şêxîtî more,*
*2 Hatibû ji xizîna jore,*
*3 Sur̂a şêxîtîyê ji kaniya qubet il-Bidore,*
*4 Ya Xwedê, tu li me şîyarkî nave Êzdîyê Sore.*

**S. 11** *1 Şêx Adî* [4074]*, melik şêx Sin bi şêxîtî qebiland,*
*2 E'rş û K'ursîy jê r̂a xemiland,*
*3 Horiya ji wan r̂a li e'zmana hilhiland.*

**S. 12** *1 Şêx Adî, melik şêx Sin bi şêxîtî qebûl kir,*
*2 Dergehê e'zmana vekir,*
*3 Bi nûrê Tea'la kir*[4075]*.*

**S. 13** *1 Şêx Adî dindara xwe dîyar kir,*
*2 Şêx Adî nave xwe yê şêrîn lê kir,*
*3 Dar û bera sicûde pê kir.*

**S. 14** *1 Sur̂a şêx Adî hate e'rde,*
*2 Li nav şêxatîyê danî ĥed û sede,*
*3 Navû dik'irê wî t'ijîye ji e'zmana k'ete bi e'rde,*
*4 Ya şêx Adî, tu jipêşîya me hilînî kul û derde.*

**S. 15** *1 Şêxîtî miraze,*
*2 Hincîyê bi şêxîtîyê dilxwaze,*
*3 Ewê li axretê bigehit dîwana baza,*
*4 Xwedê dê hasil bikê miraza çendî mirazxwaza.*

**S. 16** *1 Ev bû dua' şêxîtîyê,*
*2 Ji Xwedê dixwezîn hîvîyê,*

[4073] *êqîn*
[4074] *Şêxadî*
[4075] *tee'md kir*

*3 Tim miraza me bikî li ber K'ursîyê.*

## 29. DUA'YA P'ÎRANÎYÊ[4076]

**S. 1** *1 P'adşa'yî p'îranî nazil kir,*
*2 Lib[a]sê r̂astîyê li berk'kir[4077],*
*3 P'îra li pê sefer kir.*

**S. 2** *1 P'îranî bi nave Ĥesin[4078] Maman çêkir,*
*2 Fitir û zek'at pêra vir̂êkir,*
*3 P'îranî ji şêxotîyê cihêkir.*

**S. 3** *1 K'arê xirab t'erk kirin,*
*2 R̂êya p'îranîyê berbi xêrê kir,*
*3 P'adşayî dua' p'îranîyê nazil kir.*

**S. 4** *1 P'îranî bi Ĥesin Maman[4079] di bo yeqîne[4080],*
*2 Hincîyê xwe ji gûneha vek'işîne,*
*3 Axret r̂aste, ev dinya fênîyeke derewîna.*

**S. 5** *1 P'îranî şêrîne,*
*2 Li ĥeqîyê dibîne,*
*3 Ewê xwe bi dîwana Ĥesin Maman bigehîne.*

**S. 6** *1 P'îranî hate e'rda,*
*2 Ji her pênc ferza, êk jê serda,*
*3 Ew mirazek ser dilê bi derde.*

**S. 7** *1 P'îranî ferzek ji yêt ĥeqîqetê,*
*2 Melik sekinîn li se'edetê,*
*3 Momin r̂awestan li ibadetê[4081],*
*4 Em sayîne li vê xilmetê.*

**S. 8** *1 Şêx ji dur̂êne,*
*2 P'îr ji sur̂êne,*
*3 Fexir candarêt mewlêne,*
*4 Mirîd li r̂êne.*

**S. 9** *1 Mirîd bi danê,*
*2 P'îr bi erk'anê,*
*3 Şêx xunk'arin[4082] li dîwanê,*
*4 Ewe ciyê dîn û îmanê.*

**S. 10** *1 Dîn û îmanêt me ji wê ye,*
*2 Yeqîna[4083] me ji wê ĥewdê ye,*
*3 Lewĥ il-meĥfuz nave Xwedê ye,*
*4 Ya Ĥesin Maman, tu me bigehîne wê xêrê ye.*

**S. 11** *1 P'îranî sur̂e,*

[4076] [2] (rr. 1007-1009)
[4077] *ber kir*
[4078] *Hasin*
[4079] *Hesilmeman*
[4080] *yêqin*
[4081] *ebadet*
[4082] *xwendk'ar*
[4083] *êqîn*

*2 Hûn bi tirsbin ji ĥemû dila,*
*3 Da hûn li axretê bibin xwedanê mezele.*

**S. 12** *1 Da hûn li axretê çêbin,*
*2 Bi xêr, xweşî[4084], şahî, da t'ebayî xelqê geyî bin,*
*3 Da hun ji dîwana Ĥesin Maman bi hîvîbin.*

**S. 13** *1 P'îranî xelate,*
*2 Suȓa p'îranîyê ji e'zmana hate,*
*3 Da destê wan maş, û xelat, û berat'e.*

**S. 14** *1 Ȓêya p'îranîyê not û neh erk'ane,*
*2 Ji not û neha, sê xweyane[4085],*
*3 Yek ȓastîye, yek ĥeya, yek îmane.*

**S. 15** *1 Ĥesin Maman, me ji te hîvîye,*
*2 Tu hîvîya me bikî ji dîwana Melikê Bêrîye.*

**S. 16** *1 P'îranî Ĥesin Maman serwere,*
*2 Melek sekinîn li mehdere,*
*3 Da deste p'îra mişura zere,*
*4 Ya Ĥesin Maman, tu hîvîya me bikî ji dîwana Melikê[4086] Ekbere.*

**S. 17** *1 Ȓêya p'îranîyê biȓêzin,*
*2 Hûn xwe ji guneha bip'arêzin,*
*3 Da li axretê, ĉirayê me'rîfetê li pêşîya we veguhêzin.*

**S. 18** *1 P'îranî bi nasîne,*
*2 Lazim ĥeqîyê bibîne,*
*3 Di vê ȓêya p'îranîyê çû misêmayî[4087] tê nemîne.*

**S. 19** *1 Bi mêrû muĥbet[4088] şêrîne,*
*2 Ya Ĥesin Maman, em ji te bi hîvîne!*
*3 Tu derman bikî dilê birîne.*

## 30. DUA'YA MIRÎDÎYÊ[4089]

**S. 1** *1 Mirîdê Xwedê xwe bi çî naskir?*
*2 Bi şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birê axretê,*
*3 Li dest [û] damana wan girtin, xwe ji agirê cehnemê xilaskir.*

**S. 2** *1 Mirîdî fere,*
*2 Li nav wan danîn mehdere,*
*3 Ȓêya mirîdê her û here.*

**S. 3** *1 Ya şêx Şems, tu li me bikî mefere,*
*2 Ya melik Fexredîn, tu ji me ȓa bibî ȓêbere,*
*3 Me hîvî ji Xwedê heye, em li ber damana pênc ferzêt ĥeqîyê bin sela.*

**S. 4** *1 Mirîdî ȓêyek ji yê dîne,*

[4084] *xoşî*
[4085] *xuyan*
[4086] *melek*
[4087] binêr: *kêmanî*
[4088] *mehbet*
[4089] [2] (rr. 1010-1012)

*2 Hincîyê r̂êya t'erîqetê bih̑ebîne,*
*3 Li dilê wan namînê k'erb û qeh̑ir û k'îne.*

**S. 5** *1 R̂êya mirîd[îy]e tenge,*
*2 Ji dîwana Êzî hat denge,*
*3 R̂êya mirîd[îy]ê not û neh r̂enge.*

**S. 6** *1 Mirîdî neh̑deye*[4090]*,*
*2 Bi Tawisî melek' den şehdeye,*
*3 R̂awestan li ber her pênc dergeye.*

**S. 7** *1 R̂êya mirîd[îy]ê sipîye,*
*2 Hincîyê Tawisî melek' girt bi r̂astîye,*
*3 Ewê li axretê bibîne xweşî û şayîye.*

**S. 8** *1 Lib[a]sê mirîd[îy]ê li ber xwe kin,*
*2 Her pênc ferza li ser xwe fer kin,*
*3 R̂êya mirîd[îy]ê bi mal û ser kin.*

**S. 9** *1 Mirîd bi xofê*[4091] *gehişit mirazê,*
*2 Hincîyê r̂êya mirîdê nexwazê,*
*3 R̂oja bangê axretê, P'adşa heqîyê, neheqîyê ji wan dixwezê.*

**S. 10** *1 Mirîdî e'ynate,*
*2 P'adşayî li nav wan danî muh̑bete*[4092]*,*
*3 Ji ew paş, mirîdîyê girt h̑ed û sede.*

**S. 11** *1 Ev bû sur̂a ji pêş,*
*2 Em li pê wê sur̂ê bikin t'eftêş,*
*3 P'adşa li pêşîya mirîdê nahêlê ne kule, ne jane, ne êş.*

**S. 12** *1 Mirîdî bi wê sur̂ê r̂êya Xwedê naskir,*
*2 Bi xofê xwe xilaskir,*
*3 Mêr bi xêrê digehine ber P'adşayî.*

**S. 13** *1 Mirîdî bi sur̂ê girtin r̂êzane,*
*2 Li pêşîya wan gur̂î bû mom û ĉirane.*

**S. 14** *1 Mirîdî bi sur̂ê girtin r̂aste,*
*2 Me r̂ê girtin bi me'rîfete,*
*3 Hincîyê bi saẍî girtibû t'erbîyete,*
*4 Ew r̂uh̑, r̂oja axretê li ber P'adşayî bi h̑izrete.*

**S. 15** *1 Mirîdî mehdere,*
*2 Melik sekinîn li ser menbere,*
*3 Melik şêx Sin — şefa'ete, Melik Fexredîn — r̂êbere, şêx Şems — mefere,*
*4 Hun hîvîya me bikin li dîwana Melikê Ekbere.*

**S. 16** *1 Me bi mirîdîyê qebûle,*
*2 Ji berî xet û mişûre,*
*3 Şêx Şems — nûre,*
*4 Melik şêx Sin — ẍefure*[4093]*,*
*5 Ya Tawisî melek', tu hîvîya me bikî li dîwana melikê Ẍefure.*

[4090] *neh̑de* — binêr: *r̂ê* (*bawirî*)
[4091] *xif*
[4092] *meh̑ibet*
[4093] *xefur*

**S. 17** *1 R̂êya mirîdîyê[4094] not u neh erk'ane,*
*2 Ji not u neha sê li nav wan dane,*
*3 Yek — r̂astîye, yek — ĥeya, yek — îmane.*
*4 Ya Êzî, tu li me bib[î] xwedane,*
*5 Tu hîvîya me bikî li dîwana Melikê[4095] R̂eĥmane.*

**S. 18** *1 R̂êya mirîd[îy]ê li nav hêvênê sinetê danî,*
*2 Ş̂êx û p'îra, mirîda, baweriya xwe pê anî,*
*3 R̂astiya wê li birka cinetê hilanî,*
*4 Me şehde û îmana xwe pê anî,*
*5 Ya Êzî, tu hîvîya me bikî li ber R̂eĥmanî.*

## 31. DUA'YA MIRAZÊ[4096]

**S. 1** *1 P'adşa li nav dur̂ê dilxwaze,*
*2 Nûra wî bi sê ĥezar û sê libase,*
*3 Navek ji yê Xwedê — Miraze.*

**S.2** *1 P'adşê min miraz sewirand,*
*2 Melek Ezraîl ji nûra e'firand,*
*3 Quba felekê pê xemiland.*

**S. 3** *1 Quba felekê nûrîne,*
*2 Lenger̂ê wê li beĥrêt k'ûrîne,*
*3 Serê wê li E'rşê E'zmîne,*
*4 Ya Cebraîl, tu miraza me bikeyî ji dîwana R̂eb il-A'lemîne.*

**S. 4** *1 Melek Ezraîl r̂awesta li deriyê mirazê,*
*2 Bi şev û r̂ojê wê dixwezê,*
*3 Ĥeta gehişt wê ĥizurê, wê mirazê.*

**S. 5** *1 Melek Ezraîl not û neh ĥezar sal sekinî li xilmetê,*
*2 P'adşa r̂ûniştî li wê ĥizûrê, wê se'edetê,*
*3 Miraz hasilbû[4097] li ĥeqîqetê,*
*4 Ew bû çawişê se'edetê.*

**S. 6** *1 P'adşa miraz hasile,*
*2 Hûn bi xof û tirs bin ji ĥemû dile,*
*3 Da li axretê bibin xweyê miraz hasile.*

**S. 7** *1 P'adşayî bi r̂astî miraz çêkir,*
*2 Navê xweyê şêrîn, şerîf[4098] lêkir,*
*3 Meleka ji ew paş sicûde li pêkir.*

**S. 8** *1 Ji P'adşê xwe diden medehe,*
*2 Melek r̂awestan li pişt dergehe,*
*3 Miraza xwe xwestin ji stêrka berê sibehe.*

**S. 9** *1 Stêrka berê sibehê dahir bû,*
*2 Bor li ibadetê[4099] siwar bû,*
*3 Sed xweziya me bi wî mêrî, li ber ĥeqiyê r̂awestabû.*

---
[4094] *mirîdê*
[4095] *melek*
[4096] [1] (pp 279-281); [2] (rr. 1027-1028)
[4097] *ĥasil*
[4098] *şirîf*
[4099] *ebadet*

**S. 10** *1 Sed xweziya me bi wî mêrî li ber ĥeqiya xwe veweste,*
*2 Aşiq û me'şûq r̂ay wê li deste,*
*3 Me mirazê xwe ji wan dixweste,*
*4 Ewan mirazê xwe ji ĥeqiyê dixweste.*

**S. 11** *1 Miraza, miraz ji dîwana ĥeqiyê,*
*2 Em mabûn li hîvîyê,*
*3 Melek r̂awestan li pêşiyê,*
*4 Bi wê mirazê, ji ew paş gehiştin wê xweşiyê.*

**S. 12** *1 P'adşa miraz qebûle,*
*2 Ji berî xet û mişûre,*
*3 Êzî neqaşê neqşê hûre,*
*4 Xewasê beĥrêt k'ûre,*
*5 Ji nêzîka yî dûre.*

## 32. DUA'YA ZÎYARETBÛN[4100]

**S. 1** *1 P'adşa divê weye,*
*2 E'rş û K'ûrsîy k'efa meye,*
*3 Ji berî binyana e'rda û e'zmana,*
*4 Ji berî mêra û meleka,*
*5 Ji berî ĉiya û sikana,*
*6 Ji berî Heyv û R̂oja,*
*7 Me'bûdê me ziyaret bûna xerqeye.*

**S. 2** *1 Heke e'rdekî bibînî, işaretke[4101],*
*2 Derwêşekî bibînî, ibadetke[4102],*
*3 Darekî bibînî, ziyaretke.*

**S. 3** *1 Ziyaret sicûdeye,*
*2 Ji meleka bû neĥdeye,*
*3 Ew melek bi ziyaretê gehiştin Xwedê xweye.*

**S. 4** *1 Ziyaretî — sê r̂enge,*
*2 Ji veĥdenîyê[4103] hatibû denge,*
*3 Me de'we heye bi cenge,*
*4 Beĥr tê nîne kesê lenge.*

**S. 5** *1 Ziyaretî — silave,*
*2 Melek hatin hindave,*
*3 Xwedê xwe nasîn bi neder û ĉave.*

**S. 6** *1 Ziyaretî — yeqîne[4104],*
*2 Xwedayî — nav şêrîne,*
*3 Li dilî namînit ne k'erbe, ne qehre, û ne k'îne,*
*4 Ya Cibraîl, tû hîvîya me bikî ji dîwana R̂eb il-A'lemîne.*

---

[4100] [1] (pp 106-109); [2] (rr. 1029-1030)
[4101] *îşaret*
[4102] *ebadet*
[4103] *weĥdanîyê*
[4104] *êqîn*

**S. 7** *1 Meleka kirbû t'egbîre,*
*2 Emê heȓin dîwana mîre,*
*3 Emê ziyaret ken dang û damanêt Celîle.*

**S. 8** *1 Xwedê li xwe kir silave,*
*2 Silav û sed silave,*
*3 Ziyaretî ji eşq, û dil, û dest, û ĉave.*

**S. 9** *1 Hêşta e'rd û e'zman ne bû,*
*2 P'adşa li nava duȓê xewle bû,*
*3 Ev muĥbê ziyaretiya nûra xwe bû,*
*4 Meleka pê şehde bû.*

**S. 10** *1 Xwedê dara her herê xulqand,*
*2 Meleka ziyaret kir, pêra sadiqand,*
*3 E'rş û K'ursîy e'ȓirand.*

**S. 11** *1 Xwedê dara her herê çêkir,*
*2 Cebraîl kir qesid, viȓêkir,*
*3 Ji ew paş meleka silav li Xwedê kir.*

**S. 12** *1 Xwedê ziyaretî ji suȓa sinetê kir t'ixûbe,*
*2 K'êşabû ber P'adşê xwe sicûde,*
*3 Her ewe bi xwe me'bûde.*

**S. 13** *1 Ew me'bûdê meye,*
*2 Navê Êzî — ji nave zêdeye,*
*3 Ew muĥbê suȓa xweye,*
*4 Sekinî li Lalişê — ji me ȓa qubleye.*

**S. 14** *1 Emê ziyaret biken wan xelata,*
*2 Suȓa Lalişê ji jor dihate,*
*3 Pê zeynî çiqas qinyate*[4105]*,*
*4 Mêra ji ber bir maş, û berat', û xelate.*

**S. 15** *1 Emê ziyaret biken wan damana,*
*2 Melek li dergehê e'zmana ȓawestane,*
*3 Xasêt Xwedê girtin meclîs û dîwane,*
*5 Ya suȓa sinetê bawerî bi sadiq û erk'ane,*
*6 Suȓa ĥemû Xwedayî — îmane.*

## DUA'YÊT ME'RÎFET Û ERK'ANAN:

## 33. DUA'YA ME'RÎFETÊ[4106]

**S. 1** *1 P'adşayê minî Cebare,*
*2 Dahir kir not û neh erk'ane,*
*3 Me'rîfet — ȓonahiya dilane,*
*4 Li ber guȓî bûn mom u ĉirane.*

[4105] *kiniyet*
[4106] [2] (rr. 1019-1021)

**S. 2** *1 Me'rîfet — gule ji cinetê,*
*2 Meleka meclis danîn li se'edete,*
*3 P'adşayî ĥeft duȓ xulfandin ji ĥeqîqetê.*

**S. 3** *1 P'adşayî me'rîfet ji k'ilîma xwe çêkir,*
*2 Navê xweyî şêrîn, şerîf lê kir,*
*3 Meleka sicûde pê kir.*

**S. 4** *1 Me'rîfet — eşqa dile,*
*2 E'rd çêkir, e'zman di sere,*
*3 Bû mom û ĉira,*
*4 Nebû muĥbê ẍafila.*

**S. 5** *1 Me'rîfet — sê ȓêye,*
*2 Meleka pê girtbû ȓêye,*
*3 Me'rîfet — navek jê Xwedêye.*

**S. 6** *1 Me'rîfet — ȓengê vekirî,*
*2 E'rd çêkir, e'zman di seȓa nijinî,*
*3 Nûr li e'zmana êwirî,*
*4 Deriyê cinetê xemilî.*

**S. 7** *1 Pê xemilî deriyê cinetê,*
*2 Ava wan bû ji me'rîfetê,*
*3 E'sasê wan ji ĥeqîqetê,*
*4 Mifta xêrê li destê çawîşê se'edetê.*

**S. 8** *1 Dara me'rîfetê geşe,*
*2 Serî li E'rşe,*
*3 K'oka wê li beĥra,*
*4 Dilê momina pê bû xweşe.*

**S. 9** *1 Me'rîfet bi nave,*
*2 P'adşê me xulqand ji wê ziman û ĉave,*
*3 Ji qudretê, ji wan stêra,weriya bû xunave.*

**S. 10** *1 Me'rîfet — t'acê zêȓe,*
*2 Li çardeh[4107] t'ebeqet e'rd û e'zmana digêȓe,*
*3 Da wan kesa, yê dayîm, mie'meleta[4108] wan bi Xwedê ȓa.*

**S. 11** *1 Me'rîfet — xelate,*
*2 Ewlîya da destê wan cindîya ȓastî û me'rîfete,*
*3 Bi wê me'rîfetê P'adşayê xwe nasîne.*

**S. 12** *1 Hincîyê bi şêx, bi saẍî t'erbiyate,*
*2 Ewî nasî ĥed û sede[4109],*
*4 Ew ȓuĥ li ber P'adşaye bi ĥizrete.*

**S. 13** *1 Me'rîfet — nasîne,*
*2 Ĉirayêt guȓîne,*
*3 Ȓêbera, ȓêya pê dibîne,*
*4 Dîndara P'adşa bi mêra şêrîne.*

[4107] *ĥeft*
[4108] *miamelet*
[4109] *set*

**S. 14** *1 Me'rîfet — more,*
*2 P'adşayî e'rd çêkir, e'zman li jore,*
*3 Mek'anê wî qubet il-Bidare.*

**S. 15** *1 Me'rîfet — e'sase,*
*2 Ji ĥeqîqetê girtin qiyase,*
*3 P'adşayî ȓastî û bawiriya me'rîfetê ji me dixweze.*

**S. 16** *1 P'adşayê min li nava duȓê,*
*2 E'rd çêkir, e'zman di ser ȓa[4110] xemilê,*
*3 Bi me'rîfetê[4111] xulqand xerzê gulê.*

**S. 17** *1 P'adşayê min derê me'rîfetê vekirî,*
*2 Çend ewlî hatin û bihurîn[4112],*
*3 Ȓengê e'rda xemilîn,*
*4 P'adşa sîqala dilî.*

## 34. DUA'YA SEBRÊ[4113]

**S. 1** *1 Xwedanê sebirê sebir çêkir,*
*2 Navê xweyî şêrîn lêkir,*
*3 Erk'an, me'rîfet vê ȓa viȓêkir.*

**S. 2** *1 Xwedê sebir kir sikane,*
*2 Melik ji nûra wî hatine xware,*
*3 Bi wan avakirbû e'rd û e'zmane.*

**S. 3** *1 Sebir — delîle,*
*2 Nazil bû ji qendîle,*
*3 Danîn ser p'erda feqîre.*

**S. 4** *1 Ewan bi sebirê xwe nasî,*
*2 Êzî bi wê sebirê dahir bû bi ĥezar û yek libasî,*
*3 Li beĥra geȓabû bi ȓengê masî.*

**S. 5** *1 Sebir — Ȓeĥmane,*
*2 Li cinetê meleka girtibû meclis û dîwane,*
*3 Sebir kir delîlê ȓêyane.*

**S. 6** *1 Sebir — sikana ewlî ye,*
*2 Hincîyê sebir nasî ye,*
*3 Ewê bibînin xweşî û şahî ye.*

**S. 7** *1 Sebir — erk'ana çê ye,*
*2 Hincîyê me'rîfet û erk'an divê ye,*
*3 Ew sebir silametiya ȓê ye.*

**S. 8** *1 Bi wê sebirê derwêşa mal û mezel t'erk kirin,*

[4110] *seȓa*
[4111] *me'rfet*
[4112] *buhirîn*
[4113] [2] (rr. 1022-1024)

*2 Şevê, r̂ojê ibadet*[4114] *kirin,*
*3 Emîn Cebraîl serdanê xêrê li wan kirin,*
*4 Ew derwêş ji agirê dojêh e'fû kirin.*

**S. 9** *1 Sebir — xelatekî P'adşa ye,*
*2 Ji ba xwe kir p'eyda ye,*
*3 Bi wê sebirê li ber wan ewlîya gur̂î bûn mom û ĉira ye.*

**S. 10** *1 Ew sebir da Gay û Masî ye,*
*2 Bi wê sebirê Xwedayê xwe nasî ye,*
*3 Çardeh t'ebeqe li ser mile wî ye.*

**S. 11** *1 Bi wê sebirê Heyv û R̂oj li e'zmana danîn,*
*2 P'erda wan li kaniya Sipî û siĥanê hilanîn.*

**S. 12** *1 Xwedê*[4115] *bi sebirê e'rd û e'zman xemiland,*
*2 Horiya li quba felekê hilhiland,*
*3 Xwedê çar dur̂ e'firand,*
*4 R̂ik'inê e'rd û e'zmana pê sekinand.*

**S. 13** *1 P'adşayî bi sebirê cinet çêkir,*
*2 Meleka hoste pê kir,*
*3 Dilê e'melçaka xweş kir*[4116]*, dilê xiraba berbi jêr kir.*

**S. 14** *1 Horî û meleka bi sebirê gihiştin îmanê,*
*2 Hatin xweyî sebirê û sikanê,*
*3 Bi wê sebirê gehiştin wê hizretê, wê dîwanê, wê keyîfê, wê seyranê.*

**S. 15** *1 Erk'anek ji wê sebirê r̂astî,*
*2 P'adşayî ji ba xwe bîr̂astî,*
*3 Ew sebir bû mom û çîra li pêşîya wan veguhastî.*

**S. 16** *1 Erk'anek ji wê sebirê nasine,*
*2 Hincîyê r̂êya Xwedê girtbû bi yeqîne*[4117]*,*
*3 Ew r̂êya mêr û meleka bi ĥeq dibîne.*

**S. 17** *1 Erk'anek ji wê sebirê ĥeyaye,*
*2 P'adşayî ji ba xwe kirbû p'eydaye,*
*3 Bi wê meclis bi navê şêx Adî û melik şêx Sin avaye.*

**S. 18** *1 Sebir — xweş ĥesare,*
*2 "Te'mîda" wê ji beĥra nîle,*
*3 Bi wê sebirê Ezraîl, Cebraîl, Mîkaîl, Derdaîl*[4118]*, Şifqaîl, Israfîl, Ezazîl*[4119] *bûn p'îra.*

**S. 19** *1 Bi wê sebirê meleka axa qalbê Adem anî,*
*2 Li ava kaniya Sipî hilanî,*
*3 Bi wê sebirê qalbê Adem*[4120] *çêkirî.*

**S. 20** *1 Ĥeftsed salî r̂uĥ pê anî,*
*2 Bi wê sebirê meleka Adem li cinetê danî.*

---

4114 *ebadet*
4115 *Xwidê*
4116 *bû*
4117 *êqîn*
4118 *Dirdaî*l
4119 *Izazîl*
4120 *qalb*

**S. 21** *1 Adem bê sebir, r̂êya Tawisî melek' girt bi nezanî,*
*2 Li ber ne ma sebra R̂eĥmanî,*
*3 Ĥeta xwe ji cinete der anî.*

## 35. DUA'YA T'IFAQÊ[4121]

**S. 1** *1 P'adşayî t'ifaq çêkir,*
*2 Novê xwe yê şêrîn lêkir,*
*3 R̂astî û bawerî vê r̂a vir̂êkir,*
*4 Ĥeqî jê bere û jêr kir.*

**S. 2** *1 T'ifaq, bawerî ji navê Xwedê ye,*
*2 Meleka pê girtbû r̂ê ye,*
*3 Bi we t'ifaqê, Xwedê xwe naskir li nav dur̂ê ye.*

**S. 3** *1 T'ifaq serê ĥemû erk'ane,*
*2 Meleka girtibûn meclîs û dîwane,*
*3 Bi t'ifaqê nijyar kirin çardeh t'ebeqêt e'rd û e'zmane.*

**S. 4** *1 Her ĥeft melek ku e'firîn,*
*2 Bi t'ifaqê û r̂astîyê lêk êwirîn,*
*3 Ji muĥbet bi nedera hev debirîn.*

**S. 5** *1 P'adşayî t'ifaq û bawerî xemiland,*
*2 Melek li e'zmana bi wan r̂ewistan,*
*3 Ĥeft cinet, ĥeft cehenim sewirand, momina pê sadiqand.*

**S. 6** *1 Neder — xweş nedere,*
*2 Her ĥeft meleka li nav xwe danîn mehdere,*
*3 Ji ew poş çêkirin sinetû[4122] fere.*

**S. 7** *1 Meleka cinet û cehneme çêkir,*
*2 Bi wê t'ebayê not û neh ĥezar r̂eng lêkir,*
*3 Lew miftê li destê Melekê Xêrê kir.*

**S. 8** *1 Mifta cinetê li destê Melekê Xêrê danî,*
*2 Xwedê beĥre, ji nûra wî diçûn co û kanî,*
*3 Ji ew paş meleka sadiq û baweriya xwe pê anî.*

**S. 9** *1 Derwêş E'rd got:«Ez come dîwane îlaĥî,*
*2 Min li wir dîtin xweşî û şahî,*
*3 Serê ĥemiyê t'ifaq û t'ebahî[4123]».*

**S. 10** *1 Ji qewlê Aba Bek'irê zerzayî,*
*2 Heke du mêra (bira) bi hev r̂a kirin t'ifaq û t'ebayî,*
*3 Bi firwara şêx Adî û melik şêx Sin, ĉiya deynin ser ĉiyayî.*

**S. 11** *1 Meleka t'ifaq û t'eba[yî] kirin,*
*2 P'adşa sê ĥezar û sê nav li xwe kirin,*
*3 Ji ew paş e'rd çêkirin,*

---

[4121] [1] (pp 109-111); [2] (rr. 1025-1026)
[4122] *Sinet û*
[4123] binêr: *t'ebayî*

*4 E'zman di ser r̂a[4124] avakirin.*

**S. 12** *1 T'ifaq û t'ebayî ji eşq û dile,*
*2 E'rd çêkirin, e'zman di ser r̂a [xemile],*
*3 [Bû] mom û ĉira,*
*4 P'adşa nebû muĥbê r̂uĥêt ẍafila.*

## 36. ATQAN[4125; 4126]

**S. 1** *1 Ezda — êke Xwedê ye,*
*2 Tawisî melek' — nûra P'adşê ye,*
*3 Bawiry min pê tê ye.*

**S. 2** *1 T'oq — nîşana min e,*
*2 R̂oj — bergehê min e,*
*3 Kaniya Sipî — mora min e.*

**S. 3** *1 Tawisî melek' — îman e,*
*2 Sêsims — mefer e,*
*3 Sîxadî — t'acê ser e.*

## DUA'YÊT SIMBALÊT ÊZDÎYAYÊT PÎROZ:

## 37. DUA'YA XERQÊ[4127; 4128]

**S. 1** *1 P'adşayê min xerqe sewirand,*
*2 Ya Hidrîsî[4129] Xeyat fesiland,*
*3 Şêxû Bek'ir[4130] li pê neqiland,*
*4 R̂êya îmanê hasiland[4131].*

**S. 1** *1 P'adşayê min xerqe sewirand,*
*2 Hidrîs Xeyat fesiland,*
*3 Şêxû Bek'ir li pê neqiland,*
*4 R̂êya îmanê[4132] ĥesiland.*

**S. 2** *1 Li pê neqiland feqîra,*
*2 Hincîyê t'erk bike xirab[î], û fêniya, û wîra,*
*3 Ewê xelat bibê bi mifte û k'ilîla,*
*4 Ewê bigehê dîwana mîre.*

**S. 2** *1 Li pê neqiland feqîra,*
*2 Hincîyê t'erk bike xirabe, û fênîya, wîra,*
*3 P'adşa dê wî xelat ket bi mifte û k'ilîla,*
*4 Ew dêgehte dîwana mîra.*

4124 *sera*
4125 binêr: *atqat*
4126 http://www.ezdixandi.com/forum/38-965-1
4127 [2] (rr. 1031-1033)
4128 Lalish 43 KA 2018 (pp18-20) https://ru.calameo.com/read/0025183173ed7ee3e3da6
4129 *Edrîs*
4130 *Şêxubek'ir*
4131 *ĥasiland*
4132 *êman*

**S. 3** *1 Hûn xerqe hilînin,*
*2 Li pê feqîra bişînin,*
*3 Da feqîr bi serê xwe hilînin,*
*4 Feqîrî erk'ana ser deynin.*

**S. 3** *1 Hûn xerqeyî hilînin,*
*2 Li pê feqîra pesinîn,*
*3 Da feqîr bi sere xwe hilînin,*
*4 Feqîr erk'ana li ser daynin.*

**S. 4** *1 Ĥiciyê hay ji me'niya xerqê dibuwe,*
*2 Ew safîne, êk r̂uwe,*
*3 Ya Xwedê, tu miraza me bikî zuwe.*

**S. 4** *1 Hincîyê hajî me'nîya xerqê xwe dibû e,*
*2 Ew safîne yek r̂û e,*
*3 Ya Xwedê, tu miraza me bikeyî zû e.*

**S. 5** *1 Xerqe — miraze,*
*2 Hincîyê bi erk'anê xerqê bêtin beĥise,*
*3 Ew xerqe r̂oja axretê ji wan r̂a bibit şehde.*

**S. 5** *1 Xerqe — miraze,*
*2 Hincîyê bi erk'ana xerqe bêtin beĥişe,*
*3 Ew xerqe r̂oja axretê ji wan r̂a dê bitin şehde.*

**S. 6** *1 Hûn xerqe bînin bip'arêzin,*
*2 Xwe dûr bikin, xêr û şer̂ birêzin,*
*3 Da r̂oje bangê axretê ĉirayê me'rîfetê li pêşîya we veguhêzin.*

**S. 6** *1 Hûn xerqeyî bînin bip'arêzin,*
*2 Xwe dûr biken, xêr û şer̂ birêzin,*
*3 Da r̂oja bangê axretê ĉirayê me'rîfetê li pêşîya we veguhêzin.*

**S. 7** *1 Xerqe — sit'are,*
*2 Hincîyê vexwar ji k'asa tale,*
*3 Feqîrî ji wîra ĥelale.*

**S. 7** *1 Xerqe — sit'ar[e],*
*2 Hincîyê vexwar ji k'asa Te'ale,*
*3 Feqîrî ji wî r̂a ye ĥelale.*

**S. 8** *1 Feqîrî not û neh erk'ane,*
*2 E'wil ibadet*[4133] *û zimane,*
*3 Naskirin ser xitmê wane.*
*4 Ya Tawisî melek', tu miraza me bikî li ber K'ursîy ya R̂eĥmane.*

**S. 8** *1 Feqîrî not û neh erk'ane,*
*2 E'wil ibadet*[4134] *zimane,*
*3 Naskirin ser xitmê wane.*
*4 Ya Tawisî melek' tu miraza me bikeyî li ber K'ursîya R̂eĥmane.*

**S. 9** *1 Feqîrî not u neh erk'anêt miqerimin,*
*2 Heke we bivê ji not û neh erk'ane sêya bi alîmin*[4135]*,*
*3 Da hun li dîwana mîr biwesilin.*

**S. 9** *1 Feqîrî not û neh erk'anêt muqer̂emin,*
*2 Heke we biwê ji not û neh erk'ane sê ya jê bi alîmin*[4136]*,*
*3 Da r̂oja axretê hûn li dîwana mîr biwesilin.*

[4133] *ebadet*
[4134] *ebadet*
[4135] *elimin*
[4136] *e'limin*

**S. 10** *1 Erk'anek jê r̂astî,*
*2 P'adşa ji ba xwe veguhastî,*
*3 Bû mom û çîrayê pêşîya wan veguhastî.*

**S. 10** *1 Erk'anek jê r̂istî,*
*2 P'adşayî li ser destê xwe bîrastî,*
*3 Bû mom û ĉirayê pêşîya wan veguhastî.*

**S. 11** *1 Erk'anek jê nasîne,*
*2 Hincîyê r̂êya Xwedê ĥeq bibîne,*
*3 Li dilî namînê ne qehre, ne k'îne.*
*4 Ya Tawisî melek', tu hîvîya me bikî li dîwana R̂eb il-A'lemîne.*

**S. 11** *1 Erk'anek jê nasîne,*
*2 Hincîyê r̂êya Xwedê ĥeq bibîne,*
*3 Li dilî[4137] namînê ne qehre, û ne k'îne,*
*4 Ya Tawisî melek' tu hêvîya me bikeyî li dîwana R̂eb il A'lamîne.*

**S. 12** *1 Erk'anek jê ĥeya ye,*
*2 P'adşa ji ba xwe kir p'eyda ye,*
*3 Pêşîya wan gur̂îbû mom û ĉira ye,*
*4 Em miraza xwe dixwezin ji Xweda ye[4138].*

**S. 12** *1 Erk'anek jê ĥeya ye,*
*2 P'adşayî ji ba xwe kirî p'eyda ye,*
*3 Pêşîya wan gur̂î bû mom û ĉira ye,*
*4 Em miraza xwe dixwazin ji Xweda ye.*

**S. 13** *1 Xerqe — setar li Eyûbe,*
*2 Hincîyê bi ol û erk'anê — xerqeve bêtin zûbe,*
*3 Ew xerqeye li axretê ji mêra r̂a danî ĥed û sed, r̂ê û t'ixûbe.*

**S. 13** *1 Xerqa — sit'ar li evîne[4139],*
*2 Hincîyê hajê ol, û erk'an, û me'nîya xerqê xwe hene,*
*3 Ew xerqe li axretê ji mîra r̂a danî ĥed û sed û r̂ê û t'ixube.*

**S. 14** *1 Xerqe — sit'are,*
*2 Derwêşa li pê wî xelatî kir t'eftêşe,*
*3 Meleka li e'zmana sema qanûnî k'êşa,*
*4 Ya Xwedê, me ji te hîvîye, tu li dilê me nehêlî çu kul û derda û êşa.*

**S. 14** *1 Xerqa — sit'are,*
*2 Derwêşa li pê wî xelatî kir t'eftêşa,*
*3 Meleka li e'zmana sema qanûnî k'êşa,*
*4 Ya Xwedê, me ji te hîvîya, tu li dilê me nehêlî çu kul û derd û êşa.*

**S. 15** *1 Xerqe ji qendîla e'zmana hate,*
*2 Li ser şêxû Bek'ir kirbû xelate,*
*3 Pê şayî bûn, bi maş û berat'e.*

**S. 15** *1 Xerqe ji qendîla e'zmana hate,*
*2 Li ser Şêxubek'ir kir xelate,*
*3 Pê şayî bûn bi maş û berat'e.*

*Em di kêmin, û Xwedê t'emame!*

[4137] *dine*
[4138] *Xuda*
[4139] *ewin*

## 38. DUA'YA DAMANA XERQÊ[4140]

*1 Sitar ẍefar cebar lib[ɑ]sê dine kifnê naxirmitê,*
*2 Dimistê min li damana Şîxadî û yarû birayê axretê,*
*3 Melik şêx Sin[4141] qazî li ser p'ira Selatê,*
*4 Me nedêlî li kiş û matê.*
*5 Êru li dine sube li bangê axretê,*
*6 Destê min li damana melik şêx Sin û yarû birayê axretê.*

## 39. DUA'YA T'OQÊ

**şaxê — 1**[4142]

**S. 1** *1 T'oqe û meft'ûle, t'oqe*
*2 Xelatekî meqbûle,*
*3 Bi sere me qebûle.*

**S. 2** *1 Şêx Adî — ẍefure,*
*2 Melek Şêxîsin — mişure,*
*3 Şêx Şems — nûre.*

**S. 3** *1 Xwedê nûr erla (edla) nûre,*
*2 Xidir–Ilyas xewase baĥrê k'ûre,*
*3 Şehda min, ĥeq bi navê silt'an Êzîd û Tawisî melek' qebûle.*

**şaxê –2**[4143]

**S. 1** *1 P'adşayî ji me r̂a vir̂êkir t'oqe*[4144]*,*
*2 K'etbû dilê êzdiya şahî û şoqe,*
*3 Destê Tawisî melek' li ser stêra Ĥeyoqe.*

**S. 2** *1 P'adşayî t'aq ji me r̂a vir̂êkir,*
*2 Ava cinetê lê kir,*
*3 Ewî xweşî û sayî ji me r̂a çêkir,*

**S. 3** *1 Wextê t'oq şîyanidin,*
*2 Meleka qap'iyê e'zmana vekirin,*
*3 Hariya li e'zmana hilhilandin.*

**S. 4** *1 T'oq ji êzdiya r̂a ziyarete,*
*2 R̂êya wê bi xilmet û ibadete*[4145]*,*
*3 Ew jî ferzeke ji ferzêt ĥeqîqete.*

**S. 5** *1 T'oq — ji mizgîne,*
*2 Tawisî melek' — nav şêrîne,*
*3 Emînê dîwana R̂eb il-A'lemîne,*
*4 Êzdî jê bi hêvîne*[4146]*.*

**S. 6** *1 Êzî t'oq ji quba felekê der anî,*

---

[4140] 43 (p. 17)
[4141] *Şexsin*
[4142] Belavkirin: *p'îr Dîma*
[4143] [2] (rr. 1034-1036)
[4144] *tok*
[4145] *ebadet*
[4146] binêr: *hîvî*

*2 Navê xwe yê şêrîn li ser danî,*
*3 Êzdiya bi serê xwe hilanî,*
*4 Me şehde, û îman, û baweriya xwe pê anî,*

**S. 7** *1 T'oq — girîvane,*
*2 Bi qiraȓa Xwedê*[4147] *û her ĥeft melekane,*
*3 Bi şehdeya şêx Adî, û melik şêx Sin, û Dawidî bin Dermane,*
*4 Dua'ya t'oqê silamatiya ȓêyane.*

**S. 8** *1 T'oq ji êzdiya ȓa qebûl kir,*
*2 Nûr bi nûrê te'mîd*[4148] *kir,*
*3 E'wil Xwedê silav li Tawisî melek' kir.*

**S. 9** *1 T'oq — girîvanê ȓaste,*
*2 Hincîyê li ȓêya girîvan safî bête,*
*3 Ewî dinya t'erk kir, axret stande.*

**S. 10** *1 T'oq — xelatekî bi more,*
*2 Hatibû ji xizîna*[4149] *jore,*
*2 Dane ser mile êzdiya, bi qirara Êzîyê Sore,*
*4 Ȓêya t'oqê bi ĥêf û core.*

**S. 11** *1 T'oq hat ji dîwana Melikê*[4150] *Bêrîye,*
*2 Hincîyê bi ȓêya t'oqê biçîye,*
*3 Ewê bibê serhevdê mala Adîye.*

**S. 12** *1 Ȓêya t'oqê — ȓêya axretê,*
*2 Meleka dîwan girtin li se'edetê,*
*3 Ya xwedanê t'oqê, tu li me bikî şefae'tê,*
*4 Em ji te dixwazîn îmanê û me'rîfetê.*

**S. 13** *1 T'oq ji e'zmana hate,*
*2 Nazil kir donzde[h] ĥezar xelate,*
*3 Ji me ȓa viȓêkirin maş û berat'e.*

**S. 14** *1 T'oq — mişure,*
*2 Hatibû ji E'rşê jore,*
*3 Hincîyê ȓêya t'oqê ȓast girt, Xwedê t'im ji wî ȓa yî ẍefure.*

**S. 15** *1 Havênê sinetê t'oq li ser xwe kir,*
*2 Me li pê bawer kir,*
*3 Ȓêya t'oqê*[4151] *mal û ser kir.*

**S. 16** *1 Ȓêya t'oqê bi ser û male,*
*2 Suȓê batinê not û neh ĥezare,*
*3 T'oq bû xelatê momina, ne yê gûnehk'ara,*
*4 Bêbaweriya bavêjin dojêh mara.*

**S. 17** *1 Ya xwedanê t'oqê, me ji te hîvîye,*
*2 Tu hîvîya me bikî li dîwana Melikê Bêrîye,*
*3 Sed xweziya li wî ȓuĥî, xwedanê t'oqê jê ȓozîye.*

---

[4147] *Xwidê*
[4148] binêr: *mor*
[4149] binêr: *xezne*
[4150] *melek*
[4151] *rok*

## 40. DUA'YA MEHIKÊ[4152] (ȒISTÊ)

**S. 1** *1 Dayîm weha bî,*
*2 Herdem li ser p'îya bî,*
*3 Sed car silavê me li meȟikê û xerqa bî.*

**S. 2** *1 Meȟike nûranî ye,*
*2 Hatî ji e'rşê banî ye,*
*4 Me pişta xwe pê şidandî ye bi destura şêîx Adî[4153] ye.*

## 41. DUA'YA MEFT'ÛLÊ[4154]

*1 Meft'ûle, meft'ûle nêva t'encû Ȓesule,*
*2 Me bi sere xwe[4155] qebûle,*
*3 Şêx Şems — nûre, şêx Adî — ẍefûre,*
*5 Tawisî melek' me bi îmana xwe qebûle.*

## 42. DUA'YA MORKIRINÊ[4156]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Mor — mora mêrane,*
*2 Kaniya Sipî — xweş nîşane,*
*3 P'adşayî jî dabû beyane,*
*4 Ciyê Êzdîne mîr û herçar birane.*

**S. 2** *1 Mora kaniya Sipî ye,*
*2 Mêr hatin û medih jê dayî ye,*
*3 Ew ciyê P'adşê min bi xwe ye.*

**S. 3** *1 Berî ne e'rd hebû, ne e'zman,*
*2 Ne beȟr hebû, ne binyan,*
*3 Ne ĉiya hebû, ne sikan.*

**S. 4** *1 Ȓê hebû — me'rîfet,*
*2 Îman hebû — t'erîqet,*
*3 Ewê ȓojê kaniya Sipî bo mêra kirbû qublet.*

**S. 5** *1 Desta ji t'erîqetê berneden,*
*2 Melik şêx Sin bi îmanê xwe ken,*
*3 Xwe li kaniya Sipî mor ken.*

**S. 6** *1 Ji e'zmana ȟeta bi e'rde,*
*2 Ji e'rda ȟeta bi ser de,*
*2 Ava kaniya Sipî dermane li ser çiqas derde.*

---

[4152] 43 (p. 16)
[4153] *Şîxadî*
[4154] 43 (p. 16)
[4155] *xo*
[4156] [52] (rr. 347-348)

**S. 7** *1 Tû morkirin li kaniya Sipî ye,*
*2 Ew li te dana berxê Êzî ye,*
*3 Îmanêt te bûne bi navê Tawisî melek' û şêx Adî ye*[4157].
*4 Pîraze, pîraze!*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 43. DUA'YA BISKÊ — LAVA BISKÊ

Bisik girtin, ferzeke ji ferzên dînê Êzidîyan. Mirovê Êzidî - helbet kesên nêr - demê dimire na hête vesartin, heke biska wî ne hatibite girtin. Bi tinê sêxên şêx Sin a p'îrê wan biska wan digire, lê belê ĥemû Êzidîyên din bi sêx û p'îr û mirîdave - sêxê wan biska wan digire. Bisk demê zarokîyê bi destê sêx (destê p'îr bo mala Adanîyê) tête girtin û gereke sêx an p'îr wî demî vê dua'yê bêje, kû jê xilas bu, sê cara bi meqesê hindek p'ora zarokî bibire:

**şaxê — 1**[4158]
*1 Biska biskane,*
*2 Biska şêx Alê Şêmsane,*
*3 K'af bilindbû, ço e'zmane,*
*4 Bi şehdeya şêx Adî û mêrane,*
*5 Wê li navda şêxê şêxane.*
*6 Înane xwar leyîlun, leyîlet il-Qedir, suȓet il-Ȓeĥmane,*
*7 Şêx Seyîd pê didet nîşane,*
*8 Şêxû Bek'ir ser mek'ane,*
*9 Ya şêx Adî u melik şêx Sin*[4159]*, ji me dest, ji we dua'ne,*
*10 Tu vê biskê bikey çil biskane,*
*11 Fitoyê vê biskê gaye, an berane!*

**şaxê — 2**[4160]
*1 Biska biskane,*
*2 Biska Şêx Alê Şemsane,*
*3 Bi şehdeya şêx Adî û mêrane,*
*6 Ȓoja kaniya Sipî dane.*
*7 Du ĉiya li hevk'etin weke du berane.*
*8 Di navda hene şêxê şêxane,*
*9 Ya Xwedê u melik şêx Sin ji me dest, ji we dua'ne,*
*8 Tu vê biskê bikî çil biskane,*
*9 Qurbanîya vê biskê, gaye an berane!*

**şaxê — 3**[4161]
*1 Ȓojeka ji ȓojane,*
*2 Em destûrê Xwedê û mêrane,*
*3 (1.2) Biska şêx Alê Şemsane,*
*4 (2.4) Ȓoje kaniya Sipî didane,*
*5 Lê danîn ĥed û sed, û ol û erk'ane,*
*6 Micade û Çelxane,*

4157 *silt'an Êzî ye*
4158 [2] (rr. 1037-1038)
4159 *Sêxsin*
4160 Belavkirin: Feremez Xeribo (23-8-2012z)
4161 *Lava biskê.* Belavkirin: Mihemed. E. Elî *Syrian-Yazidish* (r. 61: r. 149)

*7 (1.6) Leylet Qedir, suȓet il-Ȓeȟmane,*
*8 (1.3) K'af bilindbû, çû e'zmane,*
*9 (2.5) Du ĉiya li hev dan wekî berane,*
*10 Şemsê Êzdî lê danî nîşane,*
*11 (1.9) Ya silt'an şêx Adî, ji deste te lavane.*
*12 Ya Ȓebî (Xwedê), qurbana vê biskê jêȓe qebûl bikî, heger gaye, û heger berane!*
*13 Hoz, hoz, bimbarek be! Pîroz!*

## 44. DUA'YA MAR BIRÎNÊ

Ji dema ku mirov ji hovîtiyê derbasî şaristaniyê dibe baweriyên olî û qanûnên wê jî pêş dik'evin. Ji bo ku di danûstandinên mirovan de, bi qencî û bi ȓûmet bimeşin ev tişt pêş k'etine. Ji bo neheqiya li ser jin û zilam ȓabe û civak paqijiya xwe bip'arêze, her civakekê li gorî baweriya xwe ȓêya zewacê daniye.
Beriya dema zewacê dawet tê kirin, pişt ȓe bûk û zave têne cem hev û sêx an jî pêşîmam tê ba wan, her weha du şahid jî tên; yek şahidê zave û yek jî yê bûkê. Sê caran ji wan tê pirsîn, hûn hev qebûl dikin an na. Eger bêjin erê dihayê li ser wan dibêjin. Eger bêjin na wan ji hev diqetînin. Di neamadebûna şêx an jî pêşîmam de, an p'îr an jî mirîdek jî mehr dikare were biȓî:

**şaxê — 1**[4162]
*Bi navê Ezdanî p'akî dil bi xêr, Ezdanê*[4163] *dil bi Ȓehim!*
*1 Bi navê Tawisî*[4164] *melek', ber pirsiyarê dîn û dîyanetê,*
*2 Li ba Xwedê, li ba Xwedê û careke din liba Xwedê, li ba Xwedê,*
*3 Yeke e'vd, yek misteheq*[4165] *li ser ȓêya ȓast,*
*4 Bi şehda şêx Şems, melek Fexredîn û melek şêx Ĥisin*[4166].
*5 Şukir ji teȓaye Xwedayê cîhanê.*
*6 Bi selamet li ser zîn, bi selamet li ser zîn.*
*7 Bi şah û ȓizgarî*[4167] *te, bi şah û ȓizaya min.*
*8 Mexdur li dîyarê Amîn, lê, lê, lê.*
*9 Mahr bi destê melek şêx Ĥesen pîroz be bi navê Ezdanê mezin!*

**şaxê — 2**[4168]
*Bi destûra Xwedê û Tawisî melek'!*
*1 Sibĥan*[4169] *ji wî ȓa*[4170] *yê jin û mêr dan!*
*2 Sibĥan ji wî ȓa yê nêr û mê dan!*
*3 Sibĥan ji wî ȓa yê Ȓoj û Heyv dan!*
*4 Ya Êzî, ya ezdayî!*
*5 Bi navê Xwedê, û bi qewate*[4171] *Xwedê,*
*6 Silav li ȓêberê me şêx Ĥesen ĥebîbê Xwedê,*
*7 Ȓêke t'emam, jinka*[4172] *gehayî,*
*8 Navê wê ..... filan, keĉa filanê.......,*
*9 Ji bona ...... filan, kuȓê filanê ……,*
*10 Bi ĥelalî, ĥelalî, ĥelalî!*

---

[4162] http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-d-03.htm; Xeribo (Ilyas) http://yeziden.de/forum/
[4163] *Ezdayê*
[4164] *Tausî*
[4165] *musteheq*
[4166] *Hisin*
[4167] *rizayiya*
[4168] http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
[4169] *siphan*
[4170] *wira*
[4171] *qewet*
[4172] binêr: *gihîştin*

*11 Nexta wê neh diram[4173] û niv zêr̂ê zer[4174],*
*12 Hûn şehde bin gelî şahidên amadê,*
*13 Li ser destê r̂êberê me şêx Ĥesen,*
*14 Qebûl kir û pê r̂azi bû,*
*15 Ĥezar carî bûyî destûra Xwedê mezin nabê!*

**şaxê — 3[4175] (zimanê e'rebî)**
*1 Bismîllaĥ R̂eĥmane R̂ehîm!*
*2 Ye R̂eĥmane, ye R̂eĥîm,*
*3 Malekê ya Medîn,*
*4 Yeke e'vd, yekî misteheqîn[4176],*
*5 Il- ĥemdillah[4177] ya R̂eb il-A'lemîn,*
*6 Ye selame ale[4178] zîn,*
*7 Ye selame tale zîn[4179],*
*8 Ehlî int'în, ehlî zîn,*
*9 Mex̂dûrî, eledarî, Amîn, lê, lê, lê!*
*10 Nekhe p'êx̂ember, fetha ya R̂eb il-A'lemîn!*

## DUA'YÊT ĤELALBÛN Û BEREK'ETÊ:

## 45. DUA'YA FITARA [4180]

*Ya R̂ebî, westana me li boşê nedî, xilmeta me qebûl bikî.*

## 46. DUA'YA SIFRÊ (XWERINÊ)

Bastirîn u civantirîn dua' li ser xwarinê dihête gotin, ewe ya Êzidîyêt Ermenistan u Corcistanê dibêjin ku bi vî r̂engê xware:

**şaxê — 1[4181; 4182]**
**S. 1** *1 Ya R̂ebî, tu Dayîmî, tu K'erîmî,*
*2 Tu R̂ehîmî, tu [Melikê] E'rşê E'zîmî,*
*3 Ji enzel da tu Qedîmî, ĥeftî û du miletî[4183] bêy r̂eĥmê.*

**S. 2** *1 Serê ser be'lgîya[4184],*
*2 Girtîyê ĥebsîya,*
*3 R̂êwîyê r̂êya,*
*4 K'esîf[4185], belengaz[4186] û êxsîra[4187], me jî pêra.*

---

4173 *xiram*
4174 *zor*
4175
4176 *mistheq*
4177 *Erhemdulla*
4178 *e le*
4179 *telezîn*
4180 [7] (r. 152)
4181 [2] (rr. 1039-1040); http://www.ezdi.info/attachments/svi...duwa_sifre.mp3
4182 Laliş 12 *DUA'YA SIFRÊ* (*ZADÎ*) (rr. 253-254)
4183 *millet*
4184 *balgî*
4185 binêr: *k'esîb*
4186 *belingaz*
4187 *hêxsîr*

**S. 3** *1 Hûn bi maş bin, bi berat' bin, bi xelat bin,*
*2 Bi kuȓ, û qîz, û mal, û dewlet bin,*
*3 Bi îman, û erk'an, û axret bin.*

**S. 4** *1 Xem nebe[4188], derd nebe,*
*2 R̂isqê[4189] we û hadêr-guhdêra kêm nebe,*
*3 Siwar bûye — p'eya nebe,*
*4 Ya dîtî — meȓûm nebe,*
*5 Şîn û şaya kêm nebe,*
*6 Ji dost û dijmina ȓa şermîn nebe,*
*7 Xanî bê derî nebe,*
*8 Mêr bê serî nebe,*
*9 Ĉiya bê kerî nebe,*
*10 Ava gelîya û kaniya ziha nebe,*
*11 Bi her bihuşt hebe,*
*13 Derê dojêh li we venebe,*
*14 Nan ji xezna Xwedê û şêx Adî be,*
*15 Hêvênî ji kaniya Sipî be,*
*16 Ew sifre ji sifrê Celîl be,*
*17 Berek'eta bi gotina Birahîm Xelîl be.*

*Em kêmin, Xwedê t'emame!*

**şaxê — 2 (zimanê e'rebî)** [4190]
*1 Il- ĥemdillah, il- ĥemdillah!*
*2 We ti'ana, we si'ana,*
*3 Mek'esana elal û we'dana,*
*4 Zelale tê feslê benî Adem*
*5 Kul li xelayî qelya*
*6 Sebir, qebir, micit Ellaĥ,*
*7 Ezdîd ȓesûl Ellaĥ!*
*8 Seyîdî se'eded[4191] ĥezretê R̂esûl,*
*9 Qurbane qebûl!*
*10 Sifrê Celîl,*
*11 Berek'et delîl[4192] Birahîm[4193] Xelîl.*
*12 Heçika daye ev te'm,*
*13 Cinet lê be cî û miqam,*
*14 Navê dik'irê silt'an Êzdîd da, e'lêk'ûm selam!*

**(zimanê k'urdî)** [4194]
*1 Erĥemdila, erĥemdila!*
*2 Met'ia'na, mesik'ana,*
*3 Mekesana,*
*4 E'lal wedane.*
*5 Ciblî beniyadem,*
*6 Xalqî yek Xuda,*
*7 Cineta bi nûr,*
*8 Minaz yek Xuda,*

---

4188 *neve*
4189 *ȓizq*
4190 [5] (стр 133)
4191 *seded*
4192 *xelîl*
4193 *Îbrahîm*
4194 [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *DI'A SIFRÊ (*гг. 110-111) T'ilbîs 2001
[5] (стр 133)

*9 Sebir, k'ebir,*
*10 Xalqî e'zîz Xuda,*
*11 Di'a qebûl,*
*12 Berek'etî cem ĥerçar melekê qedîm,*
*13 Bi şe'detî bî,*
*14 Ĥeĉa daye me te'm,*
*15 Dojê lê ĥeram,*
*16 Bihişt lê mik'an,*
*17 Nav-dik'irê EzdamêMezin,*
*18 Elêyîkim selam,*
*19 Qebûl be ev xêr,*
*20 Xêr bigîje ber destê xayî!*

*Di'a sifirê tê gotinê ser navê Ezdamê Mezin waxta xêrê didin bone ku xêr bê qebûl kirinê.*

**şaxê — 3**[4195]

*1 Şikir ji Xwedê, şikir ji Xwedê,*
*2 Yê ku xwerin da me,*
*3 Yê ku vexwerin da me,*
*4 Şikiryê ji Ezdayê mezin, yê ku bi t'enê.*
*5 Me bawerî heye bi qenciya te!*
*6 Ya kur̂ê Adem ji ĥemû mûxliqê din bêtir.*
*7 Ezda xwediyê vê xwerinê bes dar kir.*
*8 Ev xwerina bi da xwaziya Ezdayê mezin, amade bûye.*
*9 Yê ku her yekî bi heval dibîne dîsa Ezda bû û got: «R̂engê Xwedê pê wîstiya başiyê ye».*
*10 Başiya ku gehîşte dawiyê,*
*11 Beriyê, gor̂ê û malê ye.*
*12 K'î ser gote seyîda?!*
*13 Ser got nivîsayî hatîye xwandin.*
*14 Lê bela seyîdayê me, serê seyîdaye,*
*15 Dawiya seyîdaye,*
*16 Destpêke û her maye.*
*17 Qebûlî qûrban,*
*18 Meqbûl ya Xwed.*
*19 Sifrahî Celîl.*
*20 Berek'eta Ezdayê mezin û Birahîm*[4196] *Xelîl têde be,*
*21 Kêm nebe, xem nebe,*
*22 R̂isq*[4197] *û malê weyî zêde be.*
*23 Hencî dabû ev xwerin,*
*24 Bihuşt lê bibe war,*
*25 Doje yî lê bibe ĥeram.*
*26 Bi ĥimeta Xwedê û şêx Adî silamet lê be.*

**şaxê — 4**[4198]

*Bi destura Xwedé û Tawisî melek'!*

**S. 1** *1 Ya R̂ebî, tu*[4199] *K'erimî, tu Dayîmî,*
*2 Ji enzel de tu qedîmî.*
*3 Ĥeftî û du milet, ĥeyştê ĥezar mexluqat tu R̂ehîmî.*

**S. 2** *1 Bi maş bin, bi xelat bin, bi berat' bin,*

[4195] http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-d-04.htm
[4196] *Îbrahîm*
[4197] *riziq*
[4198] Feremez Xeribo *Qewl û beyt'ên êzidiyan yê pîroz* http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
[4199] *ti*

*2 Bi sehde bin, bi sihud bin,*
*3 Bi keç bin, bi kur bin,*
*4 Bi mal bin, bi dewlet bin,*
*5 Bi îman, û erkan, û axret bin,*
*6 Yê ev zad çêkirin.*

**S. 3** *1 Ya R̂ebî, tu bikê ev zad ji xezîna şêx Adî bê,*
*2 Havên ji kaniya Sipi bê,*
*3 Berek'et ji ba Xwedayê jorî bê,*
*4 Sifra bi destura melekê Celîl bê.*

**S. 4** *1 Ya R̂ebî, yê jêra çê bu ev te'm*[4200]*,*
*2 Bihuşt*[4201] *jêra bibê meqam,*
*3 Dojeh lê bibê ĥeram,*
*5 Em kêmin, Xwedê t'emam! Amîn!*

## 47. DUA'YA BERÎ QURBAN DAYÎNÊ[4202]

**(zimanê e'rebî)**
*1 Selam Alê!*
*2 Nazilê Alê,*
*3 Dua' ye R̂esûl,*
*4 Ellaĥ*[4203] *qebûl!*
*5 Minet — cinet,*
*6 Cinet ji nûr!*
*7 Qewlê int'în,*
*8 Ismê xint'în!*
*9 Îlaĥî qulbetê*[4204] *me cehûne,*
*10 Melikê menat elêk'ûm met'acehûne!*
*11 T'elqîneke dixûnim,*
*12 T'elqîne — Yasîne*[4205]*!*
*13 Şever̂eşe — me qenûne,*
*14 Ewlahî — mewlahî!*

## 48. DUA'– DIR̂OZINGA ÊZDIYA SER NONÊ XÊRÊ[4206] (QURBAN DAYÎNÊ)

*1 Xwedê bidî k'iryametê,*
*2 K'erema xwe, qelema qudretê,*
*3 P'ir̂ kî r̂isq*[4207] *û berek'etê,*
*4 E'rdê çêkî cinetê,*
*5 Hildî k'ubarî û zinetê!*
*6 Me bikî maşoqê xwe ĥezretê,*
*7 Ya dinê û ya axretê!*

---

[4200] *teham*
[4201] *beheşt*
[4202] [5] (стр. 132) М.Б. Руденко *Курдская обрядовая поэзия*.
[4203] *Allah*
[4204] binêr: *qible*
[4205] *asîn*
[4206] http://www.ezdixandi.com/forum/38-973-1
[4207] *r̂izq*

8 *Sifrê t'ijî kî bi naz–ne'metê,*
9 *Qebûl kî xêr–xêratê,*
10 *Qurbanê ber mêr, milyak'etê,*
11 *Ber te dikin dua', ibadetê!*
12 *Ji me vekî dergê ȟeqîqetê,*
13 *Me dûrxî ji pişka şile'tê!*
14 *Me kêm kir, Tu zêde kî ȓisqetê,*
15 *Ȓeȟmê bidî vê cimae'tê*[4208]*,*
16 *Mal–mezelê em têda!*
17 *Qebûl be xêr! (Qebûl be qurban)!*
18 *Eva nan–ava dua' kirî bi navê Xwedê û Tawisîmelek'!*

## DUA'YÊT SILAMETIYA HATIN Û ÇÛYÎNÊ:

## 49. DUA' JI MAL DERK'EFTINÊ

**şaxê — 1**

*Ya Xwedayê minî mezinî!*
*Tu bînaya çavê minî*
*Tawûsî Melek îmana minî*
*Şêşems tu mesefê minî.*
*Ya navê Xweda!*
*Navê ezîz Xweda!*
*Ya navê Şêşems*
*Tawûsî Melek*
*Vê sibê bînin,*
*Xatirê navê xwe bikin.*
*Kîjan xêre, hûn wê bikin,*
*Ya xwe bikin,*
*Ya evda nekin!*
*Serê min*
*Qurbana navê xwe kin!*
*Ya navê Xwedê!*
*Tawûsî Melek*
*Şêşems*
*Xatira navê xwe kin,*
*Xwedê bira rema te lê zêde be*
*Sêşems, bira li dine edilayî be.*
*Tawûsî Melek tu remekî bavêjî*
*Dilê wan kafir û Kafirstanîyê.*
*Bira miletê me,*
*Dînê me,*
*Welatê me,*
*Lalişa meyî Nûranî !*
*Bêne remê,*
*Dergê xêrê,*
*Rîya rastîyê,*
*Ser meda vekî.*

[4208] binêr: *cemae't*

*Tifaqê û xîretê*
*Nav meda qawîn û qedîm kî.*
*Em derkebine fireqetîyê*
*Em bikin hereket,*
*Hûn me bikin xêr û bereket.*
*Ya nave Xwedayê mezin!*
*Tawûsî Melek*
*Sêşems*
*Xatira nave xwe bikin,*
*Xatira nave Lalişa Nûranî bikin.*
*Xatira nave Êzdîxanê,*
*Çûk û mezin*
*Heq û neheq.*
*Rica we ez dikim*
*Derîyê xêrê,*
*Rîya rastîyê,*
*Ser min da vekin*
*Rê û mecalê bidin!*
*Ez layîqî*
*Qulxayî miletê we,*
*Dinê we!*
*Lalişa nûranî*
*Wê sibê*
*Serê xwe qurbana nave we dikim.*
*Ya Xwedayê mezin!*
*Tû bînaya cave minî*
*Şêşems tu xayê minî*
*Tawûsî Melek îmana minî*
*Amîn! Amîn!*
*Qulbeta Nasredîn*
*Qawedîn, bav me dîn,*
*Melek Ferxedîn,*
*Nasredîn!*
*Ezîz Xweda!*
*Şêşems! Tawûsî Melek hûn*
*Bêne Hewara me û dîn.*
*Ya nave Xweda!*
*Vê sibê,*
*Ji mal der têm,*
*Xêrêvim, ne şeravim*
*Karêvim ne zîyanêvim.*
*Tu min durû, qeda û bela,*
*Hepsa û kela,*
*Ne paka, bêxîreta,*
*Nemama û boxdanbêja,*
*Bênamûs û xayîna*
*Xayîkî!*
*Serê min*
*Qurbana navê xwe bikin!*
*Ya navê Xweda!*
*Navê Şêşems, Tawûsî Melek!*
*Herçê şaşî û gunê min kirine*

*Min biborînin!*
*Pêsîra min dakşînin*
*Tu cara min newaklînin.*
*Mêrê siba Ezîz!*
*Tu serda şedayî*
*Xudayê min!*
*Hertim tu min bîr,*
*Hewara min,*
*Her heft Melekên te yê*
*Kawe kubîr!*
*Vê sibê ji we hêvî dikim*
*Sehet û qevatê,*
*Fem û firsatê,*
*Îman û oxiretê,*
*Xêrê û bereketê.*
*Ya Şêşems!*
*Xudayê min!*
*Tu gewirîyê qul*
*Bê risq nehêlî,*
*Şêşems!*
*Tu risqekî min û hûrikara*
*Verêkî!*
*Tawûsî Melek!*
*Tu çerxa min û zara rastkî.*
*Ya navê Xudayê mezin!*
*Amîn, Amîn!*
*Qulbeta Nesredîn*
*Çîyayê Şengalê*
*Lalişa Nûranî*
*Qubildore!*
*Vê sibê*
*Hewara min*
*Êzdayê meyî jorê*
*Vê sibê bêne*
*Hewara girtîyê hefsa,*
*Birçîyê nefsala,*
*Serê ser belgîyê,*
*Revîyên serê rîya!*
*Ya navê Xweda!*
*Navê Tawûsî Melek,*
*Şêşems,*
*Xefûrê serê rîya,*
*Şêxalê Şemsa*
*Pîra Fat*
*Vê sibê*
*Ji mal der têm*
*Oxirê ji we dixwezim!*
*Kîjan xêre hûn wê bikin,*
*Ya Evda mekin*

**S. 1** *1 Ya navê Xwedê, navê E'zîz xwe da, navê Tawisî melek', navê şêx Şems!*
*2 Vê sibê bi xatirê navê xwe, k'îjan xêre, hûn wê bikin,*
*3 Ya xwe bikin, ya e'vda nekin, serê min qurbana navê xwe kin!*

**S. 2** *1 Ya navê Xwedê, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Ya Xwedayê minî mezin — tu bînaya çavê minî,*
*3 Tawisî melek' — tu îmana minî,*
*4 Şêşems — tu mesebê minî!*

**S. 3** *1 Ya navê Xwedê, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Xwedêo, bira k'erema te li me zêde be,*
*3 Tawisî melek' bira li dinê e'dilayî be,*
*4 Şêx Şems, tu r̂eĥmekî bavêjî dilê wan k'afira û K'afirstanîyê.*

**S. 4** *1 Ya navê Xwedê, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Şêx Alê Şemsa — ẍefûrê serê r̂êya, p'îr Afat — ĉarka meye.*
*3 Dergê xêrê ser meda vekin, r̂îya r̂astîyê û mecalê bidin!*
*4 Bira miletê me, dînê me, welatê me, Lalişa meyî Nûranî bêne r̂eĥmê.*

**S. 5** *1 Ya navê Xwedê, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 T'ifaqê û xîretê nav meda qewîn û qedîm kin.*
*3 Em bibin herek'et, em derk'evine firêqetîyê, hûn me bi xêr û berek'et kin.*

**S. 6** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Bi xatira navê Êzdîxanê, ĉûk û mezin, ĥeq û neĥeq, r̂ica we ez* dikim.
*3 Ez layîqim qulixayî miletê we, dînê we, Lalişa nûranî,*
*4 Wê sibê serê xwe qurbana navê we dikim.*

**S. 7** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Vê sibê verin hewara girtîyê hebsa, birçîyê nefsala, serê ser belgîyê, r̂êvîyên serê rîya.*
*3 Amîn! Amîn! Amîn! Bi hurmetê Şemsedîn, Fexredîn, Nasirdîn, Sicadîn, şêx Sîn, şêxû Bek'ir, Qadirê R̂eĥman!*

**S. 8** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Hûn min durkin ji qeda û bela, ji ĥepsa û kela,*
*3 Ji nepaka, bêxîreta, ji nemama û buxtanbêja, ji bênamûsa û xayîna xayîkin!*
*4 Serê min qurbana navê xwe kin!*

**S. 9** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Herçê şaşî û gunê min kirine — min biborînin!*
*3 P'êsîra min dak'şînin, t'u cara min newaklînin.*
*4 Mêrê siba e'zîz, tu serda şehdayî ber Xwedayê min!*

**S. 10** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Ya Xwedayê min, tu gewrîyê qul bê r̂isq nehêlî,*
*3 Tawisî melek', tu çerxa min û zara r̂astkî.*
*4 Şêx Şems, tu r̂isqekî min û hûrikara verêkî!*

**S. 11** *1 Ya navê Xwedayê mezin, navê E'zîz xwe da, hert'im tu min bîr,*
*2 Hewara min her heft melekên te yê k'awî k'ibîr!*
*3 Vê sibê ji te hêvî dikim sehet û qevatê, fem û ferasetê, îman û axiretê, xêrê û berek'etê.*

**S. 12** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, boy xatira navê xwe kin!*
*2 Ĉiyayê Mişetê, ĉiyayê Ĥizretê, ĉiyayê E'refatê, Lalişa Nûranî, qulbeta Nesredîn, qubet* il-Bidore!
*3 Vê sibê hewara min Êzdayê meyî jorê.*

*4 Amîn, Amîn, Amîn! E'zîz Xweda, şêx Şems, Tawisî melek' hûn bêne hewara me û dîn.*

**S. 13** *1 Ya navê Xwedayê mezin, Tawisî melek', şêx Şems, hûn ya xwê bikin, ya e'vda nekin!*
*2 Vê sibê ji mal der têm, xêrêvim — ne şeravim, k'arêvim — ne zîyanêvim,*
*3 Vê sibê ji mal der têm, oxirê ji we dixwezim!*

## 50. DUA'YA OẌIRÊ[4209; 4210]

Dema ku kesekî êzîdî dibe r̂êwî û seferê dike, vê dua'yê ji Xwedê, xas û qelenderan r̂e dike, daku ew wî/ wê, ji qeda û belayê bip'arêzin.

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Çi sibeyek hoye k'ubare,*
*2 Derê bihuştê[4211] li ber min vebû, herçar yara,*
*3 Ez çûme silavî biranû yara.*

> **S. 1** *1 Çi sibeyek hoye k'ubare,*
> *2 Derê Bihustê li ber min vebû,*
> *3 Herçar yara.*

**S. 2** *1 Min silav li yarû biran[4212] kirî,*
*2 Horî hatin û bihurîn[4213],*
*3 Qintar û qewşen ji hev kirî.*

> **S. 2** *1 Min silav li yarû biran kirî,*
> *2 Horî hatin û bihurîn,*
> *3 Zintar û qewşên ji hev kirî.*

**S. 3** *1 Çome ser r̂êya ĥeqîyê,*
*2 Xam û înk'ar, leng û berleng pêşîyê,*
*3 Banga mine Xwedê û melekê ber K'ursîye.*

> **S. 3** *1 Çûme ser r̂êya[4214] ĥeqî,*
> *2 Xam û înk'ar leng û berleng pêşîyê,*
> *3 Banga min e xwedê û melekê ber K'ursîyê.*

**S. 4** *1 R̂êya ĥeqiyê qendîla t'ijî xêr, û berek'et, û nûre,*
*2 Banga mine Xwedê û melekê Ẍefûre.*

> **S. 4** *1 Rêya ĥeqiyê qendîla t'ijî xêr, û berek'et, û nûre,*
> *2 Banga mine Xedê û melekê Ẍefûre.*

**S. 5** *1 R̂êya ĥeqîyê — ẍefûrê r̂êye,*
*2 Heke ĉiyaye (deşte) û heke berîye,*
*3 Destê me li dang û damana şêxê Adî û melik şêx Sinê[4215] Adîya,*
*4 Em bi saẍ û silametî ji van ciya biçine wan ciya,*
*5 Em bi saẍ û silametî ji wan ciya bêyîne van ciya.*

> **S. 5** *1 Rêya ĥeqî — ẍefûrê r̂êye,*
> *2 Heke ĉiya ye û heke berîye,*
> *3 Destê me li dang û damana şêx Adî û melek şêx Sinê Adiya,*
> *4 Em bi saxî û silametî ji van ciya biçine wan ciya.*

---

4209 [2] (rr. 1041-1042)
4210 http://www.ezdixandi.com/forum/38-305-1; http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-d-01.htm
4211 *behuşt*
4212 *yar û biran*
4213 *buhirîn*
4214 *riya*
4215 *Sêxsin*

**S. 6** *1 Banga min şêx Şemsê[4216] T'et'ere,*
*2 Li ber sekinîn ĥeftî ĥezar xas û qelender[e],*
*3 K'ember best, xerqe r̂eş, hile zer[e],*
*4 Li vê seferê, li vê oẍirê,*
*5 Tu li min û hevalê min, bikî xêr her û her[e].*

**S. 6** *1 Banga min şêx Şemsê babzêr̂e,*
*2 Li ber sekinîn ĥeftê ĥezar xas û qelendere,*
*3 Kember best[4217] xerq[e] [r̂eş] hile zere,*
*4 Li vê seferê, li vê oxirê,*
*5 Tu li min û hevalê min bike xêr her û here.*

**S. 7** *1 Ya silt'an Êzîd, p'erda te li ber me bit,*
*2 Ya p'îr Afat, ĉarka teye li me werkirî bit.*

**S. 7** *1 Ya Sêsims, tu meferî,*
*2 Ya Tawisî melek', tu îmana minî,*
*3 Ya melek Fexredîn, tu rêberî*
*4 Ya xaliqê minî her û herî,*
*5 Em dua'yê[4218] bikin li ber p'îrê k'ar û ẍefûrê[4219] r̂êya,*
*6 Li me, hazir û guhdaran li ĥemû wexta û ĥemû deran.*

**S. 8** *1 Ya derwêş li e'rd, bi saẍî ez amanetê[4220] teme,*
*2 Bi destûrî şêx Adî, melik şêx Sin û ẍefûrê r̂êye.*

Du'aya oxirê li cem hindek mirovan li sebeqa (5,6) êda wisa tête gotin:

**S. 5** *1 R̂êya ĥeqîyê — ẍefûrê[4221] r̂êye,*
*2 Heger deşte, heger berîye,*
*3 Min ji şêx Şems hîvîye,*
*4 Silametî li bêxêrê, min ji van ciya bibite wan cîye.*

**S. 6** *1 R̂êya ĥeqî melik şêx Sine,*
*2 Ẍefûrê r̂êyane,*
*3 Heger deşte û heger zozane,*
*4 Şêx Şems û melik şêx Sin bo min bêt hane,*
*5 Silametî li bêxêrê min, ji wan ciya bînite van ciyane.*

## DUA'YÊT LI SER MIRÎYAN

## 51. DUA'YA DI SER GÎYANÊ MIRÎ[4222]

**S. 1** *1 Ya Xwedê, her tûyî, û her tû yê heyî, û her dê hebî!*
*2 Ya Xwedê ne tû ji kesî û ne kes ji teye!*

**S. 2** *1 Êk firwarî, bê şirîkî, bê hevalî!*
*2 Ya Xwedê, te ne wek'île, û ne k'efîle,*
*3 Tû wê li gel ĥemû dem, û ĥeyam, û bedîle.*

---

[4216] *Şêşems*
[4217] *Kemberdest*
[4218] *duha*
[4219] *xafûr*
[4220] *êmanet*
[4221] *xefîr*
[4222] http://www.ezdixandi.com/forum/38-308-1

**S. 3** *1 Ya Xwedê, tû dişkînî û tû dicebirînî,*
*2 Tû beĥrêt giran dimeyînî,*
*3 Vê dinyayê bi k'ar tînî,*
*4 Vî e'zmanî bê stûn řadwestînî,*
*5 Tû bo me meseb û dînî.*

**S. 4** *1 Sed xwezma bi wî gîyanê bideyê û jê nestînî,*
*2 Dê bi zor dereca gehînî,*
*3 Tû vî mirî biřeĥmînî.*

*Em di kêmin, Xwedê yî ťemame!*

## 52. DUA'YA T'ESMÎLÎ E'RD

**şaxê — 1**[4223]

*1 T'eslîmî t'eslîma te,*
*2 T'esmîlî derwêş E'rd.*
*3 Ya derwêş E'rd,*
*4 Evî e'vdî herge jine, herge mêre bix̌efirînî, bisit'irînî,*
*5 Sahibekî řihê wî (wê) bikî,*
*6 Berxê [k'oza] Êzdîda,*
*7 T'oqe Tawisî*[4224] *melek' stuyê wî dane.*
*8 Benî*[4225] *Adem wê bêne ser te Neke û Menkîne,*
*9 Pirs kin: «Xwedê te k'îye?»*
*10 Bê: «Xwedêyê min ez da Xwede,*
*11 Xwedêyê ĥişîyar û mestane,*
*12 Xwedêyê çol û bestane,*
*13 Xwedêyê ĥemû xwedane,*
*14 E'vd*[4226] *û benî nizane,*
*15 Ew Xaliqê mewl û mewîye,*
*16 Bê çendere, bê gunaye*[4227]*,*
*17 Ew ne bîne, ne jî baye,*
*18 Ew ne ewsîye, ne nefsîye,*
*19 Ĥeft xazila min wî nefsî,*
*20 Ewî řehim lê pirsî,*
*21 Weke e'melê te, řeĥma Xwedê li te be!*

**şaxê — 2**[4228]

*1 T'eslîmî t'eslîmatê,*
*2 T'eslîmî derwêşê E'rd,*
*3 Ya derwêş E'rd,*
*4 Bix̌efirînî, bisit'irînî,*
*5 Sehabê řuĥê wî bikî,*
*6 Berxa Êzîda*[4229]*,*
*7 T'oqa Tawis melek'*[4230] *istiyê wî dane,*
*8 T'oqa silt'an Êzîd istiyê wî dane.*

---

[4223] [5] (стр 132)
[4224] *Tawûs*
[4225] *benê*
[4226] *e'wd*
[4227] binêr: *gunah*
[4228] [31] *Dua' t'esmîlî li e'rdê* - 2 (p. 23)
[4229] *Êzdîd*
[4230] *Melek*

**şaxê — 3**[4231]

*1 Eṣed — ĥeq, meṣed — ĥeq,*
*2 Nar — ĥeq, nûr — ĥeq,*
*3 Xwedê — ĥeq, ĥeqil — ĥeq,*
*4 E'rdê derwêş Adem,*
*5 Êzdîo, tu bexê silt'an Êzîdî,*
*6 Xwedê sitariye dua' r̂uĥê*[4232] *te bike.*

**şaxê — 4**[4233]

*1 Ya R̂ebî Ĥeq,*
*2 Nûrê — ĥeq, narê — ĥeq,*
*3 Doja — ĥeq, bihuṣta*[4234] *— ĥeq,*
*4 Mêzîna — ĥeq, t'erazû — ĥeq,*
*5 Cineta — ĥeq, cehnima — ĥeq,*
*6 Ĥeq bi ĥeq.*
*7 Ya R̂ebî, te eva benda,*
*8 Te t'unebû da, hebûn bir.*
*9 Xwedêo tu xwedêtîyê lê bikî,*
*10 Şêx Sin*[4235] *tu qazîtîyê lê bikî,*
*11 Sexû Bek'ir*[4236] *tu xwedantîyê lê bikî.*
*12 Ya dewreṣî E'rd,*
*13 T'esmîlî te ev e'vd,*
*14 Bira tu r̂uĥê vî mirî bir̂eĥmînî.*

**şaxê — 5** [4237]

*1 Ya derwêş E'rd,*
*2 T'esmilî te ev e'vd.*
*3 Te t'unebûn da, hebûn bir.*
*4 Nûre — ĥeq, nare — ĥeq,*
*5 T'erazû — ĥeq,*
*6 Ĥeq bi ĥeq.*

**şaxê — 6** [4238]

*1 E'rd heq,*
*2 Ĥeqil heq,*
*3 E'zman heq,*
*4 Ĥeqil heq,*
*5 T'erezû heq,*
*6 Ĥeqil heq,*
*7 Mêzîn heq*
*8 Ĥeqil heq.*

*«Bandê, neheqiya te dest heqiya te da bibetle. Tu herî dîndara mîrê xa şabî, ser dînê êzdîtiyê, şêx û p'îr û hastayî û merebî, silavk'êşê kaniya Sipî. T'esmîlî dewrêşî e'rd. Qasî e'melê te r̂eme*

---

[4231] [31] *T'esmîlî li e'rdê* (p. 23)
[4232] *riĥ*
[4233] Vardan Voskanian *IRAN & CAUCASUS,* vol. 3-4, 1999-2000, (pp. 159-166) (şêx K 'elaṣê Mîrzo)
[4234] *bihoşt*
[4235] *Sîxisin*
[4236] *Sexûbek'ir*
[4237] Vardan Voskanian IRAN & CAUCASUS, vol. 3-4, 1999-2000, (pp. 159-166) (şêx H'esenê Me'mûd и şêx Cesimê E'gît)
[4238] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *DI'A T'ESMÎLÎ E'RD (*r. 120) T'ilbîs 2001

*te be!»*

## 53. DUA'YA SILAVA ZEHMANÎ[4239] (TELQÎN)

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Ji qewlê şêx Fexrê ĥeqî,*
*2 Eve bû r̂êya mirîdî bi ĥeqî,*
*3 Ya R̂ebî, tuyî Dayîmî tuyî Baqî.*

**S. 2** *1 K'erem ken, deng hilînin,*
*2 T'elqînê li ser min bixwînin,*
*3 Navê Êzî û Tawisî melek' li ser min bînin.*

**S. 3** *1 Xerqe ji K'afa, Nûnê,*
*2 Şerie' ji qanûnê,*
*3 Dimdim ji gava bûnê.*

**S. 4** *1 Şêx û p'îr, û hosta, û merebî, û yarû birêt axretê,*
*2 We fere li me sinetê,*
*3 Wekî li bindara zincat'opê digirin t'erîqetê.*

**S. 5** *1 Her k'î, yê li pê fikra şe'rîe'tê,*
*2 Bar tê nebit li qatê,*
*3 Li ser p'ira Selatê.*

**S. 6** *1 Wekî melik şêx Sin r̂utnêt li ser berê eresatê,*
*2 Li şêxa, li p'îra, li mirîda, li hazir û guhdêra diket şefae'tê*[4240],
*3 Min dîn û îman ji wê dihatê.*

**S. 7** *1 R̂oja îd û E'refatê,*
*2 Ĥezar r̂eĥmêt Xwedê li vî mirî, li vî goristanî, li gel vî civatê,*
*3 Xwedanê k'eremê cêşêt gelîyê Lalişê meded di ĥolê me û sinetê*[4241].

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

## 54. FATĤE[4242]

Li dema hilanîna darbestê û li ser gor̂ê ev lave tê gotin:

**zimanê e'rebî:**
*1 Amîn! Amîn! Amîn!*
*2 T'ebarek Ellaĥû il-dîn*[4243],
*3 Ellaĥû eĥsen û mîn kull xaliqîn*
*4 Ĥimeta me Şemsedîn, Fexredîn, Nasirdîn, Sicadîn, Amadîn, Babadîn,*
*5 Şêx Şemse qewata dîn,*

---
[4239] [52] (rr. 359-360)
[4240] *şifat*
[4241] *sunet*
[4242] [7] (r. 152-153) Dr. Mihemed. E. Elî *Êzdî û Êzdiyetî*
[4243] *idîn*

*6 Melek'î Tawis t'ac ji il-e'wilîn ĥeta axirîn,*
*7 Xêra bide, şer̂a wergeȓîn,*
*8 Ĥeq il-ĥemdillah R̂eb il-A'lemîn,*
*9 Şehda dînê min yek Ellaĥ,*
*10 Melik şêx Sin ĥeq ĥebîb Ellaĥ.*

Ev lava jêrîn jî li ser mirî, yan gava mirov di ber mezelekê, pîrozgehekê û tiştên mîna wan re diçe, tê gotin:
Li p'iraniya caran, doşekek ji pembî di binê goȓê de radixin û mirî li ser piştê li ser dirêj dikin, serê wî li ȓoava û ȓûyê wî berva ezmên bi hêla ȓohilat de berva ȓojê dikin. Paşê, piştî ku mirî binax dibe, Şêx li ber serê wî disekine, berê xwe bi ȓohilat ve dike, xwe p'êxas dike, destê xwe datîne ser sîngê xwe û Qewla Saremergê ya T'elqînê dibêje. Li dawîhatina t'elqînê, şênî jî Fatihê dibêjin.
Laveke taybet ji boneya mirinê heye tê gotin, Êzdî kane wê li ber mezel, pîrozgeh û li cih û li boneyên wek wan bêje, ew jî eve:

*1 Ĥeq tu Xwedayî,*
*2 Xwedanê Mor û Mayî*[4244]*,*
*3 Ya R̂ebî, kes ne ji te, û tu ne ji kesayî,*
*4 Ya R̂ebî, tu layîqî medhayî,*
*5 Kes nizane tu çawayî,*
*6 Kes nizane tu çi lewnî, çi ȓengî,*
*7 Kes nizane tu çi sewtî, çi dengî.*
*8 Ya R̂ebî, tu R̂eĥîmî!*
*9 Xaliqê ji enzel da, tu Qedîmî.*
*10 Li vê dinê tu k'ar tînî,*
*11 Vî e'zmanî, vê stun[ê] ȓadiwestînî,*
*12 Li ĥemû derda tu ĥekîmî.*
*13 Sed xwaziya wî, ȓuĥî tu bidî jê nestînî,*
*14 Zor derecan digihînî,*
*15 Tu bi ȓeĥma xweye Xwedê, tu me biȓeĥmînî.*

Piştî veşartina mirî, şêx li hersê ȓojên serxweşkirinê li ba mala mirî dimîne, li civata serxweşkirinê ȓûdine û li ser mijarên ol û dinyayê daxive. Li ȓoja ĥeftê ji mirinê, ĥeftek tê kirin, piştî xwerinê şêx laveya sivrê dibêje, û bi wê yekê rê û resmên mirinê digihên dawiya xwe.
Goȓên Êzdiyan ji yên Mislimanan netên naskirin, t'enê li ser gorên êzdiyan Ayetên Qura'nê û laveyên Mislimantiyê netên nivîsandin. Li van salên dawîn, hin nivîsar li ser goȓên Êzdiyan tên neqşandin, wek:
((Şêx Mend — şêxê mine, şêx Bek'ir — mirebiyê mine, Esnalka — p'îrê mine)). ((Şihada dînê min — yek Ellaĥ, melek Şêxesen — ĥeq ĥebîb Ellaĥ))...

[4244] binêr: *mihr û meh*

# VI. Şehda dînî

Berî mirovê êzidî r̂azê, serê xwe danê ser be'lgîyê, ji tirsa mirinê, canê xwe ĥelal dike, sehda xwe dide, dibêje:

# DUA'YA ŞEHDA DÎNÎ

**şaxê — 1**[4245]

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Xwedê her ewe, her ewe!*
*2 Ne xwarine û ne xewe,*
*3 Şehda dînê min bi navê Xwedê û Tawisî melek' dibit r̂ewa.*

**S. 2** *1 Şehda dînê min — êk Ellaĥ,*
*2 Melik şêx Sin — ĥeq ĥebîb Ellaĥ,*
*3 Meqlûbe û mergeh — sela.*

**S. 3** *1 Silavê me li Lalişê, Meqlûbî mergehê,*
*2 Cotêt quba, li wî e'rdî, e'rdê êzdîxanê ser dik'şîne ber şêx Adî ibadetê*[4246] *û sicûdehê.*

**S. 4** *1 Silt'an Êzî — P'adşê mine,*
*2 Tawisî melek' — şehde û îmanêt mine,*
*3 Kaniya Sipî — mora mine,*
*4 K'af, û mix̂ar, û Zimzim — ĥeca mine,*
*5 Qubet il-Bidor — qubleta mine,*
*6 Silt'an şêx Adî — P'adşayê mine,*
*7 Şêx Şems*[4247] *— mesebê mine, bînaya çawêt mine.*

**S. 5** *1 ……….. — p'îrê mine,*
*2 ……….. — şêxê mine,*
*3 ……….. — merebiyê mine,*
*4 ……….. — xwedanê mine.*

**S. 6** *1 Il- ĥemdillah ji Adîya,*
*2 Vavartîn ji k'afir û r̂afidiya,*
*3 Em havêtîne ser pişka sinîya.*

**S. 7** *1 Minetk'arîn ji mîra,*
*2 Vavartîn ji k'afira û xenzîra,*
*3 Em havêtîne ser pişka şêxan û p'îra.*

**S. 8** *1 Minetk'arîn ji minetê,*
*3 Vavartîn ji k'afira, ji şe'rîe'tê,*
*4 Em havêtîne ser pişka şêxê sinetê.*

**S. 9** *1 Heke Xwedê kir êzdîne,*
*2 Ser navê silt'an Êzîne.*
*3 Em bi ol û erk'anêt xwe di r̂azîne!*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emam!*

[4245] [52] (rr. 331-332); Feremez Xeribo Qewl û beyt'ên êzidiyan yê piroz http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
[4246] *ebadet*
[4247] *Şê Şims*

**şaxê — 2**[4248]

**S. 1** *1 Şehda dînê min yek Ellaĥ!*
*2 Melik şêx Sin ĥeq ĥebîb Ellaĥ!*
*3 Meqlubû mergeh sela.*
*4 Silavêt mêra li Lalişê, Meqlubî, berî me*[4249] *cotêt quba li wî e'rdî, e'rdê êzdîdxane ser dik'êşîne ber şêx Adî, ibadetê*[4250]*, sicûdehe.*

**S. 2** *1 Silt'an şêx Adî — P'adşê mine,*
*2 Şêxû Bek'ir — mewlayê mine,*
*3 Silt'an Êzî — P'adşê mine,*
*4 …………… — p'îrê mine,*
*5 …………… — merebiyê mine,*
*6 Tawisî melek' — şehde û îmanêt mine,*
*7 Kaniya Sipî mora mine,*
*8 K'af, û mix̆ar*[4251]*, û Zimzim — ĥeca mine,*
*9 Qubet il-Bidor — qubleta mine,*
*10 Melik şêx Sin — baxoyê mine,*
*11 Şêx Musê Sor — xwedanê mine,*
*12 Şêx Şems — mesebê mine, bînaya cavêt mine.*

**S. 3** *1 Il- ĥemdillah [minetk'arîn] ji Adîya,*
*2 Vavartîn ji k'afira, ji r̂afidiya,*
*3 Em havêtîne ser pişka siniya.*

**S. 4** *1 Minetk'arîn ji mîra,*
*4 Vavartîn ji k'afira, ji xenzîra,*
*5 Em havêtîne ser pişka şêx û p'îra.*

**S. 5** *1 Minetk'arîn ji minetê,*
*5 Vavartîn ji k'afira, ji şire'tê,*
*6 Havêtîne ser pişka şêxê sinetê.*

**S. 6** *1 Heke Xwedê kir êzdîne,*
*2 Ser navê silt'an Êzîne.*
*3 Şikir em bi ol û t'erîqetêt xwe di r̂azîne.*

**şaxê — 3**[4252]

*Bi destûrî Xwedê!*

**S. 1** *1 Her ewe, û her ewe,*
*2 Ne xwerine, û ne xeve!*
*3 Şehda dînê min bi navê Xwedê dibit r̂ewa!*

**S. 2** *1 Şehda dînê min yek Ellaĥ!*
*2 Melik şêx Sin ĥeq ĥebîb Ellaĥ!*
*3 Meqlûbû mergeha sela,*
*4 Silavêt*[4253] *me li Lalişê, Meqlûbê mergehê, cotêt quba, li wî e'rdî, e'rdê êzdîxanê ser dik'êşite ber şêx Adî ibadetê*[4254] *û sicûdahê.*

---

[4248] [1] (pp 988-989) [3] (rr 226-229) Zincîra belavokên Bingeha Êzidîyan li Dervey Welat. Jimare 1, hindek *Du'a u Dirozên Êzidîyan* berhevkirin u vekolîna Dr. Xelîl Cindî, Einbeck 1997 http://www.kaniya-sipi.de/kurdish/diwa%20u%20dirozen%20ezidiyan-1.pdf
[4249] *birî meh*
[4250] *ebadet*
[4251] *mixar*
[4252] "*Perwerda Êzidyatî*". Pûla çarê binaretî. Çapxanayî Dilêr- Slêmanî. Sal 2011. Wana nehê (Rû: 29-31) ŞEHDA DÎNÎ из учебника для начальных классов (4 класс). Издательство Дилер-Сулеймания. Перевод с арабской графики на латиницу Карама Анкоси
[4253] *selav*
[4254] *ebadet*

**S. 3** *1 Silt'an Êzîd — P'adşê mine,*
*2 Kaniya Sipî — mora mine,*
*3 Qubet il--Bidor — qubleta mine,*
*4 Silt'an şêx Adî — P'aşayê mine,*
*5 Şêx Şems — mesebê mine, bînaya çawêt mine,*
*6 ………… — p'îrê mine,*
*7 ………… — şêxê mine,*
*8 ………… — merebiyê mine,*
*9 ………… — xwedanê mine,*

**S. 4** *1 Il-ĥemdillah ji Adîya!*
*2 Vavartîn[4255] ji k'afir û r̂afidiya,*
*3 Em hawêtine ser pişka siniya.*

**S. 5** *1 Minetk'arîn ji mîra,*
*2 Vavartîn ji k'afir û xenzîra,*
*3 Em hawêtîne ser pişka şexan û p'îran.*

**S. 6** *1 Minetk'arîn ji minetê,*
*2 Vavartîn ji k'afira ji şire'tê,*
*3 Em hawêtîne ser pişka şêxê sinetê.*

**S. 7** *1 Heger Xwedê kir êzdîne,*
*2 Ser navê silt'an Êzîne[4256],*
*3 Em bi ol û erk'anêt xwe[4257] di r̂azîne.*

**şaxê — 4**[4258; 4259]

**S. 1** *1 Serê min ser be'lgî,*
*2 Be'lgîyê min Berê Şibakê,*
*3 Sêrî çûme zikakê,*
*4 Bidî xatira Êzdî û makê.*

**S. 2** *1 Serê min qublet, berê min r̂ohilat,*
*2 Ser min r̂a sekinî[n] du celat,*
*3 Go: «Miskîno, Tajdîno, benîo, şehda dînê xwe bîne, ezê serê te hilînim».*

**S. 3** *1 Go: «Şehda dînê min — yek Ellaĥ!*
*2 Melik şêx Sin ĥebîb Ellaĥ!*
*3 Mergehê Meqlûbê sela.*
*4 Comayê[4260], Binîmayê, ciyê Şerq û Şam êzdîxane lê dike sicûdeyê,*
*5 Sicûda me diçe bal şêx Adî, şêx Adî r̂edayê.*

**S. 4** *1 Şêx Şems — melikê mêrayê,*
*2 Şêx Adî — ser K'ursîy westayê,*
*3 Şehda dînê xwe ĥeq bi navê Êzîd dayê,*

**S. 5** *1 Sinîme, sine nebîyme.*
*2 Bi şêx, p'îr, hosta, merebî, yarû birê axretême,*
*3 Mirîdê şêxê Adî me,*

---

[4255] *wawartîn*
[4256] binêr: *Êzîd*
[4257] *xo*
[4258] *Şehda dînî* http://www.ezidi-russia.ru/; http://yeziden.de/forum/board25-civata-bi-kurd/board49-qewl-beyt-d-hay-n-z-diyan/1186-ehda-d-n/
[4259] [29] *Şehdetîya dînê êzdîya* (r. 377) (№ 1694)
[4260] *Selayê*

*4 Silavk'êşê kaniya Sipîme,*
*5 Bi qelema melik şêx Sin nivîsîme,*
*6 Il-ĥemdillah, ez êzdîme, ji dînê xwe ȓazîme.*

**S. 6** *1 Nasirdîn — celatê serê mine,*
*2 Şêx Şems — mesebê mine,*
*3 Laliş û Zimzim — ĥaca mine,*
*4 Kaniya Sipî — mora mine,*
*5 Silt'an Êzîd — atqata mine,*
*6 Şerfedîn — dîne mine.*
*7 Tawisî melek' — îmana mine,*
*8 ………… — şêxê mine,*
*9………… — p'îrê mine,*
*10 ………… — merebiyê mine.*

**S. 7** *1 Ȓeĥme li dê û bavê hosta!*
*2 Şêx Adî — yek Ellaĥ!*
*3 Êzîd — ĥebîb Ellaĥ!*
*4 Em kêmin, şêx Adî ťemame!*

**şaxê — 5**[4261]
**S. 1** *1 Şehdetiye min — yek Xweda!*
*2 Melik şêx Sin — ĥebîbî Xweda!*
*3 Silav mergeh û Meqlub, Comayê*[4262]*, Binîmayê*[4263]*,*
*4 Lalişê, helelê, qubayê,*
*5 Ciyê cimlî êzdîxanê, Şark û Şam diça sicûdayê.*

**S. 2** *1 Sicûdê dibim ber Xwedayê,*
*2 Şêx Sin — ser K'ursîy yê ȓawestayê,*
*3 Şēşems — melikê mêraye,*
*4 Min şehdetîyê xwe melek' Tawisî xwe qayîye.*

**S. 3** *1 Dînê min — Şerfedîn!*
*2 Mesebê min — melik Fexredîn!*
*3 Ît'îqada*[4264] *min — qubet il-Bidor!*
*4 Bang — sehda min Êzdanê Sore!*

**S. 4** *1 Êzdîme, êzdî[me],*
*2 Sinîme, sinê nebîyme,*
*3 Mirîdê şêxê Adîme,*
*4 Bi şêx, p'îr,* hosta, *merebîme,*
*5 Her pênc t'erîqê xwe dest girtîme,*
*6 Il-ĥemdillah ezî vî dînî, vê olê, vê erk'anê ȓazîme!*

**şaxê — 6**[4265]
**S. 1** *1 Ĥeqa min — Êzîd,*
*2 Quble*[4266] *min — kaniya Sipî,*
*3 Dînê min — Şerfedîn,*
*4 Mesebe*[4267] *dînê min — melik Fexredîn,*

---

[4261] Азизе Иско *ЕЗИДЫ* (краткий исторический очерк). *Şehda Dînî* http://www.ezdixane.ru/content/view/1788/27/
[4262] *Cirîmayê*
[4263] *Birîmayê*
[4264] *îtqat*
[4265] *Şehda Dînî* http/jamali, narod.ru/mol.htm (29.04.2003)
[4266] *qulba*, binêr: *qible*
[4267] *mithev*

*5 Qasidê r̂uĥê min — Sicadîn,*
*6 Ĥaca*[4268] *min qubet il-Bidor* [4269],
*7 Kaniya Sipî, gelîyê Lalişê dive mor.*

**S. 2** *1 Şehdetîye min — miqîm Ellaĥ,*
*2 Şêx Adî — ĥebîbî Ellaĥ,*
*3 şêx Sin — r̂esûlî Ellaĥ.*

**S. 3** *1 Silave mergehê Meqlubî serayê.*
*2 Comayê,*[4270] *Binîmayê,*
*3 Ciyê Êzdîxanê Şerq û Şemê diçe ber tiwafe*[4271]*, sicûdayê.*

**S. 4** *1 Êzdîme, êzdîme.*
*2 [Bi] şêx, p'îr, hosta, merebî, yarû birê axretê, mewlayîme*[4272]*,*
*3 Silavk'êşê kaniya Sipîme,*
*4 Vî dînî, vî mesebî*[4273] *nav dik'irê şêx Adî, her pênc t'erîqê xwe r̂azîme.*

**S. 5** *1 Minetk'arim minetê,*
*2 Vavartim*[4274] *şile'tê,*
*3 Ya R̂ebî, şikir şêx Adî dame ser pişka sinetê.*

**S. 6** *1 Ya R̂ebî, minetk'arim mîra,*
*2 Vavartim ji vavira*[4275]*,*
*3 Ya R̂ebî, şikir şêx Adî dame ser pişka şêx û p'îra.*

**S. 7** *1 Ya R̂ebî, minetk'arim ji mala Adiya,*
*2 Vavartim ji qadîya,*
*3 Ya R̂ebî, şikir, şêx Adî dame ser pişka melik şêx Sinê Adiya.*

**S. 8** *1 Ya R̂ebî, şêx Adî — P'adşaye,*
*2 Şêxû Bek'ir — mewlaye*[4276]*,*
*3 Şêx Şems*[4277] *— ĉiraye,*
*4 Şehdetiya îmana xwe navê Tawis[î] melek' hildaye.*

**S. 9** *1 Şêx Adî — dayîme,*
*2 Şêx Şems — qedîme,*
*3 Şehdetiya îmana xwe navê Tawis[î] melek' anîme.*

**S. 10** *1 Şêx Adî — ẍefûre,*
*2 Şêx Şems — nûre,*
*3 Şêx Sin — r̂esûle,*
*4 Şehdetiya îmana xwe navê Tawis[î] melek' qebûle.*

**S. 11** *1 Derdê min — dua'yê min,*
*2 Şêxê min — mewlayê min,*
*3 P'îrê min — hostayê min.*

**S. 12** *1 Serê min ser be'lgîyê min,*

---

[4268] *hec*
[4269] *qubldar*
[4270] *Cema'yê*
[4271] *tawav*
[4272] *mewulame*
[4273] *mesev*
[4274] *vevarim*
[4275] *wavîr*
[4276] *mewula*
[4277] *Şêxşems*

*2 Be'lgîyê min beriyê şivakê.*
*3 Ya R̂ebî, bidî xatirê Êzîdû makê.*

*Dergêh xêra veke, dergêh şer̂a dade, axrîye me r̂ehim bike!*

**şaxê — 7**[4278]
**Navê şêx û p'îra:**
**S. 1** *1 Şêxê min — şêx Sin,*
*2 P'îrê min — Ĥesin Maman,*
*3 Hoste û merebî — ji mala baba[n].*

**S. 2** *1 Dînê min — Şerfedîn[e],*
*2 Mesebê min — melik Fexredîne,*
*3 Mek'teba min — melik Şemsadîne.*

**S. 3** *1 Mefera me — şêx Şems,*
*2 Ît'îqada*[4279] *me — Êzîd.*
*3 Derdê min — dua'ye min, şêxê min — mewlayê min, p'îrê min — hostayê min.*
*4 Xwedê ĥeq — xwedayê min,*
*5 Tawisî melek' — îmane min,*

**S. 4** *1 Kaniye Sipî — more,*
*2 Ĥaca*[4280] *me — Zimzim, qubet il-Bidor*[4281]*, mek'anê silt'an Êzîdê Sore,*
*3 Sinetxane li wêda dibû more.*

**şaxê — 8**
**S. 1** *1 Sibe çû, êvar hat,*
*2 Hate ser min du celat,*
*3 Celatî miskîne,*
*4 Ĥeq bidine şehdaya dîne.*

**S. 2** *1 Şehdaya dînê min — êk Ellaĥ,*
*2 Melik şêx Sin — ĥebîb Ellaĥ,*
*3 Meqlûbe û mergeh — sela,*
*4 Silavê me li Meqlûbê mergehe, li ĥeqê k'af û mix̂arê, li Comayê*[4282]*, li Binîmayê*[4283]*, li xwedanê qubê li wî cî, ciyê êzdîxanê serê xwe dik'şîne ber sicûdê.*

**S. 3** *1 Mala şêx Adî — mala îmana meye,*
*2 Nasirdîn — celatê serê meye,*
*3 Şêx Adî — Ĥeq P'adşaye,*
*4 Melik şêx Sin — ĉiraye,*
*5 Me şehda îmane xwe bi navê Tawisî melek', xerqê şêx Adî daye.*

**S. 4** *1 Şêx Adî — nûre,*
*2 Melik şêx Sin*[4284] *— mişûre,*
*3 Me şehda îmane xwe bi navê Tawisî melek', xerqê şêx Adî daye.*

**S. 5** *1 Ez minetk'arim ji mala bava,*

---

[4278] *Şehda dînî* https://www.youtube.com/watch?v=NmRv_h1vkKE
[4279] *îtqat*
[4280] *hec*
[4281] *qubildar*
[4282] *cirînê*
[4283] *birînê*
[4284] *Şêxisin*

*2 Ẍafilî korin ji herdu ĉava,*
*3 T'im û dayîm hilnadin wan ava.*

**S. 6** *1 K'ursîy ya R̂eĥman berê r̂ewaqê,*
*2 Ĥaca[4285] me k'af û miẍer, Berê Şibakê,*
*3 Eve ciyê şêx Adî.*

**S. 7** *1 K'ursîya R̂eĥman berî min jore,*
*2 Ĥaca me k'af û miẍer, kaniye Sipî, qubet il-Bidare,*
*3 Mek'anê silt'an Êzîdî Sore,*
*4 Sinetxane lê dibe more.*

**S. 8** *1 Beĥrê r̂eş t'u sipîye,*
*2 Ĥaca me k'af û miẍer kaniye Sipîye,*
*3 Mek'anê silt'an Êzîdîye,*
*4 Sinetxane lê qewat dibîye.*

**S. 9** *1 Sinîme sinete nebîy me[4286],*
*2 Dur̂eke enzelî me,*
*3 Bendeyî kaniye Sipî me,*
*4 Mirîdê şêxê Adî me,*
*5 Berxê k'oza silt'an Êzî me,*
*6 Il-ĥemdillah şikir ji vî dînî, îmanî, ji vî ol û erk'anî r̂azî me.*

**S. 10** *1 Çûme Lalişa nûranî,*
*2 Min serê xwe li ber catê quba danî,*
*3 Min îman bi navê Tawisî melek' anî.*

**S. 12** *1 Tawisî minî mêrane,*
*2 Xaliqê minî, û e'rd, û e'zmane,*
*3 Ev silt'an şêx Adî mêr saẍî jê bidin beyane.*

**S. 13** *1 Tawisî minî milyak'ete,*
*2 Xaliqê min û ĥeftî û du milete, hîjdeh ĥezar xulyaqete,*
*3 Ew silt'an şêx Adî mêr bi saẍî jê bidin atqate.*

**S. 14** *1 Mergah şêx Adî xweş tişte,*
*2 Dînê me ne yê kaẍeteye, ne yê nivîşteye,*
*3 Dera ilmê şêx Adî lê ĥeq bê gatin, heke mêrê êzdî guh daye, wî qasî ewder jê r̂a bihuşte.*

**S. 11** *1 Ya şêx Adî emî nezanin, her tu zanî.*
*2 Ya Xwedê û şêx Adî emî kêmin, tu ťemamî!*

**şaxê —9**[4287]

**S. 1** *1 Şehda dînê min yek Xwedaye!*
*2 Amin[4288] Cebraîl evîniya Êzdaye!*
*3 Bergeha min R̂oj û mergehe,*

**S. 2** *1 Silavên min li mergehê, li Lalişê, û li xwedanê qubêyê.*
*2 Şêx Adî — şêxê mine, ji nûra P'adşêye,*
*3 Şemsê Êzdînê — ĉiraye.*

---

[4285] *hec*
[4286] *siniyetê sinîme*
[4287] *Şehda dînî* http://www.ezdixandi.com/forum/38-825-1; http://r̂ojava.net/Shehda%20dinin.htm; http://yeziden.de/302.0.html; http://www.ciwanen-ezidi.de
[4288] *Emînî*

**S. 3** *1 P'îrê min — Ĥesin Mamane,*
*2 Hoste û merebî — ji mala babane,*
*3 Kaniya Sipî — mora mine,*
*4 K'af, û mix̂ar, û Zimzim ĥaca*[2782] *mine,*
*5 Tawisî melek' şehda îmana mine.*

**şaxê — 10**[4289]

*1 Serê min [ser] be'lgî,*
*2 Be'lgîyê min [Berê] Şibakê*[4290]*,*
*3 Sêrî çûme zikakê,*
*4 Bidî xatirê Êzîdû make.*
*5 Serê min qublê*[4291]*,*
*6 Berê min R̂ohilat,*
*7 Ser min r̂a*[4292] *sekinî[n] du celat,*
*8 Go: «Miskîno, T'acdîno, benîo,*
*9 De te were, şehdetiya*[4293] *dînê xwe bîne,*
*10 Ezê serê te hilînim».*
*11 Go: «Şehdetiya dînê min êk Ellaĥ,*
*12 Şêx Sin — ĥebîb Ellaĥ,*
*13 Mergayê Meqlûbê selayê.*
*14 Ciyê Şerq, Şam lê diçe tayê, sicûdayê.*
*15 Sicûda me diçe bal şêx Adî, şêx Adî r̂eda yê,*
*16 Şêx Şems — melikê mêrayê,*
*17 Şêx Adî — ser K'ursîy westayê,*
*18 Şehdetiya dînê xwe ĥeq navê Êzîd dayê.*
*19 Şêx Adî — nûre,*
*20 Melek Fexredîn — x̂efûre,*
*21 Şehdetiya dînê xwe ĥeq navê Êzîd qebûle.*
*22 Sinîme, sinî nebîy me*[4294]*,*
*23 Silavk'êşê kaniya Sipî me,*
*24 Mirîdê şêx Adî me.*
*25 Qelema melik şêx Sin nivîsîme,*
*26 Il-ĥemdillah şêx, p'îr, hoste, merebî, yar birê axretê, her pênc t'irêqê xwe r̂azîme.*
*27 Celatê r̂uĥê min Nasirdîn,*
*28 Atqata min — silt'an Êzîd,*
*29 Dînê min — Şerfedîn,*
*30 R̂eĥme li r̂uĥê hosta yê min,*
*31 Êzdîd — êk Ellaĥ,*
*32 Şêx Adî — ĥebîb Ellaĥ!»*

**şaxê — 11**[4295]

*1 Şehda*[4296] *miqîm*[4297] *Ellaĥ,*
*2 Şêx Adî — ĥebîb*[4298] *Ellaĥ,*
*3 şêx Sin — r̂esûl Ellaĥ,*
*4 Merge[h] Meqlûb sela,*

---

[4289] [13] (гг. 189-192)
[4290] *şivak*
[4291] *qulbe*
[4292] *mira*
[4293] *şe'detiya*
[4294] *nevî*
[4295] [31] *Se'da sibê zû* (15-16)
[4296] *şe'da*
[4297] *mikûm*
[4298] *ĥebûb*

*5 Silava me mergê[hê],*
*6 Comayê*[4299] *Binîmayê,*
*7 Lalişe xwedanê*[4300] *qubê*[4301]*,*
*8 Ciyê êzdîxane lê dikine sicûdê.*
*9 Ĥeqê min — şêx Adî,*
*10 Baqiyê min — melî şêx Sin* [4302]*,*
*11 Dînê min — Şerfedîn,*
*12 Mesebê min — melî Fexredîn,*
*13 Ĥeca min — qubet il-Bidare*[4303]*,*
*14 Aqeta*[4304] *min — Êzîdê sor,*
*15 Ciyê sinîxan lê dibine mor.*
*16 Sinîme*[4305]*, sinîme,*
*17 [Bi] şêx, p'îr, hosta, merebî me,*
*18 Seȓt*[4306] *e'vdê kaniya Sipî me,*
*19 Mirîdê şêxê Adî me*[4307]*,*
*20 Il-ĥemdillah*[4308] *şikir ezî êzdî me.*
*21 P'îrê min — hostayê min,*
*22 Şêxê min — mewlayê min,*
*23 Derdê min — dua'yê*[4309] *min,*
*24 Şehdetiye xwe navê Tawisî melek' daye.*

**şaxê — 12**[4310]

**S. 1** *1 Her ewe, her ewe, her ewe!*
*2 Ne xwerin û ne xewe,*
*3 Şehda dinê min bi navê Xwedê û Tawisî melek' dibê ȓewe. Amîn!*

**S. 2** *1 Şehda dinê min yek Ellaĥ*[4311]
*2 Tawisî melek' û melek şêx Ĥesen ĥeq hebib Ellaĥ!*
*3 Meqlub û mergeh sela!*
*4 Silavên mêran li Lalişê, li Meqlubê,*
*5 Liberé mehê, cotkê quba, li wê e'rdê , e'rda êzidxanê ya serî liber şêx Adî k'êşin ber ibadetê*[4312].

**S. 3** *1 Silt'an Êzî — P'adşê mine,*
*2 Tawisî melek' — îmane mine,*
*3 Şêx Adî — ȓêberê mine,*
*4 Kaniya Sipî — mora mine,*
*5 K'af û mix̂ara Zimzim — ĥeca mine,*
*6 R̂oj — bergeha mine (qublet il-Bidur),*
*7 Şêx Şems*[4313] *— mesebê mine, binyana ĉavê mine.*

**S. 4** *1 Il-himdilla ji Adiya,*
*2 Vavartîn ji k'afira, ȓafêdiya,*
*3 Em avêtin ser pişka siniya.*

---

[4299] *cimayê*
[4300] *xudan*
[4301] *quve*
[4302] *Melîşîxisin*
[4303] *qubildar*
[4304] *Îtqet*
[4305] *sunî*
[4306] *ser*
[4307] *şêx E'dî*
[4308] *Herĥemdila*
[4309] *dia'*
[4310] Feremez Xeribo *Qewl û beyt'ên êzidiyan yê piroz* http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
[4311] *Ela*
[4312] *ebadet*
[4313] *Şêşimes*

**S. 5** *1 Minet k'arim ji mîra,*
*2 Vavartîm ji k'afira, ji xenzira,*
*3 Em avêtim ser pişka şêxan û p'îra.*

**S. 6** *1 Minet k'arim ji minetê,*
*2 Vavartîn ji k'afira, ji şire'tê*[4314]*,*
*3 Avêtin ser pişka sinetê.*

**S. 7** *1 Heka Xwedê bikê em êzdîne,*
*2 Li ser navê sultan Êzîne,*
*3 Em bi ol, û erk'anê, û t'erîqetê xwe ȓazine. Amîn!*

**şaxê — 13**[4315]

*1 Serê min be'lgî,*
*2 Be'lgîyê min [Berê] Şibakê,*
*3 Sêrî çûme zikakê,*
*4 Bidî xatira Êzdî makê*[4316]*.*
*5 Serê min — qulbe ,*
*6 Berê min — Ȓohilat,*
*7 Ser mi ȓa sekinî du celat,*
*8 Go: «Miskîno, tajdîno, benîo,*
*9 Şehdetîya*[4317] *dînê xwe bîne,*
*10 Ezê serê te hilînim».*
*11 Go: «Şehdetîya dînê min miqîm*[4318] *Ellaĥ, şêx Sin ĥebûb Ellaĥ!*
*12 Mergayê Meqlûbê selayê,*
*13 Comayê*[4319] *Binîmayê, ciyê Şerq, Şam lê diçe tayê sicûdayê*[4320]*,*
*14 Sicûda me diçe bal şêx Adî,*
*15 Şêx Adî — ȓedayê.*
*16 Şêx Şems*[4321] *— melikê*[4322] *mêrayê,*
*17 Şêx Adî ser K'ursîy westayê,*
*18 [Min] şehdetîya dînê xwe ĥeq bi navê Êzîd*[4323] *dayê,*
*19 Şêx Adî — nûre,*
*20 Melek*[4324] *Fexredîn*[4325] *— ẍefûre,*
*21 [Min] şehdetîya dînê xwe ĥeq bi navê Êzîd qebûle.*
*22 Sinîme, sinî nebîyme*[4326]*,*
*23 Silavk'êşê kaniya Sipîme,*
*24 Mirîdê şêxê Adîme*[4327]*,*
*25 Qelema melek şêx Sin nivîsîme,*
*26 Il-ĥemdillah*[4328] *şêx, p'îr, hosta, merebî,*
*27 Yar birê axretê,*
*28 Her pênc t'irêqê xwe ȓazîme.*
*29 Celatê ȓuĥê min — Nasirdîn,*

4314 *şerihet*
4315
4316 binêr: *max*
4317 *şe'detîya*
4318 *mikîn*
4319 *Selayê*
4320 *sûcûd*
4321 *Şêxşim*
4322 *melk*
4323 binêr: *Êzîd*
4324 *Mellek*
4325 *Ferxedîn*
4326 *nevî*
4327 *şêx E'dî*
4328 *E'ȓĥemdille*

*30 Atqata min — silt'an[4329] Êzîd,*
*31 Dine min — Şerfedîn,*
*32R̂eĥme li r̂uĥê hostayê min.*
*33 Şêx Adî — yek Ellaĥ!*
*34 Êzdîd — ĥebûb Ellaĥ!»*

**şaxê — 14[4330] (ŞEDETYA SIVÊ)**

*1 Berê min royê, rohilatê,*
*2 Ser mira sekinîye du qasidê celatê,*
*3 Miskîko, benî ademo, rabe bide şedetiyê:*
*4 «Şedetiya min yek elah,*
*5 Şexisin hebûb elah,*
*6 Meryê û meqlûb sela,*
*7 Silavê ji meryê Lalişê,*
*8 Xudanê qubêyê, cîyê mayê,*
*9 Cîyê êzdîxanê lê mayê û sucudayê,*
*10 Derdê min, diayê mi[n],*
*11 Pîrê min — hostayê min,*
*12 Şêxê min — şehulayê min,*
*13 Şêx Qeymes — birayê min.*

[4329] *sultan*
[4330] [53] (r 215) got: Elîyê şêx Biro

# VII. XIZÊMOK

**şaxê — 1**[4331]

**S. 1** *1 Hey dîno, hey dîno!*
*2 Şêxo dîno, p'îro beze miskîno!*
*3 Delal gule e'zîz melik Fexredîne,*
*4 Sê mal hene li dinya dawî: Qudsû Xelîl, Mekke û Medîne,*
*5 Ĥeq Xwedêye, ba ĥeq mala babe min Lalişa nûrîne,*
*6 Belê ẍefil di korene, beĥra wan têda nine.*

**S. 2** *1 Hey mala min, teyrek li e'zmana wê hey, navê wî Enqere,*
*2 Ĥeftî û du p'eȓe,*
*3 P'eȓekî Gay li sere.*
*4 Ji min ȓa bêjin, xêra navê şêx Adî, ew k'î mêr bû wek'az li e'rdê da, go: «Zimzim Te'al, were?!»*

**S. 3** *1 Çendî teyrek li e'zmana wê hey, navê wî Enqer bi nave,*
*2 Ȓoje îd û e'ȓefata derk'eft ji kaniye Sîĥanê,*
*3 Çeng u basikêt xwe vediweşînê,*
*4 Jê dicê şewq, û şemal, û nûrîn, û xûnave.*

**S. 4** *1 Dergek li e'zmana vebû, nuqteyek jê nuqitî,*
*2 Teyrek nazil bû li ser t'extê se'edetê,*
*3 Wê dibêjit: «Bila bêt şêxek ji ĥeqîqetê, p'îrek ji me'ȓîfetê, ilmdarekî ji malêt ilmdare,*
*4 Bila derê ȓeşbelaka veket, bixwinit û jê bêjit k'a beĥra emanê*[4332] *çend gave li besta,*
*çend kevir di nave?*
*5 Melik Fexredîn fitîla*[4333]*, digêȓit li ser xasan û xava.*

**S. 5** *1 Hey mala min, banga min melekê dilê melûle,*
*2 T'elpek e'wra ji e'rda ȓabû, li e'zmana bestbû şûre,*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî ew k'î mêr bû, xîveta t'eref zêȓîn vedabû li ser beĥrêt*
*k'ûre?*

**S. 6** *1 Çendî mala min, banga Xwedê u melekê dilê damayî,*
*2 T'elpek e'wra ji e'rda ȓabû, li e'zmanê bilind bestbû alayî,*
*3 Wi[n] ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ew k'î mêr bû, xîveta t'eref zêȓîn li ser beĥrêt k'ûr*
*vedayî?*

**S. 7** *1 Çendî mala min, dilê min li ber van me'nîya sotin,*
*2 Gîyanê*[4334] *min gorî Şemsê Êzdîna wê li sûka me'ȓîfetê,*
*3 Melik şêx Sin*[4335] *wê li derê kaniya Sipî t'izbî li destî,*
*4 Ji min ȓa bêjin bi xêra navê şêx Adî, ew k'î mêr bû, silt'an Êzî ji wî ȓa me'nîyêt k'ûr digotin?*

**S. 8** *1 Çendî teyrek li min hilatî ji kenarê girî,*
*2 Şemsê minî bi nûr û k'eremet bû, şefaq*[4336] *dabû li binêt beĥra,*
*ȓanahî li Lalişa nûranî li ometa xwe kirî.*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ew k'î mêr bû, şêx Şems navê xwe lê şayî kirî?*

**S. 9** *1 Çendî teyrek li min hilatî ji kenarê Beẍdayî,*
*2 Şemsê min bi nûr û k'eremet bû, şefaq dabû li binêt beĥra,*
*ȓanahî kirbû Lalişa nûranî ĥeta bane K'abet Îlaĥîyê.*
*3 Wellaĥ û Tillaĥ û Billaĥ sê nav ji navêt Xwedêne*
*4 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ew k'î mêr bû şêx Şems navê xwe dayê?*

---

[4331] [1] (p. 398); [2] (rr. 1050-1053)
[4332] *emen*
[4333] *fitil*
[4334] *gîhan*
[4335] *Şêxsin*
[4336] *şifeq*

**S. 10** *1 Çendî stêrek li min hilatî, ji stêra Cebare,*
*2 Şêx Şemsê min bi nûr û k'eremet bû, şefaq dabû li binêt beȟra,*
*ȓanahî kirbû Lalişa nûranî ȟeta wan dîyara,*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî quba felekê çend zincin û çend k'ursîyne?*
*4 Heke hûn pirsiyara quba felekê ji min diken, quba felekê ȟeft k'ursîyne, zinc bîstûçarin.*

**S. 11** *1 Çendî şêxek li Şamê dahir bûyî k'ûre,*
*2 Wek'azê destê wî k'eske, t'acê serî şev ĉira, û leyl, û duȓe.*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ew k'î mêre suȓe wî digeȓê li gel ȟemû suȓa?*

**S. 12** *1 Çendî şêxek li Şamê dahir bûyî k'ûrîne,*
*2 Wek'azê destê wî k'eske, t'acê serî şev ĉiȓa, û leyl, û duȓîne.*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ew çi dîyarî bû, şêxû Bek'ir da Şemsê Êzdîne?*

**S. 13** *1 Çendî sibeye ku ȓoj li min hiltêye,*
*2 Şemsê minî bi nûr û k'eremet bû, şefaq dabû li binêt beȟra,*
*ȓanahî kirbû Lalişa nûranî ȟeta bi banê k'afêye.*
*3 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî ȓoje bin xîveta t'eref zêȓîn, li ser beȟrê, ew k'îye?*
*Navê wî şêrîn Xwedêye!*

**S. 14** *1 Çendî sibeye ku ȓoj-ȓoj li min hilate,*
*2 Şemsê minî bi nûr û k'eremet bû, şefaq dabû li binêt beȟra,*
*ȓanahî kirbû Lalişa nûranî ȟeta bi bane xelata.*
*4 Ji min ȓa bêjin, bi xêra navê şêx Adî, ȓoje bin xîveta t'eref zêȓîn, li ser beȟrê, ew k'îye?*
*Navê wî yêşêrîn p'îr Afate!*

**şaxê — 2**[4337]

**S. 1** *1 Mala min, mala min, mala mine, hê hê, hey malê!*
*2 Mala min, mala babe min, hê hê,*
*3 Mala minê, ȓo derk'etiye li cîde, hê hê,*
*4 Serê min qurbana nûra Şemsedîne,*
*5 Dayîm dide çardeh t'ebeqe e'rd û e'zman, gelîyê Lalişê, hê [hê],*
*6 Herçar qulba goveke dinyayê,*
*7 Enzelî, zencelî nifusî ťemam,*
*8 Bera (qermesê) Gay û Masî da, hey malê!*

**S. 2** *1 Mala min, mala min, mala mine, hê hê, hey malê!*
*2 Mala minê, derwêşek hatî ji derda, hê hê,*
*3 Piştê, k'ember beste, hê hê,*
*4 Di linga da sol û meste, hê hê,*
*5 Xerqekî ȓeşî lê ye, dembuleke sore le sere, hê hê,*
*6 De wextê dinya t'ev av bû, hê hê,*
*7 Darek li ort'a wê avê bû, hê hê,*
*8 Teyrekî Enqerî li ser wê darê bû, hê hê,*
*9 T'oximê miletê Ezdayî dest bû, hê hê,*
*10 Serê min qurban be, navê wî Tawis melek' bû, hey malê!*

**S. 3** *1 Hey mala min, mala min, mala mine, hê hê, hey malê!*
*2 Mala minê, bila [qurme] li ser pişta Gay*[4338] *u Masî da,*
*3 Şêxo — mîro, p'îro — beze*[4339] *miskîno, e'zîz Xwedê ye,*
*4 De werin derê ȓeşbelekê vekin, hê hê,*
*5 P'elkî becenzerî bixûnin, hê hê,*

[4337] [2] (rr. 1054-1056)
[4338] *gê*
[4339] binêr: *bezok*

*6 Xêra mala şêx Adî ji min r̂a bêjin, k'a ew k'îjan bû, ciyê xwe çêkir avê tiryêda? Hey malê!*

**S. 4** *1 Mala min, mala min, mala min, mala mine,*
*2 Mala minê, serê Lala, Elîf û Bê ne, hê hê,*
*3 Serê dur̂a Elîf û Bê ne, hê hê,*
*4 K'oĉekê wan r̂uniştine, extîyarê wan t'eveserû p'êne, hey male!*

**S. 5** *1 De werin şêxekî ji min r̂a bînin, hê hê,*
*2 Bila ĥeftî û du govek babî şêx be,*
*3 Bila donzde[h] ilmî vê be ji mala şêxa be, hey male!*

**S. 6** *1 De werin p'îrekî ji min r̂a bînin,*
*2 Bila ĥeftî û du govek babî p'îr be,*
*3 Bila donzdeh ilm, ilmî be,*
*4 Bila ji mala p'îra be, hey male!*

**S. 7** *1 De hûn derê r̂eşbelekê vekin,*
*2 P'elkî becenzelê hûnê bixûnin,*
*3 Xera mala şêx Adî ji min r̂a bêjin,*
*4 Dînê silt'an Ezdayî yeke, çima meseb ji hev cuda bûn! Hey male!*

**S. 8** *1 Mala minê, mala min, mala babe mine, hê hê,*
*2 Mala minê, min go: «E'zîz Xwedê ye,*
*3 Şêx Şemse mala me şa dike ji nûrê,*
*4 Hunê min r̂a bêjin k'îjan mêr bû dik'işand qelema îmanê?*
*5 K'îjan mêr bû wezîrê dîwanê?*
*6 K'îjan mêre r̂uniştine gelîyê Lalişê, berberê sikanê? Hey male!*

**S. 9** *1 Mala min, mala min, mala mine, hê hê,*
*2 Serê minî qurban be, melik şêx Sin dik'işîna qelema îmanê, hê hê,*
*3 Melik Şemsedîne wezîrê dîwanê, hê hê,*
*4 Şêxu Bek're mewlayê dîwanê, hê hê,*
*5 Serê min qurban be, silt'an şêx Adî ye r̂uniştîye li gelîyê Lalişê, berberê sikanê,*
*maşê mêra dide, distîne, hey male!*

**S. 10** *1 Mala min, mala min, mala mine, hê hê,*
*2 Mala minê, teyrekî li e'zmana, teyrî Enqere, hê hê,*
*3 Sêsed, û şêst, û şeş silav lê ye, hê hê,*
*4 T'oximê miletê Êzî xilas kiriye ji t'ofanê, hey mala male,*
*5 Navê wîye, mala min, mala min, mala babe mine, Tawisî melek'e, hey male!*

**şaxê — 3**[4340]
**S. 1** *1 Çendî mala min, mala min, mala min!*
*2 Banga mine Xwedê di dilada mayî,*
*3 T'elpekî e'wra ji e'zmana hildayî,*
*4 R̂asta Lalişa nûranî kire şewq û alayî,*
*5 Me şêxek divêt ji malêt Adîya, p'îrekî ĥeqîqetê, ilmdarekî ji ilmayî zêde,*
*ji ĥeftî û du baba xeberbiden, k'a ew k'î mêr bû, xîveta t'eref zêr̂î ser behr̂êt k'ûr vedayî?!*

**S. 2** *1 Çendî binga mine Xwedê dilêt melûle,*
*2 T'elpekî e'wra ji e'zmana r̂abû, r̂asta Lalişa nûranî kirbû şure,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adîya, p'îrekî ĥeqîqetê, ilmdarekî ji ilmayî zêde,*
*bila derê r̂eşbeleka veken, ji ĥeftî û du baba xeber biden,*
*k'a ew k'î bû, xîveta t'eref zêr̂în vedayî ser behr̂êt k'ûre?!*

[4340] [2] (rr. 1057-1059)

**S. 3** *1 Çendî teyreke wê li e'zmana navê wî Enqer bi nave,*
*2 Ji qudretê ji çengê wî teyrî dibarit xunave,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adîya, p'îrekî ĥeqîqetê,*
*ilmdarekî ji ilmayî zêde, derê r̂eşbeleka veken,*
*ji ĥeftî û du baba xeber biden, k'a bi xêra navê şêx Adî,*
*beĥra sîĥa yê çend k'eşkûl[4341] ave?! Di beştê çend kevir di nave?!*

**S. 4** *1 Çendî bejna teye bilind be, berberê banî,*
*2 Ĉavêt te ne bûne biruska bedelê, awrêt te nebûne awirêt şêra,*
*wê li min diden wekî awrêt e'silanî,*
*3 Wellaĥ, u Billaĥ, u Tillaĥ, me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*p'îrekî ĥeqîqetê, ilmdarekî ji ilmayî zêde, bila derê r̂eşbeleka veken,*
*ji ĥeftî û du baba xeber biden bi xêra navê şêx Adî,*
*k'a ew k'î mêr bû t'oqa meft'ûlê kire stuwna girîvanî?!*

**S. 5** *1 Çendî bejna teye bilind, berberê bane kelê,*
*2 Awirêt te ne bûne awrêt şêra,*
*3 Ĉavêt te ne bûne biruska bedelê,*
*4 Wellaĥ, û Billaĥ, û Tillaĥ, hersê navêt Xwedêne.*
*5 Me şêxek divêt ji malêt Adiya, p'îrekî ĥeqîqetê,*
*ilmdarekî ji ilmayî zêde, bi xêra navê şêx Adî,*
*bila derê r̂eşbeleka veken ji ĥeftî û du baba xeber biden,*
*k'a ew k'î mêr bû, t'oqa meft'ûlê kire stuwna p'axilê?!*

**S. 6** *1 Çendî xizêma te zêr̂ê zere,*
*2 Bend û tîrêja da Lalişa nûranî ĥeta bi koçka t'et'ere,*
*3 Wellaĥ, û Billaĥ, û Tillaĥ, — hersê navêt Xwedêne.*
*4 Me şêxek divêt ji malêt Adiya, p'îrekî ĥeqîqetê, ilmdarekî ji ilmayî zêde,*
*bila derê r̂eşbeleka veken, ji ĥeftî û du baba xeber biden,*
*k'a çawa xwedana xizêmê ji mala şêx Şemsê T'et'ere?!*

**S. 7** *1 Çendî xizêma te zêr̂ê sipîye*
*2 Bend u tîrêja dabû koçka t'et'ere ĥeta Lalişa nûraniye,*
*3 Wellaĥ, u Billaĥ, u Tillaĥ, hersê navêt Xwedêne.*
*4 Me şêxek divêt ji malêt Adiya, p'îrekî ĥeqîqetê,*
*ilmdarekî ji ilmayî zêde, bila derê r̂eşbeleka veken, ji ĥeftî u du baba xeber biden,*
*çava xwedana xizêmê ji mala silt'an Êzîye?*

**şaxê — 4[4342; 4343] (BEYT'A HEYÎ MALE)**

**S. 1** *1 Mala min, r̂o derk'etiye cîda,*
*2 R̂o derk'etiye ava,*
*3 Serê min qurban be, nûra Şemsê Êzdîna,*
*4 Daye çardeh t'ebeq e'rd û e'zman, gelîyê Lalişê, herçar qubla[4344],*
*beĥra emanê, pişta Gay û Masîda.*

> **S. 1** *1 Mala min, r̂o derk'etiye cîda,*
> *2 R̂o derk'etiye ji cîda,*
> *3 Serê min qurbabe nûra Şemsî Êzdîna,*
> *4 Daye çardeh t'ebeq[4345] e'rd û e'zman.*
> *5 Gelîyê Lalişê,*

---
[4341] *keşkul*
[4342] *BEYT'A HEYÎ MALE* http://www.ezdixane.ru/content/view/597/156/
[4343] [31] *Beyt'a heyî malê* (гг. 49-53)
[4344] *qulba*
[4345] *tebek*

*6 Herçar qulba goveka dinya[4346],*
*7 Nifûsî mefûs encerî t'emam,*
*8 Beĥrê Qirmisê, pişta Gay[4347] û Masî[4348]da,*
*9 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 2** *1 Mala min, gelî şêxan û p'îran, extîyar, k'oĉek û beden miskîna,*
*2 Werin derê r̂eşbelekê vekin, belgê belcevêzê[4349] bixûnin.*
*3 Xêra mala şêx Adî min r̂a bêjin k'anê ew k'î mêre,*
*r̂ûniştîye ser birka kaniya Sipî, maşê mêra dide-distîne.*
*4 E'zîze Xwedaye, melekî Şemsedîne, dîn-dînê î'n Êzîde, cema' mesebî[4350] hev cidane.*

**S. 2** *1 Mala min, daye beĥra Qirmisê, pişta Gay û Masî da,*
*2 Gelî şêxan û p'îran, extîyar, k'oĉek û beden miskîna[4351],*
*3 Werin derê r̂eşbelekê vekin, belgê becenavê[4352] bixûnin.*
*4 Xêra mala şêx Adî bê me'ne mi r̂a bêjin,*
*5 De çika ew çi mêrek bû, ciyê xwe çêkir nava ĥeva tirîya da,*
*6 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 3** *1 Mala min daye çardeh t'ebeq e'rd û e'zmana,*
*pişta qeliyê Lalişê k'ûrîn da, m'esiyê hinê beĥra da.*
*2 Sêxekî min r̂a bînin, şêx be, donzdeh ilma ilmdar be, t'alibî zana be, malî bava be.*
*3 P'îrekî min r̂a bînin p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be,*
*4 Xêra navê şêx Adî bêjin, k'anê ew k'î mêre ĉira herçar qubla ne.*
*5 E'zîzê Xwedaye, melik Şemsedîne, dîn-dîne silt'an Êzîde, mesebî hev cidane.*

**S. 6** *1 Mala [min, mala min, mala] min.*
*2 Daye gelîyê Lalişê,*
*3 Der-dorê wê dane berxê wî şîlanê,*
*4 Gelî şêxan û p'îran, Extîyar, k'oĉekê beden miskîna,*
*5 Werin, xêra mala şêx Adî, bê me'ne mi r̂a bêjin,*
*6 Çika ew çi mêreke, diger̂îne qelemê îmanê,*
*7 Ew çi mêreke wezirê dîwanê,*
*8 Ew çi mêreke e'lêkûme selame,*
*9 R̂uniştiye gelîyê Lalişê berberê sikane,*
*10 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 4** *1 Mala min, serê dur̂a Elîf û Bêne, serê Lala Elîf û Bêne,*
*2 Extîyar onî tîye, k'oĉekê wana sekinîye pisne,*
*3 Werin, şêxekî min r̂a bînin, şêx be, ĥeftî û du govek bavê xwe da şêx be, donzdeh ilmayî ilma be,*
*4 P'îrekî min r̂a bînin p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be, donzdeh ilmayî ilmdar be,*
*5 Werin derê r̂eşbelekê vekin, belgê belcevêzê bixûnin.*
*6 Xêra mala şêx Adî, min r̂a bêjin not ĥezar sal pêjda hêvênê mêrê Êzdî qendîlê destê k'î mêrî bû? (Tawisî melek'e).*
*7 Hey mala minê, yala ilmê şêxan-p'îran, yala extîyara ber derê mergêh, yala dîndara mala Adiya!*

**S. 3** *1 Mala min, mala min, mala min,*
*2 Mala min serê dur̂an[4353] Elîf û Bêne,*
*3 Serê Lale, Elîf û Bêne,*
*4 Extîyarê r̂ûniştine, k'oĉekê wana sekinîne, li p'êne,*
*5 Hey malê, hey malê, hey malê.*

**S. 4** *1 Mala min, extîyarê r̂ûniştine, k'oĉekê wana sekinîne, li p'êne,*

---

[4346] *duniya*
[4347] *gê*
[4348] *me'sî*
[4349] *bacar*
[4350] *mesev*
[4351] *miskîn*
[4352] *bacarê, an belcevêzê*
[4353] *duran*

2 Werin şêxekî ji mi r̂a bînin,
3 Ĥeftê du govek bavê xwe da şêxe, malê şêxa be, donzde[h] ilman[4354] ilma be,
4 P'îrekî min r̂a bînin, eftê du govek bavê xwe da p'îr be, malî p'îra be,
donzdeh ilman be,
5 Şêxo dîno, p'îro beden miskîno, Ezîz Xwedaye[4355],
6 Melek Şemsedîne, mala me li şêxa jê di nûrîne,
7 De werin derê p'erbelekê[4356] vekin, belgê becarê bixûnin,
8 Xêra mala şêx Adî bê me'ne mi r̂a bêjin,
9 Çika dînê silt'an Êzîd yek, çima meseb hev cudane,
10 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.

**S. 5** 1 Mala min, r̂o derk'etiye ji denê,
2 Serê min qurban be, nûra Şemse Êzdîne.
3 Daye çardeh t'ebeq e'zmane ĥerçar qubla goveka dinya nifûsî zenuerî t'emam,
beĥra emanê, gelîyê Lalişê, der-dorê wê denê, ber berxê wî şîlanê,
cele şêxan û p'îran, extîyar, k'oĉekê, beden miskîna.
4 Werin xêra mala şêx Adî, min r̂a bêjin, çika ew k'î mêre digeȓîne qelemê îmanê,
ew k'î mêre k'ê wezirê dîwanê,
5 Ew k'î mêreke, e'lêk'ûm selam, r̂ûniştîye gelîyê Lalişê berberê sikanê ?
(şêx Sine, şêx Şemse, p'îrê Be'rîye).

**S. 5** 1 Mala min, mala min, mala min,
2 R̂o derk'etiye ji dane,
3 Serê min qurbabe, nûra Şemsê Êzdîna,
4 Daye çarde t'ebeq e'rd û e'zman,
5 Her ça[r] qulba goveka dinya,
6 Nifûsî zencerî t'emam,
7 Beĥrê Qirmisê, gelîyê Lalişê,
8 Der û dorê wê dane berxê wî şîlanê,
9 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.

**S. 6** 1 Mala min Şemsedîne, Fexredîne, Sicadîne, Nasirdîne[4357]
2 Herçar pisê sitîya Zîne, xelefa mîr Ezdîne,
3 Şêxekî min r̂a bînin şêx be, ĥeftî û du govek bavê xwe da[4358] şêx be, donzdeh ilmayî ilma be,
4 P'îrekî min r̂a bînin p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be, donzdeh ilmayî ilmdar be,
5 Xêra navê şêx Adî bêjin ew k'î mêre, beĥrê giran dimeyîne[4359]? (melîk Fexredîne).

**S. 7** 1 Hey mala min, çendî sitîya Zîn dilorîne,
2 Ber bêşîka Şems û Fexrê mîra dihejîne,
3 Şêxekî dibêjim[4360] min r̂a bînin, bira şêx be,
[ĥeftî û du govek bavê xwe da şêxbe, donzdeh ilmayî ilmabe?]
4 P'îrekî divejim min r̂a bînin, bira p'îr be, [ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be],
6 Xêra navê şêx Adî bêjin k'anê ew k'î mêre, r̂ûniştîye ser birka kaniya Sipî,
xêr-xêratê êvarîna diqebilîne? (mîr Zeyîdîne).

**S. 8** 1 Mala min, teyrekî heye, teyrê Enqerî bi nave,
2 Ser pişta wî teyrî sêsed û şêst û şeş cot silave.
3 Şêxekî min r̂a bînin sêx be, ĥeftî û du govek bavê xwe da şêx be, donzdeh ilmayî ilma be,
4 P'îrekî min r̂a binin p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'iȓ be, donzdeh ilmayî ilmdar be,
5 Xêra navê şêx Adî bêjin k'anê ort'a e'rd û e'zman çend gave, beĥra emanê çend k'eşkûl ave,
çend kevir nave.

[4354] *ulm*
[4355] *Xuda*
[4356] binêr: *r̂eşbelek*
[4357] *Nasrêdîn*
[4358] *xa*
[4359] *dimehîne*
[4360] *divêjim*

**S. 9** *1 Teyrekî min heye, teyrekî t'eke,*
*2 Ser pişta wî teyrî Tawisî melek'e*
*3 Şêxekî min ȓa bînin, sêx be ĥeftî û du govek bavê xwe da şêx be, donzdeh ilmayî ilma be.*
*4 P'îrekî min ȓa bînin, 'p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be, donzdeh ilmayî ilmdar be,*
*5 Xêra şêx Adî bêjin k'anê ew k'î mêre, dergê cinetê vedike û dadide? (Tawisî melek'e)*

**S. 10** *1 Serî t'ac û t'acpoşe, piştî k'ember beste, qapûtî ser mile,*
*2 Ser piştê sêsed û şêst û şeş nûr û nedere, lal û duȓ, cehwar, şemala şêx Adî dişixule.*
*3 Xêra navê şêx Adî bêjin dinya beĥr bû, K'ursîykî ort'a beĥrê bû, mêrek ser bû,*
*hêvêna kurê mêrê Êzdî ber bû,*
*4 Şêxekî min ȓa bînin, şêx be, ĥeftî û du govek bavê xwe da şêx be, donzdeh ilmayî ilma be,*
*5 P'îrekî min ȓa bînin, p'îr be, ĥeftî û du govek bavê xwe da p'îr be, donzdeh ilmayî ilmdar be,*
*6 Ew k'î mêr bû e'zîzê dinya — axretê ȓa xeber dida? (Tawisî melek'e).*

**S. 11** *1 Teyrekî min heye E'rşe, teyrekî Enqer sipîye,*
*2 P'eȓekî wî yek E'rşe, yek e'zmane,*
*3 K'asek ser piştêye, nixtek wê k'asê fiȓîye,*
*4 Xêra navê şêx Adî bêjin k'anê ew nixte k'uye? (quba Şerfedîne).*

**S. 12** *1 Mala min e'rda çû e'zmane,*
*2 Teyrê Enqer bi nave.*
*3 Ser pişta wî teyrî sêsed û şêst û şeş cot silave,*
*4 Xêra navê şêx Adî bêjin k'anê ew k'î mêre, ciye xwe çêkir nava ĥeva tirîda?(silt'an Êzîde).*

**şaxê — 5[4361; 4362] (BEYT'A HEYÎ MALÊ)**

**S.1** *1 Hey mala min, hey mala min, mala bavê min,*
*2 Teyrekî Enqerî nave,*
*3 Ser piştê sêsed û şêst û şeş cot silave.*

**S. 2** *1 Şêxekî bînin şêx be,*
*2 P'îrekî bînin p'îr be,*
*3 T'alibî zane, ji mala baba be,*
*4 Ĥeftî govek bavê xwe da ilma be.*

**S. 3** *1 Bira xêra Xwedê ȓa,*
*2 Derê ȓeşbelekê veke,*
*3 Belgê belcevêzê[4363] bixûne.*

**S. 4** *1 Bira mi ȓa bêje,*
*2 Beĥra emanê çend k'eşkûl avî nave,*
*3 Ort'a e'rd e'zman da çend gave.*

**S. 5** *1 Hey malê, hey malê, hey malê*
*2 Babanê, hey lê, hey malê, hey malê…*
*3 Serê duȓa Elîf û Bê[4364] ne,*
*4 Serê lala Elîf û Bê ne.*

**S. 6** *1 Teyrê Enqer duȓe E'rşê e'zmîne,*
*2 Du melek lê xulqîne,*
*3 Yek bû nûra e'zmîne,*

[4361] [12] *BEYT'A HEYÎ MALÊ* (rr. 193-195)
[4362] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYT'A HEYÎ MALÊ (*rr. 97-99) T'ilbîs 2001
[4363] *belgevêz*
[4364] *Bî*

*4 Beĥrê[4365] giran dimeyîne.*

**S. 7** *1 Yek ĉira çar qulbaye,*
*2 Stûna çar dînaye,*
*3 Çerxa felekê dorê dizivirîne baye.*

**S. 8** *1 Hey malê, hey malê…*
*2 Serê duȓa Elîf û Bê[4366] ne,*
*3 Serê lala Elîf û Bê ne.*
*4 Extîyarê ȓûniştine,*
*5 K'oĉekê ser darê piya ber da westane[4367],*
*6 Fexrê gulî nûre li e'zmane.*

**S. 9** *1 Hey mala min, hey mala min,*
*2 Serê duȓa Elîf û Bê[4368] ne,*
*3 Serê lala Elîf û Bê ne.*
*4 Extîyarê ȓûniştine,*
*5 K'oĉekê ser darê piya ber da westane,*
*6 Ȓoj me derk'et ji E'rşê girane,*
*7 Bû ĉira boyî herçar qulbane,*
*8 Stûn boyî herçar dînane.*

**şaxê — 6[4369] (BEYT'A ẌERÎBO)**

*Bi desturî Xwedê!*

**S. 1** *1 Hey mala min, mala min, mala min,*
*2 Banga min Xwedê di dila da may,*
*3 T'elpekî e'wra ji e'zmana hilanî,*
*4 Ȓasta Lalişa nûranî kire şewq û alay,*
*5 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*6 P'îrekî ĥeqîqetê ji alîmekî zêde,*
*7 Ji ĥeft ê û du baba xeber biden,*
*8 K'a ew k'î mêr bû, xîvêta terab zêȓî li ser beĥrêt k'ûr vedaye?*

**S. 2** *1 Çendî banga mine dilêt melule,*
*2 T'elpe e'wra ji e'zmana ȓabû,*
*3 Ȓasta Lalişa nûranî girtibû şure,*
*4 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*5 P'îrekî ĥeftê  alîmekî ji ilmê zêde,*
*6 Bila derê ȓeşbeleka veken,*
*7 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*8 K'a ew k'î mêr bû, xîvêta terab zêȓîn vedayî ser beĥrêt k'ûre?*

**S. 3** *1 Çendî teyreke wê li e'zmana difirî nanê wî Enqer bi nave,*
*2 Ji qudretê ji çengê wî teyrî dibarit xunave,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*4 P'îrekî ĥeqîqetê - alîmekî zêde,*
*5 Derê ȓeşbeleka veken,*
*6 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*7 Bi xêra navê şêx Adî k'a beĥra sîĥanê çend k'eşkul ave û di deştê çend kevir di nave?*

**S. 4** *1 Çendî  bejna teye bilinde ber berê banî,*

---

[4365] *be'r*
[4366] *Ba*
[4367] *wastan*
[4368] *Bî*
[4369] [52] *BEYT'A ẌERÎBO* (rr. 253-256)

*2 Ĉavêt te nebûne biruska bedelanî,*
*3 Avrêt te nebûne avrêt şêra, wê li min didin wekî avrêt eslanî,*
*4 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*5 P'îrekî ĥeqîqetê - alîmekî zêde,*
*6 Bila derê r̂eşbeleka veken,*
*7 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*8 Bi xêra navê şêx Adî k'a ew k'î mêr bû, t'oqa meft'ûlê kirye stûwa girîvanî?*

**S. 5** *1 Çendî bejna teye bilind berberî bane kelê,*
*2 Avrêt te nebûne avrêt şêra,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*4 P'îrekî ĥeqîqetê - alîmekî zêde,*
*5 Bi xêra navê şêx Adî, bila derê r̂eşbeleka veken,*
*6 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*7 K'a ew k'î mêr bû, t'oqa meft'ûlê kire stûna p'axilê?*

**S. 6** *1 Çendî xizêma te ji zêr̂ê zere,*
*2 Bend û tîrêja dabû Lalişa nûranî, ĥeta bi kuçika T'et'er̂a,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adiya,*
*4 P'îrekî ĥeqîqetê - alîmekî zêde,*
*5 Bila derê r̂eşbeleka veken,*
*6 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*7 K'a çawa xwedana xizêmê ji mala şêx Şemsê T'et'ere?*

**S. 7** *1 Çendî xizêma te sipî ye,*
*2 Bend û tîrêja dabû kuçeka T'et'era ĥeta Lalişa nûranî ye,*
*3 Me şêxek divêt ji malêt Adî ya,*
*4 P'îrekî ĥeqîqetê - alîmekî zêde,*
*5 Bila derê r̂eşbeleka veken,*
*6 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*7 K'a çawa xwedana xizêmê ji mala silt'an Êzî ye?*

**S. 8** *1 Çendî banga min Xwedêye û melekê dik'êşit bay û baranê ye,*
*2 Kirasê tey[î] sipî ye,*
*3 Şewqê dabû ji girîvanî ĥeta damanê ye,*
*4 Me divêt alîmakî ji alîmayî zêde,*
*5 Şêxekî ji malêt Adî ya,*
*6 P'îrekî ĥeqîqetê,*
*7 Mêrekî wekî şêx Sinê Adiye, r̂ûnişte derê kaniya Sipî ye,*
*8 Bila bixunit bi xêra navê şêx Adî,*
*9 K'a ew k'î mêr bû, r̂ûnişte ser berê sikanêye*

**S. 9** *1 Banga min Xwedêye û melekêt dik'êşin şew û r̂oje,*
*2 Kirasê tey[î ]sipîye,*
*3 Şewqê dabû li bendan û pişkoje,*
*4 Me divêt alîmakî ji alîmayî zêde,*
*5 Şêxekî ji malêt Adiya,*
*6 P'îrekî ĥeqîqetê,*
*7 Mêrekî wekî şêx Sinê Adiye, r̂ûnişte derê kaniya Sipîye,*
*8 Bila derê r̂eşbeleka veken,*
*9 Ji ĥeftê û du baba xeber biden,*
*10 K'a ew k'î mêr bû, xulqendî bihuşt*[4370] *û dojeh?*

*Em di kêmin, Xwedê yî t'emame!*

[4370] *behişt*

# VIII. PAYÎZOK

# RINDE GIRAVÎ[4371]

**S. 1** *1 Xemêt dilê min gelekin,*
*2 Xeyalêt[4372] dilê min p'iȓ belavin,*
*3 Sonî di ser k'eskin,*
*4 Werdek aşiqê golêt bi avin,*
*5 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*6 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 2** *1 Dinyayê bike sê pişke,*
*2 Pişkek birîndarê şîran û tîrane,*
*3 Pişkek aşiqê zêȓ, û zever, û male dinêne,*
*4 Ez e'vdalê Xwedê, aşiqê kiçk'oke, ke şenge şoẍe[4373] ser bi diravim,*
*5 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*6 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 3** *1 Xemêt dilê min gelekin,*
*2 Xeyalêt dilê min p'iȓin,*
*3 Sonî di ser k'eskin,*
*4 Werdek ji golêt bi av difrin,*
*5 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*6 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 4** *1 Dinyayê bike sê pişke,*
*2 Pişkek birîndarê şîran û tîrane,*
*3 Pişkek aşiqê zêȓ û zever û male dinêne,*
*4 Ez e'vdalê Xwedê, aşiqê kiçk'oke ke şenge şoẍ memik xirim,*
*5 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 5** *1 Çendî p'îre payîzekê li min da, me nekir k'ar û bare zivistanê,*
*2 P'eletekî e'wrî ȓabû ji binyatê, jê dibarin xirugêt befirê, nexîxêt baranê,*
*3 Bila xirab nekirba xemil û xêza dare ȓewanê,*
*4 Şenge giraviya mine giravî nebuwe kareke ẍezala li ẍeyîrêt siba,*
*5 Li esrêt hêvara, ji ber tajî û t'ulêt baba ȓa dibit xwe di havêt,*
*6 Hewîngekê ji hevîngêt ziya mezin kanê,*
*7 Herdu melikêt şenge giraviya mine giravî nebûne xwexêt mîranî,*
*8 Sêvêt Ȓostem–begî, li ewlîya payîzê bi serêt şaẍa ve bimînin,*
*9 Wextê dik'evine destêt cihêlêt vî dewrî, vî zemanî,*
*10 Têne dexalekê, têne yeman–yemanê,*
*11 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*12 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 6** *1 P'îre payîzekê li min da, bi ser meda hatî zivistaneke bi hêl-hêle,*
*2 P'eletekî e'wrî girte pawanê jorî, jê dibarin xirugêt befrê, nexîxêt baranê,*
*3 Bila nedaba li p'îre Meqlubê şêxa, li sere sûka û semedara,*
*4 Silavgeha Mehmed Ȓeşan,*
*5 Bila xirab nekirba quçkêt ȓewend xêla,*
*6 Herdu memikêt şenge giraviya mine giravî nebûne xoxêt mîranî,*
*7 Sêvêt Ȓostem–begî, li ewlêt payîzê bi serê şaẍa ve bimînin,*
*8 Wextê paşî nîvanêt şevê bidene ber duvet wan simbêla,*
*9 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*10 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

---

[4371] [2] (rr. 1060-1063)
[4372] *xiyal*
[4373] *şox*

**S. 7** *1 Hatîye bendewar, bariye nazdar,*
*2 Bila fiȓêkiya bayî ne daba şal û şapikêt xelqê delal,*
*3 Ser bezin û balîna xelqê minî delal, ne bane şeng û gopal,*
*4 Wextê ĉavêt xort û cihêlêt vî zemanî di dik'efte bejin û balîna xelqekî minî delal,*
*5 Yek-yek dibûne teyrkekî ter k'emal,*
*6 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*7 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 8** *1 Cendî p'îre payîzekê li min da,*
*2 Bi ser meda hatî zivistaneke çiruke,*
*3 P'eletekî e'wrî ȓabû ji binyatê,*
*4 Jê dibarin xirugêt befirê, nexîxêt baranê*
*5 Bila xirab nekirba xemil û xêxa darêt dev gêduka,*
*6 Herdu memikêt şenge giraviya mine giravî bûne xoxêt mîranî,*
*7 Sêvêt Ȓostem–begî, li ewlêt payîzê bi serê şaẍa ve bimînin,*
*8 Wextê dik'evine destêt xort û cihêlêt vî zemanî,*
*9 Paşî nîvanêt şevê ji xwe ȓa dikine bûke,*
*10 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*11 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 9** *1 Cendî p'îre payîzekê li min da,*
*2 Bi ser meda hatî zivistaneke bi gişte–gişte,*
*3 P'eletekî e'wrî ȓabû ji binyatê, girte ȓinde pawanê jorî,*
*4 Bila xirab nekirba xemil û xêxa darêt dev tenişte,*
*5 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*6 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!*

**S. 10** *1 Cendî ȓeqînekê k'ete e'zmanî, ko min berê xwe danê,*
*2 Hindeka digo: «Dengê şerqîna qoçêt nêryan û qerte berana».*
*3 Hindeka digo: «Li beĥrêt giran dengê her fandina (dengê Şerfandina) kelek û gemiyana».*
*4 Hindeka digo: «Şenge giraviya teye giravî xwe ji tenişta çepê qulpande, tenişta ȓastî,*
*5 Xirênî k'ete ber t'oq u mendeştêt zêȓane,*
*6 T'oq û mendeştêt qaşêt k'esk û sor kehrebane,*
*7 Ez kovandar û bendewarê xizêma şorim,*
*8 Hey hayê, hey hayê, hey hayê!»*

# IX. R̂OBARÎN[4374]

[4374] [2] (rr. 1064-1066)

**S. 1** *1 R̂obar çend car r̂obar,*
*2 Esmerêt şebabî,*
*3 Çereza çelenga lawa heye li bal.*

**S. 2** *1 R̂obarîna xweş r̂obarîna,*
*2 Esmerêt şebabî,*
*3 Li gel çelenga lawa çerxeçîne,*
*4 R̂obarî, xweş r̂obarî.*

**S. 3** *1 Li min da bayê sur̂a şêrîn*[4375]*, jê dibarîn du gulêt tarî,*
*2 Sed xweziya wî, her pênc ferzêt ĥeqîqetê jê dibin r̂azî,*
*3 Ciyê wî bihuşta baqî vejwarî.*

**S. 4** *1 Yar gelo, yar gelo, îngorî xweş îngorî,*
*2 Li min da bayê sur̂a şêrîn, jê dibarîn du gulêt sorî,*
*3 Sed xweziya wî, her pênc ferzêt ĥeqîqetê jê dibin r̂azî,*
*4 Ciyê wî bihuşta baqî li banêt jorî.*

**S. 5** *1 R̂obar, r̂obarêt bi zeyînetin,*
*2 Nîşanêt şarê Şamê, û Misrê,û T'ewrêzê çîye?*
*3 Nîşanêt şarê Şamê, û Misrê, û T'ewrêzê birc û kelahin, qub û k'umbedin*[4376]*.*

**S. 6** *1 R̂obar, r̂obarêt bi zeyînetin,*
*2 Nîşanêt cêşê melik Fexredîn û xilmetk'arêt şêx Adî çîye?*
*3 Nîşanêt cêşê melik Fexredîn û xilmetk'arêt şêx Adî r̂ist û k'eşkûlin*[4377]*, t'izbî û wek'azin, saf û heynetin.*

**S. 7** *1 Sipîndara me birin, sipîndar di webalin,*
*2 Sîng û berat' te malik wêranê,*
*3 Nebûne birka K'abet Îllaĥ, hawîr k'oĉekin, ĥecî û e'vdalin.*

**S. 8** *1 Sipîndara me birin, sipîndar di çêne,*
*2 Sipîndar di bilindin, hemberî dara sewlêne,*
*3 Me divêt şêxekî şêx, bi xêra navê şêx Adî veket derê r̂eşbelekê,*
*4 K'a ew k'î mêr bû, k'î meleke bû, cara e'wilî ser beĥra Qudsê, û meyê, û sîĥanê sekinî,*
*5 Wek'az li beĥrê da, beĥr kire du kenare,*
*6 Masîyêt binê beĥrê mirin ji têna?!*

**S. 9** *1 Şêxo, ez bûm xulam!*
*2 Min xilmeta şêxê xwe kir ĥeft sala t̂emam,*
*3 Çardeh t'ebeqêt e'rd û e'zman, ser k'efa Xwedêyê minî t̂emam.*

**S. 10** *1 Şêxo, ez bûm mirîd,*
*2 Min ĥeft sala xilmeta şêxê xwe kir ji dil û yeqîn*[4378]*,*
*3 Çardeh t'ebeqêt e'rd û e'zman, ser k'efa Xwedêyê minî Dayîm, yî Qedîm, yî R̂ehîm.*

**S. 11** *1 Şêxo xwedanê erk'anê,*
*2 Xebîr wê dixûnin Incîlê, T'ewratê, Zembûrê, Qura'nê,*
*3 Me divêt şêxekî şêx, bi xêra navê Xwedê veket derê ilmekî ĥeqîqetê.*
*4 K'a ew k'î mêr bû, k'î meleke bû, cara e'wil sekinî ser berê sikanê*[4379]*?!*

[4375] *şirîn*
[4376] *kumet*
[4377] *keşkul*
[4378] *êqîn*
[4379] *sûkan*

# X. NIYAZ

**A**
*Aqibeta wî serê te!*

**B**
*Bawerî bawerîye, yê dixwaze bawer dike kû Xwedê heye, û naxwaze jî bawer nake, ew jî derdê wî/wê ye.*
*Belkî mala te xana Xwedê be!*
*Berek'eta Îbrahîm Xelîl têde be! berek'eta Xwedê bikeve mala te!*
*Berek'eta Xwedê lê be!*
*Berxwedar bî!*
*Bextê te sipî be!*
*Bêy hikmê Xwedê pelg jî li ser darê naheje!*
*Bi destûra Xwedê!*
*Bide xatirê navê Xwedê!*
*Bi dile kala — qîza bistîne, bi dile xorta — hespa.*
*Bi hêvîya*[4380] *Xwedê!*
*Bi xêr be!*
*Bi xêr û xweşî biqetînî!*
*Bi p'ê û p'ar be!*
*Bi selametî r̂abî!*
*Bila bi dê û bab mezin be!*
*Bila bi hev r̂a pîr û kal bin! = bi hev r̂a (p'êkve) pîr û kal bibin!*
*Bila bive mû — neqete!*
*Bila ciyê te bibe bihuşt (cenet)!*
*Bila li te bibe goşt û xwîn!*
*Bila Xwedê bi ber dua'yên salihan bixe!*
*Bila Xwedê r̂eĥma xwe bavêje dilê te!*
*Bila Xwedê şifayê xêrê bide!*
*Bila Xwedê û şêx Adî (P'êx̂ember) bên hawara we!*
*Bila Xwedê e'mrê min li ser e'mrê te zêde bike!*
*Bila Xwedê ya xwe bike, ya e'vde neke!*
*Bila Xwedê yar be — bila duniya t'ev neyar be!*
*Bila Xwedê yar be — bila şûrê te dar be!*
*Bila li te bigivire!*
*Bila p'er̂ û baskên Xwedê li ser be!*
*Bila serê te sax be, bila sitara Xwedê li ser be!*

**C**
*Cûcûk cûcûke, avê veduxwe jor Xwedê dinihere.*

**Ç**
*Çawa av ciyê bilind nasekine, dua'- dir̂ozinge jî li ser qure û babaxan nasekine!*
*Çiqas dibî mîr, Xwedê neke ji bîr!*

**Ĉ**
*Ĉara bêĉara – Xwedêye!*
*Ĉavê Xwedê li te be! = di bin ĉavdêriya Xwedê de bî!*

**D**
*Darbir̂o, dara bibir̂, deste xwe e't'eka Xwede nebir̂!*
*Dengê te xweş!*
*Dengê te li dinê be!*
*Derdê te li canê min bikeve!*
*Derewîn — dijminê Xwedêye.*
*Destê ocaxa mala şêx li pişta te be!*
*Destê te t'er û hêşîn be!*
*Di dilovaniya Xwedê de be!*

[4380] binêr: *hîvî*

*Di nav xêr û şahiyê de be!*
*Deweta we li ser xêrê be!*

**E**
*Emrê te dirêj be!*
*Emr dirêj bî!*
*Evên kevin, ĥezarî nûh!*
*Ez çawan ji te xweşim, bila Xwedê jî wisan ji te xweş be!*
*Ez goriya te bim = ez qurbana te bim!*
*Ez derdê te nebînim!*
*Ez kêmaniya te nebînim!*
*Ev ne vire, lê Xwedê wî vire!*

**E’**
*E’mrê te e'mrê Sîmir be!*

**G**
*Go: k’ûsî çir̂a usa p’îsî? Go: Xwedê usa e’nya min nivîsî!*
*Gor̂a te t’ijî nûr be!*
*Gor̂a wî fireh be!*
*Goşt pê bigivire!*
*Gul bî, geş bî, neĉilmisî!*

**H**
*Hawara Xwedê!*
*Her hebe! = dayîmî be! = tim hebe!*
*Her t’êr û t’ijî be!*
*Hûn li ser be’lgîyekî pîr û kal bin!*

**Ĥ**
*Ĥezar salî bî!*

**X**
*Xêr heri, silamet veger̂î!*
*Xidir nebîy alîk’arê te be!*
*Xwedê angorî dilê te bîne pêşîya te*
*Xwedê bab û birayê te bihêle!*
*Xwedê bedena te şên bike! (p’ir̂anî ji bûkan r̂e tê gotin)*
*Xwedê ber destê te kêm neke!*
*Xwedê bêt’ifaqiyê neke nava we!*
*Xwedê bîhna we fireh bike (ket)!*
*Xwedê bi r̂eĥma xwe şa bike!*
*Xwedê bigihîne r̂uĥê miriyan!*
*Xwedê bike k’efaretê gunehan!*
*Xwedê bike, melleyê çi bike!*
*Xwedê çira wî ji t’unede vêxe!*
*Xwedê ĉiya dibine berf ser datine.*
*Xwedê çu meraqa di dilê te de nehêle!*
*Xwedê dengê te bibihîze (sehbike)!*
*Xwedê derd û bela neke nesîbê te!*
*Xwedê deriyekî digre, ĥezarî vedike!*
*Xwedê derê t’ifaqan (qeza û belayan) bigre!*
*Xwedê deriyê xêrê li te veke!*
*Xwedê destê r̂astê moĥt’acê destê çepê neke!*
*Xwedê dilê te xweş biket!*
*Xwedê dilê te şahî biket!*
*Xwedê divê: «Min dest, p’ê, ĉav dane te — pêşya te av, agire — xwe nevêje».*
*Xwedê dûr dike, lê bir nake!*

*Xwedê e'mrê te dirêj bike!*
*Xwedê gerdena te azad bike!*
*Xwede gotiye: «Min berek'et, ji te ĥerek'et»!*
*Xwedê guh li dengê te bît!*
*Xwedê hewe biparêzit!*
*Xwedê hawara ĥeftê du mileta bê, paşê hawara me!*
*Xwedê xêra te binivîsit!*
*Xwedê xêra wî qebûl bike!*
*Xwedê îmanê bide te!*
*Xwedê îmana te k'amil bike!*
*Xwedê ji dê û babê te r̂azî be!*
*Xwedê ji dîn û îmanê bêp'ar neke!*
*Xwedê ji te r̂azî be!*
*Xwedê k'esî bê pişt neke!*
*Xwedê k'esî bêxwedî (bêxweyî an bêkes) nehêle!*
*Xwedê k'esî li xwe neheyrîne!*
*Xwedê kêmaniya dengê te neke!*
*Xwedê kêmaniya te nede!*
*Xwedê kurekî bide te!*
*Xwedê qeyda wî veke!*
*Xwedê qeza û belayan ji ber derê we dûrxîne!*
*Xwedê quwetê bide te!*
*Xwedê li gor dilê te bide te!*
*Xwedê li ĥalê te binêre!*
*Xwedê li ĥalê te were hawarê!*
*Xwedê li ĥeftê û du mileta bêye r̂aĥme û me jî!*
*Xwedê mala te ava bike!*
*Xwedê me bide bi xêra te!*
*Xwedê me ji belayên hîn mezintir bisitirîne!*
*Xwedê me li ber dua'yê te bixe!*
*Xwedê me nede şermê!*
*Xwedê me r̂ojekê jî bê te nehêle!*
*Xwedê min bi goriya te ke!*
*Xwedê mirazê dilê te hasil bike!*
*Xwedê mirazê xwedanmirazan hasil bike, yê me jî têde!*
*Xwedê mirinê nede!*
*Xwedê mirov nexe ser zar û zimanan!*
*Xwedê mirov neke benîştê devê xelqê!*
*Xwedê mirov ji nezera çavan bisitirîne!*
*Xwedê min nezrê te bike! Xwedê min qurbana te bike!*
*Xwedê neyne serê tu k'esî!*
*Xwedê nête dilê te ya qenc bîne sêrî!*
*Xwedê nivînên xêrê bide te!*
*Xwedê nûra çavê te kêm neke!*
*Xwede r̂isqê te batin da bighîne!*
*Xwedê r̂uĥa dide û distîne!*
*Xwedê sebrê bidet we!*
*Xwedê selametiyê (selametiya xêrê) bide!*
*Xwedê serî li we negeȓîne!*
*Xwedê serê e'yalê me bihêlit!*
*Xwedê şên û qedîn bike!*
*Xwedê te bê war neke!*
*Xwedê te bigihîne dewraneke mezin!*
*Xwedê te bihêle!*
*Xwedê te bixefirîne!*
*Xwedê te e'fu bike!*
*Xwedê te ji qeza û belayan biparêze!*
*Xwedê te ji dest û p'iyan neke!*

*Xwedê te ji qudûmê dest û lingan neke!*
*Xwedê te ji nav zarokên te nebet!*
*Xwedê te li (ji) ser serê zarokên te kêm neke!*
*Xwedê te ĥewce nekit!*
*Xwedê te moĥt'acê namerdan neke!*
*Xwedê, tu, me û Êzdîxanê ji şefa'eta xwe kêm nekî!*
*Xwedê û p'êxember bi te r̂e bin!*
*Xwedê we bi hev r̂a kal û pîr bike!*
*Xwedê we bi hev şa bike!*
*Xwedê we bisitirîne!*
*Xwedê we ji ber hev nexe!*
*Xwedê we şermezar neke!*
*Xwedê ya dilê te bi cî bîne!*
*Xwedê yeka te bike deh!*
*Xwedê yekî (yeke) bi dilê te bide te!*
*Xwedê yekîtiya hewe xerab neket!*
*Xwedê zarokên te ji te r̂e bihêle!*
*Xwedê zêde bike!*
*Xweşî be!*

**J**
*Jîyîna ser vê dinê hulm-gulmeke, gotina Xwedê tu qebûlke û ewê te bextewarke!*
*Ji e'vda tê veşartin, lê ji Xwedê nayê veşartin!*
*Ji vir û ĥeta ba mala Xwedê!*

**K**
*Kevir ber p'iyê te bive penîr, penîr jî bive hevir!*
*Kevir li ber p'iyên te nek'evin!*
*Kevirê ku li ber lingê te bik'eve, bila li ĉavê min bik'eve!*

**K'**
*K'îjan xêre bira Xwedê mîyaser ke!*

**Q**
*Qap'îye te şen be, ava be, t'er be, t'ijî be, zede le nek'eve!*
*Qelema te şên û geş be!*
*Qencî û xiravî herdu jî ji dergê Xwedê ten!*
*Qenciya Xwedê înk'ar neke!*
*Qirar, qirara Xwedê ye!*

**L**
*Li ser xêrê be!*
*Li te xweş bît!*

**M**
*Mala te ava be!*
*Mala te ava, t'ijî bûk û zava!*
*Mala te ava, Xwedê kurê te bike zava!*
*Malê ji te ĥezar malî! = ji vê malê ĥezar mal çêbe!*
*Mandûnebî! Qewat be! Xwedê qewatê bide!*
*Me kêm kir, bila Xwedê zêde bike!*
*Mert'ala Şems ser milê te be!*
*Mêvan, mêvanên Xwedê ne!*
*Mirazê te malê be!*
*Mûyê sipî li çoka te k'evin!*

**N**
*Noşî can be!; sihet be!*

**O**
*Ocaxa te [qap'iyê] te şên be!*
*Oxira te oxira xêrê be!*

**P**
*Pîroz û mibarek (bimbarek) be!*

**P'**
*P'ê bî, goȓê bî, goȓober te fire be!*

**Ȓ**
*Ȓastî — mala Xwedê ye!*
*Ȓastiya Xwedê milet serfinyaz dike, lê ji ȓêk'etina milet, milet unda dike.*
*Ȓeĥma Xwedê li dê û babê te be!*
*Ȓeĥma Xwedê li miriyên haziran!*

**S**
*Sere min ber serê te k'eve!*
*Serderiya te zêȓ be!*
*Sae'ta te xweş be!*
*Siya Xwedê li ser te be!*
*Sifra we dayîmî be!*

**Ş**
*Şuxula usul him Xwedê xweş tê, him Ȓesûl!*

**T**
*Taya te, bi mirina min be!*
*Tu bi mirazê xwe şa bibî!*
*Tu bi xêr û silametî biqetînî!*
*Tu bibî ĥezar salî!*
*Tu bijî dinyalikê eşq û dil, bê derd, bê kul!*
*Tu ĥezar cejnan bibînî!*
*Tu li herdu dinyan (cîhanan) jî ȓûspî bî!*
*Tu dîn û dinya ȓûsipî bî!*
*Tu nekî — Xwedê bide te!*
*Tu nemirî, t'u ȓahêjî axê, di destê te de bibe zêȓ!*
*Tu t'u kul û derdan nebînî!*
*Tu xêrandar bî! = tu xwedanê xêran bî!*

**T'**
*T'extê te bira vekirî be, t'extê îşqê be, yê şayê be!*
*T'u kêmaniyê (kêmasiyê) nebînî!*

**V**
*Vegeȓa (oxira) te ya xêrê bît!*

**Y**
*Ya Xwedê, tû derê xêra veke, derê şeȓa wergeȓîn!*
*Ya Ȓebî şikir ji te ȓa!*
*Ya Ȓebî tu me moĥt'acî k'esî nekî!*
*Ya Ȓebî tu me ji nezera xerab bisitirînî!*
*Ya Ȓebî, tu me ji ya hayê me jê t'une bisitirînî!*
*Ya Ȓebî tu qenciyê ji dilê me kêm nekî!*
*Yê bo Xwedê be, Xwedê jî bo wane!*

Z

*Zêdeya we bi dê û bab mezin be!*
*Zehmeta te di avê de neçe!*

# XI. GILIYÊ XWEDÊ NASÎ Û BI TIRS

*.. ..ji Xwedê ne tirsiya*
*.. ..berxê Xwedê ye*
*... bela xwe ji Xwedê bivînî*
*... bi wî Xweda yê bêşirîk kim*
*... ji Xwedayê dilovan dixwazim*
*... xwe ji Xweda yê xwe naki..*
*... Xwedê ditirsim*
*.... bi qedrê Xwedê bik…*
*...ê çewa here huzûra Xwedê*

*Baweriya …. bi Xwedê hebe*
*Bê qeweta Xwedê*
*Bêy hukumê Xwedê pel jî li ser darê naheje*
*Bi destûra Xwedê*
*Bi helaliya Xwedê*
*Bi îzna Xwedê*
*Bi navê Xwedê*
*Bi navê Xwedê sûnd bixwi.*
*Bi siya Xwedê*
*Bi xatirê Xwedê kî*
*Bi ȓonaya Xwedê*
*Bi Xwedê*
*Bide xatirê Xwedê*
*Bidin xatirê navê Xwedê*
*Bila nura Xwedê li* ser be
*Bila Xwedê ȓahma xwe bavêje dilê …..*

*Dahin û standina Xwedê xweşe*
*Derewîn dijminê Xwedê ne*
*Destê xwe ji Xwedê nekin*
*Dewlet serê Xwedê û serê ….*
*Di ȓêya Xwedê de b….*
*Dilovaniya Xwedê*
*Dinya ji pêxemberên Xwedê ȓe nema ye*
*Divê Xwedê li hev bîne*
*Dîwana Xwedê*
*Dua bo Xwedê*

*Eger Xwedê yar be, bela şûr dar be*
*Emî kêmin Xwedê yî temame*
*Emrê Xwedê xweş e*
*Emrê Xwedê ye*
*Evdê-a Xwedê*
*Ez ȓastiya Xwedê me*

*Fermanê Xwedê*

*Gazî Xwedê bi…..*
*Gazina ji Xwedê nek…*
*Gaziya xwe bigîne Xwedê*

*Hawara Xwedê*
*Her ji Xwedê û çiqas xasên Xwedê hene bawer bikin*
*Her tenê Xwedê heye*
*Her tim Xwedê li bîra xwe bînin*
*Her tişt ji Xwedê ve eyan e*
*Her Xwedê tenê zane*
*Hey Xwedê ….. hîşto*
*Hey Xwedê ….. kuşto*
*Hey Xwedê malik avakir.*
*Hey Xwedê malik xeravkir….*
*Heyiya Xwedê*

*Ĥebandina Xwedê*
*Ĥeq navê Xwedê ye*
*Ĥezar û yek navên Xwedê hene*

*Xas û Qelenderên bo Xwedê*
*Xasên Xwedê gelekin*
*Xêra Xwedê li ….. be*
*Xezeva Xwedê li …. Be*
*Xweda dizane*
*Xwedayê xwe nasnakin*
*Xwedayê dilovan*
*Xwedê Xwedanê şev û rojê ye*
*Xwedê … bê aqilê …. neke*
*Xwedê … r̂ûsipî bike*
*Xwedê …. bihêle*
*Xwedê …. biparêze*
*Xwedê …. bistrîne*
*Xwedê …. şaş neke*
*Xwedê …… xweyîke*
*Xwedê bê şirîk û heval e*
*Xwedê bela xwe bide ….*
*Xwedê bext bide …..*
*Xwedê bi …. r̂e ye*
*Xwedê bi oxira ….. r̂a be*
*Xwedê bi tenê dikare*
*Xwedê bihebînî*
*Xwedê bike tu gelekî sax bî*
*Xwedê bike tu hazar salî bî*
*Xwedê birayê …. bihêle*
*Xwedê çavên ….. xweyîke*
*Xwedê çêtir dizane*
*Xwedê cîhan sêwirand*
*Xwedê nas (i)*
*Xwedê da û stand*
*Xwedê daye te …..*
*Xwedê deriyekî digre, hezarî vedike*
*Xwedê emrê …. dirêj bike*
*Xwedê emrê …. dirêj neke*
*Xwedê heqê ……. ji ….. nehêle*

*Xwedê hezkirina me zêde bike*
*Xwedê hîştê*
*Xwedê hîşto*
*Xwedê hurmetê bide ...*
*Xwedê îmanê bide ….*
*Xwedê îmanê ji …. bistîne*
*Xwedê îşê …. r̂ast bike*
*Xwedê ji …. r̂azî be*
*Xwedê ji …. standiye*
*Xwedê ji ….. na tirse*
*Xwedê ji ….. xweşbe*
*Xwedê ji kesî nestî ne*
*Xwedê ji neheqan ra ne hêle*
*Xwedê k'erem e*
*Xwedê kurekî bide ...*
*Xwedê li ... bixe*
*Xwedê li …. şefa bike*
*Xwedê li …. were r̂ahmê*
*Xwedê li bîra xwe bîne..*
*Xwedê li ĥeftê û dû mileta bêye r̂ahme û me jî*
*Xwedê li hev anî*
*Xwedê li hev ne anî*
*Xwedê li pişta …. ye*
*Xwedê li r̂aserî ...ye*
*Xwedê mala ... xirab nekiro*
*Xwedê mala …. ava bike*
*Xwedê mala bavê …. ava bike*
*Xwedê mala bavê …. xira bike*
*Xwedê mala nezana xira ke*
*Xwedê merazê… bike*
*Xwedê meriv ji bela û teşqelan bistirîne*
*Xwedê mezin e*
*Xwedê miradê …. bike*
*Xwedê mizgîna xêrê bide …..*
*Xwedê mizgîniyê bide ….*
*Xwedê nasîna me Êzdiyan ji qedîm heta îro heye*
*Xwedê ne hîştê*
*Xwedê ne hîşto*
*Xwedê ne nas…*
*Xwedê neke gidî*
*Xwedê nekî*
*Xwedê nur e*
*Xwedê pesnê xwe na de*
*Xwedê qahra xwe li ….. bike*
*Xwedê qebûl nake*
*Xwedê qebûl neke*
*Xwedê r̂eĥetiyê bide …. e*
*Xwedê r̂ehma xwe li …. bike*
*Xwedê r̂oja ... r̂eşke*
*Xwedê r̂uĥa dide û distîne*
*Xwedê r̂ûyê …. spî bike*

*Xwedê şade ye*
*Xwedê şade ye*
*Xwedê serê ... nexîne belayê*
*Xwedê şikriyê bi de ....*
*Xwedê temenê .... dirêj bike*
*Xwedê tenê pê dizane*
*Xwedê tû bidî xatirê navê xwe*
*Xwedê t'u derdan nede ....*
*Xwedê t'u êşê nede ....*
*Xwedê tu řuêê ..... bistînî*
*Xwedê warê .... korbike*
*Xwedê weke dilê .... bike*
*Xwedê xêra .... binivsîne*
*Xwedê xêra .... qebûlbike*
*Xwedê xêrabike*
*Xwedê xêrê bide .....*
*Xwedê xêrke*
*Xwedê xirab bike destengiya dinya yê*
*Xwedê xizmeta .... qebul bike*
*Xwedê xweda ye!*
*Xwedê xwedanê ins û cins e*
*Xwedê xwediyên xêran bê p'ar nahêle*
*Xwedê yek e*
*Xwedê yek e derke(dari) hezar*
*Xwedê yeke û lı seranserî hemû xwedana ye*
*Xwedê yekî cebar e*
*Xwedê zanî be*
*Xwedê zarokên .... bihêle*
*Xwedê zêde bike*
*Xwedê řeĥma*
*Xwedêo*
*Xwezla xêra mala Xwedê řa*

*Êzdîye bê Xwedê ne êzdîye*
*Êzdî jî navekî Xwedê ye*
*Êzdî Xwedê perestin*

*Ji bo meznaya Xwedê*
*Ji bo navê Xwedê*
*Ji evda tê veşartin, lê ji Xwedê nayê veşartin*
*Ji vir û heta ba mala Xwedê*
*Ji Xwedê dilovan hêvî dikim*
*Ji Xwedê natirs…*
*Ji Xwedê Teala bitirs..*

*Kula Xwedê bikeve nav mala paşveruya*

*K'î bo Xwedê be, Xwedê jî bo wan e*
*K'îjan xêr be bila Xwedê wê bike*
*K'a Xwedê bejê erê*
*K'erema Xwedê ji ...*

*Qencî û xiravî herdû jî ji dergê Xwedê ten*
*Qenciya Xwedê înkar neke*
*Qewlê Xwedê*
Qirar - *qirara Xwedê ye*

*Li jor Xwedê heye*
*Li r̂êya Xwedê nebin xerfê*

*Mala Xwedê ava,*
*Meriv gereke ya Xwedê bêje*
*Mêvan mêvanên Xwedê ne*
*Milyak'et ferwara Xwedê bi cih tînin*
*Milyak'et ji nûra Xwedê hatine e'frandin*
*Miradê xwe ji Xwedê bixwaze*
*Muhbeta Xwedê gelekî şîrin e*

*Na bi Xwedê ez ……..*
*Nûra Xwedê li we bibar e*

*Pesnê Xwedê bidin*

*P'epûka Xwedê*

*R̂ahma Xwedê li dê û bavê …. be*
*R̂astî mala Xwedê ye*
*R̂ebenê Xwedê*
*R̂izqê …… li Xwedê ye*
*R̂oj nûra Xwedê ye*
*R̂oja Xwedê dayîna … pîroz be*
*R̂ojên Xwedê gelekin*

*Şikir ji Xwedê ra*
*Şikir ji Xwedê re em Êzdî ne*
*Şikriya xwe ji Xwedê bike*
*Silava Xwedê li … be*
*Standina Xwedê ye*
*Sitara Xwedê li ser ….. be*

*Tawisî-Melek emînê Xwedê ye*
*Teslîmî Xwedê dib…..*
*Tîra Xwedê lê ket…..*
*Tiştê Xwedê kiriye betal nabe*
*Topa Xwedê li ….. k'eve*
*Tu bi xatirê Xwedê kî*
*T'u evdî Xwedê nedîtîye*
*T'u kes nikare ji qirara Xwedê bireve*

*Wê Xwedê çêke*
*Weleh navê Xwedê ye*
*Wey Xwedê r̂uĥê ….. bistîne*

*Wey Xwedê yo*

*Ya mala Xwedê*
*Ya Xwedê*
*Ya Xwedê bêjin*
*Ya Xwedê her tû yî, û her tû yê hey, û her dê hebî*
*Ya Xwedê r̂iya te r̂astî ye*
*Ya Xwedê dîzane kes nîzane*
*Ya Xwedê tu derê xêra veke, derê şer̂a wergerîn*

# XII. K'ITÊBA CELWE

**şaxê — 1**[4381]

### Dibaçe (Pesgotin)

1. *Ew kêjî peşiya hêmû ĥeqîqetiyê (hebûna, xelq, r̂ihber̂a) bû — melek' Tawise.*
2. *[Eva] ew bû k'ê Abtaûs şande a'lemê wekî [ew] başqe bike cimae'ta xweye xas û begîhîne wî zanîbûna ĥeqîqetê û azad bike ji tirsê û xofê.*
3. *Pêşiyê ev îş û k'ar ezber hate kirinê — rû bi rû lê paşê bi alîk'ariya (wasetêyê) vê k'itêbê bi navê Celwe, xandina k'îjanî qedex̂eye bona wan kesa k'êjî miletê me dere [k'êjî ne ji miletê meye].*

### Fesilê e'wil

1. *Ez hebûm, niha ji heme û dimînim ĥetanî axirzemînê. Qewata (zora) min heye ser ĥemû e'firandina*[4382] *(hebûna). Ez îşe (k'arê) wana t'eşkîl (p'êîk') dikim.*
2. *Ez hazirim, [ez] xêrim boy wana k'ê ji bawariya min dikin û şîretê ji min dixazin.*
3. *Qet cîk tine wekî ez têda nebim (ez heme ĥemû dera). T'evbûîna min heye bal ĥemû qewmandinada k'îjan ji dîndared dînê başqe ça şer̂ (cengî), xirabî (neqençî) hesab dikin, çimkî [ew qewmandin] xwastina wana nîne.*
4. *Bona ĥemû (her) dewrana hikmdarek heye û ewa jî bi gotina (şêwra) mine. Her zeman (neslet) diguhêre hikmdare vî û mokelel dike.*
5. *E'frandine t'ebîe'tê r̂a ĥeqê qanûnî didim.*
6. *Wê a'cizbe ew [kes] k'ê jî muqabilê mine.*
7. *Xwedanêd*[4383] *mayîn t'ev îşê min nabin. Her cî jî arzûbim (bixazim) ewana miqabil nînin.*
8. *Ji wan k'itêba k'îjan jî destê wanadanin [xelqê x̂erîbadanin] ĥemû hergav r̂ast nînin û bi destê p'ex̂embera nehatine nivîsarê. [Ew k'itêba] hatine guhastinê û qelpkirinê. Her yek ji wan k'itêba yê dinê r̂a (mayîn r̂a) înk'ar dikin.*
9. *Ĥeqî (r̂astî; durustî) û neĥeqî (ner̂astî; nedurustî) dîyar (e'yan) dibe e'melêda (k'arda).*
10. *Ez hêrsim ser wana k'e ji bi navê min qise dikin. [Ez] fikirê xweye mix̂afilet (migabil) e'yan dikim bi alîk'ariya wan serwêrê beşîr (zanedar) k'îjana dişînim bo çend r̂oja. Gelek (ze'f) cara k'are (îşe) xilasbûyî [bi fik'rê min yê ne r̂ast] qedex̂e dikim.*
11. *[Ez] r̂ê nîşanî dikim û zanîbûne digihînim wana, k'e jî pey hînbûna min diçin. Ew [xelq] wê bextewar bin, k'îjan ji dibine hevalbendêd min.*

### Fesilê duda

1. *Însana r̂a qencî dikim bi arzûya (xwastina) xwe.*
2. *Zora (qewata) min heye ser ĥemû tişta çijî ser e'zmane, ser e'rdêye u bin e'rdêye.*
3. *Nabe wekî hebûnek (kesek) ba hebûneke (kesekî) mayîn şer̂ (ceng) bike.*
4. *Xêrê bême'nî mexsûs wana r̂a dixazim êd k'û hîmî min bûne û guhdariya min dikin.*
5. *[Ez] şixul (iş; k'ar) didim wana k'e ji min t'aqîm kirye (cêr̂ibandiye) û bi arzûye (xwastina) min ĥerek'et dikin.*
6. *Bo wana êd k'û bawariya min dikin û şêwra xwe mi r̂a dikin Ezê bi sûretekî din bêm (hazirbim).*
7. *Bi k'ûrê zeman [carcara] xelq r̂a (benî Adem r̂a) derda tînim (dişînim). Kes nikare ewa qedex̂eke (nehêle).*
8. *Kes t'ev îşê (k'are) min nabe.*
9. *R̂enc û nexweşî wana r̂a tînim k'ê jî*[4384] *miqabilî (pêşberî) min diçin.*
10. *Ew k'ê jî bi r̂eca min diçe not'la însanêd mayin namire.*
11. *[Ez] ĥiznakim çaxê kesek vê dinyaê da (dinêda) ji wî zemanî (we'deî) zêdetir dimîne, k'îjan ji min [jê r̂a] k'ifş kirye.*
12. *Eger arzû bikim (arzû kim), k'e jî bixazim yek bi yek [paşî] qeydekî yan ji du — sê qeyde pê t'enasoxê r̂ih bişînim wê dinê yan jî dinêke din.*

---

[4381] [20] (стр. 209-212)
[4382] *afirandin*
[4383] *xudan*
[4384] *k'ejî*

### Fesilê sisiya

1. *Bê k'itêb r̂ê nîşanî wan ĥizkirinêd xwe dikim k'îjan jî bi r̂êçê min diçin. Ez bêk'ifşbûnê r̂ehberiya wana dikim. Çijî hîmî [wana] dikim r̂encî (cefa) nîne.*
2. *Bi k'ûrê nêta zeman cara zîanê didime (tînim) wana k'e jî a'lemekî mayîndanin û ji dînê min derin (dûrin; derdik'evin).*
3. *Em benî Adem r̂ewşa şire'tê nizanin [û] bo vê jî gelekî (ze'fî) [ji wana] r̂êya [r̂ast] derdik'evin.*
4. *[Hebûnêd] r̂uĥberêd li ser zemîn, kevokêd e'zmana da, masîyêd*[4385] *beĥrê da — ĥemû bi destê minin û k'etine bin qolê min (destê min).*
5. *Ez derheqa [ĥemû] xezîne yê bin e'rde (zemîne) dizanim û yek-yek (yek bi yek) xelqê r̂a dibexşînim.*
6. *E'cêbiyê xwe nîşanî wana dikim, k'ê jî de'wê dikin dixazin.*
7. *Ew ẍerîba k'îjan jî xirabiye dikin û bi t'emiyê min û hevalbendêd min naçin wê zirarê bibînin çimkî nizanin wakî ê'zîmî û dewlemendî destê mindanin. [Ez] wan [tişta] bi [destê] nesilê (nisilê) benî Adem yê bijartî (bawertî) r̂a p'êşk'êş didim (dikim).*
8. *E'firandina a'leme, hilatina xelq (nesil) û guhastina ĥemû hikmdara [destpedibe] paşî [îzna] min.*

### Fesilê çara

1. *Ĥeqê xwe [Ez] nadim xwedanêd mayîn.*
2. *Min çar p'ar û çar wext û çar r̂ik'in bexşand (ber danî) [wekî] e'firandin bihata qedandinê.*
3. *K'itêbêd ẍeriba têne qebûlkirinê eger beranberî (not'la) [ayîna] dînê minin: Ew [k'itêban] k'îjan jî ne [nêzîkî] dînê minin hatine guhartinê (guhastinê).*
4. *Dijminê min sê tiştin û nifira wana dikim.*
5. *Xêrê wê ew [însan] bibînin k'ê jî r̂emzê min eşkere nakin.*
6. *Her yekî ji wana r̂a, k'ê jî bona (bo) min r̂enc dibînin, dinyakîda*[4386] *xêrê (qenciyê) didimê.*
7. *Çaxê t'ev (ba) ẍerîba r̂eqîbî (dijmintayî) hebe Ezê [k'êleka] wana bisakinim (pişta wana bigrim) k'ê jî t'evî minin.*
8. *Êyî ev kesano (însano)! K'ijan ji r̂astiya min pê guhê [xwe] dibhîn, ji wan qiseta (xeberdana) derk'evin, k'îjan [jî] ji min nînin (nayên). Navê min u sifetê (sûretê) min e'yan nekin, weki [hûn] gunehk'ar nebin. Hûn nizanin çi dikin û çi nakin ewana k'ê jî r̂êya ĥeqî [r̂astî] derk'etine.*

### Fesilê pênca

*Zatiya (k'êbûna) min sûretê min bi me'rifetî (maqûlî) bigrin, çimkî ewana wê bînin bîra we wan tişta ji dînê min çi jî we bîr kiriye.*

*Pey gilî-gotinê xizmetk'arê min herin. Guhê xwe bidin ser wê ilmê eyan, k'îjan jî ewana bi (ji) navê min we r̂a dibêjin.*

**şaxê — 2**[4387]

*K'itêba Celwe (K'îtaba Wahiyê) fermanên melekê Tawis vedibêje; Misĥefa Reş jî r̂êzik û r̂êgezênvê olê û avabûna dinyayê, bingeha mirovahiyê, çîroka Adem û Hewayê vedibêje.*

*Melek'ê Tawis beriyaher heyberê hat e'firandin. Ji bo gelê xwe ĥişyar bike û ji şaşiyan dûr bigre, alîk'arên xwe şand vê dinyayê; e'vdên xwe berê bi devkî ĥişyar kir, cara dudu yan bi vê p'irtûkê ku; hat qedeẍekirin ku beyanî lê binêrin an jî bixwînin.*

### Beşa yekem

[4385] *me'sî*
[4386] *dunîya*
[4387] http://www.ezdixandi.com/forum/72-974-1 Ew nivîsk'arê k'itêba Celwe ye. Misĥefa Reş jî ji aliyê Şêx Ĥesen ve hatîye nivisandin.

*Ezê ku hebûm, heme, ĥeta dawiyê ezê hebim; hikmê[4388] min li ser t'evahiya tiştên ku hatine e'firandin heye. Her bûyer û her tiştê girêdayî hebûnan bi fermana min p'êk tên. Kî ji vê yekê bawer bike û dema ku pê divî hebe gazî min bike, ezê derĥal[4389] bigihîjim wan, t'u tişt bêyî min nayê fikirîn. Kesên ku min qebûl bikin, ji bo ku li gor daxwaza wan nîne ĥemû bûyerên ku dibêjin xirabin, bi daxwaza min pêk tên. Wek'îlekî r̂êveberê herdemê heye, wî ez hildibijêrim. Bi her nifşê r̂e, serokê vê cîhanê jî diguhere; serok bi dorê tên, peywirên têkildarî dema xwe bicih tînin. Ez sûcan li gor nirxên ku ji taybetmendiyên xulqiyetê tên, dibexşînim. K'î ku li hemberî vê derk'eve, dê tengasî û êş jê kêm nebin. Wekî din t'u Xwedayek, nikare têkilî k'arê min û tiştên ku ez dikim bibe. Ez çi biryarê bidim dê ew p'êk bê.*

*P'irtûkên pîrozên di destê beyaniyan de, ger̂ ji aliyê p'êxember û hawariyan ve hatibin nivîsîn jî, êdî ne derbasdarin. Ew k'etine r̂ewşeke serhildêr, xera bûne, vana hev diderewînin û himê hev p'ûç dikin. Cudahiya navbera r̂astî û şaşiyê, dê li gormercên dema tê jiyîn bê destnîşankirin. Sozên ku min daye mirovan ezê bînim cih. Di demên dîyarkirî de li gor daraza wek'îlên min ên bi aqil û ĥişyar ku min selahiyeta xwe dewrî wan kiriye, ezê li gor peymana di navbera xwe û e'vdên Xwede t'evbiger̂im an jî t'evneger̂im. Ez li hemberî pêşveçûna bûyeran baldarim; dema ku em têde, ne çi tişta bi fêde hebe ez p'êk tînim. Kesên ku hîndekariya min dipejirînin, ez wan p'erwerde dikim û berê wan didim r̂astiyê. Ew bi guhdarîkirina min k'êf û zewqên mezinên gîyanî dijîn.*

## Beşa Duyem

*Ez bi t'evahiyarê bazên ku baş dizanim, xelat û ceza didim mirovan. Li r̂ûyê e'rdê û binî e'rdê çi hebe, di kontrola min de ye. Ez alîk'ariya ji bo netewên din nagirim ser xwe, ji başiya ji bo wan jî dûr namînim. Ez alîk'ariyê ji civata xwe ya hilbijartî r̂e û yên ku bi ya min kirine qet kêm nakim. Ez kontrola selahiyeteke çalak didim mirovên ku min ew cêribandine. Ev mirov li gor îradeya min, di r̂ewşên dîyarkirî de, alîk'arî dane kesên ku ji min bawer kirine. Yê ku dide jî ezim, yê distîne jî.Yê dewlemend jî dike ezim yê xizan jî dike ez. Yê bê hêvî dike jî ezim. Ev t'evlî gor derdorê û li gor demê p'êk tên. T'u hêzek nikare têkilî k'arê min bibe û mirovekîyê ji kontrola min derîne. Yên ku dixwazin ji min r̂e astengiyê derînin ez êş û nexweşiyan bi ser wan de dibarînim. K'î li fermana min guhdar bike, wek kesên din namire. Ez t'ehmul nakim ku t'u kes di vê dinyaya k'etî de zêdetirî dema ku min jê r̂e dîyar kirye bimîne; lê ku ez bixwazim wî[wê] li vê dinyayê du car, sê car yan jî zêdetir paşve veger̂înim, gîyanê wî[wê] têxim bedeneke din; ev zagoneke ger̂dûnî ye*

## Beşa Sêyemîn

*Ez, bê p'irtûk jî dikarim dostên xwe û kesên ku di r̂êya[4390] min de ne r̂amanên min dihesibînin, r̂êya r̂ast bi amûrên veşartî nîşanî wan didim; r̂êçikên ku ez dixwazim werin bicihanîn ne tengavkerin, li gor demê û mercan hatine dîyarkirin. Yên ku li hemberî zagonên min derên li dinyaya din didim cezakirin. Benî Adem, tiştên ku divê bên kirin nizanin, ji ber vê yekê t'imî dik'evin nav şaşîtiyan. Ajalên li r̂ûyê e'rdê û li e'zman[4391], masiyên di nav derya yan de, t'ev di bin r̂êveberî û venêrîna min dene. Xezîne yên veşartî yên li dinyayê û tiştên din, bi agahiya minin. Ez der feth[4392] didim ku ew xezîne yeko-yeko werin dîtin û standin. Kesên ku bibin xwediyê vana û kesên ku di demê de ji min daxwaz kirine, nîşane yên xwe yên veşartî, mûcîzeyên xwe nîşan didim. Dijminahî û berxwedana ku beyanî li hember min û yên ku di şopa min de ne nîşan didin; encax zirarê bide xwediyê xwe; lewre*

---

[4388] *hikm*
[4389] *derhal*
[4390] *riya*
[4391] *asîman*
[4392] *derfet*

*nizanin ku hêz û dewlemendî di destê min de ne û ez vana didim benî Ademên ku ĥeq kirine. Rêveberiyên dinyayê, derbasbûna serdemana li dû hev, guherîna wek'îlên mina di her serdemê de, ĥeta dawiyê di bin kontrola min de ye. K'î ku bi duristî berbi wir ve nemeşe, ez, di demeke ku bi xwe dîyar bikim de wê[wî] cezadikim û wan dişînim cihê ku jê hatine.*

### Beşa Çaremîn

*Çar dem sal hene, hêman jî çar in; min ev, ji bo tiştên ku min e'firandine pê diviyên xwe p'êk bînin, bexş kirye. P'irtûkên pîroz ên biyaniyan, encax bi qasî ku li gor zagonên min bin, li dijî min dernek'evin; ji aliyê min ve tên pejirandin. Dîsa vana, bi p'iranî ji r̂ê derketine. Sê ji wan li dijîminin û ez ji sê navan nefîret dikim. Ji bo yên kurazên min aşkera nekin, ezê soza xwe ya der barê xelatan de bicih bînim. Yên ku di r̂îya min de êşê dik'işînin, bila guman t'une be, ezê wan di dinyayekê de xelat bikim. Yên di r̂îya min de dimeşin bila li hemberî neyar û beyaniyan wek cema'etê bijîn. Hûn, ên ku li gor zagonên min t'ev digeȓin, fikrên ku ji aliyê min ve nehatine r̂agihandin nekin hişê xwe. Wek ku beyanî dikin nebe nebe navê minan jî navên ku li min hatine danîn bi lêv nekin, an na hûnê gunehk'ar bibin; lewre ev mijar ji derveyî têgihîştina we ne.*

### Beşa Pêncem

*Hurmeta xwe ji tişt û wêne yên ku min t'emsîl dikin r̂e p'êşkêş bikin; lewre dê ew, helwestên we yên ne li gor zagonên minin bînin bîra we. Li gor fermana alîk'arên min t'ev bigeȓin, guh bidin gotinên wan. Da ku agahiyên dinyaya din ên ku ji min girtine r̂agihînin we.*

# XIII. K’ITÊBA MESHEFA R̂EŞ

**şaxê — 1**[4393]

*I. Cara e'wil Xwede ji hebûna xweye e'ziz (mehbûb) dur̂eke*[4394] *(guhareke) Sipî û teyrek (kevokek) bi navê E'nqer e'firîn kir. Ev dur̂ (guhar) danî ser pişta [teyr] (kevokê) û çil ĥezar sal [dur̂; guhar] ser pişta we mabû.*

*II. R̂oja e'wil çaxê [Xwedê]*[4395] *e'firandk'arî (e'firînk'arî) dikir yekşem bû. [Xwedê] melekek çêkir (saz kir) bi navê Ezraîl. Eva melek' Tawise — hikmdarê ĥemiya.*

*III. R̂oja duşenbê [Xwede] melek Derdaîl e'frîn kir k'îjan ji şêx Ĥesene (şêx Sin*[4396]*).*

*IV. R̂oja sêşenbê*[4397] *[Xwedê ]melek Îsrafil e'firîn kir k'îjan ji şêx Şemse (Şesims).*

*V. R̂oja çarşemê [Xwedê] melek Mik'aîl e'firîn kir k'îjan ji şêx Abû Bek'ire (şexû Bek'ir*[4398]*).*

*VI. R̂oja pêncşembe [Xwedê] melek Cebraîl e'firîn kir k'îjan jî Sicadîne.*

*VII. R̂oja înî [Xwedê] melek Şemnaîl e'firîn kir k'îjan jî Nesirdîne*[4399]*.*

*VIII. R̂oja şemiye [Xwedê] melek Tûraîl e'firîn kir k'îjan jî Fexredîne*[4400]*.*

*IX. [Xwedê] melek' Tawis k'ifş kir r̂êberê (r̂ehbere) wana.*

*X, Paşe [Xwedê] sûretê ĥeft E'zmana, E'rd, Te'v û Heyv*[4401] *(Mang) e'firîn kir.*

*XI. Fexredîn însan û ĥeywan*[4402] *û ĥemû hebûned r̂uĥber û teyr e'firîn kir û [qişk eva] danî (kire) xerqê da. [Paşe] t'ev ĥemû meleka ji dur̂ê (guharê) derk'et (derk'ete der). Bi hêrs ser dur̂ê (guhare) kire qîrîn. [Dur̂, guhar] şkest, hev belabû ser çar keriya û ji we av r̂ijiya (derk'et) û beĥr çêbû*[4403]*. Dinya xar (gurover) bû û bê xeleq (qul) bû.*

*XII. [Xwedê] Cibraîl bi sûretê teyr e'firîn kir û şand û çar goşê dinyayê da [daste] wî. Lê paşê gemîkek çêkir û danî (hişt) ser avê [bi ve'dê] sî ĥezar sal. Paşî vê hat û sekinî (war bû) Lalişê da. Qîrînek nav dinyayê xist. Dinya [qaîm] bû û e'rd (xalî) çêbû û destê [Wî] lerizîn. [Xwedê] ferman da (kir) Cebraîl r̂a [paşê] aram bû. [Hîngê] du keriye dur̂e (guhare) anî. Yek berjêrî zemîn danî û yê din jî ber jorîna dergê e'zman danî. Li paşî vê ji hurikê dur̂a Sipî Heyv (Mang), Te'v (R̂oj) û stêrk [e'firîn kir] û ser [banê] E'zman [wana] dardakir seva (bo) bedewbûnê.*

*XIII. [Xwedê] dare berdar û giha (hêşnayî) û şaxe ĉiya e'firîn kir seva (bo) bedewbûna e'rd. [Paşê] çêkir t'acê E'rş ser ferşê e'rd.*

*XIV. Xwedaiyê K'ibîr gote meleka: «Ez Adem û Hawa*[4404] *e'firîn dikim û [paşe] bi sûretê wan neslê benî Adem e'firîn bikim». Ji bedenê Adem çêdibe (dibe, wê bê) Şehir bin Sefer û ji wî wê bê dine (dinyayêda) milet [û] paşî k'îjan ji p'êyda*[4405] *dibe (tê) miletê Ezraîl, yanî miletê melek' Tawis — êva êzdîne (êzdayîne).*

*XV. Paşê [Xwedê] şêx Adî ji (li) e'rdê Şamê şande Lalişê.*

*XVI. Paşê Xwedê hate xarê (dak'ete) ser ĉiyaê R̂eş û kire qîrîn. Sî ĥezar melek e'firîn kir û başqe-başqe kir bi destî, k'îjan jî çil (têk'sta e'rebî da nivisiye «çil ĥezar») sal ĥebandina xasê (mexsûse) ĥelal dikirin.*

*Paşê [Xwedê] ewana (wana) da destê melek' Tawis û gişk [hevra] hilk'işiyan e'zmana.*

*XVII. Paşê Xwedê hate xarê (dak'et) ser e'rde Qedes (sofiê). Hikm kir Cebraîl r̂a wekî ji herçar goşê dinyayê (dinê) xalî bi aniya. [Paşî vê] e'rd, û hewa, û agi,r û av e'firîn kir. Û bi piştî (sayîya) p'irqudretiya xwe nefes k'işand [ba] r̂uĥe [Adem] (r̂uĥ da Adem) û hikm kir Cebraîl r̂a wekî [Adem] bibira nav baẍe cenete*[4406] *û [îzin bida Adem] êmîşê ĥemû dara bixwara, her genim nexwara (xêncî genim; nehîşta bixwara).*

*XVIII. Li paşî [derbasbûna] sed sala melek' Tawis gote Xwedê: «Wê ça Adem û neslê wî zêdebin?». Xwedê gote [wî]: «T'edbîrkirina û t'eşkîlkirina ĥemû van [pirsa, k'ara] didim destê te». [Melek' Tawis] hat ba Adem [û] je pirsî: «Te genim xar?» [Adem] got: «Na. Çimkî Xwedê nehîşt (îzin Ne da)». [Melek' Tawis] gote:*

*«Bixwe. Ewa te r̂a çêtire (başe)». Paşî xarina [genim] zikê [Adem] werimî (t'ijî bû). Tawis melek' [Adem] ji cenetê derxist û bê cî hişt û bilindbû (hilk'işiya) e'zmana.*

*XIX. [Adem] ber [êşandina] zik tengî (a'ciz) bû, lema wekî xelek (qul) tinebû [û tişt dernedik'et].*

---

4393 [20] (стр. 212-216)
4394 *dur*
4395 *Xudê*
4396 *Şîxisin*
4397 *seşenbê*
4398 *Şêxûbek'ir*
4399 *Nasridîn*
4400 *Faxredîn*
4401 *hîv*
4402 *ĥeiwan*
4403 *çebû*
4404 *Hêva*
4405 *p'êîda*
4406 *cine't*

*Xwedê kevokek şand ba wî, k'îjan ji pê dindika xwe ĥeya wî vekir. [Adem] aram (r̂iĥet) bû.*
*XX. Cebraîl sed sal t'enê mabû [ji Adem dûr bibû]. Sed sal derd dik'işand.*
*XXI. Xwedê Cebraîl r̂a ferman kir. [Ew] hat û Hawa e'firîn (saz) kir ji p'arxana ĉepe ya Adem.*
*XXII. Paşe melek' Tawis hate ser e'rde (zemîn) ba mexlûq*[4407] *ji t'ayîfa me. Çimkî [xêncî] p'adşayê Aşurî çend p'adşayê me ji hebûn: ji me bû Neşrûh, k'îjan jî Nasirdîne û K'ambûş (K'ambîz), k'îjan jî Fexredîne û Artîmûş, k'îjan jî heye Şemsedîn û paşî vana jî du p'adşêd me [dîsa] hebûn: Şabûrê*[4408] *e'wil û [Şabûrê] duda. Hikmdartîya (hikmkirina) wana sed pêncî sal k'işand. Gire-girê me ĥeta r̂ojêd îro jî ji nesletê wana e'sil bûne.*
*XXIII. Û r̂ikê (hêrsa) min tê ser çar p'adşaha.*
*XXIV. K'ahû (salat) mera ĥerame, çimkî [ev xeber] angorî (not'la) navê xasîyê p'exembere. Û lobî jî [qedex̂eye] û r̂engê şîn. Bo xatire Îûnan (Ionan) p'exember masî nexwe. [Goştê] ask (xezal) nexwe, çimkî ew pizmamê ji yekî p'exemberê meye. Û şêx û şagêrdêd wînî gerek qet nexwin goştê dîka bona (seva) me'rîfeta (qedir-qîmeta) melek' Tawis. Û Tawis yek-yekî ji wan ĥeft Xwedana ne sûretê k'ê jî [Tawis] bîna [sûretê] dîkane. Şêxan û şager̂dêd wan gerek kundir naxwin. Serp'iya av berdan (şilkirin) û r̂ûniştî derpî (şal) xwekirin*[4409] *ĥerame. Ĥewcyê t'ebîe'tiyê îzn t'ine bikin (derbaskin) dest avêda û şûştin ĥimamêda [t'evî şile'tê]. Usa jî r̂ast nîne xebered mîna qeyt'an*[4410] *û şat û şer̂ bidine xebatê. Durust (r̂ast) niye lefzê (xeberê) me'lun bidine xebatê (nifira bikin), k'îjan jî dikarin bînin bîra we [xeberê] not'la nale-nal, nalîn.*
*XXV. Li berî (pêşîya) hatina Îsa vê dinê, dînekî me [hebû] k'îjanê r̂a digotin agirp'erestî. Yaĥûd (Cihû) û xaçparêz û Îslam miqabilî dînê me bûn. Û wisa*[4411] *jî e'cem (fariz).*
*XXVI. Ahab ji p'adşaêd me bû. [Wînî] her yekî jî me r̂a e'mir (hikm) kir wekî[em] navekî xas bidne wî. Nav jê r̂a danîn Xwedê Ahab yan Xwedê Be'lzbûb, k'e niha p'îr Bube*[4412]*.*
*XXVII. P'adşakî me hebû li Babole*[4413] *navê wî Boxtnaser bû. U li E'ceme*[4414] *p'adşakî me hebû bi nave Axeşvêroş Qostantînînye*[4415] *da jî p'adşakî me hebu bi navê Ax̂irîqalûs (Akrîqalûs?).*
*XXVIII. Li berî (pêşîya) [e'firînkirina] e'rd û e'zman Xwedê ser beĥre bû. Gemîk xwe r̂a çêkir û ser beĥre seferî dikir.*
*XXIX. [Xwedê] ji xwe dur̂ek (guharek) e'firîn kir û çil sal hikm ser kir. Paşê piĥînek lêxist.*
*XXX. Weyî li e'cêbê (e'cebiyê), li qalme-qalmê û dengê wî çêbûn ev ĉiya û ji t'oza wî — ev t'epa û ji du — ev e'zmana. Û [Xwedê] ĥemû eva bê stûn meĥikem kir û ji k'ulekê [derk'et] (r̂êk'et).*
*XXXI. Paşê [Xwedê] e'rd [pê k'ûp] dada (qulifand) û qelem girte destê xwe û destpêkir niwîsara ĥemû e'firînkirinêd xwe.*
*XXXII. Paşê [Xwedê] ji zatiya (ji hebûna xweye e'ziz) û ji nûra xwe şeş Xwedê e'firîn kir. Û e'firînkirina wana bîna (not'la) vêxistina ĉirekî ji ĉira din bû.*
*XXXIII. Xwedayê e'wil gotaye duda: «Min e'zman e'firîn kir. Hilk'işe ser e'zman û tiştekî e'firînke». Hilk'işiya û bû Heyv. Yê çara felek e'firîn kir. Ye pênca sterka sibe e'firîn kir. Ye şeşa hewa e'firîn kir.*

**şaxê — 2**[4416]

*I. Xwedê di destpêkê de ji cewherê xwe dur̂a Sipî e'firand; û ĉivîkek e'firand ku navê wê Anfar bû. Û dur̂ da ser pişta wê. Û li wir çil ĥezar salî ma.*
*II. R̂oja destpêkê yanî r̂oja yekşemê, milyak'etê*[4417] *bi navê Azazîl e'firand. Ew melek'ê Tawise*[4418] *yê ku serokê t'evane.*
*III. Xwedê, r̂oja duşemê, milyak'etê bi navê Dardaîl e'firand — ku ew Şêx Ĥesene.*
*IV. R̂oja sêşemê, Îsrafîl e'firand — ku ew şêx Şemse.*
*V. R̂oja çarşemê, yê bi navê Cibraîl e'firand — ew jî Abû Bek'ire.*
*VI. R̂oja pêncşemê, Azraîl e'firand — ku ew Sicadîne.*
*VII. R̂oja înê, yê bi navê Şemnaîl e'firand — ku ew Nasirdîne.*

---

4407 *mexlûg*
4408 *Sabûr*
4409 *xukirin*
4410 *qeît'an*
4411 *isa*
4412 *P'irbub*
4413 ango: *Vavîlon*
4414 ango: *Iran*
4415 ango: *Konstantinopol*
4416 http://www.ezdixandi.com/forum/72-975-1
4417 *melayîk'et*
4418 *Tawus*

VIII. *R̂oja şemiyê, yê bi navê Nûraîl e'firand — ku ew (Fexredîn).*

IX. *Melek'ê Tawis kir serokê wan.*

X, *Piştî wê Xwedê, ĥeft t'ebeq e'zman, E'rd, R̂oj û Heyv e'firand (…).*

X. *Mirov, ĉivîk û t'evahîya ajalan e'firand û ew di valahiya pelerînê de bi cih kirin û ew jî jiser duȓê hat xwarê, milyak'et jî li balê bûn. Dûre bi dengekî bilind li duȓê qîȓiya, ew jî ji cihê xwe k'et û bû çar p'erçe, ji nava wê av peşikî û bû derya. Dinya gilover bû, derz lê t'une bû.*

XII. *Dûre Xwedê Cebraîl di şeklê ĉivîkekê de e'firand û ȓêveberiya çar kenaran amanetî*[4419] *wî kir. Dûre keştiyek e'firand û sî ĥezar sal di nav gemiyê de ma, dûre hat Lalişê û li wir bi cih bû. Ji nav dinyayê qîȓiya û bi giraniyê derya e'firî û dinya bû ȓûyê e'rdê û lerizîna wan berdewam kir. Dûre ferman da Cebraîl ku herdu perçeyên duȓa Sipî bîne, perçe yek xist binê e'rdê, yê din jî wek derî danî ber e'zman. Dûre R̂oj û Heyv di navbera wan de bi cih kir, ji hûrikên wan jî stêrk e'firandin û ew wek xemilê bi e'zman ve daliqandin.*

XIII. *Her wiha ji bo xemilandina ȓûyê e'rdê: darên fêkiyan, giya û çiya e'firandin. Li serxaliyê T'ext e'firand.*

XIV. *Dûre, got ku Xwedayê mezin got: «Ey milyak'etan, ezê Adem û Hewayê bie'firînim, wan bikim mirov û ji her duyan, ji pişta Adem dê Şehîd bîn Car were dinyayê û ji wî dê li ȓûyê e'rdê gelek tenêzêde bibe. Ev gel, gelê Azazîl ango melek'ê Tawis, gelê êzîdî ye.*

XV. *Dûre ezê Şêx Adî bîn Misafîr ji Sûriyeyê bişînim û ewê were li Lalişê bimîne».*

XVI. *Xwedê dûre, hat welatê pîroz û ferman da Cebraîl ku ji çar aliyên dinyayê axê bîne: ax, hewa, agir û av. Bi wan mirovek çêkir û ji ȓuĥê xwe, ȓuĥek jê ȓe bexişand.*

XVII. *Dûre ji Cebraîl ȓe got Adem di cenetê de bi cih bike, li wira jê ȓe hat gotin ku dikare fêkî û t'evahiya gîyayên hêşîn bixwe, lê xwerina genim jê ȓe qedeẍeye.*

XVIII. *Piştî sedsalan melek'ê Tawis ji Xwedê ȓe got: «Adem dê li ku bijî û çawa zêde bibe?» Xwedê jê ȓe got: «Ez di vê mijarê de selahiyet û ȓêveberiyê dewrî te dikim». Wê demê melek'ê Tawis, çû ji Adem pirsî got: «Te qet genim xwariye?» Wî jî got: «Na, lewre Xwedê ev yek li min qedeẍe kir, got divê tu ji wî nexwî». Melek'ê Tawis jê ȓe wiha got: «Ku tu bixwî dê ji bo te p'iȓ baş be». Lê piştî ku Adem genim xwar, zikê wî werimî û melek'ê Tawis ew ji cenetê derxist û danî ȓûyê e'rdê û derk'et e'zman.*

XIX. *Wê demê Adem ji ber werma zikê xwe êş k'işand û nikaribû di cihê xwe de bisekine, lewre di cane wîde dereke vekirî t'une bû. Lê Xwedê çivîkek şand, çivîkê di bedena Adem de qulek vekir, bi vî awayî Adem ȓihet bû.*

XX. *Û Cebraîl sed salan xwe nîşanî wî ne dabû, ew bê hêvî*[4420] *bû, girya.*

XXI. *Wê demê Xwedê ferman da Cebraîl û Cebraîl hat, ji bin milê çepê yê Adem Hewa e'firand.*

XXII. *Dûre melek'ê Tawis — ez dixwazim bibêjim ku ji bo alîk'ariya êzîdiyên ku êşê dikişînin hat ȓûyê e'rdê û li ba Asûrên kevn, kiralek ji me ȓe destnîşan kir. Kiralên Asûr Nesrukh (ku ew, Nasirdîne) û K'amûş (ew jî silt'an*[4421] *Fexredîne*[4422]*) û Artîmûs (ku silt'an Şemsedîne*[4423]*).*

XXIII. *Piştî vê ji aliyê du kiralan ve em hatin bi ȓêvebirin. R̂êveberiya kiralên bi navê Şahpûrê yekemîn û duyemîn sed û pêncî sal berdewam kir û Emîrên me yên ku ji nîjada wan dihatin, ĥeta îro em bi ȓê ve birine û em bûne çar qebîle.*

XXIV. *Ji me ȓe xwerina xasê (marul) hatîye qedeẍekirin, lewre xas navêjinê (p'êẍember) bi bîr dixe, fasûlyeyên ĥişk jî ĥeramin, bikaranîna ȓengê şînêgirtî jî qedeẍeye. Ji bo em ji p'êẍember Yûnus ȓe bêrêziyê nekin, xwerina masiyan ji bo me ĥerame, xezalan jî nexwin, lewre ew bûne keriyê p'êẍemberekî me. Her wiha şêx û mirîdên wî, ji bo hûn ji çûka Tawis ȓe bêhurmetiyê nekin goştê dîk jî nexwin. Lewre çûka Tawisyek ji ĥeft Xwedayên ku berê navê wan hatîye gotine û dirûvê dîk pê dik'eve. Dîsa şêx û murîdên wî, ji xwerina kundir dûr bisekinin, ango nexwin. Ji derveyî vana, li piya mîztin an jî ȓûniştî li xwekirina cilan an jî wek ku misilman dikin li tuwaletê*

---

[4419] *emanet*
[4420] binêr: ***hîvî***
[4421] *sultan*
[4422] *Faxrudîn*
[4423] *Şemsudîn*

*taretgirtin an jî li serşoyên wan xuslgirtin, ji me r̂e hatîye qedex̂ekirin. Her wiha, bi lêvkirina navê ….. ku Xwedayê me ye an jî gotinên wek kitan, şar, şat û peyvên wek Melûn(…) Nalên ku wî tînin ĥişê mirovan qedex̂eye.*

XXV. *Pêşiyê (…) ji dînê me e gotin pûtperestî û cihû, xirîstiyan, misilman û îranî ji dînê me dûr sekinîn.*

XXVI. *Kiral Ahab û Arman ji me bûn, wisa bû ku Ahab Belzebûbê ku me wek p'îr Bûb bi nav dikir ji Xwedayê xwe alîk'arî dixwest.*

XXVII. *Li Babîlê bi navê Buktî-Nosser (Nabûkadnezar) kiralekî me hebû. Li Îranê Ahesuerus, li Stenbolê Agrîkalûs jî ji me bû.*

XXVIII. *Beriya ku e'rd û e'zman çê bibin Xwedê, li ser avê di keştiyekê de bû.*

XXIX. *Dûre ji dur̂a ku e'firandibû xeyîdî, ew ji xwe dûr xist.*

XXX. *Ji şikîna dur̂ê çiya, ji çingîniya wê girên qûmê, ji dûmana wê jî e'zman çêbûn.*

XXXI. *Dûr̂e Xwedê derket e'zman û e'zman zêde bû û bêyî ku tiştekî deyne binî wan ew li hewa bi cih kirin, lîsteya navê t'evahiya tiştên ku e'firandine nivîsî.*

XXXII. *Ji cewher û nûra xwe şeş Xweda e'firandin ku, e'firandina wan wek bi lambeyekê pêxistina lambeyeke din bû.*
*Dûre Xwedayê pêşîn, ji Xwedayê duyemîn r̂e got: «Min e'zman e'firandin; tu here wira û tiştina bie'firîne». Û ew, dema derket e'zmanan, R̂oj çêbû. Ji Xwedayê piştî xwe r̂a got: «derk'eve» û Hîv hat e'firandin. Û xwedayê dû wî, e'zman bi ger̂ xist; Xwedayê dû wî, stêrk e'firandin; yê ku di dû wî r̂e hat, il-Kuragh ango Stêrka Sibehê e'firand û her tişt wiha hat e'firandin.*

# XIV. ZÊDEYÎ

# 1. QEWLÊ QAHFÊ CIMCIMO[4424]

**S. 1**
*1 Ya Îsayê nûranî û nebîy Şimûne,*
*2 Li ber beĥrê[4425] diçûne,*
*3 Liqaye kahfê Cimcim dibûne,*
*4 Ji zamanê berê wa avêtî li sahrava.*

**S. 2**
*1 Ya Îsayê nûranî û nebîy Şimûne bi ser nimêja ra diweste,*
*2 Û dua' ji Xwedê dixweste,*
*3 Rih li kahfê Cimcim daxiste.*

**S. 3**
*1 Ya Îsayê nûranî û nebîy Şimûnê,*
*2 Li ber kewiye beĥrê mezin diçûn,*
*3 Liqayê kahfê Cimcim dibûne,*
*4 Îsaye nûranî digo: «Ya Cimcimo tû jinî ew tû mêrî?"*

**S. 4**
*1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Ez ne jinim, belê, ez mêr im,*
*3 Ez ne ji xelqê derwêş im,*
*4 Belê ji xelqê dibag û t'êrim».*

**S. 5**
*1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî dema û sed carî dema,*
*2 De rûnin ji we ra bêjim qiset û kelama,*
*3 Îsayê nûranî bi xwe ji Meryemê».*
*4 Cimcimo digo: «Îsayê nûranî bi xwe Xwedê ye*
*5 Bav tûnîne Meryem dêye».*

**S. 6**
*1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Min hebû ĥezar gavanî,*
*3 Min hebû ĥezar şivanî,*
*4 Min hebû ĥezar bilûrvanî,*
*5 Min hebû ĥezar kopalbêdane,*
*6 Min hebû ĥezar kopko dihatine dîwanê,*
*7 Min hebû ĥezar xweşîlan dikşandin dîwanê*
*8 Min hebû ĥezar kevçî zîvkirî dihatine dîwanê*
*9 Nav dido yek digehanê,*
*10 Min hebû ĥezar belgîhê kûmaşkirî dihatine,*
*11 Nav dido yek digehanê,*
*12 Min hebû ĥezar qelûne avzêȓkirî dihatine dîwanê*
*13 Nav dido yek digehanê*
*14 Min hebû k'ehêlê bizinê li meydanê,*
*15 Min hebû ĥezar ciwanê nazînkirî li seyranê,*
*16 Min hebû ĥezar stranê bidenge,*
*17 Min hebû rikasê biçengê Xan û dîwanê».*
*18 Cimcim sûltan dihate ringa ringê.*

**S. 7**
*1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Wekî ezbim aẍayê dik'anê,*
*3 Ĥeta ȓoj dihate erk'anê,*
*4 Ĥezar fikir û feqîr ji male minê,*
*5 Bikar dibûne xwerin û bi nanê».*

**S. 8**
*1 Cimcimo digo: «Ya İsayê nûranî,*
*2 Wekî ezbim axayê Dikasê,*
*3 Ĥeta ȓoj dihate e'sasê,*
*4 Ĥezar fikir û feqîr ji male min k'ar dibûne, bi cil û kirase».*

[4424] http://ru.scribd.com/doc/105948961/Ramazan-Ergin
[4425] *bahr*

**S. 9** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Min hebû ĥezar kopekê ĥemû bi pîra?*
*3 Û ĥemû biqeyd û zincîra,*
*4 Xwerina wan nivîşk û şîra,*
*5 Min jê nedida bidestê fikr û feqîra,*
*6 Belê ĥemû min didan destê kûȓê di ĥakim we, di wezîra».*

**S. 10** *1 Îsayê nûranî digo: «Ya Cimcimo tû dîne xwe bi ç dip'aresî?»*

**S. 11** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Min hebû gakî zêȓînkirî,*
*3 Min ȓojê t'obekî ketan min ȓa dikistî* dixistî,*
*4 Min jê ȓa datînî we lıber dinivîstî, toba îstexfir,*
*5 Min ȓojê sê cara min dîne xwe je dibaristî.*

**S. 12** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Min hebû gakî çêkirî zîf û zêȓa,*
*3 Min ȓojê sê cara datinî,*
*4 Ji wa xwa pa toba û îstixfar».*
*4 Min digo: «Qey Xwedê ewa,*
*5 Min nizanbû Xwedayê mezin li e'zmane».*

**S. 13** *1 1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî, weqqatê melik Cibraîl bi ser min şandîye,*
*2 Li dîvana min nazilbûye,*
*3 Anîye min peywendîye,*
*4 Ĥeft bost û çar tilî bi der anîye,*
*5 Debûzekî li min dayîye,*
*6 Qêrînekî bi min ketîye»,*
*7 Dîvanê Cimcim siltan ji wê rabûye.*
*8 Digo: «Lo Cimcimo, hal û hîcranê te çîye?»*
*9 Lo melek Cebraîl bi e'zman ȓewiya,*
*10 Go: «Îsayê nûranî bi xwe jê pirsîye.*
*11 Çima tê rihê wî k'afirî zilamî te nanîye?»*
*12 Go: «Bi nûrê go, tû jê ya tê sîkal daye,*
*13 Kes mefer bi ȓuĥê vî k'afirî zalimî tûnîne».*

**S. 14** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Tê rica heqiyemin aniye* (Rica-Roca-ȓoja?),*
*3 Diya min bi lez bê hekir çûye detep,*
*4 Çawa taze ji mera anîye,*
*5 Te ez birima li çar darê li ser mila,*
*6 Çar rêya ra te ez ĥeft t'ebak dakirin,*
*7 Li bin erdê xwa ra,*
*8 Cîhê tûpişk û mara».*

**S. 15** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Min hebû ĥezar zînî zêȓînkirî,*
*3 Min datînî li ser gûhkê distara,*
*4 Pişt mira gelo mane ji kêra».*

**S. 16** *1 Îsayê nûranî digo: «Ya Cimcimo,*
*2 Tû dînê xwe diĥebînî,*
*3 Nîşanê dûjehê çîye? Dûjeh?»*

**S. 17** *1 Cimcimo digo: «Ya Îsayê nûranî,*
*2 Nîşanê dûjehê kettmekî tîr reşa,*
*3 Tarîya vîra zimzimekî reşa.*
*4 Marê wî dizerin,*

*5 Dûpişkê wî kasî di ker in,*
*6 Dixun goştê ĥeramxwara û selefxwara,*
*7 Yê gû ji qate dê û bavê xwe bi der in*
*8 Ewê ĥeft sala te jê anîme dare,*
*9 Hê dewê min jê tahle û tî're».*

*R̂eĥmet li dê û bavê ê ku qewl gotin û dê û bavê gûhdar û hazira!*

*DAWÎ.*

## 2. QEWLÊ MESIHÎ[4426]

**S. 1** *1 Îsus welidî ji betnê Meryem,*
*2 Tarî hilabû ji ber r̂eviya,*
*3 L'rûyê Ezman Sitêrk xuya[n] bû,*
*4 Ji nislê Dawid xelasa me bû.*

**S. 2** *1 Yesû welidî li Erdê Kudsê,*
*2 Biçûk û mezin tev ketne pirsê,*
*3 Xwedê me yek e navê Wî sisê,*
*4 Selam da Erdê li ava Bahrê.*

**S. 3** *1 Îsûs welidî li nav Mix̂ara,*
*2 Biçûk û mezin tev çûne bale,*
*3 Yesû welidî li nava Çolê,*
*4 Milyaket jor li vir nazil bû.*

**S. 4** *1 Şivanê Çolê li vir hazir bû ne,*
*2 Ji eşq û tirsa tev Kerr û lal bûn, (Dubare kirin - Nakarat)*
*3 Xwezî bi wan çavan Îsûs bibînin,*
*4 Îmanek t'emam îman pê bînin.*

**S. 5** *1 Ji Rohilat nûra wî Dinê xuya[n] bû,*
*2 Nuré Stêrkê wî li Ecem bela bû,*
*3 Qasidê Stêrkê wî çû nav Ecema,*
*4 Mizgîni da ser Rebbê Alemê.*

**S. 6** *1 Stérık li ézmana gellek xuya[n] bû,*
*2 Resmê "Qîzik" bû Yesû li milê bû,*
*3 Go hazir bibin û karê xwe bikin,*
*4 Secde bikin ji Rebbê Alemê.*

**S. 7** *1 We "Milûk" rabûn ji Erdê Ecema.*
*2 Hediye birin ji Rebbê Alema,*
*3 Navê "Milûka" Ecema ev în-bu,*
*4 "Zûhûr Nodûr" pêşîya wan bû.*

**S. 8** *1 Padîşa dido "Melik Îştûf" bû,*
*2 Ewê sisiya "Melîk Erşak" bû,*
*3 Padîşahê çara "Gûhar Nûrdîn" bû,*
*4 Melîkê pênca "Melîk Arih" bû.*

**S. 9** *1 Padîşahê şeşa "Melîk Ertaşt",*
*2 "Melîk Îştûf Nadûn Xorî Şerşûn" bû,*

[4426] http://ru.scribd.com/doc/105948961/Ramazan-Ergin

*3 Padîşahê hefta "Mehdûk û Hûyan" bû,*
*4 ........*
*5 ........*
*6 ........*
*7 Wê Melikê deha "Hişîrîş Sahbûn" bû.*

**S. 10** *1 Padîşê yazda "Sirdan Bûldan" bû,*
*2 Wê Melîkê duwazda "Mehdûqabîl" bû,*
*3 T'arîxê Ecem welev nivîsti bû,*
*4 "Zerduşt Filûzûf" ji wa re beyankir bû.*

**S. 11** *1 Melîk ji ezman wê nazil bibe,*
*2 Ji betnê keçık wê biwelide,*
*3 Alemeta Wî wê xuya[n] bibe,*
*4 Nav e'rd û e'zman wê bisekine.*

**S. 12** *1 Navê Stêrkê keçik rûniştî,*
*2 Li milê "Keçikê Sebî" wê hebe,*
*3 Wexta alemeta "Wî" bibînin,*
*4 Karê xwe bikin wê cem "Wî" herin.*

**S. 13** *1 Hediya bibin jêr secde bikin,*
*2 Stêrik wê rêzan ji we ra bibe,*
*3 Tarixa "Zerdûş filûzûf" eva,*
*4 Cem Melûkê Ecem Welev nivîstî bû.*

**S. 14** *1 Wextê ew elemeta wî dibûn,*
*2 Stêrk nav Erd û Ezman sekinî,*
*3 Reisê Ecem "Melîk Şabûr" bû,*
*4 Cem wî runiştin mişêwir danîn.*

**S. 15** *1 "Melîk Şabûr" gote ji wezîrê xwe,*
*2 T'arîxa "Zerdûş" îro t'emam bû,*
*3 Dûwazde padîşah ji Ecem neqand,*
*4 Di rêza Stêrkê wan şiyandiye.*

**S. 16** *1 We gelek esker bi wa re şiyandî bû,*
*2 We gelek hediye qîmetî da wan,*
*3 Her Melîk ji wa sê hezar zilam,*
*4 "Sîlah û esker" bi wa ra hebû.*

**S. 17** *1 Pênc hezar zilam ta bi ling bi wa ra bûn – tablık,*
*2 We hemû bi eşk (eşq) û kêf rabibûn,*
*3 Di rêzê Stêrkê dimeşiyabûn,*
*4 We l'pey Stêrkê rabûn û çûbûn.*

**S. 18** *1 We Milûk rabûn ji welatê xwe,*
*2 Stêrk dimeşiya rêza Wî diçûn,*
*3 Dûwazde Padîşah ji nav Ecem rabû,*
*4 Li bajaré Hexê (Anıtlı) sekinîn û peya bûn.*

**S. 19** *1 Li wir rûniştîbûn mişéwir danîne,*
*2 Sê Milûk secdê ji nav wan rabûn,*
*3 wê duwazde Milûk ji Ecem rabûn,*
*4 Heta gîhabûn nehrê Firatê.*

**S. 20** *1 Li wêder pirsîbûn çi heye çi tune-nine,*
*2 Gote wan vegerin wêder xela ye,*
*3 Li wêder sekinîn ew bi hev şêwirîn,*

*4 Go em qîm nakin ji ber xwarinê.*

**S. 21** *1 Ew duwazde Milûk bi hev şêwirîn,*
*2 Sisê ji wan çûn hediye birin,*
*3 Sê Milûk rabûn bi hezar Zilamî,*
*4 Heta gîhabûn welatê Qudsê.*

**S. 22** *1 Melik "Hîrodes" wexta wan diye,*
*2 Ji xof û tirsa rih jê çûye,*
*3 "Melûn Îrodes" ji wan pirsiye,*
*4 Digo hal û mexsedê we çiye.*

**S. 23** *1 Milûk rûniştin bi hev şêwirîn,*
*2 go em çi civab ji Melik bidin,*
*3 Gotne "Hîrodes em rûniştîbûn,.*
*4 Li welatê xwe bûn tixûbê (sınır) Ecemê.*

**S. 24** *1 Li nava Stêrkê Qîzik xuyabû,*
*2 Li milê Keçik me dibû,*
*3 Stêrkê ezmana gelik xuyabûn,*
*4 Resmê Qîzik bû "Îsos" li milê bû.*

**S. 25** *1 Milûk pirsiyan ji "Melûn Hîrodes",*
*2 Li kû der welidî Rebbê Alemê,*
*3 Digotin wan nivîstiye,*
*4 Li Erdê "Beyt Lehmê" wê biwelide.*

**S. 26** *1 "Hîrode" digotê wan Milûka,*
*2 Herin û rabin ser wî bipirsin,*
*3 Wexte bibînin jêr secde bikin,*
*4 Ew hediya xwe bidin ji Rebbê Alemê.*

**S. 27** *1 Ji me re bişînin xeberekî bi lez,*
*2 De ezî bibînim jêr secde bikim,*
*3 Her sê Milûka bi lez rabûbûn,*
*4 Stêrik didîtin ji wara rêzan bû.*

**S. 28** *1 Stêrik rijiya ji wî Emanî,*
*2 Li devê Mixarê şewq û lîlanê,*
*3 Stêrik û Amûd ji nav qetandin,*
*4 heta gîhabûn devê Mixarê.*

**S. 29** *1 Li devê Mixarê sekinîn peyabûn,*
*2 Çûne Mixara Rebbê xwe dîtin,*
*3 Çûne mixara rebbê xwe dîtin,*
*4 Li ber wî Sitiya sekinîn û rabûn.*

**S. 30** *1 Temana karbûn hediye danîn,*
*2 Rebbê xwe dîtin îman pê anîn,*
*3 Ev hediyê wan çi qîmetîbûn,*
*4 Li Dinê hemû wekî wan nebû.*

**S. 31** *1 Her sê hediyê wî bi çi terzîbûn (Terzibun -Tarz),*
*2 Yek Mirra yek Lîban yek Wercîhan bû,*
*3 Çin Antîkabûn we qîmetlîbûn,*
*4 Tiştekî wulo li cîhe me nebû.*

**S. 32** *1 Tiştekî wulo li cîhe me nebû,*
*2 ew bû layiqê wi Rebbê me bûn,*

*3 Milûk razehan li nava mixarê,*
*4 Milyaket ji ezman hatine xwarê.*

**S. 33** *1 Milyaket gotin ji Milûkare,*
*2 Rabin û herin li erde xera,*
*3 Ew Herodîsa zilamek melûne.*

**S. 34** *1 Milyaket gote wan Milûka ra,*
*2 Mehêlin Hîrodes bi we bihesiya,*
*3 Ew Milûk rabûn xatir ji wa xwestin,*
*4 Çûn welatê xwe Erdê Ecema.*

**S. 35** *1 Îrodes sekinî bi ser wî de nehatin,*
*2 Gelik pirsirî li Îsa kiriye,*
*3 Melek nazil bû ji Yûsif ra gotiye,*
*4 Îrodes melûn li we digeriya.*

**S. 36** *1 Digote Yûsif mesekine here,*
*2 Digote Yûsif rabe û here,*
*3 Yusif fêhm kiribû sebî hilanî*
*4 we ji ber Hîrodes Îsa hilanî.*

**S. 37** *1 Yûsif rabûbû sebî hilanî,*
*2 Bajarê Misrê bir li wir danî,*
*3 Heta weqatê wî zemanî,*
*4 Hîrodes bimre ji wî mekanî.*

**S. 38** *1 Melik Hîrodes gelek zalime,*
*2 Şûr berdabû Beyt il ehma li wa mahzûma,*
*3 Çil zilam şiyand Îrodes melûn,*
*4 Ji kuştina zaro wa tixûbê Beytlehm.*

**S. 39** *1 Wan tawsiye kir zaro bukujin,*
*2 Kurê dusala û ji wan biçûktir,*
*3 Ew çil zilama her yek bi xwe r̂a bir,*
*4 Çil zilam her yek çil zaro kuştin.*

**S. 40** *1 Zaroyê kuştin hesabê wan Ewa,*
*2 Şeştû çar hezar zaro kuştina,*
*3 Şîr u xwîn tevlihev bûna,*
*4 Îsa xelaskirin ji wê Tixûba.*

**S. 41** *1 Ew hemû kuştin ji bona Îsa,*
*2 Wî go hat kuştin nav wan sebiya,*
*3 Hiznik rabûbû weka sitûna,*
*4 Rahel digrîbû li ser masûma.*

*(Rahel- pireka Yakup. peşiye İsa bı 1800 sal beri jimaye).*

**S. 42** *1 Ew Îsa û Meryem mane li bajarê Misrê,*
*2 Hetta Îrodes mir ji vî mekanî,*
*3 Ew melek gotiye ji Yusif ra rabe,*
*4 Û sebî bive erdê Beytlehmê.*

**S. 43** *1 Îrodes melûn mir ji vî mekanî,*
*2 Rabe û here li erdê Qudsê,*
*3 Yûsif rabû û Îsa anî,*
*4 Li bajarê Nasira li wêder sekinî,*

*5 Yesû Dinyayê zahf hakimî kir,*
*6 Çavê kor vekir miriya rakir,*
*7 Û suphan bidin ji reb Îsus ra,*
*8 Em xelaskirin ji destê Şeytan.*

*DAWÎ*

## 3. QEWLÊ ZERDEŞT[4427]

**S. 1** *1 R̂êya r̂astiyê li ber xwe danî,*
*2 Xwedê û xwedanan jêre kir r̂êzanî,*
*3 Zerdeşt sekinî li berê banî,*
*4 Got: «Ya Xwedê tû yî R̂eĥmanî!*
*5 Destê min bigihîne deman û dengê,*
*6 Tu me azad bikî ji e'zab û astengê».*

**S. 2** *1 P'adşayê minî R̂eĥmane,*
*2 Horiya hilandin t'ext û dane,*
*3 Li Zerdeşt gur̂ kirin mom û ĉirane.*

**S. 3** *1 Zerdeşt got: «Ya Xwedê tu Xweda yî[4428]!*
*2 Tu layîqê[4429] medih û sena yî[4430],*
*3 Tu kesê bêkesa yî[4431],*
*4 Tu mefera bê mefera yî[4432]!*

**S. 4** *1 Tu Xwedayê[4433] neĉar û bê ĉare yî,*
*2 Tu Cebarê şkestiya yî,*
*3 Tu ĥekîmê[4434] kul û derda yî!»*

**S. 5** *1 Zerdeşt bi sit'ara ji bê xwe naskirî,*
*2 Bi şev û r̂ojê difikirî,*
*3 Ya Xwedayê minî ji e'wil[4435] ĥeta axirî.*

**S. 6** *1 Xwedayê minî Cebare,*
*2 Dawî hatibû ferware,*
*3 R̂êya baweriyê ji Zerdeşt r̂a kiribû ferware.*

**S. 7** *1 Zerdeşt got: «Xeyala min ewe,*
*2 Ya Xweda, te ne xwerine, ne vexwerine, ne xewe,*
*3 Şehde[4436] û baweriya min ewe.*

**S. 8** *1 Ya Xwedê, te bihuşt[4437] çêkir,*
*2 Dojeh li ber [h]êwirande[4438] ji bo gîyana nezan û ẍafila,*
*3 Şehde û baweriya min ewe».*

**S. 9** *1 Zerdeşt bi şev û r̂ojê xwe nas kir,*
*2 Canê me ji destê k'afir û zalima azad kir.*

---

4427 [10] (гг. 142-14 ); http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/_gebete/gebete-q-15.htm
4428 *xwedanî*
4429 *laiyq*
4430 *senanî*
4431 *kesanî*
4432 *meferanî*
4433 *Xwediyê*
4434 *hekîm*
4435 *ewil*
4436 *şade*
4437 *buhûst*
4438 *ewir*

**S. 10** *1 P'adşayê[4439] minî mehbûde[4440],*
*2 Ewî sebir ji Zerdeşt r̂a kiribû t'ixûbe,*
*3 Bi şev û r̂ojê li ber nûra sibê kiribû sicûde.*

**S. 11** *1 Bi şev û r̂ojê sicûde kirî,*
*2 R̂engê e'zmanan pê xemilî,*
*3 Emîn[4441] Cebrail serdana xêrê lê kirî.*

**S. 12** *1 P'adşayê minî Cebare,*
*2 Ewî not û neh erk'an nazil kirin xware,*
*3 Ji not û neh ya çar jê r̂êjware.*

**S. 13** *1 Yek heqîye,*
*2 Yek r̂astîye,*
*3 Yek baweriye,*
*4 Yek sit'are.*

**S. 14** *1 Sit'ara min ji wê e'ynatê[4442],*
*2 Ez li ber nûra Xwedê dikim xizmetê[4443],*
*3 Da Ezdanê min azad bike dadê r̂oja axretê.*

**S. 15** *1 Tirsa min ji dada axretê heye,*
*2 Me li nefsa xwe kiribû t'obeye.*

**S. 16** *1 Zerdeşt got: «Min dît, bi herdu ĉava,*
*2 Ji nûra e'zmanan weriyabû xunave[4444],*
*3 Ya Ezdanê min tu zanî li derya çendî ave,*
*4 Tu zanî li e'rdê çend gave,*
*5 Em dil bi kovanin ji mala bava.*

**S. 17** *1 Ez li wan me'nîya[4445] dibûm xebîr,*
*2 Min nefsa xwe kiribû êxsîr,*
*3 Da bi wê r̂astiyê bighîjim dîwana mîr[4446].*

**S. 18** *1 Dilê min mabû li wê fikarê,*
*2 P'adşayê min Xwedayê k'ir̂yarê[4447],*
*3 Ji dilê min hilînî k'erb û k'în û qehrê.*

**S. 19** *1 Piştî wan me'nîya,*
*2 Mek'anê P'adşayê min li ser dur̂a sipîye,*
*3 Ya Ezdanê min, me ji te hîvîye[4448],*
*4 Tu jî pêşîya me hilînî nexweşîye,*
*5 Tu me azad bikî ji tengavî û r̂ûr̂eşiya.*

**S. 20** *1 Piştî wan xweziya Xwedayê minî mezine,*
*2 Ol û baweriya dilê mine.*

**S. 21** *1 Ez mabûm li wan e'cêba,*
*2 Li wan bedîla, li bûya û derêwa.*

---

[4439] *Padşah*
[4440] *dilovan*
[4441] *Emin*
[4442] *eynet*
[4443] *xilmet*
[4444] *xwenav*
[4445] *maniya*
[4446] *p'îra*
[4447] *qiryar*
[4448] *hêvî*

*3 Xirab û qunehk'ar p'iȓ bûn, nayên ĥisêba*[4449].

**S. 22** *1 Hat bedîla nehseda*[4450],
*2 Dîlbûna avê cemede,*
*3 Ȓastî ji e'rda çû, ma şeȓ û qeda.*

**S. 23** *1 Xofa min ji wan bedîla,*
*2 Şewqa ȓonaya*[4451] *Xweda çû ji qendîla,*
*3 Xew yî şeref îman û namûs,*
*4 Di wê bi dîlêde bû dîle.*

**S. 24** *1 Li wan bedîla nikarin ji heqiyê bidin xebera,*
*2 Hevrê li gel hev ȓêya nabin sere,*
*3 E'cêb û sed e'cêb.*
*4 Go: «Wê demê dil nabe kerî û kerî».*

**S. 25** *1 Ji e'zmana ĥeta*[4452] *e'rda,*
*2 Ya ȓastî çûye*[4453]*, ya derwîn ma di cîde,*
*3 Axirî*[4454] zeman lewma.

**S. 26** *1 Ji e'zmana ĥeta bi xware,*
*2 Yê*[4455] *wê bedîlê nabe ava şare*[4456],
*3 Veşartin k'erema k'eremdara*
*4 Neman çûwinên de'wdara*[4457].

**S. 27** *1 Ji e'zmana nazîvirî,*
*2 Dilê wê betlê bûn avê şevîn,*
*3 Şewq û muĥbet*[4458] *ji dilê wan ȓevî.*

**S. 28** *1 Ewê bedîla nehsedê,*
*2 Kes bi kêrî kesî netê,*
*3 Ji xeyrî*[4459] *xweyî yê ȓastiyê, yê baweriyê yê me'rîfetê.*

**S. 29** *1 P'adşayê min Ezdane,*
*2 Ȓengê wê bedîlê li min xwêyaye*[4460],
*3 Ji sed ĥezar ȓastî, yek ȓastî maye.*

**S. 30** *1 Zerdeşt got: «Ez ji wê dilbirînim,*
*2 Ez çi ȓastiya di wê bedîlêde nabînim,*
*3 Ez bang û* hawara bi Xweda *yê xwe digihînim».*

**S. 31** *1 Ew bedîl lê xwêyaye*[4461] *erk'ana tenge,*
*2 Ji wê bedîlê derk'etin p'iȓ ȓenge,*
*3 Li çar kenara bû cenge.*

**S. 32** *1 Bedîl hatin û bihûrîn,*
*2 Xwedan îman û xwedan şeref k'ewgirîn,*
*3 Zerdeşt bi şev û ȓojê difikirî,*

---

[4449] *hisêb*
[4450] *neh sed*
[4451] *ronahî a*
[4452] *heta*
[4453] *cuye*
[4454] *êxir*
[4455] *Ê*
[4456] *sare*
[4457] *dawdar*
[4458] *mihibet*
[4459] *xeyn*
[4460] *xûya*
[4461] *xwiya*

*4 Xwe ji agirê xezebê dûr kirî.*

**S. 33** *1 Zerdeşt fikirî, fikir da ser xeyale,*
*2 Bi şevê nekir xew, bi r̂ojê ne dixware,*
*3 Kul û xema min ew dîndare,*
*4 Zerdeşt got: «Ya Xwedayê min ez ji te bi hîvîme.*

**S. 34** *1 Ez wê bedîlê bi ĉavê xwe nebînim,*
*2 Ez wê bedîlê ji nebûya, nedîtiya yî dilbîrînim».*

**S. 35** *1 Nebûyî ner̂astî ji wê bedîlê dihatin,*
*2 Xweyî e'sila cih veguhastin*
*3 Xweyî [bê] e'sila xwe ji agirê xezebê ne p'arastin.*

**S. 36** *1 Bê e'sila xwe ji nedîtina ne p'arastin,*
*2 Gotinê ner̂astî veguhastin,*
*3 Xwe ji agirê xezebê ne p'arastin.*

**S. 37** *1 Zerdeşt got: «Ji nezana we r̂a axret nine,*
*2 Ji ser ve sipîne, di dilê wan de xezeb û k'îne,*
*3 Cihê wan li ba meleke dojêh jî nîne»*
*4 Ewanin li ber gelîyê waweylê ve dilezîne.*

**S. 38** *1 Zerdest got: «Yên bedîla nehsedê agire, xezebê li wan wesilê, li wan bû hizin û girîne,*
*2 Li xweyî e'sila bû şayî[4462] û şewqe, bê e'sil di ĥeybeta Xwedê k'ewgirîne.*

**S. 39** *1 P'adşayê minî ẍefûre[4463],*
*2 Ji ba hatîye ew destûre,*
*3 Nêzîk[4464] bû axret û îmane, ji bê îmana r̂a bûye dûr̂e[4465].*

**S. 40** *1 Zerdest got: «Min bawerî bi Ezdanê xwe anî,*
*2 Min lib[a]sê sipî hilanî,*
*3 Min cîhan t'erk kir, r̂êya axretê li pêşîya xwe danî.*

**S. 41** *1 P'adşayê minî R̂eĥmanîye,*
*2 R̂engê r̂astiyê k'esk, sor û sipîye,*
*3 Got: «Ya Xwedayê min tu bigihe xweşîye.*
*4 Tu ji pêşîya min hilînî nexweşiya».*

**S. 42** *1 Zerdeşt dibê: «Ez nebînim du xebera:*
*2 Mezin r̂abûn piĉûk li ber ji nedîtina,*
*3 Û ji du xebera:*
*4 Ji nedîtina p'ir̂ bêjin, ji zimana Tae'liya[4466] dir̂êjin,*
*5 Ner̂astiya vediguhêzin,*
*6 P'adşaye min cerg û dilê wan dibîrêjin».*

## 4. QEWLÊ P'ÎRÊ SÎBA[4467]

**S. 1** *1 R̂ojekê ez hebûm,*
*2 Ji e'rdekî xewle bûm,*
*3 Ji ax û av û agir û ba p'eyda bûm.*

4462 *şahî*
4463 *xefûr*
4464 *nezîk*
4465 *dir̂*
4466 *Taaliya*
4467 [11] (pp. 90-94)

**S. 2** *1 Xalitî bûm, û zana bûm,*
*2 Xwedêp'arêz bûm, û mêrxas bûm,*
*3 Ji ariya miletê xas bûm.*

**S. 3** *1 Ez ji arî bûm, ji miletê dinê,*
*2 Fêde û r̂êkên fêde hatine ji bo minê,*
*3 Benî Adem ĥemû mirov pê bûne xinê.*

**S. 4** *1 Fêde ew r̂êya ĥeqîyê,*
*2 R̂astî û r̂onahiya Êzdayîyê,*
*3 Berî şêx Sin û Şemsê Adîyê.*

**S. 5** *1 P'ir̂ mîr hatin û bihurîn,*
*2 P'ir̂ dem hatin û guherîn,*
*3 Lê Xwedê û milayk'etên xwe qet namirin.*

**S. 6** *1 Ew Xwedayê me yî li e'zmana,*
*2 Emîn Cebraîl ilmê Xwedê tîne ji ba wana.*

**S. 7** *1 Tawisî melek' – Cebraîle,*
*2 Pirsên xwe ji Xwedê ne herdemê tê, ne yî bi wek'île,*
*3 Li ber me ne yî bi bedîle.*

**S. 8** *1 Demên dihatin û dihêzirîn,*
*2 R̂onî û zerî li deşta dikirîn,*
*3 Ji tirs û ĥeybetên wan ĥemû tişt diguherîn*

**S. 9** *1 R̂ojeke xweş li cem min derbas bû,*
*2 Mijûl û axavftinê li ser wî r̂ast bû,*
*3 P'îrê Sîba t'ev dostan bû.*

**S. 10** *1 P'îr li gel dostan cema'[4468] bû,*
*2 P'îr û mişûrên xwe ji wan bû,*
*3 Çend qelender û feqîrê zana bûn,*
*4 Ji gotinê wîre şa bûn.*

**S. 11** *1 P'adşê min Xwedêyekî Bêrîye,*
*2 Pirs û mirazên te hebin ji Xwedayê jorîye,*
*3 K'ar, û peyv, û r̂astîye,*
*4 K'a ew r̂astî û zanistî çîye,*
*5 Sur̂eke ji bo p'îrê Sîba hatîye.*

**S. 12** *1 Ew sur̂e ji dara her herê çêbûne,*
*2 Ew dara her herê sergûze,*
*3 Şîn dibû careke hindik t'oze,*
*4 R̂uĥekî p'ak danîbû li serî dilsoze.*

**S. 13** *1 R̂uĥ li darê geş bû t'emame,*
*2 P'îr lê diçerine ĉêl û gane,*
*3 Ĉêlekê p'elê darê xwar giştine cane.*

**S. 14** *1 Riĥ[4469] ji darê derk'et,*
*2 R̂oniyek geş k'et li şîrê ĉêlekê,*
*3 P'îrê Sîba ji tirsa bi xew neket[4470].*

---

[4468] *cima*
[4469] *rih*
[4470] *xewne ke*

**S. 15** *1 R̂onî da û geş bû,*
*2 Emîn Cebraîl melekê e'zman bû,*
*3 P'îr Sîba tirsiya,*
*4 Emîn Cebraîl ji bo wî bi hurîye,*
*5 Zana kir bi dilxweşîye.*

**S. 16** *1 Xwedayê minî cane,*
*2 Mîrê mîrane,*
*3 Li gel p'îrê Asmane*[4471]*,*
*4 Nûr ji e'rdan gihişte e'zmane.*

**S. 17** *1 Ew sur̂a p'adşê bû,*
*2 Da ku*[4472] *zarekî dostê jê çê bû,*
*3 Havêynê qenciyê li e'rdê bû.*

**S. 18** *1 Emîn Cebraîl bû k'arîne,*
*2 Ew bo sur̂a Xwedê emîne,*
*3 Dizane wê sur̂ê bo kê tine.*

**S. 19** *1 Ew sur̂a r̂oj û zerbabe,*
*2 K'etiye canê p'îr̂î çiqas babe.*
*3 Da ku li darekî p'êk bibe ave.*

**S. 20** *1 Ew sur̂a xûn*[4473] *û ave,*
*2 Jê çêbû dil û hinave,*
*3 Dest û p'ê, ĥeya jê çêbûn ĉave.*

**S. 21** *1 Dest û p'ê, û qalb çêbûn,*
*2 Lê dem hatîye zabûn,*
*3 Ĥemû tişt r̂onî dabûn,*
*4 Xulyaqet*[4474] *siwar bûn.*

**S. 22** *1 Ew r̂oja r̂onî da,*
*2 Zerî li deşt û ĉiya de,*
*3 Dil û hinavê dijminan de.*

**S. 23** *1 Xêrnexwazin û dijminin,*
*2 Bi ĥîlet û mikur̂ difikirin,*
*3 Ku çawa zara ji destê dê û bava bigrin.*

**S. 24** *1 Zar birin nav k'omeka agir danîn,*
*2 Zar daliqandin nav gunda,*
*3 Zar avêtin nava agirde.*

**S. 25** *1 Emîn Cebraîl dager̂î di ser de,*
*2 Ava bihuştê*[4475] *serde ber da,*
*3 Agir vemirî ji bin de.*

**S. 26** *1 Ew zaroyê dostaniyê,*
*2 Ji sur̂eke xwedaniyê,*
*3 Ji xêrnexwazan p'arastiye.*

**S. 27** *1 P'aristîbû ji yê herî mezin,*
*2 Çiqas li hev biçivîn p'erî û cin,*

---

[4471] binêr: *Ĥesin Maman*
[4472] *dakû*
[4473] *xwîn*
[4474] *xûliyaqet*
[4475] *buheşt*

*3 Ferwara Xwedê hatîye ji bo Zerdeştê min.*

**S. 28** *1 Zaro birin û li ser rê danîn,*
*2 Danîn li ser rê t'ewranî,*
*3 Danîn li ber lingê hespanî,*
*4 Li ber devê hov û guranî.*

**S. 29** *1 Dip'arastin ji cin û teyrane,*
*2 Kirin warê hesp û gur û gaye,*
*3 Tirs û ĥeybeta cinan ji wane.*

**S. 30** *1 Zaro mezin bû ji wane,*
*2 K'etine salê pazdehane,*
*3 Ji bo wî dikim qurbanê.*

**S. 31** *1 Birine ser destê p'îrê p'îrane,*
*2 Da k'u zanebe ji ilmê dîn û ol û erk'ane,*
*3 Bi dîtin k'ar û peyvane.*

**S. 32** *1 Dayîk û babane,*
*2 Destpêdikin bi dîwane,*
*3 Lê digeȓînin t'ac û hilane.*

**S. 33** *1 K'ember anîn û ȓistin,*
*2 Ji 72 mileta dip'arastin,*
*3 Navê Zerdeşt cara digeȓînîn.*

**S. 34** *1 Lê geȓandin sê cara,*
*2 Ji bo fikir û ȓaman dost û yara,*
*3 Peyv û dîtîn niyet û k'ara.*

**S. 35** *1 P'îrê Sîba ȓuĥê xwe û suȓa xwe dide Zerdeşt,*
*2 Û p'îrê wîye Zerdeşt şandiye.*

## 5. QEWLÊ NEWRAZÊ[4476]

**S. 1** *1 Benî, benî ĥeyranî,*
*2 Sibĥanê[4477] suȓî Celanî[4478],*
*3 Memnûn bûn li meh[4479] û sal bi qudreta Ȓeĥmanî[4480],*
*4 T'evdîr bi ĥal pêxweş bû, bir Newrozê silt'anî.*

**S. 2** *1 T'evdîrekî aşiq bûm,*
*2 Sorgul û hevçirakî,*
*3 Bilbilî bi eşq û dil bû û hencilî,*
*4 Hencilî[4481] bi kert û dalî.*

**S. 3** *1 Ezim feqîrê dara,*
*2 Sefayê vê dîlberê,*
*3 K'amil dibû Adare,*
*4 Melek Zeyîn hate derê.*

---

[4476] [10] (rr. 139-141)
[4477] *siphan*
[4478] binêr: *Celal*
[4479] *mih*
[4480] *rihmanî*
[4481] *hunzil*

**S. 4** *1 Nerm bû hewaya salê,*
*2 Xweş bû heyat sewerê,*
*3 Sibĥan ji heyat der bû.*

**S. 5** *1 Xelqno werin t'emaşa,*
*2 Heyat kirin ber û mû,*
*3 Cebelî bûne p'aşa.*

**S. 6** *1 Zergûn herî mezlûme,*
*2 Cezakî li ser wane Xwedê nekir haşa,*
*3 Cezakî Xwedê li ser wan heye û nekin haşa.*

**S. 7** *1 Qasidê e'celê hat,*
*2 Felek lê metelib bû,*
*3 Ewe zeyn bû welat, bayê barin li şikil bû,*
*4 Ey befrê le hat hat bê mek'an û mezel bû.*

**S. 8** *1 Bê mezel û bê mek'ane,*
*2 Hebrê r̂ê da k'axezê,*
*3 Ew ji hemriya dinale,*
*4 Celat[4482] dikete lezê ji ber e'wr û bayê Nîsane.*

**S. 9** *1 Însan li derwerzê,*
*2 Însan ew şefeqete[4483],*
*3 Awazek tê ji e'zmanî,*
*4 Celatî bê meletz bû,*
*5 Însanî sergom bête ji ber derxetî zindanê.*

**S. 10** *1 Dengek li î zindanê wa bû,*
*2 R̂oja ezdayî hat bû,*
*3 Xeyat ji k'ef xeyat wer bû,*
*4 R̂oja ezdayî hat der bi der bû.*

**S. 11** *1 Mîr alayî şahî hat,*
*2 Şahî sefayî xwes bû,*
*3 Bahar[4484] hat û dik'amilî,*
*4 Sosinî bûne gopalî,*
*5 Dê kine melhema dilî.*

**S. 12** *1 Sosin û Yasimîn û cobarin,*
*2 Xemilîn bûne bi yek carek,*
*3 Etreşî babê mila,*
*4 Binere xwedî k'oke,*
*5 Xweş r̂enge, xweş Cobare.*

**S. 13** *1 Kulîk bi ĥezar r̂eng bûn,*
*2 Xewş bûne bi lezeta bahare[4485].*

**S. 14** *1 Ji teyra hatin deng,*
*2 Qaz û quling miraz mirazî,*
*3 Wer te bi sur̂ dixwazin,*
*4 Seqer û bazin,*
*5 Totî zel û habî,*
*6 Wisa dixwîne letunê şazî.*

---

[4482] *celad*
[4483] *şifqet*
[4484] *bihar*
[4485] *buhar*

**S. 15** *1 Sibĥan çi şir̂îne,*
*2 Ĉirayê Xwedê hir bû,*
*3 Lewma qencî dişkeftin,*
*4 Ji lewnê wandal hala,*
*5 Birînêd k'ûr diaxiftin,*
*6 Ji r̂engê wan zilxana,*
*7 Xalê t'asê ser hingiftin.*

**S. 16** *1 Bihuşte soze qudrete û k'erîme,*
*2 Cindîo r̂abe sibeye,*
*3 Deqa sibe sare siware,*
*4 Dil kulî, dil bîrîndare.*

**S. 17** *1 Bilbil dixwînin Xwedao,*
*2 Sibĥan çi zilziline,*
*3 Feqîrin cor û emere,*
*4 Filesî zazînetî were.*

**S. 18** *1 Beriya me berî bereng,*
*2 Beriyeke alîm bû,*
*3 Şerab li wê kaxetê,*
*4 Ez bi wê nûrê kim,*
*5 Milê xêra te lê,*
*6 Ew bû ĥaca li ĥacetê.*

*Xwedê ava bike mal û mezelê em têda!*

## 6. BEYT'A QIYAMETÊ[4486] — T'EMET, HAZA, QEWLÊ QÎYAMETÊ[4487]

**S. 1** *1 Subĥan ji şahê qudretê,*
*2 Guh bidêrin vê qissetê,*
*3 Kesêt evê vê ummetê.*
> **S. 1** *1 …………………… ,*
> *2 Guh bidine qisetê,*
> *3 Kesê ji ometê,*
> *4 Bes bikêyîn ji quf letê.*

**S. 2** *1 Bes biken ji vê dine,*
*2 Bitirsin ji mirinê,*
*3 Vebîr xwe bînin şeva bi tinê.*
> **S. 2** *1 Bes bikêyîn ji vê dinê,*
> *2 Bitirsin ji mirinê,*
> *3 Da hûn ji Xwedê bibin qenî.*

**S. 3** *1 Bitirsin ji paşerojê,*
*2 Dayîmen şevê û rojê,*
*3 Ji agirê û germay dûjê.*
> **S. 3** *1 Bitirsin ji paşrojê,*
> *2 Dayîm şevê, r̂ojê,*
> *3 Ji ber agirê dojêh.*

**S. 4** *1 Guh bidêrin ciwan û pîr e,*
*2 Ya gelê beniyêt feqîr e,*
*3 Mirinê neken ji bîr e.*

---

[4486] [19] *Vejîn*, hejmar 3, 1996ê, (rr. 91-108), Dihok http://cankurd.wordpress.com/2013/07/18/beyta-qiyamete-1/; Mela Mesîhayê Tirwanşî [1882-1973]
[4487] [26] K'eremê Anqosî Bi kurtî derheqa p'eyîda kirina met'nê "Qewlê Qîyametê" „P'irtûkxana Êzdîyan " TBILISI, 2010

**S. 4** *1 Guh bidinê cevan û pîre,*
*2 Digel nebîyê di feqîre,*
*3 Mirinê meken ji bîre.*

**S. 5** *1 Ji bîr biken zêȓ û malî,*
*2 Da her bigrîn û binalîn,*
*3 Ji tirsa yê Zulcelalî.*
**S. 5** *1 Ji bîr bikeyîn zîr û male,*
*2 Bigirîn her be nale-nale,*
*3 Ji tirsa zûlcelale.*

**S. 6** *1 Karê xwe biken xebatê,*
*2 Lez biken demê û sea'tê,*
*3 Ji roja e'resatê.*
**S. 6** *1 K'arê xwe bikeyîn xebatê,*
*2 Bilerzin demê û sae'tê*[4488]*,*
*3 Ji tirsa ȓoja e'rasetê.*

**S. 7** *1 Bilerzînin ji hîsabê.*
*2 Ji mehşûşa î'qabê.*
*3 Ji ȟeybeta e'zabê.*
**S. 7** *1 Bilerzin ji mîzanê,*
*2 Ji uqab û cezayê,*
*3 Ji tirsa xwe û cevabê.*

**S. 8** *1 Ya gelî xelqêt*[4489] *evê cemae'tê,*
*2 Guh bidêrin vê qisetê,*
*3 Da bo we bikem beh'sê Qiyametê.*
**S. 8** *1 Guh bidine ȟikayetê*[4490]*,*
*2 Ji bo beh's û bejana ȓoja qiyametê,*
*3 K'anê çi ȟale bi ser me tê?*

**S. 9** *1 Qiyamet rojeka pir xewxa ye,*
*2 Nêzîke hind ne maye,*
*3 Meferê me her Mewla ye.*
**S. 9** *1 Qiyamet ȓojek bi qewqaye,*
*2 Nêzîke, hindik maye,*
*3 Mefera me mewlaye,*
*4 Zeman çûye, p'iȓ nemaye.*

**S. 10** *1 Zeman ku çi perête,*
*2 Qiyamet wextê bête,*
*3 Çi*[4491] *halev ser me têtê.*
**S. 10** *1 Qiyamet weqt'e bêtin,*
*2 K'anê çi ȟal bi ser me bêtin?*

**S. 11** *1 Çi halekê mek'an tenge,*
*2 Çi rojeka vedeng e denge,*
*3 Yê bi heq dizanît, h'al çi renge?*
**S. 11** *1 Ew çi ȟale mek'an tenge,*
*2 Ji ȓojek bi deng û denge,*
*3 Her dizanit ew çi ȓenge.*

**S. 12** *1 Zemanêt radibne ve însane,*

---

[4488] *siye't*
[4489] *xelk*
[4490] binêr: *ȟikyat*
[4491] Di t'eviya metnê beyt'a qiyametê de (çu) li ciyê (çi) hatîye.

*2 Qazî bi xwey Sultane,*
*3 (…… ……. ….. ….).*

**S. 12** *1 Wekî têtin ew zemane,*
*2 Dinya dibit wêrane,*
*3 Qazî bi xwe silt'ane.*

**S. 13** *1 Qazî şehê ekbere,*
*2 Dê ket roja meh'şere,*
*3 Mihemmed nebîyê Ekbere.*

**S. 13** *1 Qazî şahê Ekbere,*
*2 R̂adiket roja meĥşere,*
*3 Mehderçî p'eyqembere.*

**S. 14** *1 Mihemmed li dîwanê,*
*2 Roja ĥeşrê û mîzanê,*
*3 Xwe dihavête meydanê.*

**S. 14** *1 Mehderçî mîrê dîwanê,*
*2 R̂oja ĥeşr û mîranê,*
*3 Ew dê bête meydanê.*

**S. 15** *1 Ew h'ebîbê Qureyşe,*
*2 Li qiyametê xîretkêşe,*
*3 Li meydanê tête pêşe.*

**S. 15** *1 Ew ĥebîbê Qureyîşe,*
*2 Di qiyametê x'eyretk'êşe,*
*3 Li meydanê ew li pêşe.*

**S. 16** *1 Ew Xaliqê Reĥmane,*
*2 A'lemê diket wêran e,*
*3 Kes naket çi pirsan e.*

**S. 16** *1 Ew xaliqê R̂eĥmane,*
*2 A'lem diket wêrane,*
*3 Bi kes naket pirsane.*

**S. 17** *1 Wêran diket dinyayê*[4492]*,*
*2 A'lemê dibet fenayê.*
*3 Kes nîne li wî biketin r̂ayê.*

**S. 17** *1 A'lem dibit fenaye,*
*2 Wêran diket dinyaye,*
*3 Dê k'î li wî biket r̂aye?*

**S. 18** *1 Ew şahe, ew emire,*
*2 Ew sultane, qedîre,*
*3 Bê malxwe û wezîre.*

**S. 18** *1 P'adşahê emîre,*
*2 Ew silt'anê qedîre,*
*3 Bê malxuyi (û) bê wezîre.*

**S. 19** *1 Ew emir e, P'adşaye,*
*2 Ji hindî mexlûqatêt di dinyaye,*
*3 Ew dizanît u'mrê wan çi maye.*

**S. 19** *1 Mîre ew P'adşaye,*
*2 Ji mexlûqê di dinyaye,*
*3 Dizanit e'mrê ĥemiyane.*

**S. 20** *1 Ew dizanît u'mrê wane,*

[4492] *dunya*

*2 Wekî têtin burhane,*
*3 Xirab diket wêrane.*
**S. 20** *1 We ku dibêt burhane,*
*2 Xirab diket wêrane.*

**S. 21** *1 Wekî têt ew mecale,*
*2 Bi pirs û bi suale,*
*3 Dibêjîtin Israfîl derh'ale.*
**S. 21** *1 We ku dibêt ew mecale,*
*2 Bê pirs û bê siwale,*
*3 Dibêjte Usrafîl derĥale.*

**S. 22** *1 Wê dibêjîtin yê Wehabe,*
*2 Ey Israfîl zû rabe,*
*3 Da a'lemê bikem xirabe.*
**S. 22** *1 We dibêjt ewê habe,*
*2 Usrafîl tu zû r̂abe,*
*3 Da a'lemê bikem xirabe.*

**S. 23** *1 Ku min emir da te,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 U'mrê wan çû pirate.*
**S. 23** *1 Min, ku e'mir dihate,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 Umrê li wan berahte.*

**S. 24** *1 U'mrê wan çi ne maye,*
*2 Sorê*[4493] *bigre çi ne maye,*
*3 Da ev roke bikem xewxa ye.*
**S. 24** *1 Umir êdî nemaye,*
*2 Sur̂ê bigir li hewaye,*
*3 Ev roje diket Qewqaye.(?)*

**S. 25** *1 Tu rabe bi destûrê,*
*2 Bi destê xwe bigre naqûrê,*
*3 Lez bike pifke Sorê.*
**S. 25** *1 R̂abe tu bi destûrê,*
*2 Hilgirê tu naqurê,*
*3 Lezke p'if ke surê.*

**S. 26** *1 Tu rabe bi xewxake,*
*2 Mîl û çiya têk rake,*
*3 Mexlûqata fena ke.*
**S. 26** *1 R̂abe bi Qewqa ke,*
*2 Çil û ĉiyan li bake,*
*3 Mexlûqetê fena ke.*

**S. 27** *1 Israfîl wekî zanî,*
*2 Sor di devê xwe danî,*
*3 Bi qudreta subh'anî.*
**S. 27** *1 Usrafîl, ku te zanî,*
*2 Sur di dew xwe danî,*
*3 Subĥane ji subĥanî.*

**S. 28** *1 Subĥan şahê qudretê,*
*2 Ne gehand ji ẍefletê*[4494]*,*

[4493] Israfîl r̂oja rabûnê (qiyametê) pif Sorê (şaxê) dike - Cankurd
[4494] *xeflet*

*3 Bi Sorê pif diketê.*

**S. 28** *1 Subĥan ji şapê(?) qudretê,*
*2 Nanegehan ji ẍefletê*[4495]*,*
*3 Di surê da pût dik'etê.*

**S. 29** *1 Izrayîl ku wu ha dibînî,*
*2 Dixûnî dilezînî,*
*3 R̂uĥ ji h'emiyan distînî.*

**S. 29** *1 Wê dibêt şahê sîfate,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 Kî maye yê bi h'eyate?*

**S. 30** *1 We dibê şahê p'ursifate,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 K'î maye li heyate?*

**S. 30** *1 Izraîl wê dibête,*
*2 Hikm her ji te tête,*
*3 Mexlûqaim ĥemû perête.*

**S. 31** *1 Izrayîl we dibête,*
*2 Subĥan ji ĥeyeta te,*
*3 Mexlûqete min berî te.*

**S. 31** *1 Ez geȓiyam li ĥemiyane,*
*2 Li tebeqe[y]êt e'rd û e'zmane*[4496]*,*
*3 Min kes ne dît bi gîyane.*

**S. 32** *1 Ez geȓiyame di ĥemiyane,*
*2 Di t'ebeqê E'rş û e'zmane,*
*3 Kes min ne dî bi qîyane.*

**S. 32** *1 Min kes ne dît bi wucûde,*
*2 Rûh' ji qalba mewcûde,*
*3 Ji xeyrê Iblîsê merdûde.*

**S. 33** *1 Kes min nedî mewcûde,*
*2 Ji xeyîrê Ublisê merdûde.*

**S. 33** *1 Ferman diket yê Celîle,*
*2 Dibêjît: Ya Izraîle,*
*3 Tu her lez bike bi tee'cîle.*

**S. 34** *1 Ferwar diket ê Celîle,*
*2 Dibêjîte Izrayîle,*
*3 Lezke heȓe bi t'e'cîle.*

**S. 34** *1 Tu here bilerizîne,*
*2 Bigeh Îblîsê lee'în e,*
*3 Rûh'a wî bi zeh'metî bistîne.*

**S. 35** *1 Tu heȓe bilezîne,*
*2 Ew k'afirê le'yîne,*
*3 R̂uĥê wî jî bistîne.*

**S. 35** *1 Xweş xweş here bi ĥeybete,*
*2 Bi xezeb û bi mîh'nete,*
*3 Rûh'a wî jê bistîne bi şiddete.*

**S. 36** *1 Here bi ĥeybetê,*
*2 Bi e'zab û muĥnetê,*
*3 R̂uĥ jê bik'êşe bi sinetê.*

---

[4495] *quflet*
[4496] *esman*

**S. 36** *1 Izraîl hate xare,*
*2 Bi h'îkmeta yê Cebare,*
*3 Ji teleba yê kuffare.*

**S. 37** *1 Izrayîl hate xare,*
*2 Di xizmeta ê cebare,*
*3 Teleb eyî k'utare.*

**S. 37** *1 Izraîl dibêjît: Ya Îblîse,*
*2 Ey li xwarê xesîse,*
*3 Te çend şûl kirin telvîse.*

**S. 38** *1 Izrayîl dibê ya xar, ya Ublîse,*
*2 Ya xarî eyî xebîse,*
*3 Çendê te kirin t'elbîse.*

**S. 38** *1 Eve çendî çend sale,*
*2 Ev Ademî rakirin zale,*
*3 Ve xwe r̂a pêda kirin hevale.*

**S. 39** *1 Çendî û çend sale,*
*2 Umir qewî bihare,*
*3 Ya bidin û bi qirare.*

**S. 40** *1 Çendî, û çend h'ezare,*
*2 Ademî te kirin zale,*
*3 Bi xwe r̂a te kir hevale.*

**S. 39** *1 Ew k'opekê beraze,*
*2 Vê dik'evîtin gaze-gaze,*
*3 Li xwe tînîtin î'raze.*

**S. 40** *1 Dê ketin dengedenge,*
*2 Lê zer dibîtin renge,*
*3 Dê bezît wekî xedenge.*

**S. 41** *1 Dê revît wekî xezale,*
*2 Ew kopekê şekale,*
*3 Ji tirsa nalenale.*

**S. 42** *1 Ji tirsa dê ketin giryanê,*
*2 Li ber ĥeybeta r̂ûh k'êşanê,*
*3 Ji Izraîl dixazît emanê.*

**S. 41** *1 Ditirsî, ku p'ekê p'îre,*
*2 Ji agirê zemherîre,*
*3 Binale, bi nal û hîre.*

**S. 42** *1 Hîre bi h'île direvîtin,*
*2 Bi mex'rib û meşriq diçîtin,*
*3 Izrayîl wra digehîtin.*

**S. 43** *1 Izraîl dibêt: Ey kafirê lee'îne,*
*2 H'ukmê şahê emîne,*
*3 Ev roke tu çi eman nîne.*

**S. 44** *1 Izraîl dibêt: Ey kafirê mirare,*
*2 H'ukmê şahê Cebbare,*
*3 Tu xilas nabî ev care.*

**S. 45** *1 Ey musteh'eqê cezayê,*

*2 Kes nema ye li ser dunyayê,*
*3 Wexte tu jî biçiye fenayê.*

**S. 46** *1 Wext e te ji dunyayê rakem,*
*2 Şerbeka avê bi devê te da kem,*
*3 Rûh'a te bi zemherîrê şakem.*

**S. 47** *1 Here wekî seyê pîr e,*
*2 Vê dik'evît hîrehîr e,*
*3 (…… ……. ……. ….).*

**S. 48** *1 Hîrehîr e ve direvîte,*
*2 Bi meşriq û bi mexriba ve dicemîte,*
*3 Izraîl vêra digehîte.*

**S. 49** *1 Izraîl dibêt: Ey musteh'eqê lee'netê,*
*2 Raweste vê sae'tê,*
*3 Tam bikevê şerbetê.*

**S. 43** *1 Dibê ya k'afirê le'netî,*
*2 Tu r̂aweste wê sae'tê,*
*3 Dê t'am bikeyî vê şeriyetê.*

**S. 50** *1 Ew şerbeta weku mergeh,*
*2 Ta'm bike av û terge,*
*3 Dê li te sojin mêlak û cerge.*

**S. 44** *1 Şerbeta*[4497]*, k'u ew mergeh,*
*2 Ta'm bike çi r̂enge,*
*3 Disojî ji ber cerge.*

**S. 51** *1 Dê sojin li ber êşanê,*
*2 Dê bihejin li ber kovanê,*
*3 Ji ber zeh'meta rûh'kêşanê.*

**S. 45** *1 Disojî ji wî janê,*
*2 Bê ĥiş bibî ji êşanê,*
*3 Ji ber zeĥmeta r̂uĥ k'eşanê.*

**S. 52** *1 Ew sezayê lee'netê,*
*2 K'efte benda zeh'metê,*
*3 Nabînît çi reh'etê.*

**S. 46** *1 Ew Ublîsê bi le'netî,*
*2 Dik'efte benda zeyqetê,*
*3 Dê biçîte e'zaba zulmetê.*

**S. 53** *1 Her wekî ewî zanî,*
*2 Bi e'zaba yê subh'anî,*
*3 Rûh' ji qalbî deranî.*

**S. 54** *1 Wê dibêjît yê Mewla ye,*
*2 Ew ji bo Qabidrûh'a ye*[4498]*:*
*3 «Mexlûqêt min kî maye?»*

**S. 47** *1 Ew seh, ku bû fenaye,*
*2 We dibê şahê mewlaye,*
*3 Ji mexlûqê min k'î maye?*

**S. 55** *1 Wê dibêjîtin Ezraîle,*

---

[4497] *qerbet*
[4498] mebest Izraîl e, ku r̂ûh'an distîne.

*2 Ya Xaliqê Celîle,*
*3 E'bdê te mey zelîle.*

**S. 48** *1 We dibêjit Izrayîle:*
*2 "Ya xaliqê celîle,*
*3 Mame ez e'bdê zelîle".*

**S. 56** *1 Izraîl wê dibête:*
*2 Subh'an li ĥeybetê te,*
*3 Ez mayme e'bdê te.*

**S. 57** *1 Wê dibêjîtin yê Zulcelale*[4499]*,*
*2 Bilindê bê zewale,*
*3 Tu jî bimre mecale.*

**S. 49** *1 We dibê şahê zulcelale,*
*2 Ew xaliqê bê zewale:*
*3 «Tu jî bimir mecale».*

**S. 58** *1 Tu jî bimre geȓa teye,*
*2 Bi destûrî û îzna meye,*
*3 Baqî îman her ji bo teye.*

**S. 50** *1 «Tu jî bimir, ku dora teye,*
*2 Bi destûrê îzna meye,*
*3 Heyat û baqî ji bo meye».*

**S. 59** *1 Izraîl guh didêrîte,*
*2 Gazîyekê radihêlîte,*
*3 Bi îzneha Xwedê dimirîte.*

**S. 51** *1 Izrayîl, ku dibihîtin,*
*2 Gaziyek radihêlîtin,*
*3 Bi e'mrê Xwedê dimirîtin.*

**S. 60** *1 Fena bûn îns û cane,*
*2 Weh'ş, û teyr, û h'eywane,*
*3 Mexlûqêt erd û esmane.*

**S. 52** *1 Fena bûne ins û cane,*
*2 Ji teyr, û weh'ş, û h'eyîwane,*
*3 Ji mexlûqê e'rz û e'zmane.*

**S. 61** *1 Erd û esman kerker bûn,*
*2 Melek di şapera wer bûn,*
*3 Rûh' ji qalba veder bûn.*

**S. 53** *1 E'zman ker bi ker dibin,*
*2 Melek dişedbu peȓan werbin,*
*3 Ji qalban ȓuĥ qeder bin.*

**S. 62** *1 Mexlûq ku bûn ew fanî,*
*2 Ew stêrêt nûranî,*
*3 Dê werhin ji esmanî.*

**S. 54** *1 Mexlûqê, ku bûne Qanî,*
*2 Ew stêrê di nûranî,*
*3 Diwerin ji e'zmanî.*

**S. 63** *1 Ew stêrêt ron û geşe,*
*2 Roj û heyvêt şefeq xweşe,*
*3 Dê xesifin, tarî û ȓeşe.*

**S. 55** *1 Ew stêrê di ȓûnî geşin,*

[4499] Xwedanê mezinahiyê

*2 Diqeyirin tarî r̂eşin,*
*3 Sed h'eyîf li wan r̂ojê di r̂uĥ nîxweşin.*

**S. 64** *1 Dê tarî bin ĥemû vêk r̂a,*
*2 Çel û çiya dêçin têkra,*
*3 Erd û esman dê bin jêkra.*
**S. 56** *1 Tarî dibin h'emî vêk r̂a,*
*2 E'zman dibin têk r̂a,*
*3 Çol û ĉiya diçin t'êk r̂a.*

**S. 65** *1 Ew çel û çiyayêt kubare,*
*2 Hat bayekî dijware,*
*3 Kirne tûz û xubare.*
**S. 57** *1 Ew ĉiyayê di k'ubare,*
*2 Bayek têt û dijware,*
*3 Diket t'oz û qubare*[4500]*.*

**S. 58** *1 Subĥan ji subĥane,*
*2 A'lem ku kir wêrane,*
*3 Dibê: «Ezim şahê silt'ane».*

**S. 66** *1 Wê dibêtin yê Mewla ye,*
*2 Xaliqê bilindê ee'la ye,*
*3 Bo min quwwete, her beqa ye.*
**S. 59** *1 Dibê: «Ezim şahê mewlaye,*
*2 Xaliqê bilind û e'laye,*
*3 Ji bo min quwet beqaye».*

**S. 60** *1 Dibê: «Ezim şahê e'lîme,*
*2 Di qedîm û sermedîme,*
*3 Ezelî me, a'bedî me».*

**S. 67** *1 Dibêjîtin: Ezim yê Cebbar im,*
*2 Êk im, her li qerar im,*
*3 Ez Wah'idê Qehhar im.*
**S. 61** *1 «Ez Cebarim,*
*2 Yekim her qirarim,*
*3 Ez wah'idê qeharim».*

**S. 68** *1 Wê dibêt şahê let'îf e:*
*2 Kanê beniyêt şerîf e,*
*3 Li wana yêt leîf e?*
**S. 62** *1 We dibê şahê let'îfe:*
*2 «K'anê nebîyê di şerîfe?*
*3 Ew însanê di zeyîfe».*

**S. 69** *1 Kanê kafirêt sewda ye,*
*2 Xudan koçk û sera ye,*
*3 Ku wan li min girtin dee'wa ye?*
**S. 63** *1 «K'anê ew k'afirê di sewdaye?*
*2 Xudan k'oĉk û seraye,*
*3 Digel min dikirin de'waye?»*

**S. 70** *1 Kanê evêt kubare,*
*2 Ku wan r̂izqê min dixare,*
*3 Li ser dunyayê, li gel min digirtin benare?*

[4500] binêr: *xubare*

**S. 64** *1 «K'anê ew k'ufarin?*
*2 Digel min ew k'ubarin,*
*3 Ji izqê min dixarin».*

**S. 71** *1 Ka mêrêt li dîwanê,*
*2 Gedayêt li meyxanê,*
*3 Cundiyêt li meydanê?*

**S. 72** *1 Kanê şah û emîre,*
*2 Xudan malxwe, wezîre,*
*3 Bo çi ranabin, bikin tedbîre?*

**S. 65** *1 «K'anê şah û emîre?*
*2 K'anê malxuy û wezîre?*
*3 Çira naken t'edbîre?»*

**S. 66** *1 Ĥemî bûne fenaye,*
*2 Ew milyak'et dinyaye,*
*3 Biĉûk û mazin kes namaye.*
*4 Ĥemiyan ji bû k'î hilaye.*

**S. 73** *1 Kes ne maye li wê xerabê,*
*2 Bibêjît wê sewabê,*
*3 Ve Xaliqî r̂a bidetin cewabê.*

**S. 67** *1 Kes nîne di vê xirabê,*
*2 Bo xaliq bidet cewabê,*
*3 Ew roja h'isabê.*

**S. 74** *1 Cewabê dê det her bi xweye,*
*2 Ew pakê munezzehê bi zatê xweye:*
*3 Ev mulkiyê te her ji bo meye.*

**S. 68** *1 Cewab didet ew bi xwe:*
*2 «Munezeh zatê meye,*
*3 Her milyak'et ji ba meye».*

**S. 75** *1 Ji bo me her qudrete,*
*2 Padişahî û e'zemete,*
*3 Mîrî û seltenete.*

**S. 69** *1 «Ji bo min her qudrete,*
*2 Mîr û silt'enete,*
*3 P'adşahê ĥezîmete».*

**S. 76** *1 Ji ew paşî yê Cebbare,*
*2 Birandin çend mîqdare,*
*3 Rakirin melekêt çare.*

**S. 70** *1 Ji ew p'aşê yê Cebare,*
*2 Çendî û çend miqdare,*
*3 Xuda bizane ĥezar sale.*
*4 R̂adike melekê di çare.*

**S. 77** *1 Ew melekêt celîle,*
*2 Cibraîl û Izraîle,*
*3 Israfîl û Mîkaîle.*

**S. 71** *1 Ew melekê di xebîle,*
*2 Cibrayîl, Mik'ayîl,*
*3 Esrafîl û Izrayîle.*

**S. 78** *1 Ew herçar ku r̂abûn,*
*2 Bi tirs û lerz û t'abûn,*

*3 Li qiyametê mult'eqa bûn.*

**S. 72** *1 Ew herçar berê r̂adibin,*
*2 Bi tirs û lerzuta bin,*
*3 Ji qîmetê multeqa bin.*

**S. 79** *1 Wê dibêt şahê qudretê,*
*2 Herin biken xilmetê,*
*3 Di ew rînin cennetê.*

**S. 73** *1 We dibê şahê qudretê:*
*2 «Her̂in biken xizmetê,*
*3 Biger̂in di cinetê».*

**S. 80** *1 Bigerhin li qesrane,*
*2 H'ûrî û ĥemû xilmane,*
*3 Hay biden ĥemyane.*

**S. 74** *1 «Biger̂in di qesrane,*
*2 Horî û hem qilmane,*
*3 Hayî biden h'emiyane.*

**S. 81** *1 Hay biden cennetê,*
*2 Bixemilînin bi zînetê,*
*3 Bo Mihemmedî û ummetê.*

**S. 75** *1 Di cinetê bilezînin,*
*2 Boraqê bi xwe r̂a bînin,*
*3 Ji bo Miĥemed bigihînin.*

**S. 82** *1 Cennetê bizeyinînin,*
*2 Buraqa bixemilînin,*
*3 Ve Mihemmedî vir̂êken*[4501].

**S. 76** *1 Digel boraqê r̂engîne,*
*2 T'u xu alayê rengîne,*
*3 Hile û t'ac û zîne.*

**S. 83** *1 Ew Buraqa nûrîne,*
*2 Digel alayêt rengîne,*
*3 Digel h'ûlle û t'ancêt nûrîne.*

**S. 84** *1 Li yaqûta eh'mer bûn,*
*2 Lix̂ab*[4502] *û ziberceda exler bûn,*
*3 H'ûlle sor û zer bûn.*

**S. 77** *1 Zîn ji yaqûta eh'mer bî,*
*2 Liqab ji zimrûda exzer bî,*
*3 Hilek hêşîn û yek zer bî.*

**S. 78** *1 Boraqê hûn çêken,*
*2 Xelatan li p'uştêken,*
*3 Ji bo Miĥemed ver̂êken».*

**S. 85** *1 Melek diken xebatê,*
*2 Dizeyinînin cennatê,*
*3 Dixemilînin wê sae'tê.*

**S. 79** *1 Melek diken xebatê,*
*2 Dilezînin wê sae'tê,*
*3 Dixemilînin cenatê.*

---

[4501] binêr: *werînin.* Peyvêd di kevanan de yên Cankurd in
[4502] *lixav*

**S. 86** *1 Dixemilînin h'ûriyane,*
*2 Digel tox û alane,*
*3 Li gel Buraq û h'îllane.*

**S. 87** *1 Ew melekêt Xwedêne,*
*2 Wan tox û alavêne,*
*3 Li meydana qiyametêne.*

**S. 80** *1 Ew melekê di Xwedêne,*
*2 Bi t'ix û alayê têne,*
*3 Li meydana qyametê wertêne.*

**S. 81** *1 Têne her digrîne,*
*2 Digel boraqê r̂engîne,*
*3 Diger̂in li qebra nûrîne.*

**S. 88** *1 Dibêjin: Erê meydanê,*
*2 Ey xerabê, wêranê,*
*3 Qebrê Mihemmedî kanê?*

**S. 82** *1 Wê dibêne meydanê,*
*2 Ya xirabe, wêrane,*
*3 Qebra Miĥémed selîm k'anê?*

**S. 89** *1 Wê dibêjin erdê Xwedê ye:*
*2 Bi wî kem yê weha ye,*
*3 Nuzanim bidem cewabe.*

**S. 83** *1 «We dibînî e'rzê xirabe,*
*2 Bi wî kim yê Wehabe,*
*3 Nizanim bidem cewabe.*

**S. 90** *1 Bi wî kem yê Cebbare,*
*2 Hat bayekê dijware,*
*3 Kirme tûz û xubare.*

**S. 84** *1 Bi wî kim yê cebare,*
*2 Bayek hat û dujware,*
*3 Ez kirime t'oz û xubare».*

**S. 91** *1 Bi fermana yê Sebûre,*
*2 Melek dibînin ji dûre,*
*3 Erdekî diçîtin nûre.*

**S. 85** *1 Bi fermana yê sebûre,*
*2 Melek dibînin ji dûre,*
*3 Ji erzekî r̂adibit nûre.*

**S. 92** *1 Ew çû bûn bi îctîhade,*
*2 Qederekê çû bûn t'evave,*
*3 Ew nûrha yê gulbav e.*

**S. 86** *1 Melek diçin bi balve,*
*2 Yeqîn dikin tefafe,*
*3 Ku nûra yê qulbave.*

**S. 93** *1 Yê ewwel Cibraîle,*
*2 Qasidê şahê Celîle,*
*3 Bi derk'efta, bi tee'cîle.*

**S. 87** *1 Ew melekê di xelîl,*
*2 Dibêjine Cibrayîl,*
*3 Bi berk'eve bi t'e'cîl.*

**S. 94** *1 Ew melekê Reĥmane,*

*2 Dê çîte tu ber wane,*
*3 Dê girît her bi ew xane.*

**S. 88** *1 Ew p'eyke Ȓeĥmane,*
*2 Diçîte ser qebrane,*
*3 Bi girîn û bi efqane.*

**S. 95** *1 Wê dibêjîtin yê nûrîn e:*
*2 Ya Cibraîlê Emîn e,*
*3 Eve çi huzn û girîn e?*

**S. 89** *1 Ew melekê di nûrêne,*
*2 Dibêjne Cibrayîl Emîn e:*
*3 «Ev çi h'izn û girîne?»*

**S. 96** *1 Cibraîl dibêt ez lew digrînim,*
*2 Mihemmedî dibînim,*
*3 Qewî li wî şermînim.*

**S. 90** *1 Dibê: «Ez bi girînim,*
*2 P'êẍember bibînim,*
*3 Qewî ji wî şermînim.*

**S. 97** *1 Ê şermînim li wê qissetê,*
*2 Xudanê Şefae'tê,*
*3 Dê pirsît li ummetê.*

**S. 91** *1 Ji ber wî qisetê,*
*2 Xudanê şefa'etê,*
*3 Dê ji min pirsê biket,*
*4 Pirs û ĥalê ummetê.*

**S. 98** *1 Dê pirsît bi xîtabe,*
*2 Gotin ev ro ya bê hîsabe,*
*3 Dê çewa dem cewabe.*

**S. 92** *1 Dipirsit xitabe,*
*2 Ku bêje sewabe,*
*3 Çi ȓeng dê bidem cewabe?»*

**S. 99** *1 Melek diçin t'emame,*
*2 Sekinî bûn bi îkrame,*
*3 Li Mihemmedî kirin selame.*

**S. 93** *1 Cibrayîl ku çû t'emame,*
*2 Sekinî bi îk'rame,*
*3 Li Miĥemed dikir selame.*

**S. 100** *1 Selama yê Semede,*
*2 Xweş riza ye bê Eh'ede,*
*3 E'leyke ya Mih'emmede.*

**S. 94** *1 Selama ye Semed,*
*2 Xweş rizaye bê ĥed,*
*3 E'leyke ya Miĥemed.*

**S. 101** *Ya nûriha berekatê,*
*Tu rabe di e'resatê,*
*Xudanê şefae'tê.*

**S. 95** *1 Ya nûra berek'atê,*
*2 Ya xudanê şefaetê,*
*3 Ȓabe heȓe e'resatê.*

**S. 96** *1 Bi qudreta yê Celîle,*
*2 Ji gaziya Cibrayîl Emîne,*

*3 R̂adibit nebîyê Xelîle.*

**S. 102** *1 Ew xatemê enbiyane,*
*2 Radibî t'eve ji qebran ,*
*3 Dadiweşînit rihane.*
**S. 97** *1 Ew xelîlê R̂eĥmane,*
*2 R̂adibî ji qebrane,*
*3 Dadiweşînin li ĥyane.*

**S. 103** *1 Riha alaxê dadiweşînît,*
*2 Çavê nûrîn teltînît*[4503]*,*
*3 Cibraîlî pê dibînît.*
**S. 98** *1 Axê ji r̂uĥan dadwerînî,*
*2 Ĉavê di nûrîn hiltînî,*
*3 Cibrayîl wira dibînî.*

**S. 104** *1 Dibêjît: «Ya Cebraîl e, bibêje,*
*2 Eve çi roj e hoya dirêje,*
*3 Min tu ne dîtibûyî li mêje».*
**S. 99** *1 Ya Cibrayîl bibêje:*
*2 «Min tu nedîtî ji mêje,*
*3 Ev rojek dirêje».*

**S. 105** *1 Çi r̂oje, çi zemane,*
*2 Dunya bûyev meydane,*
*3 Dîyar nînin çi î'mrane.*
**S. 100** *1 Çi r̂ojeke zemane,*
*2 Dinya bûye wêrane,*
*3 Dyar nînin çu e'mrane.*

**S. 106** *1 Wê dibêjîtin yê nûrîne,*
*2 Ya Cebraîlê emîne,*
*3 Kanê Mekke û Medîne.*
**S. 101** *1 We dibê yê nûrîne,*
*2 K'anê Mek'e, Medîne?*
*3 Çu nîşan dyar nin.*

**S. 107** *1 Cibraîl dibêjîtin sewabê,*
*2 Ve nebî ra detin cewabê,*
*3 Ev roke roja ĥîsabê.*
**S. 102** *1 Cibrayîl diket xitabe,*
*2 Bo nebîyê didet cewabe,*
*3 Ev r̂oja cewab ĥisabe.*

**S. 103** *1 Ev r̂oja qyametê,*
*2 Tu bikeyî şefae'tê,*
*3 Li gunehk'arê ometê.*

**S. 108** *1 Ev ro roja firaqê,*
*2 Ya we'dê û mîsaqê,*
*3 Hilo suwar be li Buraqê.*
**S. 104** *1 Ev r̂oja firarê (firaqê),*
*2 Xudanê we'd û misaqê,*
*3 Hilû suwar be li boraqê.*

**S. 105** *1 R̂abe ĥulan di ber ke,*

---

[4503] *hiltînît*(?)

*2 T'aca nûrîn li ser ke,*
*3 Di qyametê sefer ke.*

**S. 106** *1 Ew ĥebîbê muxt'are,*
*2 Bi quweta yê Cebare,*
*3 Li boraqê dibit suware.*

**S. 109** *1 Ew suwarê serwer e,*
*2 Dibêjîtin: «K'a Abû Bek'ir û U'mer e,*
*3 Û Osman û E'liyê heyder e?»*

**S. 107** *1 We dibê suwarê serwere:*
*2 «K'anê Abû Bek'ir û U'mere,*
*3 U'sman, E'liyê ĥeydere?»*

**S. 108** *1 Ew ĥebîbê Řeĥmane,*
*2 Wekî dipursî li wane,*
*3 Herçar řadibin ji qebrane.*

**S. 109** *1 Herçar radibin bi heyeta xwe va,*
*2 Bi t'ac, hileyê xwe va,*
*3 Dicin bi pê nebîyê xwe va.*

**S. 110** *1 Ew suwarêt serbestin,*
*2 Celeb girtin li desta (deşta),*
*3 Rawestin li pêşî desta.*

**S. 110** *1 Ew suwarê di sermeste,*
*2 Hilan dikirin bi deste,*
*3 Řadiwestin li pêşe deste.*

**S. 111** *1 Wê dibêjîtin yê nebî ye:*
*2 Ya Cibraîlê exî*[4504] *ye,*
*3 Ummeta min li ku ye ?*

**S. 111** *1 We dibê řesûlê nebîye,*
*2 Ya Cibrayîl – axîye,*
*3 Ummeta min li k'uye?*

**S. 112** *1 Ya exê (Cebraîl) bo min bira ye,*
*2 Bê minnet û riza ye,*
*3 Ummeta min kî maye?*

**S. 112** *1 Ya axiyê min biraye,*
*2 Li nik min wekî ĉiraye,*
*3 Ummeta min nexuyaye.*

**S. 113** *1 Ez mame li jiyanim,*
*2 Bi muşt'aqê h'eyranim,*
*3 Bo emmetê xwe dilkovanim.*

**S. 113** *1 Ez bi xwe li çûvanim,*
*2 Muşt'aq û ĥeyranim,*
*3 Ji bo ummetê dil bi kuvanim.*

**S. 114** *1 Řawestame ez li çuvanê,*
*2 Suwarim li meydanê,*
*3 Ji bo ummetê dilkovanê.*

**S. 114** *1 Wê dibêjîtin melekê emîn e:*
*2 Bi wî kem yê nûrîn e,*

[4504] *Exî* (*erebî* ) — *birayê min*

*3 Min hay ji ummeta te nîne.*

**S. 115** *1 Cibrayîl dibêje bigirîne,*
*2 Ya ĥebîbê nîrîne,*
*3 Min haj ummetê nîne.*

**S. 116** *1 Ya ĥebîbê R̂eĥmane,*
*2 Biqeyrê t'ew yarane,*
*3 Kes r̂anebûye ji qebrane.*

**S. 115** *1 Bi wî kem yê subehe,*
*2 Ne Adem û ne Nûh'e,*
*3 Ne hatîye bi kes rûh'e.*

**S. 117** *1 Bi wî kem yê subûĥe,*
*2 Ne Adem, ne Nûĥe,*
*3 Bi kes ne hatîye çu r̂uĥe.*

**S. 118** *1 Ĥebîb digirî bi nihaye,*
*2 Bangê diket şahê mewlaye,*
*3 Ummeta min nexuyaye.*

**S. 116** *1 Ew suwarê qiyametê,*
*2 Wî sicûde çû wê sae'tê,*
*3 Her digrît bo ummetê.*

**S. 117** *1 Xaliqî ku we dîte,*
*2 H'ebîbî digirîte,*
*3 Baranekê dadirêjîte.*

**S. 119** *1 P'adşah ku dibîhite,*
*2 Ĥebîb digirîte,*
*3 Baranekî dirêjîte.*

**S. 118** *1 Bi qudreta ê Reh'man e,*
*2 Wekî têtin baran e,*
*3 Ĥeta çil r̂ojan e.*

**S. 120** *1 Bê ĥisab têtin baran e,*
*2 Baranekê bi qelîze(?) bi burhan e,*
*3 H'eta we çil r̂ojan e.*

**S. 119** *1 Çil r̂oja dibarîtin,*
*2 Çend mîqdar pê ve diçîtin,*
*3 Mexlûq paşî ditirsîtin.*

**S. 120** *1 Ew Xaliqê Celîle,*
*2 Wê dibête Israfîle,*
*3 Hilo pifke Sorê bi tee'çîle.*

**S. 121** *1 Ji ew paşê şahê Celîle,*
*2 Dibêjîte Usrafîle,*
*3 (Ĥ)T'uf ke sûrê bi t'e'cîle.*

**S. 121** *1 Bi qudreta îlaĥî ye,*
*2 Pif dikete şaxî ye,*
*3 Vêra dikete gazî ye.*

**S. 122** *1 Ew melekê di k'ubare,*
*2 (Ĥ)T'uf ke sûrê yek care,*
*3 Bi quweta yê Cebare.*

**S. 123** *1 (Ĥ)T'uf diketê bi şiqetê,*
*2 Feryad diket gaziye,*

*3 Bi e'mrê bariye,*
*4 Bi gaziya Ademiye.*

**S. 122** *1 Wê gaziyê radibêye,*
*2 Ya mexlûqêt Xwedê ye,*
*3 Rabin ev ro roja h'eşrê ye.*
**S. 124** *1 Bi hawarê r̂a dibêje,*
*2 Ya mexlûqê di Xwedê ye,*
*3 R̂abin, ku r̂oja heştê*[4505] *ye.*

**S. 123** *1 Ya hestiyêt ker-ker bû yî,*
*2 Ya leşê jêk r̂a bû yî,*
*3 Qiyamet wa r̂abû yî.*
**S. 125** *1 Ya leşê jêk r̂abû yî,*
*2 Ya hestiyê di ker – ker bû yî,*
*3 Qiyamet we r̂abû yî.*

**S. 124** *1 Werne derê ji qebrane,*
*2 Ji zikê h'ît û beh'rane,*
*3 Werne ber lîqayê Rehmane.*
**S. 126** *1 R̂abin ji qebrane,*
*2 Zikê ĥûtê beĥrane,*
*3 R̂abin we biçîn leqayê(?) R̂eĥmane,*
*4 Zikê mişk û marane.*

**S. 125** *1 Werne ber lîqayê,*
*2 Li qiyamet û xewxayê,*
*3 Ji e'mela û cezayê,*
*4 Ji e'zabê û cefayê.*
**S. 127** *1 R̂abin werne leqayê,*
*2 Qyametê qewqayê,*
*3 E'melê di xwe biken cezayê.*

**S. 126** *1 Her ji vê gaziyê ra ya mezine,*
*2 Rûh' ji Sorê difirine,*
*3 Li qalba dihine.*

**S. 127** *1 Erwah'êt wane dave,*
*2 Li qalba bûn belave,*
*3 Ĥemû cemyan t'evave.*
**S. 128** *1 Ew erwah'ê di ziravin,*
*2 Li qalban dibin belavin.*

**S. 129** *1 Ew erwah'ê di berîne,*
*2 Li qalban wertêne,*
*3 Ĥemî radibin t'efafe.*

**S. 128** *1 Ĥemû rabûn di e'resate,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 Ĥemû dizanin e'resate.*
**S. 130** *1 Ĥemî r̂adibin der sae'te,*
*2 Ji hindî mexlûqate,*
*3 Dizanin ku e'resate.*

**S. 129** *1 Ĥemû dizanin eh'wala,*
*2 Xwe bi xwe dibêjin hevala,*

[4505] binêr: *ĥeyşt*

*3 Wey le me yê xerabe mala.*

**S. 131** *1 Dizanin ĥal û eh'walan,*
*2 Xwe bi xwe dibêjine hevalan,*
*3 Wey li me xirabemalan,*
*4 Wey li me beniyê di poşman.*

**S. 132** *1 Wey li me vê rojê,*
*2 Wekî bik'evne dojêh.*

**S. 130** *1 Ew beniyêt sergerdane,*
*2 Radibineve ji qebrane,*
*3 Çil sala li ser piyane.*

**S. 133** *1 Çil sala li ser qebrane,*
*2 Diradwestin li ser p'yane.*

**S. 131** *1 Çil salêt dî t'evave,*
*2 Roj gezekê[4506] li hindave,*
*3 Dê lê sojin hinave.*

**S. 134** *1 Çil salan t'efafe,*
*2 R̂ojê disekinêt li hidave,*
*3 Disozitin ji ber hinane.*

**S. 132** *1 Çil salêt dî bi qiyase,*
*2 Serkolin di pêxasin,*
*3 Ne kizot e û ne libase.*

**S. 135** *1 Çil salan bê qyasin,*
*2 Ne k'iswetin, ne libasin,*
*3 Di sergul û di p'êxasin.*

**S. 136** *1 Sergul di birsîne,*
*2 Dirûsin di t'ihnîne,*
*3 Kes haj kesê nîne.*

**S. 133** *1 Kesê hay li kesê niye![4507],*
*2 Ne babê û ne dayê ye,*
*3 Ji ber germa rojê ye.*

**S. 137** *1 K'î haj k'iye,*
*2 Ne bab û ne dêye,*
*3 Ji ber germa rojêye.*

**S. 134** *1 Ji ber germê û şeqawetê,*
*2 Di roja qiyametê,*
*3 Kes di hawara kesî netê.*

**S. 138** *1 Ji ber mi şeqawetê,*
*2 Ji ber roja qyametê,*
*3 Kes di hewara kes netê.*

**S. 135** *1 Li qiyametê û xewxayê,*
*2 Li poşiya û weylayê,*
*3 Ĥemû dizanin xebera (….).*

**S. 139** *1 Kes di hewara kesî nayê,*
*2 Ji ber bûsiyu qewqayê,*
*3 Ĥemî têne weylayê.*

**S. 136** *1 Wê dibêjin: Wey le me bê mefere,*

---

[4506] gazek
[4507] binêr: *nîne*

*2 Li me dirêj bû meh'şere,*
*3 Kî dê bo me ketin mehdere*[4508]*?*

**S. 140** *1 Ĥemî têne xeberan,*
*2 Wey li me bê meferan,*
*3 K'î dê biket mehderan?*

**S. 137** *1 Kî dê bo me ketin vê hîmmetê,*
*2 Mehderê diket vê şefae'tê,*
*3 Me xelas biket ji vê zeh'metê.*

**S. 141** *1 K'î dê biket humetê?*
*2 Mehder biket bi şufqetê?*
*3 Me xilas biket ji zeh'metê?*

**S. 138** *1 Me xelas biket ji vê xewxayê,*
*2 Ji e'mela û ji cezayê,*
*3 Ji e'zabê û cefayê.*

**S. 142** *1 Me xilas ketin ji Qewqayê,(?)*
*2 Ji zeh'met û we cefayê,*
*3 Ji wê e'zab û weylayê.*

**S. 143** *1 Weyî, cefayê Qulmîne,(?)*
*2 Ji ber germa Qyametê me t'u h'al nîne,*
*3 Em bê t'aqet bûne.*

**S. 139** *1 Ew beniyêt miskîn e,*
*2 Wan ji ber germê taqet nine,*
*3 Di pêxasin, di şeqî ne.*

**S. 140** *1 Di rûsin, di qelendere,*
*2 Di pêxasin, di bê mefere,*
*3 Dêçine nik Adem pêxembere.*

**S. 141** *1 Ew beniyêt Xwedê ne,*
*2 Her digrîn û her dibêne,*
*3 Ve nik Ademî ve têne.*

**S. 144** *1 Ew beniyê di Xudêne,*
*2 Digeȓin, digirîne, her dibêne,*
*3 Ĥeta ba Adem wê têne.*

**S. 142** *1 Dibêjin: Ya babê me yê pîr e,*
*2 Sotîn em êt feqîr e,*
*3 Tu jî li me bike tekbîr e*[4509]*.*

**S. 145** *1 Dibêjin ya bab û bap'îre,*
*2 Sotin emê di feqîre,*
*3 Ji bo me bikeyî t'edbîre.*

**S. 143** *1 Adem ve (bi) wan ra dibêye:*
*2 Min xariye ji darê ye,*
*3 H'eya (fedî) dikem ji Xwedê ye.*

**S. 146** *1 Adem bo wan ra dibêje,*
*2 Min ji darê xariye,*
*3 Ĥeya dikim ji Xudêye.*

**S. 144** *1 Bi wî kem yê sebûh'e,*
*2 Şefae'tê nakem bo çi rûh'e,*

---

[4508] *Mehder: Şefae't û înfîkak û qurtalbûn*
[4509] binêr: *tedbîr*

*3 Hûn herne nik nebî Nûh'e.*

**S. 147** *1 Ĥeya dikem ji subûĥê,*
*2 Şefae't nakim çu r̂ûĥê,*
*3 Herne li nik Nûĥê.*

**S. 145** *1 Adem ne kir şefae'te,*
*2 Bê hîvî bûn der sae'te,*
*3 Jê zêde bûn şeqawete.*

**S. 148** *1 Adem, ku nekir şefae't,*
*2 Bê hîvî dibin dersae't,*
*3 Zêde dibî e'zab û şeqawet.*

**S. 146** *1 Di şeqî da li çûnê dilerizînin,*
*2 Hewara xwe ve Nûh'ra digehînin,*
*3 (..... ..... .....).*

**S. 149** *1 Dişeqînin çu ĥal nînin,*
*2 Ji ber germa rojê dilezînin,*
*3 Hewarê li nik Nûĥ digehînin.*

**S. 147** *1 Dibêjin: Ya Nûh' pêxembere,*
*2 Li me dirêj bû meh'şere,*
*3 Bo me bike mehdere.*

**S. 150** *1 Dibên ya Nuĥ p'êx̂embere,*
*2 Dirêj bû li me meĥşere,*
*3 Ji bo me r̂a bike mehdere.*

**S. 148** *1 Nûh' dibêt: Ez ew nîme,*
*2 Xudanê mehderê nîme,*
*3 Hûn herne nik Ibrahîm e.*

**S. 151** *1 Nûĥ dibê ez we nîme,*
*2 Heya dikem ji k'erîme,*
*3 Herne nik Ubrahîme.*

**S. 149** *1 Ji nik wî wê zelîl diçin,*
*2 Bi qudreta yê Celîl diçin,*
*3 Ve nik Ibrahîm Xelîl diçin.*

**S. 152** *1 Ji nik Nuh' radibin du zelîl,*
*2 Diçine li h'izreta Ubrahîm Xelîl.*

**S. 153** *1 Diçin dibêne ya Ubrahîm em hatine,*
*2 Germa r̂ojê em patine.*

**S. 150** *1 Dibêjin: Ya xelîlê Reh'mane,*
*2 Hatîn em êt sergerdane,*
*3 Hîvî biken nik yê Subh'ane.*

**S. 151** *1 Wê dibêt Ibrahîme:*
*2 «Ez bi xwe mehderçî nîme,*
*3 Hûn herne nik Mûsayê kelîme».*

**S. 154** *1 We dibê Ubrahîme,*
*2 Ez mehder çûnîme,*
*3 Herne nik Mûsa, ku ew kelîme.*

**S. 152** *1 Ew ji nik wî cuda bûn,*
*2 Bê hîvî p'êkve r̂abûn,*
*3 Bi Mûsayî multeqa bûn.*

**S. 155** *1 Ji nik wî t'êkra dibin,*
*2 Bi Mûsa mult'eqa dibin,*

*3 Bê h'isab ew şa dibin.*

**S. 153** *1 Dibêjin: Ya Mûsa, tu bi Xwedê key,*
*2 Em hatîn debrê lê key,*
*3 Sotîn, tu hîvîyê bikey.*
**S. 156** *1 Dibên ya Mûsa, bi Xudê keyî,*
*2 Ji germa qyametê me veȓêkeyî.*

**S. 154** *1 Wê dibêjît Mûsa ye,*
*2 Şermê dikem ji Mewla ye,*
*3 Hûn herne nik Isa ye.*
**S. 157** *1 We dibê Mûsaye,*
*2 Heya dikem ji mewlaye,*
*3 Herne li nik Usaye*[4510].

**S. 158** *1 Ji nik Mûsa we radibin,*
*2 Bê hîvî, bê mik'an dibin,*
*3 Bi Usa ew şa dibin.*

**S. 155** *1 Dibêjin: Ya Isa, em bê mefer bûn,*
*2 Di xubara qiyametê da wer bûn,*
*3 Sotîn em, kerker bûn.*
**S. 159** *1 Dibên, ya Usa em bê mefer bûne,*
*2 Di beh'ra xuhê zer bûne,*
*3 Di t'oz û q(x)ubara qyametê wer bûne.*

**S. 156** *1 Isa dibêt: «Ez ew nîme,*
*2 Xudanê mehderê nîme,*
*3 (….. ….. …….).*

**S. 157** *1 Hûn bo çî we di nezanin,*
*2 Sewdayêt sergerdanin,*
*3 Xudanê şefae'tê nizanin?*

**S. 158** *1 Ya şeqîyêt melîle,*
*2 Her êkî ji me bi ĥalê xwe meşxûle,*
*3 Herne nik h'ezreta yê Ȓesûle.*

**S. 159** *1 Resûlê rîsaletê,*
*2 Di roja qiyametê,*
*3 Ew dê ket şefae'tê.*

**S. 160** *1 Ew h'ebîbê muxtare,*
*2 Li Buraqê suware,*
*3 Ev roke ew serdare.*

**S. 161** *1 Em jî ĥemî bi Buraqîn,*
*2 Nebîyên te xelaqîn,*
*3 Bi Mihemmedî di muştaqîn.*

**S. 162** *1 Wan ku bihîst ew mizgîne,*
*2 Ĥemû vêk ȓa girîne,*
*3 Dibêjin: «Ey Mihemmed nav şirîne».*

**S. 163** *1 Ĥemû vêk ȓa bi giryanin,*
*2 Sewdayêt sergerdanin,*

[4510] binêr: Isaye

*3 Li Mihemmedî di h'eyranin.*

**S. 164** *1 Di h'eyranin, di feqîrin, di miskînin,*
*2 Li çûnê dilerizînin,*
*3 Hewara xwe ve Mihemmedî radigehînin.*

**S. 165** *1 Dibêjin: «Ya h'ebîbê me yê p'ake,*
*2 Di qiyametê bûn hîlake,*
*3 Li me sotîn mîlake».*

**S. 166** *1 Ummet qewî ya bi e'zabe,*
*2 Bi şedîd û bi î'qabe,*
*3 Sotîn, bûne kebabe.*
**S. 160** *1 Hewar biken yê Wehabe,*
*2 Dirêjin li me ĥisabe,*
*3 Sotin bûne k'ebabe.*

**S. 167** *1 Mihemmed dibêjît: «Ya ummetê!*
*2 Hingo çi dikir di qiyametê,*
*3 Ji germê û dûjê û zeh'metê».*

**S. 168** *1 Ewî ku ummet dîte,*
*2 Qewî dil pê disojîte,*
*3 Diçîte sicûdê û digrîte.*

**S. 169** *1 Ferman diket yê Reh'mane:*
*2 «Ey Mihemmed bizane,*
*3 Ev roke ne roja sicûdane».*

**S. 170** *1 Eve ne ew mecal e,*
*2 Serî hilîne derh'al e,*
*3 Meqsûdê bike sual e.*

**S. 171** *1 Wê dibêjîtin Mihemmede,*
*2 Ya xaliqê Semede,*
*4 Suala min ummete.*

## 7. BEYT'A DINÊ[4511]

**S. 1** *1 Dilo r̂abe ku êvare,*
*2 Dilê r̂abe veke ĉave,*
*3 Bi new mêra mebe yare,*
*4 Hey nezano, bes di xewdabe.*

**S. 2** *1 Dilo r̂abe ji vê newmê,*
*2 Tu neçe nêzîkî vê qewmê,*
*3 Ew fêniyeke û ew xisare.*

**S. 3** *1 Dilo nomê me pê beĥse,*
*2 Beyana xilfetêye nase,*
*3 Tu ne yî şiyarî, gelek te ĥise[4512],*
*4 Me nive li xofêt mêra da.*

[4511] [2] Feqê Teyran (rr. 746-753) Belavkirin: p'îr Xelat Elîyas
[4512] *xis*

**S. 4** *1 Dilê r̂abe ji vê xofê,*
*2 Weke bap'îrî, weke babe,*
*3 Em jî dêçine nêv t'irabê,*
*4 Li ba baxoyî we firware.*

**S. 5** *1 Tu bir̂êne baxoyî û firwarê,*
*2 Bir̂êne çerxê û r̂ojgarê,*
*3 R̂oj li te hate êvarê,*
*4 Tu ne yî aqilî û tu ne yî siwarî.*

**S. 6** *1 Bi aqilî were cengî,*
*2 Tuyî mijulî bi vî r̂engî,*
*3 Bi vî nefsê ĥeta k'engî,*
*4 Yê kale, û ne yî guhdare.*

**S. 7** *1 Çima yî sistî, çima yî k'alî,*
*2 Tu bi xwe, bo xwe dinalî,*
*3 Me bê xeliqo*[4513]*, bi vî Te'alî,*
*4 Seyadêt bêne maldare.*

**S. 8** *1 Seyadêt bên û te r̂akin,*
*2 Mebêj nayêm, mebêj nakim,*
*3 Mecal hatin dê ẍewakin,*
*4 Car binêr çî haware.*

**S. 9** *1 Carek binêr çî bangîne,*
*2 Tu xwe ji newmê bihevjîne,*
*3 Dinya qet'ile û dinya xûyîne,*
*4 Dinya r̂ojgare û ger̂dûne.*

**S. 10** *1 Tîr dibarin ji ger̂dûnê,*
*2 Ji xew r̂abe, demek r̂ûne,*
*3 Tu natirsî ji hêtunê*[4514]*,*
*4 Li bin te agire û nare.*

**S. 11** *1 Li nav agirî, li ber p'êtê,*
*2 Li ser selê, xewa k'ê tê,*
*3 Felek gurge û e'cal têtê,*
*4 Te ne fikire, û ne fikare.*

**S. 12** *1 Dilo çime fikir nakî,*
*2 Tu navêyî xwe ji xew r̂akî,*
*3 Dê êvarî çî p'eydakî,*
*4 Te ne qutbe, û ne r̂izqare*[4515]*.*

**S. 13** *1 Dilo r̂abe, weha nabî,*
*2 Ĥeta k'engî dê di xewdabî,*
*3 Ĥeta r̂oj bêt û avabî,*
*4 Hey mesto, yî xeware.*

**S. 14** *1 Xewa qelpî e'mel bê cîh,*
*2 Meçe p'alde li ser bêlgî,*
*3 Xewa bê şehdeyî qewî are.*

**S. 15** *1 Xewa bê şehdeyî qewîye ẍusa,*
*2 Wî ne nave û ne namuse,*

[4513] *xelik*
[4514] *êtun*
[4515] *r̂izqal*

*3 Dikana xwace*[4516] *te r̂use,*
*4 Çima xwaceyî qalbdare.*

**S. 16** *1 Çima xwaceyî kêm debire,*
*2 Ew me'nîya nake qebire,*
*3 T'ijî t'oze û t'ijî ẍebire,*
*4 T'ijî mare, t'ijî more.*

**S. 17** *1 Serhev r̂enge, gelekî tenge,*
*2 Qewî tenge, qewî k'ûre,*
*3 Hun qebrê ji xwe mekin dure,*
*4 Li vê male û li wê ware.*

**S. 18** *1 Dilo bû payîz li van wara,*
*2 Xizam weşiyane bin dara,*
*3 Li mêrga buwe xuyên sare,*
*4 Dê çî li me kin gelî yare!*

**S. 19** *1 Dinê gewir bû ji xûn sore,*
*2 Ji sermayî, ji ya sarê,*
*3 Em sefatiyekê nakin ji wan wara,*
*4 Hewayî li me zor kirin dare.*

**S. 20** *1 Xizêm sotin ji sarmayê,*
*2 R̂ewneq r̂evî ji dinyayê,*
*3 Ji boş ava, deng jê nayê,*
*4 Me ne kaninî man û ne enhare.*

**S. 21** *1 Dilo behar bihurî û av kêm bû,*
*2 Ĥezar behar li ber ĉêm bû,*
*3 Payîz hat û gul dêm bû,*
*4 Werandin belg*[4517] *û moẍare!*

**S. 22** *1 Ne p'erĉem*[4518] *ma û ne simbêl*[4519] *ma,*
*2 Ne r̂eĥan ma û ne sorgul ma,*
*3 Ne hevrê ma û ne heval ma,*
*4 T'inê min ĥeyf ji wan xware.*

**S. 23** *1 Ne hevrê ma, û ne heval ma,*
*2 Ne alayê sîyê xal ma,*
*3 Ĥeyfa min tê li wan xwana.*

**S. 24** *1 Ne bê ĥeyfa min tê li wan tişta,*
*2 Xwezî ew tişt ne hêvişta,*
*3 Yasmîne di namdare.*

**S. 25** *1 Ne çîçek man, u ne yasmîn man,*
*2 Ne zoranêt di r̂engîn man,*
*3 Ne e'bdêt di xetxwîn man,*
*4 Ne Adar ma, ne Nîsan ma.*

**S. 26** *1 Dilo borî li Nîsanê,*
*2 Hewayê wan meha me dî kanê?*
*3 Bûye Îlon li zoranê,*
*4 Me ne kanî man, û ne enhare.*

---

[4516] binêr: *ĥac*
[4517] *pelk*
[4518] *pelçum*
[4519] *sunbil*

**S. 27** *1 Ji cobare giyayîker çon,*
*2 Nazik u let'îf t'er li ber çon,*
*3 Ev dinya weke bayekî kelenper li ber ço,*
*4 Dilo ev ba çî dijware.*

**S. 28** *1 Ar dibarîn ji e'zmana*[4520]*,*
*2 Ji du ma çerx û dewrana,*
*3 Gerê diavête r̂ehana,*
*4 Bixur barî ji buxarê.*

**S. 29** *1 Ji buxarî di r̂eng dayê,*
*2 Li mexmurê di pêçayê,*
*3 Qumaşê kevn bi kêr nayê,*
*4 Têxistine sunbilan û ware.*

**S. 30** *1 Dilo hewayê li me dikire gazî,*
*2 Xizêm p'êça bi hevr̂azî,*
*3 Me qumaş bi vî şazî,*
*4 R̂ûyê ĥêmî êbdare.*

**S. 31** *1 R̂ûyê ĥêmî çil salî,*
*2 Deqîq weşiyan ji pertalî,*
*3 Nav baẍçeda tuyî r̂eşkalî hebû, t'êkda bûne cobare.*

**S. 32** *1 Hema pertal k'ete avê,*
*2 K'efa beĥrê geha nave,*
*3 Siha meqbûl li ber tavê,*
*4 Ya R̂ebî, te li me sipî kirin r̂eng û r̂û kale.*

**S. 33** *1 Sipî nûre ji hidayete,*
*2 R̂engî r̂eşe bi zilmate,*
*3 Şikir şev diçu, r̂oj dihate,*
*4 Xwedê ẍefurê qesare.*

**S. 34** *1 Qesarê nerm kirî şuştî,*
*2 Li ber tavê domê ĥiştî,*
*3 Bi r̂engê pîrî r̂iştî,*
*4 Şikirdarim ji Cebare.*

**S. 35** *1 Şikirdarim ji vî ĥalî,*
*2 Hewayê lebaleba*[4521] *sale,*
*3 Werandin belgêt*[4522] *helhalê,*
*4 Ne r̂eng mane, ne r̂uxsare.*

**S. 36** *1 Me ne xew ma, ma ne newim ma,*
*2 Me ne şîret ma, me ne qewat ma,*
*3 Me ne ĥewal ma, me ne serkan ma,*
*4 Ĥeyam bihurîn û dinê sare.*

**S. 37** *1 Dinê mehde û mehluke,*
*2 Weke leb û leyîzuke,*
*3 T'evlî zare û t'evlî zar̂uke,*
*4 Dinê çerxe û dorane.*

**S. 38** *1 Dinê qence ji şêra r̂a*

[4520] *asman*
[4521] *lebleb*
[4522] *pelg*

*2 Avakiriya ji xêra r̂a*
*3 Xweş milke ji mêra r̂a*
*4 E'cel merze û Ĥeq ware*[4523]*.*

**S. 39** *1 Qence dinya t' jî şêr bî,*
*2 Ji xêra r̂a yî xweş*[4524] *mêr bî,*
*3 Ne mersumekî bê kêr bî,*
*4 Yî bê k'esp û yî bê k'are.*

**S. 40** *1 Bê k'espo, yî bexîle,*
*2 Çima aqilê teyî teqsîre,*
*3 Tu ya ciwan mede bi ya pîre,*
*4 Tu dest jê berde seĥare.*

**S. 41** *1 Dilo ya pîr bi kêr nayê,*
*2 Tu mebe oldaşê dinyayê,*
*3 Kilama xweş herr̂o*[4525] *nayê,*
*4 Qutê xwe bigre ji vê zayê.*

**S. 42** *1 Dilo sûke û dinê bazare,*
*2 Dinê sare û dinê sûke,*
*3 Dinêye pîre û ne bû bûke,*
*4 Hincî ciwanê ew pê sûke,*
*5 Dê bigeře wê gire û îne xware.*

**S. 43** *1 Ne Adem ma, û ne Sîs ma,*
*2 Ne Nuĥ ma, ne Ederîs ma,*
*3 Ne Unis ma, û ne Cercîs ma,*
*4 Ne Eyubê birîndare.*

**S. 44** *1 Ne Eyub ma, Yeĥya ma,*
*2 Ne Meyîrem ma, k'o Îsa ma,*
*3 Ne Ferun ma, ne Mûsa ma,*
*4 Ne Cemşîd ma, na Ferîdun û Luqman man,*
*5 Ne Şalut u ne Calut man.*

**S. 45** *1 Ne Calîs û ne Suxret man,*
*2 Ne zirqanî Nemr̂ûd ma,*
*3 Ne canî cimî eqbal ma.*

**S. 46** *1 Ne Harut ma, ne Marut ma,*
*2 Ne Azir ma, ne Nemr̂ûd ma,*
*3 Ne ewledêt di Aqub man,*
*4 Evê pîrê Usifê nazik xware.*

**S. 47** *1 Dinê pîrê beyabanê,*
*2 Ew xelqê medî ĥemû k'anê?!*
*3 Ĥemû xwerin vê xanê,*
*4 Ne silt'an ma û ne xwenk'are*[4526]*.*

**S. 48** *1 Dinya pîre ne m'equle,*
*2 Ya pê xure, ya merx̂ule (mil xule)*
*3 Hevo r̂enge, r̂eng eftare.*

---

[4523] *ĥeqar*
[4524] *xoş*
[4525] *hero*
[4526] *xwendk'ar*

**S. 49** *1 Ji eftarî di lêv şarê,*
*2 Erê pîre acuzê dev goȓê,*
*3 Heçîyê tê k'eft ware,*
*4 Serî ne k'eft hefsare.*

**S. 50** *1 Ku Îsa pîrê dibîne,*
*2 Îsa xulqê pîrê nebû ȓazî,*
*3 Telaq kirbû li ber qazî,*
*4 Te ne ehde, te ne qirare.*

**S. 51** *1 Îsa go: «Min sundek xwarîye bi Adem,*
*2 Bi Încîla k'efa Adem,*
*3 Êdî meyîlê bi te nadem,*
*4 Te ne ehde û ne qirare».*

**S. 52** *1 Xwedê ȓuĥa Îsa k'esk kir,*
*2 Îsa dinya dît û nas kir,*
*3 Tecirbû ji xwe ĥas kir,*
*4 Lew Îsa xwe ji vê dine vavarte.*

**S. 53** *1 Dinya pîre u ne dilcare,*
*2 Ba xwedan aqila ya Te'ale,*
*3 Ba Îsa tewir mirdare.*

**S. 54** *1 Yekî bi aqile û yekî merde,*
*2 Berî em çine nav wan e'rda,*
*3 Wewe ji mêla xwe xeberde,*
*4 Çira aẍ make qehare.*

**S. 55** *1 Dinê pîre û dinê make,*
*2 Dine tîne û dine xake,*
*3 Bi ewlada a'bad nake,*
*4 Di ya male ya bê ȓeĥm û dijware.*

**S. 56** *1 Na dilsoze ji ewladê keȓ û gêje,*
*2 Ya seĥare, ya p'ele mewte, ya qehare,*
*3 Pan-pan meke goştin dila,*
*4 Dema dibû xul-xule,*
*5 Herȓo k'oçe û herȓo mal êwire.*

**S. 57** *1 Herȓo k'oçe u herȓo çone,*
*2 Wê ji dora me ȓakin kone,*
*3 Nav qebirada dihajone,*
*4 Li wê xerpişte û îstifane.*

**S. 58** *1 Li wê xerpişte û dîsan zêde,*
*2 Dilo carek heȓe wêde,*
*3 Wê di ȓazayîne di nêv axêde.*

**S. 59** *1 Wê di xamoşin, wê di ȓazayî,*
*2 Gelo çima deng jê nayê,*
*3 Me'zul bûne ji vê dinyayê.*

**S. 60** *1 Îstefare û li wê t'obe,*
*2 T'obe û sed carî t'obe,*
*3 Yî ĥişiyar be, yî bê xew be,*
*4 Tu diçiya nav wan nobe.*

**S. 61** *1 Me ne xew ma, me ne newim ma,*

*2 Ne şîret ma, qewit ma,*
*3 Me ne ĥewal ma, ne serxan ma,*
*4 Em jî dêçine li pê wan ĥewala.*

**S. 62** *1 Qesro zêr̂ê li nav wan ĉala (çala?),*
*2 Ĥeta gay geya ser singe me dixware.*

**S. 63** *1 Mîr Miĥo here felek çu,*
*2 Bi hêceta[4527] dewran gelek ço,*
*3 Sal ĥezar û çil û yek ço,*
*4 Werezur[4528] hate dîyare,*
*5 Bi hêceta bilbil û zare.*

*Em di kêmin, û şêx Adî t'emame!*

## 8. BEYT'A ŞE'RÊ[4529]

**S. 1** *1 Bedîlê, bedîla vî zemanî,*
*2 Îsmayîlê Xanî,*
*3 Emê fet'a bikin gewrstanî.*

**S. 2** *1 Emê her̂ne ser Qeyserê sult'ane,*
*2 Meĥemed deh sal kirin t'emam,*
*3 Şêrekî aqilî k'emale.*
*4 Meĥemed dive Bişarê xulamê male:*
*5 «Bişaro, mala meda t'une t'u te'me».*
*6 Meĥemed çarde sal kirin t'emame,*
*7 Lê buhurîn sal, r̂oj û mehe,*
*8 Mêrikî şer̂ada şer̂ê bavê xweye.*

**S. 3** *1 Meĥemed û Bişarin,*
*2 Kavranîyêva kirbû dere,*
*3 E'lî hat nas kir ew r̂uĥbende,*
*4 Wêderê sê cara e'rĥemdulle dixûne.*
*5 Go: «Kur̂o, were xebera mi hilgire û meçe,*
*6 Diçî şeherê Findiqê nebihire,*
*7 Şeherê Findiqê wêda ciyê k'ufran dilgire».*

**S. 4** *1 Meĥemed ajot çû çil şevî şeherê Findiqê girt mik'ame,*
*2 T'ev bestubû naz-ne'met û te'me,*
*3 Sibê r̂abûbû dabû pêşîya xulame,*
*4 «Bişêro, go, tu bajo ĥer̂e,*
*5 Mi nimêj û ti[y]ate,*
*6 Pênc ferz nimêj bikim,*
*7 Bira dilê dê-bavê min nebe k'eser û xeme».*

**S. 5** *1 R̂ojekê ĥeta êvarê,*
*2 Meĥemed bûye ĥevjarê,*
*3 Bêr̂a bûye xilmetk'arê.*

**S. 6** *1 We bû we cirîya,*
*2 Xew ĉe'vê Meĥmed ger̂îya,*
*3 Der̂î û seĥet bore wî r̂ê dager̂îya.*

[4527] *ĥêcet*
[4528] *Werezur* – nave gundê Feqê Teyran lê ji dayîk bûye.
[4529] [29] (rr. 368-376) (№ 1693)

**S. 7** *1 Şevê û nîveȓeşê,*
*2 Meĥemed ĉe'vê xwe vekir,*
*3 Borê wî sekinîye pişt çadirekê guh nexşe.*
*4 Meĥmed wêderê mabû guhbidarî,*
*5 Dîna xwe dayê Daymê[4530] ȓûniştîye Şe'ra li bale,*
*6 Herda xebereke zare.*
*7 Daymê go: «Şe'rê çima tu zergunî?*
*8 Mêrê te gewrekî zemîne,*
*9 T'u kêmasî ber destê te t'uneye».*
*10 «Daymê,- go,- lema ez zergûnim,*
*11 Şevê ȓadizêm canekî xewne xwe dibînim,*
*12 Dest gerdenê wertînim,*
*13 Sibê ȓadibim kesek dora xwe nabînim».*
*14 «Ew cane tu dibêjîye,*
*15 Meĥemedê pisê E'lîyê Şêre,*
*16 Ew xarzîyê me ȓomîyane.*
*17 Hulu Şe'ra mi tu ȓabe,*
*18 Wexta Mekke, Medînê bê Meĥemed bave,*
*19 Wê Esfer bikujene,*
*20 K'afira kêm bikine,*
*21 Te ĥelal Meĥemed E'lîyê şêr mare[4531] bikene».*

**S. 8** *1 Ĉako xudanê qudretê,*
*2 Meĥemed ȓast ajote derê xebetê,*
*3 Go: «Bajo, heȓe nesekine ĥafê fikî keȓe,*
*4 Mêrê min gewrekî bê nedere,*
*5 Nek tê te ȓa dike şeȓe».*
*6 Meĥemed dive: «Şe'rê biĉûkim, biĉûkekî nezanim,*
*7 Ȓewîme ȓîya xwe bûme sergirdanim,*
*8 Eşqa p'ût-senemê îşev we mêvanim,*
*9 Biĉûkim, biĉûkekî xurwetim,*
*10 Ȓewîme ȓîya xwe bûme xelatim,*
*11 Îşev eşqa p'ût-senemê virbim,*
*12 Sibê zû diĥeȓetim.*
*13 Şe'rê go: «Şeve, şeveȓeşe bilqete've,*
*14 Borê min hindekî ȓe'te,*
*15 Ez nizanim eva çi e'rde, çi welate?»*

**S. 9** *1 Şe'rê go: «Lawo[4532] bajo pêşva bîne,*
*2 Qewî ĉêȓ k'ilamê te mi şîrine».*
*3 Şe'rê Meĥemed xwe kiribû mêvane,*
*4 Hahanga dabû ber sirfe û nane.*
*5 «Lawo, nave te çiye?» — go.*
*6 Go: «Navê min Mirade».*
*7 Go: «Şe'ded be ne t'u nave,*
*8 E'silê min mezine,*
*9 Mekke, Medîne, ĥemû pismamê mine».*

**S. 10** *1 Some û Selate,*
*2 Ewan sê destê şevê dinarete,*
*3 Paşê dengê Esferê k'afir nêĉîȓê dihate,*
*4 Daymê, Şe'rê destê xwe girtin, cotik bere,*
*5 Çûne pêşîya k'afir Esfere.*

[4530] *daym*
[4531] *me'r*
[4532] *lao*

**S. 11** *1 Esfer dûrva bang didete:*
*2 «Şe'rê kes mala me netê,*
*3 Ew k'îye r̂ûniştîye bin xebetê?»*

**S. 12** *1 Şe'rê go: «Esfer, biĉûke, biĉûkekî nezane,*
*2 R̂ewîye r̂îya xwe bûye sergirdane,*
*3 Eşqa p'ût-senemê îşev me mêvane,*
*4 Biĉûke, biĉûkekî xurwete,*
*5 R̂ewîye r̂îya xwe bûye xelate,*
*6 Eşqa p'ût-senemê îşev virbe, sibê zû diĥer̂ete».*

**S. 13** *1 Wey k'afirê bêdîne,*
*2 Dilê wî ger̂îyabû xeyale,*
*3 Derp û seĥet dide xeberê di tale*[4533]*,*
*4 Dibêje Şe'rê: «Şe'ra min bêje mêvanê xwe diçe bira her̂e,*
*6 Wekî neçe, îşev kuştine wî destê mi t'aqete».*

**S. 14** *1 Meĥemed ji babe xwe da zergûne,*
*2 Fir̂îya bû ort'a zîne,*
*3 «Gewrî miraro, go: «Şe'rê mole tê nine».*
*4 Dor hate Meĥemedê lawçîne,*
*5 Dast avîtibû Zilfeqarê heşîne,*
*6 Serê k'afir du qet*[4534] *kir, anî ort'a zîne.*

**S. 15** *1 Dest-p'îyê wî jîke, kewanê wî dibeste,*
*2 Avîtibû qerp'ûza zîn, pêş Şe'rêva kiribû qeste,*
*3 «Şe'rê, — go, — bikujim ber dilê te heste, yan ne heste?»*

**S. 16** *1 Gava Meĥemed serê Esfer bir̂îye,*
*2 Qendîla dolava ĥevt aşa tê bîye,*
*3 Qalbê zirĉo maye zevîye,*
*4 Dest avîte dezmaleke guh bi nexşe,*
*5 Ser ĉe'vê Meĥemed paqiş kir t'ozê, xubarê û t'erkeşe.*

**S. 17** *1 Şe'rê go: «Ya lawik, mi r̂a bêje pirsa sabit,*
*2 Çika tu ha dijarî, k'ê dayîme, k'ê bavit?»*
*3 Go: «Şe'rê, Meĥemedê pisê E'lîyê Şêrim,*
*4 Şûr devê xwe dilêrim,*
*5 K'afirek hate r̂û dinê nahêlim.*
*6 Şe'rê, Meĥemedê pisê E'lîyê Şêr ezim,*
*7 Şûr di devê xwe digezim,*
*8 Mala me ber k'afir nebezîye, ez jî nabezim».*

**S. 18** *1 Berê sibê zer bû dahiştê,*
*2 Eskerê Qewxê sult'an hat dihiştê,*
*3 Kesî nizanbû çend ĥezar sîyarê cebe r̂îşî li pişte.*
*4 Qewxê sult'an qîr̂înekê r̂adihişte,*
*5 Go: «Şe'ra min, k'ê Esfer kuşte?*
*6 Mi bir̂îya gaz û garden û piste».*

**S. 19** *1 Şe'rê go: «Bavo, her̂e tu ne virbî».*
*2 «Çir̂a, go lawo?»*
*3 «Esfer gewrekî bê ĥunur bû,*
*4 Hurmetek ji wî çêtir bû».*
*5 «Şe'rê bêje mêwanê xwe bira çadurê bê dere,*
*6 Ewî mi kuştîye Esfere,*

---

[4533] *te'l*
[4534] *qat*

*7 Mi bir̂îye gaz, gerdan û pişte,*
*8 Mi ji wî r̂a heye zor xebere».*

**S. 20** *1 Gava Meĥemed sîyar bû,*
*2 Eskerê k'afir pêva dîhar bû,*
*3 Kesî nizanbû çend ĥezar bû.*
*4 Meĥemed sere sed cotî bir̂îye,*
*5 Çarêd cotê mayî ber guhastîye,*
*6 Meĥemed sere sed cotê din jî bir̂îye,*
*7 Sêsed cotê mayî ber guhastîye,*
*8 Welle, Bille û T'ille, eva xeber r̂aste, şik tê nîye,*
*9 Meĥemed sere sed cotê din jî bir̂îye,*
*10 Dusid cotê mayîn ĥeybetê ber r̂evîye.*

**S. 21** *1 Şe'rê sere meydanê sekinî guhbidêrî,*
*2 Go: «Gewrê mirar, serê Meĥemedê t'ifal ne bazêrî,*
*3 Şe'rê me'rûmê fincana je'rê bixwe r̂uĥ bispêrî.*
*4 Daymê Şe'rê r̂a biribû mizgîne,*
*5 Go: «Hulu Şe'ra mi, tu r̂ave,*
*6 Nava k'afirada bûye ĉe'vîne,*
*7 Hêja ber derê bavê te biye huzne û şîne».*

**S. 22** *1 Qewxê sult'an dike gazî:*
*2 «Mex̂dusimo, apê Şe'rê yî,*
*3 Tu nayê yî hawara me vê care yî?*
*4 R̂aste, sîyarekî t'enêye, lê me anîne ber yemanê».*

**S. 23** *1 Mex̂dusimo dive: «Qewxê sult'an, aqilê te k'anê?*
*2 Namûsa min namûseke girane,*
*3 Ew t'ifaleke hatîye ber zevîyane».*
*4 Go: «Qewxê sult'an, aqilê te k'uye?*
*5 Namûsa min namûseke qewîye,*
*6 Ew t'ifaleke te ort'a meydanê dîye».*

**S. 24** *1 Meĥemed go: «Gewrê, beyt' xeberî, dûrva lef̂ê xwenekirî,*
*2 E'wneta Xwedê u mêra ezê te jî bibirim serî»,*
*3 Meĥmed go: «Gewrê bêwe'de,*
*4 Tu wekî nebî Meĥemedê t'ifal nekî şe'de,*
*5 E'wneta Xwedê u mêra ezê kuştine te jî bikim ce'de».*

**S. 25** *1 Dor hate k'afirê bê miwrete,*
*2 Derîyek danî Meĥemedê t'ifale,*
*3 Derî û seĥet binda kuştîye bore.*
*4 Dor hate k'afirê bê dîne,*
*5 Derpekê din jî pey derpa xwe dinarete,*
*6 Derî û seĥet destda bela kirîye mert'ale.*

**S. 26** *1 Dor hate Meĥemedê di jare,*
*2 Ber k'afir sekinî bîne dîware,*
*3 Danî sere k'afir şeşp'er̂ek, pê nikeribû t'u ĉare.*
*4 Dor hate Meĥemedê lawçîne,*
*5 Dest avîtbû zilfeqarê heşîne,*
*6 Serê k'afir du qet kiribû anîne[4535].*

**S. 27** *1 Îjar Meĥemed r̂ûnişt girîya,*
*2 Go: «Werin, bav-birê mino, werin,*
*3 Dore min k'om leşkerin,*

[4535] *anîbû*

*4 Dîsa ĉare min nedikirin,*
*5 Dêwê fiȓinde hatine şewk'ulebe çêkirin,*
*6 Wê bavêjin mi bigeȓin mi biberin,*
*7 Mert'al destê mi çûye,*
*8 Şeşp'eȓ dest mi da bela bûye,*
*9 Bor bin mi da kuştine,*
*10 Ezê vira mame peye,*
*11 Bira hewara mi Mekke, Medîne bê deyme mame».*

**S. 28** *1 Bakî hatî Cebêro,*
*2 Ne li darda, ne li bêro,*
*3 Keremp'eȓ xeber bir çû, kire guhê E'lîyê Şêro.*
*4 E'lî go: «Ĥenîfe, tu ȓabe Dundul bik'işîne,*
*5 Teng û bera bişidîne,*
*6 Bira hazirbe hespe zîne».*

**S. 29** *1 Ĥenîfe go: «E'lî pisê min û teye,*
*2 Hûn hewara wî neçene,*
*3 Xwedê bike vê gave k'afirê wî bikujene».*

**S. 30** *1 E'lî go: «Ȓabe Dundulê bik'işîne,*
*2 Teng û bera lê bişidîne,*
*3 Bira hazirbe hesp û zîne».*

**S. 31** *1 Gava Ĥenîfe ȓabû Dundul dikir zîne,*
*2 Teng bera lê dişidîne,*
*3 Fetĥa sê kit p'arsuyê Dundul dişkênîne.*
*4 E'lî derk'ete ber derê serayê,*
*5 Go: «Bişêro k'anê pisê minî şêro,*
*6 Qewî pêşîya te ne hate lêro».*

**S. 32** *1 Bişêr go: «E'lî some û selat be,*
*2 Nimêj û diate,*
*3 Ez hatim, nizanim çi bela jê ȓa hate.*

**S. 33** *1 Malê spar bûne çarde sîyare xumarî,*
*2 Şor kirine bendê mert'ala,*
*3 Mêrka heȓne şeȓa û de'wa.*
*4 E'lî wê dihurmijî,*
*5 Dilê E'lî da heye agirekî gujî,*
*6 Gote Dundulê: «Bimbarek, çi qewî îro bi mi da xwe dikujî?»*
*7 E'lî vê diniȓî,*
*8 Dilê E'lî da heye agirekî lê guȓi,*
*9 Ya bimbarek çi qewî îro bin mi da nafiȓî?»*
*10 Pê ȓa zar hat, go: «Jina te sê kit p'arsê mi şikênandîiye».*
*11 E'lî peye bû, hate xarê,*
*12 Destê xwe p'arxanê wê xist,*
*13 P'arxan ciyê xwe girtin.*
*14 E'lî sîyar bû.*
*15 E'lî şêrekî k'emîne,*
*16 Sî cizê Quran dixûne,*
*17 K'umê xwe jî pê ȓa dertîne,*
*18 Go: «Ya bînaya ĉe'va, tu qewata jina jê bistîne».*
*19 Qudreta Melikê*[4536] *Ȓeĥmanî,*
*20 Dundulê E'lî hilanî,*
*21 Nîveka wî şêȓî jî danî.*
*22 E'lî we diçûye,*

[4536] *melk*

*23 Serê meydanê canikek dîye,*
*24 Canikê pirs kirîye:*
*25 «Tu wî kî, — go, — îlaĥîye,*
*26 Tu bêjî min pirsa r̂astîye,*
*27 Çika çi k'ome zore ze'fe dera hay lev civyane?»*
*28 Go: «Ez wî kim îlaĥîye,*
*29 Ezê te r̂a bêjim pirsa r̂astîye,*
*30 Herge tu E'lîyê Şêrî, Meĥemedê pisê te wêderê k'etîye tengavîyê».*

**S. 34** *1 E'lî şêrekî k'emîne,*
*2 Ber xwe k'işanibû Zilfeqare,*
*3 K'afir kiribû belave,*
*4 Ĥeta Meĥemed dîbû herdu ĉe'va*
*5 Wel Ĥesene, wel Ĥusêyîne,*
*6 Daberjîne bêre stûne,*
*7 Ewan jî xun meydanê danîne.*
*8 Ĥesen, Ĥusêyîn şer̂ekî giran kir,*
*9 Ne weke bav û pisa kir,*
*10 Erê zîfir̂ sult'anê mezin jî gîyan kir.*

## 9. BEYT'A E'LÎ ŞÊRÊ XWEDÊ[4537]

**S. 1** *1 Sahba kir leşkere,*
*2 Çû ser kela k'afire,*
*3 Dîna xwe dayê gewrekî wê hazire.*

**S. 2** *1 Gewrekî çim-çim dibijartin,*
*2 Serê r̂îya vedişartin,*
*3 Hin dikuştin, hin diperatin.*

**S. 3** *1 Ĥesen, Ĥusêyîn girtin,*
*2 Gelîya war kirin,*
*3 Kela mêzîn da xar kirin,*
*4 Go: «Hûnê vira da bin, ĥeta r̂oja dimirin».*

**S. 4** *1 Çi sibeke nehîne,*
*2 Digrî, E'yş, Fat û Zîne,*
*3 Seva herd kur̂ê E'lîne.*

**S. 5** *1 E'lî dihate male,*
*2 Fatmê[4538] pê r̂a şer̂ û qale,*
*3 Gate: «Te girtî kirine zîndanê»,*
*4 Ew Fatme dêm şelale.*

**S. 6** *1 Ew Fatme dêm biĉûke,*
*2 Diger̂e sûk bi sûke,*
*3 Unda kirîye du biĉûke.*

**S. 7** *1 Çi sibeke zûye,*
*2 E'lî şûştîye dest û ĉe'v û r̂ûye.*

**S. 8** *1 Ço cem nebîye,*
*2 Go: «Ya E'lîye,*

[4537] [29] (403-410) (1700)
[4538] *Fatime*

*3 Xebera xwe bêje hêdîye».*

**S. 9** *1 Go: «Xebera min nave hêdî,*
*2 Feleka min mihêdî,*
*3 Ezê heȓme xiraba Amêdî».*

**S. 10** *1 Go: «Neçe, leşkera te bideme»,*
*2 Go: «Leşker nayêne birinê,*
*3 K'afirê min binzilzilin.*

**S. 11** *1Wê derê kela[y]ê mi girtin,*
*2 Wê Ȟesen, Ȟusêyîn yan bikujin,*
*3 Yan jî têda vê bimirin».*

**S. 12** *1 E'lî anî bîȓaste,*
*2 Çil sendoq pîȓaste,*
*3 Ȟeyştê e'shebe nav nivaste,*
*4 Gemî çêdikir, ȓûyê be'rê dixeste.*

**S. 13** *1 E'lî sîyarê Werdekê,*
*2 Bar dike erdekê,*
*3 Datîne mêrga mîr, dusekê.*

**S. 14** *1 Badîn wêda dihate,*
*2 Şeȓe, qate-qate,*
*3 Divê: «Ew k'îye merga mîr danîye?*
*4 Teyr teyrtîye xwe difiȓe,*
*5 Ez baska lê dibȓim».*

**S. 15** *1 E'lî go: «Gewrî mezino,*
*2 Bes te'na bidî mino,*
*3 Xo tu ne mêrî, ez jino?»*

**S. 16** *1 E'lî ber xwe ĉe'wan dî*[4539] *pişte,*
*2 Badî e'rdê dixiste,*
*3 Sê kit p'arasî zikda dişkênande,*
*4 Dest da ȟemla, dêst da bisulman bû.*

**S. 17** *1 E'lî go: «Welle, Bille û T'ille,*
*2 Tişte destê min hilê,*
*3 Ezê te têkme mîr, daynime serê kelê».*

**S. 18** *1 Go: «Heȓe bêje mîr ewe Misrê qazî,*
*2 Digeȓe çerx û bazî,*
*3 Ça k'efa mîr bixazî.*

**S. 19** *1 Bêje mîr ewe Misrê qata,*
*2 Digeȓe çerx welate,*
*3 Mîrê bîne te jî, didine maş û xelate.*

**S. 20** *1 Badî diçe mîr dipirsîye,*
*2 Go: «Mîrê min ewe Misrê qazî,*
*3 Digeȓe çerx û bazî,*
*4 Ça k'efa mîr bixazî.*

**S. 21** *1 Ewe Misrê qata,*
*2 Digeȓe çerx welate,*

[4539] *ĉe'wandî*

*3 Mîrê bîne te jî didine maş û xelate».*

**S. 22** *1 Mîr go: «Heȓe bêje p'elewanî,*
*2 Bira xwe neke zore,*
*3 Bira barke were jore».*

**S. 23** *1 Go: «Heȓe bêje p'elewanî,*
*2 Bira xwe neke bar giranî,*
*3 Bira barke bê xan û manî».*

**S. 24** *1 Hat gotê, E'lî bar kir hat,*
*2 Go: «Ew hêstirê bav k'ulabe,*
*3 Xwe da dergê deȓabe,*
*4 Têda niȓîya E'merî bin Xeteve.*

**S. 25** *1 Ew hêstirê bav k'ere,*
*2 Xwe da dergê dere,*
*3 Têda niȓîya E'mere.*

**S. 26** *1 Dergewan dergê E'mer nas kir,*
*2 Go: «Ne guȓîna e'wra bû,*
*3 Ne niȓîna şêra bû,*
*4 Lê dengê E'merê cêyran bû».*

**S. 27** *1 E'lî ser mile xwe ȓa fikirî,*
*2 Badî xulqê xwe kirî.*

**S. 28** *1 E'lî ço cem dergevanî,*
*2 Go: «Tu xayê xwe û çend serîyanî,*
*3 Tu dibêjî*[4540] *evî bisurmanî*[4541]*?»*

**S. 29** *1 Qudreta yekê Ẍefûre,*
*2 E'lî du t'ilî dane jûre,*
*3 Serê dergevanî fiȓand, avîte gelîyê k'ûre.*

**S. 30** *1 Mîr E'lî pirsîye:*
*2 «Ĥîla te çîye,*
*3 Te serê dergevanê min fiȓîye?»*

**S. 31** *1 E'lî go: «Mîrê min k'emk'er têne k'aşa,*
*2 Ĥdê k'eran û ceşa,*
*3 Yê usa çine ber dergê mîran û p'aşa?»*

**S. 32** *1 «Mîrê min - go - yê k'emk'er têne zevîya,*
*2 Pîr diçine dox t'eşîya,*
*3 Yê usa dergevan tînin dikine tewaşê îgirmîya».*

**S. 33** *1 E'lî deh û du gul hildavêtin,*
*2 T'ilîyê xwe pê ȓa dimêtin,*
*3 K'afira xelat diȓêtin.*

**S. 34** *1 K'afir E'lî şik k'etîye,*
*2 Go: «Ĥunurê wî bîna ĥunurê E'lîye,*
*3 Lê E'lî careke, ez du care E'lîme».*

**S. 35** *1 E'lî go: «Mîrê min tu bawarî nayne yeqîne*[4542]*,*

[4540] *divêjî*
[4541] *bi surmanî*
[4542] *yêqîn*

*2 Heȓe du ĉêjkê misurmana mi ȓa bîne,*
*3 Ez sere wan pêş teva hilqetînim».*

**S. 36** *1 Çon Ĥesen, Ĥusêyîn anîn wêva,*
*2 Qeyd û zincîr pêva.*

**S. 37** *1 Go: «Mîrê min girtîyê te evin?*
*2 Ellaĥ neke evana ber şûrê min k'evin,*
*3 Ewan bive ĥimamîşke.*

**S. 38** *1 Naz û ne'met pêde,*
*2 Şûrê hêşîn hespa lêde,*
*3 Subekê min û wana ȓûyê hevde».*

**S. 39** *1 Ĥesen, Ĥusêyîn birin ĥemamê ĥimamîş kirin,*
*2 Naz û ne'met lêdan,*
*3 Hespê bedew pêdan.*

**S. 40** *1 K'afir go: « E'lî ȓeşekî min heye mixarê,*
*2 Dioȓe mine e'wrê baharê.*

**S. 41** *1 Ĥevt dik'işînin sere,*
*2 Ĥevt dik'işînin hevsare,*
*3 Ĥevt jî ji mixarê derdixînin dere,*
*4 E'lîyê nizanim lê bike ĉare?»*

**S. 42** *1 E'lî go: «Berde min qalê,*
*2 Ĥekî E'lî kire ĉarê,*
*3 Yanê E'lî ber wî bêzare».*

**S. 43** *1 Sibekî ĥeta êvarê,*
*2 K'afira meydan bijarê.*

**S. 44** *1 Ĥevta k'işand sere,*
*2 Ĥevta k'işand hevsare,*
*3 Ĥevta jî [ji] mixarê derxist dere,*
*4 Berdane E'lî şêȓe.*

**S. 45** *1 E'lî ȓeş ȓabûne heve,*
*2 E'lî ber xwe k'işand Zilfeqare,*
*3 Ȓe'nê k'afir qut kir yek care.*

**S. 46** *1 Ew k'afirê dîn mûye,*
*2 Ȓe'nê xwe ȓa diçûye,*
*3 Ȓe'nê xwe E'lî wer dikire.*

**S. 47** *1 Ew k'afirê dîn siste,*
*2 Ȓe'nê xwe ȓa diheȓiste,*
*3 Gihîşte E'lî k'olemiste.*

**S. 48** *1 Quran k'itêba hebû,*
*2 Wekî E'lî çil şevî ber wî guhî keȓ bû.*

**S. 49** *1…………………………………..???*

**S. 50** *1…………………………………???.*

**S. 51** *1 K'afir çû ĥîla kir,*
*2 Ĥevt ĥodazirî li xwe kir,*

*3 Beraşekî mermerkirî ser kir,*
*4 Teze hat E'lî r̂a şer̂ kir.*

**S. 52** *1 E'lî k'afir t'eze r̂abûne hev r̂ike,*
*2 E'lî avîte k'afir Zilfeqarê kinike,*
*3 Ĥevt ĥodazirî, beraşe mermerkirî bir̂î ĥeta gelîyê berike.*

**S. 53** *1 E'lî go: «Elle û Ekberî,*
*2 Wekî te ne da ber şeşp'er̂ê zerî,*
*3 Minê qot kira pişta Gay û Masî*[4543]*,*
*4 Wekî dinya serî.*

**S. 54** *1 E'lî gote E'mere:*
*2 «Tu derge bike sefere,*
*3 Xwe bide bere».*

**S. 55** *1 K'afir anî ĥîle kir,*
*2 Pîrek kire dêleke gur̂î çêkir,*
*3 T'oximê k'afir ĥûrê genî kir,*
*4 Anî ber E'mer r̂a derge r̂a derbaz kir,*
*5 T'oximê k'afir dine wer kir.*

**S. 56** *1 E'lî hate ba E'mere,*
*2 Go: «Te derge r̂ind kire sefere?»*

**S. 57** *1 Go: «Dêleke gur̂î ĥûrekî gur̂î,*
*2 Derge r̂a t'enê derk'etine dere».*

**S. 58** *1 «Aha, - E'lî go – te t'oximê k'afir,*
*2 Dîsa dine bela kir,*
*3 E'lî kir nekir îdî ĉar pê nekir.*

**S. 59** *1 Ĥesen, Ĥusêyîn hatin wêva,*
*2 E'lî, E'mer abşûn pêva,*
*3 Badîn kirine mîr, danîne sere kelêve.*

**S. 60** *1 R̂eş r̂evî, k'ete pişt demir qap'î da,*
*2 Wekî r̂eş r̂ave ji mixarê derî serder, binder polane.*

**S. 61** *1 Gava serderê ber nizdê t'ivinga bimaşe,*
*2 Bindarê ber gîzmê sola bimeşe,*
*3 Hingê k'afirê dîsa dinê altke.*

*E'lî dengê xwe weke zir̂e misqalekê dide quling, baharê wexta diçe zozana dike qîr̂în, birîna k'afir diaxibe: «E'lî hê saxe». Payîzê quling dadiger̂e berîyê dîsa dike qîr̂înî, k'afir dîsa dive: «E'lî saxe», ditirse û ji mixarê dernaê.*

## 10. BEYT'A ÎBRAHÎMÊ BIRA[4544]

**S. 1** *1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Îbrahîmê bira r̂abûye ser banane,*
*3 Qurana mezin danîye ser çokane,*
*4 Divê: «Dayê, sere min dêşe ber mêvane».*

---

[4543] *me'sî*
[4544] [29] (гг. 410-414) (№ 1701)

**S. 2** *1 Divê Axî Cibrahîlê Axîye,*
*2 Fiȓî, çû bihişta baqîye,*
*3 Bûye mêvanê Nebîye.*

**S. 3** *1 Lê Fatimê dilbirîne,*
*2 Cahabekê bide derwêşê Medînê,*
*3 Divê Îbrahîmê bira me qelandîye dengê Qura'nê, sewta Yasînê.*

**S. 4** *1 Divê: «Lê Fatimê dil kovanê,*
*2 Ȓabe cahabekê bide derwêşê dîwanê,*
*3 Îbrahîmê bira me qelandîye dengê Yasînê, sewta Qura'nê».*

**S. 5** *1 Nevî dive: «Bilêlî Ĥebeş, bike, bilezîne,*
*2 Xwe Mêdînê ȓa bigehîne,*
*3 Bêje Fatimê, bê Îbrahîmê bira nexweşe, ĥalê xwe t'i nîne*[4545]*».*

**S. 6** *1 Bilêlî Ĥebeş dike, dilezîne,*
*2 Xwe Mêdînê ȓa digehîne,*
*3 Fatim dûrva Bilêlî Ĥebeş dibîne,*
*4 Xwe Bilêlî Ĥebeş digehîne.*

**S. 7** *1 Divê: «Bilêlî Ĥebeş, tu wî kî îlaĥîye,*
*2 Tê mi ȓa bêjî pirsa ȓastîye,*
*3 Qe ĥalê Îbrahîmê birayê min çîye?»*

**S. 8** *1 Bilêlî Ĥebeş go: «Ezî wî kim îlaĥîye,*
*2 Ezê te ȓa bêjim pirsa ȓastîye,*
*3 Îbrahîmê birayê te dêşe dest û ser û p'êye,*
*4 Dibe tu bigihîjî sere,*
*5 Dibe tu negihîjî sere».*

**S. 9** *1 Fatim dike, dilezîne,*
*2 Ĥesen, Ĥusêyîn herdu kuȓê xwe mal tîne,*
*3 Xwe Îbrahîmê birayê xwe ȓa digehîne.*

**S. 10** *1 Divê: «Axî Cibrahîl, ȓuĥê Îbrahîmê birayê min nestîne,*
*2 Ȓuĥê Ĥesen, Ĥusêyînê min ber xîne».*

**S. 11** *1 Axî Cibrahîl go: «Fatim ez Axî Cibrahîlê p'eȓkuȓim,*
*2 Şayî şalûla difiȓim,*
*3 Ez nehatime ȓuĥê ber ȓuĥa xînim,*
*4 Ez hatime destê bav û kuȓ hev dabiȓim».*

**S. 12** *1 Go: «Fatim ez Axî Cibrahîlê p'eȓ k'eskim,*
*2 Ez şayî şalûla dikime qeste,*
*3 Ez hatime ȓuĥu ber ȓuĥa xînim,*
*4 Ez hatime ȓuĥê Îbrahîmê birayê te meqes kim».*

**S. 13** *1 Fatimê go: «Bînin, bînin, darê çardarê bînin,*
*2 Cinîyazê Îbrahîmê bira ser daynin».*

**S. 14** *1 Anîn, anîn, anîn,*
*2 Darê çardarê anîn,*
*3 Cinîyazê Îbrahîmê bira ser dawastin».*

**S. 15** *1 Go: «Hilda yek û du û sê û çare,*
*2 Birne nav mezelê girane».*

[4545] ***t'inîne***

**S. 16** *1 Fatimê go: «Daê dêranê, tirsa min me'rê beleke,*
*2 Ditirsim wê hef̂e derê merzelê Îbrahîmê birayê min veke.*
*3 Me'ro, bextê te da me, ĉe'v û birîyê belek xwe f̂a xirav neke».*

**S. 17** *1 Fatimê go: «Daê delîlê, tirsa min tîre'me're,*
*2 Wê t'irba Îbrahîmê birayê mi da hef̂e xare,*
*3 Wê bixwe goştê nazikî nazdare».*

**S. 18** *1 Mişka gote van me'ra:*
*2 «Me hef̂ne li van wara,*
*3 Emê bixun xwe f̂a goştê nazikî nazdara».*

**S. 19** *1 Divê mişka gote li vî me'rî:*
*2 «Me hef̂ne gof̂istanê giran li herî te'rî*[4546]*,*
*3 Emê bixun goştê nazikî sere zimanî».*

**S. 20** *1 Fatimê got: «Dayê, dilê min dibêye,*
*2 R̂abe em serxweşîyê bidne bavêye,*
*3 Îbrahîmê bira t'erk kirîye dinêye».*

**S. 21** *1 Fatimê got: «Dayê, dilê min k'îne-k'îne,*
*2 Îbrahîmê birayê min mirîye, bavê min t'enê dimîne,*
*3 Dike, nake, herd kuf̂ê xwe jî anîye,*
*4 Nikare f̂uĥê Îbrahîmê birayê xwe vegef̂îne».*

**S. 22** *1 Bavê Fatimê divê: «Lawo, dilê min dibêye,*
*2 Îbrahîmê bira ço, bavê te ma t'enêye,*
*3 Ezê ço kim zêf̂ê xeznê, male dinêye?»*

## 11. BEYT'A MIRINE NEBÎYÊ OMETÊ[4547;4548]

**S. 1** *1 R̂ojekê f̂ojane,*
*2 Nevî Meĥemede, E'lîye, E'mere, Abûbek'ire, E't'mane,*
*3 Nevîyê ometê go: «Îro f̂uĥanê*[4549] *minî girane».*

> **S. 1** *1 R̂ojekê f̂ojane,*
> *2 Nevî Me'mede E'lîyê E'mer, Abûbek'ir E't'mane.*
> *3 Nevîyê ometê go: «Îro gîhanê min girane».*

**S. 2** *1 Nevîo ji madera,*
*2 Were em suf̂*[4550] *bidine xebera,*
*3 Werin em gîĥanê Nevîyê ometê bidin bang û sera.*

> **S. 2** *1 R̂ojekê madere,*
> *2 Suf̂*[4551] *bidin xebere,*
> *3 Go: «Werin em hef̂in gîhanê nevîyê ometê bidin bang û sere».*

**S. 3** *1 Nevîo ji civata,*
*2 Suf̂ bidin ĥikyata,*
*3 Werin em gîĥanê Nevîyê ometê bidin bang û serata.*

> **S. 3** *1 R̂ojekê civate,*
> *2 Suf̂ bidin ĥikyate,*

4546

4547 [29] (гг. 414-417) (№ 1702)
4548 [29] (гг. 388-392) (№ 1697)
4549 *ruhan*
4550 *sur*
4551 *sur*

*3 Go: «Werin em heȓin gîhanê nevîyê ometê bidin bang û serate».*

**S. 4** *1 Nevî Medînê ȓê bû,*
*2 Çendîk çend se'va a pê bûn,*
*3 Sidq bawarîkê a ji hev cihê bûn.*

**S. 4** *1 Nevî Medînê ȓabû,*
*2 Çendik çend se've [y]a pê bûn,*
*3 Sitq û bawerîkê lew cihê (şihê?) bûn.*

**S. 5** *1 Nevî Medînê wadwestîye*[4552]*,*
*2 Çendîk çend se'va pêjva dadwestîyan.*

**S. 5** *1 Nevî Medînê wedwastîya,*
*2 Çendik çend se've pêşva dadiwastîyan.*

**S. 6** *1 Qudreta yekê ĥale,*
*2 Nevî çûye male,*
*3 Nevî nexweşekî bedĥale.*

**S. 6** *1 Qudreta yekî ĥale,*
*2 Nevî çûye male,*
*3 Nevî nexweşîke bedĥale.*

**S. 7** *1 Nevî go: «E'yşê,*
*2 Ȓave ȓaxe xal û ferîşe,*
*3 Îro gîĥanê Nevîyê ometê dêşe».*

**S. 7** *1 Nevî go: «E'yşê,*
*2 Ȓave ȓaxe xalî û ferşa,*
*3 Îro gîhanê nevîyê ometê dêşe».*

**S. 8** *1 E'yşê xal û ferîşe ȓaxistin,*
*2 Be'lgî pêva hilperistin,*
*3 Nevîyê ometê nexweşe, navda niviste».*

**S. 9** *1 Ewin herçar xasê ya Ȓebî*[4553]*,*
*2 P'evk'etin hatine ser Nevî,*
*3 Gotin: «Nevîo ĥemetya Xwedê mera te hevî».*

**S. 10** *1 Ewin herçar xasê Ẍefûr,*
*2 Sekinîne ber yekê jûr,*
*3 Go «Ya Ȓebî, me herçare yekî bidî destûr».*

**S. 11** *1 E't'man dicedîne wêye,*
*2 Digrî şevê û ȓojêye,*
*3 Go «Ya Ȓebî, heve Nevîyê ometê vê care jî ȓave ji p'êye?»*

**S. 8** *1 E't'man dice'dîne wêye,*
*2 Digrî şevê û ȓojêye,*
*3 Go: «Ya Ȓebî, heve nevîyê ometê îjar jî ȓave p'êye?»*

**S. 12** *1 We dibêje*[4554] *Abûbek'ir,*
*2 Go: «Nevîo, çal te me kir,*
*3 Te me te'l*[4555] *kirîye şîrin û şekir».*

**S. 9** *1 We dibêje*[4556] *Abûbek'ir,*
*2 Go: «Nevîo, çî [y]a te me kir,*
*3 Te me tal kirîye şîrin û şekir».*

---

4552 *wadwastîye*
4553 *yarebî*
4554 *divêje*
4555 *te'l*
4556 *divêje*

**S. 13** *1 E'mer deyn dike bi zêre,*
*2 Go «Xaska ez bimirama li hêre*[4557]*,*
*3 Nevî r̂abîya nav ometa xwe silamet û xêre».*

**S. 10** *1 E'mer deng dike bi zere,*
*2 Go: «Xazil ez bimr̂ema li here,*
*3 Nevîyê ometê r̂abîya nava ometa xwe silamet û xêre».*

**S. 14** *1 E'lî go: «Nevîo, tuyî mamê minî r̂ast,*
*2 Ez wî kim*[4558] *Mekke, Medînê di bîr̂ast*[4559]*,*
*3 Tu r̂abe ez t'irba teda nivast».*

**S. 11** *1 E'lî go: «Nevîo, tuyî îmanê minî r̂ast,*
*2 Ez wî kim, Mekke û Medînê di bîr̂ast,*
*3 Tu r̂ave, ez dewsa te nivase».*

**S. 15** *1 Nevî go: «E'lîo, herça dibêje*[4560] *ne we ye,*
*2 Bende heye pey bende ye,*
*3 Her kesek me ber dora xwe ye».*

**S. 12** *1 Nevî go: «E'lîo, herça wa dibêje*[4561] *wa nave,*
*2 Wekî eva dinya hana t'emam cimĥave,*
*3 T'emam r̂ake r̂awastave,*
*4 T'ivdîra jorê Xwedê bike, jêrê betal nave».*

**S. 16** *1 Nevî go: «E'lîo, herça dibêje we nave,*
*2 Wekî eva dinya hana gi cimĥa ve,*
*3 Gi r̂akê r̂ewasta ve,*
*4 T'ivdîra Xwedê jor bike, jêr betal nave».*

**S. 17** *1 Nevî go: «Bişînin Ĥesen, Ĥusêyîn bînin,*
*2 Ezê çend wesyeteka lê wesînim».*

**S. 18** *1 Nevî go: «Wesyeta min nevne bîrê,*
*2 E'mer têne mîre,*
*3 Abûbek'ir têne wezîre,*
*4 Bidne ser t'extê zêr̂îne,*
*5 Bira pê tuave Mekke û Medîne».*

**S. 13** *1 Nevî go: «Wesyeta me nekine bire,*
*2 E'mer têkne mîre,*
*3 Abûbek'ir têkne wezîre,*
*4 Daynin ser t'extê zêr̂îne,*
*5 Bira pê tuave Mekke û Medîne».*

**S. 19** *1 E'mer bira nîşanê mîrtîyê lê vin,*
*2 Abûbek'ir t'ûxê wezîrtîyê ber ve,*
*3 A cem we nûre neder ve.*

**S. 20** *1 Fatmê go: «Bavimo, nûrîne,*
*2 E'lî, E'mer mêrne stûrin,*
*3 Pêşîmama bavê min nakine qebûle».*

**S. 14** *1 Fetme go: «Bavimo, nûrîne,*
*2 E'lî, E'mer mêrne stûrin,*
*3 Pêşîmama bavê min nakine qebûlin».*

**S. 21** *1 Nevî go: «Fatmê wesyeta mine weye,*
*2 Herça r̂oja bive înî û xubreye,*

---

[4557] *lihêre*
[4558] *wîkim*
[4559] *dibîrast*
[4560] *divêje*
[4561] *divêje*

*3 Pêşîmamê cimlî se'va dîsa bavê teye».*
**S. 15** *1 Nevî go: «Wesyeta mine weye,*
*2 Herça r̂oja bive înî xubreye,*
*3 Pêşîmamê cimlî se'va dîsa bavê teye».*

**S. 22** *1 Bilêlê He'veşîyê,*
*2 Ber derê me r̂a meşîyê,*
*3 Gazîke tal*[4562] *r̂ahiştîyê.*
**S. 16** *1 Bilêlê Ĥeveşîye,*
*2 Ber derê Fatmê r̂a meşîyê,*
*3 Gazîke tal r̂ahiştîyê.*

**S. 23** *1 Fatmê derk'et,*
*2 Neder bi neder k'et,*
*3 Sam hebeteke giran ser k'et.*
**S. 16** *1 Bilêlê Ĥeveşîye,*
*2 Ber derê Fatmê r̂a meşîyê,*
*3 Gazîke tal r̂ahiştîyê.*

**S. 24** *1 Fatmê go: «Bilêlê He'veşîyê,*
*2 Tu Xwedê kî, îlaĥîyê,*
*3 Gazîya te tal ser ĥesave».*
**S. 17** *1 Fatme derk'et,*
*2 Neder bi neder k'et,*
*3 Sam-hêbeteke giran ser k'et.*

**S. 18** *1 Fatmê go: «Bilêlê Ĥeveşîyê,*
*2 Tu wî kî îlaĥîyê,*
*3 Tê bêjî mi r̂astîyê,*
*4 Çika gazîye tal ser çiyê?»*

**S. 25** *1 Bilêl go: «Fatmê r̂ave,*
*2 Mi te r̂a anîye xeber û cave,*
*3 Îro bavê teyî ber ĥesave».*
**S. 19** *1 Bilêl go: «Fatmê r̂ave,*
*2 Mi te r̂a anîye xeber û cave,*
*3 Îro bavê teyî ber ĥesave».*

**S. 26** *1 Bilêl go: «Fatmê were,*
*2 Mi te r̂a anîye cav û xebere,*
*3 Îro bavê teyî ber deft'ere».*
**S. 20** *1 Bilêl go: «Fatmê were,*
*2 Mi te r̂a anîye cav û xebere,*
*3 Îro bavê teyî ber deft'ere».*

**S. 27** *1 Fatmê wesilî ber derê mizgevtê,*
*2 Digrî xwe û ometê,*
*3 Go: «Dengê bavê min çû ĥeta r̂oja oẍir-qîametê».*

**S. 28** *1 Fatmê wesilî ber derê cêmêye,*
*2 Digrî xwe û êmêye,*
*3 Go: «Dengê bavê min çû ĥeta r̂oja oẍir-qêmêye».*

**S. 21** *1 Fatme dike dilezîne,*
*2 Milê Ĥesen, Ĥusêyîn digre xwe r̂a tîne,*
*3 Berê axî Cibrahîlê axîyê datîne,*
*4 Go: «R̂uĥê Ĥesen, Ĥusêyîn bistîne,*

[4562] *te'l*

*5 R̂uĥê nevîyê ometê bibexşîne».*

**S. 29** *1 Fatmê go: «Bavimo, nûranîyê,*
*2 Mêvanê teyî p'ê wewastayî[4563] k'îyê,*
*3 Sam hêbeta wî gîhanê min girtîyê».*

**S. 22** *1 Fatmê go: «Bavimo nûranîyê,*
*2 Mêvanê teyî p'ewastîyayî k'îyê,*
*3 Saw-hebeta wî gîhanê min girtîyê».*

**S. 23** *1 Fatmê go: «Bavimo nûrîne,*
*2 Ez mêvanê te t'u se'ba naşêvînim,*
*3 Ezê naşême ĉe'va ber hilînim».*

**S. 30** *1 Nevî go: «Fatmê dota minê,*
*2 Mêvanê min Axî Cibrahîle û mifteyî k'ilîle,*
*3 Hatîye telbê r̂uĥê Îbrahîm Xelîle».*

**S. 24** *1 Nevî go: « Fatmê, dota minê,*
*2 Mêvanê min axî Cibrahîle û mifteyî k'ilîle,*
*3 Hatîye telbîyê r̂uĥê Îbrahîm Xelîle».*

**S. 31** *1 Nevî go: «Fatmê mêvanê min Axî Cibrahîlê E'rşane,*
*2 Nazilbûye r̂û e'rdane,*
*3 Hatîye r̂uĥê min bive e'zmanane».*

**S. 25** *1 Go: «Mêvanê min axî Cibrahîlê E'rşane,*
*2 Nazil bîye e'rdane,*
*3 Hatîye r̂uĥê bavê te bûye mêvane».*

**S. 32** *1 Fatmê go: «Îro r̂oje r̂oja gulbave,*
*2 Îro r̂oje omete ze'fe,*
*3 Bihêl bira r̂o me her̂e ava».*

**S. 26** *1 Nevîyê xadim di nave,*
*2 Duşemîyê bûye ze'va,*
*3 Duşemî jî bû t'evave.*

**S. 33** *1 Culê e'rdê culave,*
*2 R̂efê teyra ji hev[4564] berdane,*
*3 Yê weke Nevîyê ometê jî qedem hildane,*
*4 Fênîyê mîra nave.*

**S. 27** *1 Culê e'rdê culave,*
*2 R̂efê teyra t'ev berdane,*
*3 Go: «Yê mîna nevîyê ometê fênîya mîra qedem hildane nave».*

**S. 34** *1 Ewin horîyê meye nûranî,*
*2 Ewana xemilê zêr̂în sere xwe danî,*
*3 Ew jî digrîn ser Nevîê nûranî.*

**S. 28** *1 Ewin horîyê mene nûranî,*
*2 Ewin jî xemilê zêr̂în sere xwe danîn,*
*3 Ew jî digrîn pey ĥebûbê R̂eĥmanî.*

**S. 35** *1 R̂o derk'etîye ximamê berda,*
*2 Lê kirîye te'rî ĥemû cîye, ĥemû e'rda, ĥemû kesa,*
*3 Yê weke Nevîyê ometê jî çûne ji miclisa.*

**S. 29** *1 R̂o derk'et ximam li berda,*
*2 Lê kirîye te'rî ĥemû cîye, ĥemû e'rda, ĥemû kesa,*
*3 Yê weke bava, yê weke pisa,*

[4563] *pêwewastayî*
[4564] *jev*

*4 Yê weke nevîyê ometê qedem hildane ji miclisa.*

## 12. BEYT'A ŞÊXÊ SENA'N[4565]

**S. 1** *1 Bifikirin nuqta[4566] eşqê,*
*2 Em bixûnin ji vê xetê,*
*3 Ĥemdû sena ji Xaliqê,*
*4 Sibĥane ji te şahê qudretê.*

**S. 2** *1 Sibĥan ji te şahê suȓ Celal,*
*2 Bifikirin li nexşê bê zewal,*
*3 Ĥal bê mical naçite bal,*
*4 Şêx k'amil bû bi vê wesfetê[4567].*

**S. 3** *1 Şêx bi vê wesfetê k'amil bû,*
*2 Derwêşekî esĥabe di dilda bû,*
*3 Nûr bi nûrê hinda dibû,*
*4 Ji maşellaĥ[4568] nebîy we tê.*

**S. 4** *1 Qalb ji ĥal ȓadibitin,*
*2 Yende ji ȓesûl p'eyda dibitin,*
*3 Aşiq bê miraz nabitin,*
*4 Em t'êr bibînin vê ȓewitê.*

**S. 5** *1 T'êr bibînin ev ȓeng belav,*
*2 Sed miftîne û şêx, û mela,*
*3 Pê wê suȓêyê dibûn mubtela,*
*4 Ji neynika eksayetê.*

**S. 6** *1 Ew me'nîya ĥeya k'o bî,*
*2 Ellaĥ Êke, nabit du bî,*
*3 Me'bûd ji dîn na qulpî,*
*4 Ȓoj hate lêva merĥetê.*

**S. 7** *1 Qemer û şemse û sit'are,*
*2 Ȓoj di nav avêda ya dîyare,*
*3 Finde, û fanose, û beşere,*
*4 Ya li beşere û xulqayetê.*

**S. 8** *1 Ez k'etime p'iȓ mubtelatê,*
*2 K'etime mewca qirqiratê,*
*3 Ling diȓyan û hidum diryan,*
*4 Ez hatime ĥalê ĥîletê.*

**S. 9** *1 Îlaĥîo, Tu îlaĥî,*
*2 Dêm dirustî,*
*3 Tu dilberê şah û mestî,*
*4 Tu aşiqê p'iȓ wesfetê[4569].*

**S. 10** *1 Aşiq — tuyî, me'şûq[4570] — tuyî,*
*2 Nezer — tuyî, menzur — tuyî,*

[4565] [2] (rr. 925-930)
[4566] *nêqt*
[4567] *ulfet*
[4568] *meşe'la*
[4569] *usfet*
[4570] *maşoq*

*3 R̂uĥê r̂uĥa gehwer — tuyî,*
*4 Te misbaĥ ji dur̂a qudretê.*

**S. 11** *1 Misbaĥ ji dur̂a Ekberî,*
*2 Aşiq û me'şûqêt berî,*
*3 Li pê wê sur̂ê dibûn muşterî,*
*4 Seĥa dila nûr na detê.*

**S. 12** *1 Dil kewkebe ji mişluqetê,*
*2 Ne ji qefesa sinduqekê,*
*3 Qalbê ẍerq maşûqkê,*
*4 Me ĥemûwa ji vê veĥdenetê*[4571]*.*

**S. 13** *1 Me ĥemûwa miraze ji e'silê xweye,*
*2 Ya R̂ebî, r̂uĥ li ba teye,*
*3 T'anc sedefe ji nûra teye,*
*4 Em t'êr bibînin ev r̂ewtê.*

**S. 14** *1 Meyîla micid mişeref dibî,*
*2 Dil dayîme dilber dibî,*
*3 R̂uĥ p'ertewe ji Ekber dibî,*
*4 Ya R̂ebî, hêl û qewat*[4572] *ji ba te tê.*

**S. 15** *1 Ya R̂ebî, r̂uĥ bê te ji cî nalive,*
*2 Zilfa di şeng ser naşive,*
*3 Agir bi qalba nak'eve,*
*4 Nar yê micalê elqetê.*

**S. 16** *1 Ceşim cemala geş dibî,*
*2 Ev ferhala r̂eş dibî,*
*3 Ĥisin ji sewta xweş dibî,*
*4 Çî çî digêne ĥizretê.*

**S. 17** *1 Enfe, û uzne, û besere,*
*2 Cizme, û micaze, û fenere,*
*3 Ĥemû li xeyala*[4573] *Ekbere,*
*4 Dêm şuşeye, ji nûra te tê.*

**S. 18** *1 Dêm şuşeye, ne ji qefesê,*
*2 Micaze ji aşiq û hewesê,*
*3 Can ji sur̂ê nabit bese,*
*4 Dêm nima wê didete.*

**S. 19** *1 Ya R̂ebî, dil li min t'êr nabitin,*
*2 Ya R̂ebî, bê te xêr nabitin,*
*3 Mer bê huzûr*[4574]*, mêr nabitin,*
*4 Zik'irê dila nûr nadetê.*

**S. 20** *1 Zik'irê civata, yê bê melek,*
*2 Sed carî zav bikin gelek,*
*3 Mîna te'mê bê nimek,*
*4 Yî dure ji zoqê û lezetê.*

**S. 21** *1 Ew bûn zik'irê amê dikir,*
*2 Nêzîkî şêx sofî dikir,*

---

[4571] *weĥdanet*
[4572] *qewet*
[4573] *xiyal*
[4574] *hizir*

*3 Merşê mirîd pê hîndikir,*
*4 Xarc kirbû ji zilmetê.*

**S. 22** *1 Bêjin bora qesîda,*
*2 Germe û sayîye*[4575] *û mese'îda,*
*3 Em biçine ser behsêt*[4576] *mirîda,*
*4 Şêxî dûre ji mişẍuletê.*

**S. 23** *1 Şêxî dûre ji ĥalê bi şik,*
*2 Bime r̂eĥet û bê kirê xêşik,*
*3 Mal esmere, dak li nik,*
*4 Şêx qebûl naket vê ẍeybetê.*

**S. 24** *1 Şêxî dûre ji van xebera,*
*2 Em bidin medhêt xwanan û dilbera,*
*3 Mak li nik, dak esmere,*
*4 Eve bû beĥiş û pirsêt merĥayetê.*

**S. 25** *1 Şêxek hebû li Merĥaniya,*
*2 Naçite îd û xişiya,*
*3 Şuẍla wî dêm bi çêriya,*
*4 Şêrîn dike wê teĥiyatê.*

**S. 26** *1 Şêx xilmet dikir dayîm medam,*
*2 Geh ji qud, geh ji qiyam,*
*3 Ĥeftî*[4577] *û ĥeft salêt ťemam,*
*4 Şêx xalî nebû ji xilmetê.*

**S. 27** *1 Şêx xilmeta mewlê dikir,*
*2 Zik'irê mezin ji pê dikir,*
*3 Çêrî ji xelqêra çêdikir,*
*4 Xelq di anîne ser ehliyetê.*

**S. 28** *1 Hincîyê şêx guhdar dibî,*
*2 Axret jê r̂a xiyar dibî,*
*3 Zeyîneta r̂ê dinyayê li ber ĉava sar dibî,*
*4 Ji awaz û bendêt şîretê.*

**S. 29** *1 Awaz û bendêt ĥekîma,*
*2 Gotina p'îr̂ E'zîme,*
*3 Şîreta p'îrî ĥekîme,*
*4 Di dêst da naket qîmetê.*

**S. 30** *1 Dur̂ hene li ehlî miluka,*
*2 Hun mebine şarêt piçuka,*
*3 T'emen naînin li wan sûka,*
*4 Yek lib ceh pê ne tê.*

**S. 31** *1 Merĥaniya şêxek hebû,*
*2 Wî haj meyla dine nebû,*
*3 Şêx aşiqê baxoyê xwe bû,*
*4 Şêxî dûre ji miẍuletê.*

**S. 32** *1 Şêxî dûre ji dine û demê,*
*2 Zav digrî, kêm dik'enê,*

---

[4575] *saye*
[4576] *beĥs*
[4577] *heft*

*3 Ji sicûdê kul bû enî,*
*4 Şêx k'ar diket zad û zewadê axretê.*

**S. 33** *1 Şêx zad û zewadê axretê k'ar dike,*
*2 Zik'irê çê miqdar dike,*
*3 Hercar wekî hercar dike,*
*4 Ji eşq û ĥalê cizbetê.*

**S. 34** *1 Cizbet suȓa suȓ qadime,*
*2 Girtin bo mêrî lazime,*
*3 Ceger pê dibit qayîme,*
*4 Ji i'şq û ĥalê cizbetê.*

**S. 35** *1 Cizbet heye ji suȓa suȓ caqiye,*
*2 Muĥbet*[4578] *hebû li ehlî xefiye,*
*3 Hat di dilî da di tewiya,*
*4 Em "esa'r" biken vê qisetê.*

**S. 36** *1 Em hatin qisa esa'r bikin,*
*2 Behs û pirsa li hev bar bikin,*
*3 Dilbera li qalba k'ar dikin.*

**S. 37** *1 Şêx dibêje qir-qir mekin,*
*2 Behs u pirsa li me p'iȓ mekin,*
*3 Vê xosiyê li me sar mekin,*
*4 Ne yî xose sewtê ji we tê.*

**S. 38** *1 Şêxek hebû ji Sena'niya,*
*2 Serdarê şêx sed sofiya,*
*3 Şêx go: «Meqamêt ewlîya,*
*4 Aşiqê dota gurcîya,*
*5 Eĥmeq nizanin nîşan çîye?»*

**S. 39** *1 Yê ne saẍ ne ĥal tê namînê,*
*2 Wê bi dua' ȓake û vejînê,*
*3 Şêx erca dikir wê se'etê.*

**S. 40** *1 Şêx ercu dikir sed lal û şil,*
*2 Pê ȓon dikir sed ĉav û dil,*
*3 Pê ȓast diken sed zalim û zil,*
*4 Şêx ji beşerîyê nezer vê k'etê.*

**S. 41** *1 Şêx ji beşerîyê kêmiye bû,*
*2 Çak, û cud, û bêrîya bû,*
*3 Di dil da t'ayfê eşqê weliya bû,*
*4 Seyîd Ellaĥ ji ber k'etê.*

**S. 42** *1 Seyîd Ellaĥya şêx (ekabir),*
*2 Qul Ellaĥ mek'an li ĥadir,*
*3 Xayîbuhu xelqê misafir,*
*4 Wey li min û vê suhbetê.*

**S. 43** *1 Suhbeta şêxê Ȓeşîd tê,*
*2 Micilise û şêx sed mirîd tê,*
*3 Deng ji mellan û sofiyan tê,*
*4 We li enbiyan û ewlîya tê.*

[4578] *miĥibet*

**S. 44** *1 Îlaĥîo, Tu Melikê[4579] çeng li hewayî,*
*2 Tu yê difiȓî lana bayî,*
*3 Li nava zik'ir û semayî,*
*4 Her wekî ȓoj derk'etê.*

**S. 45** *1 Ȓoja xotbet[4580] dihate,*
*2 Şêv û cema'ye'[4581] û cemae'te[4582],*
*3 Zik'ir û germû civate.*

**S. 46** *1 P'êlekê der anî cêş bû,*
*2 Micilisê aşiqê xiroş bû,*
*3 Micilisê kiras bi coş bû,*
*4 Aşiqê e'qêxiros bû.*

**S. 47** *1 P'êlekê dewranî çê bû,*
*2 Hincîyê li pê xofa mîrê elê bû,*
*3 Wek "miçik" meyla Xwedê bû.*

**S. 48** *1 Keĉê, dînê, te ez dîn kirim,*
*2 P'êçam û di Şamê wer kirim,*
*3 E'bid bûm li sûka ẍurbetê.*

*Xwedê ava bike mal û mezelet em tê.*

## 13. BEYT'A ŞÊX XELO[4583]

**S. 1** *1 Hûn guh bidine xebera,*
*2 Hinek qewlin, hinek beyît'in,*
*3 Hinek jî xeberê zara.*

**S. 2** *1 Nîvê dinêyî p'ir be're,*
*2 Baran e'zmana dibare,*
*3 We dîtine ĉe'va bavare.*

**S. 3** *1 Ser we da nûreke zere,*
*2 [Ew] Nûra zer Zerbve,*
*3 Xof ȓem dinê da hebe.*

**S. 4** *1 Ȓastî heye Xudêye,*
*2 E'zmanî ser da şe'deye,*
*3 E'rd – dêye, E'zman – bave.*

**S. 5** *1 Tebekê e'zmane hene,*
*2 Yeke Hîve, yeke Ȓoje,*
*3 Yek sitêrka sibêye.*

**S. 6** *1 Ȓastî navê Xudêye,*
*2 Dîn heye wê nextêye.*

**S. 7** *1 P'êxember dinê da hene,*
*2 Meĥemede, Îsa, Mûsa,*

---

[4579] *melek*
[4580] *xutbe*
[4581] *cimee'*
[4582] *cimee't*
[4583] [54] *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. *BEYÎT'A ŞÊX XELO (*rr. 116-118) T'ilbîs 2001

*3 R̂astî navê Xudêye,*
*4 Şems melekê Tawisa.*

**S. 8** *1 Def, şibêbî ber didin denge,*
*2 Bengzekî ĥezar r̂enge,*
*3 Gazî dikin ĥezar yek r̂enge,*
*4 Şemsê Sorî bilinde.*

**S. 9** *1 Şewaqa Hîvê heye,*
*2 R̂oj dertêye, ew i'ndaye,*
*3 E'zmanî serda şe'deye,*
*4 At'qata dînê êzdiyaye,*
*5 Cinet ewe r̂uyê e'rdêye.*

**S. 10** *1 Nawê dinê dudune,*
*2 Qencî û xirabîne,*
*3 Qencî heye cinete, xirabiye - ce'nime.*

**S. 11** *1 Cinet, ce'nime cotin,*
*2 Qencî, xirabî jî cotin,*
*3 Herr̂o, herr̂[le]o têne gotin.*

**S. 12** *1 Nebine maşoqê dila,*
*2 Her hene baẍçengê gula.*

**S. 13** *1 Dila da xem k'eserin,*
*2 Ji ĥerfê neyêne dere,*
*3 Mala Adiya je'ra me're.*

**S. 14** *1 Nebine maşoqê dila,*
*2 Hene baẍçengê gula.* (binêr: **S. 12**)

**S. 15** *1 Giliyê Gulê nerastin,*
*2 Qeyîdê destê şêx Al digestin.*

**S. 16** *1 Werin misilĥetê gelî kesa,*
*2 Misk'în bûye şêx Alê Şemsa,*
*3 Havêtine Şamê ĥevsa,*
*4 Hîvî kirin sitiyê Şemsa.*

**S. 17** *1 Guh bidine xeta hanê,*
*2 Şêx Alê Şemsa xudanê e'yîd, qurbanê,*
*3 Havêtine ĥevsa Şamê.*

**S. 18** *1 Çarşema serê Nîsanê,*
*2 Deng belav bû êzdiyê dinê-a'[le]mê,*
*3 Şêx Alê Şemsa k'eremke were dîwanê,*
*4 Bikin e'yîdê, bidin qurbanê,*
*5 Vekin deft'era îmanê.*

**S. 19** *1 Hûn guh bidine gotinê,*
*2 Bedevî namûse bi dinê,*
*3 Qeda bê qismê jinê,*
*4 Gatina Fatimê.*

**S. 20** *1 Waxta nixte ĥelale,*
*2 Ĥusnekî delalî bale,*
*3 Dinê da xirabî nabe*

*4 Şîrê ĥelal ĥeram nabe.*

**S. 21** *1 Herge nixte ĥerame,*
*2 Şîrê teyîranî ceme,*
*3 K'êlekê şûrê E'lî*
*4 Xa r̂a dibîne hewalî,*
*4 Gatina gezan welî.*

**S. 22** *1 Kuştin dinê da heye,*
*2 Dest ser desta zêdeye.*

**S. 23** *1 R̂astî navê Xudêye,*
*2 E'zman serda şe'deye,*
*3 Qara jinê net'êye.*

**S. 24** *1 Diniya her bêît'bare,*
*2 Herr̂o k'oĉe, herr̂o bare,*
*3 [Tu] kesî r̂a nabe ware,*
*4 Beniyademî misk'înî jare.*

**S. 25** *1 Diniya heye xana t'ijî,*
*2 Têda hene beĥîn berjî,*
*3 Nemir hene ser dijîn.*

**S. 26** *1 Nemir yek navê Xudêye,*
*2 Ya dinê - qenciya bendeye.*

**S. 27** *1 Eva giliya min hev anî,*
*2 Qewl û beyît'a min der anî,*
*3 Qewal def-şibêbiyê lêxe,*
*4 Eva gotinê Xeloyê şêxe.*

## 14. QEWLÊ ĤEQÎQETÊ

*1 Bedîl dihatin û diçûne,*
*2 Kêm bûn alim û xetxûne,*
*3 Lema jî yek û du berî nasbûne.*

*1 Ew bedîlê der k'evin,*
*2 Ew bedîlê li hev k'evin,*
*3 Ew bedîlê mêra bikine şike.*
(Ji Qewlê Îmanê)

**S. 1** *1 Eva qewlê dewr-zemanê meye,*
*2 Ĥeq-neĥeqiya êzdiya têda heye,*
*3 Xwe davêjine ser p'işka şile'tê, sê h'erfê me t'ev hileye.*

**S. 2** *1 Eva qewla qewlê Ĥeqîqetê,*
*2 Baş guhdar kin gotinê vê xetê,*
*3 Xwedê k'iriyamet dayê êzdî, lê bikin ĥizretê.*

**S. 3** *1 K'ê vî qewlî r̂a bibe yare,*
*2 Nevsa wî ber Xwedê t'ucar nabe xare,*
*3 Te'lî-tengiyê dîn wê bibîne, hilde ser xwe t'oq û bare.*

**S. 4** *1 Mixarek hebû ciyê e'babetê,*
*2 Kanîk jê dik'işiya bi qewata qudretê,*
*3 Êzdiya xwe mor dikirin, ew bû ava cinetê.*

**S. 5** *1 Şêx Adî cindiyê xwe k'om kirin,*
*2 Qesta mixarê, kaniya Sipî kirin,*
*3 Destûrî Xwedê, mêr-meleka xwe ziyaret kirin.*

**S. 6** *1 Laliş kirine warê mîra,*
*2 Li wê danîn dîwana feqîra,*
*3 K'oĉekê ber kuĉikê nûrîn kirine xizmeta p'îra.*

**S. 7** *1 Gotin: «R̂iya mêrê dîwanê ĥeq û r̂astin!»*
*2 R̂a bûn ol û erk'anê kemn guhastin,*
*3 Êzdiya r̂a xêr û berek'eta Xwedê xwestin.*

**S. 8** *1 Şêx Adî ĥed û sed danî,*
*2 Ferzê biratiyê li hev anî,*
*3 Sê ĥerf sêvirand, êzdî pê wan kirine bawar û r̂eĥmanî.*

**S. 9** *1 Şêx Adt, şêx Îsn mêrne çê bûn,*
*2 Ji wan k'itêb-deft'er çê bun,*
*3 Qelem ji Ferxê Adiya girtin, xweş jê t'êr bûn.*

**S. 10** *1 Nivîsîn k'itêb û deft'ere,*
*2 R̂adibûne ser membere,*
*3 Zimanê e'rebî, gotinê Quranê êzdiya r̂a kirin şertê herî here.*

**S. 11** *1 Şêx Adî dînê Êzdan teng kir,*
*2 Mêr dora xwe civand r̂eng bi r̂eng kir,*
*3 Bû p'êxember, êzdiya r̂a bi navê Xwedê deng kir.*

**S. 12** *1 Şêx Adî ulm li Şamê hilgirî,*
*2 Dewrana dewran birî,*
*3 Ne got, r̂ojekê zanîn pêş k'eve, aqilê êzdiya ferzên wî danî nabirî.*

**S. 13** *1 Îro kes nemaye bik'işîne we minetê,*
*2 Êzdîno, werin bixûnin vê xetê,*
*3 Ĥerfê wî nesîĥetin, r̂ojekê kêrî we tê.*

**S. 14** *1 Zemanê berê va bû,*
*2 Qelem êzdiya r̂a gune bû,*
*3 Her çi şêx-p'îrên nexwendî digotin, her ew bû.*

**S. 15** *1 Îro êzdiyan qelem hildane deste,*
*2 Ulmê dinê r̂a kirine qeste,*
*3 Qedexa xwendinê bi ĉe'va dîtin bi qeste.*

**S. 16** *1 Îro ew bedîl der k'etin,*
*2 T'erîq û mirîd li hev k'etin,*
*3 Şik birine mêra, mala Adiya r̂a de'v k'etin.*

**S. 17** *1 K'etine de'v mala Adiya,*
*2 K'itêb dêrxistin xwendiya,*
*3 Dane ber ĉe'va ĥeq-neĥeqiya pisên Adiya.*

**S. 18** *1 Zemanê me ne t'u xêre,*
*2 Şêx û p'îr r̂evînê ji lêre,*
*3 Êzdiya xwe vekirin dergê mizgevt û dêre.*

**S. 19** *1 Derk’etiye dewreke ser dewrêye,*
*2 Dînê êzdîtiyê diĥele li vêye,*
*3 Bira bawariya xwe nayîne li bîrêye.*

**S. 20** *1 Êzdî k’înê hev r̂a dik’işînin,*
*2 Ĉe’vnebar, zinêk’ar, delingşînin,*
*3 Lema jî mane bê ĥeq, bê welat û şaneşînin.*

**S. 21** *1 Bira xêra birê qet naxweze,*
*2 Ji hev dir̂evin xal, ap û biraze,*
*3 Êzdî ĥetanî ser wî aqilî bin, nagîjine t’u miraze.*

**S. 22** *1 Hilşiya ĥed û sede,*
*2 Qirara r̂a heye we’de,*
*3 Doza mala Adiya ji êzdiya digire kem merde.*

**S. 23** *1 Îro nefsa gelek êzdiya xare, ne li jore,*
*2 Davêjine ser dînê xwe qisêd p’ir qore.*
*3 Dil nakin herne ĥizreta silt’an Êzîdê Sore.*

**S. 24** *1 Xerqe, k’ulik wê r̂izîne,*
*2 Havêtine ser mêzîne,*
*3 Şêx, p’îr, mirîd hev r̂a bûne xal-xarzîne.*

**S. 25** *1 Dilê êzdiya biye bazar-sûke,*
*2 Şêx, p’îr, mirîd direqisin bindarûke,*
*3 Şile’tê r̂a dizevicin, wana r̂a dibin zava, bûke.*

**S. 26** *1 Cahêl nizanin çi îmanîne,*
*2 Ola şêx Adî, mêra r̂a bê derdîne,*
*3 Ji şêx û p’îra kêm mane şikestiyêd dîne.*

**S. 27** *1 Êdî e’babetî nakin xerqeye,*
*2 Nizanin ew lib[a]sê Xwedê bi xweye,*
*3 Naçine ber damana şêx û p’îrê xweye.*

**S. 28** *1 Mirîdan, şêxan, p’îran,*
*2 Ji zû va berdane fenê mîran,*
*3 Ne jî êdî e’babet dikin wan feqîran.*

**S. 29** *1 Tawisî êdî ne siyare,*
*2 Xaĉ xwe r̂a kirine yare,*
*3 Laliş, Şengal, ĉiyayê Mişetê r̂a dibêjin ne t’u ware.*

**S. 30** *1 Sunet êdî ne yê wanin,*
*2 Ne r̂ezin, ne jî r̂ezvanin,*
*3 Sunet berdan, êzdî ne ĥevcê wan ferzanin.*

**S. 31** *1 Îro ji şêx, p’îran ulmdar neman.*
*2 Kes nak’işîne derdê van deman,*
*3 Qewlbêj derk’etine zaneyê çendik sebeqan.*

**S. 32** *1 Kêm dikin xizmetê vî dîne,*
*2 Waxt bê şêxtî, p’îrtî qet namîne,*
*3 Herçî şêx Adî, şêx Ĥesen ava kirin, wê k’okê da hilşîne.*

**S. 33** *1 Şêx, p’îran xêr xwe r̂a dibirin,*

*2 K'ivş bibûn, nasebirin,*
*3 Xof, r̂ema Êzîdê Sor, melek Tawis kêm dikirin.*

**S. 34** *1 Di'a, dirozgêd wan e'babetê,*
*2 Kes nema xaş mak ke şe'detê,*
*3 Ulmê şêx Adî û mêra wê tê ber t'emamêtê.*

**S. 35** *1 Hîviya t'eriqan ne t'u ji hîviyane,*
*2 Mirîd dest berdidin ji mala Adiyane,*
*3 Qedrê wan ber zêndiya k'et, dibine şêx, p'îrê miriyane.*

**S. 36** *1 Hê şêx Zeyîdîn, şêx Al neyî sipar bûn,*
*2 Her pênc t'erîqe xwe r̂a de'vîdar bûn,*
*3 Ferzê biratîyê û merebtiyê r̂a ne bawar bûn.*

**S. 37** *1 Wê diçe dewra şêxan û p'îrane,*
*2 Êzdî êdî naçine ber malêd girane,*
*3 Qet nak'işînin minetê ji govek û e'slê t'erîqêd mala Adiyane.*

**S. 38** *1 Xelqê k'itabê îro jî sere,*
*2 Borîna wan tê li dinê her dere,*
*3 Vî zemanî da jî êzdî mane bê nivîs û deft'ere.*

**S. 39** *1 Eva gunehê şêxan û p'îran,*
*2 Dîwana xasan û feqîran,*
*3 R̂eşbelekek çê nekirin boyî e'babetê dergê mîra.*

**S. 40** *1 Ew xêra êzdî îro didin boyî saxane,*
*2 Ne Xwedê r̂a û r̂iĥê wan miriyane,*
*3 Van cûra naz–ne'meta Êzîdê Sor qebûl nake t'u waxt, t'u zemane.*

**S. 41** *1 Xêra miriya lazime bi goşt û de'n bî,*
*2 Şêx û p'îr lazime qenc bî,*
*3 K'êrê bidî situyê dewara xêrê her sunet bî.*

**S. 42** *1 Ger̂ ne sunet kirî,*
*2 Xêra miriya ĥeram kirî,*
*3 Xwedê vê gunê nabexşîne, bê îman kirî.*

**S. 43** *1 Hûn bizanbin ehlêd mirinê,*
*2 E'zîzê min qirarek kire axreta dinê,*
*3 Ĥetanî ciniyaz li male t'u nan naê danînê.*

**S. 44** *1 Mala mirî bê nan bibî,*
*2 Hewarî bi qonaxê cînaran dibî,*
*3 Gunekî girane r̂ex qalibê mirî nanxur dibî.*

**S. 45** *1 Ew k'asê şerabê hûn vedixwin, ne yê Êzîdê Sore,*
*2 Ne jî dak'etiye ji E'rşê jore,*
*3 Ne jî şêx Adî û mêran danîne ser more.*

**S. 46** *1 Ĥalê me êzdiyan îró ĥalê Denûne,*
*2 K'ubariyê qirarêd dîn dikin k'af û kûne,*
*3 Em çi îro unda dikin, êdî venager̂e ji ĉe'van birêĵin hêstir û xûne.*

**S. 47** *1 Şevekê li xevnê E'zîzêm bû dîhare,*
*2 Dengek ji e'zman ser min da hate xare,*
*3 Go: «Evî t'oqî hilgire, xelqê min vegerîn ser r̂iya ĥeq baware!»*

**S. 48** *1 E'zîzê min got: «Rabe, here,*
*2 Çarnikalê diniyayê seranser bigere,*
*3 K'oĉekan r̂ake, qirarêd min bila bigîhînine êzdiyên ĥemû dere!»*

**S. 49** *1 Bêjin: «Ez Xaliqê wanim,*
*2 Bê şirîk û bê hewalim,*
*3 Herĉî êzdiyêd xizmeta min bike, ber dilê wanim!»*

**S. 50** *1 Şev û r̂ojan ez vê fikarê bûm,*
*2 Dayîna Xwedê nuxtê wê sur̂ê bûm,*
*3 Ĥetanî qedem guhast xizmeta ber dergê wê duîê bûm.*

**S. 51** *1 Qewlê min bibihên gelî guhdêra*
*2 Wê ji me derên xwedanê xêra,*
*3 Ser at'qata Êzîdê Sor wê vegerînin cindiya û mêra.*

**S. 52** *1 Werin hûn xweyî nedera,*
*2 Banga Êzîd bînin her dera,*
*3 Tav û Sîn xwedanê zorin, nedine t'u dîndera.*

**S. 53** *1 Dînê me dînekî Ĥeq û R̂aste,*
*2 Kuĉikêd xwe t'u dema nedida guhaste,*
*3 Mayîna me t'enê ser p'işika êzdîtiyê dixwaste.*

**S. 54** *1 Wê derk'evin k'oĉekêd ĥeqîqetê,*
*2 T'emîziya dîn bikine misilĥetê,*
*3 P'êxemberek wê r̂abe bona r̂astiya dinê û axretê.*

**S. 55** *1 Wê k'ivş bin xwedan* nedere,
*2 Paqîjiya dîn wê derînin li dere,*
*3 Êzîd, Tawis, Tav, Hîvê û sitêrka Sibê pîroz kin her dere.*

**S. 56** *1 Wê r̂ojek bê bibe gaziye,*
*2 Êzdî wê xwe dûr xin ji şêx – p'îrêd, xal*-xarziye,
*3 Ber bînaya ĉe'va wê diyar bin k'oĉekêd êzdîxane jê r̂aziye.*

**S. 57** *1 R̂oj bê êzdî wê ji gotinêd e'rebî k'ûvî bî,*
*2 Dîwana dînî bê ĥed û sedî bî,*
*3 Ciyê her pênc t'erîqan yek k'oĉekê şikestî bî.*

**S. 58** *1 Xiyalê dilê min Êzîdê Sore,*
*2 Tawisî Melekê E'rşê jore,*
*3 Tav, sitêra Sibê û Hîva dinê ser more.*

**S. 59** *1 Sê nave, yek Beşere,*
*2 Navê Şems, Tawis, Êzîd sere,*
*3 Ew Xwedayê ĥemû êzdiyayî herî here.*

**S. 60** *1 Sur̂a dînê Êzîdê Sor hildin ĥesêva,*
*2 Mak kin qewla, binîvîsin k'itêva,*
*3 Ji wan ĥerfan hûnê bibînin xoşî, şayî û e'cêva.*

**S. 61** *1 Eva qewla p'ayê Tav û Sîne,*
*2 Ne ji k'itavêd Încîl, T'ewrat û Quran –Yasîne,*
*3 Xwedê ew k'iriyamet dayê, xet û r̂êzêd K'eremê Anqosîne.*

# TELQÎNA MIRIYAN[4584]

Bi t'evahî, li gor bawerî û adetên mislimanan, gava ku mirov dimre, tê şuştin, kefenkirin, binaxkirin û paşê tê telqînkirin. Telqîn jî piştî veşartinê li ser gorê ji hêla xoce yan şêxekî olî ve tê xwendin.
Telqîn bi xwe lave, gotin û zînine olî ne, li her deverekê û li gor her rêolekê (mezheb), pirhindik, ji hev cuda dibin. Lê belê ew bi t'evahî di çarçewa zanîna olî ya derbasbûna miriyan bo cîhana din de digere. Mebest jê ew e, ku kesê mirî bersiva pirsên herdu firîşteyên hesabê gorê (Enker û Nekîr) bi şêweyekî rast bide, û ol û baweriyên xwe yên mislimantiyê yên jiyana xwe ya dinyayê dîyar bike.
Telqîn ne ferza û ne jî sinet e, ew di dema pêxember de tine bû. Loma jî deqeke yeksane û hevgirtî ji telqînê re nîne. Lê belê bi t'evahî, xwendina wê bûye adeteke cihgirtî, naverok û mebest wê jî li ȟemî deveran pir nêzîk hev dibin. Û li navça me -Efrîn- bi piranî ev herdu deqên jêrîn li ser gora miriî tên gotin, telqînek ji mezinan re heye, yek jî nemaze ji miriyê zarok re ye.
Me ev herdu deq ji pirtûkeke kevin wergirtin û wergerandin Kurmancî. Hêviya me ew e, ku xoceyên me telqîna miriyên me bi Kurmancî bikin. Çima na!? Madam Tirk, Ereb û Ecem erkên xwe yên olî bi zimanên xwe dikin, ma çima emê jî wan erkan, û di navde rêw-resmên Telqînê, bi zimanê xwe nebêjin!? Nemaze jî, ew ji hêla milet ve û ji aliyê olî ve jî tê qebûlkirin, û bêguman wê cihê razîbûn û sipasiyê be jî.

# 15. TELQÎNA MIRIYAN

*Bi Navê Xudayê Mihirbanê Dilovan!*

**S. 1** *Ji Xwedayê gewre pêve tu Xwedê tunene, ȟezretî Mihemed pêxemberê Xwedê ye. Xweda yeke, bi tenê û bê hevale, arzî ya wî ye, malavabûn ji wî reye, ew zindî dike û dimrîne, çêxwazî di destê wî de ye û li ser hertiştekî serdare.*

**S. 2** *Xwedayê gewre di Qurana xwe ya pîroz de gotiye: «Her nefsek wê mirinê bibîne, wine berdêla karê xwe jî li roja qiyametê bibînin, kî ji êgir hat dûrxistin û derbas bihuştê bû, serk'eftî dibe. Xweşiya jiyana vê cîhanê tenê ya nefsgirtinê ye. Yê li ba we xelas dibe, lê yê li ba Xwedê dimîne. Ji bilî heyna Xwedê her tiştek fanî ye, destlata wî ye û winê li wî jî vegeȓin. Hertişt li ser zemînê wêran dibe, tenê Xwedayê te yê gewre û bi rûmet dimîne. Tuyê bimirî, ew jî wê bimirin, winê li roja qiyametê li ba Xwedayê xwe bibin dozdarên hev».*

**S. 3** *Ey e'vdalê/e'vdala Xwedê kurê/keça e'vdala Xwedê, ew soz û peymana ku tu li ser wê ji cîhanê derketî û pê diçî warê axretê bibîr wîne û bi zimanekî zelal bêje: «Ji bilî Xwedê tu Xwedê tunene û ȟezretî Mihemed pêxemberê Xwedêye, bihuşt, agir, mirin û gor rast in, Munker û Nekîr rastî ne, pirs û bersiv, hesab û mîzan, gunevedan û lêborîn, ȟewzoyê kewserê û pira Siratê jî rastî ne, ȟeşira mirov û dîtina bawermendan ji Xwedare di bihuştê de rastin, hatina qiyametê û vejandina kesên di goran de rastîne bêgumanin». Tu bi Xwedê wek yek Xwedê bawer dikî, bi ola Îslamê û bi ȟezretî Mihemed jî, nimêj û silava Xweda lê be, wek şande û pêxember, razî bûyî.*

**S. 4** *Ev warê yekê ye ji warên axretê, û warê dawî ye ji warên cîhana fanî. Xwedê di pirtûka xwe ya hêja û pîroz de gotîye: «Me win ji axê afirandin, emê we lê vegeȓînin û careke din ji bo vejînê û hesêb jê derînin».*

**S. 5** *Ey e'vdalê/e'vdala Xwedê, niha du firîşteyên hesêb ên pîroz wê werin ba te, ji wan metirse, bêzar mebe, ew afrande ne ji afrandeyên Xwedê, eger ji te pirsîn û gotin: «Xwedayê te kî ye? Pêxemberê te kî ye? ol, îmam, qulbe û birayên te kî ne?»*

**S. 6** *Bê tirs bêje: «Xwedayê gewre Xwedayê mine, ȟezretî Mihemed pêxemberê mine, Îslam ola mine, Quran îmama mine, Ke'be qulba mine, bawermend û misliman ȟemî birayên minin, ez li ser wê afirîme, li ser wê jîyame û li ser wê jî mirime, bi ya Xwedayê gewre tuyê li ser wan jî werî vejandin û dilrihet bibî».*

[4584] [49] *MEWLÎDA PÊXEMBER*. (rr. 85-91)Dr. Mihemed Ebdo Elî.

**S. 7** *Xweda te li ser gotina rast rawestîne, ((Xweda mirovê bawermend li jiyanê û axretê li ser gotina rast radiwestîne, setemk'aran r̂ê winda yî dike û çi bixwaze wî dike)). Ey nefsa dilrihet, bi dilekî razî li Xwedêyê xwe vegere û derbas be nava perestvan û bihuşta mina bilind û rengîn.*

## 16. LAVA PIŞTÎ TELQÎNÊ

**S. 1** *Xwedawo.. Xoşhevalê bêkesawo, tu her heyî, herdem li ba me yî. Xwedawo, Tu tenêbûna me û wî hêsan bikî, li xerîbiya me û wî dilovan bî, gotina rast jêre bêjî, me jî ji riya rast dernexî, li kêmaniyên me û wî biborî ya Xwedayê gerdûnê.*

**S. 2** *Xwedawo.. Eger ew çêkar bû, çêkariyên wî pir bike, û eger gunehkar bû li gunehên wî bibore.*

**S. 3** *Xwedawo.. Li wî dilovan be, wî biparêzî, lê biborî, warê wî di bihuştê de bilind bikî, dergeh û gora wî fere bikî, bi avê, berfê û zîpikan bişoyî, wekî çawa kirasê sipî ji qirêjê pak dibe tu wî ji gunehan pak bikî, maleka ji mala wî çêtir, xudanine ji xudiyên wî çêtir bidê, wî derbas bihuştê bikî û ji eşa gorê û êşa êgir biparêzî.*

**S. 4** *Selwata Xwedê li seydayê me Mihemed û mal û ĥemû dostên wî be.*

**S. 5** *Ji bo ĥezretî pêxemberê Mistefa, malbata wî, dostên wî, gîyanê miriyên me û miriyên bawermendan,bi taybetî jî ji bo gîyanê miriyê me yê dilovanî El- Faaaatîĥe...*

# ĈAVKANÎ


1. Philip G. Kreyenbroek, Xelîl Cindî Ȓeşo *God and Sheikh Adi are Perfect. Sacred Poems and Religious Narratives from the Yesidi Tradition* Harrassowitz Verlag • Wiesbaden 2005.
2. Xelîl Cindî Ȓeşo *Perin ji e'debê dînê êzdan.* Dohuk 2003
3. Philip G. Kreyenbroek *Yezidism—it's background, observances' and textual tradition.* The Edwin Mellen Press 1995
4. P'îr Xidir Silêman *P'irtûka Êzdiyetî,* Hewlêr 1996
5. М. Б. Руденко *Курдская обрядовая поэзия* М 1982г.
6. C. Celîl, O. Celîl *Zargotina K'urda II* Москва 1978
7. Dr. Mihemed E. Elî *Êzdî û Êzdiyetî* nivîsa k'urdî EFRÎN … 2008
8. Xelîl Cindî Ȓeşo *Du'a u Dirozên Êzidîyan* Einbeck 1997
9. *Ezdaname I* Weşanen Laliş 1
10. *Ezdaname I* Weşanen Laliş 2 Brandenburgerstr. 42 33602 Bielefeld
11. Omarkhali Kh. *Manuscripta orientalia,* vol.15, no.2, 2009 // Names of god and forms of address to god in yezidizm with the religious hymn of the lord.
12. Omarkhali Kh. *Religious Minorities in Kurdistan: Beyond the Mainstream*
13. Omarkhali Kh. Ars Christiana Scrinium: *Journal of Patrology, Critical Hagiography and Ecclesiastical History* 7–8, 2011–2012 Gorgias Press
14. Estelle Amy *LA PASSION DU TRAGIQUE* Université Paris-Ouest La Défense, Ecole doctorale Milieux, cultures et sociétés du Passé et du Présent 2010
15. Vardan Voskanian *IRAN & CAUCASUS*, vol. 3-4, pp. 159-166, Erevan 1999-2000.
16. Азизе Иско. *ЕЗИДЫ. Краткий исторический очерк.*Тбилиси-Ярославль 2001-2004
17. Карам-е Анкоси. "*Фарзе Братйе" у езидов*. Тбилиси 1996.
18. Kovar *Dengê Êzdiyan* (6-7 1997 p 29)
19. *Vejîn,* hejmar 3, Zivistana 1996ê, r. 91-108, Duhok
20. Керим Амоев. *Езиды и их религия*. Тбилиси 2016.
21. Дмитрий Пирбари. *На пути к истине* Тбилиси
22. Feremez Xeribo (Ilyas) http://yeziden.de/forum/
23. Bedel Feqîr Ĥecî http://www.bahzani.net/services/forum/archive/index.php/f-52.html
24. Kemal Tolan. *Mîtolojî û diroka "Kurdên resen" wenda na be*!
25. Pîr Xidir Slêman. Êzidyatî 1996. *Milyaket di bawerîya Êzîdiyan de*.
26. K'eremê Anqosî "*Qewlê qiyametê*" ya êzdiyan. Tbilisi 2010
27. С.А. Егиазаров *Краткий этнографическо- юридический очерк езидов Эриванской губернии* Тифлис 1891
28. Melle Mesîhayê Tirwanşî. *Vejîn*, hejmar 3, *Beyt'a Qiyametê* Zivistana 1996
29. C. Celîl, O. Celîl *Zargotina Kurda* (*Курдский фольклор, книга* 1), Ереван 1978
30. *The American jornel of semitic lenguages and literature*. vol. 25, Chicago and New York 1909
31. Ĥemîdê Bek'irê Ûsiv (ji mala p'îrê Me'bûbî) *Ji xezîna ulmê şêx Adî* T'ilbîs 1998
32. *Dua' û Dirozên Êzidîyan* http://www.bahzani.net/services/forum/archive/index.php/t-56653.html
33. Feremez Xeribo *Qewl û beyt'ên êzidiyan yê pîroz* http://www.kaniya-sipi.de/ku/modules.php?name=News&file=article&sid=1416
34. http://bedel.maktoobblog.com/
35. http://www.ahrata.com/index.php/forum/4-qewle-ezdia-/
36. http://ezipedia.de/religioese-texte/
37. http://www.kaniya-sipi.de/
38. http://www.kurdist.ru/index.php?option=com_content&task=view&id=70&Itemid=99999999
39. http://www.ezdixandi.com
40. http://www.ezdixane.ru/
41. http://www.ezdixane.ru/
42. http://www.eziden-celle.de/html/_eziden/
43. http://www.pec-celle.de
44. http://ezipedia.de/religioese-texte/
45. http://revsha-ezdia.ucoz.ru/blog/
46. http://www.yezidi-european-society.de/
47. Reşad Bêcirmanî. *Şêx Fexrê AdIyan filosuf û xasê ola êzdiyatîyê* Mala êzdiyan, Duhok 2011
48. Bedel Feqîr Ĥecî *Bawerî û Mîtologiya Êzidîyan. Cendeha Têkist û Vekolîn*. Duhok 2002
49. Dr. Mihemed Ebdo Elî *Mewlîda P'êxember*. Ȓastanîna zimanî û veguhastin ji tîpên osmanî. Eferîn. 2014

50. Sileman Cafer *QEWLÊN ÊZDIYAN* 2017
51. Şemo Qasim Dinanî *Cend Tekisten Piroz yên ola Êzdiyan* - I Duhok 2013
52. Şemo Qasim Dinanî *Cend Tekisten Piroz yên ola Êzdiyan* - II Duhok 2013
53. Hecîyê Cindî *KILAMEN CIMETA KURDA* YEREAN, WEANXANA LÎMÛŞ 2008
54. Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî *AYÎN Û QIRARÊ DÎNÊ ÊZDÎTIYÊ* T'ilbîs 2001
55. Berivan Can Emmez *AWAZÉ TAWUS: AŞK VE YAS BATMAN EZİDİLERİNİN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE ETNOGRAFİK YAKLAŞIMLAR* Ankara – 2018

# NAVEROK


**ВСТУПИТЕЛЬНОЕ СЛОВО** ………………………………………………… 4
**I. QEWL** …………………………………………………………………………… 5
**BAWERÎ Û PESNANDIN**
1. QEWLÊ TAWISÎ MELEK’ şaxê 1(1–2) – 2 ……………………………………. 6
2. MEDHÊ XWEDÊ şaxê 1–3 ..……………………………………………..….. 10
3. QEWLÊ P’ADŞAY – QEWLÊ XWEDANEN ………………………………… 16
4. QEWLÊ SENA ………………………………………………………………… 21
5. QEWLÊ MERSUMA CEBÊRE ………………………………………………… 22
6. QEWLÊ ÇARŞEMBÊ – BEYT’A NESÎĤETÊT ÇARŞEMBÛYÊ …………….. 30
7. QEWLÊ ÇARŞEMA SOR ...…………………………………………………… 34
8. QEWLÊ XWEDANÊ MALÊ ..………………………………………………. 35
9. QEWLÊ ÎMANÊ şaxê 1–2(1-3) ……………………………………………… 36
10. QEWLÊ NASIRDÎN – QEWLÊ ÎMANÊ şaxê – 3 ……………………………. 46
11. QEWLÊ DUȒA ………………………….……………………………… 51
12. QEWLÊ SUȒA ..…………………………………………………………….. 53
13. QEWLÊ K’ASA ……………………………………………………… 55
14. QEWLÊ T’EXTE ..……………………………………………………………… 59
15. QEWLÊ BEĤRA (1–4) ..…………………………………………………….. 62
16. QEWLÊ ILMÊ NADIR ..…………………………………………………… 71
17. QEWLÊ BÊ Û ELÎF ………………………………………………………. 72
18. QEWLÊ HERÎ BERÊ KU BÛ? ……………………………………………….. 73
19. QEWLÊ QERE FURQAN şaxê 1–2 (1–2) ..………………………………… 75
20. QEWLÊ QENDÎLA ……………………………………………………… 83
21. QEWLÊ SEFERÊ (1–3) ……………………………………………………… 86
**E’FRANDINA QINYATÊ**
22. QEWLÊ ZEBÛNÎ [DIL] MEKSÛR (1–4) ……………………………………… 93
23. QEWLÊ E’FRANDINE QINYATÊ ……………………………………….. 104
24. QEWLÊ E’FIRÎNA DINYAYÊ ..……………………………………………. 108
25. QEWLÊ NIJYAR ...……………………………………………………………... 111
26. QEWLÊ ŞÊXÛ BEK’IR – I (1– 5) ……………………………………….. 115
27. QEWLÊ HERÊ BERÊ K’O BÛ?! ……………………………………….. 123
28. QEWLÊ MELIK SALIM ..…………………………………………………. 125
29. QEWLÊ QIYAMETÊ – QEWLÊ T’ERCAL şaxê 1(1–2) – 2 ………………… 126
30. QEWLÊ ĤEZAR Û YEK NAVA ……………………………………………… 131
31. QEWLÊ SILAV, SILAVÊD CEBÊRE (1–2) ..………………………………… 135
**NESÎĤET**
32. QEWLÊ MEHA ……………………………………………………………….. 140
33. QEWLÊ GAY Û MASÎ ..……………………………………………………….. 147
34. QEWLÊ E’RD Û E’ZMAN (1–3) ……………………………………………… 151
35. QEWLÊ NEFSÊ ..…………………. ……………………………………... 159
36. QEWLÊ ÎMAN BI ÇI NÎŞANA? ……………. ………..……………….. 161
37. QEWLÊ NEFS Û AQIL (QEWLÊ SIBEKÊ JI TÊT E’DEVIYA–QEWLÊ AXRETÊ) 163
38. QEWLÊ MIŞT’AQÊ SÊ BORIM …………………………………………… 172
39. QEWLÊ AŞÊ MUĤBETÊ (1–2) …………………………………………… 175
40. QEWLÊ ȒIMÊ ȒASTIYÊ …………………………………………………… 179
41. QEWLÊ ÇAKÊ ME BI SERDA ..………………………………………… 180
42. QEWLÊ DERWÊŞ QAT’ANÎ (1–2) ...…………………………………….. 183
43. QEWLÊ ABÛ BAK’IRÊ OMERA şaxê 1–2 ..…………………………….. 188
44. QEWLÊ DÎYA ŞÊX MUS ……………………………………………………… 193
45. QEWLÊ DERWÊŞ ĤEBÎB şaxê 1–2 ………………………………………. 194
46. QEWLÊ LAWÊ P’ÎRAN (1–2) ……..……………………………….. 198
47. QEWLÊ ĤESEDÊ IL-T’EWRÎ ………………………………………………… 210
48. QEWLÊ MISKÎNO JARO (1–4) ..…..…………………………………… 213
49. QEWLÊ SILAVÊT MELIKÊ K’ERÎM ……………………………………… 221
50. QEWLÊ MERSUMA BORÎ ………………………………………………… 225
51. QEWLÊ ÇI SIBEYEK TARÎYE (1–2) ……………………………………… 227

52. QEWLÊ XAFILÊ BÊ NASÎN ………… 231
53. QEWLÊ BÊGOYE (1–2) ………… 233
54. QEWLÊ BEDÎLA SINĤET K'AMILA ………… 238
55. QEWLÊ HEVSARÎ ………… 239
56. QEWLÊ ŞÊXÊ SIRÎ ………… 242
57. QEWLÊ ŞEQE SERÎ şaxê 1–2 ………… 243
58. QEWLÊ DAYÎK Û BABA ………… 251
59. QEWLÊ ŞÊX Û AQÛBÊ MÛSA ………… 253
60. QEWLÊ T'ELPÛN Û SE'EDÛN ………… 276
61. QEWLÊ GÊLA ÇAR ZIMAN ………… 278
62. QEWLÊ XEWRÊ ………… 280
63. QEWLÊ XILMETÊ ………… 282
64. QEWLÊ MUHRA MÊRA ………… 284
65. QEWLÊ SEBRÊ ………… 287
66. QEWLÊ CIVATÊ ………… 288
67. QEWLÊ CIMA' CIMAE'TA ………… 290

**OL Û ERK'AN**

68. QEWLÊ PIŞT P'ERDA ………… 292
69. QEWLÊ MIZGÎNÎYÊ – QEWLÊ MIZGÎNA MÊRA şaxê 1–2(1–2) ………… 294
70. QEWLÊ E'SASÊ ………… 300
71. QEWLÊ MIRÎDIYÊ (1–2) ………… 303
72. QEWLÊ ŞÊXÛ BEK'IR – II(1–3) ………… 307
73. QEWLÊ XERQE (1–3) ………… 315
74. QEWLÊ BORÊT FEQÎRA ………… 318
75. QEWLÊ DERWÊŞA ………… 321
76. QEWLÊ K'OĈEKA (1–3) ………… 323
77. QEWLÊ BAZA — QEWLÊ P'ÎR ŞEREFÎ MÊRAVÎ ………… 325
78. QEWLÊ MIŞATÊ ………… 328

**ĤELAL KIRIN**

79. QEWLÊ BISK BIRÎNÊ ………… 331
80. QEWLÊ SER MIRÎ ………… 331
81. QEWLÊ BERÎ ŞÛŞTINÊ ………… 332
82. QEWLÊ SERE MERGÊ şaxê 1(1–4) –2 ………… 333
83. QEWLÊ T'ERQÎNÛ YASÎN şaxê 1–3 ………… 353
84. QEWLÊ T'ERQÎNE şaxê 1–2 ………… 356

**SILT'AN ÊZÎD**

85. QEWLÊ SILT'AN ÊZÎD Î MEZIN ………… 358
86. QEWLÊ SILT'AN ÊZÎD Î BIÇÛK ………… 367
87. QEWLÊ JI HINDAVE ÇÛME BANÎ ………… 368
88. QEWLÊ DI E'MIREKÎ DA MAME (1–2) ………… 372
89. QEWLÊ ÊZÎDÛ MEDHÊ (1–4) – QEWLÊ GUL E'MELÊ ………… 378
90. QEWLÊ EZDA – QEWLÊ ÊZDÎD ………… 385
91. QEWLÊ ÊZÎD ………… 389
92. QEWLÊ ÊZDÎNE MÎR ………… 391
93. QEWLÊ ŞIRURA ………… 393
94. QEWLÊ MAKÊ ………… 397
95. QEWLÊ QAZÎ ESKER ………… 399
96. QEWLÊ P'ÎR HESEDÊ BOZ ………… 401
97. QEWLÊ E'REB BEGÎYA – QEWLÊ ŞÊX E'REBBEGÎ INT'ÛZÎ ………… 402
98. QEWLÊ YAZÎD ÎBN MAVÎ (Gotina şêx Îsn) ………… 406

**ŞÊX ADÎ**

99. QEWLÊ ŞÊX ADÎ Û MÊRA (1–2) ………… 408
100. QEWLÊ BI ŞÊX ADÎ XILASIM ………… 415
101. QEWLÊ K'ENIYA MARA — QEWLÊ ŞÊX ADÎ ŞÊXÊ ŞARANE (1–2) ………… 417
102. QEWLÊ XAN QUBAD ………… 423
103. QEWLÊ MALA BAVA ………… 427
104. QEWLÊ XWEŞ MALA BABA şaxê 1 (1–3) – 2 (1–2) ………… 429

**XASÊ ŞÊX ADÎ**

105. QEWLÊ ĤEMEDÊ BABA (1–2) ………………………………………………. 439
106. QEWLÊ P'ÎRÊ DAWIDÊ XERBENDE ……………………………………… 443
107. QEWLÊ QADÎ BILBAN (1–3) ……………………………………………… 445
108. QEWLÊ MELLE ABÛ BEK'IR ……………………………………………….. 450
109. QEWLÊ TEKSTÊ ..…………………………………………………………….. 452
**ŞÊX SIN**
110. QEWLÊ MELEK ŞÊX SIN – QEWLÊ SILAV Û SED SILAV şaxê 1–2 ……… 453
111. BERVEDANA QEWLÊ BORE-BORÊ — QEWLÊ FIWARA MELIK ŞÊX SIN .. 459
112. QEWLÊ B0RE BORÊ (1–3) ……………………………………………………. 460
113. QEWLÊ ŞÊXÊ ĤESENÎ SILT'ANE şaxê 1–2 …………………………….. …… 467
114. QEWLÊ CELWÊ ……………………………………………………………… 473
**ŞÊX ŞEMS**
115. QEWLÊ ŞÊX ŞEMS (MESTIM JI QEDEHÊ) ...……………………………… 475
**ŞÊX FEXREDÎN**
116. QEWLÊ ŞÊX FEXRÊ ZERGUN ……………………………………………… 480
117. QEWLÊ SILAVÊT CARA – QEWLÊ SIAVÊT JARA ……………………… 481
118. QEWLÊ SILAVÊT MELIK FEXREDÎN (1–2) ……………………………….. 487
119. QEWLÊ MELEK FEXREDÎN (1–6) ………………………………………….. 493
**ŞÊX MEND**
120. QEWLÊ GÊLA ŞÊX MEND ……………………………………………………….. 512
121. QEWLÊ ŞÊX MEND Û GÊLA ……………………………………………….. 513
122. QEWLÊ BEDIR Û MEND (1–2) ……………………………………………… 517
**ŞERFEDÎN**
123. QEWLÊ DU ŞAX …………………………………………………………… 522
124. QEWLÊ ŞERFEDÎN şaxê 1(1–3) –2 …………………………………… 527
**MÊR-MELEKÊ ÊZDÎYAN**
125. QEWLÊ MÎR MEHEMEDÊ K'URDÎ ..………………………………………… 537
126. QEWLÊ SITÎYA ÊS ...…………………………………………………………. 538
127. QEWLÊ MISKÎN T'AJDÎN (1–2) ……..………………………………………… 541
128. QEWLÊ OMER XALA Û ĤESEN ÇINARÎ (1–3) '………………………….. 552
129. QEWLÊ K'OFA (QEWLÊ P'ÎRÊ LIBNANE) (1–3) ...……………………… 559
130. QEWLÊ ĤESENÊ CÊLÊ ...…………………………………………………… 562
**MÊR-MELEKÊ QURANÊ**
131. QEWLÊ NUĤ P'ÊẌEMBER ……………………………………………… 564
132. QEWLÊ EYÛB P'ÊẌEMBER ……………………………………………… 566
133. QEWLÊ ÛSIFÊ NEBÎYA ..……………………………………………………… 567
134. QEWLÊ MÛSA (1–3) ..……………………………………………………… 570
135. QEWLÊ MÛSA P'ÊẌEMBER Û XIDIRÎ ZÊNDE (1–2) …………………… 574
136 QEWLÊ GELÎYÊ MARÎ ……………………………………………………… 577
**QEWLÊ JI ĈÎROKA BIRAHÎM XELÎL Û NEMRÛD** …………………….. 580
137. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER Û NEMRÛD ……………………………... 576
138. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER Û NEBÎY SIMAÎL (1-2) ………………….. 587
139. QEWLÊ NEBÎY SIMAÎL (1-2) ..…………………………………………… 595
140. QEWLÊ BIRAHÎM P'ÊẌEMBER ……………………………………………… 599
141. QEWLÊ CUMCUMÎ SILT'AN ……………………………………………… 602
**MÊR-MELEKÊ SAFÎYE**
142. QEWLÊ ȒABIYA IL-EDEWIYE ………………………………...…………... 605
143. QEWLÊ DENUNÊ MISRÎ ..……………………………………………………. 608
144. QEWLÊ MÎR BIRAHÎM …………………………………………………………… 609
145. QEWLÊ DERWÊŞ ADEM – BEYT'A DERWÊŞ ADEM ………………………. 613
146. QEWLÊ ĤUSÊYÎNÎ ĤELAC şaxê 1–2 ..……………………………………… 618
147. QEWLÊ DOTA QADÎYÊ BESRAYÊ (1–2) ..…………………………………. 623
148. QEWLÊ MALÛ MÊRA ……………………………………………………… 629
**II. BEYT'** …………………………………………………………………… 631
1. BEYT'A ŞÊX ADÎ . ………………………………………………………… 632
2. BEYT'A KANYA SIPÎ ..……………………………………………………… 633
3. BEYT'A ŞÊX Û P'ÎRA ..………………………………………………………. 634
4. BEYT'A P'ÎRA ……………………………………………………………… 635

5. BEYT'A DERWÊŞA ………… 636
6. BEYT'A BAZA şaxê 1–2 ………… 638
7. BEYT'A CINDÎ — LAVA ŞIFAQÊ şaxê 1–2 ………… 642
8. BEYT'A ŞERSFEDÎN ………… 648
9. BEYT'A ŞÊX ŞEMS — BEYT'A SIBÊ şaxê 1(1–2) –2 ………… 648
10. BEYT'A ŞÊX MENDÊ GÊLÊ ………… 654
11. BEYT'A ŞÊX ALÊ ŞEMSA (1–4) ………… 658
12. BEYT'A ŞÊX AL ………… 668
13. BEYT'A FENDA BERÊ SIBÊ (GOVENDA ŞÊX ALÊ ŞEMSA) ………… 668
14. BEYT'A ĤESENÊ CÊLÊ ………… 669
15. BEYT'A NISRA ………… 671
16. BEYT'A MÎR MIH şaxê 1–3 ………… 674
17. BEYT'A GILAVÎ (1–3) ………… 678
18. BEYT'A NESÎĤETA — HEGAN TU P'ADŞAYÎ ………… 683
19. BEYT'A ŞÊWRA — JANDILA ŞÊWRAN ………… 691
20. BEYT'A MÊZÎNÊ ………… 694
21. BEYT'A SERAFÊ HINDÎYE ………… 695
22. BEYT'A BEĤRÊ ………… 696
23. BEYT'A HÊVARÎ (HÊVARE DEST) ………… 698
24. BEYT'A MÛSA P'ÊẌEMBER ………… 700
25. BEYT'A EYÛB P'ÊẌEMBER ………… 701
26. BEYT'A BILBILÊ şaxê 1(1–4) – 2 ………… 703
27. BEYT'A SILÊMAN P'ÊẌEMBER Û BÛM ………… 714
28. BEYT'A ȒABIYÊ — JANDILA ȒABIYÊ ………… 716
29. BEYT'A SÊVANA K'ESK ………… 721
30. BEYT'A ZEMBILFIROŞ ………… 722
31. BEYT'A DINÊ ………… 725
**III. JANDIL** ………… 728
1. JANDILA LAVIJÊ PÎRÊ şaxê 1–2 ………… 729
2. JANDILA MENDO ………… 731
3. JANDILA ŞÊX ŞEMS ………… 731
4. JANDILA ŞÊX SIN ………… 734
5. JANDILA SER MIRÎ (1–2) ………… 736
**IV. QESÎDA** ………… 738
1. QESÎDA ȒABIYA EDEWIYE (1–2) ………… 739
2. QESÎDA NADIMÎ ………… 744
3. QESÎDA COPAN ………… 745
4. QESÎDA SIBĤANE JI TE MELIKÊ EKBER ………… 745
**QESÎDÊ SÊXANIYAN**
5. QESÎDA ADÎYA ŞÊXÊ MINE ………… 747
6. QESÎDA AMEDÎN ………… 748
7. QESÎDA SÊX BABIK ………… 749
8. QESÎDA NASIRDÎN ………… 749
9. QESÎDA SICADÎN ………… 749
10. QESÎDA ŞERFEDÎN ………… 750
11. QESÎDA SÊX ALÊ ŞEMSA ………… 751
12. QESÎDA SÊX CENCER ………… 752
13. QESÎDA SÊX E'BDILQADIR ………… 753
14. QESÎDA SÊX MEND ………… 753
15. QESÎDA ŞÊXÊ ĤESENÎ SILT'ANE ………… 754
16. QESÎDA SÊX SIN (QESÎDA KES NE TÊ) — BEYT'A ŞÊX ÎSN ………… 755
17. QESÎDA ŞEMSÊ T'EWRÊZÎ ………… 758
18. QESÎDA ŞEMSEDÎN Û FEXREDÎN ………… 759
19. QESÎDA ŞÊXÛ BEK'IR ………… 759
20. QESÎDA E'BDALÊ ŞEMSA (QESÎDA XATÛNA FEXRA) ………… 760
**QESÎDÊ P'ÎRANIYAN**
21. QESÎDA ALUBEK'IR ………… 761
22. QESÎDA ÎSIBIYA ………… 761

23. QESÎDA ĤACÎ MIĤEMED ………………………………………………… 762
24. QESÎDA HACYAL ..…………………………………………………….. 763
25. QESÎDA HASNALEKA ………………………………………………… 763
26. QESÎDA ĤECÎ E'LÎ ..………………………………………………………….. 764
27. QESÎDA MEMÊ ŞIVAN ………………………………………………………… 764
28. QESÎDA QEDÎ BILBAN ...………………………………………………… 765
29. QESÎDA ĤESIN MAMAN ………………………………………………… 765
30. QESÎDA MEĤMEDÎ R̂EBAN ……………………………………………….. 766
31. QESÎDA MEĤMED R̂EŞAN ………………………………………………………. 767
32. QESÎDA P'ÎRÊ CERWA ..………………………………………………… 768
33. QESÎDA P'ÎRÊ K'EMAL ………………………………………………… 770
34. QESÎDA P'ÎR MEHMED (P'ÎR AFAT) – XETÎ PISÎ ..………………………… 770
35. QESÎDA ÊK SIWAR ……………………………………………………… 770
**V. DUA', DIR̂OZA** ………………………………………………………… 772
1. DIR̂OZA şaxê 1–3 ………………………………………………………… 773
2. DUA' – DIR̂OZA ………………………………………………………….. 781
**DUA'YÊT P'ERWESTIN Û BI R̂OJ Û ŞEVÊVE DI GIRÊDAYÎ**
3. DUA'YA PIŞT GIRÊDANÊ ..……………………………………………… 783
4. DUA'YA FECRÊ — DUA'YA ŞIFAQÊ ……………………………… 783
5. DUA'YA SIBÊ ..………………………………………………………….. 785
6. DUA'YA SIP'ÊDEHÊ ……………………………………………………… 789
7. DUA'YA NÎVRO şaxê 1–2 ..………………………………………… 790
8. DUA'YA ÊVARÊ …………………………………………………………… 791
9. DUA'YA [BERÎ] R̂AZANÊ ………………………………………………… 793
10. DUA'YA R̂OHILATÊ ……………………………………………… 794
11. DUA'YA R̂OAVAYÊ ………………………………………………… 795
12. DUA'YA DI R̂OJÊ ………………………………………………………… 798
13. DUA'YA HEYVÊ …………………………………………………………… 798
14. PAŞDUA' ……………………………………………………………… 799
**DUA'YÊT ĈARESER KIRNA ÊŞ Û DERDAN**
15. DUA'YA KÊMA HEYVÊ ..……………………………………………... 799
16. DUA'UA NEZERÊ şaxê 1–2 ..…………………………………………….. 799
17. DUA'YA DÛPIŞK Û MAR ..……………………………………………… . 800
18. DUA'YA XATÛNA FERXRA ………………………………………………. 800
19. DUA'YA STÊRA DEMBILQAP'ÎYÊ ………………………………………. 801
**DUA'YÊT BAWERÎYÊ Û PESNANDINÊ OCAXA**
20. DUA'YA MEZIN ..…………………………………………………… 801
21. DUA'YA ÎMANÊ ………………………………………………………… 803
22. DUA'YA XWEDANÊ MALÊ ..…………………………………………… 805
23. DUA'YA TAWISÎ MELEK' ……………………………………………… 806
24. DUA'YA T'EMEDÎYA ŞÊX ADÎ ……………………………………… 808
25. DUA' EZÎ ÊZDÎME ………………………………………………………… 808
26. DUA'YA ÊZDÎYATÎYÊ ..………………………………………………………. 808
27. DUA'YA SI'ÛRA ………………………………………………………… 810
28. DUA'YA ŞÊXÎTÎYÊ ……………………………………………………… 810
29. DUA'YA P'ÎRANÎYÊ ..…………………………………………………… 812
30. DUA'YA MIRÎDÎYÊ ..……………………………………………………… 813
31. DUA'YA MIRAZÊ ..……………………………………………………... 815
32. DUA'YA ZÎYARETBÛN …………………………………………………… 816
**DUA'YÊT ME'RÎFET Û ERK'ANAN**
33. DUA'YA ME'RÎFETÊ ……………………………………………………… 817
34. DUA'YA SEBRÊ ..……………………………………………………… 819
35. DUA'YA T'IFAQÊ ……………………………………………………… 821
36. ATQAN …………………………………………………………………… 822
**DUA'YÊT SIMBALÊT ÊZDÎYAYÊT PÎROZ**
37. DUA'YA XERQÊ (1-2) …………………………………………………... 822
38. DUA'YA DAMANA XERQÊ ……………………………………………… 825
39. DUA'YA T'OQÊ şaxê 1–2 ……………………………………………… 825

40. DUA'YA MEHIKÊ (ȒISTÊ) ………… 827
41. DUA'YA MEFT'ÛLÊ ………… 827
42. DUA'YA MORKIRINÊ ………… 827
43. DUA'YA BISKÊ — LAVA BISKÊ ………… 828
44. DUA'YA MAR BIRÎNÊ şaxê 1–3 ………… 829

**DUA'YÊT ĤELALBÛN Û BEREK'ETÊ**

45. DUA'YA FITARA ………… 830
46. DUA'YA SIFRÊ (XWERINÊ) şaxê 1–4 ………… 830
47. DUA'YA BERÎ QURBAN DAYÎNÊ ………… 833
48. DUA'– DIȒOZINGA ÊZDIYA SER NONÊ XÊRÊ (QURBAN DAYÎNÊ) ………… 833

**DUA'YÊT SILAMETIYA HATIN Û ÇÛYÎNÊ**

49. DUA'YA JI MAL DERK'EFTIN ………… 834
50. DUA'YA OẌIRÊ (1–2) ………… 838

**DUA'YÊT LI SER MIRÎYAN**

51. DUA'YA DI SER GÎYANÊ MIRÎ ………… 839
52. DUA'YA T'ESMÎLÎ E'RD şaxê 1–6 ………… 840
53. DUA'YA SILAVA ZEHMANÎ (TELQÎN) ………… 842
54. FATĤE ………… 842

**VI. ŞEHDA DÎNÎ** ………… 844
DUA'YA ŞEHDA DÎNÎ ………… 845
şaxê – 2 ………… 846
şaxê – 3 ………… 846
şaxê – 4 ………… 847
şaxê – 5 ………… 848
şaxê – 6 ………… 848
şaxê – 7 ………… 850
şaxê – 8 ………… 850
şaxê – 9 ………… 851
şaxê – 10 ………… 852
şaxê – 11 ………… 852
şaxê – 12 ………… 853
şaxê – 13 ………… 854
şaxê – 14 (ŞEHDETYA SIVÊ) ………… 854

**VII. XIZÊMOK** ………… 856
şaxê – 1 ………… 857
şaxê – 2 ………… 858
şaxê – 3 ………… 859
şaxê – 4 BEYT'A HEYÎ MALE (1-2) ………… 860
şaxê – 5 BEYT'A HEYÎ MALÊ ………… 863
şaxê – 6 BEYT'A ẌERÎBO ………… 864

**VIII. PAYÎZOK** ………… 866
RINDE GIRAVÎ ………… 867

**IX. ȒOBARÎN** ………… 869

**X. NIYAZ** ………… 871

**XI. GILIYÊ XWEDÊ NASÎ Û BI TIRS** ………… 878

**XII. K'ITÊBA CELWE** ………… 885

**XIII. K'ITÊBA MESHEFA ȒEŞ** ………… 890

**XIV. ZÊDEYÎ** ………… 895
1. QEWLÊ QAHFÊ CIMCIMO ………… 896
2. QEWLÊ MESIHÎ ………… 898
3. QEWLÊ ZERDEŞT ………… 902
4. QEWLÊ P'ÎRÊ SÎBA ………… 905
5. QEWLÊ NEWRAZÊ ………… 908
6. BEYT'A QIYAMETÊ — T'EMET, HAZA, QEWLÊ QÎYAMETÊ ………… 910
7. BEYT'A DINÊ ………… 931
8. BEYT'A ŞE'RÊ ………… 937
9. BEYT'A E'LÎ ŞÊRÊ XWEDÊ ………… 942
10. BEYT'A ÎBRAHÎMÊ BIRA ………… 946

11. BEYT’A MIRINE NEBÎYÊ OMETÊ (1–2) ………………………………… 948
12. BEYT’A ŞÊXÊ SENA’N ..……………………………………………………… 953
13. BEYT’A ŞÊX XELO ………………………………………………………… 957
14. QEWLÊ ĤEQÎQETÊ ……………………………………………………………. 959
**TELQÎNA MIRIYAN** ...…………………………………………………………… 964
15. TELQÎNA MIRIYAN ……………………………………………………………….. 964
16. LAVA PIŞTÎ TELQÎNÊ …………………………………………………………… 965
**ĈAVKANÎ** ………………………………………………………………………… 966
**NAVEROK** ………………………………………………………………………… 968



**Xwedêyo, te ne daye, û ne babe, û ne tevale!**
**Ĥemû tișt yî betale bê řoja Xwedê Te'ale!**
**Xwezka bi wî êzdî bit, dua'ya, û beyt'a, û qewla,**
**Ji xweřa bikite řastemale!**

(ji qewlê mersuma Cebêre)